# Ferhenga Kamêran

Xwediyê Imtiyazê
**Hafiz Qazî**

Sernivîskar
**Mueyed Teyib**

Mafê çapkirinê
parasti ye

**Adrês**
Êraq – Kurdistan
Duhok
Avahiye yekîtiya
sendikayên karkerên
kurdistanê
Qatê sêyem

Tel. 7225376 - 7222125

www.spirez.org
www.spirezpage.net

- **Jimara weşanê**: (152)
- **Navê pirtûkê**: Ferhenga Kamêran
- **Danan:** Kamêran Silêman Botî
- **Derhênana hunerî:**Nazdar Cizîrî
- **Berg**: Beyar Cemîl
- **Serperiştkarê çapê:** Zagros Mahmûd
- **Çapa:** êkem
- **Tîraj:** (1000) Dane
- **Jimara Sipardinê:** (      )  li sala (2006)
- **Çapxaneya Wezareta Perwerdeyê/Hewlêr**
- **Weşanxaneya Spîrêz**

دار سپيرێز للطباعة والنشر

SPIREZ PRESS & PUBLISHER

# FERHENGA KAMÊRAN

## kurdî- kurdî

**Danan**
**Kamêran Silêman Botî**

2006

# Naverok

**Pêşgotinş** ………………………………… 7

**Jibo çi ferhenga kurdî- kurdî û bi rênivîsa latînî** ……………………..……... 11

**Kurtkirin** ……………………….……... 19

**Jêder** ……………………………………… 29

Pîta A …………………………………….. 31

Pîta B …………………………………….. 51

Pîta C ……………..………………..….. 123

Pîta Ç ……………….……………..….. 141

Pîta D …………………………………….. 167

Pîta E ………………………..……...….. 229

Pîta Ê ………………………..……….... 241

Pîta F ………………………..……….…. 247

Pîta G …………………………….…..….. 259

Pîta H ……………………….……….…. 299

Pîta I ……………………..……..…….. 337

Pîta Î ……………………..……..…….. 339

Pîta J ………………………..…..…….. 343

Pîta K …………………………………….. 353

Pîta L …………………………...……….. 407

Pîta M ………………………….....………. 423
Pîta N ……………………….…….…..…….. 453
Pîta O ……………………….…….…..…….. 481
Pîta P ………………………..……..…….. 485
Pîta Q ………………………….………..….. 543
Pîta R …………………….…………..….. 565
Pîta S ……………………………….…..... 595
Pîta Ş …………………………..…..…….. 635
Pîta T …………………………..…..…….. 663
Pîta U ………………………….………..….. 669
Pîta û ……………………...………..….. 701
Pîta V ………………………….………..….. 703
Pîta W ……………………...…………..…. 713
Pîta X ………………………….………….... 723
Pîta Y ………………………….………..….. 751
Pîta Z …………………..…………..….. 755

# Pêşgotinş

Her ji zarokînîyê, min pir hez ji zimanê xwe yê zikmakî di kir û hêjta ez ne çûbûm çi xandingehan, li mala me gelek kitêbên helbest, çîrok, zanistî hebûn dema birayên min yên mezin bo me di xwandin û wêne nîşa me di dan, min gelek keyf pê di hat û bawer ne di kir kanê kengî dê rojekê bi çim qutabxanê ez jî mîna wan dê çîrok helbestan bi xwînim.

Li destpêka jiyana xwe ya xandinê dema me wane bi zimanê kurdî di wrgirtin û mamostayî bo me şirove di kir û navên giyandar, mirov, ber, dar û çiya bi kurdî di gotin, me hest bi xweşî û dilgermîyê di kir.

Dema ez fêrî zimanên dî di kirim, min di viya hemberî her peyveka biyanî, yeka kurdî danim, gelek caran heger ew peyv min ne zaniba da pisyara êkê şareza kem, yan jî şirovekirinekê dabo darêjim.

Li qonaxên navincî û amadeyî, dema rijêmê pêkol di kir li xandingehan êdî zimanê kurdî ne mîne, pitir gêwilê min kevt ser, min pitir pûte di da waneyên bi kurdî ji yên erebî, jiber girev û dijwestana qutabîyan, rijîm neçar bû dubare wan waneyên kirîn erebî bi ke kurdî ve.

Herdem di xwast peyvên kurdî kom kem û zimanê xwe bi hêz bi kem. Gelek caran li xandingehê (Birayetî) qutabîyan berîkana peyv û bijavtina zimanê kurdî di kirin û li ber hev di rawesta bûn kanê kî dê peyvên biyanî, nemaze erebî di nav gotinên xo da bi kar bînit da pêkeve berdenê û tiranan pê ken.

Li gund û dîwanxanan min gelek guhdarîya pîrejin û pîremêran di kir, dema mamik, pend û stiran di gotin û peyvên nû demildest min li ser kaxezê di nivîsandin dako ji bîra min neçin.

Herwesa gelek guhdarîya bernameyên îzgeha kurdî ya Bexda di kir.

Li çend salên pêşmegatîyê min bi hizaran peyvên şirîn yên kurdî li gundan û deverên cuda yên Kurdistanê ji zardevê gundîyan di wergirtin û li salnameyên xwe yên berîkê di nivîsan û xirve di kirin û hingî hêrve min rênivîsa latînî dest pê kir, jiber ko min ne dixwast têbînî û nivîsên min kes bi xwîne, evê çendê ez paldam ko êdî rênivîsa bi pîtên latînî ez ji xwe ra bi kim bingeh.

Serdemê xwandina zanîgehê li derve, nemaze li Sovyetî û Holenda tiştê herî nexweş û ez pê di herişîm dema qutabîyên kurd ji Kurdistana îraq û surîyê ferheng û zimanê erebî bi kar di hînan, yên îranê bi farisî û yên Turkya bi turkî, gelek caran tirane jî bi me di kirin dema me di go, em bi kurdî hosa di bêjin yan ev peyve kurdîye!. Min di xwast mîna her kesekê biyanî, mina ereb û gelên din ferhengeka zimanê kurdî heba, lê mixabin, nebûn, jiber hindê heger her ferhengek min ji bêgavî bi kar bi anîba, min pêkol di kir û hizira xwe di kurdîkirina wan zaravayn di kir û bi zamanê kurdî hemberê zimanên biyanî ramana peyvan di nivîsî û nîşa hevalên xwe di da ko mejî ziman û çanda xwe heye ji çi zimanên dî kêmtir nîne, eger zengîntir jî nebit û rênivîsa me ne pîtên erebî yan silavî ne, lê latînî û taybetîye û xweserîya kurdî ye, zimanê me ne bermayê zimanên turkî, erebî û farisî!.

Piştî serhiladana biharê û azadbûna pişkeka mezin ji Kurdistanê, pûtekê mezin bi zimanê kurdî hat dan bi kurdîkirina xandina piranîya xandingeh, peymandgeh û zanîngehan, avakirin û danana hijmareka mezin ya radyo û kenalên telvizyonî ko di xizmeta pêşvebirina çand, dîrok û zimanî da ne, danana çendîn zandorên zimanî li bajêrên kurdistanê.

Lê bi hizir a min hêjta wek pêdvî giringî bi vî warî ne hatî ye dan wek warên dî, mîna avedanî tenahîyê. Jiberko ziman bingehê her tiştî ye, pêwîste pûtekê gelek mezintir pê bi hêt dan, li dezgeh û rêvebirîyan bi awayekê rast û dirist bi hêt bi kar anîn , heger bi vî destûdarî bi rêve bi çit, dê zimanê kurdî wek zimanê farisî leng bi be.

Mixabin nxweşîyek kevin di nav çîna rewşenbîr da belave, ewjî bi kar hînana peyv û zaravayên biyanî nemaze erebî, gelek caran dema mirov guhdarîya werzişvanekî li kenalên televizyonî yan

îzgehan di ket, yan jî fermanberê rêvebirîyekî, axivtina wî nîvnîveye ji peyvên erebî eger pitir jî nebe, lê her ew kes rengê nizane bi erebî bi peyve, eve jî ji egera giringî nedana bi zarav a û zimanî, çunkî kes xemê jê naxot û xo mandî na ket , jiber ko çi dezgeh nînin zêrevanîyê lê bi ket. Lê eger berpirs li cihê karî wek biryareka bi xurtî pêgirîyê bi ket bi danana nav û zaravayan, karmend û xelik jî dê hînî wan peyvan bin û rojane û asayî dê bi kar hînin. Hindek nav û zarav ên nû, evca bi zanebûn yan ne, hatin danan û wekî wan hatin gotin kevtin ser zimanê gelî, xelikê sade jî bi kar di hînin bêy hizir a xwe di wergerana wê yan hemberê wê bi erebî û hestê bi kêmanîyê bi ken, ev zarava jî bo mînak:  pêşmerge, sopa, asayîş, tozûba, bale, fermande, û htd ango heger ronakbîr û karbidest bi kar bi hîne, xwelik jî dê bi kar hînin.Jibo vê çendê jî pêdivîye pêngavên mezin bi hên havên jibo xurtkirina zimanê kurdî, rizgarbûn ji vê nexweşîyê.

# Jibo çi ferhenga kurdî- kurdî û bi rênivîsa latînî?.

Zimanê kurdî êk ji zengîntirîn zimanên cîhanê ye, lê jiber rewşa siyasî û parçebûna Kudistanê, ziman jî parçe bû û gelek zarav û devok peyda bûn û dûratî keft di nav van devokan da, herweha çend rênivîs di zimanî da egereka neyînî heye, çunkî kurdên bi pîtên erebî di nivîsin û di xwînin nikarin mifayî ji nivîs û kitêbên bi latînî hatîn nivîsîn wer bi girin û dîsan piranîya kurdên li ewropa, bakûr û rojavayê Kurdistanê nikarin rênivîsa pîtên erebî bi xwîn û mifa jê bi wergirin.

Rênivîsa latîna zimanê kurdî dirist û ciwantir pê di hên nivîn, wek nav, kiryar û corên kiryaran(xurî, darijttî, lêkadayî), herwesa bi pîtên erebî hendek pît û deng hinda di bin, bi şaşî di hên nivîsîn yan jî cihgurkî di bin, wek pîtên  y ;yarî, î; înan,  ko du pîtên cudane lê di rênivîsa erebî da di bin yek.

Hinde peyvên resen yên kurdî hene, jiber ko xelik hizir û nivîsîn wek ya erebî di ken, lewra lêvkirina wan wek erebî lê di hêt, herçende ew pît di zimanê kurdî da nînin. Wek: Erd, Esman, lê bi ya latînî ciwan û dirist di hên nivîsan û xandin.

Nav û kiryar ên darijtî û lêkayî bi latînî pir zelal û ciwan xuya di kin, mîna karkirin, berhevbûn, mêrçak, sermezin û htd, lê dema bi pîtên erebî di nivêsin mirov nizane kanê yek peyve yan çend peyvekin.

Jibo piranî jî di rênivîsa latînî gelek ciwan diyare, wek. Gul =gulan, Gule = guleyan, dehbe= dehbeyan û hw.lê bi erebî wek dehban û gulan di nivîsin û ev çende renge hinde caran ramana peyvê bi gihore.

Cihê dilxweşîyê ye noke li Kurdistana azad giringîyeka baş bi nivîsîna latînî di hêt dan , xasim çendîn govar û belavokên bi latînî di hên weşandin û li kanalê K TV û vê dawîyê li kursad, sererayî kenalên din, nivêsîn bi pîtên latînîye, û hêdî hêdî xelik xwe hînî vê rênivîsê di ken. Herçende gelek şaşîyên nivêsî û rêzmanê hene, lê

pêngaveka gelek pîroze ku kurd li hemû dera di karin bi xwînin û di hevdu bi gehin.

Jiber vê yekê min di vîya li gor karînên xwe vê ferhengê jibo xwendevan û xemxwerên zimanê kurdî, bi taybetî pîtên latî danim. Pitire ji panzde salan ez mijîlî vî karî me, ji xirvekirina peyv, pend, rêzaman û htd .Li van çar salên dawîyê min dest bi nivîsîna ferhengê kir û êxit ser kompiyoterî.

- **Ferhenga kurdî-kurdî latînî jibo kê?.**

Mebest ji çêkirina vê ferhengê ewe ko bi dîtina min zimanê kurdî gencîyeka mizin ya pirî peyv û pende, lê mixabin em ne karîne weke pêwîst bi kar bi hînin, lewra li dîv şiyanên xwe min di xwast karekî bi kem jibo hînbûna pîtên latînî bi zimanekê xurî dako xelkê me mifayî jê bi wergire.Ev ferhenge ji zimanekê xurî û bijavtî pêkhatîye,hemû kes û di hemû pileyên xwandinê di karin mifayî jê bi bînin,çunke bi kurdîyeka sade û hêsane. Min gelek pêkol kirîye ko peyvên biyanî û çewt ne êxim nav da, lê gelek peyv heye, renge ne kurdî bin, lê jiber yên kevtîn nav zimanê me da kurd rojane bi kar di hînin, herwesa zarava û peyvên navneteweyî û cîhanî wek xwe hatîne û ez bi pêdivî na bînin bi hên wergerandin wek:kompiyoter, televizyon, radyo, faks û htd.

Kesên ji nû fêrî xwendin û nivêsînê di bin, di karin bi hêsanî mifay ji vê ferhengê wergirin, çunko peyv ya hatî nivêsîn kanê çewa dê hînî nivîsandina wê bin, riste bi awayekê sade hatiîne darijtin, gelek pendên pêşînan û mamik têda hene, şirovekirina peyvê û çewatîya lêvkirina wê û bi kar anînê di risteyan da.

Dîsan kesên zimanê kurdî bi rênvîsa pîtên erebî xwandine di karin zû û hêsanî fêrî latînî bi bin, herwesa biyanîyên hez di ken zimanê kurdî fêr bi bin, kurt û kurmancî kesên di her ast û qonaxên xwandinê da di karin mifayî jê bi wergirin.

Ramana her peyveka kurdî her bi kurdî ye û piranî peyv hatîne şirovekirin, çewanîya bi kar anînê di nav hevokan da, enca çi hevokeka asayî yan gotineka mezinan , herwesa hemberî wê

peyveka dî ko heman wate heye, hatî ye danan gelek caran berdijê(berevajî) hember hatîye danan.

**a-** **L**i berahîkê çewanîya lêvkirina peyvê, kanê çewa bi diristayî dê hêt xwandin, heger peyv ji du birgehan û pêtir pêkhatibe, bilinddek di kevit çi alê peyvê, peyva ji yek birgeh pakhatî bi êk selîqe di hêt lêvkirin, mîna peyva **Ez, Tu, Dar, Ber, Can** û htd.

Lê peyva ji yek birgehê pitir dê bilinddek kevit di alekê wê da ; minak çewayîya lêvkirina peyva KURDISTAN bilinddek di keve dawîya peyvê, ango; deng (selîq) dê li dawîyê bilind bi be û xîçek li bin wî cihî hatîye kişandin wek; **Kurdis<u>tan</u>** . ango deng li paşpirta TAN bilind di be.Hejî gotinê ye piranîya peyvan bilinddek di keve dawîya peyvê, lê hinek peyv hene di keve berahîya wê, wek:**<u>Be</u>vil. <u>Bi</u>vir,<u>çi</u>ma(boçî),<u>de</u>hil,<u>ge</u>lek** û htd.

**b-** Diyarkirina corê navan ji alîyê zimanî, kanê çi core nav hene wek:

1- Navên **mirovan**. Mîna:**Azad, Nermîn, Camêr, Jiyan** û htd.

2- Navên **candaran** wek:**Se, Kitik, piling, hesp, ker, Sîxur** û htd.

3- Navên **tiştan**, wek: **Dar, ber, xanî, mal, mêze, sênî, ,hesin,** û htd. Herweha navên fêqîyan wek:**sêv, zerdil, hijîr, hinar, gundor** û htd.

4- **Pîşenav** navên pîşeya mirovan wek: **Nojdar, zêrgir, mamosta, endazyar.karker, nanpêj** û htd.

5- **Karnav**; navên girêdayî karê mirov di ke wek: **Nêrevanî. nojdarî, paleyî, cotkarî, rêncberî** û htd.

6- **Welatnav**. Ang navên welatan. Wek: **Kurdistan, Yapan, Misir, îraq** û htd.

7- **Nejadatnav**,yan netewenav, naveke girêdayînejad û neteweyê ve ye. Wek: **Kurd, ereb, faris, rûs, holendî** û htd.

8- **Malbatenav**, navên bi malbatê ve girêdayîne. Wek: **berwarî, mîranî, doskî, Duhokî, Hewlêrî, gundî** û htd.

9- **Devernav,** cugirrafînav Navên deveran. Wek: **berwarîbala, berêgare, navkurê,Barzan, badînan** û htd.

10- Navên **çiya.** Cugrafînav Wek: **gare, metîn, zozik, pîris, helgord, şirîn** û htd.

11- Navên **çem**(robar)an cugrafîanv, Wek: **xabûr, xazir, dîcle, rûyêşîn, zê** û htd.

12- **Naznav**, hine navin jibo nazandin yan birîndarkirinê di bêjin jibo mirov û candaran, nêr,mê ya du zayend. Wek: **Xifşê, pitê, canê, xiro, lingo, hîro**, û htd.

13- **Bangnav** yan navên hodeng. Wek: nêr, mê, duzayend û pirînî; **helalino, birano, gavano, xorto, zarokino, kuro, keçê, jinê, xûşkê** û htd.

14- **Hijmanav,** naveke jibo hijmar û hijmartinê bi kar di hêt. Wek: **deh, hizar, du, sêyem, çaremîn** û htd.

**C-** Nav ji alîyê pêkhatinê ve: Sê cor hene:

1- Navên **xurî**: navên xurî ji navek bi tenê û bê pêşgir, navgir û paşgir pêkhatîne, û navên mirov,candar û tiştan bi xwe ve di girin, wek: **Evîn, Hêja, Tirî, hêstir, ker, dar, kevir, sor, dîwar, kaxez, çira, guh** û htd.

2- Navên **darijtî**: core navekin ji navekê xurî û pêşgir, yan paşgirek heye. wek:

**(da)Danan, (da) daxistin, (da) darijtin, (der) derkirin, (ve) veguhaztin, (ve)vexwarin,(wer) wergirtin, werpêçan.** Paşgir**; aşvan (van), karker(ker), karder(der)** û htd.

3- Navên **lêkdayî**, ji du yan pêtir peyvan hatîne darijtin û her peyvekê ramana xwe heye.

Wek: **Çavreş, mêrçak, bejinbilind, sermezin, difinbilind, lingxwar** û , navên aloz(gelek lêkdayî) **çavbixal** (çav bi xal), sêvbinerd ( sêv bin erd) û htd.

**ç- Jêderenav**; kiryar yan kirinên mîna nav û jêder bi kar di hên.

1- **Xurî**: wek :**Xwarin. Kirin, nivistin,çandin, anîn, kujtin** û htd.

2- **Darijtî** wek: **Rabûn, hilbûn, dakevtin, vedan, vekirin**, û htd

**3- Lêkadayî** wek: **Karkirin, nanpatin, serkevtin, bilindbûn, Kezwankelûtin** û htd**.**

4- **Jêderenavê aloz(gelek lêkayî**)wek: **Hatinûçûn, bêserûberkirin, danûsitandin bêhinçikbûn** û htd.

**d- Cihnav** : ez, min, em, me,te,tu,hûn, hewe, we, ew,ewê,wî,wê, ewan.

**e- Havalnav(rengdêr)**: corekê navên pesindarin çend corin.

1- **Hevalnavê xurî**. Wek: Ciwan, tal, xweş, rind, bilind, pîr, peyt, lewaz, şirîn, gemar û htd.

2- **Hevalnavê darijtî**. Wek: Dilvan, berxvan, golikvan, hilkeft, daşir, damayî, qurmiçî, zerikî, vekirî, lezgîn, xapînok û htd.

3- **Hevalnavê lêkdayî**. Wek: bêhinfireh, çavnetirs, nander, guhbel, ezmandirêj.

4- **Hevalnavê geleklêkdayî**. Wek:gunehbarkirî, dûrpêçkirî,

**ê- Pêrbest**(daçek) alveke jibo girêdana hevekan bi kar di hêt;

1 - **Pêrbestê xurî**. Wek: li, di, ji, çi.ho, ko ku,û xwezî, , ax, dax, mixabin htd.

2- **Pêrbestên lêkadayî**. Wek: çiqas, herçend, ewqas, çitov, wetov, jibo, jiber, beweko,jiberko û htd.

- **Abeya kurdî ji  31 pîtan pêkhatîye**:

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| **A** | **B** | **C** | **Ç** | **D** | **E** | |
| **a** | **b** | **c** | **ç** | **d** | **e** | |
| **Ê** | **F** | **G** | **H** | **I** | **Î** | |
| **ê** | **f** | **g** | **h** | **i** | **î** | |
| **J** | **K** | **L** | **M** | **N** | **O** | |
| **J** | **k** | **l** | **m** | **n** | **o** | |
| **P** | **Q** | **R** | **S** | **Ş** | **T** | |
| **P** | **q** | **r** | **s** | **ş** | **t** | |
| **U** | **Ǔ** | **V** | **W** | **X** | **Y** | **Z** |
| **U** | **û** | **v** | **w** | **x** | **y** | **z** |

- **Pîtên kurdî li ser du desteyan parve di bin:**

1- Pîtên **nivok** (dengdar)  23 pîtin, ew jî evê xarê ne:

| | | | |
|---|---|---|---|
| **B** | **C** | **Ç** | **D** |
| F | G | H | J |
| K | L | M | N |
| P | Q | R | S |
| Ş | T | V | W |
| X | Y | Z | |

2- Pîtên **zingok**(dengdêr) heşt pîtin ew jî evên li xarê ne:

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **A** | **E** | **Ê** | **I** | **Î** | **O** | **U** | **Ű** |
| **A** | **e** | **ê** | **i** | **î** | **o** | **u** | **û** |

Pîtên zingok çi caran bi hevra nabin di hevekan da, herdem pîteka nivok di keve navbera du zingokan.Wek:

K**U**RD**I**ST**A**N. H**AVÎ**N. L**Ê**N**A**N

- **Çewayîya bi kar anîn û nasîna pîtan.**

**A** mîna Amed
**B** mîna Botan
**C** mîna cotyar
**Ç** mîna Çiya
**D** mîna Daristan
**E** mîna Evîn
**Ê** mîna êvar
**F** mîna feraşîn
**G** mîna Gare
**H** mîna helbest
**I** mîna b**i**z**i**n
**Î** mîna înan
**J** mîna jiyan
**K** mîna Kurdistan
**L** mîna Lezgîn
**M** mîna Mihabad
**N** mîna Nazdar
**O** mîna mir**o**v
**P** mîna pale
**Q** mîna Qehreman
**R** mîna Roj
**S** mîna sîpan
**Ş** mîna şoreş
**T** mîna tevger
**U** mîna k**u**rd
**Ũ** mîna ç**û**n
**V** mîna Viyan
**W** mîna War
**X** mîna xebat
**Y** mîna yarî
**Z** mîna zozan.

# Kurtkirin

Di vê ferhengê da gelek peyv bi awayê kurtkirî hatîne bi kar înan, jiber ko çendbare bûne yan jibo nivîsînê hêsan tire, ewjî bi hilbijartina çend pîtan ji peyvê û piranî pîta yekê, yan çend pîtên ji peyvê wek evên li xarê:

| kurtkirî | Raman |
|---|---|
| N | Nav. |
| Nêr | Nêrîne zayend(nivş) ê nêr. |
| Mê | Mêyîne zayend(tuxm) ê mê. |
| DN | Navên du nivşî(ango nêr û mê). |
| DZ | Navên duzayend(ango nêr û mê). |
| HK | Hevalkar |
| HN | Hevalnav. |
| RD | Rengdêr. |
| Rdx | Rengdêrê xurî (havalnavê xurî). |
| Rdl | Rengdêrê lêkdayî(hevalnavê lêkdayî). |
| Cihn | Cihnav. |
| Karn | Karnav. |
| Pêrb | Pêrbest. |
| X | Xurî, sade. |
| NX | Navê xurî, ser, çav, berx, jin. |
| Hnx | Hevalnavê xurî. wek; ciwan, rind, peyt, kirêt. |
| Hnl | Hevalnavê lêkdayî.wek; çavbelek, serxweş. |

| | |
|---|---|
| JN | Jêdernav. wek; mirin, vexwarin, hêlan. |
| K | Kiryar(kirin). wek; di kem, bi xwe, hat. |
| Bdn | Berdewamî dema noke(niho). wek; di hêm, di bêjin. |
| Bdb | Berdewamîya dema bihorî (derbaz). wek;di hatin, di leyzîm. |
| Db,dûr | Dema bihorî(derbaz) ya dûr.wek; çûbû, hatibû, xwarbûn. |
| F | Ferman(firman); wek here, bîne, bi nivin. |
| Pîşn | Pîşenav.wek; zêrgir, endaziyar, nojdar. |
| Rêz | Rêzman. |
| Cugirn | Cugrafînav.çiya, çem. |
| Devern | Devern(navê deveran). |
| Pir | Pirînî(piranî). daran, hevalan. |
| Dar | Darijtî. |
| G | Gelek. |
| L | lêkdayî. |
| GL | Gelek Lêkdayî. |
| Kurt | Kurtkirin. |
| Gazn | Gazînav(gazîkirin). |
| Bangn | Bangkirin(navê bangkirin). |
| HK | Hevalkar. |
| HD | Hodeng(gazî). |
| Biyan | Biyanî(navê biyanî). |
| Cîhn | Navê cîhanî. wek;têlefon. |
| Netewn | Netewe nav.wek; ereb. |
| Nejn | Nejad nav.wek; kurd |
| Hijn | Hijmarnav.wek; êk, dû, deh. |

| | |
|---|---|
| Çewa | Çewayî,çewanî(navê çewayî). |
| Br | Berdij(berevajî). |
| Çend | Çendayî(navê çendayî). |
| Dîrok | Nav yan zaravayên dîrokî. |
| Kevin | Nav û zaravayên kevin.wek; ramûsan. |
| s.x | Silavên xudê liser bin. |
| Pr | Paşeroj. |
| htd | Heta dawîyê. |
| hw | Herwesa. |

- **Navên çar werz û duwazdeh meh ên salê**:

**Bihar:** Avdar(axlêve) - Nîsan - Gulan

**Havîn:** Xizîran(cehzeran) - Tîrmeh(coxînan) - Tebax

**Payîz:** Îlon(rezber) - Çiryî êkê(pêşin) - Çirîya duwê(paşin)

**Zivistan:** Kanîn(kanûn)a biçûk- Kanîn(kanûn)a mezin - Şubat.

- **Navên heft rojên heftîyê**:

1- Êkşemb.
2- Duşemb .
3- Sêşemb.
4- Çarşemb.
5- Pêncşemb.
6- Eynî(în).
7- Şembî.

- **navên çend welatan:**

Lîsteya navên çend welatan û çewayîya bi kar înana welatî(xelik ê welatî) û mitayê ji wan.

Mînak : Hêja Kurdistanî ye ango ji Kurdistanê ye, Hêja kurde, ango ji neteweya kurd e, zimanê wî kurdî ye. Ava metîn Kurdistanî ye, ango li Kurdistanê hatî çêkirin.

| Navê walatî | Welatî, nejad û kelûpelên wî |
|---|---|
| **A** | |
| Afganistan | Afganî |
| Afrîka | Afrîkayî(Afrîkî) |
| Albanya | Albanyayî(Albanî) |
| Amerîka | Amerîkayî(Amerîkî) |
| Angola | Angolî |
| Arcentînya | Arcentînî |
| Armînya | Armînê(Ermenî) |
| Asya | Asyayî |
| Azerbaycan | Azerbaycanî(azerî) |
| **B** | |
| Bangikadêş | Bangiladêşî(Bangalî) |
| Berazîl | Berazîlî |
| Belcîka | Belcîkayî(Belcîkî) |
| Bêlarûsya | Bêlarûsî (Rûsya sipî) |
| Birîtanya | Birîtanî |
| Bolîviya | Bolîviyayî(Bolîvî) |
| Bosnya | Bosnî |
| Bulgarya | Bulgarî |
| **C** | |
| Cezayîr | Cezayîrî |

### Ç

| | |
|---|---|
| Çîçênya | Çîçênî |
| Çîlî | Çîlî |
| Çîkya | Çîkî |
| Çîn | Çînî |

### D

| | |
|---|---|
| Danimark | Danimarkî |

### E

| | |
|---|---|
| Elmanya | Elmanî(Alamanya-Almanî) |
| Emrîka | Emrîkî(Amrîka) |
| Erden | Erdenî |
| Ermînya | Ermenî(Armînya-Armînî) |
| Etyopiya | Etyopî |

### F

| | |
|---|---|
| Felestîn | Felestînî |
| Filipîn | Filipînî |
| Finland(Filanda) | Filendî |
| Firnsa(Firensa) | Firensî(Firensayî) |

### G

| | |
|---|---|
| Gana(Xana) | Ganayî(Xanayî) |
| Giwatîmala | Giwatîmalî |
| Gurcistan(Corciya) | Gurcistanî(Corcî) |

### H

| | |
|---|---|
| Hindistan | Hindistanî(Hindî) |
| Hindoras | Hindorasî |
| Hingarya | Hingarî |
| Holenda | Holendî |

## Î

| | |
|---|---|
| Îndonîsya | Îndonîsî |
| Îran | Îranî |
| Îraq | Îraqî |
| Îrlanda | Îrlandî |
| Îsrayîl | Îsrayîlî |
| Îtalya | Îtalî |

## J

| | |
|---|---|
| Japan | Japanî |
| Jamayka | Jamaykayî |

## K

| | |
|---|---|
| Kamîron | Kamîronî |
| Kambodya | Kambodyayî |
| Kazaxistan | Kazaxistanê(Kazaxî) |
| Keneda | Kenedî |
| Kênya | Kênyayî |
| Kirgiztan | Kirgizsatanî(Kirgîzî) |
| Kirwatya | Kirwatî |
| Kongo | Kongoyî |
| Korya | Koryayî(Korî) |
| Kurdistan | Kurdistanî(Kurdî, kurd) |
| Kuweyt | Kuweytî |
| Kûba | Kûbî |

## L

| | |
|---|---|
| Latvîya | Latvî |
| Lawus(Laos) | Lawusî |
| Libnan | Libnanî |
| Lîbya | Lîbî |
| Luksemgurg | Luksemburgî |

## M

| | |
|---|---|
| Masêdonya | Masêdonî |
| Medexesker | Medexeskerî |

| | |
|---|---|
| Malîzya | Malîzî |
| Malta | Maltayî |
| Meksîko | Meksîkî |
| Mengolya | Mengolî |
| Mexrîb | Mexrîbî |
| Morîtanya | Morîtanî |
| Mozambîk | Mozambîkî |
| Misir | Misrî |

**N**

| | |
|---|---|
| Nerwîc | Nerwîcî |
| Nîcêrya | Nîcêrî |
| Nîkaragwa | Nîkaragwayî |
| Nîpal | Nîpalî |

**O**

| | |
|---|---|
| Ogenda | Ogendî |
| Ozbekistan | Ozbekistanî(Ozbekî) |

**P**

| | |
|---|---|
| Pakistan | Pakistanî |
| Panama | Panamayî(Panamî) |
| Pêro | Pêroyî |
| Polenda(Polonya) | Polendayî(Polonî) |
| Portugal | Portugalî |

**R**

| | |
|---|---|
| Romanya | Romanî |
| Ruwanda | Ruwendî |
| Rûsya | Rûsî |

**S**

| | |
|---|---|
| Silovakya | Silovakî |
| Silovênya | Silovênî |
| Sirbiya | Sirbî |
| Sirîlanka | Sirîlankî(Sirîlankayî) |

| | |
|---|---|
| Siwêd | Siwêdî |
| Siwîsra | Siwîsrî(Swîsrayî) |
| Sîngapor | Sîngaporî |
| Somalya | Somalî |
| Spanya | Spanî |
| Sûdan | Sûdanî |
| Sûrya | Sûrî |

## T

| | |
|---|---|
| Tajîkistan | Tajîkî |
| Tanzanya | Tanzanî |
| Tayland | Taylandî |
| Taywan | Taywanî |
| Tonis | Tonisî |
| Turkiya | Turkî(Turk) |
| Turkmenistan | Turkmenistanî(Turkmenî) |

## Û

| | |
|---|---|
| Ûkrayîna | Ûkraynî |

## V

| | |
|---|---|
| Venziwêla | Venziwêlî |
| Vîtnam | Vîtnamî |

## Y

| | |
|---|---|
| Yapan(Yaban) | Yapanî(Yabanî) |
| Yemen | Yemenî |
| Yonanistan | Yonanî |

## Z

| | |
|---|---|
| Zambiya | Zambî |
| Zayîr | Zayîrî |
| Zîmbabo | Zîmbabiyî. |

- **Hind çeveng(nîşan) cîhanî**

Hind çeveng(nîşan) û alavên bi kurdî yan cîhanî di hên bi kar anîn û ramana wan:

| | |
|---|---|
| ^ | Bilinddek; cihê selîqe lê bilind di be. |
| @ | Êd; kurîya meymûnê, di gel navnîşanên elektironî bi kar di hêt. |
| . | Xal; jibo bêhinvedana nevbera hevokan. |
| , | Bêhnok; bêhinvedaneka kurtir ji xalê. |
| [ ] | Kivana mezin. |
| { } | Kivana navincî. |
| ( ) | Kivana biçûk. |
| : | Duxal; du xalên li ser yek. |
| ; | Xalbêhnok; xalek li ser bêhnokê. |
| ? | Pisyar; jibo piryarkirin. |
| ¡ | Seyr jibo karekê seyr û hicmetîbûn. |
| € | Yûro pareyê hevgirtî ê çendîn welatên ewropa. |
| $ | Dolar; Pareyê welatê Emrîka. |
| % | Sedased; rêjeya sed ji sedê. |
| = | Yeksan |
| + | Komkirin. 2+1=3. |
| - | Jêbirin.  2-1=1. |
| ½ | Nîv. |
| ¼ | Çarêk; ji çarê êk. |
| ♀ | Mê. |
| ♂ | Nêr. |

# Jêder

Çend jêderên mifa jê hatî wergirtin jibo vê ferhengê:


1- Ferhengên zimanê Holendî yên zimanvan (van Dale).nemaze ferhenga zimanê holendî jibo biyanîyên di xwazin hînî zimanê holendî bibin. ya sala 2003.
2- Du ferhengên Holendî_Ingilîzî û Ingilîzî-Holendî yên G.J.Kroes.sala 1996.
3- Ferhenga Kurdî-Ingilîzî ya Ezîz Emîndarov. 1994.
4- Ferhenga Rûsî-Holendî, Holendî-Rûsî 1989.
5- Ferhenga Kurdî-Turkî ya Izolî 191987.
6- Ferheng Kurdî-Turkî ya Musa Anter 1967.
7- Rêzmana kurdî, kirmancîya jêrî û jorî ya hevberkirî, ya seyda S.Baha-adin Amêdî çapa yekê 1987.
8- Radyoya kudî li bexda.
9- Radyoya dengê Kurdistanê.Radyoya êrîvanê.
10- Radyoya dengê emrîka pişka kurdî, xasime bernameyê zimanê me.
11- Berhem û gotarên seyda M.E.Osman li ser zimanê kurdî(zimanê xo bi zane).
12- Çîrok û romanên seyda M.Bozerselan.
13- Romana Labîrenta Cîhan ya Hesenê metê sala 1994.
14- Kitêta çîrokên gelêrî ya seyda Mela .M.Dêrşewî (miştaxa çiya ji gotinên pêşîya).
15- Kenalên telefizyonî yên esmanî wek med tv, K TV.
16- Ferhenga Kurdî-Holendî ya Mahabad Qilorî & Nêçîrvan Qilorî.
17- Bîranîna Elî Kaşifpûr çapa yekî pîtên latînî1997.
18- Pêlên Bêrîkirinê, Mustafa Aydogan 1997.
19- Ardû, ji kurteçîrokên gelêrî ya Hesenê metê 1990.
20- Heftenemeya Peyman mijarên zimanvanî.
21- Kanî; komele têkistên folkilorî, pirta yekê, Seyda A.Qerenî 1984.

# A

**A** 1.Pîta êkê ji abeyê. 2.Bersivdana eyînî[erênî] anku belê. Erê.3. dema axivtinek ne ron bit û mirov bixazit bihêt dubarekirin. 4. Gavan yan xwedî çevrî, gareş (çêl û ga) jibo hawişkirin, serrêkirin yan vegerandina çêlekan dibêjin.: A were çêlê!.

**Abad** (n,kevin.nêr) ***kevin*** Avayî.

**Abdar** (n.x.nêr) Hesp.

**A be** Rêzkirina pîtêd kurdî ji a ta z .Zanîna rêzkirina pîtan : Abêya kurdi ji 31 pitan pêk di hêt.

**Abone** (n.x.mê) Parek vebirî û bêkute mirov di dit partî yan dezgehekî ko endamê wê bit.:Aboneya mehane, aboneya sanale û htd.

**Abonedan** (k.jn.l.mê) Weke endamek aboneyan di de. : Ez mehane 10 dînar abone di dim dezgehê. :Heger aboneyê ne dî nikarî bibî endam. (K) bn: Dan.

**Abor** ( n.x.mê) Destgirtin.

**Abori**, (n.x.mê) 1.destgijrtin, kêm mezaxtin 2. tiştê têkilî bi kirî û firotinê ve hebit.

**Aborînas** ( n.l.dz) bn: Abrîzan.

**Aborîvan** (ndar.dz) bn : Aborîzan.

**Aborîzan** (n..l.dz) Mirovê pispor û şareza di ware aborî da.

**Aborkirin** (k.jn.l.mê) Aborî têda kirin. kêm mezaxtin. Destgirtin. (Di vêt em aborîyê[aborê] di pareyê xweda bi kin, dako bi karin xanîyê xwe ava bi kin. (K) bn: Kirin.

**Adar** ( n.x.mê) Meha êkê ji biharê, serê sala kurdi. ***Pend*** :Adarê meşik li darê ne li vêrê li beriya şingarê. ***Pend*** :Avdar naçit bê gul.

**Ade** (n.x.mê) Paqijkirina çandininê ji gîyayên bê mifa.

**Adekirin** (k.jn.l.mê) Jinavbirin û derînana gîyayê bi ziyan ji nav çandinê. : Rezê xwe ade kir. Baxî ade bi ke. (K) bn: Kirin.

**Adekirî** (hk.l.çewa) Zevî, çem yan baxê ji gîyayê ziyandar hatî baqijkirin. :Zevîya adekirî. Ev reze yê adekirî ye.

**Adem** (n.x.nêr) Êkemîn babkalkê mirovan. Adem û Hewa.

**Ademzad** (n.dar.dz) Mirov. Meriv.

**Adî**, (n,x,nêr, hn.x.çewa), 1.Giyandarên biçûk yên jehirdar wek dûpişk, zîvzîve,tevipîrk,…htd. :Adîyekî yê pêveday. 2. Dirinde.

**ADK** (kurtkir) Ajansa dengubasên Kurdistanê.Dezgeha ragehandin û belavkirinê li Kurdistanê.

**Adodik** (n.dar.mê) Hesinek dev zirav û tîje bi destikekê darî ve kirîye jibo derînan kengir û serikên Gîyayên xwarinê. Hadûd.

**Afat** (n.x.mê) Derd, kovan, nexweşî.: Afatek dê bi serî hêt çunkî mirovekê ne hecimtîye.

**Aferin**, (alv.pesindan) Destxweşi , keyf pê hatin, pesin dan , aferin tu di xandkna xweda serkefti.

**Afirander** (n.dar.dz) Kesê afirandinê diket.

**Afirandi** (hk.dar.çewa) Hatîye afirandin.

**Afirandin** (k.jn.x.mê) Tiştê nû çêkirin. Hizirên nû peydakirin.Avrandin.(K) bdn: ez di afirînim em di afirînîn, tu di afirînî hûn di afirînin, ew di afirînit[…ne] ewan di afirînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di afirand, di afirandin. Db,dûr :afirandibû. ….bûn.(F) : bi afirîne, bi afirînin.

**Afret**, (n x, m) Nivşê mê , jin. Pîrek. Kulfet.

**Afrîka** (hk.cih.cugrn) Kîşwera Afrîka. Welatên Afrîka.

**Afrîkayî** (nej,n.dar.dz) Mirovê ji Afrîka.

**Afrîkî** (n.nej,n.dar.dz) 1. Mitayê ji Afrîka. 2. Mirovê Afrîkayî.

**Agah** (n.x.mê) Ageh.

**Agahbûn** (k.jn.l.mê) Hişyarbûn. Agehbûn. (K) bn: Bûn.

**Agahdar** (hn.dar.çewa) Agehdar.

**Agahdar<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Agehdarbûn. (K) bn: Bûn.

**Agah<u>darî</u>** (n.dar.mê) Agehdadrî.

**Agahdar<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Agehdarkirin. :Berî tu herî navendê min agahdar bi ke!. (K) bn: Kirin.

**Agah<u>ker</u>** (n.dar.dz) Agehker.

**Agah<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Agehkirin. (K) bn: Kirin.

**A<u>geh,</u>** (n.x.mê) Hay. Nûçe. Peyam.

**Ageh<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Hişyarbûn. Hestkirin. (K) bn: Bûn.

**Ageh<u>dar</u>**(hn.pesn,dar.çewa) Haydar

**Ageh<u>darî</u>** (n.dar.mê) Hay ji bûyerekê heye.Hay.

**Agehdar<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Hişyarkirin. Haydarkirin.:Ez dê te bi encamên dawîyê agehdar bi kim.. (K) ez agehdarim, em agehdarin tu agehdari hûn agehdarin ,ew,ewê agehdare, ewan agehdarin. (K) bn: Kirin.

**Ageh<u>ker</u>** (n.dar.dz) Kesê ku mirovî haydar dike, hişyar dike.

**Ageh<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Hişyarkirin. Haydarkirin. (K) bn: Kirin.

**Age<u>hî</u>** (n.dar.mê) Dezgehên agehdar kirinê.Hay jê hebûn. :Min agehi ageh ji te heye.

**A<u>gir,</u>** (n.x. nêr) Germîyeke bi reng, hilim û dûkêle, pileya wî bilinde,jibo têhin û germê bi kar di hêt ***Pend*** :Agir berbo mala direwini, kesê bawer nekir. ***Pend*** :Agirê ji dehmena mirovî.

**Agir<u>diz</u>** (nl.mê) Volkan. Borkan. Girkan.

**Agir<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Hilkirina agirî. Agir berdanê. (K) bn: Kirin.

**Agir<u>perês</u>** (nl.dz) Yê agirî pîroz di bîne û di perêsit.

**Agirperis<u>tin</u>** (k.jnlmê) Bawerî înan bi pîrozîya agirî. (K) bn: Peristin.

**Agir<u>van</u>** (n.dar.n) 1.Kesê hilgir, xudan yan karê agiri dike.2 .Navê mêran.

**Ah** , (Pêrb) ***rêzman*** Alavê dax û kovanê. Ax, nexweşiî, peşêmanî, u mixabiniyê bi kar di hêt : Ah bo welati.

**A<u>ha</u>**, (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hicmetibûnê bi kar di hêt. :Aha min zani ! aha min dit!. Aha ew tu bûy te têlefon kirî!.

**Aheng** (n.x.mê) Bîranîn. Cejin.Govend. Sema. : Evro ahenga Newrozê ye. :Ahenga me geleka dilveker bû.

**Ahenggêran** (k.jn.l.mê) Ahengkirin. :Hersal li 21 ê adarê gelê Kurdistanê ahengan di gêrin. (K) bn : Gêran.

**Ahengkirin** (k.jn.l.mê) Saxkririna bîranînan. Gêrana cejin û ahengan. (K) bn: Kirin.

**Ahengvan** (n.dar.dz) Kesên ku pişikdarin di ahengê da. Xwendîyên ahengê. : Ahengvanên hêja em bi navê tîpa mûzîkî û dengbêjan pêrgînîya we di kin.

**Ahên** (n.x.mê, alv.keser) 1. Axîn. Dax. 2. Navê jinane.

**Ahîn** (n.x.mê) 1. Hesin. Asin. Bihêz.2. Axînk. Nalîn. Keser. 3. Navê jinane.

**Aho** (n.x.mê, alv.hêrs), 1.Aso ,dîtina ji dûrve.2. Alaveke bi kar di hêt, dema mirov çend barekirina gotinekê ve hêris di be. Helo. Hê. Ho. : Aho ma ez bi kêre di peyvim.

**Ahû** (n.x.mê) Asîk. Mamiz. Xezal.

**Ahûramazda** (p.l) ***kevin*** Xweda.Xudayê dîna Behdînî [Zerdeşt].

**Ajans** (p biyani n,x mê) Dezgehên ragehandin û belav kirinê.

**Ajawe** (n.x.mê) Têkvedan ,çandina tovê duberkiyê.

**Ajaweçi** ( hk.l.çewa) Kesê hez ji têkvedanê, ajawê dike.

**Ajel** (n.x.m) Giyandar. Giyanewer. Ginawur. Lawir.

**Ako** (n.x.nêr) Navê Mêrane.

**Akordiyon** (n.biyan.mê) Amêrekê mûzîkê ye.

**Akrê** (hk.cih,cugr,n) Bajêrek ,ciwan û kevnare,li Kurdistana Iraqê.

**Akrobat** (nbiyan.dz) bn: Lêbûk.

**Al** (n .x.nêr) La , rex, tenişt, tî :Ez li alekî, tu li yê dî.

**Ala** (n.x.nêr) Perokê welat yan dezgeh wek nîşana (sinbola) xwe bi kar di hînin, perçem, alaya kurdan kesik, sipî sor û zere.

**Alan** (n.x.nêr) 1. Evîndareke di dastana memê alanda hatiye.2. Navê kurane.

**Alandin** [tê alandin] (k.jn.x.mê) Li dor alandin, dor zivrandin. : Lewendî di zendên xwe alandin. :Destên xwe têkalandin. :Şîtik di bejna xwe aland. :Werîs di darê di alînin. (K) bdn : ez di alînim em di alînîn, tu di alînî hûn di alînin, ew di alîne[…it] ewan di alînin. Pr :dê[bi] alînim, di alîne. Bdb : di aland, di alandin. Db,dûr: alandibû, alandibûn. (F): bi alîne, bi alînin.

**Alav** (peyv.x.mê) ***rêzman*** Ji pîtek yan pitir pêkhatîye,jibo girêdana risteyan (hevokan) bi kar di hên.wek : Li, ji, jî, cem, û,yan,û htd .Amêrên jibo tiştên sazî bi kar di hînin ; wek çekuç, das, kartîk, amêrê tirombêlan û htd.

**Alban** (netew,n.dz) Xelkê Albanya.

**Albanî** (netw,n.dar) 1. Mitayê Albanya. 2. Xelkê Albanya. : Mamostayê me di kûka xwe da albanî ye.

**Albanya** (cugrn. Hk.cih) Welatekê Ewropayî ye. : Alabanya welatek pir xweşe.

**Alif** (n.x.mê) Alîka giyandaran.

**Alifdan** (k.jn.l.mê) Alif danan ber caneweran. Me alifê daye kewalan. (K) bn: Dan.

**Alizandin** (k.jn.x.mê) 1. Mirov davekê di hev bi alîne, bi alizînit. : Te davên dezî yên di alizandîn. 2. Alozkirina karî. Zehmet êxistin. Karê me ne alizîne !. (K) bdn : ez di alizînim em di alizînîn,tu di alizînî hûn di alizînin, ew di alizîne[…it] ewan di alizînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di alizand, di alizandin. Db,dûr: alizandibû. … bûn. (F): bi alizîne, bi alizînin.

**Alizîn** (k.jmê) Hilçinîn. Dinavêkda kevtin. Davik alizîn.

**Alî** (n.x.mê) Rex. Tenişt. Kêlek. : Were vî alî (bi) rûne.

**Alîgir** (hn.dar.çewa) Kesê ku aliyê mirovi digirit,yan girêdayî bi keseki , partekê yan desteyekê ve. :Ew aligirê ……ye. Tagir.

**Alîgirî** (n.dar.mê) Tagirî.

**Alîgirîkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov tayê yekî bigire. (K) bn: Kirin.

**Alîgirtin** (k.jn.l.mê) Tagirtin. Tagirîkirin. (K) bn: Girtin.

**Alîk** (n.x.mê), Xwarina giyandaran. :Hespi alîka xwe xwar. :Alîka bizinan. Alif.

**Alîkar** (hn.l.çewa) 1. Kesê ku aliyê mirovi bi girit .Harîkar. Xudê alîkar bit. 2. Navê kurane.

**Alîkarî** (n.l.mê) Harîkarî. Supas jibo alîkarîya te.

**Alîkarîkirin** (k.jn.gl.mê) Harîkarîkirin. .:Tu di karî alîkarîya bavê xwe bi kî?. (K) bn: kirin.

**Alîkdan** (k.jn.l.mê) Xwarin dan lawiran. Alîkê bi de pezî. Gavanî çêl alîk dan.

**Alîkirin** (k.jn.l.mê) Harîkirin. (K) bn: Kirin.

**Alînok** (n.l.mê) 1.Zevîya nokan.2. Pirtên nokan.

**Alîstin** (k.jn.x.mê) Dema mirov xwarinekê bi ezmanî tam bike û bi mêje. : Zarokî tilîn xwe di alîstin. Seg sênîka xwe di alîze.(K) bdn: ez di alîsim em di alîsîn, tu di alîsî hûn di alîsin, ew di alîse, ewan di alîsin. PR: dê bi +bdn. Bdb : di alîst, di alîstin. (F) : bi alîse, bi alîsin.

**Aloz** (hn.x.çewa) Şepirze, şepilî, yê ku rê liber berze. : Ez gelek alozim û nizanim dê çi (bi) kim..

**Alozbûn** (k.jn.l.mê) Şepilîn. Evro babo glek ê aloz bû, karên wî hebûn.(K) bn: Bûn.

**Alozî** (n.dar.mê) Asteng. Şepirzeyî. :Pir alozî kevtin di rêya min da, lê min xwe jê qurtal kir.

**Alozkirin** (k.jn.l.mê) Şepilandin. :Wwe aloz neke ez dê çim. (K) bn: Kirin.

**Alûle** (hn.dar.çewa) Rêya rik û bi çepûçîr.: Eve rêyek a alûleye, em ni karin lê bi çin.

**Amade** (peyv.x.çewa) Berhev. :Ez yê amade me di gel te bi hêm.

**Amadebûn** (k.jn.l.mê) Berhevbûn. :Çima duh tu li civînê amade ne bûy?.(K) bn: Bûn.

**Amadekar** (n.l.dz) Yê ku amade di ket. : Ew bi xwe amadekarê şahîya xwe ye.

**Amadekarî** (hk.l.mê) Berhevî.

**Amadekirin** (k.jn.l.mê) Berhevkirin. (K) bn: Kirin.

**Amadeyî** ( hn.x.çend,n.dar.mê) Berhevî, rêzên piştî sêyê qonaxa xandinê. :Azad li rêza (sêyê,çarê, pêncê,şeşê) ye.

**Aman** (n.x.mê) Kelûpelên xwarinê.sênî, qazan, tirar, kefçik, mencel û htd. : Piştî xwarinê amanan di şûn.

**Amanc** (n.x.mê) Armanc.

**Amanşû** (karn.l.dz) Kesê karê wî şûştina amanan.

**Amanşûk** (n.l.nêr) Tiştên amanan pê di şûn. Lîfikên amanan. :Ha bo te amanşûkî perdaxê pê bi şû.

**Amar** (n.x.nêr) Serhijmar, serjimêr, proseya hijmartina welatiyan : Kurdistan ji 40 milyonan pitire.

**Amed** (hkc.mê) Diyarbekir, Bajêrek mezin û diroki ye, paytextê Kurdistane.


**Amêdî**(hkc.cugr,n.dz) 1.Bajarek kevnar û dirokiye, cihê , mîrgeha Badinan, liser kevirekî hatiye ava kirin.2. Xelkê Amêdî yê.

**Amêr**,(n.x.nêr) Amraz, bo tiştên teknolocî bikar tê, kelûpelên pîşesazî, hinde caran wek : kesên xwefiroş û darsest amêrê destê dujminane. Alav.

**Amoşkirin** (k.jn.l.mê) diledildan.tenakirin. Hawîşkirin. Amoşkirina zarokan.bn : kirin.

**An** (Pêrb. pêvegir) Alaveke jibo desestnîşankirinê bi kar dihêt. :Ev tişte bo wîye an bo wêye, yan. An na çit aşî an dê aşvanî kujit. Ang ; mirovê serhişk û xirabkar.

**Ananas** (n.niyan.mê) *fêqî* Core fêqîyeke, mezin şêwe berasîye, tam xweş û şriîne.



**Ananas**

**Ane**, anne, (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo misogerîyê di pirsin. :Dilovan li male an ne ?. :Dê çî bajêrî anne?.

**Ango** (pêrb. l) *rêzman* Alavek girêdanê ye, jibo hevber kirinê bikar tê, mebest jê. Bi gotineka dî. :Ez wî di nasim, ango nasê mine.

**Anîn** (k.jn.x.mê) Veguhaztina tiştî ji cihekê bo yê alê xwe :Min pere bi xwere ne anî. : Te jin anîye ?. Înan. (K) bn : Anîn, înan.

**Anînziman** (k.jn.l.mê) Derbirîn. :Ez nizanim çawa dilşadbûna xwe bi hînim ziman jiber hilbijartina Barzanî jibo serokatîya Kurdistanê.

**Anko** (pêrb) bn :Ango.

**Ap** (n.x.nêr) 1.Birayê babê. 2.Jibo rêzgirtin dibêjin kesên ji xwe mezintir.

**Apo**, (hd.dar.nê) Gazîkirina birayê babê yan mirovê ji xwe mezintir. Mamo.

**Apoçî** (n.dar.dz) Kesên ser bi partîya pkk ê ve.

**Aqar** (nx,n) Çûl, derveyî gund û bajêran. :Şivanî pez berda(bire) aqari. : Ez pir hez ji geryana li aqaran di kem. : Aqarê gundê me.

**Aqil** (hn.x.çewa) Jîr ,têgehiştî, zîrek. :Ew kurekê gelek bi aqile. ***Pend*** :Kar bi aqilî tê kirin. ***Pend*** :Aqilê sivik barê girane. ***Pend*** :Aqilî ji bê aqilan bigre.***Pend*** :Aqilê xirab, rêya xirab dide ber xodanî. ***Pend*** :Aqil di seran daye , ne di ruyan daye. ***Pend***: Aqilîl hebit,ne ciwanî. ***Pend*** :Aqil xweş male ,bo xodanî kemale. ***Pend*** :Aqilê bi hîvîya xelkî herê peşêmane.*Pend* :Aqil tanca(Kulav) zêrîne, lê di serê hemû kesan da nîne.

**Aqilane** (hk.dar.çewa) Serederîkirina dirist û jîrane.

**Aqilcihû** (hn.l.çewa) Mirovê mîna cihûyan bi aqil û zana.: Seyad mirovek aqil cihûye.

**Aqildan** (k.jn.l.mê) Kesê şîret û gotina çak di de xelkî. (K) bn: Dan.

**Aqildar**(hn.dar.çewa) Kesê bi aqil û şareza, zirek. Xwedî hoş, xwedî aqil. Jîr. :Aqildara malê. Aqildarê gundî.

**Aqilfiroş** (n.l.dz) Kesê aqilî di dit.

**Aqilfirotin** (k.jn.l.mê) Aqildan. (K) bn: Firotin.

**Aqilgirtin** (k.jn.l.mê) Weke mirov aqilî ji yên zana werdigire. ***Pend*** :Aqilî j ibê aqilan bi gire.(K) bn: Girtin.

**Aqilmend** (n.dar.dz) Aqildar.

**Aqilsivik** (hn.l.çewa) Bê aqil. Mejîhişk.

**Aqilsivikbûn** (k.jn.gl.mê) Dema aqilê mirovî kêm dibe. :Dapîra wî weke berê ne maye, aqilê wê sivik bûye!.(K) bn: Bûn.

**Aqilsivikî** (n.l.mê) Bê aqilî.

**Aqilsivikkirin** (k.jn.gl.mê) Bi qutan û birîndarkirina yekî dibe egera dînbûna wî. (K) bn: Kirin.

**Ar** 1 (n.x.nêr) Toza ji hêrana genim, ceh,…htd, peyda dibe ko hevîr di kin nanî jê çê di kin. Arê genimî. Arê nokan. Arê cehî.

**Ar** 2 (n.x.nêr) Agir.

**Aram** (hn.x.çewa) 1.Tena . Bêdeng. Hedar. :Rewşa welat ya arame. 2.Nave kurane.

**Arambexş** (n.l.dz) Yê ko aramê di de, di bexşe.

**Arambexşîn** (k.jn.l.mê) Aramdan.

**Arambûn** (k.jn.l.mê) Tenabûn. Hawîşbûn. (K) bn: Bûn.

**Aramdan** (k.jn.l.mê) Yê ko aramê di de.(K) bn: Dan.

**Aramder** (n.dar.dz) Arambexş.

**Aramgeh** (n l, mê) Cihê tenahî û aramîyê, pitir ji bo gor û goristanan bikar tê : Aramgeha wî ya dawîyê.ang; goristana lê hatî veşarin.

**Aramî** ( hn.x.nêr) Tenahî, xweşî, bê arêşe.

**Aramkirin** (k.jn.l.mê) Tenakirin. Hawîşkirin. (K) bn: Kirin.

**Aramxane** (n.dar.mê) Cihê aramîyê, nemaze jibo pîran.

**Arandin**,(k.jn.x.mê), Şarandin. Azirandin. Şarandin, çelengkirin, torekirin , geşkirin. Şoreşê bi şarînin, mraniyê bi arînin.(K) bdn:ez di arînim, em di arînin,tu di arînî hûn di arînin,ew di arîne(di arînit) ewan di arînin, PR: dê bi + bdn. Bdb: di arand, di arandin. Db,dûr: arandibû, … bûn. (F) : bi arîne, bi arînin.

**Ararat** (cugirn.) Agirî, çiyayek bilind ê Kurdistanê ye bi girkan(kanî agir) ,şoreşan û berxwedanê navdare. 2. Navê kurane.

**Araste** (n.x.nêr) Sent.

**Arastekirin** (k.jn.l.mê) Berê wê dan sentekê. (K) bn : Kirin.

**Arav** (n.l.mê) Avar. : Arav dana ber bizina nesax.

**Araz** (n.x.nêr) Nave çemek, (rîbar) di keve Azerbaycan, piştî rêpîvana mezin ya nemir Barzanî û pêşmergên di gel wî da, li vî çemî derbazî axa Sovyetistana berê bûyn, navdengê wî di nav gelê kurd da belav bo, bo dastaneka dîrokî û sedan kur û keç bi wî di hên navkirin, ko gelê kurd şanazîyê pê di ke.

**Arçeng** (n.dar.mê) Cihê yekgirtina hestûyê lama ser û binî ya mirov û giyandaran.

**Ard** (n.x.nêr) Ar. : ardê genim, ceh û htd.

**Arezo** (nx,mê), 1. Vîyan , hez. :Arezoya wî xandina kitêbên dîrokî ye.2. Navê keçane.

**Arêşe** (n.x.mê) Alozî, giriftarî. Asteng. :Arêşeya avê li Duhok hat care kirin. :Te arêşeyeka mezin jibo min çê kir.

**Arik** (n.dar.mê) 1. Arê ji mişarkirina daran peyda di bit.2. Arê genim, nok, piskêt. toz û htd.

**Arî** 1 (n.x.mê) Alîkarî. Harîkarî.

**Arî** 2 (n.x.dz)1. Nejadekê kevin e miletane , jiwan gelê kurd, 2. Navê kurane.

**Arîkar** (n.dar.dz) Kesê alîkarîyê dike. Alîkar.

**Arîkarîkirin** (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. (K) bn: Kirin.

**Arîkarî** (n.dar.mê) Alîkarî.

**Arînejad** (n.l.dz) Ji nejadî arî. :Gelê kud arînejade.

**Arînk** (n.x.mê) Corekê girîyê ye. Kelegirîn. : Arînkên zarokî di gehiştin serê gundî.

**Arînk** (n.dar.mê) Arê nokan.

**Arînok** (n.l.mê) Nokên hûrkirî. Nokên şikestî.

**Arjing** (n.x.mê) Bêjînk.

**Armanc** (nx,mê) 1. Nîşan, mebest, kêla venay bo lêdanda beran yan tivengan,pilan.2. Navê xort û keçane. : Armanca me serkevtina gelê meye. : Bi xebatê dê gehîn armanca xwe.

**Armûş** (n.x.nêr) Avirmîş.

**Aro** (n.x.nêr) Xiyar.

**Arvan** (karn.dar.dz) Aşvan. Aşevan.

**Arxavk** (n.l.mê) Xwarineke ji ar û rûnî di hêt çêkirin. Arê qelandî di gel rûnî.

**Asan** (hn.x.çewa) Sanahî. : Waneya evro gelek a asane.

**Asanbûn** (k.jn.l.mê) Sanahîbûn. Hêsanbûn. (K) bn: Bûn.

**Asanî** (hn.dar.çewa) Sanahî. : Bi asanî ez hatim vê derê.

**Asankirin** (k.jn.l.mê) Hêsankirin. (K) bn: Kirin.

**Asankirî** (hk.l.çewa) Karê asankarî jibo hatî kirin. Bi sanahî kirî.

**Asayî** (hn.x.çewa) Normal. Xuristî. :Kawdan asayiye.

**Asayîbûn** (k.jn.l.mê) Vegeran ser barê xwe yê asayî. Hêsanbûn. Arambûn.

**Asayîkirin** (k.jn.l.mê) Rewş mîna berê zivirandin.

**Asê** (hn.x.çewa) Cihek asê, bi zehmet bo gehiştinê, mirovek asê , serreq. Sext. Dijwar. :Rêya çiyayî gelek a asê ye.

**Asêbûn** (k.jn.l.mê) Weke tiştek asê bi be. Peytbûn. Dergeh asê bûye û na ve bit.(K) bn: Bûn.

**Asêgeh** (n.dar.mê) Cihê asê. Hişargeh.

**Asêkirin** (k.jn.l.mê) Zepkirin. Peytkirin. : Zarokî xwe di mal da asê kir. :Marî yê xwe di kunê da asê kirî. (K) bn: kirin.

**Asêkirî** (hk.l.çewa) Tiştê hatî tund kirin êdî mirov bi asteng nikare tê bi xebite.Hatî asê kirin. Hatî qayîm kirin.

**Asik** (n.x.mê) Zik. Gede.

**Asin** (n.x.nêr) 1.Kanzayek reqe , qayîme. ***Pend*** :Asin ji asinî na xwe. 2. Çembera(simbola) bergirî û berxwedanê ye. ***Pend*** :Asinî bi sari xar di ket.(çemîne) ***Pend*** :Asin bi pufan nerim nabit, serşo bi tiran germ nabit.

**Asingir** (pîşn.dar.dn) Kesê ko karê asinî di ket.

**Asingirî** (karn.dar.mê) Karê helandin û çêkirina asinî.

**Asîk** (n.x.mê) 1. Bizina kîvî . Xezal. Mamiz.2 Navê kiçane.

**Asîtan** (n.x.mê) Hewş. Derîzan. :Havînan xelik li asîtanêd malan da di rûnin.

**Ask** (n.x.mê) Xezal.

**Asman** (n.x.nêr) Esman.

**Asmanî** (hn.dar.çewa) Şînê mîna asman. Rengê mîna yê asmanî.Esmanî.

**Aso** (n.x.mê) Pêşeroj. Aho. Rast.

**Asoyî** (hn.dar.çewa) Rast di gel erdî. Terîbî. Br× Stûnî.

**Ast** (n.x.nêr) Şiyanên mirovî, astê zanîna mirovî , rewşenbîrîya mirovî. Astê bilindbûna avê.

**Asteng** (pn.x.mê) Tiştê rê li pêşveçûnê di gire, rêgirtin :Çi asteng di rêya teda hene?.

**Astengbûn** (k.jn.l.mê) bûne asteng. :Ev zelame yê bûye asteng di rêya me da!.

**Astengî** (n.dar.mê) Arêşe. Alozî. :Ez hîvî ji te di kem bes astengîyan bo min çêke.

**Astengkirin** (k.jn.l.mê) Alozkirin. Rê lê girtin. (K) bn: Kirin.

**Asûde** (hn.x.çewa) Tena. Aram. Jiyana asode; ang jiyana tena û dû ji derd û belayan.

**Asûdeyî** (n.dar.mê) Tenayî. Bextewerî.

**Asya** (hk.cih,cugrn, n.x.mê) 1. Kîşwera asya. 2. Navê jinane.

**Asyayî** (nejn.dar.mê) Xelk Asya. Mitayê  Asya.

**Aş** (n.x.nêr) Amêrekê alozê mîkanîkî ye, bi zivrîna du beran liser êk jibo hêran (hûrkirina)a genim, ceh..htd, bi hêza avê, bayî, agir yan karebê kar di ket. ***Pend*** :Aşê nezanan xudê di gêre. ***Pend*** :Aş û mêş zû xudanî di hînin pêş û zû  di kene derwêş. ***Pend*** :Aş di gere li ser avê kur di gire şolê bavê. ***Pend*** :Aş li xeyalekê , aşvan li êka dî.

**Aşevan** (pîşn.dar.dz) Aşvan.

**Aşêv** (n.x.mê) Xepare.: Noke dema aşêva bîstanane.

**Aşêvkirin** (k.jn.l.mê) Xeparekirin. Rezvanî rez aşêv kir. :Min rezê xwe aşêv kir. (K) bn: Kirin.

**Aşik** (n.dar.mê)1. Hûrkê qehwê.2. Aşê biçûkjibo hûrkirina dermank, biharat, bi badanê tov û berikên giyayî di bin arik.



**Aşik**

**Aşîjin** (n.dar.mê) Dava stûr ya bendikên ji mûyên bizinan, jibo dirûna xiraran bi kar di hêt.

**Aşîrk** (n.x.mê) Meşkeke ji kevilê bizinên tiştîr dirist di ken, mast û avê tê di kin bo çêkirina rûnî(nîvişk û dew).

**Aşkera** (hn.x.çewa) Li ser avê xistî. Dîyarkirî.Xuya. :Gotina ,kirya aşker.ang; ne veşarî û berçav. Br× Nepenî. Nihênî.

**Aşkerabûn** (k.jn.l.mê) Xuyabûn. :Nihênîya te aşkera bû.(K) bn : Bûn.

**Aşkerakirin** (k.jn.l.mê) Xuyakirin. Dîyarkirin. Derxistin holê. : Gunehên neyaran hatin aşkera kirin.(K) bn : Kirin.

**Aşkerakirî** (hk.l.çewa) Tiştê hatî aşkerakirin. Seravxistin.

**Aşna** (pn.x.çewa) 1.Nasyar, şareza, bisteh. 2. Nave kiçane.

**Aştî** (rd.x.çewa) 1.Tanahî. Pêkhatin. Li hevhatin. Tebayî. Nemana şer û ajawe. :Aştî daxwaza meye. :Jibo aştîyê em di xebitîn. 2. Nave kuran.

**Aşop** (n.x.mê) Hizir. Bîr Xewnên dûr û dirêj.:Keft di nav aşopan da.

**Aşopî** (hn.dar.çewa) Hizirî.:Fimlekê, çîrokeka aşopî.

**Aşûjin** (n.x.mê) Derzîya mezin a girêdana cewalan.

**Aşyan**, (nl,dz), xodan yan karkerê aşî, bo semyan , xodan jî bikar di hêt .

**Ataf**,(pnx,mê), çam , nexweşî,derdeserî, kuvan, ferman.

**Aşxane** (n.dar.mê) Aş.

**Ataf** (n.x.mê) Çam.

**Atûn** (n.x.mê) Étûn. Komir.

**Av** (n.x.mê) Şileyka bê reng, tam û bêhin e, rengê wî amanî di girit yê tê di kinnîşana kimyayî ,.. H2O. ***Pend*** :Ava xurtan ser evraze.ang ; mirovê hêzdar di karit her karekî bi ket bêy asteng. ***Pend*** :Av avayîye. ***Pend*** :Avê vexo ji kanîyan, jinê bîne ji eslîyan, da bibînî nedîtîyan. ***Pend*** :Ava zêye abor lêye.***Pend*** :Av rawesta ew ne rawesta. ***Pend*** :Av bi kevit cihê teng, dê deng jê hêt. ***Pend*** :Ava kanîya genî nabit. ***Pend*** :Av boş bo aş xoş bo. ***Pend*** :Av avahî ye. ***Pend*** :Av te bi bit li pira nemerdî siyar nebe. ***Pend*** :Ava li dwî mêwîja, weko ramosana kîja. ***Pend*** :Ava li dwîv tirî wek giya bab mirî. ***Pend*** :Ava li dwîv berîyê, wek maça bin perîyê.***Pend*** :Av û agir dijminên hevin. :***Pend*** :Ava li dû kezana, weke karê nezana.

**Ava** (hn.x.çewa), 1.Dirist. Çêkirî. Xanedan. Peyt :Gundekê ava. :Maleka ava. 2. Cihê ku roj lê berêve (niqo) dibit.3. Mirovê difinbilind . :Ewê he di zikê xweda çendê avaye!.

**Avabûn** (k.jn.l.mê) 1.Dema tiştek li ber çavan hinda di be. :Roj li êvaran ava di be. :Roja me ava bû.2. Hatin avakirin. :Supas bo xudê xwelatê me jinû ava bû ve.(K) bn: Bûn.

**Avakirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov xanîyek, dikanek, pirekê û htd ava di ket. Ranan. :Me ji xwe rr xanîyek ava kir. :Gundê me dubare hat avakirin. Damezrandin. : Em dê gund û bajêran ava bi kin. *Pend*: Ta mizgeftek ava kir, dêrek wêran kir. Ang; ta mirov karekê baş di ket, hember wî yekê xirabtir di ket. BR× Kavilkirin. (K) bn: Kirin.

**Avakirî** (rd,hk.l.çewa) Diristkirî. Ranayî. Yê hatî avakirin. :Xandingeha avakirî.ang;hatî ye ava kirin. Br× Kavilkirî.

**Avan** (n.x.dz) 1. Ava. Avakirî. 2.Nave xort û kiçane. : Avan hate mal. :Eve qelemê avanî(avanê)ye.

**Avahî** (n.x.nêr) Cihê ava ko mirov lê bi karin bi jîn, mîna gund û bajêran , xanîyên dirsitkirî. :Ev avahîye ji pênc texan pêk di hêt. Avayî.

**Avba** (n.l.mê) Biyav. Seqa.

**Avberdan** (k.jn.l.mê) Vekirina rêya avê rêjtin ser erdî. Avrêjtin. (K) bn: Berdan.

**Avdan** ( k.jn.l.mê) Weke mirov avê bi de giyandar , darubar çandin. (K) bdn: ez avdidem,em av didin tu avdidî, hûn avdidin,ew, avdidit(dide) ewan avdidin.(F) : avde, avden. PR: Dê av[bi] dim, dî,.bn : dan. : pezî av de. Bîstanî avde.

**Avdank** (n.dar.mê) Amanke bi lepik û cilkirî jibo têkirina avê, li aqaran mifa jê wer di girin. Dolikê avê.

**Avdel** (karn.ddar.dn) 1.Kesê avê liser co û bîsanan belav di ke. 2. Nave kurane.

**Avdest** (n.l.mê) 1. Cihê şûştina dest û çavan.2. Tewalêt. Daşir.

**Avedan** (hn.dar.çewa.) Ava. Bi xudan. Sexbêrkirî.Gundek avedan. maleka avedan. Welatek avedan.

**Avedanî** (n.dar.mê) Bizava avakirina şar û gundan.Avakirin. :Karê avedanîyê li Kurdistanê berdewame.

**Avedank** (n.l.dar.mê) Dolkê avê.

**Avêsta** (n.x.mê) Pirtoka pîroz a dînê behdînî, ko jibo pêxember Zerdeşt (s.x) hatîye.

**Avhil** (n.x.mê) Destpêk. Berahîk. Nişkêve. :Avhilekê em gehiştim.

**Avgenî** (n.l.mê) Ava gemar. Avan pîs.

**Avik** (n.x.mê) 1.Xwarina şil, 2. Ava kêm, nazik, 3. Tovê giyandaran.

**Avilk** (n.dar.mê) Peqîşkên bi avin li dest û pêyên mirovî ji egera karkirinê yan rêveçûnê peyda di bin. Avlek.

**Avir** (n.x.mê) 1.Nêrînek ciwan,kurt û balkêş.2. Çav lê niqandin. Çavkirin.

**Avirandin** (k.jn.x.mê) Tiştê honerî, zanîn, sazkarî.htd yê ji nû bêt çêkirin.dahênan.(K) bdn :ez di avirînin em di avirînin, tu di avirînî hûn di avirînin, ew di avirîne[…it] ewan di avirînin. Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di avirand, di avirandin. Db,dûr : avirandibû, aviradibûn.(F) :bi avirîne bi avirînin.

**Avirêner** (karn.dar.dz) Mirovê avirandinê dike.

**Avirmîş** (n.l.mê) Tevin yan qeska kirmek taybete, mirov bo durusit kirina perûkan bikar di hînin, kurtekê avirmîşî.

**Avis** (hn.x.çewa) Giyandarên zikpir. Dugiyan.Têjik di zikî da. : Çêla avis. Bizin, mih, kitik a avis.

**Avisbûn** (k.jn.l.mê) Ji encamê cotbûna nêr û mêyan, tuxê mê avis di be. Bergirtina giyandaran. Giranbûn. Zikpirbûn. (K) bn: Bûn.

**Avisî** (n.dar.mê) Diyarbûna nîşanên avisbûnê. Avisbûn.: Avisîya vê bizinê xuya na ke.

**Avisîn** (k.jn.x.mê) Avisbûn. Girbûn.

**Aviskirin** (k.jn.l.mê) Paş cotbûna nêr û mêyan, nivşê mê ji alîyê yê nêr ve di hêt aviskirin. (K) bn: Kirin.

**Aviskirî** (hk.l.çewa) Giyandarê bi rê destkarî hatî aviskirin, yan li demekê taybet da berdana nêrînan jibo nav mêyan dako bi perin..

**Avî** (hn.dar.çewa) Darûbarên bi avdanê dijîn. Ne dêm. : Zevî ya avî. Hijîra avî. BR×Dêm.

**Avîkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov zevîyekê, erdekî bi çîne avê berde ser. Me erdê xwe yê dêm kire avî û dê zerdil û sêvan lê çînîn.(K) bn :Kirin.

**Avîvan** (nl.mê) 1. Kesê avê liber mêhvanan di gêrit. Avder. 2. Nave kiçane.

**Avjen** (karn.dar.dz) Melevan.

**Avjenîn** (k.jn.l.mê) Melekirin. (K) bn: Jenîn.

**Avkêş** (hk.l.dz)1. Mirovê avê di hîne. 2. Pempê avê.


**Avkêşan** (k.jn.l.mê) Kêşana avê. Înana avê.(K) bn: Kêşan.

**Avpalêvtin** (k.jn.l.mê) Avê li pate yan kaxezeka nemaze di kin jibo ava pakij peyda bi bit. (K) bn : Palêvtin.

**Avlek** (n.dar.mê) bn :Avilk.

**Avlêkirin** (k.jn.gl.mê) Av berdane ser cihekî. Pêdakirina avê. :Avê li belgên giyayî kir. (K) bn: Lêkirin.

**Avokado** (n.biyan) *fêqî* Core fêqîye wek hirmîkane, tama şirîn têda nîne.



**Avokado**

**Avpalêv** (n.l.mê) Amêrê palavtina avê. Fîlter.

**Avpijandin** (k.jn.l.mê) Avreşandin. :Avê li nanî bi pejîne. (K) bn : Bijandin.

**Avpijînk** (n.dar.mê) Amêrê pijandina avê. Amêrê av reşandinê.

**Avpîv** (n.l.mê) Amêrê pîvana astê avê. Amêrê pîna çendîya avê.

**Avpîvaz** (n.l.mê) Xwarine ji avê û pîvazan pêkhatîye. Avka pîvazan.

**Avpîvan** (k.jn.l.mê) Pîvana ast û çendîya pirbûn û zêdebûna avê. (K) bn : Pîvan.

**Avrabûn** (k.jn.l.mê) Dema ava çem û coyan jiber barîna befir û baranan boş di bit. (K) bn: Rabûn.

**Avreşandin** (k.jn.l.mê) Weke mirov çipikên avê li tiştekî bike. (K) bn: Reşandin.

**Avrêj** 1 (n.l.mê) 1.Destav. Av lêkirin. Mîztin.2. Tewalêt. Daşir.

**Avrêj** 2 (n.l.mê) Borîya av jê di dên dema mirov ve di ke.



**Avrêj**

**Avrêjk** (n.dar.nêr) Mesîn. Mesînê avdanê.

**Avrêjtin** (k.jn.l.mê) Rêjtina avê. Berdana avê. (K) bn: Rêjtin.

**Avrijandin** (k.jn.l.ê) Avrêjtin.

**Avsark** (n.l.nêr) Gozik. Cer. Den. :Ava avsarkî ya tezîye. Avsrk şikest.

**Avşile** (n.l.mê) Xoşavên tîr.Ava fêqî ya tîr.

**Avşir** (n.dar.mê) 1.Sîlav.Sûlav.2. Tewalêt.

**Avşirdoq** (n.dar. mê) Avika bê tam û ne kelî. :Metfînî ya bûye avşirdoq.

**Avşork** (n.dar.mê) Ava şor. Sîravk.

**Avtal** (n.dar.mê) 1. Derya. 2. Ava tal. Talavk.

**Avtawe** (n.x.mê) Axlewîk.

**Avzêl** (n.dar.mê) Cihê av û kur (teqin) lê kom bûyî û pêtî bûyî. Lehî.

**Avzêr** (n.l. mê) Ava zêrî.

**Avzêrkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirina zêrî. Vavartina zêrî bi avê. Palêvtina zêrî. (K) bn : Kirin.

**Avzih** (n.l.mê) Erd yan cihê av lê di zêt. :Jiber barîna barana pir, avzih ên li zevîyan çê bûyne.

**Avzone** (n.dar.nêr) 1. Cihê av lê xir di bit, di be gol.Gola avê.2. Hesinkê demhijmêr û bendikên(qeytan) pêlavan.

**Aw** (n.x.mê) bn :Av.

**Awa** (n.x.nê) Reng. Cor.Şêwe.: Bi vî awayî; bi vî rengî.

**Awar** (n.dar.mê) Av û ar têkel kirin bo xwarina kewalan. Avar.

**Aware** (n.x.dz) Derbider. Dûr ji mal û welatê xwe. Revend. Mişext.

**Awarebûn** (k.jn.l.mê) Ji mal û warê xwe derkevtin. :Hizaran kurd jiber zordarîya dagîrkeran li biyanistanê aware bûn.

**Awareyî** (n.dar.mê) Derbiderî. Xerîbî. :Jiyana awareyî. Jiyana dûr war û cihê xwe.

**Awarekirin** (k.jn.l.mê) Bi darê zorê ji mal û waran derêxistin. Bê hez ji cihê xwe dûrkevtin.

**Awat** (n.x.mê)1. Hîvî. 2. Navê keçane.

**Awaz** (n.x.mê) 1. Selîqe. 2.Navê keçan.

**Awazdanan** (k.jn.l.mê) Dema mirov awazan jibo staranan di dane. (K) bn : Danan.

**Awaz<u>daner</u>** (pîşn.l.dz) Kesê pispor di warê danana wazan da.

**Awaz<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Awazdanan. (K) bn: Kirin.

**A<u>wir</u>** (n.x.mê) Avir. Avrî.

**A<u>wîz</u>** (n.x.nêr) Amêr. Awîzêd radyoyê.

**Aw<u>rîng</u>** (n.x.mê) Navê kiçane.

**Ax** 1 (n.x.mê) Xak. Erd. :Axa seran . Xxa sor. Axa pêtî. ***Pend*** :Axa dûr dermanê çavên kor(***khor***). Ang; tiştê dûr yê şirîn û bihadare.

**Ax** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê dax û keserê ye. Mixabinî, kovan .Ah. Êş. Jan. :Ax bo wê roja em xo serferaz di bînîn !. :Ax dayê çi bi serê hat !. ***Pend*** :Ax jibo êka bi kemax.

**Axa** (nax.nêr) Rûsipî. Mezinê gund, hoz ,binemal. Serokê hozê. ***Pend*** :Heger axa bi be ker pîyên xwe lê ne hejîne. Ang; rêzgirtina mirovên kenkele.

**Axa<u>tî</u>** (n.dar.mê)Mîna axa serederî kirin.

**Axav<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Axivtin.

**Axe<u>ban</u>** (n.l.mê) Ax a banên avahîyan pê di nixêvin. Axa ser banan.

**Axeban<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Paş avakirina xanî [li gundan]bi dawî hat dê banî ax ken.

**Axivan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Dane axivtin.

**Axi<u>vîn</u>** (k.jn.x.mê) Peyvîn. Gotin. Ev jine pir di axivit (K) bdn : ez di axivim em di axivîn, tu diaxivî hûn di axivin, ew diaxive[…it] ewan di axivin. Pr. Dê[bi] + bdn. Bdb : di axivîm, di axivîn, di axivî, axivtî,di axivîn(axivtin) . Db,dûr : axivtibûm, .bûyn, bûy,.. bûn,..bûn. (F) : bi axive, bi axivin.

**Axiv<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Axivîn. . ***Pend*** :Heger axivtin zîv be, ne axivtin zêre. ***Pend*** :Axivtina şev û rojan ne êke.***Pend*** :Axivtina mêranî bêje, roja pevçûnê li mal nebe.

**A<u>xîn</u>** (pêrb) 1.Alavê dax û kovanan. Bîranînên bi jan, kovan, peşêmanî .Ax. 2. Navê kiçane.

**Axîn<u>kişandin</u>** (k.jn.l.mê) Weke mirov axînkekê bînit xwe. Bêje ax,dax. (K) bn: Kişandin.

**Axîn<u>rahêlan</u>** (k.jn.l.mê) Axînkişandin. (K) bn: Rahêlan.

**Axlê<u>ve</u>** (n.x.mê) Meha avdare. Destpêk. Nûsal.

**A<u>xurk</u>** (n.dar.mê) ***pêşik*** Axwîrk.

**Ax<u>ûr</u>** axwîr(n.x.mê) Cihê hewandina dewaran. :Hespê xwe bire axûrê.

**Ax<u>wîrk</u>** (n.dar.mê) Corek pêşîyên biçûke li havînan peyda di bin û xwîna candar û mirovan di mêjin.

**Ay** (pêrb) ***rêzman*** Alavê peşêmanî yê ,keseerê.derbirîn ji êş û jan , derd ,nexweşî sotin, :Ay babo çend peyameka disoj bû. :Ay te ez êşandim!.

**<u>A</u>ya** (pêrb ) Alavê pisyarê. E<u>rê</u> ?.

**A<u>yîn</u>** (n.x.nê) = dîn , ol. ayîna îslamê,..

**Ay<u>şê</u>** (n.x.mê) Nave jinane, gazî kirina(Ayşa) ye.

**Aza** (hn.x.çewa) Zîrek. Bi cerg. Mêr. Mêrxa. 2. Destordayî. :Şivanî hespê xwe aza kir, lê borîn. Gerdena min aza ke.

**A<u>zad</u>** (n.x.nê) 1. Serbest. 2. Navê kurane.

**Azad<u>bûn</u>** (k.jnlmê) Rizgarbûn. (K) bn: Bûn.

**Aza<u>dî</u>** (n.dar.mê) Serbestî. :Hemû kes di bîr û boçûnên xweda azadin .:Xebat ji pêxemet azadîya welat.

**Azad<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Gelek, kesek ji bindestî yê bi hêt derxistin. :Gelê kurd, Kurdistan bi xwîna xort û keçên xwe azad kir.(K) bn: Kirin.

**Aza<u>kirin</u>** (k.jnl.mê) Lêbûrîn. Berelakirin. Lêxweşbûn. Gerdenazakirin.:Ez hîvî ji te di kim min vê carê azake.:Lewendî kerê xwe aza kir.

**Aza<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Mirovê hatî aza kirin. Candarê hatî aza kirin.:Ew mirovek azakirî ye hema çi di ke bila bi ke.: Ev hêstire ya azakirî ye.

**Az<u>ar</u>** (n.x.mê) Êş .Nan Nexweşî. Derd.

**Azar<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Éşandin. (K) bn: Dan.

**Aza<u>yî</u>** (n.dar.mê) Zîrekî. Mêranî.

**Azerbey<u>can</u>** (hk,cih. Cugrn) Welatekê [komareka]Sovyettistan a berê.

**Azerbeyca<u>nî</u>** (nete,n.dar) Xelik û mitayê Azerbaycan.

**Azerî** (net,n) Azerbaycanî.

**Azirandin** (k.jndarmê) tu kesekî tiştekî bi azirînî. Wîzarokî ne azirîne. (K) : bdn :ez di azirînim em di azirînîn, tu di azirînî hûn di azirînin, ew di azirîne[..it] ewan di azirînin. Pr :dê[bi] azirînim, azirînin, azirînî, azirîinin, azirînit[..ne], azirînin. bdb : di azirand, [pir] di azirandin. Db,dûr : azirandibû, …bûn. (F) : bi azirîne, bi azirînin.

**Azirîn** (arizîn)( k.Jn.x.mê) Tingijîn. Torebûn. Pindivîn. :Mirov, stêng, mêş, zirkêtik ya(yê) azirî, (K) bdn :ez di azirim em di azirîn, tu di azirî hûn di azirin, ew di azire[..ît] ewan di aziri n. Pr: dê[bi] azirim, azirîn, azirî, azirin, azirit, azirin. bdb: di azirîm, di azirîn,di azirî, di azirîn di azirî, di azirîn. Db,dûr : azirîbûn, azirîbûyn, bûy, .. bûn,, bû. (F) :bi azire bi azirin.

**Azmûn** (n.x.mê) Ezmûn.

**Aznîf** (n.x.mê) Yarîya domîne.

**Azoqe** (n.x.nê) Erzaq. Xwarin. :Azoqeyê me têra du mehane. Tiştên xwarinê. Erzaq.

# B

**B** pîta duwê ji abeya kurdî.

**Ba** 1 (n.x.nêr) Gazek bê reng û bêhin e, bi çav nahêt dîtin. ***Pend*** :Ji ber bay çû ber barovê. Ang;

Tanî mirov ji belayekê derbaz di be,di keve êka mezintir.***Pend*** :Ba di hêt jaran jar di ket, hejaran har di ket. Ang ; gihorîn. ***Pend*** : Hay ji bayê dinyayê nîne. Ang; kesê (mest) çi bi xo ne kete xem. ***Pend*** :Devê xwe di bayî di werînit.ang; kesê çavtarî xwe di havêt her tiştê kevte ber.

**Ba** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê nêzkirinê ye.Cem. Nik .Li ba. Li Cem. Liba. Licem. : Were ba min. Ez li ba kalkê xwe bûm.

**Bab** (n.x.nêr) Nivşê nêr ji daybabên kur û kiçan yan êk ji makên nêr bo têjikan.  Bav.

**Baban** (welatn) Navê mîrgeheka kevin a kurdane.

**Babanî** (malb,n) Xlik ên mîrgeha Baban.

**Babe** (n.x.nêr) Bab.

**Babelîç** (n.dar.mê) Tilîya navbera qilîç û nîvê. Tila gustîlê.

**Babelîsk** (n.dar.mê) Bayê dijwar û hêzdar, yê di zivirit û ziyanê di gehînit.



**Babelîsk**

**Baberkevtin** (k.jn.gl.mê) Perçivîn. Êvitîn. (K) bn: Kevtin.

**Babet** (n.x.nêr) Mijar.

**Babetî** (hn.dar.çewa) Girêdayî mijarekê, babetekî.

**Babik** (n.x.nê) Berebab. Dara malbatê. :Ez û ew mirovên êkin , lê babikên me cudane.

**Babil** (cugr,n.hk.cih) Bajêrek kevine li Iraqê.

**Babir** (n.l.mêr) 1. Dîwar. Berbest. 2. Corekê cilikane mirov li ber xwe di ken jibo xwe parastina ji serma,hur û bayî.

**Babirc** (n.dar.mê) Gula beheştok.

**Babirek** (n.dar.mê) Perdeya bi hêza bayî gemîyan pal di de.

**Babkalk** (n.l.pir) Nivş. Berebab. Nejad. :Babkalikên wî ji Kurdistana Turki ne.

**Bablekan** (n.l.mê) Sitraneka kevine, folkilorî ya kurdiye , ta noke li şayîyan tê gotin, govend liber di hêt kirin.

**Bablîsok** (n.dar.mê) Babelîsk.

**Babole** (n.dar.mê) Parîyê nanî yê mezin.Balolka nanî. Balolik.

**Babsalarî** (rd.l.çewa) Dema deshelat di destê babê da bit û bab semyan bit.(patiyark).Bab serwere.

**Babûn** (k.jn.l.mê) Hêzik ji alîyekî di çe yê din.Bi ba kevtin. Dadan. Hêsk ba bû. Dartevin gelek ba di bit.

**Babûne** (n.x.mê) Gula beybûn.


**Bac** (n.x.mê) Rêjeka pareyî ji welatîyan di hêt wergirtin , diçit xizîna hukmetê û bo projeyên nîştimanî di hêt mezaxtin.

**Baca** (n.dar.mê) Kuna derkevtina dûkêlê. Kuleka banî.

**Bacan** (n.x.mê) Berhemek çandinîye Temate. Bacansor..

**Bacanreşk** (n.l.mê) Berhemê çandinîye rengê wê reşe. Şêweyê wê dirêje û lûleyîye, bi kelandin, birajtin, dagirtin, xavî û htd tê xwarin. Balcan. :Îpraxên bacanreşkan.

**Bacansork** (n.l.mê) Bacaneka reng sore şêwe xire,bi xavî û kalandî , birajtî tê xwarin.



**Bacansork**

**Bacdan** (k.jn.l.mê) Dana bacê. :Di vê herkes li gor dahatîyê xwe bacê bi de.

**Bacdanan** (k.jn.l.mê) Danana bacê liser mitêyî. (K) bn: Danan.

**Bacdanîn** (k.jn.l.mê) Danîna bacê. Bacdanan.

**Bacgeh** (n.dar.mê) Rêvebirîya bacê.

**Bacgir** (pîşn.dar.dz) Kesê bacê werdigire.Fermanbirê bacgehê. :Birayê min bacgir, li bacxanê.

**Bacik** (n.x.mê) Bîber. Filfil.

**Bacwergir** (pîşn.l.dz). Kes yan dezgeha berpirs bi wergirtina bacê.

**Bacwergirtin** (k.jn.l.mê) Wergirtina bacê.(K) bn: Wergirtin.

**Baçermok** (n.dar.nêr) Çekçekîle. Şevkork.

**Baçik** (n.dar.mê) Cigare.

**Bad** (n.x.nê) Ba.

**Badam** (n.x.mê) Bahîv.

**Badan** (k.jn.x.mê). Lêkzivrandin zivrandin. Tiştekî badey, axivtinekê badey, xwe badan xwe ragirtin, mezin kirin. (K) bdn: ez badidim em badidin, tu badidî hûn badidin, ew badide(badidit) ewan badidin. (di badan, di badim, di badit,..)PR : dê bi + bdn. Bdb :Badida badidan (di bada, di badan). Db,dûr : badabû. …bûn. (F): bi bade bi badin(daden). : xwe di ber bêjîngêra ba dide.

**Badayî** (pesin.x.çewa) Tiştê hatî badan . :Zendên badayî. Bendikê badayî .

**Bade** (n.x.mê) Corekê vexwarina kiholîye ji tirî di hêt çêkirin reng sor yan sipîye. Wayn.

**Badefiroş** (kar,n.l.dz) Kesê badeyê di firoşe.

**Badek** 1 (n.x.mê). Kaxezên hilgirtî di nav bergekî de,dako bi hên paraztin. Fayêle.

**Badek** 2 (n.dar.mê) Dirêlê karebayî ê kunkirina dar, dîwar, pencer û htd.

**Badenoş** (peyv.alv. niza) Peyveke li dema vexwarinê kopan li hev di din û daxaza saxîya hevdu dikin bi gotina [badenoş bit]. .. noşê can bit. Demarniman.

**Badev** (n.dar.mê) Bayê tezî. Bakuzîrk. :Duhî badeveka dijwar hebû. :Jiber bdevê mirov nikare serê xwe ji derî derxe.

**Badîn** (n.dar.mê) Kopê vexwarina ereqê.

**Badînan** (cugraf,n.dar). Deverek binavdenge li Kudistana başûr. Wargeha mîran bo.Ramana wê ji badînî hatîye ango dînê pîroz, ko dînê Zerdeştîye.

**Badînanî** (malbn.deverndar) Xelik yan kelûpelên ji devera badînan.

**Badînî** (malbn,devern,n.n.dar.dz). 1 .Zarê(devoka) badînî .2 Xelkê devera Badînan. 3. Mitayê badînan.

**Bagêje** (n.dar.mê) Babelîsk.

**Bagird** (n.dar.mê) Bagêje.

**Bagirtin** (k.jn.l.mê) Bawîbûn.

**Bagirtî** (hn.l.çewa) Mirovê bawî. Nesax.

**Bagurdan** (n.dar.nêr) Berekê lûleyîye destikek mîna darlastîkan heye di kunên herdu alîyên wî de di zivirin, liser banên axî di hînin û di bin jiob ban dilopan neke.***Pend*** :Banek û bagurdanekin.ang; kesên gelek heval û têkelên hev.

**Bahîv** (n.x.mê) 1 Dareka bi bere li cîyên dêm yan avî, hişîn di bit.2. Berê dara bahîvê, wek kakilk di hêt xwarin û gelek rengên xwarin û sabûnan jê çê di kin, herwesa paş gehiştinê req di bit, kakilka wê bo xwarin û nav zadî mifa jê tê wergirtin.

**Bahîfterk** (nl.mê) Berê bahîvê dema yê ter(kesik).

**Bahor** (n.dar.mê) Persîv. Pejî. Serma.

**Bahoz** (n.x.nêr). Bayê dujwar, bi hêz, digel xwe toz, baran, befrê radimalit.

**Bajar** (n.x.nêr) Bajêr.

**Bajarî** (n.dar.dz) Bajêrî.Kur û keçên xelkê bajêran.

**Bajarok** (n.dar.nêr) Bajêrk.

**Bajarvan** (n.dar.dz) Bajêrvan.

**Bajarvanî** (n.dar.mê) Bajêrvanî.

**Bajele** (n.dar.mê) Nexweşîyeka pîstî ye.

**Bajen** (n.l.mê) Baweşînk.

**Bajêle** (hn.x.çewa) Dema candar ji cihê xwe di revit, hinda di bit. Berela.

**Bajêlebon**( k.jn.l.mê) Dema mirîşk li ser hêk û cihê xwe ne raweste :Mirîşka me ya bajêleye.

**Bajêr** (hk.cih,n.x.nêr) Şar. Avayîyê hijmara wî zêde bit, mercên pêşkeftina jiyanê lê hebin , wek xandingeh, polîsxane, nexoşxane, û htd. :Bajêrê gelek ê mezine. Navê bajêrê te çiye?. Tu xelkê kîjan bajêrîyî?. :Jiyana li bajêran ne wek ya gundane.

**Bajêrî** (n.dar.dz) Xelkê bajêrî. Xwecihên bajêrî.: Rengê te diyare, tu bajêrîyî!.

**Bajêrk** (n.dar.nêr) Bajêrê biçûk yê ko bajêvanî heye. Gundê mezin.

**Bajêrvan** (n.dar.dz) 1.Xwecihê bajêrî. Xelkê[a] bajêr.2. Serokê bajêrî.

**Bajêrvanî** (n.dar.mê) 1.Rêvebirîya bajêran. Şarvanî. 2. Pêşveçûn. Sivîl.

**Bakêş** (n.l.mê) Pank. Batezînk.

**Bakirin** (k.jn.l.mê) Dane bayî. (K) bn: Kirin.

**Bakuzîrik** (nl.mê) bayê dujwar û sar deng û awaz jê dihên.

**Bakûr** (hk.cih.cugr,n) 1.Semta jorîya cihan. Serî. Serû.Jorî. Serî. Br× başûr.2. Navê mêrane.

**Bakûre** (n.dar.nêr) Gopal.

**Bakûrî** (nej,n.dar.dz) 1.Xelkê bakûrî. 2. Navê mêrane.

**Bakût** (n.dar.mê) Çala pir befir. Kuleka tijî befir bûyî jiber bahozê.

**Bal** 1 (n.x.nê) 1. Çeng. Per.2. Rex. Alî.

**Bal** 2 (n.x.mê) Nêrîn. Serinc.

**Bal** 3 (n.x.mê) Bejin.

**Bala** (n.x.mê) Bilindî.

**Balaban** (n.x.mê) Amêrekê mûzîkê yê pifkirinê ye.

**Balaberz** (hn.l.çewa) Bejinbilind.

**Balbalok** (n.dar.pir) ***candar*** Kulî.

**Balbas** (karn.dar.dz) Zêrevanên zom yan xîvetgehan. Élçî.

**Balcan** (n.dar.mê) Bacanreşk.

**Balçermok** (n.dar.nêr) Baçermok.Çekçekîle.

**Baldar** (n.dar.mê) Candarên bi per ko di firin. Firinde. Tewal. Çûçik. Teyr. : Kotir baldare. : Baldar firî.

**Baldarî** (n.dar.mê) Hişyarî. Agehî.

**Baldirêj** (hn.l.çewa) Bêhinfireh. Milpan.: Bapîr kesekê baldirêje.

**Baldirêjî** (n.l.mê) Bêhinfirehî.

**Baldirêjbûn** (k.jn.l.mê) Xwe jêkrakêşan. Bêhinfirehbûn. (K) bn : Bûn.

**Baldirêjkirin** (k.jn.l.mê) Bêhinfirehkirin. (K) bn: Kirin.

**Bale** 1 (n.x.mê). Perokên pêçayî, ên kevin û nû . Bazarê balan, ….perokan.

**Bale** 2 (hn.x.çewa) Lewçe. Çivêl.

**Baleban** (n.x.mê) ***mûzîk*** Balaban.

**Balefir** (n.l.mê) Firoke.

**Balefirgeh** (n.l.mê) Cihê firîn û danana firokeyan. Firîngeh. Firokexane. :Firokeyan li balefirgehê dadan. :Balefirgeha Hewlêrê.

**Balefirvan** (pîşn.dar.dz) Mirovê balefirê di hajot. Şûfêrê balefirê.

**Balefirxane** (n.l.mê) Balefirgeh.

**Balekirin** (k.jn.l.mê) Kesthavêtin. Girtin. Bezînê. : Daykê bale kir destê zarokî. (K) bn: Kirin.

**Balete** (n.dar.nêr) Balête.

**Balgeh** (n.dar.mê) Balîfk. Palgeh. :Serê xwe liser balgehê dana û di xew çû.

**Balinde** (nl.dz) ***candar*** Giyandarên bi bal . Tewal. Teyr.Çûçik.

**Balîf** (n.dar.mê) Balîv.

**Balîlk** (n.x.mê) Goştekê zêdeye, wek pirsikane,li dest û giyanê mirovî di hên.Balûk.

**Balîv** (n.x.mê) Balgeh. Serîn. Şêweyê lakêşe, lûleyî ye, ji hiryê, mûya, perên mirîşk û tewalan yan îsfencî dagrirtîye, bo bin serî dema razanê, û didin ber palê xwe dema bêhinvedanê.

**Balkêş** (hn.l.çewa) Tiştê bala mirovî dikêşit. Sericrakêş. Gotina we balkêşe. Ango cihê xweşhalîya mine.

**Balkêşî** (n.l.mê) Tiştê bala mirov di kişîne.

**Balkişandin** (k.jn.l.mê) Mirov di xwaze li tiştekî yan kesekî, baş bi nêre. Mirov bala xwe di kişîne..: Ewê bi gotinên xweyên rind, bala guhdaran kişand. (K) bn: Kişandin

**Balkon** (n.x.mê) Eywanka ser banî.

**Balnekêş** (hn.l.çewa) Mirov yan tiştê bala mirov na kişîne. Br× balkêş.

**Balnekêşî** (n.l.mê) Ne xweşik. Ne rind ku bala mirovî nakişîne.

**Balolk** (nl.mê). Tiştê pêçayî, lûlkirî, wek baloka nanî.Parîyê mezin.

**Balolkkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov parîyê nanî di pêçe û çê di ke. : Şivanî nanên xwe kirin balolk û bi rêve xwarin.(K) bn : Kirin.

**Balûg** (n.x.mê) Balîlk.

**Balûpal** (hn.dar.çewa) Qelew. Pifpife. Zegzege.

**Balûr** (n.x.mê) Balûg. Balîlk.

**Balyoz** (n.x.dz) Nûnerê welatî xwe li welatekê din.

**Balyozxane** (n.dar.mê) Bingeh yan avayîyê rûniştina balyozî.

**Bam** (n.x.mê) Dengek hêdîyê, mîna lêdana dil, dihol û htd.

**Bambû** (n.biya.mê) Dareke. Dara bambû.

**Bamernê** (hk,cih,cugr,n) Bajêrkeke li Kurdistana Iraqê.

**Bamernî** (malbn) Xelkê bajêrkê Bamernê. : Ew ji kîye?. Ew bamernîye.

**Bamî** (n.x.nêr) 1. Berê çandinîye loleyîye. :Me evsale li bîstanî bamî çandine. 2.Xwarneke, metfînîya bamîyan.

**Ban** (n.x.nê) Serê xanî, avayî. :havînan liser banan dinivin. : xwezîyek ji banê bilind.

**Banandin** (k.jn.x.mê) Kehîkirin û hînkirina candaran, nemaze kewan. Pez û bizin.

**Banbank** (n.dar.nêr) ***candar*** Curd.

**Bançav** (n.l.mê) Zîha çavî ya serî. Br× Binçav.

**Bandev** (n.l.mê) Kuleka banî. Pencerka banî.

**Bandêr** (n.dar.nêr) Bagurdan. Makîna bagurdan ya tundkirina rê û cadeyan.

**Bandor** (n.x.mê) Şûp. Eger.

**Bandorkirin** (k.jn.l.mê) Bandor lê kirin. Şûp liser kirin. . :Dijminan bandora xirab liser xortan kirîye. (K) bn: Kirin.

**Bane** 1 (cugr,n.hk,cih) Bajêrek li Kurdistana Iranê.

**Bane** 2 (hn.x.çewa) Peyveke nemazeye jibo giyandarên malî bi kar tê , bizineka, miheka baneye , ango;li ser karê, berxê xwe di mîne. Kehî. Guhdar. Sexbêrvan. Qayîl.

**Bane** 3 (n.x.mê) 1. Zozan. Zom. 2. Çerdan. Çerwan.

**Banebûn** (k.jn.l.mê) Hinbûna û nasîna kewalan jibo têjikên xwe. Qayîlbûn. (K) bn: Bûn.

**Banegeh** (n.dar.mê) Zozan. Çerwan.

**Banekirin** (k.jn.l.mê) Dema candarek di hên banekirin. Banandin. Hînkirin. (K) bn: Kirin.

**Bang** (n.x.dn) 1 Bi deng hewar di key mirovekî . Gazî. Hewar.


**Bangdan** (k.jn.l.mê) 1.Gazîkirin bi dengek bilind, xasim mela da xelik bi hên mizgeftê jibo nimêjê. :Melayî bang da.2. Qîrandina Kelebangî. :Kelebangî liser banî bang di da.

**Banî** (n.x.mê) Cihên bilind û rast.

**Bapîr** (n.l .nêr). Babê daykê yan babê mirovî. :Bapîrê min notsalîle. :Bapîrê diyê. :Bapîrê babê.

**Baq** (n.x.mê) Dirêjîya navbera pêy û çokê mirovî. Nexasim alê piştê.

**Baqilk** (n.x.mê) 1.Giyayekê, kêlîka di girit û tovê baqilkê têda dirist di bit.2. Berê baqilkê mîn fasolîye, pane, ya ter reng keske, dema di gehe reng qehwayî ye.



**Baqilk**

**Bar** (n.x.nêr) 1. Pertalên liser pişta dewaran di ken yan bi tirobêlan vediguhêzin. :Barê te çîye?.2. Kawdan, rewş. 3. Pişk. Bara min bara te. 4. Berpirsî . :Hilgrtina vî barê giran, berpirsîya mezin.

**Baran** (n.x.mê) Çipik (dilop) ên avê yên ji asmanan di kevin. : Jiber baranê ez ji mal ne derkevtim. :

**Baranbarîn** (k.jn.l.mê) Hatin yan kevtina dilopên avê ji esmanan. : li biharan pir baran di bare.

**Barbar** (nl.mê) Dengê(barîna) pezî.

**Bargeh** (n.l.mê). 1.cihê barkirina mitay.2. patirîya barkirin(zax kirina) tiştên eliktironî, wek telefon..yd.

**Bargîr** (n.l.nêr) Hespê barî, barhigir. Bargîrê hêzdar. :Bargîrekê lewaz.

**Barîn** 1 (k.Jn.x.mê) Hatina baranê. Ketina baranê. Werana tiştan.

**Barîn** 2 (k.jn.l.mê) Dengê pezî. :Mih di barit. Barêna beranî.

**Barkirin** (k.jn.l.mê) 1. Karê barî, bar danana ser pişta dewaran. Tirombêl bar kirin.2. zivrandina ser barê destpêkê , demjimêr(se'et) barkirin.

**Barot** (n.x.mê) Keresteyekê peqînere,potiraye bo peqandina guleyên top û tivengan di cengan da bi kar di hêt. Barît.

**Barove** (n.l.nêr). Bayek dujwar ,bi toz û duman, li havîn û payîzan. ***Pend*** :Jiber bayî çû ber barovê.

**Barzan** (devern) 1.Devereke. 2. Çend hozin . 3.Gundeke , li Kurdistana îraqê, wargehê xebatker û nîştimanperwerane , yên mîna ; Ş. Ebdulselam ,Ş. Ehmed, Nemir Mustefa Barzanî ,Îdrîsî herdem zîndî, Serok M.Barzanî û gelekên dî. Ko canê xwe kirin gorî doza gelê Kurdistanê.

**Barzanî** (dever,n.dar.dz) 1. kesê kû xelkê dever yan gundê Barzane 2. Nemir babê gîyanî ê neteweya kurd û kurên wî yên dijî bi rêbaza pîroz a wî di den.

**Bas** (n.x.nêr.biyan) Gotin. Tekes.Gilî.

**Bask** (n.x.nêr) 1.Girk û milên ser zirav ,tîj. Şivanî pez li ser baskî di çerand. 2.Darkê cigaran. :Baskê cigara wî ji dara kinêrî ye. 3. Lêvên goreyan. :Baskê gora min gelek di tundin, pêyên min di êşînin. 4. Çingilê mirovî ji enîşkê ta binkefşî û milî. :Baskêd lîstikvanî di badayîne.

**Baskirin** (k.jn.l.mê) Gilîkirin. (K) bn: Kirin.

**Baş** (hn.x.çewa) Çak. Qenc. :Geryan ya başe. :Ez baş di zanim ev çiye. :Mamostayê me mirovek pir başe. Br× Xirab.

**Başbûn** (k.jn.l.mê) Tiştê ber bi başîyê diçe. : Rewşa jîyanê baş bûye. (K) bn: Bûn.

**Başî** (n.dar.mê) Karê baş. Çakî. Qencî. :Ev kure başî û xirabîyê ji hev cuda nake.

**Başîkirin** (k.jn.l.mê) Qencîkirin. ***Pend*** :Başîyê bike, da başîyê bi bînî. ***Pend*** :Başîyê bi ke û di ber avê da berde.ang; çakî bê berhember. (K) bn: Kirin.

**Başkirin** (k.jn.l.mê) Pêşêxistin. Qenckirin. : Te baş kir ku tu zivirî mal. (K) bn: Kirin.

**Başkirî** (hk.l.çewa) Hatî başkirin.

**Başûr** (hk.cih.x.nêr) Jêrîya her cihekî.: Başûrê Kurdistanê. :Ez ji başûr di hêm.

**Batezînk** (n.l.mê) Amêreke karebayî ye, li havînan bayî di tezîne, jibo xwe ji gerimê paraztinê bikar di hêt. : Batezînka me kar na ke. :Bayê batezînê pir sare.

**Batirsok** (n.l.mê) Reşe. : Batirsok li ber çavan çê bi bûn. Ji batirsokan di tirse.

**Batîfa** (cugir) Bajêrkek li Kurdistana Iraqê.

**Bawer** (n.x.mê) 1. Kar yan kiryaran mirov ji dil wergire û bi pejirîne. 2. Hizir. Ez bi bawerim ku em dê serkevîn di karê xwe da. 3. Navê xort û keçane.Bawerî.

**Bawerî** (p.x.mê) Gotin û kiryara di cihê xwe da. Piştrastî. Piştgrêdan bi karekî yan gotinekê. :Bawerîya gelê me ji gefên dijminan bi hêz tire.

**Bawerîhînan** (k.jn.l.mê) Bawerkirin. :Bawerîya min nahêt hevalînîya wî bi kem. : Te çima bawerî bi wê çpelê hîna?. Çi caran bawerîyê bi mirovê xapînok ne hîne !.

**Bawerkirin** (k.jn.l.mê) Mirov gotin yan sozekê sedased wergire.Mirov gotina êkî bi pejirîne. :Ez bawer di kem ji soza te. Bawer bi ke ez rast di bêjim. :Tanî bi çavên xwe ne bînî bawer neke. ***Pend*** :Agir berbû mala direwînî tu kesê bawer ne di kir.

**Bawesîrî** (n.l.mê) Nexweşîyeke, rûvika rast kul di bit.

**Baweşk** (n.l.mê) Bayê li dema xewa mirvî di hêt yan mirov mandî di bit, ji devî der di kevit, dev ve di bit û dengek wek (AA)di gel da di hêt. : Baweşkên vî zarokî di hên, diyare xewa wî ya di hêt.


**Bawk** (n.x.nêr) bn :Bab.

**Bawksalarî** (hn.l.çewa) bn :Babsalarî

**Bax** (n.x.nêr). Werzê. Rezê fêqî. Baxçe. :Ewê he baxek gelek xemildare.:Gundên Kurdistanê pir baxin. :Baxê xwe av da. :Çûn nav baxî.

**Baz** 1 (n.x.nêr) 1.Ast. : 2. Kêş yan şûnpêyên pezkûvîyan.

**Baz** 2 (n.x.nêr) ***perinde*** Core balindeyekê goşxwere hez ji nêçîra candarên mîna kêvrîş, kew,sîsk û htd di ke.



**Baz**


**Bazar** (n.x.nêr). Cihê kirîn û firotinê. ***Pend*** :Bira biraye, bazar cuda ye.

**Bazarkirin** (k.jn.l.mê) Dema bikir pisyar û gengeşê bi firoşyarî ra di ke, jibo ko bi pêdivîyan bihayekê erzan bi kire. :Piştî me bazarê xwe kirî, min xanî firotê. : Min bazar di gel dikandarî nekir, jiber hindê wî ez xapandim.

**Bazbend** (n.l.mê) Nivîştîyeke di êxin zenda xwe dako mirovî ji belayên dunyayê û pîrhevîyan bi hêt paraztin. Melayî bazbendek bo ,.. çêkir.

**Bazgeh** (n.l.mê). 1.Cihê derbazbon yan xirvebûna mirovan û giyandaran. 2. Xalên kontirolkirinê yên hatin nav bajêran û derkevtinê.

**Bazin** bazink (n.x.nêr)1. Xelekek ji zêr yan zîvî di ken zenda xwe nemaze jin.Xelek. Bazinên destê wê zêrin. 2. Şêweyek endazeyî xire. Gîx. : Bazinek liser dîwarî çê kir.



**Bazin**

**Bazinî** (hn.dar.çewa) Şêweyî endazeyî mîna bazinan. : Xsanîyê bazinî. :Zevîya me ya bazinîye.

**Bazî** (n.x.dz) Bavê jin û mêrane. Teyrê baz.

**Bazok** (n,cîh.mê) Bazoka. Rakêt .Core topeke,dijî tank û makînên leşkerî bi kar di hêt.

**Beçe** (hk.dem, n.x.nêr) Heşt rojên zivistanê, yên bi sermayê navdengin. *Pend* :Beçe, ji mala xwe neçe.

**Bed** (hn.x.çewa) 1.Nebaş. Xirab. Pîs.herimî. Reş. 2.Bê.Bed rewiş, ang; bê rewişt.

**Bedbext** (hn.l.çewa) Mirovê bê şens. Mirovê xolîser.Mirovê bê rê.

**Bedew** (hn.x.çewa) Ciwan. Rind.xweşik. :Xortekê bedew. Kîjeka bedew.

**Befir** (n.x.mê) Petîlkên ava bestî, reng sipî ji esanî di barin. Berf. *Pend* :Befir karê xwe na hêlit. *Pend* :Befirê gijegije, daxaza kitikê jije.ang; çi çê di bit mirovê her liser ya xwe.

**Befirî** (hn.dar.çewa) Mîna befirê sipî û rind.

**Befrîk** (n.dar.mê) Dareke serê wî sêkujî ye, destikek dirêj pêveye, jibo malîna befirê ji banan û kolanan bikar dihêt. Berfavêj. : Befir ê bi befrîkê ji ser banî bi male.

**Befrîn** (hn.dar.çewa) 1. Pir befir. Berfîn. : Kurdistan welatekê befrîne. 2. Navê keçane.

**Befirmalîn** (k.jn.l.mê) Havêtina befirê ji ser ban û kolanan. : Te befira banî malî?. (K) bn : Malîn.

**Beg** (n.x.dz) Rûspî. Mezin. Axa, ê binemalê yan hozê.

**Begî** ( begê) (n.x.mê) Navê jinane ji beg hatîye.

**Begzade** (malb,n.dz) Nivişê began. Malbeg. Malmezin. *Pend* :Begzade kurore lê bûne kade.

**Behane** (n.x.mê) Dema mirovî di vêt karekî ji xwe ra rewa bi bîne û berevajî, mirov dê li hêcetan gerit. Pelîka.:Wî ji xwe ra behanek dît ko bi karit destûrîyê ji mamostayê xwe bi sitînit. Rê. :Şerha xema dil bikim behane, Zînê û memo bikim behane.(h;A.Xanî)

**Behdînan** (cugraf,n.x) Devereke li Kurdistana Iraqê. Parêzgeha Duhok, Musil. Zaxo Akrê û htd.

**Behdînî** (malbn.dar) 1. Xelkê devera behdînan. 2.Devoka xelik ê Badînan pê di peyvin. Zarê behdînan. 3. Dînê pîroz (zerdeştî). Ola zerdeştî.

**Beheşt** (n.x.mê) Mala xodê ya xweş û dilveker, ko cihê çakan û xodênasan. *Pend* : Beheşta ker û golik lê bi çerindojehe.. :Xudê cihê wî bi kete beheşt. Hîvîdarim tu biçî beheştê. : Kurdistana wekî beheştê ye. Ang; cihek herçend yê xweş û ciwan bit, heger mirovên ne rind lê hebin dê bite dojeh. Br× Dojeh.

**Beheştî** (hn.dar.çewa) Mirovê çak xweşdivî, ko xelik hertim daxaza beheştê jêra di kin.: Ew mirovek hind, hêjaye beheştîye.

**Beheştok** (n.dar.mê) Giyayekê kûvîye, gula wî sipî û nîva wê zere..: Mirov pê di lîzin, dema perên gulê di kişîn ;di bêjin beheşt , ya dû re dojeh, yan ez divêm , ez nevêm. Evca kanê dê perê dawîyî (beheşt, dojeh, viyan yan ne viyan) be. Babirc.

**Behitî** (hn.x.çewa) Mirovê behitî; ango mirovê pir tirsonek ji tirsan da reng zer û pêtî di bit, yan ji egera mizgînîyeka nexweş pêtî di bit. :Eve çi zelamekê behitî ye!.

**Behitîn** (k.jn.x.mê) Reng zerbûn ji tirsan, birsan û nesaxîyan. Pêtîbûn.(K) bdn: ez di behitim em di behitîn, tu di behitî hûn di behitin, ew di behite[…it] ewan di behitin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : ez di behitîm em di behitîn, tu di behitî, hûn di behitîn, ew di behitî ewan di behitîn. Db,dûr : ez behitîbûm, em bihitîbûyn, tu behitîbûy hûn behitîbûn, ew behitîbû ewan bihitîbûn. (F) : bi behite, bi behitin.

**Behî** (n.x.mê) Danana civatan ji alîyê mirovên mirî ve û xelik di hên serexoşîyê li wan di ken û nizaya beheştê ji mirîyê wan ra di kin. Şînî.

**Behîçin** (n.l.dn) Mirovên di çin behîya xwedîyê mirî. : Evro gelek behîçin ji gundî hatin behîya me.

**Behîdanan** (k.jn.l.mê) Dema xudanên mirî behîyê li mal yan mizgeftan di danin ji xelik bi hên sersaxîya wan bi xwazin. : Erê behîya …. Li kîrê ye?.

**Behîdar** (n.dar.dz) Kesên di hên behîyê. Pişikdarên ehîyê. Behîçin.

**Behîn** (k.jn.x.mê) Giya li werzê payîzê reng zer di bit.genin û ceh behîn dema dirûnane. :Li meha xizîranê pîş di behit .Seridîn. Giyayê aqarî behî.

**Behît** (hn.x.çewa) Mirovê bizdihayî.Behitî. : Eve te çîye tu yê behît ?.

**Behîtman** (k.jn.l.mê) Behitîn. (K) bn: Man.

**Behre** (n.x.mê) Bar. Pişk. Par. : Te çi behre di malê da nîne. Behra pitir jibo birayê mezine.

**Behredar** (karn.dar.dn) Pişkdar.

**Behredarî** (n.dar.mê) Pişdarî.

**Behredarîkirin** (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn :Kirin.

**Behremend** (hn.dar.çewa) Xwedî şiyan. Xwedî hizir. Hizirvan.

**Behzad** (n.l.nêr) 1. Kurê ji malan ,resen. Nivşê baş.2. Navê kurane.

**Bejin** (n.x.mê) Pêkhatina leşê morovî .Qed û navteng. Bala. :Bejina wê mîna tayê darê ye.***Pend*** :Bejin ê çi di dirînî, ziko çi di xoy.ang; jibo kesê zengîn û her tişt liber destan.

**Bejinbihost** (hn.l.çewa) Mirovê bejina wî gelek kurt. :Bejinbihostê rih çil gez.

**Bejinbilind** (hn.l.çewa) Mirovê dirêj û bi bejin.

**Bejindan** (k.jn.l.mê) Mezinbûn. Geşbûn. Bilindbûn. :Nemamkê bejin daye. (K) bn: Dan.

**Bejindirêj** (hn.l.çewa) Mirovê bejina wî dirêj û bilind.

**Bejinkirin** (k.jn.l.mê) Bejindan. (K) bn: Kirin.

**Bejinzirav** (hn.l.çewa) Kesê bejina wî zirav. Navtengzirav.

**Bektirya** (n.cîha.x.mê) Candarekê hûrike, bi çav nahêt dîtin.

**Beko** (n.x.nêr) 1. Qehremanê dastana Mem û Zînan, yê ku navbera herdu evîndaran têkdayî.2. Nîşana têkdanê.Têkder.Bekrok.

**Bekrok** (hn.dar.çewa) Mirovê têkder mîna bekoyî.

**Bel** (hn.x.çewa) Diyar . Xuya .Tiştê bilind nexasme jibo guhan tê gotin eger di bilind bin(ji serî), guhbel.

**Bela** (n.x.mê) Derd. Bive. : Malê wan bo bela serê wan.

**Beladîtin** (k.jn.l.mê) Bela di hêt serê mirovî. (K) bn: Dîtin.

**Belafiroş** (hn.dar.çewa) Kesê ku hertim hez ji arêşe û balayan dike, karên xira dike.: Tu çima hosa yê belafiroşî?.

**Belafirotin** …**firoştin** (k.jn.l.mê) Dema mirov di bit egera bela û nexweşîyan jibo xelkî. (K) bn: Firotin.

**Belakir** (hn.dar.çewa) Belafiroş.

**Belakirin** (k.jn.l.mê) Mirov nexweşî çêke. (K) bn: Kirin.

**Belakirîn** (k.jn.l.mê) Belafiroş.

**Belam** (alav) Belê .Lê.Bes.

**Belaş** (hn.x.çewa) Tişt, mita ê bê hember, bê pare. Herwe. :Te ev cilike belaş yên di kirîn.

**Belaşdan** (k.jn.l.mê) Mirov tiştî bide xelkî bê pere û bê hember. Bi herwe dan. : Hevsîyê me keça xwe da yekî belaş. Ang; bê next[qelen]. : Heger tu pêlava xwe belaş bi dî min ez li pên xwe nakim. (K) bn: Dan.

**Belaşkirin** (k.jn.l.mê) Dane xelkî belaş. : îro dikandarekî gundor belaş kiribûn, evca xelkî ji xwe ra di birin. (K) bn: Kirin.

**Belatînk** (n.dar.mê) Pelatînk.

**Belav** (hn.x.çewa) Tişt yan mirovên ji hev dûr. : Pezê me yê belave. Zevîya belav.

**Belavbûn** (k.jn.l.mê) Bijyan. Jihev cudabûn. Jihev piçan. Paş ku dujminî gundê me wêran kirî, em mîna mêrûyên bi per balav bûn.(K) bn: Bûn.

**Belavker** (karn.dar.dn) 1. Kesê tiştî belav diket.2. Pêşkêşker. Nûçeyan belav dike û radigehîne. Belavkerê pişka bernameyên ramyarî.

**Belavkirin** (k.jnlmê) Gehandin. Bijandin. (k) bn: Kirin.

**Belavkirî** (hk.l.çewa) Hatî belav kirin. Ji hev belavbûyî.

**Belavok** (n.dar.mê) Tiştê liser kaxez hatî nivêsîn. Niştî. :Belavoka nûçeyan dê li demjimêr çarê êvarî hêt pêşkêş kirin.

**Belbelîtank** (n.dar.mê) Pelatînk.

**Belbûn** (k.jn.l.mê) 1 Mezinbûn, bilindbûn. 2. Pişkivîn, bişkivîn. Geşbûn. (K) bn: Bûn.

**Belcîka** (hk,cih.cugrn) Welatekê Ewropayîye. Welatê Belcîka.

**Belcîkayî** (tetewn) Mirovê yan mitayê ji Belcîka.Belcîkî.

**Belek** (hn.x.çewa). Kever. reş û sipî bi hevre. belekên befrê,(cihê hin befir û hin ax),.çavên belek.ang reş û sipî. Kewalên belek.

**Belekbûn** (k.jn.l.mê) Befir ji zinar û berojan di buhoje nîve dibe. (K) bn: Bûn.

**Belekçav** (hn.l.çewa) Çavbelek.

**Belekî** (n.dar.mê) Durengî.

**Belem** (n.x.mê) Amêrê veguhaztina mirov û kelûpelan bi rêya avê. Qayîk. Papora biçûk. : Deryaya pirî beleme.

**Belemvan** (n.dar.dz) Yê ku belemê di hajot. Xwedîyê belemê.

**Belengaz** (hn.x.çewa) Hejar. Bê guneh. Sade. : ... mirovekê belengaze.

**Belengazbûn** (k.jn.l.mê) Hejarbûn. (K) bn: Bûn.

**Belengazî** (n.dar.mê) Hejarî. Neyînî.

**Belengazkirin** (k.jn.l.mê) Hejarkirin. : Rewşa aborî xelkê me yê belengaz kirî. (K) bn: Kirin.

**Belê** 1(ngazkir.dar.mê) Candarê mê yê guhên wê di bel, bizina bel. Miha bel.

**Belê** 2 (pêrb) Alavê eyînî (erêkirinê) ye. Erê. :Belê; tu rast di bêjî. Belê weye.

**Belê** 3(pêrb) Alaveke jibo boçnena berdij bi kar di hêt. Lê : Eve diriste, belê ya dî dirist tire. : Ez da hêm seredana te, belê mêvan jibo min hatin.

**Belê** 4 (alv. qayîlbûn) Heger mirov digel bûçna êkî bit. Bi yekî ra be.Erê.

**Belêkirin** (k.jn.l.mê) Piştraskirin. Erêkirin. (K) bn: Kirin.

**Belên** (n.x.mê) Peyman. Soz.

**Belêndan** (k.jn.l.mê) Sozdan. (K) bn : Dan.

**Belênder** (n.dar.dz) Qonterçî.

**Belfe** (n.x.mê) Xap . find. Serdabirin.

**Belg** (n.x.nê) Perên kesik yên bi daran ve di hên. Pelg. :Belgên darê. ***Pend*** :Şirînîya darê ji belgale.ang ji ber kesekî ,mirov hez ji mal, mirov û cihên wî bi ke.

**Belgdan** (k.jn.l.mê) Dema belgên daran ve di bin. : Dara hewşê belgên dayn. (K) bn: Dan.

**Belge** (n.x.mê) Tiştê nivîsî, tomarkirî, wenekirî. Grove. : Gelek belge di destê min da hene jibo girtina gunehbarî.

**Belgename** (n.l.mê) Nameyên di hêne bi kar anîn wek belge, grove. Grovename.

**Belgih** (n.dar.mê) Nivîn.

**Belgkirin** (k.jn.l.ê) Qurtifandina belgan. Jêkirina belgan. : Dayka min belgên mêwê jibo îpraxan jê kirin. (K) bn :Kirin.

**Belgmêw** (n.l.mê) Permêw. :Îpraxên belgmêwan.

**Belgweran** (k.jn.l.mê) Belgên daran di kevin. : Li payîzê belgên daran di werin.

**Belgwerandin** (k.jn.l.mê) Mirov yan hêzek belgên daran bi werîne. :Dar belgên xwe di werîne. (K) bn: werandin.

**Belgweşan** (k.jn.l.mê) Belgweran.

**Belgweşandin** (k.jn.l.mê) Belgwerandin. (K) bn : Weşandin.

**Belifandin** (k.jn.mê) Serdabirin. Xapandin. : Wî bazirganî ez belifandin.

**Belindir** (n.dar.mê) Mîha du ,sê salî.Berindir.

**Beliyandin** (k.jn.dar.mê) Belêkirin. Erêkirin.

**Belkirin** (k.jn.l.mê) Eşkerekirin. Xweyakirin. Bilinkirin. : Hespî guhêd xo belkirin. Bilindkirin. Qîtkirin. : Hespî, segî guhên xwe bel kirin. (K) bn: Kirin.

**Belkirî** (hk.l.çewa) Hatî belkirin. Aşkerakirî. Serav keftî.

**Belkî** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo gotineka, bûyereka ne misoger.. Gotina bi goman. Qemî. Dako. Jiber ko. : Ez çim bazarî belkî bo xwe kirasekî bi kirim.

**Belko** (pêrb) Belkî.

**Belo** (ngazkir.dar .nêr) 1. Beran, nêrî ,ango kewalên nêr yên guhbel. 2. Mirovê dilpak. Dilsax.

**Belokirin** (k.jn.l.mê) Aşkerakirin. Xuyakirin. Diyarkirin. (K) bn: Kirin.

**Belûçî** (nej,n) Neteweyeke li îranê xwecihin.

**Belûçistan** (hk.cih,cugrn.dar) Welatê belûçan.

**Belxem** (n.x.nêr) Bilxem.

**Ben** (n.x.mê) Bend. Bendik.

**Benav** 1 (n.x.mê) Kulind. Kundik.

**Benav** 2 (n.x.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê hişîn di be.

**Benc** (n.x.mê) 1.Madeyeke dema lêdanê leşê mirovî bê hest di ke. :Heker didanê min benc ne bi kira, ez ne di wêram bînim der.

2. Mirovê mest. Serxweş. Mirovê hay ji xwe tune. Bêdeng.

**Bencbûn** (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Bêhoşbûn. (K) bn : Bûn.

**Benckirin** (k.jn.l.mê) Cihekê leşî yan hemûyê benc di kin jibo ku mirov ne êşe dema nijterkirinê. : Dansazî didanê wî benc kir û derîna. (K) bn: Kirin.

**Bend** (hn.x.çewa) 1.Reben . êxsîr. Girêdayî.girtî. Zîndanî. 2.Bendê xwedê. 3. bendik.

**Bendav** (n.l.mê) Cihê ko rêya avê bend û dîwar di ken jibo pengandina wê bo karên pêdvî.Pengav. Sikir. :Bendava Duhokê.

**Bendbûn** (k.jn.l.mê) Girêdan. Qedexebûn. (K) bn: Bûn.

**Bende** (hn.x.çewa) Bend. Reben.

**Bendek** (n.dar.mê) 1. Dema barkirina daran li pişta dewaran, çend darekan di êxin ser kurtanî û wek hev rêk di xin daku bar xar ne bit û peytbit, paş da, dê darên din danin ser ta bi dawî bêt. Bar û bendek li hespê xwe kirin. Wekhev. Hevsan. 2. Zehmet. Dijwar.

**Bendekkirin** (k.jn.l.mê) Dirstkirina bendekan Hevsankirin. (K) bn: Kirin.

**Bendeman** (k.jn.l.mê) Li bendê di mînit. Li hîvîyê man. : Ez li benda te mam, tu ne hatî.(K) bn: Man.

**Bender** (n.dar.mê) Cihê rawestana papor û beleman.

**Bendewar** (hn.l. çewa) 1.Kesê dûr ji ax , cih û welatê xwe û bîrî û kovana jibo di kişîne. Evîndadr. Girêdayê warê xwe. Tengezar. 2. Navê xortan yan keçane.

**Bendewarbûn** (k.jn.gl.mê) Korewarbûn. Bîrkirin. (K) bn : bûn.

**Bendewarkirin** (k.jn.gl.mê) Korewarkirin.: Eve çend salin tu çûyî, te em bendewar kirîn. (K) bn: Kirin.

**Bendewarî** (n.l.nê) Kovandarî. Evîndarî.

**Bendeyî** (n.dar.mê) Nokerî. Xolamînî. Bindestî.

**Bendik** (n.x.nê).Ta yan davên ji dezî stûr tir. Dezîyên têkalandî û dirêj bo girêdana tiştan. ***Pend*** :Heger tu bendikê sor û zer bayî, da bi himbanka xwe ve bî!.ang ; kesê bi kêrî xo ne hêt bi kêrî kesê din nahêt.

**Bendî** (pn.x.çewa) Girtî. Zîndanî.

**Bendîxane** (n.dar.mê) Girtîgeh. :Gunehbar êxist di bendîxanê da.

**Bendkirin** (k.jlm) Girtin. Xistine nav zîndanê. : Jiber gunehên xwe hat benkirin. (K) : bn Kirin.

**Beng** (n.x.mê) 1. Benc. 2. Dîn. Mest. 3.Ék ji du karkên çîroka zeng û beng ê.

**Bengî** (hn.dar.çewa) Bengîn. Mest.

**Bengîn** (hn.dar.çewa) 1. Serxweş. Mest 2. Benckirî(bêhoş) 3. Navê kuran.

**Bengkêş** (hn.l.çewa) Mirovê heşê bi kar dihîne.Bengîn.

**Bengkêşan** (k.jn.l.mê) Kêşana heşê. (K) bn: Kêşan.

**Be<u>nik</u>** (n.x.nêr) Bendik.

**Be<u>nî</u>** (n.x.mê) Dara benî. Dara benokê.

**Be<u>nîşt</u>** (n.x.nêr) Madeyek çire ji stirka daran, nemaze dara kezwanê peyda di bit, mirov di devê xwe da di cût bêy dahîrin. Cîl. ***Pend*** :Mîna benîştê keskanan ma bi dehmenan ve.ang; mirov rastî arêşeyekê yan kesekê neçak di be, nikare bi tu rêyan xwe jê derbaz ke. ***Pend*** : Bû benîştê devê xelikî.ang ; kesê karekê seyr û ne rast bi ket, hemû kes liser di axivin.

**Benk** (n.cîhx.mê) Cihê dan û wergirtina pereyî. Bank.

**Benok** (n.x.mê) Dara benokê ye li çîyayên Kurdistanê hişîn di bin. Dara benî.

**Benq** (n.cîh.x.mê) Benk.

**Beq** (n.x.mê) ***hişkavî*** Giyandarek hişkavîye, gelek çîvanok li ser hatîne gotin. Çembera(simbol) kirêtîyê ye. Beqa pivdayî.ang; mirovê qelew. ***Pend*** :Heger beq ne qurit, dê (bi) dirit.ang; mirovê axivtin xwe di devî da na girin.



**Beq**

**Be<u>qal</u>** (karn.x.dz) Yê ku giya û dermanka di firşe.

**Beqa<u>lî</u>** (kn.dar.mê) Karê beqalîyê.

**Beqalî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirovê karê beqalîyê dike. (K) bn: Kirin.

**Beqbe<u>qok</u>** (n.dar.mê) 1. Cihê bilqên avê jê di hên. 2 .Peqokên li dest û pêyan di hên. 3. Amaneke rêncber avê di kinê jibo nav zevî û aqaran.Avdank.

**Beqla<u>we</u>** (n.x.mê) Xwarineka xweş û şirîne ji hevîr û şekirê çê di kin.

**Beq<u>lî</u>** (n.x.mê) ***giya*** Core giyayekê pelik pan û keske jibo çêkirina îpraxan yan qelandin û di nav avikan da bikar di hînin. : îparaxên beqlî. Beqlîyên zer kirî.

**Beqse<u>me</u>** (n.x.mê) Coreke şirînîye.

**Ber** (n.x.nêr) 1.Tenekê reqe jibo dîwarên xanî û pêdvîyên avakirinê mifa jê di hêt wergirtin. Kevir.***Pend*** :Ber li cihê xo yê bi qedre.***Pend*** :Yê berê ji xwe mezintir bi hilgire, dê bi serî keve.ang; karê ji şiyanên mirovî mezintir, ne pêdvî kirinê ye.***Pend*** :Beran ne havêje kanî ya te av jê vexwarî. Ang: (emekdarî) qencîyê jibîr neke.2. Tuxmê giya û giyandaran. Berhem. Berê darên fêqî. Mita.: Me hijîreka mezin di hewşê da heye, lê mixabin ya bê bere. 3. Sing. Sent. : Berê xwe bi de min.

**Bera** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo pejirandinê û daxwazkirinê bikar di hêt. Bila.

**Beraber** (hk.cih) Beramber. Singûsing.

**Beradan** (k.jn.l.mê) Havêtin hevdu. Di êkdu werkirin.. Berek dana wî. (K) bn: Dan.

**Berafî** (n.x.mê) Şirove.

**Beraftin** (k.jn.x.mê) Şirovekirin. Di beraft,bi berêfe, dê bi berêfim,….

**Berahî** (hk.dem,n.dar.mê) Destpêk. Pêşekî. :Li berahîyê bi navê xwe pêrgînîyê li mêvanan di kem. Br× Dawî.

**Beramber** (hk.cih,.çewa) Du tişên berê wan li hev be. Mala min beramberî a wane. Singûsing.

**Beramberbûn** (k.jn.l.mê) Beramberê hev di bin. Rûbirûbûn. Hember hev di rawestin. (K) bn: Bûn.

**Beramberî** (hn.dar.çewa) Rûbirû. : Ez li beramberî seydayê xwe rûniştim.

**Beramberkirin** (k.jn.l.mê) Kevtine beramber hev. Hevberkirin. Wekhevkirin. Rûbirûkirin. (K) bn: Kirin.

**Beran** (n.x.nêr) Tuxmê nêr ê pezî ye. Dûmahîk qonaxa gehiştinê ye .(berx, kavir, ..şek ,beran). ***Pned*** :Serê du branan di dîzekê da nakelin.

**Beranek** (n.dar.mê) Tilîya beranî.

**Beranî** 1 (hn.x.çewa) Gelemperî. Tebayî. Zarekî. Ne fermî.

Beranî 2 (n.x.mê) 1. Tilîya mezin ya destî. Beranek. 2. Paçika mezin ya pêyî

**Beraqil** (hn.l.çewa) Tiştê yan gotina cihê bawerîyê. Bêgoman.

**Beraş** (n.l.n) Du berin di kin distarên aşî , liserêk zivrîna wan danî hwîr diken, di bit ar. *Pend* :Berên beraşan avê birin tu pisyara kengirperan dikey.ang ; dema çamek di bit, mirovek pisyara tiştên bi biha bi ket.

**Beraşo** (n.dar.nêr) Berav. Husan. : Bi beraşo devê dasê hisî.

**Beratav** (hn.l.çewa) Kesê pir nexweşî û derd di hên serî.: Wey babo ew çi mirovekê beratave!.


**Berav** 1 (n.l.n) Berek nemazeye jibo husîn, xweşkirin yan seqakirina das û bivran bi kar di hînin. Husan.

**Berav** 2 (n.l.mê) 1.Perav. Ser lêva avê. 2.Li ber avêye jibo şûştinê.

**Beravêtin** (k.jn.x.mê) Berhavêtin. :Bizinê beravêt.

**Beravkirin** (k.jn.l.mê) 1. Hisîn. 2. jêrvkirin.şûştin. (K) bn : Kirin.

**Beraz** (n.x.dz) *candar* 1. Giyandare(ginawerek kîvî yan kehî ye.sîmbola qelewî û gemarîyê ye. Di hindek dînan da (Islamê û cuhî) herimîye û goştê wî herame. 2. Nîşana gemar û pîsî yê.



**Beraz**

**Beraze** (n.dar.nêr) Asinek reqe jibo jihev cudakirina tiştên req bikar di hêt.Lîhaz..

**Berazgeh** (n.dar.mê) Cihê ku beraz lê di mişene. Mexela berazan.

**Berazî** (hn.dar.çewa) Karên ne çê yên mîna berazan mirov, bi taybet zaro di kin. Gemarî.

**Berazîkirin** (k.jn.l.mê) Xirabîkirin. Serreqîkirin. : Berazîyan neke kuro!. (K) bn: Kirin.

**Berazkuj** (n.l.mê) Corekê nemaze, yê guleyên çifteyane[tivenga nêçîrê] jibo kujtina berazan bikar di hînin.

**Berayî** (hk.dem,n.dar.mê) Berahî.

**Berba** (hn.l.çewa) Li ber bayî. Hilêvirî. : Xwarina berba ya pîse.

**Berbabûn** (k.jn.l.mê) Liber bayî man. (K) bn: Bûn.

**Berbakirin** (k.jn.l.mê) 1. Liber bayî danan. :Cilik berba kirin dako zuha bi bin. 2. Danebayî. :Savar berba di ke da sivivî jinav derkeve. (K) bn: Kirin.

**Berbad** (hn.dar.çewa) Gemar. Pîs. Herimî.

**Berbadkirin** (k.jn.l.mê) Pîskirin. (K) bn: kirin.

**Berban** (n.l.mê) Banek nizim e di kevit ber banekê dî û di bit hewş jibo malê, ku jibo rûniştinê bi kar di hêt.

**Berbang** (hk.dem.n.l.mê) Berê spêdê.Elind. : Li berbangê seda çû mizgeftê.

**Berbar** (kn.dar.dz) Mirovê baran bi pişt, yan galiskeyan kelûpelan ji cihekî bo yê dî di veguhêzit.

**Berbejin** (n.l.mê) Dareke cilikan pêve di kin. Darê hilwîstina cilan.

**Berbejink** (n.l.mê) Nivişţî. Hemaylok.

**Berbelav** (hn.dar.çewa) Tişt yan mirovê ji hev dûr û cuda.

**Berbelavbûn** (k.jn.l.mê) Parvebûn ji hev dûr ketin. : Piştî me zanîngeh bi dawî anî, hevalên me li welatî berbelav bûn û heryek li cihekî kar di ke. (K) bn: Bûn.

**Berbelavî** (n.l.mê) Belavbûn. Jêkvebûn.

**Berbelavkirin** (k.jn.l.mê) Ji hev dûr xistin. (K) bn: Kirin.

**berben** ( n.dar.mê) Corekê ristikane jin bi kar di hînin, bi kulavî ve girêdaye, di bin guhan û di bin erzinkê ra di bûrit.

**Berbend** (hn.l.çewa) Karê ku nabit bi hêt kirin. Qedexe. :Çûnejor berbende.

**Berbendbûn** (k.jn.l.mê) Pengîn. Der lê hatin bend kirin.

**Berbendî** (n.l.mê) Qedexe.

**Berbendkirin** (k.jn.l.mê) Qedexekirin. : Rijêmên dagîrker zimanê kurdî li xwendingehan berbend kirî ye. (K) bn: kirin.

**Berber** (nej,n) Neteweya berber.

**Berberî** (nej.dar.dz) Mirovê bi nejad berber.

**Berbest** (hn.l.çewa) Berbend. Girtî. Dûrpêç. Sikir.

**Berbestî** (n.l.mê) Berbendî.

**Berbestkirin** (k.jn.l.mê) Dîwarkirin. Rê lê girtin. Berbendkirin. (K) bn: Kirin.

**Berbext** (hn.l.çewa) Mirovê jîyê wî nêzî ji 13 tanî 18 salî. Sinêle.

**Berbêj** (pîşn.l.dz) Mirovê paşeroja xelikî di bêje. Xêvzan.

**Berb<u>iber</u>** (hn.dar.çewa) Hêdî. Hêdîhêdî. Gav bi gav. Berebere. : Em dê ber bi ber dest bi karê xwe bi kin.

**Ber<u>bisk</u>** (n.l.mê) Toq. Têle.

**Ber<u>bûk</u>** (karn.l.mê) Keça ku bi bûkê reye di dema şahîyê ku xizmetê jêra dike û şîretan di de wê. ***Pend*** :Kî dibe bûk tu xwe dikî berbûk!. Ang; Kesê mayê xwe di her tiştî di ke.

**Ber<u>çav</u>** (hn.l.çewa) Xuya. Diyar. Eşkera. : Xebata we gelek ya berçave.

**Ber<u>çavk</u>** (n.l.mê) Şûşeyên mirov jibo baştir dîtinê dixin çavên xwe. :Çavan seydayê me baş nabînin, jiber hindê berçavkê di ke çavan.

**Berçav<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Desnîşankirin. Çavên xwe liser danîn. :Te êk ji xwe ra berçav kirîye ?. (K) bn : kirin.

**Berçav<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Hatî berçavkirin. Destnîşankirî.

**Ber<u>çek</u>** (hn.l.çewa) Çekdar. Bi kêr çek higirtinê di hêt.

**Ber<u>çem</u>** (n.l.mê) Lêva çem. Rexê robarî.

**Ber<u>çêlk</u>** (nl.mê) Li cem teyran cîyê xarin di çitê . zik. Gede. Hefik. Bersing.

**Ber<u>çile</u>** (n.x.mê) Meha duwazdeye .Kanîna biçûk.

**Berçî<u>çek</u>** (n.dar.mê) Berçêlk.

**Ber<u>çîn</u>** (n.dar.mê) Çeperê(dergeh) kosk û kotanan.

**Ber<u>çûn</u>** (k.jn.l.mê) ji ber çûn, Zarok ji ber daykê çûn. Berhavêtin. : Biçûk ji ber çû. (K) bn: Çûn.

**Berd** (n.x.nêr) Ber. Kevir.

**Ber<u>dan</u>** (k.x.mê) 1.Derêxistin. Azadkirin. Ji girtîgehê berdan, jina xwe berda. 2. Di paşde hiştin. Hêlan. Bi cih hêlan. 3. Ne pejirandin. (K) bn: dan.

**Ber<u>dar</u>** (hn.dar.çewa) 1.Dar, giya yan giyandarên ber di girin. Sêv, zerdil, xox, a berdar. Dara berdar.ang; dara bi ber. 2. bi Kêrhatî. Xwedî karîn. 3. Gehiştî.

**Berda<u>yî</u>** (hn.dar.çewa) Azadkirî. Hatî berdan.

**Berdebo<u>rîn</u>** (n.dar.mê) Destûrî. Pêhêlan. Bihêl.

**Ber<u>deq</u>** (n.dar.mê) Lîztineke du yan pitir zaro li ser pêyekî radiwestin û milên xwe li hev dixin tanî yek bi keve.

**Berdeqanî** (n.dar.mê) bendikek dirêj û nîva wî cihê beran lê heye, ba di din û bera pê di havêjin.

**Berdeqkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov yarîya berdeqê di kin. (K) bn: Kirin.

**Berdereş** (devern.l.mê) devereke li Kurdistana başûr.

**Berdestk** 1 (n.l.mê) Pateyeke didin ber destê xwe li dema hilgirtina amanên xwarinên yên gerim, jibo destên mirovî ne sojin.: Berdestkê bi de ber destêd xo, çaydank yê kele.

**Berdestk** 2 (n.l.dz) Mirovê karê yekî dike û pêdivîyan liber destî di dane.Murîd. Şagird.

**Berdest** (hn.l.çewa) Berhev. Amade. : Kelûpelên pêdivî berdest ke, daku em herin seredana dostê xwe li nexweşxanê.

**Berdestbûn** (k.jn.gl.mê) Berhevbûn.(K) bn: Bûn.

**Berdestik** (n.l.mê) Du perçe patene şêwe bazin, lakêşe, sêkujî û htd bi bendekî bi hevre girêdayîne mirov didin berdestên xwe jibo girtina qazan û dervankêd kel(gerim) daku dest ne sojin. Destir. Destgir.

**Berdestî** (hn.l.çewa) Deshil. Berkevtî.

**Berdestkirin** (k.jn.gl.mê) Berhevkirin. : Min hemû kelûpelên xwe berdest kirine, çunkî suba dêwexerê kem.(K) bn: Kirin.

**Berdevk** (pîşn.l.dz) Kesê li şûna welatek,alîyek yan sazîyekê di axivit. Boçûna wan dibêjit. Peyvdar. :Berdevkê dewletê.

**Berdevkî** (n.l.mê) Karê şîretvanîyê.

**Berdewam** (hn.çewa) Hertim. Dirêjdem.bêkuta.

**Berdewambûn** (k.jn.l.mê) Mirov liser karekî, gotinekê berdewam be. Bê rawestan. : îro barîna baranê ji sibê ta êvarê ya berdewam bû. : Keremke liser gotina xwe berdewam be. (K) bn: Bûn.

**Berdewamî** (n.dar.mê) Ne rawestan. Hertimî.

**Berdewamkirin** (k.jn.l.mê) Liser ya xwe man bê rawestan. (K) bn: Kirin

**Berdevk** (pîşn.l.dz) Kesê li şûna welatek,alîyek yan sazîyekê di axivit. Boçûna wan dibêjit. Peyvdar. :Berdevkê dewletê.

**Berdêlî** (n.dar.mê) 1. Li ciyê. Li şûna. 2. Pêgihork.

**Berdij** (hn.l.çewa) Karvedana her pestanek yan hêzekê ye. Kardan.

**Berdijbûn** (k.jn.gl.mê) Kevtin hember yek. Rû bi rû bûn. (K) bn :Bûn.

**Berdijkirin** (k.jn.gl.mê) Danan berhember hev.Hevberkirin. (K) bn :Kirin.

**Berdil** (n.dar.dz) 1. Bîranîn. 2. Evîndar. Dilber.

**Berdilk** (n.l.mê) Ristika bi stoyê xwe ve di kin û dilikek pêveye, di keve ser singî. Dilik.

**Berdîwar** (n.l.mê) Cihê rûniştinê liber dîwarên malan.

**Bere** 1(n.x.mê) Enî. Sing. Berok. Pêşî.

**Bere** 2 (hn.x.çewa) Pirt. Pîçek. Hêdî. Gav bigav. Berebere.

**Berebere** (hn.l.çewa) Gav bi gav. Pîçpîç.

**Berecot** (n.l.mê) Berên aşî. Du berên distarî. Beraş.

**Beredan** (k.jn.x.mê) Berdan.

**Berendam** (n.l.dz) Kesê destnîşankirî jibo hilbijartinê. Berbijar.

**Berste** (n.dar.mê) Bereke û perçe hesineke li hev dixin jibo peydakirina agirî. Sitewber.

**Berevajî** (hn.l.çewa) Tiştê ber û piştên wî hatîn lêkzivirandin. Berûpişt. Berdij. : Berevajîya hatinê çûn e.

**Berevajîbûn** (k.jn.gl.mê) Lêkwergeran. Lêkzivirîn. (K) bn: Bûn.

**Berevajîkirin** (k.jn.gl.mê) Berûpiştkirin.  : Te kirasê berevajî li ber xwe kirî! .(K) bn: Kirin.

**Berevajîkirî** (hk.l.çewa) Cil yan tiştê hatî berevajî kirin. :Kiraskê te yê bervajî kirî ye!.

**Berevan** (hn.dar.çewa) 1. Kesê di keve navbera kes, xelkek, ji pêxemet ne hêlana şer û nakokîyê.dudilîlê. 2. Navê kurane.

**Berevanî** (ndar.mê) Karê berevanîyê. Navbijî.

**Bervanîkirin** (k.jn.gl.mê) Navbijîkirin. Ewan şer di kirin, min berevanî di kir. (K) bn: Kirin.

**Berevankar** (hk.l.çewa) Kesê yarînekarê wî berevanî. Parêzer.

**Bereyîsk** (n.dar.mê) Darlastîk. Bertivk.

**Berê** (hk.dem) Dema çûyî. Ji mêje. Di kevinda.

**Berêbihar** (cugrn, l) Gundeke li devera Duhok- Kurdistan Iraqê.

**Berêxwedan** (k.jn.l.mê) Temaşekirin. Hêvkirin. Mêzekirin. : Berê xwe bi dê wê kîye ji wê ve di hêt?. (K) bn: Dan.

**Berêz** (hn.dar.çewa) 1. Hêja. Rêzdar. Birêz.2. Nave mirovane.

**Berf** (n.x.mê) Befir.

**Berfavêj** (n.l.mê) Befrîk.

**Berfende** (n.dar.mê) Cihên pêyan yên çekirî di nav befirê de, jibo ku mirov ne keve.

**Berfiravîn** (n.l.mê) Xwarineka sivike berî zadê nîvro[firavîn] mirov di xwe, xasim pale û rêncber. : Demhijmêr yanzde me berfiravînk xwar.

**Berfireh** (hn.l.çewa) Cihê fireh û mezin. : Mala berfireh. Xwarina berfireh; ang. Pir. Zaf.

**Berfirehbûn** (k.jn.l.mê) Cih fireh û mişe bûn. (K) bn: Bûn.

**Berfirehî** (n.l.mê) Erzanî. Bê minetî. Cih fireh û mezin.

**Berfirehkirin** (k.jn.l.mê) Mezin û fireh kirin. (K) bn: Kirin.

**Berfirehkirî** (hk.l.çewa) Hatî berffireh kirin. Mezinkirî. Mala berfirehkirî. Cihê berfirehkirî.

**Berfî** (hn.dar.çewa) Rengê sipî xweşik mîna berfê.

**Berfîn** (hn.dar.çewa) 1.Cihên pir berf lê di bare. Befrîn. :Kurdistan welatekê befrîne.2. Navê keçan.

**Berg** (n.x.mê) Cilik. Kevil. Kiras.

**Bergeh** (n.dar.mê) Meydan. Qad. Depê şanûyê.

**Berger** (karn.dar.dz) Zêrevan. Nêrevan. Çavdêr.

**Bergeryan** (k.jn.l.mê) Li dû tiştî çûn. Li peyçûn. (K) bn: Geryan.

**Bergir** (hn.dar.çewa) Asteng. Rêgir.

**Bergirî** (n.l.mê) Berevanî.

**Bergirtin** (k.jn.l.mê) Avisbûn. Ragirtin. (K) bn: Girtin.

**Bergirtî** (hk.l.çewa) Xweragirtî. Avisbûn.

**Bergîz** (n.dar.pir) Cilikên kurdî yên zelaman, ji merezî di hên ristin. Şal û şepik.

**Bergkirin** (k.jn.l.mê) Kiraskirin. (K) bn: Kirin.

**Berguh** (n.l.mê) Du serikên di kin guhên xwe jibo guhdarîya radyo, têlefon û htd.

**Berhelistî** (hn.dar.çewa) Berhingarî.

**Berhelstkar** (hn.l.çewa) Dij. Ne pê re.

**Berhem** (n.dar.nêr) Ber. Tuxim. Karpêk. :Berhemê xebata gelê me ev azadî ya em li bin sîbera wê di jîn.

**Berhemdar** (hn.gdar.çewa) Bi ber. Bi berhem. Berdar.

**Berhemberbûn** (k.jn.gl.mê) Keftin heber yek. Rûbirûbûn.

**Berhemberkirin** (k.jn.gl.mê) Anîn hember yek. Kevtin bersingê hev. Rûbirûkirin.

**Berhev** (hk,hn.dar.çewa) Amade. Peyt. : Ezê berhevim, da bi çîn.

**Berhevbûn** (k.jn.gl.mê) Amadebûn. (K) bn : Bûn. Ez yê berhev bûm jibo çûne seyranê, lê tu ne hatî!.

**Berhevî** (n.dar.mê) Amadeyî. :Berhevîya xwe diyar kir, jibo yarî yê.

**Berhevîkirin** (k.jn.l.mê) Xwe berhev kirin.: Emê berhevî ya xwe di kin jibo ahengê

**Berhevkirin** (k.jn.l.mê) Amadekirin. :Ezê xwe berhev di kin jibo seredana mamê xwe. (K) bn: Kirin.

**Berhevok** (n.dar.mê) Belavok.

**Berhingar** (hk.dar.çewa) Dij.

**Berhingarbûn** (k.jn.l.mê) Dij rawestan. Bersing lê girtin. :Li aqarî marek berhingarî min bû, bi kotekî min xwe qurtal kir. (K) bn: Bûn.

**Berhingarî** (n.dar.mê) Ne pê re. Ne digel. Dij.

**Berhingarkirin** (k.jn.gl.mê) Dijatîkirin.

**Berhingav** (hn.dar.çewa) Berhingêv.

**Berhigêv** (hn.dar.çewa) Lezgîn. Bi lez. Lezûbez.

**Berik** (n.dar.mê) 1.Reşmal. Mêzer. ***Pend*** :Berika xwe ji avê derîna.ang; Xwe ji tengasîyê qurtal kir.***Pend*** :Pîyên xwe hindî berika xwe di rêj ke.ang ; Mirov karên ji xwe mezintir neke.2. Berê piçûk. Gulle. Berik ê darlastîkî. Berikê tivengê. Berikê mekînê, .. û htd.

**Berî** (n.x.mê) 1. Berê darberîye . Berû. 2. Dara berî ya  li çiyayên Kurdistanê pire. 3. Deştek pan û mezin, nexasim xîz bit.

**Berîk** (n.x.mê) Cihên çal, nexasime li cilkan çêdiken jibo hilgirtina pare û pêdvîyan. Kûrik. Gîrfan.

**Berîkanê** (n.l.mê) Core yarîne di navbera du kesan , biran da tê kirin ka kî dê bi serkevit. Kêbirkê.

**Berîkanêkirin** (k.jn.l.mê) Lîztika berîkanê di kin. (K) bn: Kirin.

**Berîmask** (n.l.mê) Berîyên darmazîyê . Berê dara mazî.



**Berîmask**

**Berjeng** (n.l.mê) Nîşan. : Berjengên baranê hir û bane.

**Berjewendî** (n.dar.mê) Giring. Mifa. : Kar di keyn jibo berjewendîya giştî.

**Berjêr** (hk.l.çewa) Sernişîv. Serşor.

**Berjêrbûn** (k.jn.gl.mê) Bernişîvbûn. Xwarkevtin. (K) bn: Bûn.

**Berjêrkirin** (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. (K) bn: Kirin.

**Berjêkirî** (hk.l.çewa) Hatî berjêr kirin. Hatîye sernişîvkirin. Cerikê berjêrkirî

**Berjor** (hk.l.çewa) Serevraz.

**Berjorbûn** (k.jn.gl.mê) Serevrazbûn. :Karwanî li çiyayî berjor bûn. (K) bn: Bûn.

**Berjorkirin** (k.jn.gl.mê) Serevrazkirin. :Destên xwe berjorkirin ji xuda niza di kin. (K) bn: Kirin.

**Berjorkirî** (hk.l.çewa) Berê wî/wê/wan daye serî.

**Berkaş** (n.dar.nêr) Helan. Kevir. Kaşeber. :Binê mezela me hemû berkaşe.

**Berkaşkirin** (k.jn.l.mê) Kaşîkirin. Helankirin. :Dîwarê nexweşxanê berkaş kirin.

**Berkatok** (n.dar.mê) Mita , fêqî yan mazî, yên bi awayek xwezayî du yan pitir pêkve nûsayî bin.

**Berkel** (hk.l.çewa) Zadê nîv kelî. Zadê kelek hatîyê. :Dê xwe bi girin camêr xwarina me ya berkele, ha vê gavê dê berhev bit.

**Berkelbûn** (k.jn.gl.mê) Kelel hînan zadî. :Zadê me yê berkel bûy. . :Me mirîşka danaye ser agirî, gelek nemaye berkel bi be.

**Berkelkirin** (k.jn.gl.mê) Kelek yan çend kelek hatîne zadî. Nêzîke bi kelit. :Min zadê berkel kirî.

**Berkele** (n.dar.mê) Golika nêzî sê salan. :Gavanî golika berkele firot.

**Berkeş** (n.dar.mê) Sênî. Sînî.

**Berkeşk** (n.dar.mê) Berkeşok. Ferxesênî. Sînîya biçûk.

**Berkevtin** (k.jn.l.mê) Bi kêr hatin. Hêja. (K) bn: Kevtin.

**Berkevtî** (hk,hn.dar.çewa) Hêja. Kêrhatî.

**Berkêr** (hk.l.çewa) 1. Kewalê bi kêr serbirînê[serjêkirin] dihêt]. 2. Qurban.

**Berkêrbûn** (k.jn.l.mê) Bi kêrî serjêkirinê di hêt. :Kelebang berkêr bû, êdî dem hat,dê serjê bi kîn.(K) bn: Bûn.

**Berkêrkirin** (k.jn.l.mê) Mezinkirin û anîn ber kêrê. (K) bn: Kirin.

**Berkêşk** (n.l.mê) Galiskeya ber kêşanê. Erebaneya beran.:Me berên xanîyê xwe hemû bi berkêşkê kêşan.

**Berkoş** (n.l.mê) Kiraseke ji alîyê singîve di kin ber xwe, jibo parastina cilan dema karkirinê, mîna; pezdotin amanşûştin û htd.

**Berkur** (n.dar.mê) Cihê xwarin di çe nav piştî ji gerîyê derbaz dibe. Gede. Zik. :Berkura mirovan. :Berkura tewalan.

**Berkurk** (n.dar.mê) Berçêlk.

**Berlêker** (n.gl.mê) *rêzman* Pêşgir. Pêşpirt.

**Bermak** (hk.l.çewa) Zaro yan têjikên candaran yên sava. Berşîr.

**Bermal** (n.l.mê) 1. Eywana rûniştinê. Jûra pêrgînîyê. 2. Bersiv. :Mêvan hatin, jin li bermalê , rûniştin û mêr li mêvanxanê.

**Bermalî** (n.l.mê) Kabanî. Kewanî. :Bermalîya te ji kûye?, ji amedê ye.

**Bermalk** (n.l.mê) Berik. Reşmalk. :Bermalk li bermalê raxist.

**Berman** (k.jn.dar.mê) Ji ber man. Tiştê ji ber di mîne, zêde di be. (K) bn: Man.

**Bermax** 1 (n.dar.mê) Defterka cigaran. Perikên cigaran.

**Bermax** 2 (n.dar.mê) Sapîtik. Bersapîtik.

**Bermayî** (n.dar.mê) Tiştê zêde di mîne. :Bermayîyê xwarinê bi dem kewalan.

**Bermêj** (n.l.mê) Giyandar û zarokên li ber singê mak û dayk a xwe şîr di mêjin. Bermak.

**Bermîl** (n.x.mê) Amaneke neftê û avê tê di kin. :Bermîla gazê bi çendê ye?. :Avê ji bermîlê vala ke!.

**Bername** (n.dar.mê) Program. Pilan. :We îro çi bername heye, hûn dê çi bi ken?.

**Bernas**,..niyas (hk,hn.l.çewa) Yê ko mirovan zû di nase, yan gelek mirovan di nasit û berevajî. . Berniyas.:Xalê min gelek yê bernase.

**Bernav** (n.l.nêr) Navê mirovî yê êkê, berahîkê. Nav. Br× Paşnav. : Navê te yê sêqolî; Azad Lezgîn Baran e, ango bernavê te Azade.

**Bernexûn** (hk.dar.çewa) Sernişîv. Berjêr.

**Bernexûnbûn** (k.jn.gl.mê) Sernişîvbûn. Berjêrbûn. :Kedîn bernexûn bû av rijya. (K) bn: Bûn.

**Bernexûnkirin** (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Berjêrkirin.

**Bernixûn** (nhn.dar.çewa) Bernexûn.

**Berniyas** (hk.dar.çewa) Bernas.

**Beroş** (n.x.mê) Qazan. Quşxan. Dîz. :Beroşa kutildewê ya mezine.

**Berpaş** (hk.l.çewa) Piştûpişt. Paşve.

**Berpaşçûn** (k.jn.l.mê) Bizivîneke mirov piştûpişt di çe.

**Berpeyî** (n.dar.mê) Bersiv. Bersivdan.

**Berpêk** (n.l.pir) 1. Bendikên nemaze jibo girêdan û peytkirina deling û goreyan. 2. Dema xwelêkdanê herkes pêkolê di ke pêyê xwe bi de ber yê hemberê xwe jibo ko li erdê bi xe.3. Astengî. Alozî.

**Berpêkdanan** (k.jn.gl.mê) Piyêd xwe xistin ber êk dako yek yekî li erdî bi de. :Ew ne di karî min lê wî berpêk danan.

**Berpêş** (n.l.mê) Pilan. Berhevî.

**Berpêşkirin** (k.jn.gl.mê) Berhevkirin. (K) bn: Kirin.

**Berpisyar** (karn.dar.dz) Kesê bi rêvebirina karekî bi stoyê xwe ve digire. Serkêş.

**Berpisyarî** (n.dar.mê) Serkêşî. Rêberî.

**Berpisyarkirin** (k.jn.gl.mê) Kar û guneh xistine ser milên yekî. (K) bn: Kirin.

**Berra** (pêrbest.alv.pêvgir) Di ber re. Di rex re. : Ez di ber ra borîm.

**Berran** (n.l.mê) *can* Pişkeka leşîye di keve navbera binê zikî û dawîya serê ranî.

**Bersev** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê hatine jor ya malan. Nihanî.

**Bersiv** (n.dar.mê) Vegerandina pisyara kesekî.: Pisyara min ya bê bersiv mayî. Br × Pisyar.

**Bersivdan** (k.jnlmê) Mirov pisyara hemberê xwe bi de. : Min pisyarek kir, lê te bersiva min neda!. (K) bn: Dan.

**Bersivk** (n.dar.mê) Bersev.Bermal.

**Bersoj** (n.dar.mê) *derd* Dema mirov hin xwarinên qelew yan zêde di xwe, berkura mirovî mandî di be, di soje û birkên tamasojtî jê dihên. : Jiber xwarina savarê bersoj ya hatî min.

**Bersork** (n.l.mê) 1. Berên rengê wan sor. Kevirên sor. 2. *tewal* Corekê çûçikane singê wan yê sore.

**Bersto** (n.l.nêr) Pisto.

**Bersûç** (hk.l.çewa) Gunehbar. Gunehkar.

**Bersûçbûn** (k.jn.gl.mê) Gunehkarbûn. :Min hay ji çi nîne û ez bi guneha te bersûç di bim!.(K) bn: Bûn.

**Bersûçkirin** (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. :Ji nezanîna xwe, xwe bersûç di ke. (K) bn: Kirin.

**Bersûçkirî** (hk.l.çewa) Hstî gunehbarkirin. *Pend* :Bersûçkirî bê gunehe, ta guneha wî xuya ne be.

**Berşîv** (n.l.mê) Xwarina sivik ya berî şîvê.

**Bertav** (hk.cih,n.l.mê) Cihê gerimê hetav lê di keve, mirov lê di rûne,Li ber hetava rojê. Liber tava rojê.

**Bertavkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov tişkekî dane ber tava rojê jibo gerim û hişk bi be. : Eve te çîye heval te ho xwe bertav kirî?. (K) bn: Kirin.

**Berteng** (hk l.çewa) 1. Cihê tengavî. Cihê teng, kêm. Cihê têra neke. : Xanîyê me gelek ê bertenge, jiber hindê me divêt bi firoşîn.2. Berê perokî yê biçûke, tenge.

**Bertengbûn** (k.jn.gl.mê) Cihê ko teng dibe. Tengasî dibe. (K) bn: Bûn.

**Bertengî** (n.l.mê) Tengavî. Qetlazî.

**Bertengkirin** (k.jn.gl.mê) Tengkirin. : Mêvanan ber pêyên me yên teng kirîn. (K) bn: Kirin.

**Bertêker** (n.dar.mê) Perê xurde. Hûrde.

**Bertêşt** (n.l.mê) Xwarina sivik ya berî têştê. Sertêşt.

**Bertivk** (n.dar.mê) 1. Berên biçûk mirov di nav tibilên xwe di havêe, dengê tivên jê di hêt. 2. Qosk. Lastîk.

**Bertîl** (n.dar.mê) Diyarîyeke di din yekî ko ji mirovî re karekî,rêberîyekê bi ke. *Pend* :Bertîl beran nerim di ke.

**Bertîldan** (k.jn.l.mê) Wekî mirov bertîlekê di de kesek, perpirsekî. (K) bn: Dan.

**Bertîlder** (karn.dar.dz) Kesê bertîlê di de.

**Bertîlgirtin** (k.jn.l.mê) Mirov bertîlan werdigire. (K) bn: Girtin.

**Bertîlgir** (karn.dar.dz) Kesê bertîlê werdigire.

**Bertîlkirin** (k.jn.l.mê) Mirov êkî bertîl bi ke. (K) bn: Kirin.

**Bertûrk** (n.l.mê) Berkurk. Gede.

**Berû** (n.x.mê) 1. Dara Berî. 2. Berê darberûyê. Berî.

**Berûk** (n.dar.mê) 1. Gerî. 2. Enî. 3.Destpêk.

**Bervajî** (hk.l.çewa) Berevajî.

**Bervale** (hk.dar.çewa) Hejar. Berteng. Bêber.

**Beryank** (n.dar.mê) Tîştê di din ber xwe dako cil û laşê wan gemar nebe. Perçeyê di xin ber kemaxên zarokan dako xwe pîs ne kin.

**Bervedêr** (pîşn.dar.dz) Parêzer.

**Bervekirin** (k.jn.l.mê) Berê wî vekirin. Vajîkirin. (K) bn: Kirin.

**Bervekirî** (hk.l.çewa) Vajîkirî. Vekirî.

**Berwar** (hk,hn.dar.çewa) 1. Xar. Xarûvîç. Pêç. Çep. 2. Navê mêrane.


**Berwarbûn** (k.jn.l.mê) Pê hilçûn. Vêraçûn. Di ber re çûn. (K) bn : Bûn.

**Berwarî** (malb,n) Tîreyeka kurdane.

**Berwarkirin** (k.jn.gl.mê) Xwarkirin. Keçkirin.

**Berwarkirî** (hk.l.çewa) Hatî xwarkirin. Xwarkirî.

**Berx** (n.x.dn) ***candar*** Têjikê pezan. :Berxê nêr. :Berxa mê. ***Pend*** :Berxê liber makê.ang; bo mirovê nazandî di bêjin. Berxê min.***Pend*** :Berxê nêr bo serbirînê ye.ang; weke mêrçak rastê tengavîyan di bin yan di hên kujtin.



**Berx**

**Berxik** (n.dar.dn) Berxê biçûk.

**Berxistin** (k.jn.dar.mê) 1. Aşkerakirin.2. Hînkirin. (K) bn : Xistin.

**Berxistî** (n.dar.mê) Pêşniyar.

**Berxudan** (k.jn.l.mê) Xebata bê rawestan. Bergirî. Berevanî ji dozek pîroz. Berxwedan.

**Berxudar** (hn.dar.çewa) Jîdirêj. Paraztî. Pîroz. Supasdar.

**Berxudarbûn** (k.jn.l.mê) Jiyan baş bûn. Jî dirêjbûn. (K) bn: Bûn.

**Berxudarî** (n.dar.mê) Supasdarî.

**Berxvan** (pîşn.dar.dz) Kesê çavdêrîya berxan dike. Xwedîyê kerê berxan. : Lawê wî berxvane.

**Berxwarin** (n.l.mê) Xwarina sivik mîna şorbe û giyayî, mirov berî zadî di xwe.

**Berxwarî** (hn.l.çewa) Yê ko berê dahatî di xwe.

**Berxwedan** (k.jn.l.mê) Berxudan. : Gelê kurd jibo azadîyê liber xwe di de.(K) bn: Dan.

**Berxwekevtin** (k.jn.gl.mê) Şerimkirin. Ji xwe fedîkirin. Daman. Berxweketin.(K) bn: Kevtin.

**Berxwekevtî** (hn.gl.çewa) Ji xwe şerimkirî. Ji xwe fedîkirî. Damayî.

**Berxweraçûn** (k.jn.gl.mê) Kesê hertim cilên xweşik li ber xwe di ke û Pûte bi rêkûpêkîya xwe di de. Xwe peytkirin. : Te çi guh lê bûye, van rojan tu gelek di ber xwe ra di çî?. (K) bn: Çûn.

**Berxwerawestan** (k.jn.gl.mê) Dema mirov ageh ji kiryar û gotinên xwe hebe û tu şaşîyan meke. (K) bn: Rawestan.

**Berxwerawestayî** (hn.gl.çewa) Mirovê xwe ji ne rindîyê bi parêze.

**Berxwêr** (n.dar.mê) Zevîya mezin. Erdê çandinê.

**Beryekî** (n.l.mê) Kesatî. Taybetî.

**Berz** (hn.x.çewa) Bilind.

**Berzbûn** (k.jn.l.mê) Bilindbûn. (K) bn: Bûn.

**Berze** (hn.x.çewa) Hinda. Nediyar. Nexweya.Winda.Bêserûşûn. : Eve tu li kûveyî, herê berzeyî ?.

**Berzebûn** (k.jn.l.mê) Hindabûn. : Cizdanka min ya berze bûy. :Xwe berze neke min karekê bi te hey!. (K) bn: Bûn.

**Berzekirin** (k.jnlmê) Hindakirin. Bêserûşînkirin. Windakirin.: Min parên xwe berzekirin. (K): Kirin.

**Berzik** (n.l.mê) *candarî* Binzik.

**Berzin** (n.dar.mê) Canîk. Cehşik.

**Berzincî** (nejadn.dar.dz) 1. Hozeka kurdane. 2. kesê ser bi hoza berzincî.

**Berzî** (n.dar.dz) 1. Bilindî. 2. Navê mêrane.

**Berzîne** (n.dar.mê) Berên rengereng.

**Berzkirin** (k.jn.l.mê) Bilindkirin. (K) bn: Kirin.

**Bes** (pêrb) 1. Alavê vebirkirinê ye.Bitinê. : Bes tu digel min were.2 Alavê nehiştinê. Nabit. Ne. Nerînî. :Bes wesa bike.3. Alavê hevberkirinê. Lê.Lêbelê.

**Besbûn** (k.jn.l.mê) Hişbûn. Bedengbûn. Bi dawîhatin. (K) bn: Bûn.

**Bese** (pêrb) Bes.Têra heye. Fermane jibo bi dawî anîna kar û gotinan.

**Besezman** (hn.dar.çewa) Bêguneh. Bêdeşelat. Belengaz. Kesê neşê berevanîyê ji xwe bike.

**Besîre** (n.dar.nêr) Tiîyê ne gehiştî. Bêsîre.

**Beskirin** (k.jmê) Bi domahî înan. Vebirîn. Bi dawî anîn .Kutakirin. :Dê bes ke camêr tu çend dirêj di kî!. :Ma te hêjta xwarin bes nekirîye?. (K) bn: Kirin.

**Besna** (n.l.mê) Navê jinane dema daybaban hêş zaro bi vên vî navî li kiça xwe di kin.

**Best** (n.x.mê) Lêva çemî. Rexê rûbarî yê zuha û bi xîz û cercîr. Li bestê xwe dirêj kir.

**Beste** (n.x.mê) 1. Peste. 2. Deste. Qeft.

**Bestek** (n.dar.mê) 1. Pivdank. 2. Qeft. 3. Perçe erd. Zevî.

**Besterûbar** (n.l.mê) Hişkayîyê ber lêva rûbarî. Best.

**Bestevîn** (hn.dar.çewa) Seqayekê evînî,dilveker. Sermest.

**Bestik** (n.dar.mê) Cok, Rûbark.

**Bestin** (k.jn.x.mê) Girêdan. :Peymanek best. Girêyek best. Derî best. (K) Bdn: Ez di bestim em dibestîn, tu di bestî hûn di bestin, ew di beste ewan di bestin. Pr Dê[bi] + bdn. Bdb :di best, di bestin. Db,dûr : bestibû,…..bûn. (F) : bi beste, bi bestin.

**Bestî** (n.dar.mê) 1. Qerisî. Bestîyê erdê, ava girtî  Erdê bestî. 2. Qerîsa li ser erdî ketî.3. Girtî, pêçayî, rûyê xwe yê bestî.

**Beş** (hn.x.çewa) 1.Jêkvebûyî. Vekirî.2. Tiştê kur[khur]. Ew mirovekê dev beşe ***Pend*** :Kêvroşk candarekê beşe.ang ; Bela di hîne rêya mirovî.

**Beşbûn** (k.jn.l.mê) Jêkvebûn. Vebûn.: Devê wî ji keyfan beş bû. (K) bn: Bûn.

**Beşdar** (hn.dar.çewa) Pişkdar.

**Beşdarbûn** (k.jn.gl.mê) Pişkdarbûn. (K) bn : Bûn.

**Beşdarî** (n.dar.mê) Pişdarî.

**Beşdarîkirin** (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn : Kirin.

**Beşdarkirin** (k.jn.gl.mê) Pişfstkitin. (K) bn: kirin.

**Beşkirin** (k.jn.l.mê) Jêkvekirin. Vekirin. (K) bn: Kirin.

**Beşûş** (hn.x.çewa) Mirovê ji kêfan devê wî beşe. Kêfxweş. Devkenî. Debeng.

**Beten** (n.x.mê)1. Tenişta girekî . Evrazî. Berik û beten. Min dît dema kew ji betenê di firî. ***Pend*** :Mineta te li betenê, şîva te di legenê. 2. Texeyên perokan. Qemsele, çakît,,htd. Du betene.

**Betil** (n.x.nêr) Amanekê şûşeye, dirêj û lûleyîye, şileyan tê di kin.



**Betil**

**Betilîn** (k.jn.x.mê) Mandîbûn. Westan. Pelixîn. (K) bdn: ez di betilim em di betilîn, tu di betilî hûn di betilin, ew di betile[…it] ewan di betilin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb: di betilîm, di betilîn, betilî. Db,dûr: betilîbûm, bûyn, bûy, .. bû… bûn. (F) : bi betile, bi betilin.

**Betir** (hn.dar.çendî) 1. Pêtir. 2.Berî.wêvetir.

**Betirpêr** (hk.dem.l) Berîya sê rojan.

**Betirpêrar** (hk.dem.l) Berîya sê salan.

**Bevil** 1 (hn.x.çewa) Mirovê nimone. Serpişk.Behredar. Gevil. : …miroveke bevile.

**Bevil** 2 (hn.x.çewa) Hevrik. :Ma tu bevil ê minî?.

**Beweko** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo hevberkirinê bi kar di hêt. Herweko.

**Bewr** (hn.x.çewa) Dirinde. Kûvî. :Gur candarekê bewre.

**Bewreşînk** (n.dar.mê) Éşeke pîsîye. Nexweşîyeka çermîye.

**Bexçe** (n.dar.nêr) Bax. Baxik. Rez. Cinîk.

**Bexçevan** (n.dar.dz) Xwedîyê bexçe. Baxvan. Rezvan.

**Bexirîn** (k.jnxmê) Azirîn. :Ev zaroke yê bexirî. Bixirîn.

**Bexşişandin** (k.jn.l.mê) Bexşîşkirin.

**Bexşîn** (k.jn.x.mê) Dan. Diyarîkirin. Pêşkêşkirin.

**Bexşîş** (n.dar.mê) Diyarî. Xelat.

**Bexşîşdan** (k.jn.l.mê) Diyarîkirin. Xelatdan. :Zavayî bexşîş dan diholvanî. (K) bn: Dan.

**Bexşîşkirin** (k.jn.l.mê) Xelatkirin. (K) bn: Kirrin.

**Bext** (nax.nê) 1. Şens. 2. Tor. Wijdan.: Xwe havêt bextê axa, ku li wî bibore.

**Bextçak** (hn.l.çewa) Bişens. Bextyar. Br× Bextreş.

**Bextçê** (hn.l.çewa) Bextçak.

**Bextdan** (k.jn.l.mê) Mirov soza lêborînê bide yekî .Lêborîn. Azakirin.: Heger tu bextê xwe bidî min, ezê werim rayê. (K) bn: Dan.

**Bextdar** (hn.dar.çewa)Bextyar.

**Bextiyar** (hn.dar.çewa) 1.Keyfxweş. Dilxweş. Bê arêşe. Asode. Ew di jiyana xo da mirovekê bextiyare. 2. Navê mêrane.

**Bextiyarî** (n.dar.mê) Xweşî. Aramî. :Xudê betiyarî bi de gelê me.

**Bextreş** (hn.l.çewa) Mirovê bextê wî hetim reş. Bêşens. Br× Bextçak.

**Bextreşbûn** (k.jn.gl.mê) Mirov bêşens di be, çamek bi serê mirovî di hêt, mirov di karekîa di keve.

**Bextreşî** (n.l.mê) Bêşensî. Xwelîserî.

**Bextreşkirin** (k.jn.gl.mê) Bela bi serî anîn. Xwelî bi yekî werkirin.

**Beyan** (nx.dz) Navê keçane.

**Beyanbûn** (k.jn.l.mê) Xweyabûn. Diyarbûn. Stêra subê beyan bû. (K) bn: Bûn.

**Beyanî** (hkcih) Sipêde.

**Beyankirin** (k.jn.l.mê) Xweyakirin. Dyarkirin. : Viyana xwe ji nim ra beyan ke. (K) bn: Kirin.

**Beyankirî** (hk.l.çewa) Ronkirî. Zelalkirî.

**Beyanname** (n.l.mê) Ragehandina beyanekê. irin.Daxuyanî. Daxweyanî.

**Beyar** (hn.x.çewa) 1. Erdê ne kolayî. Zevîya ne çêkirî. :Em dê zevîya xwe evsal hêlîn beyar. irin.2. Navê mêrane.

**Beyarbûn** (k.jn.l.mê) Cih, zevî, bax û htd, ko êdî na hêt çavdan û sexbêrkirin. Bûne beyan. Rezê te yê bûye beyar.

**Beyarhêlan** (k.jn.l.mê) Ne kolan û sexbêrkirina erdî. Çemê xwe hêla beyar.

**Beyarkirin** (k.jn.l.mê) Rez ,bax, û htd, hêlan beyar. Sexbêr nekirina rez û baxan , ne kolan û adekirin.

**Beybûn** (n.x.mê) Corek gulane.

**Beyef** (n.x.mê) Behîv. Bahîv.

**Beyîn** (k.jn.x.mê) Behîn.

**Beytik** (n.x.mê) Sivandok. Sivyank.

**Beyîv** (n.x.mê) Bahîv.

**Bez** (nx.nêr) Rûnê gîyandaran.

**Bez** (n.x.mê) Rev.

**Beza** (hn.dar.çewa) Rehwan. Hespê beza ango; hespê rehwan.

**Bezan** (k.jn.x.mê) Bezîn. : Ez bezam. Ew beza. Here bi beze.

**Bezandin** (k.jn.dar.mê) Mirov tiştekî bibezîne. Rateqandin. (K) bdn: ez di bezînim em di bezînîn, tu dibezînî hûn di bezînin, ew di bezîne[…it] ewan di bezînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb : di bezand, di bezandin. Db,dûr: bezandibû, ….bûn. (F) : bi bezîne, bi bezînin.

**Bezdonek** (hn.dar.çewa) Bizdiyayî. Bizdonek. : Ey hewar eve çi mirovekê bezdoneke.

**Bezek** (hn.dar.çewa) Beza. Bi xar.: Mirovê bezek.ang; mirovê pêsivik.

**Bezeyî** (hn.dar.çewa) Dilşewatî.

**Bezgirtin** (k.jn.l.mê) Jiber qelewbûnê leşê mirvî bez di gire. Qelewî. (K) bn: Girtin.

**Bezgirtî** (hn.l.çewa) Mirovê, candarê leşê wî pir bez. Mirovî pir bez. Mirovê qelew.

**Bezîn** (k.Jmê) Revîn.Xarkirin. Xardan. (K) Bdn: ezdi bezim em di bezîn, tu di bezî hûn di bezin, ew di beze[…zit] ewan di bezin.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di bezîm, di bezî, di bezîn. Db,dûr: Bezîbûm, …bûyn, .. bûy,...bûn. (F) : bi beze, bi bezin.

**Bezok** (pn.x.çewa) Kesê di beze. Leşsivik. Bi bizav.

**Bê** (pêrb) Alavê neyîkirinê. Nabit. Neyînî. Netê. Nejê. Zirbarkirin. Bê, mal ,bê bawer, bê welat…bê xudan, … bê ser..htd.

**Bê àlî** (hn.l.çewa) Ne bi tu alîyan re. Bêlayen.

**Bêbab** (pn.l.çewa) 1. Babmirî. 2. Bîjî.3. bêwijdan.

**Bêbabî** (n.l.mê) 1. Sêwîtî. 2. Bêwijdan. Xwe nenas.

**Bêbar** (hn.l.çewa) 1.Bara mirovî têda nebe. Zirbar.2. Ne barkirî.: Dewarê bêbar,ang ; bar li piştê nekirîye.

**Bêbarbûn** (k.jn.gl.mê) Bara wî/wê, têda tuneye. Zirbarbûn. (K) bn: Bûn.

**Bêbarî** (n.l.mê) Zirbarî.

**Bêbarkirin** (k.jn.gl.mê) Zirbarkirin. : Wan xweha xwe ji mal milkan bêbar kirî. (K) bn: Kirin.

**Bêbar**<u>**kirî**</u> (hk.l.çewa) Hatî bêbar kirin. Zirbarkirî.

**Bê**<u>**bav**</u> (n.l.dz) Bêbab.

**Bêba**<u>**vî**</u> (n.l.mê) Bêbabî.

**Bêba**<u>**wer**</u> (hn.l.çewa) 1. Mirovê bawerî bi xwe nebe.2. Lewaz. 3. Bêdîn.

**Bêbawe**<u>**rî**</u> (n.l.mê) Bawerî bi hebûnê tunebûn.

**Bê**<u>**belên**</u> (hn.l.çewa) Bêsoz.

**Bê**<u>**ber**</u> (hn.l.çewa) 1.Candar û giyayên berî nagirin. Stewir. Xirş.2. Teng. Peroyê berê wî teng.

**Bê**<u>**bext**</u> (hn.l.çewa)1. Bêwijdan. Dilreq.2. Bêşens. 3. Xwefiroş.4. bêbawer.

**Bêbex**<u>**tî**</u> (n.l.mê) Soz şikênan. Îxanet.

**Bêbextî**<u>**kirin**</u> (k.jn.gl.mê) îxanetkirin. Sozberdan. Direw lê kirin. Xapandin. (K) bn: Kirin.

**Bê**<u>**bin**</u> (hn.l.çewa) 1. Cihê kûr. 2. gotina vala. Bêbingeh. : Deryaya bêbin.

**Bêbin**<u>**bûn**</u> (k.jn.gl.mê) Weke bin bi tiştî ve nemîne. Binê wê/wî jê ve bûye. (K) bn: Bûn.

<u>**Bê**</u>**bingeh** (hn.gl.çewa) Gotina ne cihê bawerîyê. Pûç.

**Bêbin**<u>**kirin**</u> (k.jn.gl.mê) Binê tiştî jêvekirin. Binê tiştî pûçkirin. (K) bn: Kirin.

**Bê**<u>**can**</u> (hn.l.çewa) Mirovê, candarê mirî.

**Bê**<u>**cerg**</u> (hn.l.çewa) Tirsonek. Kulekfireh.

**Bê**<u>**cih**</u> (hn.l.çewa) Bêwar. Bêmal.

**Bê**<u>**çare**</u> (pn.l.çew) 1.Lewaz. Bêgav. 2. Pîr.

**Bêçare**<u>**bûn**</u> (k.jn.gl.mê) 1.Pîrbûm. 2. Lewzbûn. (K) bn: Bûn.

**Bêçare**<u>**kirin**</u> (k.jn.gl.mê) 1.Lewazkirin. 2. Pîrkirin. : Xemên mal û zarokan ew yê bêçara kirî. (K) bn: kirin.

**Bêçare**<u>**yî**</u> (n.l.mê) 1. Lewazî. Bêgavî.2. Pîrî.

**Bê**<u>**çav**</u> (hn.l.çewa) Kore.

**Bê**<u>**çek**</u> (hn.l.çewa) Mirovê çekê wî tune be.

**Bêçek**<u>**kirin**</u> (k.jn.gl.mê) Çek jê standin. Ji çekkirin. (K) bn: Kirin.

**Bêçekkirî** (hk.l.çewa) Mirovê hatî ji çek kirin.

**Bêçeng** (hn.l.çewa) 1. Bêper.2. Bêrê. Bendewar.

**Bêçengkirin** (k.jn.gl.mê) 1. Bêperkirin. Çeng lê birîn. 2. Bendewarkirin. (K) bn: Kirin.

**Bêçî** (n.x.mê) Tilîyên pêyan. Pêçik.

**Bêdad** (hn.l.çewa) Bêwijdan. Şêlî.

**Bêdadî** (n.l.mê) Bêwijdanî. Ne rastî. Mafxwarin.

**Bêdawî** (hn.l.çewa) Tiştê dawîya wî tune be. Bê dûmahîk.

**Bêdayk** (hn.l.çewa) Daykmirî. Sêwî.

**Bêdeling** (hn.l.çewa) Ezmandirêj. Bêhetik. Bêşerim.

**Bêdeng** (hn.l.çewa) Mirovê kêm di peyve. Mit. ***Pend*** : Bêdengî zikê pirbêjî dirand. :Zarokekê bêdenge.

**Bêdengbûn** (k.jn.gl.mê) Hişbûn. Mitbûn. :Heger hûn bêdeng nebin em nikarîn civîna xwe bi bin serî.(K) bn: Nûn.

**Bêdengî** (n.l.mê) Mitî. Kerî. Ne xivtin. : Bêdengî nîşana qayîlbûnê ye.

**Bêdengkirin** (k.jn.gl.mê) 1. Hişkirin. Hema xwe bêdeng bi ke jibo te baştire. 2. Hawîşkirin. Vî zarokî bêdeng bi ke. 3.Kujtin. (K) bn: Kirin.

**Bêdengkirî** (hk.l.çewa) Deng jê hatî birîn. Hatî kujtin. Hatî bêpêjinkirin.

**Bêderew** (hn.l.çewa) Gotina derew tê tune be. Bêgoman.

**Bêderman** (hn.l.çewa) Birîna derman jêra tune be.: Derdê bêderman.

**Bêdidan** (hn.l.çewa) Pîrê didanên wîne mabin. ***Pend*** :Xwedê goştî didet bê didanan.

**Bêdil** (hn.l.çewa) Karê ne bi dilê mirovî be. : Ez bêdil xwarinê di xwem.

**Bêdilî** (n.l.mê) Bê gêwilî. Dilşikênan.

**Bêdilîkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov dilê yekî bişkêne. Dilê êkî bi hêlit. : : Tu bi xudê bêdilî ya zarokan ne ke. :Ew zaroryek sêwî, nabe bêdilî ya wî bihêt kirin. (K) bn: Kirin.

**Bêdiran** (hn.l.çewa) Bêdidan.

**Bêdîn** (hn.l.çewa) Kesê bawerîya wî bi dînan tuneye. Kesê ne liser çi dînan. Bêbawer. Bê ol.

**Bêfedî** (hn.l.çewa) Mirovê fedî ji xwe nake. Bêşerim.

**Bêfehêt** (hn.l.çewa) Bêfedî.

**Bêfirşik** (hn.l.çewa) Merivê bi kêrî xwe û kesê nayê. Bêbawer. Bêzax.

**Bêgar** (hn.l.çewa) Kesê karî bê pere û bê hember dike.

**Bêgav** (n.l.mê) Neçar. Bêrê. Neçar.

**Bêgavbûn** (k.jn.gl.mê) Neçarbûn. Bêrêbûn. (K) bn: Bûn.

**Bêgavî** (n.l.mê) Neçarî.

**Bêgavkirin** (k.jn.l.mê) Neçar kirin. : Min bêgav neke her bi axivim!.

**Bêgavkirî** (hk.l.çewa) Neçarkirî. Bêrêkirî.

**Bêgavman** (k.jn.gl.mê) Neçarman. Man bê rê. (K) bn: Man.

**Bêgerd** (hn.l.çewa) Bêguneh.

**Bêgêwil** (nhn.l.çewa) Bêkeyf. Damayî.

**Bêgêwilbûn** (k.jn.gl.mê) Gêwilê mirovî di şikê.Dilçirmisîn.

**Bêgêwilkirin** (k.jn.gl.mê) Gêwilfisandin. Gêwilşikandin.: Bi xudê te ez gelek bêgêwil kirim, ko te wesa got!.

**Bêgêwilî** (n.l.mê) Dema mirov yê bê gêwil be. Kiz.

**Bêgiyan** (hn.l.çewa) Mirî. Bêcan.

**Bêgoman** (pêrb )Alavê misogerkirinê.  Gotina goman têde tuneye, sedased raste.

**Bêgoşt** (hn.l.çewa) Lewaz.

**Bêgoştbûn** (k.jn.gl.mê) bn :Lewazbûn.

**Bêgova** (cugrn.hk.cih) Gundeke li Kurdistana bakûr.

**Bêguneh** (hn.l.çewa) Kesê guneh nebin. Kesê ji kiryareka xirab bêbar be.bêgerd. Pak. Çak.

**Bêgunehbûn** (k.jn.gl.mê) Weke çi guneh li cem mirovî dernekeve. : Ew yê bê guneh bû.

**Bêgunehkirin** (k.jn.gl.mê) Ji gunehê rizgarkirin. Bêguneh derêxistin. : Dadgehê ew bêguneh kir.

**Bêhay** (hn.l.çewa) Weke merivî ageh ji xwe nebe.Hay ji çi nîne.Bêhiş. Bêhoş.

**Bêhaybûn** (k.jn.gl.mê) Hay ji xwe neman. Ageh ji xwe neman. (K) bn: Bûn.

**Bêhempa** (hn.l.çewa) Mirovê bi kar û kiryarên xwe yên qenc ji xelkî cudaye. Nimone. Tek. Bevil.

**Bêhengam** (hn.l.çewa) Mirovê, xelk ji gotin û kiryarên wî hêris di be.

**Behetik** (hn.l.çewa) Bêfedî. Bêfehêt. Ezmanpîs. : Ez naxazim çi caran xwe di wî hilkem, hindî mirovekê bêhetike.

**Bêheval** (hn.l.çewa) 1. Mirovê hevalên wî nebin. Tenê. 2. Bêhevrê. Bêhempa.

**Bêhevrê** (hn.l.çewa) 1. Bêheval. Tinê. 2. Bêhempa.

**Bêhêz** (hn.l.çewa) Merivê sist. Merivê hêza wî tunebe. Bêçare. Lewaz.

**Bêhêzbûn** (k.jn.gl.mê) Bêçarebûn. Xavbûn. Sistbûn. (K) bn: Bûn.

**Bêhêzî** (n.l.mê) Sistî. Lewazî. Xavî.

**Bêhêzkirin** (k.jn.gl.mê) Lewazkirin. Hêz jê birîn. Hêz tê nehêlan. (K) bn: Kirin.

**Bêhin** (n.x.mê) 1. Hatin û cûna bay bo nav sîhan(singî) û bervajî. 2. Karê difinê (kepî) bi nasîna cuda kirina tiştan. Bêhna xweş , ne xweş (gemar).3. Demek kurt, gavek, bîstek.

**Bêhinav** (hn.l.çewa) Tirsonek. Kulekfireh.

**Bêhinavî** (n.l.mê) Tirsonekî. Kulekfirehî. : Wey bavo bêhinavîyê weha li te kiriye ku tu ne wêrî ji mal derkevî.

**Bêhinberdan** (k.jn.l.mê) Dema mirov bêhinekê belav bike, berde. : Bêhina gulavê yan bêhinên din berdide. . (K) bn: Berdan.

**Bêhinbiserketin** (k.jnl.mê) Ji egera gelek westanê bêhina mirovî bi lez dihêt û di çit.

**Bêhinçik** (hn.l.çewa) Mirov, candarê bi zehmet yan nikare bêhina xwe bîne û bibe.

**Bêhinçikbûn** (k.jn.l.mê) Bêhina mirovî bi zehmet yan na hêt û biçit.Bêhinkurtbûn..: Jiber dûkêla cigaran bêhna min çik bû. (K) bn: Bên

**Bêhinçikî** (n.l.mê) Derdeke ku bêhina mirovî teng di bit. Bêhinkurtî.

**Bêhinçikkirin** (k.jn.gl.mê) Dema tiştek bêhina mirovê çik dike. : Tu dikarî çend çirkeyan bêhina xwe çik bi kî?. (K) bn: Kirin.

**Bêhindan** (k.jn.l.mê) 1. Tiştê bêhinê dide. Fêkî bêhina xweş didit. 2. Xwe xavkirin. Bêhinvedan. 3. Nêrîn. Balkişandin. (K) bn: Dan.

**Bêhindar** (hn.dar.çewa) Tiştê bi bêhin. Tiştê bêhin jê di hêt. : Gul, sêv, gulav û htd a bêhindar.

**Bêhingirtin** (k.jn.l.mê) Tiştê bêhin di kevitê, bêhinê di gire.: Cilên min bêhina cigaran yên girtîn. Bêhindan. (K) bn: Girtin.

**Bêhinfireh** (hn.l.çewa) Mirovê zû tore nabe, her tiştî bi zanîn û liser xwe encam di de.Milpan. Baldirêj. Babo mirvekê gelek bêhinfirehe. Br× Bêhinteng.

**Bêhinfirehî** (n.l.mê) Xwe ragirtin. Tore nebûn. Milpanî. : Çi ji bêhinfirehîyê baştir nîne.

**Bêhinfirehbûn** (k.jn.gl.mê) Weke bêhina mirovî fireh di be. : Aha ji nû bêhina min fireh bû , pa(K) bn: Bûn.

**Bêhinfirehkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov xwe hêris neke. (K) bn: Kirin.

**Bêhinînanûbirin** (k.jn.l.mê) Karê mêjtina bay bo nav sîhan û derêxistin. (K) bn: înan, birin.

**Bêhinkirin** (k.jn.l.mê) Gîyandar bi rêya kepîyê bêhina tiştî ji hev cihê di ke. (K) bn: Kirin.

**Bêhinkurtbûn** (k.jn.l.mê) Dema bêhina mirov kurt di be. (K) bn: bûn.

**Bêhinkurtkî** (n.l.mê) Ji egera nexweşî yan westanê bêhinçikî mirovî di girit.

**Bêhinpak** (hn.l.çewa) Dilpak. Çak. Hêja.

**Bêhinpakî** (n.l.mê) Çakî. Dilpakî.

**Bêhinteng** (hn.l.çewa) 1. Kesê bi zehmet bêhina xwe bîne û bibe.2. Kesê zû hêris di be. Bê aram.

**Bêhintengbûn** (k.jn.l.mê) 1.Bêhina mirovî teng di bit. 2. Tengavbûn. (K) Bûn.

**Bêhintengî** (n.l.mê) 1.Bêhinçikî. 2. Tengavî.

**Bêhinvedan** (k.jn.l.mê) Xwe xav kirin ,xwe rihet kirin.Dilvekirin. : Ez gelekê mandî bûym, dê bêhina xwe vedem.

**Bêhnefs** (hn.dar.çewa) Kesê zêde hez ji xwarinê di ke û di xwaze parîyê xweş ji wîra be. Mirovê çavtarî bo xwarinê.

**Bêhnefsî** (n.dar.mê) Çavtarî jibo xwarinê.

**Bêhnefsîkirin** (k.jn.l.mê) Weke meriv bêhnefsîyê di ke. (K) bn: Kirin.

**Bêhnijîn** (k.jn.x.mê) Ji egera xuranekê yan livînekê li bêvila merivî, bayekê bihêzdar û dengdar ji kepîyê derdikeve û bê mirov bi kare bi rawestîne.(K) bdn: ez di bêhnijim em di bêhnijîn. Tu di bêhnijî hûn di bêhnijim, ew di bêhije[…it] ewan di bêhnijin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : ez di bêhnijîm em di bêhnijîn, tu di bêhnijî, hûn di bênijîn, ew di bêhnijî ewan di bêhnijîn. Db,dûr : Bêhnijîbûm, bûyn,..bûy,..bû…. Bûn. (F) : bi bêhnije, bi bêhnijin.

**Bêhnijk** (n.dar.mê) Bêhnijîna ji difin a mirov derdikeve. Pişkîn. : Bêhinjka te pir dendare (bi denge) !. Bêhnijka min nehat.

**Bêhnok** (n.dar.mê) *rêzman*.Nîşaneke di nava rêzikêd nivîsaranda, li dema xwendinê mirov hinekê di rawestit. Nîşana (**,**) .

**,**

**Bêhnok**

**Bêjan** (hn.l.çewa) Bê êş. Ne jan.

**Bêjanî** (n.l.mê) Ne êşan. : Dermanê bêjanî yê,ango ; dermanê jan rawestanê.

**Bêjankirin** (k.jn.gl.mê) Derman yan derzî dane merivî jibo rawestana jana leşî. Benckirin. (K) bn : kirin.

**Bêje** (p.x.mê) 1. Gotin. Peyv. Axivtin. : Tu dizanî bêjeya KURDISTAN ji çend pîtan pêkhatîye? 2. bêje fermana [gotin]e, ang ; bi peyve. Bi axive. : Ka navê xwe bêje?.

**Bêjekar** (pîşn.dar.dz) Kesê gotinan di ke. Peyvdar.

**Bêjevan** (pîşn.dar.dz) Mirovê semînarê di de. Bêjedar.

**Bêjing** (n.x.mê) Bêjînk.

**Bêjînk** (n.x.mê) Amêreke ji depek çemandî şêweyê bazin bi bendikên çermî hatîye raçandin, bo jêk(ji hev) cudakirina dan û gilêşî .bi livandineka bazinî, dan di binda diçe û ka, zil ber(tiştê zêde) biser dikeve.Arjing.

**Bêjînkkirin** (k.jn.l.mê) Danî li bêjînkê di ken jibo ji zîwanê pakij bi be. :Savar li bêjîngê kir. (K) bn : Kirin.

**Bêjok** (n.dar.dz) Pirbêj. :Bêjoko ma devê na kevit serêk?.

**Bêjtin** (k.jn.x.mê) Gotin. di bêjim di bêjîn di bêjî, di bêjin di bêje, bêje. di bêjin. Bi bêje, bi bêjin.

**Bêkar** (hn.l.çewa) Merivê tu kar nebin.

**Bêkarî** (n.l.mê) Nebûna karî. ***Pend*** :Şer ji bêkarîyê baştire.

**Bêkes** (hn.l.çewa) 1. Mirovê kesê xwe tunebe. Bêxwedî. Bêxudan. 2. Navê mêrane.

**Bêkesî** (n.l.mê) Bêxudanî.

**Bêkeskirin** (k.jn.gl.mê) Ji kesûkaran kirin. Bê xwedîkirin. : Xwedê kesê bêkes neke. (K) bn : Kirin.

**Bêkesman** (k.jn.gl.mê) Bêxwedîman. : Piştî bavê wî mirî ew ma bê kes û bê xwedî.(K) bn: Man.

**Bêkeyf** (hn.l.çewa) Damayî. Posîde. Bêgêwil. : Te çiye tu evro yê bêkeyfî?.

**Bêkêr** (hn.l.çewa) Bi kêr nehatî. Bêwic.

**Bêkuta** (hn.l.çewa) Bêdawî. Bêdûmahî.

**Bêl** (n.x.mê) Hesineke pane, destekekê darî pêve heye, jibo kolana erdî bi kar di hêt.

**Bêla** (nax.mê) Xanîyê mezin û du sê texe.

**Bêlan** (n.dar.mê) 1. Cihê hişk û gerim. Berî. Biyaban. 2. Cihek bilinde di navbera du çeman. 3. Pile. Peyîsk.

**Bêlayen** (hn.l.çewa) Bê alî. Ta negir.

**Bêlbêlava** (n.l.mê) Yarîyek (lîstik)a zarokane, kîskekî di kuna(borî)a banî ra ber di din xwarê  û di bêjin : bêlbêlava xudê kurê hew bi kit zava . dako xwedîyê malê şekirok, gîz yan kezwanan bo bi kene kîskê wan û dubare hil di kêşin serî û ve di ken kanê çi bo kirîyê.

**Bêlkirin** (k.jn.l.mê) Erd bi bêlê kolan.(K) bn ; kirin.

**Bêmik** (n.x.mê) Rengekê keskanên hûrikin.

**Bênivêj** (pn.l.çewa) Herimî, gemar nemaze ji alî dînîve. :Mirovê bênivêj.ang ; mirovê herimî, mirovê nimêjan neke.

**Bênivêjî** (n.l.mê) Dema jin heyvane avê di bînin.

**Bênivêjbûn** (k.jn.gl.mê) 1.Hatina xola bênivêjîya jinan ya mehane. 2. Herimîn. (K) bn : Bûn.

**Bêr** (n.x.mê)1. Pezdûtin. 2. Mer a kulanê .

**Bêrdoş** (n.l.mê) Amaneke jibo dotina giyandaran bi kar di hêt. Setil.

**Bêrîvan** (pn.l.çewa)1.Keç, kabanî a diçe bêrê jibo dotina pez û bizinan. 2. Navê keçane.

**Bêserûber** (hk.gl.çewa) Mirovê bêserûber ;ang mirovê ne lêkdayî. Verêlyayî. Karê bêserûber ang ; karê sist, xav karê nerind. karê bi kêmasî.

**Bêserûberbûn** (k.jn.gl.mê) Şepilîn. Tengavbûn. Şepirzebûn.

**Bêserûberî** (n.gl.mê) Tengavî. Nerêkûkûpêkî.

**Bêserûberkirin** (k.jn.gl.mê) Tengavkirin. Şepilandin. Şepirzekirin. :Xwe bêserûber ne ke em dê herin mal.

**Bêserûçav** (hk.gl.çewa) Bêhetik. Bêrûmet. Necamêr. :Zelamê bêserûçav. Jina bêserûçav.

**Bêsûç** (hn.l.çewa) Bêguneh.

**Bêsûçbûn** (k.jn.gl.mê) Bêgunehbûn.

**Bêsûçî** (n.l.mê) Bêgunehî. (K) bn :Bûn.

**Bêsûçkirin** (k.jn.gl.mê) bêgunehkirin. (K) bn:Kirin.

**Bêsûçkirî** (hk.l.çewa) Bêgunehkirî.

**Bêşerim** (hn.l.çewa) Bêfedî. Zirşerim. :Wey babo eve çi mirovekê bêşerme.

**Bêşerimî** (n.l.mê) Zirşerimî. Şerim nekirin.

**Bêşiyan** (hn.l.çewa) Bêkêr. Lewaz. Sist. Kêrnehatî.

**Bêtam** (pn.l.çewa) 1. Xwarina tama wî tune.2. Mirovê bêtam,ang ; mirovê xwîntal. Zinx.

**Bêteşe** (n.dar.mê) Gotin û kiryarên sivik û bê hizir ko civatê hêris di ke.

**Bêtêhn** (hn.l.çewa) Giyan yan amêrê têhn têda tunebe. Germî tê nebît. Bêcan. Mirî.

**Bêtêl** (hn.l.çewa) Amêrên bê têle kar dikin, mîna têlefon, kompiyûter, û htd.

**Bêtir** (pêrb) Alavê zêdekirinê.  Pitir. Zêdetir.

**Bêtirîn** (pêrb) Pitirîn. Ji hemûyan zêdetir.

**Bêtirs** (hn.l.çewa) Meriv karekî bi ke û netirse. Netirsan.

**Bêv** (n.x.mê) Tora girtina masîyan ji çeperên darî hatîye diristkirin. Sîte. Sulte.

**Bêvankes** (n.nediyar.dar) Li cihê navî bikar dihêt.  Kesek nediyar.

**Bêvên** (hk.dar.çewa) Bêgêwil.

**Bêvil** (n.x.mê)  Kepî(difin) kunên difinê . ximximk.

**Bêwar** (hk,hn.n.l.dz,.çewa) 1. Bêmal. Bêcih. Bêxanî. 2. Navê mêrane.

**Bêwexer** (hk.l.çewa) Kur(khur). Beş.

**Bêwic** (hn.l.çewa) Bikêrnehatî. Bêkêr. Bêmifa.

**Bêwijdan** (hn.l.çewa) Dilreq. Bêdil.

**Bêx** (n.x.mê) Rih. Bêxên didanî. Rihên didanî.

**Bêxêr** (hn.l.çewa) Kêrnehatî. Bêkêr.

**Bêxîret** (hn.l.çewa) Tembel. Gemşo. Gemjo.

**Bêxîretî** (n.l.mê) Xîret nekirin. Tembelî.: Ew ji bêxîretî na here xwendingehê.

**Bêxudan** (hn.l.çewa) Mirovê kesên wî tunebe. Bêkes. Bêxwedî.bêsemyan.

**Bêxudanî** (n.l.mê) Nebûna xudanî. : Baxê me ji bêxudanî hişk bû.

**Bêxwedî** (hn.l.çewa) Bêxudan.

**Bêxwê** (hn.l.çewa) 1. Xwarina xwê dinav de tunebe.2. Mirovê bêxwê, ang ; mirovê sist û xav. : Ev zade yê bê xwê ye. Girara bêxwê.

**Bêxwîn** (hn.l.çewa) Xwîn di leşî da tune. Candarên bêxwîn.

**Bêxwînî** (n.l.mê) Nebûna xwînê. Kêmxwînî.

**Bêxwînman** (k.jn.gl.mê) Xwîn di laşî de neman. (K) bn : Man.

**Bêy** (alv.pêvgir) Ne dige. Ne pêra. Tunebe. Bêy te ez naçim. Br× Digel. Pêra. Bê.

**Bêz** (n.x.mê) Dilreş (tiştê) pîs ,gemar.

**Bêzar** (hn.l.çewa) 1. Bê ezman. Nezan. 2.Hêris. Tengav.

**Bêzarbûn** (k.jn.gl.mê) Hêrisbûn. Tengavbûn. (K) bn: Bûn.

**Bêzarî** (n.l.mê) Tengasî. Hêrisbûn.

**Bêzarkirin** (kjn.gl.mê) Hêriskirin. Tengavkirin. Torekirin. (K) bn: Kirin.

**Bêzever** (hn.l.çewa) Bêzirav. Kulafe. Kulekfireh.

**Bêzirav** (hn.l.çewa) Tirsonek. Kulafe. Kulekfireh.

**Bêziravî** (n.l.mê) Kulekfirehî.

**Bi** (Pêrb, alv.pêvgir) 1.Digel. : Ez bi dil û can bi te ra me. Bi hevre .2. Pêşpirta kiryarê.bi ke. Bi xwe. Bi zanin. Bi dîta. 3. Pêşpirtê pesinnavan. Bi hîvî. Bi bawerî, … 4.Pêşpirta sûndxwarinê.Bi gora nemiran. :Bi xudê.

**Biçkov** (n.dar.mê) Bişkov.

**Biçûk** (hn.x.çewa) Tiştê hûr. Ne gir. Ne mazin. : Xanîyê biçûk. Mirovê biçûk. Gundê biçûk.

**Biçûkatî** biçîkatî (n.dar.mê) Dema jîyê zarokînî yê. Her ji biçûkatîya xwe min hez ji xandinê di kir.

**Biçûkbûn** (k.jn.l.mê) Kinbûn. Hûrbûn .Têkçûn. Gundê me sal bo salê biçûk di bit. (K) bn : Bûn.

**Biçûkkirin** (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov qebarê tiştekî kêm bi kit. Me baxçeyê mala xwe biçûk kir. 2. Nazikkirin. Nazandin. Jîyê xwe kêmkirin. : Ev jine çend xwe biçûk di ke.

**Bigoman** (hn.dar.çewa) Tiştê goman têda hebe. Ne sedased. :Ew bi goman li karê me di nêrit.

**Bigor** (n.dar.mê) Amêrê kontirolkirina têhina karebê.

**Bigoşt** (hn.dar.çewa) Têrgoşt. Qelew.

**Biha** (n.x.nêr) 1 Nirx, nirxe. 2 Hêja. Pîroz. : Bihayê kîloyeka sêvan çende ?.

**Bihagiran** (hn.l.çewa) Pir hêja bi biha. Giranbiha. : Hevalê bihagiran.

**Bihaname** (n.l.mê) Kaxeza bihayên mitayî û kelûpelan liser hatîye nivêsîn.

**Bihar** (hkdem.x.mê) Werzekê salê yê xweşe dema hişîn(şîn)bûna gîya û darane, ji mehên avdar, nîsan û gulan an pêk di hêt.***Pend*** :Biharan di de ber dilê xwe. Ang ; kesê ji xwera tiştan xweş û sanahî di ke.

**Biharanavîn** (n.l.mê) Meha nîsanî.

**Biharapaşîn** (n.l.mê) Meha gulanê.

**Biharapêşîn** (n.l.mê) Meha adarê.

**Biharat** (n.dar.mê) Arê giyayê tam û bêhin xweş di kin nav xwarinan da. :Karî, bîber, gijnîj, catirk û htd biharatin.

**Bihare** (n.dar.mê) Genimê li biharê jibo di behit û jibo dirûnê yê berheve.

**Bihêl** (n.dar.mê) Kaxez, yan karta destûrî ya çûne jor ,pişkarîkirin di çalakîyan da. Bihêla ; ahingê, sînemayê, pîşangehê û htd. Te bihêl nebit, nabit tu bi çî ahengê. :Bihayê her bihêleka yarîya topanê, deh dînarin.

**Bihêz** (hn.dar.çewa) Xwedî zendûbaz. Zeberdest. Hêzdar. : Hespê han pir bihêze, dikare çarsed kg bi hilgire.

**Bihişt** (n.x.mê) Beheşt.

**Bihîstin** (k.jn.x.mê) Hestkirina dengan bi rêya guhan. Guhlêbûn. Gulêbûn. Bîstin. : Te bihîstîye kurê Sêvdînî jin ji xwere xwaztîye ?. (K) bdn : ez di bihîzim em di bihîzîn, tu di bihîzî hûn di bihîzin, ew di bihîze[…it] ewan di bihîzin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di bihîst, di bihîstin. Db,dûr. Bihûstibû, …. Bûn. (F) : bi bihîze, bi bihîzin.

**Bihîstok** (n.dar.mê) Têlefon.

**Bihnok** (n.dar.mê) Bêhnok.[,]

**Bihojandin** (k.jn.dar.mê) Heladin. :Rûn liser agirî bihojand. :Bi bihojînin, di bihojand, dê bi bihojîne, bihojandibû, .

**Bihojîn** (k.jn.x.mê) Helan. Helyan. :Qerîse jiber germa tavê bihojî.

**Bihok** (n.x.mê) Bîh.

**Bihûrbijar** (hn.l.çewa) Kesê hûrik hizir dike. Kesê barê wî giran û xema her tiştî di xwe. Xemxor.

**Bij** (n.x.mê) 1.Heza mirovî jibo xwarinê. Gêwil. Vîyan. : Ev meheke bija min jibo xwarinê pir kêm bûye. : Ez xwarinêd tîj di xwem dako bija min ve bi be. 2. Gîyan. Can.

**Bijandin** (k.jn.x.mê) 1.Belavkirina nûçeyan liser xelik, hendaman. Belavkirin. Reşandin. 2. Pir ji xwarinê hezkirin. Ji dil vîyan. Jibo dînbûn. Pijandin. (K) bdn :Ez di bijînim em di bijînîn, tu di bijînî hûn di bijînin, ew dibijîne […it] ewan dibijînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di bijand, di bijandin. Db,dûr : bijandibû. …..bûn. (F): bi bijîne bi bibijînin.

**Bijang** (n.x.pir) Mijîlank.

**Bijar** (hn.dar.çewa) 1. Tiştê di nav birekê ji hemûyan geş û ciwan tir. Bijare. 2. Bi hejarî. Bi jarî. : Daykê zarokê xwe bijarî xwedî kir. 3 .Navê mêrane.

**Bijare** (hn.dar.çewa) Mirov, candar,mita, cil û htd yê ji hemûyan baş û xweşiktir. Serpişk. Bijar.

**Bijarte** (hn.dar.çewa) Bijare.

**Bijartin** (k.jn.x.mê) Tiştê baş û xirab jihev cudakirin. paqijkirn. :Daykê danê savarî bijar û paşî lêna. (K) bdn: ez dibijêrim em dibijêrîn, tu dibijêrî hûn dibijêrin, ew dibijêre[…it] ewan dibijêrin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bijart, di bijartin. Db,dûr : bijartibû, …bûn. (F):bi bijêre bi bijêrin.

**Bijartî** (hn.dar.çewa) Yê hatî bijartin. Xwarina bijartî.

**Bijikandin** (k.jn.dar.mê) Mirov tiştekî belav bi ke. Parçe bi ket. Bi pirtikînit. :êkî cama pencera me bijikand. (K) bdn : ez di bijikînim em di bijikînîn, tu dibijikînî hûn di bijikînin, ew di bijikîne[…it] ewan di bijikînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di bijikand, di bijikandin. Db,dûr: bijikandibû, …bûn. (F): bi bijikîne, bi bijikînin.

**Bijikî** (hk.dar.çewa) Şikestî. Peritî. Pirtikî.

**Bijikîn** (k.jn.x.mê) Belavbûn. Pirtikîn. : Demhijmêr kevt û bijikî.

**Bijî** (fermana. jiyan) Daxaza jîyek dirêj jibo yekî bi kin. Desxweşî lê kirin.Aferîn. :Bijî Kurdistan.

**Bijîn** (hn.da.çewa) 1. Pakij. Pak. Jaravkirî. Amanên bijîn. 2. Hezkirina xwarinê. Bij. 3. Sax. Zindî. Çeleng. Jîndar.

**Bijînbûn** (k.jn.gl.mê) 1.Paqijbûn. Bi giyan kevtin. 2.Zaxbûn. Peytbûn. (K) bn: Bûn.

**Bijînkirin** (k.jn.gl.mê) 1. Pakijkirin. Jaravkirin.2. Zaxkirin. Peytkirin. Destan bijîn ke. (K) bn: Kirin.

**Bijînkirî** (hk.l.çewa) Paqijkirî.

**Bijîr** (hn.dar.çewa) Mirovê zîrek û hoşmend. Zanebûn. Jîrane.

**Bijkoj** (n.dar.mê) 1. Pişkovk. 2. Navê keçane.

**Bijûn** (hn.x.çewa) 1. Xweş. Peyt. Leşsax. 2. Biber. Berdar.

**Bijûnbûn** (k.jn.l.mê) Pakijbûn. Saxlembûn. (K) bn: Bûn.

**Bijûnkirin** (k.jn.lmê) bijînkirin. Pakijkirin. (K) bn: Kirin.

**Bikaranîn** (k.jn.gl.mê) Weke meriv tiştek, amêrek, makînek ê karî têda bi ke, yan pê bi ke. Karpêkirin. :Ezê tirombêla xwe jibo şahîyê bi kar bînim.(K) bn: Anîn.

**Bikarînan** (k.jn.gl.mê) Bikaranîn.

**Bikêr** (hn.dar.çewa) Merivê hêja, peyt, çeleng. Tiştê qenc.

**Bikêrhatin** (k.jn.gl.mê) Dema mirov yan kelûpel jibo xwe û civakê yê zana û peyt be. Ji hejî cihê lê kar di ke. :Ew pêlav bi kêr pîyên te na hêt. (K) bn: Hatin.

**Bikêrhatî** (hn.l.çewa) Mirovê di kare bi çakî kar û serederîyê bi ke. Peyt. Hejî. : Xortekê bi kêrhatî ye.

**Bikok** (hn.dar.çewa) Peyt. Zivt. Çeleng. Kok.

**Bikoranî** (hn.dar.çewa) Mirov karekî bê hizir darijtin bike. Bikoretî.

**Bikoretî** (hn.dar.çewa) Bikoranî.

**Bikirk** (n.dar.mê) Binê bîr, kanî, çal, aman an û htd.

**Bil** (pêrb) Alaveke jibo ji nav girtin û vederkirinê, bi kar di hînin. ne ev, lê yek din. Ji bil. Ji bilî. Eve ne, yê/ya dî. : Dergeh jibo her kesê vekirîye ji bil zarokan. : Ez hemû zadan di xwem ji bil savarê.

**Bila**(pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo pejirandin û qayîlbûn li ser biryarek, gotin yan daxwazekê.Başe. Qeydî nake. Xem nake. :Bila ez di gel hewe bi hêm?. ***Pend*** :Bila rê bit, bila dûr bit, bila kiç bit, bila pîr bit.

**Bilandin** (k.jn.dar.mê) Hawîşkirin. Tenakirin. Bêdengkirin. Kêmkirin. Têlefizyona xwe bi bilîne, ezê di xwînim. Zarok bilandin. Di viya min zarok bi bilanda.(bilandiba). (K) bdn: ez di bilînim em di bilînîn, tu di bilnîî hûn di bilînin, ew di bilîne[..it] ewan di bilînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di biland, di bilandin. Db,dûr : bilandibû, ….bûn. (F) : bi bilîne, bi bilînin.

**Bilav** (hn.x.çewa) Belav.

**Bilbil** (n.dar.nêr) ***balinde*** Çeçikeka ciwan û deng xweşe, bi awazên dilînî di stire. Nîşana evîndarîyê.

**Bildirik** (n.dar.mê) Dar û tiraşên bi stirî. Dirî.

**Bilez** (hn.dar.çewa) Kiryara di vê zû bi hêt kirin. Lezgîn. Çima tu weha yê bilezî?. ***Pend*** gotina xesoyan :Min bûkek îna bilez û bez, sivika malê bûme ez.

**Bilêt** (n.x.mê) Karta bihêlîyê. Bihêl.

**Bilind** (hn.x.çewa) 1. Tiştê ji erdî dûr, li serî. Berz. Evraz. Esmanê bilind. Dareka bilind. Çiyayên bilind. Bejin a bilind. ***Pend*** :Yê bilind bi firit, dê nizim bi erdî kevit. Ang; kesê xwe mezin bi ke û kesên li dora xwe kê bi bîne, dê rastî çaman bi be. 2. Navê mêrane. Br× Nizim.

**Bilindahî** (n.dar.mê) Bilindî. : Bilindahîya spîndarê bît gezin.

**Bilindayî** (n.dar.mê) Bilindî.

**Bilindbêj** (hk.l.çewa) Dengbilind.

**Bilindbûn** (k.jn.l.mê) Ber bi evraz ve çûn. Jêhelçûn. Bibakevtin. Bay li kaxezêda, bilind bû. (K) bn: Bûn.

**Bilinddek** (n.dar.mê) ***rêzman***. Cihê selîqa dengî bilind dibe di peyvê da (^). : Mînak: dengê mirovî li birgeha (tan) ji peyva Kurdistan bilind dibe.ango bilindek di keve tan.

**Bilindî** (n.dar.mê) Tişt yan cihêd bilind. Evrazî. : Ew ji bilindîya deh gavan kevte xwar.

**Bilindîne** (hn.dar.çewa) Giring.

**Bilindkirin** (k.jn.l.mê) Ber bi evraz ve birin, avêtin. Berzkirin..: Mamostay gote xwendekaran; yê bersiva pisyara min bizane, bila destê xwe bilind ke. Dengê xwe bilind ne ke!. (K) bn: Kirin.

**Bilindkirî** (hk.l.çewa) Hatî bilind kirin.

**Bilî** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo jêgirtin û neyîkirina tiştekî ji birekê. Ji bilî. Bilî.Heger ne.

**Bilîl** (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrekê mûzîkê ye du lûlî ye bi pifkirinê deng jê der dikevit. Bilûr.

**Bilîlbêj** (pîşn.l.dz) Bilîlvan. Bilûrvan.

**Bilîlbêjî** (karn.l.mê) Karê gotin û pifkirina bilûrê.

**Bilîlvan** (pîşn.dar.dz) yê bilîlê lê dixe. Bilîlbêj. Bilûrvan.

**Bilîvanî** (karn.dar.mê) Bilîlbêjî.

**Bilîmet** (nh.x.çewa) Bevil.

**Bilo** 1 (n.x.mê) Tevinpîrk. Pîrik.

**Bilo** 2 (n.x.nêr) 1. Bilind. Bel. 2. Hedamê guhnelî yê nêr.Kîr.

**Bilok** (n.x.mê) Libneyêd avakirina dîwaran. Libne.

**Biloq** (hn.x.çewa) Bel. Derkevtî. Zîq. Gir. : Çavêd biloq.

**Bilot** (hn.x.çewa) Bilind. Serevraz. : Paşîya bilot.

**Bilotbûn** (k.jn.l.mê) Bilindbûn. (K) bn: Bûn.

**Bilotkirin** (k.jn.l.mê) Bilindkirin. Brlkirin. (K) bn: Kirin.

**Bilq** (n.x.mê) 1. Pêqîşkêd bayî ji nava avê derdikevin.2. Dema şileyek[av, xwîn, zad û htd] bi gor der diçe.

**Bilqhavêjtin** (k.jn.l.mê) Derkevtina bilqan. . :Kanî ya bilqan di havêje. (K) bn: Havêjtin.

**Bilqok** (n.dar.mê) Bilq.

**Bilûr** (nx.mê) bn :Bilîl.

**Bilûrjen** (pîşn.dar.dz) Bilûrvan.

**Bilûrjenîn** (k.jn.l.mê) Bilûrkutan. Bilûrlêdan. (K) : Jenîn.

**Bilûrkutan** (k.jn.l.mê) Wekî mirov li bilûrê dixe.

**Bilûrlêdan** (k.jn.l.mê) Lêdana bilûrê. Bilûrjenîn. (K) bn: Lêdan.

**Bilûrvan** (pîşn.dar.dz) bn : Bilîlvan.

**Bin** (hkc.nnr) 1.Pişka xarê ya tiştî. Alê binî yê dîwarî. 2.Cihê tişt xwe liser digirin. Binê, pê, xanî, amanan, derayn û htd :Ez li bin darê nivistim.. Br× Ser.

**Binaçe** (n.dar.mê) Binemal. Nivş. Berebab.

**Binanûxwê** (hn.gl.çewa) Wefadar. :……, mirovkeê bi nanûxwê ye û çi caran dostên xwe ji bîr nake.

**Binar** (n.dar.nêr) 1. Arê di keve binê gonîyan. 2. Bingeh. Şengiste.

**Binas** (n.x.pir) Sûç. Guneh. :Binasên tene, evro em gîro bûn.

**Binaskar** (hn.l.çewa) Sûçbar. Gunehkar.

**Binaskarkirirn** (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. :Jiber wî bûyera xirab gelek kes hatin binaskar kirin. (K) bn :Kirin.

**Binaskarî** (hk.l.çewa) Gunehbarî. Sûçbarî.

**Binaş** (n.l.mê) Bingeh. Binaxe. Şengiste.

**Binav** 1 (n.l.mê) Binê avê.

**Binav** 2 (hn.dar.çewa) 1.Navkirî. Yê ko nav heye.2. Navê wî di nava xelkî de belave. Binavdeng.

**Binavbûn** (k.jn.gl.mê) Kevtin binê avê. Niqobûn. :Cerik binav bû. (K) bn: Bûn.

**Binavdeng** (hn.l.çewa) Merivek bi nave. Sernas. Bernas.

**Binavdengbûn** (k.jn.gl.mê) Binavdengkevtin.: Eve ji kengî ew hosa binavdeng bû. bn: (K). Bûn

**Binavdengkevtin** (k.jn.gl.mê) Navdengê wî/wê di nav xelkî da belav bûye. (K) bn: Kevtin.

**Binavkanê** (n.l.mê) Lîztineke mirov hevdu di bin avê ve di kin.

**Binavkanêkirin** (k.jn.gl.mê) Hevdu di bin avê ve kirin. : Were ez û tu binavkanê bi kin!. (K) bn:Kirin.

**Binavkirin** 1 (k.jn.gl.mê) Nav danîn ser kes, tişt yan candarekî. Nav lê kirin.

**Binavkirin** 2 (k.jn.gl.mê) Xistin bin avê. Hevdu êxistin bin avê. Niqokirin. Min xwe di bin avê ve kir. Hevdijî xwe binav kir. (K) bn : Kirin.

**Binavûdeng** (hn.gl.çewa) Binavdeng.

**Binax** (n.l.mê) Binê axê. Di bin axê de. Kûrayî. Bingeh.

**Binaxbûn** (k.jn.gl.mê) Man di bin axê da. Ax kevt ser. (K) bn: Bûn.

**Binaxe** (n.dar.mê) Bingeh.

**Binaxkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov tiştekî bi ke bin axê. Ax radan ser. Veşerin. : Mirîyêd xwe binax kirin. (K) bn : Kirin.

**Binba** (hn.l.çewa) 1. Tiştê pir sivik.2. Corek ardê sipîye.

**Binbal** (n.l.nêr) Binkefş. Binhingil.

**Binbir** (hn.dar.çewa) Wêran.Vebir.

**Binbirbûn** (k.jn.gl.mê) Bi êkcarî jinav hatî birin. Wêranbûn. (K) bn: Bûn.

**Binbirkirin** (k.jn.gl.mê) Bi êkcarî jinav birin. Nehêlan.Qirkirin. (K) bn: Kirin.

**Binc** (n.x.mê) Jajî. Rêçal.

**Bincilik** (n.l.mê) Kiraskên mirov li ben cilan li ber xwe di ke. Fanêle.

**Bincî** (n.l.mê) Doşek. Nalîk.

**Binçav** (hk.l.çewa) 1. Kesê li bin zêrevanîyê be. 2. Zîha binî ya çavî.

**Binçavkirin** (k.jn.gl.mê) Xistine bin çavan. Zêrevanî lê kirin. (K) bn: Kirin.

**Binçavkirî** (hk.l.çewa) Kesê di bin çav û nêrînê da.

**Binçeng** (n.l.pnêr) Binkefş. Binşaper.

**Binçenganê** (n.l.mê) Xwelêkdan. : Du zarokan binçenganê di kirin.

**Binçîne** (n.l.mê) Bingeh. Binaş. Binaxe.

**Binçok** (n.l.nêr) Cihek çale di kevit bin çokî.

**Bindank** (n.l.mê) Danê di keve binê amanan. Hûrikê savarî.

**Bindar** (n.l.mê) Siha darê. Sîbera darê. 2. Jina şûkirî. Jina mêrkirî.

**Bindeq** (n.x.mê) Coreke çerezên dindik xire.

**Bindest** (hn.l.çewa) Mirovê li bin destê yekî. Mirovê ne serbest. Girêdayî. Girtî. Ne azad.

**Bindestbûn** (k.jn.gl.mê) Meriv di keve bin destê alî, yan kesekî. :Ta kengî em dê bindest bîn ?. (K) bn : Bûn.

**Bindestî** (n.l.mê) Jiyana bin destê dagîkeran. Jiyana ne azadî. :Bindestî derde.

**Bindestkirin** (k.jn.gl.mê) Tepeserkirin. Dagîrkirin. (K) bn: Kirin.

**Bindestkirî** (hk.l.çewa) Binçavkirî. Tepeserkirî.

**Bindok** (n.l.mê) Rûnê di keve binê amanan. binê rûnî.

**Binecih** (hn.l.çewa,hk.cih) 1.Peyt. Neliv. Rêkûpêk.2. Xwecih. Rûniştî.

**Binecihbûn** (k.jn.l.mê) Akincîbûn. Rûniştin. :Em hêjta binecih ne bûne.(K): bn. Bûn.

**Binecihî** (l.dar.mê) 1. Cihê jê hatê .kûk.2. Cihê mirov lê akincî di bit.

**Binecihkirin** (k.jn.l.mê) 1. Serûberkirin.rêkxistin. 2. Xwecihkirin. :Piçek xwe binecih bi kin di dû ra em dê herin. (K): bn Kirin.

**Binecihkirî** (hk.l.çewa) Peytkirî. Hatî binecihkirin.

**Binecîh** (hn.l.çewa,hk) bn :Binecih.

**Binefş** (n.x.mê) 1. ***gul*** Corekê gulane, pir rengên wan hene. 2. Navê jinane.

**Binefşî** (hn.dar.çewa) Rengê mûr.

**Binegeh** (n.dar.mê) Bingeh. Binecih.

**Binekarî** (n.dar.mê) Karê binvebinve. Xapandin. Di serdabirin. Fêl.

**Binemal** (n.dar.mê) Malbat. Babik. Nivş. : Ew ji binemaleka kurdperwer bû.

**Binerd** (hk.l.cih) Cihê li bin erdî. Tiştê bin erdî, axê. : Sêva bin erdî.

**Binerdbûn** (k.jn.gl.mê) Tişkê di keve bin erdî. Binaxbûn. (K) bn: Bûn.

**Binerdik** (n.l.mê) Sêvbinerd.

**Binerdîn** (hk.l.cih) Cihên kunkirî mîna rêyan di bin erdî ve.

**Binerdkirin** (k.jn.gl.mê) Tiştê mirov bêxe bin erdî. Meriv axê bike ser tiştekî. : Cotyaran tov binerd kirin. (K) bn: Kirin.

**Binerdkirî** (hk.l.çewa) Êxistî bin erdî. Verşarî.:Ev pitate ya binerd kirî ye.

**Binetar** (n.dar.mê) Bingeh.

**Binevş** (nl.mê) ***gul*** 1. Corek gulane(kulîl)a .2. Navê jinane. Binefş.

**Binêsk** (n.dar.mê) Pirta dawîyê ya biçûk ya jiber sabûnê di mîne.

**Binêşt** (n.x.nêr) Benîşt.

**Bingeh** (n.l.nêr) 1.Destpêka danana her tiştekî. Şengiste.Binetar. 2. Navend. Bingehê ronakbîrî.

**Bingehavêtin** (k.jn.gl.mê) Pêngavhavêtin jibo avakirina bingehekî. Damezrandin. (K) bn:Avêtin.

**Bingehdanîn** (k.jn.gl.mê) Avakirin. Dana bingehî. Pêngavhavêtin.Danana şengisteyan, (K) Danîn.

**Bingehgirtin** (k.jn.gl.mê) Binecihbûn. Xwecihbûn. Rûniştin. (K) bn: girtin [em bingeh digirin]..

**Bingehîn** (hn.l.çewa) Tiştê, gotina bingehî. Giring. Serekî. Serpişk.

**Bingehziman** (n.l.mê) Rêzman. Bingeha, kûka ziman.

**Bingelte** (hn.l.çewa) Merivê pir hej ji henekan di ke û axivtin şirîn. Tiraneker. Yarîker.

**Bingelteyî** (n.l.mê) Tirane.

**Binharî** (hn.dar.çewa) bi nîharî, Mirovê jiber mirina xweşdivîyekî cilên reş li xwe di ke. Bi Şînî.

**Binhingil** (n.l.nêr) Binkefş.Binbal. Binçeng.

**Binik** (n.dar.nêr) Binê tiştên biçûk, binik ê cigarê, binik ê qelemî û htd.

**Binî** (hk.cih) 1. Xwarê. Alîyê jêrî. 2. Bin. Binik. 3. Pinî. Tewil.

**Binîdanîn** (k.jn.l.mê) Avakirin. Damezrandin. Bingeh jêre danîn.(K) bn: Danîn.

**Binîgirtin** (k.jn.l.mê) Weke xwarinek binê amanî digire. (K) bn: Girtin.

**Binîkirin** (k.jn.l.mê) Pinîkirin. Pêlav binîkirin. (K) bn: Kirin.

**Binîkişandin** (k.jn.gl.mê) Ji destan wergirtin. Ji destan deranîn. (K) bn: Kişandin.

**Binîkolan** (k.jn.l.mê) Xapandin. Di serdabirin. Axivtin jê çêkirin. Vekolîn. (K) bn : Kolan.

**Binîşewat** (n.l.mê) Binvereng. Binîşewata îpraxan pir xweşe.

**Binîşewitîn** (k.jn.gl.mê) Dema zad bi binê qazanê ve di şewite. (K) bn: şewitîn.

**Binkask** (nl.mê) Kasika digel peyalê, yaku peyala çayê liser dadinin. Kasik.

**Binkefş** (n.l.nêr) Cîyê di kevit bin bask û sermilêd mirovî yê mû lê di hêt. Binhingil. ***Pend*** :Bikefşêd wî di xurin.ang; di xwazit kiryareka seyr bi ke.

**Binkêl** (n.dar.nêr) Binkefş.

**Binkirask** (n.l.nêr) Kirasê di bin cilikan di ken ber xwe. Binkiraskê sipî. Binkiraskê wî yê vebûy.

**Binkol** (n.dar.nêr) Xermaşe.

**Binpê** (n.l.mê) 1.Binê pêyî. Panka pêyî. 2. Mehsika pêlavê.

**Binpêbûn** (k.jn.gl.mê) Kevtin bin pêyan.

**Binpêkirin** (k.jn.gl.mê) Şêlîkirin. Bêrêzkirin. Bêrûmetkirin. Kirêtkirin. :Mafên welatîyan binpê di ken. Biyara babê xwe binpê kir. (K) bn: Kirin.

**Binpêkirî** (hk.l.çewa) Xistin bin pêyan. Bêrûmet.

**Binrex** (n.dar.mê) Doşek. Nalîk. : Liser binrexê xwe dirêj kir. Binrexa dumêre.

**Binta** (n.l.mê) 1. Bingeh. Şengiste. 2. Tûtina ta digel. Tûtina kate.

**Bintatî** (n.dar.nêr) Corek tirîye. Tirî.

**Binvebinve** (hn.l.çewa) Mirovê bêdeng û kêm axivtin dîyar, lê di binve gelek yê bi kenî û gotin xweşe.Yan mirovê xwedî find û fêl.

**Binzik** (n.l.mê) ***candar*** Parçeyeke di keve binê zikî.

**Binzînk** (n.l.nêr) Tûrk yan kulavê di keve binê zînê liser pişta dewaran.

**Bir** (n.x.mê) 1. Deste. Revde. :Bira kewan. Bireka mirovan. 2. Dema derbaz, kiryara birin.

**Bira** (n.x.nêr) 1.Kurên daybabêd mirovî. 2. Jibo rûmetê di bêjin hevdu.

**Birader** (.n.dar.dz) Heval. Hevrê. Hevkar. Niyas. Bira.

**Biraderi (biraderînî)** . Hevalî. Hevalînî.Biraynî.

**Birajtin** (k.jn.x.mê) Xwarin liser agir danan, yan di nava pelan da, bêy av û rûn, tanî bikêr xwarinê bêt. Goşt birajtin, hêk birajtin. (K) bdn: ez dibirêjim em dibirêjîn, tu dibirêjî hûn dibirêjin, ew dibirêje[…it] ewan dibirêjin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di birajt, di birajtin. Db,dûr : birajtibû, …bûn. (F): bi birêje**,** bi birêjin.

**Birale** (n.dar.mê) Nemamk. Şitil.

**Biramak** (n.l.nêr) Birayê ji daykê. Birayê şîrî.

**Biraştin** (k.jn.x.mê) Birajtin.

**Biratî** (n.dar.mê) Biraynî.

**Birayane** (hk.dar.çewa) Serederî û bi hevre jîyana mîna birayan.

**Birayetî** (n.dar.mê) 1. Hevalînî. Barayî. 2. Rojnameyeka rojaneye zimanhalê PDK.

**Birayî** (n.dar.mê) 1. Birayêd hevdu.2. Hevra kar kirin wek bira, bi dilsojî. Dilsaxî.

**Biraza**(n.dar.nê) Kurê bira yê mirovî. Pisbira.: Azad birazayê mine.

**Birazava** (n.l.nêr) Keseke li demê şahîyê hertim bi zavayî ra ye, jibo xizmeta wî bi ke û şîretan bi dê.

**Birazî** (n.dar.nêr) Biraza. Kurbira.

**Birbend** (n.dar.mê) Dolab. Refik. Kendor.

**Birbir** (hk.l.çewa) 1.Komkom. Destedeste. : Kew birbir firîn. Destedeste firîn.2. Zîvik a pişta mirov û candaran.

**Birbire** (n.dar.mê) 1.Birbir. 2. Zîvik.

**Birc** (n.x.mê) Avayîyê bilin û asê jibo zêrevanîyê bi kar di hêt.

**Bircabelek** (n.l.mê) Kevine birca wargehê mîran, li Cizîra Botan.

**Birçî** (hn.x.çewa) Hestkirina candaran ko pêdvî bi xwarinê heye.Birsî. :Ez birçî me.


**Birçîbûn** (k.jn.l.mê) Dema giyandar birçî di bin. Pêdvî xwarinê di bin. Birsîbûn. (K) bn: Bûn.

**Birçîkirin** (k.jn.l.mê) Ne xwarina zadî, ne dana zadî.zahidkirin. : Xwe birçî kir ang; zû zad ne xwar. (K) bn: Kirin.

**Birçîkirî** (hk.l.çewa) Birçî hiştin. Hêlan birsî.

**Birçîtî** (n.dar.mê) Dema xwarin nemîne yan kê di be. Qetlazî. Derdê dirçîbûnê. Birsîtî. Kulb. :Heger baran ne bare, dê birçîtî li welatê me peyda bibe.

**Birek** (n.dar.nêr) Alavekê asinîne pan û tenike, didankên tîj hene jibo birîna daran û tiştên din bikar di hêt. Mişar.



**Birek**

**Birekkirin** (k.jn.l.mê) Birîna daran bi birekî. Mişarkirin. (K) bn: Kirin.

**Birêz** (hn.dar.çewa) Rêzdar. Birûmet.

**Birgeh** (n.dar.mê) *rêzman* Cihê birînê. Cihê vebirînê. Cihê rawestanê.cihê hevgirtina gehan. : Peyva Kurdistan ji sê birgehan pêk di hêt; kur - dis - tan.

**Birh** (n.x.mê) Birû.

**Birik** (n.x.mê) Bayekê bêhin nexweşe paş zadxwarinê ji devê mirovî der di keve.Qirp.

**Birikhatin** (k.jn.l.mê) Derkevtina birikan ji devî. : Birik di hêne min. Birikên min di hên. (K) bn :Hatin.

**Birikîn** (k.jn.x.mê) Birikhatin. (K)ez di birikim em di birikî, tu di birikî hûn di birikin, ew di birike ewan di birikn. (F): bi birike, bi birikin.

**Birin** (k.jn.x.mê) Veguhastin ji cihek bo yê dî. Livandin. Bizizandin. (K) bdn: ez di bim,em di bîn,tu di bî hûn di bin. ew di be[…et] ewan di bin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bir, di birin. Db,dûr : biribû, …bûn. (F) bi be, bi bin (bi ben).

**Birinc** (n.x.mê) 1.Danek çandinî sipî û ciwane. 2. Xwarinek xweş û bi tame.

**Birincî** (hk.çewa,pn.x.dz) 1. Wek birincî ciwan. 2. Bijare.

**Birincok** (hn.dar.çewa) Tiştê ron, yê meriv ronahîyê têra di bîne.Ron.

**Biriskîn** (k.jn.x.mê) Teysîn. : Cilik di biriskin.

**Birî** (n.x.mê) 1. Birû. 2. Xwe givaştina meriv û candarên mê dema zanê.

**Birîkar** (pîşn.dar.dz) Kesê karên êkî bi stoyê xweve di girit û serderîyê bi karên wî di ke. Cihgir.

**Birîkarî** (karn.l.mê) Kareke di hêt kirin navbera kesanda ko êk di hêt destnîşankirin jibo bikarên wî rabibe . Cihnişan.

**Birîkarîyagiştî** (n.l.mê) Birîkarîya hemû mal û karî di hêt kirin.

**Birîkarîyanemaze** (nl.dz) Birîkarîyeke tenê jibo karek nemazeye.

**Birîkarname** (n.l.mê) Nameyeka yan formeke bi îmza birîkar û dîdvanan hatîye berhevkirin.

**Birîkirin** (k.jn.l.mê) Xwe givaştin li dema zanê. :Bizin ya birîyan di ke wesa diyare dê zêt. (K) bn : Kirin.

**Birîn** 1 (k.jn.x.mê) Dukerkirina tiştî.Jêvekirin.:Dar birîn. :Ser birîn. (K) bdn : ez di birim em di birîn, tu di birî hûn di birin, ew di bire[…it] ewan di birin. Pr : dê [bi] + bdn. Bdb : di birî, di birîn. Db,dûr : birîbû, … bûn. (F) : bi bire, bi birin.

**Birîn** 2 (n.x.mê) Şûna gurzekî. :Cihek ji leşê mirovî xwîn jê bi hêt dema gurzek vê di keve. Cihê lêdanê,hingavtinê. Kul. : Birîna xencerê.

**Birîndar** (hn.dar.çewa) 1. Kesê birînek liser leşê wî çêbûye. 2. Navê kurane.

**Birîndarbûn** (k.jn.l.mê) Weke birînek ji egera hingavtinekê li leşê merivî bi be. :Li pevçûna di gel dujminî sê pêşmergeh birîndar bûn.(K) bn : Bûn.

**Birîndarkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov gurzekî li yekî bi de tanî xwîn ji leşê wî bê. .Dilşewitandin. Çiklêdan. : Hesta xelik î birîndar di ke. (K) bn: Kirin.

**Birîndarkirî** (hk.l.çewa) Tiştê hatî birîndarkirin. Tayê darê birîndar kirî ye.

**Birînkul** (hn.l.çewa) Dilkul. Kovandar. Dilşewitî.

**Birînpêç** (pîşn.l.dz) Kesê karê wî dermankirin û pêçana birînên birîndarane.

**Birînpêçan** (k.jn.l.mê) Pêçan û girêdana birînan. (K) bn: Pêçan.

**Birîsî** (birosk) (n.x.mê) Xîçek ronahî li asmanan ji egera vêketina bayê sar û gerim bargehên karebê peyda di bin û deng ronahî di hên bihîztin û dîtin.

**Birîsîvedan** (k.jn.l.mê) Dema dengê birîsîyan digel ronahîyê li esmanan di hên.

**Birîskîn** (k.jn.x.mê) Biriskîn.

**Birk** (n.x.mê) Cihê av lê ragirtinê , çalek şêwe çaralî, lakêş yan bazinî ku avê tê dixin,. Birka avê.: Xwe havêt birkê. Ava birkê berda. Birka tijî.

**Birmît** (n.x.mê) Birmût.

**Birmîz** (hn.l.çewa) Mirovê gelek di mîze. Zarokê pir di mîze. Pirmîz. Yê ku bi xweve di mîze. :Zarokê birmîz.

**Birmût** (n.x.mê) Arê tûtinê, pîremêr û pîrejin bi difnê hildikêşin.Birmît.


**Birû** (n.x.mê) *leş* Mûyên bi rêz bi şêweyê kivane li hindav çavan.

**Birûsk** (n.x.mê) Birîsî.

**Birûsklêdan** (k.jn.l.mê) Birîsîvedan.

**Birxî** (n.x.nêr) Pirtên asinên bi xirkin asin û daran pêkve peyt(tund) di kin.

**birxû** (n.x.nêr) Birxî.



**Birxû**

**Biryanî** (n.x.mê) Corekê zadîye, ji têkhelkirina birinc, goşt, pitat, biharat û htd çêdikin.

**Biryar** (n.x.mê) Derêxistin yan derbazkirina her gotin yan kiryar bo qonaxa bicih kirinê.: Eve biryara bajêrvanîyê ye di vê em pêgirî yê pê bi keyn.

**Biryardan** (k.jn.l.mê) Standina biryaran. Derbazkirina biryaran. :Biryar hat dan, ji evro û wêve cigarekêşan li rêberîyannabit. (K) bn : Dan.

**Biryargirtin** (k.jn.l.mê) Biryardan.(K) bn: Birtin.

**Biryarname** (n.l.mê) Nivîsara biryarê. Nameya biryarê. :Biryar daye, ko qutabî bi çin seyranê û min biryarname dîtî ye.

**Biryarsitandin** (k.jn.l.mê) Biryardan.

**Bisemt** (hn.dar.çewa) Bi kêrhatî. Peyt. Ji hejî.

**Bisk** (n.x.mê) Du parçe ji pora serê mirovan, nemaze keçan ko di ser guhan , diber herdu rûyan da derbaz di û be di hête xwar, nexasne.:Biskên badayî, Biskên reş.Biskên dirêj.

**Bist** (n.x.mê) 1.Darkek nêzî metrekê dirêj mîna şêweyê şûrîye jibo wergêrana nanê sêlê bi kar di hêt.2. Darikên zirav yan şûşikêd hesinî jibo birajtina pişkan bi kar di hêt. 3. Bihost.

**Bistî** (n.x.mê) Tayên ter û nazik yên şînkatî, dava zirav ya di keve navnbra belg û çeqê daran.

**Bişavtin** (k.jmê) Paqijkirina tiştê têkel di avêda wek; dan ,ax, bişavtin. Ji avê girtin.yan şûştin bi avê paşî jê gijrtin. (K) bdn :ez di bişêvin em dibişêvîn, tu di bişêvî hûn di bişêvin, ew di bişêve[..it] ewan dibişêvin. Pr: dê bi +bdn. Bdb: di bişavt, di bişavtin. Db,dûr: bişavtibû, …bûn. (F): bişêve bişêvin.

**Bişewat** (hn.dar.çewa) Bi kovan.

**Bişewatî** (hn.dar.çewa) Bi kovan. Kovandarî.

**Bişkavtin** (k.jn.x.mê) Ji hev cihêkirin. Jêk cudakirin.

**Bişkivî** (hk.x.çewa) Geş. :Gula bişkivî. Rûyê bişkivî.

**Bişkivîn** (k.jn.x.mê) Geşbûn. Pişkivîn.

**Bişkoj** (n.dar.mê) Gula ne gehistî, negeşbûyî. Sava. Ne vebûyî.

**Bişkul** (n.x.mê)Pişkil.

**Bişûre** (hn.dar.çewa) Tore. Hêris. Tengav.

**Bişûrebûn** (k.jn.l.mê) Torebûn. Tengavbûn. Hêrisbûn. (K) bn: Bûn.

**Bişûrekirin** (k.jn.l.mê) Tengavkirin. Hêriskirin. (K) bn: Kirin.

**Bitim** (n.x.mê) Corekê keskanane, ji kezwanan mezintirin.

**Bitir** (hk.hevber) 1.Pitir. 2. Tore. Tirbilind.

**Bitirpêr** (hk.dem.dar) Berîya sê rojan. Betirpêr.

**Bitirpêrar** (hk.dem.dar) Berîya sê salan. Betirpêrar.

**Bive** (hn.x.çewa) Tiştek bitirs nemaze bo zaroyan. Bela. : Agir biveye.



**Bive**

**Bivir** (n.x.nêr) Alavek hesinî nemazeye dev tîje destikek darî pêve,bo birîna daran mifa jê tê wergirtin. … ***Pend*** : Wek bivirê melaye.ang ; kesê çi kêmasî lê nebin. Jiber ko bivirê melay yê seqakirîye û kar pê nayê kirin.

**Bixêrig** (n.dar.mê) Amaneke ji cerik yan feyfûrîye di keve bin henefîya avê. Destşû. Cirne.

**Bixirîn** (k.jn.x.mê) Giyandar nirenirê ji xwe di hînin dema tore di bin. Gayê mezin yê bixirî. :Kitik a di bixirit. Xinzirîn.

**Bixûr** (n.x.mê) Madeyeke ji corên fêkî hatîye çêkirin li cejin û bîranînên pîroz di şewitînin bêhinek xweş ji dûkela wê der di keve.

**Bixûrdan** (k.jn.l.mê) Dûkela bixûrê li civatê belav di kin. (K) bn: Dan.

**Bixûrdank** (n.l.mê) Amaneke bixûrê tê dixin.

**Bixûşk** (n.x.mê) Xîz. Berexîz.

**Biyanetî** (hn.dar.çewa) Derdê biyanî û xerîbîyê.

**Biyanetîkirin** (k.jn.l.mê) Hestkirin bi biyanî yê. : Ev bizine ya biyanetî yê di ke;ang: hest di ke ko ya biyanî ye û bê arame.

**Biyanî** (hn.x.çewa) Kesê ne xelkê welatekî, deverekê gundekî û htd. Be. *Pend* :Goştê ranî, bi dî biyanî, herê pêşemanî. Br× Xuyanî.

**Bizanebûn** (k.jn.l.mê) Karê mirov bi pilan û ji qesta bi ke. : Ew karê wî kirî ne ji bêdestê, lê bi zanebûn kirî ye. Br× Bêdestî.

**Bizankî** (hn.l.çewa) Bizanebûn.

**Bizarkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirovek mîna yekî bi peyve. Bizarvekirin. (K) bn: Kirin.

**Bizarvekirin** (k.jn.l.mê) Bizarkirin.

**Bizav** (n.x.mê) Livîn. Xebat. Têkoşîn.

**Bizavkirin** (k.jn.l.mê) Livîn. Xebatkirin. Pelijîn. (K) bn: Kirin.

**Bizavtin** (k.jn.x.mê) Bizavkirin.

**Bizbizok** (hk.dar.çewa) Livlivok.

**Bizdandin** (k.jn.x.mê) 1. Piçandin. 2. Tirsandin.: Bendik bizdandin. (K) bdn: ez di bizdînim em di bizdînîn, tu di bizdînî hûn di bizdînin, ew di bizdîne[…it] ewan di bizdînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di bizdand, di bizdandin. Db,dûr : bizdandibû, …bûn. (F) : bi bizdîne, bi bizdînin.

**Bizdîn** (k.jn.l.mê) Bizdandin.


**Bizdok** (hn.dar.çewa) Tirsonek. Kulekfireh.

**Bizdonek** (hn.dar.çewa) Bizdok.

**Bizêv** (n.x.mê) Bizav.

**Bizin** (n.x.mê) *kewal* Giyandarek şîrdere, mêye, qonaxa dawî ya tuxmîye, (kar , gîsk, tişîr, ..).

**Bizinakoç** (n.l.mê) Bizin a bê qoç. Bizina bê şax.



**Bizinakoç**

**Bizinakovî** (n.l.mê) Bizina li çol û çiyan dijît , dûr ji merivan.

**Bizindoş** (karn.l.dz) Kesê şîrê bizinan di doşe. Bêrîvan.

**Bizink** (n.dar.mê) 1. Darikeke dixin paşîya devê karikan û li patika wan girê di din jibo nikare guhanê maka xwe bi mêje. Devbizink. 2. Bizinna biçûk.

**Bizinkoç** (n.l.mê) Bizin a bê şax.

**Bizinmêj** (n.l.dz) *giyandar* Candareke di kevin da wesa bawer di kirin ko şîrê bizinan ji guhanan dimêje û di xwe. Bizinmişk.

**Bizinmişk** (n.l.dz) *giyandar* Candarek xişok û kovîye.

**Bizir** (hn.x.çewa) Berze. Hinda.

**Bizirbûn** (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. (K) bn: Bûn.

**Bizirkirin** (k.jn.l.mê) Berzekirin. Hindakirin. (K) bn: Kirin.

**Bizivandin** (k.jn.dar.mê) Livlivandin. Livandin.

**Bizivîn** (k.jn.x.mê) Bizavkirin.(K) bdn: ez di bizivim em di bizivîn, tu di bizivî hûn di bizivin, ew di bizive[…it] ewan di bizivin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di bizivîm em di bizivîn, tu di bizivî hûn di bizivîn, ew di bizivî ewan di bizivîn. Db,dûr : ez bizivîbûm em bizivîbûyn, tu bizivîbûy, hûn bizivîbûn, ew bizivîbû ewan bizivîbûn. (F) : bi bizive, bi bizivin.

**Bizî** (hn.x.çewa) Bargiranî.

**Bizmar** (n.x.mê) 1. Asinek yan darek sertîje bo pêkvenûsan(girêdana) tiştan bikar tê. Mêx.2. Birîndar kirina mirovî ji alîyê derûnîve . axivtinên kirêt û nexweş.

**Bizmarkirin** (k.jjn.l.mê) Bizmarlêdan. Dergeh bizmarkir. Text bizmar kir. (K) bn: Kirin.

**Bizmarlêdan** (pnl.mê) 1. Bizmar kirina tiştî bo girêdanê. 2. Birîndarkirin. kirêtkirin. (K) bn : Lêdan.

**Bizot** (n.x.nêr) Darê serekê wî sotî(şewitî) û geş.

**Bizotlêkdan** (k.jn.l.mê) 1. Xweş, geş kirina agirî. 2. Lêk êxistina mirovan. Têkvedan. (K) bn :Lêkdan.

**Bizrik** (n.x.mê) Pirsik. Kulik.

**Bî** (n.x.mê) *fêqî* Bih.Bîh.

**Bî<u>ber</u>** (n.x.mê) *giya* Filfil. :Bîbera sor. Bîbera kesk. Bîbera tîj.



**Bîber**

**Bî<u>bîk</u>** (n.x.mê) 1.Reşika çavî. Nîva çavî.Zarokê zava. Pizok.

**Bî<u>bok</u>** (n.x.mê) Bîbîk.

**Bîh**(bih) (n.x.mê) *fêqî* 1. Darek fêqîye. 2. Fêqîyeke tam û bêhin xweşe. *Pend* :Ker tama bîhê nizanit. Ang; kesê bihayê tiştî nizane.

**Bîhn** (n.x.mê) Bêhin.

**Bîhn<u>dar</u>** (hn.dar.çewa) Tiştê bêhin jê dihêt. Bi bêhin. Bêhindar.

**Bîhn<u>fireh</u>** (hn.l.çewa) Bêhinfireh.

**Bîhn<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Bêhinvedan. Bêhin înan, birin.

**Bîhn<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Bêhinkirin.

**Bîh<u>nok</u>** (n.dar.mê) Bêhnok. (,).

**Bî<u>hok</u>** (n.x.mê) Darek bê bere, avîye, ciwan û xemildare, sîbera wê dil vekere.

**Bî<u>jin</u>** (n.l.mê) Jina mêrmirî.  Jina berdayî. Jina bê mêr.

**Bî<u>jî</u>** (hk.x.çewa) 1. Nivş yan tuxmê ne bi rêyên rewa peyda di bit.2. Kesê lêbûk û bingelte.

**Bî<u>jok</u>** (hk.dar.çewa) Dirinde. Hov.

**Bî<u>kar</u>** (n.dar.nêr) Renok.

**Bîk** {bûk} (n.x.mê) 1.Keç , jin li dema şahîya şwî(mêr) kirina wê. 2. Kabanîya kurê mirovî.

**Bîk<u>mar</u>** (n.l.nêr) Giyandarek xişûk û biçûke bi dest û pê ye.

**Bî<u>me</u>** (n.x.mê) Giroveya bîmekirinê.

**Bîme<u>xane</u>** (n.dar.mê) Cihê, avahîyê,berpisyar jibo bîmekirinê.

**Bime<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Heger mirov, xwe û navmalîyê, bîme bike, herdema mirov rastî çamek yan nexweşîkê hat, yan tiştê mirovî hat dizîn, şewitîn jinavçûn û htd, mirov di kare pere li cihê ziyana xwe werbigire. (K) bn: Kirin.

**Bîna<u>hî</u>** (n.dar.mê) Bînayî.

**Bînayî** (n.x.mê) 1.Dîtin sînayî.2. Xweşdivî, bînayîya çavan.

**Bîner** (n.dar.dz) Temaşevan. Yê di bîne. :Bînerên telefizyonê.

**Bînîn** (k.jn.x.mê) Dîtin. (K) : Bdn:ez di bînim em di bînîn tu di bînî hûn di bînin, ew di bîne[…it] ewan di bînin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : di dît, di dîtin. Db,dûr: Dîtibû, … bûn. (F) : bi bîne, bi bînin.

**Bîr** 1 (n.x.mê) Hizir. Boçûn.

**Bîr** 2 (n.x.mê) Cihê av lê kom di be. Çala avê.:Av ji bîrê hilkêşa.

**Bîra** (n.x.nêr) Birayê jina mirovî. Xizim.

**Bîranîn** (k.jn.l.mê) Saxkirina cejin û bûyerên neteweyî,dînî, şehîdan(nemiran) .Bîrewerî. Yadkirin. (K) bn:Anîn.

**Bîrbir** (hn.dar.çewa) Qonaxa jiyê mirovî piştî sinêleyîyê.Merivê gehiştî.

**Bîrbirin** (k.jn.l.mê) Li bîra xwe anîn.

**Bîrborî** (hn.dar.çewa) Mirovê bêhoş.

**Bîrborîn** (k.jn.l.mê) Dilgirtin. Bêhoşbûn.

**Bîrdar** (hn.dar.çewa) Hoşmend. Xwedî bîr. Xwedî hizir.

**Bîrdarî** (n.dar.mê) Zîrekî. Bîrtîjî.

**Bîrdoz**(n.l.mê) Dîtina bîr, hizran. Tîyûrî.

**Bîre** (n.x.mê) Vexwarineka kiholî ye.

**Bîrhatin** (k.jn.l.mê) Bîranîn. : Bîra min di hêt wekî ezê biçûk me li vêrê yarî di kirin.

**Bîrhatî** (n.l.mê) Zindîkirina tiştê li bîra meriv mayî. Bîrhatin.

**Bîrname** (n.l.mê) Nameya bîranînan.

**Bîrov** (n.x.mê) Nexweşîyeke ji egerê tewil , yan pinîyên dewkî, gewir yan sipî liser leşî, (rû, dest) çêdibin.

**Bîrovî** (hn.dar.çewa) 1.Kesê bîrov li leşî hebin. 2. Pinîya mîna bîrovê.

**Bîrtîj** (pn.l.çewa) Kesê tişta jibîr neket , her li bîrê bin. Hizirtîj.

**Bîrûbawer** (n.l.mê) Xebat û doza mirovî bawerî pê heye û qurbanîyê jêra di de.

**Bîrveçûn** (k.jn.l.mê) Ji egera pêkevtina gurzekî yan mizgînek dilşewat bêhina mirovî çik di be, hind caran bêhoş di be. (K) bn: Çûn.

**Bîrwera<u>nî</u>** (n.dar.mê) Binav salveçûn. Gehiştin.

**Bîrxis<u>tin</u>** (k.jn.l.mê) Li bîra xwe anîn. Zindîkirin. Saxkirin. Hizir. (K) bn: Xistin.

**Bîrxis<u>tok</u>** (n.l,dar.mê) Nameyeke jibo cihek yan alîyek pêdvî di nêrin, yan ra digehînin ji pêxemet xuyakirina helwîstekê hember bûyerekê.

**Bîsk** (hk.dem.mê) Demek kurt. Gavek. Bîstek. : Ezê bîskê herim mala cîranê xwe, kanê çi di ke.

**Bîst** (hij.n.) Hijmara 20. 10+10= 20.

**Bîs<u>tan</u>** (n.x.nêr) Erdê tere [aro, bacan, bacanreş, bamî, û htd] lê di hêt çandin û çinîn. Bax. Cinîk.

**Bîs<u>tek</u>** (hk.dem) Demek kurt. Gavek. Bêhnek. Bîsk.

**Bîs<u>temîn</u>** (hijn,rêzkirin) Ya/yê/yên bîstê.

**Bî<u>şeng</u>** (n.l.mê) Corekê bîhokane xemildar û ciwane, ta û belgên wê mîna porê di hêt xwar.

**Bî<u>şî</u>** (n.x.mê) Rîşîk.

**Bî<u>tik</u>** (n.x.mê) Corekê pirsikane nemaze li zîhên cavan di hên. Bûkik.

**Bîv** (n.x.mê) Delîve. Derfet. Dem.

**Bîz** (n.x.pirîn) Şîşikên ristina goran.

**Blêç** (n.x.mê) Birûsk. Birîsî.

**Blûr** (n.x.mê) Bilîl.

**Blûr<u>van</u>** (n.dar.dz) Bilîlvan.

**Bo** (pêrb. alv.pêvgir) ***rêzman*** 1. Alaveke jibo pirsînê bikar di hêt. Boçî. Çima. Te bo we kir. 2. alavê hebûnê Ji. Bo kê? Bo min . Bo te. Ang; ji kêra. 3.Alavê sent kirinê. Ber bi çi sentê ve. Bo kîrê, bo kûve?.

**Bo<u>çî</u>** (pêrb alv.pis) ***rêzman*** Alavê pirsînê Bo. Çima. : Boçî duh tu nehatî civînê ?.

**Bom<u>be</u>** (n.x.biyan.mê) Top.

**Bombe<u>baran</u>** (n.l.mê) Barîna gule û bomban mîna baranê. Topbaran.

**Bombebaran<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Top havêtin ser cihekî. Topbarankirin. (K) bn: Kirin.

**Bo<u>na</u>** (pêrb.alv.merc) *rêzman* Alaveke mîna merc û sedem bi kar di hêt. Ji bona jiber. : Ji bona te ez hatim vir.

**Bor** (pn.x.çewa) 1.Tiştek bi tov. Pir . tijî, genim, ceh birinc û htd, bor. Br× Şelal. 2. Rengek gewirê tarî ye. 3. Deravê çem(rîbarî) cihê tenk bo derbazbûnê. Pend : Da borî. ang:dema mirov gotineka ne di cih û demê xwe da bêje.4. Bekere (bûrê dezî = bekerê dezî).5. *kevin* Hesp(dastana borê reş, hespê reş ya folkilorî).

**Boran<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Derbazkirin. Dem borandin. : Ewî yê ji babê xwe borandî bi gotina stiranan. (K) bdn: ez di borînim em di borînîn, tu di borînî hûn di borînin, ew di borîne[…it] ewan di borînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di borand, di borandin. Db,dûr : borandibû, …bûn. (F) : bi borîne, bi borînin.

**Boran<u>geh</u>** (n.dar.mê) Hêlîn yan lîsê kotiran.

**Bo<u>re</u>** (n.x.mê) Dengê çêl û kewalan. Marîn. Barîn.

**Bore<u>bor</u>** (n.dar.mê) Bore.

**Borê<u>reş</u>** (n.l.nêr) Hespê reş di dastana sîsebanê da.

**Bo<u>rî</u>** (n.x.mê, k,derbaz) 1. Lûlekên dirêj û nîva wan vala jibo veguhaztina avê û şileyên din.2. Çû. Derbazbû.

**Bo<u>rîn</u>** (k.jn.x.mê) Derbazbûn. Biserdaçûn. Biserveçûn. (K) bdn: ez di borim em di borîn, tu di borî hûn di borin, ew di bore[…it] ewan di borin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di borîm , di borî, di borîn. Db,dûr : borîbûm, bû,..bûyn…bûn. (F) : bi bore. Bi borin.

**Bor<u>îzan</u>** (karn.dar.dz) Kesê şareza di warê jenîna amêrên mûzîkê yên pifkirinê da.

**Bor<u>se</u>** (n.biyan.x.mê) Cihê gihorîn (kirîn û firotin)a diravî.

**Bo<u>sî</u>** (hk.x.çewa) Xwarina sotî. Tam û bêhina zadê şewitî.

**Bosî<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Zêde kelîna zadî ta bosî bi be.Sotina xwarinê di amanan da.

**Bosî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Sotina zadî dema zêde di kelit.(K) bn :Kirin.

**Bost** (n.x.mê) Bihost.

**Boş** (pn.x.çewa) 1. Ava boş Pir. Tijî. Mişt. 2. Xilole. Vala.

**Boşa<u>hî</u>** (n.dar.mê) 1. Valayî. 2. Pirînî. Gelek. Dengûdor.

**Boşa<u>tî</u>** (n.dar.mê) Male, cihek pir ji mirovan.

**Boşbûn** (k.jn.l.mê) Pirbûn . Zêdebûn. : Li biharê avên co û robaran boş di bin.(K) bn : Bûn.

**Boşkirin** (k.jn.l.mê) Zêdekirin. Pirkirin. : Heger ava coyê boş nekî, nikarî avdanê liber bikî. (K) : Kirin.

**Bot** (n.x.mê) 1. Kun. 2. Pêlav. Pot.

**Botan** (cugraf,n.hkdev) Devereke. Hozeke li Kurdistana bakûr, devera Cizîrê. Mîrnişîna bi navê xwe navdare.warê Mem û Zînê.

**Botik** (n.x.mê) Cihê av jê di havêt . yan tête xwarê, nexasme di borîkan da. Borî. Şirik.

**Boz** (pn.x.çewa) Dewkî. Poş.

**Buha** (n.x.nêr) Biha.

**Buhar** (hk.dem.mê) Bihar.

**Buhartin** (k.jn.x.mê) Borandin.

**Buhêrk** (n.dar.mê) *rêzm*; Dema derbaz. Dema borî.

**Buhtan** (n.dar.mê) Bêbextî. Direw. Xapandin.

**Buhuşt** (n.x.mê) Beheşt.

**Buhtankirin** (k.jn.l.mê) Direw, bêbextî kirin. Xapandin.

**Bujîn** (k.jn.x.mê) Weke meriv pir ji tiştekî hez bi ke. Dilê mirov tiştekî bi xwaze. Di bujim , bi buje.

**Bulbul** (n.x.nêr) Bilbil.

**Bulgarî** (nejn.n.dar.dz) 1. Xelkê Bulgarya. 2. Kelûpelên ji Bulgarya.

**Bulgarya** (hk.cih. cugrn) Welatê Bulgaran.

**Bulgaristan** (cugrn. Hk.cih) Bulgarya.

**Bulq** (n.x.mê) Bilq.

**Bulqhavêtin** (k.jn.l.mê) Bilqhavêtin.

**Burno** (n.x.mê) Tivengek dirêje , peyvek bîyanîye , lê bûye çembera berxwedana gelê kurd, nîşana pêşmergatîyê ye, nemaze pêşmergeyên eylolê.

**Burxî** (n.x.nêr) Birxî. Birxû.

**Buxçik** (n.x.mê) Parçe perokek lakêşe yan çargoşeye, bo nixavtin û parazatina çilik, nan, xwarin û htd. Mêdek. Serhevîrk.

**Bûjen** (n.x.nêr) Madde.

**Bûk** (n.x.mê) Bîk. ***Pend*** :Bûkê di gel te me, xesoyê guh bidê!.***Pend*** :Bûk bi dilê zavaye.ang ; heger karek bi dilê êkî be, guh nade tu kesan. ***Pend*** : Bûkek hîna bi lez û bez,me lêdan rez û pez, sivik a malê bûme ez. ***Pend*** :Bûka salê berde nav malê.

**Bûkabaranê** (n.l.mê) Helameteke li gund û kolanan di gerînin xelik avê pêda di kin dako baran bi bare. Şemo.

**Bûkemar** (n.l.nêr) Bîkmar.

**Bûkînan** (n.dar.mê) Şeva êkê ko bûk bi zava reye.

**Bûm** (n.x.mê) ***balinde*** Kund.

**Bûn** (k.jn.x.mê) Kirin . Rûdan. :Biraye te dê bit çi? Dê bite endazyar. (K) bdn: ez di bim em di bîn, tu di bî hûn di bin, ew di be[..it] ewan di bin. Pr dê[bi] + bdn. Bdb ; bi bû, bi bûn. (F) : bi be, bi bin.

**Bûnebûn** (n.l.mê) Bûyer.

**Bûş** (hn.x.çewa) Rêl. Pir.

**Bûşelan** (n.dar.mê) Ava boş. Çem yan cokên avê dema boş di bin. Darûbarên pir. Rêl.

**Bûtik** (n.x.mê) Kepir.

**Bûyer** (n.dar.mê) Rûdan. Qewmîn. Evsane. Çîvanok.

**Bûyîn** (k.jn.x.mê) Ji daykbûn. Peydabûn. Zayîn.

# C

**C** pîta sîye ji abeya kurdî.

**Ca** 1 (n.x.nêr) 1. Cih.

**Ca** 2 (pêrb.av girêdan) Vêca . Evca.

**Cacik** (n.x.nêr) Xwarineka rêçalîye , xiyar û swîr an di kin nav mastî.

**Cade** (n.x.mê) Rêya tirombêl û makînan . şarê.rêyek pan , mezin.

**Cadibaz** (karn.dar.dz) Cadûger.

**Cadibazî** (n.dar.mê) Cadûgerî.

**Cadir** (n.x.nê) 1.*giya* Catir. Catirk. 2. Kevne navek mêran(peyayan ) zelamane.

**Cadû** (n.x.mê) Niviştî.yên ko mela, şêx û xêvzank, bi nexweşên giyanî yan derûnî ve di kin jibo nojdarî û paristin ji ecine,pîrhevî û giyanên xirab.

**Cadûger** (karndar.dz) Mirovê cadû, niviştîyan çê dike. Niviştvan.

**Cadûgerî** (kar.n.dar.dn) Karê cadû, niviştî kirinê.

**Caf** (malbn) Navê tîrek (hozek)a kurdane li başûrê Kurdistsn.

**Cahşik** (n.dar.nêr) Cehşik.

**Calcaloke** (n.dar.mê) Tevinpîrk. Dapîroşk.

**Cam** (n.x.mê) 1. Şûşeya penceran. Şûşeya di xin ser keval û wêneyan. 2. Tirarê avê.

**Cambaz** (n.l.dz) Kesê leşsivik û pehlewan.şareza di hunerê livînêda.

**Cambazî** (karn.dar.mê) Karê canbazan. Lîztina canbazan.

**Cambazîkirin** (k.jn.l.mê) Bi karê canbazîyê ra di bin. (K) bn : Kirin.

**Cambazxane** (n.l.mê) Cihê fêrbûna canbazî û yarîyên cambazîyê.

**Camêr** (hn.x.çewa) Pesindana mirovê baş, qenc, hêja, çavvekirî. : Te banê min digel yê xwe gêra, supasîya te dikim, tu camêrî. :Dê bi hêle bi bi peyvit camêr!.

**Camêrî** (n.dar.mê) Mirovê kiryara wî baş. Merdînî. Serferazî.

**Camker** (pîşn.dar.dz) Yê karê wî camkirina pencer, derî û htd.

**Camkirin** (k.jn.l.mê) Cam xistine pencer û degehan. (K) bn: Kirin.

**Camxane** (n.l.mê) 1. Dikana firotina caman. 2. Xanî, avayîyê ji caman diristkirî.

**Can** 1 (n.x.nêr) Giyan. Têhna saxîya leşî. : Keç û xort canê xwe di kin qurbanî doza gelê xwe.

**Can** 2 (pn.x.çewa) Xweşik. Xuşkok. Şirîn. Ciwan. : Cilikêd te pir di canin.

**Canan** (n.dar.mê) Xeşdivî.

**Canavêtin** (k.jn.l.mê) Bi dil û can xwe avêtin karekî, tiştekî. Pir hezkirin.

**Canbaz** (n.dar.dz) Cambaz.

**Canberî** (n.x.mê) Candarekê deryayîye, hûrike mîna kirim a ne, mirov jibo xwarinê nêçîr di kin.

**Canbêzar** (hn.l.çewa) Pir westiyan. Gelek mandîbûn. Kesîrebûn.

**Candan** (k.jn.l.mê) Canê xwe kirin qurban jibo dozeka hejî. : Jibo azadîya welat em amadene canê xwe bi din. (K) bn: Dan.

**Candar** (n.dar.nêr) Giyandar. Canewer. Mirov, hesp, pez, kotir û htd candarin.

**Canega** (n.l.nê) Gayê can. Xurt.ne pîr. Golikê xurt ê nêr.

**Canemerg** (hk.l.çewa) Mirina zû. Kesê hêj genc,xurt di mirit.

**Canewer** (n.dar.dz) Giyandar.Giyanewer. Ginawir.

**Canê** (n.dar.hd.mê)1. Navê jinane. Ji canîyê hatîye.2. Gazîkirin û naznavê keçka can.

**Canê̲ş̲** (hn.l.çewa) Hest û deronê birîndar. Bêzar. Kovandar.

**Can̲f̲e̲d̲a̲** (hn.l.çewa) Kesê canê xwe gorî dozekê bike . qehreman. Qurban.

**Canfeda̲k̲i̲r̲i̲n̲** (k.jn.gl.mê) Canê xwe kirin feda. (K) bn: Kirin.

**Canfeda̲y̲î̲** (n.l.mê) Xwe gorîkirin. Qurbanî.

**Cang**(n.x.mê) Core peroyekê sipîye wek cilkên xewê yan binda di ken ber xwe, yan jibo kifinê mirîyan bi kar di hînin. ***Pend*** :Cangê wî bû rîs.ang; şermizar bûn.

**Can̲g̲a̲** (n.l.nêr) Canega.

**Can̲g̲i̲r̲a̲n̲** (hn.l.çewa) Mirovê hertim mandî û leşêş. Zemro. Gemjo.

**Can̲g̲o̲r̲î̲** (hk.l.çewa) Kesê canê xwe jibo rêyeka pîroz dike gorî. Canfeda.

**Cangorî̲k̲i̲r̲i̲n̲** (k.jn.gl.mê) Canê xwe di ke qurban.: Şehîdan canê xwe kirin gorî welatî, jibona gel azad bi be. (K) bn: Kirin.

**Can̲i̲k̲** (n.dar.mê) Jin . Keç. Xatûn. Br× Camêr.

**Canî** (n.dar.mê) 1.Cehşê hesp, hêstir, yê can.

**Can̲k̲u̲j̲** (hn.l.çewa) Kujek.

**Can̲p̲o̲l̲a̲** (n.l.dz) Merivê canê wî mîna polayî qayîm. Mêrxas. Xweragir.

**Can̲t̲i̲k̲** (n.dar.nêr) Cihoreke ji bendikên hirî yan qayîşê hatîye diristkirin, jibo têkirina kelûpelan mifa jê di hêt wergirtin. Cewtik.:Cantikê xwarina xwe bi milê xwe ve kir û çû ser karî.

**Can̲x̲w̲e̲ş̲** (hn.l.çewa) Merivê leşsax û peyt. Saxlem. Gişt.

**Canxweş̲b̲û̲n̲** (k.jn.gl.mê) Peytbûn. Saxbûn. : Canê te xweş be ko te ji mere lawik gotin. (K) bn : Bûn.

**Can̲x̲w̲e̲ş̲î̲** (n.l.mê) Leşsaxî. Nojdarî. Peytî.

**Can̲z̲e̲r̲** (hn.l.çewa) Ji egera nexweşî, tirs yan lewazîyê, canê merivî zer xuya di ke. Pêt.

**Canzer̲b̲û̲n̲** (k.jn.gl.mê) Canê mirovî jiber tirs, nexweşî yan lewazî, zer di be. (K) bn : Bûn.

**Car** (n.x.mê) Ger. Hel. :Cara yekê min tu li mala Azadî dîtî. ***Pend*** :Car pîroz di bin car qiloz di bin(di kevin). ***Pend*** :Car bo di mirin, car pê di mirin.

**Caran** (hk.dem) 1.Hin caran. Di demekîda. 2. Ji mêje. Berê.

**Carcar** (hk,dem.rêzkirin.l) Demek nediyar, ne rêk. Hindek caran. Heyam heyam. Ne herdem.

**Carcaranjî** (alv pêvegir) Hinde caran jî.

**Carcûr** (n.x.nêr) Sacûrê tivengan yê ko guleyan di xin nav.

**Cardin** (hn.dem.jêgirtin) Careka dî. Carek din. Paş. Delîvek din.

**Carek** (hijn.l.mê) Demek vebrî.. Ek car. ***Pend*** :Carekê di bêjin befra sare.

**Carekê** (hk.dem) Demekê. Serdemekê. Rojekê. Carekê ji caran.

**Carina** (hk.dem) Caran.

**Caş** (hn.x.çewa) Ji navê kerî hatî wergirtin . ang ; Kesê çekê dujminî hildigirit dijî gelê xwe. Xwefiroş. Çete.Rêgir.Ker.

**Caşatî** (karn.dar.mê) Yê di be caş, caşatîyê di ke. : Kesê caşatîyê dijî gelê xwe bike, liber çavên xelkî hertim rûreşe.

**Caşik** (n.dar.nêr) Cehşik. Kerê biçûk.

**Catir** (n.x.mê) *giya* Giyayek tiraşoke belgên wî di hûrik û boz ve ne,bo nav xwarinan bi kar di hînin, tam tîje. :Catirk kir nav zadî. :Îpraxêd bi catirk.

**Caw** (n.x.mê) Perokên ji hirî, pembû û avirmîş.

**Cawbir** (n.l.mê) Amêreke jibo birîna hirî û mûyên kewalan û pora mirovan bi kar di hêt. Cew. :Pora xwe bi cawbirê kur kir.



**Cawbir**

**Cawbirkirin** (k.jn.gl.mê) Kurkirin û birîna pora seran yan hirî û mûyên kewan bi cawê.

**Cawîn** (n.dar.mê) Caw.

**Caz** (n.x.mê) ***mûzîk*** Awazek , selîqek mûzîkê taybete. ji alîyê reşên bakûrê Emrîka ve hatîye pêşxistin û mûzîka afrîkî û rojavayî kartê kirina lêkirî.

**Ce** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo xweşkirin û bihêzkirina axivtinê tê(di hêt) bikar anîn. Ce bixudê. Ce bira.

**Cebar** (pîşn.x.dz) Kese dest û pêyên şikestî yên mirov û giyandaran ve di girit.

**Cebilxane** (n.dar.mê) Cihê danana çekan.

**Cebirandin**(k.jmê) Cebirîn.

**Cebirîn** (k.jmê) 1.Dest, pê, (cihê), piştî şikestinê xwe lêkdayî. 2. Bergirtina fêqî. :Bahîvî kulîlkêd xwe hemî cebirandin.

**Cedew** (n.dar.mê) Nexweşîyeke, kewalan di girit, ko dev û lêvên wan kul di bin.

**Cedewgirtin** (k.jn.l.mê) Candar rastî cedewê di bin. Girtina nexweşîya cedewê. (K) bn: Girtin.

**Cefa** (n.x.mê) Derd. Westan. Zehmetî. Renc.

**Cefakar** (hn.dar.çewa) Kesê pir zehmetê di bîne. Yan zehmet dîtî.

**Cefakêş** (hn.dar.çewa) Yê gelek derd û nexweşî kişandine.

**Cefakêşan** (k.jn.gl.mê) Dema mirov pir derd û zehmetan di bîne. Cefakişandin. (K) bn: Kêşan.

**Ceg** (n.x.nêr) Amêreke bo bilindkirina makînan ji alîyê fîteran ve kar pê tê kirin, bo çêkirina tiromêbêlan, terekiran htd.

**Ceger** (n.x.mê) 1.***candarî*** Mêlak. Kezeb. Cerg.2. Nivş. : Kurê/ keça wî/wê; cegera wî /wê ye.

**Cegerhez** (hn.l.çewa) Dayk yan bavê pir ji zaroyên xwe hez di ke.

**Cegersotî** (hn.l.çewa) Mirovê xweşdivîyekê wî wexera dawîyê kirîye. Dilsotî. Kovandar. Tanotî.

**Ceh** (n.x.mê) ***giya*** (*dan)* Mitayek çandinîye. Daneke jibo xwarinê nemaze, alîka giyandaran , gelek corên xoşav û xwarinan jê çêdikin.

**Cehcîr** (n.l.nêr) Cercîr. Xîzê gir yê ber avan di ken nav çîmentoyê bo karê avayîyan.

**Cehd** (n.x.mê) Cade. Şarê.

**Cehik** (n.x.nêr) Aro. Xiyar.

**Cehiş** (n.x.dz) 1. Têjikê keran. Ker. 2. Kesê xwe firotî û çekê dujmin dijî gel hidigirt. Caş. Cahiş.

**Cehzeran** (hk.dem.l.mê) 1.Meha despêka havînê. Meha şeşê. Xizîran.2. burc; Cêmik.

**Cejn** (n.x.mê) Bîranînên dînî neteweyî :Cejna Newerozê, qurbanê,Remezanê, cemayê.

**Cejnane** (n.dar.mê) Diyarî û xelatên bi helkevtina cejnan.

**Cejnname** (n.l.mê) Kartên bi reng û nivîs xemlandî, li cejnan di kin diyarî bo kes û nasan.

**Cejnpîrozî** (n.l.mê) Silaveka taybete pê cejna hevdu pîroz di kin.

**Cejnpîrozkirin** (k.jn.gl.mê) Cejna hevdu pîrozkirin. : Em jibo cejnpîrozkirinê çûn mala hevlê xwe. (K) bn: Kirin.

**Celadet** (hn.x.çewa) Mêxasî. Mêranî.

**Celal** (n.x.nêr) Çok. Rîbar. Çem.

**Celalî** (malb,n) Hozeka kurdane li Kurdistanê.

**Celeb** (n.x.nêr) 1. Birek, kerek pezî. Komek kewalan.2. Hevsarê dewaran.3. Cor. Rêbaz.

**Celebnav** (n.l.nêr) *rêzman* Navê lêkdayî; wek keyfxweş. Dilveker. Sersipî.

**Cem** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo cihê nêz bi kar di hêt. Li cem . Li nik. Li def . al. :Ew li cem te ye? : Were cem min rûne.

**Cema** (n.x.mê) Cejneka dînî ya êziyîyane.

**Cembelî** (n.x.nê) 1. Mîrê hekarî di gelek serhatîyan da basê navdengê wî hatîye kirin.2. Navê peyayan(zelam)e.

**Cembaz** (karn.l.dz) Canbaz.

**Cemciqandin** (k.jn.dar.mê) Pirtikanin. Hincinandin.

**Cemedanî** (n.x.mê) Dersok. Kivink. Şaşik. : Bapîrî cemedanî li serê xwe kir û çû nêçîrê.Cemedanî gelek liser şelûşepikan di hêt. :Cemadanîya sor. Cemedanîya reş. Cemedanî girêda.

**Cemik** (n.dar.mê) Milhêb. Duguh. Çarguh. :Bi cemikê danebayê di ken.

**Cemser** (n.l.nêr) Gopika serî. Kulovank. Pol. :Cemserê bakûr û başûr ê goka erdî.

**Cenabet** (n.x.mê) bi cenabet;Mirovê karê guhnelî kirî hêşta canê xwe jarav nekirîye.

**Cenabet<u>kevtin</u>** (k.jn.l.mê) Mirovê cenabet liser. (K) bn: Kevtin.

**Cen<u>cer</u>** (n.x.mê) Amêrekê mezine li şêweyê tirobêlê, bi dwîv dewaran ve di kin bi zivrîna balteyên ji devên bivrên tîj pêkhatî qeselê hûr di ke û di ke ka, dako dan û kayê ji hev cuda bi kin.

**Cencer<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Qutan û hûrkirina qesela genim,ceh, nîsk û htd bi amêrê cencerê. : Cuxîn hêjta ji cencerkirinê bi dawî ne hatîye. (K) bn :Kirin.

**Cencu<u>lok</u>** (n.dar.mê) Candareke(jiyê wî ji du sal û pêhel) rengê xwe mîna cihê lê, di guhêre.

**Cen<u>dek</u>** (n.dar.nêr) Canê candarên mirî. Terim. Kelex. Keleş. : Nêçîvanî gurg kire cendek.

**Cendir<u>me</u>** (n.biyan.dz) Polîsê leşkerî.

**Ceng** (n.x.mê) Pevçûn . Şer. Şoreş. : Cenga cîhanî a yek û duwem.

**Ceng<u>awer</u>** (karn.dar.dz) Şervan . Şoreşvan. Yê pişkdar di cengê da.

**Ceng<u>baz</u>** (karn.dar.dz) Cengawer.

**Ceng<u>în</u>** (k.jn.x.mê) Pevçûn. Pevdaçûn. Cengkirin. (K) bdn :Ez di cengim em di cengîn, tu di cengî hûn di cengin, ew di cenge[...it] ewan di cengin. Pr dê bi + bdn. bdb : ez di cengîm em di cengîn, tu di cengî hûn di cengîn, ew di cengî ewan di cengîn. Db,dûr : ez cengîbûm, em cengîbûyn(bûn), tu cengîbûy, hûn cengîbûn, ew cengîbû, ewan cengûbûn. (F) : bi cenge, bi cengin, bi cenge.

**Ceng<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Pevçûn. Şerkirin.: Emê dijî dagîkeran cengê bi kin. (K) bn : Kirin.

**Ceng<u>name</u>** (n.l.mê) Name yan giroveyên kirin û dawî anîna cengê. Giroveyên liberyî cengan. Çîrokên liser cengê.

**Cer** (n.x.nêr) Amaneke ji axek nemaze çê di ken bo av têda bêt higirtin û tezî bi be. Kedîn. :Xatûnê cerê avê danî ser milê xwe. ***Pend*** :Cer bi rêya avê ve di şikêt. ang ; mirov çi û li kîrê kar di ke,dê mîna wê û li wêrê rastî bûyeran bi bit.

**Cer<u>bader</u>** (n.l.nêr) Amêreke serê wî tîj û pane yan xaçî ye, jibo peytkirin û vekirina birxûyan bi kar di hêt. Dernefîs.

**cer<u>cer</u>** (n.dar.mê) Corekê ristikane, ji zêr yan zîvîye.

**Cer<u>çîr</u>** (n.x.mê) Cehcîr.

**Cer<u>de</u>** (n.x.nêr) Birek mirovane rê li xelkî digirin di şelînin. Çete.

**Cerdel** (n.dar.mê) Setila şîrî, avê. Setil.

**Cerdevan** (n.dar.dz) Mirovên diz û rêgir. Çete. Qaçaxçî. :Cerdevanan bi ser gundî da girtin û terş kewalên wan talankirin.

**Cerg** (n.x.nêr) Mêlaka giyandaran. Ciger. 2. Nîşana kesên xweştivî. :Daykê gazî kurê xwe kir û gotê cergê min ka tu ?.

**Cergdar** (hn.dar.çewa) Çavnetirs. Mêrçak. Bi cerg. :Pêşmergeyên cergdar.ang ;pêşmergeyên qehreman.

**Cest** (hn.x.çewa) Mirovê peyt. Mirovê zîx. Çixt. Çîst.

**Cext** (n.x.nêr) Misoger kirina tiştî. Destnîşankirina tiştî.

**Cew** (n.x.mê) Amêreke jibo tiraşîna[birîna] mûyên kewalan yan pora serê mirovan bi kar di hêt. Cawbir. Hevring.

**Cewdik** (n.x.mê) Amanekê av tê kirinêye, ji peroyek qayîm hatîye çêkirin, bo vexwarina avê li kar û aqaran.

**Cewî** (n.x.mê) Madeyeke nîseke ji qurm û tayên daran derdikeve. Strk.

**Cewkirin** (k.jn.l.mê) Tiraşîn.(K) bn : Kirin.

**Cewr** (hn.x.çewa) Bikar anînîna hêzê. Xurtî. Kotekî. Zorî.

**Cewrik** (n.dar.pir) Têjik, kûçikên segan. Seyê biçûk.

**Cewtik** (n.dar.nêr) Cantik.

**Cezme** (n.x.mê) Pêlava basik dirêj.bo parastina pêyan ji serma, teqin ,stirî.û htd.

**Cezû** (n.x.nêr) Cezwe.

**Cezwe** (n.x.nêr). Amanek taybete yê têda kelandin û daxkirina qehwê. Qehwedan.

**Cê** (n.x.mê) Cih . Şûn . War .

**Cêbûn** (k.jn.l.mê) Cihêbûn. Cudabûn. Ji hev dakevtin. Jêkvebûn. (K) bn: Bûn.

**Cêga** = Cê. Cih.

**Cêkerî** (n.dar.mê) Navçegerî. Derverperistin.

**Cêkirin** (k.jn.l.mê) Cudakirin. Cihêkirin. Ji hev qutkirin. Jêkcudakirin. (K) bn: Kirin.

**Cêmik** (n.x.mê) Du zaro kar ,berx yan pitir. htd bi hevre.li dema zanê.

**Cênig** (n.x.mê) Cênîk.

**Cênîk** (n.x.mê) Rêze mûyên pirça serî û rîh(rihdîn) êd mirovî, liser herdu sîretan di gehînit hev.

**Cifre** ( n.cîha.mê) Nivîs, axivtin yên nexasime di hên bi kar anîn dako alîyên dij nepenîyên wan tê negehin.

**Cifte** (n.x.mê) Core tivengeke bo nêçîra giyandar û tewalan bi kar di hînin.Qurpe. Cifteya xwe bi milê xwe ve kir. Cifteya du lûlî.

**Cigare** (n.x.mê) Tûtin di nav kaxezeka pêçayî bi forma(şêwe) lûleyî, agirî di berdinê dûkêla wê di kêşin.

**Cigarekêş** (pn.l.çewa) Kesê cigaran di kişîne. Kesê cigareyan ve di xwe. :Mirovê cigarekêş yê kêmxwereye.

**Cigarekêşan** (k.jn.l.mê) Weke mirov cigareyan bi kêşit. :Ez cigaran nakêşim. Cigarekêşan qedexeye. (K) bn : Kêşan,

**Ciger** (n.x.mê) Cerg. Mêlak.

**Cih** (n.x.nê) Şûn. War. ***Pend*** :Ber li cihê xwe bi qedre.***Pend*** :Neçe cihê tu kesê te lê nebe.: Kurdistan cihê jiyana meye. : Here ser cihê xwe bi nive. :Cihê wî li def me nemaye.

**Cihal** (n.x.nêr) Tûrkek(twîrik) ji bendikan, dezî, yan şelte hatîye çêkirin , dan û pêdvîyên jiyanê di kine têda. :Cihalê kalê. Gonî. Telîs. Cewal.

**Cihanîn** (k.jn.x.mê) Bi serûberkirin. Bi cî anîn. Berhevkirin. : Kar û erkê seyda gotî min, hemû bi cih anî. (K) bn : Anîn.

**Cihbûn** (k.jn.l.mê) Bi mal û hal kevtin. Akincîbûn. Xwecihbûn. (K) bn: Bûn.

**Cihdan** (k.jn.l.mê) Dema dezgehek yan welatek cihî bi de mirovekî jibo jiyanê.

**Cihê** (hn.x.çewa) Cuda.

**Cihêbûn** (k.jn.l.mê) Cudabûn.(K) bn: Bûn.

**Cihêkerî** (n.dar.mê) Cêkerî. Navçegerî.

**Cihêkirin** (k.jn.l.mê) Cudakirin. (K) bn: Kirin.

**Cihêl** (hn.x.çewa) Law. Xort. Genc. Tolaz. ***Pend*** :Cihêlî stirîyek bi dîve nûsya hay jê nebû.ang; cihêl di xwîn germin û hay ji xwe nînin.

**Cihêz** (n.x.mê) Karûbarê bûkê. Pêdivîyêd bûkê.

**Cihgir** (pîşn.l.dz) Cîgir.

**Cihgirî** (karn.l.mê) Karê cêgirîye. :Ew dê bi karê cihgirî ra bi be tanî hevalê wî di vegere.

**Cihî** (netew, x) 1. Dîneke( yehodî) 2. Neteyeke li axa Israyîl, ko welat, zimanê xwe heye. (Israyîl).***Pned*** :Cihîyê(cîyê) pîr nabit busilman.ang; mirov di jiyê mezin da zû hînî tiştî na be.

**Cihînan** (k.jn.l.mê) Cihanîn. (K) bn: înan.

**Cihkirin** (k.jn.l.mê) Bi cih kirin. Cih jibo peydakirin. Bi mal kevtin. (K) bn : Kirin.

**Cihkî** (hn.dar.çewa) Di cih de. Di ciyê xweda. Xwecihî.

**Cihnav** (n.l.nêr) ***rêzman***. Peyveke cihê navî di gire û li şûna navî bi kar di hêt., ez, em, tu, hûn, ew, ewan. Me, min, te, hewe, we, wan.

**Cihnişan** (karn.l.mê) Birîkar.

**Cihû** (netw.n.) Cihî. Cî.

**Cihûwar** (n.l.nêr) Cîwar. Şûnwar.

**Cihwar** (n.l.mê) Cihûwar.

**Cihwarbûn** (k.jn.gl.mê) Weke mirov li cihekî binîne jibo jiyanê. Akincîbûn. Rûniştin. (K) bn: Bûn.

**Cihwarkirin** (k.jn.gl.mê) Dema yekî li cihekî akincî bi ken. :Rijêma jinavçûyî, kurd bi xurtî li jêrîya îraqê cihwar di kirin.(K) bn: Kirin.

**Cil** (n.x.mê) 1. Parçe peroke sitûr ji hirî û patan dirist kirîye, liser pişta dewaran da dinin li bin yan ser kurtanî ji ber barkirinê dako ji pişta wan ne girint. 2. Cilikên mirov liber xwe di kin. Kinc.

**Cildanîn** (k.jn.l.mê) Cil jiber xwe kirin. Xwe şelandin. Xwe rwîskirin. (K) bn: Danîn.

**Cildank** (n.dar.mê) Dar yan singê cil hilawîstinê. Hilço.

**Cildirû** (n.dar.mê) Mekîna dirûna cilikan.

**Cildirûvan** (pîşn.l.dz) Kesê cilikan bi dest yan mekînê di dirût.

**Cildirûvanî** (karn.gl.mê) Karê dirûna cilikan.

**Cilew** (n.x.mê) Alaveke ji qayîşê dirist kirîye wek toreka şelal bi ser serê dewaran da di girin  werîs yan kinifek pêveye bo girêdana wan yan zep kirin li dema siwarbûnê.

**Cilik**.(n.x.pir) Perokên mirov li ber xwe di kin. Cilkên neteweyî. Cilikên olî. Cilikên xewê.Cilikên fermî. Cilikên leşkerî. :Cilikêd havînê, zivistanê neke berxwe.

**Cilîkan** (nbiyan.x.mê) Dewlik yan amanê av têkirinê ji naylonî dirist kirîye.

**Cilşo** (n.dar.mê) Mekîna şûştina cilikan. Amêrê şûştina cilan.



**Cilşo**

**Cinabet** (n.x.mê) Cenabet.

**Cinawir** (n.dar.nêr) Ginawir. Dirinde.

**Cincil** (hn.dar.çewa) Mirîşkên per pinîpinî (gewir, boz , qehwayî). :Mirîşka me ya cincile.

**Cincilandin** (k.jn.dar.mê) 1.Nazkirin. Dindilandin. Nazandin. : Te ev zaroke gelek yê cincilandî.2. Zelalkirin. Jaravkirin. Parzinîn.

**Cincilî** (hn.dar.çewa) Zelal. : Ava cincilî ;ang ava zelal.

**Cincilîn** (k.jn.x.mê) Parzinîn. Vavartin.

**Cinciqî** (hn.dar.çewa) Cincil. Hemereng. Pirreng.

**Cinciqîkirin** (k.jn.x.mê) Parzinîn. Zelalkirin.

**Cindar** (n.dar.dz) evsane; Kesê destê ecinan digel da heye. Yê ku cinê wî hene.

**Cindî** (hn.x.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan. : Kurê apê min xortek cindî ye.

**Cinên** (n.x.mê) Bexçe. Rez. Cinîk.

**Cingane** (malbn.x.dz) Qereç.

**Cingir** (n.dar.dz) evsane;Kesê ku bi ecinan re danûsitandinan di ke, û di gire. Xêvzank.

**Ciniqandin** (k.jn.dar.mê) Tirsandin. Hesp cininqand. (K) bdn: ez di ciniqînim em di ciniqînîn, tu di ciniqînî hûn di ciniqînin, ew di ciniqîne[…it] ewan di ciniqînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di ciniqand, di ciniqandin. Db,dûr : ciniqandibû, ….bûn. (F) : bi ciniqîne, bi ciniqînin.

**Ciniqîn** (k.jn.x.mê) Rawestaneka bi tirs. Di cihda rwesta ji tirsan. (K) Bdn. Ez di ciniqim em di ciniqîn , tu di ciniqî hûn di ciniqin, ew di ciniqe[…it] ewan di ciniqin. PR : dê [bi] + bdn. Bdb : di ciniqîm, di ciniqîn, di ciniqî,. db,dûr :Ciniqîbûm,…bûyn...bû.. bûn. (F) : bi ciniqe, bi ciniqin.

**Cinîk** (n.x.mê) Baxê fêqî. Çem. Rez. Bax. Bîstan. :Cinîka pir hinar û zerdil.

**Cinûs** (hn.x.çewa) Pîs. Gemar. Qirêjî.

**Cire** (n.x .mê) Hevpeyvînên danûstandina bi toreyîve, dijwar, gerim. Gengeşa gerim. Şeredev. : Eve çi cireye hû di ken gelo?.

**Cirebir** (n.dar.mê) Dijwarbûna cireyî. Şeredev.

**Cirecir** (hn.dar.çewa) Dengûdor. Cirebir.

**Cireçûn** [bi] cireçûn(k.jn.l.mê) Mirov dev di girin hev. Şeredev. : Hevsîyêd me yêd bi cire çûyn. (K) bn: Çûn.

**Cirekirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov cireyî di kin. :Babê cire di gel kurê di kir. (K) bn: Kirin.

**Cirik** (n.x.nêr) Kirmê armoşî. Qeska avirmîşî.

**Cirk** (n.x.nêr) Dermanekê nîvrone, civre, jibo çavêd kul û birînan bi kar di hêt. Milhem.

**Civak** (n.x.mê) Bireka mirovan di çand, ziman, tîtal û htd hevpişkin, bi hevre li cihekî kar û jiyana xwe di borînin û civakê pêk di hînin. Komelgeh.: Civaka Kurdistanê.

**Civakî** (hn.dar.çewa) Kiryar û jiyana bi hevre. Tebayî.: Rewşa civakî. Çelengîyên civakî. Arêşeyên civakî.

**Civaknas** (pîşn.dar.dz) Merivê pispor û şareza di warê zanîna civakî da. Zanayê karûbarên civakî.

**Civakzan** (pîşn.dar.dz) Civaknas.

**Civakvan** (pîşn.dar.dn) Civaknas.

**Civandin** (k.jn.x.mê) Komkirin. Xirvekirin. :Xelik ê gundî bi civînin, dê seyda jibo wan bi axivit. (K) bdn: ez di civînim em di civînîn, tu di civînî hûn di civînin, ew di civîne [...it] ewan di civînin. Pr:dê+bdn. bdb : di civand, di civandin.db,dûr :civandibû, civandibûn. (F): bi civîne, bi civînin.

**Civat** (n.x.mê) Komeka merivan. Bireka mirovan. Dîwan. Civa nûneran, civata bajêrvanîyê, civata pîran.

**Civatgeh** (n.dar.mê) Cihê civat lê di rûnit. Jora kombûnan.

**Civatname** (n.l.mê) Name yan berhevî ya civîna civatê ko têda şîret û boçûnên cihvatê hatîne nivîsîn û berhevkirin.

**Civatnişîn** (k.jn.l.mê) Civîn.

**Civatok** (n.dar.mê) Civateke biçûke ji çend kesan pêk di hêt, bi hevre danûstandinan di kin berî civata mezin bi cive.

**Civîn** 1 (n.x.mê) Kombûna mirovan liser mijarekê danûsitandin di hêt kirin. Gengeşe, miştûmir bêt kirin.kombûn.

**Civîn** 2 (n.x.mê) Axiftinên pûç. Birîdarkirin. Sixêf. Djûn.

**Civîndan** (k.jn.l.mê) Xebergotin. Dijûndan. Sixêfîdan.

**Civînvan** (n.dar.dz) Kesê ku li civînê amade dibit. Berhevbûyêd civînê.

**Ciwan** (hn.x.çewa) 1. Xuşkok. Can. ***Pend*** :Ciwanîya liser ciwanîyê, ya bextreşe. ***Pend*** :Ciwanîya jinê nan nîne dê bixweyn .2. Xort. Law. Genc.3.Navekê du nivşe.

**Ciwanga** (n.l.nêr) Canega.

**Ciwanî** (n.dar.mê) 1.Xweşikî. Rindî. 2. Xortînî.

**Ciwankarî** (n.l.mê) Kar têda kirîye tanî ciwan bûy.Karê ciwanîyê.

**Ciwankarîkirin** (k.jn.l.mê) Karek ciwan têda hatîye kirin. Ciwankirin.

**Ciwankirin** (k.jn.l.mê) Xweşikkirin. Peytkirin. Tazekirin. (K) bn: Kirin.

**Ciwanmêr** (hn.l.çewa) Merivê hêja, mêrxaz. Zîrek. Peyt. Camêr.

**Cixare** (n.x.mê) Cigare.

**Cixarekêş** (n.l.dz) Cigarekêş.

**Cixarekişandin** (k.jn.l.mê) Cigarekêşan. (K) bn: Kişandin.

**Ciyawaz** (hn.dar.çewa) Cuda. Cihê.

**Ciyawazî** (n.dar.mê) Cudayî.

**Cizdank** (n.dar.mê) Tûrikeke ji çerim , naylonî , yan pateyî hatîye çêkirin, parey têda di parêzin. Peldank. Perdank.

**Cizme** (n.x.mê) Cezme.

**Cî** (netewen)1. Cihî(cihû). *Pend* :Cî kurê xwe quta hêşta cang bi avêda neçûy. Pend :Gotin cî da bi bim beheştê, got ; evro şembî ye. 2. (n.x.nêr) Cih.3. Nivîn.: Cîyê min liser banî dane.

**Cîgir** (n.l.dz) Kesê li ciyê berpirsekî kar di ke dema ew ne amade be. Cihgir. Cêgir.

**Cîhan** (n.x.mê) Cihê jiyana mirovan. Erdê ko em liser dijîn. Dunya. :Ev cîhane gelek a mezine.

**Cîhanger** (pîşn.dar.dz) Kesê li cîhanê di gerit bo karên zanîn û aşkera kinina nepenîyan. , gerok.

**Cîhangîr** {cangîr} (karn.dar.çewa) 1. Serwer. Serdar. Semyan . Deshelatdar.2 Navekê kudî yê zelamane.

**Cîhangîrî** (n.l.mê) Serdarî. Serwerî. Semyanî. Globalizasyon.

**Cîl** (n.x.nêr) Benîşt.

**Cîla** (n.x.mê) Stirkeka nîseke jibo pêkvekirina darû kaxezan bi kar dihêt.

**Cîlakirin** (k.jn.l.mê) Depekî, kaxezekê bi cîla, bi hêt Pêkvenûsan. (K) bn: Kirin.

**Cîn** (nax.mê) Ref. bir . kûm. Gurop. Me xwe kir du cîn .

**Cînar** (nl.dz) Kesên mal, kar, cihkarên wan bi rex êkve yan nêzîkî hev. Hevsî.

**Cînav** (n.l.nêr) *rêzman*. Cihnav.

**Cînoşayd** (nbiyan.x.mê) Qirkirin,a bi komel. Ferman. Pakkirna nejadî.

**Cîran** (n.x.dz) Cînar.

**Cîwar** (n.l.mê) Cihwar.

**Cîwarbûn** (k.jn.l.mê) Cihwarbûn.

**Cîwarkirin** (k.jn..lmê) Cihwarkirin.: Em bi xurtî li vir cîwar kirin!.

**Cîwe** (n.x.nêr) Keresteyekê nîvrone, di nav gerimpîv î da heye. Zîbeq.

**CNK** (kurt) Civata Nîştimanî a Kurdistanê(Perleman) li 1992 hat danî paş hilbijartinan, baregayê wê li Hewlêr e.

**Co** (n.x.mê) Cihê av têra diçit. Şîvik. :Coya avê. :Coya xwînê. *Pend* :Coya av lê neçûy, lê naçit. ang; kesê merdînî û mêranî ne kirî êdî nikare bike.

**Cobar** (n.l.mê) Coya mezin. Rwîbarê biçûk . Coya rabûyî.

**Cobir** (n.l.nêr) *adî* Candareke li bin erdî di nav bax û bîstanan dijît, co û malikên mitayî di bire.

**Codelîk** (n.l.mê) Merş a li ser di rûnin. Gildik. Tatî. Merş. Doşeka tenik.

**Codî** (cugin.x) Çîyayeke li Kurdistana Iraqê , devera Zaxo.

**Coga** = Co.

**Col** (n.x.mê) 1. Bizav. 2. Zincîr.

**Colandik** (n.dar.mê) Ciheke , werîsekî ducar dixin du tayên daran li hember hev, ko herdu tayên werîsî li rasta yek bin, perçeka tatî yan peroyen hindî cihî razana zaroyekî bi herdu alîyên tayên werîsî ve girê di din, mirov, nemaze zarok têda di razin û di hejînin. Dolîdank.

**Colandin** (k.jn.dar.mê) Livandin. Hejandin.

**Colane** (n.dar.mê) Colandik.

**Cole** (n.x.mê) Livîn. Bizav.

**Colek** (n.dar.mê) Bir. Celeb. Ker. Revde.

**Conî** (n.x.nêr)1. Çalek di berî kolayî bi şêweyê lûleyî, danî tê di ken û bi berek lûleyî(desteconî) lê di din (di qutin) jibo cuda kirina dan û siviyê. 2. Navek kurane.

**Coqcoq** (n.dar.dz) Elok. Elîşîş.

**Coqe** (n.x.nêr) Birek mivên yek ast. Wek hev.

**Cor** (n.x.nê) Reng. Teba. Awa. :Çi core cilikan tu hez jê di kî?

**Corbicor** (n.dar.l.çewa) Gelek cor.

**Coş** (hn.x.çewa) Gerim.

**Coşandin** (k.jn.x.mê) Kelandin. Lênan. Gerimkirin. : Ezê xwarinê bi coşînim.

**Coşîn** (k.jn.x.mê) Kelîn. Gerimbûn.

**Cot** (hn.x.çewa) 1. Dû . Dudû.2. Hijmara cot(ne kit) dû çar, şeş,..htd.3. Kêlana zevî û erdan bi dewaran.

**Cotbûn** (k.jn.l.mê) Giyandar di bin cot. Jinanîn. Kew bûne cot. (K) bn: Bûn.

**Cotik** (n.dar.nêr) 1.Du tişt bi hevra.2. Pênlêdana dewran. :Cotikek lêda.ang ; pêhinek lê da.

**Cotkar** (karn.l.dz) bn;Cotyar.

**Cotkarî** (n.l.mê) Karê cotkaran.

**Cotkirin** (k.jn.l.mê) 1.Kêlana zevîyan bi dewaran. : Cotyar ê cotî di ke2. Bûne cot. . Tilîyê xwe kirin cot. (K) bn: Kirin.

**Cotmeh** (demn.l.mê) Meha dehê.

**Cotyar** (n.dar.dz)1. Kesê karê cot û kêlan di ke. Kesê zevî, çem û rezan di kêle.2. kesê pîşeya wî çandin bit. 3. Navê mêrane.

**Cotyarî** (karn.l.mê) Cotkarî.

**Coxîn** (n.dar.mê) Bênder. Bêder.

**Coxînan** (hk.dem,n.dar.) Meha heftê. Meha duwê ji havînê. Tîrmeh.

**Cozerdan** (nl.mê) Cehzeran. Xizîran.

**CTN** (kurt) Kurtkirîya ; Civata Tenayîya Navneteweyî, rêkxistîyeka navneteweyîye erkê bi hev ra jiyan û parastina tenayîya welatên endam û cîhanê bi stoyê xwe ve di girît.

**Cuda** (hk.x.çewa) Tiştê ne bi hevra. :Em û ew ji hev cudane.

**Cudabûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov ji hev dûr di kevin. :Bira ji hev cudabûn ; ang : bûn du mal. (K) bn : Bûn.

**Cudakirin** (k.jn.l.mê) Ji hev vekirin. Ji hev dûrxistin. :Hindî ez di hêm nikarim wan du cêmikan ji hev cuda bi kim. :Cotyarî genim û ka jêk cuda kirin. :Pareyên hûr gir ji hev cuda ke. (K) bn : Kirin.

**Cudayî** (hn.dar. çewa) Ne wek hevî. Ne wek yek. :Ez bê cudayî li wan di nêrim.

**Cudayîkirin** (k.jn.l.mê) Mirovkanêkirin. Tagirîkirin. :Nabit cudayî di navbera zarokan da bi hêt kirin. (K) bn: Kirin.

**Cuhî** (nej.n) Cihû.

**Curd** (n.x.nê) *candar* Core mişkekê mezine. Geklek reng û cor hene.

**Curf** (n.x.mê) Tirsek ji nişkav. Lût.

**Curfvêkevtin** (k.jn.gl.mê) Dema ji xafilkî ve dengek têt mirovî û lûtek bi mirovî di kevit. : Kewek ji nişkê ve firî, curfek bi gavanî kevt(keft). (K) bn:Kevtin.

**Curne** (n.x.mê) Birkeka biçûke ya vegirtina avê. Destşû.

**Cuwan** (hn.x.çewa) Ciwan.

**Cûbirk** (n.l.nêr) Cobir.

**Cûçe** (hn.dar.çewa) Biçûk. Hûrik. Çikune.

**Cûçik** (n.dar.mê) Têjikên çûçikan.

**Cûn** (k.jn.l.mê) Hûrkirina zadî bi diranan. Parî di cûm.(K) ez di cûm, em di cûn, tu di cûy hûn di cûn. Bi cû, bi cûn.

**Cûre** (n.x.mê) Cor.

**Cût** (n.x.mê) Hijmarên cût, du, çar, .. deh, û htd.

**Cûtin** (k.jn.x.mê) Dema mirov yan candar xwarinê di devê xweda bi didanan di hêrin.

# Ç

**Ç** (çe) Pîta çarê ji abeya kurdî.

**Ça** (n.x.mê) 1.Giyayeke belgên wî, hişik di ken digel ava kelandî têkel di kin , piştî rengê sor werdigire di kin kopan, yan peyalan di gel şekirê têkve di din vedixwen.

**Ça<u>dir</u>** (n.x.mê) Nîhanîyek ji perokan hatî diristkirin wek xanî tê bi kar anîn. Xîvet. Reşmal. Kon.

**Çadir<u>geh</u>** (n.dar.mê) Cihê çend çadir lê hatî vedan. Xîvetgeh. :Eve çadirgeha penaxwazane.

**Çadir<u>vedan</u>** (k.jn.l.mê) Danan û peytkirina çadirê dako wek mal bi kar bi hînin, jibo di nav da jiyanê. :Me çadira xwe liserê girî veda. Kî yê şarezaye jibo çadirvedanê?. (K) bn:Vedan.

**Çak** (hn.x.çewa) Baş. Qenc. Hêja. :Mirovêd çak ji dinyayê qir nabin.

**Çak<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Başbûn. Qencbûn. : Piştî vexwarina dermanî ez çak bûm. (K) bn: Bûn.


**Ça<u>kêt</u>** (n.x.nêr) Qutik. Qemsele.

**Ça<u>kî</u>** (n.dar.mê) Başî. Qencî.

**Çakî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Başî, qencî -kirin. ***Pend*** :Çakîyê bike, bila di ber avêda biçe. (K) bn: Kirin.

**Çak<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Başkirin. Çêkirin. Peytkirin. :Text çk kir. :Pora xwe çak di ke.(K) bn: Kirin.

**Çakuç** (n.x.nêr) Amêreke jibo mîxkirin yan derînana mîxan(bizmaran) ji dar, dep, text û htd bi kar di hêt.



**Çakuç**

**Çakuçlêdan** (k.jn.l.mê) Bikar anîna çakuçî jibo girêdê. Lêxistin bi çakuçî. :Çakuçek li mîxê da. :Dengê çakuçlêna asingirî di gehişt serê kolanê.

**Çal** 1 (n.x.mê) 1. Kûratîyeke di erd yan her cihekî da. :Çala genimî. :Çala befrê. 2. Pîlan. Bê bextî. ***Pend*** :Yê çalê bo êkî bikolit,ew bixwe dê kevitê.

**Çal** 2 (hn.x.çewa) Kewalên xaleka sipî li enîya(navbera çavêd) wan heye, mirovê tewleka sipî li enîya wî. :Bizina çal. :Karika çal.

**Çalak** (pn..x.çewa) Çeleng. Zîx. Peyt. Bi bizav. :Serdar qutabîyekê çalake.

**Çalakî** (n.dar.mê) Bizav. : Çalakîyên meha gulanê yêd bingeha me ji hemû mehan pitirin.

**Çalav** (n.l.mê) Çala av tê kom di be. Bîr. Birk.

**Çalbûn** 1 (k.jn.l.mê) Weke çalek di erdekê ve bibit. : Cihê guletop vê kevtî yê bûye çal.(K) :Bûn.

**Çalbûn** 2 (k.jn.l.mê) Xaleka sipî li hindav çavan çêbûye. (K) bn : Bûn.

**Çaldêran** (cugraf,ndar.mê) Deverk kurdîye. Peymana bi navê çaldêran ko li vî cihî hatibû girêdan û cara êkê Kurdistan du parçe kirî navbera Osamanî û Sefewîyanda, sala 1814 .

**Çaleke** (n.dar.nêr) ***candar*** Qurbeşk.

**Çalepk** (hk.dar.çewa) Dema zaro liser lep û çokên xwe bi rê di çe.

**Çalepkaçûn** (k.jn.gl.mê) bi çalepka, Zaro bi çalepka di hêt û di çit. :Keça wî jinû bi çalepkan bi rêve di çit.(çarlep).

**Çalkirin** 1 (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov çalekê li cihekî bike.: Te vêrê jibo çi çal kirîye?. 2. Dagirtina çalan bi mitayî. : Berî çalkirin. :Befir çal kir.

**Çalkirin** 2 (k.jn.l.mê) Dema hindav çavên kewalan yan mirovî, xaleka sipî lê bi hêt nîgarkirin. (K) bn : Kirin.

**Çalkirî** (hk.l.çewa) 1.Mitayê di çlan da hatî hilgirtin. : Genimî çalkirî.2. Xala sipî li enîyê hatî kirin.

**Çam** (n.x.mê) Bûyerên kovandar. Femran. Kujtina bi komel. Tengavîyên mezin. Serpêhatîyên nexweş.:Dujminî çamên mezin anîn serê kurdan.

**Çand** (n.x.mê) Rewşenbîrî. Ronakbîrî. Keltor. :Wezareta çandê ya hikometa Kurdistanê.

**Çandayî** (hn.dar.çewa) Çandî.

**Çandin** (k.jn.x.mê) Tov, nemamik, ta, serik yên giya û daran binax di kin jibo hişîn bibin. ***Pend*** : Cotyaro çî di çînî, go heger hişîn bû dê bînî. : Kesê bi xwaze çakîyekê jibo mirîyê xwe bi ke bila darekê bi çîne.şîreta pêxember,Zeredeşt( s.x). (K) bdn: ez di çînin, em di çînîn, tu di çînî hû di çînin, ew çîne[…it] ewan di çînin. Pr:dê [bi] + bdn. Bdb : di çand, di çandin. Db,dûr: çandibû, … bûn. (F) : bi çîne, bi çînin.

**Çandî** (rd.dar.çewa) Mijarên rewşenbîrî. :Çelengîyên çandî. :Werzên çandî. :Bizava çandî.

**Çante** (n.x.nêr) Tûrik. Cihor.Cante.

**Çap** (n.x.mê) Makîna(amêrê) nivêsîna pertokan.

**Çapan** (n.x.mê) Core perokek sipîye. Nifsî. Cang.

**Çapez** (n.dar.nêr) Çaydank. Qorik.

**Çapker** (karn.dar.dz) Kesê ko liser çapê kar di ke.

**Çapkirin** (k.jn.l.mê) Nivêsîna bi tîpên makînê, çapê.tîpkirin. :Kitêba wî hêjta ne hatîye çapkirin. :Bê zehmet vê nivîsarê çap bi ke !.(K) : Kirin.

**Çapxane** (hk,n.dar.mê) Xanîyê ,cihê nivêsîna pertokan. Cihêt tîp kirinê .Weşanxane. :Çapxaneya xebat.

**Çaq** (n.x.nêr) Çeq.

**Çaqrût** (hn.l.çewa) Hejar. Rût. Belingaz.

**Çaqû** (n.x.mê) Kêrik. Kêr.

**Çar** (hijn.çend) Hijmara 4. 2+2=4. :Çar parçeyên Kurdistanê.

**Çarbaz** (n.dar.mê) Çargav.

**Çarbazî** (n.dar.mê) Beza çargavê ya hespan.

**Çarçabik** (n.dar.mê) Gavek. Demek kurt. Pêngav.

**Çarçef** (n.dar.mê) Pateyekê ciwan û çargujî yan lakêşe bi ser text û nivînan da di kêşin.

**Çarçira** (hk.cih,devern.l.mê) Meydaneke li bajêrê Mihabad-Kurdistana Iranê, ko serokê komara kurdistanê Q. Mehemmd, lê hatîye li sêdaredan.

**Çarçûv** (n.dar.nêr) Delîve. Dem. War.

**Carde** (hijnçen.l) Hijmara 14.

**Çardeh** (hij,n.l) Çarde.

**Çardehemîn** (hijn,rêzkir.l) Ya/ yê çardehê.

**Çardest** (hn.l.çewa) Dema mirovek ji nişkêve nexweş di be, yan bêhoş dibe, xelik bi desatan radikin di gehînin cem nojdarî. :Dilê mamê min hat girtin, me bi çardestî gehand nexweşxanê.

**Çare** (n.dar.mê) Dawî înana her karekî bi serferazî, serkeftî. Jibo qurtalbûn ji vê tengavîya em têda tu çare nînin.

**Çarekirin** (k.jn.l.mê) Başkirin. Nojkirin. Saxkirin. Qurtalkirin. : Supas bo xudê me arêşe çare kir. (K) bn: Kirin.

**Çarem** (hijn.rêzkkirin.çend) Ya/ yê çarê.

**Çaremîn** (hij,rêzkirin.çend) Ya/ yê çarê.

**Çarenivîs** (n.l.nêr) Paşeroj. : Çarenivîsê hizaran kurdên enfalkirî ne diyare.

**Çareser** (n.dar.mê) Çare.

**Çareserbûn** (k.jn.l.mê) Çarebûn. Çêbûn. Çakbûn. :Heger tu cigaran ne hêlî çi caran çareser nabî !.

**Çareserî** (n.dar.mê) Çare.:Nojdar mijîlî çareserîya nexweşî ye.

**Çareserkirin** (k.jn.l.mê) Çarekirin. :Hêjta arêşeya wan ne hatîye çareserkirin. (K) bn:Kirin.

**Çarêk** (hijn.çend.l) Pişkek ji çaran ¼. :Çarêka demhijmêrekê ez li benda te mabûm.

**Çargav** (n.l.mê) Xara dewaran bi çar lingên xwe. :Hesp bi çargavê navdenge.

**Çargavkirin** (k.jn.l.mê) Dewarê xarê di ket. :Bi nêre kerê henê, yê çargavê di ke!. (K)bn: Kirin.

**Çargoşe** (n,endaz.l.mê) bn :Çarkujî.

**Çarhizar** (n.hijnl.çend) Hijmara 4000.


**Çarik** (n.dar.mê) Hîşar. Dersoka jinan. Pêçe.

**Çarîn** (n.dar.mê) Ji çar rex, bend, risteyan pêkhatîye.

**Çarkinar** (n.l.mê) Çar alî yan sentên cihanê, Bakûr, başûr, rohilat û rojava. Çarrex.

**Çarkindêle** (n.dar.mê) Silka şekirê. Şilindir.

**Çarkujî** (n.l.mê) *endaze* Şêweyên endazeyî ko çar kujîyên wekhev hene.



**Çarkujî**

**Çarlep** (n.l.mê) Çalepk.


**Çarlepkî** (hk.l.çewa) Çûna zarokan bi çalepkan.

**Çarmedor** (n.l.mê) Dormandor. Rexûçan. Dewrûber. Hawirdor.

**Çarmêrkî** (hk.l.çewa) Rûniştina li erdî dema mirov lingên xwe di çemîne di binêk ra di be. Çarmêvankî.

**Çarmilyon** (hijn.çend.l) 4000000.Çar milyûn.

**Çarmîx** (n.l.mê) Du xîçêd diser yekra derbazbûyîn. Çarriyan.



**Çarmîx**

**Çarneçar** (hn.l.çewa) Arêşeyên nîvbero mayîn û ne hatîn çarekirin. Bêrê.

**Çarnîk** (hn.dar.çewa) Mirovê xwedî serbor. Şareza. Zana.

**Çaroke** (n.x.mê) Hîşara jinan. Dersoka jinan.

**Çarpare** (hn.l.çewa) Tiştê hatî parkirin, parçekirin, bûye çar pirt.

**Çarparebûn** (k.jn.gl.mê) Pirtbûn. Perçebûn. (K) bn: Bûn.

**Çarparekirin** (k.jn.gl.mê) Pirtikandin. Hincinandin. (K) bn: Kirin.

**Çarpê** (hn.l.çewa) Candarên liser çar dest û pêyan diçin, mîna hesp, ker, bizin û htd.

**Çarrex** (n.l.nêr) Çaralî.

**Çarrê** (n.l.mê) Çarrîyan.

**Çarrîyan** (nkcih.mê) Çar rêyê di berêk yan serêk ra di bûrin.

**Çarhizar** (hijn.l) Hijmara 4000.

**Çarmilyon** (hijn.l) Hijmara 4000,000

**Çarsed** (hijnl.çend) hijmara 400.

**Çarşemb** (demn.l.mê) Rojeka heftîyê. Roja navbera sêşmb û pêncşembê .

**Çaryek** (hijn.çend) Çarêk.

**Çatir** (n.dar.mê) Catir.

**Çav** (n.x.nê) ***hedam*** Endamên dîtinê yên giyandarane**.** ***Pend*** :Çav lêkerî xwelîya serî.***Pend*** :Çavên li derê, bi hên derê. ***Pend*** :Çavên pîs û jehir a marî, weko yekin bi karî. ***Pend*** :Çav kanîka kilîne.***Pend*** :Çavekê te kure bû, yê dî kure neke.***Pend*** :Çavan dijminê xo di nasin.***Pend*** :Dîtna çavan, sotina hinavan. ***Pend*** :Dîtina çavan direwe. ***Pend*** :xwe bi çav û dev havêtê, ang : dema mirovî karek bi çavtarî di vêt bi ket.



**Çav**

**Çavbarenegirtin** (k.jn.gl.mê) Çavpênerabûn. :Ew çavabare na gire ko birayê wî ji wî zîrek tire.

**Çavbelek** (hn.l.dz.çewa) Çavên ciwan û sipîlik sipî û reşik pir reş yan rengên din. : Çavên reş û belek.

**Çavberdan** (k.jn.l.mê) Dema meriv li yekî/ yekê hûrik bi nêre. Çavliderî. Temaşekirin.: Wî çavê xwe berdaye ser keça mamê xwe.

**Çavbiloq** (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî mezin û derkeftî.

**Çavbirçî** (hk.l.çewa) Çavbirsî. Dinyanedîtî. :Çi Jineka çavbirçî ye, ji malê dinê têr nabe !.

**Çavbirçîtî** (n.l.mê) Çavbirsîtî. Çavtarî.

**Çavçilûs** (hk.dar.çewa) Mirovê dinyanetîtî. Hefhefî.  Kirêt. Çepel.

**Çavçilûsî** (n.dar.mê) Hefhefî. Kirêtî. Herimî.

**Çavdamilandin** (k.jn.l.mê) Pêşdem zanîn. Pêşbînîkirin.

**Çavdan** (k.jn.l.mê) Sexbêrî. Sexbêrîkirin. Xwedîkirin. Nêrîn. :Ez bextê teme çavê xwe bide mal tanî ez di zivirim. (K) bn: Dan.

**Çavdar** (pîşn.dar.dz) Çavdêr.

**Çavdarî** (karn.dar.mê) Çavdîrî.

**Çavdarîkirin** (k.jn.gl.mê) Sexbêrkirin. Xwedîkirin. Xudankirin. Pûtedan. (K) bn: Kirin.

**Çavdêr** (pîşn.dar.dz) Kesê çavê xwe di dit candaran, rez û baxan, mirovan û htd. Sexbêrker.Zêrevan. Nêrevan.

**Çavdêrî** (karn.dar.mê) Sexbêrî.

**Çavdêrîkirin** (k.jn.gl.mê) Çavdarîkirin. : Ew çavdêrîya rezî di ke. (K) bn:Kirin.

**Çavenî** (hk.l.çewa) Navçavgirê. Posîde.

**Çaverê** (hn.l.çewa) 1. Kesê li benda mizgînekê,bûyerekê bi mine. 2. Navê jin û mêra ne.

**Çaverêbûn** (k.jn.gl.mê) Li bendê man. Li hîvîyê man. : Ez duh demhijmêrekê çaverê te bûm, lê tu nehatî ?. (K) bn : Bûn.

**Çaverêkirin** (k.jn.gl.mê) Li bendê man. Li hîvîyê man. : Tu çaverêy çi dikî, êdî ew nahêt (nema tê)?. (K) bn: Kirin.

**Çavêş** (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî di êşin.

**Çavêşan** (k.jn.l.mê) *derd* Êşana çavan. Çavêşana te ne ya başe, here cem nojdarekî!. :Çavên min ji mê di êşin.

**Çavêşî** (n.l.mê) Éşana çavan. Çavkulî.

**Çavgirêdan** (k.jn.l.mê) 1. Core listokeke çavên mirovî girê di din. 2. Xapandin.:Çav lê tarîkirin. (K) bn: Girêda.

**Çavgirêdayî** (hk.l.çewa) Mirovê di serda birî. Mirovê xapandî.

**Çavhar** (hk.l.çewa) Çavhîz. Çavdijwar.

**Çavhavêj** (hk.l.dz.çewa) Mirovê çavan li tiştî di dit.:Hişyar be li zarokên xwe, jiber çavhavêjan.

**Çavhavêjtin** (k.jn.l.mê) Çavlêdan.:Ev pîrejine çavan di havêje. (K) bn: Hvêtin.

**Çavhîz** (hn.l.çewa) Çavlider.

**Çavik** (n.dar.mê) 1. Cîhê av jê di hilavêjit. Serekanî. Çavkanî. 2. Berçavik.

**Çavîn** (hk.dar.çewa) Karê bi çavan di hêt kirin.

**Çavînbûn** (k.jn.l.mê) Hatî çavînkirin.

**Çavînkirin** (k.jn.l.mê). Hin mirov temaşayî kesek, zaroyek xweşik bi kin di bit egera nesaxbûn yan kujtina wî. Têkdana mal, kargeh û htd.Bi çavan karkirin ser mirov, candar tiştan. (K) bn: Kirin.

**Çavkanî** (n.l.mê) Serekanî. Jêder.

**Çavkirin** (k.jn.l.mê) 1. Dema mirovê çavê xwe li êkî bi neqînit. 2. Bi çavkirin; ang destnîşankirin. (K) bn: Kirin.

**Çavlêbûn** (k.jn.gl.mê) Weke çavê mirovî li kesek, candarek yan tiştekî be. Pûtepêdan. : Sube ez dê herin seredana hevalekî, çavê te li zarokan be. Çavê min lê bû dema ew ji mal derkevtî. (K) bn: bûn.

**Çavlêdan** (k.jn.gl.mê) Çavînkirin. Êkî çavek li kurê min daye, eve çend roje yê nexweşe (K) bn: Lêdan.

**Çavlêgerandin** (k.jn.gl.mê) Lêgeran. Lênêrîn. Temaşekirin. : Hindî çavên xwe lê di gerînim, yara xwe li çi deran nabînim. (K) bn: Gerandin.

**Çavlider** (hk,hn.l.çewa) Yê berê xwe dide jinên xelkî. Yan mineta xelkê dî hildigirît. **Çavliderî** (n.l.mê) Mirovê li benda alîkarîya biyanîyan. ***Pend*** :Çav li derî, xwelîya serî.

**Çavnebar** (hk,hn.l.çewa) Dilpîs. Kumreş. Zikreş.

**Çavnebarî** (n.l.mê) Dilpîsî.

**Çavnebarîkirin** (k.jn.gl.mê) Kumreşî, dilpîsî kirin. (K) bn: Kirin.

**Çavnêr** (pîşn.dar.dz) Çavdêr. Zêrevan.

**Çavnêrî** (karn.dar.mê) Çavdêrî. Zêrevanî.

**Çavnêrîkirin** (k.jn.gl.mê) Çavdêrîkirin. (K) bn: Kirin.

**Çavniq** (hn.dar.çewa) Yê ku qencîyan zû ji bîr bike. ***Pend*** :Kitika çavniq.ang; kitika pîştî têr di xwe, çavên xwe di niqîne , qencîya xwedî xwe jibîr di kit.

**Çavniqandin** (k.jn.l.mê) Weke mirov çavên xwe ,daneser hev, bigire. Biniqîne. (K) bn: Niqandin.

**Çavpêkefitin** (k.jn.l.mê) Hevdîtin. Gehiştin hev. :Çîya bi çîya nakevin, lê çav bi çavan di kevin.(K) bn: Keftin.

**Çavpirpîç** (hn.l.dz.çewa) Mirovê ku çavên wî di bê serûber bin.

**Çavreş** (hn.l.dz.çew, n.l) 1. Mirovê ku rengê çavên wî di reşin. 2. Navek kurdîye.

**Çavreşî** (n.l.mê) Dilpîsî. Kumreşî. Çavnebar.

**Çavron** (hnl.çewa) Mirovê çavên wî di ronin û tiştan baş di bînit.

**Çavronbûn** (k.jn.gl.mê) Dema kesek xweşdivîyekê xwe di bîne bîne yan ji wexereka dûr bihêt, xelik daxaza dilxweşîyê jibo dike, di bêje ; êavên te ron bin. (K) bn: bûn.

**Çavronkirin** (k.jn.gl.mê) Şadbûn. : Te çavên me ronkirin ku tu bi silmetî vegeray mala xwe. (K) bn: kirin.

**Çavsivikî** (n.l.mê) Bêrêzî. Sivkatî.

**Çavsor** (hn.l.çewa) Tore. Hêris. : Bapîrê min çavsore!.

**Çavsorbûn** (k.jn.gl.mê) Torebûn. Hêrisbûn. :Hêjta çavêd min sor be bûne!. (K) bn: Bûn.

**Çavsorî** (n.l.mê) Hêrisbûn. Tingijîn. Toreyî. ***Pend*** : Çavsorî jibo gayî nabit.

**Çavsorkirin** (k.jn.l.mê) Torekirin. Hêriskirin. (K) bn: Kirin.

**Çavşaş** (hn.l.çewa) Çavwir. Çavhewêl. Xêl. Çavtirîwar.Vîr.

**Çavşikandin** (k.jn.l.mê) Mirov gurzekî li êkî bidit, ko çi caran ji bîr neke. Tirsandin. Paşvebirin. (K) bn: Şikandin.

**Çavşikestî** (hn.l.çewa) Kesê hatîye tirsandin û dema ew bûyer li bîra wî di hêt, ji xwe fedî di ke.

**Çavşîn** (pn.l.çewa) 1. Mirovê çavên wî di şîn bin. 2. Navê jin û mêrane.

**Çavşor** (hk.l.çewa) Serşor. Pûç. Bêzax.: Ew kabirayekê çavşore, bila tu kes têkelîya ne ket.

**Çavşorbûn** (k.jn.l.mê) Serşorbûn. Vehêtbûn. (K) bn: Bûn.

**Çavşorî** (n.l.mê) Serşorî. Bêzaxî. Ta kengî dê bi çavşorî bi jîn ?.

**Çavşorkirin** (k.jn.l.mê) Serşorkirin. Ji fehêtîyan çavêt xwe şer di ket. (K) bn: Kirin.

**Çavtarî** (hn.l.çewa) 1. Kesê ronahîyê baş nabîne, jiber ko çavên wî di lewazin.2. Dinyanedîtî. Hefhefî.

**Çavtarîbûn** (k.jn.gl.mê) 1.Dema çavên mirovî lewaz di bin û êdî baş nabînin. 2. Dema mirov tore di be yan di tirse çav tarî dibin. (K) bn: Bûn.

**Çavtarîkirin** (k.jn.gl.mê) Weke mirov tiştek yan gotinek nexweş bi bihîzit, çav dihên tarî kirin. : Hindî Azadî yê bi lez bû çav li min tarî kirin, min jibîr kir pisyara babê wî bikim. (K) bn: Kirin.

**Çavteng** (hn.l.çewa) Çirîk.

**Çavtengî** (n.l.mê) Çirîkî.

**Çavtêr** (hn.l.çewa) Merivê merd û dinyadîtî. Mirovê nandeh.

**Çavtêrî** (n.l.mê) Merdînî. Nandehî.

**Çavtirsandin** (k.jn.l.mê) Dema mirovek bihêt tirsandin û hertim tirs di dilê wî da be. (K) bn: Tirsandin.

**Çavtirsandî** (hn.l.çewa) Mirovê tirs dîtî, her di dilî da mayî.

**Çavvekirin** (k.jn.l.mê) 1. Mirov çavên xwe yên niqayî, veke.2. Hatin ser dinyayê. Ji daykbûn. Peydabûn.

**Çavvekirî** (hk.l.çewa) Mirovê hez ji mêvan û hevalan di ket û xwarin û perey di mezêxit jibo dinyadarîyê. Merd. Nandeh. Dinyadîtî.

**Çavxwînbûn** (k.jn.gl.mê) Jiber kerb û torebûnê çavên mirovî mîna xwînê sor di bin.

**Çavzêlk** (hn.dar.çewa) Kesê di xwaze her tiştî bi zane. Davdoz.

**Çavzêlkî** (n.dar.mê) Heza mirov jibo zanîna her tiştî.

**Çavzil** (hn.l.çewa) Mirovê çavên wî di zilin. Çavzîq.

**Çavzilbûn** (k.jn.gl.mê) Dema çavên mirovî jibo dîtina tiştekî gir û vekirî di mînin. (K) bn: Bûn.

**Çavzilkanê** (n.l.mê) Yarîyeke, du kes hember hev di rawestin û çavên xwe zil di kin, kanê kî dê bi kare pitir çavên xwe bi hêle vekirî ew dê bi serkeve.

**Çavzilkirin** (k.jn.gl.mê) Dema mirov çavên xwe zil dike ji egera bihîstin yan dîtina tiştekê seyr. (K) bn: Kirin.

**Çavzîq** (hn.l.çewa) Yê çavên xwe jiber bûyereka seyr vediket, mezin diket û çavên wî di teysin.

**Çavzîqbûn** (k.jn.gl.mê) Çavzilbûn. (K) bn:Bûn.

**Çavzîqkirin** (k.jn.gl.mê) Çavzilkirin. (K) bn:Kirin.

**Çawa** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pirsînê. Çewa. :Çawa dê wesa bi be?. Hûn çawanin?. Rengê esmanî yê çawane?.

**Çax** (hk.dem) Dem. Wext. Gav. :Çaxê berê, ne wek vî çaxî bo!.

**Çay** (n.x.mê) ***giya***, ***vexwarin*** Ça.

**Çayçî** (karn.dar.dz) Kesê çayê çêdikit li ber çayxanan .

**Çaydan** (n.dar.nêr) Çapest. Qorî.:Ça di çaydanî da di kelit. :Çaydankê asinî.



**Çaydan**

**Çayxane** (n.l.mê) Xanîyê bêhinvedana xelik î, cihê ko çayê lê çê di ken û di firoşin.

**Çeç** (n.x.nêr) Nazikkirina destîye bi zarê zarokan.

**Çejtin** (k.jn.x.mê) Tamkirin.

**Çek** (n.x.nêr) 1. Amêrên şerkirinê;mîna top, tiveng, demance û htd. 2. Zêrên jinan, ristik. Guhark,.htd.

**Çekçekîle** (n.dar.nêr) ***giyandar*** Candarek şîrdere, firindeye bi şev çelenge. Şevkork. ***Pend*** Çekçekîle ne şevê di dîyarin, rojê di berzene.ang; kesê herdem ne diyar.

**Çekçekûle** (n.dar.nêr) Çekçekîle.

**Çekçemêjok** (n.dar.nêr) Çekçekîle.

**Çekdanan** (k.jn.l.mê) Dema mirov çekê xwe di danit. : Me soz daye em çekî jibo dujminan ne danin. (K) bn: Danan.

**Çekdanîn** (k.jn.l.mê) Çekdanan. (K) bn: Danîn.

**Çekdar** (pîş.dar.dn) Mirovê çekî hil digrit. Leşker.Xudan çek. Br×Bêçek.

**Çekadarî** (kn.dar.çewa) Karê bi çekî di hêt kirin. Çalakîyên çekdarî. Şoreşa çekdarî.

**Çekxane** ( n.dar.mê) Cihê lê danîna(hilgirtina) çekan. Cebilxane.

**Çel** (n.x.nêr) Çelake.

**Çelake** (n.dar.nê) Darekê dirêje dawîya wî çuklek xar pêveye bo girtina tiştî; wek çinîna mazî, gûz û htd, bi kar di hêt.

**Çelem** (n.x.mê) Kelemî.

**Çeleng** (hn.x.çewa) 1. Çalak. Zîx. Peyt. 2 .Bedew. Rind. Ciwan.:Qutabî yê çeleng.

**Çelengî** (n.x.mê) Çalakî.:Me liber çend çelengîyêd ronakbîrî li meha gulanê bi keyn.

**Çelê** (cugir) Bajarekê Kurdistana bakûre.

**Çeliqandin** (k.jn.x.mê) Jêk vekirin. Dar çeliqand. (K) bdn: ez di çeliqînim em di çeliqînîn, tu di çeliqîn hûn di çeliqînin, ew di çeliqîne[..it] ewan di çeliqînin.Pr: dê bi + bdn. Bdb: di çeliqand, di çeliqandin. (F): bi çeliqîne, bi çeliqînin.

**Çelitandin** (k.jn.x.mê) Tîvkil di serda înan. Sipîkirin. Selixandin.

**Çelitîn** (k.jn.x.mê) Selixîn. Çerim di serda çûn.

**Çelixt** (n.x.mê) Cihê êvitî. Werim.

**Çelkew** (n.dar.dz) Têjikên kewan. Têjkewk.

**Çelkê** (cugirn) Gundekê kurdane li Kurdistana Iraqê.

**Çelp** (n.x.mê) Dengê lemçêna devî li dema xwarinê. : Çelpeçelp.

**Çelqandin** (k.jn.x.mê) Şilqandin.

**Çelqîn** (k.jn.x.mê) Şilqîn.

**Çem** (n.x.nêr) 1. Cinîk. Baxê fêqî. Rez. 2. Rîbar. Robar.

**Çemandin** (k.jn.x.mê) Xwarkirin. Tewandin. : Serê xwe çemand ji fedîyan de. ***Pend*** :Asin bi sarî çemandin.ang; bi hêz û şiyane. (K) bdn : ez di çemînim em di çemînîn, tu di çemînî hûn di çemînin, ew di çemîne[..it] ewan di çemînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di çemand, di çemandin. Db,dûr: çemandibû, …. Bûn. (F) : bi çmîne, bi çemînin.

**Çemandî** (kn.dar.çewa) Tiştê hatî çemandin. Tewandî. Xwarkirî. :Dara çemandî. Gopalê çemandî.

**Çemayî** (hn.dar.çewa) Çemandî.

**Çember** (n.x.mê) 1. Nîşan. Sîmbol. 2. Şêweyê bazinî.

**Çembil** (n.x.nêr) Çimbil.

**Çemik** (n.dar.mê) Şivik. Darik.

**Çemîn** (k.jn.x.mê) Xwarkirin. Bi çemîne, bi çemînin.

**Çemyan** (k.jn.x.mê) Çemîn.

**Çemyayî** (kn.dar.çewa) Çemayî.

**Çend** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo pisyara çenînîyê di hêt bi kar anîn. Jîyê te çende?. Ev tişte bi çendê ye? ***Pend*** :Çend fayde min ji cuxînê dîtîye, heta, ji kayê?. ***Pend*** :Çend mêrçak bî, ji te mêrçaktir hene. ***Pend*** :Çend tengavî hene, hinde berfirehî jî hene.***Pend*** :çend dûr bî, şirîntirî.

**Çe<u>ne</u>** (n.x.mê) ***endam*** Erzink.

**Çene<u>baz</u>** (pn.dar.çewa) Mirovê pirbêj û kêfxweş. Tiraneker. Henekbaz.

**Çene<u>bazî</u>** (n.dar.mê) Henek. Gelte. Tirane.

**Çeng** (n.x.nêr) Zendûbas. Destûmil. Per. ***Pend*** :Mirov teyrê bê çenge.Pend :Mîna çûçika çeng lê birî. Ang ; kesê ji hmû tiştan hatî bêbehirkirin.

**Çen<u>gal</u>** (n.dar.mê) Core kevçikeke, du, sê yar çar tilîye jibo girtina xwarinêd req û nîreq bi kar di hêt. :Zad bi çengalê di xwar.



**Çengal**

**Çen<u>te</u>** (n.x.nêr) Çante.

**Çente<u>bask</u>** (n.l.nêr) Çentê milî. :Çentebask bi milî xwe ve kir û çû !.

**Çente<u>dest</u>** (n.l.nêr) Çentê destî.

**Çen<u>tik</u>** (n.dar.nêr) Çentê biçûk.

**Çep** (hn.x.çewa) 1. Kesê bi destê çep kar di ke.2. Xwar. Xwarûvîç. . Kheç.

**Çep<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov senta xwe bi gihore û bo alîyê çep yan rast vegere. :Jiber ko min ne di xwest xelik min bi bîne, li rasta gundî min çep da. (K) bn: Dan.

**Çe<u>pel</u>** (hn,hk.x.çewa) Mirovê kiryar û gotinên kirêt di kit. Mirovê ,gemar. Pîs. Herimî. Lewçe.:Dujminê çepel.

**Çepe<u>lî</u>** (n.dar.mê) Kiryara çepel.Gemarî.

**Çe<u>per</u>** (n.x.nêr)1. Amêreke şiv û dar di berêk ra birinê, weke dergehek bo kotan û govên kewal û dewaran, yan perjanan, bi kar di hînin.2.Dîwarek yan şorhek nijinîye jibo xwe li pişt parastinê dema pevdaçûnanda. 3. Navê mêrane.

**Çeperkirin** (n.x.nêr) Perjankirin. Tankirin. :Gov çeper kir. (K) bn: Kirin.

**Çepê** (n,gazkir.dar.mê) Naznav û navê bangkirina keça, jina çep.

**Çepik** (n.x.pir) Dema mirov bi kar û gotinan hemberê xwe şad bi be, çepikan jêra dixwaze.Destqutan. Çeple.

**Çepiklêdan** (k.jn.l.mê) Dema mirov çepikan lê di de. (K) bn: Lêdan.

**Çepiklêxistin** (k.jn.l.mê) Çepiklêdan. (K) bn: Lêxistin.

**Çepî** (hn.x.çewa) Çep.

**Çepîn** (hk.dar.çewa) Karê bi çepê tê kirin. Karê bi dest, pê, çav û htd ê çepê tê kirin. Mirovê çepîn,ang: mirovê çep.

**Çepkirin** (k.jn.l.mê) Berevajîkirin. (K) bn: Kirin.


**Çeple** (n.x.mê) Destqutan. Destlêkadan. Çepik.

**Çepo** (n.gazkir.dar.nêr) Naznav û navê bangkirina mêrê çep.

**Çeprê** (pn.l.çewa) Kesê bîr û bawera çep heye. Sosîyalîst.

**Çeq** (n.x.nêr)1. Tayê daran.2. Liq. Pişk.

**Çeqel** (n.x.dz) ***candar*** Giyandarek kûvûye.ji gropa gurg û seyan. Rûvî.



**Çeqel**

**Çeqilk** (n.dar.nêr) Çeq.

**Çeqilandin** (k.jn.x.mê) Çiklandin.

**Çeqilmast** (n.l.mê) Avemast. Dew.

**Çeqîn** (k.jn.x.mê) Çikilîn. Rawistan. :Sing di erdî ra çeqî.

**Çeqrût** (kn.dar.çewa) Xazok.

**Çer** (n.x.mê) Çerwan. :Şivanî pez bir çerê.

**Çerandin** (k.jn.mê) Kewal dewar berdan ser giy û pelexî li mal yan aqarî,da ko xwarinê bi xwen.: Gavanî dewar çerandin. :Şivanî pez çerand. (K) bdn: ez di çrînim em di çerînîn, tu di çrînî hûn di çerînin, ew di çerîne ewan di çerînin.Pr: dêbi +bdn. Bdb: di çerand, di çerandin. Db,dûr: çerandibû, çerandibûn.(F): bi çerîne, bi çrînin.

**Çerçirandin** (k.jn.dar.mê) Jenîn. Şilqandin.

**Çerd** (n.x.mê) Peyveke bo jêk cuda kirina pezî, bizinî bi kar di hêt.

**Çerdbûn** (k.jn.l.mê) Cudabûn. Jêkvebûn.

**Çerdkirin** (k.jn.l.mê) Cudakirina kewalan. Cudakirin. Ji hevkirin.: Kar û berx ji hev çerd kirin. (K) bn: Kirin.

**Çerîn** (k.jn.x.mê)Weke giyandr xwarinê di xun. Xwarin; taybete jibo candaran bi kar di hêt. : Kewalêd gundî yên li zevîyê di çerin. :Ev karike na çere, çukî hêjta şîrê makê di xwe.

**Çerm** (n.x.nêr) Pîst. Post. ***Pend*** **:**Çermê gonê xwe bixo, mineta qesabî helnegir.***pend*** :Ji mirîşkê çermê xweşe.

**Çermik** (n.dar.mê) Perçeyên çermî jibo pêlav, cante û kelûpelêl din bi kar di hêt. Kevilk.

**Çermiqandin** (k.jn.mê) Tamdan û rengkirina çeman.

**Çermiqîn** (k.jn.x.mê) Hatine rengkirin. Renggirtin. Reng wergirtin.

**Çermîn** (hn.dar.çewa) Pêlav, cente, cilik û htd yên ji çermî hatîne çêkirin. :Sakoyê çermîn. Pêlava çermîn.

**Çermsor** (nejn.l.dz) Hindokên sor. Pîstsor.

**Çerxandin** (k.jn.x.mê) 1.Lêkzivrandin. 2. Xapandin.Pare jê çerixandin. malê wî jê çerixand.

**Çerxîkevjal** (n.l.nêr) Kêvjale.

**Çerxîn** (k.jn.x.mê) Lêkzivrîn. (K) bdn: ez di çerixim em di çerixîn, tu di çerixî hûn di çerixin, ew di çerixe[....it] ewan di çerixin. Pr: dê[bi] +bdb. Bdb: ez di çerixîm em di çerixîn, tu di çerixî hûn di çerixîn, ew di çerixî ewan di çerixîn.Dbdûr: ez çerixîbûm em çerixîbûyn, tu çerixîbûy hûn çerixîbûn, ew çerixîbû ewan çerixîbûn[bi bûn]. (F): bi çerixe bi çerixin.

**Çerxkirin** (k.jn.l.mê) Xweşkirina devêd das, bivir, sator û htd. Tîjkirin. Seqakirin. :Devê bivirî çerx kir. (K) bn: Kirin.

**Çerxlêdan** (k.jn.l.mê) 1. Çerxkirin. 2. Zivrîn.

**Çeşn** (n.x.nêr) Cor. Reng.

**Çeşt** (n.x.mê) Tam.

**Çeştkirin** (k.jn.l.mê) Tamkirin. :Ez xwarinê çeşt di kim. (K) bn: Kirin.

**Çerwan** (n.dar.mê) Cihê çera(çerandin)a terş û kewalî. kûz.

**Çesp** (n.x.mê) Madek nîseke bo pêkve besitina kaxez û tiştên dî. Stirk.

**Çespan** (hk.x.mê) çeleng. Zîrek .kêrhatî.

**Çespandin** (k.jn.x.mê) Karê çesp kirinê.Pêkvenûsandin.

**Çete** (pîşn.x.dz) Caş. Xwefiroş .Rêgir.

**Çetel** (n.x.mê) Çengal.

**Çeteyî** (karn.dar.dn) Caşatî. Rêgirî. :Wî di jiyana xu da çeteyî nekirîye!.

**Çetîn** (hn.x.çewa) Tiştê bi zehmet, karê giran û bi zehmet.

**Çetînbûn** (k.jn.l.mê) Bi zehmet bûn. Asêbûn. Alizîn.

**Çetînî** (n.dar.mê) Zehmet. zehmetî. Dujwarî.

**Çetînkirin** (k.jn.l.mê) Bi zehmetêxistin. asêkirin. Alozkirin.

**Çevandin** (k.jn.dar.mê) Çemandin. Tewandin.

**Çevîn** (k.jn.x.mê) Çeman. Tewan. Çemyan.

**Çevrî** (n.x.g) ***gagolk*** Çêl, ga û golik.

**Çewa** (perb) ***rêzman*** Alavê pirsînê ye. Çima.Çawa.: Te çewa zanî ez li vêrê me? Çewayî başî? . Çewa di be bila bi be.

**Çewal** (n.x.nêr) Cihal. Cewal.

**Çewender** (n.x.mê) Silika şekirê. Şilindir.

**Çewir** (n.x.mê) Bez. Ron.

**Çewsandin** (k.jn.x.mê) Weke mirov, deshelatek zor û kutekîyê li xelik ê bêguneh bi ke. Pêlêkirin.Binpêkirin.

**Çewt** (hk.x.çewa) Şaş. Nedirist. :Gotina te kirî ya çewt bû.:Karê çewt.

**Çewtî** (n.dar.x.mê) Şaşî. Hele.: Bibore ew çewtîya min bû.

**Çewtîkirin** (k.jn.l.mê) Şaşîkirin. : Waneya evro min gelek çewtîyên rêzmanî kirîne.(K) bn: Kirin.

**Çê** (hk,hn.x.çewa) Baş. Çak. Hêja. :Ew mirovekê çê ye.

**Çêbûn** (k.jn.l.mê) Başbûn. peytbûn. Saxbûn. : Tu çê bûy?; ez baştirim supas. :Ew karê ez li dû di geram çê bû. (K) bn: Bûn.

**Çêj** (n.x.mê) Tam. Çêja swîr, tirş, şirîn, tal..htd.

**Çêjandin** (k.jn.mê) Tamkirin. ez di çêjînim, tu di çêjînî, ewan di çêjînin,...


**Çêjdar** (hn.dar.çewa) Xwarina,zadê xweş û bi tam.

**Çêjkirin** (k.jn.l.mê) Çêjandin. Tamkirin.

**Çêjtin** (k.jn.x.mê) Çêjandin. Tamkirin.

**Çêkirin** (k.jn.l.mê) Diristkirin. Peytkirin. Lêkdan. ***Pend*** :Çêkirin çêkirina xudê ye. ***Pend*** :Çêkirin bi zehmete, xirabkirin bi sanahîye.(K) bn:Kirin.

**Çêl** (n.x.mê) ***candar*** Giyandarek şîrdere ,bi mifaye. Manga. ***Pend*** :Çêl dotin, kezwan kelotin. ***Pend*** :Çêl mir dew birya. ***Pend*** :Çêleka tiro, garanekê tiro diket.



**Çêl**

**Çêlek** (n.dar.mê) Çêl.

**Çêlê** (gazn.mê) Naznav û navê bangkirina jina wek çêlan qelew û gemjo.

**Çêlik** (n.dar.mê) Çûçikên mirîşkan. Çûçelk.

**Çêlîkirin** (k.jn.l.mê) Baskirin. Li ser axivtin. (K) bn : Kirin.

**Çêlo** (hd,n.nêr) Naznav û navek gazîkirinê ê mêrê gemjo.

**Çêr** (n.x.mê) Çer. Çerwan.

**Çêrgeh** (n.dar.mê) Çerwan.

**Çêştin** (k.jn.x.mê) Çêjtin.

**Çêtir** (hn.dar.çewa) Gelek çê. Baştir. :Ma ne çêtire heger em bi hevre biçin mala Hevalî?.

**Çêtirbûn** (k.jn.l.mê) Baştirbûn. Başbûn, lêhatin.

**Çi** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarê jibo kar û tiştan.Pisyareke jibo tişê nexuya bikar dihêt. :Tu çi di bêjî ? Ev çiye ?***Pend*** :Çi di çînî, ewî di helînî. ***Pend*** :Çi di kene kwarê, ew di hête xwarê.Pend :Çi roja barane,zivistane. ***Pend*** :Çi roja barî zivistane.***Pend*** :Çi dar nînin ba li belgan nede.

**Çiçik** (n.x.mê) ***hedam*** Endamê şîrî yê giyandaran. Sing.Memik. Guhan, guhandîn.

**Çift** (hn.x.çend) Hijmara cot ; wek  du, çar,... deh û htd.

**Çifte** (n.x.mê) Tivenga nêçîrê. Cifte.

**Çik** 1 (hn.x.çewa) Rawestayî. Ava çik, bêhin a çik.

**Çik** 2 (n.x.mê) Gotinên bi bizmar ko mirovan birîndar di ke. ::Jiber çikên cîranan, mala xwe ji gund barkir.

**Çikandin** (k.jn.dar.mê) Çiklandin.

**Çikbûn** (k.jn.l.mê)1.Hişkbûna kanî, çem û cokan ji avê.2. Bêhin westana mirovî :Bêhina min çik bû.

**Çikçik** (n.l.mê) Dengê lêdana demjimêrê.

**Çikçikandin** (k.jn.gl.mê) Dengê çikçikê jê anîn.

**Çikdanan** (k.jn.l.mê) Lomekirin. Birîndarkirina hesta mirovî.(K) bn:Danan.

**Çikkirin** (k.jn.l.mê) Hişkkirin. Rawestandin. Zepkirin. :Wî ji tirsan bêhin a xwe çik kir. (K) bn :Kirin.

**Çiklandin** (k.j.x.mê) Dar yan tiştê serê wî tîj di erdekî ra kirin, ta di cihê xwe da di mîne.:Singek di erdî çikiland. (K) bdn:ez di çiklînim em di çiklînîn, tu diçiklînî hûn diçiklînin, ew diçiklîne[..it] ewan diçiklînin. Pr: dê[bi]+ bdn. Bdb : di çikland, di çiklandin. Db,dûr. çiklandibû,...bûn. (F): bi çiklîne bi çiklînin.

**Çiklêt** (n.x.mê) Şekrokea şirîn û piloxe, gelek cor, reng û tam hene.



**Çiklêt**

**Çiklî** (hk.x.çewa) Dar di erdî ra çikilî.Gilçê çikilî.Mirovê req liser pêyan rwestayî.

**Çiklîn** (k.jn.x.mê) Dema tiştekê sertîj bêxî nav tiştekî, wek axê. : Ev dare ji mêje di dîwarî ra çiklî ye.

**Çil** (hij.mê) hijmara 40. 20+20=40.

**Çile** 1 (hk.dem.dar.nêr) Çil rojên gelek sar li ziviztanê yan gelek gerim li havînê. :Çilê zivistanê.

**Çile** 2 ( hk.dem) Meha yekê.

**Çilik** ( n.dar.pir) Çil rojin, her ji ya peydabûna zarokî tanî roja çilê, daykê hinde pêgirî hene wek xwe dûrxistin ji karê guhnelîyê û derkeftin.

**Çilikdar** (hn.dar.çewa) Jina di çilikan de. Ew ya çilikdare, di çilikan da ye.

**Çilikdarî** (n.dar.mê) Çil rojên çilikan.

**Çilî** ( n.x.nêr) Ta û belgên daran, nexasim dara berî û mazî, bo xwarina kewalan û çêkirina kepran mifa jê tê wergirtin.

**Çilîz** (hk.x.çewa) 1. Nîsek.2. Rezîl. Gemar. Şir.

**Çilkandin** (k.jn.dar.mê) Dilop jê êxistin. Werandin.

**Çilkîn** (k.jn.x.mê) Kevtin, werana dilopan. Kevtina çipikan.

**Çilm** (n.x.nêr) Kilmîş.

**Çilmisîn** (k.jn.x.mê) Çirmisîn.

**Çilmkirin** (k.jn.l.mê) Kifkirin. Kilmîşkirin.

**Çilp** (n.x.mê) Demgê devî li dema xwarinê. Lemç.

**Çilpandin** (k.jn.dar.mê) Tama devî xweşkirin.

**Çilpeçilp** (n.dar.mê) Çilp. Lemçelemç.

**Çilpeçilpkirin** (k.jngl.mê) Çilpandin.

**Çilpîn** (k.jn.x.mê) Dengê çilpêna devî.

**Çilqandin** (k.jn.x.mê) Şilqandin. Bi çilqîne.

**Çim** (n.x.nêr) Binê pêlavê yê ko di kevit bin panîya pêyê mirovî.

**Çima** (perb) *rêzman* Alavê pirsînê. Çewa. Çawa.: Tu çima na hêy ahenga me?. :Ezê çima qencîya wî jibîr bikim?.

**Çiman** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê pirsînê. Çima.

**Çiman** 2 (k.jn.x.mê) Çeman. Çemyan.

**Çimandin** (k.jn.dar.mê) Çemandin.

**Çimbil** (n.x.mê) Destkên ceran, qazanan , dulkan. Htd. : Çimbilkê mesînî şikest.

**Çimçir** (n.dar.mê) 1. Hêzik[hêsk].Colandik. Dolîdank.2. Mencenîq.

**Çimçolk** (n.dar.mê) Hêzik. Colandik.

**Çimento** (n.x.mê) Çîmento.

**Çimkî** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo sedeman bi kar di hêt. Çunkî.

**Çinar** (n.x.mê) *darûbar1*.Dareka bi xemil û ciwane li ser avan şîn di bit belgêd wê pan û pencpencin. 2. Navê kiçane.

**Çindik** (n.x.mê) Xwe havêtin. Lotik.

**Çing** (n.x.mêr) Dengê zingêna asinî. Ting. :Dengê çinga hefsarê hespî di hat guhê mirovî.

**Çingeçing** (n.dar.mê) Çnigên. :Çingeçinga dolabê.

**Çingên** (n.dar.mê) Zingên.

**Çingil** (n.x.nêr) Zendûbas. Çeng. Hingil.

**Çinî** (n.x.mê) Pirt û parçeyên nanî yên jiber xwarinê di mînin. : Kurê min, here çinîyêd nanî dane ber kewalan.

**Çinîn** (k.jn.x.mê) 1.Jêkirina berê fêqî û mitayî. :Sube dê sêvan çinîn. 2. Navê keçane.(K) Bdn : ez di çinim em di çinîn. Tu di çinî hûn di çinin, ew di çine[…it] ewn di çinin. Pr. dê[bi]+ bdn. Bdb : di çinî, di çinîn. Db,dûr : çinîbû,... bûn. (F) :Bi çine, bi çinin.

**Çinko** (pêrb) *rêzman* Alavekê (sedem) jibo girêdana hevekan. Jiberko . jiber. :Ez nahêm cem te , çinko yê nexweşim.

**Çip** (n.x.mê) Dilopa avê.

**Çipçip** (n.l.mê) 1.Kit kit ketina dilopan. Dilopdilop. 2. Dengê dilopan.

**Çipik** (n.x.mê) Dilopên avê.

**Çipkirin** (k.jn.l.mê) 1. Dema çipik ji erdekî di kevin. dema xanî dilopan dike. 2. Zepkirin. Girtin.

**Çipo** (gaz.n.dar) Naznav û navê bangkirin yê zelamê lenger.

**Çiqas** (pêrb.l) Alavê pirsîna çendî yê.Çend. Herçend.

**Çiqil** (n.x.nêr) Çeqê daran. Tayê daran.

**Çir** (hn.x.çewa)1. Madeyekê nwîsek, bi tiştî ve di mînit.2. Tiştê ron piştî ava wî kêm di bit.Kizir.

**Çira** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê pirsînê. Çawa. Çima. :Çira te wa kir ?.

**Çira** 2 (n.x.mê) Lempe. Ronanahî. Find. 2.Navê keçane.

**Çiran** (n.x.mê) Diran. diryan. : Pate çira. Di çire, di çirin.

**Çirandin** (k.jn..dar.mê) Dirandin. : …..cilikêd xwe çirandin.

**Çirav** (n.dar.mê) Cihên ji egera baranê av lê di pengit.

**Çirçire** (n.dar.mê) ***giyandar*** Candarekê biçûke, bi ziyane, liser mêwên tirî û darên fêqî dijît. Çirçirk. Çirçirok.

**Çirçirk** (n.dar.mê) Çirçire.

**Çirçirok** (n.dar.mê) Çirçire.

**Çirên** (n.dar.mê) Dengê dirîna pero, kaxezan. Dengê çirçirê jê hatin. :Fîstanênê wê rakêşa bo çirên jê hat.

**Çirçoye** ( hn.dar.çewa) Rojên pir sir, seqem û befir baran gelek di barin.

**Çirik** (hn.x.çewa) Fîşek yan guleyên ne teqin.

**Çirikandin** 1 (k.jn.dar.mê) Deng û awazên teyr û çûçikan. Çûçik liser darê di çirikîne.

**Çirikandin** 2 (k.jn.dar.mê) Dengê têkhisûna didanan. :…. didanêd xwe bo şerî di çirikandin.(K) bed: ez di çirikînim em di çirikînîn, tu di çirikînî hûn di çirikînin, ew di çirikîne[…it] ewan di çirikînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb :di çirikand, di çirikandin. Db,dûr: çirikandibû, .. bûn. (F): bi çirikîne, bi çirikînin.

**Çirikîn** (k.jn.x.mê) Tehisandina didanan liser yek ta deng jê bi hêt, xasme dema nivistinê.

**Çirisandin** (k.jn.dar.mê) Tiştekî bi çirisîne; bi teysîne.

**Çirisîn** (k.jn.x.mê) Teysîn. Birisîn.

**Çirî** (kn.dem.x.mê) Mehên payîzê.

**Çirîk** (hn.x.çewa) Mirovê nemerd. Çavteng. Ew zelamekê pir çirîke, naxwaze nanekê bi de mêvanekê. Br× Nandeh.

**Çirîkî** (n.dar.mê) Nemerdî.

**Çirîsk** 1 (n.x.mê) Pirteka biçûk ya agirîye ji darên sotî yan cigarê di peşit. Gurîyek biçûke ji egera lêkxişandina du tenên zivir peyda di be.2 Çembera hîvî,xewin û xwezîyê. 3. Navê keç û xortane.

**Çirîyapaşin** .(n.l.mê,hk.dem) Meha yazdeye .

**Çirîyapêşîn**(n.l.mê, hk.dem) Meha deh.

**Çirkandin** (k.jn.dar.mê) Dengê çikînê jê anîn. : Tilîyên xwe çirkandin. Teqandin. Qirçandin.

**Çirke** (hk.dem,n.x.mê) 1.Dengek biçûk. Demek kurt. Gavek. 2. Şêstêka xolgeha demhijmêrê.1/60.

**Çirt** (n.x.mê) Zibil yan zilqa teyr û tewalan.

**Çirtemîz** (hn.l.çewa) Pirmîz. Çirmîz.

**Çirtemîzî** (n.l.mê) Derdê pirmîzîyê.

**Çirûskandin** (k.jn.mê) Çirîskandin.

**Çirûskîn** (k.jn.x.mê) Çirîskîn.

**Çirxîs** (n.x.mê) *xwarin* Core xadeke ji arikê ceh û rûnê pezî di nav êk da di qelînin, nemaze li roja Xidir Ilyasê.

**Çiryan** (k.jn.x.mê) Diryan. Diran. :Cilikên birîndarî di berda çiyan.

**Çiryayî** (hk.dar.mê) Dirayî. Diryayî, xasme jibo ;cilik yan pateyên dirayî tê bikar anîn.

**Çişt** (hn.x.çewa) Gişt. Peyt. Zîx.Çeleng.

**Çiştbûn** (k.jn.l.mê) Zîxbûn. Peytbûn. (K) bn: Bûn.

**Çiştî** (n.dar.mê) Peytî. Zîrekî.

**Çit** (Pêrb.alv.pisyar) Di lîztika çitûkitanê da, ang; çi têda ye?. Çi di destê min da heye, cot yan kit?

**Çitandin** (k.jn.x.mê) Hajotina kewalan. :Çite nêrîyê kever!.ango; here!. BR×Wiştandin.

**Çitûkitanê** (n.l.mê) Lîstoke zarokek, mazî, tebel[mat] û htd, dê êxit di destên xwe da û dê miçînin, şanî hemberê xwe de, û bêje çit?. Hemberê wî dê bêjit cot yan kit, heger mîna wî gotî derkevt, ango wî bir û dê hemû mat yan mazî jibo wî bin lê heger şaş derkevt kanê çend di destan da hene dê hindî wan bide hemberê xwe.

**Çivêl** (hn.x.çewa) Yê herdem yarî û henekan di ke, caran ji tixûban derdikeve.

**Çivên (** n.x.mê) Dengê çûçikan.

**Çivir** (hn.x.çewa) Teqin yan hevîr, piştî vestirînê piçek zuha di bit. : Teqna çivir bo avahîyan ya başe. Kizir.

**Çivîk** (n.x.mê) Çûçik.

**Çivîn** (k.jn.x.mê) Xwendina tewalan. Dengê çûçikan.

**Çix** (n.x.mê) Renîya befirê.

**Çixt** (hn.x.çewa) Peyt. Zivt. Zîx. Çîst.

**Çi<u>ya</u>** (cugirn.x.nêr) 1. Bindayîyên bi kevir, dar û av. Şax.2. Navê mêrane. ***Pend*** :Xwedî çiya di bîne, lewra befirê lê di barîne. ang ; tiştê bihêt rêya mirovî binasêd mirovî bi xwe ne. ***Pend*** :Çiya bi çiya na kevin, lê çav her dê bi çavan kevin.ang ; hindî ji hev dûr bin her dê gehin hev.***Pend*** :Ez çiya û tu çiya golik ma bê giya.ang; heger her kes xwe mezin biket, çi kespan neket, ziyanê di gehit hemûyan.***Pned*** :Çiyayêd mezin bê befir nabin, newalêd kûr bê av nabin.

**Çiya<u>nişîn</u>** (devern.l) Xelik ê çiya. Çiyavan.

**Çiya<u>qaf</u>** (n.l.nêr) ***kevineşop*** Çyayê qafê Çiyayekê evsaneyî ye gelek mezin asê ye di çîvanokanda heye. :Mala kiralî li pişta çiyayê qafê ye, ke na gehitê !.

**Çiya<u>van</u>** (n.dar.dz) 1. Xelik ê çiya. 2. Pehlewanê bi werîsan hil di bit çiya. 3. Navê mêrane.

**Çiya<u>yî</u>** (devern.dar) 1. Xelik ê çiyay. 2. Navê mêrane.

**Çizan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Xîçkirin. Xîç di bin ra kêşan.

**Çi<u>zên</u>** (n.x.mê) Dengek hêdî zirave caran ji guhên mirov di hêt.

**Çî** (perb) *rêzman* Alaveke jibo piyarkirinê bi kar di hêt. ***Pend*** :Çî gotina min kir, te xwe di ber ra kir.

**Çîç** (n.x.mê) Şana hingivî. Sîs.

**Çî<u>çal</u>** (n.x.mê) Çîçelk.

**Çî<u>çek</u>** (n.x.mê) Gul. Gulçîçek.

**Çî<u>çik</u>** (n.x.mê) ***tewal*** Giyandarek , wala(tewal)e firindeye hêk kere û biçûke. ***Pend*** :Çîçik bixwe çi nîne, heta bezê wê tiştek bit.

**Çîç<u>kek</u>** (hn.çend) Piçek. Hindik.

**Çîk** (n.x.mê) Berek yan darek mezine, di yarîya çîkanê da, di kin nîşan.Çîng.

**Çîkan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Qîjandin. Hewarkirin.

**Çîka<u>nê</u>** (n.dar.mê) Yarîyek [lîztin]e, zarok di bin du bir , yek liber çîkê di mîne û ya din xwe di veşêre, bira liber çîkê dê xwe parve kin, hin dê mînin û hin dê çin li bira hevdijê xwe gerin tanî hindekan ji wan di girin, evca dê ew kevin ber çîkê, lê heger nekarîn bira veşarî peyda bikin û bigirin, yek jiwan dê hêt bi dizîve destê xwe li çîkê bi de dê dubare serkevin herin xwe vêşêrin.

**Çîlan** (n.x.nêr) Hiçik.

**Çîlik** (n.x.nêr) Takên darî.

**Çîm** (n.x.nêr) Giya. Hişînayî.Çîmen.

**Çîmen** (n.x.mê) Cihê şînkatî û ciwan .Mêrg. Bax.

**Çîmento** (n.x.mê) Çimento.

**Çîmenzar** (n.dar.mê) Çîmen.

**Çîn** 1 (hk.cih.cugrn) Welatê çînîyan. Welatê Çînê.

**Çîn** 2 (n.x.nêr) Nexş. Nîgar.

**Çîn** 3 (n.x.mê) Texe. : Çîna karkeran.

**Çînî** (nejadn.n.dar) Xelik yan mitayê ji Çînê.

**Çînkirin** (k.jn.l.mê) Nîgarkirin.

**Çînko**(n.x.mê) Amanên bi rengek likeyî tamdayîn.

**Çîr** 1 (hn.x.çewa) 1.Bizina mûyê wê sipî. 2.Sipî.Mirov nexasme keça por zer û sipî. Kej.

**Çîr** 2 (n.x.mê) Çendbarekirina axivtinê. Çîrok.

**Çîrdirêj** (hk.l.çewa) Mirovê pirbêj. Mirovê gotinekê çendbare di ke. :Çîrê bes dirêj ke, te em gêj kiîn!.

**Çîrê** (n.dar.gazkirin.mê) ***naznav***.1.Bizina çîr.2. Keça porzer. Sîs.

**Çîrên** (hn.x.mê) Dengek taybetîye, mîna ; dengê dergehî .çîrêna dergehî. Penceran û htd.

**Çîro** (ngazkirin.dar.nêr) ***naznav*** 1.Nêrîyê çîr. 2. Mêrê porzer.Sîs.

**Çîrok** (n.x.mê) Vegêrana bûyeran bi awayek hûnerî. Serhatî. Rûdan. Serpêhatî.

**Çîrokbêj** (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di bêjit.**Çîroknivîs** (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di nivîse.

**Çîrokvan** (pîşn.dar.dz) Kesê çîrokan di nivîse. Çîroknivîs.

**Çîst** (hn.x.çewa) Zîx. Peyt.

**Çît** (n.x.nêr) 1. Perokek sipîye. Nifs.2. Xêlî. Poşî. Hîşar.

**Çîtare** (n.x.nêr) Peroyêd çîtî.

**Çîv** (n.x.nêr) Dareke mirov di destê xwe di girit. Destedar. ***Pend*** :Çîvê stûre, tixûb dûre, çîvê zirave tixûb ave.

**Çîvhavêj** (hk.dar.çewa) Mirovê çîv di havêje.

**Çîvanok** (n.x.mê) Serhatî û çîrokên evsaneyî û pîrhevîyan.

**Çîvçîv** (n.dar.mê) Dengê çûçikan. Çîwçîw.

**Çîvçîvkirin** (k.jn.gl.mê) Çûçik awazan di xwînin. Çivîn.

**Çivîn** (k.jn.x.mê) Çîvçîvkirin.

**Çîye** (pêrb) *rêzman* Alavê pisyarkirinê. : Ev çîye? Te çîye?. Navê te çîye.

**Çîzçîz** (nl.mê) Dengê çîzêna çûçikan. Dengê mişk û curdan.

**Çîzên** (n.x.mê) Dengek taybet û zirav, wek dengê teşkên çûçikan .

**Çîzok** (n.x.mê) Zîlkê ji nû hişînbûyî, yê giyayî û derketina bistîka êkê.

**Çok** (n.x.nêr) *leş* Geha navbera baq û ranî.



**Çok**

**Çokdanan** (k.jn.l.mê)Dema mirov liser çokêd xwe di raweste hember dujmin û serê xwe şor di ket. (K) bn:Danan.

**Çokdaner** (karn.dar.dz) Kesê xwe jibo neyaran di tewîne. Xwefirotî.

**Çokşikên** (hk,rd.dar.çewa) Kesê axivtinêd wesa dike ko dilê xelkî pê di şkê. Şeqilşikên.

**Çol** (n.x.nêr) Aqar.: Ew bi şev li çolî raza, ji ber ko gund û avayî li nêzîk tunebûn.

**Çolanê** (n.dar.mê) Lîstikeke, çend xîçên wekhev liser cihek rast di kêşin dirêjîya gavekê, zarok liser lingekî berê çole bi pêyekî ji xîçan derbaz di kin, li navbera hinekan bêhina pêyên xwe ve di din.

**Çole** (n.x.nêr) Berekê pan biçûke zaro yarîya çolanê pê di kin.

**Çolistan** (n.dar.mê) Cilê çol û bê avahî.

**Çolî** (n.x.nê) Navê mêrane.

**Çom** (n.x.nêr) Çem. Robar.

**Çoman** (cugirn.cih) Bajêrkek Kurdistana Iraqê ye.

**Çune** (hijmar.n) Tune.Nîne. Neyînî. Sifir.(0). 2-2=0.

**Çong** (n.x.nêr) *leş* Çok.

**Çop** (n.x.mê) Lastîkeke pirî baye di nava tayêrên tirombêl û paysiklan daye.

**Çor** (n.x.mê) teyr Por.

**Çox** (n.x.mê) Çoxik

**Ç<u>oxik</u>** (n.x.nê) Cilikek stûr û bê hiçik. êlekeke ji hiryê çêkirî ye.

**Çun<u>kî</u>** (pêrb) ***rêzman*** Alavê eger(sedem)ê ye, Jiber ko. Lewra. Jiber hindê. : Ez ne çûm xandingehê, çunkî[çunko] yê nexweş bûm.

**Çurta<u>nok</u>** (n.dar.nêr) Perçe hestûyeke di keve ser çokê mirovî.Serçok.

**Çû<u>çik</u>** (n.x.mê) Civîk. Çwîçik.

**Çûk** (n.x.mê) ***balinde*** Sivandok.

**Çûk<u>reş</u>** (n.l.mê) ***balinde*** Hacîreşk.

**Çûn** (k.jn.x.mê) Livîn ji cihekî bb yê dî. ***Pend*** :Çû ser avê av lê hişk bû.Ang; bêşensî. (K) bdn : Ez di çim,em di çîn, tu di çî hûn di çin, , ew di çe[çit] ewam di çîn. Pr : dê [bi] çim, çin, çî. Bdb : ez di çûm, em di çûyn [çûn] tu di çûy, hûn di çûn. Db,dûr : çûbûm, ..bûyn, ..bû,..... bûn.(F): Bi çe, (bi çû), bi çin[ here. Herin] .

**Çûn<u>ava</u>** (k.jn.l.mê) Binavbûn. Niqobûn.

**Çûne<u>ve</u>** (k.jn.dar.mê) Dubare çûn cihekî. Vegeran mal.

**Çûnû<u>hatin</u>** (k.jn.l.mê) Bizivîna du serî.ang ; mirov bi çit cihekî û vegerit. Hatinûçûn. Piyase.

**Çûşandin** (k.jn.x.mê) Rawestandin dewaran. Şûşandin. Gotin dewaran çûş.

**Çwîv** (n.x.nê) ***dar***. Darekê di destê xwe di girin.

# D

**D** (de) pîta pêncê ji abeya kurdî.

**Da** 1 (n.x.mê) 1.Dayk. Deyk.2. Gazîkirina daykê.

**Da** 2 (pêşpirt) Pêşpirteke di keve berî kiryaran, mîna ; dakirin dahînan, daqutan. Daleqandin. **Da** 3 (pêrb) Alavê eyînî,ang ; erê. Bêlê.

**Dab** (n.x.mê) Rewuşt.

**Dabarîn** (k.jn.dar.mê) Barîn.

**Dabaş** (n.x.mê) Danûstandin. Babet. Mijar.

**Dabaşkirin** (k.jn.l.mê) Danûstandinkirin. Hûrnêrîn. Lêgeran.

**Dabeşbûn** (k.jn.l.mê) Parvebûn. Pişkbûn. Pirtbûn.

**Dabeşkirin** (k.jn.l.mê) Parvekirin. Lêkvekirin. : Mamosta defter û qelem liser xwendekaran dabeşkirin. (K) bn : Kirin.

**Dabêş** (n.x.mê) Dabaş.

**Dabêşkirin** (k.jn.l.mê) Dabaşkirin.

**Dabilandin** (k.jn.dar.mê) Dahîran.

**Dabinartin** (k.jn.dar.mê) Darûbar çandin. Binaxkirin.

**Dabiristin** (k.jn.dar.mê) Milên xwe dane hev û rêzbûn. Rêzbûn. bi rêzbûn.

**Dabînkirin** (k.jn.dar.mê) Peydakirin. Misogerkirin. (K) bn: Kirin.

**Dabûn** (k.jn.dar.mê) Niqobûn. binavbûn.

**Daçek** (n.dar.mê) *rêzman* Pêrbest.

**Daçikandin** (k.jn.dar.mê) Çandina tayên daran. Çiklandin. Çandin.

**Dad** (n.x.mê) 1 Perwer. Rastî. Parastina mafan.2. Alavê peşêmanîyê.

**Dadan** (k.jn.dar.mê) 1. Girtin. Daxistin. : Derî dade. 2. Paldan. Rahavêtin. : Hêskê dade. 3. Li peyçûn. li dû çûn. (K) bn: Dan.

**Dadbexş** (hn.l.çewa) Mirovê rasrew û dilovan.

**Dadê** (ngaz,hd.dar.mê) Gazîkirin û nazandina daykê.

**Dadgeh** (n.dar.mê) Xanîyê, Cihê kar û rûniştina dadvanan. Dadgeha serbazî.

**Dadger** (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî qanûn û li dadgehê kar di ke. Dadvan.

**Dadgehîkirin** (k.jn.l.mê) Li dadgehê derbazkirina biyara kesekî çi gunehbar yan bê guneh.

**Dadî** (n.dar.mê) Rastî. Dadperwerî. Wekhevî.

**Dadmend** (n.dar.mê) Rastgo. Dadvan.

**Dadperwer** (n.l.çewa) Dadvan.

**Dadperwerî** (n.l.mê) Dadî.

**Dadvan** (pîşn.dar.dz) Dadperwer. Dadger.

**Dadok** (n.dar.mê) Kesê çavdêrî yan sexbêrîya zarokan di kit. Li ber zarokan di mînit.

**Daf** (n.x.mê) Dav.

**Dager** (n.dar.dz) Nêrevan. Zêrevan. Berpirs.

**Dagerandin** (k.jn.dar.mê) Zivrandin. Vegerandin.

**Dagerîn** (k.jn.dar.mê) Vegeran. Vegeryan. Zivrîn.

**Dageryan** (k.jn.dar.mê) Dagerîn.

**Dagirtin** (k.jn.dar.mê) Pirkirin. Tijîkirin. : Cewal ji mêwîjan dagirt. Zikê xwe dagirt.

**Dagîrker** (karn.dar.dz) Kes yan desteyek malê û welatê mirovî ji xwere bi gire.: Rijêmêd Turk, Iran û Ereb,dagîrkerên Kurdistanê ne.

**Dagîrkirin** (k.jn.l.mê) Dest biserde girtin. : Kurdistan ji alî çar rijêman ve hatîye dagîr kirin.(K) bn: Kirin.

**Dahatin** (k.jn.dar.mê) Hatin xwar. Nizimbûn. Av ya dahatî. Êvitîna birînê ya dahatî;ang . ya kêm kirî. Hatî xwar.(K) bn: Hatin.

**Dahatî** (n.dar.nêr) Pere û berê keda destê mirovî yan dezgeha mirov lê kar di ket, di gehit heftane, mehane, salane.

**Dahatû** (n.dar.nêr) Dahatî.

**Dahênan** (k.jn.dar.mê) Avirandin.

**Dahêner** (pîşn.dar.dz) Kesê avirandinê di ke. Dahênanan dike.

**Dahilandin** (k.jn.dar.mê) Weke mirov tiştekî jorda bihavêjit. Şorkirin.Dahêlan.

**Dahiştin** (k.jn.dar.mê) Bêdeng rawestan. Hûrik hizir liser kirin. Mitbûn.

**Dahîran** (k.jn.dar.mê) Kiryareke xwerin û vexwarina ji devî di çe nav gedeyê mirov û giyandaran. (K) Bdn: ez (di) dahîrim em dahîrîn, tu dahîrî hûn dahîrin, ew dahîre[…it] ewan dahîrin. Yan dia di hîrin. Pr : dê da[bi] hîrim, hîrîn, hîrî, hîrin, hîre[…it], hîrin. .Bdb: di dahîra (dadihîra) di dahîran(dadihîran). Db,dûr: dahîrabû,….bûn. (F): da bi hîre, da bi hîrin. Yan bi dahîre, bi dahîrin.

**Dahol** (n.dar.mê) *alavê* ***mûzîkê*** Dihol.

**Daketin**-kevtin (k.jn.dar.mê) Serjêrbûn. Ber bi xwar kevtin.

**Dakêşan** (k.jn.dar.mê) Dema du giranîyêd wek hev hember yek di terazî yan destan de danin, yek ji ya din girantir be; ango ya giran ya sivik di dakêşe. Bo binî kêşan. (K) bn: Kêşan.

**Dakirin** (k.jn.l.mê) Giyandar kirine jor , hajûtine jor. Pez dakir. Bizin dakir. Radan nav.

**Dako** (pêrbest) ***rêzman*** Alavê sedem û encamî. Jiberko. Lewra. Jibona.: Em xwarinê di xwen dako ne mirîn.Ez hatim dako te bi bînim.

**Dakutan** (k.jn.dar.mê) 1.Darê di hejîne ta fêqî bi keve erdî. 2.Lihêf, nalîk, pero û htd dadiweşînin jibo toz ji nav derkeve.Werandin.

**Dal** (n.x.mê) Gelî. Newal. Nihal. Dol.

**Dalan** (n.dar.mê) Ciheke navbera dîwaran ber bi avahîyan ve diçe. Rêya hatin yan çûn a jûr. Bersivka awayê wê dirêj û lakêş, bazin ,çarkujî û htd.

**Dalehî** (n.dar.mê) Rexne yan gazinde bi awayekê nazik, xasim di nav mal û hevalan da, bêy ko hemberê mirovî sil bi be. Bisteyî.

**Dalehîkirin** (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Xwe biste kirin. (K) bn: Kirin.

**Daleqandin** (k.jn.dar.mê) Çikilandidn. : Alaya xwe daleqand. Hilawîstin. Li sêdardan. Mirandin. (K) bn: Leqandin.

**Daleqîn** (k.jn.dar.mê) Sêdardan. Hilawîstin.

**Dalho** (n.x.nêr) Helamet. Mamikê nav rez û baxan.

**Dalistin** (k.jn.dar.mê) Alîstin. Mêtin.

**Dalîkerxur** (n.dar.mê) ***balinde*** Qelereşk.

**Damaliştin** (k.jn.dar.mê) Damalîn.

**Damalîn** (k.jn.dar.mê) Bi carekê rakirin û paqijkirin.

**Daman** 1 (k.jn.x.mê) Paşde man. Veman. Posîdebûn. Bêgêwilbûn.

**Daman** 2 (n.x.mê) Dehmen.

**Damanê** (n.dar.mê) Yarîya damê[dameyê].

**Damanêkirin** (k.jn.l.mê) bi Damanê lîstin.

**Damar** (n.x.mê) Demar.

**Dame** (n.x.mê) 1. Sindoqa dameyan.2. Lîstikeke bi daman di hêt kirin.

**Damelîztin** (k.jn.l.mê) Damanê. Damanêkirin.

**Damezrandin** (k.jn.dar.mê) Diristkirina part, deste û navendan. Li sala 1946 ê PDK hatîye damezrandin. Ang ; Avakirin. (K) bdn :ez [da] dimezrînim em dimezrînîn, tu di mezrînî hûn di mezrînin, ew di mezrîne[..it] ewan di mezrînin. (F) da bi mezrîne ….nin.

**Damilandin** (k.jn.dar.mê) Daxistin. Girtin.

**Damxe** (n.dar.mê) Mor.

**Damxekirin** (k.jn.l.mê) Morkirin. (K) bn: Kirin.

**Dan** 1 (k.jn.x.mê) Ttiştekî bidey êkî. (K) bdn: ez di dim em di dîn ,tu didî hûn di din, ew di de […it] ewan di din. Pr: dê [bi] bdn. Ber,db : di da, di dan. Db,dûr. Dabû, …bûn.(F): bi de , bi din.(bi den).

**Dan** 2 (n.x.nêr) Tov û dindikên genim, ceh, nîsk û htd.

**Dan** 3 (hk.dem) Demroj. Sê danên rojê, mîna ; Danê sipêdê. Danê nîvro. Danê êvarî.Danê salê, mîna bihar havîn bayîz û zivistan.

**Dana** (n.x.dz) 1. Xîçêd li şûna birînan liser leşî di mînin. 2. Navê mêrane.

**Danan** (k.jn.dar.mê) 1.Mirov tiştekî dane cihekî. : Kitêbê dane ser mêzê. Zadî dane. Cilikên xwe danan. Çek dana. Danîn.Liser erdî raxistin. 2. Têwerkirin. Havêtin. : Heger tu ne rawestî ez dê berekî danim te.Danîn.3. Avakirin. :Danana navenda civakî.

**Danasîn** (k.jn.dar.mê) Xwe dan nasîn. Pêşkêşkirin.

**Danberçavan** (k.jn.gl.mê) Xistine ber çavan.Şanîdan. Nîşadan. Xuyakirin. Ronkirin. Zelalkirin.

**Danberhev** (k.jn.gl.mê) Hevberkirin. Danan hember hev. Rûbirûkirin.

**Dane** (n.x.mê) Pişk. Mînak.

**Danedest** (jn.k.l.mê) Mirov tiştekî bi de destê yekî. :Kesekî yan girtîyekî bi dî destê alî yan kesekî. Pêşkêşkirin. Radestkirin. :Gunehkarî xwe da dest polîsan.

**Daner** (karn.dar.dz) 1. Kesê kitêb yan nivîsekê di danit.Kesê xwedî berhemek nivîskî.2. Navê mêrane.

**Danezan** (n.l.mê) Danpêdan. Derxistin. Daxuyan.

**Danêr** (pîşn.dar.dz) Dadvan.

**Dang** (n.x.mê, hk.cih) 1. Dehmen. 2. Cihê çerandina kewalî li zivistanê. 3. Bin. Jêr. : Gundê me li danga çiyaye.

**Danhev** (jn.x.mê) Vecemandin. Pêkvekirin. Pêkguhêrîn.

**Danhêrk** (n.l.mê) Core xwarineke ji genimê hêrayî çê dikin ji savar hûrtire.Danhêrkê kelandinê .Danhêrkê kutilkan.

**Danik** (n.dar.mê) Dindik. Tov. Dan.Tomik.

**Danîk** (n.dar.pir) Genimê kelandî û nerim yê jibo savarî di kelînin û bi germî têt xwarin.

**Danîn** (k.jn.dar.mê) Danan.

**Danînberçavan** (k.jn.gl.mê) Li ber çavan danan. Nîşadan.

**Danînberhev** (k.jn.gl.mê) Hevberkirin.

**Danişgeh** (hk.cih,n.l.mê) Zanîngeh. Zanko.

**Danîştin** (k.jn.dar.mê) Rûniştin.

**Dankujtin** (k.jn.l.mê) Biryara kujtina êkî bi dî û bi destê yekî bi kujî. : Dujminêd dagîrker kurdan bi destêd kurdan di din kujtin. (K) bn: Kujtin.

**Danmêr** (k.jn.l.mê) Daybab yan seyman keça xwe di din mêr. Danşû.

**Dannasîn** (k.jn.l.mê) Mirov xwe yan hevalekî bi de nasîn, ango navnîşanana wî bi dit xuyakirin : Ev hevalê mine, navê wî Hêjaye.

**Dannivîsandin** (k.jn.l.mê) Nameyek yan nivîsek ji alî kesekî yan dezgehekî ve jibo mirovî bi hêt nivîsîn.

**Danqut** (n.l.mê) *Xarin* Xwarineka nemazeye, ji genimê qutayî û sivî jê kirî dirist diken, di gel nok, goşt û hindek corên giyayî di lênin.

**Danpey** (jn.k.l.mê) Kevtin dû. Li şopa wî/wê çûn. : Me da pey wan.(K) bn: Dan.

**Danpêdan** (k.jn.l.mê) Karek yan biryarek dema ji alîyê kes, navend û welatek dî bi hêt pejirandin yan pesendkirn. Nasîn.

**Danrê** (jn.k.l.mê) Bi rê kevtin. : Demhijmêr pêncî êvarê me da rê, nîvşev em gehiştîn qonaxê.

**Dansal** (n.l.mê) Danêd salê. Werz. Demsal.

**Danû** (n.dar.mê) Danîk.

**Danûstandin** (jn.gl.mê) Miştûmir. Gengeşe. Hevrikî.:Jiyan dan û standine.

**Danûstandinkirin** (k.jn.gl.mê) Miştûmrkirin. Gengeşekirin. Cirekirin. :Danûstandin di nvabera me û wan da di hên kirin. (K) bn :Kirin.

**Dansal** (n.l.nêr) Danekê salê. Werzek salê. :Vî dansalî me libere em bi çîn zozanan.

**Danyar** (n.dar.dz) Daner. Nivîsevan.

**Dapaçîn** (n.dar.mê) Nîşana jêbirinê. (-).

**Dapalandin** (k.jn.dar.mê) Palavtin. Parzinîn.

**Dapalandî** (hk.dar.çewa) Hatî parzinîn. Parzinî.Dilopandin.

**Dapalîn** (k.jn.dar.mê) Parzinîn. Dilopandin.: Şîr dapaland; ango li patekî kir jibo ko ji gilêşî pakij bi bit.

**Dapîr** (n.l.mê) Dayka babê yan dayka daykê. Dayka pîr. Dayka mezin.

**Dapîrk** (n.l.mê) Jina sexbêrîya zarokê nûhatî dikit û navika wî di birit.

**Dapîrûşk** (n.l.mê) Jina sexbêrîya zarokê nû ji daykbûyî di ke.

**Daposî** (hk.dar.çewa) Nixavtî. Sergirtî. :Qazana dapoşî.

**Dapoşîn** (k.jndar.mê) Nixavtin. (K) bdn: ez da di poşim em da di poşîn, tu da di poşî hûn da di poşin, ew da di poşe ewan da di poşin. Pr : dê da bi+ bdn. Bdb: da di poşî, da di poşîn. Db,dûr: Dapoşîbû, … bûn.(F): da bi poşe da bi poşin.

**Daqulandin** (k.jn.dar.mê) Dabilandin. Dahîran. : Parîyê nan daquland.(K) bdn : ez (di) daqulînim em daqulînîn, tu daqulînî hûn daqulînin, ew daqulîne[..it] ewan daqulînin, yan da(di) qulînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di daquland, di daqulandin. Db,dûr : daqulandibû,..bûn.(F) : da bi qulîne, yan bi daqulîne, da bi qulînin, yan bi daqulînin.

**Daqurçandin** (k.jn.dar.mê) Daqulandin.

**Daqurtandin** (k.jn.dar.mê) Daqulandin.

**Dar** (n.x.dz) 1 Riwekek mezine, hişîn di bit bi rih, qurm, ta, çeq û bi ta û belgan hatîye xemlandin. : Dara berî, mazî, sêv û htd. 2 Cwîv. Destedar. Darê hişik. ***Pend*** :Kirim ê darê ne ji darê be, nemana wê nîne. ***Pend*** :Dar di bin xwe ra birîn.ang ; karek ji xwe mezintir û bive bi hêt kirin.***Pend*** :Dara xozîyan ya xirşe. ***Pend*** :Dara sîberê li xo ne ke.ang ; mirovê bêzax.

**Dara** (n.x.nêr) Navê mêrane.

**Darayî** (n.dar.mê) Diravî.

**Darbe** (n.x.mê) Bizaveka leşkerî dijî deshelatekê û wergiritina wê bi rêya çekî yan pesta xelkî. Gurz.Kodeta.

**Darbekirin** (k.jn.l.mê) Gurz lêdan. Jinav birin. (K) bn : Kirin.

**Darbend** (n.dar.nêr) Banê bi daran hatî bendkirin, Ranan. Ban.

**Darbendkirin** (k.jn.gl.mê) Girtina banî bi daran. Nixavtina banî. (K) bn: Kirin.

**Darberî** (n.l.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê ya mîşeye û çembera neteweyîya kurdane.Dara berî.

**Dar<u>best</u>** (n.l.mê) Texteke ji daran hatîye çêkirin, berikek yan patekî di raxin, birîndar yan mirîyan liser di danin mirov ra di kin. Darterm.

**Dar<u>bir</u>** (karn.dar.dz) Kesê daran di bire.

**Dar<u>birîn</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov daran di bire. Darperçekirin. (K) bn: Birîn.

**Dar<u>cigark</u>** (n.l.nêr) Darkek kunkirî(simtî), serekê wî cigarê di êxinê û yê dî di kene di devê xweda dwîkêla cigarê têra hi di kêşin. Basik. :Darcigarkê bapîrî ji darê kinêre.

**Dar<u>çîn</u>** (n.l.mê) Giyeke tamxweşe di kin nav xwarin û vexwarinan.

**Dar<u>darok</u>** (n.l.mê) Darîqoz. Hophopk.



**Dardarok**

**Darde<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Li sêdarê dan. (K) bn: Kirin.

**Dar<u>dînk</u>** (n.dar.mê) Darekê dutaye, serê wî yê stûr di erdî ra kirîye û du serên din serevrazin,alîka terşî mîna çilî, rwîsî, giya û htd dixin nav jibo candar bi sanahî bi gehinê û bi xun, herwesa da ne keve erdî û pîs ne bi be.

**Dare<u>van</u>** (karn.dar.dz) Darvan.

**Dar<u>firoş</u>** (pîşn.l.dz) Kesê daran di firoşit.

**Darfiro<u>şî</u>** (karn.l.mê) Karê firotina daran.

**Darfiroş<u>tin</u>** (k.jn.l.mê) Firotina daran. Darfirotin. : Çendîn salan karê wî darfirotin bû.

**Da<u>ring</u>** (n.dar.mê) Made.

**Darin<u>gî</u>** (hn.dar.çewa) Tiştê madeyî.Keresteyî.

**Daris<u>tan</u>** (nl.mê) 1 Welatê daran. Cîyê pir dar. 2. Navê jinane.


**Da<u>rînk</u>** (n.dar.mê) Amanên darî. Qazana darî.

**Darîn<u>qûz</u>** (n.l.mê) Darek dirêje li ser khela darek din yan cihek bilind dana ye, du kes yan pitir li ser herêk ji serên wî di rûnin hevdu nizim û bilind di kin. Qirnaqûz. Hophopk.

**Darkarî** (karn.mê) Karê birîn , kirîn û firotina daran.

**Darkirok** (n.dar.nêr) Darkoke.

**Darkoke** (n.dar.dz) Giyandarek firindeye xwarina wî bahîv û fisteqin , dara kun di ke jibo hêlîlan yan veşarina xwarina xwe bû dem pêdvî. ***Pend*** :Tûba darkokey .kesê hercar biryar bide ko karekî bihêlit, lê roja din dîsan dubare bi kit.



**Darkoke**

**Darkunker** (n.l.mê) Amêreke bi destî yan têhna karebê kar di ke, jibo kunkirina dar, dîwar û htd bi kar di hêt. Mikare.

**Darkutik** (n.l.nêr) Darkoke.

**Darlastîk** (n.l.mê) çekê kujtina balindeyan ; ji darekê duçeq û du lastîk pêve girêdayîne û serên dî bi kevilkekî ve girêdayîne. Berikan di kin di nava kevilkî da ra dikêşin di balinde û çûçikan wer di kin. Qosk.

**Darmazî** (n.l.mê) Dara mazî, li çîyayên Kurdistanê heşîn di bit gelek ciwan û bi xemle.

**Darqesp** (n.l.mê) Dara qespê.

**Darqosk** (n.l.mê) Darekê duta(çeq) sipî û hulî kirîye, her rexekî lastîkekê di êxinê û her du serên dî yên lastîka bi alîyên kunkirî yên kevlekî di bin û girê didin. Qoskek jê dirist di bit.

**Dartaş** (pîşn.l.dz) Kesê karê dartiraşînê di ket. Pîşesazîya daran di ket. Wek diriskirina kentûr, qumsor, text û htd.

**Dartaşî** (karn.l.mê) Karê çêkirin û lêkdana kelûpelên navmalîyên ji darî di hên çêkirin; wek tex, dîwar, depebend û htd.

**Darterm** (n.l.mê) Darbest.

**Dartevin** (n.l.nêr) Yarîyeka dilvekere werîsekî bi darekêve di ken û serê din bi du alîyên darek qayîm û hulî ve girê di din, her serek darî mirovek liser radiwestit û werîsî digirit û li nîvê du, sê mirov di rûnin xwe di daweşînin dako dartevin bi hêt û diçit wek colankê û dartevinvan sitranan dibêjin.

**Dartevinvan** (karn.l.dz) Mirovên bi dartevinî di lîzin.

**Dartiraş** (kn.l.dz) Dartaş.

**Dartiraşî** (kn.dar.mê) Dartaşî.

**Dartû** (n.l.mê) Dara tûyê. Tû.

**Darvan** (pîşn.dar.dz) 1 Mirovê daran li çîya û çolan dara di birit bû sotinê û karên malê.2 navê mêrane. Êzingvan.

**Darvanî** (kar.dar.mê) Karê birîn, kirîn û firotna daran.

**Darxistin** (k.jn.dar.mê) 1.Li sêdarê dan. Hilawîstin.2. Rêxistin.

**Darxîç** (n.l.mê) Qamçî.

**Darxurme** (n.l.mê) Dara xurme. Dara qesp.

**Das** (n.x.mê) Amêreke hesinî, dev tîje destikek heye, jibo birîn û hildana daran bi kar di

**Dasî** (n.x.mê) Stirîyên havînê di nav pelexî da bi cil û delingên merivî ve di mînin.

**Dastan** (n.x.mê) Dîrok û serpêhatîyên qehremanî û mêrxasîyê û herdem li ser ezmanê xekîne .

**Daşandin** (k.jn.dar.mê) Daweşandin.

**Daşir** (n.dar.mê) Tewalêt.

**Dav** (n.x.mê) 1.Tayê bendikî. Tayê dezî. 2. Tora giritina çûçik ,kew û tewalên dî. 3.Pîlan.

**Davdoz**.(hk.l.çewa) Yê divêt her tiştî agehdar bit . nehecimtî. şareza. : Eve tu li vir çi dikî davdozo?. Eve çi pîremêrekê davdoze !.Matêker.

**Davdozî** (n.l.mê) Mêtêkirin.

**Davek** (n.dar.mê) Qayîş.

**Dawer** (pîşn.dar.dz) Dadwer. Dadvan.

**Dawerandin** (k.jn.dar.mê) Daqutan. Werandin. (K) bn: Werandin.

**Dawerîn** (k.jn.dar.mê) Weryan. Kevtin.

**Daweşandin** (k.jn.dar.mê) danan)lêdana) gurzek bi hêz ko weşên jê bi hêt.(K): ez dadi weşînim em dadi weşînin, tu dadiweşînî hûn dadiweşînin, ew dadiweşîne ewan dadiweşînin. (F): da bi weşîne da biweşînin, yan bi daweşîne, bi daweşînin.

**Daweşîn** (k.jn.dar.mê) Şilqan. Hijyan.

**Dawet** (n.x.mê) Dewat. Şahî. Govend.

**Dawetkirin** (k.jn.l.mê) Şahîkirin. Leyzîn. (K) bn: Kirin.

**Dawên** (n.x.mê) Dehmen. Dang. Lêv.

**Dawênpak** (hn.l.çewa) Dehmenpak. Hêja. Xwedî rûmet.

**Dawênpîs** (hn.l.çewa) Dehmenpîs. Bênamûs. Bêhetik.

**Dawiyandin** (k.jn.dar.mê) Bi dawî anîn. Bi dûmahîk înan. Kutakirin.(K) bdn : ez di dawînim em di dawînîn, tu di dawînî, hûn di dawînin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : di dawîyand, di dawîyandin. Db,dûr : dawîyandibû,..bûn. (F) : bi dawîne, bi dawînin.

**Dawî** (n.x.mê) Dûmahî. Br× Berahî.

**Dawîhatin** (k.jn.l.mê) Dawiyandin. Bi Dûmahîhatin. Kutabûn. (K) bn : Hatin.

**Dawîn** (hn.dar. çend) Ya dûmahîyê. Ya dawîyê. :Cara dawîn. Meha dawîn.

**Dawudkêdunikil** (n.gl.nêr) Core teyreke kumrek mîna nikil liser serê wî ye, mîna du nikilan xuya di ke. Teyrê Silêman pêxember.

**Dax** 1 (n.x.mê ) 1. Şûna (cihê) sotinê li ser leşî. 2. Kovan.

**Dax** 2 (hk.dem) *Kevin*; Roj. Br× Şev.

**Daxaz** (n.dar.mê) 1.Her tiştekê dilê mirovî bi vêt. Dest bû dirêj kirin. Viyan. Hîvî. : Daxaza min ewe ko tu yê çak û jî dirêj bî.2. Navê xort û keçane.

**Daxazî** (n.dar.mê) Daxaz.

**Daxazkirin** (k.jmê) Tiştê mirov daxaz bi ke.Tiştê mirovî di vêt. : Ez dê daxazekê ji te bi kem, ne bêje ne !. (K) bn :Kirin.

**Daxistin** (k.jn.dar.mê) Girtin. (K) Bdn: ez da dixim, en dadixîn, tu dadixî, hûn dadixin, ew dadixe, ewan dadixin.yan di (daxin). PR: dê bi daxim, daxîn, daxèxî, daxin, daxe, daxin. Bdb : Dadixist. Dadixistin, yan di daxist, di daxistin. Db,dûr: Daxistibû,..bûn. . (F) : daxe[dabixe] daxin[dabixin]. Yan bi daxe, bi daxin.

**Daxkirin** (k.jn.l.mê) Bi Hesin, pel yan bizotî cihekê leşî bi şewitînin dako bi hêt nîşakirin. Guhêd kewalan dax di ken dako bi hên nasîn. Birîn dax kir. (K) bn : Kirin.

**Daxme** (n.dar.mê) Mor.

**Daxmekirin** (k.jn.l.mê) Morkirin.

**Daxuşandin** (k.jn.dar.mê) Li erdî xişandin. Rakêşan.Xişkirin. Revandin.

**Daxuyanî** (n.l.mê) Tiştê di hêt xuyakirin bi nivêsîn. Ragehandin. Ronkirin.

**Daxwaz** (n.dar.mê) Daxaz.

**Daxwazkirin** (k.jn.gl.mê) Daxazkirin.

**Daybab** (n.l.pir) Dayîk û bab. Semyanên zaroyan.

**Dayê** (n.gazkir.mê) Dayîk.

**Dayîk** (n.x.mê) Xwedîya yek yan pitir zaroyan ko ji wê peyda bûne. . Da. Dadê.

**Dayîn** 1 (n.dar.mê) Jina li şûna deykê sexbêrîya zarokî di ke.


**Dayîn** 2 (k.jn.x.mê) Dan.: Pere dayîn. Xwarin dayîn.

**Daykemar** (n.l.mê) Bizinmişk. Bîkmarê mezin.

**Dazanîn** (k.jn.dar.mê) Diyarkirin. Xuyakirin. (K) bn: Zanîn.

**De** (hk.dem) Dê.

**Debance** (n.x.mê) Çekekê biçûke fîşek û guleyên nemaze di xwe. bo şer û berevanîyê bi kar di hêt. Demance. Werwere.



**Debance**

**Debar** (n.x.mê) Kar û koka jiyanê. Rêvebirin.Berhevî.

**Debarkirin** (k.jn.l.mê) Karê xwe kirin. Îdarekirin. . : Ez di karim evsal debara xwe bi kim, bêy pêdvî kesê bi bim. (K) bn: Kirin.

**Debe** (n.x.mê) Setil.

**Debeng** 1 (hn.x.çewa) Kêfxweş. Devkenî.Beşoş.

**Debeng** 2 (hn.x.çewa) Bêmejî. Sawîlke.

**Decal** (n.x.nê) Di çîrokên dînî da hatîye ko gîyaneyek xirab li roja dawîya dunyayê dê xuya bit, dema xwarin nemînit, ewî hemû corên xwrinê hene mirov gelek birsî(birçî)ye , lê yê nikarit xwe ragirit li dwîv biçit dê xwe ji xudê ket û kafir bit..

**Def** 1 (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrek mûzîkêye bazineyî, alekê wê bi kevilê gîyandaran dapoşîye û lêvên alê din bi xelekên hesinî rêz kirîne û bi destî lê di xin .

**Def** 2 (hk.cih) 2. Nik. Rex. Tenişt. Ba.Cem.: Were def min xorto. Li def me befir ya barî.

**Defandin** (k.jn.dar.mê) Li defê xistin.

**Defîne** (n.x.mê) Xizîne.

**Degme** (hk.dem) Caran. Carna. Hinde caran. Kêm caran.

**Degmen** (hn.x.çewa) Zehmet. Kêm.

**Deh** (hijn.çend) Hijmara 10 . 5+5= 10. ***Pend*** :Li deh avan derbaz bû , gozeka wî ter ne bû.

**Dehan** (hijn.çen.dar) Bi dehan. Dehcarkî. : Li pevçûnekê de bi dehan kes hatin kujtin.

**Dehbe** (n.x.nê) 1. ***dirinde*** Giyandarên(ginawir) dirinde yên goştxwer , terş û kewalan di xun. Wek gurg, heftiyar. 2.Mirovê kirêt û dirinde.

**Dehcarkî** (hijn.çend dar) Rûdanên bi dehan car dubare di bin.

**Dehem** (hijn.çend) Ya/ yê dehê.

**Dehik** (hk,çen.mê) 1. . Êk ji deh. 1/10. 2. Deh rojên bi xêr ko xelkê dindar niza û rojîyan di ken û di girin.

**Dehil** (n.x.nêr) Cihek tijî(pir) qerem, stirî, çeq û tiraş. ***Pend*** :Heger agir berbû dehlî, ter û hişk pêkve di şewitin(sojin). Ang ; heger kiryareka çewt rû bi ziyan di gehe de çak û xirab wek hev.

**Dehmen** (n.x.mê) lêvên kiras û kurtekan.

**Dehmenpak** (rd.l.çewa) Mirovê hêja û ji xwe şerimkirî.

**Dehmenpîs** (rd.l.çewa) Kesê ezmanreş, bê rêz û rûmet.

**Dehol** (n.dar.mê) Dihol.

**Deholjen** (karn.l.dn) Diholjen.

**Dehollêdan** (k.jn.gl.mê) Dihollêdan. (K) bn : Lêdan.

**Dehollêxistin** (k.jn.gl.mê) Dihollêdan. (K) bn: Lêxistin.

**Deholvan** (karn.dar.dz) Diholvan.

**Delak** (karn. x.dz) 1. Kesê li serşûxanan xizmeta xelkî di ke. 2. Sertiraş.

**Delakxane** (n.dar.mê) Sertiraşxane.

**Delal** (hn.x.çewa) 1.Xweşik. Rind. Ciwan. 2. Navê keçane.3. Navbij.

**Delalbûn** (k.jn.l.mê) Xweşikbûn. Ciwanbûn.

**Delalî** (kn.dar.mê) Keseke li meydankên kewal û dewaran navbijî ya kirîn û firotinê dike navbera xwedî û bikiran.

**Delalkirin** (k.jn.l.mê) Ciwan. Rinkirin. (K) bn :Kirin.

**Delav** (n.dar.nêr) 1.Amanê vexwarina avê. Dolik.2. Kendav. Girav. 3. Covan. Kerax.4. Pêl.

**Delik** (n.dar.mê) Perçe pateyekê nîsek û bijîne û dermankirî ye, di êxin ser birîn û cihên kul.

**Delikandin** (k.jn.dar.mê) Delik bi leşî ve kirin. (K) bdn: ez di delikînim em di delikînîn, tu di delikînî hûn di delikînin, ew di delikîne[..it] ewan di delikînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di delikand, di delikandin. Db,dûr: delikandibû, delikandibûn. (F): bi delikîne, bi delîkînin.

**Deling** (n.dar.nêr) Cihê(şûna) pê di derpê,pentelon, şelwal î da der dikevit. Dawîya di kevit ser pêyan.

**Delî** (n.x.dz) Qereç. Mutirb.

**Delîve** (n.x.mê) 1 Derfet. 2 Der . Cihê derbazbûnê.

**Delûv** (n.x.mê) Setil.

**Dem** (hk.dem,n.x.mê) Kat. Wext. Çax.: Her şev vî demî ez di nivim. : Dema we xweş be.

**Dem** (hk.dem.x.çewa) Xasme jibo çayê bikar dihêt ango.dijwar, bitov. : Çaya hewe ya bi deme, we diyare gelek tovê kirîyê.

**Demaborî** (n.l.mê) *rêzman* Dema çûyî. Derbazbûyî.

**Deman** (n.dar.mê) Kirê.

**Demance** (n.x.mê) Debance.

**Demar** (n.x.mê) 1. Rihên leşê mirovî yên hevbendîkirina navbera mejî û leşî. 2. Borîyên xwînê.

**Demarniman** (k.jn.l.mê) Daxazkirina xweşî û nojdarîyê jibo hevdu.Noşîcan. (K) bn : Niman, nimyan.

**Dembosk** (n.l.nêr) Derzîk yan her asinkek sertîj bo peytkirina cilikan û alavên din.

**Demdem** (hkdem,rêzkirin) Carcar.

**Demdemî** (hk.l.çewa) Merivê ko her demekî bi rengekîye, yan boçûnek heye. Li dwî demî xwe di guhorit. Gêwlo.

**Demekî** (hk.dem) Carekê. Heyamekê. Zemanekî.

**Demhat** (hk.dem) 1. Dem. Çax. 2. Navê mêrane.

**Demhijmêr** (n.l.mê) Amêreke jibo hijmartin û diyarkirina demê bi kar di hêt. Gelek corên wan hene, mîna, demhijmêra destî, berîkê, dîwaran û htd. 2.Pişkeke ji şevûrojan.ango 1/24, her demhijmêrek 60 xolgehin  û xolgeh di be 60 çirke.



**Demhijmêr**

**Demgirêdayî** (hk.l.çewa) Mirovê girêdaye jiber jivanan û dem kême.Şepilî.Şepirze.

**Demildest** (hk .dem) Karek di dema xweda bi hêt kirin(encamdan) .êkser. Lezgîn. : Wan demildest nexweşê xwe gehand xestexanê.

**Demî**  (hk.dar.çewa) Katî. Çaxî. Wextî. Br× Herdemî. Hergavî.

**Demîn** (n.dar.mê) 1.Tîtal. Dabûnerît.2. Dema bi serve çûyî, derbazbûyî.

**Demjimêr** (n.l.mê) Demhijmêr.

**Demkirin** (k.jn.l.mê) Tovça kirin nav ava kelandî jibo rengê wê sor bi be. (K) bn : Kirin.

**Demokrasî** (n.peyv.biyan) Sîstemeke ko gel rolê xwe di deshelata wê da pire.

**Demokrat** (hn.peyv.biyan) Kes,deste yan partî yê/ya jibo demokrasîyê xebatê di ke û bawerî bi wê heye.

**Demsal** (hk.dem) Çar demên salê.Werz. Dansal.

**Den** (n.x.mê) Cerek mezine ji axê dirist kirîye(axa cerkan) bo ava tezî a vexwarinê bi kar di hînin.2. Zik.

**Dendik** (n.dar.mê) Dindik.

**Dendikî** (hn.dar.çewa) Navokî.

**Dendikreş** (n.l.nêr) Zebeş. Şitî.

**Deng** (n.x.mê) Awaz, xurîn, nizeniz, ya ji devê mirov, giyandar,livîn yan vêk kevtina tenan peyda di bit .: Dengê kewî li çiyan xweş di hêt.***Pend*** :Dengêşeşan, kelexê mêşan. Ang; kesê gotinên ji xwe mezintir di ke. ***Pend*** :Dengê diholê ji dûr xweşe.ang; tiş kes, yan cihê mirovî ne dîtî li nik mirovî yê xweş û şirîne.

**Dengbêj** (pîşn.l.dz) Sitranbêj. Lavjebêj. : Şivan Perwer dengbêjekê bi navdenge.

**Dengbilind** (hk.l.çewa) Mirovê hêl di axivit. Dengê wî bilind.

**Dengbilindî** (n.l.mê) Dengûdor. : Dengbilindîya zarokan ez ji xew rakirim.

**Dengbilindkirin** (k.jn.gl.mê) Dengbilindî. Dengûdor.

**Dengbirîn** (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Hişbûn. (K) bn: Birîn.

**Dengdan** (k.jn.l.mê) Li dema hilbijartinan xelik dengan di de berbijarên xwe.: Ez dê dengê xwe bi dim wî kesî yê berjewendî ya gelê me bi parêze. (K) bn: Dan.

**Dengdar** (n.l.mê) Hemû pîtên abeya kurdî ji bilî heşt dengdêran. Nivok.

**Dengdêr** (n.l.mê) Pîtên dengdêr di abeya kurdî da heştin : a,e,ê,i,î,o,u,û. Zingok.

**Dengîr** (hn.dar.çewa) Bi navdeng. Navdar. Navdêr.

**Dengjar** (hn.l.çewa) Mirovê dengê wî dilsoj.Melûl.

**Dengketin** (k.jn.l.mê) Dengkevtin.

**Dengkevtin** (k.jn.l.mê) Ji egera nexweşî yan qîjandinê dengê mirov kiz di bit û bi ser nakevit. : Hindî duhî min kirîye hewar dengê min yê keftî. (K) bn: Kevtin.

**Dengkirin** (k.jn.l.mê) Bangkirin. Gazîkirin. (K) bn: Kirin.

**Denglêkirin** (k.jn.gl.mê) Lê xurîn. Lê heytandin. Gazinde jê kirin. : Dengê xwe li zarokan neke, dako ji te ne tirsin. (K) bn: Kirin.

**Dengşirîn** (hn.l.çewa) Yê dengê wî jibo gotina sitran, helbest û çîrokan pir şirîn.Dengxweş.

**Dengûdor** (n.l.mê) Qerebalix.: Eve çi dengûdore ji mala cîranan di hêt.

**Dngûdor<u>kirin</u>** (k.jnlmê) Qerebalixkirin. (K) bn: Kirin.

**Deng<u>vedan</u>** (k.jn.l.mê) 1. Dema dengek der di kevit, dubare berevajî di bit û di hêt bihîstin, xasme li gelî û newalan. 2. Bi navdeng kevtin. ***Pend*** :Mîna kevirî deng ve di de. Ang; mirovê gotinên hevberê xwe di vecût dubare di ke. (K) bn : Vedan.

**Deng<u>xweş</u>** (rd.l.çewa) Yê dengê wîjibo stirîn û xwendinê xweş be.

**Deng<u>zar</u>** (n.l.mê) Dengûdor.

**De<u>nik</u>** (n.dar.mê) Dindik.

**Denî<u>mark</u>** (cugr.n,hk.cih) Welatekê Ewropaye.

**Denîma<u>rkî</u>** (nej,n.dar) Mita yan mirovê ji Denîmar.

**Dep** (n.x.nêr) 1. Darek pan û tiraşî ye bo text, dergeh û pêdvîyên dî mifa jê werdigirin. 2. Pan. depê singê wî.

**Dep<u>reş</u>** (n.l.nêr) Depeke bi dîwaran ve kirî ye,li xwendingehan û cihêd dî waneyan liser di nivîsin.Textereş.

**Deq** (n.x.dz) 1. Parçe nivîs. Nivîsar. : Mamosta deqa nivîsê ji mere xwand. 2. Xalên reş yan şîn ko mirov liser dest û giyanê xwe wêne di ke. 3. Mat,mazîyeke ko zaro pê di lîzin li yên hev dixin. 4.Wire.Gêwil. Keyf.

**Deqan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Deq liser leşî çêkirin.

**Deq<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Deqandin. (K) bn: Dan.

**Deq<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Deqdan. (K) bn: Kirin.

**Deqşi<u>kandin</u>** (k.jn.l.mê) Lêheytandin. Paşvebirin. Gêwilşikandin. : Mamostayî evro pîs deqê min şikand çunkî min waneyên xwe berhev ne kiribûn. (K) bn: Şikandin.

**Der** (n.x.mê) 1.Dergeh . Çeper. 2. Rê. 3. Dervank. Qepax. 4. Cih : Tu ji kûderê di hêy ? 5. rêz,..Pêş û paşpite. : Hatinder. Kirinder. Derkirin. Derxistin. Derbazkirin. Derhavêtin.

**Derab<u>zûn</u>** (n.dar.mê) Derazînk.

**Dera<u>met</u>** (n.x.nêr) Mita. Ber. Dahatî.

**Der<u>anîn</u>** (k.jn.dar.mê) !. Anîn der. Inan der .derêxistin. : Nojadarî zilikek ji çavê nexweşî deranî. 2. Aşkerakirin. Xuyakirin.

**De<u>rav</u>** (n.x.nêr) 1. Cihê ava wî ya tenik ko mirov û candar lê derbaz di bin.2. Çoya avê. : Kanîya gundê me deravekê avê jiber di çit.3.Kawdan. Rewş.: Niha hûn di çi derav de dijîn?.

**Deravok** (k.dar.nêr) 1. Deravê biçûk. Deravk. 2. Cihê derbazbûnê.

**Derazînk** (n.dar.mê) Dîwarkekê biçûke di derê malanda, di kevit alîyê bin dergehî, dergeh xwe li ber di girit û rêya hatina ba û sermayê di girit.

**Derbaz** (hn.dar.çewa) ***rêzman*** Dema çûyî. Biserveçûn.

**Derbazbûn** (k.jn.l.mê) Li cihekî,çiyayek, avekê bi dey û biçî alîyê din. Têperîn. (K) ez derbaz di bim em dderbaz di bin, tu derbaz di bî hûn derbaz di bin, ew derbaz di bit ewan derbaz dibin. (F) derbaz be , derbaz bin, yan derbaz bi be, derbaz bi bin.

**Derbazkirin** (k.jn.l.mê) Meriv barekî, mirovekî yan tiştekî li ciyekî bi borîne. : Şivanî pez êkêk li çemî derbaz kirin. :Mêr ew mêre yê xwe jê (tengavî) derbaz bi ke. (K) bn :Kirin.

**Derbend** (n.dar.mê) Cih, gelîyê derê wî hatî dîwarkirin jibo xirvekirina avê yan derbazbûnê. Sikir. Pengav.

**Derbendkirin** (k.jn.gl.mê) Dîwarkirin yan nijinîna derê gelî, newal yan qodîkan. Girtin û tundkirina derê amanan. (K) bn: Kirin.

**Derbest** (hn.dar.çewa) Tiştê derê wî hatîye girtin, bestin. Dergirtî. Nixavtî.

**Derbestkirin** (k.jn.gl.mê) Dema derê amanekî bi hêt girtin.

**Derbider** (hn.l.çewa) Kesê ko ji welat , mal û warê xwe dûr di keve.Aware. Mişext.

**Derbiderbûn** (k.jn.gl.mê) Ji mal û warê xwe dûr kevtin.: Ji egera nexweşî û kawdanên aloz gelek ji xor û keçên kurd derbider bûn. (K) bn:Bûn.

**Derbiderî** (n.l.mê) Awareyî.

**Derbiderkirin** (k.jn.gl.mê) Bi xurtî ji mal warî derêxistina xelkî. (K) bn:Kirin.

**Derçûn** (k.jn.dar.mê) 1.Derkevtin. Derketin. : Eve du roje babê min ji mal der çûye.2. Serkevtin. : Xwendekarên gundê me îsal hemû derçûn. (K) bn: Çûn.

**Derd** (n.x.nêr) 1. Éş. Jan. Nexweşî. Kovan. Br× Derman.

**Derdan** (k.jn.dar.mê) 1. Weke çipikên avê ji cihekî der di kevin. Dêrandin.2. Pivdank.

**Derdandka mîzê** (n.l.mê) Pivdanka mîzê. Mîzdan.

**Derdekopan** (n.l.mê) ***noj*** Nexweşîyeka janêd dujwar di kevin masolkên mirovî. Têtanûs.

**Derdekurtan** (n.l.mê) *noj* Derdekopan.

**Derdese** (n.l.mê) *noj* Nexweşîyeke ji egera geztin[leq]a segên nesax û har mirovan di gire.

**Derdest** (rd.dar.çewa) Desteser.

**Derdestkirin** (k.jn.gl.mê) Desteserkirin.

**Derdmend** (hn.dar.çewa) Nexweş. Nesax.

**Derebeg** (karn.l.dz) Keseke ji texeka bilind û zengîne, erd û malê hejaran û keda wan di xot. Axa.

**Derebegatî** (n.dar.mê) Axatî. Kedxwarî.

**Derebegî** (hk.dar.mê) Derebegatî.

**Dereng** (hk.dem) Direng.

**Derengî** (hk.dem) Direngî.

**Derengkevtin** (k.jn.l.mê) Gîrobûn.

**Derengtir** (hk.dem) Pitir dereng. Hêjta direng. Pitir veman. : Ezê piçekê ji te derengtir vegerim malê çunkî karekê min heye.

**Derengtirîn** (hk.dem) Ji hemû deman derengtir.

**Derew** (n.x.mê) Direw. Vir.

**Derewbêj** (hk.l.çewa) Mirovê derewan dike. Merivê viran di bêje.

**Derewbûn** (k.jn.l.mê) Dema gotinek di be derew. : Ta derew dibit rast serê xwedî tê diçit.: Ew gotinên dijî hewe hatîn kirin, hemû bûn derew.

**Derewçîn** (hk.l.çewa) Direwîn. Derewbêj. Direwker.

**Derewîn** (hk.dar.çewa) Derewçîn. Bafiro.

**Derewker** (hk.dar.çewa) Derewîn.

**Derewkirin** (k.jn.l.mê) Virkirin. Direwkirin. (K) bn: Kirin.

**Derewzîn** (hk.dar.çewa) Xapînok.

**Derêxistin** (k.jn.dar.mê) 1. Derkirin. Jê havêtin. : Babê kurê xwe ji mal derêxist. 2. Aşkerakirin. Xuyakirin.

**Derfet** (h.x.mê) Delîve. Hel. Hilkeftin. Şens. Kewdanên eyînî.

**Dergeh** (nl.n) 1 Der. : Dergehê mala xwe li mêvanan vekir. 2 Hîvî. : Xwedê dergehekî jibo me veke.3. Rê.

**Dergehvan** (n.dar.dz) Kesê ku liber dergahê baregeh, yan malan di rawestit û nêrevanî û sexbêrî ya xelkî diket. Parêzvan.

**Dergehvanî** (n.dar.mê) Nêrevanî. Parêzvanî.

**Dergistî** (n.dar.dz) Desgirtî. Dezgir.Xastî.

**Dergîs** (n.dar.dz) Desgirtî.

**Dergûş** (n.dar.mê) 1.Landik. Dêdîk. 2. Zarokê sava di landikê de.

**Derhatin** (k.jn.dar.mê) Jê hatin der. Derkevtin.(K) bn: hatin.

**Derhênan** (k.jn.dar.mê) Derhînan. Deranîn.

**Deriz** (n.x.mê) Kelişteka biçûk, tîkeke di keve dîwar, ber, hestû û htd.

**Derizandin** (k.jn.dar.mê) Mirov yan hêzek ji egera lêdan cihek, givaştinê tîkekê bi êxit cihekî.: Dengê topan dîwarên me yên derizandîn. (K) Ber,dn:Ez di derizînim, em di derizînîn, tu di derizînî, hûn di derizînin, ew di derizînin, ewan di derizînin. Pr: dê[bi]+ ber,dn.Berd,db: di derizand, di derizandin. Db,dûr: Derizandibû, …bûn. (F) : bi derizîne, bi derizînin.

**Derhînan** .(k.jn.dar.mê) tişekî bînî der. Derînan. Der dihînim. Der dihînîn. Der dihînit. Der bihîne, der bihînin.

**Derî** (hk.cih,n.x) 1. Der. Dergeh.2 gelîyê teng.

**Derînan** (k.jn.dar.mê) Derhînan.

**Derîzan** (n.dar.mê) Hewş. Asîtan. Derazînk.

**Derkar** (nax.mê) Gundeke li devera Sindî - Zaxo.

**Derketin** (k.jn.dar.mê) Derkevtin.

**Derkevtin** (k.jn.dar.mê) 1.Tiştek, kesek yan candarek ji cihekî, avahîyekî bihêt der. Jê hatin der. 2. Peydabûn. : Corekê nû yê tirombêlan derkevtîye. (K) bn: kevtin.

**Derkirin** (k.jmê) 1 Kesekî ji karê wî dûr bêxin. Ji mal derêxistin. Derêxistin.2 Peyda kirina tiştek nû. (K) bn: kirin.

**Derling** (n.dar.nêr) Deling.

**Dermal** (n.dar.mê) Şirînî, xwarin û vexwarin hin caran pere û cilik, ku mala zavayî jibo mala bûkê di kin diyarî li dema nîşanîyê.

**Dermale** (n.dar.mê) Pareyê mehane yê fermanberan. Heyvane. Mehyane.

**Dermalî** (n.dar.mê) Xwarin û vexwarina mala zava jibo ya bûkê di şînin.

**Dermalkirin** (k.jn.gl.mê) Xwedîkirin û sexbêrkirina kewalan di mal da, daku qelew bibin jibo firotin yan serjêkirinê. Ribêtekirin. Malofîkirin. (K) bn: kirin.

**Derman** (n.x.mê) 1.Xwarin ,vexwarin, şirenqe û htd ji giya û candaran dihêt çêkirin jibo çarekirina mirov û gîyandarêd nexweş. 2. Çare. Br× derd. : Dermanê çi jê nehatinê dest danane.derman dermale.dermanê nebûnê karê xudê ye.

**Dermanfiroş** (kn.l.dz) Kesê dermanan di firoşe. Xwedîyê dikana dermanan. Xudan yan karmandê dermanxanê.

**Dermangeh** (n.dar.mê) Cihê çêkirin û firotina dermanan. Dermanxane.

**Dermankar** (kn.l.dz) Merivê dermanan çê dike. Pisporê çêkirina dermanan.

**Dermankarî** (n.l.mê) Karê çêkirina dermanan.

**Dermankirin** (k.jn.l.mê) Derman xistin ser birî cihêd kul .Derman dane nexweşan. : Nojdarî birîna birîndarî derman kir. (K) bn: kirin.

**Dermanxane** (k.dar.mê) Dermangeh.

**Dermansaz** (kn.l.dz) Kesê liser dermanan xwendî û dermanxanan kar diket. Dermankar.

**Dermansazî** (n.l.mê) Dermankarî.

**Dernefîs** (n.x.nêr) Cerbader.

**Dernexûn** (hn.dar.çewa) Tiştê serê wî jibo xwar hatîye wergeran û binê wî jibo alê serî. Sernişîv.

**Dernexûnbûn** (k.jn.gl.mê) Sernişîvbûn. : Cerrikê avê dernexûn bû.

**Dernexûnkirin** (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Wergerandin. : Kabanî hêris bû, mencela xwarinê dernexûn kir.

**Derpê** (n.l.mê) Kiras , cilikê mirv di kete berxwe ku her du lingan ta kemaxê di girit pitir cilikên şevê yan xewê çi dirêj yan kurt, libin pentor yan şelwalan diken û jibo melekirinê di avê de bikar dihêt.: Derpê jibo beqê çêkirin.

**Derpêdanan** (k.jn.gl.mê) Li dema xwe şûştinê, xwe gihorînê yan karên din, mirov derpêyê xwe ji pêyên xwe dike.

**Derpêhavêtin** (k.jn.gl.mê) Xwe bêderpêkirin. Bêfedî. Bêzax. Li derdan.

**Derpê-ji-pêkirin** (k.jngl.mê) Derpêxistin.

**Derpê-li-pêkirin** (k.jn.gl.mê) Derpê li pêkirin. Li ber xwe kirin.

**Derpêxistin** (k.jn.gl.mê) Derpêdanan. Derpêdanîn.

**Derpî** (n.l.nêr) Derpê.

**Derpoşk** (nl.mê) dergehk. Dervank.

**Dersîm** (cugrn.) Bajêreke li Kurdistana Turkî.

**Dersimî** (malb.n) Xelkê Dersîmê.

**Dersok** (nl.mê) cemedanî.

**Derşo** (n.dar.nêr) Lîfikê pakijkirina amanan. Amanşok.

**Derûber** (n.l.pir) Cihê mirov têda.Rexûçan. Çarçov. Biyav.

**Derûdor** (n.dar.pir) Biyavê mirov di nav de dijît. Rexûçan. Dever.

**Derûn** (n.x.nê) Nepenîyêd di nava mirovî da. Hêz û hizira navxwe.Can. Giyan.

**Derûnî** (hn.dar.çewa) Kawdanêd girêdayî bi derûn ve.: Nexweşîyên derûnî. Êşandina derûnî. Şerê derûnî.

**Derûnnas** (karn.l.dz) Pispor di warî derûnî de.: Nojdarê derûnnas.

**Derûnnasî** (n.dar.mê) Xwendin û karên girêdayî bi zanista derûnî ve.

**Derûnzan** (karn.dar.dz) Derûnnas.

**Derûnzanî** (n.dar.mê) Derûnnasî.

**Dervank** (nl.mê) ew parça di êxin ser yan da dinin ser tiştî. Derok. Derî. Derxwînk.

**Derve** (hk,cih.dar) Cih, yan tiştê ne li avahîyan da. : ne li jor. : dervey welat ; ang ne di nava tixûbên Welatî.

**Dervedan** (k.jn.l.mê) Danpêdan. Danezan.

**Derveyî** (hn.dar.çewa) Tiştê derve. Biyanî.

**Derwaze** (n.dar.mê) 1. Galiske. 2. Dergeh.

**Derwêş** (n.x.dz) 1. Mirîd. 2. Navê mêrane. Derwêşê Evdî, mêrxaseke stran pê hatîne vehandin.

**Derxwînk** (nl.mê) dervank.

**Derya** (n.x.mê) Gol, gomên avê yên mezin. Derya navîn . derya reş. Htd.

**Deryavan** (pîşn.dar.dz) Mirov bi gemî û kelekan karî di nav deryayan da di kin.

**Deryavanî** (karn.dar.mê) Karê deryavanan.

**Derz** (n.x.mê) Valahî, peq, kelişte , ya dikevit cihekî , dîwarekî yan hestî.

**Derzî** 1 (n.x.mê) Parçe asinek zirav û tîje jibo dirûna cilkan û karên malê bikar di hînin. *Pend* :Bîra bi derzîkê di kolin.

**Derzî** (n.x.mê) Şirenqeya lêdana leşî.



**Derzî**

**Desnivêj** (nl.mê) 1 bermayîyê xarina gîyandaran ê ku ji paşîyê der di keve.2 xwe şuştin bo nijêj kirinê, ez bi desnijêjin anku dişêm nivêjê bi kim.

**Dest** (nax.nê) pişkek leşî bi baskan domahî di hên û çûtin, her êk ji pjênc tiblan pêkhatîye. (p): destê mino kesê mino. Destê mandî(westiyay) li ser zikê têre. Destê bi tinê deng jê na hêt.destê dizan bi dizan na hête birîn.destê li bin berîye. Dest destî di nasit.

**Destajo** (hn.dar.çewa) Guhdar.

**Destakirin** (k.jn.l.mê) Dema destên jin û mêran bi hev di kevin, divê desnivêjê dubare bigirin. : Tu bi xudê desta min ne, ez bi desnivêjim. (K) bn : kirin.

**Destan** (n.x.mê) Dastan.

**Destar** (n.x.nêr) Distar.

**Destav** (n.l.mê) Cihê desnivêj û destûçav şûştinan. Tewalêt. : Dê çim destavekê.

**Destavêj** (hn.l.çewa) Desthavêj. Gurzweşîn.Érişkar. Hêrişvan.

**Destavêjî** (hn.l.mê) Gurzweşandin. Hêrişkirin-birin.

**Desravêtin** (k.jn.l.mê) Desthilandin. Hêrişkirin. (K) bn : avêtin.

**Destavgeh** (n.gl.mê) Cihê destavê. Tewalêt.

**Destavkirin** (k.jn.gl.mê) Çûn destavgehê. Çûn desnivêjê.Mîztin. Rîtin. (K) bn : kirin.

**Destavxane** (n.gl.mê) Destavgeh.

**Destberdan** (k.jn.l.mê) Heger mirov destan ji tiştekî berde. Bi cih bihêlit.Destdahêlan. : Ezê destan ji te brbidim, çunkî tu nabî mirov. (K) bn : berdan.

**Destberdayî** (hk.l.çewa) Kesê gelek pere diravî bi mezêxit.

Destbilindkirin (k.jn.gl.m) Xwe dane dest. Hatin ray

**Destbira** (h.l.nr) Destebira.

**Destbizêv** (hn.l.dz) Zeberdest. Desthil. : Ew palek destbizêve.

**Destçalak** (hn.l.dz) Desthil. Destbizêv. Zeberdest.

**Destçepilandin** (k.jn.l.mê) Destqutan. Destlêkdan.

**Destçînk** (n.dar.mê) Sele ji parçeyên levenan hatî çêkirin. Zembîlk.

**Destdaman** (k.jn.l.mê) Mitayê ku di destê mirovî de di mîne bi kêrî firotinê nahê, xerc nabit.

**Destdan** (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov destêd xwe li tiştek yan kesekî bixe,.. bide.Destlêdan. Desttêwerdan. Bi destan girtin.2. Desthijandin. Destleqandin. 3.Destûrdan. Rêdan. : Heger mamosta dest bide, ez dê sube li mal mînim û na herim xwendingehê.4. Destên hev girtin. Çûn destên hev. : Min silav kirê lê wî destê xwe ne da min, nizanim boçî yê sile.

**Destdeman** (k.jn.l.mê) Destdaman.

**Destdeneman** (k.jn.gl.mê) Weke çi pere û mal di destêd mirovî de nemîne.Hejarbûn. Bêperebûn. Belingazbûn. : Ez pir hez dikim alîkarîya te bikim, lê mixabin çi di dest min de nemaye.

**Destdirêj** (hk.l.çewa) Mirovê destên wî di gehim hemû cih alîyan.1. matêker. 2. Zordar.

**Destdirêjkirin** (k.jn.gl.mê) Dema kesek destên xwe dirêj ke ser mal û namûsa xelkî. Kirêtkirin. (K) bn: kirin. : Yê destên xwe dirêj biket ser axa me, dê destêd wî birîn.

**Deste** (hk.x.mê) 1.Grop. Revde. Bir. : Desteyeka nû ji xortan ber bi xwendingehê ve çûn.2.Qeft. : Desteyeka gulan danî ser gora şehîdan.

**Desteber** (nl.n) 1. Berek hilîye didest xwe digirin bo hisîna dîwarên kurtanekirî da hilî û ciwan bibit.2 Kesê bo êkî desteberîyê dike.

**Desteberî** (nl.mê) Dema mirovek xwe berpisyar hember kesek yan alîyekî di dane li cihê êkê din ku soz yan biryara liser bicih bîne, lê yê desteberî kirî li şûna wî dê hêt sizadan eger xwedîyê kêşê soza xwe bicih ne îna.

**Destebira** (hn.l.nêr) Hevalek qenc, .. baş. Heval . Dost. Hevrê. Hevkar.

**Desteconî** (nl.n) Berek dirêj û hulîye di destê xwe di girin li conî yê dan tê di din bo loçkirina danî ji sivîyê.

**Destedîvk** (n.l.mê) Amêrekê cotyarane, liser hincarîye, li dema cotî cotyar destê xwe liser di danit jibo ragirtin û livandina hincarî.

**Destegir** (n.l.mê) Berdestik.

**Destekirin** (k.jn.l.mê) Destakirin. (K) bn : kirin.

**Destemo** (n.dar.mê) Jin yan keça karê pakijkirina mal û avahîyan dike hember pereyî.

**Desteng** (hn.l.çewa) Hejar. Destkurt. Belingaz.

**Destengî** (n.l. mê) Hejarî.

**Destêduwê**( peyv.l) Cil û mitayên hatine bikar anîn. Kevinûnwî.

**Destêhevgirtin** (k.jn.gl.mê) Weke du yan çend mirov destên xwe didin hev, mebest jê alîkarîya hev dikin. Bi hevre xebat û têkoşînê dikin. Li rojên teng divê em destêd hev bigirin. (K) bn: girtin.

**Destêxwetêdan** (k.jn.gl.mê) Desttêwerdan. Matêkirin.

**Destgiran** (hn.l.çewa) 1.Mirovê destê wî bi hêz dema gurzekî da di weşînit. 2. Kesê gelek hêdî kar û nivîsanê dike. Ne çeleng.

**Destgirêdan** (k.jn.l.mê) Kelabçekirin. : Polîsan destêd dizî li pişt girêdan xistin nav girtîgehê.(K) bn : girêdan.

**Destgirtî** (hn.l. çewa) 1.Çirîk. Br× Nandeh.2. Dezgir.

**Destgîr** (n.dar.mê) Berdestik.

**Destgîrî** (n.dar.dz) Dezgir.

**Destgork** (n.dar.mê) Coreke goreyêd taybetin ji hirî yan pembû dihên çêkirin mirov jibo parastina destan ji sirê yan ciwanîyê,dikin destên xwe. Lepik. Destkêş.



**Destgork**

**Desthelat** (n.dar.mê) Desthilat.

**Desthilandin** (k.jmê) li rojên tengavî pevdaçûnan mêrxas li meydanê çek bi destin û bexodanê diken.

**Desthilat** (nl.mê) Kes yan partîyen her tişt di dest de. Serwer. Semyan.

**Destik** (n.dar.nêr) Qeft. : Destikê gulan. Destikek pîvazterkan.destikekê nêrgizan.

**Destir** (n.dar.mê) Berdestik.

**Destîcer** (k.l.nêr) Gozik. Cerik.Kedîn.

**Destjêberdan** (k.jn.gl.mê) Dema mirov destan ji tiştek yan karekî berde û bi yekcarî bihêlit.: Jiber ku ez nikarim wî karî bikin, min dest jê berda. : Em tu car destan ji xebatê bernadin. (K) bn : berdan.

**Destjêkişandin** (k.jn.ggl.mê) Destjêberdan. (K) bn: kişandin.

**Destkar** (hn.l.çewa) Zeberdest.

**Destkarî** (nl.mê) Bi dest karek yan guhorînek têda bi hêt kirin.

**Destkarîkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov bi dest di tiştek yan karekî di xebitit û hin guherînan têda dike. Destkarî-têda-kirin.(K) bn: kirin.

**Destkevtin** (k.jn.l.mê) wergirtin. Peydakirin. Bi destê xwe xistin. : Di çelengîyekê da gelek çek û kelûpelêd leşkerî kevtin destê pêşmergeyan.

(K) bn : kevtin.

**Destkevtî** (n.l.pir) Tiştê ku bi dest mirovî dikeve. Kelûpelên mirov ji xwe re peyda dike. : Destkevtîyêd we çi bûn di vî şerîda?

**Destkêş** (n.dar.mê) Destgork. Lepik.

**Destkêşan** (k.jn.l.mê) Xwe ji karek yan kiryarekê dan paş. Xwe jê dûrxistin. : Min destê xwe ji wî karî kêşan jiber ku yê bi sergêjî bo. : Destêd xwe ji karê xirab bi kêşe, heger dê poşman bî.Destjêberdan.(K) bn: kêşan.

**Destkişandin** (k.jn.l.mê) Destkêşan. (K) bn: kişandin.

**Destkurt** (hn.l.çewa) 1. Kesê ku çi pê çê nabit. Bê desthilat. Kêrnehatî.2.Hejar. Belingaz. : Ezman dirêjê destkurt; ang mirovî bi ezmanî pir soz dide di bêje, lê kiryar berevajîye.

**Destkurtî** (n.l.mê) Hejarî. Belingazî.

**Destlêgerandin** (k.jn.l.mê) Weke mirov bi destan li tiştekî bi gerîne.

**Destlêkevtin** (k.jn.l.mê) Dema dest bi tiştekî kevtin.

**Destlêweşandin** (k.jn.l.mê) Desthejandin. Destleqandin. Destlêxistin. Teplêdan. Qutan.

**Destlêxistin** (k.jn.gl.mê) Destê xwe lêdan. Destê xwe lê xistin. Destê xwe gihandinê. Bi destan girtin. (K) bn : xistin.

**Destlibakirin** (k.jn.gl.mê) Destê xwe lê hijandin. (K) bn : kirin.

**Destlipiştxistin** (k.jn.gl.mê) Dema mirov destê xwe li pişta yekî bixe, jibo destxweş û aferînî lê kirin. (K) bn: xistin.

**Destmal** (nl.mê) Parçe pateyeke jibo malîn û zuha kirina destan . kefîk.

**Destmaye** (n.l.nêr) Pare û malê di mirov de di mînit. Sermaye.

**Destmayedar** (kn.l.dz) Mirovê yan dezgeh êdzengîn, xwedî mal û sentenet. Sermayedar.

**Destmêj** (n.dar.mê) Desnivêj.

**Destmêjgirtin** (k.jn.gl.mê) Desnivêjgirtin. (K) bn: girtin.

**Destnivîs** (n.l.mê) Mijarêd bi dest dihên nivîsîn.

**Destpak** (hn.l.çewa) Mirovê dilsax. Mirovê disoj. Mirovê bê ziyan. Mirovê çak.

**Destpaqij** (hn.l.çewa) Destpak.

**Destpelink** (hn.dar.çewa) Dema mirov li tarîsatanê çi na bînit, bi destan rêya xwe dizanit. Lepequt.: Şev tarî bo ez bi destpelinkê li pêlavêd we geryam.

**Destpelixî** (hn.l.çewa) Tembel. Destkurt.

**Destpê** (n.dar.mê). Berahî.

**Destpêk** (n.dar.mê) Destpê. Berahîk.

**Destpêkirin** (k.jl.gl.mê) Weke mirov dest bi karekî bike. : Evro wî dest bikarê xwe kir. (K) bn: kirin.

**Destpîs** (hn.l.çewa) Mirovê bê rûmet. Mirovê destdirêj.

**Destşo** (n.dar.mê) Cihê mirov destêd xwe têda di şot.

**Destûr**(nl.mê) Rêdana mirovî ji karî bo heyamekê, bêhinvedanê. Rêdan.

**Destûrdan** (k.jdar.mê) Dema mirov destûrîyê bi dit,yan ji yekî bi xwazit.(k) bn : dan.

**Destûrname** (n.l.mê) Name yan karta bi awayê fermî destûr têda nivîsî ye. : Min destûname jibo mehekê wergirt da herim dervey welat.

**Destvala** (hn.l.çewa) Mirovê nikarit çi bikit, çi senga xwe nebit çi pê çê nebit. Bê biryar.

**Destvank** (n.dar.mê) Kelabçe.



**Destvank**

**Destvekirî** (hn.l.çewa) Nandeh. Merd.:Mirovek destvekirî. Jineka destvekirî.

**Desstxistin** (k.jn.l.mê) bi Dests kevtin. Peydakirin. :Tirombêl bi dest xwe xist. (K) bn :Xistin.

**Destxistî** (n.l.mê) Tiştê bi destê mirov di keve. Karê di keve destê mirovî. Serkevtina bi dest mirovî ve di hêt. :Fîdralîzim yek ji destxistîyên gelê meye.

**Destxwîşk** (n.l.mê) Çêtirîn heval û dosta mirovî.

**Destyar** (hn.l.çewa) 1. Alîkar. 2. Kêfxweş. Xwînşirîn.

**Deşt** (cugrn.x.mê) 1. Cihê, erdê pan û rast. 2. Rast.Br× çîya.

**Deştî** (dever,nav.) Xelkê li deştê dijîn.

**Dev** (nax.nêr) Valayîya didan û ezman têda. Axivtin ûxwarin. : Devê xwe bi girire û ne peyve.

**Dev** (pêrbest,alav.pêvegir) Li dev li nik, li rex. Li cem. Li ba. : Ew li dev babê xwe na mîne. Xandingeh li dev mala meye.

**Devavêtin** (k.jn.l.mê) 1.Weke mirov yan lawir devê xwe bihavêjît tiştekî û leq bidet.Leqdanan. Geztin. 2. Bi gotinan hêrîş birin ser yekî. Dij axivtin.(K) bn : Avêtin.

**Devberday** (hn.l.çewa) Mirovê çi nepenî xwe di devî de na girin.Kesê ku gotinan ne li cih demên hejî diket. : Çi gotina li dev wî neke, ew mirovêk devberdaye.

**Devbeş** (hn.n.l.dz.çewa) 1. Mirovê hertim devê wî vekirî. 2. Pirbêj. 3. Yê tuca ji xwarinê û gotinan têr nabe. 4.Devkenî.

**Devbeşkirin** (k.jn.gl.mê) Devê xwe beşkirin. Devê xwe vekirin. (K) bn : Kirin.

**Devbixwîn** (hk,hn.l.çewa) Hov. Xwînmêj. Dirinde.

**Devcîn** (n.l.nêr) Benîşt. Qaçik. : Bi rêve di çit û devcînê xwe di cît.:Devcînê di devê kewalan da.

**Devcûn** (n.l.nêr) Devcîn.

**Devdifink** (n.l.mê) Dervankê biçûk yê derê şûşeyan. Tepedor.

**Devdirî** (hn.l.çewa) Mirovê kêm di axivît. Mirovê kêmbêj. Mirovê hez ji axivtinê nake.

**Deve** (n.x.mê) Hêştir.

**Devedeştî** (n.dar.mê) Sergîn.

**Dever** (cugrn.x.mê) Cihek diyar kirîye ji çîya, yan deştan pêk hatîye hin caran gund û bajêran bi xwe ve digirît. : Devera badînan. Devera amêdîyê. Devera Barzan û htd.

**Deverû** (hn.dar.çewa) Sernişîv. Wergerayî. Berevajî.

**Deverûkirin** (k.jn.gl.mê) Sernişîvkirin. Berevajîkirin. Serabinkirin. (K) bn: Kirin.

**Devgem** (n.dar.nêr) Hevsar.

**Devgenî** (hn.l.çewa) 1.Kesê ku bêhna genî ji dev û hilma wî dihêt. 2.Mirovê ezmanreş.

**Devgilêj** (hn.l.çewa) Mirovê gilêj ji devê wî di rêjit.

**Devgilîz** (hn.l.çewa) Devgilêj.

**Devgir** (hn.dar.çewa) Hin xwarinin tamek taybet heye di giran devê mirovî di girin.

**Devgirtek** (n.l.mê) Dervank.Devdifink.

**Devgirtin** (k.jn.l.mê) 1.Bêdengbûn. Bêdengkirin. Hişbûn- kirin. Mitbûn-kirin. : Hema tu devê xwe bigire û ne axive. 2. Hin corên xwarinê mîna karî û fêqîyê negehiştî devê mirov di girit.(K) bn: girtin.

**Devik** (n..n) 1 Devek yan keliştek biçûk. 2. Mûsên rihtraşînê.

**Devik** (n.dar.nêr) Dervank. Derîk. Tepedor.

**Devikkêş** (n.l.mê) Amêreke jibo deranîn yan kişandina devik (tepedor) ên derê şûşeyan(betil).

**Devilxwîn** (hn.l.çewa) Devbixwîn. Devxwîn.

**Devî** (n.x.mê).Dehil. Rêl.Tiraş. Bîşe.

**Devîstan** (cugir,n.cih.n.dar) Cihê pir devî. Warê pir tiraş, giya,pîş û pelex.

**Devjêberdan** (k.jn.gl.mê) Wekî mirovî karekî yan tiştekî bi cih bihêlit. Hêlan. : Ev pênc salin bapîrê min dev ji cigarekêşanê berdaye. : Zarokino ; dev ji karên xirab berden. (K) bn : Berdan.

**Devjihevçûn** (k.jn.gl.mê) Jibo mirovê devberday dihêt gotin.

**Devken** (hn.l.çewa) Yê ku hertim di kene.Mirovê pir di kenit. Rûxweş. Keyfxweş.

**Devkenî** (hn.l.çewa) Devken.

**Devkenok** (hn.l.çewa) Devken.

**Devkevçik** (n.l.nêr) Kevçik. Kefgîr.

**Devkî** (hn.dar.çewa) Dema peyv û gotar, bi dev dihên gotin û belavkirin.

**Devlêkirin** (k.jn.gl.mê) Tamkirin. (K) bn: Kirin.

**Devlixwîn** (hn.l.çewa) Devbixwîn.

**Devlo** (ndar.mê) derz yan devek biçûk dem dikevit çerm, qayîşa yan lastîkan.

**Devkenî** (hn.l.çewa) Beşoş. Debeng.


**Devok** (n.dar.mê) Zimanê xelik li deverekê bikar dihînin.Zar.

**Devpîs** (hn.l.çewa) Kesê gotinên pîs, bêrûmet ji dike.Bêhetik. Xeberreş. Bêdeling.

**Devpoş** (n.l.mê) Dervan. Derpoş.

**Devrû** (n.l.nêr) Serûçav.Dirûşm.

**Devşêr** (n.l.mê) Core guleke mîna devê şêrane. bn :Mînakî.



**Devşêr**

**Devtijî** (hn.l.çewa) Mirovê kêm axivtin. Bêdeng. Mit.

**Devûlêv** (n.gl.mê) Dev û lêv.

**Devûlêvkirin** (k.jn.gl.mê) Livandina dev û lêvan. Dirêj û gurc kirina dev û lêvan. (K) bn: Kirin.

**Devûrû** (n.gl.mê) Devrû.

**Devxwîn** (hn.l.çewa) Devbixwîn.

**Devzêrîn** (hn.l.çewa) Kêfxweş. Tiraneker. Devxweş.

**Dew** (nax.mê) ji têkşêlana mast û avan peyda di bit, çi bi meşkê yan amanek din bû vexwarinê bi kar tê.

**Dewank** (n.dar.mê) Dervank.

**Dewar** (hnx.g) gîyadarên mezin wek hesp, hêstir û ker.

**Dewdew** (n.dar.dz) Pepegay. Totî.

**Dewen** (n.x.nêr) Dehil.

**Dewik** (n.x.nêr) Dewê meşkê.

**Dewiqîn** (k.jn.x.mê) Gehiştin, helbûn yan zerbûna fêqî. : Ev sêve ya tirşe, ango ne dewiqîye.

**Dewisîn** (k.jn.x.mê) Givaştina tiştan bi dest, pê yan amêran. Liser hev givaştin.di navêkdabirin. (K) Br,db :Ez di dewisînim, em di dewisînin,tu di dewisînî, hûn di dewisînin, ew di dewisînit(…ne) ewan di dewisînin.Pr: Dê bi + berd,db. Db: Di deswisand, di dewisandin. Db,dûr: dewisandibû, … bûn. (F) : Bi dewisîne, bi dewisînin.

**Dewisîn** (k.jn.x.ê) Tiştê bi giranî û hêz bihêt pestin.Givaştin. : Banê jiber baş ne hatîye dewisîn, dilopan dike.

**Dewixandin** (k.jn.x.mê) xwe tê alandin.Dest li hevkê nan. Xiniqandin.

**Dewixîn** (k.jn.x.mê) Di hêt dewixandin.

**Dewîn** (nax.mê) Xwarinek kurdîye ji dewî tê çêkirin, dew û dan .

**Dewjin** (n.l.nê) Dewê meşkê.

**Dewkî** (hn.dar.çewa) Dema giyanê mirovî rengê mîna dew di girit, jiber germê yan mandîbûnê.

**Dewkîs** (n.l.nêr) 1. Dewê zuha di nav tûrikan de.2.Lûrik.

**Dewlemend** (hn.dar.çewa) Zengîn. Hêyî.

**Dewlemendbûn** (k.jn.l.mê) Zengînbûn.

**Dewlemendî** (n.dar.mê) Zengînî.

**Dewlemendkirin** (k.jn.l.mê) Zengînkirin.

**Dewlet** (n.x.mê) Welat. Deshelat.

**Dewlik** (n.x.mê) Amaneke naylon yan asine, şêweyê lûlîye avê, avemastê û corên xoşav(vexwarin) an tê dikin.

**Dews** (n.x.mê) Şopa li cihê piyên mirov û lawiran peyda dibe.Şûnpê.Şwînpê.

**Dewsgirtin** (k.jn.mê) Li ser dewsê ya rêçê çûn. Cihgirtin. Fêrbûn. : Wî dewsa babê xwe ya girtî. (K) bn: girtin.

**Dexel** (n.x.mê) Gîyayên ziyano dinav bax û rezan ku ziyanê di gehînin çandinê.

**Dexes** (hnx.dz) mirovê zikreş.

**Dexil** (n.x.nêr) Dan. Genim û ceh.

**Dexsî** (hn.x.çewa) Dema mirovek, nemaze zarok li cihek gelek bi mît û hêris bibit.Mandî. westayî.

**Dexsîbûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov mandî î dibit. K): ez dexsî di bim em dexsî di bîn, tu dexsî dibî hûn dexsî dibin, ew dexsî dibit ewan dexsî dibin. (F): bibe bibin.

**Dexsîkirin** (k.jnlmê) Bi cih ne hînana daxazên mirovekî,zarokek :We ev zaroke di jor ve dexsî kir, bêhnekê bibin der.Hêriskirin.(K): bn :Kirin.

**Dexso** (hn.dar.çewa) Zikreş.

**Dexsoyî** (n.dar.mê) Zikreşî.

**Dey** (n.x.mê) Deng. : Çima tu dey nakî ?.

**Deyatî** (n.dar.mê) Daykatî. Dayînî.

**Deybab** (nl.g) Cot gîyandarên nêr û mê yên zaro yan têjik jê peyda dibin. Deyk û bab.

**Deydik** (n.dar.mê) Dêdîk. Colank.

**Deykirin** (n.jn.l.mê) Peyvîn. Lê xurîn.Dengkirin. Axivtin. (K) bn: Kirin.

**Deylêkirin** (k.jn.gl.mê) Deykririn.

**Deyn** (n.x.nêr) Pere yan malê mirovî li cem yekî bit, divê jibo xwedî bihêt vegerandin. : 200 dînar deynê hevalekî li mine.

**Deyndan** (k.jn.l.ê) Dema mirov deynekî bi de yekî. : Mamê min 1000 dînar bi deyn dane min. (K) bn: Dan.

**Deyndar** (hk.dar.çewa) Mirovê deynê êkî (pare yan mal) lê bit. : Min pê çênabit xanî bi kirin, jiber ku ez deydarim.

**Deyndarî** (n.dar.mê) Weke mirov li bin deynan ve be. Perê xelkî li cem mirov be.

**Deynder** (hk.dar.çewa) Mirovê deynan dide xelkî. Kesê perê wî li xelkî bit.

**Deyngirtin** (k.jn.l.mê) Mirov pere û malî ji yekî yan dezgehekî bi deyn wergire. (K) bn: Girtin.

**Deynkirin** (k.jn.l.mê) Deyngirtin. : Min tu deyn ji kesekî ne kirîne.(K) bn: Kirin.

**Deyûz** (hn.x.çewa) Kesê rêberîya karên kirêt jibo xelkî dike, mina gehandina jin û mêran jibo guhnelî ya ne rewa, hember parey.

Dezgah (n.dar.mê) Dezgeh.

**Dezgeh** (hkcihl.mê) Deste ya bi rêvebirina çelengîyan.Kargeh, rêvebirî, cih, Sazî.htd.

**Dezgehdanan** (k.jn.gl.mê) Danan yan avakirina dezgehan. (K) bn: Danan.

**Dezgehdanîn** (k.jngl.mê) Dezgehdanan. (K) bn: Danîn.

**Dezgehîkirin** (k.jmê) Dema mirov yan deshelat dezgehan ava ke.Serbixwekirina dezgehan. (k) bn: kirin.

**Dezgehvan** (n. dar. dz) Danerê dezgehê. Avakerê dezgehê. Birêvebirê dezgehê

**Dezgir** (n.dar.dz) 1 Keça xastî, yan kurê jibo keç xwastî, gustir li tiblê yan hez ji hevdu biken. : Dezgira hevalê min li zanîngehê di xwînit.

**Dezî** (nax.nê) Bendikê zirav ku jibo dirotina cilan bikar dihet. Ta. Dav.

**Dê 1** (nx.mê.hkd)Dayk .

**Dê 2**(alav.dem) Dema dihêt. Paşî. : Paş meheka din ez dê herim dervey welat. : Ez dê sube çim karwanî.

**Dê3** Alavê girêdanê kû mirov digel boçûnekê be. Dê başe. Erê dê. Dê vêca bes dirêj ke, te serê min gêj kir.

**Dê4** (alv) Alaveke jibo daxazê bikar dihêt. : Dê tu bi xudê sube were mala me.

**Dê 5** (hk.dem,cugr,n.x.nêr) Gund.

**Dêbav** (n.l.pir) Dayk û bav. Dayk û bab. Daybab. Deybab.

**Dêdîk** (nl.mê) cihekê asinî yê nivistina zarokan. Core landikeke.

**Dêh** (n.x.nêr) Gund. Dê.

**Dêhlik** (nax.mê) Seya mê. Kûçika mê.

**Dêjîn** (kj.mê) 1.Daxaza berdewamîya jîyanê. 2.Navê kiçane.

**Dêkane** (n.x.mê) Coreke çirika darane gelek nîseke liser cih tayên daran di danin jibo girtina çûçik û teyran. Bêwkane.

**Dêl** (n.x.mê) Dêhlik.

**Dêleba** (n.l.mê) Heyama gunelîya dêl û segan.

**Dêlegur** (n.l.mê) Mêgur. Mêgurg.

**Dêlemar** (n.l.mê) 1. Mara mê. Mêmar.2. Bîkmar.

**Dêleşêr** (n.l.mê) Şêra mê.

**Dêm 1** (n.x.nêr) Serûçav. Rû :. Sîma.

**Dêm 2** (hn.x.çewa) Cihê yan şînkatîyê liser baranê di jît. Ne avî.

**Dêman1** (n.dar.mê) Dirotina dexil û danî.

**Dêman 2** (n.dar.nêr) Serûçav.Dêm.

**Dêmarî** (n.dar.mê) 1.Jinbab.2. Dayîn.

**Dêmacame** (n.l.mê) bn : Dêmcane.

**Dêmcane** (n.l.mê) Perûkek çaralî bi daranve asê û tund kirîye û weneyê mar ûadîyan li ser kêşayîne daû dama ravê gîyandar ji tirsa xwe xirve ken û nêçîrvan hijmarek pitir bi kujit.

**Dêmdirêj** (hn.l.çewa) Jin yan peyayê dêmê wê/wî dirêj be.

**Dêmî** (n.dar.mê) Erdê dêm. Zevîya dêm.

**Dêmxir** (hn.l.mê) Mirovê dêmê wî girovir be.

**Dên** (n.x.nêr) Deyn.

**Dêr** (n, cugrn.x.mê) 1. Perisgeha felan. 2. Gund.

**Dêran 1** (cugr,n.dar.nêr) Gund.

**Dêran 2**(hn.dar.çewa) Wêran. Xirabe.

**Dêran 3**(hn.dar.çewa) Lewaz. Bêçare.

**Dêrandin 1** (n.jn.dar.mê) Dema dilopêd avê ji erdekî di derkevin. : Gozikê me gelek avê di dêrîne.

**Dêrandin 2** (k.jn.dar.mê) Çandin. Tovkirin. Nemamkirin.

**Dêrelok** (hk.cih.cugr,n) Bajêrkeke li devera badînan.

**Dêrelokî** (malb.n.dar) Xelkê dêrelokê.

**Dêrik** (hk.cih,cugraf,n.mê) 1. Gund. 2.Bajêrek Kurdistana Suryê.

**Dêrs** (hn.x.çewa) Pîs. Gemar.

**Dersbûn** (k.jn.l.mê) Pîsbûn. (K) bn: Bûn.

**Dêrsim** (hkc.cugrafn.nl.mê) Bajêrek Kudistana turkî ye.

**Dêrsimî** (malbn.dz) xelkê Dêrsimê.

**Dêrsbkirin** (k.jn.l.mê) Pîskirin. (K) bn: Kirin.

**Dêrşew** (hk.cih.cugrafn.mê) Gundeke li Kurdistana bakûr.

**Dêrşewî** (malbatnl.dz) Xelkê dêrşwê.

**Dêrzeman** (hkdl.mê) Demek ji mêje. Demek gelek dûr.

**Dêtî** (n.dar.mê) Daykînî. Dayînî.

**Dêv** (n.x.nêr) Dêw.

**Dêvzime** (n.dar.nêr) Gapîsk.

**Dêw** (n.x.nêr) 1.Helametekê evsaneyî yê liser erdî yan firindeye alîkarîya qehremên çîrokî di kir jibo vegustina wan. Caran jî bervajî, bi karên xirab di rabû.2. Çembera mirovê zelelah û bi hêz.

**Dêwane** (hn.dar.çewa) 1. Kesê mîna dêwan bi hêz û zebelah. 2. Dîn. Şêt.

**Dêze** (hn.x.çewa) Kesê reştale. Esmer.

**Dêzereş** (nl.dz) Kesê gelek reş. Reşqelayî.

**Dêzê** (hn. Gazî.dar.mê) Jina dêze. Reş.

**Dêzo** (hngazî.dar.nêr) Zelamê dêze.

**Di** (pb.alv.g) ***rêzman*** Pêşpirta kirinane . di kem , di çe. Di xwen. Di hên. : Min di dilê xweda di got.

**Dibe** (Allav. misogerkirin) ***rêzman*** Dibit. Br× nabe.

**Dibistan** (hkl.cih.mê) Xandingeh. Qutabxane.

**Dibit**[dibe] (alv.mis) Çê di bit.: Dibit evro ezê li mal bim. Br× nabit.

**Didan** (n.x.nêr) Hestîyê sipî di devê candaran da, jibo hêrana(cûna) xwarinê. Didanêd mezinan 32.Didanêd şîrî, didanên zaroyan ji jiyê çend meh tanî 6 sal.



**Didan**

**Didansaz** (kar,n.dar.dz) Pispor di warê çêkirina didanan da. Nûjdarê didanan.

**Dido** (hij.n.x) Hijmara du. Du. 2.

**Didoyan** (hij.n.dar) Yêd/yê/ya duyê. : Xanîyê yekê ne,ê didoyan yê apê mine.

**Difin** (n.x.mê) ***leş*** Hedamê hesta zanîna bêhin, bêhinînanînûbirinê. Kepî. Kepo. Lût. Poz.




**Difin**

**Difinbilind** (hn.l.çewa) Mirovê xwe mezin dike. Mirovê ji xwe zêde bi bawerî. :Ev çi zelamekê difinbilnde. :Jineka difinbilind.

**Dihindan** (k.jn.x.mê) Reqkirin. Peytkirin.

**Dihlik** (n.dar.mê) Dêhil. Seya mê.

**Dihol** (n.dar.mê) Duhol. Def.

**Dij** (hk.x.çewa) Her karek ne di gel vîyana mirovî. Br× berdij. : Divê em hemû dij erebandina Kurdistanê bi westin. Hevrik.

**Dijane** (hk.dar.çewa) Berevajî.

**Dijatî** (n .dar.mê) Weke mirov dij karekî be. Rikatî.:Dagîrker dijatîya me di kin.

**Dijber** (hn.dar.çewa) Beevajî. Rikeber. Berdij. : Dijbera ; were × here.

**Dijberî** (n.dar.mê) Berdijî. Berevajî.

**Dijgiranî** (n.l.mê) Dema giranî ya du tenêd hevberkirî ne mîna hev bin. Tayêd terazîyê ne wek hev di giran bin.

**Dijî** (hn.x.çewa) Dij.

**Dijmin** (n.x.dz) Dujmin. Neyar. Xwîdar. : Dagîrkerên Kurdistanê dijminêd me kurdanin.

**Dijminayî** (n.dar.mê) Kiryarên dijminkarî.

**Dijminkarî** (n.l.mê) Kar û kiryarên dijminane. Dijminayî.

**Dijrabûn** (k.jn.gl.mê) Hember kesekî mîna dijminî serederî kirin. (K) bn: Rabûn.

**Dijûn** (n.x.mê) Civîn. Sixêfî. Xeber.

**Dijûndan** (k.jnl.mê) Civîndan. Sixêfîdan. Xebergotin. : Mirovê ezmanpîs herdem dijûnana di de.(K) bn: Dan.

**Dijûnkirin** (k.jn.l.mê) Xebergotin. Dijûndan. (K) bn: Kirin.

**Dijwar** (hn.x.çewa)1. Tiştê har,tîj.Tund. Zirek. :Bîber dijware. Pîvaza dijwar. :Mirovê dijwar. 2. Navê kurane.

**Dikan** (hk.cih.mê) Cihê firotina û kirîna kelopelan.firoşgeh.: Li taxê me pir dikan hene. : Dikan li rex mala meye.

**Dikandar** (pîşn.dar.dz) Xwedî yan mirovê liber dikanê kar dike. : Dikandarî dikan vekir.

**Dikandarî** (karn.dar.mê) Kesê pîşe yan karê li ber dikanê di ket.:Dikndarî karekê dilvekere.

**Diktator** (hn.biyanî.dz)) Mirov yan desheta mafê mirov û civakê şêl diket. Deshelata tekrewî.

**Diktatorî** (n.dar.mê) Rijêm yan sistema takrewî.

**Diktor** (pîşn.biyan.dz) Nojdar. Dixtor.

**Diktorî** (kar,n.dar.mê) Nojdarî. Dixtorî.

**Dil** (n.x.nêr) 1.Endamek leşî ye dinav sebeteya singî da, mîna pempekî xwînê di havêje canî û di vegerîne,.: Ez di dilê xweda di bêjim. 2. Sûz. Viyan. Hezkirin.: Dilê min gelek bi hejaran di şewite. :*Pend* :dila dilan di evîne. *Pend* :Dil pîr nabit.

**Dilandin** (k.jn.dar.mê) Mirov zaro( kur û keç) yan candaran bi nazî xwedî bike û serederîyê pêra bi ke. Nazkirin. Nazikkirin. Nazandin. Nazdarkirin. Dindilandin. Ez di dilînim hûn di dilînin,ew di dilîne,…. .

**Dilawer** (hn,çewa.dar.) 1. Mêrçak. Wêrek. Çavnetirs. 2. Navê mêrane.

**Dilawerî** (n.dar.mê) Mêrxasî.

**Dilazad** (hn.l.çewa) Mêrçak. Dilşêr.

**Dilbawer** (hn.l.çewa) Mirovê zû bawerîyê bi hemberê xwe dihînit.Dilnazik.

**Dilbaz** (hn.l.çewa) Mirovê,xasime keça bi cilik û rapêça xwe bala mirovî di kişîne.

**Dilbazî** (n.l.mê) Kesê xwe dilbaz bikit.Nazdarî.

**Dilbazîkirin** (k.jn.gl.mê) Nazkirin. Xwe tivtivandin. (K) bn: Kirin.

**Dilbend** (hn.l.çewa) Evîndar.

**Dilbendî** (n.l.mê) Evandin. Evînkirin.

**Dilber** (hn.nl.mê) 1. Pesidana şox û şengîya jinan. Ciwan . Xweşk. Naz.2. Dilreq. Evînçirîk.

**Dilbijîn** (hn.l.çewa) Kesê dilê wî bi çit tiştekî. Dilvekirin.

**Dilbirîn** (hn.çewa,n.l) 1.Dilê birîndar. bi kovan, Xem ,pejare. 2. Navek kurdî ê kurane.

**Dilborîn** (k.jn.l.mê) Bêhoşbûn. Bêhişman. Hay ji xwe neman. Dilgirtin. (K) bn: Borîn.

**Dilçepel** (hn.l.çewa) Zinx. Tamsar.

**Dilçirmisî** (hk.l.çewa) Bêgêwil. Posîde.

**Dilçirmisîn** (k.jn.l.mê) Bêgêwilbûn. Mirîtûbûn. (K) bn: Çirmisîn.

**Dilçûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov di xwazit xwarinekê bi xwe. : Dilê min gelek di çit savarê. Dilê wî naçe îpraxa. (K) bn: Çûn.

**Dildan** (k.jn.l.mê) Weke mirov dilê xwe dide yekî. Mirov hez ji êkî biket. : Wî dilê xwe daye keça mezinê gund. Gulê min dil daye te, ev çend salin ez li benda te.(K) bn: Dan.

**Dildar** (hk.n.l.çewa) 1. Evîndar. 2. Navê kuran.

**Dildayî** (n.l.mê) Dildar.

**Dilevîn** (hn.l.çewa) Kesê evîn ketî dilê wî. Evîndar.

**Dilêr** (hn.dar.çewa) Aza. Dilşêr. Dilawer.

**Dilêş** (hn.l.çewa) 1. Mirovê posîde. Birîndar. Kovandar.2.Mirovê bi gotinan xelkî birîndar diket, dilê mirovî di êşînit.

**Dilêşandin** (k.jn.l.mê) Gêwilşikandin. Paşvebirin. Birînkirin..: Tu bi wan gotinan dilê min û yê di êşînî. (K) bn: Êşandin

**Dilfireh** (hn.l.çewa) Mirovê bêhinfireh. Singvekirî. Liser xwe. Merd. Bi aram.

**Dilfirehî** (n.l.mê) Bênfirehî.

**Dilgerm** (hn.l.çewa) Mirovê xwedî têhin û hêz.Geşbîn . Xurt. Çeleng.

**Dilgermî** (n.l.mê) Çelengî. Zîrekî. geşbînî.

**DilediIdan** (k.jmê) kêmkirina xema mirovê dilteng yê ku tiştek lê qewimî. dilnerimkirin. Ji bîrbirin. Bn: dan.

**Dilgeş** (hn,nl çewa)1.Kesê dilê wî xweş. Keyfxeş. Geşbîn.2 navê mêran.

**Dilgeşî** (n.l.mê) Kêfxweşî.

**Dilgir 1**(hn.l.çewa) Zadê giran dema mirov pê gêj di bit.. Xwarina pir çevir.

**Dilgir 2** (hn.l.çewa) Mirovê di dilê xweda mezin, qebe. Ji xwe razî.

**Dilgiran** (hn.l.çewa) Mirovê sil. Mirovê Tore. Mirovê hêris. : Mamostayê min ji min dilgirane, jiber ku min waneyên xwe ne nivîsbûn.

**Dilgiranî** (n.l.mê) Silbûn.Hêrisbûn.

**Dilgirtin** (k.jn.l.mê) 1. Silbûn. 2. Bêhoşbûn. Jibîrveçûn. 3. Li hevhatin. Pêkhatin.

**Dilgîr** (hn.dar.çewa) Sil. Hêris. Tore.

**Dilhebûn** (k.jn.l.mê) Dema mirovî gêwil hebit jibo karekî. : Min dil heye sube herim çem birayê xwe bi mêvanî.

**Dilhesin** (hn.l.çewa) Kesê dilê sî req mîna asinî.Dilreq. Dilqayîm.

**Dilhêlan** (k.jn.l.mê) Weke mirov dilê êkî bi gotinêt gemar bi şikênit. Dilşikandin. Birîndarkirin. : Bibore eger min dilê te hêla bit. :Tu bi xudê dilê wê ne hêle.(K) bn: Hêlan.

**Dilhişk** (hn.l.çewa) Dilreq.

**Dilhiştin** (k.jn.l.mê) Dilhêlan.

**Dilik** (n.dar.nêr) 1. Nazik yan biçûk-kirina dilî.2. Wêneyê dilî liser ristik û stovankan, ku mirov bi dest yan stoyê xwe ve diken.

**Dilikkirin** (k.jn.l.mê) Nazkirin. Piçûkkirin. Dilandin. Dindilandin. (K) bn: Kirin.

**Dilînî** (hn.dar.çewa) Sozdarî. Hest. :Stiraneka dilînî. :Helbestena dilînî.

**Dilîr** (hn.dar.çewa) Dilêr.

**Diljar** (hn.l.çewa) Kovandar. Dilkul.

**Diljarî** (n.l.mê) Dilşikestin. Kovan.

**Dilkevir** (hk.l.çewa) Dilreq. Dilêwî mîna keviran reqe.

**Dilkevtin** -ketin(k.jn.l.mê) Dema dilê mirovî kesekî yan tiştekî bi xwazit. : Dilê gelek ketîye tirobêla te. (K) bn: kevtin- ketin.

**Dilkevtî** (hn.l.çewa) Dildar. Evîndar.

**Dilkêş** (hn.l.çewa) Balkêş. Xweşik.

**Dilkirin** (k.jn.l.mê) Hezkirin.Viyan. Xwaztin. (K) bn: Kirin.

**Dilkişandin** (k.jn.l.mê) Hezkirin.

**Dilkul** (hn.l.çewa) Dilşikestî. Dilbirîn. Dilçirmisî. Kovandar. :Jineka dilkul.Mêrekê dilkul.

**Dilkulî** (n.l.mê) Derd. Kovan.

**Dilkutan** (k.jn.l.mê) Lêdana dil. Qutana dilî.

**Dilkutîn** (k.jn.l.mê) Dema dil lê dide. Qutana dilî. Dilqutan.

**Dilkuzrandin** (k.jn.l.mê) Dilsotin. Dilşewitandin. :Te dilê kuzrand bi wan gotinan. (K) bn : Kuzrandin.

**Dilkuzrîn** (k.jn.l.mê) Dema ji kovanekê yan çamekê dilê mirovî di şewite. : Çend ez wî zarokî di bînim, dilê min di kurrit, çunkî babê wî dihêt bîra min. Dilsotin.(K) bn : Kuzrîn.

**Dillihevkevtin** (k.jngl.mê) Hez ji hev kirin. Hevdu viyan. Dilêd wan kevtin hev.

**Dilman** (k.jn.l.mê) 1. Silbûn. Posîdebûn. Hêrisbûn. ; Ez nizanim çima dilê wî ji min maye ?. Dilê te ne mînit ez dê te ji karî deêxim.2. Navek kurdî ye.

**Dilmezin** (hn.l.çewa) Mirovê merd û singfireh. Hêja. Dilovan.

**Dilmezinî** (n.l.mê) Dilovanî. Singfirehî.

**Dilmê** (hn.dar.çewa) Nazik. Xav. : Hêka dilmê.

**Dilnas** (kar,n. l.dz) Pisporê nexweşîya dilan. Nûjdarê dilan.

**Dilnasî** (n.l.mê) Zainîn û xwendina li dor dilî tê kirin.

**Dilnazik** (hn.l.çewa) Dilînî. : Ew mirovek hinde dilnazike, çi caran neşêt guhdarîya dengê Şêxoy biket. ***Pend*** :Dilê nazik negehit çi miradan.

**Dilnerim** (hn.l.çewa) Dilovan. Liser xwe.Singfireh. Dilnazik. Br× dilreq.

**Dilnerimkirin** (k.jn.gl.mê) Diledilîdan. Dilxweşkirin. (K) bn : Kirin.

**Dilop** (n.x.mê) Çipik. Çilk. Çipikêd avê.

**Dilopandin** (k.jn.l.mê) Bi amêran avê dilop dilop bi fîteran paqij û bijîn di kin jibo vexwarinê.

**Dilopandî** (hk.dar.çewa) Ava bi dilopandinê hatî bijîn kirin. Ava paqij. Ava bijîn.

**Dilopkirin** (k.jn.l.mê) Dema dilopên avê ji cihekî di kevin. : Banê me li biharan dilopan diket. (K) bn : Kirin.

**Dilovan** (hn.l.çewa) 1. Dilsoz. Sozdar.2 Navê kuran.

**Dilovanî** (ndar.mê) Sozdarî.

**Dilpak** (hn.l.çewa) 1. Dilsoz. 2. Navek kurdî hevpişke.

**Dilpakî** (n.l.mê) Dilsojî. Dilsozî.

**Dilpîs** (hn.l.çewa) Kumreş. Çavnebar.

**Dilpîsî** (n.l.mê) Kumreşî. Çavnebarî.

**Dilqijîn** (n.dar.mê) Derdeke ku zik(geda) mirovî jan dike. Di sojit. Di şewite. Janegede. Janezik.

**Dilqusîn** (n.dar.ê) Dilqijîn.

**Dilrabûn** (k.jn.l.mê) Hilandin. Hilavêtin. : Jiber xwarina zadê kevin dilê rabû.

**Dilrast** (hn.l.çewa) Rastgo. Vekirî. Dilsax.

**Dilrastî** (n.l.mê) Dilsaxî.

**Dilrawestan** (k.jn.l.mê) Dema dilê mirovî yan candaran ji lêdanê di rawestit. : Dilê wî ji lêdanê rawesta û malavayî li me kir.

**Dilreş** (hn.l.çewa) 1. Mirovê ne dilsax. 2. Zadê pîs, gemar.

**Dilreşbûn** (k.jn.gl.mê) Dilê mirov ji kar,tişt, xwarin yan yekî reş bi be; mirov wî na xwaze. Xwe jê dorxistin. (K) bn: Bûn.

**Dilreşî** (n.l.mê) Pîsî. Gemarî.

**Dilreşkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov dilê xwe ji tiştekî, zadekî reş kit; ango mirovî ew tişt êdî nevêt..: Dilê xwe ji zadî reş reş neke. (K) : Kirin

**Dilron** (hn.l.çewa) 1. Mirovê zû di zanînan wer bi girit.Şareza.2. Dilvekirî. Bêguneh.

**Dilsax** (nl.mê) kesê çi xirabî di dilîda nebit. Bê guneh.

**Dilsaxî** (n.l.mê) Bêgunehî. Sadeyî. Rasgoyî.

**Dilsar** (hn.l.çewa) Kesê bê hîvî. Reşbîn. Br× dilgerm.

**Dilsarbûn** (k.jn.gl.mê) Dil jê sar bûn.Wekî dilê mirovî ji karekî sar bi bit. : Dilê wî ji xwendinê sar bûye, lewra ne vêt herit xwendingehê. (K) bn: Bûn.

**Dilsarî** (n.l.mê) Reşbînî. Bêgêwilî.

**Dilsarkirin** (k.jn.gl.mê) Bêhîvîkirin. Gêwilşikandin. : Heger dilê xwe sar key, tu neşêy liser karê xwe berdewam bî!. (K) bn: Kirin.

**Dilsotin** (k.jn.l.mê) Kovanên mezin. Çam . Derd. Dilşewat.

**Dilsoz** (hn.l.çewa, n.l.dz) 1. Yê dilê wî bû dozek hejî di şewute. sozdar. Perwer.2.Navek duzayende.

**Dilsozî** (nl.mê) Perwerî. Dilsojî. Nîştimanperwerî.

**Dilşa** (hn.l.çewa) 1. Bi keyf. Kêfxweş. 2. Dilmezin. 3. Navek du zayend.

**Dilşad** (hn.l.çewa) 1.Kefxweş. Navê mêrane.

**Dilşayî** (hn.l.çewa) Dilşa.

**Dilşewat** (hn.l.çewa) Dilsoj. Kovan.

**Dilşewitandin** (k.jn.l.mê) Dilkuzrandin. (K) bn: Şewitandin.

**Dilşewitîn** (k.jn.l.mê) Dilsotin.

**Dilşêr** (nl.dz) 1 mêrxas. Qehreman. Bi cerg. 2 navê kuran.

**Dilşikandin** (k.jn.l.mê) Dilhêlan. Silkirin. :.Dilê wî ne şikêne. (K) bn: Şikandin.

**Dilşikestin** (k.jn.l.mê) Dilman. Silbûn. Kovandarî. :Heger dil şikest êdî sax nabit. (K) bn: Şikestin.

**Dilşikestî** (hk.l.çewa) Sil. Damayî. Bêgêwil.

**Dilteng** (hn.l.çewa) Bêhinteng. Bê aram.

**Diltengî** (n.l.mê) Bê aramî. Bêhintengî.

**Dilter** (hn.l.çewa) Mirovê çi bi xwe nekit xem û hez ji cilêd ciwan, stiranêt xurt û keçan û bejina xwe biket.: Bapîr çendê dilte, mîna xurtekî li govendê di leyze.

**Diltevdan** (k.jn.l.mê) Gêjbûn.

**Diltêrbûn** (k.jn.gl.mê) Dil ji kare, mirovek yan xwarinekê têr bibit, ango êdî wî naxwazit, êdî nevêt bi bînit. Dil jê reşbûn. : Dilê min ji dinyayê têr bûye, ango ji her tiştî ez bêzar bûme.

**Dilxirab** (hn.l.çewa) Kumreş. Dilpîs.

**Dilxirabî** (hn.l.çewa) Dilpîsî.

**Dilxirabîkirin** (k.jn.gl.mê) Dema jin yan mêr bawerî bi hevjîn yan xuşik û bara ne be, ji wî ve çavê mirovan lisere.

**Dilxwastin** (k.jn.l.mê) Ji dil viyan. Hezkirin.

**Dilxweş** (hn.l.çewa) Kesê çi arêş di jiyana xwe de nebin, yan xweşî ji bo xwe çê bikit..Keyfxweş.

**Dilxweşbûn** (k.jn.gl.mê) Kêfxweşbûn.: Bi hatina te dilê min pir xweş bû.

**Dilxweşî** (n.l.mê) Kêfxweşî.

**Dilxweşkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov bi gotinan dilê yekî xweş ke. Jibîrvekirin.: Te bi wê mizgînîyê dilê  xweş kir. (K) bn: kirin.

**Dilzar** (nl.n.n) 1. Dilsax. 2. Navek kurdî yê kurane.

**Dim** (n.x.nêr) Pişka dirêj û req bi serê çûçik û tewalanve jibo girtina xwarinê(tomik, goşt .htd). Dimê mirîşkê, kotirê, sivandokê û htd. Nikl. Dev.

**Dimbik** (n.dar.mê) Duhol. Def. Tombilk.

**Dimik** (n.dar.nêr) 1.Zêdeyîyeka dirêj û biçûk .2. Dimê çûçika 3. Dimê biçûk.

**Dimilî** (zar,n.x.nêr) Zaravayê zazakî.

**Din** (p.ap) Tiştê ne ew yê kû li ber teye. Dî. Ne ev yê(ya) din.

**Dinbilî** (.zar,nx.nêr) Zazayî.

**Dindik** (n.dar.mê) 1.Tovê fêqî yan genim , ceh .htd . : Didan wek dindikên birincî. Ango; sipî.Lib. 2. Çune. : Ez dindik di axivtina te ne gehiştim.

**Dindikhinar** (n.l.mê) 1. Dindikên hinaran. 2. Navê çîrokeka zarokane, û qehremana wê ji keçeke bi heman navî.

**Dindil** (hn.x.çewa) Nazik. Nazdar. Xweşdivî.: Hespê dindil.

**Dindilandin** (k.jn.dar.mê) Pûte pêdaneka mezin.Nazandin.Nazdarkirin.

**Dindilandî** (hk.l.çewa) Nazkirî. Sexbêrkirî. :Hespê dindilandî. Mahîna dindilandî. Zarokê dindilandî.

**Dinê** (hk.cih,cugir,n.x.mê) Dinya. Cîhan. : Li sala 1970 ew hate dinê. : Malê dinê li dinê di mîne. Malê dinê qirêja destane.

**Dinêdîtî** (hn.l.çewa) Mirovê dinêdîtî;ango mirovê xwedî serbor û zana.

**Ding** (n.x.nêr) Dîwarê mezin û qayîm. : Dingê daye ber rêya gundî daku xirab nebit.

**Dinge** (n.x.nêr) Ding.

**Dinya** (hk.cih.cugr,n.x.mê) Dinê. : Dinya ya pûçe. : Dinya jibo kesê ne male. Malê dinyayê qirêja destane.: Li ser darê dinyayê min ev xanî ye heye.

**Dinyayî** (hn.dar.çewa) Kar û jiyana li dinyayê di hêt kirin. Kiryarên ne jibo olî, dînî.

**Diqdiqandin** (k.jn.dar.mê) Qidqidandik vekirin. Gilîzank vekirin.

**Diqdiqank** (n.dar.pir) Qidqidandk. Gilîzank.

**Diraf** (n.x.nêr) Bn :Dirav.

**Dirahî** (n.x.mê) Direw.

**Diran 1** (n.x.mê) 1. Cihê hatî dirandin. Kelaştin. 2. Direw. Vir.

**Diran 2** (n.x.nêr) Didan.

**Dirandin** (k.jn.x.mê) Dema mirov peroyekî di kelêşit, şeqekê di cihekî vekit. : (K) bnd; ezz di dirînim, em di dirînîn, tu di dirînî, hûn di dirînin, ew di dirûnit(....ne) ewan di dirînin.Pr: dê bi + Bdn. Bbd: min di dirand, me di dirand. Db dûr: Dirandibû,dirandibûn. (F): bi dirîne. Bi dirînin. Çîqandin. Çîqkirin. Pirtandin. Pirtkirin.: Ji kerban cilikêd xwe dirandin.

**Dirankirin** (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina diranan, didanan. 2. Leqdanan. Gestin.

**Diransaz** (kar,n.dar.dz) bn Didansaz.

**Dirayî** (hn.dar.çewa) Diryay. Tiştê hatî dirandin. : ….cilikên dirayî jibo karî liber xwe kirin.

**Dirav** (n.x.nêr) Pare. ***Pend*** :Diravê sipî, jibo roja reş.

**Diravî** (hn.dar.çewa) Tiştê têkelî bi diravî ve hebit. Raporta diravî, mijara diravî, zanîna diravî û htd.

**Diravname** (n.l.mê) Raporta diravî ya rojane, mehane yan salane, dihêt berhevkirin ku mazaxtî û hatî bi hijmar têda tê xweyakirin.

**Direng** (hk.dem) Ne zû. êvarek, salek, şevek direng.: îro ez direng ji xew rabûm. Here mala da li te nebit direng. Br×Zû.

**Direngeşev** (hk.l.dem) Demhijmêrên nêzî dawîya şevê. :Direngeşev mêvanek jibo me hat.

**Direw** (n.x.mê) Gotina nerast. Axivtina ne dirist. Vir. :Gotinên wî hemû direwin !.

**Direwîn** (hn.dar.çewa) Kesê direwan di kit. ***Pend*** :Direwîn carek di xot firavîn.***Pend*** :Agir berbû mala direwînî kesê bawer ne di kir.

**Direwkirin** (k.jn.l.mê) Wekî kesek gotinan ji direw bi ket, çi rastî di axivtina wî de ne bit. Virkirin. (K) bn : Kirin.

**Direxť** (n.x.pir) Darûbar.

**Dirêj** (hn.x.çewa) Tiştê ne kurt. Nekin. Ew jineka dirêje ; ango bejinbilind. Robarek dirêj. Darekê dirêj. Pora dirêj. Br× Kurt.

**Dirêjayî** (n.dar.mê) Yekeyeke jibo pîvana tenan. :Dirêjayî ya vî robarî çende ?. Dirêjî.

**Dirêjbûn** (k.jn.l.mê) Tiştek dirêj bi be. Lastîk bi kêşanê dirêj di bit. Kateya darê ya dirêj bûy. *Pend* :Çîrok dirêj bû, serê guhdaran gêj bû. (K) bn : Bûn.

**Dirêjî** (n.dar.mê) Yekeya pîvanan. : Dirêjîya baxê me 70 metire. Dirêjîya te çende ? Br× Panî.

**Dirêjkirin** (k.jn.l.mê) 1. Birakêşan yan givaştin, tişt, ten dirêj di bin. : Xwe dirêj kirin ;ango razan, raketin.2. Axivtina bê rawestan. : Çîrokê dirêj neke ; ango kurt vebire. (K) bn : Kirin.

**Dirêş** (n.x.mê) Core şojine, ji hesin hatî çêkirin, sertîje, destikek darî heye, jibo kunkirina cewal û berikên qayîn, paş kunkirinê davê di kunê ra di kêşinû pê di dirûn. : Ev gonîye hinde yê qayîme, bi dirêşê jî nahêt simtin.

**Dirh** (n.x.mê) Dax. Cihê qimyayî. Sotin. Dirî.

**Dirhan** (n.dar.mê) 1.Diryan. Diran. 2. Direw.

**Dirhkirin** (k.jn.l.mê) Dirîkirin. (K) bn : Kirin.

**Dirik** (n.dar.mê) Kenarî. Dirî. Stirî.

**Dirinde** (rd.dar.çewa) 1. Candarê bi kêlbe û pencan, nêçîra xwe perçe di ke. 2. Hov. Çavsor. Bewr.

**Dirindeyî** (n.dar.mê) Awayê dirinde. Hovî. Çavsorî.

**Diringandin** (k.jn.dar.mê) Lê xurîn. Lê heytandin.(K) bdn: ez di diringînim em di diringînîn, tu di diringînî hûn di diringînin, ew di diringîne ewan di diringînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : min, te ,ewî, ewê(wî,wê) di diringand ; me,hewe(we), (ewan)wan, di diringandin.

**Dirist** (hn.x.çewa) Kiryar, gotin, kar û htd yên bê kêmanî û rast. : Gotina te diriste.Dirist bi xwîne û binivîse. Br× Şaş. Çewt. Nedirist.


**Diristayî** (hn.dr.çewa) Bi rastî. Bê çewtî.: Ez bi diristayî tênegehiştim mebestan te çîye?.

**Diristbûn** (k.jn.l.mê) Rastbûn. Petbûn. Hatin ser rêya dirist. Çêbûn.

**Diristî** (hn.dar.çewa) Diristayî. : Navê xwe bi diristî bêje.

**Diristkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirin. Peytkirin. Rê şanî dan. Ji şaşîyan vavartin. Berhevkirin. Amadekirin. (K) bn: Kirin.

**Dirî** 1 (n.x.mê) *giya* 1.Giya û tiraşeka bi stirîye, belgêt wê di kesik û xemildarin, berê wê mîna tûyane, şirîn çêjdarin, rengê wan di reşin, berî gehiştinê di kesik û sorin.2. Dehil.



**Dirî**

**Dirî** 2 (n.x.nêr) Nîşaneke, nemaze xwedîyê kewalan, bizin û pezên xwe ji yên din pê di nasin, dema bi daxkirin yan birînê liser guhên wan di ken.

**Dirîdan** (k.jn.l.mê) 1. Xwînberdan ji guhan. Dirîkirin. 2.Tankirina bax û rezan bi dirîyan. Perjanê bi dirîyan hatî kirin.

**Dirîn** (k.jn.x.mê) 1. Jêkirin. Çinîn. Birîn . 2. Pêkvegirêdan a cilkan. .Dirûtin.: Tu cilan kerke, ez dê dirîm. Dema dirîna cehane.

**Dirkandin** (k.jn.dar.mê) Aşkerakirin. Ji holê derxistin. Berçavkirin. Ragehandin.

**Dirke** (n.x.mê) Zibil ê çûçikan. Zîç. Zîq.

**Dirîne** (nax.mê) Çinîn.

**Diro** (n.x.mê) Direw. Vir. Neweyî.

**Dirov** (n.x.mê) Dirûv.

**Dirûd** (n.x.mê) Silavêd pîroz. Silavêd pêxember û çakan. Silav.

**Dirûn** (k.jn.x.mê) Dirîna genim, ceh, nîsk û htd li zevîyan Dirûna cilikan.

**Dirûne** (n.dar.mê) Karê dirûtina zevîyan,genim, ceh, birinc, nîsk û htd. : Meha bihêt dema dirûne ya genimî ye.

**Dirûnekirin** (k.jn.l.mê) Dema pale zevîyan di dirûn. : Salekê me dirûna genim di kir, baranek mezin barî.(K) :Kirin.

**Dirûngeh** (n.dar.mê) Zevî yan cihê dirûnê.

**Dirûnkar** (pîşn.dar.dz) Pale û cotkarên dirûnê di kin.

**Dirûnkarî** (karn.dar.mê) Karê dirûna dexil û giyayî.

**Dirust** (hn.x.çewa) Dirist.

**Dirûş** (n.x.nêr) Binê pêy.

**Dirûşim** (n.dar.mê) 1. Rû. Rûmet. 2. Parole. 3. Rewş.

**Dirûtin** (k.jn.x.mê) Dirûn.

**Dirûv** (n.x.mê) 1. Perçe kaxez, yan peroyeke bihayê mitayî liser di nivîsin jibo firotinê.2. Rû. Rûmet. Serûçav.

**Dirûvandin** (k.jn.dar.mê) Şêwe diriskirin.Guherandina şêweyê tenan. (K) bdn : ez di dirûvînim, em di dirûvînîn. Tu di dirûvînî, hûn di dirûvînin. Ew di dirûvîne[...it], ewan di dirûvînin. Pr : Dê bi + bdn. Bdb : di dirûvand, di dirûvandin. Db,dûr : Dirûvandibû, ... bûn. (F) : bi dirûvîne, bi dirûvînin.

**Dirûvdan** (k.jn.l.mê) Çêkirin. Peydakirin. Avirandin. (K) bn : Dan.

**Dirwêne** (n.x.mê) Dirûne.

**Disan** (pêrb) *rêzman* Alavê dubarekirinê ye.Dîsa. Dîsa. Carek din. Careka dî.

**Dismal** (n.dar.mê) Destmal. Desmal. Kefîk.

**Distar** (n.x.nêr) 1. Du berên pan û zivir liser hev di zivrînin, jibo hêrana danî.Aşkê destî. 2.Hêmaya xebat û berxwedanê.

**Distarhêr** (karn.dar.dz) Mirovê distarî di hêre.

**Distarhêran** (k.jn.l.mê) Karê distarî. Hêrana danî bi distarî. (K) bn : Hêran.

**Distarhêrk** (n.dar.mê) Dema hêranan distarî, nemaze şeva ko dê li malekê danî bi hêrin. : îşev li mala bapîrî distarhêrke.

**Diş** (n.x.mê) Xûşka jinê. : Dişa wî ye û jinbira wîye ,ango ; Xweha jina wî jina birayê wî ye.

**Divêle** (n.x.mê) Bendikên ji çerim yan lastîkê hatîne çêkirin.

**Diwa** (n.x.mê) Dawî. Domahîk.

**Diwazde** (hijn.çend) Hejmara 12. 6+6= 12.

**Diwazdeh** (hijn.çend) Diwazde.

**Diwazdehmîn** (hijn.çend) Ya/yê/yêd diwazdê.

**Diwazdehizar** (hijn.l) 12,000.

**Diwazdemilyon** (hijn.l) 12,000,000.

**Diwêl** (n.x.mê) Divêle.

**Dixtor** (pîşn.x.dz) Kesê nexweşan çare di ket. Nojdar. Pizîşk.Diktor.

**Dixtorî** (karn.x.mê) Nojdarî.

**Diyar** (hn.x.çewa) 1.Aşkera. Xuya. Berçav.. 2.Navê mêrane.

**Diyarbûn** (k.jn.l.mê) Xuyabûn. Aşkerabûn. Avhilbûn.: Eve tu li kîve yî diyar bibe!. (K) bn: Bûn.

**Diyarî** (n.dar.mê) Xelat.

**Diyarîdan** (k.jn.l.mê) Diyarî pêşkêşkirin. Diyarî parvekirin. :Evro mamosta diyarê dan qutabîyan. (K) bn: Dan.

**Diyarkirin** (k.jn.l.mê) Xuyakirin. Aşkirakirin. (K) bn: Kirin.

**Diz** (karn.x.dz) Kesê malê xelkî bi rêya ne rewa ji xwere di be. Dizîker. ***Pend*** :Dizê bi bilûr.ango mirovê dixaze karekî bi dizî ve bi ke, lê ji nezanîna wî kar aşkera di be. Cerde.***Pend***:Dizî(dizîker) ji dizî(dizîker) kir dizî(dizîn), erd û esman lerizî. . ***Pend*** :Diz û maxweyê malê bûn heval.ga di kulekê ra dizîn.

**Dizdî** (n.x.mê) Dizî.

**Dizî** (n.x.mê) Karê ko mirov malê xelkî bi dizî ve di stîne.

**Dizîker** (karn.l.dz) Kesê pîşe yan karê wî dizîye . Diz.

**Dizîkirin** (k.jmê) Dema yek tiştekî bi dizit. (K) bn: Kirin.

**Dizîn** (k.jn.x.mê) Dizîkirin (K) bdn:z di dizim, em di dizîn, tu di dizî hûn di dizin. Ew di dize[…it] ewan di dizin. Pr: Dê bi dizim,..n,,. Bdb : di dizî, di dizîn. Db,dûr :Dizîbû, …bûn. (F) :Bi dize, bi dizin.

**Dizok** (kar,n.dar.dz) Diz. Dizîker.

**Dî** (pêrb) ***rêzman*** Alavê hevberkirinê.Eve ne, ya dî, yê dî, yên dî. Rojeka dî. Careka dî. Saleka dî. Demek dî. Din.

**Dîbace** (n.x.mê) Pêşgotin.

**Dîcle** (cugirn.x.nêr) Yek ji mezintirîn çem ên Kurdistanê.

**Dîdar** (n.dar.mê) Dîtin. Hevdîtin. Hevpeyvîn.

**Dîde** (n.x.mê) Dîdar. Dîtin.

**Dîdevan** (karn.dar.dz) Kesê ko tişt yan bûyer bi çvên xwe dîye.Zêrevan. Nêrevan.

**Dîdvan** (karn.dar.dz) Dîdevna.

**Dîk** (n.x.nêr) Dîkil.

**Dîkêl** (n.x.mê) Kadî. Dûkel. :Dîkêla kuçkî. Dîkêla cigarê.

**Dîkêlkirin** (k.jn.l.mê) Peydabûna dîkêlê. :Sope dîkêlê di ket.

**Dîkil** (n.x.nêr) Tewalek malîye, nêrînê mirîşkane. Kirosk.Kelebang.

**Dîkilok** (n.dar.mê) Stêrka tivengê.

**Dîkor** (n.biyan.x.nê) Mal , jor , xanî. htd. Xemlandî.

**Dîkorkirin** (k.jn.l.mê) Xemlandin.

**Dîksilêman** (n.l.nêr) ***balinde*** Teyrikê Silêman pêxember. Teyrikê dunikil.

**Dîktator** (hnbiyan.çewa) Diktator.

**Dîktatorî** (n.biyan.dar.mê) Diktatorî.

**Dîl** (hn.x.çewa) Kesê di kevit destê neyaran .Girtî.zîndanî. Ne azad. Bend.

**Dîlan** (n.x.mê) 1.Keyf. Xweşî. 2.Govend. Şahî(Şayî).3. Navê keçane.

**Dîlankirin** (k.jn.l.mê) Govendkirin. Şayîkirin. Kêfkirin. : Werin dîlanê bi kin evro roja meye. (K) bn: Kirin.

**Dîlawer** (hn.dar.çewa) Dilawer.

**Dîlbaz** (hn.dar.çewa) Xweşik. Balkêş. Ciwan. Rind.

**Dîlî** (hn.dar.çewa) Girtî. Bendî. Ĕxsîrî. Rebenî. : Ew bi dîlî kevte destê dujmin.

**Dîlokvan** (karn.dar.dz) Serkêşê desteya dengbêjan ko li dîlanê di stirin.

**Dîmen** (n.x.mê) Cihê jibo dîtina çavan balkêş û bi xemil.: Dîmenê çiyayê han pir ciwane.

**Dîn** 1 (hn.x.çewa) Kesê ji alîyê mejî ve kêmasî hebin. Şêt. Aqilsivik.

**Dîn** 2 (n.x.nêr) Bawerî. Ol. Dinê îslamê, Felan û htd.

**Dînamîk** (hn.biyan) Bi bizav.Livîn. Çeleng.

**Dînamîkî** (n.biyan) Tiştê berdewam di livîn û guhorînê da.

**Dînamo** (n.biyan) Dînemo; Amêreke di zivirit, têhna karebê jê peyda di bit.

**Dînar** (n.x.mê) Parê welatê îraqê û hindekên din.

**Dînbûn** (k.jn.l.mê) Dema aqilê kesekî sivik dibe. Ji tirsan dîn bû. (K) bn: Bûn.

**Dîndar** 1 (hn.dar.çewa) Kesê pêgirî beramber dînî hebit. Mirovê xudanas. Xwedênas. Olperês.

**Dîndar** 2 (n.dar.mê) Dareke li çiyayên Kurdistanê hişîn di bit.

**Dîndarî** (n.dar.mê) Kar û xebata jibo dînî dihêt kirin. Olperistin.

**Dînemêr** (hk.l.çewa) Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs.: .... Dîne mêre her nizanit mirin heye yan ne.

**Dînemêrî** (n.l.mê) Mêrçakî. : Dînemêrî ya wî bo her kesî xuyaye.

**Dînê** (nhd.dar.mê) Gazîkirin û naznavê jina dîn.

**Dîng** (n.x.nêr) Kilka pezî ya qelew û bi bez.: Dîngê mihê, beranî, berxê.

**Dînik** (hn.dar.çewa) Mirovê kêmaqil. Piçek dîn. Nîvdîn. Sade.

**Dînî** 1 (rd.dar.çewa) Karên têkelî bi dînî ve hebin. Olî. : Bizava dînî, gotara dînî, partîyên dînî,û htd.

**Dînî** 2 (n.dar.mê) Kiryarên mîna dînan. Dînatî. : Te bo xwe bi dînî yê bire ser.


**Dînîtî** (n.dar.mê) Dînî. Dînatî.

**Dînk** (n.x.mê) Cihekê kizir û bijîne alîkê lê di danin û pez û bizinî ber di din ser dako bi çerin. Dardînk.

**Dînkirin** (k.jn.l.mê) Weke mirov jiber tirs, kutekî yan her sedemeka dî dîn bi be yan mejî wî têk bi de. . :Dengê firokan zarokêd me dînkirin. (K) bn: Kirin.

**Dîno** (ngaz.dar.nêr) Bangkirin û naznavê peyayê dîn.Zelamê dîn.

**Dînozor** (n.cîhan) Candarek mezine, ji mêje jinav çûye. Daynesor.



**Dînozor**

**Dînperist** (hn.l.çewa) Dîndar.

**Dînperistî** (n.l.mê) Dîndarî.

**Dînsist** (hk.l.çewa) Mirovê pêgirîya wî bi dînî kêm be.Kesê sistîyê di erkê dîn da di ke.

**Dînxane** (n.dar.mê) Cihê çavdêrîya dînan.

**Dîq** (n.x.mê) ***derd*** Nexweşîya sihan. Ĕşa zirav. Sile.

**Dîpişk** (n.dar.nêr) ***adî*** Giyandarekê adîye , xişoke, jehirdare. Dûpişk.

**Dîr** (hn.dem,cih) 1.Tiştê dîr(dûr) yê ko delîve navbera wî û yê dî da hebit. Dûr.

**Dîratî** (n.pîvan,dar.mê) Delîve. Cihê dîr.Dirêjî. : Dîratîya navbera Duhok û zaxo nêzî 50 kme. Dûrî.

**Dîrbûn** (k.jn.l.mê) Dûrbûn.

**Dîrî** (n.pîvan.dar.mê) Dîratî.

**Dîrkevtin** (k.jn.l.mê) Dûrkevtin.

**Dîrkirin** (k.jn.l.mê) Dûrkirin.

**Dîrkuj** (hk.l.çewa) Tişt yan mirovê ji dîrve ciwan . Ji dûr xuşkûk.

**Dîrok** (n.dar.mê) Zanîna nivîsîn û tomarkirina bûyerên demên kevin yên netewe, welatan.

**Dîrokî** (hn.dar.çewa) Bûyerên têkelî bi dîrokê ve hehe. : Waneyêd dîrokî, Dîvçûnên dîrokî û htd.

**Dîroknivîs** (karn.l.dz) Kesê pispor di warê nivîsîna dîrokê da.

**Dîrokvan** (karn.dar.dz) Dîroknivîs.


**Dîrokzan** (karn.dar.dz) Dîrokvan.

**Dîsa** (pêrb) ***rêzman*** Alavê duca û çendcarkirinê. Tiştê, bûyera dubare di bit. Carek din. :Dîsa te we got. Ango;berî nuke jî gotîye.

**Dîsan** (pêrb) Dîsa.

**Dîsanekê** (pêrb.dar) Dîsa.

**Dîsk** (n.x.mê) 1.Du darikin bi destikê bagurdanî ve, di kevin herdu çalikên bagurdanî. 2. Dîska Kompyoterî.



**Dîsk**

**Dîtbar** (hn.dar.çewa) Berçav. Xuya. Mirov dikare bibîne.

**Dîtin** (k.jn.l.mê) 1.Dema candar bi çavan di bînin. *Pend* :Dîtina çavan direwe.2. Boçûn. Nêrîn. :Bi dîtina min eve krekê çake.(K) Bdn: ez di bînim, em di bînîn. Tu di bînî, hûn di bînin. Ew di bîne[..it] ewan di bînin. PR: Dê[bi] + bdn. Bdb: di dît, di dîtin. Db,dûr: Dîtibû, ….bûn. (F): Bi bîne, bi bînin.

**Dîtir** (pêrb) *rêzman* Alavê jêgirtinê.Ya dî ne ya dîtir. Eve ne, lê ya dîtir. Dî. Din.

**Dîv** (n.x.mê) 1.Kilka giyandaran. Dûv. 2. Paş.:Ez dê çim tu li dîv min were.

**Dîvçûn** (k.jn.l.mê) Pisyar û lêgerana tiştan , bûyeran ta mirov di gehit dawîyekê. Vekolîn . Lêgeran.Lêkolîn.(K) bn: Çûn.

**Dîvçûnkirin** (k.jn.gl.mê) Dîvçûn. :Min dîçûna wê bûyerê kir, lê hêjta ne zelale.(K) bn:Kirin.

**Dîvdîvk** (n.l.dz) 1. Tişt yan kesê herdem bi dîv mirovî yan tiştî ve. 2.Texteke yan çepereke di êxin dîv cencerê jibo hulîkirina qeselê(kayê).

**Dîvelank** (pin.dar.dz) Kesê bi dîv dujminê gel, mal , refa xwe bi kevit. Xwefiroş. Kirêgirtî.

**Dîw** (n.x.mê) *giya*; Silk.

**Dîwan** (n.x.mê) 1.Koçika pir ji mêvanan.:Dîwana axay ya germe, ang; tijîye ji mirovan. 2. Pertoka hozanan. Dîwana melayê cizîrî.3. Bireka mirovan bi hevre.4. Kenepe. Qenepe.

**Dîwanxane** (n.dar.mê) Koçika mêvanan.

**Dîwar** (n.x.nêr) Doşkeke ji beran yan, libnêt axê yan çîmentoyê di hêt ranan jibo avahîyan. Şorhe :Dîwarê xanî. :Çar dîwarên girtîgehê. *Pend* :Dîwarê liser befirê.ang; gotin û kiryara sist û bê.bingeh.

**Dîwardanan** (k.jn.l.mê) Dana dîwaran. Avakirina dîwaran. (K) bn: Danan.

**Dîwarkirin** (k.jn.l.mê) Diristkirina dîwaran. Avakirina dîwarên xanîyan. Nijinîn. : Me hewşa xwe jiber kewal û candarên din dîwarkir.Dîwargirêdan. (K) bn: Kirin.

**Dîyar** (hn.x.çewa) 1 Tiştê berçav, yê di bînî. Xuya.Diyar. 2 Navê kurane.

**Dîyarbûn** (k.jmê) xuyabûn .bn :Bûn.

**Dîyarî** (n.x.mê) 1. Xelatê pêşkêşî kesekî bikey. 2. Navekê duzayende.

**Dîyar**__**kirin**__ (k.jmê) Xuyakirin. (K) bn: Kirin.

**Dîz** (n.x.mê) Amanê tê lênana xwarinê. Qazan. ***Çîroka zarokan*** :Kêza terecan kete dîza pan. Neman sitî û xan. ***Pend*** :Du ser di dîzekê da na kelin.ang ;heger du semyan yan du rêber hebin dê alozî peyda bin.***Pend*** :Dîza kabanîyê şikênandî, deng jê nahêt.

**Do**__**be**__ 1 (n.x.mê) 1.Hingvînê zelal yê ji şaneyan cuda di bit. Dilopeke şirînîya zer ji hijîran di hêt xwar.

**Do**__**be**__ 2 (n.x.mê) Kelek. Daverist.

**Do**__**jeh**__ (n.x.mê) Cihê agirê sizadana mirovên xûdê nenas û gunehkaran. Agir. Cehnem. BR × Beheşt.

**Dol** (n.x.mê) Newal. Nihal.

**Do**__**lik**__ (n.dar.nêr) Amaneke ji like, asin yan şûşe hatîye çêkirin, ava vexwarinê tê di ken. Nihalk.

**Do**__**lar**__ (n,biyan.x) Pareyê hinek welatane, xasim Emrîka. Dolar. $.

**Dolî**__**dank**__ (n.dar.mê) Hêzik. Hêsk. Colandik.

**Domî**__**ne**__ (n.biyan) Amêreke pê di lîzin, domînê pê di kin.

**Domîne**__**kirin**__ (k.jn.l.mê) Lîstika domînê di hêt kirin.Bi domînê lîstin. (K) bn: Kirin.

**Don** (n.dar.nêr) Çevir. Rûn. Nîvişk. Bez. ***Pend*** :Donê wî di serê wî da. Ango; dema mirov şîretekê yan diyarîkê bi de yekî her ji ked û malê wî be.

**Don**__**girtin**__ (k.jn.l.mê) Qelewbûn. Bezgirtin.

**Donz**__**de**__ (hijn.çend) Diwazde. 12.

**Doq** (n.x.nêr) 1. Dar. Çîv. 2. Sîvok.

**Dor** (n.x.mê) Ger. Hel. : Dora kîye, dora mine. Bi dore, ne bi zore.

**Doran**__**din**__ (k.jn.dar.mê) Belavkirin. Parvekirin.

**Dor**__**girtin**__ (k.jn.l.mê) Abloqedan. Dorpêçan.

**Dor**__**girtî**__ (hn.dar.çewa) Abloqedayî.

**Dor**__**hêl**__ (n.dar.mê) Dewrûber. Kawdan. Rewş.

**Dorman**__**dor**__ (n.dar.mê) Hemû alî. Dorpêç. Rexûçan.

**Dor**__**pêç**__ (n.dar.mê) Abloqe.

**Dorpê**__**çan**__ (k.jn.l.mê) Dorgirtin.(K) bn:Pêçan.

**Doskî** (malbn.x) 1. Hozeka kurdane li Kurdistana Iraq,Turkya û Iranê. 2. Kesê ji hoza doskî.

**Dost** (n.x.dz) Heval. Birader. Hevrê. ***Pend*** :Dujminê zana çêtire ji dostê nezan. ***Pend*** :Dinya di bit bihost, dujmin nabit dost.

**Dostane** (hn.dar.çewa) Kiryarêd hevalîlî. : Yarîya dostane.

**Dostanî** (n.dar.mê) Dostînî.

**Dostikî** (malb,n.x) Doskî.

**Dostînî** (n.dar.mê) Hehalînî.

**Doşandin** (k.jn.x.mê) Dotin. Şîr yan ava fêqî dotin. Bi doşîne. Bi doşe.

**Doşav** (n.l.mê) Ava şirîna ji tirî û fêqîyên dî tê çê kirin.

**Doşek** (n.x.mê) ***nivîn*** Perokek stûre mirov li ser di raze dema xew û pêhinvedanê. Lalîk.

**Doşîn** (k.jn.x.mê) Givaştina her tiştekî tanî şilîyek jê bi hêt. :Çêl doşîn. Pez doşîn. ***Pend*** :Ez di bêjim nêre, ew di bêjî bi doşe. (K) : bdn : ez di doşim em di doşîn, tu di doşî hûn di doşin, ew di doşe[…it] ewan di doşin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di doşt, di doştin. Db,dûr : doştibû. ….bûn. (F) : bi doşe, bi doşin.

**Doştin** (k.jn.x.mê) Doşîn. Dotin.

**Dot** (n.x.mê) Nivşê mê yê daybaban. Keç. Kiç. Dota mamê. Dota xalê, Dota bira, htd.

**Dotin** (k.jn.x.mê) Doşîn. ***Pend*** :Çêl dotin û kezwan kelotin. Ang; kirina du karên ji hev dûr.

**Dotir** (pêrb) Dîtir.

**Dotmam** (hn.l.n.mê) Keça mamê.

**Dox** (n.x.mê) Bar. Rewş.

**Doxîn** (n.x.mê) Bendikeke di şel yan şelwalî ra derbaz di kin jibo tundkirinê.

**Doxînsist** (hn.l.çewa) Mirovê doxîna wî sist be.  Şelwalsist. Mirovê bêserûber. Mirovê xav.

**Doxînşil** (hn.l.çewa) Doxînsist.

**Doz** (n.x.mê) 1.Kêş. 2.Daxaz. 3. Armanc.4.Rêç.Doza gelê kurd.

**Dozkar** (n.l.dz) Kesê daxwazekê yan gazindekê pêşkêşî alîyêd havildar di ke, mîna dadgehê. Daxwazker.

**Dozkirin** (k.jn.l.mê) Daxwazkirin. Sikalakirin. (K) bn : Kirin.

**Du** (hijn.çend) Hijmara 2. 1+1=2.

**Dubare** (hk.ducakirin) Wekî karek yan bûyerek careka dî rû di det.Careka dî. Carek din. : Ev filme dubare ye.

**Dubarrebûn** (k.jn.gl.mê) Dema karek yan bûyerek dubare di bit. : Gotina hatî kirin dubare na bit. (K) bn : Bûn.

**Dubarekirin** (k.jn.gl.mê) Kar û kiryar carek dî di hêt kirin.: Tu dikarî gotina xwe dubare bikî?. Bapîrê min di got çi caran axivtina xwe dubare ne ke. (K) bn: Kirin.

**Dubarekirî** (hk.l.çewa) Karê hatî dubare kirin. :Bernameya dubarekirî.

**Dubend** (hk.l.çewa) Duta. Duser. Hevgirtin.

**Dubendî** (n.l.mê) Hevnegirtin. Berelayî. Bêserî. Yeknegirtin.

**Duber** (hk.l.çewa) 1. Peroyêd du ber hebin. 2. Candarên salê du car di zên. : Pezên duber. 3. Dar yan giyayêt salê ducar berî di din. : Hijîra duber.

**Dubrank** (n.dar.nêr) ***balinde*** Teyrê nêçîrê. Baz.

**Duca** (hkducakirin) Du kar bi hên kirin. Dubare.: Ez duca çûme derveya welatî. :Xanîyê wî duca ji yê min mezintire. du ca du di bit çar.

**ducabûn** (k.jn.gl.mê) Dubarebûn.

**Ducakirin** (k.jn.gl.mê) Dubarekirin. (K) bn: Kirin.

**Ducan** (rd.l.çewa) Jina giran yan candara avis.

**Ducar** bn: duca.

**Ducarbûn** (k.jn.gl.mê) Dubarebûn.

**Ducarkirin** (k.jn.gl.mê) Dubarekirin. (K) bn: Kirin.

**Duçar** (n.dar.mê) Serpêhatîyên nexweş.Çam. Derd. Karesat.

**Duçarbûn** (k.jn.gl.mê) Rastî derd û çaman hatin. Toşbûn. Têkevtin.(K) bn:Bûn.

**Duçarkirin** (k.jn.gl.mê) Toşkirin. (K) bn: Kirin.

**Ducarkî** (hn.l) Duca kar di hê kirin.

**Duçeng** (hk.l.çewa) Du şaper, du dest.1. rêzman. Pîtên du deng hene, mina P, Ç,L û htd. Dudeng.2. Du alî.

**Duçerx** (hk.l.çewa) 1.Duta. Du xirxalî. 2. Paysikil. Kerkê asinî.

**Dudil** (hk.l.çewa) Mirovê di kevit navbera du karan û nizane çi bi bijêre. :Ezê du dilim nizanim bi çim nik wî yan ne !.Gomandar.

**dudilî** (n.l.mê) Mirov ji gotin yan kiryara xwe ne piştraste. Nepiştrastî. :Jiber dudilîya xwe ew herdem ya aloze.

**Dudu** (hijn.çend) Hijmara du. 2. 1+1=2.

**Duduyan** (hk.hevberkir.hij) Ya/yê/yêd duwê.

**Dugihan** (h.dar.çewa) Ducan. Avis.

**Duguh** (n.l.mê) Milhêba bi du guhan.

**Duh** (hk.dem) Roja çûyî. Roja bihorî.Duhî. :Duh baran di barî.

**Duhem** (hk.hevberkir,hij) Ya / Yê / Yên duwê.

**Duhizar** (hk.hij,n) Hijmara 2000,.

**Duhin** (n.x.nêr) Rûn.

**duhî** (hk.dem) Duh.

**Duhok** (hk.cih,Cugrafn) Bajareke li bakûrê Kurdistana Iraqê, devea Badînan.

**Duhokî** (malbn) Xeilk yan kesê ji bajarê Duhokê.

**Duhol** (n.l.mê) ***mûzîk*** Amêrekê mûzîkêye du alî hene bi, darî şiveka zirav.lê di din. Li şahîyan di gel awazên zirnayê lê dixin.

**Dujmin** (n.dar.dz) Neyer. Xwîndar. :Nezanîn dujmine.

**Dujminayî** (n.dar.mê) Dujminahî. Neyarî. Xwîdarî.

**Dujminkarî** (n.l.mê) Dujminahî.

**Dumahî** (n.x.mê) Senta dawîya her tiştî. : Dumahîya rojê; ang êvar. Dumahîya heyvê, salê.Kutayî.

**Dumahîhatin** (k.jn.l.mê) Kutahatin. Dawîhatin. :Karê me bi dumahî hat.

**Dumahîk** (n.dar.mê) Dumahî.

**Dumarekol** (n.l.nêr) Dûpişk.

**Dumbelan** (n.x.mê) Coreke hişîkatî ye, reng boze û girovire mîna kivarkane.

**Dumilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 2,000000,.

**Dundan** (k.jn.l.mê) Dema tiştek candarek yan xwarinek bi dunî bi hêt tamdan.Zeytkirin. : Wî tivenga xwe dun di da. Pişta hespî dun dan. (K) bn: Dan.

**Dundayî** (hk.l.çewa) Hatî dun dan. : Dorika dundayî;ango nanê dundayî.

**Dundul** (hn.dar.çewa) Dindil.

**Dundulandin** (k.jn.dar.mê) Nazkirin. Nszandin. Dindilandin.

**Dupişk** (hk.l.çewa) Ji du pişkan pêk hatî ye.Dubeş. Dubar.

**Dupişt** (hk.l.çewa) Duber. Duser. Durex. Du alî.

**Dupoçik** (n.dar.nêr) Dûpişk.

**Duqat** (hk.hevberkirin.çewa) Duca. Ducarkî. Duberamber. : Bihayê cilikan bûye duqat.

**Dur** (n.x.mê) Core berekê ciwan û bi bihaye jibo nexşkirina gostîl û ristikan bikar dihêt. Mirarî.

**Dureh** (hk.l.çewa) Duryan.

**Durehkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirina du rêyan, du liqa, du coya û htd. (K) bn : Kirin.

**Durî** (n.x.nêr) Nîşaneke xasime kewaldar bi kêrê yan daxkirinê liser guhên bizin û mihan di ken dako ji yên din bi hên cudakirin, ango her malekê durî yê xwe heye. Dax. Nîşan.

**Durîn** (k.jn.x.mê) 1. Çinîn.2.[cilik] Peytkirin. : Zevî durîn. (K) bdn:ez di durîm, em di durîn, tu di durî, hûn di durîn, ew di durît, ewan di durîn. PR: Dê[bi] + bdn. Bdb: di durî, di durîn. Db,dûr : Durîbû, …bûn. (F) : bi durî, bi durin.

**Durîne** (n.dar.mê) Durîna danî. : Dema durîna genim û ceh.

**Durust** (hn.x.çewa) Dirist.

**Durû** (hk.l.çewa) Mirovê li her cihekî bi rengekî serederîyê di ke, û hez ji têkvedanê bi ke. Ang ; li cem te hevale û li pişt te dujmin. : Bawerîya xwe bi wî ne hîne, ew mirovekê durû ye.

**Durûtî** (n.dar.mê) Dema mirov karê [durû] bi ke.

**Durûv** (n.dar.mê) Dirûv.

**Durzîle** (n.dar.mê) *giya* Gezînk.

**Dused** (hijn.l.çend) Hijmara 200.

**Dusibe** (hk.dem) Roja li paş sube. Piştî sube.

**Dustar** (n.x.nêr) Distar.

**Duşaxe** (n.dar.mê) Nexweşî, êşa diftêrya.

**Duşem**(b) ( hk.dem) Roja di keve navbera êkşemb û sêşembê.

**Duta** (hk.l.çewa) Du rex. Du alî. Du dav.Du kit.

**Dutabûn** (k.jnl.mê) Dema tiştek di be duta.

**Dutakirin** (k.jn.l.mê) Mirov davek yan tiştekî bikete du ta. Cotkirin.

**Duvkî** (hk.dem) Di dûv re. Paşî. Bêhneka din.

**Duwa** (hk.x.çewa) Ya dumahîkê.Dawî.

**Duwazde**[h] (hijn.çend) Hijmara 12.

**Duwazdehizar** (hijn.l) Hijmara 12,000.

**Duwazdemilyon** (hijn.l) Hijmara 12,000,000.

**Duwem** (hijn.çend) Ya/yê/ yên duwê.

**Duwê** (hijn. çend) Duwem. Cara, roja, sala duwê.

**Duwêl** (n.x.mê) Divêle.

**Duzerik** (hk.l.çewa) Hêk [hêlik] a du zerik têda bin.

**Duzil** (n.l.mê) *mûzîk*,Dudik.

**Duzîn** (hk.l.çewa) Dewar, [nemaze] hespê çar salî.

**Dû** (hn.hij.n.x) 1. Hijmara 2. 1+1= 2. 2. Dûv. Kilk. Kurî. 3. Paşî. Dûv re.4. Dûkêl. Kadî. Dûman.

**Dûbare** (hk.ducakirin) Dubare.

**Dûblaj** (n.biyan) Dengê liser filman hatî danan.

**Dûblajkirin** (k.jn.l.mê) Deng xistine ser filman ku digel livînê bit.

**Dûbrang** (n.dar.nêr) Teyrê nêçîrê.

**Dûçar** (n.dar.mê) Duçar. Dûçar- bûn, …kirin.

**Dûçûn** (k.jn.l.mê) Li dîvçûn. Lêgerîn.Vekolîn.

**Dûde** (hk.dem) Dûra. Paşî.

**Dûdeman** (k.jn.l.mê) Berdewam li dûv çûn.

**Dûdik** (n.dar.mê) Dudik.

**Dûg** (n.x.nêr) Dwîng. Kilk.

**Dûkan** (n.dar.mê) Dikan.Dukan.

**Dûkevtin** (k.jn.l.mê) Weke mirov bi keve dû kesek yan karekî. Peykevtin. (K) bn: Kevtin.

**Dûkêl** (n.x.mê) Kadî.

**Dûkirin** (k.jn.l.mê) Kadîkirin. :Kuçik dû di ke.

**Dûmahîk** (n.dar.mê) Dawî. Dumahîk.

**Dûman** (n.x.mê) Dûkêl. Kadî. Mij.

**Dûmeqesk** (kn.l.mê) ***balinde*** Çûçika kurî meqesk. Hacîreşk.


**Dûn** (n.x.mê) Bez. Rûn. Nîvişk.

**Dûndan** (k.jn.l.mê) Dundan.

**Dûng** (n.x.nêr) Dîng. Kilk. Kurî.

**Dûngirtin** (k.jn.lmê) 1. Nîvişk ji ji mastî cuda kirin.2. Qelewbûn. Bezgirtin.

**Dûpişk** (n.l.nêr) Dupişk.



**Dûpişk**

**Dûr** (hk.x.pîvan,çewa) Tiştê ne nêz. Ne nêzîk. : Gundê me ji bajêrî gelek dûr e.

**Dûra** (hk.dem) Paşî.Dûr ra-re.

**Dûrahî** (npîvan.dar.mê) Dûrî.

**Dûratî** (npîvan.dar.mê) Dûrî.

**Dûrayî** (pîvann.dar.mê) Dûratî.

**Dûrbîn** 1 (n.l.mê) Dêrbîne.

**Dûrbîn** 2 (hk.l.çewa) Kesê bêhinfireh û pispor ko li paşerojê di nêrit.

**Dûrbûn** (k.jn.l.mê) Dema tişt, mirov dûr di bin li ber çavan.

**Dûre** (hk.dem) Dûra.

**Dûrêxistin** (k.jn.l.mê) Dûrxistin.

**Dûrgeh** (n.dar.mê) 1. Girav. 2. Girik. Mil.

**Dûrhêl** (n.dar.mê) Tîştê, kiryara berçav û rastî.riyalistî.

**Dûrik** (n.dar.mê) 1. Nanê sêlê yê gerim û piçek ji nanê tenik stûr tire. Dûrika dûnî. Dûrika mirîyan ; ango nanê bi xêra mirîyan didin. : …. du dûrik bi çayê xwarin.

**Dûrî** (n.dar.mê) Pîvana delîveya navbera du alîyan. tiştê dûr. BR× nêzîkî.

**Dûrkevtin** (k.jn.l.mê) Mezinbûn yan firehbûna delîve di navbera tiştan yan kesan da. : Ji welatê xwe dûr kevtin.

**Dûrkirin** (k.jn.l.mê) Ji hev dûr kirin. Ji hev dû xistin. Ji hev dane paş. Jêk cudakirin. (K) bn : kirin.

**Dûrtir** (n.hevberkirin) Pêtir dûr. Hêjta dûr. Jê pitir dûr. : Tu çend ji welatî dûrî, hevalê min hêjta ji te dûrtie.

**Dûrtirîn** (n.hevber) Ji hemûyan dûrtir. Gelek dûr.Pir dûr.

**Dûrxistin** (k.jn.l.mê) Dûrkirin.

**Dûv** (n.x.mê) Kilk. Kurî.

**Dûvik** (n.dar.mê) Dûv.

**Dûvlerzînk** (n.l.mê) ***giyandar*** Corek çûçikane.Kurîreprepînk.

**Dûvmeqesk** (n.l.mê) Kurîmeqesk. Hacîreşk.

**Dûvra** ( hk.dem) Dûra.

**Dûvre** (hk.dem) Dûvra.

**Dûzele** (n.dar.mê) *mûzîk* bn :Dudik.

# E

**E** 1 Pîta şeşê ji abeya kurdî.

**E** 2 (pêrb) *rêzman* Alavê erênî, ang ;belê.Erê. : Te zad xwrîye?. ; E, min xwarîye.

**Eblo<u>qe</u>** (n.x.mê) Abloqe. Dorpêç.

**Ebloqe<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Abloqedan.

**Eb<u>reş</u>** (hn.dar.çewa) Jina paş zarokbûnê şîr di singan de nebe.

**Ebû<u>qat</u>** (kar,n.x.dz) Parêzer. Berevankar.

**E<u>cel</u>** (n.c.mê) Nêzbûna mirina mirovî.

**Ecel<u>hatin</u>** (k.jn.l.mê) Egerên nêzbûna mirinê zêde di bin û mirin di hêt. *Pend* :Ecela bizinê hat, nanê şivanî xwar.

**E<u>cem</u>** (netewe,n) Faris. Iranî.

**Ece<u>mî</u>** (netewe,n) Mirovê ecem.

**Eci<u>ne</u>** (n.x.dz) Canên berze. Jimeçêtir. Jimeboştir.

**E<u>dav</u>** (n.x.mê) Daringekê nîvreqe,sipî ye dema kulbona birînan yan di nava pirsikan da kom û peyda di bit.Kêm.

**E<u>dem</u>** (n.x.nêr) Adem.

**Efen<u>dî</u>** (hn.x.çewa) Efindî.

**Efe<u>rîn</u>** (pesindan) Aferîn.

**Efin<u>dî</u>** (hn.x.çewa) Xudanê sentor û pentoran. Mîrza. Seyda.

**Efganistan** (hk.cih.cugir,n.l) Welatê efganan.

**Efganî** (nejad,n.dar) 1. Xelikê Efganistanê.2. Kelûpelên ji Efganistanê. : Cilikên efganî.

**Efrîka** (hk.cih.cugir,n) Kîşwera reş. Afrîka.

**Efrîkayî** (nejad,n.dar) Efrîkî.

**Efrîkî** (nej,n.dar) 1. Xelil ê Efrîka. 2. Kelûpelêd Efrîkî.

**Efsane** (n.x.mê) Çîrok û serhatî yên dirêj û pir bûyer.

**Efser** (pîşn.x.dn) Kesê piledar di nav hêza leşkerî da. Berpirsê serbazî.

**Efserî** (karn.x.mê) Karê efseran.

**Efsûn** (n.x.mê) Sehrebazî. Efsane.

**Eger 1** (pêrb) ***rêzman*** Alavek girêdanê ye di risteyan(hevek) da jibo merc bi kar di hêt. :Eger te dem hebe, were cem me bi mêvanî. Eger xudê hez ket ez dê xanîyekî bi kirim. ***Pend*** :Eger gul nebî, stirî jî nebe. Heger.

**Eger 2** (n.x.mê) Sedem. Ho. Hokar. : Egera nehatina wî nesaxî ye. Ka bêje eger çine te xwe sil kirî ?.

**Egîd** (hn.x.çewa) Xweşmêr. Qehreman. Mêrxas.

**Eh** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hicmetîbûnê yan dema mirovî bi gotin yan kiryarekê nexweş bit, bi kar di hêt. : Eh pa karek çak bo te kirî !. Eh eve çiye dîsan !. Eh dê bela xwe ji min veke!.

**Ehrîmen** (n.dar.nêr) ***peyveka kevine*** Xwedayê şer û xirabîyê. Satan. Br× Hormiz.

**Ejdeha** (n.x.nêr)1. Marê gelek mezin. 2.Paşayekê xwînmêj bû ko bi destê kaweyê asinger hatî ji nav birin.3. Candarên zebelah û dirinde.

**Ejdahak** (n.x.nêr) Xwînmêjek efsaneyî ye sitemek mezin li gelê kurd dikir û bidestê kaweyê hesingir hat kujtin û kurd ji bêdadî a wî rizgar bûn û bi agirê Newrozê mizgînî da gel.

**Ejder** (n.x.nêr) Ejdeha. Navê xor û keçan e.

**Ejdiyar** (n.dar.nêr) Ejdeha.

**Ejnû** (n.x) Çok.

**Elamet** (n.x.nêr) Helamet. Dalho.

**Elho** 1 (n.hn.x.n) ***balinde*** Tewalek mezin, goştxwer, û firindeye. Teyrê kelexan. 2. Kesê sivik û çespan [peyt].

**Elho** 2 (n..x.mê) Sinet. Sinetkirin. Birîn.

**Elhokirin** (k.jn.l.mê) Birîna zêde goştê hedamê guhnelîyê nêr yê zarokan. Sinetkirin.

**Elind** (n.x.nêr) 1.Spêdeka zû dema dinya ber bi zelalabûnê di çe.2.Navê mêrane.

**Elmas** (n, biyan.x.nêr) Berekê bi biha ye. Almas.

**Elok** (n.x.dz) ***balinde*** Tewalek malî yan kûvî, hêkkere. Mirîşkeşa. Şamirîşk. Elîşîş. Coqcoq.

**Em** (cihn. Pir) ***rêzman*** Kesê êkê yê piranî(gelek). : Em sê kesîn di malê da. :Em hevalêd hevin.

**Eman** 1.(pêrb) ***rêzman*** Alavê gazî û hewar kirinê ye. Hewar.

**Eman** 2 (hk.cih.cugrn) Bajareke, paytextê welatê Erdenê ye.

**Emerîka** (hk.cih.cugir, welat,n) Emrîka.

**Emrîka** (hk.cih.cugir,n,welat) Welatek mezin ê rojavaye. Welatê Emrîkîyan e.

**Emrîkayî** (nejad,netewe.n) Emrîkî.

**Emrîkî** (nej.netewe.dz) 1. Xelkê Emrîka. 2. Mitayê ji Emrîka.

**Encam** (n.x.mê) Dawî. Dumahî. Verêj. Ber. Berhem.:Encama hilbijartinan hêjta ne hatîye ragehandin.

**Encamdan** (k.jn.l.mê) Kirin. Pêrabûn.Behemîn. : Li demek nêz qutabî dê taqîyên nîva salê encam bi den.(K) bn: Dan.

**Encame** (n.x.mê) Hesinek kelabeye dergehan pê bi derî ve girê di den û bi sanahî dergeh di hê girtin û vekirin.

**Endam** (n.x.dz)1.Mirovê bi awayê fermî, ser bi yane, dezgeh, part, û htd vebit. : ew endamê navenda civakî ye. Endama civata bajêrvanîyê. Endam di partîyekê da. 2.Pişkek, parçek yan pirtek ji leşê giyandaran. Hedam.

**Endamî** (karn.dar.mê) Karê yan hebûna mirovî di dezgehekê da.

**Endaze** (n.x.mê) Zanîna xwendina deng, kêş,pîvan, sazî û htd, ya şêweyan.

**Endazeyî** (hn.dar.çewa) Şêweyê endazeye.

**Endazekirin** (k.jn.l.mê) Pîvan. Şêwekirin- Danan. (K) bn: Kirin.

**Endaziyar** (pîşn.dar.dz) Mirovê xandina endaze bi dawî anîye û kar di ke. Pisporê warê endazeyê.

**Endaziyarî** (karn.dar.mê) Karê têkelî bi zanîna endazeyê ve heye.

**Endelî** (n.x.mê) *çûçik* Tîtîk.


**Enirandin** (k.jn.x.mê) Torekirin. Hêriskirin. :Babê zarokê xwe enirand. (K) bdn: ez di enirînim em di enirînîn, tu di enirînî hûn di enirînin, ew di enirîne[..it] ewan di enirînin.Pr: dê bi +bdn. Bdb: di enirand, di enirandin. Db,dûr: enirandibû,... bûn. (F) : bi enirîne, bi enirînin.

**Enirîn** (k.jn.x.mê) Gelek torebûn,hêrisbûn, xeyîdîn. : Bi nêre ew mirovê henê yê enirî.(K) bdn : ez di enirim em di enirîn, tu di enirî hûn di enirin, ew di enire[..it] ewan di enirin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : ez di enirîm em di enirîn, tu di enirî hûn di enirîn, ew di enirî, ewan di enirîn. Db,dûr : ez enirîbûm, em enirîbûyn, tu enirîbûy, hûn enirîbûn, ew enirîbû, ewan enirîbûn yan(bi bûn).

**Enitîn** (k.jn.x.mê) Demê ko mirovek pir hêris di be entênî(intên) jê di hêt. Enirîn. (K) bdn : ez di enitim em di enitîn, tu di enitî hûn di enitin, ew di enite[...it] ewan di enitin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : ez di enitîm em di enitîn, tu di enitî hûn di enitîn, ew di enitî ewan di enitîn. Db,dûr : ez enitî(bi)bûm em enitîbûyn, tu enitî bûy hûn enitîbûn, ew enitûbû ewan enitîbûn. (F) : bi enite, bi enitin.

**Enî** (n.x.mê) 1.*leş* Parçeya serê mirovî a rût û pan di keve hindava her du çavan du birû li serin. 2. Hevalbendî ya navbera çend part yan desteyan da. Qulp. Berok.

**Enîşk** (n.x.mê) *leş* Cihê girêdana(gehiştina) zend û baskên mirovan.



**Enîşk**

**Entere** (hk.dem.kevin.x) Rojeke ji yên seqem, ko di kevit meha kanînamezin, hember meha duwê. *Pend* :Entere, di kujit ga û kere, xudan yê bê xebere. *Pend* :Entere, heçîyê ji mal biçit dere, yê kere.

**Entî<u>ke</u>** (n.biyan.x) 1.Kevin. Gelek kevin.2. Seyr.

**Enze<u>lok</u>** (n.dar.nêr) Zinc.Kolik. Holik.

**Erbe<u>tan</u>** (hk.cih.cugir.kevin) Paytextê dewleta mîdya bû.

**Erd** (hk.cih.cugir,n.x.nêr) Tepa erdî. Aqar. Zevî.

**Erd<u>çinî</u>** (n.dar.nêr) Erdê bi kêrî çandinê di hêt. Erdê çandî.

**Erde<u>lanî</u>** (zarn.x) Zarek kurdî taybete li Kurdistana îran.

**Erd<u>hej</u>** (n.l.mê) Erdhejîn.

**Erd<u>hejîn</u>** (n.l.mê) Dema livîn di keve erdî û di hejit û gelek caran di bit egera çamên mezin.

**Er<u>dîn</u>** (hk.dar.çewa) Tiştê têkilî bi erdî ve hebit. Ne esmanî. : Kenalê têlevizyonê yê erdîn.

**Erd<u>nas</u>** (pîşn.l.dz) Kesê pispor di zanîna çînên erdî da. Cyoloc.

**Erd<u>nasî</u>** (karn.l.mê) Zanîna pêkhatiyên erdî. Cyolocî.

**Ereb** ( netewe,n.x.dz) Neteweyek mezine .

**Ereban<u>din</u>** (k.jn.l.mê) Polîtîka rijêmên dagîkerên ereb li bajar û gundên kurdan ereb akincî di kirin û rûniştvanên kurd ji ser mal û warên wan der di êxistin jibo gorîna çand, cugrafî û ziman.

**Ereba<u>ne</u>** (n.x.mê) Galiskeka du destike û xirxalek yan du hene jibo karûbarên çandin û avakirinê bi kar di hêt.



**Erebane**

**Ere<u>be</u>** (n.x.mê) Erebane.

**Ere<u>bistan</u>** (hk.cih.cugir,n.dar) Welatê ereban. Se`ûdî.

**Ere<u>bî</u>** (nej,n.dar.dn) 1. Zimanê ereban. 2. Kelûpelêd ji welatên ereban.

**Ereb<u>karî</u>** (n.l.mê) Erebkirin.

**Ereb<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Erebandin.

**Er<u>ê</u>** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê eyînî.Alavê erêkirin. Belê. : Erê wesa ye. Erê ez bi tera me. Erê tu rast di bêjî.

**Erê** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo pisyarê bi kar di hêt . : Erê tu çi di bêjî heger ez xanîyê xwe bi firoşim?. Erê birayê te ne diyare, li kîve ye?.

**Erêbûn** (k.jn.l.mê) Misogerbûn.

**Erêdanîn** (k.jn..l.mê) Erêkirin.

**Erêkirin** (k.jn.l.mê) Misogerkirin. : Min bilîta xwe erê kir, sube heger xudê hez ke dê ber bi Ewropa ve firim.***ingilîzî ang; OK***. : (K) bn: Kirin.

**Erênî** (hn.dar.çewa) 1.Rasvekirî. Piştrastkirî. Hebûn.2. Çak.Pozetîv. Eyînî.

**Ergoş** (hk.cih.cugir,nx.mê) Gundekê Kurdistanê ye.

**Ergoşî** (malbat,n) Xelkê Ergoş.

**Erik** (pêrb) ***rêzman*** Alavê seyr û hicmetîbûnê. Erik kuro tu dê çi bi kî?.

**Erinîn** (k.jn.x.mê) Hêrsibûna. Torebûn. Enirîn.

**Erînî** (hn.dar.çewa) Erênî.

**Erjeng** (hn.dar.çewa) Tirs. Sehim.

**Erk** (n.x.nêr) Karê ku liser milêd mirovî ye, divê bihêt kirin. : Erk û maf li ser milên her welatîyeke hene.

**Ermen** (nejad,n) Kesê ji netewe ermen bit.

**Ermenistan** (hk.cih.cugir,n.dar) Welatê ermenan.Ermînya.

**Ermenî** (nejad,n) 1.Ermen.2. Zimanê ermenan.

**Ern** (n.x.mê) Kovan.Qehir.

**Erno** (hn.dar.çewa) Kovandar. Dilkul. Hêris. Enirî.

**Ernok** (hn.dar.çewa) Erno.

**Err** (perb) bn :Erik.

**Errik** (perb) bn :Erik.

**Erwend** (hn.dar.çewa) 1.Jîr. Zana. Aqil. 2.Ciwan. Xweşk.

**Erzan** (hn.x.çewa) Tiştê li bazarî bi parekê kêm û hejî bi hêt kirîn. : Gundor li bazarî gelek di erzanin. BR× Giran.

**Erzanbûn** (k.jn.l.mê) Kêmkbûa bihayê mitay. Hatine xwara nirxa mitay. : Bihayê cilikan gelek yê erzan bûy. : Dê kengî kirê erzan bin ?.

**Erzanî** (n.x.mê) Dema mita û keleûpel li bazaran erzan di bin. : Li cem me wek berê nemaye, noke erzanîye !. Br× Qetlazî.Giranî.

**Erzankirin** (k.jn.l.mê) Kêmkirina bihayê kelûpelan. : Hikmetê biryar daye ku kirêya xanîyan bi hêt erzankirin. (K) bn : Kirin.

**Erzankirî** (hk.l.çewa) Hatîye erzankirin. :Gundorên erzankirî bi kire!.

**Erzaq** (n.x.nêr) Tiştê xwarina, wek ar, savar, birinc, nok, nîsk û htd.

**Erzêl** (n.x.nêr) Kol.Kolik. Zinc.

**Erzên** (n.x.mê) *leş* Pişkeka serê mirovî di keve bin devî, navbera lêva binî û gerdenê.Erzink.

**Erzink** (n.x.mê) *leş* Erzên.

**Eskîmo** (nejad,n) Neteyeke li Sovyeta berê di jîn.

**Esman** (hk.cih..x.nêr ) Bilindî ya ko sitêr , roj û heyvan li himbêza xwe di girit, rengê şine. :Ji rdî heta esmanî ew jêk di cudane.

**Esmanî** 1 (rd.dar.çewa) Rengê şînê wek ê esmanî.

**Esamanî** 2 (hk.dar.çewa) Hêza bi karên esamî ra di bit, çi sivîl yan leşkerî. Firokeyên esmanî.Kenalên telefizyonê yên esmanî.

**Esmanger** (karn.l.dz) Kesê pispor di warê gerana li esmanî bi firoke û rokêtan., li esmanan di gerin jibo karên zanistî.



**Esmanger**

**Esmangerî** (kar.l.mê) Karê ku esmanger pê ra di bin.

**Esmer** (hk,hn.x.çewa) Kesê dêmê wî ber bi reşî ve.

**Esp** (n.x.nêr) *candar* Hesp.

**Estewir** (hn.x.çewa) Stewir. Xirş.

**Eşkence** (n.x.mê) Lêdan . Qutanek berdewam. Êşandina deronî. Azar.

**Eşkencedan** (k.jn.l.mê) Azardan. Ĕşandin. :Girtîyên ramyarî li girtîgehên dagîrkeran rojane di hên eşkence dan. (K) bn : Dan.

**Eşkencekar** (karn.l.dz) Azarder. Zordar. Hov.

**Eşkencekirin** (k.jn.l.mê) Azardan.(K) bn : Kirin.

**Eşkere** (hn.x.çewa) Aşkera. Xuya.

**Eşkrebûn** (k.jn.l.mê) Aşerabûn.

**Eşkerekirin** (k.jn.l.mê) Aşkerakirin.

**Etûn** (n.x.mê) Komir.Êtûn.

**Ev** (cihn.nişadan) *rêzman* Eve.

**Evan** (cihn.pir) *rêzman* Cihnavê nêz jibo nîşadanê yê pirînî. : Evan mirovan em hêlan û çûn. :Evan cilikan li ber xwe bi ke. BR×Ewan.

**Evandin** (k.jn.x.mê) Hezkirin. Viyan. *Pend* :Nanê duca reşandî, zadê duca kelandî, bûka duca xemlandî tu dilan ne evandî. (K) bdn: ez di evînim em di evînîn, tu di evînî hûn di evînin, ew di evîne[….it] ewan di evînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di evand, di evandin. Db,dûr: Evandibû, ….bûn. (F) : Bi evîne, bi evînin.

**Evca** (pêrb) *rêzman* Alavek girêdana ristane jibo berdewamî û misogerkirina bûyerê. Vêca. Jiber. Jiberko.

**Evdal** (hn.dar.çewa) Reben. Jar. Bêkes.Perîşan.

**Eve** (cihn.nîş.tek) *rêzman* Cihnaveke jibo nîşandana tiştê nêzîk. :Eve çîye?. :Eeve kîye?. :Eve tuyî li vêrê?. : Ha eve qelemê te, gelek supas.

**Evê** (cihn.x.mê) *rêzman* Chnaveke ibo nîşadana tişt yan kesê mê yê nêz. :Evê jinê çi bi serê me anî. :Evê carê ez nahêm digel te. :Evê darê ne bire gunehe!.

**Evil**(hn.dar.çewa) Peyveka darijtî ya kevne ang; di gel hilavêtina yekem bilqa avê. Êkê. Yekem. Avhil. Lezgîn.

**Evir** (n.x.nêr) Ewir.

**Evîn** (n.x.mê) 1.Hezkirina mirovan ji hevdu ra, ji jîyanê, jîngehê .htd. Vîyan . Hezkirin. Dilandin.2. Navê jinaye.

**Evînçirîk** (hn.l.çewa) Kesê bihayê evînê nezanit.

**Evîndar** (hn.dar.çewa) Kesê hez û evînî di ke armanca xwe.

**Evîndarî** (n.dar.mê) Evînî.

**Evînî** (n.dar.mê) Hezkirin.

**Evînîkirin** (k.jn.l.mê) Evandin.Evînkirin.

**Evînkirin** (k.jn.l.mê) Avandin. : Te çend caran di jiyanê da evîn kirî ye?

**Evînperwer** (hn.l.çewa) Kesê evînî li cem pîroz.

**Evînperwerî** (n.l.mê) Pîrozîya evînê.

**Evrandin** (k.jn.dar.mê) Hinde bilin kir gehand evran.Pesindan. Rêzgirtin. Bdkirin.

**Evrav** (hn.dar.çewa) Pîroz. Xudayî.

**Evraz** (hk.cih.n.x.nêr) 1. Jêhelî. Jêlelî. Jûrda. Serî. ***Pend*** :Çi evraz di bê nişûvî nînin. ***Pend*** :Her evrazîyekî nişîvîyek heye. 2. Navê mêrane.

**Evrîşim** (n.x.mê) Avirmîş.

**Evro** (hk.dem) Roja ko mirov têda. Ev roje.Îro. : Te evro çi kar heye?. : Evro cejina bûna mine. :Evro ne wek duhî ye.

**Evsar** (n.dar.nêr) Hevsar.

**Ew** (cih,n.tek) 1.Cihnavek teke , kesê sîyê ye. :Ew pismamê mine.Ew kîye?. Cihnavê pisyara nîşadanê :Ew çiye? Ew te çi got?.

**Ewan** (cihn.pir) ***rêzman*** Cihnavek piranîye(gelek) , Kesê sîyê. Ewan ji mera diyarîyek anî. Ewam paran bi de hejaran.

**Ewçend** (pêrb) Alavê pîvan û çendcarkirinê. Çiqas.

**Ewê** (cih,n.tek. mê.nîşadan) ***rêzman*** Cihnavek teke, mêye, kesê sîyê ye.:Ewê şûkir. Ewê keçê çi got?.

**Ewha** (pêrb) ***rêzman*** Alavê hevberkirinê, destnîşankirin.: Ewha bi rêve ne ç!. Ewha ne bêje!. Weha.

**Ewir** (hn.x.çewa,,n.x.nêr) Mij yan morana li esmanî peyda di bit, hin cara nizim û di bit baran , befir, terg. û htd.:Ewrekê reş û tarî li hindava çiyayê me diyar bû.:Dinya ewre. ***Pend*** :Ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî.ang; ne merce ewrê dengdar baran û befir jê bi barin û mirovê dengûdorê di ket, mêrçak bit.

**Ewik** (n.dr.dz) Tişt. Ew tişt.

**Ewî** (cihn.x.nêr) ***rêzman*** Cihnavek teke, nêre, kesê sîyê ye. : Ewî got. Mala ewî(wî).

**Ewk** (n.dar.dz) Ewik.

**Ewqas** (pêrb) *rêzman* Alavê nirxndin û nîşadanê ye. Wesa. Wek wê. Hindî.

**Ewqasî** (pêrb) Ewqas.

**Ewropa** (cugir,n) Kîşwera Ewropa.

**Ewropayî** (nejad,n) Ewropî.

**Ewropî** (nej,n) 1.Kesê xwedîyê nasnameya ewropa.2. Kelûpelên ji Ewropa.

**Ewt** (n.x.mê) Dengê rewîna segan. Hef. : Ew vî seyî çîye ewt ewta wî?.

**Ewtandin** (k.jn.l.mê) *seg* Weke mirov segan bi di rewandin.

**Ewitîn** (k.jn.x.mê) *seg* Rewîn. :Se di ewite.

**Exlewîk** (n.x.mê) Axlewîk.

**Ey** (pêrb) *rêzman* Alava girêdana risteyane jibo hişyarîyê bi kar têt. :Ey bira. Ey eve çiye?.

**Eydî** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegire. Ědî.

**Eylo** (n.x.nêr) *teyr* Elho.

**Eylûl** (hk.dem.n.x) *meh* Meha nehê. Meha yekê ji payîzê. Îlon.

**Eynî** (hk.dem) Roja li paş pêncşembê di hêt. Roja niza li cem musilmanan. Pend : Heger pîr ya xêrker bit, eynî di mişene.ang: heger mirovî bi vê karek çak bi ke, li her dem û cih di kare bike.

**Eyreqîb** (n.l.mê) bi Navdengtirîn siroda nîştimanî ya kurdî.

**Eywan** (n.x.mê) 1. Balkon. Hewş. Berbank.2.Jor. Mezel. Ode.

**Eywax** (alav. Keser) *rêzman* Ax. Dax. : Eywax dilo.

**Ez** (cihn.tek) *rêzman* Cihnavek teke kesê êkê ye,dema mirov li ser xwe di bêjit. : Ez kurdim. :Ez ji te hez di kim. Ez nizanim navê te çî ye?. :(nêr)Ez yê mandî me. :(mê)Ez ya mandî me.

**Ezbenî** (hn.dar.çewa) Pesindane jibo rêz û rûmet girtin bi kar di hêt. Hêja. :Ezbenî kerem ke. :Belê ez benî, min hay ji te heye.

**Ezber** (hn.dar.çewa) Gotina mirov di serê xweda tomar bi kit. Jiber.

**Ezberkirin** (k.jn.l.mê) Jiberkirin. (K) bn: Kirin.

**Ezezî** (hk.l.çewa) Kesê herdem û her tişt ji xwe re bi vêt û pesina xwe bi det. :Tefşê beroka xwe.

**Ezitî** (hk.dar.çewa) Ezezî.

**Ezman** (n.x.nê) 1. ***endam*** Hedameke di devîda ye ku jibo tamkirin û axivtinê alîkarîyê diket.2. *rêzman* Ziman.

**Ezmandirêj** (hn.l.çewa) Mirovê gelek axivtinên ji xwe mezintir di ket. Bê perwerde. Lewçe. ***Pend*** : Ezmanê dirêj darkokê serê xudanî ye.

**Ezmanpîs** (hk.l.çewa) Ezmanreş.

**Ezmanreş** (hn.l.çewa) Kesê hergav axivtinên kirêt di kit. Civînan di det.

**Ezmansork** (n.l.dz) ***kevin*** Mirovên di çîvanokanda jibo tirsandina zarokan bi kar di hên.

**Ezmanxweş** (hk.l.çewa) Mirovê gotin û selîqeyên dilveker di ket. Kêfxweş.

**Ezmûn** (n.x.mê). Nirxandin yan sengandina karê mirovî. Taqî.

**Ezmûnkirin** (k.jn.l.mê) Mirov xwe taqî di ke dako kar û xwandina xwe di de sengandin. :Meha bi hêt dê ezmûnên serê salê li dibistanan (bi) hên kirin.

**Ezperist** (hn.l.çewa) Ezezî.

**Ezperistî** (n.l.mê) Ezezî.

# Ê

**Ê** 1. Pîta heftê ji abeya kurdî.

**Ê** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê pejirandinê ye. Erê. E. :Suba were cem me, Ê; başe ez dê hêm.

**Ê** 3. (paşgir.hd,gazkirin) Paşgira gazîkirinê jibo mê. Xuşkê . Yayê. Jinê. Hevalê.

**Ê** 4 (pêrb) ***rêzman*** Alavê daxwazkirina berdewamîyê di gotinan da. Ê dê dê bêje, ka çi lê hat!.

**Ê** 5 (cihn.nediyar.nêr) Yê. ***Pend*** :Ê ne li şerî, şêre.

**Êdin** (pêrb,a.destniş.nêr) ***rêzman*** Peyveke dihêt bi kar anîn jibo helbijartina tiştan ji hev. Êkê dî. Yekê din. : Ev ne êdin.

**Êd** (n.cîhanî.mê) Çevengeke di navnîşanên nameyên eliktironî da bi kar di hînin. @.

@

**Êd**

**Êdî** (pêrb) *rêzman* Alavek girêdanê , di dawîya nivêsînê da jibo kilîldana mijarê. :Nivîsara min bi dawî hat, êdî supas bo hewe. Ji nih û paşve. :Ez êdî na herim mala wan.

**Êgcar** (hk.dem) 1. Êkcar bûyera carek rû di de.2. Rehayî. Êgcar ne wusa !.

**Êk** (hijn.çend)Hijmareke paş çune dest pê di kit. 1. 4-3=1.Yek. Nîva duwê. : Xudê êke.

**Êkane** (hn.dar.çewa) Daybabên bi tinê êk kur yan keç hebin. kur yan kiçên bê xwîşk û bira.. Berazê bê xuşk û bira. :Kurê mala cîranê me gelek ê nazandî ye, çunke êkaneye.

**Ěketî** (n.dar.mê) Hevgirtin. Yekêtî. Êkgirtin.

**Êkê** (hn,x,çend) 1 Tiştê, kesê mê , nedîyar. êkê(jinek) we got. 2 Rêzkirina tiştî, ya êkê.

**Êkgirtin** (k.jmê) Bi hevra kar, xebat kirin bo êk armanc.Hevalbendî. Biraynî. Tebayî. (K) bn :Girtin.

**Êkî** (hn,nedîyar.nêr) Kesê nêr yê ne dîyar, :Êkî yê birî. Êkî got.

**Êkmale** (cugirn) Navên gelek gundane li Kurdistanê. Malek.

**Êkser** (rd.l.çewa) 1. Tiştê demildest rû di det. Zindî. :Bername bi awayekê êksere. 2. Êk alîÊk sent. Êk araste. :Min bihêleka(tikêt) êkser kirî.

**Êl** (n.x.nêr) Avahîyê pir mirov ûxanedan. Xîvetgeh. Kuçerat. Hoba.

**Êlçî** (n.l.dz) Zêrevanên êlî. Leşkerê mîr, paşa, yan êlî.

**Êleg** (n.x.nêr) Elek.

**Êlek** (n.x.nêr) çoxikê ji perûkan çêkirî.

**Êlinc** (n.x.mê) *candar* Hestîyên milî. Kelkelk.

**Êlincî** (n.x.pir) Rewşeke mirov têda gêj di be ji egara xwarineka pîs di gedê mirovî da yan dîtina tiştekê gemar,dengek bolbolî ji devî û gerîyê peyda di be,dev pirî av di be û nêzîke dilê mirovî ra bi be(mirov bi hilîne).

**Êlincîhatin** (k.jn.l.mê) Dema mirov hest bi êlincîyan di ke û nêze dê mirov verişit. Êlincî yêd di hêne min, ez bawer di kem dilê min dê rabit. (K) bn:Hatin.

**Êlincîkirin** (k.jn.l.mê) Mirov dixwaze êlincîyan bike jibo ko bi kare zadê di zikî da bi hilîne. (K) bn:Kirin.

**Êm** (n.x.mê) Alîka lawiran. Alîka candaran.

**Êmdan** (k.jn.l.mê) Alîdan. Xwarin dane kewalan.

**Êr** (n.x.nêr) Agir.

**Êre** (hk.cih) Hêre. Hire.Vêre. Vêrê. Vê dirê.Vê derê.

**Êriş**(n.x.mê) 1.Biser cihekî da girtin jibo dagirkirin yan rizgarkirn.2. Dabezîne ser alî yan kesekî bi rêya ragehandinê. Hêriş.

**Êrişber** (karn.dar.dn) Yê ku êrişê di bit ser berdijê xwe.Hêrişber.

**Êrişbirin** (k.jn.l.mê) Hêrişkirin. (K) bn : Birin.

**Ērişkar** (karn.dar.dz) Hêrişber.

**Ērişker** (karn.dar.dz) Hêrişber.

**Êrişkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov êrişê di ke ser kes, yan birekê. : Gurî êriş kir ser kerê bizinî. (K) bn : Kirin.

**Êsik** (n.x.nêr) *candar* Hestî.

**Êsta** (hk.dem) Nuke. Vê bavê.Niha.

**Êstir** 1(n.x.mê) Rondik.

**Êstir** 2 (n.x.dz) *candar* Hêstir.

**Êş** (n.x.mê) 1. Nexweşî. Nesaxî. Derd. 2. Jan . ***Pend*** :Çi kes wek xudanî êşa leşê xwe nizanit.

**Êşan** (k.jn.x.mê) êsana leşî ye. Derd. (K) Bdn: Ez di êşim em di êşîn .tu di êşî hûn di êşin. Ew di êşe[..it] ewan di êşin. PR : dê[bi]+ bdn. Bdb: di êşam, di êşa, di êşay, di êşan.Db,dûr. Êşabû,…bûn.(F) : bi êşe, bi êşin.

**Êşandin** (k.jn.x.mê) Mirov, giyandar ji alîyê kes yan desteyekê ve bi hêt êşandin. Yan kekî azar bide. Azardan.(K): Bdn; ez di êşînim em di êşînîn, tu di êşînî hûn di êşînin, ew di êşîne [..it] ewan di êşînin. Pr: dê [bi] êşînim, êşînîn,êşînî,êşînin, êşîne[..it], êşînin. Bdb : Di êşand, di êşandin. Db,dûr êşandibû,... bûn. (F): bi êşîne bi êşînin.

**Êşîn** (k.jn.x.mê) Êşandin. (K) bdn : ez di êşim em di êşîn, tu di êşî hûn di êşin, ew di êşe[..it] ewan di êşin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : Ez di êşam, em di êşayn , tu di êşay, hûn di êşan, ew di êşa, ewan di êşan. Db,dûr : ez êşabûm, em êşabûyn(bûn), tu êşabûy(bû), hûn êşabûn, ew êşabû, ewan êşabûn. (F) Bi êşe, bi êşin.

**Êtîm** (hn.x.çewa) Zaroyên bê dayk yan bab. Babmirî. Daykmirî.Sêwî. Bêsemyan.

**Êtîn** (n.x.mê) Cihê asin têda di hêt bihujandin[helandin].Kurha asingiran.

**Êtûn** , (n.x.mê) 1.Avahîyek heremîye bi axê dirist di ken daran tê dixin jibo sotinê dako rejîyê jê peyda bi kin. Komir. 2.Germîya herî pile bilind.3. Bizotê agirî.

**Êvar** (hk.dem.mê) 1. Daneke ji rojê, piştî nîvro.Berî bibit şev.2. Navê kur û keçane.

**Êvaran** (hk.dem.dar) Dema êvarî. Li êvaran. :Hemû êvaran ez guhdarîya nûçeyan di kim.

**Êvarbaş** (silav.pîroz) Silava êvarî. : Daxwaza êvareka xweşû baş jibo êkî bêjî. :Êvarbaş heval.

**Êvarî** (hk.dem) Demê roj be bi rojava ve di çe. Danê êvarî. Kengî dê te bînim?. Êvarî.

**Êvitîn** (k.jn.x.mê) *nexweşî* Cihê ji egera lêdanekê yan kulbûbûn birîndarbûnê reş û şîn di be û bilind, pif di be. Perçivîn. Werimtin.

**Êvnî** (hn.x.çewa) Leşê bi hêz. Leşê peyt. Mirovê peyt. Mirovê lêkdayî.

**Êvnîk** (hn.dar.çewa) Peyt. Saxlem. Sirt.

**Êvnûte** (hn.x.çew) Êvnî.

**Êxistin** ( k.jn.x.mê) 1.Dema mirov tiştekî, kesekî li erdî bi de yan ji bilindîyê bi êxe xwarê. Li erdî dan. Xistin. :Cilêd xwe êxistin. : Du mirovan xwe lêkdan êkê êk êxist. 2. Pêvekirin. Pêkvekirin. Girêda. :Dervankê avdankî bêxê(bi êxê). :Kaxez êxist dîwarî. (K) Bdn: ez di êxim, em di êxîn, tu di êxî, hûn di êxin, ew di êxe[..it], ewan di êxin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb: êxist, êxistin. Db,dûr. Êxistibû,… bûn. (F) bi êxe, (bi êxê)bi êxin(bi êxinê).

**Êxre** 1 (n.x.mê) Dirwareke li derên xirar, gonî, telîsan di din jibo ko kurt û peyt bi be.

**Êxire** 2 (n.x.mê) Rizdeya kevirî. êxir a çiyayî.

**Êxsîr** (hn.x.çewa) Dîl. Girtî . bend.

**Êxte** (n.x.dz) ***canda( dewarr)*** Hêstir.

**Êxtiyar** (hn.x.çewa) Navsalveçûyî. Pîr. Kal.

**Êzdan** (n.x.nêr) Xuda. Xwedê. Ezdan.

**Êzdî** (hn,nl.dz)1.Kevitirîn dîn(ol) a kurdane. 2. Kesê bawerîya wî

bi dînê êzdîyan hebe.

**Êzdîxane** (hk.cih,l.mê) Bingeha êzdîyan. Civaka êzdîyan.

**Êzdîyatî** (n.dar.mê) Belavkirina ola êzdîyan. Xebat jibo saxkirina dînê êzdîyan.

**Êzing** (n.x.nêr) Dar. Kête. Nîre.

**Êzingvan** (n.dar.dz) Darvan. Darbir.

**Êzmûg** (n.x.mê) Êzmûk.

**Êzmûk** (n.x.mê) *adî* Tevinpîrk.

# F

**F** (fe) Pîta heşt ê ji abeya kurdî.

**Fabrîqe** (n,biyan.mê) Kargeh. : Ferhad li fabrîqê kar di ke.

**Fafon** (n.x.mê) Daringekê reqe wek asinî ,piranî ya amanan jê di hên çêkirin.

**Fal** 1(hn.x.çewa) Candarê nêr yê ne xesandî ko ji alîyê guhnelî ve yê peyte û bi kêrî perînê di hêt.. :Hespê fal. Nêrîyê fal. :Kerê fal.

**Fal** 2 (n.x.mê) Falik.

**Falavêj** (pîşn.l.dz) Falveker.

**Falbêj** (pîşn.l.dz) Falveker.

**Falbêjî** (karn.l.mê) Karê vekirina falikan.

**Falbîn** (pîşn.l.dz) Falveker.

**falgir** (pîşn.dar.dz) Valveker.

**Falik** (n.x.mê) Dîtin yan aşkerara kirina paşeroja mirovî çi bi nêrîna panka destî yan fincanê dema qehwe bi dawî di hêt.

**Falinc** (n.x.mê) Nexweşîyeke(nesaxî) demarane mirov pê şil di bit ji egerên zikmakî, nivşî yan derekî, nemaze zaroyan di girît.

**Falincbûn** (k.jn.l.mê) Rastî derdê falincê Hatin. (K) bn: Bûn.

**Falincgirtin** (k.jn.l.mê) Falincbûn.

**Falveker** (pîşn.l.dz) Kesê bi falikan paşeroja mirovî diyar di ket.

**Falvekirin** (k.jn.l.mê) Vekirin û nêrîna bextê mirovî bi falikan. (K) bn: Vekirin.

**Fanêle** (n.x.nêr) Cilikekê tenike li bin kiras û cilkên dî di ken ber xwe, hiçikkurte yan bi lepike. Bincilk.

**Fanos** (n.x.mê) Core çirayeke. Lempe. Fener. :Fanosê hilke (pêke). :Li ber ronahîya fanosê di xwînîn. :Jineka hinde cane wek fanosê.

**Faris** (nejadn.x.dz) 1.Neteweyeka Iranîye.2. Kesê farisîziman.

**Farisî** (ziman,n) Zimanê farisan.

**Farzik** (hn.dar.çewa) Çavbirçî. Çavbirsî.

**Fasolî** (n.x.mê) *çandin* Giya û berê giyayekî ye, dindik biçûke gelek cor û reng hene.



**Fasolî**

**Faşîzm** (n,biyan) Sîstemek zordar û dirindeye.

**Faşist** (hn,biyan.dar.çewa) Zaravek ramyarîye, kes yan desteya dardest û zordar xwe bi ser xelkî da bi sepînit.

**Fatareşk** (n.dar.mê) *leşzanî* Xalxalk.

**Fatfatîk** (n.dar.mê) *tewal* Kevoka kûvî. Kokuxtî.

**Fatîk** (n.x.mê) *adî* Margîsk. Bîkmar.

**Fatmok** (n.dar.mê) *tewal* Fatfatîk.

**Feç** (hn.x.çewa) Mirovê difina wî  biçûk û serevraz.

**Feçer** (hn.dar.çewa) Mirovê feç.

**Feçê** (n,gazkirin.mê) Bangkirin û naznavê jina feç.

**Feço** (hd,gazn.dar.nêr) Gazîkirin û naznavê  kur,zelamê(peya) ê feç.

**Feda** (hn.x.çewa) Qurban.

**Fedakar** (pîşn.l.dn) Kesê xwe di ke qurban , gorî dozekê.

**fedakarî** (karn.l.mê) Xwe gorîkirin. Xwe fedakirin.

**Fedakirin** (k.jn.l.mê) Gorîkirin. Qurbankirin. (K) bn: Kirin.

**Federal** (zarav,biyan) Hevalbend. Êketîya bi hez û viyan.

**Feralî** (zara,biyan) Sîtema bi hevra kar-xebarkirin.

**Fedî** (n.x.mê) Şerim.:Ma ne fedî ye tu wesa di kî ?.

**Fedîker** (rd.dar.çewa) Şermîn. Şermok.

**Fedîkirin** (k.jn.l.mê) Şerimkirin. : Ew fedî di ke, lewra na xwaze bi stire. (K) bn: Kirin.

**Fedîtî** (n.dar.mê) Şerim.

**Fedok** (hn.dar.çewa) Fedîker. :Zarokê fedok. Jina fedok.

**Fehêt** (hn.dar.çewa) Şerim û fedîyek mezin . Kirêt.

**Fehêtîn** (k.jn.x.mê) Şerimkirin. Fedîkirin. (K) di fehête, bi fehêtin.

**fehil** (hn.x.çewa) *candar* Fal.

**Felaqe** (n.x.mê) Qutan û lêdana binê pêyan.

**Felaqedan** (k.jn.l.mê) Core lêdaneke bi dar û qamçîyan li binê pêyên mirovan di din. (K) bn : Dan. :Daykê kurê xwe felaqe da, çunkî dizî kiribû.

**Fele** (dîn,n.x.dz) 1. Dînê mesîh. 2. Kesê mesîhî.

**Felek** (n.x.mê) 1. Çerx. Zeman. 2. Navê keçan.

**Felestîn** (hk.cih.welat,n) Welatek erebane axa felestînîyane.

**Felestînî** (nejdad,n) 1. Xelikê welatê Felestîn. 2. Kelûpel yan mitayê ji Felestînê.

**Felît** (hn.x.çewa) Felîte.

**Felîte** (hk.x.çewa) Mirovê bi kêrnehatî. Kurê kulana. Kulanî. Şelatî. Pûç.

**Felîtebûn** (k.jn.l.mê) Mirovê ji rêya çak derkeftî û karên xirab di ket.: Kurê wî yê bûye felîte, êdî li mala xwe na rawestit.

**Felte** (hk.x.çewa) Mirovê, xasime jina pûç.

**Felteyî** (n.dar.mê) Karê felte. Karê pûç. pwîçatî.

**Fend** (n.x.mê) Find. Çira. Lemp.

**Fenek** (n.x.mê) *amêr* Panka bayî.

**Fener** (nax.mê) Lempe. Çira.

**Fenik** (hn.x.çewa) Honik. Hîn. Fênik. :Bi şev gundê me pir feneke.

**Feqî** (pîş.x.dz) Xwîndkarê dînî, yê li mizgeftan waneyên ola Islamê di xwînin. Soxte.

**Feqîyatî** (karn.dar.mê) Karê feqîyan yê xwendin û hînbûna zanista dînî.

**Fer** (pêrbest.x) Pêdvî. Giring. Hejî. :Ya fere bêjîn,

**Ferașîn** (hk.cih,n.x.mê) 1 Deverek hîn û biyav xweş , dilveker li Kurdistana bakûr. 2. Zozan û cihên xweş û fênik li Kurdistanê.

**Ferat** (cugirn) Çemekê mezine li Kurdistanê. Rîbarê furat.

**Ferde** (n.x.nêr) Tûrik yan gonî yê dexil û danî dikenê. Telîs.

**Fereh** (hn.x.çewa) Fireh.

**Ferhad** (n.x.nêr) 1. Naveke di dastana fehad û şirîn da hetîye. Evîdarê şirînêye.2. Navê kurane.

**Ferheng** (n.x.mê) Pertoka rêzkirina peyvan û pejna(raman) wan çi bi şirove kirin bit eger yek ziman be yan hember bi zimanek din.Zanîna peyvan.

**Ferîşte** (n.x.nêr) 1.Firîşte. Milyaket.2. Zerî. Perî.

**Ferman** (n.x.mê) 1. Qirkirina bi komel. Jinav birina neteweyekî. Pakkirina nejadî.Cînosayd. 2. Navê jinane.

**Fermanber** (karn.dar.dz) Kesê li rêvebirîyekê kar di kit mehyanê ji dezgehekî werdigirit.

**Fermandan** (k.jn.l.mê) Biryara karekî fermanekê bi hêt derbazkirin. (K) bn: Dan.

**Fermandar** (kar,n.dardz) 1.Desthelatdar. Xwedî biryar. Karbidest.Serok.2. Serleşker. Qumandar.

**Fermankirin** (k.jn.l.mê) Fermandan.

**Fermanname** (n.l.mê) Nameya ku têda ferman di hêt nivîsîn û ragehandin.

**Fermî** (hn.x.çewa) Biryarên qanûnî yên ji dezgehêd qanûnî derbaz di bin. :Encama dengdanên civata bajêrvanîyê bi awayekê fermî hat ragehandin.

**Fermîn** (k.jn.x.mê) Keremkirin.

**Fermo** (k.ferman) Jibo rêz û rû met bi kar di hêt. Keremke.:Fermo were nav malê. :Fermo zadî bi xo. :Fermo rûne.

**Ferşik** (n.x.mê) Berek pane jibo nivêjan bi kar di hêt. Helankê nimêjan. : Nivêja xwe liser ferşikî kir.

**Fesad** (hn.x.çewa) Mirovê axivtina di navbera kesan da di veguhêzit.

**Fesadî** (n.dar.mê) Axivtin veguhaztin. Durûyî.

**Fesadîkirin** (k.jn.l.mê) Axivtin veguhaztin. (K) bn: Kirin.

**Feşkilandin** (k.jn.dar.mê) Pûçkirin. Herifandin. Ji nav birin.

**Feşkilîn** (k.jn.x.mê) Pûçbûn.Heriftin.ji navçûn.

**Fetisandin** (k.jn.dar.mê) Heger mirov tiştekî, giranîyekê danit yan bikevit ser devî ku rêya hatinûçûna bayî bo nav singî rawestînit di bit egera mirinê. Bêhinçikkirin. (K) bdn: ez di fetisînim, em ewan di fetisînin. Bdb: di fetisand, di fetisandin. Dê fetisînim, dê fetisînîn.

**Fetisîn** (k.jn.x.mê) Bêhinçikbûna mirovî yan candaran ta di mirit. (K) di fetisit, di fetisin. dê bi fetisit, dê bi fetise. bi fetisin.: Dergehî veke, heger dê fetisîn.

**Feylî** (malb,devn) 1.Devereke kurdane li Kurdistana Iraq û Iranê. 2. Zaravek kurdî ye.3.Kesê feylî, xelkê devera feylî lê xwecih.

**Fêkî** (n.x.nêr) Fêqî.

**Fêl** (n.x.mê) Xapandin.Serdabirin. Xap.

**Fêlbaz** (hk.dar.çewa) Xapînok.

**Fêlkirin** (k.jn.l.mê) Xapandin.

**Fênik** (hn.dar.çewa) Cihê xweş û dilveker , sar li havînê. Hwîn.Honik. :Spêdeyeka fênik.

**Fêqî** (n.x.nêr) Berê darên bi ber ko piranî tam şirîninin, mîna sêv,xox, zerdil, tirî, gundor û htd. ***Pend*** :Fêqîyê zivistanê zarokin.

**Fêr** (n.x.mê) Zanîn. Xwendin.

**Fêrbûn** (k.jn.l.mê) Çewayîya wergirtina waneyan, yan her karekî. hînbûn. . :Ez di xwazim fêrê zimanên biyanî bi bim. (K) bn :Bûn

**Fêrbûyî** (hk.l.çewa) Kesê fêrî karekî bûye.

**Fêrdar** (pîşn.dar.dz) Fêrvan.

**Fêre** (n.x.mê) Wane.:Fêreya zimanê kurdî.

**Fêrgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê fêrbûna xwendekaran yên law. Xandingeha paş berhevî yê.

**Fêris** (hn.x.çewa) Pelewan. Hêja. Pehlewan. Zîrek.

**Fêrkirin** (k.jn.l.mê) Hînkirin. .:Ez dê xwe fêrî zimanê farisî bi kim. :Te xwe fêrî hajotina tirombêlan kir?. (K) bn: Kirin.

**Fêrvan** (pîşn.dar.dz) Kesê xelik li ber destê wî fêr di bin. Mamosta. Seyda.

**Fêsad** (hk.x.çewa) Bekirok. Fesad.

**Filan** (hk.x.çewa) Kesê, yan tiştek nedîyar. :Filan kesî got. Filan tiştî ji min ra bîne.Bêvan.

**File** (dîn,n.x) Fele.

**Filfil** (n.hnx.dz) 1.Şînkatîyeke, bi xavî û lênan tê xwarin, gelek cor û tam hene ; mina ;,tîj , şirîn . Bîber.2.Mirovê dujwar. Har.

**Filipîn** (hk.cih.cugir,n) Welatê filipîn.

**Filipînî** (netewe,n) 1. Xelikê filipînê. 2. Kelûpel yan mitayê ji Filipînê.

**Filis** (n.x.nê) Êk ji hizara dînra Iraqî ye. Wek sent li hind welatên dî.

**Filitîn** (k.jn.x.mê) Peşîn. Firîn. Qurtalbûn.

**Filîte** (hk.x.çewa) Felîte.

**Fincan** (n.x.mê) Kopên vexwarina qehwê, çayê û htd.:Fincanekaqehwê dana ber mêvanî.



**Fincan**

**Find** 1(n.x.mê) Çira. Fener. Şemalk.

**Find** 2 (n.x.mê) Fêl. Xap.: Ew zelamekê bi finde.

**Finddank** (n.dar.mê) Amankeke findikê yan şemalkê têda di danin. :Bê zehmet şemalkê bi di finddankê da.

**Findiq** (n.x.mê) Bindeq.

**Fiqeroşk** (n.dar.mê) Kivark. Kukavoşk.

**Fir** 1(n.x.mê) Piçeka avê ko mirov bi carekê di qurçîne. Qurç. : Fireka avê, çayê, şîrî û htd.

**Fir** 2(n.x.mê) Firîneka kurt. Lûtik. Xwe avêtin. ***Pend*** :Kes bi firekê na gehit serê milekê.

**Fir** 3 (rd.x.çewa) Fireh. :Gava fir. Ang; gava ji hev dûr.

**Firajîn** (k.jn.x.mê) *darûbar* Pişkovkdan. Pişkdan. :Darên rezan yên ririjîn.

**Firake** (n.x.mê) Cihek bilind, kendalek bilind. Lat. Kevirên bilind ko mirov û candar liser dikevin û di firin.

**Firandin** (k.jn.dar.mê) 1.Dema tewal têjikên xwe ji hêlînê der di ke û di firîne. 2. Havêtina ber,dar kevir û htd.(K) bdsn: Ez di firînim em di firînîn, tu di firînî hûn di firînin, ew di firîne[..it] ewan di firînin.Pr: dê bi +bdn. Bdb: di firand, di firandin. Db,dûr: firandibû, ...bûn. (F): bi firîne, bi firînin.

**Firavîn** (n.x.mê) Xwarina danê nîvro. Zadê nîvro. :Firavîna evro tirşike, îpraxe.savare. û htd.

**Firawan** (hn.x.çewa) Fireh.

**Firax** (n.x.pir) Aman.

**Firçe** (n.x.nêr) Alaveke ji davan hatî çêkirin destikdare,jibo paqijkirina didanan, yên mezin jibo malan. Gêzik. Havlêk.



**Firçe**

**Firçekirin** (k.jn.l.mê) Didan firçekirin; paqijkirina didanan bi firçeyê didanan. Firçikirina malêa;ang malîna malê bi firçeyê mezin.

**Firdik** (n.x.mê) Xwarineke ji nan û dew, yan nan û mast yên têkel pêkhatîye.

**Firefir** (hk.dar.çewa) Dengeke ji devê dewaran di hên, yan mirovê persîvdar. :Te çiye firefira te?.

**Firefirkirin** (k.jn.gl.mê) Candar û mirov dengê firefirê ji devê xwe di hînnin. (K) bn: Kirin.

**fireh** (hn.x.çewa) 1.Yekeya pîvanê jibo panîya tiştî bi kar têt. Vedayî. 2.Pir.Çir. Mezin. Cilkên fireh, xanîyê fireh, htd. Br× Teng.

**Firehbûn** (k.jn.l.mê) Mezinbûna qebare. Jiberêk hatin der. Dema tişt fireh di bit. :Cilik firehbûn. (K) bn: Bûn.

**Firehî** (n.dar.mê) *endaze* Yekeya firehbûna tenan. Çudîya firehbûnê. : Firehîya xanî, zevî, bîstan û htd.

**Firehkirin** (k.jn.l.mê) Jêkrakêşana tiştî ta fireh bi be. Mezinkirin. :Coya avê fireh bi ke!. :Bêhina xwe fireh kir. (K) bn: Kirin.

**Fireng** (nejad,n) Ewrpayî.

**Firengistan** (hk.cih.cugr,n) Ewropa.

**Firengî** (nejad,n) Fireng.

**Firensa** (hk.cih.cugr,n) Welatekê ewropayî ye.

**Firensayî** (nejad,n) 1. Xelkê Firensa.2 .Kelûpelêd ji Firensa.

**Firensî** (nejad,n) Firensayî.

**Firêzer** (nbiyan,x.mê) Amêrekê wek sindoqe, xwarin û fêqî tê dixin dako tezî bi be û ji xirabbûnê bi hêt parastin.

**Firfire** (n.dar.nêr) Perwane.

**Firfirok** (n.dar.mê) Virvirok. Firoke. Firinde.

**Firgeh** (hk.cih.dar.mê) Firokexane. Firîngeh.

**Firin** (n.x.mê) Cihê patin û firotina nanî.

**Firinde** (n.dar.mê) Firoke.

**Firî** (n.x.mê) ***spîyatî*** Berhemek rêçalî ye rojên êkê piştî zana giyandaran ko ji kelandina şîrî çê di bit. ***Pend*** :Li hîvîya firîyê gay man.ang; li benda karekî ko bi zehmet hebûna wî heye. Gazîya dûv gurî.

**Firîn** (k.jn.x.mê) Hatin û çûna tewalan, çûçikan û firokeyan di valayîyê da (li asmanan )bi şaperên xwe.***Pend*** :Yê bilind bi firit, dê nizim bi erdî kevit. (K) :Bdn : ez di firim em di firîn, tu di firî hûn di firin, ew di fire[…it]ewan di firin. PR: Dê[bi]+ bdn. Bdb : Di firîm, firîn, firî, firin. Db,dûr : firîbûm, …bûyn,… bûy,..bû.. bûn.(F) :bi fire, bi firin.

**Firîngeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cîyê firoke lê di nîşin û di firin.Firokexane

**Firîşte** (n.x.dn,hn.x.çewa) 1. Melayketên ji asmanan tên xwarê jibo bi cih anîna hezên xuda.2.Çembera ciwanî yê. Zerî. Perî.

**Firîz** (n.x.nêr) Firîzî

**Firîzî** (n.x.nêr) ***giya*** Giyayek keske li baxan di çînin jibo ciwanîyê.

**Firne** (n.x.mê) Cihê nan patinê. Tenîr.

**Firnik** (n.dar.mê) 1. Firneya biçûk. 2. Kunêd difnê. Bêvil.

**Firo** (n.x.nêr) Firî.

**Firo<u>ke</u>** (n.dar.mê) Makîneyeka mezine bi hêza agirî li bilindîyan di firit jibo karên veguhastin û leşkerî mifa jê têt wergirtin. Balefir.



**Firoke**

**Firoke<u>yan</u>** (pîşn.dar.dz) Kesê firokeyan di firîne(hajot). : Birayê wî firokevane.

**Firokeva<u>nî</u>** (karn.dar.mê) Karê hajotina firokeyan.

**Firoke<u>xane</u>** (hk.cih,n.dar.mê) Firîngeh.

**Firo<u>şer</u>** (pîşn.dz) Kesê kelûpelan,fêqî û htd di firşit. Kesê karê firotinê dike.

**Firoş<u>geh</u>** (n.cih.mê) Dikana mezin. Cihê firotina kelûpelan, tiştan.

**Firoş<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Her tiştê(mitayê) beramber pareyî yan mitayekî bi dî yekî. (K) Bdn:ez di firoşim,em di firoşîm, tu di firoşî, hûn di firoşin, ew di froşe[..it] ewan di froşin. PR: Dê[bi] + Bdn.  Bdb: Di firoşt, di firot, di firoştin.di firotin. Db,dûr: firoştibû,...bûn.(F): bi froşe, bifroşin.

**Firoş<u>yar</u>** (pîşn.dar.dz) Firoşer.

**Firoş<u>yarî</u>** (karn.dar.mê) Karê firotina kelûpelan.

**Firo<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Firoştin.

**Fir<u>şik</u>** (n.x.nêr) ***candar*** 1. Nermegoştê navbera zik û singê lawiran ji nav da. 2. Hêvênê penîrî ko ji hedamê lawiran çêkirî ye.

**Firşk<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Paş zayînê jibo cara yekê karik yan zaro şîrê dayk,maka xwe di xwe. :Bi şîrê makê firşik bû. (K) bn: Bûn.

**Firşik<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Êkem car şîrê makê di din karikan.Yekem car zaro şîrî di xon.(K) bn: Kirin.

**Firşik<u>teng</u>** (hn.l.çewa) Bêhinteng. :Wey hewar çi jinkeka firşiktenge!.

**Firş<u>teng</u>** (hn.l.çewa) Firşikteng.

**Fir<u>tine</u>** (n.x.mê) Hur. Bahoz. Babelîsk.

**Fis** (n.x.mê) Bayî ji paşîya mirov û candaran di keve der. Derdikevit. Kuş.

**Fisan<u>din</u>**(k.jn.dar.mê) 1. Ba jiber berdan. Pivdank fisand. 2.Perîna tewalan.Perîna çûçikan. Cotbûna tewalan.

**Fisgur** (n.dar.mê) Core giyayek qehwayî ye, mêş û kêzikan di girit.

**Fisken** (hk.l.çewa) Kesê ko fisan di ke.

**Fiskirin** (k.jn.l.mê) Derêxistina bayê hinavan. Kuşkirin. (K) bn: Kirin.

**Fisqe** (n.x.mê) Pîvazên biçûk.Kixs.

**Fisteq** (n.x.mê) *darûbar* 1. Dareka mîna dara keskannane fisteqan di girit. 2.Corek çerezane, tîvkilreqe, yan kakile.

**Fişandin** (k.jn.x.mê) 1.Ba jiber berdan. Valakirin. Tepik fişand. 2. Kifkirin. 3.Xwarkirin. : Pişta kerî di bin barî ve fişand.

**Fişefiş** (hn.dar.çewa) Dengê kifekifa difin û devan.

**Fişefişkirin** (k.jn.gl.mê) Difinradan tanî deng jê bi hêt.Kifkirin.

**Fişkandin** (k.jn.dar.mê) Derêxistin. Derkirin.

**Fişkilandin** (k.jn.x.mê) Pirtikandin.

**Fişkilîn** (k.jn.x.mê) Pirtikîn. Peritîn.

**Fiştiqandin** (k.jn.dar.mê) Pûçkirin. Xirakirin. Aşkerakirin. Jinavbirin.

**Fiştiqîn** (k.jn.x.mê) Pûçbûn. Xirabbûn. Herifîn.

**Fitare** (n.biyan) Xwarina êkê ya şikandina rojîyê, li dema roj ava d bit.


**Fitarekirin** (k.jn.l.mê) Xwarina fitarê. (K) bn: Kirin.

**Fîk** (n.x.mê) *deng* Fît.

**Fîkan** (n.x.mê) Fîtik.

**Fîkandin** (k.jn.x.mê) Fîtikvedan. (K) bdn: ez di fîkînim em di fîkînîn, tu di fîkînî hûn di fîkînin, ew di fîkîne[…it] ewan di fîkînin. Pr: dê [bi]+ bdn. Bdb: di fîkand, di fîkandin. Db,dûr: fûkandibû. ….bûn. (F): bi fîkîne, bi fîkînin.

**Fîl** (n.x.dz) *candar* Mezintirîn giyandarê şîrdere, liser erdîdi jît. :Fîlek mezin. :Limbîsê fîlî.



**Fîl**

**Fîlim** (n.byiyan) Film.

**Fîlter** (n.biyan) Parzinînk.

**Fîncan** (n.x.mê) Kopeke ji axa cerik yan şûşe hatîye çêkirin, bi reng û nîgaran xemilandî ye, mirov jibo pê vexwarina qehwe û çayê bi kar di hîne.***Pend*** :Vexwe heft fincanêd jehrê, ne vexwe fincaneka qehirê.

**Fînok** (hn.x.çewa) Jinka yan zelamê pûç.Rispe.

**Fîrandin** (k.jn.dar.mê) Fîtikvedan. (K) bdn: ez di fîrînim em di fîrînîn, tu di fîrînî hûn di fîrînin, ew di fîrîne[..it] ewan di fîrînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb: di fîrand, di fîrandin.Db,dûr: fîrandibû,..fîrandibûn. (F): bi fîrîne, bi fîrînin.

**Fîre** (n.x.mê) Zikçûn. Fîşk.

**Fîredan** (k.jn.l.mê) Zikçûn. Bi fîşan kevtin. Hinavçûn. (K) bn:Dan.

**Fîrik** (n.dar.mê) 1.Dengê fîtêna ji devî tê.2. Amêreke bi pifkirinê fîtên jê di hêt.

**Fîstan** (n.dar.nêr) kirasê jina yê dirêj .

**Fîş** (n.x.mê) Tiştê şil yê bi pest di çit wek zikçûnê. Fîşên wî di çin.

**Fîşeng** (n.x.mê) Fişek.

**Fîşengbend** (n.dar.nêr) Rextê fîşekan.

**Fîşek** (n.x.mê) Guleyên tivengan.



**Fîşek**

**Fîşik** (n.dar.mê) Fîş.

**Fîşikçûn** (k.jn.l.mê) Zikçûna mirov û giyaneweran. Hinavçûn.bi Fîşikan kevtin.

**Fît** (n.x.mê) 1.Dengê bi hêza paldana bayî ji lêvan peyda di bit. ***Pend*** :Fita Hesedê hewêrî. Ang; karê ko gelek dirêj di bit.2. Peyt. Dirist. : Cilik yan her tiştê ji mirovî bi hêt. Ev kirase jibo te fîte.ang; jibo te yê diriste.

**Fîter** (pîşn.dar.dz) Kesê alavên şikestî nûjen di ket.

**Fîterî** (karn.dar.dn) Karê çêkirin û nûjenkirina amêran.

**Fîtik** (n.dar.mê) *deng* Fît.

**Fîtikvedan** (k.jn.l.mê) 1.Bi pifkirina bayî û gurckirina lêvan mirov dengê awazan ji devê xwe di hînin. 2.Pifkirin amêrê fîtikê tanî deng jê bi hêt. Fîkandin. (K) bn: Vedan..

**Fîtkirin** (k.jn.l.mê) 1. Nehêlan. Jinav birin. Çi ji ber xwarin û vexwarinê neman. :Zadê xo fît kir. Nanê xwe fît kirin.2. Fîtikvedan. (K) bn:Kirin.

**Fîxan** (n.x.mê) Nalîn. Zêmar. Kovan. :Axînk rahêlan. Kovan kişandin.

**Fîxankirin** (k.jn.l.mê) Kovandarbûn. Xemxwarin.

**Fîzar** (n.x.mê) Fîxan.

**Fîzarkirin** (k.jn.l.mê) Axîn rahêlan. Xemxwarin. (K) bn:Kirin.

**Fîzîk** (n.biyan) 1.Zanîna xuristî. Zanîna xwezayî. 2. Hêza laşî.

**Fîzîknas** (pîşn.l.dz) Pispor di warê fîzîkê da.

**Fîzîknasî** (n.biyan.l) Zanîna fîzyayê.Fîzîk.

**Fîzya** (n.biyan) Fîzîk.

**Folklor** (n.biyan) Rewişt,tîtal, cilik û kelûpelên kevnar yên gelêrî. Kelepor.

**Folklorî** (hk.dar.çewa) Tiştêd folklorî. Kevin. Keleporî.

**Frans** (cugirn) Welatê Firensa.

**Fransî** (maln.n.dar)1. Xelik yan zimanê welatê frans. 2. Kelûpelên ji Fransa.

**Frêkirin** (k.jn.dar.mê) Bi rê kirin. Şandin. Rêkirin. Hinartin.

**Fus** (n.x.mê) Fis.

**Fûtik** (n.x.mê) Parçe perokeke bo nivêj li ser kirinê bi kar di hînin. Şemilk. Cilnivêşk.

# G

**G**(ge) Pîta nehê ji abeya kurdî.

**Ga** (n.x.nêr) Giyandarek şîrdere, nêre, kehî yan kûvîye. ***Pend*** :Gayî cot ne kir mirêbayî minê kir.***Pend*** :Gayê kilik qut mêşa ji xwe na revînit.***Pend*** :Gayê nav golikane, ang; kesê karên zarokane bi ke.***Pend*** :Ga di ke, xwedî di xwe.***Pend*** :Gayê pîr hî nabit cotî. Ang; mejîyên kevneperist di gel serdemî narahên. ***Pend*** :Ji gayî guh nîşa da. Ang; kesê piranîya malê yekî ji xwe ra zep di ke û kêm di detê. *Pend* :Ne me ga li garanê, ne nob li gavanî.ang ; yê çi nebe, sergêjî û xem jî nebe.nabe.

**Gabarê** (hk.cih.cugir,n.) Çend gundekin li Kurdistanê.

**Gabarî** (malbat.n) Xelkê gundên gabarê.

**Gabinêzk** (n.dar.mê) ***derd*** Êşeke stoyê mirovî rêncî[girj] di be, mirov nikare serê xwe bi bade. Xinzirîna stoyê mirovî.

**Gabinêzkgirtin** (k.jn.gl.mê) Toşî derdê gabinêzkê bûn. Stoxinzirîn. Rastî gabinêzkê hatin.

**Gader** (hkcih.cugirn) Çiyayeke li Kurdistanê.

**Gadêr** (kar,n.dar.dz) Gavan.

**Gadêrî** (karn.dar.dn) Gavanî.

**Gaj** (n.x.mê) Gulolka bendikan.

**Gakêl** (pîşn.dar.dz) 1. Cotyar. Cotkar.2. Gayê jibo kêlana zevîyan bi kar di hînin.Gayê cotî.

**Gakotir** (n.l.dz) ***balinde*** Balindeyeke mîna kotirane. Gapil.

**Gakûvî** (n.l.dz) ***candar*** Gayê kûvî. Gayê kwîvî. Bîzon.



**Gakûvî**

**Galgalîsk** (n.dar.mê) *giyandarzanî* Gerî. Gewrî. Gero.Gelalîşk.

**Galiske** (n.x.mê) Erebeyeka teybetî ye, cihê rûniştina çend kesan di nav da heye, di xin dû hespan jibo veguhaztina mita yan mirovan.

**Galte** (n.x.mê) Henek. Yarî. Gelte. Tirane. : Ew mirovek bi gelteye;ang  tiranekere.

**Galtebêj** (hk.dar.çewa) Tiraneker.

**Galteker** (hk.l.çewa) Tiraneker.: Mirovê galteker.

**Galtekirin** (k.jn.l.mê) Tiranekirin. Wî herdem galte di kirin. (K) bn: Kirin.

**Gamêş** (n.x.dz) ***candar*** Giyandarek malî, şîrdere ji bira çevrîya ne.

**Gan** (n.x.mê) Cotbûna navbera du giyandaran. Guhnelîya giyandaran. Kutan.

**Gander** (hn.dar.çewa) Pûç. Rispe.

**Ganêr** (n.dar.nêr) Gayê nêr.

**Gankirin** (k.jn.l.mê) Kutan. Perîn.Cotbûn. (K) bn :Kirin.

**Gapîsk** (n.l.nêr) Helameteke dema nivistinê mirov we hizir di ke ko xwe bi ser leşê mirovan da di girit û bêhna mirovî çik di bit. Dêvzime.

**Garan** (n.dar.mê) Birek (komeka) çêl û ga, gareşan bi hevra li çerwanî. ***Pend*** :Çêleka tiro garanekê tiro di ket.ang ; kesekê ziyano, ziyanê di gehîne civakekê.

**Gare**  (hk.cih.cugirn.x.nê) 1. Çiyayeke li Kurdistana Iraqê.2. Navê xort û keçane.

**Gareş (**n.l.dz) Çêl, gol û ga. Çevrî.

**Garis** (n.x.nêr) *giya* Mitayek dindik hûre jibo xwarinê wek nan mifa jê di hat wergirtin û wek tomkê çûçikan bi kar di hêt.Pend :Garisî du rê bi stûnê ve di bet.ang ; mirovê zorzan.

**Garîte** (n.x.nê) Darek dirêj û stûre bo ser avahîyan û karên din bi kar di hêt.

**Gasik** (n.dar.mê) Pelgir. Gazik.

**Gasin** (n.dar.nêr) Gêsin.

**Gav** (n.x.mê) 1. Dûrîya navbera du pêyan dema rêveçûnê.2. Pêşkeftin.Pêşveçûn.3. Dem. : *pend* gava xudê da, na bêjit tu kurê kêyî?. Gava tu hatî, dê bi rê kevîn.

**Gavan** (pîşn,dar.dz) Kesê di çit ber gareşan(çevrîyan). Sexbêrkerê garanê.***Pend*** : Faydê gavanî siwarbûna dewarane.

**Gavanî** (karn.dar.mê) Karê ber dewaran. Çavdêrê dewar û çevrîyan.

**Gavanîkirin** (k.jn.gl.mê) Dema mirovek karê çavdêrî ya gareş û dewaran di ke. :Wî heft salan gavanî kir. :Gavanîkirin karekê dijware.

**Gavavêtin** (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov bi rê di çe û gavan di havêje.2. Pêşveçûn. Pêşdaçûn.3. Destpêkirin. :Me gav avêtine jibo avakirina dezgehekî. (K) bn: Avêtin.

**Gavber** (hn.dar.çewa) Dijber. Dij.

**Gavdan** (k.jn.l.mê) Bazdan. Bezîn.

**Gavhavêtin** (k.jn.l.mê) Gavavêtin. (K) bn: Havêtin.

**Gavîn** (n.dar.mê) Navbir. Vebir. Heyam. Navber.

**Gavkirin** (k.jn.l.mê) ) Gavhavêtin. (K) bn: Kirin.

**Gawir** (n.x.dz) Mirovê bê bawer, yê ji xudê netirs. Bêwijdan.

**Gaz** (n.x.mê) 1.Madeyek sivike di nav bayî da, gelek cor hene mîna oksicîn, haydirocî, htd. 2. Gaza sotinê ya jibo karên gerimkirin û xwarin lênanê bi kar di hînin.

**Gazel** (n.x.pir) Belgên zerên daran,li payîzê di werin.

**gazik** (n.x.mê) 1. Berbiska bi rwîşîk.2. Amêrekê du deve jibo girtina pelên kuçik û tenûran bi kar di hînin. Pelgir.

**Gazind** (n.x.mê) Gazinde.

**Gazinde** (n.x.mê) Dema mirov ji karekî ne qayîl bit bi xwaze şaşîyên wî diyar bi ke rêya dirist nîşan de. Gilî.Rexne. Dalehî.

**Gazindekirin** (k.jn.l.mê) Rexnegirtin. Gileyîkirin. Dalehîkirin. (K) bn: Kirin.

**Gazinok** (hk.dar.çewa) Mirovê pir gazindan di ke. Pitpitî.

**Gazî** (n.x.mê) Bang. Hewar.Dengê mirovî. : *pend* Gazîya dûv gurî, ang; dema kar ji destê mirovî der di kevit û êdî hindî hewar bi kî na zivirit.

**Gazîker** (n.dar.dz) Kesê gazî di ke.

**Gazîkirin** (k.jn.l.mê)1. Bangkirin. Daxazkirin.(k) bn :Kirin.

**Gazîvan** (n.dar.dz) Gazîker.

**Geç** (n.x.mê) Gêç.

**Geda** (hn.x.çewa) Hejar. Nedar.

**Gedandin** (k.jn.dar.mê) Destê xwe li ber xelkî ragirtin jibo alîkarîyê. Xwaztin. Xazokîkirin. (K) Bi gedîne, di gedînîn, gedînin. Di gedand.

**Gede** (n.x.nê) ***leş*** Hedamê hêrana xwarinê. Zik. Berkurk. Bertûrk.

**Gef** (n.x.mê) Gotineke dijî mirovekî  di hêt kirin bi kiryararek êşandin yan lêdana gurzekî.

**Gefandin** (k.jn.x.mê) Gefkirin. (K) bdn: ez di gefînim em di gefînîn, tu di gefînî hûn di gefînin, ew di gefîne[...it] ewan di gefînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: di gefand, di gefandin.Db,dûr: gefandibû, gefandibûn. (F) : bi gefîne, bi gefînin.

**Gefkirin** (k.jn.l.mê) Kirina gefan dijî kesekî. : Wî gefa kujtinê li hevdijê xwe kirîye, eger pareyên wî ne zivrînit.

**Geh** 1 (n.x.mê) *leş* Cihê êkgirtina du serên hestîyan. Girê. :Janek kevtîye gehên destên min.

**Geh** 2 (n.x.mê) Car. Carcar. Dem. Gav. :Vê gehê ne êka dî dê hêm.

**Geh** 3 (n.x.nêr) ***kevin*** Paşgireke bi peyvê ve di mîne ramana cih di de; wek bingeh, dezgeh, xwaringeh û hw. Cih.

**Gehandin** (k.jn.dar.mê) Dema mirov yekî, tiştekî ji cihekî bo yê din bi gehîne. : Bê zehmet van zaroyan di gel xwe bi gehîne xwendingehê. (K) Bdn: ez di gehînim, em di gehînîn, tu di gehînî hûn di gehînin, ew di gehîne[..it] ewan di gehînin. PR: dê[bi]+ bdn. Bdb: di gehand, di gehandin. Db,dûr: Gehandibû,…bûn. (F): bi gehîne, bi gehînin.

**Gehçûn** ji gehçûn (k.jn.l.mê) Dema geha hestî ji cihê xwe diçit ji egera ketin yan hilgirtina tiştê giran. : Çoka min ji geh çûye.(K) bn : Çûn.

**Gehiştin** (k.jmê) 1.Dema tiştek di gehit wek fêqê yan mirov mezin di bit. 2.Tiştek yan kesek di gehit cihê pêdvî. Gehîn.

**Gehîn** (k.jn.x.mê) Gehiştin. (K) : Bdn: ez di gehim em di gehîn, tu di gehî hûn di gehin, ew digehe[…it ]ewan di gehin. PR: dê[bi]+ Bdn. Bdb: Gehişt, gehiştin. Db,dûr : gehiştibûm,…bû, bûyn, bû..bûy. … bûn. (F) : bi gehe bi gehin.

**Gehkurt** (hn.l.çewa) Mirovê hedamên canê wî di kurt bin.

**Gejgerînk** (n.dar.mê) Babelîsk. Zivroka bay.

**Gejmirandin** (k.jn.dar.mê) Gemirandin.

**Gel** (n.x.dz) 1.Bireka mirovan yek ziman, ax û tîtal hebin. Netewe.:Gelê kurd. :Gelê faris, htd.2. Deste. Bir. Kom.

**Gela** (n.x) *darûbar* Belg.

**Gelale** (n.x.mê) Reşnivîs. Mijar.

**Gelalîşk** (n.x.mê) Gerî. Gero. Gewrî. Hefk.

**Gelavêj** (n.x.mê) ***stêr*** Gilavêj.

**Gelejimêr** (hk.l.çend) *rêzman* Pir. Gelek. Ji gelek hijmaran pêk hatîye.

**Gelek** (hk.çend) Pir. Zor. : *pend* Gelek nede ber dasê da ne mînit asê. ***Pend*** :Gelek gotin dilsotin. ***Pend*** :Gelek bizane kêm bi axive. ***Pend*** :Ji gelekan gelek di çin, ji piçekan piçek.ang; dema ziyan di gehe mirovê zengîn yan malbata pir mirov pir mirov û malê wan di çe û yên destkurt û kêm mirov ziyana wan ya kême.

**Gelemper** (n.dar) Civak. Komel.

**Gelemperî** (hn. Dar.çewa) Giştî. Bi giştî. Civakî. Tebayî.

**Gelêrî** (hn.dar.çewa) Tiştê keleporî , huner, sitran, cil, htd. Gelî.

**Gelî** 1(hk.cih.cugirn.x.mê) Navbera du çiyan, giran. : Gelîyê Duhok, Zaxo, Zîlan û htd.

**Gelî** 2 (hn.çewa) Gelêrî.

**Gelmiçandin** (k.jn.dar.mê) Germişandin.

**Gelmişandin** (k.jn.dar.mê) Perçiqandin û têkhelkirin.

**Gel<u>nas</u>** (hn.l.çewa) Dilsoj û xebatker ji pêxemet gel û welatê xwe. Welatparêz.

**Ge<u>lo</u>** (pêrb.alv.bangkirin) ***rêzman*** Alaveke jibo gazîkirin û hişyarkirin bi kar tê.: Gelo ma ta kengî em dê bindest mînîn?.

**Gel<u>te</u>** (n.x.mê) Tirane . Henek. Yarî.

**Gelviçan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Perçiqandin. Pankirin.

**Gel<u>waz</u>** (hn.çewa,n.dar.mê) Gulwaz. Gilwaz.Qeft.

**Ge<u>mar</u>** (hn.x.çewa) Tiştê rizî, genî û pîs.Qirêj. :Ava gemar. Xwarina gemar. Mirovê gemar.

**Gemar<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Pîsbûn. Qirîjîbûn.

**Gemar<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Dorpêçkirin. Abloqedan.

**Gema<u>rî</u>** (n.dar.mê) Pîsî. Qirêj.

**Gemar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Pîskirin. Qirêjîkirin. (K) bn: Kirin.

**Gema<u>ro</u>** (n.dar.mê) Dorpêç.

**Gemaro<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Dorpêçkirin. (K) bn: Dan.

**Gem<u>bol</u>** (n.dar.nêr) Segê nêr. Se.

**Gemiran<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Vemalîn yan perixandina leşê mirovî. (K) bdn: ez di gemirînin em di gemirînîn, tu di gemirînî hûn di gemirînin, ew di gmirîne[..it] ewan di gemirînin. PR: dê bi + bdn. Bdb: di gemirand, di gemirandin. DB,dûr; gemirandibû, …bûn.(F): bi gemirîne, bi gemirînin.

**Ge<u>mî</u>** (n.x.mê) Amêrekê bi hêza bay, zendik yan şewatekê kar di ke, jibo veguhaztina mirov û kelûpelane di avê da mifa jê di hêt wergirtin. Belem. Papor. Keştî.

**Gemîv<u>nan</u>** (pîşn.dar.dz) Kesê gemîyî di hajot. Xwedîyê gemîyê.

**Gemîva<u>nî</u>** (kar.dar.mê) Karê hajotin û sexbêrkirina gemîyan.

**Gem<u>jo</u>** (hn.x.çewa) Mmirovê qelew gêj û tembel. Çêlo.

**Gem<u>şo</u>** (hn.x.çewa) bn:Gemjo.

**Genc** (hn.x.çewa) Law. Xort. Cihêl . Tolaz. Nestêl. Azad hêj gence.

**Gencî<u>ne</u>** (n.x.mê) Xizîne. Defîne.

**Gencî<u>nî</u>**. (n.dar.mê) Lawînî. Cihêlî. :Gencînî ya hemû li biyanîyê derbaz bû.

**Gendel** (hk.x.çewa) 1. Mirovê pere û dahatê dezgeh, kargeh welat û htd jibo xwe di dzit. 2. Navê mêrane.

**Gendelî** (n.dar.mê) Dema ajawe, berelayî û qetlazî di kevit nav civakekê da, ko pere jibo meremên kesatî bi hên bi kar anîn, çi nêrevanî liser ne be.

**Gendij** (hn.dar.çewa) Kesê bêhna gemar jê di hêt. Genî.

**Gengeşe** (n.dar.mê) Hevrikî. Miştomir. Danûstandin. :Ez di xwazim bizanim gengeşeya hewe li ser çiye ?.

**Gengeşekirin** (k.jn.l.mê) Cirekirin. Hevrikîkirin.

**Genim** (n.x.nêr) Mitayek çandinî ye, dindika wî wek savar, danqut, danhêr di jibo xwarinê bi kar dihê û nanî jê çê di ken. ***Pend*** : Genim nebî, ceh be, ceh nebî têkel be.***Pend*** :Nanê genimîye bi her zadî tê xwarin.ang ; mirovê çak yan amêrê desthil jibo her karî mifa jê di hêt wergirtin.

**Genimî** (hn.dar.çewa) Rengê mîna genimî.:Pora wê genimî ye.

**Genimşam** (n.l.nêr) Genmok. Şagenim. Genimşa

**Genî** (rd.x.çewa) Gemar. Herimî. :Mirovê genî. :Jajîyê genî. :Hêka genî.

**Genîbûn** (k.jn.l.mê) Gemarbûn . pîsbûn. Rizîn. Rizîbûn. :Zadê liber tavê mayî genî bi bû.

**Genîkirin** (k.jn.l.mê) Pîskirin. Rizîkirin.

**Genmok** (n.dar.nêr) Genimşam.

**Genû** (n.x.nêr, hn.x.çewa) Genî.

**Gep** (n.x.mê) Rû. Gone.

**Ger** 1 (hk.cih.n.x.mê) Cihê av lê pengî, kombûy. Gol. : Gelek masî yên di gerê da. :Xwe havêt gerê.

**Ger** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê mercê. Ang; eger.:Ger min bi zanîya tu dê wesa bi kî..?.:Ger ez çûm bajêrî, dê ji te ra tembûrekê bi kirim.

**Ger** 3 (n.x.mê) Dor. :Tu here paşî gera mine. :Gereka dî ez dê xwarinê lênim.

**Geran** (k.jn.x.mê) Hatinûçûn . Piyase. Geryan : ***Pend*** :Geryane, diryane. (K) Bdn: ez di gerin em di gerîn, tu di gerî hûn di gerin, ew di gere[…it] ewan di gerin.PR: dê [bi]+ bdn. Bdb: di geram, di gerayn, geray, di gera ,di geran. Db,dûr: Gera[gerya] bûm, bûyn(bûn),..bûy(bû)…bû.. bûn.(F): bi gere bigerin.

**Gerandin** (k.jn.x.mê) Gêrandin. Mirov yekî bi gerîne. . : *Pend* Jina minê, were pişta minê, da te bi gerînim li dinê. Dayka minê bela serê minê. (K) Bdn: ez di gerînim em di gerînî, tu di gerînî hûn di gerînin, ew di gerîne[…it] ewan di gerînin.. PR: dê [bi] + bdn. Bdb: di gerand, di gerandin. Db,dûr : gerandbû,…bûn.: (F) : bi gerîne, bi gerînin

**Gerav** (n.dar.mê) Girav. Pengav.

**Gerdelûle** (n.x.mê) Babelîsk.

**Gerden** (n.x.mê) *leş [can]* Pirteka leşê mirovî ye ,ji bin erzinkê ta singî .Hefik.

**Gerdenaza** (hn.l.çewa) Mirovê hatî aza kirin ji şaşîyan. Azad. Serbest.

**Gerdenazakirin** (k.jn.l.mê) Lêbihorîn. Azakirin. Lê xweşbûn. : Heger min dilê te hêla bit, hîvîye gerdena min aza ke. (K) bn : Kirin.

**gerdenbend** (n.l.mê) Ristik.Stovank.

**Gerdengaz** (hn.l.çew.çewa) Mirovê, nexasime jina gerdena wê dirêr û ciwan.

**Gerdenî** (n.dar.mê) Stovank. Ristik.

**Gerdenkêl** (hn.l.çewa) Jina gerdena wê mîna kêlê ciwan û diyar.

**Gerdenzer** (hn.l.çewa) Xudana gerdena zer û xweşik.

**Gerdûn** (hk.cih.cugirn.x.mê) Cîhan. Dinya. Topa erdî. : *helbest* Min dî alema kelamê mewzûn , alî bi kira ji banê gerdûn.Helbestvan ; A.Xanî.

**Gerdûnî** (hn.dar.çewa) Cîhanî. Valayî. : Heyva gerdûnî.

**Gereke** (pêrb) ***rêzman*** Pêdvîye.

**Gerew** (n.x.mê) Barimte. Li cihê êkî. Pêş yekî ve. : Birayê te di gerewa te da çû.

**Gerewdan** (k.jn.l.mê) Mirov pare, yan malî li pêş yekî ve bi de da bi hêt azadkirin,çi ew kes yê girtî bit yan karek ne rê dijî yekî encam da bit.

**Gerewkirin** (k.jn.l.mê) Mirov bi barimte bi hêt girtingirtin.

**Gerger** (n.dar.nêr) Cercîr. Cehcîr.

**Gergerok** (hk.dar.çewa) Gerok.

**Gergûnk** (n.dar.mê) Stovan. Ristik.

**Gerik** (n.x.mê) 1.Tovê gul û giyayî yê hûrik mîna tozê.2. Toza havînan liser belgên daran di nîşit. 3. Gera avê a biçûk.

**Gerim** (n.x.mê,,hn.çewa)1.Pileyeka bilind. Havîna gerim. Germa agirî. Evro rojeka çewane?.; rojeka gerime.2. Çeleng. Çespan. : Mirovekê gerime. :Berîka wî ya gerime. Ava gerim. Xwarina gerim. BR× Sar.

**Gerimbûn** (k.jn.l.mê) Bilindbûna pileyên gerimê. Av li be tavê gerim di be. Havînê dinya gerime. (K) : Bûn.

**Gerimkirin** (k.jn.l.mê) Mirov pileya gerima tiştekî bilind bi ke. : Avê gerim bi ke. Çayê gerim bike. (K) bn: Kirin.

**Gerimkirî** (hk.l.çewa) Hatî gerim kirin. Ava gerimkirî. Şîrê gerimkirî.

**Gerisandin** (k.jn.x.mê) Dema mirov xwe li êkî bi dit, bêxit erdî û kelexê wî werbadet û bi gevizînit. (K) Bdn: ez di gerisînim em di gerisînîn, tu di gerisînî hûn di gerisînin. PR: dê[bi] + bdn. Bdb: di gerisand, di gerisandin. Db,dûr: gerisandibû, …. bûn. (F) : bi gerisîne, bi gerisînin.

**Gerîh** (hn.x.çewa) Bahîva ne gehiştî. Bahîvterk.

**Gerîla** (n.dar.dz) Gerok.

**Gerîn** (k.jn.x.mê) 1.Geryan. 2. Gerandin.3. Jêvebûn. Bela xwe lêdan.: Ez ji te nagerim ta perên min ne dî. Ji min bi gere.

**Germ** (n.x.mê, hn.çewa) Gerim.

**Germandin** (k.jn.dar.mê) Kerimkirin.

**Germav** (n.l.mê) 1.Kanîyên ava wan gerim. 2. Serşo.

**Germavî** (n.l.dz,hn.çewa) Mirov, xasim jin yêd di çin gemavê jibo şoştina cilik û seran. Balavî.

**Germavxweş** (silav.pîroz) Dema êk serê xwe di şot, pîrozîyê lê di kin û jêra di bêjin ;germavxweş. Noşêcan be.

**Germhijmêr** (n.l.mê) Amêrê pîvana pileyêd germê.

**Germijandin** (k.jn.dar.mê) Gerimkirin.

**Germijîn** (k.jn.x.mê) Gerimbûn. Gelek gerimbûn.

**Germijok** (n.dar.mê) Dema canê mirovî li ber germê di şewite. Tavbirin. Tawî. Tavî.

**Germik** (n.dar.mê) 1.Patekê gerimkirî di danin ser laşê mirovê westayî dako giyanê wî nerim bi bit. 2. Germav.

**Germik<u>dan</u>** (k.jn.gl.mê) Germik li ser erdê westayî û girj di danin dako nerim û tena bi be. : :Wî zendika xwe ya perçivî û şînbûyî germik da.(K) bn:Dan.

**Ger<u>mişk</u>** (n.dar.pir) Ji egera tava dujwar a havînê, coreke pirsikê horik li canê mirovî di hên.

**Germixan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Gerimkirin û zuhakirina tiştî bi nixavtinê.(K)bdn: ez di germixînim em di germixînîn, tu di germixînî hûn di germixînin, ew di germixîne[…it] ewan di germixînin. Pr: dêbi + bdn. Bdb : di germixand, di germixandin. Db,dûr: germixadibû, germixandibûn. (F): bi germixîne, bi germixînin.

**Germi<u>xîn</u>** (k.jn.x.mê) Liber tava rojê, yan li ber germê fêqî, zad,vexwarin gerim di bin di rizin.

**Germi<u>yan</u>** (hk.cih.cugirn.dar) Cihên gerim , nemaze li dema zivistan û biharan. BR× Zozan.

**Ger<u>mî</u>** (hn.dar.çewa) Bilinbûna pileyan .Gerim. :Germîya leş.

**Germî<u>dan</u>** (k.jn.lmê) Cih yan tiştê ko germa jê peyda di be.: Ev sopeye çi germîyê nade?.(K) bn: Dan.

**Germ<u>jimêr</u>** (n.l.mê) Gerhijmêr.

**Ger<u>nas</u>** (hn.dar.çewa) Mêrxaz. Qehreman. Mêrçak.

**Ge<u>rok</u>** ( hk.dar.çewa) 1.Mirovê li welat û cihan di gerit jibo lêkolînan.2. Kesê pir di gere.

**Ge<u>rû</u>** (n.x.mê) Gewrî. Gerî.

**Ger<u>yan</u>** (k.jn.x.mê) Geran.

**Ge<u>sik</u>** (n.x.nêr) Gêzik.

**Ges<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Geztin.

**Geş** (hn.x.çewa)1.Ronî. Bi ronahî. : Heyva geş, lempa geş, çirayê geş û htd. 2. Vebûyî. Vekirî. : Gula geş. Çavên geş.Dilê geş û htd. BR × Tarî .Çirmisî.

**Geş<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) 1.Vebûn. :Jiber avdanê gulêd baxê me geş bûn. 2. Xweşbûn .Ronîbûn. Bişkurîn :Bi hatina te em pir geş di bîn.(K) bn : Bûn.

**Ge<u>şî</u>** (n.dar.mê) Ronahî. Vebûn.

**Geş<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Ronkirin. Vekirin. (K) bn : Kirin.

**Gevaztin** (k.jn.dar.mê) Gevizandin.

**Gever** (devern.mê) Devereke li Kurdistana bakûr.

**Gevez** (hn.x.çewa) Pora sor. Pirça sor.

**Gevil** (hn.x.çewa) Bilîmet. Behredar. Bevil.

**Gevizandin** (k.jn.dar.mê) Di tozê,axê werkirin. Di tozê vedan. (K): [di,dê] gevizînim, gevizînîn,gevizînî, gevizînin, gevizîne[…it], gevizînin. Bi gevizîne, bi gevizînin. Gevizand, gevizandin.

**Gevizîn** (k.jn.x.mê) Canewer ji ber xurandina leşî, xwe di nav toz, ax, yan xîzî da dirêj di kin û hemû canê xwe wer di gêrin. Xwe di gevêzin.

**Gevizk** (n.x.nêr) Cihê bi toz û xîz, giyandar bi taybet dewar xwe lê di gevizînin. Tozgevisk.

**Gevjo** (hn.dr.çewa) Mirovê pora wî bê serûber û ne çêkirî. Sergij. Sergijavij.

**Gewc** (hn.x.çewa) Bêmejî. Dîn. Aqilsivik. Xişîm.

**Gewçe** (hn.x.çew) Lewçe.

**Gewerbûn** (k.jn.l.mê) Mirina giyandaran. Sekitîn. Mirarbûn. : Kerê melayê gund yê gewer bûy. (K) bn: Bûn.

**Gewir** (hn.çewa) 1.Rengê sipîyê tarî.2. Zîrek .Peyt. Rind.

**Gewixandin** (k.jn.dar.mê) Desthefkê danan. Xeniqandin. (K) bdn: ez di gewixînim em di gewixînîn tu di gewixînî hûn di gewixînin, ew di gewixîne[…it] ewan di gewixînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di gewixand, di gewixandin.Db,dûr: gewixandibû,… bûn.

**Gewlaz** (n.x.nêr) Hevsarê dewaran.

**Gewr** (hn.x.çewa) Rengê gewir.

**Gewre** (hn.x.çewa) Mezin. Pir mezin.

**Gewrê** (gazn. mê) Pejin,bangkirin û naznav ên jina gewir, ciwan.

**Gewrik** 1 (hn.dar.çewa) Rengêd reş û sipî têkel.Boz.

**Gewrik** 2 (n.x.nêr) Kevişk.

**Gewro** (ngaz.nêr) Pejin, bangkirin û naznav yên mêrê gewir.

**Geyîştin** (k.jn.x) Gehiştin.

**Gez** 1(n.x.mê) Core tiraşeke(dar) kesk û bêhinxweşe.

**Gez** 2 (n.x.mê) Yekyeke bo pîvana dirêjîyê bi kar di hêt, mîna perokan. ***Pend*** :Gez û cew di destî da ne;ang; hemû biryar û ferman di destî da ne. :Wî du gezên peroka kirîn. Çaleka deh gezan kûr di hewşê da ye.

**Gez** 3 (n.x.mê) Leqa mirovan,adî, pêşikan û htd. : *pend* Mar gestî ji werîsî di tirsit.

**Gezan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Gezkirin. Sotin. : Xwarina tîj ezman gezand.

**Gez<u>gezînk</u>** (n.dar.mê) ***giya*** Gezînk.

**Ge<u>zîn</u>** 1(k.jn.x.mê) Dema tav gerim di bit bi çavan livînek tê dîtin. Tav di gezit.

**Ge<u>zîn</u>** 2 (k.jn.x.mê) Gestin. Geztin. Cotin. Şewitî. Jan.

**Ge<u>zînk</u>** (n.dar.mê) *giya* Core giyayekê keske leşê mirovî di gezîne.

**Gez<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Leqdan. Leqdanan. Pêvedan. : Zarokî tibila babê xo gez kir. (K) bn: Kirin.

**Gez<u>nex</u>** (malb.n.x) Hozeka kurdên felene ji gundê geznex li Kurdistana Turkî hatîn Kurdistana Iraqê li devera Silêvane xwecih bûne.

**Ge<u>zo</u>** (n.x.mê) 1.Şirînîyeke di kevit ser belgên daran.2. Core şekrokeke.

**Ge<u>zok</u>** (n.dar.mê) ***giya*** Gezînk.

**Gez<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Gestin. Leqdan. Tamkirin.

**Gêç** (n.x.mê) 1.Corek axa sipî ye jibo avahîyan bi kar di hêt. :Dîwarê mala me gêçe. 2. Tebaşîr.

**Gêç<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov avahî, xanî yan dîwarkî bi gêçê di xemlîne. :We xanîyê xwe gêç kir?. (K) bn: Kirin.

**Gêj** (hn.x.çewa) Mirovê hay ji xwe ne bit û tiştî ji bîr bi kit. Gêl.

**Gêj<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Wekî mirov gêj di be. : Heger ez zadî ne xom, ez gêj di bim. :Jiber bêhna dermanan gêj bû. (K) bn: Bûn.

**Gêje<u>lok</u>** (n.dar.mê) Lîstokeke zaro di dora xwe da di zivirin tanî gêj di bin.

**Gê<u>jî</u>** (n.dar.mê) Nexweşîya gêjbûnê. Gêjbûn. : Gêjîya wî ji nexwarinê ye.

**Gê<u>jînk</u>** (n.x.mê) *giya* Core giyayke kûvîye, di hêt xwarin, tam tîje.


**Gêj<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirovek, hêzek bi be egra gêjbûna êkî. :

Hindî tu di axivî te ez gêj kirim. Îro me xwe bi geryanê gêj kir. (K) bn: Kirin.

**Gêjnok** (n.x.mê) Gêjînk.

**Gêl** (hn.x.çewa) Gêj.

**Gêlas** (n.x.mê) *fêqî* Core fêqîyeke şirîne wek helhelokane, gelek reng hene.



**Gêlas**

**Gêle** (n.x.mê) Mêrî.

**Gêleşok** (n.dar.mê) Dengûdor. Qerebalix.

**Gêlexur** (n.dar.mê) Kunmêrî.

**Gêlme** (n.x.mê) Têkelkirina gelek corên xwarinan. ***Pend*** :Gêlma gavanî.ang: jibo tiştê têkel û di nav êk ra di bêjin. Zadê têkel yê gavanî. Ji ber ko gavan xwarina xwe ji malên gundîyan werdigirin û di kene di êk amanî da.

**Gêran** (k.jn.x.mê) Belavkirin yan pişkkirina tiştekî li ser xelkî. :Çayê di gêrînit ang; di det xelkî, mêvanan.Çavan di gêrînit , temaşa di ke. (K): Bdn: ez di[ gêrînim em gêrînin, tu gêrînî hûn gêrînin, ew gêrîne[..it]ewan gêrînin]. PR: dê[bi] + bdn. Bdb: di gêrand, di gêrandin. Db, dûr: gêrandibû, …bûn. (F): bi gêrîne bi gêrînin.

**Gêrav** (hn.x.çewa) Çavlêkirin. Zarvekirin.

**Gêravkirin** (k.jn.lmê) 1.Zarvekirin. Çavlêkirin. :Ew gêrava bavê xwe di ke. 2. Sextekirin. Wî di xwast nasnameyekê gêrav bi ke.[ango mîna wê çêke.] (K) bn: Kirin.

**Gêraz** (n.x.mê) *fêqî* Gêlas.

**Gêre** (n.x.mê,hn.çewa) 1.Dewaran ber di din ser qeselê dako hûr bi bit, jibo cudakirina dan û kayê. 2. Tiştek peyt û bê kêmasî bit. : Kar çewan bi rêve di çe? … Gêreye.

**Gêrekirin** (k.jn.l.mê) Qutan û hûrikkirina qeselê dema dewaran li ser di gerînin (K) bn: Kirin.

**Gêrekirî** (hk.l.çewa) Qesela yan pûşê hatî gêrekirin.

**Gêrik** (n.x.mê) ***candar*** Coreke mêrîyane di hûrikin.Morîyên piçûk.Mêrîk.

**Gêrûse** (n.x.nêr) Distar. Destar.

**Gêsin** (n.x.nê) Asineke bi serê hincarî ve ye, sertîje jibo kêlana zevîyan, erdî bi kar di hêt.: Gêsinê, terektir yan dewaran.

**Gêsinkirin** (k.jn.l.mê) Kêlana zevîyan bi gêsinî. :Cotkar zevî gêsin kir. (K) bn: Kirin.

**Gêsinlêdan** (k.jn.gl.mê) Gêsinkirin. :Gêsinek li zevîya xwe da.

**Gêwil** (n.x.nêr) Hizir û viyana mirovî jibo encamdan yan ne encamdana karî.:Bela xwe ji min veke min gêwilê te nîne!. :Te gêwil heye em piçek derkevin?.

**Gêwildar** (hk.dar.çewa) Mirovê bi keyf. Mirovê gêwil hebe jibo kirina karekî. Bi gêwil.

**Gêwilsarbûn** (k.jn.l.mê) Dil ji karekî sar bûn. Bêgêwilî.

**Gêwilsarî** (n.l.mê) Bêgêwilî.

**Gêwilsarkirin** (k.jn.l.mê) Dilsarkirin ji karekî. :Çi caran gêwilê xo ji xwandinê sar neke. (K) bn: Kirin.


**Gêwilşikandin** (k.jn.l.mê) Bêgêwil kirin. Dilsarkirin. Deqşikandin. :Gêwilê min yê ji hajotina tirombêlan şikestî.

**Gêwilşkên** (hk.l.çewa) Kesê şeqilşikên. Mirovê deqşikên. :Tu miroveke gêwilşikênî û dilê mirovî ji her tiştî sar di key.

**Gêwlê** (hk.lçewa) Jina karî li gor gêwlê di ke.

**Gêwlo** (hk.dar.çewa) Mirovê her gavekê xwe di gihorit, car bi gêwil car bê gêwile.: Nojdar mirovek gêwloye, bi xwe nizanit wî çi di vêt!.

**Gêzer** giyayê zer(n.dar.mê) *çandin* Giyeke riha wî ya zere û têt xwarin dermanê çavane ji ber vîtan A têda heye.



**Gêzer**

**Gêzik** (n.x.nêr) Dav ,zil, şivik yan davên naylonî wek destik pêçayî, yan jî kirîne firçe jibo malîn û paqijkirina mal yan kolanan. :Gêzikê karebê. Gêzike yê bi karebê kar di ke û toz qirêjê di mêje.Sinik. Havlêk.

**Gêzikdan** 1 (k.jn.l.mê) Malîn bi gêzikî. :Here gêzikekî li malê bi de ya pîse. (K) bn:Dan.

**Gêzikdan** 2 (n.dar.mê) Cihê gêzikî lê di hilgirin. :Gêzik li kîrêye. Di gêzikdanê da ye.

**Gêzikkirin** (k.jn.l.mê) Malîn bi gêzikî. Gêzikdan. (K) bn:Kirin.

**Gêzirandin** (k.jn.x.mê) Gîrokirin. Şaşkirin. Serdabirin. (K)bdn: ez di gêzirînim em di gêzirînîn, tu di gêzirînî hûn di gêzirînin, ew di gêzirîne[…it] ewan di gêzirînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di gêzirand, di gêzirandin. Db,dûr: Gêzirandibû, ..bûn. (F): bi gêzirîne, bi gêzirînin.

**Gicgicandin** (k.jn.dar.mê) Şile; Şilqandin. Hijandin. Zirziqandin. : Dermanî bi gicgicîne paş bi de zarokî.(K) bdn: ez di gicgicînim em di gicgicînîn, tu di gicgicînî hûn di gicgicînin, ew di gicgicîne[...it] ewan di gicgicînin.PR:dêbi +bdn. Bdb: di gicgicand, di gicgicandin.

**Gid** (n.x.dz) Jibo nazandina karikan bi kar di hêt. (mê)Gidê..(nêr)Gido.

**Gidik** (n.dar.dz) Karik. Gid.

**Gidî** (hn.x.çewa) 1.Xort. Xorto.2. Bê bawer. Bê wefa.

**Gidîş** (n.x.mê)1 Komek qesela genim, ceh yan danên dî ye bi şêweyek lakêşe yan çargoşe çêkirîye,liser yek hatîye danan paş dirûnê jibo ko hişk bi be bi kêrê cencerkirinê were.

**Gidok** (n.x.nêr) *erd* Girik.

**Gidûk** (n.x.nêr) Girdok. Girik.

**Gidyan** (hnal.nê) 1. Gidî 2. Navê mêrane.

**Giftûgo** (n.dar.mê) Gengeşe. Danûsitandin.Miştûmir.

**Giftûgokirin** (k.jn.l.mê) Danûsitandin.(K) bn: Kirin.

**Gihan** (k.jn.x.mê) Gehiştin. Gehan.

**Gihandin** (k.jn.dar.mê) Gehandin.

**Gihar** (n.x.nêr) Deravê avê yê tenik. Bor. : Li giharê derbaz bûm.

**Gihîşk** (n.x.mê) *fêqî* Fêqîyek kîvî ye, piranî di reng zerin, xir û tam şirînin.

**Gihorîn** (k.jn.x.mê) Wergitina tiştekî hember yê dî. Li hev guhartin. (K)bn: Guhartin.

**Gij** (hk.cih..x.çewa) Cihê pir tefşeber û kevirên tîj.

**Gijavij** (hn.dar.çews) Pora jiberêk çûyî û ne şekirî. :Mirovek ser gijavij.

**Gijeber** (hk.cih..l..mêr) Cihek , zevîyek pir ji berêd gij.Gelek berêd gij di nav êk ra hebin.

**Gijên** (n.dar.mê) *deng* Dengê baran û gijikê. :Gijêna baranê.

**Gijênhatin** (k.jn.l.mê) Bihîstan dengê gijêna baran û gijlokê. :Gijêna dengê gijikê di hêt.

**Gijgij** (n.l.mê) *deng* 1. Dengê pêjna giyandaran demê di nav pîş û pelexî da di livin.:Gijgija pêyên wî ya di hêt.2. Dengê gijêna baranê.

**Gijgijandin** (k.jn.dar.mê) Hejandin. Leqandin.

**Gijik** (n.x.mê) 1. Dilopên baranê yên pir tezî û di bin qerîse û di barin. 2. Por. Pirç. :Ezê gijika te bi girim.

**Gijlok** (n.x.mê) Gijik.

**Gijnîj** (n.x.mê) *çandin, giya* Giyayeke tovê wî biçûk û xire bêhxweşe piştî qutanê, arê wî bo nav nanî nav xarinên dî mifa jê tê wergirtin. :Sawikêd gijnîjan.

**Gijnîk** (n.x.mê) *candar* Kirnî.

**Gil** (n.x.mê) *erd* Ax.Teqin.

**Gilale** 1 (hk.cih.devern.cugirn) Bajêrkeke li başûrê Kurdistanê. Kurdistana îraqê.

**Gilale** 2 (n.x.mê) *nojdarî* Bahîvokên di gerîya mirovî da . Hestîk.

**Gilav** (hn.dar.çewa) Ava gemar. Ava bi teqin. Teqnav. Kurebeq.

**Gilavêj** (n.x.mê) 1.Stêreka geşe li sipêdeyan der di kevit. 2. Navê kiçane.

**Gilç** (n.x.nêr) 1. Dareke ser tîjkirîye dako di erdî da biçit û bi çiklit. Sing.2.Kesek ji piyanve rawestay û pir bi minit. : Dê rûne, tu liser pêyên xwe bûye gilç.

**Gilçanê** (n.dar.mê)Yarîyek (lîstikek) zarokane gilçên xwe di ber êk da di çikilînîn , herkesê ê yê dî êxist dê ji xwe re gilçê berdijê wergire. : Zaro yêd çûyne gilçanê.

**Gilçanêkirin** (k.jn.gl.mê) Liztin bi gilçan. :Em dê gilçanê bi kin. :Werin gelî zarokan da gilçanê bi kin. (K) bn : Kirin.

**Gildik** (n.x.mê) Codelîk. Merş.Tatî.

**Gildî** (n.x.mê) Peroyên mîna balolkan hatî werpêçan. Balolik.

**Gildîkirin** (k.jn.l.mê) Werpêçan. Balolkirin. :Min nivînêt xwe gildî kirin û çûm bi xwere birin ser banî.(K) bn:Kirin.

**Gilêj** (n.x.nêr) Gilîz.

**Gilêjkirin** (k.jn.l.mê) Gilîzkirin.

**Gilêle** (n.x.nêr) Babelîsk.

**Gilêne** (n.x.mê) *candar* Bîbîka çavî.

**Gilik** (n.x.mê) *zindewerzanî* Tîtilk.

**Gilêş** (n.x.nêr) Bermayîyê xwarin û tiştên malan , sercadan yên di havêjin.

**Gilî** (n.x.mê) Gazinde. Gazin.

**Gilîdar** (n.dar.dn) Gilîkar.

**Gilîkar** (hk.dar.dz, çewa) Kesê gilîyan di ke.Gazindeker.

**Gilîkirin** (k.jn.l.mê) 1.Liser axivtin. Baskirin.2. Gazindekirin. Gelek gilîyan neke!.(K) bn : Kirin.

**Gilîz** (n.x.nêr) Aveke ji devê mirovî, nexasim zarokan di keve.

**Gilîzank** (n.dar.pirî) Qidqidank.

**Gilîankvebûn** (k.jn.gl.mê) Mirovê ji gilînkan di tirse. Qidqidankên mirovî ve di bin. :Gilîzankêd min ve di bin, destê xwe ne ke zikê min !.

**Gilîzkirin** (k.jn.l.mê) Dema gilîz ji devê mirovî, xasim zarokan di keve. (K) bn : kirin.

**Gilîzok** (hn.dar.çewa) Mirovê dev bi gilîz. Devgilîz.

**Gilken** (hk.cih.l.mê) Cihê(çala) axê jê ra di ken jibo avahîyan û karên din.Çal.

**Gilok** (n.x.mê) Têkalandina bendikan tanî şêweyekê girover jê peyda di be.Gilolk. Gilolka bendikan.

**Gilol** (n.x.mê) Xwarineka kurdî ye, ji dewî yan mastî û danî[birnc, savar] çê di kin.

**Gilolk** (n.x.mê) Gilok.

**Gilolkkirin** (k.jn.l.mê) Badana bendikan tan awayê girover werdigire.Çêkirina gilolkan. (K) bn:Kirin.

**Gilor** (hn.x.çewa) *endaze* Şêweyên girovir. Xir.

**Gilorbûn** (k.jn.l.mê) Girêlbûn.:Bagurdan di banî keft û li kolanê gilor bû.(K) bn:Bûn.

**Gilorkirin** (k.jn.l.mê) Girêlkirin. :Xwe di kenda da gilor kir. (K) bn: Kirin.

**Giloxe** (hn.x.çewa) Çûçelkên qaz û werdekan.

**Gilpe** (n.x.mê) Gurîya agir. Agir.

**Gilviçandin** (k.jn.dar.mê) Perçiqandin. Herişandin. Givaştin. (K) bdn: Ez di gilviçînim. em di gilviçînîn, tu di gilviçînî hûn di gilviçînin, ew di gilviçîne[...it] ewan di gilviçînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di Gilviçand, di gilviçandin, Db,dûr : gilviçandibû, ...bûn. bi gilviçîne, bi gilviçînin.

**Gimandin** (k.jn.x.mê) Dengek hêdî[kiz] jê anîn, jê berdan. (K) Bdn: ez di gimînim em di gimînîn, tu di gimînî hûn di gimînin, ew di gimîne[..it] ewan di gimînin, Pr: dê bi +bdn. Bdb: di gimand, di gimandin, Db,dûr:Gimandibû,... bûn. (F): bi gimîne, bi gimînin.

**Gimgimok** (n.dar.dz) *candar* Kimkime. :Gimgimokê li ser kevirî rawestaye.

**Gimîn** (k.jn.x.mê) Dengek kiz jê hatin mîna tivêna pêşî û mêşan. Di gimîne, di bi gimînin, bi gime.

**Ginawir** (n.dar.dz) Giyandar. Jîyandar.Candar. : Ewê he çi ginawire , li wê derê rawestaye ?.

**Gincir** (n.x.nêr) Kincir

**Gincirandin** (k.jn.dar.mê) Dirandin. Çirçirkirin. .(K) bdn: ez di gincirînim em di gincirînîn, tu di gincirînî hûn di gincirînin, ew di gincirîne[...it] ewan di gincirînin. Pr : dê bi+bdn. Bdb : di gincirand, di gincirandin.Db,dûr: gincirandibû, ...bûn. (F) :Bi gincirîne, bi gincirînin.

**Gindirandin** (k.jn.x.mê) Girêlkirin. Pêçan. Werbadan. Girovirkirin. (K):Bdn: ez di gindirînim em di gindirînîn, tu di gindirînî hûn di gindirînin, ew di gindirîne[...it] ewan di gindirînin.Pr: dê bi+bdn. Bdb: Di gindirand, di gindirandin. Db,dûr:Gindirandibû,... bûn. (K) :Bi gindirîne, bi gindirînin.

**Gindirîn** (k.jn.x.mê) Girêlbûn. Girovirkirin. :Berek ji kendalî gindirî û ket navagundî.

**Gindor** (hn.x.çewa.n.x) *şêwe* 1.Girovir. Xir.2. *fêqî* Gundor.

**Ginegin** (n.dar.mê) Dengê yan axivtina di difin ê ra.

**Ginginî** (hk.dar.çewa) Mirovê di difinan ra di axivit.

**Gir** 1 (n.x.nêr) 1. Agir. 2. *derd* Nesaxîyeke leşê mirovî di sojit.

**Gir** 2 (hn.x.çewa) Mirovek yan tiştekê bi kelex, mezin. Qebe. :Ev zebeşe çend yê gire!. Br×Hûr.

**Gir** 3 (n.x.nêr) Bilindayî, girik. Çiyayê biçûk. :Ez çûm serê girî. :Mala wan li serê girî ye.

**Giram** (n.navnet.mê) Yekeyeka pîvanê. Êk ji hizar a kîloyê.

**Giran** (hn.x.çewa) 1. Tiştê bihayê wî pitir pare be. Mitayê nirxa wî ji asayî pêtir bit. Br × Erzan. :Nirxeya van perokan gelek ya girane, kes nikare bi kire. 2. Tiştê bi seng .Bi bariste. Br×Sivik. 3. Mirovê xwedî rûmet. Mezin. Hêja. : *pend* Giran be da giravî bî.

**Giranbiha** (hn.l.çewa) Hêja. Rêzdar. Rûmetdar.

**Giranbûn** (k.jn.l.mê) 1. Dema nirxeya kelûpelan di çit serî. . :Şewtek li bazarî pir giran bûye. :Bihayê xwarinê rij bo rojê girantir di be. 2. Dema baristeya tenan pêtir di be. :Senga garîtey gelek ya giran bûy,jiber ko li ber baranê bû. (K) bn: Bûn.

**Girandin** (k.jn.x.mê) Dema mirov yekî bi gotinan wesa lê bike ko dest bi girîyê bi ke[bi girît]. *Pend* :Yê te bi girîne dostê teye, ne yê te bi kenîne.(K) Bdn: ez di girînim em di girînîn,tu di girînî hûn di girînin, ew di girîne [..it]ewan di girînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb :Di girand, di girandin. Db,dûr : (min êkgirandibû), ..wî ez girandibûm..,.bûn.

**Giranî** (n.dar.mê,hn.çewa) 1. Baristeya giran. Senga mezin. : Giranî ya vî kevirî çende?.Giranîya tirombêla te çende?. Br×Sivik. 2. Bilindbûna bihayê kelûpel û xwarinê. Qetlazî.: Li welatên rojava pir giranîye. Br×erzanî.

**Girankirin** (k.jn.l.mê) 1. Bilindkirina bihayê tiştî. :Te zanî ye bihayê fêqî yê hatî giran kirin?. Br×Erzankirin. 2.Bariste pitir lê kirin. : Te barê kerê xwe giran kirîye. Br×Sivikkirin.

**Girar** (n.x.mê) Xwarina wek savar , birinc,danqut, htd. : *pend* Girara ron ji kêm danîye. ***Pend*** :Xwê ya xwe di ke nav hemî giraran. ang;mirovê davdoz û matêker. ***Pend*** :Girara mêran bi bêhna fireh di kele. ***Pend*** :Girara ron ji kêm danî ye.

**Girav** (hk.cih,n.l.mê) *erd* Parçe erdekê axe, hemû rex û çanên wî ave. Girê di avê da.

**Giravî** (malbn) 1. Hozeka koçeran a kurdane.2. Kesê giravî. Kesê bi rûmet. Hêja. : *pend* Giran be da yê giravî bî.

**Gi<u>raw</u>** (n.x.mê) Gerew.

**Gir<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Hişînbûn. Geşbûn.Mezinbûn. Qebebûn. :Kerikên hinaran yêd gir bûyn. (K) bn: Bûn.

**Girda<u>ne</u>** (n.dar.mê) Corekê stovankane ji zêr yan zîvî ye. Berben.

**Gir<u>de</u>** (n.x.mê,hn.çewa) 1. *erd* Girav.2. *giyan* Kemax.3. Pareyên gir.

**Gir<u>dek</u>** (n.dar.mê) *rêzman* Pîtên mezin. Pîtên gir.

**Gir<u>dik</u>** (n.dar.mê) *giyan* Masolke.

**Gire<u>gir</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê ewran, tirombêlan,amêran û htd. Girên.

**Girev** (n.x.mê) Dema mirov dijî kiryarekê radiweste. Gireva birçîbûnê.xwe zahidkirin. Ne xwarina zadî.

**Girev<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov girevê di gire.Mangirtin. Kurdistanîyan heyama çend rojan gireva birçîbûnê girtin dijî desdirêjîyên dagîrkeran. (K) bn :Girtin.

**Girev<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Girevgirtin. (K) bn :Kirin.

**Gi<u>rê</u>** (n.x.mê) 1. *nojdarî* Cihê êvitî li ser leşî. : Girêyek ya liser milê min çêbûy. Kulik.2. Cihê hatî girêdan. Bendikê liser êk ra birî . 3. Asteng. Pirs. 4. Kurîşk : Enîya girê. Navçavên girê.: *pend* Girêya bi destan ve di be, pêdivî didanan nake.

**Girê<u>ba</u>** (n.l.mê) *derd* Nexweşîyeke, masolke û gehên mirovî jan di ke.. Ba.

**Girê<u>bend</u>** (n.l.mê) 1.Cihê girê ya bendikî lê hatî tundkirin . 2. Peyman.Raport. Rêkkeftin.

Girêbenda jinînanê. Marekirin. Markirina jin û mêran.

**Girê<u>can</u>** (n.l.mê) Bêhinkurtik. Bêhinçikbûn.

**Girê<u>çik</u>** (n.dar.mê) *candar* Gehên tibilan. Gehên tilîyan.

**Girê<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Pêkvenûsandin. Tiştê girêdayî. Pêkve tundkirin. : Doxîna xwe girê da. Dewar girêdan. (K) Bdn:Ez girêdidim em girêdidin, tu girêdidî hûn girêdidin, ew girêdide [..it] ewan girêdidin.(bi girêdan). Pr:dê bi +bdn. Bdb : girê dida,(di girê da) girê di dan(di girêdan). Db,dûr : girêdabû,..bûn. (F): bi; girêde bi girêdin(girê bide, girê biden).

**Girêdank** (n.dar.mê) Peyman. Girêbend.

**Girêdayî** (hk.dar.çewa) Hatî girêdan. Ne serbixwe. : Ew yê girêdayîye bi karên malê ve.

**Girêj** (n.x.mê) *candar* Memik. Guhan.

**Girêjkirin** (k.jn.l.mê) Dema nêzbûna zanê(serzan), guhanên kewalan gir di bin. : Bizinê girêja xwe ya kirî, dê li van rojan (bi) zêt.

**Girêk** (n.dar.mê) Girêyek biçûk. Girêya biçûk.

**Girêkor** (n.l.mê)Girêya bi darî tund kirî. Îşk.

**Girêlbûn** (k.jn.dar.mê) Dema tiştek di keve û liser alekê xwe ji girek, yan bilindîyekê di zivire û di çe binî. : Kevirek ji çiyay verest û girêl bû tanî bilê gelî. (K) bn: Bûn.

**Girêlkirin** (k.jn.l.mê) Havêtina tenekî ko liser alîyên xwe bi zivirîn di çe. :Tepik li jordanî girêl kir.

**Girêmitik** (n.dar.mê) *erd* Jordanî. Nişîvî.

**Girêpêç** (n.l.mê) Babelîsk. Gerdelûle.

**Girgire** (hn.dar.çewa) Kenkene.Gir. Mezin.:Evro girgirên gundî hemî dê li mizgeftê bi civin.

**Girgirk** (n.dar.mê) Erebanka zarokan. Pêçolk.

**Girgîn** (hn.dar.çewa) Bêhinteng. Bêhinçik. Tengav.:Ez jiber te pir girgînim, çima tu ne xuyayî ?.

**Girhar** (hk.l.çewa) Mirovê har. Mirovê tore. :Jineka girhar. :Mêrekê girhar.

**Girik** 1 (n.dar.nêr) 1.*erd* Girê piçûk. 2. Tepikêd hevîrî, yêd hatîn vestirîn û berhevkirin jibo pêjtinê. Girikêd hevîrî. :Jinik ya girikan di ket dê nanî pêjit.

**Girik** 2 (n.x.mê) Serma. Seqem.

**Girikhatin** (k.jn.l.mê) Dema mirovê ji ber sermayê di lerze. :Girikên di hêne vî zarokî ji serman da. (K) bn :Haten.

**Giring** (rd.x.çewa) Tiştê yan karê pêdvî. Fer.Bi biha. :Xwandin jibo me pir ya giringe.

**Giringî** (n.dar.mê) Pêdvî. Pêwîstî. Berkevtî.

**Giringîpêdan** (k.jn.gl.mê) Dema mirov pûteyî bi karek, yan kesekî bi de. Pûtepêdan. :Hikmeta me gelek giringîyê bi malbatên şehîdan di de. (K) bn: Dan.

**Giriyan** (k.jn.x.mê) Giryan. Girîn.

**Giriyandin** (k.jn.x.mê) bn :Girandin.

**Girî** (n.x.mê) Zêmareke bi deng yan bêdeng, ji mirovî der di kevit û hêstir(rondik) ji çavan di barin dema kovanek yan keyfek mezin rû di de. Xirîk. Şîn. :Dengê girî ya zarokekî di hêt guhên min.: *pend* Girî ya jinê çekê jinê. ***Pend*** :Girîya bûkê ne ya ji dile.

**Girîdeng** (n.l.mê) ***deng*** Lorîn. Dengê girîyê. Zêmar.

**Girîkirin** (k.jn.l.mê) Kiringirî; bn :Girîn.

**Girîn** (k.jn.x.mê) Wekî mirov dengê girîyê ji xwe di hînit. :Eve te çiye, çima tu di girî ?. Br×Kenîn. (K) bdn : ez di girîm em di girîn, tu di girî hûn di girîn, ew di girît ewan di girîn. Pr dê [bi]+ bdn. Bdb : di girîm, di girî, di girîn, girîn. Db,dûr : girîbûm,…bûyn,…bûy, …bû,… bûn. (F) : bi girî bi girîn.

**Girînok** (rd.dar.çewa) Mirovê zû zû di girî. Kizgiryok. Dilnazik.

**Girkan** (n.x.mê) Agirdiz. Volkan.



**Girkan**

**Girkirin** 1 (k.jn.l.mê) Mezinkirin.

**Girkirin** 2 (k.jn.l.mê) Agir hilkirin. BR× Hûrkirin.(K) bn; Kirin.

**Girmandin** (k.jn.x.mê) Dengê girmegirmê kirin.Di girmîne, girmînin. Bi girmînin.

**Girmegirm** (n.dar.mê) Dengê girmegirmê.:Dengê girmegirma topan.

**Girmegirmkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê girmegirmê kirin.: Ew kîye girmegirmê li ser banî di ket?.

**Girmik** (n.dar.mê) Mist. Lep.

**Girmixandin** (k.jn.dar.mê) bn :Germixandin.

**Girmixî** (hn.dar.çewa) Tiştê ji sedema gerim ê pûç bûyî. Genî. Rizî.

**Girmixîn** (k.jn.l.mê) Li ber gemê pûçbûn. Rizîn. :Ev zade yê li ber tavê girmixî!.

**Girmişk** (n.dar.pir) *derd* Germişk.

**Girmîn** (n.dar.mê) Dengê girmegirmê. : Girmîna ewran.

**Girnas** (hn.dar.çewa) Gernas.

**Girnijandin** (k.jn.dar.mê) Mirov bi gotin yan kiryarekê wesa li kesekî bi ke ko bi kene(bi girnije). (K) bdn:ez di girnijînim emgirnijînîn, tu di girnijînî hûn di girnihînin, ew di girnijîne[…it] ewan di girnijînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di girnijand, di girnijandin. Db,dû : girnijandibû,… bûn. (F) : bi girnijîne, bi girnijînin.

**Girnjîn** (k.jn.x.mê) Dema li serûçavên(sîmayê) mirovî nîşana keyf û kenê dîyar di bit. Kenîyan bê deng. (K) bdn: ez di girnijim em di girnijîn, tu girnijî hûn di girnijin, ew di girnije[..it] ewan di girnijin. PR; dê[bi]+ bdn. Bdb : di girnijîm,girnijî, girnijîn. Db,dûr : girnijîbûm,…bûyn,..bûy,..bû,… bûn. (F) : bi girnije, bi girnijin.

**Giroşk** (n.x.mê) Dervank. Tepedor.

**Girove** (n.x.mê) Belge. :Giroveya xandinê. Giroveyên kirîn û firotinê.

**Girover** (hn.x.çewa) bn :Girovir.

**Giroverbûn** (k.jn.l.mê) Bn :Girovirbûn.

**Giroverkirin** (k.jn.l.mê) bn :Girovirkirin.

**Girovir** (hn.x.çewa) *endaze* Şêweyê mîna pîta ,O, yan tepikan. Xir. Bazin. :Tepa erdî girovire.

**Girovirbûn** (k.jn.l.mê) Şêweyê tiştan, tenan di hêt gihorîn ta xir bi be. Xirbûn. :Gilomiçka befrê di destan da girovir bû. (K) bn: Bûn.

**Girovirî** (n.dar.mê) Şêweyê xir. Girovir.

**Girovirkirin** (k.jn.l.mê) Mirov yan hêzek şêweyê tenan bi gihore tanî girovir di be. :Girikên hevîrî girovir bike!. (K) bn: Kirin.

**Girs** (hn.x.çewa) Mezin.Gir.

**Girsandin** (k.jn.x.mê) Mezinkirin. :Girikên xwe bi girsîne!. (K) bdn: ez di girsînim em di girsînîn, tu di girsînî hûn di girsînin, ew di girsîne[…it] ewan di girsînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di girsand, di girsandin. Db,dûr: girsandibû, girsandibûn. (F): Bi girsîne, bi girsînin.

**Girsik** (n.x.mê) *çandin* Corekê hirmîkane, li çûl û beyaran hişîn di be.Hirmîka kûvî. Hirmîka dêm ya kûvî.

**Girsî** (n.dar.mê) Mezinî. Girî.

**Gir<u>tek</u>** (n.dar.mê) Parçe kaxezeke dema mirov tiştekî bi kirit wek girove di din mirovî ko biha, nav û corê wî liser hatîye nivîsîn, caran navnîşana mirovî jî liser tomar di kin. : Ez dê pêlava xwe vegerînim, çunkî jibo pêyên min ya tenge û min girteka wan heye.

**Gir<u>tik</u>** (n.dar.mê) *leş* Kirkirk.

**Gir<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) 1.Ketinedest. Zîndankirin. :Polîsan gunehbar girtin. 2. Daxistin.:Wî xanîyek bi kirê girt. :Rê hat girtin.:Nêçîrvanî kewek girt. :Derî bi gire.(K) Bdn: ez digirim em digirîn, tu digirî hûn digirin, ew digire[..it] ewan digirin PR: dê [bi] + bdn. Bdb: di girt di girtin. Db,dûr: Girtibû,... bûn. (F) : bi gire, bi girin.

**Gir<u>tî</u>** (n.dar.dz,hn.çewa) 1. Zindanî. Bend. : Girtîyê, (girtiya) cengê. 2.Girêdayî. : Derê xanî girtîye.

**Girtî<u>geh</u>** (hk.cih..dar.mê) Cihê girtîyan tê dixin. Zîndan. Girtîxane.

**Girtîxa<u>ne</u>** (hk.cih..l.mê) Girtîgeh.

**Gi<u>rû</u>** (hk.cih.x.çewa) Erdê ne çêkirî. Beyar.

**Gi<u>rûn</u>** (k.jn.x.mê) Kevilkirin. Kevil di ser da anîn xwar. Guran. (K) bdn:Ez di girûm em di girûn[girûyn], tu di girûy hûn di girûn, ew di girût ewan di girûn. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di gura, di guran.db,dûr : gurabû, gurabûn.(F) :Bi girû bi girûn.

**Girû<u>xane</u>** (hk.cih..dar.mê) Cihê serjêkirin û kevilkirina kewal û çevrîyan.

**Gir<u>yan</u>** (n.x.mê) Girî.

**Giryan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Girandin.

**Giş** (hn.pir) Hemû. Gişt.

**Giş<u>kî</u>** (hn.pir) Giş.Gişt. Hêmû. Tebayî. Gelemperî.

**Gişt** 1(hn.pir) 1. Teba. Gelemperî. Hemû.

**Gişt** 2 (hn.çewa) Peyt. Ciwan. Zîx. Qişt.

**Giş<u>tî</u>** (hn.çewa) Gelemperî. Tebayî. Bi hevre. : Civî me ya giştî ye. BR× taybetî.

**Givan<u>de</u>** (hk.cih..x.mê) 1. Cihê bilind. :Wî xwe ji serê givandê havêt xwarê.Kendal. Mil.2. Hêl.Xîç.

**Givan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Hêvên lê kirin. Meyandin. Mast givand. Penîrî bi givîne. Hevîrê givandî jibo sawikan. Hêvênkirin. Tirşkirin. Mehandin.(K) bdn: ez di givînim em di givînîn, tu di givînî hûn di givînin, ew di givîne[..it] ewan di givînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : Di givnd, di givandin. Db,dûr: givandibû, givandibûn. (F): bi givîne, bi givînin.

**Givaş<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Pestan êxistin ser. Perçiqandin. Pestkirin. : Wî destê hevalê xwe girt û givaşt.(K) bdn: Ez di givêşim em di givêşîn, tu di givêşî hûn di givêşin, ew di givêşe[..it] ewan di givêşin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb: Di givaşt, di givaştin. Db,dûr: givaştibû,…bûn. (F) : bi givêşe bi givêşin.

**Give<u>giv</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Givên.:Givegiva bayî di hêt.

**Gi<u>vên</u>** (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî. Dengê hurî.:Givêna bayî.

**Giv<u>giv</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Givegiv.

**Gi<u>vişk</u>** (n.dar.mê) Bizaveke mirov ji egera xewê, westanê, canê xwe ji hev di rakêşit.

**Givişk<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov givişkan di de xwe. :Tu çima givişkan di dî xwe, diyare xewa te di hêt ?.

**Gi<u>vir</u>** (n.x.nêr) *candar* Kitka kûvî. Gîvir.

**Giv<u>rik</u>** (hn.x.çewa) Mirovê hêzdar. Mirovê Peyt. Mirovê xurt.

**Gi<u>ya</u>** (n.x.nêr) Keskatîyê êksalî û biçûk, mîna firîz. Hişînkatî. : *pend* Giya liser binê xwe hişîn di be û liser binê xwe jî di behe.***Pend*** :Giya ewe yê bi devê bizinê xoş bit.

**Giya<u>benîşt</u>** (n.l.nêr) ***giya*** Giyayeke mîna benîştî bi kar di hêt. Qaçik.

**Giya<u>gewrk</u>** (n.l.nêr) ***giya*** Core giyayek rengê wî keskek ber bi gewrî ve ye, xwarina kewalane bi terî yan hişkî.

**Giya<u>gezok</u>** (n.l.nêr) ***giya*** Gezînk.

**Giya<u>gêzik</u>** (n.l.nêr) ***giya*** Giyayeke jibo gêzikan bi kar di hînin.

**Gi<u>yan</u>** (n.x.nêr) 1.Can. 2. Jiyan. Leş. ***Pend*** : Ne zanî xweşîya giyanî.

**Giyan<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Xwe gorîkirin. Mirin. (K) bn: Dan.

**Giyan<u>dar</u>** (n.dar.dz) Candar. Jiyandar.Mirov giyandare, hesp, kitik, kew,masî û htd, giyandarin.

**Giyan<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Qelewbûn. :Wî piçek giyan girtîye.

**Giya<u>nî</u>** (n.dar.mê) Tiştê girêdayê bi giyan ve. Canî.

**Giyan<u>leber</u>** (n.dar.dz) Giyandar.

**Giya<u>xor</u>** (hk.l.çewa) Giyandar yan mirovên tinê xwarina giyayî di xon. BR× Goştxor.

**Giya<u>xwer</u>** (hk.l.çewa) Giyaxor.

**Giz** (n.x.mê) Hizir. Viyan. Hez. Balkişandin.

**Giz<u>dar</u>** (hn.dar.çewa) Balkêş.

**Gi<u>zêr</u>** (n.x.mê) *giya* Gêzer.

**Giz<u>giz</u>** (n.dar.mê) Lerzîn. Lerzik.

**Gizgizan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Lerzandin. Hejandin. Vehejandin. Livandin. Zirziqandin. (K) bdn: ez di gizgizînim em di gizgizînîn, tu di gizgizînî hûn di gizgizînin, ew di gizgizîne[..it] ewan di gizgizînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di gizgizand, di gizgizandin. Db,dûr: gizgizandibû, gizgizandibûn. (F): bi gizgizîne, bi gizgizînin.

**Gizgi<u>zîn</u>** (k.jn.x.mê) Lerzîn. Livîn. Gijyan. (K) bdn: ez di gizgizim em di gizgizîn, tu di gizgizî hûn di gizgizin, ew di gizgize[...it] ewan di gizgizin. Pr: dê bi +ben. Bdb: ez di gizgizîm, em di gizgizîn, tu di gizgizî, hûn di gizgzîn, ew di gizgizî, ewan di gizgizîn. Db,dûr: ez gizgizîbûm, em gizgizîbûyn(bûn), tu gizgizîbûy, hûn gizgizîbûn, ew gizgizîbû,(gizgizî,..bi bû,bûn,bûm,bûy, bûyn)

**Gizgiz<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dengê gize gizê jê derkevtin. Lerzîn.

**Gi<u>zing</u>** (n.x.mê) Elind.

**Gi<u>zîr</u>** (kar,n.dz) Mezinê gund û êl . Serwer. Semyan. Kwîxe.***Pend*** :Gund bê gizîr na be.ang; tu cih di bê xwedî nînin.

**Gizva<u>nok</u>** (n.dar.mê) Kezî.Gulwaz.

**Gî** (n.x.nêr) 1. Gişt. Hemû.2.Bermayî yê xwarinê yê ko ji paşîya giyandaran der di kevit. Zibil.pîsatî.Rîx. Desnivêj. Gû.

**Gîha<u>nek</u>** (n.dar.mê) *rêzman* Pêrbest.

**Gî<u>fank</u>** (hk.cih..x.nê) Cihê ziblî lê xir ve di ken. Gîfik. Sergîfk. Zibildan.

**Gî<u>fik</u>** (n.x.mê) 1.Serkên pateyî bi rîşîk, nexşandî di êxin kulav, dersok û perokan jibo ciwanî yê. ***Pend*** :Te gîfik birnê! Ang; dema mirov karekî, çi jê çê neke. 2. Gîfank. Sergîfk.

**Gîl** (n.x.mê) Herî. Teqin. Kur(khur).

**Gînî** (n.x.nê) Cewal.Cihal. Ferde.Gûnî.

**Gîr** (hn.x.çewa) Tund. Asê. Girtî. Rawestayî.

**Gîrav** (hk.cih..l.mê) Ava têkel di gel madek din wek av û xuwê.

**Gîrbûn** (k.jn.l.mê) Qebizbûn.Rawestan. Asêbûn. (K) bn:Bûn.

**Gîrhe** (n.x.mê) Madeyekê sipî yê tarîye[şîrî], li binê çaydank, cerik, qazan û htd, ve çê di bit ji wan madeyên digel avê û bayî.

**Gîro** (hn.x.çewa) Vemayî. Ne gehiştin. Paşve, paşda man.

**Gîrobûn** (k.jn.l.mê) Dema tiştek , mirovek zû ne gehit jivan yan ser karê xwe.(k) bn: Bûn.

**Gîrokirin** (k.jn.l.mê) Paşda hêlan. :Te ez gîro kirin, êdî na gehim ser karî. ***Pend*** :Zivistanan xwe gîro neke, biharan xwe ter neke.(K) bn: Kirin.

**Gîsin** (n.x.nêr) Gêsin.

**Gîsinkirin** (k.jn.l.mê) Gêsinkirin.

**Gîsk** (n.x.dz) *candar* Karê êk salî piştî ji şîrxwarinê ve di bit. :Gîskê melayî.

**Gîştin** (k.jn.x.mê) bn Gehiştin.

**Gîtar** (n,biyan.mê) ***mûzîk*** Amêrekê jenînê yê mûzîkê ye.

**Gîx** (n.x.mê) Xîçeka kêşayî ya bazinî. Xîç.

**Gîya** (n.x.nêr) Giya.

**Gîyandar** (ndar.dz) Giyandar.

**Gîz** (n.x.mê) 1. Darek mezin û xemildare. 2. Berê bi dargîzê ve di hêt, xire, reqe û kakilka wê wek xwarin bi kar di hînin.***Pend*** :Gîzên xwe li ser dilê xelkî di şikêne.ang; mirovê hemû gazin û arêşeyên xwe bibe cem êkê tilove ji arêşeyan. ***Pend*** :Gîz liser difinê şikand(şikênand). ***Pend*** :Gîza mizgeftê ye.ang ; kesê yan tiştê nazdar û bijîn.

**Gîzan** (n.x.mê) 1. Mûsa rih tiraşînê.2.Kêrik. Sator.

**Gîzankirin** (k.jn.l.mê) Tiraşîn. Rihêd xwe gîzan kirin. :Serê wî gîzan kir. (K) bn : Kirin.

**Gîzankirî** (hk.l.çewa) Ser yan rihêd hatîn tiraşîn.Rût. Rûtkirî.

**Gîzik** (n.x.nêr) ***candar*** Kulî.

**Go** (n.x.mê) 1.Milhêb. Çarguh. Duguh. 2. Tepe.Gog.Gok.

**Goçan** (n.x.nêr) Gopal.

**Gog** (n.x.mê) Go. Gok.Tepik.

**Gogirandin** (k.jn.dar.mê) Tiştê ko mirov bixwaze guhorîna têda bi kit , hindek jê kêm kit çi bi birîn , tiraşîn yan kurtkirin. Beran jibo avakirinê di gogirînin. . (K) bdn: ez di gogirînim em di gogirînîn, tu di gogirînî hûn digogirînin, ew digogirîne[..it] ewan di gogirînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di gogirand, di gogirandin. Db,dûr : gogiradibû, gogiradibûn. (F): bi gogirîne bi gogirînin.

**Gok** (n.x.mê) Tepe. Tepik. Goka pêy. Goka destî.

**Gokanê** (n.dar.mê) Kirina yarîya tepanê. Lîstin bi gokê.

**Gol** (n.x.mê) 1.Di lîstina tepa pêyda, ciheke di navbera du daran da û tor kirîye, tepê di havînê. 2. Cihê pengandin û xirvekirina avê.Gom. Derya.

**Golanê** (n.dar.mê) Yarîya (lîstika) Tepa pêy. Fotbol.

**Golçî** (karn.dar.dz) Kesê li ber golê ye jibo ne hêle tepe bi keve gola wan.

**Golik** (n.x.dz,, hn.çewa)1. Têjikê çêlê. Conega.2. Mirovê nezan û xişîm. : ***pend*** Golik bi çikeçikê na bite ga. ***Pend*** :Golikê biyanî werîsê xwe di piçîne.Pend :Bi golkanî tirsandî ye.

**Golikvan** (pîşn.dar.dz.) Kesê di çe ber golikan û çavdêrîya wan di ke.

**Golikvanî** (karn.dar.dn) Karê liber glikan. Sexbêrîya golikan.

**Golkirin** (k.jn.l.mê) Tomarkirina xalan di lîstika tepa pêy da. :Yaneya Duhok du gol kirin hembera xwer. (K) bn: Kirin.

**Gom** (n.x.mê) Gola avê.

**Goman** (hn.x.çewa) Ne piştrastî. Dudilî. : Bi hatina wî ez bi gomanim.

**Gomanbar** (hn.l.çewa) Mirovê cihê gomanê. Mirovê ne cihê bawerîyê.

**Gomankirin** (k.jn.l.mê) Mirovî goman ji karek yan kesekî he be û bawerî pê ne be. Mirov ji kiryarekê pişrast ne be.(K) bn : Kirin.

**Gone** (n.x.mê) Gep. Rû.

**Gopal** (n.x.nêr) Dareke serê wî çemandî ye di destê xwe di girin û serê dî rast û dirêje, jibo hajotina kewal, rêveçûn û karên din mifa jê di hêt wergirtin. Gopalê şivanî.

**Gopik** (n.x.mê) Ser yan dawîya her tiştî. :Gopika darê .:Gopika çîyay. Kopik.

**Gor** 1(hk.cih.x.nêr) Cihê mirîyan têda di veşêrin. Ziyaret. Tirbe.

**Gor** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanê ye.Li gor. Li pey. Li dû. : Li gor şiyanên xwe em dê xebatê bi kin. :Li gor zanîna min, ew kurê seydayê gundî ye.

**Goran** 1 (hk.cih.devern,cugir) 1. Deverek Kurdistanê ye. 2. Xelkê goran.3. Navê mêran.

**Goran** 2 (n.x.mê) Cihê pir dehil û giya.Mêrg. Çîmen.

**Gorangeh** (hk.cih..dar.mê) Mêrga cihê seyran û bêhinvedanan.

**Goranî** 1(n.x.mê) Devokeke ji zimanê kurdî..

**Goranî** 2.(n.x) Stiran. Lavje.

**Gore** (n.x.mê) Cilikek taybete ji pembû,naylon yan hirî, çêkirîye mirov di kin pêyên xwe.

**Gorevan** 1 (pîşn.dar.dz) Jin yan mêrê goreyan di çinit.

**Gorevan** 2 (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî kolan û çêkirina gorane jibo veşarina mirîyan. Gorvan.

**Goristan** (hk.cih..x.mê) Cihê ji gelek gorên mirîyan pêkhatî. Cihê goran, tirban. Welatê mirîyan. Goristana şehîdan.

**Gorî** (hn.x.çewa) Qurban. Heyran. : ***pend*** Jûjîko day gorîko bê stirîko.ang; dema malê mirovî li ber çavên mirovî pir şirîn be.

**Gorîbûn** (k.jn.l.mê).Ji pêxemet dozekê mirov di be qurban. : Ez gorî welatê xwe bim. (K) bn: Bûn.

**Gorîçe** (n.x.mê) Kêlîya gorî. Kêlîya tirbeyan.

**Gorîkirin** (k.jn.l.mê) ) Xwe gorî, qurbanî rêyekê kirin. : Wî xwe kir gorî welatî jibo azadî yê. (K) bn: Kirin.

**Gorîn** (k.jn.x.mê) Gihorîn.

**Gosale** (n.dar.dz) Golika/ golikê yek salî. Canega.

**Goşe** (yek.endaze) Kujî. Quncal. Quncik.

**Goşegîr** (hk.dar.çewa) Kesê hez ji jiyana bi tenê di ke. kesê têkelî bi mirovan tune be, yan kêm be. Êkane.

**Goşegîrî** (n.dar.mê) Cudayî. Tekane.

**Goşepîv** (n.dar.mê) ***endaze*** Amêreke jibo pîvan û çêkirina goşeyan lis er kaxez û erdî.

**Goşt** (n.x.mê) Nermeya leşê giyandaran . Goştê bizin, pez , mirîşk, htd. Goştê birajtî[liser agir], qelandî[di rûnî da], kelandî[di avê da]: ***pend*** Goştê mêran ne bi kêşan û pîvane; ango nirxandina mirovan ne bi kelwaşê wane.***Pend*** :Goştê leşê xwe di xwe.ang; karê mirov pir ne ji dil û xurtî bi ke. ***Pend*** :Xudê goştî di de bêdidanan.ang; mirovê nezan, tiştê çak di kevit destî,lê bihayê wî nizanit.

**Goştfiroş** (pîşn.l.dz) Kesê goştî di firoşe.

**Goştfiroşî** (hk.cih) Cihê firotina goşî. Qesabxane.

**Goştgirtin** (k.jn.l.mê) Qelewbûn.

**Goştnexur** (hk.l.çewa) Mirov yan candarên goştî na xun,ango tenê xwarinên giyayî di xun.

**Goştxor** (hk.l.çewa) Mirov yan candarên xwarina wan goşte.

**Goştxwer** (hk.l.çewa) Goştxor.

**Gotar** (n.x.mê) Peyv, gotina hatî pêşkêş kirin. :Te guhdarî li gotara serokî kir?.

**Gotardan** (k.jn.l.mê) Dema kesek gotarekê belav di ke, di xwîne, di de. (K) bn:Dan.

**Gotarvan** (pîşn.dar.dz) Kesê gotarê berhev uan pêşkêş di ke.

**gotegot** (n.dar.mêr) Gotin û bûyerên liser devê xelikî di hên gotin. Gotgotik.

**Gotin** (k.jn.x.mê) 1. Peyvîn. Axivtin. 2. Peyv. Wuşe. Axivtin. : ***pend*** Hizar gotin gorî kiryarekê bi bin. (K): Bdn: ez di bêjim em di bêjîn, tu di bêjî hûn di bêjin, ew di bêje[…it] ewan di bêjin. Bdb: di got, di gotin. Pr: dê bi+ bdn. Db,dûr : gotibû,... bûn.(F): bi bêje, bi bêjin.

**Gotûgo** (n.l.mê) Gengeşe. Miştûmir. Danûsitandin.

**Gov** 1 (hk.cih.x.mê) Cihê , avayî yê kewalan. :Gova pezî. Gova bizinî.

**Gov** 2 (hk.cih.x.mê) Deryak. Gol. Gera avê.

**Govan** (hn.dar.dz) Kesê bûyer bi çavên xwe dîtî. Dîdvan.

**Govanî** (karn.dar.mê) Bi çav dîtin. Dîdvanî.

**Govanname** (n.l.mê) Girove û nivîsîna liser bûyeran.

**Govend** (n.x.mê) 1.Şahî . dîlan . Dewat. 2.Navê keçane. : *pend* Şer govenda mêrane.

**Govenddanan** (k.jn.l.mê) Weke desteyeka mirovan mêr û jin destê hev di girin û govendê di kin. (K) bn : Danan.

**Govenddanîn** (k.jn.l.mê) Govenddanan. (K) bn; Danîn.

**Govendgêr** (hk.dar.çewa) Kesên govendê di ken.

**Govendgêran** (k.jn.l.mê) Govendgirtin. (K) bn: Gêran.

**Govendgirtin** (k.jn.l.mê) Govenddanan. : Xortino, keçino werin govendê bi girin!. (K) bn: Girtin.

**Goyîj** (n.x.mê) *darûbar* Gihîşk.

**Goyîn** 1 (hn.x.çewa) 1. Mirovê bi kenî.Pêkenok. Lêbûk. Oyîn.2. Dema borî, dema çûyî.

**Goyîn** 2 (n.x.mê) Kotira daristanan. Gapil.

**Goyîn** 3 (n.x.mê) Zêrevanî. Çavdêrî.

**Goyînvan** (kar,n.n.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr.

**Goz** (n.x.nêr) Amaneke ji axek nemaze di hêt çêkirin jibo av têkirinê . Cerikê biçûk. : *pend* Gozik bi rêya avê ve dişikê, ango ;dema mêrxasek tê kuştin. *pend* Gozikê nî ye, ava tezî ye, ang ; tiştê nû yê şirîne.

**Gozek** (n.x.mê) *leş* Cotekê hestîyên reqin, di kevin herdu alên her yek ji pêyên mirovî.

**Gozik** (n.x.nêr) Gozê biçûk.

**Guçik** 1 (n.x.nêr) *leş* 1.Guh.

**Guçik** 2 (n.x.mê) *endaze* Kujî. Swî.

**Guh** (n.x.nêr) *leş* Hedamê bihîstinê, guhlêbûnê (guhdarîkirinê) ye. Guçik. : *pend* Guhê xwe bi de min belê, çavê xwe ne ke min. *pend* Guh nede mirovê nezan da ne bî peşêman. Pend :Di guhekî ra di çe, di yê din ra derdikeve.ang ; kesê mejîhişk.

**Guhan** (n.x.mê) *leş* Endamê şîrî ê giyandarane. Guhandîn. Çiçik.: Guhanên çêlekê. Guhanên bizinê.

**Guhar** guhark (n.x.nêr) Xelek û pirtên zêr yan zîv yan kanzayên din, jin di kin guhên xwe.Pend :Bi ke guhark û bi ke guhê xwe.ang; şîreta ko na be bi hêt ji bîr kirin.

**Guharîn** (k.jn.x.mê) Guhorîn. Guhartin.

**Guhartin** (k.jn.x.mê) 1. Tişt pêk guhorîn .Xanîyên xwe guhartin. 2. Tiştekî ji cihek bo yê din bê veguhaztin.(K) Bdn: ez di guhorim em di guhorîn , tu di guhorî hûn di guhorin, ew di guhore[..it], ewan di guhorin. Pr: dê bi + Bdn. Bdb : di guhart, di guhartin. Db,dûr: guhartibû,...bûn. (F): bi guhore bi guhorin.

**Guhastin** (k.jn.x.mê) Guhaztin.

**Guhaztin** (k.jn.x.mê) Tiştek ji cîyekî bo êkê dî bi hêt birin.. Veguhastin. (K) Bdn :ez di guhêzim em di guhêzîn, tu di guhêzî hûn di guhêzin, ew di guhêze[…it] ewan di guhêzin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di guhast,(guhazt) di guhastin(guhaztin). Db,dûr : guhaztibû, .... bûn.(F) :bi guhêze, bi guhêzin. :Boka xwe guhztin (veguhastin).

**Guhbel** (rd.l.çewa) Mirovê guhên wî bel bin.

**Guhdan** (k.jn.l.mê) 1.Bihîstin. Guhlêbûn. 2. Bi dilî kirin. Pêgirîkirin.3.Balkişandin. : *pend* Guh nede yê nezan, da nebî peşêman.(K) bn :Dan.

**Guhdar** (hk.dar.çewa) 1. Mirovê tiştî wer di gire. Pêgir. 2. Navê mêrane. Ew gelek guhdare.

**Guhdarî** (n.dar.mê) 1. Pêgirî. 2. Guhdan. Bîstin.

**Guhdarîkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov guhê xwe bi de deng, mûzîk, stran û htd. :Te îro guhdarîya nûçeyan kir?. (K) bn: Kirin.

**Guhderz** (hn.dar.çewa) 1.Bîrtîj. 2.Guhdar. Sernerim.

**Guhdêr** (hn.dar.çewa) Guhdar. Sernerim.

**Guherîn** (k.jn.x.mê) guhorîn.

**Guhêrandin** (k.jn.x.mê) Guhorîn.

**Guhêrbar** (hn.dar.çewa) Mirov, candar yan tiştê bi kêrî guhorînê were. Bi sanayî di hêt guhorîn.

**Guhêrek** (hn.dar.çewa) Guhêrbar.

**Guhêrgeh** (hk.cih..dar.mê) Cihê guhorîna pareyî.

**Guhêrîn** (k.jn.x.mê) Guhorîn.

**Guhêrk** (n.x.mê) Guhorîn. *rêzman* Paşgir. Pare, cil, fêqî-guhêrk.

**Guhgiran** (hn.l.çewa) Mirovê na bihîze yan baş na bihîze. Kher.

**Guhiş** (n.x.mê) Panîya bêlavê. Çimik.

**Guhişandin** (k.jn.dar.mê) Hicmetîkirin. : Ew te çi got, te hosa xelik hemû te guhişandin.(K) bdn : ez di guhişînim em di guhişînî, tu di guhişînî hûn di guhişînin, ew di guhişîne[…it] ewan di guhişînin.Pr : dê bi +bdn . Bdb : di guhişand, di guhişandin. Db,dûr : guhişandibû, guhişandibûn.(F) bi guhişîne, bi guhişînin.

**Guhişîn** (k.jn.dar.mê) Ji egara tirs yan mizgîneka ne xweş, mirov bêdeng di bit. Mitbûn. Daman. Sarbûn. Hicmetîbûn. (K) bdn : ez di guhişim em di guhişîn, tu di guhişî hûn di guhişin, ew di guhişe[…it] ewan di guhişin. Pr : dê bi +bdn. Bdb : ez di guhişîm em hûn, ewan di guhişîn, tu,ew di guhişî. Db,dûr : ez guhişûbûm(bibûm) em guhişîbûyn, tu guhişbûy, ew guhişîbû, ewan guhişîbûn. (F) :Bi guhişe, bi guhişin.

**Guhîj** (n.x.mê) *dar- fêqî* Guhîşk. Gihîşk.

**Guhîşk** (n.x.mê) Guhîj.

**Guhlêbûn** (k.jn.l.mê) Bihîstin. :Çîroka te noke gotî min tu caran guh lê ne bûye !. (K) bn : Bûn.

**Guhlêkirin** (k.jn.l.mê) Guhdarîkirin. (K) bn : Kirin.

**Guhmasî** (n.l.dz) Şeytanok.



**Guhmasî**

**Guhnelî** (n.dar.mê) Karê perîn û cotbûna candaran.

**Guhnêrî** (n.dar.mê) Perîna giyandaran. Guhnelî.

**Guhşor** (hn.l.çewa) Mirove herdem serê xwe di tewîne(çemîne) naxwazit guh bi de tu kesan.

**Guhveçinîn** (k.jn.l.mê) Mirov û giyandar li dema pêjinek yan dengek di hêt,guhên xwe bel di ken jibo baş bi bihîzin. (K) bn: Veçinîn.

**Gujim** (n.x.mê) Bireka pareyî dema komkirin, parvekirin,jêbirin û lêkdan ko jiber di mînit. Yekeyeke jibo bireka peran tê gotin. : Perê ko hatî mezaxtin jibo kirîna xwarin, cil û hatin û çûnê di be €100,00.: Pirojeyek bi gujmê bîshizar dînaran hat dest pêkirin.

**Gujîn** (k.jn.x.mê) Hêriş. Hêrişkirin. Bi guje, bi gujin. Di gujim, di gujin, di gujîn , dê bi  gujim, di gujî, di gujîn, gujîbû,.

**Gul** (n.x.mê) 1.Kulîkên rengîn û ciwan bi dar û giyayan ve dihên, li hindek daran ber[fêqî] jê çê di be. Gula, zer,sor, sipî û htd.2. Navê keçane.: ***pend*** Gul ji stirîyan di bin û stirî jî ji gulan.***Pend*** : Heger gul nebî,sirî jî ne be.ang; heger her nikarî karên çak bi kî, yên xirab neke!.

**Gulac** (n.dar.mê) Pişkovk.

**Gulan** (hk.dem) Meha dawîyê ji biharê. Meha pêncê.: ***pend*** Meha gulanê, xudêyo ne de tava baranê, pezkûvî yê liber zanê.

**Gulav** (n.l.mê) Ava bêhinxweş a ji gulan di hêt wergirtin, mirov li xwe di kin.

**Gulavdan** (n.l.mê) Aman yan şûşeyêd gulavê tê dixin.

**Gulbejin** (hn.l.çewa) Jin yan mêrê bejinzirav û ciwan.

**Gulberoj** (n.l.mê) Gulek mezine reng zere, qeda wê dirêj raste, belgên kesik û pan di det, rûnî jê dirist di ken û tovikên wê bi qelandî di xun.

**Gulbihar** (n.l.mê)1.Gulên biharê. 2.Navê jinane.

**Gulçan** (n.dar.nêr) Asinek req û tunde, serê wî xware jibo rakirin û ji hev cudakirina asin, dîwar, dar û htd bi kar di hêt.

**Gulçin** (karn.l.dz) 1. Mirovên gulan di çinin.2. Navê keçane.

**Gulçiçek** (n.dar.mê) Gulçîçek.

**Gulçîçek** (n.dar.mê) Corekê gulane pir reng û di bêhinxweşin.

**Gulçîn** (karn.l.dz) Gulçin.

**Guldan** (n.dar.mê) Amanêd gulan di êxinê. Qafikê gulan . Gulwaz.

**Gule** (n.x.nêr) Berikêd tiveng û topan. : Dujminî gule berdan ser gundê me.

**Gulekalane** (n.l.mê) Gezînk.

**Gulendam** (hn.l.çewa) Bejinzirav.

**Gulexizêm** (n.l.mê) Corek gulane mîna helalan, gelek reng û corin.

**Gulgenim** (n.l.mê) Gulîya serê genimî ya pire ji dasî û dindikên genimî.Gulîya genimî. Gulî.



**Gulgenim**

**Gulgul** (hn.l.çewa) Kiras yan her tiştê bi reng û mînakên gulan xemlandî, gulgule

**Gulgulî** (hn.l.çewa) Gulgul. .: ***pend*** Gulgulî yê ji mafîrê kême.

**Gulik** (n.dar.mê) Pişkovk.

**Gulistan** (n.dar.mê) Cihê gulan çandinê. Welatê gulan.Baxê gulan.

**Gulî** (n.x.mê, malbn)1. Gula(serkê) genimî. Gulgenim.2. Hozeka (tîre) kurdane li Kurdistana îraqê. 3. Davên pora(pirça) keçikan.

**Gulîfk** (n.dar.mê) Bisk.

**Gulînk** (n.x.mê) ***endamê leş*** Endam ê guhnelî,yê mê, yê mirov(jin) û candara. Koş.

**Gulîstan** (n.dar.mê) Gulistan.

**Gulîzar** (hn,nl.mê) 1.Baxê gulan.. 3.Navê jinane.

**Gulîzer** (hn.l.çewa) 1. Jin (keç) a gulîkên pora wê reng zerin.2. Navê pîrekane.

**Gulkelem** (n.l.mê) Qernabît.

**Gulle** (n.x.mê) Gule.

**Gulor** (hn.x.çewa) Girover.

**Gulpik** (n.dar.mê) 1. Gopik.2 .Pişkovk.3. Lep. Mist.

**Gulşen** (n.dar.mê) Baxê gulan. Gulistan.

**Gulte** (n.x.mê) 1.Stûn. 2. Dareke dirêje digehe bi kefşê mirovî, serê wî bi dareke dî yê kurt mîna pîta **T,** mirovên lenger dixin bin hingilên xwe jibo bi rêve b  i çin.



**Gulte**

**Gultekirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov stûnekê dixit bin kepir, ban,stêrik û htd dako xwe liber giranîyê bi gire. (K) bn: Kirin.

**Gulwaz** (n.dar.mê) 1. Qeft. Destik. 2.Guldan.

**Gulzar** (n.dar.mê) 1. Baxê gulan.2. Navê jinane.

**Gumegum** (n.dar.mê) ***deng*** Gumgum.

**Gumgum** (n.dar.mê) Dengê top û tivengan.

**Gumgumkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê gumgumê jê peyda di be.(K) bn: Kirin.

**Gumgumok** (n.dar.dz) Kimkime. Xemegur.

**Gumîn** (k.jn.x.mê) Teqîn. Peqîn. Gumên.

**Gumtil** (n.x.nêr) Dirgêd axê. Komeka ax, şekir û htd, pêkve nûsayî. *Pend* :Zarokê wan mîna gumtilkê şekirê ye.ang; zarokekê hinde şirîn û ciwane.

**Gun** (n.x.nêr) *endamê leş* Hendamek cot,guhnelî yê nêrînê giyandarane.

**Guncan** (k.jn.x.mê) Hînbûn. Rahatin. Wekhev.(K) bnn: ez di guncim em di guncîn, tu di gincî hûn di guncin, ew di gunce[…it] ewan di guncin. Pr: Dê[bi] guncim, guncin, guncî, hûn guncin, gunce[…it], guncin. Ddb: di gncam. Di guncay, di guncan.di guncayn. Db,dûr: guncabûm, guncabû, guncabûy, guncabûyn, guncabûn. (F): bi gunce, bi guncin.

**Guncandin** (k.jn.dar.mê) Xwe li gor kawdanan gihorîn. Guncan. (K) bdn: ez di guncînim em di guncînîn, tu di guncînî hûn di guncînin, ew di guncîne[…it] ewan di guncînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb : di guncand, di guncandin.Db,dûr: guncandibû, guncandibûn. (K) : bi guncîne, bi guncînin.

**Gund** (hk.cih..x.nêr) Hijmareka malan bi hevre. Biçûktir ji bajaran. Pend :Gundeke, gundoreke. Ang; dema xwarina (kelûpel) di kêm mirov gelek bin û çi bi kesê ra negehit.

**Gundikî** (hn.dar.çewa) Xelik ê gundan.

**Gundirandin** (k.jn.dar.mê) Tiştê girover girêlkirin. (K) bi gundirîne, bi gundirînin, dê gundirînim,… û htd.

**Gundî** (hn..dar.çewa) 1. Xelik ê gundan. 2. Navê mêran. 2. Kêmzan. Sade. : *pend* : Gundî nabin cindî.

**Guncîn** (k.jn.x.mê) Guncan.

**Gundor** (n.x.nêr) Fêqîyekê xweş û şirîne, xire mezine,gelek cor reng hene.

**Guneh** (n.x.mê) Karên ne baş ne çak. Ne rewa. Tawan. :Guneha wî çîye, hewe wesa bi serî îna ?.

**Gunehbar** (hk.dar.çewa) Kesê şaşîyan dijî dînî di ke, yan pêgirîyê bi qanûnê neke. Karê wî guneh. Tawanbar.

**Gunehkar** (hk.dar.çewa) Gunehbar.

**Gunehkarî** (n.l.mê) Guneh.

**Gunehkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov gunehekê di ke. (K) bn: Kirin.

**Gunek** 1 (n.x.mê) Guneh.

**Gunek** 2 (hn.dar.çewa) *nexweşî* Ritlo.

**Gungulî** (hn.dar.çewa) Pir. Tijî. Dagirtî.

**Gupik** (n.x.mê) Gopik.

**Gur** (n.x.dz) Giyandarek kûvî ye,dirindeye, dujminê kewalane.Pend :Bûn gurê çiyan. Ang; bê xwedî bûn. Bê war bûn. :*Pend* :Gurê dev bi xwîn. Ang; mirovê tore.çavsor.

**Guran** (k.jn.x.mê) Dema pîstê(çerimê)kelexên kewalê serjêkirî bi serda di hînin. Bizin guran.(K): ez di gurêm em di gurêyn , tu di gurêy hûn di gurên, ew di gurêt ewan di gurên. Pr: dê[bi] gurêm, gurêyn,gurêy, gurên,gurêt[..re], gurên. Ddb :di gura, di guran. Db,dûr: Gurabû, gurabûn. (F): bi gure[ê], bi gurên.

**Gurandin** (k.jn.dar.mê) Gihorandin.

**Gurc** (hn.x.çewa) Peyt. Tund. BR× Şor. :Lêvên gurc. Kirasê dehmen gurc.

**Gurcbûn** (k.jn.l.mê) Peytbûn.

**Gurckirin** (k.jn.l.mê) Peytkirin. Tundkirin. :Delingêd xwe gurc bi ke da bi karî la çemî derbaz bi bî!.

**Guregur** (n.dar.mê) Dengê giregirê.

**Gurg** (nx.dz) Gur.*Pend* :Hegê dewleta xwe. Ang; kesê bi kêr xwe nehatî.

**Gurge** (n.dar.mê) *giya* Corek giyayê ziyandare, di nav werzan da hişîn di be û ziyanê di gehîne çandinê li bax û bîsatanan.

**Gurgeh** (n.dar.mê) Gurge.

**Gurgîn** (hn.l.çewa) 1. Mirovê dijwar wekî gurgan. 2. Navê mêrane.

**Gurgur** (n.dar.mê) Giregir. Girgir.

**Gurî** 1 (hn.x.çewa) Mirovê bi nexweşîya pîstî di kevit û canê wî kul di bit.

**Gurî** 2 (n.x.mê) Soratîya rengê agirî.Gurîya agirî. Pêt

**Gurmên** (n.dar.mê) Dengê Top, tiveng, evran û htd.

**Gurmîn** (k.jn.x.mê) Gurmîna dengê ewran. Gurmên.

**Gurtil** (n.x.nêr) Gumtil.

**Gurz** (n.x.nêr) 1. Darekê stûr desthile, mirov jibo bervanîkirin û pevçûnan bi kar di hînin. 2. Destik, qef. Gurzekê giyayî.



**Gurz**

**Gurzdaweşandin** (k.jn.l.mê) Bi kar anîna gurzî. Lêdana li dijminî. Pêşmergehî gurzekê mezin daweşand dijminî.

**Gustîl** (n.x.mê) Xelekek zêr, zîv, aasin û htd, sade yan bi morî,mirov di xin tilîyêd xwe.



**Gustîl**

**Gustîlk** (n.x.mê) Gustîl.

**Gustîrk** (n.x.mê) Gustîl.

**Guşîn** (k.jn.x.mê) Givaştin.

**Guvandin** (k.jn.x.mê) Maçîkirin. Maçkirin.

**Guvaştin** (k.jn.x.mê) Givaştin.

**Guvişk** (n.x.mê) Givişk.

**Gû** (n.x.nêr) Bermayîyê xwarinê ko ji paşîya candaran di derkeve. Rîx.

**Gûç** (n.x.mê) Kujî.

**Gûfik** (n.x.mê) Gîfik.

**Gûhesin** (n.dar.dz) Şeytanok. Guhmasî.

**Gûhûr** (n.x.nêr) Gilêş.

**Gûjme** (n.x.mê) *erd* Nihal. Dol. Newal. Herivte.

**Gûkirin** (k.jn.l.mê) Rîtin. (K) bn: Kirin.

**Gûrî** (hn.x.çewa) Qurban.

**Gûrî<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Xwe kirin qurban ji pêxemet karekî. Bû qurban. : Ez gûrî welatê xwe bi bim (K) bn: Bûn.

**Gûrî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Qurbankirin. Xwe kirin qurban..: Wî jibo çi xwe kir gûrî?. (K) bn: Kirin

**Gûs<u>têrik</u>** (n.dar.mê) ***candar*** Stêrstêrok. Stêrok.

**Gû<u>şî</u>** (n.x.nêr) Îşî yê tirî.

**Gûv** (n.x.mê) Gov. Axur.

**Gûz** (n.x.mê) ***dara berdar*** Gîz.



**Gûz**

**Gû<u>zan</u>** (n.x.mê) Kêrika devxweş. Devik.

**Gû<u>zek</u>** (n.x.mê) ***endamek leşî*** Cot hestîyên liser rexa herdu pêyêd mirovî.

**Gû<u>zik</u>** (n.x.nêr) ***adî*** Kulî.

**Gûzî<u>dan</u>** (k.jn.x.mê) Pêkhatin. Lihevhatin.

**Gû<u>nî</u>** (n.x.nêr) Ferde. Cewal. Cihal.

**Gwînî** (n.x.nêr) Gûnî.

**Gwî<u>risk</u>** (n.x.mê) ***giya*** Giyayek biharîye, li çiyan hişîn di be, di hêt xwarin bi kelandin yan zerkirin.

**Gwî<u>riz</u>** (n.x.mê) Gwîriz.

**Gwîz** (n.x.mê) bn :Gûz.

# H

**H** (he) Pîta dehê ji abeya kurdî.

**Ha** 1 (pêrb) ***rêzman*** Alavê hicmetîbûnê. :Ha; eve kengî wesa çêbû!.

**Ha** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo dan û wergirtinê bi kar di hêt.: Ha ji te ra!. Ha bi gire! Ha were.

**Hacan** (hozn) 1 Hozeka kuçerên kurdane.

**Hacanî** (malbn) Kesê ser bi hozHacan ve.

**Hacîreşk** (n.dar.dz) Çûçikeka biçûke reş û sipîye, koçere, li biharan di hên Kurdistanê jibo danana hêk û têjikan.

**Haf** (n.x.mê) Cih. Meydan. Himber.

**Hajîn** (nl.mê) Nîşan dana jînê. Ev jîyane . Jîyan bi vî rengî ye. 2 Navê jinane.

**Han** (cihn) ***rêzman*** Cihnaveke jibo kes yan tiştê dûr bi kar di hêt. Henê.: Tu mirov han yê liser banî di bînî?.:Gundê han. Kevirê han.

**Hanê** (cihn) ***rêzman*** 1. Han. Henê.2. Alavê danê.;Hanê bo te. Hanê wergire.

**Har** (hk.x.çewa) 1.Giyandarê zû tore di bit. Dijwar. Mirovê har. Jina har .Tore. bêhinteng.2. Xwarina har, ang; xwarina dijwar. Tîj. Bîbera har.

**Harbûn** (k.jn.l.mê) 1. Torebûn. Bêhintengbûn. :Seyê ciranî yê har bûye. : *pend* Jin ji bê mêrî har di bin, mêr ji bê jinî jar di bin. 2.Bi hêz kevtin. Geşkirin. Qelew.:Bacanên me evsale dê har bin. (K) bn :Bûn.

**Harî** (n.dar.mê) Derdê harbûnê. Dijwarî. Tondî. Toreyî. :Harîya bîberan ne wek ya pîvazane.

**Harîkar** (hk.l.çewa) Alîkar. :Xudê harîkar be.

**Harîkarbûn** (k.jn.gl.mê) Bûn piştevan. Bûn alîkar. :Xwedê harîkarê we bit. :Babê min herdem harîkar bû ko ez ez bi xwînim.

**Harîkarî** (n.l.mê) Alîkarî. : Ez pêdivî Harîkarîya te me.

**Harîkarîkirin** (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. :Heger tu harîkarîya min ya diravî bi key, ez dê xanîyekî bi kirim.

**Harîkirin** (k.jn.l.mê) Digel kar kirin. Jêra karkirin.Piştevanîkirin. :Bê zehmet harî min bike da vî barî danîn ser pişta hespî. (K) bn: Kirin.

**Harîvan** (n.dar.mê) Navê mêrane.

**Harkirin** (k.jn.l.mê) 1.Dijwarkirin. Torekirin. Hêriskirin. :Te ev sege yê har kirî!. 2.Bi hêzkirin. :Bacanên xwe bi lêkirina zibilî har kirin. (K) bn: Kirin.

**Hatin** (k.jn.x.mê) Ji cihekî zivrîn ,vegeryan.*Pend* :Hat ve dest ji pêyan dirêjtir. Ang; Çi bi destî ve nehat. Armanc bi cih ne hat. *Pend* :Çûn bi mirovîye, lê hatin ne. *Pend* :Hat dengê duholê, pîrejin negehiştin solê(pêlav). (K) Bdn: ez di hêm em di hêyn(di hên) tu di hêy hûn di hên, ew di hêt ewan di hên. Pr:dê bi + bdn. Bdb: ez di hatim, em di hatîn, tu di hatî ,hûn di hatin, ew(wî, wê) di hat, ewan di hatin. Db,dûr: ez hatibûm,em hatibûyn, tu hatibûy, hûn hatibûn, ew hatibû, ewan hatibûn. (F) :bi hêy, bi hên[were werin]. Br× Çûn.

**Hatî** (hn.dar.çewa) Vegerayî. Mêvan. Gehiştî. Eve hatîne, kanê çûyî?.*Pend* :Hatî di çûyîne, xwaztî di birîne. Ang; yê hatî her dê vegerit, ya xwaztî dê her hêt birin.

**Havana** (hk.cih) Paytextê welatê Kûba.

**Havanayî** (malbn) Kelên xwecihên Havana.

**Havanî** (malbn) Havanayî.

**Haveyn** (n.x.nêr) Hêvên.

**Havêjtin** (k.jn.x.mê) Tiştek ji cîyek bo yê din bi bizivit. Firêdan. Firandin. :Kevirek havêjt(havêt). : Cilêd xwe yên kevin havêjtin. :Wê xwezîyê ji mejîyê xo bi havêje.(K) bdn: ez di (havêjim) em di havêjîn , tu di havêjî, hûn di havêjin(havên) ew di havêt(havêjit) ewan di havên(havêjin).). Pr: dê[bi] havêjim, havêjîn, havêjî, havêjin, havêjit[..je], havêjin. Ddb: di havêjt, di havêjtin. Db,dûr: havêjtibû, … bûn.(F): bi havê(havêje) bi havên(havêjin

**Havil** (hn.x.çewa) 1.Biryar. Şirove.2. Navê mêrane.

**Havildar** (hn.dar.çewa) Pêvegirêdayî. Peywenddar.Şolejê. : Jibo alîyê havildar,ango cihê peywenddar.

**Havî** (hn.x.çewa) Bajêle. Berela. Teqyayî.Derbider. Aware.

**Havîbûn** (j.n.mê) Derbiderbûn . Awarebûn.(K) bn: Bûn.

**Havîkirin** (k.jn.l.mê) Derbiderkirin. Derêxistin. Awarekirin.

**Havîn** (hk.dem,n.x.mê) 1.Wezek salê ye, germtirîn werze, ji mehên xizîran, tîrmeh û tebaxê pêk tê.2. Navê keçane. ***Pend*** :Havîn daybabe, havîn malbabe.ang; li havîna pir corên fêqîyên xweş hene û li her der erzanî ye.

**Havîngeh** (hk.cih,n.dar) Cihê fênik û dilveker , mirov jibo derbazkirina demên xweş lê di mînin. Cihê bêhinvedana havînan. Havîngeha Siyaretîka. Havîngeha gelîyê elîbeg. Havîgeha Sersikî. :Havîgehên welatê me pirin.

**Havînvan** (n.dar.dn) Navê jin û mêrane.

**Havîvan** (n.dar.dz) Navê keç û xortane.

**Havlêk** (n.x.nêr) Firçe.

**Hawar** 1 (n.x.mê) 1.Dema mirov daxwaza alîkarîyê di ke. Gazî. Hewar. 2. Navê mêrane.

**Hawar** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê keserê ye.

**Hawarhatin** (k.jn.l.mê) Weke mirov di hana yekî bi çe dema di keve tengavîyê. **Hawargehandin** (k.jn.l.mê) Dema mirov hawarê bi gehînit kesek, yan desteyekê ko di hana mirovî bi hên li demên tengav.

**Hawarkirin** (k.jn.l.mê) Daxwazkirin alîkarîya lezgîn, bi deng, nivîs yan ragehandin.Qîjandin. Gazîkirin li dema tirsê,jibo di hanê hatin. (K) bn: Kirin.

**Hawêr** (hk.cih) Rex. Al. Dewrûber.Rexûçan.

**Hawêr<u>dor</u>** (hk.cin.n.dar.mê) Rexûçan. Derûdor. :Dujminî hawêrdora me girtine.

**Ha<u>wîr</u>** (hk.cih) Hawêr.

**Ha<u>wîş</u>** (hn.x.çewa) Tena . Bêdeng. :Zarokê hawîş.

**Hawîş<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Tenabûn. Bêdengbûn. : Kuro te çiye, dê hawîş bi be!.

**Hawîş<u>kirin</u>** (k.jmê) Dmoşkirin. Tenakirin. :Dayê zaroyê xwe hawîş di kir. (K) bn :Kirin.

**Hay** (n.x.mê) Ageh. Zanîn. :Haya min jê tune. :Min hay jê nîne.

**Hay<u>dar</u>** (hn.n.dar. çewa) Agehdar. :Mamosta got: gelî qutabîyan hûn di haydarin ko sibe me seyrane?.

**Haydar<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Agehdarbûn. Zanîn. :Ez bi çi biryaran haydar nebûme!.

**Haydar<u>î</u>** (n.dar.mê) Agehdarî.

**Haydar<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Aghedarkirin. .:Her gihorîneka bi bit ez dê we haydar bi kim.

**Hayjê<u>bûn</u>** ( k.jn.gl.mê) Ageh jê hebûn.. Agehdarbûn. . :Haya te ji wî zarokî hebe.

**HD** (kurt) Heta dawîyê. Heta domahîyê.

**He<u>bûn</u>** (hkmê.k.jmê) 1. Mirovî tiştek hebe. Çîrok :Hebû, tunebû,…. Pîrjinek hebû. :Wê pênc zaro hene. : Te çi heye ji me ra bi bêje. 2. Amadebûn. :Hebûna te li vê dirê giringe. Br× Tunebûn. Nebûn.

**Heche<u>cik</u>** (n.dar.dz) Hacîreşk.

**Heci<u>mîn</u>** (k.jn.x.mê) Tenabûn . Hawîşbûn. :Ev çi zaroye, li cihekî na hecime!. (K) bdn : ez di hecimim em di hecimîn, tu di hecimî hûn di hecimin, ew di hecime[..it] ewan di hecimin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : ez di hecimîm, em di hecimîn, tu, ew di hecimî, hûn, ewan di hecimîn.Db,dûr :Ez hecimîbûm, em hecimîbûyn, tu hecimîbûy, hûn hecimîbûn, ew hecimîbû, ewan hecimîbûn(bi bûn ). (F): bi hecime bi hecimin.

**He<u>çik</u>** (n.x.mê) Darekê duçeqe(ta) di êxin serekê werîsî dako jibo girêdana baran sanahî bi be.

**He<u>dar</u>** (n.x.mê) 1. Aramî. Bêhinfirehî. 2. Navê jinaye.

**Hedarhatin** (k.jn.l.mê) Hewyan.Hawîşbûn. Tenabûn. Rihetbûn. . :Hedara min li çi diran nahêt:Hedara wî li vêrê nahêt. (K) bn : Hatin.

**Hefik** (n.x.mê) *leş* Gerden. Gerî. :Hefka wî ya kul bûy.

**Hefqas** (pêrb.dar) *rêzman* Hinde. Hindî. Temet.

**Hefsar** (n.dar.nêr) Serlixafa dewaran. Cilew. Devgem. :Hefsarê kerî di ser da hat.

**Hefsarkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov hefsarî di xin serê dewaran. : Min hespê hefsar kirî dako bi herim daran.

**Heft** (hijn.çend) Hijmareke 1+6 =7 . 10-3= 7.

**Hefte** (hk,dem.mê) Heft rojin. : êkşemb, duşemb, sêşemb, çarşemb, pêncşemb, eynî(în), ; şembî,. Çar hefte di bin mehek.


**Heftem** (hijn.çend) Hijmareke heger hefit bin , jibo ya dawî yê dihêt gotin. Ya/yê hefit ê. Hefit car bû, kirin. Roja heftem. Cara heftem.

**Heftemîn** (hij,n) Ya hefit ê. Heftem.

**Heftê** (hijn.çend) Hijmara .70 , 7×10=70.

**Hefthizar** (hijn.l.çend) Hijmara 7000. 1000×7=7000.

**Heftiyar** (n.x.dz) *candar* Giyandarek dirindeye, şîrdere. Keftar.



**Heftiyar**

**Heftî** (hk,dem..mê) Hefte.

**Heftmilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 7000000.

**Heftreng** (n.l.mê) Keskesor yê ji heft rengan pêkhatîye, li dema barana hûr yan hebûna xunavê peyda dibe, ko rengêd rojê berevajî di ke; sor, pirteqalî,zer,kesik,esmanî,şîn û mor. Kelestûn.

**Heftsed** (hijn.çend) Hejmara 700. 100×7= 700.

**Heger** (pêrb) *rêzman* Alaveke di hevekanda wek merc bi kar di hêt. Eger. :Heger tu hatî, ez jî dê hêm. : Heger min bi zaniba tu li virî, ez ne hatim.

**Hej** (n.x.nêr) Çeqên çir û tijî yêd daran. Tayên daran. :Bi hejî agir vemirand.

**Hejandin** (k.jn.x.mê) Leqandin. Livandin. Livlivandin. :Ala hejandin. :Serê xwe hejand. (K) Bdn:ez di hejînim em di hejînin, tu di heînî hûn di hejînin, ew di hejîne{…it] ewan di hejînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di hejand, di hejandin. Db,dûr: hejandibû, …bûn. (F): bi hejîne bi hejînin.

**Hejar** (hn.x.çewan) 1. :Mirovê hejar,ang; mirovê kêm mal û pare. Belingaz. Jar. *Pend* :Mirovê bêmejî hejare, ne yê bê mal û pare. 2. Navê mêrane.

**Hejarî** (n.dar.mê) Belingazî. Neyî. *Pend* :Derdê hejarîyê pir girane. *Pend* :Mirin heba, lê hejarî tune ba.

**Hejan** (k.jn.x.mê) bn: Hijyan.

**Hejdeh** (hijn.çend) Hijmara 18. 20-2=18.

**Hejdehem** (hijn.çend) Ya, yê, yên hejdeyê.

**Hejdehemîn** (hijn.çend) Hejdehem.

**Hejdehizar** (hijn.çend) Hijmara 18,000.

**Hejdemilyon** (hijn.çend) Hijmara 18,000,000.

**Hejhejok** (hk.dar.çewa) Tiştê yan mirovê, di heje. Sist. Xav. Livlivok. Leqleqok.

**Hejî** (hn.x.çewa) Rêzdar. Bi rûmet. Mirovek hejîye ; mirovek berkevtî, bi rêz. Hêja.

**Hajîn** (k.jn.x.mê) 1. Leqîn. Livîn.Hijyan.2.Navekê nêr û mê ye.

**Hejmar** (n.x.mê) Zanîna hijmartinan. Nîşana rêzkirin û hijmartinê 1,3,4,5,7, …û htd, komkirin, parvekirin, jihevbirin û lêkdan.

**Hejmartin** (k.jn.x.mê) Hijmartin. : Kî di kare xwendekaran di polê da bi hejmêre?.

**Hek** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo dem hicmetîbûnê(seyr) bi kar di hêt. :Hek eve tuyî li vêrê?.

**Hekar** (hk.cih.devern) 1. Devereke li Kurdistana bakûr. 2. Navê mêrane.

**Hekarî** (hkc.malb,ndar.dz) 1. Hekarî ,devera hekarî.2. Hekarî, devoka ko li devera hekar pê di axivin. 3. Hekarî, xelkê devera hekar ê.

**Heke** (pêrb) *rêzman* Alavê mercê. Eger. Heger. Heker.

**Hel** (n.x.mê) 1. Derfet. Delîve. : Ez bi hel dizanim ko em biçîn seredana hevalê xwe li xestexanê. 2. Car. :Vê helê ez dê bi ezmûna dawîyê bi serkevim.

**Helan** 1 (n.x.nêr) Kevirê pan, hulî û mezin. :Mala wan liser helanekî ye

**Helan** 2 (k.jn.x.mê) Helyan. Bihojîn.:Qerîse di hele. Nîvişk li ber germê helîya. .(K) bdn :ez di helim em di helîn, tu di helî hûn di helin, ew hele[...it] ewan di helin. Pr :dê [bi] +bdn. Bdb : ez di helam, em di helayn, tu di helay hûn di helan, ew di hela ewan di helan. Db,dûr : ez helabûm em helabûyn, tu helabûy hûn helabûn, ew helabû ewan helabûn.[bi bûn]. (F) : bi hele, bi helin.

**Helan** 3 (k.jn.x.mê) Derkeftin. Helhatin. Xuyabûn. :Roj di helêt.

**Helandin** (k.jn.x.mê) Dema mirov tiştekî(rûn) bi gerimkirinê bi helîne.:Qeşê bi helînin. :Te dilê min heland, dê vebire!. (K) bdn: Ez di helînim em di helînîn, tu di helînî hûn di helînin, ew di helîne[…it] ewan di helînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di heland, dihelandin. Db,dûr:Helanbibû, helandibûn.(F) :Bi helîne, bi helînin.

**Helandî** (hk.dar.çewa) Tiştê hatî helandin. Bihojandin. Rûnê helandî.

**Helanîn** (k.jn.x.mê) 1. Parastin. 2. Veşarin. Veşartin. Varêkirin.

**Helar** (n.x.mê) Gurî ya agir. Pêt.

**Helat** (n.x.mê) 1.Kiryara dema derbaz ya (helatin) . Xuyabûn. Diyarbûn. Derkevtin. Roj helat. 2.Nave jinane.

**Helatin** (k.jn.x.mê) Derkeftin. Xuyabûn. Diyarbûn. :Roj li spêdeyan di helêt.

**Helbest** (n.dar.mê) Derbirîna hizran bi awayek selîqe û dilveker .Hozan. Riste. :Me guhdarîya helbesta seydayî di kir, pir dilveker bûn.

**Helbestin** (k.jn.dar.mê) Girêdan. Bestin. Vehandin. Ristin. Rêzkirin.

**Helbestvan** (pîşn.dar.dz) Kesê helbestan di vehînit. Hozanvan. :Helbestvanî dîna xwe ya êkê da çapkirin.

**Helbestvanî** (karn.dar.mê) Karê nivîsan û vehandina helbestan. :Ew bi helberstanî yê ve xerîke.

**Helbet** (pêrb) ***rêzman*** Alavê misogerkirinê.1.Çi pê nevêt. Bêgoman .2. Erê. Belê. : Sube dê çiye xandingehê? helbet dê çim!.

**Helbijartin** (k.jn.dar.mê) Weke mirov kesekî jibo karek yan berpirsîyekê ji nav çend kesan bi bijêre dengê xwe jêra bide dako nûnerîya mirovî bi ke. :Mirov tiştekî ji çendêd din bi gire.:Sube dê helbijartinêd bajarvanî dest pê bi kin. (K) bn: Bijartin.

**Helbijêr** (n.dar.dz) Berbijar.

**Helbirîn** (k.jn.x.mê) Helgirtin. Rakirin. Hilandin.Hilgirtin.

**Helçinandin** (k.jn.dar.mê) Malîn. Pakijkirin. Vemalîn.

**Helçinîn** (k.jn.x.mê) 1. Pakijkirin.2. Alizîn.

**Heldan** (k.jn.x.mê) Bilindkirin. Rakirin. Helgirtin. : Serê xwe heldan. Ala heldan.(K) bn :Dan.

**Heleşe** (hk.x.çewa) Mirovê xemsar yê her tiştê bi keve destan xirab di ke.

**Helgirtin** (k.jn.x.mê) Hilgirtin.

**Helhelan** (k.jn.dar.mê) Qîjandin. Hewarkirin.

**Helhelok** (n.dar.mê) 1. Dareka(tiraş) dême bi bere. 2. Berê helhelokê , fêqîyeke xir û biçûke pir reng hene , sor ,zer, htd, tama wan şirîn û xoşe.

**Helhilîn** (k.jn.dar.mê) Helyan. Bihojîn.

**Helisandin** (k.jn.dar.mê) Hulisandin. Tehisandin. Hilîkirin.

**Helisîn** (k.jn.x.mê) Hulisîn. Tehisîn.

**Helişkandin** (k.jn.x.mê) Bêgavkirin jibo gotin yan kirina karekî. Pêdan kirin. Pêdan gotin. Azirandin. :Tu mijarê helişkîne û ji werê wêve xema min.(K) bdn: ez di helişkînim em di helişkînîn, tu di helişkînî hûn di helişkînin, ew di helişkîne [...it] ewan di helişkînin. Pr: dê [bi]+bdn. Bdb: di helişkand, di helişkandin. Db,dûr: helişkandibû, helişkandibûn. (F): bi helişkîne, bi helişkînin.

**Heliz** (n.x.mê) ***giya*** Giyayek ter û bi xemle, li çiyayên Kurdistanê hişîn di be, xwarineka baş a kewalî(terşî) e.2. Navê jinane.

**Helîkopter** (n.biyan) Firokeka bi perwaneye, cengî yan jibo karên sivîl mîna veguhaztina nesax, birîndaran û çandinê bi kar di hêt.

**Helîme** (n.x.mê) Hilim.

**Helîmegirtin** (k.jn.l.mê) Hilimgirtin.

**Helîn** (k.jn.x.mê,n.x.mê) 1. Helyan. Helan. Bihojîn. 2.Nave jinane.3. Hişyarbûn. Rabûn ser xwe. Desthelîn. Desthelan. 4.Hêlan.

**Helîse** (n.x.mê) Xwarina ron. Avik. Metfînî.

**Helkeft** (n.l.nêr) 1. Bûyera ko bê zanebûn rû di det.2.Navê mêrane.

**Helkeftin** (k.jn.dar.mê) Haelkeft.

**Helkehelk** (n.dar.mê) Li dema westanê yan tirsê bêhina mirovî lezgîn di hêt û di çit. Hilkehilk.

**Helkehelkkirin** (k.jn.gl.mê) Ji egera nexweşî, tirs yan westanê dengê helkehlkê ji mirovî di hêt. (K) bn :Kirin.

**Helketin** (k.jn.l.mê) Helkevtin.

**Helkevtin** (k.jn.l.mê) 1.Bîranîn. Bîrewerî.2. Serkevtin. Serevazbûn. Bilindbûn.

**Helkirin** (k.jn.dar.mê) 1.Pêkirin. Agir, cigare, lempe helkirin.2. Hilkolan. Kolan. Kêlan. Zevî hel kir. 3. Kêşan û alandin. :Bendik hilkirin. : Davê bi kêşe û di darîhel bi ke. (K) bn: Kirin.

**Helkişandin** (k.jn.dar.mê) Tiştekî, (dav, werîs, bendik) mirov jibo alîyê xwe ve bi kêşe. Anînder. Înander : Nojdarî didanê wî helkişand. (K) bn :Kişandin.

**Helikîn** (k.jn.x.mê) Helkehelkkirin. (K) : bdn: ez di helikim, em di helikîn, tu di helikî hûn di helikin, ew di helike[..it] ewan di helikin. Bdb: ez di helikîm, em di helikîn, tu di helikî, hûn di helikîn, ew di helikî ewan di helikîn. Db,dûr: helikîbûm,…bûyn,..bûy,…bû,… bûn. (F): bi helike, bi helikin.

**Helkulîn** (k.jn.dar.mê) Gavhavêtina xwarûvîç. Lengîn. : (K) di helkulim di helkulî, di helkulîn, di bi helkulim, bi helkule :Çima di helkulî, ma pîyê te birîndare?.

**Helkutan** (k.jn.dar.mê) 1. Pêyêd xwe liser erdê rakirin û danan, nemaze dema di qerimin[ji serma]. 2. Hêriş kirin ser malan. Kevtin nav.

**Helm** (n.x.mê) Hilim.

**Helmeşyan** (k.jn.dar.mê) Bi ser gir û çiya kevtin. Pêveçûn jibo serî. Serevrazbûn.

**Helmet** (n.x.mê) Hêriş. Pêşveçûn. Kiryar.

**Helmêjk** (n.dar.nêr) Lûleyeka kune, jibo veguhaztina şileyan ji amanekî bo yê din. Sondeyê avê. Merpîç.

**Helo** (n.x.nêr) 1.Teyrê kelexan. Elho.2. Navê mêrane.

**Helpehelp** (n.dar.mê) Helkehelk.

**Helpehelpkirin** (k.jn.gl.mê) Helkehelkkirin.

**Helpîvan** (k.jn.x.mê) Dijûndan. Xebergotin. (K) bn :Pîvan.

**Helsengandin** (k.jn..dar.mê) Tiştê ko taqî bikey bizanî kanê başe yan ne. Nirxandin. :Karê me bi diristî hat helsengandin!.

**Helişandin** (k.jn.x.mê) Xerakirin. Kavilkirin. Hilweşandin. Herifandin.

**Heltûtan** (k.jn.dar.mê) Çarmêvankî rûniştin. (K) : Heltûte, heltûtin, dê bi heltûte.

**Helûje** (n.x.mê) 1. Hilîk. 2. Helhelûk.

**Helweşandin** (k.jn.dar.mê) Ji navbirin. Pûçkirin. Xirabkirin. Herifandin. : Biryara rijêmê hat heweşandin. (K) bn: Weşandin.

**Helxe** (n.x.mê) Tirane. Gelte. Yarî.Henek.

**Helyan** (k.jn.x.mê) Tiştê bi gerimkirinê ron bi bit. Bihojîn. :Ron helya.

**Hem** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo zêdebarîkirinê bi kar di hêt. : Hem zelaman û hem jinan pişkdarî di govendê da kirin.

**Hema** hema (pêrb)1. Rikatî yan rijdî liser biryara xwe. Jiber ku.: Te çima weha kir? Hema !. 2. Jibo vebirînê bi kar di hêt. : Hema tu ne axive! Hema bêje. Hema bila we li te bi hêt, tuyê hejî wê yekî yî.

**Hemahema** (pêrb.dar) *rêzman* Ew qas. Wesa. Kêmkêm.

**Heman** (pêrb) *rêzman* Alavê wehevîkirin. Mînakî. Tiştê mîna yê berî xwe bit, wek wî be. Êvarî ez li mal bûm min ça di vexwar, li heman dem temaşey filmekî di kir. Heman dem. Heman car.

**Hemayîl** (n.x.mê) 1. Corekê ristik[zincîrên] zêr yan zîvî ye.2. Niviştî.Bazbend.

**Hembajêrî** (n.l.dz) Mêr yan jina xelik ê/a heman bajêrê mirovî bit. : Ew hembajêrîyê mine; ango ez û ew ji yek bajêrîn.

**Hember** (hk,cih.n.dar) Li alîyê din.Beramber. Berhember. : Mala mezinê gund li hember mizgeftê ye; ango berêd wan[malan] li êkin.

**Hembêz** (n.x.mê) Bermil. Des li mil.  Li kêlek. Li singî.

**Hembêzkirin** (k.jn.l.mê) Dema du kes singên xwe di gehînin êk û bi destan li navmilên devdu dixin.Dest li milêd hev xistin. Xwe di êk werkirin. Pîrozkirin. (K) bn: Kirin.

**Hemdem** (hn.l.çewa) Mirov yan tiştê di gel demî di guncit. Serdem. Pêşvero. Nûxaz. Hevçerx.

**Hemêz** (n.x.mê) 1.Piştî. Bermil. Gurz.2. Hembêz.

**Hemêzkirin** (k.jn.l.mê) Hembêzkirin.

**Hemgundî** (hn.l.çewa) Gundîyên hev. Gundîyêd êk.

**Hemî** ( hn,nediyar) 1 Gişt. Vêkra. 2. Her. : Ez hemî roja di çim geryanê. Hemû.

**Hemnav** (hn.l.pir) Kesên navên wan mîna hev. Yên navêd wan wek êk.

**Hemû** (hn.nediyar) Gişt. Hemî. : *pend* Hmû tişt bi ziravîyê di pirçit, lê kutekî bi storîyê.*pend* :Hemû zikan xwarin divên, hemû bejinan cilik divên. *pend* Hemû tişt dirone, merc çav û birone.

**Hemwelatî** (hn.l.çewa) Xelikê heman welat. Hevwelatî.

**Henar** (n.x.mê) *fêqî* Hinar.

**Henase** (n.x.mê) Bêhin.

**Henasedan** (k.jn.l.mê) Ba ji singî[sîh] derkevtin.

**Henasegirtin** (k.jn.l.mê) Ba kevtin nav singî[sîh].

**Hendef** (n.x.nêr) *erdzanî*  Gir. Girik. Mil.

**Hene** (n.biyan) Xena.

**Henek** (n.x.mê) Gelte. Helxe. Tirane.

**Henekkirin** (k.jn.l.mê) Tiranekirin. Geltekirin. :Heneka jibo zarokan bi ke, dako tena bi bin. :Ew hertim henakan di ke. (K) bn: Kirin.

**Hengame** (n.x.mê) Dengûdor. Hera.

**Hengav** (n.dar.mê) 1.Demek kurt. 2.Pêngav.

**Hengil** (n.x.mê) *leş* Hingil.

**Henîşk** (n.x.mê) *leş* Enîşk.

**Her** (pêrb) *rêzman* Alavekê pêvegire jibo destnîşankirinê bi kar di hêt. Her kes. Her tişt.Herdem. *pend* : Her kesê keçek nazand, wî gundek bezand. *pend* : Her teyrek û refa xwe, her kes û welatê xwe. *Pend*: Her evrazîyek nişîvîyek li dû ye. *Pend* : Her pez û pêpikên xwe, her mirov û kiryarên xwe.*pend* :Her kesê bi lezîne, dê çerxa xwe bizdine.*pend* : Her kezîzerekê simbêlsorek heye. *pend* : Her rondikek jibo çavê kul geleke.

**Hera** (n.x.mê) Dengûdor. Qêreqêr.Gêleşok.

**Hercar** (pêrb.dem) *rêzman* Alavê cendbarekirina bûyeran. Hemû caran.

**Herçend** (pêrb) *rêzman* 1. Hindî. Sereray.Çiqas.2. Lê. Jibilî ku: Herçend min pêkol kir ko bi hêm cem te, ez ne şiyam. : Herçend min ne di xwazt bi çim, lê min çi rê nebûn.

**Herdem** (pêrb) *rêzman* alavê berdewamîyê. Hemû deman. Hergav. : Herdem tu li bîra minî.

**Herder** (pêrb.cih) *rêzman* Alavê hebûnê(mişebûn). Her cih. Her war. Her alî. : Li herder dengê kewan di hêt.Herdu , hersê, herçar û htd;alavê wergirtin, pejirandina hemûyan. Dema mirov du,sê, çar û htd, tiştan, kesan, gotinan û htd di helbijêrit. :Te sêv yan hinar divê? Herdu; ango sêv û hinar divê.

**Hereşe** (n.x.mê) Gef.

**Hereşekirin** (k.jn.l.mê) Gefkirin.

**Herewez** (n.x.mê) Zibare.

**Herê** (pêrb) *rêzman* 1.Alavê erêkirin, pejirandin. Erê. Başe. : Tu hatî?; Herê ez hatim. 2. Alavê hicmetîbûnê. :Herê kuro eve tu li vir çi di kî?.

**Herêk** (pêrb) *rêzman* Alavê desnîşankirin Herkes. Heryek. Êk êk. : Herêk ji we 10 dînaran bi hînin, da em tepeyekê bi kirin.: *pend* Herêkî dîkilê wî yê di bin kevşê wî ve. Ang; herêkî nihênî yek li cem heye.

**Herêm** (hk.cih) 1.Deverek mezin. Herêma Kurdistanê. 1. Navê jin û mêrane.

**Hergav** (pêrb.dem) rêzman Alavê berdewamîya demîye. Hemû gavan. Hemû deman.

**Herho** (pêrb.l) *rêzman* Alavê hevberkirinê, nîşadanê. Her hosa. Hosa. Wesa.

**Herhosa** (pêrb.l) *rêzman* Hosa. Ha hosa. Herdem hosa.

**Herifandin** (k.jn.dar.mê) Dema mirov tiştekî,avahîyekîtêkûpêk bi de. Kavilkirin. Xerakirin. Wêrankirin. :Dîwar herifand. .(K): bdn: ez di herifînim em di herifînîn, tu di herifînî hûn di herifînin, ew di herifîne[..it] ewan di herifînin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di herifand, di herifandin. Db,dûr: herrifandibû, …bûn.(F): bi herifîne bi herifînin.

**Herifîn** (k.jmê) Kavilbûn. Wêranbûn. Hirgumîn.:Xanîyê kevit herift.:Dîwar herift.

**Heriftin** (k.jn.x.mê) Herifîn.

**Herimandin** (k.jn.dar.mê) Pîskirin. Gemarkirin. Bênivêjkirin. :Zarokî xwe herimand. *Pend* : mastê segî herimadî, her jibo wî başe. (K) bdn: ez di herimînim em di herimînîn, tu di herimînî hûn di herimînin, ew di herimîne[..it] ewan di herimînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di herimand, di herimandin.Db,dû herimadibû, …bûn. (F) : bi herimîne, bi herimînin.

**Herimî** (hn.dar.çewa) Gemar. Gelek pîs. : Ew mirovek herimî ye.

**Herimîn** (k.jn.x.mê) Pîsbûn. Gemarbûn. : Av herimî. Cilik di herimin,.

**Heriş** (n.x.mê) *rêçal* Firo. Firî.

**Herişandin** (k.jn.mê) Mirov tiştekî yan cihekî bi givêşe ta şêweyekê dî di girePerçiqandin.Pelixandin.(K) bdn: di di herişînim em di herişînîn, tu di herişînî hûn di herişînin, ew di herişîne[…it] ewan di herişînin.Pr: dêbi +bdn. Bdb: di herişand, di herişandin. Db,dûr: herişandibû, herişandibûn. (F): bi herşîne, bi herişînin.

**Herişîn** (k.jn.x.mê) 1Têkçûn, guhorîna şêyê tiştî. :Tirombêla wan ya herişî. Pelixîn.2. Peydabûna şûnwarê gurzekî li ser leşê mirovî. 3. Bi gotinên kirêt û birîndarkirina deronî mirov di herişe.(K)bdn:ez di herişim em di herişîn, tu di herişî hûn di herişin, ew di herişe [..it] ewan di herişin. Pr:dêbi +bdn. Bdb: ez di herişîm em di herişîn, tu di herşî hûn di herişîn, ew di herişî, ewan di herişîn. Db,dûr: hrişîbûm,..bûyn,..bûy,..bûn, ..bû,…bûn. (F) bi herişe, bi herişin.

**Herî** (n.x.mê) Ax û ava têkhelkirî a reng û şêweyek taybet di girit. Teqin. Khur(qur).

**Herîkêl** (n.l.mê) Kêlana zevîyên birincî di nav herîyê da, piştî erdî pir av di ken û bi dewaran û amêran di kêlin.

**Herîkêlkirin** (k.hn.gl.mê) Kêlana zevîya jibo çandina birincî, bi herîkêlê. (K) bn:Kirin.

**Herîkirin** (k.jn.l.mê) Mirov herîyê jibo avayîyan çê di ke. : Me herîya kirî dê sube libinan birîn.Teqinkirin. :Me dîwarê xanî herî kir. (K) bn: Kirin.

**Herîn** (k.jn.x.mê) Çûn. (K) bdn: ez di herim em di herîn, tu di herî hûn di herin, ew di here[…it] ewan di herin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : ez di herîm tu di herî, em,hûn di herîn, ,..Db,dûr: Herîbûm,..bûy,..bûyn,… bûn. : Çûn pitir bi kar di hêt.

**Herîse** (n.x.mê) bn :Helîse.

**Herkes** (pêrb.l) *rêzman* Alaveke jibo kesê nediyar. :Herkes di karit pişikdarî ahengê bi bit.

**Hermê** (n.x.mê) *fêqî* Hirmîk.

**Hermî** (n.x.mê) *fêqî* Hirmîk.

**Herro** (hk.dem.kengî) Çendbarebûna bûyeran. Rojane. Herroj.

**Herroj** (hk,dem) Hemû rojan. : Herroj ez demhijmêrekê di lîzim(werziş di kim).

**Hertim** (hk.dem) Herdem. Hergav.

**Hertişt** (n.l.nêr) Hemû tişt. : Li malê hertişt li cihê xwe ye.

**Herweha** (pêrb.l) *rêzman* Alavê çendbarekirinê. Alavê li ser zêdekirinê. Herhosa. Herwesa.

**Herwekî** herweko (pêrb.l) *rêzman* Her wek. Mîna. Bo nimone. Wek ya din. Wek ya hatî gotin, kirin.

**Herwesa** (pêrb) *rêzman* Herhosa.Herweha.

**Heryek** (pêrb.desnîş) *rêzman* Herêk.

**Herzalik** (n.x.mê) Kepir. Kolik. Zincik.

**Heshesok** (n.dar.nêr) Şaxê candaran Qoç.

**Hesin** (n.x.nêr) *kanza* Asin. :Ew mîna hesin qayîme. *Pend* :Hesin ji hesin na xwe.

**Hesingêr** (pîşn.dar.dz) Asinger.

**Hesingerî** (karn.dar.mê) Karê çêkirin û lêkdana asinî. Asingerî.

**Hesinî** 1 (hn.dar.çewa) Mirovê serreq mîna hesin. Tiştê wek asinî req.

**Hesin<u>î</u>** (malbn) Tîreyeka kurdane.

**Hesin<u>kar</u>** (pîşn.dar.dz) Asinger. Hesingêr.

**Hesin<u>karî</u>** (karn.l.mê) Karê çêkirina hesin.

**Hesk** (n.x.mê) Heskîv.

**Heskîfk** (n.x.mê) Heskîvk.

**Hes<u>kîvk</u>** (n.x.mê) Kefçikek mezine jibo têkvedan yan rwîkirina xwarinê bi kar di hînin.

**Hesp** (n.x.nêr) ***dewar*** Giyandarek malî yan kûvî ye, mezine jibo siwarbûn û bar veguhaztinê bi kar tê, hêmaya hêzê ye.: ***pend*** Hesp kirî zîn divê, zîn kirî siwar divê. ***Pend*** :Hespê bi zîn bê siwar na be, newala kûr bê av nabe.***Pend*** : Hesp hat ber nalkirinê, kêvjaleyî pîyê xwe bilin di kir;ang kesê ji hêza xwe mezintir bi xwe di danit. ***Pend*** : Hesp û qesp li nik wî êkin: ang; yê merd, çi bi de mêvan û biraderan li nik wî her kême.***Pend*** :Mîna hespê fale.ang; mirovê bi hêz dijwar.



**Hesp**

**Hespê<u>reş</u>** (n..l.nêr) ***kevin*** Navê hespekîye di dastana sîsebanê da. Borê reş.

**Hespkê<u>derya</u>** (n.l.dn) Giyandarekê avîye biçûke, wek hespane.



**Hespkêderya**

**Hes<u>ret</u>** (n.x.mê) Kovan. Dax. Fîxan.

**Hest** (n.x.mê) 1.Tiştê mirov ne bîne û pê di zane. Hesta tam, gerim,sar, û htd. 2. Soz.

**Hestbirîndar<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Dilşikandin. Gêwilşikandin. Êşandin. :Te hesta min birîdar kir, bi wan gotinên kirêt.

**Hest<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Wekî mirov hest bi gorînên rex û çanan di ket. Pê di zane. :Ez hest bi dilxweşîyê di kem demê te di bînim.

**Hes<u>tan</u>** 1 (k.jn.x.mê) Rabûn.

**Hes<u>tan</u>** 2 (n.x.mê) Sitranên koçik û dîwanan. Lawik. Heyran.

**Hes<u>te</u>** (n.x.mê) Mekîna agir hilkirinê. : Ka hesteya xwe bi de min da cigara xwe pê berdemê(hil bi kem).

**Hes<u>tî</u>** (n.x.nêr) *leş* Hedamê leşîye, req yê ko laşê mirov û candaran peyt di ke û liser hatîye ragirtin.. Hestîyê canê mirovî pitir ji 600 pirtan pêkhatîye. ser, ling, zend, û htd.

**Heş** (n.x.mê) Hiş. Hizir. Bîr.

**He<u>şîn</u>** (hn.x.çewa) Şîn. Hişîn. Dareka hişîn,ango; dareka bi xemil û bi ta, çeq û belg.

**Heşîna<u>tî</u>** (n.dar.mê) Xemila kesik ya darûbar û giyayî. Şînkatî.

**Heşîn<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Dema dar, giya bi tovî yan nemamkan hişîn û geş di bit. *Pend* : Dara Azadîyê bi xwînê hişîn di bit. *Pend* :Cotkaro çiye di çînî?, ;heger hişîn bû bê (bi) bînî!. (K) bn: Bûn.

**Heşîn<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov giya yan darekê di çîne û hişîn di be.(K) bn: Kirin.

**Heş<u>kirin</u>** (k.jnl.mê) Hestkirin.

**Heşt** (hijn.çend) Himara 8. 4+4= 8.

**Heşt<u>deh</u>** (hij,n.l) Hijmara hejde. 18.

**Heş<u>tem</u>** (hij,n,rêzkirin) Ya/ yê / yêd heştê.

**Heşte<u>mîn</u>** (hij,n,rêz) Heştem.

**Heş<u>tê</u>** (hij,nl) Hejmara 80. 8×10= 80.

**Heş<u>hizar</u>** (hij,n.l) Hijmara 8000.

**Heş<u>tir</u>** (n.x.dz) *candar* Hêştir. Deve.

**Heşt<u>milyon</u>** (hij,n.l) Hijmara 8000000,

**Heşt<u>sed</u>** (hij,n.l) Hijmara 800.

**He<u>ta</u>** (pêrb.pêvgir) *rêzman* Tixûbdana dem û dûrî. :Ji evro heta sube di vê te bi bînim. Ji mala me heta mizgeftê deh gavin. Heta kengî dê li benda te mînim?. *Pend* : Heta mirinê, kirine. *Pend* :Heta liser serî bi rêve neçî, bihayê pêyan nizanî. Pend :Heta di bêjim û di bêjimeve, dê çim û dê hêmeve.*Pend* :Heta bûk xemilî govend vemirî. *Pend* :Heta mar rast nebit na çite di kunê ve.*Pend* :Heta ne kevî destê dujmin, bihayê mirovê xwe nizanî.*Pend* :Heta stûr zirav di bit, zirav di piçit.Ta. Tanî.

**Heta<u>ko</u>** (pêrb.dar) ***rêzman*** Tanî. Heta. :Hetako ez hatim tu li wê derê nemabûy.

**He<u>tav</u>** (n.x.mê) Ronahîya rojê. Tav. : Ew liber hetavê gêj di bit. : Hetava havînê dijware.

**He<u>tik</u>** (n.x.mê) Şerim. Şermizarî. Kirêtî.Fehêtî. Namûs.

**Hetikan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Pîskirin.Kirêtkirin. Fehêtkirin. Şermizarkirin. (K) bdn :ez di hetikînim em di hetikînîn, tu di hetikînî hûn di hetikînin, ew di hetikîne[…it] ewan di hetikînin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : di hetikand, di hetikandin. Db,dûr: hetikandibû, hetikandibûn. (F): bi hetikîne, bi hetikînin.

**Hetik<u>birin</u>** (k.jn.l.mê) Şermizarkirin. Kirêtkirin.Bêrûmetkirin. Şikandin. Ez dê htika wî bi bim. :Camêr dê bese te hetika me bir?.

**Hev** (pêrb) ***rêzman*** Pêşpirteke di hevekanda bo girêdana wan. Êk. Pêkve. Bi hevra, hevdeng, hevbîr, htd.

**He<u>val</u>** (n.dar.dz) Birader. Dost. Hevrê. Hevkar.: ***pend*** Heger hevalê te şekir bit, hemîyê ne xwe.: ***pend*** Hevalê babê di bit hevalê kurî.: ***pend*** :Hevalê qelê nikil bi gûye,ang; hevalînî ya mirovê ne çak herdem poşmanî ye. ***pend*** : Heval yê dilî ye, bira yê leşî ye.

**Heval<u>bend</u>** (n.dar.dz) Hevalînî ya bi hevra. Desteya hevalan.

**Heval<u>bendî</u>** (n.dar.mê) Avakirina enî, bere, di nav bera kesan yan desteyan da jibo alîkarîya hev bi kin di kar û xebatê da. Qulp. Peyman.

**Heval<u>cêmk</u>** (n.l.mê) Cêmik. ;Ew û xweha xwe hevalcêmkin.

**Heva<u>lînî</u>** (n.dar.mê) Dostînî. Biraderînî.

**Hevalînî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Bûn hevalên hev. :Hevalînîya kesê xirab ne ke!.Ez hevalînîya wî na kim.

**Heval<u>kar</u>** (kn.dar.dz) Hevalên karî. Hevkar. :Ez û wî hevalkarin.

**Heval<u>kiras</u>** (n.l.mê) Derpê di gel kirasî, xasime yê jinan. Serdeling.

**Heval<u>nav</u>** (n.l.mê) ***rêzman*** Peyveke yan navekê ko pesindare; mîna hevalnavê xurî :ciwan, , zana, jîr, hejar. Hevalnavê darijtî mîna: rengîn guhdar. Nêrevan. Karker. Havalnavê lêkdayî mîna: mejîhişk, sermezin Bejinbilin û htd. Rengdêr.

**Heval<u>tî</u>** (n.dar.mê) Hevalînî.

**Hevbawer** (hn.dar.çewa) Hevbîr. : Ew û birayê min hevbawein.

**Hevbend** (n.dar. dz) Heval. Hogir.Hevalbend.

**Hevbendî**. (n.dar.mê) Hevalînî. Têkilî.

**Hevbendîkirin**. (k.jn.gl.mê) Têkilîkirin. Peywedîkirin. (K) bn: Kirin.

**Hevbîr** (hn.dar.çewa) Mirovên heman bîr û boçûn hebin. Xwedî yek armanc.

**Hevbîrî** (n.dar.mê) Yek armancî.Hemanbîrî.

**Hevcar** (n.dar.nêr) Hincar.

**Hevçerx** (hn.dar.çewa) Mirovê xwe digel pêşveçûna dem di guhêre. Serdem.

**Hevdeh** (hij,n.çend) Hejmara 17, hevdehhizar, hevdehmilyon.

**Hevdehem** (hij,n) Ya/yê/ yên hevdê.

**Hevdehemîn** (hij,n) Hevdehem.

**Hevdem** (hn.dar.çewan) 1. Hevçerx. Digel demî xwe digihorit.2. Navê keç û kurane.

**Hevdu** (pêrb) ***rêzman*** Ékûdu. Hev.

**Hevdîtin** (k.jn.l.mê) Hevdu dîtin. êkdu dîtin. Çavpêkevtin. : Kurdistan TV hevdîtinek jibo çend qutabîyan rêkxist.

**Hevek** (n.x.mê) ***rêzman*** Riste. Rêz. Rêzik.

**Hevêz** (n.x.mê) Rikeha balindeyan.

**Hevgehandin** (k.jn.l.mê) Hevgihandin.

**Hevgihandin** (k.jn.l.mê) Vecivandin. Xirvekirin.

**Hevgur** (n.dar.dz) Heval. Hogir.

**Hevhatin** (k.jn.dar.mê) Pêkhatin. Peyman girêdan. (K) bn :Hatin.

**Hevirandin** (k.jn.dar.mê) Gogirandin. Birîn. Kezaxtin. : Pora wî hevirand, tayên darê di hevirînin.

**Hevîr** (n.x.nêr) Ar û av ên têkelkirî û hatîn vestirîn, nerim bûyî, jibo çêkirina nanî.***Pend*** :didanên hevîrî.ang ; didanên lewaz û sist. Hevîrê didanan.ang ; hevîrê şûştina didanan.

**Hevîrdidan** (n.l.mê) Hevîrekê nemazeye di kin serfirçeyî jibo şûştina didanan bi kar di hînin, gelek cor tam hene.



**Hevîrdidan**

**Hevîrkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirin û berhevkirina hevîrî. :Daykê got keça xwe rabe hevî bi ke dê mêvan hên.(K) bn : Kirin.

**Hevîrtirş** (n.l.nêr) Madeyek nemazeye, di kin nav hevîrî dako tirş bi bit û bi kêr patinê bi hêt.

**Hevjîn** (n.dar.dz) 1. Mirovên bi hevre dijîn. Heval. 2. Mêr yan jin. : Seyran hevjîna Memoye û Memo hevjînê Seyranê ye.

**Hevkar** (n.dar.dz) Hevalkar. Heval. Alîkar. :Araz hevkarê min e.

**Hevkarî** (n.dar.mê) Hevalînî di karî da.Alîkarî di karî da.

**Hevkarîkirin** (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin. Bi hevre karkirin. :Hevkarîya min bi bi ke. :Supas jibo hevkarîya we di gel me da kirî.(K) bn :Kirin.

**hevketin** (k.jn.l.mê) Li hevkevtin. Lêkkevtin. Pevçûn.

**Hevkevtin** (k.jn.dar.mê) Hevketin.

**hevkirin** (k.jn.l.mê) Li hevkirin. Pêkkirin. (K) bn: Kirin.

**Hevling** (n.dar.nêr) Zelamên jinkên wan xuşkên hev.: Azad û hêja hevlingin, ango jinên wan xuşkên hevdu ne.

**Hevnav** (hn.dar.çewa) Yên navên wan mîna hevdu bin. :Ez û te hevnavin.

**Hevojtin** (k.jn.x.mê) bn:Hevotin.

**Hevok** (n.x.mê) *rêzman*.Hevek. Riste. :Ji peyva welat hevokekê dirist bi ke!.

**Hevoksazî** (n.l.mê) *rêzman* Zanîna diristkirin û darijtna hevokan.

**Hevor** (n.x.nêr) *candar* Ga.

**Hevotin** (k.jn.x.mê) Perwerdekirin. Wanedan. Hînkirin. Fêrkirin. : Mamosta xwendekaran di hevoje. (K) : Ez di hevojim, bi hevoje, dê bi hevojin,…

**Hevpar** (hn.dar.çewa) Hevpişk. Hevkar.

**Hevpeyivîn** (jn.l.mê) 1. Dîdar. 2 Digel êk axivtin. Bi hevra peyvîn. :Radyoyê hevpeyvînek di gel min da kir.

**Hevqas** (pêrb.alv, çend) *rêzman* Jibo çendayîyê bikar dihêt. : Hevqas tu li virî û min tu ne dî. : **Hevqas** pere,. Hinde. Temet.

**Hevra** (hn.dar.çewa) Bi hevre.Pêkve. :Em dê bi hevra herin seyranê.

**Hevran** (n.x.nêr) Dan ; genim, ceh di gûnîyan. :Mişkî hevran hingaftin.

**Hevraz** (n.x.nêr) Evraz.

**Hevre** (hn.dar.çewa) Bi hevre.Pêkve. Bihevre.Tebayî.:Ew bi hevre rûniştin.

**Hevrê** (n.dar.dz) Kesê bi mirovî ra di rêyekê, cihekî, qonaxekê.Hevalê rê. Heval.

**Hevring** (n.x.mê) Cewa birîna mûyê pora mirvan û bizinan yan hirîya pezan. Cew. Cewbir.

**Hevrist** (n.x.mê) Dareka bê bere, herdem ya keske, belgên wê mîna stirîyane. Qaç. : *Pend* Hevrist ne dare, nêrgiz ne bihare, keç ne şûnware.

**Hevrî** (hn.dar.çewa) Wekhev. Hevcor.

**Hevrîşim** (n.x.mê) Avirmîş.

**Hevsar** (n.dar.nêr) 1.Hefsar. Cilew. :Hevsarê kerî yê bi ser ve. 2 Hevsî. Cîran.

**Hevsê** (n.dar.dz) Cîran. Cînar. Hevsî.

**Hevsî** (n.dar.dz) Hevsê.

**Hevşî** (n.x.nêr) Ciheke li çûlî, xwedî terş, pez û bizinên xwe lê bi şev lê di hêlin(mexel di kin).

**Hevzik** (hn.dar.çewa, n.dar.nêr) Cêmik.

**Hew** 1 (n.x.mê) Pêrabûn. : Hewa lêdana derzîkan li zarokan sube dê dest pê bi ket.

**Hew** 2 (n.x.nêr) Derd. Kul.

**Hewandin** (k.jn.x.mê) Mêhvan li malê wergirtin jibo xwarin, vexwarin û nivistinê. . Pêrgînîkirin. (K): Bdn: ez di hewînim em di hewînîn, tu di hewînî hûn dihewînin, ew di hewîne[…it ]ewan di hewînin. Bdb: di hewand, di hewandin. Pr: dê[bi] hewînim hewînîn, hewînî hewînin, hewînit[ne]. Db,dûr: hewandibû, …bûn. .(F): bi hewîne bi hewînin

**Hewcar** (n.x.nêr) Hincar.

**Hewdan** (k.jn.l.mê) Vekolîn. Kulbûn. Êvitîn. : Birîna wî baş ne hatibû dermankirin, lewra hew daye.(K) bn: Dan.

**Hewêl** (hn.x.çewa) Vîr. Çavtirîwar.

**Hewês** (hn.x.çewa,n.mê) 1. Panka destî. 2. Mirovê porweyayî, serweryayî.Keçel.

**Hewî** (n.x.mê) Jina biser jinê hatî. Jinên yek mêrî di bin hewîyên hev.*Pend* : Hewî hate nav derê, axîn keft jina berê.*Pend* :Hewîyê jiber hewîyê xwe ciwan kir, jintîyê jiber jintîyê mal kir.

**Hewîdar** (hn.dar.çewa) Xudan hewî. Bi ser hewî.

**Hewîdarî** (n.dar.mê) Jiyan di gel hewîyan.

**Hewş** (n.x.mê) Meydana ber derîyan, ko li bihar û havînan lê di rûnin. Asîtan. Derîzan.

**Hewyan** (k.jn.x.mê) 1. Rawestan bêdeng. Rihetbûn .:Ev zaro nahewit nizanim wî çi divêt.. 2. Wergirtin. Pêşwazîkirin. Pejirandin. Hecimtin[hecimîn].(K): bdn ez di hewtyim em di hewyîn, tu di hewyî[hewî] hûn di hewyin, ew di hewyit ewan di hewyin. Pr : dê[bi] hewim(hewyim) hewyîn(hewîn), hewyî(hewî)hewyin(hewin) hewyit(hewit). bdb: di hewya(hewî) di hewyan (hewîn). . (F): bi hewye [hewe] bi hewyin [hewin]

**Hey** (pêrb) ***rêzman*** Alveke jibo hicmetîbûn û hoşdarîyê bi kar di hêt.

**Heya** (pêrb) bn: Heta.

**Heyam** (hk,dem. x.mê) 1. Demek kurt yan vebirî. : Eve heyameke tu ne dîyarî(xuyayî). 2. Navê jinane. Heyam keça Berojî ye.

**Heyho** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo peşêmanîyê bi kar di hêt. :Heyho mamo tujî ya xwe bêje.

**Heyî** (hn.x.çewa) Mirov xudan mal û pare. Zengîn. : ***pend*** Heyî be, kurê kerî be, ;ang mal û pere li cel xelikî giringe, ne rûmet.

**Heyîn** (k.jn.x.mê) Hebûn.

**Heyv** (n.x.mê) 1.Stêra mezin li esmanan reng sipî, şêweyê xir[girover] yan şalokî di wergirit. ***Pend*** :Heyva xwe rûniştî dît !. Di bêjin bêvankesî heyva ji pêrve(piyanve) dît.:Jibo mirovê bi bext di hêt gotin.ang ; mirovê şensdar. ***Pend*** :Heyva bin ewrî,ang ; mirovê berze, ne diyar. 2. Meh. 3. Navê jinan û mêrane.

**Hez** (n.x.mê) Tiştê dilê mirov pê xweş be.Vîyan. : Heza te çiye ?. Heza min xwendina rojnameyane.

**Hezar** (hij,n) Hijmara 1000. Hizar.

**Hezaran** (hij,n) Gelek hezar. Çend hezar. Bi hezaran.

**Hezkirin** (k.jn.l.mê) Mirov hez ji tiştek yan kesek bi ke. Ez hez ji te di kim. (K) bn: Kirin.

**Hê** (pêrb) ***rêzman*** Alavê hicmetîbûnê ye. : Hê; Ew tu li wêrê[wê derê] çi di kî!

**Hêbetî** (hn.dar.çewa) Hicmetî. Seyr.

**Hêbetîbûn** (k.jmê) Dem mirov tişek seyr bi bînit û bawer nekit , hêbetî dibit .hicmetîbûn. (K) bn: Bûn.

**Hêcet** (n.x.mê) Dema mirov nexwazit karekî bi ket dê jibo xwe li hindek behanan gerit dako hemberê xwe razî ket. Behane. :Heger tu naxwazî biçî kar, hema neçe, bes li hêcetan negere.: *pend* :Bi hêceta silkê xwe gehand kutilkê ;ango dema merem ji gotin yan kiyara mirov ne ew bi xwe be lê tiştek mezintir be.

**Hêdî** (hn.çewa) 1. Kiryareka mirov li ser xwe û bi dilê xwe bi ke , lez nekit. . 2. Navê mêrane. Br× Lezgîn.

**Hêdîhêhî** (hn.dar.çewa) Gelek hêdî. Hêdî.

**Hêdîka** (hn.dar.çewa) Hêdî. Pêdizkî. : Ez hêdîka derkevtim da zaro ji xew ne rabin.

**Hêdîkirin** (k.jn.l.mê) Sistkirin. Leza wî/wê/wan kêmkirin. Kêmkirin. : Leza tirombêlê hêdî ke. : Dengê televisyûnê hêdî ke.

**Hêj** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo karê ne bûye bi kar di hêt..Ta noke. Ta vêgavê. Heşta. : Eve hêj tu li malî ?.

**Hêja** (hn.x.çewa) 1.Birûmet. Birêz. Rêzdar. Tu mirovekê hêjayî. 2. Navê jin yan mêrane.

**Hêjandin** (k.jn.x.mê) Nirxandin. Bilindragirin. Helsengandin.

**Hêjîr** (n.x.mê) ***fêqî*** Hijîr.

**Hêjmar** (n.x.mê) Hijamar.

**Hêjmartin** (k.jn.x.mê) Hijmarin. Hijmartin.

**Hêk** (n.x.mê) Tuxmê giyandarane, ji kevilek req û xir yan hekî [lûle]pêkhatîye di navda şileyek tîr heye du pişkin spîlk û zerik.Hêkên mirîşk, çûçik, qaz, û htd. : ***Pend*** :Hêka dîkilî ;ang jibo tiştê êkcarî kêm yan qetlazî dibêjin. ***Pend*** :Hêka evro çêtire ji mirîşka sube. ***Pend*** :Hêk her hêke û tameke, çi sor,zer yan keske.***Pend*** :Hêka dilmê ye. Ang ; mirovê gelek xwe nazik di ke.

**Hêkanê** (n.dar.mê) *yarî* Lîstikeka kevina kurdewarîye , çend kes di rûnin û serê hêkan lêk diden, yê ko hêka hemberê xwe bişkênit ya sersax bi mînit, dê serkevit û herdu hêk bo wî di mînin.

**Hêkerûn** (n.l.mê) Xwarineke ji hêk û rûnî dirist di kin, bi hevra di qelînin.

**Hêkeyî** (hn.dar.çewa) *endaze* Şêweyê mîna hêkê lûleyî.Şêweyê erdî hêkeyî ye.

**Hêkî** (hn.dar.çewa) *endaze* bn :Hêkeyî.

**Hêkker** (hk.dar.çewa) Giyandarên hêkan di ken. : Mirîşka hêkker.

**Hêkkirin** (k.jn.l.mê) Dema giyandar, nemaze balinde, hêkan di kin. :Çûçikê hêkek kir.

**Hêl** 1 (n.x.mê) Xîça bi qelemî yan her tiştek din kêşayî. Gîx. Xîç.

**Hêl** 2 (n.biyan .x) Corek biharatane di kin nav ça yan xwarinê jibo tama wê xweş bi be.

**Hêl** 3 (cugirn.x.mê) Al. Rex. :Sêmêl li hêla Duhokê ye.

**Hêlan** (k.jn.x..mê) 1. Tişekî li cîyekî danî û ne bizivînî. : Min kitêba a xwe li cem wî hêla . 2. Karekî kuta bi kî. Dest jê berdan. :Birayê min cigare hêlan. 3. Destûrdan. Rêdan. 4.Navê jinane. (K): Bdn: ez di hêlim em dihêlîn, tu dihêlî hûn dihêlin, ew dihêle[..it] ewan dihêlin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di hêla di hêlan. Db,dûr: hêlabû,..bûn.(F): bi hêle bi hêlin.

**Hêlane** (n.x.mê) Hêlîn.

**Hêlanek** (n.dar.mê) Colandik. Hêzik.

**Hêlik** 1(n.x.n) *leş* Endamekê cot yê guhnelîya candarên nêre. Gun.

**Hêlik** 2 (n.x.mê) Hêk.

**Hêlîn** (n.x.mê) 1. Mala teyr û tewal bi pîş û pelexî çêdikin û hêkên xwe di daninê. 2. Navê jinane.



**Hêlîn**

**Hêlkan** (n.x.mê) Hêlanek. Colandik.

**Hêlke** (n.x) Hêk.

**Hêma** (h.x.mê) Çember. Sîmbol. Nîşan.

**Hêmin** (hn.x.çewa) 1. Hêdî. Aram. 2. Navê mêrane.

**Hênan** (k.jn.x.mê) Anîn. Înan. Hînan.

**Hêncet** (n.x.mê) Hêcet.

**Hênik** (hn.x.çewa) Hûnik. Fênik.

**Hênikbûn** (k.jn.l.mê) Hûnikbûn.

**Hênikkirin** (k.jn.l.mê) Hûnikkirin.

**Hêr** (hn.x.çewa) Mirovê hay ji xwe nebit. Difinbilind.

**Hêran** (k.jn.x.mê) Hûrkirina danî, xwarinê. :Genim bi distarî hêra. Bi aşî hêra.(K) bdn :ez di hêrim em dihêrîn, tu dihêrî hûn dihêrin, ew dihêre[..it] ewan dihêrin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di hêra , di hêran. Db,dûr : Hêrabû,… bûn. (F): bi hêre bi hêrin.

**Hêrandin** (k.jn.dar.mê) Dan hêran. Hatin hêran. Hûrkirin.

**Hêrifandin** (k.jn.dar.mê) Herifandin.

**Hêrifîn** (k.jn.x.mê) Herifîn.

**Hêris** (hn.x.çewa) Tore. Enirî. Xeyîdî. :Seydayê me îro gelek ê hêrise.

**Hêrisbûn** (k.jn.l.mê) Torebûn.Enirîn. :Ez nizanim wî çiye, gelekê hêris bûy!. :Tu bi xubê hêris nebe. (K) bn : Bûn.

**Hêriskirin** (k.jn.l.mê) Torekirin. Enirandin.:Te ez hêris kirin. :Min tu hêris kirî. (K) bn:Kirin.

**Hêrisok** (hn.dar.çewa) Silsilok. Tore. Navçavgirê.: Tu çendê hêrisokî, min nikare henekan bi te ra bi ke!.

**Hêriş** (n.x.mê) Êrîş.:Hêrişa pêşmergehî bo ser çeperên dijminî li spêdê dest pê kir.:Hêrişeka berfireh.

**Hêrişanîn** (k.jn.l.mê) Êrişbirin. :Dujminî hêrişek mezin anî ser devera rizgarkirî.

**Hêrişbirin** (k.jn.l.mê) Êrişbirin.

**Hêrişkirin** (k.jn.l.mê) Êrişkirin.

**Hêrîn** (k.jn.x.mê) Hêran.

**Hêro** (n.x.mê) 1. *gul* Guleka ciwane reng spî, sor,pîvazî htd, li çiyên Kurdistanê hişîn di be.2. Navê jinane.

**Hêsan** (hn.x.çewa) Sanahî. Xurî. Sivik. Br× Çetin.

**Hêsanbûn** (k.jn.l.mê) Sanahîbûn. :Hatinûçûn roj bo rojê hêsan tir di be.(K) bn : Bûn.

**Hêsandin** (k.jn.dar.mê) Sanahîkirin.

**Hêsanî** (hn.dar.çewa) Sanahî. Sanayî.

**Hêsankirin** (k.jn.l.mê) Sanahîkirin. (K) bn: Kirin.

**Hêsil** (n.x.mê) Curnekê taybetîye ji; ber, kils yan darî hatîye diristkirin, jibo çêkirina doşavê. ûsle.

**Hêsîr** (hn,n.x.çewa.dz) Dîl. Bend. Êxsîr.

**Hêsk** (n.x.mê) *yarî* Lîstikek dilvekere, werîsek bi darekê ve hilawîstî , herdu serên wî li xarê girê di din û mirov têda di rûnit û xwe di hijînit. Hêzok.

**Hêstir** 1 (n.x.mê) Dilopên(çipik) avê yên ji çavan di barin. Rondik. :Hêstirên çavên wê mîna tevîya baranê di barîn.

**Hêstir** 2 (n.x.dz) *dewar* Giyandarek malî ye tuxmê ji ker û mahînane yan hesp û makeran. *Pend* :Suxra hêstiran rûvîyan bazdan.



**Hêstir**

**Hêşta** (pêrb.dem) *rêzman* Hêj.Hêjta. Hêşta babê min yê li xestexanê. :Hêşta wî jin ne anî ye!.

**Hêştir** (n.x.dz) *candar* Deve.

**Hêşû** (n.x.nêr) Îşîyê tirî.

**Hêt** (n.x.nêr) *leş* Hestîyê ranî. Ran.

**Hêtê** (n,gazkirin.dar.mê) *rêzman* Jina leng. Jina li dema rêveçûnê di lenge.

**Hêto** (n,gazkirin.dar.nêr) Mêrê leng.

**Hêtûn** (n.x.mê) Komir. Êtûn.

**Hêvên** (n.x.nêr) 1.Nivişe her tiştekî yê ko ji wî peyda di bin. 2.Hêvênê, mastî, penîrî ,htd jibo mehandinê bi kar di hêt.

**Hêvî** (n.x.mê) Hîvî.

**Hêvîdar** (hn.dar.çewa) Daxwazker. Hîvîdar.

**Hêvîkirin** (k.jn.l.mê) Hîvîkirin. Daxwazkirin. (K) bn :Kirin.

**Hêvkirin** (k.jn.dar.mê) Berêxwedan. Temaşekirin.Nêrîn. Mêzekirin. Meyzandin. (K) bn: Kirin.

**Hêwer** (n.x.nêr) Birayê mêrî[jibo jinê]. Tî.

**Hêwirandin** (k.jn.dar.mê) Xwecihkirin. (K) bdn: ez di hêwirînim em di hêwirînîn, tu di hêwirînî hûn di hêwirînin, ew di hêwirîne[..it] ewan di hêwirînin. Pr: dê bi+bdn. Bdb :di hêwirand, di hêwirandin. Db,dûr: hêwirandibû,… bûn. (F): bi hêwirîne, bi hêwirînin.

**Hêwirîn** (k.jn.x.mê) Xwecihbûn. Hewyan. (K) bdn: ez di hêwirim em di hêwirîn , tu di hêwirî hûn di hêwirin, ew di hêwire[…it] ewan di hêwirin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di hêwirîm, em, hûn, ewan di hêwîrîn.tu,ew di hêwirî. Db,dûr : ez hêwirîbûm,em hêwirîbûyn, tu hêwirîbûy, hûn,ewan hêwirîbûn, ew hêwirîbû. (F): bi hêwire bi hêwirin.

**Hêz** (n.x.mê) 1.Şiyana fîzîkî(leşî) . :Hêza xwe lê taqî kir. :Kareke ji hêza min mezintire. Karîn. Tundî. 2.Yekeyeka leşkerîye ji çend pêşmergeyan pêkhatîye.

**Hêzan** ( hn.dar.çewa) Mirovê,candarê bi hêz. :Azad xortekê hêzane.

**Hêzdar** (hn.dar.çewa) Hêzan. Bi hêz.

**Hêzok** 1 (hn.dar.çewa) Tiştê di hejit. Livok. Leqok.

**Hêzok** 2 (n.dar.mê) Hêsk.

**HHK** (kurt) Hukometa Herêma Kurdistanê.

**Hicmetî** (hn.x.çewa) Seyr. Semere. Hêbetî. :Wey dayê çi xortekê hicmetîye ?.

**Hicmetîbûn** (k.jn.l.mê) Hêbetîbûn. Seyrman. :Te çiye tu hosa hicmetî bûy ?.(K) bn : Bûn.

**Hicmetîkirin** (k.jn.l.mê) Hêbetîkirin. (K) bn : Kirin.

**Hiçhar** (n.dar.mê) Bîbera sor ya har. Bîbera tîj.

**Hiçik** (n.x.nêr) Cihê destên mirovî têra derdikevin ji kirasan. Kirasê hiçikkurt , hiçikdirêj. Çîlan.

**Higvîn** (n.dar.nêr) Xwarinek pir şirîne di nav şanan da mêşhingvîn çêdiket.Hingiv. Hingvîn. **Hijandin** (k.jn.x.mê) Tiştê mîna hêskê di bizivit. Hejandin.Leqandin. Livandin. : Landik hijandin. Dest hijandin. (K) bdn: ez di hijînim em di hijînîn, tu di hijînî hûn di hijînin, ew di hijîne[…it] ewan di hijînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di

heijand, di heijandin. Db,dûr: hijandibû,.. bûn. (F): bi hijîne bi hijînin.

**Hij<u>deh</u>** (hijn.çend) Hejdeh.

**Hij<u>îr</u>** (n.x.mê) *fêqî* 1. Dareka belg pane, berdare.2. Fêqîyek xweş û şirîne gelek cor û reng hene. *Pend* :Hat dema tefsik û hijîran, malêd me xweştirin ji yêd mîran.



**Hijîr**

**Hijmar** (n.x.mê) Hejmar. 1,2,3,70, htd.

**Hijmar<u>tin</u>** (k.jn.mê) Zanîna çendîyê. Rêzkirina hijmaran. (K) bdn: ez di hijmêrim em di hijmêrîn, tu di hijmêrî hûn di hijmêrin, ew di hijmêre[…it] ewan di hijmêrin. Pr:dê[bi]+ bdn. Bdb: di hijmart, di hijmartin. Db,dûr: hijmartibû,.. bûn. (F): bi hijmêre bi hijmêrin.

**Hik<u>met</u>** (n.x.mê) Deshelat. Hukomet. Civata wezîran.

**Hil<u>anîn</u>** (k.jn.dar.mê) 1.Bilindkirin. Rakirin. Rahijtin. 2. Tolhilanîn; tolevekirin.(K) bdn: ez di hilînim, em di hilînin, (F): bi hilîne.

**Hilavê<u>tin</u>** (k.jn.dar.mê)1.Derkevtina xwarinê ji gedey di rêya devî da ji egera pîsbûna zadî yan nesaxîyê. Hilandin. Dilrabûn. 2.Tiştekî bilind bihavêjî. :Zarokê xwe ji keyfan di hilavêt. Ang; xwe bilind di kir. Di hilavên, bi hilavêje,…. .

**Hilawîs<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Wekî mirov tiştekî bi tayekî ve girê de û bi darek yan cihek bilind ve bi girde. Daleqandin. :Xwe bi darê ve hilawîst. (K) bdn: ez di hilawîsim em di hilawîsîn, tu di hilawîsî hûn di hilsawîsin, ew di hilawîse[..it] ewan di hilawîsin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di hilawîst, di hilawîstin. Db.dûr: hilawîstibû, …. Bûn. (F): bi hilawîse, bi hilawîsin.

**Hil<u>ber</u>** (n.x.mê) Ber. Berhem.

**Hilberan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Berhemanîn. Geşkirina aborî.

**Hilbijar<u>tin</u>** (k.jn.dar.mê) Jêgirtin. Ji nav girtin. Bijartin. :Kesekî hilbijêrin jibo nûnerî ya mirovî di dezgehekî da bi ke. (K) bn: Bijartin.

**Hilbi<u>jêr</u>** (hk.dar.çewa) Mirovê mafê dengdan û hilbijartinê hebe. Yê dengê xwe di de berbijarekî. BR× Berbijar. Berbijêr.

**Hilbûn** (k.jn.dar.mê) 1. Agir berdane tiştekî. Agir hilbû. Pêkevtin. 2. Bi ser kevtin. Serevrazbûn. :Ew hilbû çiyayî.

**Hilciniqandin** (k.jn.dar.mê) Ciniqandin.

**Hilciniqîn** (k.jn.dar.mê) Ciniqîn.

**Hilçinîn** (k.jn.dar.mê) Dema bendik yan dezî têk di alizin. Alizîn. :Kasêt hiçinî. Xirvebûna davê liser êk.

**Hilço** (n.x.nêr) Darikê hilawîtina cilikan. Cildank.

**Hildan** (k.jn.dar.mê) 1.Bilindkirina her tişt jibo serî. Hilgirtin.,serhildan. delinghidan.2. Kezaxtin. :Dara berî, mazî hilda.(K): ez hildidim em hildidîn, tu hildidî hûn hildidin, ew hildide ewan hildidin. (F): (bi) hilde hildin.

**Hilêvirîn** (k.jn.dar.mê) Tiştê dapoşî hilêvirîn,ang; der, dergeh, dervank, û htd liser rakirin. :Qazan ya hilêvirî. (K) bdn : ez di hilêvirim em di hilêvirîn, tu di hilêvirî hûn di hilêvirin, ew di hilêvire[...it] ewan di hilêvirin. Pr: dê [bi] +bdn. Bdb: di hilêvirî, di hilêvirîn.Db,dûr: hilêvirîbû, hilêvirîbûn[bi]. (F): bi hilêvire, bi hilêvirin. Br×Nixavtin.

**Hilêvirî** (hk,rd.dar.çewa) Amanê bê serpoşk. Dervank liser rakirî. Ev xwarine ya hilêvirî ye. BR× Peçinî.

**Hilgavtin** (k.jn.dar.mê) Hilgirtin. Rakirin. (K) hilgavêje, di hilgavêjin.

**Hilgirtin** (k.jn.dar.mê) 1. Tiştekî bi dest rakey. Rakirin. 2. Danana tiştî jibo heyamekê. : Me berka nav malê ya hilgirtî tanî zivistanê.Veşarin, veşartin. (K): Ez hildigirim em hildigirîn, tu hildigirî hûn hildigirin, ew hildigirit ewan hildigirin. (F): bi hilgire bi hilgirin.(K) bn :Girtin.

**Hilingivîn** (k.jn.x.mê) Dema bi rêveçûnê berek yan her tiştek bi kevit ber pêyan, mirov bi kevit yan bi setimit. Setimîn. (K) bdn: ez di hilingivtim em di hilingivtîn, tu di hilingivî hûn di hilingivtin, ew hilingive[...it] ewan di hilingivtin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di hilingivtim, di hilingivtîn, di hilingivtî, di hilingivtin. Db,dûr: Hilingivtibûm,.bûyn, bûy, bû.. bûn. (F): bi hilingive bi hilingivin.

**Hilkehilk** (n.dar.mê) Dengê hatinûçûna bêhina mirovî dema westanê. Bêhin bi ser kevtin.

**Hilkehilkkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov hilkehilkê di ke. :…hinî mandî bûye, yê hilkehilkê di ke.(K) bn : Kirin.

**Hilkêşan** (k.jn.dar.mê) Rakêşana tiştekî ji çalekê yan cihekê khûr bi hêza fîzîkî. Deranîn. Înan derê. : Dixtorî didanê wî hilkêşa. Dahêran. :Dûkela cigarê hilkêşa. :Setlê ji bîrê hilkêş.:Pîyêd xwe hilkêşe ber xwe. (K) bn: Kêşan.

**Hilkirin** (k.jn.l.mê) 1.Pêkirin. Berdanê. Agir hilkirin. 2. Derînan.

**Hilkişandin** (k.jn.dar.mê) Deranîn. Înan der. Qurtifandin. (K) bn: Kişandin.

**Hilkişîn** (k.jn.dar.mê) Bilindbûn. Serevrazbûn.

**Hilm** (n.x.mê) 1. Gaza bi av ya ji encamê kelîn yan gerimbûna avê radibit.2.Bayê gerim ê ji devê mirov derdikevit.

**Hilo** (f) Rabe. Rabe ser xwe.

**Hilperiştin** (k.jn.dar.mê) Hilbûne evrazî. Serkevtin. : Ew hilperişe kevirî.

**Hilşandin** (k.jn.x.mê) bn :Helişandin.

**Hilû** (hn.x.çewa) Tiştê hilû;ango yê ne zivir, ko tişt liser di hilisin. Dîwarê hilû, Dergehê hilû, pora hilû,sabûna hilû.

**Hilûbûn** (k.jn.l.mê) Dema tiştek hilû di be. : Paş rengkirinê dîwarê me yê hilû bûy. (K) bn: Bûn.

**Hilûkirin** (k.jn.l.mê) Dema cilek bi hêt hilûkirin. : Didanên xwe bi firçekirinê hilû kirin. :Pora xwe hilû kir. (K) bn: kirin.

**Hilweryan** (k.jn.dar.mê) 1.Tiştê bi kevit xwar. Weryan. Daqutan. :Dar hilweryaye,ango belgên wê hemû weryane.2. Lewazbûn. :Ev mirove yê hilweryayî. (K) bn :Weryan, weran.

**Hilweşan** (k.jn.dar.mê) Jinavçûn. Neman (K) bn: Weşan.

**Hilweşandin** (k.jn.dar.mê) Biryarekê bi hiweşînit.Jinavbirin. Pûçkirin. . :Parlementa Kurdistanê piranîya biryarên ser dema rijêmê hilweşandin. (K) bn: Weşandin.

**Him** (pêrb) ***rêzman*** Alavê wekhevkirinê.Hem.Heman.

**Himban** (n.x.mê) Pîstê kewalan di serda di hînin xar(di gurên) mûyê wî jê diken paş hişk di bit dibe kevil jibo tê kirina dan û pêdvîyên malê. ***Pend*** :Erzankiro himban diro.ang; yê pir mitayên erzan bi kire, dê himbana wî dirit û ziyan gehit malê, jiber hindê mitayê kêm û çak bit bila giran bit.

**Himber** (n.dar.mê) beramber.:Mala me li himber ya wane. :Ez li himber wî rawestam.

**Himbêz** (n.x.mê) Hembêz.

**Himbêzkirin** (k.jn.l.mê) Hembêzkirin.

**Himbil** (hn.x.çewa) Cilikên peritî, dirayî. Kinçir.

**Himhim** (n.dar.mê) *deng* Dengûdor. Dengê sofîyan li mizgefta.

**Hin** (pêrb) *rêzman* Jibo kes yan tiştê nebinavkirî. :Hin dizanin û hin nizanin. : Hin bi mînin û hin werin.

**Hinar** (n.x.mê) *fêqî* 1. Dareke bibere. 2. Core fêqîyeke xire dindikdare, gelek cor û tam hene.



**Hinar**

**Hinare** (n.dar.mê) Şand. Hinartî

**Hinarik** (n.dar.nêr) *leş* Cot hestîyên di kevin bin herdu çavan li ser rûyên mirovî.

**Hinarin** (k.jn.x.mê) Şandin. Virêkirin. (K) bdn: ez di hinêrim em di hinêrîn, tu di hinêrî hûn dihinêrin, ew di hinêre[…it] ewan dihinêrin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hinart, di hinartin.(F): bi hinêre bi hinêrin

**Hinarî** 1 (n.x.mê) Xirîk.

**Hinarî** 2 (hn.dar.çewa) Core rengeke, ber bi sorekê geş ve ye, wek rengê hinaran.

**Hinartin** (k.jn.x.mê) bn :Hinarin.

**Hinav** (n.x.pir) *leş* 1.Valayîya navbra bergê giyadarî û endamên nav zik û singî. 2. Mêranî. :Ew miroveke bi hinave; angomêrçake.

**Hinavreş** (hn.l.çewa) Zikreş. Dilreş. :Wey bira eve çi jineka hinavreşe!.

**Hinavsotî** (hk.l.çewa) Dilsotî. Kovandar.

**Hinavşîn** (hn.l.çewa) Zikreş. Hinavreş.

**Hincar** (n.x.nêr) Alaveke cotyar jibo kêlana erdî bi kar di hînin. :Hincarê cotyarî bi erdî ra şikest. Hevcar.

**Hincinîn** (k.jn.x.mê) Pirtikandin. Çirandin. :Canê wî bi guleyan hat hincinîn. (K) bdn: ez di hicinînim em di hincinînîn, tu di hincinînî hûn di hincinînin, ew di hincinîne[…it] ewan di hincinînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hincinand, di hincinandin. Db,dûr : hincinnandibû,… bûn. (F) : bi hincinîne, bi hincinînin.

**Hincirandin** (k.jn.dar.mê) Givaştin. Pestandin.

**Hinchinc** (hk.dar.çewa) Parçeparçe. Pirtpirt.

**Hinchinckirin** (k.jn.gl.mê) Hincinandin.

**Hind** 1 (pêrb) ***rêzman*** Kes yan tiştê nebinavkirî.

**Hind** 2 (hk.cih.cugr,n) Hindistan.

**Hinda** (hn.x.çewa) Berze. Nexuya .Nediyar. :Ev çend salin lawê wî hinda ye.

**Hindabûn** (k.jn.l.mê) Berzebûn.(K) bn: Bûn. : Pareyên wî li aqarî hinda bûn.

**Hindakirin** (k.jn.l.mê) Berzekirin. (K) bn: Kirin.:Heta gore dî,pêlav hinda kir.

**Hindav** (hk.cih) Li alîyê serî. : Ez hatim hindav serê wî li ser kevirî. : Gundê me di keve hindav çemî.

**Hindek** (pêrb) ***rêzman*** Hind.***Pend*** :Hindek pê mirin, hindek bo mirin.***Pned*** :Hindekan wey bab û wey babe, hindekan bist û kebabe.

**Hindik** (hn.dar.çewa) Piçek. Kêm. Pîçek.: Axivtina te hindike, lê rindike.

**Hindikahî** (hn.dar.çewa) Kêmatî. Kêmayetî.: Kurd li Iraqê ne hindikahîye.

**Hindikbûn** (k.jn.l.mê) Kêmbûn. Li kêmî dan. (K) bn: Bûn.

**Hindikkirin** (k.jnl.mê) Kêmkirin. (K) bn: Kririn.

**Hindistan** (hk.cih.curgir,n) Welatê hindîyan.

**Hindî** 1 (netew,n) Xelikê Hindistanê.

**Hindî** 2 (pêrb) ***rêzman*** 1.Alavê çendîyê ye. Herçend. Çend. :Hindî bêjî ew xortekê hêjaye. : ***pend*** Hindî bi mînîn dê bînîn. ***Pend*** :Hindî li benda tebim, dê her ev male bim. 2. Temet. Hevjî. : Xanîyê me hindî yê weye. :Ez û tu hindî êkîn.

**Hindur** (hk.cih) Navxwe. Navxo. : Li hidurî welat. Br× Derve.

**Hinek** (pêrb) Hindek.

**Hiner** (n.x.nêr) Huner.

**Hinermend** (kar,n.dar.dz) Pispor di warê hunerî da.Hunermend.

**Hingav** (n.dar.mê) Pêngav.

**Hingavtin** (k.jmê) Gurzek bi tiştekî bikevit û ziyan bi gehitê. Birîndarkirin. Lêdan. Lêxistin. :Firokeşikênan firokek hingaft. (K) bdn: ez di hingêvim em di hingêvîn, tu di hingêvî hûn di hingêvin, ew di hingêve[..it]ewan di hingêvin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di hingaft, di hingaftin. Db,dûr : hingavtibû, … bûn. (F): bi hingêve bi hingêvin.

**Hingê** (hk.dem) ***rêzman*** Wê serdemê. Dema berê.Hîngê.

**Hingijtin** (k.jn.dar.mê) Mirov ji çavtarî xwe bi havêt tiştekî. Lêpalebûn. Hingijtine tiştî : Bezînê, xwe avêtinê.(K) bdn: ez di hingijim em di hingijîn, tu di hingijî hûn di hingijin, ew di hingije[…it] ewan di hingijin. Prdêbi +bdn. Bdb: ez di hingijîm em di hingijîn, tu di hingijî hûn di hingijîn, ew di hingijî ewan di hingijîn. Db,dûr: ez hingijîbûm em hingijîbûyn, tu hingijîbûy hûn hingijîbûn , ew hingijîbû ewan hingijîbûn(bi bûn). (F): bi hingije, bi hingijin.

**Hingil** (n.x.nêr) ***candar*** 1.Zendik.Çingil.2. Kemax. Til.

**Hingiv** (n.x.nêr) Hingivîn. :Hingivê zozan pir xweşe.

**Hingivîn** 1 (n.dar.nêr) Xwarina şirîn û bi tam ya mêşhingiv çê di ke. Hingiv.2. Mirov yan tiştê mîna hingivînî rind û şirîn.

**Hingî** (hk.dem) Hîngê. Hîngê.

**Hingilîsk** (n.dar.mê) Gustîlk.

**Hinik** (pêrb) ***rêzman*** Kes yan tiştê Nediyar. Hinek.

**Hir** (n.x.nêr) Bayê bi hêz û toz. Hur.

**Hirç** (n.x.dz) ***ginawir*** Candarek kûvîye,şîrdere, dirindeye, li daristan û çiyan dijît. ***Pend*** :Hirç candareka xirabe, çunko hêkan na ket.***Pend*** :Hirça bi kudî ne berde dora gundî. ***Pend*** :Hirç û cot rûvî û gêre!.



**Hirç**

**Hirên** (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî.Dengê hirî. :Dengê hirêna baye, diyare dê baran bait?.

**Hirhir** (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê bayî. Hirên.2. Dengek nexasime şivan bi kar di hînin jibo hawîşkirina kewalên xwe.

**Hirî** (n.x.mê) Mûyên pezî. :Hirîya mihan. :Hirîya baranan. : Sakoyê ji hirî yê pir getme.

**Hirmî** (n.x.mê) Hirmîk. :Hirmî fêqîyekê bi tame.



**Hirmî**

**Hirmîk** (nax.mê) *fêqî* 1.Dareka fêqîye. 2. Fêqîyeke berê dara hirmîkêye.

**Hisan** (n.x.nêr) Berav.:Hisanê me yê berzeye, niza li kîrê ye. :Das bi hisanî xweş kir.

**Hisîk** (n.x.mê) *giya* Hişînkatîyekê dême, tiraşa wê bi stirî ye, xemil keske berê wê xir yan dirêjoke, di keskin, zaro di beran di hisîn şûna wê sor di be. Dema hişik di be di hêrin û arê wê di gel şekirê têkel di ken û di xun. Xurnîfk.

**Hisîn** (k.jn.x.mê) Tîjkirina devê das, kêr, sator, htd. Seqakirin.(K) bdn: ez di hisîm em di hisîn, tu di hisî hûn di hisin, ew di hise [..ît ] ewan di hisin. Pr:dê bi+ bdn. Bdb : di hisî, di hisîn. Db,dûr : hisîbû, …bûn. (F): bi hise bi hisin.

**Histewr** (hn.x.çewa) Stewir. Xirş.

**Histukur** (n.x.mê) *candar* Sto. Stukur.

**Hiş** 1 (n.x.mê) Ageh. Hoş.

**Hiş** 2 (ferm.hişbûn) Fermane jibo bêdengkirinê bi kar di hêt.

**Hişar** (hk.cih..x.mê) Hişargeh.

**Hişargeh** (hk.cih.dar.mê) Cîyê bi av û daristan jibo hewana , bêhinveda şivan, karwanî û pêşmergan.

**Hişavtin** (k.jn.x.mê) Dahîran. Qurçandin. Bi hişêve, di hişêvin.

**Hiş** (hk.x.çewa) Bêdeng. Mit.

**Hişbûn** (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Mitbûn. Kuro hişbe, heger dê te derêxim !. (K) bn : Bûn.

**Hişk** (hn.x.çewa) Zuha. Neter. Neşil. :Dara hişk. :Cilikêd hişk. :Berê hişk. : devê hişk.

**Hişkandin** (k.jn.x.mê) Hişkkirin.

**Hişkatî** (n.dar.mê) Dema nehatina baranan, erd zuha di be. : Jiber hişkatîya evsale, av kêm bûn û seqa gerim bû..

**Hişkav** (h.cih.l.çewa) Tişt yan cihê ji hişkî û avê pêkhatî.

**Hişkavî** (hn.l.çewa) Giyandarên jîyana wan di avê û hişkayî da, wek beq.

**Hişkbûn** (k.jn.l.mê) Zuhabûn. :Kanîya gundî evsale ya hişk bûy. (K) bn: Bûn.

**Hişkesalî** (n.l.mê) Sala bê rêjî, ya berf û baran ne, yan kêm bi barit.

**Hişkirin** (k.jn.l.mê) Bêdengkirin (K) bn : Kirin.

**Hişkî** (hn.dar.çewa) Hişkatî.

**Hişkkirin** (k.jn.l.mê) Zuhakirin. . Av jê birîn. Zuhakirin. (K) bn: Kirin.

**Hişsivik** (hn.l.çewa) Bêmejî. Kamaqil.

**Hiştin** (k.jn.x.mê) Hêlan. Bi cih hêlan. Jê geryan. :Min perên xwe li mal hiştin. :Rih hiştin. Ang ; rih berdan.

**Hişyar** (hn.dar. çewa) 1. Kesê herdem çeleng bit. Ne nivistin. Haya wî hebit.2. Navê mêrane.

**Hişyarbûn** (k.jn.l.mê) Ji xewrabûn.Agehdarbûn. Bi agehhatin. Berhevbûn. (K) bn: Bûn.

**Hişyarî** (n.dar.mê) Ne nivistin. Çelengî. Zêrevanî.

**Hişyarkirin**(k.jn.l.mmê) Ji xewrakirin. Agehdadrkirin. Ez dil nadem ji xew hişyar bi kem. (K) bn: Kirin.

**Hivdeh** (hijn.çend) Hevdeh. 17.

**Hivdehem** (hijn.çend) Ya/yê/yên  hevdê.

**Hizar** (hijn.çend) Hijmêareke. 1000.

**Hizêlk** (n.dar.mê) Çaleke fêqî tê dixin.:Evê zivistanê em dê bi fêqî xinê bîn, çunkî hizêlka pire.

**Hizir** (n.x.mê) Bîr. Aşûp. : Hizrek hat bîra min. : Ez herê di hizirêd wî da.

**Hizirîn** (k.jn.x.mê) Hizirkirnn. (K) bdn: Ez di hizirim em di hizirîn ,tu di hizirî hûn di hizirin, ew di hizire[…it] ewan di hizirin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di hizirîm em di hizirîn, tu di hizirî hûn di hizirîn, ew di hizirî ewan di hizirîn. Db,dûr : ez hizirîbûm em hizirîbûyn, tu hizirîbûy hûn hizirîbûn, ew hizirîbû, ewan hizirûbûn(bi bû). (F) : bi hizire, bi hizirin.

**Hizirkirin** (k.jn.l.mê) Bîrkirin. : Hizra xwe bi ke dûra biryarê bi de.

(K) bn: Kirin.

**Hizirvan** (pîşn.dar.dz) 1. Kesê nivîsînên hizirî di danit. Xudanhizir. 2. Navê zelamane.

**Hizirvanî** (karn.dar.mê) Karê hizirvanan.

**Hîç** (pêrb.neyînî) Ne çi . Tune. : Hîç kes,der, tişt û htd.

**Hîlandin** (k.jn.x.mê) Dengê hespan. Şihîn. :Hesp ji tirs û birsê di hîlîne.

**Hîlhîl** (n. dar.mê) *deng* Dengê kenîya mirovan dema ji dûr ve bilind di be. :Eve çi hîlhîle, ma we çi bihîste ?.

**Hîm** (n.x.nêr) Bingeh. Şengiste.

**Hîmdanan** (k.jn.l.mê) Bingeh danan. Şengiste danîn.

**Hîmdaner** (kar,n.l.dz) Kesê berê hîmê di dane. Kesê bingehê di dane.

**Hîmdanîn** (k.jn.l.mê) Hîmdanan. :Hîmê gundekê serdem hat danîn.

**Hîn** (pêrb) *rêzman* Hêşta. :Ew hîn xuya nebûye.

**Hîna** (pêrb) *rêzman* Hîn.Ta niha.

**Hînan** (k.jn.xmê) Înan. Anîn. Ez di hînim. Hûn di hînin, bi hîne. (K)bn: Înan.

**Hînbûn** (k.jn.l.mê) Fêrbûn.(K): ez hîndibim em hîndibîn, tu hîndibî hûn hîndibin, ew hîndibit ewan hîndibin.(F): hîn bibe hînbibin.

**Hînga** (hk.dem) Hîngê. Hingê.

**Hîhik** (hn.dar.çewa) Hûnik. Fênik. :Rojeka hînik.

**Hînkirin** (k.jn.l.mê) Fêrkirin. : Mamosta qutabîyan hînî mûzîkayê di ke.(K) bn: Kirin.

**Hîphop** (n.dar.mê) Darîn.Darînqûz. :Were em herin yarîya hîphopê.

**Hîphopkirin** (k.jlgl.mê) Bi hîphopê lîstin. Zarokên hîphopê di ken. (K) bn:Kirin.

**Hîr** (hn.x.çewa) 1.Hûr. Biçûk. :Ew peyayekê hîre. Br×Gir. 2. Pirt. Ker.

**Hîrandin** (k.jn.x.mê) *deng* Şihîna hespan. :Hespî hîrand.

**Hîrbûn** (k.jn.l.mê) Biçûkbûn. Kerbûn. Pirtbûn. Têkçûn. Br×Girbûn. (K) bn : Bûn.

**Hîrde** (n.dar.nêr) Pareyê hîr, wek sênt, filis.

**Hîrê** (gaznx.mê) 1. Naznav û navê bangkirina jina hîr. 2.Navê jinane.

**Hîrik** (hn..dar.çewa)1. Pişka hîr. 2. Mirovekê hîr. 3. Dûr. : Hîrik hizira xwe bi ke.

**Hîrkirin** (k.jn.l.mê) Pirtkirin. Kerkirin.(K) bn: Kirin.

**Hîro** (hd,gazn.dar.nêr) 1. *rêzman* Gazîkirin jibo zelamê hîr. 2. Navê mêrane.

**Hîşar** (n.x.mê) Dersokeka tenik û rengîne jin di êxin pora xwe.Hîjar. Hîzar.

**Hîv** (n.x.mê) bn :Heyv.

**Hîvî** (n.x.mê) Daxwaz. Hez. Vîyan. Xewin. :Hîvîya min serkevtina te ye.

**Hîvîdar** (hn.dar.çewa) 1. Kesê hîvîyan di xwazit.2. Navê kur û kiçane.

**Hîvîkirin** (k.jn.l.mê) Daxwazkirin. (K) bn : Kirin.

**Hîwa** (n.x) Hîvî.

**Hîzar** 1 (n.x.nêr) Mişar.

**Hîzar** 2 (n.x.mê) Hîşar.

**Hîzil** (cugir,n) Çemeke[rûbar] li Kurdistanê.

**Ho** 1 (n.x.mê) Eger. Sedem.

**Ho** 2 (pêrb,gazî) *rêzman* Alavê gazî-bangkirinê.:Ho gavano!!!!.

**Hoba** (hk.cih..x.mê) Cihê (aqarê) mirov lê xîvetan vedidin û xwecih di bin, jibo çerandina terş û kewalê xwe. Koçerat.

**Hodeng** (n.dar.mê) *rêzman* Deng yan navên gazîkirinê, mîna; ho, wa, ey, gelo û htd.

**Hogir** (hn.dar.çewa) 1. Mirovê bi tiştekî( xwarin, vexwarin)ê ve bi hêt girêdan û nekare bi hêle. 2. Navê mêrane.

**Hojîn** (n.x.dz) 1. Gazîkirina jînê.Gazindekirin ji jiyanê.2. Navek kurdî du zayende.

**Hol** (hk.cih,n.x.mê) Rex. Alî. Hêl.

**Holenda** (hk.cih,cugir,n) Welatek ewropayî ye.

**Holendî** (malb,n) 1. Kes yan zimanê holendî. 2. Mitayê Ji Holenda.

**Holik** (n.x.nêr) Kolk. Kol. Zinc.

**Honer** (n.x.mê)1. Tiştê têkelî bi kelepor,çand mûzîk, htd heye.Huner. 2. Navê jinane.

**Honermend** (pîşn.dar.dz) 1. Kesê ji honerî dizanit, şareza bit.2. Navê kurane.

**Honermendî** (karn.dar.mê) Karên honermend di kin.

**Hophopk** 1 (n.dar.mê) *tewal* Corekê balindeyane.

**Hophopk** 2 (n.dar.mê) Darînqûz.

**Hophopkanê** (n.dar.mê) Yarîya hophopkê. :Zarok hophopkanê di ken.

**Hosa** (pêrb.pêvegir) *rêzman* Nîşadana mînakekê. Fêrkirin. Rasterêkirin.Berdewambûn di peyvîna da. :Hosa ne bêje. Hosa diriste. Hosa hat û hosa çû. Hosa rindtire.

**Hosajî** (pêrb.dar) *rêzman* Herhosa. Hosa.

**Hosta** (pîşn.x.dz) 1.Kesê pispor di warê avarkirina xanî û piran da. *Pend* :Hosta ne ji dil kir, dîwar xwar kir. Şareza. Seyda. Pispor.

**Hostayî** (karn. mê) Karê hotayan. Karê avakirina xanîyan. Şarezayî. :Hostayî karekê bi mifaye.

**Hostayîkirin** (k.jn.l.mê) Weke meriv karê hosta di ke; ango xanîyan ava di ke.: Niho tu çi kar di kî? Ez hostayî di kim.(K) bn: Kirin.

**Hoş** (n.x.mê) Hiş. Ageh.

**Hoşdar** (hn.dar.çewa) Xwedî hoş. Hişyar.

**Hoşdarî** (n.dar.mê) Hişyarî. Agehdarî.

**Hoşdarîdan** (k.jn.gl.mê) Agehdarkirin. :Nojdaran hoşdarî daye welatîyan ,ko fêqîyê neşûştî ne xun.

**Hoşeng** (n.dar.dz) 1. Hişyar. 2. Navek kurdî duzayende.

**Hotov** (pêrb.pêvegir) *rêzman* Hosa. Wetov.

**Hov** (hn.x.çewa) Mirov yan desteya dûr ji sincê mirovantîyê. Xwînmêj. Dirinde. Bêwujdan. :Rijêmeka hov. :Dujminê hov.

**Hovberî** (n.dar.mê) Dirindeyî. Xwînmêjî.

**Hovîtî** (n.dar.mê) Dirindeyî. Xwînmêjî. :Hovîtî a dujmin.

**Hoz** (n.x.mê)  Malbat.Ûcax. Êl. Eşîr.Civak. :Hoza biradostî. Hoza Şikak.

**Hozan** (n.x.mê) 1. Hesbest. Riste. .:Hozana kilasîk. Hozana nûxaz. 2. Stiranbêj. 3. Navê keçan û xortane.

**Hozanvan** (karn.dar.dz) 1. Yê hozana di nivêse. Kesê helbestan di vehîne. 2. Navê mêrane.

**HSK** (kurtkirî) Heyva Sora Kurdistanê.Rêxistîyeke alîkarîya qurbanîyên çam û cengan di ke.

**Hulû** (hn.x.çewa) Hilû.

**Humban** (n.x.mê) Himban.

**Hundir** (nl.mê) Navîn . Navxwe.Di nav da.

**Huner** (n.x.nêr) Honer.

**Hunermend** (pîşn.dar.dn) Honermend.

**Hunermendî** (karn.dar.mê) Honermendî.

**Hur** (n.x.nêr) Bayek bihêz. Bahoz. :Duhî hirekê mezin hat.

**Hurdar** (hn.dar.çewa) Bi hur. Rojeka hurdar;ang rojeka bi hur.

**Hurmiz** (n.x.kevin) *kevin* Xuda di dînê badînî da[ zerdeştî].

**Hurûba** (hn.n.l.mê, çewa) Hur. Toz. Hurdar.Bahoz. :Jiber hurûbayî em nikarin ji mal derkevin.

**Hûçik** (n.x.nêr) Hiçik.

**Hûnîn** (k.jn.x.mê) Vehandin.

**Hûphûpik** (n.dar.mê) *tewal* Hophopk.

**Hûr** (hn.x.çewa) Hîr. Br× Gir.

**Hûrbîn** (n.dar.mê) 1. Mîkroskop.2. (hn.l.çewa) Mirovê di kar û kiryaran da hûrik û rêkûpêk.

**Hûrbûn** (k.jn.l.mê) Hîrbûn. Çavên wî hûr bûne.Br× Girbûn.

**Hûrkirin** (k.jnl.mê) Hîrkirin. Pirtkirin. : Pîvazan hûr bi ke. Giyayî hûr di ke.Br×Girkirin.

**Hûrhûr** (hn.dar.çewa) Gelek hûr. Pirtpirt.:Hûrhûr baranê lê kir.

**HTD** (kurtkir) Heta dûmahîyê.Heta dawîyê.

**HWD** (kurtkir) Herwekî din. Herwesa. Heta dawîyê.

# I

**I** Pîta yazehê ji abeya kurdî.

**Incîl** (n.x.mê) Încîl.

**Ingirandin** (k.jn.x.mê) Hêriskirin. Torekirin. (K) Bdn: ez di ingirînim em di ingirînîn, tu di ingirînî hûn di ingirînin, ew di ingirîne [..it]ewan di ingirînin.Pr:dê bi + bdn. Bdb: di ingirand, di ingiranddin.Db,dûr: ingirandibû, …bûn. (F): bi ingirîne, bi ingirînin.

**Ingirîn** (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di ingirim em di ingirîn, tu di ingirî hûn di ingirin, ew di ingire[…it] ewan di ingirin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di ingirî, di ingirîm, di ingirîn. Db,dûr :ez ingirîbûmem ingirîbûyn, tu ingirîbûy hûn ingirîbûn, ew ingirîbû, ewan ingirîbûn(bi bûn). (F) : bi ingire, bi ingirin.

**Inirîn** (k.jn.x.mê) Torebûn. Enirî. (K) bdn : ez d inirim em di inirîn, tu di inirî hûn di inirin, ew di inire[…it] ewan di inirin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : ez di inirîm em di inirîn, tu di inirî hûn di inirîn, ew di inirî ewan di inirîn.Db,dûr :ez inirîbûm em inirîbûyn, tu inirîbûy hûn inirîbûn, ew inirûbû, ewan inirîbûn,(bi bûn). (F) : bi inire, bi inirin.

**Int** (hn.x.çewa) Bêhintengî.

**Intên** (hn.dar.çewa) ***deng*** Ji kerban da dengek ji mirovî di hêt. Kerb.

**Intênhatin** (k.jn.l.mê) Dengê intênê ji kerban ji mirovî di hêt. : Bi erdî keft intên jê hat. : Ji kerban da intên jê hat.(K) bn : Hatin.

**Istekan** (n.x.mê) Piyale.

# Î

**Î** Pîta duwazdehê ji abeya kurdî.

**Îblîs** (n.biyan.nê) Xudayê şer û xirabîyê.

**Îca** (pêrb) ***rêzman*** Evca. Vêcarê.

**Îcax** (n.x.mê) Êl . Hoz. Tîre. Malbat. :Tu ji lîjan îcaxê yî?.

**Îdis** (n.x.cîha.mê) Nexweşîyeka kujeke, bi rêya guhnelî xwînê di hêt veguhaztin.

**îflîc**(n.x.mê) ***derd*** falince.

**Îflîcbûn** (k.jn.l.mê) Nesaxbûn bi falincê.Rastî nexweşîya falincê hatin.

**Îhanet** (n.x.mê) Xwefirotin.

**Îhanetkirin** (k.jn.l.mê) Xwefirotin.

**Îlon** (hk.dem.x.mê) Meha êkê ji werzê payîzê. Meha neh.Eylol. :Şoreşa îlonê.

**Îm** (cih.x) ***rêzman*** Ev. Eve.

**Îmam** (nbiyan.x.nêr) Zanayî olî[dîn] yê ko gotarên dînî ji bo musilmanan di bêjit, nexasim rojên înî. . mela.

**Îmro** (hk,dem) Evro. Îro.

**Îmsal** (hk.dem) Evsal. Îsal.

**Îmza** (n.x.mê) Hêmaya nemaze ya kesekî jibo pejirandina her krekî , ko her mirovek îmzayeka nemze liser kaxezê bi kar di hînit.Mor.

**Îmzakirin** (k.jn.l.mê) Mirov îmzaya xwe liser kaxezê di ke. Morkirin. (K) bn: Kirin.

**Îmzakirî** (hk.çewa) Hatî îmza kirin. Morkirî. :Kaxeza îmzakirî.

**În** (hk.dem. mê) Roja bêhinvedan ji karî û nizakirin li cem musilmanan.Eynî.

**Înan** (k.jn.x.mê) Anîn. Hînan. :Te jin înaye?. :Here xwarinê bo xo bîne. (K) bdn: ez di înim em di înîn, tu di înî hûn di înin, ew di îne[…it]ewan di înin. Pr:dê + bdn. Bdb : di îna, di înan. Db,dûr : înabû, …bûn. (F): bîne bînin.

**Înandin** (k.jn.x.mê) bn : Înan.

**Înca** (pêrb) *rêzman* Evca. Vêca.

**Încîl** (n.x.mê) Kitêba pîroz ya dînê mesîh.

**Îngilîz** (malb.) 1.Kesên ji neteweya îngilîzî.

**Îngilîzî** (n.dar.mê) Zimanê yan kelûpelên îngilîzan.

**Înî** (nx.mê) bn : în.

**Îprax** (n.x.mê) Xwarineka kurdîye belg, bîber, kulind, hd, pir birnc û goşt dikin dilênin.

**Îran** (hk.cih.wel.x.mê) Welatê îran.

**Îranî** (malb,n.dar) Kes yan tiştê îranê.

**Îraq** (hk.cih.wel,nx.mê) Welatê Iraqê.Weletê ereb,kurdan û neteweyên din.

**Îraqî** (malb,n.dar) Kes yan tiştê ji îraqê.

**Îrlanda** (hk.cih.wel,n) Welatek ewropayîye.

**Îrlandî** (malb,n) Xelik yan mitayê ji îrlanda.

**Îro** (hk.dem) Evroj. Evro. :Emê îro herin mala cîranê xwe. :Îro roja yekê ye ji payîzê.

**Îroke** (hk.dem) Evroke. Evro.

**Îroyîn** (hn.çewa) Tiştê îro. Mitayê evro. : Nanê îroyîn.Rojnameya îroyîn.

**Îsal** (hk.dem) Evsale. Evsal. : Îsal em dê herin seredana kurê xwe li dervey welat.

**Îsk** (n.x.mê) Ji egera xwarinê hind caran dengek mîna fîtê digel bayî ji gerîya mirov di devî ra di derkevit bê viyan.

**Îskandinavî** (nej,n) Xelikê welatên îskandinavîya.

**Îskdan** (k.jn.l.mê) Dema îsk ji mirovî di hên.

**Îskkirin** (k.jn.l.mê) bn: Îskdan.

**Îskvedan** (k.jn.l.mê) bn :Îskdan.

**Îslam** (din,n.x.mê) Dînê musilmanan. :Piranîya kurdan îslamin.

**Îslamî** (dîn,n. dar) Mirovê ku bawerîya wî bi ola îslamê heye. bawerî û rewiştên îslamê.

**Îsrayîl** (hk.cih.wel,n) Welatê îsrayîlîyan.

**Îsrayîlî** (nej,n.dar) Xelikê yan ji welatê îsrayîl. Mitayê îsrayîlî.

**Îstgeh** (n.dar.mê) Îzgeh.

**Îstîkan** (n.x.mê) Perdaxa çayê. Piyale.

**Îş** (n.x.nêr) Kar. Şol. :Îşê min pire. : Tu çi îş di kî?.

**Îşev** (hk.dem) Evşeve. :Îşev cejin a Newroze. Îşev ez na nivim jiberko filmekê xweş heye.

**Ìşî** (n.x.nêr) 1. Bireka dan ,dindikan bihevre. Çend tilîyên tirî bi katekêve. 2. Çend kes bi hev ra piyasek yan rêpîvanekê rêxin.

**Îşîkkêş** (hn.l.çewa) Kesê serkêşîya desteyeka mirovan di ke, li dema rêpîvanan da.

**Îşîkkêşan** (k.jn.l.mê) Rêpîvan. Li hev civyan. Xwe nîşadan.

**Îşk** (n.x.mê) Girêya jibo tundkirina baran bi darekê qayîm çend caran di hêt badan bo peytkirina barî.

**Îşkav** (n.x.mê) Sindoq. Elbik. :îşkava nanî.

**Îşker** (karn.dar.dn) Mirovê rêncber. Pale. Karker.

**Îşkirin** (k.jn.l.mê) Karkirin. Şolkirin. (K) bn:Kirin.

**Îşqilk** (n.dar.mê) Lîztineke mirov li ser lingekî radiweste û lingê din bi destî ra di gire û di çe.

**Îşqilkkirin** ( k.jn.l.ê) Yarîya îşqilkê di kin. (K) bn: Kirin.

**Îvan** (n.x.nê) Navê mêrane.

**Îtir** (pêrb) *rêzman* Êdî.

**Îzgeh** (hk.cih.dar.mê) Cihê xirvebûna tirombêlan, pasan. bingehê belavkirinan, mîna tevizyûn, radyo..

# J

**J** (je) Pîta sêzdehê ji abeya kurdî.

**Jajerûn** (n.l.mê) Xwarineke ji jajî û rûn ên di nav êk da qelandî di hêt berhevkirin. :Firavîn evroj jajerûne.

**Jajî** (n.x.nêr) ***rêçal*** Berhemekê spîyatîye, ji dewê civirkirî di gel sîrkan yan giyayên din tê diristkirin di ken cerkan. Rêçal.

**Jajîrûn** (n.l.mê) Jajerûn.

**Jakaw** 1 (hn.x.çewa) Hov. Kûvî. Dirinde.

**Jakaw** 2 (hn.x.çewa) Qurmiçî.

**Jan** (n.x.mê) 1.Êş. Derd. 2 kovan. :Jana min pir girane.

**Janazirav** (n.l.mê) ***derd*** Nexweşîyeke li sihêd mirovî di kevit. Sile.

**Jandan** (k.jn.l.mê) Êşan. Didanê min janan di dit.

**Jandar** (hn.dar.çewa) Bi jan. Bi êş.

**Janeser** (n.l.mê) Serêşan. :Jiber janeserê min hay ji xwe nîne!.

**Jangirtin** (k.jn.l.mê) Jandan.

**Janê** (n,gaz.dar.mê) Naznava jina leşêş.

**Jankirin** (k.jn.l.mê) Jandan. Êşan. : Didanê min yê janan di ke. (K) bn: Kirin.

**Jano** (n, gaz.dar.nêr) Naznavê mêrê leşêş.

**Japan** (hk.cih.weln.mê) Welatê japanîyan. Yaban. Japon.

**Japanî** (malb,n) Xelik yan tiştê Japanî.

**Japon** (hk.cih.wel,nhk,cih) Japan.

**Jar** 1 (hn.x.çewa) 1. Hejar. Belingaz. Melîl. :Zarokê bi jarî û jîrê hatîye xudankirin. 2. Jan. Derd.

**Jar** 2 (n.x.mê) Jehir. :Jara marî. :Jara zerkêtkê.

**Jarav** (hk.da.çewa) Bijîn. Jêrav.

**Jaravbûn** (k.jn.gl.mê) Bijînbûn. Paqijbûn. :Ev amane baş jarav nebûne!.

**Jaravkirin** (k.jn.gl.mê) Piştî amanan di şon avekê liser di kin jibo kefa sabûnê pêve nemîne û bijîn bi be. (k) bn: Kirin.

**Jaravkirî** (hk.l.çewa) Amanên hatîne jaravkirin. Bijîn.

**Jarbûn** (k.jn.l.mê) 1. Hejarbûn. 2. Melûlbûn.: *pend* Jin ji bêmêrî har di bin, mêr ji bêjinî jar di bin.(K) : Bûn.

**Jarê** (n, gaz.dar.mê) 1. Jina melûl û bê gêwil. Kovandar. 2. Navê jinane.

**Jarî** (n.dar.mê) 1.Hejarî. Belingazî. 2. Melûlî.

**Jarîn** (k.jn.x.mê) Girîn. Nalîn.

**Jarkevtin** (k.jn.l.mê) Hejarbûn.

**Jarkirin** (k.jn.l.mê) Hejarkirin.

**Jaro** (gazn.nêr) 1 Nazanv û navê bangkirin ê peyayê jar û melîl. 2 Navê zelamane.

**Jebeş** (n.x.nêr) *fêqî* Fêqîyekê mezin, naviksor, dindik(tovik) reşe, pir av û tama wî şirîne. .Zebeş.

**Jehir** (n.x.mê) Şileyeka kujeke li cem giyandaran û giyayan heye. Jehir a mar, dûpişk, stêng, û htd.

**Jehirdan** (k.jn.l.mê) Cadar û giyayên jehir ê di rêjin, di den.

**Jehirdar** (hn.l.çewa) Candar û giyayên bi jehir. : Marê jehirdar. Br× Bêjehir.

**Jehirkirin** (k.jn.l.mê) Dema candar yan giya jehirê di kin nav leşî.

**Jehrav** (n.l.mê) Jehir û av bi hev ra. av û jehir êd têkel.

**Jehremar** (n.l.mê) Jehir a maran.

**Jehrîn** (hn.dar.mê) Xwedî jehir. Jehirdar. : Marê jehrîn.

**Jem** (n.x.mê) Danek xwarinê . Jema nîvro. Danê nîvro. Dem. Zeman.

**Jeng** (n.x.mê) Madekê sorê ser qehweyî ve, ji egera av ketina ser asinî peyda di bit.

**Jengar** (hk.dar.çewa) Asinê jengîbûyî. Asinê jengar; ango asinê jengdar. Jenggirtî.

**Jengdar** (hk.dar.çewa) Jengî. Jenggirtî.

**Jenggirtin** (k.jn.l.mê) Dema jeng asinî di girit.

**Jenggirtî** (hk.l.çewa) Kanzayê jengê girtî. Jengîbûyî.

**Jengî** (hk.dar.çewa) Jengê girtî. Asinê jengî.

**Jengîbûn** (k.jn.l.mê) Jenggirtin.

**Jengîkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov kanzayekî, nemaze asinî li ber avê, baranê bi hêlit, tanî jeg di girit.

**Jengîn** (hn.dar.çewa) Jengar. Jengdar.

**Jenîn** (k.jn.x.mê) 1. Livlivîna ronahîyê ji dûrve. 2. Lêdana amûrên mûzîkê. Tembûr jenîn. (K)bdn : ez di jenim em di jenîn, tu di jenî hûn di jenin, ew di jene[..it] ewan di jenin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di jenî, di jenîn. Db,dûr :jenîbû, jenîbûn. (F): bi jene bi jenin.

**Jê** 1 (n.x.mê) Dav. Divêle.

**Jê** 2 (pêrb) ***rêzman*** Digel. Pêra. 3 Jinav. Lê. Ji wî,wê,wan, hewe, me û htd. ***Pend*** : Ne me jê û ne tê.ang ; me çi têkelî bi wê kiryarê ve nîne, ne ji dûr û ne ji nêz.

**Jêber** (n.dar.mê) Pirteka lastîkîye jibo jê birina nivîsê bi kar di hêt.

**Jêbir** (n.dar.mê) Jêber.

**Jêbirin** (k.jn.l.mê) Nehêlana şûnwarê tiştî. Kêmkirin. Navê min jêbir. Yekê ji çarê bibe, di mînin sê. 4-1=3. (k) bn : Birin.

**Jêbûn** (k.jn.l.mê) Jê peyda bûn. Jê ve kirin. :Ew li sala 1975 an ji dayk bûye.

**Jêçûn** (k.jn.l.mê) Ji nav çûn. Jê kêmbûn- kirin.: Nasnameya min kevte di avê da hemû nivîsîn jê çûn. :Dehan pênc jê bi çin di mînin pênc; 10-5=5. (K) bn: Çûn.

**Jêder** (n.dar.nêr) ***rêzman*** Jê der di kevit .Çavkanî. Lêker. :Jêderekê bawer pêkirî got;…, :Jêderê hat, hatine. :Jêderê çû çûn e.

**Jêderenav** (n.l.mê) ***rêzman*** Peyveke jêder û nav,ang; ji jêder û navî pêk di hêt. wek; karkirin. xwarin, hatin, mirinû htd. çend jêderenav hene: xurî mîna kirin, dan, kujtin, birin û htd. darijtî: mîna dakirin, vekirin, dasepandin û htd. Lêkdayî: mîna karkirin, sertiraşîn, serjêkirin, jêkcudabûn û htd. Gelek lêkdayî: mîna biserûberkirin, desttêwerdan û htd. Çavkanî.

**Jêgerîn** (k.jn.l.mê) Bela xwe jê vekirin. Lêgerîn. Bi cih hêlan. Dest jê berdan. : Dê jê gere camêr !.

**Jêgirtin** (k.jn.dar.mê) Tiştê mirovî bivêt ji yên din bigirit. hilbijartin. : Min ji xwe ra ciwantirîn qelem jê girt. (K): ez jêdigirim em jêdigirîn, tu jêdigirî hûn jêdigirin, ew jêdigirit ewan jêdigirin. (F): jêbigire jêbigirin.

**Jêgirtî** (hk.l.çewa) Hilbijartî. Bijartî.

**Jêhatin** (k.jn.l.mê) 1. Pêçêbûn. Karîn. Şiyan. ***Pend*** : Lêhatin çêtire ji jêhatinê. Ang; şens pêtir rolê xwe di lîze ji şiyana mirovî. 2. Li ser hatin. : Cilikên kurdî gelek ji te di hên. (K) bn: Hatin.

**Jêhatî** (hk.l.çewa) 1. Kesê kiryar bi dest ve di hên.Bi kêrhatî. Hêja. Peyt. 2. Xwedî hêz. :Gizîrê gundê me mirovêkê pir jêhatîye!.

**Jêhelî** (n.dar.nêr) Evrazî. Br× Jordanî. ***Pend*** :Her jêhelîyekî jordanîyek heye.

**Jêk** (hn.dar.çewa) Ji êk. Digel êk. Bihevre.:Em dê lîstoka biranê bi kin ez û tu jêk.

**Jêkanê** (n.dar.mê) Yarîyên(lîstik) zarokan dema di bin birbir. Çend bir. Ref. : Ez, tu û haval jêk, û yên dî hemû jêk.

**Jêkanîn** (k.jn.dar.mê) Jêgirtin.

**Jêkcudabûn** (k.jn.ggl.mê) Cudabûn. Ji êk cuda bûn.

**Jêkcudakirin** (k.jn.ggl.mê) Ji êk cuda kirin. Ji hev dûr kirin. Jêk ve kirin.

**Jêkçûnepaş** (k.jn.ggl.mê) Ji hev dûr kevtin. Jêk silbûn. :Erê te zanîye cîranêt yêt jêk çûyne paş?.

**Jêkdûrkevtin** (k.jn.ggl.mê) Ji hev dûr keftin. :Dujminan wesa li me kir ko em jê dû bi kevîn.

**Jêkirin** (k.jn.l.mê) Jêk ve kirin. Jêbirin. Jê derêxistin. Birîn. Piçandin. : Serê berxê jê kir.

**Jêkkirin** (k.jn.gl.mê) Ji hev dûr kirin. :Wan bêbextan em jêk kirîn. :Tivenga xwe jêk bi k!.

**Jêkvebûn** (k.jn.gl.mê) Cudabûn. Jêk çûn paş. :Eve demhijmêreke du kelabang berbûne hev û hêj jêkve ne bûne. (K) bn : Bûn.

**Jêkvekirin** (k.jn.gl.mê) Cudakirin. Ji hev dûr xistin. (K) bn : Kirin.

**Jêlelî** (n.dar.nêr) Evrazî. Jêhelî.

**Jêr** (hk.cih) Bin. Xwar Li xwar. : Gundê me di kevit jêr çiyayekê mezin. Br× Jor.

**jêrda** (hn.da.biziv) Senta ber bi xwarê. Jibo binî.Ber bi jêr. Br× Jorda.

**Jêrde** (alv.biziv) bn : Jêrda.

**Jêrî** (hn.çewa,hk.cih) .Binî. Kurmancîya jêrî. Xwarê. Br× Jorî.

**Jêrîn** (hn.çewa, hk.cih) Jêrî.

**Jêvekirin** (k.jn.l.mê) Jêkirin. Qurtifandin. Birîn.: Çima te mînakê xwe ji dîwarî ve kir?.(K) bn: Kirin.

**Jêza** (n.dar.mê) Nejad. Tuxim. Nivş. Resen.

**Ji** (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdana hevokane. :Ji tera, ang; jibo te. :Ji Amed ta Duhok çende?. Ji meha avdarê ta xizîranê seqa yê Kurdistanê ê xweşe.: Ji te pêve min kes navê.

**Jibilî** (pêrb) ***rêzman*** Alavê bijartinê. Bêy. : Hemû kes di karin pişkdarî ahenga me bi bin jibilî Aştî. Bijlî.

**Jiber** 1 (pêrb) ***rêzman*** Gotina di serê mirovî da dihêt tomarkirin û mirov bizanit bêy xwandin yan nêrîn. : Ev zaroke gotinêd nivêjan jiber di zane. : Helbesteka pir xweşe, lê mixabin ez jiber nizanim.

**Jiber** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavekê eger û mercane. :Jiber te ez ahtim. :Jiber çi te we kir?.

**Jiberkirin** 1.(k.jn.gl.mê) Wane, helbest, çîrok û htd di mejî yê xweda tomar bikî û bêy nêrîn bi karîbêjî.: Hozanvanî hemû hozanêd xwe jiber kirîne. (K) bn: Kirin.

**Jiberkirin** 2 (k.jn.gl.mê) Di ber xweda înan. Ji xwe kirin. Xwe şelandin, gihorîn. Êxistin. : Cilên xwe jiber xwe kirin.: Sakoyê xo jiber xo kir.(K) bn: Kirin.

**Jiberko** (pêrb.merc) *rêzman* Alavê mercê ye. Ango. Çunkî. Jiberko Hêja qutabîyekê zîreke, mamostay xelat kir.

**Jibo** (pêrb) *rêzman* Alavê hebûnê ye. : Jibo dîtina te ez hatim vêrê.

**Jibona** (pêrb) *rêzman* Jibo. Jipêxemet.:Jibona serferazîya Kurdistanê me xebat kir.

**Jider** (pêrb) Ji derve. Derve. : Ez ji der di hêm. Br× Jinav.

**Jidêla** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo cihgirtinan bi kare. li Şûna. Li cihê. Pêşve. Bi navê. : Mamosta jidêla birêvebirî di axive.

**Jidil** (hn.dar.çewa) Mirov karekî bi kêfa dilê xwe bi ke. Mirovî pê xweş bit. Pir. Gelek. :Ez jidil supasî ya te di kim ko tu hatî seredana min. : Em jidil pîrozî yê li te di kin jiber serkevtina te.

**Jih** (n.x.mê) Kezîk. Dav. Simbêl.

**Jihevkirin** (k.jn.gl.mê) Jêkvekirin. Cudakirin. : Dujminî em ji hev kirîn.

**Jihevxistin** (k.jn.gl.mê) Jihevkirin.

**Jij** (n.x.nêr) Goşt bizimanê zarokan.

**Jijî** (n.x.dz) *candar* Jîjî.

**Jikerve** ji kherve (hn.dar.çewa) Jinişkêve. Bêdengîve. :Eve çi bo tu hema jikerve bi jor keftî ?.

**Jimare** (n.x.mê) Hijmar. 1,2,3,4,..

**Jimardin** (k.jn.x.mê) Hijmartin.

**Jimartin** (k.jn.x.mê) Hijmartin.

**Jimeboştir** (n..l.dz) Jimeçêtir.

**Jimeçêtir** (n.l.dz) bn : Ecine.

**Jimêje** (hk.dem) Dema derbazbûyî. Berî noke. Di kevin da. : Kengî xandina te bi dawî hat?. Jimêje. :Ji mêje em li benda vê rojê.

**Jimêryar** (n.dar.mê) Amêrê hijmartinê.

**Jimêryarî** (karn.dar) Xwandin yan karê hijmaritin û jêk vavartina perê di hêt û di hêt mezaxtin.

**Jimêrvan** (pîşn.dar.dz) Kesê karê hijmartin û vavartina hatî mezaxtinê di ke.

**Jin** (n.x.mê) Zayendêmê yê mirovan. Nivşê mirovan yêd mê. Pîrek. Afret. Kulfet. ***Pend***: Jin male binyat xanî, mixabin jina baş bikevit destê nezanî. ***Pend*** :Jina xirab berde, mêrê xirab derde. ***Pend*** :Jinin mêran pêş di xin. ***Pend*** :Jinê bihîne ji malan mizgînîyê bi de xalan. ***Pend*** :Jina bêkes, nanê reş, dewê tirş, mala min xirab di kin.***pend*** : Jinê çav lidere, mêr xwelî sere. ***Pend*** :Jin stûna malê ye. ***Pend*** :Jin heye terşa malê, jin heye rewşa malê. ***Pend*** :Jinê, were pişta minê, da te bigêrînim li dinê, dayka minê bela serê minê. ***Pend*** : Jin hene gula mêrê xwene, jin hene kula mêrê xwene. ***Pend*** :jin gula malane, jin derdê mêrane. ***Pend*** :Jina baş, şûrê pişta mêrane, ya xirab derdê êşa girane. ***Pend*** :Jin kanîya jînê ye, dil kanîya vînê ye. ***Pend*** :Jinan çav li jinan kir, mala mêran xira kir.***Pend*** :Karên jinan, bîsûçarin, du jê di diyarin, ewjî nan û girarin.

**Jinane** (hn.dar.çewa) 1. Nivşê mê.2. Cil, pêlav, zêr kar û htd yêd jinan. : Ev kirase jinaneye!.

**Jinanîn** (k.jn.l.mê) Jin anîn. Jin înan. Jinînan.Cotbûn. (K) bn: Anîn. ;Wî xortê hat hêjta jin ne anîye?.

**Jinap** (n.l.mê) Jina apê mirovî. Jinmam.

**Jinbab** (n.l.mê) Dema bab jineka din liser jina xwe ya xwedî zaro di hînit yan piştî mirin yan berdana daykê. Jina babê. Zirdayk. ***Pend*** :Jinbabê, kafirbabê, ez birsîme li pişt dolabê.

**Jinbav** (n.l.mê) Jinbab.

**Jinbira** (n.l.mê) Jina birayê mirovî.

**Jinbîra** (n.l.mê) Jina birayê jina mirovî. Jina xizim ê mirovî.

**Jinebî** (n.dar.mê) bn : Bîjin.

**Jinik** (nanz,n.dar.mê) Nazikkirina jin ê. Jin.

**Jinişkêve** (hn.çewa) Demildest. Êkser. Ji xafilkîve.

**Jinînan** (k.jn.l.mê) Dema jinek digel mêrekî girêbenda hevjînîyê îmza di kin. Dema mirov jinê di hînit. Avakirina xêzanê. Markirin. (K) bn: Înan. ***Pend*** :Jinê bîne ji eslîya avê bîne ji kanîya da bibînî xweşîya.

**Jinkok** (naz,n.dar.mê) Nazkkirin yan biçûkkirina jinê. ***Pend*** : Jin hene û jinkok jî hene. Ang; jinên çak û xirab hene.

**Jinmam** (n.l.mê) Jina birayê babê mirovî. Jina mamê mirovî. Jinap.

**Jinpisman** (n.l.mê) Jina pismamê mirovî. Jina kurê mamê mirovî.

**Jinpisxal** (n.l.mê) Jina kurê xalê mirovî.

**Jintî** (n.l.mê) Jina birayê mêrê her jinekê.

**Jinxal** (n.l.mê) Jina birayê dayka mirovî. Jina xalê mirovî.

**Jivan** (n.x.mê) Dema mirov di gel êkî rê bi kevit jibo hev dîtinekê li dem û cihêkê diyarkirî. *Pend* : Jivana jîjî,ang; eger mirovî jivan di gel êkî hebû, û diyar nebû. Jivana bê wic.

**Jixwe** 1.(hn.dar.çewa) Bê mifa. Bêwic. Kêrnehatin.

**Jixwe** 2 (pêrb) Bo agehdarî. Jibo zanîn. Herçende.

**Jiyan** (k.jn.x.mê) 1.Candarên di karin bêhina xwe bi stînin û derêxin, xwarinê di xwen, di bizivin, wrarê di kin. Br× Mirin. (K) bdn : ez di jîm em di jîn, tu di jî hûn di jîn, ew di jî[..ît] ewan di jîn. Pr :dê bi + bdn. Bdb : ez di jiyam, tu di jiyay, ew di jiya, hûn, ewan, em di jiyayn. Db,dûr : ez jiyabûm, tu jiyabûy, ew jiyabû, em jiyabûyn, hûn, ewan jiyabûn. (F) : bi jî, bi jîn. 2. Navê keçane.

**Jiyandin** (k.jn.mê) Wekî mirov çavdêrîya candar yan darûbarî di ke ta bijî.

**Jiyanname** (n.l.mê) Mirov dîroka jiyana xwe yan ya yekî di nivîse, yan tomar di ke, kanê çi kirîye, ji kîrê ye, kî bû û htd.

**Jî** 1 (n.x.nêr) Temen. :Jîyê te çende ?. :Xudê jîyê te gelek dirêj ke.

**Jî** 2 (pêrb) *rêzman* Alavê hevberkirinê. Weke hin kar, kiryar, tişt endam û htd wekhev bin. : Ez jî wek te qutabîme. :Ew jî ji Kurdistanê hatî ye. : Gotina te jî raste.

**Jîjik** (n.x.dz) bn: Jîjî.

**Jîjî** (n.x.dz) Jûjî. Giyandarek kûvî, bi sitirîyan dapoşîye. *Pend* :Jîjîko, daygorîko, bê stirîko,. Ang ; herkes pesina tiştê xwe di de.

**Jîman** (n.dar.dz) Navek kurdî dutuxme.

**Jîn** (n.x.mê) Jîyan.

**Jîndar** (hn.dar.çewa) Yê ko di jî. Candar. Jiyandar.

**Jîndarî** (n.dar.mê) Jiyan bi ser birin. Dinyadarî.

**Jîndewar** (hn.dar.çewa) Candar. Zîndewer.

**Jînenîgarî** (n.l.mê) Jiyanname.

**Jîngeh** (hk.cih,dar.n.mê) Cîyî jîyana giya û giyandaran. :Pêdvîye em jîngeha Kurdistanê bi parêzin.

**Jînhat** (n.dar.dz) Navek kurdî yê jin yan û mêrane.

**Jînjan** (n.l.dz) Navek duzayende.

**Jînsal** (n.l.mê) Temen. Jî.

**Jînvan** (ndar.dz) Navek kurdî duzayende.

**Jînwar** (n.l.dz) Navek kurdî duzayende.

**Jînyar** (n.l.dz) Navek kurdî duzayende.

**Jîr** (hn.x.çewa) Mirovê jîr, ang; mirovê zîrek, hoşmend. :Zarokê jîr.

**Jîrane** (hn.dar.çewa) Zîrekane. Pehlewanî. Hişyarî.

**Jîrî** (hn.dar.çewa,n.mê) Zîrekî.

**Jo** (pêrb) bn: Jibo.

**Jojî** (n.x.dz) bn: Jîjî.

**Jor** (hk.cih) Serî. Bakûr. Evraz.Ode.

**Jorda** (hn.çewa) Bizava ber bi serîve. Serevraz. Ber bi jor.Br× Jêrda.

**Jorde** (hn.çewa) bn: Jorda.

**Jûjî** (n.x.dz) Jîjî.



**Jûjî**

**Jûr** (hk.cih.n.x.mê) Mezel. Olîk. Eywan. Xanîyê wê ji pênc jûran pêk di hêt.

**Jûrî** (hk.cih.mê) Serî. Bakûr.Br× Jêrî.

# K

**K** (ke) Pîta çardehê ji abeya kurdî.

**Ka** 1.(pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarkirina kesek yan tiştek nedîyar. :Ka Azad?. :Ka pirtoka min?. :Ka tu li kîve yî?.

**Ka** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo daxwazê bi kar di hêt.: Ka bêzehmet were vêrê. :Ka dê rawese camêr!. : Ka tu bi xudê bêdeng bi be!.

**Ka** 3 (n.x.mê) ***kha*** Qesela genim yan ceh, piştî cencerkirinê danî jê cuda di kin, jibo alîka candaran bikar di hêt.

**Kab** (n.x.nêr) Hestîyekê navbera gehên pêyên kewalî piştî vekuştina wan di hînin der jibo mezin û zarokan, pê di lîzin.

**Kabanê** (n.dar.mê) Yarîyeke(lîstik) bi hilavêtina kaban , eger kete ser tîyekê xwe yê çal, bi

xalekê ye , ser tîyê hilî bi du xalane.***Pend*** :Kabê bêvan kesî yê hatî.Ang: bo mirovê bi şens û bextsipî di hêt gotin.

**Kabanêkirin** (k.jn.l.mê) Bi kaban lîztin. :Werein gelî gundîyan da kabanê bi kîn.

**Kabanî** (n.x.mê)1. Jina karê malê bi rêve di bit. Xwedîya malê. 2. Jina mêrkirî. :Kabanîya Serdarî ya nesaxe. ***Pend***: Xwarina du kabanî çêken dê ya swîr yan bêxwê bit.

**Kabgolik** (hn.l.çewa) Mirovê kabên wî mîna yên golikan stûr.ango :Hestîgiran. Dargiran.

**Kabira** (n.dar.nêr) Kesek nediyar. Navînay. Navbirî. :Evro kabirayekî gundor li kolanê di firotin.

**Kabîne** (n.biyan) 1. Hukmet. : Kabîneya çarê ya HHK.2. Jor yan fagone.

**Kabînet** (n.biyan) bn: Kabîne.

**Kaçanî** (n.x.pir) Amanên xwarinê. Aman. :Kaçanîyan jarav bi ke.

**Kaçik** (n.x.nêr) Amêreke ji dar yan hesin (fafon) hatîye çêkirin mirov jibo xwarin û vexwarinê bi kar di hînin, pir cor, reng û qebare hene wek: kaçikên xwarinê, çayê, zadlênanê û htd. Kefçik.

**Kadan** (n.dar.mê) bn: Kadîn. :Ka di kadanê da rizî. :Kadana kayê.

**Kade** (n.x.mê) Nanek nexasime, girkên biçûk yên hevîrî pir di kin ji gwîz, xurme, kakilbahîv, û htd, di tenûran da sor di kin jibo rojên cejin û şahîyan. Sawik. Kolîçe.

**Kadir** (n.biyan.dz) Kesê zanîn di her warî da hebin wek; ramrarî, teknîk, nojdarî û htd bi xwandin û rêya zandoran . Şareza. Pispor.

**Kadiz** (n.l.dz) Mirovê dizîya kayê di kit. Rêya kadizan; Xîçeka spî li asmanan jiber ko wek kayê diyare bi (rêya kadizan) navkirîye.

**Kadîn** (n.dar.mê) Cîyê yan xanîyê kayê têda di higirin. Kadan.

**Kafir** (hn,biyan.çewa) Mirovê karên dijî qanûnên şrî`tê bi ke, ji rêya xwedê derkevtî. xudênenas.Bêbawer.

**Kahîn** (n.dar.mê) Navê jinaye.

**Kaj** (n.x.mê) Dareka xemildar û ciwane herdem ya keske li Kurdistanê gelek cor hene. Sinewber.

**Kajistan** (n.dar.mê) Baxê kajan.Daristana tenê kajan.

**Kajîn** (n.n.l.mê) 1. Hîvîya jîyanê. Lêgeryan jibo jîyanê. 2. Navê keçane.

**Kak** (n.x.nê) 1. Bira. Birayê mezin. 2. Hêja. Mîrza.

**Kake** (n.x.nê) 1. Gazîkirina kak.2. Navê mêrane.

**Kakêşan** (k.jn.l.mê) Kêşana kayê. Kêşa kayê. Rêya kadizan.

**Kakijk** (n.x.mê) Giyeke li çîyan hişîn di be di hêt xwarin dema bizdandina bistîkên wê, şîr jê tê.

**Kakil** (n.x.mê) 1. Navika mitayê hişk û req, wek bahîv, gûz, htd. Navik.2. Navê mêrane.

**Kakilbahîv** (n.l.mê) Kakila bahîvê.: Kakilbahîv kirin nav birincê.

**Kakişk** (n.x.mê) bn :Kakijk.

**Kal** 1 (hn.x.çewa) 1. Pîr.Sere. 2. Berebab. Ji papîrî pêhel.

**Kal** 2 (hn.x.çewa) Rengê sorê tarî.bizna kal.

**Kalan** (n.x.nêr) bn: Kavlan.

**Kalbapîr** (n.l.nêr) Bapîrê mezin. Mêrê navsal. Gelek pîr.

**Kalbûn** 1 (k.jn.l.mê) Pîrbûn. Kevinbûn. Navsalveçûn.:Zava û bûk pêkve pîr û kal bi bin.(K) bn: Bûn.

**Kalbûn** 2 (k.jn.l.mê) Sorbûn.

**Kale** (n.x.mê) Corekê pêlavên nerim in, jin û mêr li pîyêd xwedi kin.

**Kalek** (n.x) *fêkî* Gundor.

**Kalekal** (n.dar.mê) *deng* Dengê bizinan. Maremar.Barebar. :Kalekala bizinê ye, jiberko ya birçî ye.

**Kalekalkirin** (k.jn.gl.mê) Marîna kewalan(bizinan).

**Kalemêr** (n.l.nêr) Pîremêr. :Hêja mirovek kalemêre êdî nikare here nav baxî.

**Kalepîr** (hn.l.çewa) Mirovê gelek pîr.

**Kalepîrî** (n.l.mê) Pîrî. Pîratî.

**Kalê** (gazn.dar.mê) Naznav û gangkirina jina sor, yan kelan lam û guh sor.

**Kalik** 1 (n.dar.nêr) Bapîr yan babê bapîrî.

**Kalik** 2 (n.dar.mê) *kevin* Pêlaveka nemazeye bin lastîk û teniştên wê bi bendikan hatîye raçandin. Kalik û gore.

**Kalî** (hn.dar.çewa) Pîrî. Kevinî.

**Kalîsk** (n.x.mê) bn:Galiske.

**Kalo** (n.gaz.nêr) 1.*rêzman* Bangkirina mirovê kal(pîr).2. Navê mêrane.

**Kam** (pêrb) *rêzman* Alavê pirsînê û jêgirtinê. Kî. Kê. Kîjan.

**Kambax** (hn.dar.çewa) Bêbext. Xwelîser. Wêran. Kembax.

**Kambaxbûn** (k.jnl.mê) Xirabûn. Wêranbûn.(K) bn: Bûn.

**Kambaxkirin** (k.jn.l.mê) Wêrankirin. (K) bn: Kirin.

**Kamê<u>ra</u>** (n.biyan.mê) Amûrê girtina mînakan. Amêrê wênegirtinê.

**Kamê<u>re</u>** (n.biyan.mê) Kamêra.

**Kamê<u>ran</u>** (hn.çewa,n.x.n) 1. Xweşî. Tenayî. Werar. 2. Navê xortane.

**Kamêra<u>nî</u>** (n.dar.mê) Tenayî. Xweşî. Serkevtin. :Hîvîya jiyaneka pir kamênî ji bo we di xwazîn.

**Kamî<u>ran</u>** (hn,n.x.nêr) Kamêran.

**Kan** (n.x.mê) Çalik. Kûrik. Kend.

**Kan<u>av</u>** (n.l.mê) Çala avê. Kanî.

**Ka<u>nê</u>** (pêrb) *rêzman* Alavê pisyarkirinê ye.: Kanê birayê te, ne diyare?. Ka.

**Kan<u>geh</u>** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê çal ko av lê kom di be.Kanîya avê.

**Kanî** (n.x.mê) Ciheke av lê di zêt û di pengit. Çavika avê.

**Kanî<u>biharîk</u>** (n.l.mê) Kanîyên li biharê di zên û havînan çik di bin.

**Kanîgulan** (n.l.mê) Kanîyên di nav mêrg û gulan da.

**Ka<u>nîk</u>** (n.dar.mê) *rêzman* Naznav yan navê biçûkkirî ya kanîyê.Kanîya biçûk.

**Kanî<u>masê</u>** (hk.cih.cugr,n.l.mê) Bajarkeke li Kurdistana Iraqê devera Amêdîyê.

**Kanî<u>masî</u>** (n.l.mê) 1.Kanîya pir ji masîyan. Gera masîyan.2. Tişt yan xelkê Kanîmasê.

**Ka<u>nîn</u>** 1.(hk.dem.n.mê) Mehên zivistanê. Kanûn.

**Ka<u>nîn</u>** 2 (k.jn.x.mê) (Khanîn) bn: Karîn. :Ez di kanim bi bêjim.

**Kanînabiçîk** (êkê) (hk.dem,n.l.mê) Meheka salê ye, [ya kurdî ku 31 rojin û ji 15 î meha 12 ta 15 meha êk ya zayînî]. ***Pend*** :Kanîna biçîk, befir hat pîçik pîçik, bi erdî ve bo nîsik.

**Kanîna<u>mezin</u>** (duwê) (hk.dem,n.l..mê) Meha duwazde.[ya kurdî 31 rojin ji 14 î meha êk ta 14 î meha du ya zayînî]. ***Pend*** :Befira kanîna mezin bi erdî ve di bit asin, di qerisit di bestit. ***Pend*** : Kanîna mezin, befir hat rumbejin, wesa çû, te di go agirê li bin.;ang befira vê mehê zû di helit. ***Pend*** :Hejdeyî kanînê rojê berê xwe da havînê. ***Pend*** :Hejdeyî kanînê rojeke ji rojên havînê. Ang; seqa pîçek gerim di bit.

**Ka<u>nûn</u>** (hk.dem) Meha kanîn.:Meha diwazdehê ya sal zayîn.

**Kapot** (n.x.nêr) Sako.

**Kar** 1 (n.x.nêr) Şol. Îş. :Niha karê çiye?. ***Pend*** :Karê berwextî, mîna paşayê ser textî.

**Kar** 2 (n.x.dz) *khar* Têjika bizinê.: Karika li ber makê. :Kar û berx. ***Pend*** :Karê guhê berxî di xwar, her wê bi xwe di kir hewar.

**Karanîn** (k.jn.l.mê) Kar pê kirin. Bi karînan. (K) bn: Anîn.

**Karbend** (n.dar.mê) Karê ko mirov di ke.Pîşe.

**Karberdan** 1 (k.jn.l.mê) ***kharberdan*** Kar ji kotan û govan derêxistin çûlî jibo çerandinê. :Zarokan karikên xwe berdan çûlê. (K) bn: Berdan.

**Karberdan** 2 (k.jn.l.mê) Karê xwe biçî hêlan. Xwejikarkêşan. Paş pêncê êvarî em karê xwe di berdin di çin mal. :Berpirsê wan karberdana xwe da. (K) bn: Berdan.

**Karbidest** (karn.l.dz) 1.Xwedîyê-ya karî. Kardêr. 2. Berpirs. : Karbidestên hukmetê.

**Karbon** (n.biyan.mê) Rejî. Kaxeza rengder.

**Karçik** (n.x.mê) Corekê hirmîyane. Girsik.

**Kardan** (k.jn.l.mê) Bersiva hember her pestanek yan hêzekê ye. :Karvedan . Berdij. :Her karekî kardan heye.(K) bn: Ban.

**Karder** (karn.dar.dz) Xudanê karî. Kesê karî di det. Rêvebirê kargeh yan cihî.

**Kardo** (n.x.nêr) Navek kurdî ê peyaya ne.

**Kardoxî** (n.x) ***dîrokî*** Kevne babkalkên kurdane.

**Kareba** (n.x.mê) Têhineke bi hêza av, ba, sotin û htd kar di ket jibo ronahî, gerimkirin, karkirina amêran û htd di nav mal û dezgehan da.

**Karekar** (n.l.mê) ***deng*** Dengûdor. Pitpit. Çîpçîp. Qareqar.

**Karesat** (n.x.mê) bn: Çam.

**Karêj** (n.dar.mê) ***zinderwar*** Gehên herdu alîyên ser û binê lama devê mirov û candaran.

**Karêz** (hk.cih,n.x.mê) 1.Coyeka kûr û mezine,li rexên zevî û bîstanan çê di kin, dako ji avê ziha bibin û mita yan şînkatî nerizit. Xendek. 2. Rêyê li bin erdî, çiyan. Tonel.

**Karg** (n.x.mê) Kivark.

**Kargeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cîhê kar lê tê kirin. Mekîna diristkirina tiştî. :Kargeha doşavê, cilikan, htd. Fabrîqe.

**Kargêr** (karn.dar.dz) Endamên dezgehan. Bi rêvebirên dezgehan.

**Kargir** (karn.dar.dz) Kesê karî werdigirit. Karker.

**Karguzarî** (hk.dar.çewa) Civakî.

**Karhatî** (hk.l.çewa) Hejî. bi Kêrhatî.

**Karik** (n.x.mê) Kara biçûk.

**Karî** (n.x.mê) ***giya*** Giyayeke belg, pane, keske li biharan li çiya û zevîyan hişîn di bit, bi kelandin û lênanê, xwarineka xweş jê dirist di kin, bi xavî nahêt xwarin. : Karî ya kelê.

**Karîkatûr** (nbiyan) Derbirînek honerîye bi mînakên nemaze jibo nirxandina kar,kiryaran û bûyeran bi awayekê dilveker û kenî.

**Karîn** (k.jn.x.mê) 1.Şiyan. : Ez di karim bêjim. 2. Navê keçane.(K) bdn: ez di karim em di karîn, tu di karî hûn di karin, ew di kare[..it] ewan di karin. Pr: dê bi+ bdn. Bdb: di karîm, di karî, di karîn. Db,dûr: karîbû, …bûn. (F): bi kare, bi karin.

**Karînan** (k.jn.l.mê) Karanîn. :Tu di karî evro qelemê min bi kar bînî .(K) bn: Înan.

**Karînayî** (hk.l.çewa) Hatî ye bi karînan. Destê duwê. Kelûpelên kevin yên hatîn bi karanîn.

**Karîte** (n.x.nêr) Garîte.***Pend*** :Karîte liser dîwaran di rawestin.

**Karker** (karn.dar.dz) Mirovê kar di ke. Kesê li kargehan kar di ke. Karmend.

**Karketin** 1 (k.jn.l.mê) 1. Karkevtin.:Ji karakevtin; Tirombêl ji karketin.ango; êdî bi kêr karî nahêt. 2. Bi karkevtin.ango kar jêra peyda bûn.Dest bi kar kirin.

**Karketin** 2 (k.jn.l.mê) Çandin(dar,darmêw, gundor, û htd) ji karketin.ang; Gelek qelew bûn. **Karkinar** (hk.l.çewa) Dema xizmeta mirovî ya karî paş çendîn salan di dawî di hêt û bi navsal ve di çe, yan ji egera bûyer û nexweşîyê mirov êdî kar nake, lê mehyanekê di wergire. Karnişîn.

**Karkinarbûn** (k.jn.gl.mê) Dema mirov ji karî di raweste û mafê karkinarîyê hebe.(K) bn:Bûn.

**Karkinarkirin** (k.jn.gl.mê) Dema mirov di hêt karkinarkirin. Karnişîn di be.(K) bn: Kirin.

**Karkirin** (k.jn.l.mê) Şolkirin. Şixulîn. :Ez kar di kem. :Kar bi ke. Çima tu kar nakî?.(K) bn: Kirin.

**Karmend** (hk..dar.dz) Karker. Fermanber. :Karmendê radyo, Tv, kargeh û htd.

**Karmendî** (n.dar.mê) Pîşe. Karbendî.

**Karname** (n.l.mê) Danana nexşeyên her projekî berî encamdana wî. Proje. Nexşe.

**Karniyar** (kar,n.dar.dz) Kesekê pispore, çend pirsan ji mirovî di ket herwesa bawername û şiyanên mirovî di nirxîne, jibo mirovî liser karekî bipejirîne.

**Karniyarî** (karn.dar.mê) Helsengandin jibo wergirtina mirovî bo karî.

**Karniyarîkirin** (k.jn.gl.mê) Hevpeyvîn û nirxandin li bareyî karîna mirovê di xwaze karekî bi ke. (K) bn: Kirin.

**Karok** (n.x.mê) Kivark. Kulavoşk.

**Karpêk** (n.dar.mê) Berhem.

**Karsaz** (karn.dar.dz) Xwedîyê kar. Karder.

**Karsazî** (karn.dar.mê) Cihê karî.

**Kartîk** (n.x.nêr) Hesinekê zivir e jibo hisan û hilûkirina kêr, das, sator û htd bi kar di hêt. Mivred. :Bi kartîkî sator seqa kir.

**Kartîx** (n.x.nêr) Kartîk. :Kartîxekî li kêrikê bi de da xweş bi bît.

**Kartol** (n.x.mê) Pitat.

**Karton** (n.x.mê) 1. Miqawe. 2. Filmên karton.

**Karûbar** (n.dar.nêr) Karê rojane.:Karûbarê îro bi dawî hat.

**Karûbarkirin** (k.jn.gl.mê) Karkirin. Xwe berhevkirin. : Emê karûbarê cejin ê di kin. :Em dê bi xwe karûbarê xwe bi keyn. (K) bn: Kirin.

**Karvan** (karn.dar.dz) 1. Karker. Xudanê karî.2. Navek kurdî ê kurane.

**Karwan** ( hn,n.x.dz) 1.Bireka dewarên barkirî bi hevra mirov jibo karên bazirganî bi kar di hînin. Bireka tirobêlan.. 2. Navê kurane.

**Karwanî** (karn.dar.dz) Mirovê karwanan di ke.

**Karwankirin** (k.jn.l.mê) Mirov bi dewaran mitayî jibo mal yan firotinê ji cihekî bo yê din di veguhêze. (K) bn: Kirin.

**Karwankuj** (n.l.mê) Stêreke li spêdeyan li elindê xuya di be.

**Karxane** (hk.cih,n.l.mê) Kargeh.

**Karzan** (hk,hn.dar.çewa) 1. Mirovê şareza di karî da.2. Navê mêrane.

**Karzanî** (karn.l.mê) Şarezayî di karî da.

**Kase** (n.x.mê) Peyale. :Kaseya çayê dana ber mêvanan. :Kase şikest.

**Kasik** (n.x.mê) Sênîka biçûk ya li bin peyala çayê di danin. Binkask.Sênîk. :Kasika peyalê ya rengîne. : Çayê di kasikê de sar bi ke û bi de zarokî.

**Kasêt** (n.cîh.mê) Peyveka navneteweyî ye.bekereya tomarkerê(tîpê). :Kasêta nû ya Şivan Perwer li bazarî heye.

**Kaş** (hk.cih,n.x.mê) Tat. Beten. Evrazî.

**Kaşan** (n.x.mê) Bizmarên darî.

**Kaşane** (n.x.mê) Koçik. Sera. Ville.

**Kaşî** (n.x.nê) Helaneke gogirandî û xemlandîye li binê xanîya dadinin jibo ciwanîyê.

**Kaşîkirin** (k.jn.l.mê) Xemilandin bi helanên kaşî. :Roja xwe kaşî di ke. :Me termeyê mala xwe kaşî kir. (K) bn: Kirin.

**Kaşkirin** (k.jn.l.mê) Rastkirin. Hilûkirin.(K) bn: Kirin.

**Kaşo** (n.x.nêr) Dareke serê wî bi girêye jibo hajotina dewar û kewalan yan yarîyan bi kar di hêt. Doqiçik.

**Kaşoyanê** (n.dar.mê) *yarî* Lîztineka kurdewarî ye, mirov xwe liser du desteyan (bir) parve di kin, her yekî kaşoyek di destî daye di kevin dû tepikekê jibo ko bi havêjin gola yan tora berdijê xwe.

**Kat** (n.d.nêr) Dem.

**Katjimêr** (n.l.mê) Demhijmêr.

**Kavan** (n.x.mê) bn: Kovan.

**Kavanbar** (hn.dar.çewa) bn: Kovandar. :Jina kavandar, mêrê kavandar.

**Kavil** (hn.x.çewa) Wêran. Xirab.Heriftî. :Gundê kavil . Maleka kavil.

**Kavilbûn** (k.jn.l.mê) Wêranbûn.Heriftin. :Gundê me ji mêje kavil bûye.: Mala dujminî kavil bi be. (K) bn:Bûn.

**Kavilkirin** (k.jn.l.mê) Wêrankirin. Herifandin. : Dujminan gundê me kavil kir. (K) bn: Kirin.

**Kavir** (n.x.dz) Berxê êksalî.:Kavir berdan ser alîkê.:Kavirê xwe bo mêvanan serjêkir.

**Kavlegund** (n.l.mê) Gundê kavil. Gundê wêrana. Bi nêre wê he gavlegundeke!.

**Kawa** (n.x.nêr) 1. Qehremanê kurd yê evsaneyî , ko ejdehak kuştî û gelê kurd ji sitemê rizgar kirî li 21 adara hersal bîranîna Newrozê cejna rizgarî û sersala kurdane . 2. Navê mêrane.

**Kawanî** (n.x.dz) *tewal* Sivandok. Sivyank.

**Kawdan** (n.x.mê) Rewş. Biyav. : Eger kawdan ber bi çakîyê ve çûn em dê serdedana derve bi kin.

**Kawêj** (n.x.mê) Vecûn. .Benîşt.Qaçik. : Kawêjê bizinî di devê wêda ye.

**Kawêjkirin** (k.jn.l.mê) Vecûn. :Benîştê xwe kawêj di kir waneya xwe di nivîsî.(K) bn: Kirin.

**Kawîs** (n.x.nêr) Gapîsk.

**Kaxez** (n.x.mê) Parçe peroyeka tenike, sipîye hin caran rengîne, ji dar yan pembo çêkirîye, jibo nivîsînê mifa jê di hêt wegirtin.

**Kaxik** (n.x.nêr) Qafik.

**Kayîn** (k.jn.x.mê) Vecûn.Vecwîn. :Xwarina çir, benîşt kayîn. (K) bdn:ez di kayêm em di kayên, tu di kayêy hûn di kayên, ew di kayê ewan di kayên. Pr: dê bi +bedn. Bdb : di kayî, di kayîn. Db,dûr : kayîbû, kayîbûn. (F) : bi kayê, bi kayên.

**Kebab** (n.x.mê) *zad* Goştekê hûrkirî û têkel digel hende xwarinên dî wek pîvaz, sîr, karî, htd bi şîşan vedikin û liser agirî di hêt biraştin.

**Kebanî** (n.x.mê) bn:Kavanî.

**Keç** 1 (n.x.mê) 1. Jina şûnekirî. Mêrnekirî. Kheç. 2. Dot. : Peyman keça mamê Arazî ye.

**Keç** 2 (hn.x.çewa) Xwar. Nerast. :Axivtina keç. :Ev xanîye yê keçe !.

**Keçel** (hn.x.çewa) Mirovê pora wî weryayî ji egera gemar(pîs) bûnê yan nivşî. *lêkînan* :Keçelo tikve tikve, mêşa mezin çû nik ve.ang ; gotineke jiber gemarîya serên keçelan di bêjin. Hewês.

**Keçelî** (n.dar.mê) Weryana pora serê mirovî.

**Keçelok** 1 (n.dar.dz) *tewal* Core balindeyekê goştxore, serê wî yê bê pere jiber ko bixe nav kelexên candaran. Teyrê nêçîrê. Elho.

**Keçelok** 2 (n.x.mê) Xwarineke , ji birinc û nîsik yên bi hevra kelandîn pêkahatî. Pelavnîsik. :Firavîna şivanî keçeloke.

**Keçê** (hd,gazn.dar.mê) *rêzman* Naznav û bangkirina keçikane.

**Keçhêlî** (n.l.mê) Zirkeç. Zirkiç.

**Keçik** (n.dar.mê) Keç. Kiçik.

**Keçî** 1 (n.dar.mê) Xwarî. Nerastî.

**Keçî** 2 (hk.dar.çewa) *Kheçî.* Qunaxa hêj mêrne kirina keçan. Keçînî.

**Keçînî** (hk.dar.çewa) *kheçî* Keçî.

**Keçkirin** (k.jn.l.mê) Armanc negirtin. Xarçûn. . Babê min tivengek dana kêlê, lê keç kir , birex ket. (K) bn: Kirin

**Keçxapînok** (hk.l.çewa) Kesê bi gotinên xweş û nazik keçan di xapîne.

**Ked** (n.x.mê) Berhemê renca mirovî. Kar. Paleyî. Bizav.Renc.

**Keder** (n.x.mê, n.nêr) 1. Mêlak. Cerg. Kezeb. Kovan. Keser.2.Navê zelamane.

**Kedî** (hk.x.çewa) Kehî.

**Kedîbûn** (k.jn.l.mê) Kehîbûn.(K) bn : Bûn.

**Kedîk** (n.x.dz) *tewal* Core çûçikeke(tewal) li deştan heye.

**Kedîkirin** (k.jn.l.mê) Kehîkirin. (K) bn :Kirin.

**Kedîn** (n.x.nêr) Cerê avê.:Zerîyê kedîn danî ser milê xwe û çû ser kanîyê.

**Kedkar** (karn.dar.dz) Karker. Rêncber.

**Kedûn** (n.x.nêr) Kedîn. :Kedûn di rêya avê da şikiya.

**Kedxwar** (n.l.dz) Kesê keda destê hejaran jê distînit û dixwet. Sitemkar. Derebeg. :Kedxwaran kedê destê hejaran di di xwen.

**Kedxwarin** (k.jn.l.mê) Dema mirovek yan rijêmek berê renca xlikî di xwe. (K) bn : Xwarin.

**Kedxwarî** (hk.l.çewa) Jina bindestê kedxwar û derebegan.

**Kef** (n.x.mê) 1Gîrheka sipî ye ku ji şilqana ava têkel digel madeyên din peyda dibit. Kefa şîr, kefa sabûn, htd. 2. Cihê çemayî yê gopalî ê ku mirov di destê xwe di gire. Kefa gopalî.3. Panka destî.

**Kefç** (kn.x.çewa) Mirovê difina wî serevraz. :Kurkekê kefç. Jineka kefç. Bizin a kefç.

**Kefçê** (hd,gazn.dar.mê) Naznav yan bangkirina jina kefç.

**Kefçik** (n.x.nêr) Kaçik.

**Kefçikdan** (n.l.mê) Amanê têda parztina kefçikan.

**Kefçî** (n.x.nêr) Kefçik.

**Kefçîdank** (n.dar.mê) Kefçikdan.

**Kefço** (hd,gaz,n.dar.nêr) Naznav yan bangkirina mêrê kefç.

**Kefdan** (k.jn.l.mê) Dema tişt kefê didin. :Sabûn kefê dide. :Min destêd xwe bi sabûnê kefdan û av nema. (K) bn : Dan.

**Kefen** (n.x.nêr) Kifin. Sindirîk.

**Kefgirtin** (k.jn.l.mê) Bi kef kevtin. Kef jê peyda di be.

**Kefgîr** (n.l.mê) Kefçikek mezine jibo jêgirtina kefê ji xwarinê bikar dihînin.



**Kefgîr**

**Kefîk** (n.x.mê) Parçe perokeke jibo malîna dest û rûyan. Destmal.Mendîl.

**Kefkirin** (k.jn.l.mê) Kefgirtin. Kefdan. :Ev şampoye kefê nakit, diyare ne ji corên başe!.

**Keftar** (n.x.dz) *cardar* Heftiyar.:Keftar giyanewerekê dirindeye.

**Keftin** (k.jn.x.mê) Tiştê yan kesê ji cihek bilind bihêt xwarê, yan ji cihê xwe bikevit. Kevtin.

**Kefteleft** (n.dar.mê) Keftûleft.

**Keftûleft** (n.dar.mê) Bizavek mezin jibo peydakirina parîyê jiyanê.

**Keftûleftkirin** (k.jn.gl.mê) Bizîvîn. Xebatkirin. Lezkirin. :Kar nîne, belê ez yê keftûlefteke dikem. (K) bn: Kirin.

**Kefxo** (n.x.dz) Mezinê gund. Kwîxe. Seregund.

**Kefxwê** (n.x.dz) Kefxo.

**Kefzer** (n.dar.mê) *giya* Kevz. :KEfzerê gera avê ya girtî.

**Kevz** (n.x.mê) *giya* Giyayek keske di avan da û li ser beran hişîn dibe.

**Kehêl** (hk,hn.x.çewa) 1. Dewarê sivik û peyt jibo siyarbûn û barî. Seklawî.2. Jina ciwan û peyt.

**Kehî** (hk.x. çewa) Giyandarê malî. Giyandarê ne kûvî. :Kewê kehî. : Kotira kehî. Br ×Kûvî.

**Kehîbûn** (k.jn.l.mê) Dema giyandarê kûvî hînî jiyana di gel mirovan di be.: Ev zaroye yê kehî bûy. ;ang êdî şerim nake di gel di hête nav civatan di kene, di axive. (K) bn: bûn.

**Kehîkirin** (k.jn.l.mê) Weke mirov giyarekî kehî bi ke. : Serbestî du kew di mal da kehî kirin.(K) bn: Kirin.

**Kehnî** (n.x.mê) Kanî.: Kehnî derbûn.

**Kehrik** (n .x.mê) Karik.

**Kej** (hk,hn.x.çewa) Keç yan xortê porzer.Rengê ciwan û veboyî. Zer. Pora kej, pora zer. Mazîya kej.

**Kejal** (hn.l.çewa) 1.Keça por û rû kej,zer. 2. Navê keçane.

**Kejê** (hd,gazn.dar.mê) Naznav yan navê bankirina keça kej.

**Kejî** (n.x.mê) Kezî.

**Kejo** (hd,gazn.dar.nêr) Naznav yan navê bangkirina xortê kej.

**Kek** (n.x.nê) Kak. Bira . Heval . Birader. :Serbest kekê mine.

**Keko** (hd,gazn.dar.nêr) Gazîkirin jibo kek. :Keko eve tuyî?.

**Kel** 1 (hk.x.çewa) Gelek gerim. Pir gerim. :Çaya kel. Ava kel.

**Kel** 2 (n.x.mê) Dema perîna pez û bizinî yan pezê kûvî.; Dema kela pezkûvîyan e.

**Kel** 3 (n.x.mê) Garan. Bireka candaran. :Kela pezkûvîyan li çiyayî di çerin.

**Kel** 4 (hk.cih.x.mê) Avahîn mezin û asê liser gir û çîyan jibo xwe parastin ji dujmin û neyaran, kelhe.:Kela xwînê. :Kela berxwedanê. ***Pend*** :Kela jin ava bi ken, çi kes nikarin xirab bi ken. :Kela dimdim. :Kela nêrwe.

**Kel** 5 (hk.dem,n.x.mê) Rojeka taybetî ye jibo kelandin û şûştina cilikan. Balav.

**Kelabçe** (n.x.mê) Du kelabkê bazinîne bi hevre girêdayîne dixin destêd mirovê bergoman jibo nikarit çi bizavan biket.Kelamçe. Destvank.

**Kelabe** (n.x.nêr) Darik yan didankên hilawîstina cilikan. Sing.

**Kelagirî** (n.dar.mê) Kizgirîk. :Kelagirî di singî da ma.

**Kelandin** (k.jn.x.mê) Zadlênan. Lênana xwarinê. Gerimkirina xwarinê di nav avê da,ta bi kêr xwarinê bihêt. (K) bdn: ez di kelînim, em di kelînîn, tu di kelînî hûn di kelînin, ew di kelîne[..it]ewan di kelînin.pr: dê [bi +] bdn. Bdb: di keland, di kelandin. Db,dûr: kalandibû,….. bûn. (F): bi kelîne bi kelînin.

**Kelandî** (hk.dar.çewa) Zadê lênay. Xwarina berhev. :Zadê zêde kelandî bê tame.

**Kelar** (hk.cih,cugirn.x.mê) Şarek Kurdistana Iraqê ye.

**Kelaş** (n.x.mê) Corek pêlavên kurdî ye ji bendikan çê dikin. Kelaşên Silêmanîyê binavdengin.

**Kelaştin** (k.jn.x.mê) Çêkirina coyekê li erdî. Kelaştina leşî; Şeqkirin. Çeliqandin. Co di erdekî ve kirin. :Berazan erdê kelaştîn. (K) bdn :ez di kelêşim em di kelêşîn, tu di kelêşî hûn di kelêşin, ew di kelêşe[...it] ewan di kelêşin. Pr:dê bi+bdn. Bdb: di kelaşt, di kelaştin. Db,dûr: kelaştibû, kelaştibûn. (F):bi kelêşe, bi kelêşin.

**Kelaştî** (hk..dar.çewa) Cihê ko hatîye kelaştin. :Birîna kelaştî.

**Kelat** (hk.cih,x.çewa) Cihê asê. Rik. Zirî.

**Kelax** (n.x.nêr) Kelex. Mirar.


**Kelbetan** (n.dar.nêr) Kêlbetan.

**Keldan** (k.jn.l.mê) Kelandin.

**Kele** (hk.x.çewa) Gelek. Pir. Mezin. Kele dirêj.

**Keleba** (n.x.nêr) Kirosk. Dîkil.

**Kelebang** (n.dar.nêr) Keleba. Dîkil.Kirosk. Xirosk.



**Kelebang**

**Kelebçe** (n.x.mê) Kelabçe.

**Kelebçekirin** (k.jn.l.mê) Dema destên kesekî bi kelebçê girê didin. (k) bn: Kirin.

**Kelebçekirî** (hk.l.çewa) Kesê destên wî bi kelebçê girêday.

**Keledirêj** (hn.dar.dz) Mirovê gelek dirêj. Roqdirêj.

**Kelegirî** (n.l.mê) Kizgiryok. Kizgirîk. :Kelegirî ya keftî hinavên wê.

**Kelegurî** (hn.dar.dz) Mirov yan candarê gemar. Mirovê gurî. Mirovê pîs.

**Kelek** 1 (n.x.mê) ***khelek*** Komeka beran liser êk. Kelûk. Komeka keviran li ser hev.

**Kelek** 2 (n.x.mê) Gemî. Belem. :Bi kelekê li ava çemî derbaz di bin.

**Kelekvan** (karn.dar.dz) Xwedîyê kelekê, yan kesê kelekê di hajot. Gemîvan. ***Pend*** :Bi kevî nav pêlên avê yan liser çokên kelekvanî rûne?. ang; bi serbilindî bi mire,yan bi serşorî bijî.

**Kelem** 1 (n.x.nêr) ***khelem*** 1. Darekê sertîj yan stirîyek tîj. ***Pend*** :Kelemê çavê neyaran. Ang; jibo mirovê mêrçak di hêt gotin. 2. Qelem. Xame.

**Kelem** 2 (n.x.mê) ***giya khelem*** Kelemî.

**Kelemêş** (n.dar.mê) Mêş. Mêşa mezin. Kermoz.

**Kelemî** (n.x.mê) ***giya hişînkatî***.Core riwekeke(giya) belgên wê têkpêçayîne, şêweyê girovir werdigirin, bo îprax û xwarinên din bi mifa jê di hê wergirtin.



**Kelemî**

**Kelemîz** (hk.dar.çewa) Mirovê gelek di mîze. Pirmîz.

**Kelemsor** (n.l.mê) ***giya çandin*** Corekê kelemî ye rengê wê sore.

**Kelendûr** (n.x.mê) ***giya çandin*** Giyayekê keske, bi stirîye, gula wê ya more, rihên wê di gel xwarina avikan, zerkirî yan xav di xon. Xelendûr.

**Kelepçe** (n.x.mê) Kelebçe.

**Kelerim** (n.x.mê) ***giya*** Gulkelem.

**Kelestûn** (n.dar.mê) Keskesor. Heftreng.

**Keleş** (hn.x.çewa) 1. Mêçak. Zîrek. 2. Rind. Ciwan.

**Keleşêr** (nl.nêr) Dîk. Dîkil. Kirosk.Kelebang.

**Kelex** (n.x.nêr) Laş (leş) ê giyandar yan mirovê mirî. Terim. Mirar.:Kelexê gurî. Kelexê bizinê. Kelexê kotirê.

**Kelexbûn** (k.jn.l.mê) Dema candarek dirêj di be, çi mirin, nexweşî yan mîna mirîyan li xwe di ke.:Segê me yê bûye kelex. :Zelamekê li bin darê bûye kekex.

**Kelexkirin** (k.jn.l.mê) Dema candar yan mirov mîna kelexê mirî ra di keve.: Ka rebe eve çiye te wesa xwe kirî kelex?.

**Kelê** (hn.x.çewa) Xwarina bêxwê. Xwarin kêmxwê. Bêxwê.

**Kelêjî** (n.x.mê) ***can*** Şûn kilikeke(kurî) di keve dawîya zîvka pîşta mirovî.


**Kelêjîgirtin** (k.jn.l.mê) Nojdarên gelêrî, kelêjîya mirovê kelêjîya wî keftî bi rêya rakirin û perixandina kelêjîyê nexweşî çare di kin.

**Kelêjîkevtin** (k.jn.l.mê) Di kurdewarî da core derdeke kelêjî ya mirovî ji cih di çit.

**Kelêjîrakirin** (k.jn.gl.mê) Kelêjîgirtin.

**Kelhorî** (n.x.mê) Devokeka taybete, ya devereka rojhilata Kurdistanê.

**Kelêkovî** (n.l.dn) ***candar*** Nêrî û bizinên kûvî.



**Kelêkovî**

**Kelik** (n.dar.mê) Xanîk. Kelek.

**Kelistin** (k.jn.dar.mê) Hicmetîbûn. (K) ez di kelizim , tu bi kelize, hû dê bi kelizin... .

**Keliztin** (k.jn.x.mê) bn :Kelistin.

**Kelişandin** (k.jn.dar.mê) Derz lê kirin. Kelaştin. (K) bdn: ez di kelişînim em di kelişînîn, tu di kelişînî hûn di kelişînin, ew di kelişîne[...it] ewan di kelişînin.Pr :dê bi+bdn. Bdb: di kelişand, di kelişandin. Db,dûr:kelişandibû, kelişandibûn.(F) :bi kelişîne, bi kelişînin.

**Kelişîn** (k.jn.x.mê) Peqîn. Derzîn. : Erd ji bê baranî yê keliştî.

**Kelişte** hk.cih,n.x.mê) Cihek , erd yan dîwarek derzên mezin bi kevinê. Peq. Derz.

**Keliştin** (k.jn.x.mê) Kelişîn.

**Kelî** (hk.x.çewa) bn: Kelê.

**Kelîn** (k.jn.x.mê) Kelîna av yan xwarinê. :Xwarin kelî. :Av di kele. :Mirov ji german di ke. (K) bdn: ez di kelim em di kelîn, tu di kelî hûn di kelin, ew di kele[...it] ewan di kelin. Pr :dê[bi] +bdn. Bdb : ez di kelîm em di kelîn, tu di kelî, hûn di kelîn, ew di kelî ewan di kelîn. Db,dûr: ez kelîbûn em kelîbûyn, tu kelîbûy hûn kelîbûn, ew kelîbû, ewan kelîbûn[bi bûn]. (F) : bi kele, bi kelin.

**Kelk** (n.x) Mifa. Pare.

**Kelle** (n.x.nêr) ***candar*** Kuloxê serê mirov û giyandaran.

**Kellereq** (hn.l.çewa) Mirovê serreq yê ji êka xwe nehêt xwarê. Riko.

**Kelojtin** (k.jn.x.mê) Dema mirov bi didanan tovik keskan û htd di şikênit û kakilan di hîne der û di xot. ***Pend*** : Çêl dotin û kezwan[keskan] kelotin.ang; dema êk du karên jihev cuda û seyr di yek dem da di ke.(K) bdn: ez di kelojim em di kelojîn, tu di kelojî hûn di kelojin, ew di keloje[...it] ewan di kelojin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di kelojt, di kelojtin. Db,dûr : kelojtibû, kelojtibûn. (F) : bi keloje, kelojin.

**Kelotin** (k.jn.x.mê) bn :Kelotjtin.

**Kelpik** (n.x.nêr) Qelpik. Tîvkil.: Kelpikê tuivka gulberojê. :Kelpikê berîmaskê.

**Kelpîç** (n.x.mê) Libin ên ji axa taybet dirist di kin jibo avahîyan. Bilok.

**Kelûpel** (n.dar.pir) Tişt. Pertal.:Kelûpelêd nav malê. :Kelûpelên xwarinê.

**Kelwaş** (n.x.nêr) Kelexê mezin. Leşê gir. Kelexê qebe.

**Kelwaşdar** (rd.dar.çewa) Mirovê bi kelwaş. :Kesekê kelwaşdare. anko; kelex mezine .Zepzepe.

**Kem** 1 (hn.çend) Kêm. Pîçek.

**Kem** 2 (hn.x.çewa) ***khem*** Mirov yan giyandarê lêva wî xwar yan kelişî.


**Keman** (n.x.mê) ***mûzîk*** Kemançe.

**Kemançe** (n.x.mê) ***mûzîk*** Core amêrekê mûzîkê ye.

**Kemançejen** (pîşn.l.dz) Kesê amêrê kemanê lê dixe. Lêderê-ra kemanê.

**Kemançevan** (pîşn.dar.dz) Kemançejen.

**Kemax** (n.x.mê) ***leş*** Cihê di kevit navbera tenişt û ranan.Ciwanîya bejinê ji kamaxane,nemaze li cem jinan. ***Pend*** :Keçeka kemax kêrîşke.ang; kemaxêd wê weke yêd kêvrûşkan di rindikin.



**Kemax**

**Kembax** (hn.x.çewa) Kavil. Wêran. Heriftî. Mal kembax, mal wêran. Kambax.

**Kember** (n.x.mê) Kemer.

**Kemer** (n.x.mê) Qayîşa li piştê di bestin(girê di din). Kemera zêrî.

**Kemê** (gazn.dar.mê) Naznav yan gazînavê jina kem.

**Kemo** **(hd,**gazn.dar.nêr) Mêrê kem.Gazîkirina zelamê lêvkem.

**Kemole** (n.x.mê) Betilkek şûşe, dar yan like, girovire, yan xarûvîçe derê wî tenge, şileyan di nav da di parêzin..

**Kemtiyar** (n.x.dz) ***candar*** Heftiyar.

**Ken** (n.x.mê) Kenî.

**Kenal** (n.cîh.mê) 1.Co. Cok . :2.Kenalê têlevizyonê.

**Kenandin** (k.jn.mê) Dema êk kenî ya mirovî bi hîne, bi kiryarên lêbokî yan gotinên bi kenî, yan mirov kenîya êkî bînit. Dane kenîn. (K) bdn: ez di kenînim em di kenînîn, tu di kenînî hûn di kenînin, ew di kenîne[...it] ewan di kenînin. PR:dêbi +bdn. Bdb : di kenand, di kenandin. Db,dûr: Kenandibû, kenandibûn. (F) :bi kenîne, bi kenînin.

**Kenar** (hk.cih) Rex. Al. Kinar.

**Kenarî** (n.x.mê) *dar tiraş1*.Tiraşeka xemildare, keske, stirîdare.2. Çûçikeka biçûke.

**Kend** (hk.cih..x..mê) Çal. Kûr. Nihal.:Cihê lêkeftina guleya topê kendek ya di erdî da çê bûy.

**Kendal** (n.l.nêr) Tenişta giran ya bi baranê hatîye renîn, xwarin. Beten.

**Kengaro** (n.biyan) Giyandarekê şîrdere, ling û kilik dirêje, li Ustralya di jît, têjika xwe di çantikê zikê xwe da xwedî di ke.



**Kengaro**

**Kengê** (hk.dem) *rêzman* Kengî.

**Kengir** (n.x.nêr) *giya* Riwekeke li çolan heşîn di bit û zîxikên wî bi keladin û xavî di hên xwarin. Kering.

**Kengiroşk** (n.dar.mê) Tov, yan danê kengiran. Sisî.

**Kengî** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegirê pisyarê. :Kengî dê Heval hêt? Kengî tu çoy welatî?.

**Kenî** (n.x.mê) *deng* Dengê ji devê mirovî derdikevit di gel bişkurîna serûçavan û caran rondik ji çavan di hên ,dema gotinek yan bûyerek seyr rû di dit. *Pend* :Kenî ji dilê xweş di hêt, baran ji evrê reş di hêt.

**Kenîn** (k.jn.x.mê) Wekî mirov bi yekî, kirayakê yan gotineka seyr bi bîne yan bi bihîze,kenîya mirov di hêt. (K) bdn : ez di kenim em di kenîn, tu di kenî hûn di kenin, ew di kene[..it] ewan di kenin,. Pr :dê[bi] + bdn. Bdb : ez di kenîm, em ewan, hûn di kenîn, tu,ew di kenî. Db,dûr : ez kenîbûm, em kenîbûyn, tu kenîbûy, ew kenîbû, ewan, hûn kenîbûn. (F) : bi kene, bi kenin.

**Kenkene** (hn.dar.çewa) Mirovê mezin û zengîn, xwedî mal û sentenet. Berpirs. :Têkelîya wî bi tinê bi kenkenan ra ye !.

**Kenok** (hk.dar.çewa) Mirovê herdem di kene. Devkenî. Devbeş.Devkenok. :Tu çendê kenokî ?. :Hindî ya kenoke, mirovî di kenîne !.

**Kepen** (n.x.nêr) Cilekê stûre ji hirîya pezî çêkirîye, ser milan ta di gehit erdî yê dirêje, şivan, berxvan, karikvan,gavan û htd, jibo xwe parastin ji serma û baranê. di kin ber xwe.


**Kepir** (n.x.mê) Çar yan pitir stûnan bi şêweyê çarkujî yan lakêş di çikilînin dar û pelexî liser di danin jibo liser yan li bin rûniştin û nivistin yan higirtina mitayî.

**Kepî** (n.x.nêr) *can* Poz. Difin.

**Kepîr** (n.x.mê) *can* Pidî.

**Kepû** (n.x.nêr) *can* Difin. Kepî. Poz.

**Ker** 1(n.x.nêr) *candar* Giyandarek malîye mirov bo veguhaztina mitay bikar di hînin. Guhdirêj. Hêmaya mirovê sade û bêmejî. *Mamik* :Ker zirî, pişkul firî.ang ;teqîna tivengê. *Pend* :Kero ne



**Ker**

mire, ta bihar di xemilit. *Pend* :li Kerî siwarbûn şermeke, peyabûn dune. :*Pend* :Kerê melê û ziyana melê.*Pend* :Her kerê berêye, lê kurtanê nûye.ang ; mirovê tenê bi serve goraye, di dil da her wek berê ye.*Pend* : Ne di şiya kerî, palî hila.ang ; dema mirovî karek pê çê ne be, xwe bi yekê kêmtir ve xerîk di ke.

**Ker** 2 (hn.x.çewa) *kherr* Mirov yan giyandarê baş nabihîze. :Ma tuyê kerî te hay ji min nîne ?.Guhgiran.

**Ker** 3 (n.x.nêr) kher Pirt. Parçe. :Kerekê nanî.ang; pirteka nanî. *Pend* :Kerekê sêvê ji ber vekirî.ang; heger du mirov wek êk bin.

**Ker** 4 (n.x.nêr) kher Bira bizinî. Bira Pezî. Kerî.Celeb. :Kerekê pezî berda nav ziyanê.

**Kerajo** (karn.dar.dz) Kesê liber keran û keran di hajot. Kervan(gavanê keran).

**Kerane** (hk.dar.çewa) Keratî.

**Keratî** 1 (hk.dar.çewa) Kiyarên sade û bê aqilane mîna keran. Kerînî.

**Keratî** 2 (n.dar.mê) *kherratî* Nexweşîya kerbûnê. Nebîstin.

**Kerax** (pîşn.x.dz) Mirovê zêrevanîya coyên li ser rez û bîstanan parve di bin, di ke dako av bi diristî balav bi bit û bi herwe ne çit.

**Keraxî** (n.dar.mê) Karê keraxan.

**Keraxîkirin** (k.jn.l.mê) Karê keraxî kirin. :Ew ji xwe ra keraxîyê di ke. (K) bn:Kirin.

**Kerb** (n.x.mê) Kîn. Toreyî. Hêrisbûn. Dilreşî. Daxdilî.

**Kerbeng** (n.dar.mê) *giya* Kerbeşk.

**Kerbeşk** (n.dar.mê) *giya* Core giyayek bi sitrîye û di hêt xwarin nexasim nêrik a wê.gelek cor hene ji wan jî, ; kebeşka xwarinê û kerbeşka keran ji ber ko mirov na xon, lê xwarinek xweşe jibo dewaran. Jiber hindê wesa hatîye navkirin.

**Kerbûn** 1 (k.jn.l.mê) Weke mirovê kiryarên şaş bi ke, mîna keran.Aqisivikbûn. :Hidî wêve tire, ew kertir bi de.

**Kerbûn** 2 (k.jn.l.mê) *kherrbûn* Mirov rastî derdê ne bihîstinê di hêt ji egra nexweşî yan pîrbûnê. Guhgiranbûn. :Jiber dengê topan yê ker bûye.

**Kerçilandin** (k.jn.dar.mê) Perçiqandin û têkelkirin.

**Kere** (hn.x.çewa) Mirovê karker û çespan. Mirovê ketxoda. *Pend* : Kereyo xwereyo, nekero, dilkesero,ang ; mirovê rêncber herdem berhemdare û bervajî.

**Kerefs** (n.x.mê) *giya (tere)*Coreke giyayekê tere bi xavî di gel xwarinan di xon, hin caran di gel zadî di lênin.

**Keremkirin** (k.jn.l.mê) Pêrgînî lê kirin. :Kerem ke .Fermo. :Rêzdarî kerem kir û got ; di vê em .. (K) bn :Kirin.

**Kereng** (n.x.nêr) Kengir.

**Kereste** (n.x.nêr) Kelûpel. Made.

**Kergez** (n.x.dz) *balinde* Elho.

**Kerguh** (n.l.dz) Kêvrîşk.Kêvroşk.

**Kerifîn** (k.jn.x.mê) Dema mirovê çavbirsî kirêt zadî di xwe. : Dê here bi kerife.

**Ke<u>rik</u>** 1 (hn.x.çewa) ***kherrik*** Fêqîyê ne gehiştî. : (Bacan, hijîr, sêv û htd) a kerik. :Zerdil gehiştîne?, ne bi xudê hêj kerikin!.

**Ke<u>rik</u>** 2 (n.dar.mê) ***candar*** Kerê biçûk.

**Ke<u>rik</u>** 3 (n.dar.mê) ***kherik*** Kerekê biçûk. Pirta piçûk.


**Ke<u>rixîn</u>** (k.jn.x.mê) Gelek mandîbûn. Gelek westan. Bêgêwilbûn. (K) Bdn. :Ez di kerixim, em di kerixîn.tu kerixî, hûn di kerixin, ew di kerixe[..it]. PR:dê bi + bdn . Bdb : ez di kerixîm, em, hûn, ewan di kerixîn, tu di kerixî, ew di kerixî. Db,dûr: ez krixîbûm, em kerixîbûyn(bûn), tu kerixîbûy, hûn kerixîbûn, ew kerixîbû, ewan kerixîbûn.(F): Bi kerixe, bi kerixin.

**Ke<u>rî</u>** 1 (n.x.mê) ***kherî*** Kerê pez û bizinî.

**Ke<u>rî</u>** 2 (n.dar.mê) ***kherrî*** Derdê ne bihîstinê.Kerbûn. Guhgiranî.

**Kerî<u>nî</u>** (hn.dar.çewa) Karê şaş û bê wic.bê aqilî. Bê mejî.Dînatî.

**Kerke<u>dan</u>** (n.x.dn) ***candar*** Candarekê mezin û hişkavî ye, di zêt.




**Kerkedan**

**Ker<u>kirin</u>** 1 (k.jn.l.mê) Mejî şûştin xapandin ta aqilsivik di be, wek keran. Mîna keran serederî di gel da kirin.

**Ker<u>kirin</u>** 2 (k.jn.l.mê) ***kherkirin*** Parçekirin. Pirtikandin. Pirtpirtkirin. :Sêv ker kir. :Kutilk ker kir. (K) bn:Kirin.

**Ker<u>kirin</u>** 3 (k.jn.l.mê) ***kherrkirin*** 1. Bi dengekê mezin,gurzekî, yan têxebitîna guhan, mirov êkî yan xwe toşî nexweşîya kerbûnê bi ke.2. Mitbûn. Gotina bi dilî nebit xwe ker di ke. (K) bn: Kirin.

**Ker<u>kûvî</u>** (n.dar.dn) Kerê kûvî. Zêbra.



**Kerkûvî** (**zêbra**)

**Ker<u>kûk</u>** (hk.cih.cugrn) Bajêrekê zengîne bi neftê li Kurdistana îraqê.: Kerkûk dilê Kurdistanê ye.; serokê neteweya kurdî M. Barzanî.

**Kerkûkî** (malb,n) Xelikê Kerkûkê.Azad kerkûkî ye,ang; Azad ji Kerkûkê ye.

**Kermêş** (n.l.mê) ***candar*** Mêşeke mezine liser xwîna dewaran di jît. Kermoz.

**Kermoz** (n.l.mê) ***candar*** Kermêş.

**Keroşk** (n.x.dz) ***candar*** Kêvrîşk.

**Kersil** (n.x.mê) Pişkulên dewaran. Zibilê dewaran yê nîvreq û tepik.

**Kert** (n.x.nêr) Pirt. Ker(kher).

**Kertik** 1 (n.dar.nêr) 1.Darekê dutaye mîna du guhan di dirêjin binê wî yek taye, çilî yan dirû û hejên bi stirî dixin nav guhan û liser milên xwe di danin. kunork.

**Kertik** 2 (n.dar.nêr) Erdê di navbera malikên çandinê, cihê hatin û çûna mirovan. : Pêyên xwe dane ser kertikan da pê li şak û tayên xiyara ne danî.

**Kerû** (n.x.mê) Kîfkû.

**Kerûbûn** (k.jn.l.mê) Kîfkûbûn. : Nan ê kerû bûy. (K) bn :Bûn.

**Kerwan** (n.x.nêr) bn: Karwan.

**Kerxane** (n.dar.mê) Xana keran. Gova keran.

**Kerxur** (hk.l.çewa) Mirovê herdem (wekî keran) di xwe û têr nabe. Hefhefî.

**Kes** (n.nedyr) Jibo mirovî dema ne dîyer bi kar di hêt. Mirov. ***Pend*** :Kesê mino destê mino ; ang divê mirov bi xwe keda xwe bi ke.***Pend*** :Kes nîne pêdivî kesê nebit. ***Pend*** :Kes mîna xudanî, nizanit derdê giyanî.ang; xudan bi xwe çakî, neçakî, derd û derman ên xwe di zane, nek kesê dî.

**Keser** (n.x.mê) Kovan. :Wexerkirina wî keserk mezin di dilê me da hêla.

**Kesk**( hn.x.çewa) ***reng*** Rengê giya û darûbaran. :Giyayê kesk.

**Keskan** (n.dar.mê) ***dar*** 1. Dara keskana di dit. 2. Berê dara keskanê, rengê wî kesk û girovire, bi terînî yan paş hişik di be, kakila wî di hêt xwarin û gelek corên derman û sabûnan jê di hên diristkirin. Kezwan.

**Keskankiroj** (n.dar.mê) ***balinde*** Çûçikên bi xwarina keskanan navdengin.

**Keskanterk** (n.l.mê) Kezwanterk.

**Keskbûn** (k.jn.l.mê) Demê tiştek rengê kesk di gire. ::Li ser giyayî rûnişt şelwalê wî kesk bû. (K) bn:Bûn.

**Keskesor** (n.l.mê) Heftreng. Kelestûn. :Baranê vekir keskesor peydabû.

**Keskkirin** (k.jn.l.mê) Mirov rengê kesk li cihekî bi de. Pirça xo kesk kir.

**Keskûsor** (n.gl.mê) Keskesor. :Keskûsorê heft reng.



**Keskûsor**

**Kesme** (n.x.mê) Core naneke wek sawik, yan kade dirist di ken bo xwarinê di gel çayê û zadên din.

**Keş** (n.x.mê) Çewayî ya pileyên gerim , ba, baran. Biyav . Seqa.

**Keşe** (karn.nêr) Qeşe.

**Keşîş** ( karn,nêr) Keşe.

**Keşîşxane** (n.dar.mê) Dêra keşan.

**Keşk** (n.x.mê) ***rêçalî*** Dewê civir di ken tepik û li ser ban û erdan di danin tanî hişik di bin, jibo gelek corên xwarina bi kar di hînin.

**Keşkerûn** (n.l.mê) Xwarineke ji keşkên di nav rûnî da qelandî hatîye çêkirin. :Keşkerûn xwaineka xweşe.

**Keşnas** (pîşn.l.dz) Pisporê warê keşnasî yê.

**Keşnasî** (karn.l.mê) Zanîna pêşbînîna seqayî.

**Keştî** (n.x.mê) Gemî. Papor.:Keştîya deryayî. :Keştî ya esmanî. :Keştî ya ceng. :Keştî ya Nuh.

**Keştîgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê rawestana keştîyan.

**Keştîvan** (kar,n.dar.dz) Kesê keştî yê di hajot. Rêvingê keştî yê.

**Ketin** (k.jn.x.mê) bn: Kevtin.

**Ketxûda** (kar,n) 1.Mezinê gund.Hêja. Rêncber. ***Pend*** :Ketxûda ewe yê çavê wî ne li destê xelkî.

**Keval** (n.x.mê) Wêne(mînak) ên hunerî .Tablo. Dîmen. :Kevalekê ciwan. :Kevalê govenda kurdî.

**Kevan** (n.x.nêr) Kivan.

**Kevaştin** (k.jn.x.mê) Givaştin.

**Kevçî** (n.x.nêr) Kefçik.

**Kever** (hn.x.çewa) Rengên sipî û reş yan rengên dî bi hev ra. Belek. : Enîya kever.ang ; pesina keç yan xortê por reş û dêm sipî. : Bizin a kever.ang ; bizina reş û sipî.

**Kevil** (n.x.nêr) Pîstê lawiran yê hişkirî.

**Kevilbûn** (kj.n.l.mê) Lûçbûn. Kevil di serda çûn. (K) bn : Bûn.

**Kevilkirin** (k.jn.l.mê) Kevilê lawiran piştî vekujtinê di serda di hînin. (K) bn : Kirin.

**Kevilkirî** (hk.l.çewa) Kevil di ser da înaye. :Kelexê gîskê kevilkirî. :Bizin a kevilkirî.

**Kevilûjank** (n.l.nêr) Çarçûve. Kevil.Biyav.

**Kevin** (rd.x.çewa) 1. Giyandarê jîyê wî dirêj û bi salve çûyî. :Ew mirovekê kevine!. 2.Tiştê ne nû. :Xanîyêkê kevin. :Gotineka kevin. Br× Nû.

**Kevinbûn** (k.jn.l.mê) Dema candarek temen dirêj di bit, tiştek pir di hêt bi kar anîn rengê wî kirêt di bit. :Cilikêd min yên kevin bûyn. :Tirombêla wî ya kevin di bit. (K) bn: Bûn.

**Kevinkirin** (k.jn.l.mê) Weke mirov tiştekî, (cil, pêlav, tirombêl û htd) bi kar di hînit û kevin di bit. (K) bn: Kirin.

**Kevinperêz** (hn.l.çewa) Kevneperist.

**Kevinûnwî** (n.l.mê) Cilikên destê duwê. Cilikên kevin. Kincên kevin.

**Kevir** (n.x.nêr) 1. Berên pan û mezin. Helan. Ber. ***Pend*** :Kevirê havînê pavê(bi havêje) kadînê.ang; her tiştê mirov bi kare li havînê vecivîne, dako li zivistanê mirov mifa jê bi wergire.2. Navê mêrane.:Ew weke kevirî ye.ang; mîna kevirî (dengvedan) gotina hemberê xwe dubare di ke.

**Kevişte** (hk.x.çewa) Mirovê kesatî lewaz. Sade. Kêrnehatî. Kolanî.

**Kevî** (n.x.mê) 1. Belekên berfê li lat û zinaran li bi har û havînan di mînit.2. Navê keç û mêrane.

**Kevjal** (n.x.dz) Kêvjale.

**Kevkanî** (n.dar.mê) Berdeqanî.

**Kevnar** (hn.dar.çewa) Pir kevin. Gelek kevin.

**Kevneperist** (hk.l.çewa) Kesê hizir û boçûnên kevin li cem .Tiştê kevin di perêsit. Paşkevtî. Paşvero.

**Kevneşop** (rd.l.çewa) Rewiştên kevin yên gelan. Kevin.Tîtal.

**Kevneşopî** (n.l.mê) Kar û tiştêd têkelî bi bi tîtalên kevin ve heye.

**Kevnik** (hn.dar.çewa) Kevin.

**Kevok** (n.x.mê) ***balinde*** Balindeyeka kehî yan kûvî ye li Kurdistanê cîhanê pire. Kotir.


**Kevot** 1 (n.x.mê) ***dar*** 1.Dareke li çiya hişîn di be û şivên wê jibo gopal û destedaran bi kar di hînin.

**Kevot** 2 (n.x.dz) ***balinde*** Tivîrk.

**Kevtin** (k.jmê) Livîn yan wergerana tenan ji cihê xwe. Fêqî ji darê kevt. Mirov kevtin. ***Pend*** : Ji me kevt û bi me kevt.ang; kesê mirov mezin di ke, li dawîyê dijî mirovî ra diweste.(K) bdn: ez di kevim em di kevin, tu di kevî hûn di kevin, ew di keve[..it] ewan di kevin. Pr : dê bi + bdn. Bdn : di keft[kevt] di kevtin[keftin]. Db,dûr : ez kevtibûm, em kevtibûyn, tu kevtibûy, hûn kevtibûn, ew kevtibû, ewan kevtibûn. (F) : bi keve bi kevin.

**Kevz** (n.x.mê) Kefz.

**Kew** (n.x.dz) ***balinde*** Balindeke dengxweşe, li çiyayên Kurdistanê mişeye, mêmaya neteweya kurde. ***Pend*** :Kew dujminê serê xweye.



**Kew**

**Kewal** (n.x.dz) ***candar*** Giyandarên wek pez û bizin. Terş. :Kewal ji govê berdan.

**Kewandin** (k.jn.x.mê) Tişek gerim yan dermanek dijwar di danî ser cihekê kul yan birîdar da ku çare bi bit. (K): ez dikewînin em dikewînin, tu dikewînî hûn dikewînin, ew ewan dikewînin. (F): bi kewîne bi kewînin.

**Kewar** (n.x.mê) Şaneya hingivê mêşan.

**Kewçerîn** (hk.dem) Demsaleke di bêjin kew li ber tava heyvê di çerin.

**Kewçîrk** (n.dar.dz) Kew.

**Kewden** (hn.x.çewa) Lewçe. Çivêl.Gewçe.

**Kewgîr** (karn,dar.dz) Nêçîrvanê kewan.

**Kewîn** (k.j.n.x.mê) Hatine kewandin. Birîna wî kewya. Dermankirin.

**Kewvan** (karn.dar.dz) Xudanê kewan. Mirovê kewan xwedî di ke.

**Kewsûsk** (n.l.dz) Sûsik.Sîsk.

**Kewtkewt** (n.dar.mê) *deng* Dengê rewîna segan.

**Kewtkewtkirin** (k.jn.gl.mê) Rewîn. :Segê cîranî kewtkewt di kir.

**Kewitîn** (k.jn.x.mê) Rewîn.: Dêhil di kewite.

**Key** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê pirsînê.Kengî.

**Key** 2 (karn.x.dz) Peyveka kevnare ango Paşa. Şa.

**Keya** (kar,n) Kedxûda. Mezinê gund yan hozê.

**Keyîn** (k.jn.x.mê) Şilqandin. : Meşk keyîn. Bi keyê. Di keyêt.

**Keyf** (n.x.mê) Xweşî. Dilxoşî. Bijkurîn.

**Keyfkirin** (k.jn.l.mê) Demên dilveker derbaz kirin. Bi keyf kevtin. :Em dê çîn seyranê ji xwe ra tê keyfê bi kin. (K) bn:Kirin.

**Keyfxweş** (hk.l.çewa) Mirovê herdem kiryar û gotinên dilveker di ke. Mirovê rûxweş. Mirovê gotin û pêkenînên xweş di ke.

**Keyfxweşî** (n.l.mê) Çewanî çakî. Keyf û xweşî.

**Keyfxweşîkirin** (k.jn.gl.mê) Silavkirin. Çewanî û çakî di gel hevdu kirin. ; Noke kabirayekî keyfxweşî di gel min kir, lê ez wî na nasim!. (K) bn:Kirin.

**Keyvan** (n.dar.dz) 1.Berpirsa-berpirsê malê. Semyan. Kabanî. Xatûn.2. Navê keç û mêrane.

**Keywan** (n.dar.dz) Keyvan.

**Kezaxe** (n.x.mê) Birîna, hildana darûbarî. bn: kezaxtin. :Çaxê kezaxê ye.Birayê min yê çûye kezaxê.

**Kezaxtin** (k.jn.x.mê) Birîna çeq û tayên zêde yên daran jibo bi hêz bi kevin û berê wan baştir bi bit. : Mêwa tirî kezaxt. (K) bdn: ez di kezêxim em di kezêxîn, tu di kezêxî hûn di kezêxin, ew di kezêxe[..it] ewan di kezêxin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di kezaxt, di kezaxtin.Db,dûr: kezaxtibû,…. bûn. (F): bi kezêxe, bi kezêxin.

**Ke<u>zeb</u>** (n.x.mê) ***can*** Mêlak.

**Ke<u>zî</u>** (n.x.mê) Çend davek pora(pirç) yan bendikên vehandî. :Kezîyên dirêj. Gizvanok.

**Kezî<u>kur</u>** (hk.l.çewa) Jina kezî lê hatîn birîn. :Çam bi serî hatî. :Wey kezî kurê ezê, eve çi xwelîye bi serê me werbû!.

**Kezî<u>mar</u>** (hk.l.çewa) Keça kezîkên wê mîna marê reş di reş û dirêj.

**Kezî<u>şor</u>** (hk.l.çewa) Jina kezîyên wê di dirêj.

**Kezî<u>zer</u>** (hk.l.çewa) 1.Keçika kezîyêd wî di zer bin.2. Navê jinane.

**Ke<u>zwan</u>** (n.x.mê) Keskan.


**Kezwan<u>kelotin</u>** (k.jn.l.mê) Keskankelotin.

**Kezwan<u>terik</u>** (nl.mê) Kezwanên ter,berî bi behin.

**Kê** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarê. Pisyara Heyînê. Pisyara karî, boyerekê yan kesekî. :Kê wesa kir?.Kê got?. :Eve xanîyê kêye? Kî.Kê di vê?.Pend :Kê kir û kê xwar!.

**Kêbir<u>kê</u>** (n.dar.mê) Leystokeke kî ji kê di bit. Berîkanê.

**Kêç** (n.x.mê) ***candar*** Giyandarek kirmijoke li ser xwîna giyandaran, mirovan dijît ***kevneşop Pend*** :Kêçê mêçê, tu bi îsa kî tu bi mûsa kî tu ev şeve min aza kî. Ev gotina di nav kurdan de tê gotin ji ber leqên kêçan yên ne xweş.



**Kêç**

**Kêç<u>gir</u>** (pesnl.dz) Mirovê kêçan digirit û di kujit.

**Kêç<u>girtin</u>** (k.jl.mê) Girtina kêçan û kuştin. ***Pend*** : Korê(***khor***) kêç girtî, ang;dema tiştek bi kevit destê mirovekî û êdî ji destan qurtal ne be. (K) bn: Girtin.

**Kêf** (n.x.mê) Keyf. Xweşî.

**Kêf<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Kefkirin. (K) bn: Kirin.

**Kê<u>fweş</u>** (hn.l.çewa) Mirovê bi keyf. Rûxweş.

**Kêf<u>xweşî</u>** (n.l.mê) Rûgeşî. Rûxweşî.

**Kêfxweşî<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) bn:Keyfxweşîkirin.

**Kêk** (n.x.mê) Xwarineke ji ar, şekir, rûn,û corên fêqî dirist di ken bo cejin û bîranînan.



**Kêk**

**Kêl** (n.x.mê) 1.Berek venayî ye jibo sêregirtin û lêdanê çi bi çek yan berê destî. Nîşan. :Here kêlekê bi çiklîne da armancanê bi keyn. 2.Tiştê bilind û berçav.

**Kêlan** (k.jn.x.mê) Rakirina erdî û kolan bi hincar û dewaran yan terektiran jibo çandinê. : Cotyar zevîyê di kêlit. (K) bdn: ez di kêlimê em di kêlîn, tu di kêlî hûn di kêlin, ew di kêle[..it]ewan di kêlin. pr:dê bi + bdn. Bdb: di kêla, di kêlan. Db,dûr: kêlabû,.... bûn.(F): bi kêle bi kêlin.

**Kêlanê** (n.dar.mê) *yarî* Yarîyeka kevina kurdewarî ye, mirov xwe di kin du bir û her alek hemberî hevdu sê kêlan di venin,(çikilînin), alê hersê kêlên berdijê xwe bêxit, serdikevit û xal bo di hên nvîsîn, bira hersêkêlên hemberî xwe bêxit û çi yên wê neketibin dê sê xalan bi dest xweve hînit û sersax bit, lê eger yek yan du kêl di ketî bin kêlên berdij hemûyan bêxit xalekê dê wergirit û cihên xwe gihorin.

**Kêlanêkirin** (k.jn.gl.mê) Yarîya kêlan di kin. : Genc hemî yên li danga gundî kêlanê di kin. (K) bn :Kirin.

**Kêlbe** (n.x.nêr) Du didanên tîj yên lama serî li herdu rexên devê mirovî. Didanên giyadarên dirinde.

**Kêlbetîj** (hk.l.çewa) Candarên dirinde yên xudan didanên tîj.

**Kêlbese** (hn.l.çewa) *dijûn* Yê didanên wî mîna kêlbeyên seyan bin.

**Kêlbetan** (n.dar.nêr) Amêrekê hesinî bi destike û devê wî mîna kêlbeyane jibo girtina bizmaran û deranîna wan bi kar di hêt.

**Kêldan** (k.jn.dar.mê) Dirûtina cilikan. : Kêlî lêdan. (K) bn: Dan.

**Kêlek** (n.x.mê) *leş, cih* Tenişt. Rex. Tî. Al. :Were li kêleka min [bi] rûne.

**Kêlendî** (n.x.mê) Şalok. : Bi kêlendî giya dirî.

**Kêlgeh** (hk.cih,n.x.mê) Erdê bi kêr kêlan û çandinê bi hêt. Zevî. Pawan.

**Kêlî** (n.x.mê) Berek pane wek kêlan liser gora mirîyan di çiklînin, hinde caran nav û bûna wî li ser di nivîsin.

**Kêlîk** (n.x.mê) *giya* Berê çend corên gîyayî, di nav qelpekî da, hijmara wan cuda ji yekê û pitir. Kêlînok. Nîsik, htd.

**Kêlînok** (n.l.mê) ***giya*** Kêlîkên nokan.

**Kêlûk** (n.x.mê) Bo jinên dînê wan ne îslam yan neteweyên din, di hêt gotin.

**Kêlûn** (n.x.mê) Kilîleka mezine, ji darî yan hesine, jibo daxistina dergehên mezin.

**Kêlûnkirin** (k.jn.l.mê) Daxistin bi kêlûnê. (K) bn: Kirin.

**Kêm** 1 (n.x.mê) Şileyekê sipî û çire, li cihên (birîn) kul peyda di be. :Kêma keftî birîna wî.

**Kêm** 2 (pêrb.alv.çend) Ne zor. Ne gelek . Ne pir.: Me kêm pare hene. : Qelemekê min yê kême.***Pend*** :kêman kêm jê di çin, zoran zor jê di çin.***Pend*** :Kêm bi de ber dasê, da ne bit asê.

**Kêmanî** (hn.dar.çewa) Kêmasî. :Bi kêma dê heftîyekê li mal mînim.

**Kêmasî** (hn.dar.çewa) Karê bi diristî ne hatî kirin, wek pêdvî pê ranebûn. Leng. Nîvberû. Qetlazî. : Supas bo we çi kêmasê li def me nînin.

**Kêmasîkirin** (k.jn.l.mê) Encam nedane karî wek pêdvî.: Ewî çi caran kamasî di karê xwe da ne kirî ye. (K) : Kirin.

**Kêmbawer** (hk.l.çewa) Mirovê kesatî ya wî lawaz. Reşbîn.

**Kêmbawerî** (n.l.mê) Bêbawerî. Reşbînî.

**Kêmber** (hk.l.çewa) Candar yan mitayê kêm berî di hînit. Xirş.

**Kêmbîr** (hk.l.çewa) Mirovê zû tiştî jibîr di ke. Bîrkurt.

**Kêmbûn** (k.jn.l.mê) Dema mita, pare, candar û htd kêm di bin. Jêçûn. : Roj bo rojê tîtalên neçak kêm di bin. (K) bn: Bûn.

**Kêmdîtin** (k.jn.l.mê) Çavtarîbûn. Xirab dîtin.(K) bn: Dîtin.

**Kêmendam** (hn.l.çewa) Kesê ji alîyê canî ve leng. Pekkeftî.

**Kêmhedam** (pesnl.dz) Kêmendam.

**Kêmî** (n.dar.mê) Kêmbûn.

**Kêmkirin** (k.jn.l.mê) Jinavbirin. Jêbirin.:Demhijmêra min kêm di ke.(K) bn: Kirin.

**Kêmtir** (hn.dar.çend) Piçektir. Ji hindekan pîçektir.

**Kêmtirîn** (hn.dar.çend) Ji hemûyan piçektire. Gelek kêm. Pir kêm.

**Kêmûzêde** (hn.l.çend) Ne kêm ne zêde. Navincî.Pitir yan kêmtir.

**Kêmxwîn** (hn.l.çewa) Mirovê xwîna wî kêm be.

**Kêmxwînî** (n.l.mê) ***derd*** Nexweşîyeke mirovî di girit ji encamê kêmbûna xwînê di canî da.

**Kêr** 1 (n.x.mê) Çeqo. Satork.***Pend*** :Stoyê xwe da ber kêrê. ang; kesê nezan bi destê xwe ji xwe ra belayan di hîne.

**Kêr** 2 (hn.x.çewa) ***khêr*** Qenc. Baş. Mifadar. Hêja.

**Kêrandin** (k.jn.x.mê) Çêkirina tiştê bi kêrî karînanê bi hêt. Nûjenkirin. Bijînkirin.(K) bdn:ez di kêrînim em di kêrînîn, tu di kêrînî hûn di kêrînin, ew di kêrîne[…it] ewan di kêrînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di kêrand, di kêrandin. Db,dûr : kêrandibû, kêrandibûn. (F) : bi kêrîne, bi kêrînin.

**Kêranîn** (k.jn.l.mê) Bi karanîn. Kar pê kirin.bi Kêr înan.

**Kêrat** (n.x.mê) ***tiraş*** Core dareka keske, biharîye,guleka zera biçûk di det û aveka şirîn têdaye zarok di mêjin, her jiber hindê di bêjinê mêjok, berê wî mîna fasolîyane, di nav kêlîkan da, tenê kewal di xwen di bêjinê pezpezok.  . Tiraş.

**Kêrhatin** (k.jn.l.mê) Jibo karanînê dirist. Peyt. Bêkêmatî. Hêja. :Ev pêlave bi kêr te nahêt. : Ez bi kêr wî karî di hêm. (K) bn: Hatin.

**Kêrhatî** (hk.l.çewa) Hejî. Hêja. Peyt. : Azad xortekê kêhatîye.  Br× Kêrnehatî.

**Kêrik** (n.dar.mê) Kêra berîkê. Kêra biçûk.

**Kêrîşk** (n.x.dz) ***candar*** Giyandarekê şîrdere, malî û kûvîye. Xirnîk. Kêrûşk Kêvrûşk.



**Kêrîşk**

**Kêrt** (hk.cih,n.x.mê) Çalik. Cihê nikirandî. Cihê têkolayî.

**Kêrtkirin** (k.jn.l.mê) Nikrandin. Têkolan. Qewartin.(K) bn :Kirin.

**Kêş** 1 (n.x.mê)1. Doz. Arêşe. Kêşa me kêşeka siyasî ye.

**Kêş** 2 (n.x.mê) Bariste. Giranî. Seng. :Kêşa vî kevirî du kîlo ne.

**Kêş** 3 (n.x.mê) Karek fîzîkîye bo rakêşana tenan bi alîyê xwe ve.

**Kêşan** (k.jn.x.mê) 1. Rakêşan bi alîyê xweve. Înan. :Bar kêşan . 2. Mêtin. Hilkêşan.:Cigare kêşan. (K) bdn: ez di kêşim em di kêşin, tu di kêşî hûn di kêşin, ew di kêşe[…it] ewan di kêşin. Pr:dê bi + bdn. Bdb: di kêşa di kêşan. (F): bi kêşe bi kêşin.

**Kête** (n.x.nêr) Darekê dirêj û raste bo ser avahî, yan diriskirina perjanan bi kar di hên. Nîre.

**Kêvjale** (n.x.nêr) candar Giyandarekê hişkavîye, reqe, gelek çng heye, du destên wek cewbiran hene jibo girtina xwarinê û xwe parastinê.

**Kêyandin** (k.jn.mê) Keyandin.Şilqandin.

**Kêz** (n.x.mê) ***candar kêzik*** Giyandarek biçûke , gelek cor hene. ***Pend*** :Kêzê jî hate rêzê.

**Kêzgilolk** (n.l.mê) ***candar kêzik*** Kêzeka reşe rîxa candaran di ke gilolk jibo xwarina xwe û têjikan di nav da di ke.

**Kêzgûgerîn** (n.l.mê) ***candar kêz*** Kêzgilolk.

**Kiç** (n.x.mê) 1.Jina ne şwîkirî. 2.Nivşê mê yê daykûbaban, kiça wî, wê . Jîyan kiça mamê mine.Dot. Keç.

**Kiçane** (hn.dar.çewa) Kelûpelên kiçan. :Pêlavqa kiçane. :Kirasê kiçane.

**Kiçik**(nazn.dar.mê) Kiça biçûk yan nazikkirin.

**Kif** (hn.x.çewa) ***deng*** Dengê vemirandina agirî bi avê. Dengê daxkirina leş yan giya û tiştê ter.

**Kifên** (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê kifkifa agir û avê.2. Dengê marî.

**Kifênhatin** (k.jn.l.mê) Dengê kifênê jê hatin. : Tilîya min bi agirî kevt kifên jê hat. :Kifêna marî ya di hêt!.

**Kifir** (n.x.mê) ***tiraş*** Core dareke liber lêvên çeman hişîn di bin, gelek mezin nabin. ***Pend*** : Garîte ji kifran ranabin. Ang; daybabên kêrnehatî nivşê wek xwe berhem di hînin.

**Kifkif** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê ji dinfna mirov, giyandarên nexweş yan lewaz derdikevit. Pişpiş.

**Kifkifî** (hk.dar.çewa) Mirovê kifkifê di ket. Pişpişî.:Zelamekê kifkifî. :Jineka kifkifî.

**Kifkifkirin** (k.jn.l.mê) Dengê kifkifê jê hatin, anîn. : Ev peza kilmîşok çend kifkifê di ke.

**Kifkirin** (k.jn.l.mê) Mirov bi hêza bayî ji nav sîhan kilmîşî bo derve birêya kepîyê pal di de û di havêje derve. (K): bn: Kirin.

**Kifko** (n.x.nêr) Kîfko.

**Kifkobûn** (k.jn.l.mê) Kifkobûn.

**Kifrî**(hk.cih,cugirn) Bajêrekê Kurdistana başûre.

**Kifte** (n.x.mê) *zad* Core xwarineka kurdî ye, hevîrê danhêrkî pirî goşt û pîvaz di ken di avkêda tê kelandin yan birinc û goştê vestirî û di rûn yan avê da kelandî. Kutilk.

**Kik** (hn.çewa) *deng* Dengê vêkketina didanan, lêkdana texma ser û binî.

**Kikên** (n.dar.mê) *deng* Dengê vêkkevtina didanan.

**Kikênhatin** (k.jn.l.mê) Dengê kikênê di hêt guhê mirovî.

**Kil** 1 (n.x.nêr) Core dermanekê reng reşe, bo ciwanî û reşkirina çavan, jin bi kar di hînin.2. Kilçîv.

**Kil** 2 (n.x.mê) Çend caran livîna lêdan û kiyana meşkê. Şilq. Pal.

**Kilçan** (n.x.mê) Eletirîk. Layêt.



**Kilçan**

**Kilçav** (n.l.nêr) Kilçîv.

**Kilçêv** (n.l.nêr) bn: Kilçav.

**Kilçîv** (n.l.nêr) Darikek lûleyî hulîye jin bo kildana çavan bi kar di hînin.

**Kildan** (k.jn.l.mê) Çavkildan. Çavrengkirin.Çavreşkirin. :Xatûnê çavêd xwe kil dan. (K) bn: Dan.

**Kildank** (n.l.mê) Tûrikek biçûke kil û kilçîv têda di hên hilgirtin.

**Kilêb** (n.x.nêr) Xermaşe.Binkol.

**Kilêbkirin** (k.jn.l.mê) Zevî, rez, bi kilêbî hilûkirin. Xermaşekirin.(K) bn: Kirin.

**Kilêjî** (n.x.mê) bn: Kelêjî.

**Kilik** (n.x.mê) *can* Kurîya giyandaran. Dwîv.dûv.

**Kilikdar** (hn.dar.çewa) 1. Candarên bi kilik. 2. Stêrên wesa xuya di kin ko kilik hene.

**Kilisan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Pêvenûsandin. Têdan. Pêradan. : Pilasterê bi destê xwe ve bi kilisîne.Nûsandin.

**Kil<u>îl</u>** (n.x.mê) Amûrek ji hesin yan darî ye jibo daxistin û vekirina a dergehan bi kar di hêt. Seqat. Kîlûn.



**Kilîl (kêlûn)**

**Kilîl<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Daxistina dergeh, sindoq, pencer û htd bi kilîlê. (K) bn: Dan.

**Kilîl<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Kilîldan. (K) bn: Kirin.

**Kil<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Kildan. ;Çavan kil di kein. (K) bn :Kirin.

**Kil<u>meşk</u>** (n.l.mê) Dema kil li meşkê di hêt xistin û di ber re di stirên; ***pend*** : kilmeşkê meşkînê , dar û loleb zêrînê.

**Kil<u>mîş</u>** (n.x.nêr) Keresteyekê şil, nîsek û rone di nav sîhên mirov û giyandaran da di rêya difinê da derdikevit.

**Kilmîş<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Kifkirin. (K) bn: Kirin.

**Kilmîş<u>ok</u>**(rd.hk,dar.çewa) Mirov yan candarê difin bi kilmîş. Kesê herdem kilmîş ji kepî yê di hêt xar.

**Kilosk** (n.x.nêr) ***khilosk*** Amaneke ji axa taybetî hatîye diristkirin bo têxistina mita, pere, zêr û htd. Gozik.

**Kil<u>ox</u>** (n.x.nêr) ***candar*** Hestî ye serê candaran yê mejî di nav da di hêt paraztin.: Kiloxê serê mirovan. Kulox.

**Kim** (n.x.mê) Kum.Kulav.

**Ki<u>max</u>** (n.x.mê) Kemax.

**Ki<u>mê</u>** (n.x.mê) Tepedora darî.

**Kim<u>kime</u>** (n.dar.dz) ***candar*** Candarek xişok û biçûke liser kevir û beran di jît. Xemegur.

**Kin** (hn.x.çewa) Hwîr Hûrik. Biçûk. Nizim. Nevî.

**Ki<u>nar</u>** (hkcih) Rex. Tenişt.

**Kin<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Têkçûn. Kurtbûn. (K) bn: Bûn.

**Kinc** (n.x.pir) Cil .Cilik. Berg.

**Kincir** (n.x.pir) Cilkên diryayî, kevin û peritî.

**Kinê** (gazn.dar.mê) 1. Naznav û bangkirina jina ciwan hûrik. 2. Navek kurdî jinaneye.

**Kinêr** (n.x.mê) ***dar*** Dareke li çiya hişîn di bit, jibo şivgopalan bi kar di hêt.

**Kinêrî** (n.x.mê) ***derd*** Qunêrî.

**Kinif** (n.x.nêr) Bendek stûr û dirêje ji naylon hatîye çêkirin bo girêda giyandar û tundkirina baran bi kar di hêt.

**Kinîşt** (n.x.nêr) Rondik( hêstir) ên çavan yên reng zer û hişik, ji egera nivistin yan çavkulîyê bi mijîlankan ve di mînin.

**Kinoj** (hk.x.çewa) Zikreş. Tefşê berokê xwe.

**Kir** 1 (hn.x.çewa) ***kirr*** Kewala guh biçûk. :Bizina , miha kir.

**Kir** 2 (k.derbaz) ***rêzman*** Dema derbazbûyî ya kirin. :Te çi kir?.

**Kir** 3 (hn.x.çewa) ***khirr*** Bêdeng. Mit. Ker[guhgiran].

**Kirandin** (k.jn.x.mê) Mirov yan giyandar xwarinek nîvreq di xot, kirtekirt ji didanan di hêt. :Seg hestîyan di kirîne. : (K) bdn: ez di kirînim em di kirînîn, tu di kirînî hûn di kirînin, ew di kirîne[..it] ewan di kirînin. Pr :dê[bi] kirînin, kirînîn, kirînî, kirînin,kirînit[..ne], kirînin. Bdb : di kirand, kirandin. Db,dûr : kirandibû, ... bûn. (F) : bi kirîne, bi kirînin.

**Kiras** (n.x.mê) Cilikên jina yên dirêj û mêran yên serî.

**Kirê** 1 (n.x.mê) Xanî, dikan, tirombêl htd, mirov pareyî di dit xwedî dako bi kar bînit, ang ; mirovê bi kar di hînit kirê di dit. Deman. : Min dukanek bi kirê girtîye, ez mehê dused dînaran kirê ya wê di dim.

**Kirê** 2 (gazn.mê) ***kirrê*** Nazanav û gazînanavê kewala kir.

**Kirêdan** (k.jn.l.mê) Mirovê xanî, erd, dukan û htd bi kirê di de xelikî.

**Kirêdar** (n.dar.dz) Yê ko di xanîyê kirê da di jît.Br× Kirêder[xudan].

**Kirêder** (n.dar.dz) Yê ko xanî, tirombêl,dikan htd bi kirê di dit. Xudan.

**Kirêgirtin** (k.jn.l.mê) Mirov xanî, dikan, û htd bi kirê ji yekî di wergire.

**Kirêgirtî** (hk.l.çewa) Mirovê bi kirê hatî girtin jibo pare û malî. Xwefiroş. Dardest. Caş.

**Kirêkar** (karn.l.dz) Karker. Pale. Rêncber.

**Kirêkirin** (k.jn.l.mê) Kirêgirtin.

**Kirêt** (hn.x.çewa) 1. Neciwan. Gemar. Neşirîn. Nerind. 2. Navê mêrane.

**Kirêtbûn** (k.jn.l.mê) Nerindbûn. Gemarbûn. Pîsbûn. (K) bn : Bûn.

**Kirêtkirin** (k.jn.l.mê) 1.Gemarkirin. Pîskirin. Neşirînkirin. 2. Bi xurtî di gel cotbûn. Bêrêzkirin. Bêrûmetkirin. Şermizarkirin. (K): bn Kirin.

**Kirim** (n.x.nêr) ***candar*** Giyandarek zirav û lûleyîye di nav axê da yan dar beranda di jît.

**Kirin** (k.jn.x.mê) 1.Kiryareke mirov pê ra di bit. Bi cih înan. Bi cê anîn. Paşpirte digel peyvên din . karkirin, darkirin. Nivêjkirin û htd. 2. Çinîn ; jê kirin. :Ser jê kirin. :Sêv jê ve kirin. 3. ***rêzman*** Kiryar. ***Pend*** :Bi ke bi keranî, bi xwe bi mêranî.(K) Bdn :ez di kim(kem) em di kîn(keyn), tu di kî(key) hûn di kin(ken), ew di ke(ket)ewan di kin(ken). Pr : dê bi + bdn. Bdb : di kir, di kirin. Db,dûr : kiribû, ...bûn. (F): bi ke bi kin[ken].bi kra, kiriba.

**Kirinder** (k.jn.dar.mê) Derkirin. Derêxistin.

**Kirîn** (k.jn.mê) Tişt yan mitayê mirov bi pare di wergirit. : (K) bdn: ez di kirim em di kirîn, tu di kirî hûn di kirin, ew dikire[..it] ewan di kirin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : di kirî, di kirîn. Db,dûr :kirîbû, ...bûn. (F): bi kire bi kirin. Br×Firotin.

**Kirîv** (n.x.dz) Peyveke jibo rêzgirtin, nemaze li cem êzdîyan bi di hêt. Bira. Heval.

**Kirîvê- kirîvaxwînê** (n.l.dz) Dema mirovek kurê xwe liber hevalê xwe sinet bikit, dê bin kirîvên xwînê yên hevdu.ang ; dost û birayên xwînê.

**Kirkirk** (n.l.mê) ***leş*** 1. Madeyek leşê giyandarane nîvreqe. Girtik. 2. Hefik.

**Kirnî** (n.x.mê) ***kirmijok*** Candarek xwînmêj û biçûke li ser xwîna kawalan di jît.Gijnîk.

**Kirosk** (n.x.nêr) Xirosk. Dîkil. ***Pend*** : Kirosk li ber derê xwedîyê xwe bang di de.

**Kirpandin** (k.jn.x.mê) Xistina tiştê req û nîvreq ber didanan û kirpe kirp jê peyda di bit. :Mişik nanî di kirpîne.

**Kirpekirp** (n.l.mê) *deng* Kirpên. :Kirpekirpa didanêt kitikê di hêt, ta hestîyan di xut.

**Kirpên** (n.dar.mê) *deng* Dengê kirtkirta(kirtandina xwarinêd req) didanên candaran, nemaze mişk.

**Kirtên** 1 (n.dar.mê) *deng* Dengek kiz. Dengek nizim.

**Kirtên** 2 (n.dar.mê) *rêzman* Nîşana (,). Rawestaneka kurd. (,)

**Kirtkirt** (n.dar.mê) *deng* Dengê didanên giyandaran wek mişk, dema tiştekî yan xwarinekê ker di ket. : Kirtkirta wî ye yê çinîkên nanî di kirî di kirînit.

**Kirtkirtkirin** (k.jn.l.mê) Dengê kirtkirtê înan.

**Kirtopk** ( n.x.mê) bn: Pitat.

**Kiryar** (n.x.mê) Kirin. Pêrabûn. *Pend* :Hizar gotin gorî kiryarekê bin. Ang; gotinê çi biha nîne eger kiryar(kirin) pnebit.

**Kisk** (n.x.mê) Bezê qelandî li dema xwarinê kiskis jê di hêt.

**Kiskis** (ndar.mê) *deng* Dengê devê mirovî dema xarinek nîvreq di xwe, wek kiskan.

**Kişandin** (k.jn.x.mê) 1.Kêşan. 2.Wergirtin. 3.Rakêşan. :Min gelek derd û cefa kişandin. (K): di kişînim, di kişînîn,dê bi kişînin, kişand, kişandibû.

**Kişkişandin** (k.jn.dar.mê) Kişkirin.

**Kişkirin** (k.jn.l.mê) 1.Hajotin yan derêxistina mirîşkan. : Mirîşkê kiş ke.2. Handan. Sîrdan. Paldan. .: Kişe mirîşkê Wî seyê xwe kişkire karwanîyan.(K) bn: Kirin.

**Kişmiş** (n.x.mê) Mêwîj.

**Kiştûkal** (n.dar.mê) Çandin. Çandinî.

**Kit** (hn.x.çend) 1. Tiştek bi tinê. Tek. êk. 2. Hijmara kit, ne cot, wek 1,3,5,7,9,21,43 û htd. Br× Cot.


**Kita** [keta] (n.x.mê) *kevin* Peyveka zend avêstaye ango; nivêsîn yan belgename .

**Kitan** (n.x.nêr) Corekê perokane pitir jin bi kar di hînin.

**Kitêb** (n.x.mê) Pirtok.

**Kitêbxane** (n.dar.mê) Cihê xandin yan kirîna kitêban. Pertokxane.

**Kitik** (n.x.dz) Giyandarek şîrdere ,malîye yan kûvî. Pişîk. Gîvir.***Pend*** :Kitika çavniq.ang; kesê qencîyan ji bîr di ke.***Pend*** :Kitika heft giyan.ang; miro yan candarên jibo mirinê di qayîm, zû na mirin.



**Kitik** (pişîk)

**Kitikî** (hn.dar.çewa) Xwarina kîfko di girit. Kîfkûyî.

**Kitikîbûn** (k.jn.l.mê) Kîfkobûn.

**Kitkit** (hn.dar.çend) Yekyek. êkêk. Br× Cotcot.

**Kivan** (n.x.mê) 1.Amêrekê xarkirî ye, bendikek lastîkî yan sipringek pêve girêdaye bi kêşan û berdana wî tîran di havêje, bo karên cengî yan werzişî bi kar di hêt.2. Çembereke peyvên nemaze di xin navbera wan.

**Kivanabiçûk** (n.l.mê) ( ), (kivan).

**Kivananavincî** (n.l.mê) {}, {kivan}.

**Kivanamezin** (n.l.mê) []. [kivan].

**Kivark** (n.x.mê) ***giya*** Corek xwarina giyayî ye. Serkulafk. Kulavoşk.



**Kivark**

**Kixe** (hn.x.çewa) Bi zimanê zaroyan. ang; Pîs. Gemar.

**Kixs** (n.x.mê) ***giya*** Pîvaza biçûk ya paş çandinê di bite pîvaza dirist.

**Kiz** (hn.x.çewa) Mirovê bê aram. Tengav yan zarokê girîya wî nêzîk, yan xewa wî bê.

**Kizbûn** 1 (k.jn.l.mê) Zarokê nazdar û zû di girî. Mirovê kovandar. (K) bn: Bûn.

**Kizbûn** 2 (k.jn.l.mê) Kêmbûn. : Ronahîya çirayî gelek kiz bûye!. (K) bn :Bûn.

**Kizgirîk** (n.l.mê) Kelegirî.

**Kizgiryok** (n.dar.mê) Kizgirîk. Kelegirî.:Kizgiryok kefte hefka wê.

**Kizir** (hk.x.çewa) Tiştê ter dema pîçek zuha di bit. Herîya kizir, hevîrê kizir, der û kolanên kizir.

**Kizirbûn** (k.jn.l.mê) Dema tişt kizir di bit. :Kengê dê der û kolan kizr bin?.

**Kizirkirin** (k.jn.l.mê) Mirov tiştî kizir di ke. :Hevîrî bi arî kizir bi ke!.(K) bn :Kirin.

**Kizîr** (karn,x) Mezinê gundî. Keya. Kedxûda

**Kizkirin** 1 (k.jn.l.mê) Nazdarkirin. Girandin. .:Hewe ev zaroke gelek ê kiz kirî!.

**Kizkirin** 2 (k.jn.l.mê) Kêmkirin. :Dengê radyoyê kiz ke. (K) bn: Kirin.

**Kî** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke bo pisyarkirina kesî. :Kî dizanit navê wî çîye? :Ew kî bo hat?.: Tu kî yî?.

**Kîf** (n.x.nêr) Perokek(cilek) nemazeye wek tûrik bo têda hilgirtina (paraztina) tiştî bi kar di hêt. Tûrik.:Kîfê tivengê.

**Kîj 1** (pêrb.) ***rêzman*** kî ji Alaveke bo destnîşankirina tiştek yan kesekî ji birekê. :Kî ji we birayê Azadî ye?.

**Kîj** 2 (n.x.mê) ***khîj*** Keç. Kiç.

**Kîjan** (pêrb) Kî ji wan. Kîj.

**Kîlo** (n.cîhan,x.mê) Yekeyeka cîhanî, ya pîvana baristeyan. 1000 gram : Kiloyeka sêv,birinc, asin, hirî û htd.

**Kîlogram** (n,cîhan)) Kîlo.

**Kîlometir** (cîhan.l.mê) Yekeya pîvana dirêjî yê. 1 km= 1000m.

**Kîmya** (ncîhn,x.mê) Zanîn û waneya nemaze li ser xandina êkgirtin û jêkvebûna madeyên kîmyayî.

**Kîmyager** (karn.dar.dz) Şarezayê zanîna kîmyayê.

**Kîmyagerî** (karn.dar.mê) Karê kîmyageran.

**Kîn** (n.x.mê) Kerib. Toreyî. Tengijîn.

**Kîndar** (hk.dar.çewa) Mirovê herdem çav li tole û êşandina mirovan. Mirovê bi kîn. Mirovê çavsor.

**Kîndarî** (n.dar.mê) Dirindeyî. Çavsorî.

**Kîngirtin** (k.jn.l.mê) Kerb û kîn mirovî di gire. Torebûn. Çavsorbûn.

**Kînoyî** (hn.dar.çewa) Kîndar.

**Kîr** 1 (n.x.nêr) ***khîr*** Hedamê guhnelî yê nêr.

**Kîr** 2 (hk.x.çewa) Kûr.

**Kîrbûn** (k.jn.l.mê) Kûrbûn.

**Kîrkirin** (k.jn.l.mê) Kûrkirin.

**Kîs** (n.x.mê) Tûrik. Çantik.

**Kîse** (n.x.mê) Kîs.

**Kîsele** (n.x.dz) ***candar*** Candareke pişta wî bi kavlanek reqê hestî dapoşîye. Kûsî.

**Kîselfis** (n.l.dz) Kîsele.

**Kîsk** (n.dar.mê) Tûrikek biçûke tûtinê di kenê. Kîskê tûtinê.

**Kîso** (n.x.dz) Kîsel.

**Kîş** ; kîj.

**Kîşe** (n.x.mê) Awayekê taybet ê zêdekirina berhemî ye,tayekê darê nemaze mêw, ji binê, di bin axê ve di kin, serê wê di cihek dî ra derdixin hişîn di bit dareka nû zêde di bit.

**Kîşekirin** (k.jn.l.mê) Çêkirin û zêdekirina kîşeyan. (K): bn :Kirin.

**kîşê** (gazn.dar.mê) ***rêzman*** Bangnavê jina direwîn.


**kîşo** (gazn.dar. nêr) ***rêzman*** Bangnavê mêrê direwîn.

**Kîşwer** (hk.cih,cugir,n) Çend welatek bi hev ra. : Kîşwera Asya, Efrîka, Ewropa û htd.

**Kîvar** (n.x.mê) ***giya*** Corekê giyaye, bi stirî ye nêrika wî ya ter tamdare,xwarina mirov û candarane. Kerbeşk. Qîvar.

**Kîve** (hn.pir) Pirsîna bizivîne, sent. Kuda. Bo kûve. : Tu dê sube kîve çî ?.

**Kîvî** 1 (n.biyan) ***Fêqî*** Fêqîyekê xweş û şirîne.



**Kîvî**

**Kîvî** 2 (n.biyan) ***perinde*** Balindeye.

**Kloç** (n.x.nêr) Şaxê candaran. Kloçê bizinê.

**Koç** (n.x.mê) Veguhastin yan dûrketin ji warê xwe. Mişext.

**Koçber**(hn.dar.çewa) Kesê koç di bit. Mişextî. Aware. Revend.

**Koçek** (karn,x) Zanayek piledar ê dînê êzidîyatî yê.

**Koçer** 1 (hn.dar.çewa) Mirov ji warekî bo yê dî di çe. Gerok.

**Koçer** 2 (malb,n) Hozeka kurdane.

**Koçerî** (n.dar.mê) Jiyana gerok li dû çerwanan jibo pez û bizinî.

**Koçik** 1 (n.x.mê) Mêvanxane. Sera.

**Koçik** 2 (n.x.nêr) ***candar*** Seg. Se.

**Koçî** (hk.dem) Mişextî. Sala koçî.

**Koçkirin** (k.jn.l.mê) Mirov û candar warê xwe bi cih di hênin. Mişextbûn. Awarebûn. (k): bn: Kirin.

**Kod** (n.x.nêr) Cer. Cerik. Gozik. Avdank.

**Kodqelên** (rd.l.çewa) Tişt yan mirov bi be egera bela û çaman. Kur. Beş. Serxwer.

**Koga** (hk.cih,n.x.mê) Xanî yan dikanên mezin yên kirîn û firotinan. Firoşgeh.

**Koh** (hk.cih,cugirn.x.nêr) Çiya. Şax.

**Kok** 1 (n.x.mê) Nivş. Berebab. : Ew di koka xwe ji gundê jêrî ye, lê li gundê me xwecihe.

**Kok** 2 (hk.x.çewa) Peyt. Bi serûber. : Ezê kokim û çi ji min ne kême.

**Kokakola** (n.biyan.l.mê) Vexwarinek şirîn û bi tame. Core xoşaveke.

**Kokandin** (k.jn.l.mê) Peytkirin. Bi serûberkirin. Li karkirin.: Jiber cejin ê xelikê gundî hemûyan xwe kokandîne.(K): bdn: ez di kokînim em di kokînîn tu di kokînî hûn di kokînin, ew di kokîne[…it] ewan di kokînin. Pr:dêbi +bdn. BdB : di kokand, di kokandin. Db,dûr: kokandibû, kokandibûn. (F): bi kokîne, bi kokînin.

**Kokî** (n.dar.mê) Ciwanî. Rindî. Peytî.

**Kokkirin** (k.jn.l.mê) Kokandin. Peytkirin. Kêrê xwe kirin.

**Kol** 1 (n.x.nêr) Xanîyên bê serûber ê bi herîyê hatîn diristkirin bo kewalî û hinde caran mirovan.

**Kol** 2 (hn.x.çewa) ***khol*** Rût. Rîs. Xas. Serkol. Bê kulav û dersok.

**Kolan** 1 (k.jn.x.mê) Rakirina axê bi pêmer yan makînan. Kêlan. : Dema kolana rezne. : Kakil yê bîstanê xwe di kolit. (K) bdn: ez di kolim em di kolîn, tu di kolî, hûn di kolin, ew di kole[..it] ewan di kolin. Pr:dê bi +bdn. Bdb: di kola, di kolan. Db,dûr: kolabû,.... bûn. (F): bi kole, bi kolin.

**Kolan** 2 (n.x.mê) ***kholan*** Rê yan cadeyên navbera malan da.

**Kole** (n.x.dz) Bend. Bindest. Reben.

**Kolebûn** (k.jn.l.mê) Bindestbûn. Bendbûn. Perîşanbûn. (K) bn :Bûn.

**Koledar** (karn.dar.dz) Mirovê xelikî wek kole bi kar di hînit. Zordest. Zordar.

**Koledarî** (n.dar.mê) Jiyana bindestî.

**Kolekirin** (k.jn.l.mê) Bindestkirin. Tepeserkirin. (K) bn :Kirin.

**Kolîn** (k.jn.x.mê) bn: Kolan.

**Kolk** (n.x.mê) Kolê biçûk.Kolkê mirîşkan.

**Kom** (n.x.mê) Gelek. Zor. Piranî. :Komeka mirovan. :Komeka axê. :Komeka candaran.

**Komando** (nbiyan.x.nêr) Serbazên bi rahênanên nemaze meşiq kirîn. Leşkerê taybet. Pêşmerge.

**Komar** (n.x.mê) Welatê ko serok lê di hêt hilbijartin.

**Komarî** (hk.x.çewa) Sîstema welatên bi serok ko ji alîyê gel ve di hên hilbijartin.

**Kombûn** (k.jn.l.mê) Lêk xirvebûn lihev civîyan. Civîn. (K) bn: Bûn.

**Komcivîn** (n.l.mê) Kombûn. Civîn.

**Komel** (n.x.mê) Civak.

**Komelayetî** (hk.dar.çewa) Civakî.

**Komelgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Civak.

**Komêdî** (hk.biyan.çewa) Çîrok û filmên rexneyî bi awayê dilveker û kenok.

**Ko<u>mik</u>** (n.dar.mê) Komên biçûk. Girik.: Komikên axê.

**Komika<u>nê</u>** (n.dar.mê) Yarîyeke, zaro di bin du bir, yek liber makê di mînit ya dî li cihên ne diyar komikên axê çê di kin û paşî bira ber makê dê li komikên berdija xwe gerin û jinav bin, eger çi keomik neman, dê xwe lêk gihorin lê eger hinek komik man ne xirab kirî dê wek xal bo xwedîyên komikan hên tomarkirin û yarî dê hosa berdewam bit.

**Komka<u>nê</u>** (n.dar.mê) Yarîyeke bi perikan di hêt kirin mirov di bin du deste û di leyzin.

**Kom<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Civandin. Xirvekirin. : Kizirî gundî hemû li mala xwe komkirin. (K) :Kirin.

**Komir** (n.x.mê) Avahîyek nemazeye liser daran tê diristkirin û banê wî bi axê digirin ji çavkekî agirî berdidinê ,jibo çêkirina rejîyê. Êton. Kûrik.

**Komir<u>van</u>** (karn.dar.dz) Xudanê yan rêvebirê komirê.

**Komî<u>te</u>** (n.x.mê) Lijne. Deste.

**Kom<u>kar</u>** (n.dar.mê) Civat. Dezgeh. Komele. Navend.

**Kom<u>kirin</u>** (k.jnlmê) civandin. Xirkirin.(K) bn: kirin.

**Kom<u>pîyote</u>r** (n. cîhl.nêr) Makîna yan amêrê zanyarîyan.

**Komo<u>nîst</u>** (n.biyan.dz) Kesê ser bi partîya komonîstî ve.

**Kon** 1 (hn.x.çewa) Kevin.

**Kon** 2 (n.x.mê) *can* Qon.

**Kon** 3 (n.x.nêr) Çadir. Xîvet.

**Kon<u>firens</u>** (n.biyan) Civîneka nemaze jibo danûsitandin liser mijar û bûyerên giring.

**Kongire** (n.biyan.) Civînên mezin jibo nirxandina desteya kevin û gihorînan bi rêya dengdanê . Civîn.

**Kon<u>tirat</u>** (nbiyan.x.mê) Girêdana peyman, rêkkevtinan li navbera alî, sazî yan kesan bo encamdana karekî yan diristkirina projeyan. Qonterat. Girêbend.

**Konter<u>çî</u>** (karn.dar.dz) Kesê yan xwedîyê kontiratê. Qonterçî. Belênder.

**Kop** (n.x.nêr) 1. Perdax. 2. Den. Cer.

**Ko<u>pî</u>** (nbiyan.x.mê) Amêrê libergirtina nivîs yan mînakan. Jêgir.

**Kopîkirin** (k.jn.l.mê) Libergirtina kopî yan. : Min nasnameya xwe kopî kir heger berzebû da min mînaka wê hebe. Jêgirtin. (K) bn: Kirin.

**Kore** (hn.x.çewa) ***khore*** Mirov yan giyandarê ne bînit. Nabîna.***Pend*** :Kore di bêje koreyî wêve here!. ***Pend*** :Kore na çite rava, pîremêr na bite zava.

**Korahî** (n.dar.mê) Korebûn. : Korahî bi çavan da bi hêt.

**Koranî** (n.dar.mê) Korahî.

**Koratî** (n.dar.mê) Korahî. Çavtarî.

**Korbûn** (k.jn.l.mê) Korebûn.

**Korebûn** (k.jn.l.mê) Çavên mirov û candaran ji egera nexweşî yan zikmakî kore di be û êdî nikare bi bîne. (K) bn: Bûn.

**Korek** (hk.cih,nx) 1. Çiyayekê bilinde li Kurdistanê devera Hewlêr. 2. Hêleka telefonên berîkane li Kurdistanê, bi bi navê heman çiya.

**Korekirin** (k.jn.l.mê) Dema ji egera lêdan yan birîndarî yê çav kore di bin.(K) bn: Kirin.

**Koremar** (n.l.nêr) Corekê marê jehirdare, jiber mitî ya wî bi kore navdenge.

**Korewar** (hk.l.çewa) Kesê dûrî welatê xo û herdem bîrîya wî bi ket.

**Korewarbûn** (k.jn.gl.mê) Ji xak welatê xwe dûrkevtin û bîrîya kesûkar, welat,war ûhtd kirin.

**Korewarî** (n.l.mê) Evîndarîya war û welatî.

**Korewarkirin** (k.jn.gl.mê) Mirov xwe yan êkî ji welat, war û cihwar ên wî bêbar bi ke ku herdem bîrîya wan bi ke.

**Korê** (naz,hd,bang) Gazîkirina jina kore, hest birîndarkirin.

**Korî** (n.dar.mê) Koratî.

**Korkirin** (k.jn.l.mê) Korekirin.

**Koro** (hd,gazn.dar.nêr) birîdarkirin, Gazîkirin zelamê kore.

**Kose** (hk.x.çewa) 1.Zelamê bê rih simbêl. 2. Xapînok. 3. ***giya*** Corekê kulindên dirêje.

**Kosk** (n.x.mê) Kotana biçûk. Kotana karikan. Kotana berxan.

**Kosp** (n.x.mê) Asteng.

**Koş** (n.x.mê) 1. Dehmen. 2. Hedamê mê yê guhnelî yê.

**Kot** (n.x.mê) Çeper.Kozik.

**Kotan** (n.x.mê) Li cihek rast dîwarekê kêtan çêkirî ,şêweyê bazinî yan lakêş bê bane û derek heye kewalî di xin nav bi taybetî li havînê. Tan. Perjan.


**Kotek** (n.x.mê) Zor. Zordarî. Xurtî:Keotek ez karîm biser banî bi kevim.

**Kotekî** (hk.x.çewa) Zorî. : Dujminî bi kotekî axa me dagîr kirî ye. :Bi kotekî keça xwe da şû.

**Kotel** (n.x.mê) 1.Burceka mezin û bilinde jibo ciwanîyê wek nîşan li cihên bûyerek lê hatî rûdan ava di ken û wêne, hêma û nivîs an liser di ken.2. Malcoyek stûnî ye jibo ava diçit ser aşî bi pengînit û hêza wê xurt bi bit jibo zivrandina berên aşî liser êk.

**Kotir** (n.x.mê) Balindeyeka kûvî yal malî ye,pir reng hene.Kevok. :Kotir çevenga aşîyê ye.

:Kotir li ser hêkên kurk bû. Kotir firî.



**Kotir**

**Kotî** 1 (n.x.mê) *derd* 1.Derdekê vegire,di bit egera gurîbûna pîstê mirovî. 2.Mirovê gurî.Kotî.

**Kotîbûn** (k.jn.l.mê) Toşî derdê kotî bûn. Gurîbûn.(K) bn: Bûn.

**Kovan** (n.x.mê) 1. Nexweş. Xem. Êş. Azar.Behî. Jan. 2. Navê mêrane.

**Kovandar** (hk,hn.dar.çewa) Kesê bi kovan. Bi xem.

**Kovandarî** (n.dar.mê) Xem. Nexweşî. Behîdarî.

**Kovar** (n.x.mê) Govar.

**Kovik** (n.x.mê) Amêreke binê wê borîyek zirav û serê wê firehe, jibo şilî kirine amanên der teng bi kar di hêt.

**Kovî** (hk.dar.çewa) Dirinde. Hov.

**Kox** (n.x.nêr) Kol. Kolk.

**Koz** (hk.cih,n.x.mê) Cihê bi pîş û pelex, ko her gundekî para xwe heye, jibo çerîna kewal û dewaran. Pawan. :Koza gundê jorî. :Koza pezî.

**Kozik** (n.x.nêr) Çeperê pevçûnan.

**Ku** (pêrb) *rêzman* Alavê girêdana hevekane. : Çewa ku ez hatim vêrê, min... . Ku careka dî karê wesa dubare be bit. Ko.

**Kubar** (hn.x.çewa) 1. Rind. Ciwan. 2. Navê keçane.

**Kuç** (n.x.nêr) Ber. Kevir. :Kuçek di kûçikî werkir.

**Kuçik** (n.x.nêr) Du sê beran yan herîyê di din rex êkve têda agirê daran di hêt hilkirin jibo lênan û gerimkirina av û xwarinê. Kuçkê daran, gazê htd. Çavka agirî.

**Kuçikreş** (hk.l.çewa) Mirovê çam bi ser hatî. Malwêran .

**Kuçikreşî** (n.l.mê) Malwêranî.

**Kuçke** (hk.cih,n.x.mê) Rêya ko dumahîya wê girtî.

**Kudî** (n.x.dz) Kudîk.

**Kudîk** (n.dar.dz) *candar* Têjika hirçê.

**Kufandin** (k.jn.x.mê) *deng* Dengê kufênê[kifên] jê înan, wek vemirandina agirî bi avê.

**Kujî** (hk.cih,nx.nêr) *endaze* Cihê derve yê avayîyan. Sê, çarkujî. Sî. Br× Qulaç.

**Kul** (n.x.mê) *derd* 1.Cihekê êvitî û kêmgirtî, edavgirtî. Birîna gemar.2. Kovan . Derd.3. Êşên giran .4. Biryan. *Pend* :Kula Helebê bikevit mala dujminî.

**Kulafe** (hk.x.çewa) Tirsonek. Kulekfireh. Bêzever.

**Kulareş** (n.l.mê) Êşa zirav.

**Kulav** (n.x.nêr) Perokeke bi qayda serî, mirov liser serê xwe dadinin jibo ciwanî yan xwe parastin ji serma û germayê. Kum.*Pend* :kulavek kir serê wî.ang; xapandin. *Pend* :Kulavê xwe xar kir. Ang; piştrastî.tena.

**Kulavpiştanê** (n.l.mê) Lîstikeke ; çend zaro bi awayekê bazinî di rûnin, yek li dora wan di zivire, bi dizîve kulavî li pişt hevalekê rûniştî di dane; heger wî hevalî zanî li pişt wîye dê dest dete kulavî û kevit pey hevalê xwe bi kulavan dê lêxit, heger ne zanî, hevalê di zivire dê gera zivirînaê berdewam bi ke ta di gehe nik yê kulav li pişt danaayî, dê dest havêt kulavî lê xit û ewjî dê bi awayê bazinî baz det ta di gehit cihê xwe û hosa yarî berdewam dê bit.

**Kulb** (n.x.mê) Nemana xwarinê.Qetlazî.

**Kulbûn** (k.jn.l.mê) Dema kulek li cihekê canê mirovî peyda di bit. (K) bn :Bûn.

**Kuldar** (hn.dar.çewa) Kovandar. Birîndar.

**Kulek** 1 (n.x.mê) Konek di dîwarî kolayî şêweyê, girovir, çarkujî û htd, bo têkirina kelûpelan.

**Kulek** 2 (hn.dar.çewa) ***kholek*** Kuldar. Gurî.

**Kulekfireh** (hk.l.çewa) Kulafe. Tirsonek.

**Kulfet** (n.x.mê) Jin. Pîrek. Afret. :Kulfeta hêjay ya nexweşe.


**Kulik** (n.dar.mê) Pirsikek mezine û edav digirit. Kul. :Kulikek ya li milê wî hatî.

**Kulim** (n.x.mê) Destê miçandî. Mist.

**Kulimdanan** (k.jn.l.mê) Dema mirov kummekê bi danit. :Kolim dana serî, gêj bû!.

**Kulimlêdan** (k.jn.gl.mê) Kulimdanan.

**Kulind** (n.x.mê) ***giya çandin*** 1.Giyayeke belg pane kulîkê zer di de.2. Berê kulindî ye, gelek cor, reng û qebare hene, jibo xwarinên cudaduda mifa jê di wergirin.Kundik.



**Kulind**

**Kulî** 1 (n.x.nê) ***candar khulî*** Giyandarek kirmijoke liser şînkatî dijît û ziyanê di gehînit çandinê.



**Kulî**

**Kulî** 2 (n.x.mê) Hirîya pez.

**Kulîlk** 1 (n.x.mê) ***giya*** Gulên biçûk ,ciwan û rengîn yên li biharan geş di bin.

**Kulîpindk** (n.l.nêr) ***candar*** Corekê kulîyan e di pindin.

**Kulkirin** (k.jn.l.mê) Weke mirov bi be egera kulbûna cihekê li giyanê mirovî. :Hindî di difin a xwe di xebitî ya kul kirî. :Te bi wan kiryarêd çepel dilê min kul kir!. (K) bn :Kirin.

**Kulkulî** (n.x.nêr) ***tewal*** Balindeyekê rengîne, ciwane, hêlîna xwe di kendalan da dirist di ket, xwarina wî mêşik û mêşhingive. Mêşxur.

**Kulkulî** (hn.x.çewa) Mirovê bê bawer û gelek vira di ket.

**Kulore** [kurore](n.x.mê) ***xwarin*** Corek nanê sitwîr û tirsîye liser sêl, tenûr yan pelan dirist di kin. ***Pend*** :Begzade kurore lê bûne kade. Ang; heger mirov birçî bo her tişt liber devî xweş di bit.

**Kulovank** (n.dar.mê) ***can*** Nîva, gopika serî. Tirarê serî. :Selik dana ser kulovanka serê xo.

**Kulox** (n.x.nêr) ***can*** Kelleya hestîyê req ya serê candara û mirovan, ko mejî têda di hêt parastin.



**Kulox**

**Kum** (n.x.nê) Kulav.***Pend*** :Serê keçel di kum da başe.

**Kumir** (nl.mê) ***can khumir*** Goştê rengsor ê bi serî dîk û mirîşkan ve. Kumra dîkilî.

**Kumreş** (hk.l.çewa) Kesê goman liser jina, yan mêrê xwe heye ko çav li dere. Dilpîs. Çavnebar.

**Kumzirî** (n.l.nêr) ***kevin*** Kulavê asinî, jibo xwe paraztinê li cengê, şervanan li serê xwe di kirin.

**Kun** (hk.cih,n.x.mê) Cihek vekirî. Cihek xulole. Kunmişik, curd, mar û htd.

**Kunbûn** (k.jn.l.mê) Dema cihek , erdek kun di bit.(K) bn: Bûn.

**Kunc** (hk.cih,n.x.mê) 1. Cihê xwe veşarina candaran. Kuna candaran. :Kunca rûvî. 2. Quncal.

**Kuncandin** (k.jn.x.mê) ***khuncandin*** Dema mirov berekî yan tebelekê li yeka dî di de, bi hêz ji cihê wê di firîne û cihê wê di gire. (K) Bdn: ez di kuncînim em di kuncînîn tu di kuncînî hûn di kuncînin, ew di kuncîne[…it] ewan di kuncînin. Pr:dêbi+bdn. Bdb : di kuncand, di kuncandin. Db,dûr :kuncandibû, kuncandibûn. (F) : bi kuncîne, bi kuncînin.

**Kuncik** (hk.cih,n.dar.mê) Kujî.Quncal.

**Kuncî** (n.x.mê) ***giya*** Mitayekê dindik hûre, tehîn û gelek corên xwarinan jê çê di bin.

**Kund** (n.x.nêr) ***balinde*** Core balindeyek çavzer û mezine,liser beran û kavlegundan di dadit û rava mişk û çûçikan di ket.

**Kundêle** (n.dar.dn) ***candar*** Têjika berazî. Têjikê berazî.

**Kundir** (n.x.nêr) Kulind.

**Kunêrî** (n.x.mê) ***derd*** Kulikeka mezin û bi jane li canê mirovî di hêt. Qunêrî.

**Kunker** (n.l.nêr) Amêrê tiştan pê kun di kin.

**Kunkirin** (k.jn.l.mê) Vekirina kunekê di cihekî. Dîwar, erd, cok, dar kun kir. (K): bn Kirin.

**Kunmêrî** (n.l.mê) Mala mêrîyan. Kuna mêrîyan. Gêlexur. :Kunmêrîyak di eywankê da heye.

**Kunork** (n.dar.nêr) Kertik.

**Kur** 1 (hk.x.çewa) ***khur*** 1. Xortê ko hêj jin ne anîye. Zigurd. 2. Nivşê nêr ji daybaban. Pis.

**Kur** 2 (n.x.mê) ***khur*** Mirîşka ser hêkan. Kurk.

**Kur** 3 (n.x.mê) Herî. Teqin.

**Kur** 4 (hk.x.çewa) Serxwer.Kodqelên. :Kêrîşk giyanewerek kure.

**Kur** 5 (hk.x.çewa) ***khur*** Kurt.

**Kurbeşk** (kn.x.dz) ***candar*** Qurbeşk.

**Kurbûn** (k.jn.l.mê) Kurtbûn.: Pora serê te kur be. (K) bn :Bûn.

**Kurd** (nej.n) Kesê nasnameya wî kurdîye.Ser bi neteweya kurde.

**Kurdayetî** (n.dar.mê) Xebat jibona azadî û doza gelê kurd. Kurdînî.

**Kurde** (n.x.mê) Navê jinane.

**Kurdewarî** (n.dar.mê) Ziman, çand, kelepor, yên babkalên kurdan. Kevneşopên kurdan.

**Kurdistan** (hkcih. cugir,n.mê) Welatê, warê kurdan. :Dujminan Kurdistan parçe kirin. *sûz* :Kudistan yan neman.

**Kurdistanî** (neten.dar.dz) Welatîyên Kurdistanê. :Ew Kurdistanî ye lê ne kurde.

**Kurdî** (hk,hn.çewa) 1. Tişt, xwarin,ziman htd, yên kurdan. 2. Navê xortane.

**Kurdînî** (ndar.mê) Kurdayetî.

**Kurik** (n.dar.nêr) *khurik* Kurê biçûk.

**Kuriko** (hd,gaz,nêr) Gazîkirina kurikî.

**Kurisandin** (k.jn.x.mê) Kuncandin.(K) bdn:ez di kurisînim em di kurisînîn, tu di kurisînî hûn di kurisînin, ew di kurisîne[…it] ewan di kurisînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di kurisand, di kurisandin. Db,dûr :kurisandibû, kurisandibûn. (F) : bi kurisîne, bi kurisînin.

**Kurî** (n.x.mê) *can* Kilk. :Kurîya çêlê. :Kurîya sey. :Kurîya kewî.

**Kurînî** (n.dar.mê) Jîyana bêjinîyê. Hêşta kur. Zigurd. :Bi kurînî min karên weha ne kirîne, evca dê çewa noke kem!.

**Kurk** 1 (n.x.nêr) Cilkeke di havên ser milan. Sako. Qemsele. Qapût.

**Kurk** 2 (hk.x.çewa) Mirîşk û balindeyên liser hêkan jibo mariqkirinê.

**Kurkbûn** (k.jn.l.mê) Dema baleinde li ser hêlak di mînin jibo têjik peyda bi bin. :Kewa me ya kurk bûy!.

**Kurkirin** (k.jn.l.mê) Kurtkirin. :Mirîşkê xwe liser hêkan kurk kir. (K) bn: Kirin.

**Kurmam** (n.l.nêr) Pismam. :Heval û Helgord kurmamên hevdu ne.

**Kurmanc** (nejn) Kurd.

**Kurmancî** (n.dar.mê) Kurdî. Xomalî. :Zarê kurmancî. :Bacankêd kurmancî.

**Kurmatîx** (n.x.mê) *can* Kemax.

**Kurme** (n.x.mê) *çek* Cifte.

**Kurmêwk** (n.l.mê) Bistîka tayê mêwa tirî ya ter û nazik tama wê miz û xweşe.Qurmêwk.

**Kursî** (n.x.mê) Amêrek çarpêpike, cihê rûniştin û pişta mirovî heye jibo liser rûniştinê bi kar di hêt.

**Kurt** (hk.x.çewa) Alîyê biçûk ji dirêjî û panîya endazeyan.Tiştê kurt ; tiştê ne dirêj. Mirovê kurt ; mirovê ne dirêj. Jiyê kurt ; jîyê nedirêj.Têkçûyî. Kin. Nevî.

**Kurtan** (n..x.nêr) Cilek nemazeye li ser pişta dewaran di bestin jiber barkirinê û xwe girtina barî, herwisa parastina leşê wan.

**Kurtane** (n.dar.mê) Herîya li dîwaran di din.

**Kurtanekirin** (k.jn.l.mê) Teqinkirina dîwaran. Hisîna dîwaran.(K) bn: Kirin.

**Kurtanker** (karn.l.dz) Mirovê kurtanan dirist di ket. Karê wî çêkirina kurtanane.

**Kurtayî** (hk.x.çewa) Kurtî.

**Kurtbîn** (hk.l.çewa) Mirovê hizirteng. Kêm dîtin. :Xortekê kurtbîne. :Jineka kurtbîne.

**Kurtbînî** (n.l.mê) Hizirtengî. Kêm dîtin. :Kurtbînîya te ji kêmbawerîya teye.

**Kurtbûn** (k.jn.l.mê) Biçûkbûna tiştan. Têkçûn. : Kirskê min yê kurt bûye.(K) bn :Bûn.

**Kurtî** (hk.çewa,n.dar.mê) Gotina kurt. Kurtvebirîn. :Rexê kurt yê tiştê pîvayî. :Bi kurtî; ***Pend*** Kurt û kirmancî. Dirêj nekirin. : Kurtîya nûçeyan.

**Kurtkirin** (k.jn.l.mê) Birîna tiştekî ta kurt bi be. Vebirîn.Peyva xwe kurtkir. ; peyva xwe vebirî. :Piça serê xo kurt bi ke.(K) bn: Kirin.

**Kurtûkirmancî** (hk.l.çewa) Dema mirovê axivtinker bi xwazit gotina xwe kurt vebirit û mijarê bi dawî bi hînit û himberê xwe tê bi gehînit.

**Kuş** (n.x.mê) Bayê ji paşîya mirov yan giyandaran der dikevit .

**Kuşken** (hk.l.çewa) Yê kuşan di kit.

**Kuşkirin** (k.jn.l.mê) Dema kuş tê kirin. Baberdan. (K) bn :Kirin.

**Kut** (hk.x.çewa) Tiştê, amêrê serê wî ne tîj. Serpan. Br× Tîj.

**Kutabûn** (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Bi dawî hatin. : Gotina wî kuta hat; bi dawî hat.

**Kutakirin** (k.jn.l.mê) Bi dawî anîn . Bêdengkirin.(K) :Kirin.

**Kutan** (n.x.mê) 1.Guhnelîya navbera nêr û mêyan. Cotbûn. 2. Qutan. Lêdan.

**Kutayî** (n.dar.mê) Dawî. Domahî.

**Kutbûn** (k.jn.l.mê) Dema serê kêr, sator, das û htd kut di bit. (K) bn: Bûn.

**Kutek** (hk.x.mê) Zor.xurtî.

**Kutekî** (n.dar.mê) Zorî. Xurtî.

**Kutildew** (n.l.mê) ***xwarin*** Xwarineka kurdîye, kutilkên arxavk yan goştî di kin nav dewî û di lênin. :Şîva me kutildewe.:Dayka min kutildew ya bo me çêkirî.

**Kutilk** (n.x.mê) ***xwarin*** Girikên hevîr, danhêr, birinc û htd pir goşt, pîvaz û xwarinên din, di kelînin di nav avikanda yan di rûnî da di qelînin.

**Kutkirin** (k.jn.l.mê) Serê yan devê amêran kut bi kî. (K) bn: Kirin.

**Kuxekuxkirin** (k.jn.l.mê) Kuxîn.

**Kuxik** (n.x.mê) ***derd*** Deng û bayê ji gerîya mirov derdikevit ji egera ketina madek di nava sîhên mirovî da, yan nexweşbûna sîhan.

**Kuxîn** (k.jn.x.mê) Dema mirov di kuxit. (K) bedn: ez di kuxim em di kuxîn, tu di kuxî hûn di kuxin, ew di kuxe[...it] ewan di kuxin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di kuxîm, di kuxî, dikuxîn. Db,dûr : kuxîbûm, bûy, bûyn, bû,... bûn. (F) : bi kuxe, bi kuxin.

**Kuzrandin** (k.jn.x.mê) Şewitandina perên mirîşk û balindeyan liser agirî dako tu mû û per pêve nemînin dema di hêt lênan yan birajtin. Sotina mûyên mirovî. (K) bdn : ez di kuzrînim em di kuzrînîn, tu di kuzrînî hûn di kuzrînin, ew di kuzrîne[…it] ewan di kuzrînin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : di kuzrand, di kuzrandin. Db,dûr: kuzrandibû, …. bûn. (F): bi kuzrîne, bi kuzrînin.

**Kuzrîn** (k.jn.x.mê) Şewitîn. Sotin. : Pora wî li hindav agirê kuçkî kuzrî.

**Kûç** 1(hk.x.çewa) Bizin û nêrîyên bê şax. :We çend bizinên kûç hene?.

**Kûç** 2 (n.x.mê) ***khûç*** Stûna mezin ya ji ax yan ber û çîmentoyê hatî avakirin, bo ragirtin û ciwanîya banan. Dinge.

**Kûçê** (hd,gaz.x.mê) Gazkirin û naznavê bizina kûç.

**Kûçik** (n.dar.nêr) Se. Seg.

**Kûço** (hngaz.dar.nêr) Gazkirina û naznavê nêrîyê kûç.

**Kûd** (n.x.nêr) Amaneke ji dar yan naylon hatî çêkirin, şivan avê yan şîrî têda hildigirin.

**Kûk** (n.x.mê) Nejad. Bingeh. Ew di kûka xweda wesane.

**Kûlîn** (hk.cih,n.x.mê) Cihê paraztina dan û xwarinê.Kwar. Kogeh.

**Kûnek** (hn.x.nêr) Qondeh.

**Kûp** (n.x.nêr) 1.Bilintirîn serê çîyay. 2. Perdaxa avê, çayê, htd.

**Kûr** (n.x.mê) Çal. Qûr. Kend.

**Kûrekûr** (n.dar.mê) Dengûdor.

**Kûremar** (n.l.nêr) Corekê marên jihrdarin, li Kurdistanê pirin, di bêjin di korene, yan ji kore (bi xafilkî) ve gurzê xwe da di weşînin. Koremar.

**Kûrhe** (n.x.mê) Amêrek wek meşkê ye bi pestanê bayek bihêz jê derdikevit bo xweşkirina agirî jibo helandin(buhujandina) asinî.


**Kûrhevan** (pîşn.dar.dz) Kesê li ser kûrheyê kar di ke.

**Kûrik** (n.dar.mê)1. Kûra biçûk. 2.Komir. Êtûn.

**Kûse** (hk.x.çewa) Kose.

**Kûsel** (n.x.dz) Kîsele.

**Kûsî** (n.x.dz) *candar* Kîsele.



**Kûsî (kîsele)**

**Kûş** (n.x.mê) 1.Hedamê guhnelî yê gîyandarên mê. 2. Dehmel.

**Kûtal** (n.x.mê) Perok.

**Kûtek** (hk.x.çewa) Kutek.

**Kûtekî** (hk.x.çewa) Kutekî.

**kûtekîkirin** (k.jn.l.mê) Zorîkirin (K) bn : Kirin.

**Kûz** 1 (n.x.mê) Erdê (cihê) çerwanê kewalan yê pawankirî.

**Kûz** 2 (n.x.nêr) Gozik.

**Kwa** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pirsê. Ka.Kanê

**Kwa<u>nê</u>** (pêrb) ***rêzman*** Kanê.

**Kwar** (hk.cih,n.x.mê) Cihê mita têkirinê. Embar. Kûlîn. Kar. ***Pend*** :Çi bi kin kwarê ew di hêt xwarê.

**Kwêt** (hk.cih,weln)Welatekê erebîye.

**Kwî<u>rinc</u>** (karn) Kesê pîşeya kwîrincî yê heye.

**Kwîrincî** (karn.x.mê) Karkerê veçirîna hirîyê bi amêrek nemaze hirîyê vedçirit daku ji navêk bihêt der û paqij bibit , bo nivînan .

**Kwî<u>stan</u>** (hk.cih.mê) Cih û warên xweş û fînik. Zozan.Feraşîn.

**Kwît** (n.x.mê) Fîtik.

**Kwîtan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Fîtandin. Fîtikvedan.

**Kwî<u>xe</u>** (hnx.dz) Rîhsipî û mezinê hoz,gund yan taxî.

# L

**L** (le) Pîta pazdehê ji abeya kurdî.

**La** (hk.cih.x.mê) Alî. Rex. Tenişt. Kêlek. Tî. :Layê rastê. Layê çep.

**Labik** (n.x.mê) Tepik. Xefk.

**Labor** (nbiya.x.mê) Ezmongeh. Taqîgeh.

**Lac** (n.x.nêr) Kur(***khurr***).Law.:Arî lacê Hêmin e. ang; kurê Hêmin e.

**Lacik** (n.dar.nêr) Kurik.

**Ladan** (k.jn.l.mê) Ji rê derkevtin. Serdaçûn.(K): ez ladidim em ladidîn, tu ladidî hûn ladidin, ew ladidit ewan ladidin. (F): (bi) lade ladin.

**Ladê** (hk.cih,n.x.nêr) 1. Xanîyên mezin li gundan. 2. Gund.

**Lader** (ndar.dz) Mirovê ladayî.

**Laf** (n.x.mê) Axivtin. Gotin.

**Lafavêtin** (k.jn.l.mê) Axivtin. Peyvîn. (K) bn: Avêtin.havêtin.

**Lafazan** (rd.l.çewa) Pirbêj.

**Lafaw** (n.x.mê) Dema av û çem ji egera befir û baranên mezin, boş di bin û bi ser avahî û rez bîstanan da di hên û ziyanê di gehînin . Lêhmişt.

**Laflafk** (n.dar.mê) ***giya*** Corek giyaye, belg pan û keske, bi şakan xwe di dar û avahîyan di alîne bi ser di keve. Daralînk.

**Laflafok** (n.dar.mê) bn: Laflafk.

**Lakêş** (n.l.mê) ***endaze*** Şêweyekê endazeyî ye, dirêjî ji panîyê pêtire.:Xanîyekê lakêş.

**Lal** (hk.x.çewa) Mirovê ne şêt (nikarit) bipeyvit, bi livînana destan, danûsitandinan di ket. :Zelamekê lal. :Jineka lal.

**Lalbûn** (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov lal di bit.2. Bêdengbûn. :Ji tirsan da lal bû.(K) bn: Bûn.

**Lale** (n.x.mê) ***gul*** Helal.

**Lalelal** (n.dar.mê) Lava. Hîvî.

**Lalelalkirin** (k.jn.l.mê) Lavakirin.Hîvîkirin.

**Lalengî** (n.biyan..mê) ***fêqî*** Corekê pirteqalan e, tîvkilê wan bi sanasî jê ve di bit.

**Lalezar** (n.l.mê) Baxê laleyan.

**Lalê** (hngaz.x.mê) Navê bangkirin yan naznavê jina lal.

**Laliş** (hk.cih,n.x.mê) Cihekê pîroze û rûgeha êzdîyane li Kurdistana başûr. Lalişa noranî.

**Lalî** (n.x.mê) ***derd*** Nexweşîya lalbûnê.

**Lalîk** (n.x.mê) ***aman*** Sênî. Sênîk. :Lalîka pirî Danqute.

**Lalkirin** (k.jn.l.mê) Bê ezmankirin. :Xwe lala ne ke!. (K) bn:Kirin.

**Lalo** (hngaz.dar.nêr) Navê bangkirina zelamê bê ezman, lal.

**Lam** (n.x.mê) ***leş*** Hestîyê devî ê didan liser rêz dibin. Lama serî û binî.Lama jêrî ,lama jorî.

**Lama** (n.biyan) ***candar*** Candareke mîna deveyane û ji bizina mezintire.

**Lame** (n.x.mê) ***leş*** Cot girêkên di kevin jêr herdu çavên mirovî. Hinarok.

**Lan** (n.x.mê) Kunca candaran.

**Landik** (n.x.mê) Amêreke ji darî hatî çêkirin, zarokan têda dinivînin. Dergûş.

**Laper** (n.l.nêr) Layekê kaxezê. Berper.

**Lar** (hn.x.çewa) Xar.

**Larbûn** (k.jn.l.mê) Xwarbûn. Xarbûn.

**Larkirin** (k.jn.l.mê) Xwarkirin. Xwehirkirin. Keçkirin.

**Lasayî** (n.x.mê) Çavlêkirin. Zarvekirin.

**Lasayîkirin** (k.jn.l.mê) Zarvekirin.

**Laser** (n.dar.mê) Lehî.:Lasereka mezin li aqarî çêbûye, jiber barana zor.

**Lastîk** (n.x.mê) 1. Keresteyekê nerim e. :Pêlava lastîkî, cantikê lastîkî. 2. Jêber.

**Laş** (n.x.mê) *can* Leş.

**Laşgiran** (hk.l.çewa) Westayî. Mandî. Leşgiran. Kerixî.

**Laşgiranî** (n.l.mê) Nexweşî. Westan.

**Lat** (hk.cih,n.x.mê) 1. Cihên bilind. Firake. Zinar.2. Coya mezin.3. Parçeka erdî.

**Latik** (n.dar.mê) 1. Lata biçûk. 2. Malikên birinc, bacan, gul û htd.

**Latînî** (nbiyan) Ziman û ênivîseka taybete ji çep bo rastî dest pê di ke, mîna zimanên îngilîzî, elmanî kurdî û htd.

**Latkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirina latikan jibo çandinê. :Me erdê xwe yê lat kirî dê birincî çînîn.

**Lava** (n.x.mê) Hîvî. Daxaz. Lavlav.

**Lavakar** (hk.dar.çewa) Kesê lava di ke. Kesê bo xwe hîvîya ji yekî di ke jibo alîkarîyekê yan azakirin û lêbûrînê.

**Lavakirin** (k.jn.l.mê) Hîvîkirin. Hêvîxastin. Daxazkirin. Lavlavkirin. Qutabî gelek lava ji mamostayî kirin dako lê bi bore.(K) bn: Kirin.

**Lavje** (n.x.mê) Sitran .Deng. Awaz.

**Lavjegotin** (k.jn.l.mê) Stirangotin. Stirîn. : Ji kerema xo lavjekê jibo me bêje. (K) bn:Gotin.

**Lavlav** (n.l.mê) bn: Lava.

**Lavlavkirin** (k.jn.l.mê) bn : Lavakirin.

**Law** (n.x.nêr) 1. Ciwan. Xuşkok. Qnc. Çak. 2. Xort. Genc. Cihêl. : Xortekê law. Jineka law. Xanîyek law.

**Lawaz** (hk.x.çewa) Lewaz.

**Lawazbûn** (k.jn.l.mê) Bçarebûn. Sistbûn. Mandîbûn. :Nêrîyê şivanî lawaz bûye, hindî yê westîyay. (K) bn :Bûn.

**Lawazî** (n.dar.mê) Sistî. Xavî.

**Lawazkirin** (k.jn.l.mê) Sistkirin. êxistin.

**Lawik** (n.dar.nêr) 1. Corek kevine stiranên evîndarî, gelêrî kurdî ne . 2. Navê mêrane.

**Lawir** (n.x.nêr) Giyandar. Candar. Canewer.

**Lawînî** (hn.dar.çewa) Jiyê lawînî yê.Jiyana gencînî.Tiştê nû bit nûyatî.

**Laz** (nej,n) Neteweyka ji Kafkazîya.

**Lebat** (n.x.mê) Bizav. Xebat.

**Lebê** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pejirandinêye.Belê. Erê.

**Lebitandin** (k.jn.x.mê) Dane axivtin. Bizivandin. Harkirin. Çelengkirin. (K) bdn : ez di lebitînim em di lebitînîn, tu di lebitînî hûn di lebitînin, ew di lebitîne[..it] ewan di lebitînin. Pr :dê(bi)+bdn. Bdb : di lebitand, di lebitandin. Db,dûr :lebitandibû, lebitandibûn. (F) :bi lebitîne, bi lebitînin. Bi lebitîne.

**Lebitîn** (k.jn.x.mê) Bizivîn. Çelengbûn. Livîn.(K) bdn : ez di lebitim em di lebitîn tu di lebitî hûn di lebitin, ew di lebite[…it] ewan di lebitin.Pr :dê(bi)+bdn. Bdb : ez di lebitîm em dilebitîn, tu di lebitî hûn di lebitîn, ew di lebitî ewan di lebitîn.Db,dûr: ez lebitîbûm em lebitîbûyn, tu lebitîbûy hûn lebitîbûn, ew lebitîbû ewan lebitîbûn.

**Lebleban** (hk.dar.çewa) Mirovê bi dev û ezman. Zorzan . Pirbêj. Devxoş.

**Legan** (n.x.mê) ***aman*** Legen.

**Legen** (n.x.mê) Amanekê firehe xwarinê tê di kin.

**Leglege** (n.x.dn) ***perinde*** Balindekê kûvîye, lingdirêje, xwarina wî beq, mişk û marin.



**Leglege**


**Leheng** (hn.x.çewa) Çavnetirs. Palewan. Mêrçak. Mêrxas. :Pêşmerge di cengan da lehenge.

**Lehî** (n.x.mê) Cih, kendalê ji egera barîna befir û baranan di herifit di bite kur di helweşit binî.

**Lemçe<u>lemç</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Dengeke ji devê mirovî di hêt dema zad xwarinê. :Lemçlemç a devê wî ye.

**Lemçelemç<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Dengê lemçelemçê ji devî hatin. (K) bn : Kirin.

**Lem<u>pe</u>** (n.x.mê) Corekê fanosane, jibo ronahî, bi gazê kar di ke, şûşek bi ser binekê pan da girtîye û pelîtika wê agir pêveye, awîzkekê kêm û zêde kirinê heye, liser cihakî yan bi dîwarî ve di hailawîsin.



**Lempe**

**Lenc** (nhn.x.çewa) Xar. Badayî.

**Len<u>cîn</u>** (k.jn.x.mê) Xwe badan. Xilingîn.(K) bdn : ez di lencim em di lencîn, tu di lencî hûn di lencin, ew di lence[...it] ewan di lencin. Pr : dê[bi] +bdn. Bdb : ez di lencîm em di lencîn, tu di lencî hûn di lencîn, ew di lencî ewan di lencîn. Db,dûr : ez lencîbûm em lencîbûyn, tu lencîbûy hûn lencîbûn, ew lencîbû ewan lencîbûn. [bi bû]. (F) : bi lence, bi lencin.

**Leng** (hn.x.çewa) Xar. Şil. Keç.:Mêrekê leng. :Jineka leng. :Bizina leng.

**Lenger** (hk.dar.çewa) Yê pîyê wî ne rêk, di lengit.

**Len<u>gîn</u>** (k.jn.x.mê) Li dema rêveçûnê mirov û giyandar di lengin. Nicimîn.(K) bdn: ez di lengin em di lengîn, tu di lengî hûn di lengin, ew di lenge...[it ]ewan di lengin. Pr:dê(bi) +bdn. Bdb : ez di lengîm, em di lengîn. Tu,ew(wî, wê) di lengî, hûn, ewan di lengîn, Db,dûr : ez lengîbûm,em lengîbûyn, tu lengîbûy, hûn, ewan lengîbûn, ew lengîbû,(bi bûn). (F): bi lenge bi lengin.

**Lep** (n.x.nêr) ***can*** Dest. Mist. :Arasî lepekê şekirokan kirin berîka xwe .:Lepê hirçê.



**Lep**

**Lepik** (n.x.nêr) 1. Bendik. Rwîşîk. Destik. Lepkê cantey.2. Desgork.

**Leq** 1 (n.x.mê) Cihê leqa bi didanan. Gez. :Leqa vî zarokî gelek di êşit.

**Leq** 2 (hn.x.çewa) Livok. : Ev dare ya leqe.ang; di livit.

**Leq** 3 (n.x.nêr) Ta. Çeq.

**Leqandin** (k.jn.x.mê) Livandin. Hijandin.(K) bdn: ez di leqînin em di leqînîn, tu di leqînî hûn di leqînin, ew di leqîne[..it] ewan di leqînin. Pr:dê bi + bdn. bdb: di leqand, di leqandin. db,dûr: leqandibû, leqndibûn. (F): bi leqîle, bi leqînin.

**Leqdan** (k.jn.l.mê) Dema mirov xwarinekê yan tiştekî bi ke di devê xwe da û didanêd xwe liser bi givêşe. Geztin. (K) bn :Dan.

**Leqîn** (k.jn.x.mê) Livîn. Bizivîn. :Didanê min di leqit.(K) bdn :ez di leqim em di leqîn, tu di leqî hûn di leqin, ew di leqe[…it] ewan di leqin.Pr :dêbi +bdn. Bdb : ez di leqam em di leqayn, tu di leqay hûn di leqan, ew di leq ewan di leqan. Db,dûr :ez leqabûm em leqabûyn, tu leqabûy hûn leqabûn, ew leqabû ewan leqabûn. (F) : bi leqe, bileqin.

**Leqkirin** (k.jn.l.mê) Sistkirin.

**Leqleqok** (hk.dar.çewa) Livlivok. :Stûna kepir ê ya leqleqoke. :Didanê leqleqok.

**Leqlêdan** (k.jn.gl.mê) Leqdan. Geztin. :Leq li sêvê da.

**Leqyan** (k.jn.x.mê) Leqîn.

**Leqandin** (k.jndarmê) zivrandina tiştan. livandin. Hejandin.serê xwe leqand. Bejna xwe leqand ; leyzîn. (K) : ez dileqînin em dileqînîn, tu dileqînî hûn dileqînin, ew dileqînit ewan dileqînin. (F) : bileqî bileqînin.

**Leqyan** (k.jmê) livîn.

**Leqleqok** (hn.l) tiştê di leqit. Dilivlivit. Didanê leqleqok.

**Lerzandin** (k.jn.x.mê) Livandin. Hejandin. :Xwe di lerzîne. (K) bdn : ez di lerzînim em di lerzînîn, tu di lerzînî hûn di lerzînin, ew di lerzîne[…it]ewan di lerzîninPr :dêbi +bdn. Bdb : di lerzand, di lerzandin. Db,dûr: lerzandibû, lerzandibûn (F): bi lerzîne, bi lerzînin.

**Lerzeta** (n.l.mê) *derd* Nexweşîya melarîya.

**Lerzîn** (k.jn.x.mê) 1. Ji egera tirs, serma yan tayê leşê mirov di livit. : Ew yê ji serman da di lerzit. 2. Mirov bo keyf û şahîyan xwe di lerzîne. Govendkirin. Şahîkirin. (K) bdn : ez di lerzim em di lerzîn, tu di lerzî hûn di lerzin, ew di lerze[...it] ewan di lerzin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : ez di lerzîm,em di lerzîn, tu di lerzî, hûn di lerzîn, ew di lerzî ewan di lerzîn. Db,dûr: ez lerzîbûm, em lerzîbûyn, tu lerzîbûy, hûn lerzîbûn, ew lerzîbû, ewan lerzîbûn. (F): bi lerze, bi lerzin.

**Lerzok** (hk.dar.çewa) 1.Mirovê xwe di lerzînit.2. Lerzîn.

**Leş** (n.x.nêr) ***can*** Laş. Can. :Leşê mirovî.

**Leşker** (n.x.nêr) Mirovê çekdar. Sûpa. Pêşmerge.Serbaz.

**Leşkergeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cih yan baregêyê meşqkirina leşkerî.

**Leşkerî** (kar,ndar.mê) Pêşmergatî.

**Leşkerkêşî** (n.l.mê) Komkirina leşkerî li berokekê bo hêşekê yan her karek serbazî.

**Leşkerxane** (hk.cih,n.dar.mê) Leşkergeh.

**Leşsax** (hk.l.çewa) Mirovê leşê wî peyt û çi nexweşî li dev nebin .Saxlem.

**Leşsaxî** (n.l.mê) Saxlemî. :Leşsaxîya wî ji egera pir xwarina fêqîye.

**Let** (n.x.mê) Pirt. Ker. Parçe.

**Letbûn** (k.jn.l.mê) Kerbûn(***kherbûn***). Pirtbûn.

**Letkirin** (k.jn.l.mê) Pirtkirin.

**Levan** (n.x.mê) Leven.

**Leven** (n.x.mê) ***darûbar*** Core hişînkatîyeke(tiraş) liber lêvên avan hişîn di bin , tilheka (ta) raste û girêgirêye û nîva wê xuloleye bo ciwanî, tan û avahîyan mifa jê dihêt wergirtin. Qamîş.

**Lewant** (n.x.mê) Gulav. Bêhin.

**Lewaz** (hk.x.çewa) Bêhêz. Bê goşt. Sist.Virçikî. :Mirovekê lewaz. :Bizina lewaz.

**Lewazbûn** (k.jn.l.mê) Bêhêzbûn. Sistbûn.Kêm goştbûn.Helyan.(K) bn: Bûn.

**Lewazî** (n.dar.mê) Nesaxî. Lawazî.

**Lewazkirin** (k.jn.l.mê) Bêhêz- sist kirin . (K) bn: Kirin.

**Lewçe** (hk.x.çewa) Bêrûmet. Ezmandirêj. Hestîgiran. :Çi kurekê lewçeye!.

**Lewçebûn** (k.jn.l.mê) Mirov bi kiryarek yan gotineka lewçe û kirêt li ber çavan di keve. :Ew wekî berê nemaye, gelekê lewçe bûy !.

**Lewçekirin** (k.jn.l.mê) Xwe lewçekirin.ang ; xwe sarkirin li ber xelikî.

**Lewçeyî** (n.dar.mê) Gotin û kiryarên kirêt. :Ew tu caran dest ji lewçeyîyêd xwe ber nade.

**Lewçeyîkirin** (k.jn.l.mê) Mirovê gotin û kiryarên lewçe di ke.

**Lewe** (n.x.mê) Teqin. Kur. Herî.

**Lewend** (kk,hn.x.çewa) 1. Ciwan. Peyt. 2. Azad. Serbers.3. Navê mêrane.

**Lewendî** (n.dar.mê) Parçe perokek sipî û dirêje di gel cilkên kurdî, zelam di zendikên xwe bo ciwanî di alînin, herwesa jin jî li ser kiras û fîstanan bi kar di hînin.

**Lewer** (n.x.mê) Çerwan. Kûz.

**Lewerandin** (k.jn.mê) Çerandin.

**Lewitandin** (k.jn.x.mê)1. Xirabkirin. Wêrankirin. 2. Pîskirin. gemarkirin.(K) bdn: ez di lewitînim em di lewitînîn, tu di lewitînî hûn di lewitînin, ew di lewitîne[..it] ewan di lewitînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di lewitand, di lewitandin.Db,dûr:lewitandibû, lewitandibûn. (F): bi lewitîne, bi lewitînin.

**Lewitîn** (k.jn.x.mê) 1.Pelixîn. Heriftin. Pirbûn. Pengîn. 2. Pîsbûn.: Sigê wî di xuhê re lewitî.

**Lewra** (pêrb) *rêzman* Peyveke jibo bi hevre girêdana hevekan. Jiberko. Dema. Ew dem.

**Leyzandin** (k.jn.x.mê) Govendkirin. Lerzandin.

**Leyzîn** (k.jn.x.mê) Govendkirin.(K) bdn: ez di leyzim em di leyzîn, tu di leyzî hûn di leyzin, ew di leyze[...it] ewan di leyzin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: ez di leyzîm em di leyzîn, tu di lezî hûn di leyzîn, ew di leyzî ewan di leyzîn. Db,dûr: ez leyzîbû em leyzîbûyn, tu leyzîbûy hûn leyzîbûn, ew leyzîbû ewan leyzîbûn.(F): bi leyze bi leyzin.

**Lez** (n.x.mê) Kar yan bizava ko zû bi hêt kirin. Gîro nebit. : Bi lez here mal, bêje birayê xwe da bi hêt vêrê. ***Pend***: Min bûkek hîna bi lez û bez, sivika malê bûme ez. ang; dema dayk bûkekê jibo kurê xwe di hîne, jibo ku karê malê liser milên xesûyê sivik bike, berevajî karê girantir di bit bûk alîkarîyê nake.Lezgîn. Br× Hêdî.

**Lezandin** (k.jn.x.mê) Lezkirin. : Bi lezîne here cem bapîrê xo û bêjê da bi hêt vêrê.(K) bdn: ez di lezînim em di lezînîn, tu di lezînî hûn di lezînînin, ew di lezîne[..it] ewan di lezînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di lezand, di lezandin. Db,dûr: lezandibû, ... bûn. (F): bi lezîne, bi lezînin.

**Lezgîn** (hk.hn,dar.çewa) 1. Bi lez. :Peyameka lezgîn û bersiveka lezgîn.2. Navê mêrane.

**Lezgînî** (n.dar.mê) Lez. Bi lez.

**Lezîn** (k.jn.x.mê) Lez. : Lezîna hajotina tirobêlê 120 km/dem.

**Lezkirin** (k.jn.l.mê) Bizavkirin jibo zû karekî bi cih bînin. Lezandin.(K) bn:Kirin.

**Lê** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke hevberkirinê ye. jiber hindê. Belê. :Ez dê digel te hêm, lê bawer nakim merema me bi cih bi hêt. :Azad hat lê Helgord ne hat!.

**Lêbelê** (pêrbl) ***rêzman*** Lê. Jiberko.

**Lêbok** (hk.n.dar.çewa) Mirovê bi cil, reng û gotinan keyf û kenya xelikî di hînit.Kenok.

**Lêçûn** (k.jn.l.mê) Pêveçûn. Wekhev. :Ew li babê xwe di çe.:Li heman rê çûn.:Agir li pelexî xweş çû.

**Lêdan** (k.jn.l.mê) Qutan. Êşandin.Azardan. Lêxistin. :Nabit mamosta li qutabîyan bi den, çunke lêdan qedexeye. (K) bn: Dan.

**Lêder** (kar.dar.dz) Kesê li amêrekê mûzîkê di de. Mûzîkvan. : Evîn lêdera tembûrê ye û Hêja lêderê kemançê ye.

**Lêgerîn** (k.jn.dar.mê) Dema mirov li karek yan kesekî bi gerit.: Êve çende ez li te di gerim, tu li kîrê bûy?. (K) bn: Geran [gerîn].

**Lêgeryan** (k.jn.x.mê) Lêgeran.Lêgerîn.

**Lêhatin** (k.jn.dar.mê) Dema tişt bê renckêşan yan zanîn bi dest mirovî di kevin.; ***Pend***: Ma dê her bo lê hêt?. ***Pend*** :Lêhatin çêtire, ji jêhtinê. (K) bn: Hatin.

**Lêhatî** (hk.dar.çewa) Mirovê bi şens.

**Lêhmişt** (n.x.mê) Tiştê bi komel , karekê bi komel, çamek mezin, êşek komkuj. Barovek wêranker,htd.

**Lêkçûn** (k.jn.l.mê) Pêkveçûn. : Ev du xwîşkên han gelek lêk di çin!.

**Lêkdan** (k.jn.l.mê) 1. Dema mirov tenekî li yê din di de.:Destêd xwe lêkdan. :Tirombêlan lêk dan.2. Lêkdana hijmaran. : Duwê li duwê bi de dê bit çar. 2×2= 4.(K) bn: Dan.

**Lêkdayî** (hk,hn,.dar.çewa) 1. *rêzman* Peyveka ji du yan pitir peyvan hatî avakirin; mîna serbilind. Çavbelek û htd. Celeb.2. Peyt. Rapêçayî. Bi serûber. :Xortekê lêkdayî. :Jineka lêkdayî. :Maleka lêkdayî.

**Lêkderkirin** (k.jn.l.mê) Ji hev birin. Jêkbirin. :Êkê ji siyan bi bin dê mînin du.3-1=2. Jêbirin.

**Lêker** (n.dar.nêr) *rêzman* bn :Jêder.

**Lêkevtin** (k.jn.dar.mê) Bi wî-wê-wan kevtin.Pê kevtin. Vê kevtin.: *pend* Çûçik bi darê wî keft.

**Lêkgeran** (k.jn.l.mê) Li êk geran. Pisyara êk kirin.

**Lêkirin** (k.jn.dar.mê) Jêkirin. Jêvekirin.:Belg li darê kir.

**Lêkkevtin** (k.jn.l.mê) Pevçûn. Pevdaçûn.

**Lêkolîn** (n.dar.mê) Li peyçûna kar, nûçe yan bûyeran. (K): ez lêdikolim em lêdikolîn, tu lêdikolî hûn lêdikolin, ew lêdikolit ewan lêdikolin. (F): lêbikole lê bikkolin. Vekolîn.

**Lêkolînvan** (karn.dar.dz) Yê kar û pîşeya wî lêkolîn. :Pismamê min lêkolînvane.

**Lêkvekirin** (k.jn.l.mê) Parvekirin. Pişikkirin. :Dehan liser pêncan lêkveke dê mînin du. 10÷5=2.

**Lêlav** (n.x.mê) Lûlav.


**Lêlê** ; (alv) Gotineke di lawik û heyranan da bi kar di hêt. Br ×Lûlû.

**Lêmişt** (n.dar.mê) Lêhmişt.

**Lêre** (hk.cih) Vê dirê. Vêrê.

**Lêrabûn** (k.jn.dar.mê) Serhildan. Dij rabûn. :Demê hêrişa dujminî hatî, xelik lê rabûn û (K) ji deverê derêxistin. bn : Rabûn.

**Lêv** (n.x.mê) 1.***can*** Parçe hedamek reng pîvazî ye li ser devê mirovî ***.Pend*** :Lêv pêştirin ji didanan..Ang ; xizim û nas ji biyanîyan pêştirin. 2. Rex. Kinar. : Lêva cem. Lêva rûbarî.



**Lêv**

**Lêva<u>binî</u>** (n.l.mê) ***can*** Lêva di kevit alê binî yê devî.

**Lêva<u>jêrîn</u>** (n.l.mê) ***can*** Lêva binî. ***Pend*** :Lêva jêrîn li ya jorîn ne da.Ang ; mit bû.

**Lêva<u>jorîn</u>** (n.l.mê) ***can*** Lêva serî.

**Lêva<u>serî</u>** (n.l.mê) ***can*** Parçe lêva di kevit serî, ya zelaman simbêl dikevin ser.

**Lêv<u>bilîl</u>** (hk.l.çewa) Mirovê lêvên wî di bilind .Lêvmûç .

**Lêv<u>bilûr</u>** (hk.l.çewa) Lêvbilîl.

**Lêv<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Zanîna çewayî ya diris xandina [dengên] peyvan. (K) bn: Kirin.

**Lêv<u>kî</u>** (hk.dar.çewa) Bi lêvan.

**Lêv<u>mûç</u>** (hk.l.çewa) Mirovê lêvên wî derkeftî bin, bilind bin, dirêj bin.

**Lêv<u>şîn</u>** (hk.l.çewa) Mirovê navçavgirê. Girtî. Mirûto.

**Lêv<u>şûr</u>** (hk.l.çewa) 1.Mirovê niznizî, nexasim zarok.2. Lêvmûç.

**Lêxistin** (k.jn.dar.mê) Lêdan. Qutan. :Lê xe. :Gavanî li gay xist. (K) bn: Xistin.

**Lêxweş<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Azakirin. Lêbûrîn.(K) bn : Bûn.

**Lêxweş<u>hatin</u>** (k.jn.l.mê) azakirin. (K) bn: Hatin.

**Lê<u>zim</u>** (n.x.pir) Xizimê glek nêzîkî mirovî. Kirîvê xwînê. Xêzan.

**Li** (pêr) ***rêzman*** Alavek girêdane, jibo cihî. Ez li mal mame. :Li Kurdistanê befir di barit. Li bin, rex, ser, tenişt , htd. :Tu li kîrê bûy?.

**Lib** (n.x.mê) Dindik. :Libeka nokê. :Libeka hinarê.

**Li<u>ba</u>** (Pêr.l) ***rêzman*** Li nik. Li cem. Li def.

**<u>Li</u>bin** (n.x.mê) Bilokên ji herî yan çîmentoyê hatîn çêkirin bo avakirina dîwar û xanîyan.

**Libhinar** (n.l.mê) Libên hinaran. Dindikên hinaran. Dindikhinar.

**Li<u>cem</u>** (pêrb.l) ***rêzman*** bn : Liba.

**Li<u>def</u>** (pêrb.l) ***rêzman*** bn: Liba.

**Lihev<u>hatin</u>** (k.jn.l.mê) Pêkhatin. :Piştî cire û pevçûnan, gundîyan ew li hev hînan. (K) bn : Hatin.

**Lihev<u>hatî</u>** (hk.l.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan. Rapêçayî.Lêkdayî. :Keçeka lihevhatî.

**Li<u>hêf</u>** (n.x.mê) Pateyekê stûre pirî hirî, mirov jibo xewê bi ser xwe di dadin.: Lihêfa hirî, pembû, pate û htd.

**Lij<u>ne</u>** (n.x.mê) Deste. Komîte.

**Li<u>nik</u>** (pêrb) ***rêzman*** bn: Liba.

**Limbîs** (n.x.nê) ***can*** Parçeke dirêje bi serê fîlî ve jibo girtina pîş û pelexî yan av vexwarin û xwe terkirinê bi kar di hînit.

**Ling** (n.x.nê) ***can*** Parçeya leşî ji kemax ta binê pêyî ,ran û baq bihev re. :Ligê nêrî yê birîndar bûy.

**Ling<u>dirêj</u>** (hk.l.çewa) Mirov yan giyandarê lingên wî dirêj bin. Pêdirêj. ::Leglege balindeyekê lingdirêje.

**Ling<u>teşî</u>** ( hk.l.çewa) Mirovê lewaz yê lingên wî zirav wek teşîyan.

**Ling<u>zirav</u>** (hk.l.çewa) Lingteşî.

**Lin<u>go</u>** (hk.çewa) Mirovê lenger.

**Liq** (n.x.nêr) Çeq. Ta. :Liqê êketîya mamostayan.

**<u>Li</u>va** (n.x.mê) Hirîya berxan. Hirî. :Balîfkêt ji livayê.

**Livan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Hejandin . Leqandin. Ba belgên daran di livînit.

(K) bdn: ez di livînin em di livînîn, tu di livînî hûn di livînin, ew di livîne[...it] ewan di livînin.Pr :dê bi + bdn. Bdb: di livand, di livandin. Db,dûr : livandibû, ...bûn. (F): bi livîne bi livînin.

**Livîn** (k.jn.x.mê) Bizivîn. Na rewestan. Civcivîn. (K) bdn: ez di livim em di livîn, tu di livî hûn di livin, ew di live[..it] ewan di livin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : ez di livîm, tu,ew di livî, ewan, em, hûn di livîn. Db,dûr : ez livîbûm, em livîbûyn, tu livîbûy, hûn,ewan livîbûn, ew livî bû. (F): bi live bi livin.

**Li<u>vok</u>** 1 (hk.dar.çewa) Leqok.

**Livok** 2 (n.dar.mê) *can* Gehên leşî.

**Lixaf** (n.x.nêr) Hevsareke di xin ser ser û devên dewaran û hindek di kevit nav devî jibo siyar bi karit li dema pêdvî bi rawestînit.

**Lixafkirin** (k.jn.l.mê) Lixaf xistin ser devê dewaran. : Hespê xwe lixaf kir.(K) bn : Kirin.

**Liyan** (n.x.mê) Depekê pane li zivistanê dema befira stût di kevit,bi binê pêyan ve bi bendikan girê di din dako pêyên mirovî di befirê da ne çin xar.

**Lîfik** (n.x.nêr) Parçek peroyê zivir e mirov leşê xwe pê di şon.

**Lîfikdan** (k.jn.l.mê) Mirov lîfikê kefdayî li canê xwe di de dako pakij bi be. (K) bn : Dan.

**Lîfikkirin** (k.jn.l.mê) Lîfikdan. :Da pîçek giyanê xo lîfik bi kin, ezê qirêjî bûym. (K) bn :Kirin.

**Lîhaz** (n.x.nêr) Asinek dirêj û tunde jibo rakirina beran bi kar di hînin, alekî di êxin bin berê asê û hêza xwe biser alê dî da di kin tanî bi hêt wergeran. Qirase.

**Lîkav** (n.l.mê) Şileya di devî da. Tif. Gilîz.

**Lîlîk** (n.dar.mê) Lîlaqên qerîsê yên li zivistanên seqem, bi kevir û sivandan ve çê di bin. Sîqal.

**Lîne** (n.x.nêr) Cerek mezine doşav, av yan mitayî tê di ken.:Lîneyê doşavê.

**Lîre** (n.x.mê) 1. Pirsikên sor li leşê mirovî peyda di bin ji egera toz yan pêvedana adîyan .2 gogokên liser ristikên zêrî.

**Lîrîn** (k.jn.x.mê) Lûrîn.

**Lîs** (hk.cih,n.x.nêr) Cihê hewana teyr û tewalan. Lîsê kew, sîsk û htd.

**Lîsbûn** (k.jn.l.mê) Balinde karê nivistê di kin û di lîsê xwe da di nivin. :Mêzeke kewê me çi ciwan yê lîs bûy!.

**Lîsik** (hn.x.çewa) Jiber ba û barovan cilkên mirov hemû ter(şil) di bin. Ter. :Ez li ber baranê bûm lîsik.

**Lîskirin** (k.jn.l.mê) 1. Dema nêçîrvan dîvçûna kew û tewalan di kin ta lîsê wan aşkira di ken.2. Dîvçûna gomanlêkirîyan û destnîşankirina cihê wan. .(K): bn Kirin.

**Lîste** (n.x.mê) Kaxeza nav yan navnîşan liser rêzkirîn. Lîsteya navên xwendekaran li cem mamostaye. Xişte.

**Lîstik** (n.x.mê) Yarî. Werziş.: :Lîstika çînganê. :Lîstika dartiranê.

**Lîstikvan** (karn.dar.dz) Yarîvan. Werzişvan.

**Lîstin** (k.jn.x.mê) Yarîkirin. Lîztin.(K) bdn: ez di lîzim em di lîzîn, tu di lîzî hûn di lîzin, ew di lîze[…it] ewan di lîzin. Pr: dêbi+bdn. Bdb : ez di lîzam em di lîzan, tu di lîzay hûn di lîzan, ew di lîza ewan di lîzan.Db,dûr :ez lîzabûm em lîzabûyn(bûn), tu lîzabûy hûn lîzabûn, ew lîzabû ewan lîzabûn. (F) : bi lîze, bi lîzin.

**Lîstok** (n.dar.mê) Yarîyên zarokan. Bûkên zarokan.

**Lîtav** (hk.cih,n.l.mê) Cihê av û xiz têkel ku hin caran mirov yan candar tê di çikilin. Avzih.

**Lîztin** (k.jn.x.mê) Yarîkirin. Lîstin.: Em dê bi topa pêy bi lîzin.

**Lo** (pêrb) *rêzman* Alavê girêdanê ye ; Dê ka were lo.

**Lobîk** (n.x.mê) *giya* Çavreşk.

**Loke** (n.x.nêr) Pembû.

**Loma** (pêrb) *rêzman* Lewra.

**Loqe** (n.x.mê) Bazdana hespan ya ko xwe di hilavêjin û dengek mezin ji pêyên wan di hêt.

**Loqekirin** (k.jn.l.mê) Bazdana bi loqe ya hespan. (K) bn : Kirin.

**Lor** (nej.n,hk.cih) 1. Kurdên bi zarê lorî di peyvin.2.Devera loran.

**Lorandin** (k.jn.x.mê) Gotina stiranên xem û xerîbî yê, nemaze dayk di ber landika savan. (K) bdn : ez di lorînim em dilorînîn, tu di lorînî hûn di lorînin, ew di lorîne[..it] ewan di lorînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di lorand, di lorandin. Db,dûr : di lorand, di lorandin.

**Loristan** (hk.cih,cugir.devern) Devera loran.

**Lorik** (n.x.nêr) *spîyatî* Xwarineka rêçalî ye.

**Lorîn** (k.jn.x.mê) 1.Stirîn. Gotina awazên xemdar. 2. Dengê gurg, se û rûvî yan. (K) bdn: ez di lorim em di lorîn, tu di lorî hûn di lorin, ew di lore[..it] ewan di lorin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : ez di lorîm, tu, ew di lorî, em, hûn, ewan di lorîn. Db,dûr: ez lorûbûm em lorîbûyn, tu lorîbûy hûn lorîbûn, ew lorîbû ewan lorîbûn.(F) bi lore, bi lorin.

**Lotik** (n.x.mê) Xwe havêtina hindek tewalan bi herdu pêyan nexasime çûçik. : Têjika kewî hêjta nafirit, lê bi lotikan di çit.

**Lûç** (hk.x.çewa) Kakilkên tîvkil jê kirîn. Sipîkirî. Kevil di ser da çûye.

**Lûçbûn** (k.jn.l.mê) Kevil di ser da çûn. :Tilîya min kevt bin berî jiber hindê lûç bû.

**Lûçîsk** (n.x.mê) Kakila ji kelp kirî. :Lûçîska bahîvê.

**Lûçkirin** (k.jn.l.mê) Kevilkirin. Sipîkirin. Ji kelp kirin. (K) bn:Kirin.

**Lûçkirî** (hk.l.çewa) Kevilkirî. :Bahîvên lûçkirî.

**Lûlan** (hk.cih,devern)  Devereke li Kurdistana başûr.

**Lûlav** (n.dar.mê) Befira bi av û bihojî. Lêlav.

**Lûlbûn** (k.jn.l.mê) Mîna lûleyan lê hatin. Xelekbûn.

**Lûle** (n.x.mê) Borî. Lwîlî.

**Lûletiveng** (n.l.mê) Lûlîya tivengan ya xilole ko gule jê der di kevin.

**Lûleyî**(hk.dar.çewa) Şêweyê wek lûle, borî.

**Lûlkirin** (k.jn.l.mê) wek lûleyan çêkirin. Xelekkirin. : Wê pora xwe lûl kirî ye.

**Lûr** (nej.n) bn:Lor. Lorî.

**Lûs** (hk.x.çewa) Hilû. Hilî. : Erdê lûs.

**Lûsbûn** (k.jn.l.mê) Hilûbûn.

**Lûskirin** (k.jn.l.mê) Hilûkirin.

**Lûtke** (hk.cih,n.x) Gopik. Kopik. Ser.

# M

**M** (me) Pîta şazdehê ji abeya kurdî.

**Ma** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyarkirinê, jibo misogerkirinê. :Ma tu ne çûye mal ?. Ma dê heta

kengî hosa mînîn ?. Ma heger min zanîba hoye, da çewa we kem. Qey.Qemî.

**Macîk** (nbiyan.x.nêr) Corek qelemane, nivêsîna wan ya gir û di rengînin.

**Maç** (n.x.mê) Mirov lêvên xwe di gehînit lêv yan rûyên kesek xweşdivî dengî ji devê xwe di hînit. Ramûsan.

**Maçajînê** (nl.mê) Maçeke ya mirov pif di kit devê kesê bêhoş ( bêhinçik) dako dubare bêhina wî bêt û biçit.

**Maçamirinê** (n.l.mê) ***kevin*** Kesê xûnmêj(vampîr) bi di danan leqa di havêjin û xwînê ji leşê mirovî di mêjin.

**Maçandin** (k.jn.x.mê) Maçkirin. (K) bdn:ez di maçînim em di maçînîn, tu di maçînî hûn di maçînin, ew di maçîne[...it] ewan di maçînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di maçand, di maçandin. Db,dûr: maçandibû, maçandibûn. (F): bi maçîne, maçînin.

**Maçîn** (k.jn.x.mê) Maçkirin

**Maçkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov yekî maç di kit.(K) : bn Kirin.

**Made** (n.x.nêr) 1.Tiştê ko cihekî digirit û bariste(pîvan) hebit. Daring. Kereste. 2.Dirav.

**Madî** (hk.dar.çewa) Mirovê pareperês. Çirîk.

**Maf** (n.x.nêr) Darijtina deshelat di danin jibo welatîyan ko çi kar kiryar çelengî di karin bi ken û berevajî, çi nabe bi hêt kirin. Mafê axivtin, dengdan, jîyan, mafê çarenivîs û htd. Br× Erk.

**Maf<u>nas</u>** (kar,n.dar.dz) Pispor di warê zanîna maf da.

**Maf<u>zan</u>** (kar,n.dar.dz) Mafnas.

**Ma<u>hîn</u>** (n.x.mê) ***candar*** Nivşê mê yê hespan. Mehîn.

**Mak** (n.x.mê) Tuxmê giyandarên gehiştî yên mê. Dayk. :Maka; çûçikan. Maka têjikan.

**Mak<u>der</u>** (n.dar.mê) ***rêzman*** Jêder. Çavkanî.

**Ma<u>ker</u>** (n.l.mê) ***candar*** Tuxmê mê yê keran. Kera mê.***Pend*** :Maker li ber çavêd kerî xatûne.

**Ma<u>kîne</u>** (n.x.mê) Amêrên bi hêza kareb, gaz, panzîn û htd kar di kin.: Makîna; cilşoştinê, cildirûnê, tirombêlê, hêranê, nivîsandinê û htd.

**Mal** (n.x.mê) 1. Xanî yan cihê jîyana mirovî. .: Mala wan li cem mala meye. :Maleka mezin.

***Pend*** :Malan barkir, jinû me xwe hişyarkir. ***Pend*** :Mala bê ser ya kavile.2. Tişt[pare , kelûpel]ê mirvî. :***Pend*** :Malê dinyayê qirêja destane.***Pend*** :Mala zêran xira di be, mala mêran xirab nabe.***Pend*** :Malê bi tirê hatî, bi fisê di çit.

**Mal<u>ava</u>** (hk.l.çewa) Mirovê çavverkirî û xanedan. Xwedî mal.

**Malava<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Zengînbûn.

**Malava<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Xwe zengînkirin.

**Mal<u>avayî</u>** (n.l.mê) Dema mirov kesûkar yan heval û nasyaran bicih di hê lit. Xatirxastin.

**Malavayî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Xatirxastin. Bicihhêlan. (K) bn: Kirin.


**Mala<u>xwedê</u>** (n.l.mê) Malaxuda. Malaxudê. Mizgeft.

**Mal<u>bab</u>** (n.l.mê) Mala babê, bi taybet jibo keça mêrkirî dema serdana mala daybaban di ke; di bêjin çû malbabê. li malbaba xwe ma.

**Malbar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov mala xwe ji cihekî bar di ke bo cihê din. ***Pend***: Malbarkirin malxirabkirine. (K) bn :Kirin.

**Mal<u>bat</u>** (n.dar.mê) Binemale. Xêzan.

# Malbat (Xêzan)



**Malbav** (n.l.mê) Malbab.

**Malbêçî** (n.l.nêr) Malbiçûk.

**Malbiçûk** (n.l.nêr) Cihê zaro (êmbiriyo) têda di zikê daykê da. Pizdan.

**Maldar** (hk.dar.çewa) Mirovê şareza di warê rêvebirin û serederî ya malê da. Xanedan.

**Maldarî** (n.l.mê) Xweşkirina rewşa aborî ya mala xwe. Xanedanî.


**Maldarîkirin** (k.jn.l.mê) Rêvebirin û pşdabirina rewşa jiyanê li malê.

**Malevîn** (hk.dar.çewa) Mirovê desgirtî. Mirovê çirîk. Mirovê nemerd.

**Malhol** (n.l.mê) Jêrav. Solîne.

**Malinc** (n.dar.nêr) Parçe asineke hilûye, hosta jibo çîmentokirin, gêckirin û teqinkirina

dîwaran bi kar di hînin.



**Malinc**

**Maliştin** (k.jn.l.mê) Malîn. Gêzikdan.

**Malîn** (k.jn.x.mê) Paqijkirina mal, hewş bax û htd, bi gêzikî. Gêzikdan. (K) bedn: ez di malim em di malîn, tu di malî hûn di malin, ew dimale[….it] ewan di malin.Pr :dê bi +bdn. Bdb : di malî, di malin.Db,dûr : malîbû, ...bûn. (F) : bi male bi malin.

**Malker** (hk.dar.çewa) Yê xwe mandî di ket jibo başkirina rewşa xwe ya aborî. Rêncber.

**Malkirin** (k.jn.l.mê) Karkirin jibo peydakirina dirav û pareyî. ***Pend*** :Malê jibo kurê çak yan yê xirab neke. (K) bn: Kirin.

**Malmezin** (hk.l.çewa) Mirovên zengîn û heyî. Xanedan.

**Malofî** (rd.dar.çewa) Giyandarê hînî mirovî û nav malê di bit. Bizina,mîha malofî.

**Malper** (n.l.mê) Berperek yan jorek vekirî jibo zanyarî û nûçeyan û danûstandinê di (Internet) da.

**Malwêran** (hn.l.çewa) Kesê mala wî wêran, çamek bi ser hatî. Malxirab.

**Malwêranbûn** (k.jn.l.mê) Wêran- xirabbûna malê ji egera çamekê. (K) bn :Bûn.

**Malwêranî** (n.l.mê) Derdeserî.Malxirabî.

**Malwêrankirin** (k.jn.l.mê) Dema çamek di be egera wêranî û derdeserî ya malê. ***Pend*** :Mala xwe bi destê xwe wêran kir.ang ; yê bi xwe karên xwe têk di de.

**Malxirab** (hk.l.çewa) Malwêran.

**Malxirabbûn** (k.jn.l.mê) Malwêranbûn.

**Malxirabî** (n.l.mê) Malwêranî.

**Malxirabkirin** (k.jn.l.mê) Malwêrankirin.

**Malxwê** (n.l.dz) Xudanê malê. ***pend*** : Ger diz û malxwê bi bin êk dê gayî di kulekê ra bi bin.

**Mam** (n.x.nêr) Birayê babê.: Wî keça mamê xwe ji xwe ra anî.

**Mama** (nbiyan.x.mê) Dayk. Dadê.

**Mambiz** (n.l.mê) Xezal. Mamiz.

**Mamend** (n.x.nêr) Navê mêrane.

**Mamik** 1 (n.dar.nêr) Helametek di nav rez, zevî û bîstanan di çiklînin dako giyandar jê bi tirsin û zîyanan nekin. Dalho.

**Mamik** 2 (n.dar.mê) Tiştîk. Têderxistinok ; mîna :derya şîne, av tê nîne. ang ; Keskan.

**Mamir** (n.x.mê) Mirîşka yek salî û hêj hêk ne kirine.

**Mamirk** (n,biçûk.dar.mê) Mamir.

**Mamiz** (n.l.mê) Xezal.Mambiz.

**Mamo** (gazn.dar.nê) Gazîkirina mamê.

**Mamosta** (karn.dar.dz) Pispor di karekî da. Seyda. Fêrvan.: Mamostayê zimanê kurdî.

**Mamostayî** (karn.l.mê) Karê mamosta. karê wanegotinê.

**Man** (k.jn.x.mê)1.Hebûna mirovî. 2.Gîrobûn. (K) bdn: ez di mînim em di mînîn, tu di mînî hûn di mînin, ew di mîne[….it] ewan di mînin. Pr: dê [bi] mînim, mînîn, mînî, mîne[mînit] Bdb: ez di mam, em di mayn, tu di may, hûn ewan di man , ew di ma. Db,dûr : ez mabûm,em mabûyn, tu mabûy, hûn mabûn, ew mabû,ewan mabûn . (F): bi mîne bi mînin.

**Mandel** (hn.x.çewa) Direw. Şaş. Nerêk.

**Mandelkirin** (k.jn.l.mê) Direw derêxistina gotin yan kiryarekê.

**Mandî** (hk.x.çewa) Westayî. Westiyay. : Ez evro gelek ê mandî me.*Pend*: Destê mandî liser zikê têre. Ang; yê kar û zehmetê bi ke, dê jiyana xwe xweş bi ke.

**Mandîbûn** (k.jn.l.mê) Westan. Westiyan. (K) bn: Bûn.

**Mandîkirin** (k.jn.l.mê) Westandin. : Tu xudê xwe wesa mandî neke. (K) bn: Kirin.

**Mang** 1 (n.x.mê) Heyv.

**Mang** 2 (demn.mê) Meh.

**Manga** (n.dar.mê) Çêl.Çêlek.

**Mangirtin** (k.jn.l.mê) Girevgirtin. (K) bn :Girtin.

**Mango** (n,biyan) *fêqî* Core fêqîyeke, girovir yan hêkî ye, mezin tam şirîne.

**Manşêt** (n.biyan.mê) Sernûçe. Bijkoj.

**Mar** (n.x.nêr) *adî* Giyadarek xişok,dirêj û bê pêye jehirdare[bi jehire]. *Pend* :Marê bin gelgeleyî. Ang; mirovê binvebinve.*Pend* :Mar nabit yar.*Pend* :marê zikê wî hate rêya wî.

**Maravî** (n.l.nêr) *candar* Marê di avê da di jît, yan melevan. Marê avî.

**Mardîn** (hk.cih,bajn.x.m) Bajareke li Kurdistana Bakûr. Mêrdîn.

**Marekirin** (k.jn.l.mê) Markirin.

**Margestin** (k.jn.l.mê) Dema mar bi mirov yan giyandarekî ve di dit yan gez di kit. Marpêvedan.

**Margestî** (hk.l.çewa) Yê marî pêvedayî yan leq lêdayî. *Pend* :Margestî ji werîsî ditirsit.ang; jiber tirsa wî ji marî, werîs li ber çavan di bit mar. kesê bi serî hatî û çavtirsayî.

**Margiros** (n.dar.nêr) *tewal* Nêrekew. Rubad.

**Margîse** (n.dar.nêr) *candar* Giyandarek xişok û biçûke , dest û pê hene.

**Margîsk** (n.dar.nêr) *candar* Margîse.

**Markirin** (k.jn.mê) Girêbenda navbera jin û mêran li cem mela yan oldarekî ve, yan jî li dadgehê. . Jin markirin ; jinînan. (K): bn :Kirin

**Marmark** (n.l.mê) ***candar kirimik*** Corek kirmên zirav û biçûkin di zikê mirovî da û di nav desnivêjê diyar di bin.

**Marmasî** (n.l.mê) ***candar*** Corek masîyên dirêje mîna marane.



**Marmasî**

**Masî** (n.x.mê) ***candar*** Giyandarek xwînsar û avîye, hindek hêkkerin hindek di zên, gelek cor û reng hene.Pend :Masîyan di avê da di firoşit.***Pend*** :Masîyذا a çeman, nabe nehinga deryayan.***Pend*** :Masî li dêmî najît.



**Masî**

**Masîgir** (pîşn.l.dz) Ravker yan nêçîrvanên masîyan. Şokvan.

**Masîgirî** (karn.dar.mê) Rava masîyan.

**Mast** (n.x.nêr) ***spîyatî*** Xwarineka rêçalî ye , ji şîrê gerimkirî piştî hêvênkirinê çend demjimêran  di hêt nixavtin, di mehit û jibo xwarinê berhev di bit.

**Mastfiroş** (pîşn.l.dz) Kesê karê firotina mastî di ke.

**Mastfiroşî** (kkarn.dar.mê) Mastfirotin.

**Masûlke** (n.x.mê) ***can candarî*** Goştê bi hêz û peyt yê leşê candar û mirovî ko mirov di karit bi livînit.

**Maş** (n.x.mê) ***giya*** Giyayekê çandinî ye berê wî wek dindikane, bi tinê yan digel xwarinên din tê berhev kirin. ***Pend***: Te da nav maşan. ang; dema mirov gotineka keç di bêjit, hemberê mirovî jibo hişyarkirinê vê gotinê di bêjit.

**Mat** (n.x.mê) Tebel.

**Matanê** (n.dar.mê) ***lîztin*** Tebelanê.

**Matanêkirin** (k.jn.l.mê) ***yarî*** Tebelanêkirin.

**Matêker**  (hk.dar.çewa) Mirovê mayê xwe di hemû karan da di ke.Davdoz.

**Matîkirin** (k.jn.dar.mê) Çavdêrîkirin. Xwedîkirin. Matî jê kirin. Matî ji zarokan di ke.(K) bn: Kirin.

**Maytêkirin** (k.jn.dar.mê) Dest di karên xelikî werdan. : Tu mayê xwe di karê min da neke. Ang; te şolejê nîne.(K) bn: Kirin.

**Mazî** (n.x.mê) *darûbar* Dareke belg kesik û xemildare, li çiyayên Kurdistanê pirin, du corên berî di det wek; mzî bo derman û tamdana kevlan mifa jê di hêt wergirtin, û berî, ku di bêjinê berîmazik.

**Mazîçin** (kar,n.l.dz) 1. Kesê ku li çiyan li mazîyan di gerit di çinit. 2. Navê jin û mêrane.

**Mazû** (n.x.mê) Mazî.

**Mazûvan** (karn.dar.dz) Mazîçin.

**Me** (cihn) *rêzman* Kesê yekê piranî, heyîn . :Kurdistan welatê (me) ye. : Stiranekê bo me bêje.:Mala me. Em. Me divêt gelê kurd serferaz bit. : Wek me bivê dê wesa bi be.

**Mebest** (n.x.mê) Şirovekirina gotina mirovî di vêt bêjit bo hemberê xwe.Ya dilê mirovî. Merem.:Mebesta te ji wê gotinê çiye?.

**Mecûsî** (dîn,n) Kevine oleka îranî yane.

**Meger** (pêrb) *rêzman* Alavekejibojêgirtin, cudakirinê Jibilî. Eger ne.

**Meh** (hk.dem,n.x.mê) 1.Sîh roj. Sê meh werzekî pêk di hînin.Sal duwazde mehin. :Meha gulanê. Meha xizîranê. :Eve meheke min cigare hêlane.Heyv.

**Mehandin** (k.jn.x.mê) Lêkirina hêvênê taybet li şîrî, paş çend demhijmêran tîr di bit û mast, yan penîr jibo xwarin berhev di bit.2.Tîrbûn. :(K) bdn: ez di mehînin em di mehînîn, tu di mehînî hûn di mehînin, ew di mehîne[...it] ewan di mehînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di mehand, di mehandin.Db,dûr: mehandibû, ...bûn. (F): bi mehîne , bi mehînin.

**Mehane** (hk.dar.çewa) Karê li mehê carek di hêt kirin. : Ez mehane mehyana xwe di wergirim.

**Mehanî** (n.dar.mê) bn: Mehyane.

**Mehbirin** (k.jn..l.mê) Her ji 20 rojên destpêka avisbûnê ta meha çarê,jin gêj di bin û di verişin. *Pend* : Ya ne bit meha, bila bînit deha.ang ; mehbirin ji bûna zarokan girantire jibo jinan. (K) bn: Birin

**Mehik** (n.dar.mê) Rojê nivêj û nizayê di hindek mehan da.

**Mehir** (n.x.mê) Mehira jinê.

**Mehirkirin** (k.jn.l.mê) Markirina jin û mêran li cem mela, yan dadgehê.

**Mehî** (hk.dar.çewa) Mast, penîrê, hatî mehandin. Tîrbûyî. : Xwîna mehî.

**Mehîn 1** (k.jn.x.mê) Tîr yan xesyana madeyên şil. Wek mastê mehî. Şîr di mehit di bit mast.

Mehîn (n.x.mê) *candar* bn :Mahîn.

**Mehol** (n.x.nêr) Amêrekê mîna çakuçane, jibo şikênandina keviran bi kar di hînin.



**Mehol**

**Mehsik** (n.dar.mê) Perçeke ji qayîşî di xin di pêlavê da, li bin pêyî jibo peytkirinê. Binpê.

**Mehyane** (n.dar.mê) Parê mehekê yê mirov werdigirit hember karî. Heyvane. Ratib.

**Mej** (n.x.nêr) bn: Mejî.

**Mejî** (nx.nêr) *can* 1. *candarî* Madeyê di kulox, yan hestîyên mirov û giyandarn da heye. Mejîyê serî. 2.Jîr. Aqil. :Ew mirovek hinde gemjoye dê bêjî mejî di serî da nîne.

**Mejîhişik** (hn.l.çewa) Mirovê zû fêrî tiştî nabit , çi naçit di serî da. Tênegehiştî. Gemjo.

**Mekîne** (n.x.mê) 1. Amêrekê agirîye bo berdana(hilkirina) cigare yan karên din bi kar di hêt. 2. Matorên livîn û paldana tirobêlan û amêrên dî. Dînemo.

**Mekke** (hk.cih,cugrir.n) Bajêreke li Erbistanê, rûgeha misilmanan lêye.

**Mela** (kar,n.x.nêr) Zanayê ola (dîn)ê islamê.

**Melayî** (hk.dar.çewa) Mirovên bi rêbaz ûnavê M. M Barzanî daxbar. Derwêşên rêçika serokê neteweyî û canî Barzanî.

**Melarî** [melarya],(n.x.mê) *derd* Êşeke tayên sar û gerim di hînit mirovî, birêya leqên pêşîya di hêt veguhastin. Lerzeta.

**Melbend** (hk.cih,n.x.mê) Bingeh. Komele.

**Mele** 1 (karn.x.nêr) Mela.

**Mele** 2 (n.x.mê) Melevanî. : Ez ne meleme. ang; melevanîyan nizanim.

**Melekirin** (k.jn.l.mê) Mirov di zane di avê da mele bi ke.Melevanîkirin. (K) bn :Kirin.

**Melevan** (hk.dar.çewa) Yê di karit di avêda bi hêt, bi çit , xwe niqo ket û bi ser avê bi kevit. ***Pend*** : Melevan di xeniqit.

**Melevanî** (n.dar.mê) Serkevtin, niqobûn û hatinûçûn di avêda.

**Melevanîkirin** (k.jn.l.mê) Melekirin.(K) bn: Kirin.

**Melexan** (n.x.mê) Şalok.

**Melez** (n.x.nêr) Mûyên çîrebizinan. Merez.

**Melêv** (n.x.mê) Milhêb.

**Melhem** (n.x.nêr) Milhem.

**Melhemkirin** (k.jn.l.mê) Melhem danan ser birînan, yan kirin çavên kul.

**Melisîn** (k.jn.x.mê) Dema balinde,mirîşk, werdek, kew, kevok û htd xwe liser hêlînê yan lîsî mit di kin.: Mirîşka pîrê lisr hêkan melisî ye.

**Melîl** (hn.x.çewa) Mirovê damayî. Bêgêwil. Posîde.Dilşikesî.

**Melîlbûn** (k.jn.l.mê) Dilşikestin. Bêgêwilbûn.

**Melîlî** (n.dar.mê) Posîdeyî. Daman.

**Melîlkirin** (k.jn.l.mê) Bêgêwilkirin. Dil şikandin.

**Melok** (n.x.mê) Komeka qesela genim, ceh , nok û htd.. di kin gurz dako jibo hilgirtin û birina ser cuxînê desxweş bi bit. Gurz.

**Melûl** (hn.x.çewa) Melîl.

**Melûlbûn** (k.jn.l.mê) Posîdebûn. Daman. (K) bn: Bûn.

**Melûlî** (n.dar.mê) Daman. Dilşikestîn.

**Melûlkirin** (k.jn.l.mê) Bêgêwilkirin. Dilşikandin. (K) bn :Kirin.

**Mem** 1 (n.x.nêr) 1. Navê mêrane, 2. Qehremanê dastana mem û zînê.

**Mem** 2 (n.x.mê) ***can*** Sing, Çiçik.Memik.

**Memê** (n.x.nêr) Navê mêrane. Mem.

**Memê alan** (n.l.nêr) 1. Qehremanê dastana mem ê alan.. 2.Dastaneka kurdî ye,çîroka du evîdarane li çizîra botan ,binavê dastana Memê-alan.

**Memik** (n.x.nêr) *can* 1.Sing. Çiçikên jinan. Guhanên giyandaran.2. Mêjokek lastîke zarok di mêjin dako pê hawîş bi bin. 3. Amanek lûleyîye şîrî bo zarokan tê di kin. Pîlik.

**Memnûn** (n.x.mê) Supas.

**Memûzîn** (nl.mê) 1. Dastana navadeng a mem û zîn. 2. Du evîdarin Mem û Zîn qehremanên dastanê.

**Mencel** (n.x.mê) Qazana mezin ya bi dervan, bo gerimkirin û kelandina av û zadan bi kar di hînin.

**Mencelûk** (n.dar.mê) Menceleka biçûk ya bi destik û bê dervane, bo şîr, mast û htd, bi kar di hêt.

**Mend** (hk.x.çewa) Hêdî. Rawestayî. Ava rawestayî. ***Pend*** : Ji ava pêl ne tirse ji ya mend bi tirse. ;ang kesê bêdeng biveye.

**Mendehoş** (hk.dar.çewa) Hicmetî. Hay ji xwe neman. Serxweş. Gêj.

**Mendehoşbûn** (k.jn.gl.mê) Hay ji xwe neman. Hicmetîbûn. (K) bn: bûn.

**Mendehoşkirin** (k.jn.gl.mê) Serxweşkirin. Guhişandin. (K) bn: kirin.

**Mendehoşman** (k.jn.gl. mê) Hicmetî man. Ageh ji xwe neman. (K) bn: Man.

**Mendelî** (hk.cih,bajarn) Bajêreke li Kurdistana îraqê.

**Menteşe** (n.x.mê) Corek stovankên zêr yan zîv jin di xin stoyê xwe liser singî belav di be.

**Menzel** (n.x.mê) Mezel. Jûr. Eywan.

**Meram** (n.x.mê) Mebest. Merem.

**Mer** (n.x.mê) Amêreke jibo kolana rez û bîstanan bi kar di hêt, destikek heye, bi pêyan liser metirka di di givêşin di erdî da di çit.

**Merbêr** (n.l.mê) Amêreke, devekê pan û qûr heye, jibo ax havêtin û erd kolanê mifa jê di hêt wergirtin.***Pend*** :Merbêr di cewalan da nahêt veşarin.



**Merbêr**

**Merc** (n.x.nêr) Nirxandina mirovê kanê dê krit kar û erkekî encam bi det. Mercên endamîyê,… ango çi di karit bi kit yan şîyan çine. : Ez dê qelemê xo demef te, bi mercekî tu sube bo min bi vegerînî.

**Mercê** (n.dar.mê) Navekê jinan ê kevine.

**Merd** (hn.x.çewa) Kesê nandeh û cavvekirî. :Ew miroveke merde.***Pend***: Malê qels û merdî wek êk di çit. ***Pend*** :Merd be û ne tirse, li malan bixo û ne pirse.

**Merdan** (n.x.nê) 1.Meholk. Çakuç.2. Merd. 3. Navê mêrene.

**Merdane** (hn.x.çewa) Mêranî.

**Merdbûn** (k.jn.l.mê) Mirov fêrî mêvandarî nandehî yê di be. : Dumahîya temenê xwe ew yê merd bûy. Seyda berê ji vêgavê merd tir bû.

**Merdejin** (hk.l.çewa) Jina merd, nandeh û çavvekirî.

**Merdemêr** (hk.l.çewa) Mêrê merd, nandehçavvekirî.

**Merdî** (n.dar.mê) Merdînî.

**Merdînî** (n.dar.mê) Nandehî. : Bi merdî jiya û bi merdînî mir.

**Merdkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov bi mal û diravî jibo mêvanan ya pêdivî bi ket. : Divê jibo mêhvanan mirov xwe merd bi ke.

**Merem** (n.x.mê) Mebest.

**Mereq** (n.x.mê) Hez. Vîyan. Daxaz. Xewin.

**Mereqe** (n.x.mê) .Danê req di gel xwarina şil têkel di ken. Birinc yan savar ê di xin nav nîskê.

**Merez** (n.x.mê) 1.Mûyên bizinên çîr.2. Keça porzer.

**Merg** (n.x.nêr) 1. Can. 2. Mirin.

**Mergever** (hk.cih,dever.n.dar) Navê deverekêye.

**Mergonek** (n.dar.nêr) Bagurdan.

**Merhem** (n.dar.mê) Dermanekê nîv reqe, jibo birîn û çavkulîyê bi kar di hêt.

**Meriv** (n.x.nêr) Mirov.

**Mermer** (n.dar.nêr) Helanek ciwan û rengîne, dîwar û binê xanîyan pê di nexşînin.

**Merov** (n.x.nêr) Mirov.

**Merş** (n.x.mê) Mêzer. Mafîr.Rayex.

**Mertal** (n.x.mê) Metal.

**Mesaj** (n.biya.x) Leş perixandin.

**Mesîh** (n.biyanx.nê) Pêxember îsa, s.x.l.

**Mesîhî** (dînn.bawer) Fele.

**Mesîn** (n.x.nêr) Amanekê avê ye destikek û lûlîyek pêve ye, bo şoştina serûçavan, desnivêjgirtinê yan avdana baxan.

**Mest** (hn.x.çewa) Serxweş. Evîndar. Dêvane. Gêj.

**Mestbûn** (k.jn.l.mê) Serxweşbûn. Gêjbûn. (K) bn: Bûn.

**Mestkirin** (k.jn.l.mê) Serxweşkirin. Dînkirin. (K) bn: Kirin.

**Meşk** (n.x.mê) Pîstê kewalan paş çêkirinê mastî û avê tê di xin bi werîsekî di hilawîsin, çendekê di kîyên dako nîvişk û dew ji hev cuda bi bin.

**Meşkkiyan** (k.jn.l.mê) Şilqandina meşkê jibo bi dest ve îna dew û nîvişkî.(K) bn: Kiyan.

**Meşq** (n.x.mê) Rahênanên leşî jibo mirov leş qayîm û peyt bi bit. :Meşqa leşkerî. Rahênan.

**Meşqdan** (k.jn.l.mê) Fêrî rahênanan kirin. (K) bn: Dan.

**Meşqdayî** (hk.l.çewa) Kesê, serbazê fêrî rahînanan bûye. :Ew serbazek meşdayî ye.

**Meşqkirin** (k.jn.l.mê) Rêhînan kirin. (K) bn :Kirin.

**Met** (n.x.mê) Xuşka babê mirovî. Xweha bavê.

**Metal** (n.x.mê) Amêrekê kevine, mîna sêlwanan e, ji hesinê tunde, şervanên berê di dan ber xwe jibo xwe paraztin ji tîr û şûrên dijminî.

**Metare** (n.x.nê) Mitare.

**Metirke** (n.x.mê) Darekê kune temet pêlavê yan piçek mezintire, di destikê merê ra di kin ta di gehit ser merê, mirov li dema kolanê( erd,rez û bax) pîyê xwe liser di danit pal di dit dako di erdî da bi çit xwarê.

**Metirsî** (n.x.mê) Tirs.Bive.

**Metîn** (hk.cih,cugir,n) 1. Çiyayeke li Kurdistana îraqê. 2. Navê xortane.

**Metran** (n.x.nêr) Zanayê dînê feleyan.

**Mewij** (n.x.mê) Mêwî.

**Mewîj** (n.x.mê) Mêwîj.

**Mexel** (hk.cih,n.x.mê) Cihê bêhinvedana kewalan. : Mexela pezî.

**Mexelbûn** (k.jn.l.mê) Xirvebûna kewalan û bêhinvedana wan li mexalê. : Pezê şivanî li bin darê yê mexel bûy.

**Mexelkirin** (k.jn.l.mê) Bêhinvedan dane kewalan. : Bizinê xwe mexel ke û were da firavînê bi xoyn. (K) bn :Kirin.

**Mey** (n.x.mê) Vexwarina kiholî.

**Meyan** 1 (hn.x.mê) Mehîn. Mehan.

**Meyan** 2 (n.x.mê) Navê jinane.

**Meyandin** (k.jn.x.mê) Mehandin.

**Meydan** (n.x.mê) Qad.


**Meyger** (karn.dar.dz) Kesê vexwarina meyê di de mêvanan.

**Meyizandin** (k.jn.x.mê) Nêrîn. Berê xo danê.Temaşekirin. Bi meyizînin, di meyizand.

**Meyizîn** (k.jn.x.mê) Temaşekirin. Nêrîn. Bi meyize. Di meyizin.

**Meyîn** (k.jn.x.mê) Mehîn.

**Meymûn** (n.x.dz) *candar* Giyandareke leşsivik û pelewane,li daristanan di jît. :Ew mêrekê hinde kirêtedê bêjî meymûne!.



**Meymûn**

**Meyxane** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê vexwarina meyê.Bare. : Du demjimêran li meyxanê ma.

**Meyzekirin** (k.jn.l.mê) Meyizandin. (K) bn: Kirin.

**Mezar** (n.x.nêr) Gora mirovên navdar û xwedênas.: Me serdana mezarê nemiran kir.

**Mezargeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mezarê çak û navdaran.

**Mezaxtin** (k.jn.x.mê) Perê mirov li kirîna xwarin kelûpelan di de. : Li vê mehê min 2000 dînar mezaxtin. (K) bdn: ez di mezêxim em di mezêxîn, tu di mezêxî hûn di mezêxin, ew di mezêxe[…it] ewan di mezêxin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di mezaxt, di mezaxtin. Db,dûr : mezaxtibû, …..bûn. (F) : bi mezêxe, bi mezêxin.

**Mezdek** (n.x.nêr) *dîrok* Navê pêxemberekê kurdane.

**Mezel** (n.x.mê) Ode. Eywan.

**Mezin** (hn.x.çewa) 1. Ne piçûk. Gewre. Qebe.Gir. 2. Navsalve çûyî. Jî dirêj. Kevin. *Pend* :Mezin bi bite pir, di ser ra derbaz nebe.ang ; rêzgirtin li mezinan. *Pend* :Mezinan çi bo biçûkan ne hêlaye.*Pend* :Mezinê aqil biçûk.

**Mezinayî** (n.dar.mê) Gewreyî. pilebilind. . : Meznayî jibo xwedê başe

**Mezinbûn** (k.jn.l.mê) Geşbûn. Werarkirin. Girbûn. : Lawê Siwarî yê mezin bûy. (K) bn: Bûn.

**Mezinkirin** (k.jn.l.mê) 1. Xwedîkirina zarokan, candaran û htd tanî mezin di be. Gewrekirin. :Min zarok bi jarî mezin kirin. 2. Pêşvebirin. : Hevsîyê me gelek xwe mezin di ket, jiber hindê ez hez jê na kem. (K) bn: Kirin.

**Mê** (hn.x.çewa) 1.*rêzman* Tuxmê, zayendê mê. 2. Candar û mirov ên mê. Dêhil, bizin, mirîşk,maker û htd, jin, keç, dayk, met û htd. ♀.

**Mêdek** ( n.x.mê) Serhevîrk. Buxçik.

**Mêga** (n.l.mê) *candar* Gaya mê.Manga, Çêl.

**Mêgank** (n.l.mê) *candar* Golika mê.

**Mêhreban** (hk.dar.mê) 1. Dilovan. Dilpak. :Jina mêhreban. :Mêrê mêhreban. 2. Navê jinane.

**Mêhvan** (n.x.dz) Mêvan.

**Mêj** (hn.x.çewa) Kevin. Berê. ji mêje.

**Mêjandin** (k.jn.x.mê) Şîrdan zarokan, karikan. : Te karik mêjandîne ?. (K) bdn: ez di mêjînim, tu di mêjînî hûn di mêjînin, ew di mêjîne[…it] ewan di mêjînin.Pr:dêbi +bdn. Bdb: di mêjand, di mêjandin. Db,dûr: mêjandibû, mêjanndibûn. (F): bi mêjîne, bi mêjînin.

**Mêjmêjok** (n.l.mê) Mêjok.

**Mêjo** (n.x.mê) Dîrok.

**Mêjok** (n.dar.mê) Tiştê bi devî di hêt mêjtin. Memik.

**Mêjonivîs** (karn.l.dz) Dîrokvan.

**Mêjtin**(k.jn.x.mê) Mirov yan giyandar, devê xwe di êxit tiştekî bi hilkêşit dako şilî yan dûkêl bi hêt di devî da. (K) bdn: ez di mêjim em di mêjîn, tu di mêjî hûn di mêjin, ew dimêje[....it ]ewan di mêjin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di mêjt, di mêjtin. Db,dûr : mêjtibû, ...bûn. (F) : bi mêje bi mêjin.

**Mêkew** (n.l.mê) Kewa mê.

**Mêlak** (n.x.mê) ***can*** Endamekê navxweyî yê leşê mirov yan giyandarane. Cerg. Ciger.

**Mêmê** (n.x.mê) Navek kevnar yê jinane.

**Mênandin** (k.jn.x.mê) Pêveçûn. Wekhevbûn.Bi mênîne, di mênînin,..

**Mêr** 1 (n.x.nêr) 1. Tuxmê nêr. Zelam . Peya. : ***Pend*** : Mêrê liber emrê[ferman]a jinê, her yê li ber mirinê. ***Pend*** : Mêrê du jinan şwîtik kete pişt gunan. ***Pend*** :Mêrê bin destê jinê, yê başe jibo mirinê. ***Pend*** :Mêrê çav bi der, jina xwelîser. ***Pend*** :Mêr di revin, jin diravin.***Pend*** :Mêrê du jinan piştîn kevte pişt gunan.

**Mêr** 2 (hn.x.çewa) Zîrek. Çavnetirs. Qehreman. ***Pend*** : Mêr bi nanekê nabin nandar û bi darekî nabin navdar. ***Pend***: Mêre, belê ji navda qulêre. ***Pend*** :Mêrê bê dujmin ne mêre. ***Pend*** :Mêr hene, mêrkok jî hene.

**Mêranî** (n.dar.mê) Gehremanî. Zîrekî. Çavnetirsî.: Mêranî ya pêşmergehan li cîhanê deng daye.

**Mêrçak** (hk.l.çewa) Mêr. Mêrxaz.

**Mêrçakî** (pesin,nl.mê) mêranî.


**Mêrdîn** (hk,cihc.mê) Mardîn.

**Mêrg** (hk.cih,n.x.mê) Cihek bi av, dar, giya û xemilî. Çîmen. Baxê xwezayî.

**Mêrgesor** (baj,cugirn,cih.l) Bajêrkek Kurdistana başûre.

**Mêrgûçîmen** mêr û çîmen (n.l.mê) 1. Gulistan. 2. Navê bernamek dilvekere li K TV di hêt pêşkêş kirin.

**Mêrî** (n.x.mê) ***can*** Giyandareke biçûke kuna xwe li bin axê dirist di kit hijmarek mezin bi hevre dijîn. Gêle.***Pend*** :Wekî mêrîyên perdar lê hatin. Ang; ji hev dûr kevtin li belavbûn.***Pend*** :Mêrîyên kunekêne û berîyêd darberîyekêne.



**Mêrî**

**Mêrîzerk** (n.l.mê) ***can*** Corekê mêrî yên hûrikin û reng zerin.

**Mêrkirin** (k.jn.l.mê) Şûkirin. : Berî sê salan Şehyanê mêr kirî ye. (K) bn: Kirin.

**Mêrkirî** (hk.l.çewa) Jina şûkirî. Şûkirî. : Zozan jineka mêrkirî ye.

**Mêrkuj** (hk.l.çewa) 1. Yê ko mêran dikujit. Kujek.2. Jina har, dujwar.

**Mêkujî** (n.l.mê) Karê êkî mêr kujtin bin.: Ew hertim basê mêjîya xwe di ke.


**Mêrû** (n.x.mê) Mêrî.

**Mêrxas** (hk,hn.l.çewa) Mêrxaz. *Pend* :Mêrxas ji zîndanan na tirsin, tirsonek ji bayê hinavên xwe di tirsin.

**Mêrxasî** (n.l.mê) Mêrxazî.

**Mêrxaz** (hk,hn.l.çewa). Mêr.Zîrek. Çavnetirs.Qehreman.

**Mêş** (n.x.mê) ***candar*** Giyandarekê firinde, kirmijok û biçûke liser xwarin û tiştê gemar dijît.



**Mêşereşk**


**Mêşahingivî** (n.l.mê) ***candar*** Mêşhingiv.

**Mêşahingvînî** (n.l.mê) ***candar*** Mêşhingiv.

**Mêşelok** (n.dar.mê) ***candar*** Mêş.

**Mêşereşik** (n.l.mê) ***candar*** Mêşa reşa nav malan. Mêş.

**Mêşhingiv**(n.l.mê) *candar* Mêşa ko hingivî çê dikit, jehirdare.mêşa hingvîn.



**Mêşhingiv (mêşahingvînî)**

**Mêşkuj (n.l.mê)** Amêreke karebayî yan destî ye , jibo kujtina mêşan bi kar di hînin.

**Mêşxur** (n.l.nêr) *balinde* Perindeyeke xwairina wî mêş û mêşhingive. Kulkulî.

**Mêtal** (n.x.biyan) Kanza.

**Mêtin** (k.jn.x.mê) Mêjtin.

**Mêtingeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê azar û êşandina xelkê.Zorxane.

**Mêtinkar** (karn.l.dz) Xwînmêj. Zordar.

**Mêtûlke** (n.x.pir) *candar* Rişk.

**Mêvan** (n.x.dz) 1. Kesê li malek bîyanî bi xwe, vexwe û bi nive. ***Pend*** :mêvan ji mêvanî ne xweşe, malxoyî ji her duyan. ***Pend*** :Mêvan xweşe şevekê. ***Pend*** :Mêvanê direwîn, di xot carek firavîn. 2. Navê mêrane.

**Mêvanbûn** (k.jn.l.mê) Mirov li malekê yan cihekî di bit mêhvan. Bûnemêvan.

**Mêvandarî** (n.dar.mê) Kar, rêz, berhevî û xizmeta jibo mêvanan di hêt encamdan.

**Mêvankirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov kesekî di mal da di hewînit. (K): bn Kirin.

**Mêvanperwer** (hk.l.çewa) Mirovê gelek keyfa xwe bi mêvanan di hînit.

**Mêvanperwerî** (n.l.mê) Rêzgirtin û xizmeta mêvanan.

**Mêvanxane** (hk.cih,n.l.mê) Cihê hewandina mêvanan. Otêl.

**Mêvok** (n.x.mê) Bijkoj. Pijkovk.

**Mêw** (n.x.mê) *dar* Dara tirî.

**Mêwîj** (n.x.mê) *mita* Tirîyê gehiştî di hêt hişikkirin yan mizeytkirin û li miştaxan radixin ta hişik di bit .

**Mêwîjareş** (n.l.mê) *mita* Ji tirîyê reş [reşmêw]çê di bit.

**Mêwîjazer** (n.l.mê) *mita* Ji tirîye zerike.

**Mêwkîk** (n.x.mê) *giya* Giyayek bi xemle li çîyayên Kurdistanê hişîn di bit.

**Mêze** (n.x.mê) Depek raste liser pêpikan qayîm kirîye, xwarin, nivêsîn û htd liser di hêt danan û kirin. Teble.

**Mêzekirin** (k.jn.l.mê) Berêxwedan. Nêrîn. Lênêrîn. Sehkirin. Meyzandin. (K) bn: Kirin.

**Mêzer** (n.x.mê) Berik. Merş. *Pend* : Ev zere ji vê mêzerê kême.

**Mêzûpotamya** (cugirn.dar.mê) Navekê dîrokîye, ango;welatê navbera du çeman.  Kurdistan.

**Mi** (cih.n) *rêzman* Min. : Birayê mi. Serê mi,.

**Miçandin** (k.jn.x.mê) Girtin. Pêkdadan. Bestin. : Devê xwe bi miçîne. ang ; devê xwe dane serêk.(K) bdn : ez di miçînim em di miçînîn, tu di miçînî hûn di miçînin, ew di miçîne[..it] ewan di miçînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di miçand, di miçandin. Db,dûr : miçandibû, ... bûn.(F) : bi miçîne, bi miçînin.

**Miçkirin** (k.jn.l.mê) Çavniqandin. Çav lê niqandin.

**Mifa** (n.x.mê)  Kêrhatî.Baş. Bi biha. Sûd. :Mifayê xwarina fêqî jibo mirovî geleke.

**Mifadar** (hn.dar.çewa) Tişt, xwarin, vexwairn, kiryarên bi mifa. :Bazirganî karekê mifadare.

**Mih** (n.x.mê) *candar* Giyandarek malî û şîrdere.Pez. Mîh.

**Mihabad** (hk.cih,bajêrn.cugir) 1.Bajêrekê Kurdistana rojhilate. Paytextê komara kurdî ya bi navê Mihabad bû. 2. Navê jinane.

**Mij** (n.x.mê) Dema ewir di kevit ser erdî û dinya tarî di bit. Mûran. Mijê çîyayên girtîn.

**Mijad** (n.x.mê) Mijar.

**Mijandin** (k.jn.x.mê) Mêjandin.

**Mijane** (n.x.nêr) Destedarekê qayîme, li dema kêlana zevîyan bi dewaran, cotyar bi destên xwe di girit da bi karit hincarî wek wî bi vê rast ragirit û xîça wî rast derkevit.

**Mijang** (n.x.pir) *can* Mijîlank.

**Mijar** (n.x.mê) Navnîşana her karek yan nivîsekê. Babet. Civîna me ji çend mijaran pêk hatîye ji wan diravî, çelengî, leşkerî û htd.

**Mijbûn** (k.jn.l.mê) Dema mij erdê di girit. Bûne mij. :Dinya mij , me berpêd xwe ne di dîtin.

**Mijdar** (hk.dem) 1.Meha yazdehê.2. Bi mij. 3.Navê jin û mêrane.

**Mijde** (n.x.mê) bn: Mizgîn.

**Mije** (n.x.mê) Tam.

**Mijî** (hk.dar.çewa) Rojek, şeveka bi mij. Mijdar.

**Mijîl** (hk.x.çewa) Yê bi karekî ve xwe mijîl di kit. :Ez nikarim herim mal, çunkî yê mijîlim. :Tu niha mijîlê çiyî ? ango; çi kar dikî?

**Mijîlank** (n.x.mê) Rêza mûyên liser herdu zîhên ser û binî yên çavan. Bijang.Mijang. Mûjank.

**Mijîlahî** (n.dar.mê) Mirov karekî di ket, di tiştekî bi xebitit. Xebitîn. Xwe ji bîrvekirin.

**Mijîlkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov xwe yan yekî mijîl di kit. (K): bn :Kirin.

**Mijmije** (n.l.mê) 1. Dara mijmijê . 2. Fêqîyek biharî û pir xweşe rengê wê zere. Zerdil.

**Mijûl** (hn.x.çewa) Mijîl.

**Mikare** (n.x.nêr) Amêrekê asine bo kunkirin û renîna(tiraşîn) daran bi kar di hêt. Nikare.

**Mil** (n.x.dz) 1. *can* Herdu bilindî yên zendik pêve hatîn girêdan û ser di kevit navbera wan da. 2.Gir.Girik. :Seg li serê milê rawesta.

**Milanê** (n.dar.mê) Corekê govenda kurdîye mirov milên xwe di din hev dema di leyzin.

**Milçemilç** (n.dar.mê) Mirçemirç.

**Milet** (n.x.nêr) Xelikê bi hevra bijît û ziman û çanda xwe he bit. Gel.

**Milêb** (n.x.mê) Milhêb.

**Milêv** (n.x.mê) Milhêb.

**Milhem** (n.x.nêr) Cirk.

**Milhêb** (n.x.mê) Çengaleke du sê yan çar guhe, destikek dirêj pêveye jibo hilavêtin û dane bayê ya genim, ceh,nîsk û htd dako dan û ka ji hev cuda bi bin. Cemik. Çarguh.

**Milî** (hn.x.çewa) Tiştê girêdayî miletekî bit, xwemalî wek ;govend yan cilkên milî. Gelêrî.

**Milk** (n.x.nêr) Mal. Erd. Dirav.

**Milkirin** (k.jn.l.mê) Liser milê xwe danan. Di milê xwe kirin. : Daykê zarokê xwe li milê xwe kir.

**Milmilanê** (n.l.mê) Hevrikîyek nerînî û bêkuta, mirov pêkolê di kit dako zûtir ji hemberê xwe bi gehit armancekê, evca çi berpisyarî yan dirav bit.

**Milok** (n.dar.mê) Melok.

**Milyard** (hij,n.çend) Hizar car milyon.

**Milyardêr** (hn.l.çewa) Kesê parê wî milyardek yan pitir be.

**Milyon** (hijn) Hizar car hizar.

**Milyonêr** (hn.l.çewa) Mirovê parê wî milyonek yan pitir be.

**Min** 1 (cihn.tek) *rêzman* Kesê êkê. Hebûn. Min du kur û keçek hene. Min di vêt . Min di got. Min nîne. Mala min. Kurê min …û htd.

**Min** 2 (n.x.mê) Yekeya pîvana mita û tiştî ye êk min nêzî kîlo û nîv e.= 3500 gr. *Pend*: Sivore û ber û minêd xwe. :Mineka pîvazan. :Mineka zerdilan.

**Minal** (n.x) Zarok.

**Mindal** (n.x) Zarok.

**Minê** (n.x.mê) Lava. Hîvî.

**Minêkar** (hk.dar.çewa) Supasdar. : Eger tu vî karî bo min bi kî, ez dê ji te minêkar bim.

**Minêkirin** (k.jn.l.mê) Supaskirin. Hîvîkirin. Lavakirin. (K) bn : Kirin.

**Minminok** 1 (hk.dar.çewa) Mirovê kiryar û bizavên hêdî di ke. Nimnimok. Nerim.

**Minminok** 2 (n.dar.mê) *candar* Pelatînk.

**Miqawe** (n.x.mê) Kaxezeka sitûre, ji kayê hatî diristkirin. Karton.

**Miqilk** (n.x.mê) Axlewîk.

**Mirandin** (k.jn.x.mê) 1.Dema mirovek wek mirî bi hêt navnivîskirin. 2.Xwe bêdengkirin. Bêhoşkirin. Xwe mirandin. (K) bdn: ez di mirînim em di mirînin, tu di mirînî hûn di mirînin, ew di mirînit ewan di mirînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di mirand, di mirandin. Db,dûr : mirandibû, ... bûn. (F): bi mirîne bi mirînin.

**Mirar** (hn.x.çewa) Kelexê giyandarê mirî. :Seyê mirar. :Kerê mirar.

**Mirarbûn** (k.jn.l.lm) Dema giyandarek di mirit.

**Mirarî** (n. x.mê) 1.Madek bihadare, di kin ristik bo ciwanîyê bi kar di hêt, nemaze li cem jinan. Dur.2. Navê pîrekane.

**Miremir** (n.dar.mê) ***deng*** Mirên.

**Miremirkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê miremirê jê hatin. :Panka hewe gelek miremirê di ke!.

**Mirên** (n.x.mê) ***deng*** Dengê firokan, tirombêlan, ba û htd. :Mirêna trombêlan di hat. Virên. Hurên.


**Mirin** (k.jn.x.mê) Dema mirov canê xwe winda di kit. Çûn ber dilovanî ya xudê. Neman.Mirina wî ji egera nexweşîyê bû. ***Pend*** :Mirina bi heval, çêtire ji jiyana bê heval (K) bdn: ez di mirim em di mirîn, tu di mirî hûn di mirin, ew di mire[..it] ewan di mirin. Pr : dê bi+ bdn. Bdb : ez di mirîm, em di mirîn, tu di mirî hûn di mirîn, ew di mirî ewan di mirîn. . Db,dûr : ez mirîbûm, em mirîbûn,tu mirîbûy,ew mirîbû, ewan mirîbûn. (F) : bi mire bi mirin.

**Mirî** (hn.dar.çewa) Laş (leş) ê bêcan. Mirîyê xwe veşartin, binax kirin. .***Pend*** :Mirî qon bi doşave.

**Mirîçok** (hk.dar.çewa) Mirovê sist, xav, lewaz.

**Mirîd** (karn.x.dz) Kesên tûbedar li ber destê şêx, xwedênasan û çakan li ser rêya wan herdem di xilwe û nizayan dane.

**Mirîşk** (n.x.mê) ***perinde*** Baldarek malî û hêkkere.***Pend*** :Mirîşk hêkan di ket, kelebang birîyan di ket.



**Mirîşk û hêk**

**Mirîşo** (karn.l.dz) Mirovê ku mirîyan di şût.

**Mirmirk** 1 (n.dar.nêr) ***fêqî*** Corek tirîye reng sorê tarî yan reşe. Bêsîrane.

**Mirmirk** 2 (n.dar.nêr) Pêşî.

**Mirov** (n. x.dz) 1.Giyandarekê jîre, sozdare. : ***pend*** :Mirovan mirov ne xwarîne.ang ; jibo mêvanan di hêt gotin dema daxaza vehewandinê ji xwedî yê malê di kin..***Pend*** :Mirovê dîn di şahî û şînîyan da diyar di bin.***Pend*** :Mirov di mirit, belê nav di mînit.2 Jîr. : Ez nizanim ev xorte dê kengî bit mirov. 3. Xizim. : Dayk û babên wî mirovên hevin. :Ew yê bê xwedî ye û tu mirov nînin.***Pend*** :Mirov bi mirovê xwe mirove.

**Mirovanî** (hn.dar.çewa) Girêdana mirovan bi hevra. Xizmanî. ji xûnekê. : Mirovanî ya wan ya kevine.

**Mirovatî** (hn.dar.çewa) Kar û kiryarên têkeilî bi alîkarîyên mirovî ve hebin. :Alîkarîyên mirovatî.

**Mirovayetî** (n.dar.mê) Mirovatî.

**Mirovmirovkanê** (hk.dar.çewa) Dema mirov tayê mirovê xwe di girit, liser rastî û şaşîyê[çewtî]. Tagirî. Cudayî.

**Mirovmirovkanêkirin** (k.jn.ggl.mê) Tagirîkirin. Cudayîkirin.

**Mirovî** (hn.dar.çewa) Mirovayetî.

**Mirovxwer** (hk.l.çewa) Di çîvanokan da pîrvevî û serkirînk ko mirovan di xon.

**Mirûz** (n.x.mê) Mirît. Gêwil.

**Mirûztirş** (hk.l.çewa) Mirîtşîn.Navçavgirê.

**Miryem** (n.x.mê) 1.Dayka Isa yê pêxembere (s.x) .2. Navê keçane.

**Mis** (n.x.nêr) Kanzayek nerime , reng sorek tarî ye.

**Mishef** (n,biyan) Kitêba pîroz. Qur`an.

**Mishefareş** (n.l.mê) Kitêba pîroz ya dînê Êzdîyan.

**Misilman** (hn.x.çewa) Mirovê ji ola îslamê.

**Misir** (hk.cih,welatn.cugirn) Mezintirîn welatê erebî ye.

**Misrî** (nejn) 1. Xelikê welatê Misir. 2. ziman, kelûpelên ji Misir ê.

**Misk** (n.x.mê) Corek gulavê ye. Bêhin.

**Misoger** (hk.x.çewa) Kar yan kiryara goman têda ne be. Sedased.:Serkevtin misogere.

**Misogerbûn** (k.jn.l.mê) Gotin yan kiryara goman têda ne mînit û sedased bi bite cihê bawerîyê.

**Misogerî** (n.dar.mê) Mirogerbûn.

**Misogerkirin** (k.jn.l.mê) Serrastkirin. Piştrastkirin. :Here misoger ke kanê sube cejin e yan ne?.(K) bn: Kirin.

**Mist** (n.x.mê) 1. Destê mirovî yê miçandî. Buks. 2. Destê pir. :Misteka genimî, tovikan û htd. Girmik. Lep.

**Mişar** (n.x.dz) 1. Amêrek asinî ye didan tûje bo birîna daran bi kar di hêt.2 Malikên çarkujî yan alkêş [lakêşe] bo çandina mitayî, wek pîvaz, sîr kixs û htd.

**Mişe** (hk.x.çewa) Zehif, berfireh. :Xwarin a mişeye. :Dar di mişene li Kurdistanê. Pir.

**Mişebûn** (k.jn.l.mê) Pirbûn. Zafbûn.Zorbûn. : Giyanewer li Kurdistanê yêd mişe bûyn.

**Mişeyî** (rd.dar.çewa) Berfirehî.

**Mişekirin** (k.jn.l.mê) Zehifkirin.Zorkirin.

**Mişexor** (hk.l.çewa) Kirmijok.

**Mişk** (n.x.nêr) *candar* Giyandarek şîrder û biçûke bi ziyane di nav malan û liser xwarin û hevranan di jît.



**Mişk**

**Mişt** (hn.x.çewa) Pir. Tijî.

**Miştaxe** (n.l.mê) Tirî ji mêwan di hêt kirin û li cihek hulî kirî û paqij, ûşîyan bi rex êkve radixin daku hişik bi bin û bibin mêwîj.

**Miştbûn** (k.jn.l.mê) Tijîbûn.

**Miştî** (n.x.nêr) Alîka gîyandaran. Xwarina kewal û dewaran.

**Miştkirin** (k.jn.l.mê) Pirkirin. Tijîkirin.

**Mit** (hk,hn.x.çewa) Bêdeng. Kêmaxivtin.

**Mita** (n.x.nêr) Hatîyê mirovî ji çandinê wek genim, ceh, nok, bacan, xiyar û htd. Berhem.

**Mitare** (n.x.nêr) Amaneke ji fafon yan plastîkê ye, avê bo vexwarinê tê di kin li aqaran yan nav zevî milkan ku av lê nebit. Avdank.

**Mitbûn** (k.jn.l.mê) Bêdengbûn. Kirbûn. (K) bn :Bûn.

**Mitî** (n.dar.mê) Bêdengî.

**Mitkirin** (k.jn.l.mê) Xwe mitkirin. Xwe bêdengkirin.Mitkirin.Bêdengkirin. Kirkirin. (K): bn Kirin.

**Mivred** (n.x.nêr) Amêreke ji hesinî hatîye çêkirin jibo hisan û xweşkirina devên das, bivir, sator û htd bi kar di hêt. Kartîk.

**Mixabin** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo peşêmanîyê di hêt gotin. : Mixabin wî jinav me barkir. : Mixabin welatê me li bin destane. : Mixabin ez nikarim alîkarîya te bi kim.

**Miyaw** (n.x.mê) ***deng*** Dengê kitkane(pişîk). Newnew.

**Miyawîn** (k.jn.x.mê) Kitik dengê miyawê ji xwe di hînit.Miyawkirin.

**Miyawkirin** (k.jn.l.mê) Miyawîn. Newkirin. Newîn.

**Miz** (hk.x.çewa) Tama tirş û şirîn têkel (bi hevre).

**Mize** (n.dar.mê) Xwarinên sivik di gel ereqê di xwen.

**Mizeyt** (n.x.nêr) Roja tirî li avê dane, ko di kin mêwîj.

**Mizeytkirin** (k.jn.l.mê) Tirî li zirikavê(ava zirik ê) dan,da bi bit mêwîj. (K) bn: Kirin.

**Mizgeft** (n.x.mê) Avahîyê xudaperistinê li cem misilmanan. Perisgeha misilmanan.

**Mizgîn** (n.x.mê) 1. Nûçeyek xweş, gotinek dilveker. 2. Navê mêr û jinane.

**Mizgîndan** (k.jn.l.mê) Gehandina nûçeyên xweş. : Ezê mizgînîyê bi dim te, kurdan mafê xwe wergirt. (K) bn : Dan.

**Mizîrî** (malbn) Navê hozeka kurdane, piranî ya xelkê wê li Kurdistana Iraqê xwe cihin.

**Mî** (n.x.nêr) Davên pora serê mirovî û leşê giyandaran. :Mîyên bizinan.

**Mîç** 1 (n.x.nê) ***leş*** Kab.

**Mîç** 2 (hk.x.çewa) Vala.

**Mîçînk** (n.dar.nêr) Amêrekê dutaye, mîna gazikan jibo derînana mûyan bi kar di hêt.

**Mîçkirin** (k.jn.l.mê) Valakirin. Firkirina vexwarinan tanî çi di amanê têkirî nehêlin, piranî bo tirane bi kar di hêt. (K): bn :Kirin.


**Mîdalî** (n.biyanx.mê) Parçe asin yan plastîke wek ristik bi zincîr yan bendikekî ve girêdaye, pêşkêşî wan mirovan di ken yên kar yan çelengîyên bi biha encam dane, yan kesên zana û qehreman. Mîdalîya Barzanî , mîdalîy a şoreşa Eylûl, û htd.

**Mîdî** (nejn) ***dîrok*** Kevine babkalkên kurdan li ser dema dewleta Mîdya.

**Mîdya** (hk.cih,n.x.mê) ***dîrok*** 1.Kevine dewleta kurdane. 2. Navê keçan.

**Mîdyayî** (nejn) Mîdî.

**Mîh** (n.x.mê) ***candar*** Peza mê. Mih. Pez.***Pend*** :Mirovek wek mîhê ye.ang; mirovekê nerim û liser xweye.



**Mîh** (mih)

**Mîkrob** (n.cîh.x.mê) Candarek hûrike, bi çavan nahêt dîtin.

**Mîl** 1 (n.x.nêr) Tîrka biçûk ya demhijmêrê. Her demjimêr ji sê mîlan pek dihêt,mîlê demjimêrê, ….xulgan,…. Çirkan.

**Mîl** 2 (ncîhan)Yekeya cîhanî ya pîvana dirêjîyê.

**Mîna** (hn,hk.x.çewa) Nimûne. Wek.

**Mînak** (n.dar.mê) 1.Nimûne. Risim.2. Bevil. ;Eve mînakê kê ye ?.

**Mînakkêşan** (k.jn.l.mê) Kêşana wêneyan. Wênekirin. :Tu di karî ji min ra mînakekî bi kêşî ?.

**Mînakkirin** (k.jn.l.mê) Mînakkêşan. Wênekirin.

**Mîr** (karn.x.dz) Kesê rêveberîya deverekê dikit û li paytextî di rûnit. Mîrê amêdîyê, Botan, Hekarî, Baban û htd.

**Mîran** (n.x.dz) Navê kur û keçane.

**Mîrgeh** (hk.cih,deven.l.mê) Dever yan cihê rêveberîya wê mîratî bit. Mîrgeha Botan …û htd.

**Mîranî** (malb,n) Hozeka koçerên kurdane li Kurdistanê. Mîrî.

**Mîratî** (karn.dar) Karê mîr pê ra di bit. :Çend salan mîratî li mîrgeha,… kirî ye.

**Mîrî** (hn.x.çewa) 1. Dezgeh, kar, mal, erd û htd, yên girêdayî desthelatê. 2. Mîranî.

**Mîrkut** (n.l.nêr) Darek duserê sitûr û mezine, nîva wî ya simtî ye û destikek pêveye, jibo qutana savar û danî bi kar di hêt.

**Mîro** (hd,gaz,dar.nêr) 1.Alavek gazîkirinê bo rûmetgirtin, wek mîr .2. Navê mêrane.

**Mîrqut** (n.l.nêr) bn: Mîrkut.

**Mîrxan** (n.l.dz) 1. Mîr. 2.Navê kurane.

**Mîrxiçik** (n.dar.mê) *derd* Corek pirsikên avdarin, li ser leşê mirovî nemaze zaroyan di hên.

**Mîrza** (malb.n) 1. Kurê mîran. 2. Navê mêrane.

**Mîşekirin** (k.jn.l.mê) Pakijkirina zevî û rezan ji dar û beran dako giyayên din lê bi çînin.(K) bn: Kirin. :Zevîya bin gundî hemî ya mîşe kirî, lê ya serî ya may.

**Mîx** (n.x.mê) Bizmar.



**Mîx**

**Mîxdan** (k.jn.l.mê) Bizmardan. :Depî mîx de.

**Mîyaw** (n.x.mê) Miyaw.

**Mîz** (n.x.mê) Ava di leşê mirov û giyandaran da heye û bi rêya hedamê mîztinê derdikevit.

**Mîzdan** (n.dar.mê) Cihê mîz lê xirve(kom) di bit. Pivdanka mîzê.

**Mîzî** (n.x.mê) Cihê hedamê guhnelî yê giyandarên nêr têda di hêt veşartin, nemaze ga û nêrîyan.

**Mîzkirin** (k.jn.l.mê) Mîztin. (K) bn: Kirin.

**Mîztin** (k.jn.x.mê) Kiryara derkeftina mîzê ji leşî, di rêya hedamê mîztinê da. (K) bdn: ez di mîzim em di mîzîn, tu di mîzî hûn di mîzin, ew dimîze[...it] ewan di mîzin. Pr:dêbi + bdn. Bdb : di mîzt, di mîztin. Db,dûr : mîztibû, ...bûn. (F): bi mîze bi mîzin.

**Mobayl** (nbiyan.x.mê) Navek cîhanî. Têlefona mobayl; … bê girêdana hêlê . têlefona berîkê.

**Mor** 1 (hn.x.çewa) Renê sor û şîn têkel. Binevşî.

**Mor** 2 (n.x.mê) Amêrekê biçûke nav û navnîşana mirovî yan ya cihê karê mirovî tê kolaye, li kaxezan di din wek îmza.

**Moran** (n.x.mê) Mij. :Bara pêtir di gel min di hê gotin. :Dinya mij û morane.

**Morbûn** (k.jn.l.mê) Dema rengê mor cihekî reng di ket.

**Morik** (n.dar.mê) Parçeyên girovir ji şûşe yan plastîk hatine diristkirin, di simtîne wek ristik yan tizbî jê di hên çêkirin û hemereng û hemecorin.

**Morî** 1 (n.x.mê) Morik.

**Morî** 2 (n.x.mê) Mêrî.

**Morîstan** (n.dar.mê) Kunmêrî.

**Morkirin** (k.jn.l.mê) Lêdana morê. Îmzakirin. : Rêvebirî karnameya min mor kir.

**Morkirî** (hk.l.çewa) Kaxez, biryar ya mor lê hatî dan.

**Morlêdan** (k.jn.l.mê) Morkirin.

**Moşek** (n.x.mê) Topa mezin. Rokêt.

**Moxil** (n.x.mê) Bêjinga hûr jibo parzinîna arî bi kar di hînin.

**Moz** (n.x.mê) Stêng.

**Mû** 1 (n.x.nêr) 1.Mî.

**Mû** 2 (deng) Dengê orêna çêlekan.

**Mûç** (hn.x.çewa) Tiştê bilind yan ji nav derdeftî.lêvên mûç, dirêj, bilind. Mirovek lêvmûçe.

**Mûçik** (n.dar.nêr) Kaçikê mezin yê dewî.

**Mûçing** (n.dar.nêr) Mûkêş.

**Mûçirk** (n.dar.mê) Ji egera tirs yan sermayê lerzikek bi ser canê mirovî da derbaz di bit. Tezîlank.

**Mûçkirin** (k.jn.l.mê) Bilindkirina tiştî, nemaze lêvan. :Wî lêvên xwe mûçkirin, ….. dirêjkirin. (K) bn:Kirin.

**Mûjank** (n.dar.pir) Mijîlank.

**Mûkêş** (n.l.nêr) Mîçînk.

**Mûm** (n.x.mê) Keresteyekê şemaye yan bez, petîlkek pêveye agirî ber didinê bo ronahîyê yan bîranînan mifa jê di hêt wergirtin. Şemalk.

**Mûmê** (n.x.mê) Navek kevin ê jinane.

**Mûrîn** (k.jn.x.mê) ***deng*** Dengê ga û çêlan.

**Mûs** (n.x.nêr) Devikê rihtiraşînê. Gwîzan. :Min bi mûsê riha xwe kur kir.



**Mûsê rihtiraşînê**

**Mûsa** (nx.nêr) Navê pêxemberê dînê cihoyan. (cîyan).

**Mûş** (hk.cih,bajarn) Bajarek Kurdistana başûre.

**Mûşî** (malb.n) Xelikê Mûşê.

**Mûz** (n.x.mê) ***fêqî*** Navê fêqîyek reng zer şêwe lûl, tam şirîn ê Efrikayî ye.



**Mûz**

**Mûzexane** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê parastin nîşadana kelûpelên kevnar.

**Mûzîk** (n,cihan.mê) ***mûzîk*** Amêrên cuda û hemereng ên lêda awazan. Tembûr, def, dehol, kemançe.

**Mûzîkjen** (karn.l.dn) Mûzîkvan.

**Mûzîkvan** (karn.dar.dz) Kesê awazên mûzîkê di jenit.

# N

**N** (ne) Pîta hevdehê ji abeya kurdî.

**Na** (pêrb) ***rêzman*** Alavê neyîkirinê. :Ez na çim, na xwem(xom), na hêm, Na hînîn, na bêje ..û

htd. Ne.

**Na<u>be</u>** (pêrb.l) ***rêzman*** Alavê berbenkirinê, neyîkirin. Nabit. Çênabit. :Nabe tu herî mala wan. :Weha

nebe. BR×Dibe.

**<u>Na</u>bit** (pêrb) ***rêzman*** Alavê neyîkirin yan nehêlan. Qedexe. Çênabit. :Nabit tu cigaran bi kêşî. Br ×

Dibit.

**Na<u>bîna</u>** (hk.l.çewa) Yê çavên wî di kore û çi nabînin. Korayî.

**Na<u>bînk</u>** (n.x.mê) Corekê tîrokane kurt, û stûre ji êk parçe yan du darên têkda pêkhatî ye jibo pankirina hevîrê nan, sawik û kadeyan bi kar di hêt.



**Nabînk**

**Na<u>çar</u>** (hk.dar.çewa) Neçar. Bêgav. Bêrê. ;Ez naçarim di vêt bi çim mal !.

**Naçar<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Bêgavbûn. Bêrêbûn.

**Naça<u>rî</u>** (n.l.mê) Bêrêyî.

**Naçar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Neçarkirin.

**Nadan** (hk.l.çewa) Nemerd. Çavteng. Çirîk.: Ew mirovek nadane, kes ji destê wî çakîyê na bîne.

**Nakokî** (n.dar.mê) Yeknegirtin. Duberekî. Netebayî. :Nakokî keftîye navbera wan da.

**Nal** (n.x.mê) Parçe asineke bi bizmaran li binê pêyê dewaran di din dako bi hên parastin li dema bi rêve çûn û karî. Sol.

**Nalbend** (pîşn.dar.dz) Kesê dewaran nal di kit. mirovê ku karê wî diristkirina nalane. şarezayê çêkirina nalên dewaran. Solbend. *Pend* :Nalbendî hesp nal di kir, kêvjaleyî pê xwe bilind di kir.

**Nalbendî** (karn.dar.mê) Karê nalbendan. :Eve çende tu nalbendîyê di kî?.

**Nalenal** (n.dar.mê) *zêmar* Dengê ax û ofê ji mirovê westayî yan nexweş di hêt.

**Nalenalkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê nalînê jê hatin. : Zarokê me hinde yê nisaxe, yê nalenalê di ke. (K) bn :Kirin.

**Nalik** (n.x.mê) Qebqebk. Şimik.

**Nalîk** (n.x.mê) Doşek. Bincî. Binrex.


**Nalîn** (k.jn.x.mê) 1.Dema mirov ji egera nisaxî, westan, tengavî yê nalenalê dike. (K) bdn : ez di nalim em di nalîn, tu di nalî hûn di nalin, ew di nale[...it] ewan di nalin. Pr :dê bi + bdn. Bdb : di ez di nalîm, em di nalîn, tu, ew di nalî hûn, ewan di nalîn. Db,dûr : ez nalîbûm, em nalîbûyn, tu nalîbûy hûn nalîbûn, ew nalîbû ewan nalîbûn. (F) : bi nale, bi nalin.2. Navê keçane.

**Nalkirin** (k.jn.l.mê) Nalbend pîyên dewaran bi nalan nal di ke. :Nalbendî hespê min nal kir. (K) bn : Kirin.

**Nalkirî** (hk.dar.çewa) Dewarê ku hatîye nalkirin. Hêstir, hesp, kerê nalkiriî.

**Namdar** (hn.dar.çewa) 1. Navdar. Navdeng. 2.Navê xortane.

**Name** (n.x.mê) Kaxeza nivîsî ku mirov ji hevalek yan nasekî ra bi şînit. :Nameyek ji birayê min gehişt destê min.



**Name**

**Namenivîsîn** (k.jn.l.mê) Nivêsîna nameyan. Kaxetek bi hêt nivîsan.

**Namerd** (hk.l.çewa) Nemerd.

**Namer<u>dî</u>** (n.l.mê) Nemerdî. Çirîkî.

**Namîl<u>ke</u>** (n.dar.mê) Balavoka ragehandin û zanînan.

**Na<u>mûs</u> [namîs]**(n.x.mê) Tiştê herî pîroz li cem mirovî, wek welat, ax, jin, zaro û htd. Şeref.

**Nan** (n.x.nêr) Xwarineke ji arê genimî dihê diristkirin piştî hevîrkirinê li ser sêla gerim yan tenûrê dihêt birajtin , gelek cor û şêwe hene ; wek nanê tenik yê sêlê, sewik, semûn,.. û htd. :Nan digel hemû zadan dihêt xwarin. ***Pend*** :Nanê xwe bi bi we bi avê, mineta xeilî pavê(bi havê).***Pend*** :Nanê garisî bi xot, tirêd pîlayî di ket. ***Pend*** :Nanê nekeran li tu deran nîne.***Pend*** :Nanê serşorîyê bi din segan jî pê razî nabin.***Pend*** :Nan jibo nanpêjan.***Pend*** :Nanê sêlêye, ne bere nepişte.

**Nan<u>çûçik</u>** (n.l.mê) ***giya*** Tolk.

**Nan<u>dank</u>** (n.dar.mê) Buxçik. Mêdek. Servîrk. Îşkav. ***Pend*** :Nanî di xwe, nandankê di dirîne.

**Nan<u>dar</u>** (hk.dar.çewa) Nandeh.

**Nan<u>deh</u>** (hk.dar.çewa) Mirovê qedirgir û nanî di dit xelik û mêvanan. Merd.***Pend*** :Nandeh be, qedir giran be.

**Nan<u>kor</u>** (hn,hk.l.çewa) Mirovê qencî û çakî yê zû jibîr di kit.

**Nan<u>pêj</u>** (pîşn.l.dz) Mirovê nanî çê di kit, di pêjit.

**Nan<u>pêjî</u>** 1 (hk.cih,n.l.mê) Cihê nan lê dihêt diristkirin. Nanpêjî ya Azadî li kîrê ye?.

**Nanpê<u>jî</u>** 2 (karn.l.mê) Karê patin(pêjtin)a nanî.:Wî deh salan nanpêjî kirîye.

**Nanû<u>xwê</u>**( n.l.dz) Nan û xwê bingehê gişt zadane, lewra bûye nîşana nirxandina mirovî. ango bi nanûxwê, yan bê nanûxwê ye. Wefa. Br×Nankor.

**Nar** 1 (n.x.mê) Narîn.

**Nar** 2 (n.x.mê) ***fêqî*** Hinar.

**Na<u>rinc</u>** (n.x.mê) ***fêqî*** Pirteqal.

**Narin<u>cî</u>** (hk,hn.dar.çewa) Rengê pirteqalî. Rengê hinarî.

**Na<u>rîn</u>** (hn.x.çewa) 1. Bejina ciwan û rêkûpêk. Bûk.  2. Navê jinan.

**Nas** (hn.x.çewa) Kesê mirovî carekê dîtî, li def mirovî yê nase , tiştê mirovî dîtî , mirov di nasit. Bernas.

**Nasandin** (k.jn.x.mê) Mirov xwe yan mirovekî bi êkî bi de nasîn, nav karnav ên xwe di bêjitê. : Ez dê evro te bi rêvebirê me yê nû bi dim nasandin. (K) bdn: ez di nasînim em di nasînîn,tu di nasînî hûn di nasînin, ew di nasîne[…it] ewan di nasînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di nasand, di nasandin. Db,dûr :nasandibû, nasandibûn. (F) : bi nase, bi nasin.

**Nasîn** (k.jn.x.mê) Naskirin. Zanîn. : Min nasîn di gel wî heye, ez wî di nasim; nas di kim. Nasîna me ji mêjeye.(K) bdn : ez di nasim em di nasîn, tu di nasî hûn di nasin, ew di nase[...it] ewan di nasin. Pr: dê bi +bdn;. Bdb : di nasî, di nasîn.Db,dûr : nasîbû, ... bûn. (F) : bi nase, bi nasin.

**Naskenan** (n.l.mê) Nanek tenik bi rûn û sertîk ve di din û liser sêla gerim di qelînin tama wî pir xweşe. Dorika dondayî.

**Naskirin** (k.jn.l.mê) Nasîn. :Ez te nas nakim. :Wê em nas di kirîn. (K) bn :Kirin.

**Naştin** (k.jn.x.mê) Najtin. Veşarin. Binaxkirin.

**Nator** (n.x.dz) Zêrevan. Nêrevan.Çavdêr.

**Natorîkirin** (k.jn.l.mê) Çavdêrîkirin. Zêrevanîkirin.

**Natorvan** (pîşn.dar.dz) Zêrevan. Nêrevan.

**Natorvanî** (karn.dar.mê) Zêrevanî. Nêrevanî.

**Nav** 1 (n.x.nêr) Peyveke her mirov, giyandar yan tişt pê di hên nasîn û ji hev cudakirin. Navê te çîye?. ***Pend*** :Navekê giran û warekê wêran.

**Nav** 2 (n.x.mê) Têda. Li. Li nav de. Li nav. Di nav. Liba : Nava gundê me kesê nexwendevan tune. : Xwezî noke Ferhad di nav me da ba.

**Navandin** (k.jn.dar.mê) Navkirin. Nav lê kirin. :Te pizokê xwe navandîye ?. (K) bdn: ez di navînim em di navînîn, tu di navînî hûn di navînin, ew di navîne[…it] ewan di navînin. Pr :dêbi +bdn. Bdb : di navand, dinavandin. Db,dûr : navandibû, navandibûn. (F) : bi navîne, bi navînin.

**Navbend** (hk.cih) Navber.

**Navbendî** (n.dar.mê) Dûrî yan dirêjîya di navbera cihan da.

**Navber** (hk.cih) Cih yan tiştê di kevit di nîva du yan pitir cihan, deveran. : Sêmêl di kevit navbera Duhok û Zaxo.

**Navbij** (hk.dar.çewa) Berevan.

**Navbijî** (n.dar.mê) Berevanî. :Karê min tinê navbijîye, ne matê kirine!.

**Navbijîkirin** (k.jn.gl.mê) Berevanîkirin. Ji hev dane paş. (K) bn :Kirin.

**Navbijvan** (karn.dar.dz) Berevan. Berevankar.

**Navbir** (n.x.mê) Bêhinvedana kurt di nav dema karî da. :Em dê piştî navbireka kurt dubare dest bi karê xwe bi kin.

**Navbirdan** (k.jn.gl.mê) Bêhinvedana kurd : Jiber civînvan di mandîne, em dê navbirekê din civînê. (K) bn : Dan.

**Navçav** (n.l.pir) *can* Navbera derdu çavan.

**Navçavk** (n.l.mê) Core pîlekeke, ji zêr zîv yan kanza, jibo ciwanîyê di xin ser enîya zarokan, li nav çavan.

**Navçavgirê** (hk.gl.çewa) Mirovê ne vekirî. Mirovê bi rûçikê wî yê girê, xuya ko yê toreye. Tingijî. Hêris. Mirûtî. : Seydayê me yê nû gelekê navçavgirê ye.

**Navçavgirêbûn** (k.jn.gl.mê) Tingijîn. Duh te çi bû wisa navçavên te di girê bûn ?.(K) bn : Bûn.

**Navçavgirêkirin** (k.jn.gl.mê) Tingijîn. Hêrisbûn.:Bapîrê min navçavên xwe wesa yên kirîne girê dê bêjî qey dûpişkan govenda xwe lê girêdaye. (K) bn : Kirin.

**Navçe** (dever.cih.mê) Dever. :Navçeya Barzan.

**Navdan** (k.jn.l.mê) 1.Navdeng belavbûn. 2. Pesindan.Nav li xwe dan.

**Navdanan** (k.jn.l.mê) Mirov navan liser zarok, candar yan tiştan di dane. : Te çi na danaye ser kurê xwe?. ang; Te navê wî kirî çi?. (K) bn: Danan.

**Navdar** (hk,hn.dar.çewa) 1. Binav. Bi navdeng. :Mirovekê navdar. :Jineka navdar. Mêrekê navdar. 2.Navê xortane.

**Navdarbûn** (k.jn.gl.mê) Bi navdeng kevtin. Navdengê, wê, wî, wan belavbûn. (K): Bûn.

**Navdarî** (n.dar.mê) Navdengî. Nasîn. :Min ji mêje navdarîya te bihîsîye.

**Navdarkirin** (k.jn.gl.mê) Navdengkirin. : Babê wî di xwazit wî navdar bi ke, lê ew bi xwe ne wesa ye.(K) bn: Kirin.

**Navdeng** (hk,hn.l.çewa) Mirovê geleg xelik wî di nasin. Bi karekî navdenge. :Bi nav.

**Navdengbûn** (k.jn.gl.mê) Navdarbûn.

**Navdengkevtin** (k.jn.gl.mê) Navdarbûn.

**Navdêr** (hk,hn.dar.dz) 1.Navdar. 2.Navê xortane.

**Navdêrbûn** (k.jn.gl.mê) Bi navdeng kevtin. : Navê te çiye, lawo?. : Serdar e; .. navdêr bî.

**Navdêrî** (n.da.mê) Navdengî.

**Navdêrkirin** (k.jn.gl.mê) Navdarkirin.

**Navend** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê kar û çelengî yên çandî, ramyarî, civakî lê di hên encamdan .Bingeh. Civat. Komele.

**Navendî** (n.dar.mê) Navbijî. Berevanî.

**Naverast** (hk.cih) Navîn. :Deryaya naverast.

**Naverok** (n.l.mê) Pêkhatî. Mijar. Rengvedana her nivîs yan gotarekê.

**Navêş** (hk.çewa) Hinavêş. Zikêş. Zikçûn.

**Navêşan** (k.jn.l.mê) Jan kevtin nav hinavan.Hinavêşan.

**Navgir** (n.l.mê) *rêzman* Pirteke yan birgeheke di keve nava peyveka lêkdayî , wek hatinûçûn. pîta û navgire. Navpirt.

**Navik** (n.dar.mê) 1.*can* Pişkek wek lûlekane di kevit nîva zikî, zarok yan tijikên giyandaran xwarinê bi rêya wê werdigirin, cihê wê di mînit paş mezinbûna candaran. 2.Kakila mita yê wek kezwan, bahîv û htd. 3 .Nîva tiştî mîna; navka nêrgizê.

**Navîn** (hk.cih,n) Tiştê di kevit nîva cihek, deverekê. :Rojhilata navîn .Naverast. Deryaya navîn.

**Navkirin** (k.jn.l.mê) Nav danan ser.: Dê çi nav li kurê xwe bi kî?. :Kiça xwe bi dapîra wê navkirîye. (K) bn :Kirin.

**Navlêdan** (k.jn.l.mê) Nav danan ser. Bi nav kirin. (K) bn :Dan.

**Navlêk** (n.dar. mê) *rêzman* Nav û devok taybet bi zimanî ve. Îdyem.

**Navlêkirin** (k.jn.l.mê) Navkirin.

**Navmal** (n.l.mê) Alî malê ji nav da

**Navmalî** (n.l.mê) Kelûpel û pêdivîyên nav malê, wek, nivîn, aman, text û htd. . :Navamalîya xwe rêkêxist.

**Navmil** (n.l.pir) *can* Cihê di keve navbera herdu milan ji alê pişta mirovî.

**Navneteweyî** (hk.l.çewa) Cîhanî. Gelemperî. :îngilîzî zimanekê navneteweyî ye.

**Navnîşan** (n.l.mê) Nav û navê cihê jiyana mirovî. navê welat, bajêr, yan gund, rendek, kolan û hijmara xanî. :Navnîşana min Kurdistan ,Duhok, taxê,... hijmara xanî,...

**Navpirt** (n.l.mê) ***rêzman*** Pirteke di zimanê kurdî da di keve nîva peyvan. mîna ;parvekirin,, par **ve** kiirn. ang; ve navpirte.

**Navpişt** (n.l.mê) ***can*** Nîva piştê.

**Navqolinc** (n.l.mê) ***can*** Nîva serî ya piştê.

**Navran** (n.l.mê) ***can*** Cihê di kevit navbera du ranan.

**Navrêz** (n.l.mê) ***nivîsîn*** Delîve yan vebira navbera rêzan. :Navrêzan gelek mezin neke da kexez têra nivîsana te bi ke.

**Navro** (n.l.mê) 1.Nîvro. 2.Firavîn.

**Navroj** (n.l.mê) Nîvroj. Firavîn. :Navroja xwe baş.

**Navronk** (n.l.mê) Delîve. Delav. Derav. Pêl.

**Navsal** (hk.l.çewa) Jîyê dirêj . Kevin.. Bi temen. Mirovek bi navsalveçûyî ye ; … mirovek pîr.

**Navsalveçûn** (k.jn.gl.mê) Pîrbûn. Jî dirêj bûn. : Ew zelamekê navsalveçûye.(K) bn :Çûn.

**Navser** (n.l.mê) Zozan. Feraşîn.:Havînan keçer di herin Navser.

**Navteng** (n.l.mê) Bejina mirovî. Kêlek . Bejin. Navtenga wê zirave, ciwane..

**Navtengzirav** (hk.çewal) bejinzirav.

**Navûnîşan** (n.l.mê) Navnîşan.

**Navûdeng** (n.l.nêr) Navdeng.

**Navxo** (hk.cih) Di nava,.. di nav da. Naxoya wewat.ang ; li welatî. Br× Derve.

**Navoyî** (hk.l.çewa) Karekê peywendî bi navxo ve heye. :Pevçûnên navxoyî.

**Navxwe** (hk.cih) Navxo.

**Navzed** (n.dar.dz) Berbijar. Berendam.

**Navzedkirin** (k.jn.gl.mê) Kesê di hêt desnîşankirin jibo berbijarîyê :Ew jibo civata bajêvanîyê hatîye navzedkirin.(K) bn:Kirin.

**Navzik** (n.l.mê) Alîyê zikê mirov û candaran di nav da. : Endamên di kevin nav zikî da.

**Nawis** (n.x.mê) 1.Şikeftok. 2. Bindav.

**Nay** (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrekê pifkirinê ê mûzîkê ye.

**Naylon** (n.x.nêr) Corek taybet ê peroyane, tenik û hilûye, agir zû di girit. Plastîk. Nalyon.

**Naz** (n.x.mê) Nazdarî.

**Nazandin** (k.jn.mê) Deybab zaroyan nazdar di kin. Mirov candaran di nazînin, nazdar di ken.(K) bdn : ez di nazînim em di nazînîn, tu di nazînî hûn di nazînin, ew di nazîne[..it] ewan di nazînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di nazand, di nazandin. Db,dûr:nazandibû, nazandibûn.(F):bi nazîne, bi nazînin.

**Nazdar** (hk,hn.dar.çewa) 1. Mirovê xwe di ber kawdan û peyvên ne xweş negirit. Br× Qayîm.2. Navê jinane.

**Nazenîn** (hn.dar.çewa) 1.Nazdarkirî. Xweşdivî. 2. Navê jinane.

**Nazê** (hd,gazn.mê) Navê gazîkirinê, jibo kiç yan jina bi naz yan nazdar navkirî.

**Nazhewîn** (hn.dar.çewa) Keyfxweş. Rûxoş.

**Nazî** (n.x.mê) Naz.

**Nazîn** (k.jn.x.mê) Nakirin. (K) bdn: ez di nazim em di nazîn, tu di nazî hûn di nazin, ew di naze[…it] ewan di nazin.Pr:dêbi +bdn. Bdb: di ez di nazîm em di nazîn, tu di nazî hûn di nazîn, ew di nazî ewan di nazîn. Db,dûr: ez nazîbûn, em nazîbûyn, tu nazîbûy hûn, ewan nazîbûn. Ew nazîbû. (F): bi naze, bi nazîn.

**Nazkenan** (n.l.mê) Naskenan.

**Nazkirin** (k.jnnl.mê) Mirovê nazan di kit, xwe naz di kit.(K) bn: Kirin.

**Naznazok** (n.dar.mê) ***gul*** Corekê gulane gelek di nazikin, dema germê di çirmisin û li hînkatî geş di bin.

**Ne** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo neyîkirinê bi kar di hêt. Na. Nexêr. No. : Babê min ne li male. :We ne ke.***Pend*** :Neçe cihê te çi kesê xwe lê ne bit. ***Pend*** :Ne vîyane ne dîtin dermane. ***Pend*** :Ne tu bî û ne ew karê te kirî. ***Pend*** :Ne gundê bêz, ne kûnê bê pez, ne mêrê di bêjit ez û ez.

**Neban** (hk.dar.çewa) Yê hinde tiştan na pejirînit, nemaze kewalên mê, dema kar yan berxê xwe wernagirit û nahêlit şîrê wê bi xot. : Bizina neban.

**Nebez** (hk,hn.l.çewa) 1.Nerev.2. Navê mêrane.

**Nebijûn** (hn.l.çewa) Ne paqij. Gêmar. Pîs.

**Nebînok** (hn.l.çewa) Mirov yan tiştê ne diyar, neberçav. Berze.

**Nebûn** (n.l.mê) Neman. Neyî.Ne berherhev. Tune. Tunebûn. Br×Hebûn.

**Necimîn** (k.jn.x.mê) Mirov yan candar li çûnê di lengin. (K) bdn: ez di nicimim em di nicimîn, tu di nicimî hûn di nicimin, ew di nicime[..it] ewan di nicimin. Pr: dê bi+bdn. Bdb : ez di nicimîm, tu, ew di nicimî, em hûn ewan di nicimîn.Db,dûr :ez nicimîbûm em necimîbûyn, tu necimîbûy hûn, ewan necimîbûn, ew necimîbû. (F) bi nicime, bi nicimin.

**Neçar** (hn.l.çewa) Bêgav. Bêrê. : Ez neçarim li mal bi mînim.

**Neçarbûn** (k.jn.l.mê) Bêgavbûn. :Ya neçar bû ,heger wesa ne di kir. (K) bn : Bûn.

**Naçarî** (n.dar.mê) Bêrêyî. : Ji neçarî ew paleyîyê di ket.

**Neçarkirin** (k.jn.l.mê) Bêgavkirin. Bêrêkirin.(K) bn: Kirin.

**Neçê** (hk.dar.çewa) Xirab. Nebaş. ;Zelamê neçê. Jina neçê. Br× Çê.

**Nediyar** (hk.l.çewa) 1. Berze. Hinda. Winda.2. Navê xor û keçane.

**Nedîtbar** (hn.l.çewa) Nabînok.

**Nedîtî** (hk.l.çewa) Mirovê dinya nedîtî. Çavtarî.*Pend* :Nedîtî çi ne di dît, dema dît bi xwe ve rît.

**Nefel** (n.x.mê) *giya* Giyayekê bi xemil û keske.2. Navê keçane.

**Nefer** (n.x.dz) Kes,mirov : Pasa 30 neferî. Neferên firokê 180 e. tirombêla min pênc neferî ye.

**Neferhigir** (n.l.mê) Amêrên hilgirtin û veguztina neferan. :Firokeya neferhigir. :Basa neferhilgir.

**Neferma** (hk.l.çewa) Dezgeha ne fermî. Sivîl.

**Nefret** (n.x.mê) Nizaya ne çak li kesekê mirovî nevêt. Nifrîn.

**Nefretkirin** (k.jn.l.mê) Nifrînên xira lê kirin. (K) :Kirin.

**Neft** (n.x.mê) Keresteyeke hemû corên sotinê jê çê di bin. Zêrê reş. Pitrol.

**Neftî** (hk.dar.çewa) Rengê şînê tarî.

**Neguhêzbar** (hk.l.çewa) Dorpêçkirî.

**Neh** (hijn.çend) Hijmar 9. 4+5=9. 10-1=9.

**Nehan** (hij.n) Hijmara nehê.Jêgirtina nehê. : Roja nehan; roja nehê.

**Nehatî** (hk.dar.çewa) Bêber, Bêberhem. :Saleka nehatî ye, bê ber û bê barîn.

**Nehem** (hijn.çend) Ya-yê-yên nehê.

**Nehemhev** (hk.l.çewa) Nehevgirtî. Berela. Belav.

**Nehemîn** (hijn.çend) Nehê.

**Neheviji** (hk.dar.çewa) Çepel. Lewçe.

**Nehê** (hijn.çend.rêz) Ya,yê, yêd nehê. Tiştê hatî hijmartin ta jimare 9, bi hijmara 9 bi dawî di hêt. Nehem.

**Nehhizar** (hijn.l) Hijmara 9,000.

**Nehik** (n.dar.pir) Neh rojên xwedê peristinê. Rojên rojîgirtinê.

**Nehmilyon** (hijn.l) Hijmara 9000,000.

**Nehsed** (hijn.l) Hijmara 900.

**Nejad** (n.x.nêr) 1.Koka mirovî :Nejadê kurdan arî ye. Tuxim.2. Navê mêrane.

**Neker** (hk.l.çewa) Mirovê çi karan jibo xwe ne ke. Kêrnehatî. Tembel. ***Pend*** :Nekero dilkesero, kerewo xwerewo.ang ; mirovê rêncber herdem berhemdar û serferaze.

**Nekes** (hk.l.çewa) Bêkes. Bêrê.

**Neko** (pêrb) ***rêzman*** 1. Alavê hoşdarîkirnê jibo kiyareka bive. Hişyarbe!. Ne webit!. 2. Bigoman .bi tirsan.: Kuro;neko te ew kar kirîye?.

**Nemam** (n.x.mê) Şivikên daran ên ter bi rih yan bê rih di berhevkirîne jibo çandinê. Şitil.

**Neman** (k.jn.l.mê) Mirin. Jinav çûn. Biryan. Qirbûn. ::Ji mêje dapîra hevalî nemaye!.

**Nemaze** (hk.x.çewa) Taybet. Nexasim. : Karek, mirovek, tiştek ê nemaze.

**Nemerd** (hk.l.çewa) Çirîk.

**Nemêr** (hk.l.çewa) Zelamê hedamê wî yê guhnelîyê kar na ke.

**Nemêrbûn** (k.jn.gl.mê) Karnekirina hedamê nêr jibo guhnelî yê. Ji mêrînî kevtin. (K) bn: Bûn.

**Nemêrî** (n.l.mê) *derd* Nemêrbûn.

**Nemêrkirin** (k.jn.gl.mê) Ji mêrînî xistin. :Diktorî nexweş nemêr kir. Xesandin. (K) bn: Kirin.

**Nemir** (hk.l.çewa) 1.Mirovê xizmetek mezin di ket û navdeng di bit, herçende di mire, lê navê wî her sax li ser ezmanê xelkî di mîne.2. Nêvê mêrane.

**Nemre** (n.x.mê) Hijmar. Pile.

**Nenas** (hk.l.çewa) Kes yan tiştê mirovî berî noke nedîye. Biyanî.: Mêvanê me yê nenase. Br× Nas.

**Nepak** (hk.l.çewa) Mirov nepak; mirovê herimî, mirovê neçê, mirovê dilpîs. Gemar.

**Nepaqij** (hk.l.çewa) Nepak.

**Nepenî** (n.dar.mê) Tiştê ne diyar, veşarî-tî. Nexuya.

**Neqandin** (k.jn.x.mê) Niqandin.

**Neqandî** (hk.dar.çewa) Çavê girtî. Hatî neqandin.

**Neqole** (hn.l.çewa) Nerawestayî. Ne hecimtî. Berevajîya tena.

**Nerast** (hk.l.çewa) Çewt. Şaş.Berevajîya rast.

**Nerev** (hk.l.çewa) 1.Xweragir di ceng û nexweşîyan da. Mêrxas. Cavnetirs. Nebez.2. Navê xortane.

**Nerênî** (hk.dar.çewa) Kar yan tiştê şaş, nerast , nedirist. Ne . Br×Erênî, eyînî. : Di civînê da karên erênî û nerênî hatin xuyakirin.

**Nerim** (hk.x.çewa) 1.Tiştê mirov bi girtinê di zanit yê nerme, ango di navêkda diçit. Vil. :Pembû yê nerim. :Nivînêd nerim. 2. Mirovê lis er xwe. *Pend* : Zimanê nerim û erê, mar ji konê di hêt derê. Br× Req.

**Nerimbûn** (k.jn.l.mê) 1.Tiştê req nerim di be. : Erdê jiber baranê nerim di be.2. Mirov piştî bêhina wî fireh di bit, axivtina wî jî nerim di bit. (K) bn :Bûn.

**Nerimker** (n.dar.dz) Yê tiştî nerim di ke.

**Nerimkirin** (k.jn.l.mê) Vilkirin. Piloxkirin. : Divêt tu serederîya xwe di gel xelik î nerim bi kî. : Hevîr nerim kirin. (K) :Kirin.

**Nerind** (hk.l.çewa) Xirab. Xera. Neqenc.

**Nerindî** (n.l.mê) Xirabî.

**Nerîman** (n.x.nêr) Navê keç û xortane.

**Nerme** (hk.dar.çewa) Axa nerim jibo kolan û çandinê ; Axa rezê me nermeye. :Goştê nerme.ang ; yêbê hestî.

**Nermik** 1 (hk.dar.çewa) Mirovê binvebinve. ***Pend*** : Nerimkê bin kayê,agir berda dinyayê.

**Nermik** 2 (n.dar.nêr) ***can*** Cihên nerim ji canê mirovan. :Nermikê guhî.

**Nermî** (hk.dar.çewa) Ziman û serederîya hêdî û nerim bi xelikî ra.

**Nermîn** (hk,hn.dar.çewa) 1.Nîşana nazikîyê.2.Navê jinane.

**Nesax** (hk.l.çewa) Mirov, giyandar, darûbar ên bi êş.ne saxlem. Nisax. Nexweş.

**Nesrîn** (n.x.mê) ***gul*** 1. Core guleke. 2. Navê keçane.

**Nestêl** (n.x.dz) Zaro. Biçûk. Xort. Genc.

**Neşmîl** (n.x.mê) Navek jinaneye.

**Neşter** (n.x.mê) Kêrika devtenik û tîj.Nişter.

**Neşterger** (pîşn.dar.dz) Nojdarê kelaştina canê mirov û candaran bi neşterê, dako parçek zêde, yan madeyek kul û zêde derêxit û çare bi ket.

**Neştergerî** (karn.dar.mê) Karê nojdarê neşterger.

**Netewe** (n.x.mê) Nasname û pêkhatîya miletekî ko ziman û çanda xwe hebit. Neteweya kurd. Gel.

**Neteweperês** (hk.l.çewa) Neteweperwer.

**Neteweperist** (hk.l.çewa) Mirovê gelek hez ji neteweya xwe di ke. Nejadperist.

**Neteweperistî** (n.l.mê) Nejadperistî.

**Neteweperwer** (hk.l.çewa) Dilsojê neteweya xwe. Neteweperist.

**Neteweperwerî** (n.l.mê) Viyana gel û neteweyê.

**Neteweyî** (hk.dar.çewa) Kes yan tiştê girêdayî netewekê bit. :Ew mirovek neteweyî ye ; ang ; xemxorê neteweya xweye, ziman, çand û ala xweye. : Ahengên neteweyî. Welatparêz. Millî. Gelvan. Gelêrî.

**Netewî** (hk.dar.çewa) Neteweyî.

**Nevisî** (n.x.dz) Zarokê babê wî mirî yan dayka wî hatî berdan, û dayka wî dubare mêrkirî, zaro di be nevisî jibo mêrê daykê û heger bab jineka din bi hînit û zaroyên mêrî nevisîyên jina wî ne. :Ango zaro nevisîyên jinbab yan zirbabê xwene.

**Nevî** 1 (n.x.dz) Zarokên kurî yan kiça mirovî çi xort yan keç bin.: Nevîya wî, nevîyê wî.

**Nevî** 2 (hk.x.çewa) Nizim. Ne bilind. Kin.

**Nevîbûn** (k.jn.lm) Nizinbûn. (K) bn : Bûn.

**Nevîçirk** (n.dar.dz) Zarokên nevîyan. :Ewî deh nevîçirk hene.

**Nevîkirin** (k.jn.l.mê) Nizimkirin. : Serê xwe nevî ke, da te ne bûnit!. (K) bn :Kirin.

**Nevîyan** (n.jn.l.mê) Neyarî. Nehezî. ***Pend*** : Nevîyane, nedîtin dermane.ang; mirov ji dujminê xwe dûr be. Br× Vîyan.

**Newal** (hk.cih,n.x.mê) bn : Nihal. Dol.

**Newekhev** (hk.l.çewa) Ji hev cuda. Ne wekî êk.

**Newekhevî** (n.l.mê) Pêkve ne çûn. Hevnegirtin. Ji hev dûr. Jêk dûr.

**Newêr** (hk.l.çewa) Tirsonek. Kulafe.

**Newêran** 1 (hk.l.çewa) Cihê ava. Ne kavil.

**Newêran** 2 (k.jn.l.mê) Tirsan. : Ez newêrim bi şev derkevim. (K) bn: Wêran.

**Newêrek** (hk.l.çewa) Tirsonek.

**Newkîn** (k.jn.x.mê) Newnewkirin. Miyawîn. : Kitik ji birsan di newike.

**Newroz** (n.l.mê) 1. Roja nû. 2. Cejna sersala kurdan, li 21 avdarê. 3. Navek kurdî nêr yan mê ye.

**Newzad** (n.l.nê) 1. Nûbere.Nivşê nû.2.Naveke kurdî mêrane.

**Nexasim** (hk.dar.çewa) Nemaze.

**Nexrî** (hn.x.çewa) Kur yan kiça êkê. :Şivan nexrîyê deyka xweye. ang; yê yekeme , ji hemûyan mezintire.

**Nexrîn** (hk.x.çewa) Mirovê ji xew ra di bit û hêj xwarin nexwarî. : Ez nikarim cigarê bi kêşim jiber ku yê nexrînim.

**Nexrînî** (n.dar.mê) Dema mirov spêdê ji xew ra di be hêj çi ne xwarî yan vexwarî.Bapîrê min bi nexrînî cigare kêşa[vexwar].

**Nexrînîşikandin** (k.jn.l.mê)Yekem parîyê xwarin yan qurça vexwarinê, mirov di xwe li spêdê. : Min nexrînî a xwe bi sêvekê şikand.

**Nexş** (n.x.mê) Hunerê kêşan û çêkirina nîgar û risman li ser kevir, kaxez, perok û htd.

**Nexşandin** (k.jn.x.mê) Xemilandin ciwankirin bi nexşan.(K) bern: ez di nexşînim em di nexşînîn, tu di nexşînî hûn di nexşînin, ew di nexşîne[..it] ewan di nexşînin. Pr:dê bi +bern. Berdb : di nexşand, di nexşandin.db,dûr:nexşandibû, ... bûn. (F) : bi nexşîne, bi nexşînin.

**Nexşe** (n.x.mê) Wêneyên kêşayî, bi reng û xîçan yên welatan ku têda dirêjî, firehîya welatî û bajêr,çem , çiya û htd, hatîne diyarkirin. : Nexşeya Kurdistanê.

**Nexşkêşan** (k.jn.l.mê) Nîgarkêşan.Nexş çêkirin.(K) bn : Kêşan.

**Nexşkirin** (k.jn.l.mê) Nexşandin. (K) :Kirin.

**Nexweş** (hk.l.çewa) 1.Nesax. Nexoş. 2. Bêtam.

**Nexweşbûn** (k.jn.gl.mê) 1. Nesaxbûn. : Jiber sermayê ... nexweş bû. 2.Bêtambûn. : Ev zade piştî sar bûy, tama wî nexweş bûye. (K) bn : bûn.

**Nexweşkvetin** (k.jn.gl.mê) Nisaxbûn.

**Nexweşkirin** (k.jn.gl.mê) 1. *candar* Nisaxkirin. 2. *zad* Bêtamkirin. : Kabanîyê hine xwê ya kirîye vê xwarinê, ta tama wê nexwş kirî. (K) bn : kirin.

**Nexoş** (hk.l.çewa) Nexweş.

**Nexoşxane** (hk.cih,n.dar.mê) Xestexane.

**Next** (n.x.nêr) Diravê daybab yan semyanên keçê wer di girin hember dane şûyaya wê. Bihayê keçan.:Nextê kiça te çende? Wî keça xwe da şû bê next.

**Ney** (n.x.mê) *mûzîk* Amêrekê mûzîkê yê pifkirinê ye.

**Neyar** (n.l.dz) Dujmin. Br ×Yar.

**Neyarî** (n.l.mê) Nehezî. Dujminî.

**Neyeksan** (hk.l.çewa) Ne wek hev. Ji hev cuda. Ne hindî êk.

**Neyînî** (hk.dar.çewa) Nerênê.

**Neyjen** (karn.dar.dz) Kesê li neyê di xe. Lêderê neyê.

**Neyjenî** (karn.mê) Karê jenîna amêrê neyê.

**Neynik** (n.x.mê) Şûşeya mînaka mirovî berevajî di kit û mirov xwe têra di bînit. Xodîk.

**Neynok** (n.x.mê) Nînok. Penc.

**Neyvan** (karn.dar.dz) Neyjen.

**Nezan** (hk.dar.çewa) Mirovê tênegehiştî. Kêmaqil. Mejîhişik. Xişîm. *Pend* :Heger nezanî, çav de cîranî. *Pend* :Xudê aşê nezanan di gêrit.

**Nezanî** (n.l.mê) Tênegehiştin. *Pend* :Nezanî xweşîya giyanî.

**Nezanîn** (jn.l.mê) Tênegehiştin. : Ew ji nezanîna xwe wesa di axivit.

**NY** (kurt) Neteweyên yekgirtî. Neteweyên yekbûyî.

**Nê** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo girêdana hevekan bi kar di hêt. Manê. Êdî. Jiberko. :Nê min ne dizanî tu dê hêy. :Nê ez na çim mal.

**Nêçîr** (n.x.mê) 1. Karê lêgerîn û kujtina giyandarên kûvî. 2.Giyandarê di bit qurbanî li dema nêçîrê. Rav.

**Nêçîrkirin** (k.jn.l.mê) Kujtina giyandarên kwîvî. Ravkirin. (K) bn: Kirin.

**Nêçîrvan** (pîşn.dar.dz) Mirovê karê wî nêçîr, yê nêçîra giyandarên kûvî di kit.

**Nêçîrvanî** (karn.dar.mê) Karê rav û nêçîran.

**Nêk** 1 (n.x.mê) Gopik.

**Nêk** 2 (n.x.mê) *can* Kemax.

**Nêr** (hk.x.çewa) 1.Mirov, giyandar û hişînkatî yê hedamê nîrîn hebit. mêr, xort, bab, bira, peya û htd. Ker, hesp, nêrî, beran, seg, dîkil û htd. *Pend* :di bêjim nêre, di bêje bi doşe. Ang; kesê liser çewtîya xwe rijd. ♂.2. *rêzman* Navên nêr: Azad, çiya, ser, dest, didan,gopal, û htd. Br × Mê.

**Nêrevan** (pîşn.dar.dz) Mirovê karê nêrîn û dwîvçûnê di ket. Zêrevan.


**Nêrevanî** (karn.dar.mê) Zêrevanî.

**Nêrg** (hk.x.çewa) Hêzdar. Bi hêz. Tund.

**Nêrgiz** (n.dar.mê) ***gul*** 1.Guleka reng zer û ciwane li çiyayên Kurdistanê hişîn dibit. 2. Navê keçane.***Pend*** :Nêrgiz ne bihare.

**Nêrik** (n.dar.mê) Qed yan bistîka ter ya giyayên xwerinê. ; Nêrika kerbeşkê, rêvasê û htd.

**Nêrî** (n.x.nêr) ***candar*** 1.Giyandarrekê malî ye, endamê nêr heye ji bira şîrderane. Nîrînê bizinî. 2.***kevin*** Navê zelamane.



**Nêrî**

**Nêrîn** (k.jn.x.mê) Berêxwedan. Boçûn. :Nêrîna te çîye bo karê me kirî? ; tu çewa di bînî? (K) bdn: ez di nêrim em di nêrîn, tu di nêrî hûn di nêrin, ew di nêre[...it] ewan di nêrin. Pr:dê bi + bdn.Bdb : di nêra, di nêran. Db,dûr : Nêrabû, ... bûn. (F): bi nêre bi nêrin.

**Nêrwe** (hk.cih,devern,tîren) 1. Devereke li Kurdistanê. 2. Hozeka kurdane li Kurdistana îraqê.

**Nêrweyî** (malban..dz) Kesê di koka xweda ji hoza nêrwe ye.

**Nêrz** (n.x.nêr) Gilçê di karit hemû gilçan. Sergilç.

**Nêz** (hk.x.çewa) Nedûr. :Mala Azadî nêzî ya mamê wî ye.

**Nêzbûn** (k.jn.l.mê) Nêzîkbûn.

**Nêzî** (hn.çewa) Nêzîkî.

**Nêzîk** (hn.x.çewa) Nêz.

**Nêzîkbûn** (k.jn.l.mê) Kêmbûna dûrîyê. : Newroz ya nêzîk bûy. (K) bn : bûn.

**Nêzîkî** (n.dar.mê) Heyam. Dûrî. : Eve nêzîkî deh rojane ez li vê derê.

**Nêzîkkirin** (k.jn.l.mê) Kurtkirina dûrîyê. : Xo nêzîkî wî ne ke,ew yê nesaxe.

**Nêzkirin** (k.jn.l.mê) Nêzîkkirin.

**NH** (kurt) Kurtkirina Neteweyên Hevgirtî. Rêkxistîyeka navneteweyîye, baregayê wê li Emrîkaye û piranîya welatên cîna têda endamin.

**Nicimîn** (k.jn.x.mê) bn : Necimîn.

**Nifrîn** (n.x.mê) Nizaya xirabîyê. Dijûn. : Xudê pişta dujminan bi şikêne. Xudê wî nehêlit!. *Pend* : Nifrîn di du serin.

**Nifrînkirin** (k.jn.l.mê) Daxaza şikestin û nemanê ji xudê, jibo yekî kirin. Dijûndan.

**Nifş** (n.x.nêr) bn : Nivş.

**Nig** (n.x.nêr) *can* Ling.

**Niha** (hk.dem) Vê gavê. Noke. Niho. :Niha demjimê 9.50; e.

**Nihal** (hk.cih,n.x.mê) Cihê navbera du giran ê kûr û avê xwarî, bi av yan bê av. Newal. Dol.

**Nihalk** (hk.cih,n.dar.mê) 1. Dola biçûk.2. Dolikê avê.

**Nihanî** (n.x.mê) Cihê mirov bi kare xwe bi de ber dema baran û berf di barit. Avayî. Berevez. *Pend* : ewrê sorê spêdeyan , gazî di kite karwanîyan, xwe bi dene nihanîyan.

**Nihênî** (hk.x.çewa) Nepenî. Veşarî.

**Nihêl** (hk.cih,n.x.mê) Aqarên bi dol, nihal û gir.

**Nihêlî** (maln) Tîreyeka kurdane li Kurdistana îraqê.

**Niho** (hk.dem) Niha.

**Nihom** (n.x.mê) Texe.

**Nijde** (n.x.mê) Hêriş. Talan. Cerde.

**Nijdevan** (karn.dar.dz) Talanker. Rêgir. Cerdevan.

**Nijinandin** (k.jn.da.mê) Nijinîn. Avakirin. Br×Herifandin. (K) bdn: ez di nijinînim em di nijinînîn, tu di nijinînî, hûn di nijinînin, ew di nijinîne[…it] ewan di nijinînin.Pr:dê bi +bdn. Bdb: di nijinand, di nijinandin. Db,dûr: nijinandibû, nijinandibûn. (F): bi nijinîne, bi nijinînin.

**Nijinîn** (k.jn.x.mê) 1. Li ser hev danana ber û keviran bi awayek endazeyî bo şûrheyên rez, bax, avayî û htd. Kelek çêkirin. Şûrhekirin.2. Dema mirov di kevit di hizir û aşûpan da.Hizirîn. : Ez herê di nijinim û di herêfim, nizanim dê çi bi kim. (K)bdn: ez di nijinim em di nijinîn, tu di nijinî hûn di nijinin, ew di nijine[..it] ewan di nijinin. Pr: dê bi +bdn. bdb :di nijinî. di nijinîn. db,dûr : nijinîbû, ...bûn. (F): bi nijine bi nijinin.

**Nik** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hebûna tiştê li rex mirovî, nêz. Li nik. li ba, li cem. : Were nik min da bo te gotinekê bi bêjim.

**Nikare** (n.x.nê) Amêrek hesine jibo nikirandina dar û beran bi kar di hêt. Mikare.

**Nikarîn** (k.jn.dar.mê) Ne şiyan. :Eger tu nikarî berhev bibî, têlefonê bike. (K) : Ez nikarim em nikarin, tu nikarî hûn nikarin, ew nikarit ewan nikarin.

**Nikil** (n.x.nêr) ***can*** Dimê tewalan.

**Nikilandin** (k.jn.dar.mê) Balinde nikilê xwe lê di din.Cihê nikilê tewalan li sere. : Çûçikan ev hijîre ya nikilandî. Nikirandin.

**Nikillêdan** (k.jn.l.mê) Nikilandin.

**Nikrandin** (k.jn.dar.mê) Têkolan û renîna tiştê req, nexasim ber û keviran. (K) bdn: ez di nikirînim em di nikirînîn, tu di nikirînî hûn di nikirînin, ew di nikirîne[..it] ewan di nikirînin. Pr:dê bi + bdn. Bdb : di nikrand, di nikrandin. Db,dûr: nikrandibû, ...bûn. (F): bi nikirîne, bi nikirînin.

**Nimandin** (k.jn.dar.mê) Nerimkirina tiştek, xwarinek nemaze di avêdatanî nerim di be. : Danhêrkî bi nimîne dako bi bite kutilk. Birinc nimandin. Savar nimandin. Erd nimandin. (K) bdn: ez di nimînim em di nimînîn, tu di nimînî hûn di nimînin, ew di nimîne[...it] ewan di nimînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di nimand, di namandin. Db,dûr : nimandibû, ...bûn. (F) : bi nimîne, bi nimînin.

**Nimêj** (n.x.mê) Nivêj.

**Nimîn** (k.jn.x.mê) Nerimbûn. : Erd di nimit, dan yê nimay.

**Nimre** (n.x.mê) Nemre.Pile.

**Nimûne** (hk.x.çewa,n.x.mê) 1. Mînak. : Mamosta çend nimûne gotin dako xwendekar tê bi gehin.2. Serpişk. Bevil. : Araz nimûneya qutabîyên çelenge.

**Nimûneyî** (hk.dar.çewa) Serpişk. Serbor. : Xandingeha nimûneyî.

**Nimyan** (k.jn.x.mê) Niman.

**Nimyayî** (hk.dar.çewa) Tiştê bi avê hatî nerimkirin. Hatîye nimandin. :Danê nimyayî bi kêr vestirînê di hêt.

**Niqanidin** (k.jn.x.mê) Dema mirov yan giyandar çavên xwe liser hev di danin, nexasim dema nivistinê. (K) bdn: ez [çavên xwe] di niqînim em di niqînîn, tu di niqînî hûn di niqînin, ew di niqîne[...it] ewan di niqînin. Pr :dê bi+bdn. bdb : di niqand, di niqandin. db,dûr : niqandibû, niqandibûn. (F): bi niqîne bi niqînin.

**Niqav** (n.l.mê) Belemek taybete di binê avêda di gerit jibo karên nêrîn û leşkerî bi kar di hînin.

**Niqîn** (k.jn.x.mê) Çavniqan. Çav kevtin serêk. ; Mirov di nivit, çavên wî di niqin.

**Niqrosk** (n.dar.pir) Dema çavên mirovî di kevin serêk û serê mirovî radihejit û xewa mirovî di hêt.

**Niqroskhatin** (k.jn.l.mê) Xewhatin. : Niqroskên vî zarokî yên di hên, xewa wî ya di hêt.

**Nirandin** (k.jn.x.mê) Giyandarên dirinde, mîna şêr, piling, dengî ji xwe di hînin. :Şêrî nirand.

**Nirên** (n.x.mê) *deng* Dengê xurêna hinde candarên dirinde, wek şêr, piling.

**Nirx** (n.x.mê) Biha. Giranî. Seng.

**Nirxandin** (k.jn.dar.mê) Nirxandina mitayî, keleûpelan: Danan û zanîna bihayê wan. Sengandin.Helsengandin .Nirxandina mijarek, gotinekê : Destnîşankirina erênî û neyînîyan .Hilsengandin. (K) bdn : ez di nirxînim em di nirxînîn, tu di nirxînî hûn di nirxînin, ew di nirxîne[…it] ewan di nirxînin. Pr :dê bi+bdn. Bdb : di nirxand, di nirxandin. Db,dûr: nirxandibû,nirxandibûn. (F): bi nirxîne, bi nirxînin.

**Nirxdanan** (k.jn.l.mê) Nirxe liser danan.

**Nirxkirin** (k.jn.l.mê) Danan nirxê li ser mitayî di danin Biha li ser danan. (K) bn : Kirin.

**Nişa** (n.x.mê) Arik.

**Nişîn** (jn.x.mê) Rûniştin. Xwarkevtin.

**Nişîv** (hk.cih,n.x.nêr) Nizim. Xwar. Bin. Br × Evraz.

**Nişîvî** (n.dar.nêr) Jordanî. Nizimî.

**Nişkav** (hk.x.çewa) Bûyer yan rûdanek bi lez û ne çaverêkirî. :Ji nişkav min dît bi jor keft. Demildest.

**Nişkêve** (hn.dar.çewa) Nişkav. Ji nişkêve.

**Nişter** (n.dar.nêr) Kêrik û devikên sertîj , seqa kirî, bo derkirina kulik yan birînan tê bi kar anîn.

**Niştin** (k.jn.x.mê) Nişîn.

**Nişûv** (n.x.nêr) Nişîv.

**Nişyan** (k.jn.x.mê) Niştin.

**Nivan** (n.x.pir) Nivîn.

**Nivandin** ( k.jdar.mê) Dema mirov yekî di nivîne. Daykê zarokê xwe nivand. (K) bdn: ez di nivînim em di nivînîn, tu di nivînî hûn di nivînin, ew di nivîne[..nit] ewan di nivînin. Pr :dê bi + bdn. Bdb: di nivand, di nivandin. Deb,dûr: nivandibû,nivandibûn. (F): bi nivîne bi nivînin

**Nivêj** (n.x.mê) Nizayeka taybete mirov daxazê ji xudê di kit dako li gunehên mirovî biborit û rêya rast nîşanî bi dit. :Her dînekî nivêja xwe ya taybet heye , yên misilmanan rojê pêncin.

**Nivêjker** (karn.dar.çewa) Mirovê nivêjan di ke.

**Nivêjkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirovê dîndar nivêjan di ke. (K) bn :Kirin.

**Nivêsan** (k.jn.x.mê) Nivêsîn.

**Nivêsevan** (karn.dar.dz) Kesê şîyanên nivêsînê hene, wek raport, gotar, peyam û htd. Nivîsevan. Nivîskar.

.**Nivêsîn** (k.jn.x.mê) Hizir û pilanên mirov bi qelemî li ser kaxez yan tiştên dî da bi rêjit. (K) Bdn: ez di nivêsim em di nivêsîn, tu di nivêsî hûn di nivêsin, ew di nivêse[…it] ewan di nivêsin..Pr. dê[bi] nivêsim, nivêsîn, nivêsî, nivêsin, nivêse[...it]. Bdb: di nivêsî,di nivîsîn. Db,dûr: nivêsîbû, nivêsîbûn. (F): bi nivêse, bi nivêsin.

**Nivêsîngeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê nivêsîn û parztina nivîsaran.

**Nivistin** (k.jn.x.mê) Xewkirina candaran weke çavên wan di kevin ser hev û ageh ji dinyayê namîne û zivrîna xûnê di leşîda hêdî di be. Xewtin. (K) bdn: ez di nivim em di nivîn, tu di nivî hûn di nivin, ew dinive[...it] ewan dinivin. Pr :dê bi + bdn. Bdb: ez di nivistim em di nivistîn, tu di nivinstî hûn,ewan di nivistin, ew di nvist.Db,dûr : ez nivistibûm, em nivistibûyn, tu nivistibûy hûn,ewan nivistibû, ew nivistibû. (F) : bi nive bi nivin.

**Nivistî** (hk.dar.çewa) Mirov yan candarê di xew.Raketî.

**Niviştî** (n.x.mê) Kaxezek werpêçayî ye çend gotin û nizayên pîroz lê hatîne nivêsîn ko şêx, mela û oldar(dîndar) jibo nexweşan çê di kin dako ji derd û pîrhevîyan bi hên pariztin.

**Nivîn** (n.dar.pir) Kelûpelên nivistinê wek doşek(nalîk), lihêf û balîf(palgeh).

**Nivîsar** (n.dar.mê) Nivêsîn.

**Nivîsevan** (karn.dar.dz) Nivêsevan.

**Nivîskar** (karn.dar.dz) Nivîsevan.

**Nivîsvan** (karn.dar.dz) Nivîsevan

**Nivok** (hn.dar.çewa) 1. Sist. Nivistî. Nizim. 2. *rêzman* Pîtên nivok.ang Pîtên dengdêr. (a,e,ê,i,î,o,u,û).

**Nivş** (n.x.nêr) Berebab. Kok. Tuxim. Rivişt. : Kurd ji nivşê arî ne.

**Nivşperist** (hk.l.çewa) Kesê cudayî ya nivş, dîn, deveran di ket û tiştên xwe ji yên xelik ê din baş û pîroztir di zanit.

**Nixandin** (k.jn.x.rmê) 1.Tewandin. Çemandin.Nizmandin.2. Pirkirin. Tijîkirin. Qubandin.(K) bdn: ez di nixînim em di nixînîn, tu di nixînî hûn di nixînin, ew di nixîne[…it] ewan di nixînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb : di nixand, di nixandin. Db,dûr : nixandibû, nixandibûn. (F) : bi nixîne, bi nixînin.

**Nixavtin** (k.jn.x.mê) Paraztina xwarin û mita û tiştên din, bi perokekî yan her tiştekê din bi ser da di din. Dapoşîn. (K) ber,dn: ez di nixêvim em di nixêvîn, tu di nixêvî hûn di nixêvin, ew di nixêive[..it] ewan di nixêvin. Pr : dê bi ×berd,dn. Berd,db : di nixavt, di nixavtin. Db,dûr : nixavtibû, ...bûn.(F) : bi nixêve, bi nixêvin.

**Nixêv** (n.x.mê) Derpoşk. Dervank.

**Niximandin** (k.jn.x.mê) Nixavtin.

**Nixivandin** (k.jn.x.mê) Nixavtin.

**Nixte** (n.x.mê) Rojê ewir û bi barîna befir û baranan.Çirçove. :Evroj rojeka nixteye.

**Nixyan** (k.jn.x.mê) Hatin nixandin.

**Niyan** (n.x.mê) Kutan.Perîn.

**Niyandin** (k.jn.x.mê) Kutan. Perîn.

**Niyaz** (n.x.mê) Karekê mirovî pilan jibo dana ye ku dê bi ket. Niyet. : Niyaza min ewe ku ez ev sale biçim derveyî welat.min li ber, ...

**Niza** (n.x.mê) Dema mirov ji xwere daxaza çakîyê ji xudê di kit. Nivêj.

**Nizakirin** (k.jn.l.mê) Daxaz ji xudê kirin. Nivêjkijkirin. Destên xwe hember xwedê serevrazkirin.

**Nizar** (hk.cih,n.x.nêr) 1.Cihê beten û na kevit ber rojê. Br× Beroj. 2. Navê mêrane.

**Nizim** (hk.x.çewa) Nevî. Kin. : Dara nizim. Xanîyê nizim. Dengê nizim.

**Nizimbûn** (k.jn.l.mê) Nevîbûn. Kinbûn. (K) bn: Bûn.

**Nizimkirin** (k.jn.l.mê) Nevîkirin. Kinkirin. Kêmkirin. :Dengê xo pîçek nizim bi ke, mirov di nivistîne!.(K) bn: Kirin.

**Nizniz** (n.l.mê) ***deng*** Dema zarok bi girî û gazinde daxazekê bi ke, yan dema zaro ne rihet bit.

**Niznizkirin** (k.jn.dar.mê) Dema zarok niznizê di ke. (K) bn :K irin.

**Niznizok** (hk.dar.çewa) Zarokê herdem niznizê di ke.

**Nî** (hn.x.çewa) Tiştê taze û ne kevin.Nû. :Cilikên min di nî ne. Br × Kevin.

**Nîdar** (hn,hk.dar.çewa) 1. Nû. 2.Navekê kurdî ye jibo nêr û mêyan bi kar di hêt.

**Nîgar** (n.x.mê) Wêne. Mînak.Nexş.2. Navê xort keçane.

**Nîgarkêş** (pîşn.dar.dz) Kesê nîgaran di kêşe. Pisporê wênekêşanê.

**Nîgarkêşan** (k.jn.l.mê) Wêne çêkirin. Keval çêkirin. (K) bn: Kêşan.

**Nîgarkêşî** (karn.l.mê) Karê kêşana nîgaran.

**Nîgarkirin** (k.jn.l.mê) Nîgarkêşan. Wênekirin. (K) bn :Kirin.

**Nîhatî** (hk.l.çewa) Kesê nî dest bi karî kirîye, wek xwendekar, leşker, karker û htd.

***Pend*** :Nî hatin kevin xelatin. Ang; dema tişt yan mirov ê nû peyda di be, ê kevin kêm biha dibe.

**Nîjen** (hk.l.çewa) Nûkirî. Nûjen.

**Nîjenkirin** (k.jn.l.mê) Tiştê dubare bi hêt nîkirin , wek xanî, pir, cade û htd. (K): bn: Kirin.

**Nîjenkirî** (hk.l.çewa) Avayîyê dubare hatî çêkirin(nîkirin).

**Nîjtin** (k.jn.x.mê) Wekî yekî bi xurtî ji cihekî bi kî der. Derêxistin. Derkirin. Bi nîje, dê bi nîjim. di nîjîn.

**Nîl** (cugirnx.nêr) Çemek mezine di welatê misir û Sodanê ra derbaz di be.

**Nîn** (n.x.mê) Tune. Çine. Hijmara (0).

**Nîne** (hn.neyîn.tek) Tune. Nebûn. : Min dem nîne li cem te bi mînim. :Ew li mal nîne.

**Nînin** (hn.neyîn.pir) Tune. Nebûn. : Serdarî pare nînin tirombêlekê bo xo bi kirit.

**Nînok** (n.x.mê) ***can*** Pareçe hestîyê pan û tenik li serê tilî(tibil) û pêçikên(tibilên pê) mirov û hinde candaran. Penc.

**Nîre** (n.x.nêr) bn: Kête. ;Nîre jibo kotanê peyda kirin.

**Nîsk** (n.x.mê) ***giya*** 1. ***mita*** Core mitayek rengsor yan zere, li Kurdistanê tê çandin, danê wê di hêt kelandin xwarika bi mifa û tam, jê çê di bit. 2. Xwarina ji nîskan tê çêkirin.

**Nîşadan** (k.jn.l.mê) 1. Dema mirovî divê tiştekî dane ber çavên yekî. :Ew çîye di destê teda, ka nîşa min bi de?. 2.Hînkirin Fêrkirin. : Bê zehmet dê şêy vê waneyê nîşa min bi dî? (K) bn: Dan.

**Nîşan** (n.x.mê) 1. Saloxdan. Sîmbol.2. Xal. Şûp. ***Pend*** :Nîşanên mirinê tane, yên nixtê bane.***Pend*** :Nîşanên kurkan çoxikên hirîne, yên keçikan ser û kezîne.

**Nîşandan** (k.jn.l.mê) bn: Nîşadan.

**Nîşêdan** (k.jn.l.mê) Nîşadan.

**Nîşangir** (hk.dar.çewa) Sêregir. Sêrevan.

**Nîşangirtin** (k.jn.l.mê) Mirov bi tiveng yan tîran bi çavî hûrik sêrê li nîşana venayî di girit di havêjtê dako bi hingêvit. Sêregirtin. (K) bn: Girtin.

**Nîşanî** (n.dar.mê) Jibo ko xelik bizanin ya xwaztîye, nîşanekê bi keçê ve di kin,wek gustîlk û demjimêre, hin caran ahengeka xêzanî biçûk li mala bûkê bi vê hilkevtê di gêrin û şirînî di hêt belav kirin.

**Nîşankirin** (k.jn.l.mê) Jibo nasîn û ji bîr nekirin, mirov tiştî bo xwe nîşanekê lê di ket yan da di nit. : Min qelemê xwe yê nîşan kirî, da ji yên hevalan cuda bi bit. (K): bn Kirin.

**Nîşankirî** (hk.l.çewa) Hatîye nîşankirin. : Ev bizine ya nîşankirîye.:Kitêba nîşankirîye.

**Nîşanxweş** (hk.l.çewa) Kesê bi tivengê yan tîrê li nîşanê di xe.Sêrevan. Seyvan.

**Nîştecih** (hk.l.çewa) Xwecih. Xocih.

**Nîştecihbûn** (k.jn.gl.mê) Xwecihbûn. : Ez li bajêrê Duhokê nîştecih bûm. (K) bn: Bûn.

**Nîştecihkirin** (k.jn.gl.mê) Xwecihkirin. : Hikometa Kurdistanê, pnzdeh mal li gundê me nîştecih kirin. (K) bn: kirin.

**Nîştiman** (n.x.nêr) Wargehê gelan. Welat. :Nîştimanê me Kurdistane.

**Nîştimanperwer** (hk.l.çewa) Kesê hez ji nîştimanê xwe di ke.Welatparêz.

**Nîv** (n.x.mê) 1. Parçeka tiştê kerkirî (pirtkirî) bo du parçeyên wek hev. 1÷2= ½..2. 2. Xala di kevit nîva tiştî. Nîva xanî, … destî,… serî,…. û htd.

**Nîvbero** (hk.l.çewa) bn :Nîvero.

**Nîvek** (n.dar.mê) Nîv. : Nîveka pareyên mamê min bo cigaran di hên mezaxtin. : Nîveka serê wî kul bûye.

**Nîvenîv** (hk.dar.çewa) Nîvnîve.

**Nîvero** (hk.dar.çewa) Karê mirov nebit serî û bi nîvî bi hêle. Nîvbero.

**Nîvişk** (n.x.nêr) *rêçalî* Xwarineka çevrî ye . Rûnê xumalî yê giyandaran yan rûnê karxaneyan.

**Nîvî** (hk.dar.çewa) Lêkvekirina tiştî bo du pişkên wek yek. : Em dê bi hevra bazirganîyê kin û pare bi nîvî.

**Nîvîbûn** (k.jn.l.mê) Parvebûn bo du nîvan. : Darên çiyayê rex gundê me jiber birîn û sotinê, bi nîvî bûne.(K) bn: Bûn.

**Nîvîkirin** (k.jn.l.mê) Du pişikkirin.. : Min û hevalê xwe, xwarin bi nîvî kir. ang; her yekî nîvek gehiştê. :Sêv nîvî kirin. :Karê xwe bi nîvî kir.(K) bn : Kirin

**Nîvîkirî** (hk.l.çewa) Tiştê kirîye du nîv. Pişikkirî.

**Nîvmêr** (hk.l.çewa) Sinêle. ***Pend***: Nîvmêre nabit têre.ang: nîvmêr gelek xwarinê di xwe.

**Nîvnîve** (hk.dar.çewa) Nêzî nîvî bûye. Duker. Nîvên wek hev. : Pora serê wê nîvnîveye.ang; nîv sipî û nîv reş.

**Nîvreq** (hk.l.çewa) Tiştê ne pir req û ne nerim.

**Nîvroj** (hk.dem.l) Nîva rojê.ango demhijmêr duwazdehê rojê.

**Nîvro** (hk.dem.l) Nîroj.

**Nîvşev** (hk.dem.l) Nîva şevê. ango demhijmêr duwazdehê şevê. :Eve vê nîvşevê tu ji kûve dihêy?.

**No** (pêrb) ***rêzman*** Alavê neyîkirinê. Ne. :Babê te li male?. No ne li mle.

**Nobe** (n.x.mê) Dor. Ger. :Subahî nobeya teye a garanê, pezî, bizinî.

**Nobedar** (karn.dar.dz) 1. Kesê nobeyê di gire. Noba wî ye.2. Navek xortane.

**Nobedarî** (n.dar.mê) Nêrevanî. Sexbêrî.

**Nobegirtin** (k.jn.l.mê) Li dorê rawestan. Li gerê rawestan.

**Nojdar** (pîşn.dar.dz) Pisporê karê çarekirina mirovan. Dixtor. Diktor. Pizîşk.

**Nojdarî** (karn.dar.mê) Karê dixrorîyê.

**Nok** (n.x.mê) ***giya mita*** Mitayekê dindik xire li Kurdistanê di hêt çandin û bi gelek awayan di kin xwarin , wek kelandin, di gel avikan, qelandin û htd.

**Noke** (hk.dem) Niho. Vêgavê. :Noke tu bi çi ve mijûlî ?.

**Noker** (hk.x.çewa) 1.Xizmetkar. Xulam.2. Xwefirotî.

**Nokerî** (n.dar.mê) 1. Xulamînî. 2.Xwefirotin.

**Nokerîkirin** (k.jn.l.mê) Xolamînî ya xelikî kirin. (K) bn: Kirin.

**Nola** (pêrb) ***rêzman*** Mîna. Wek.

**Nolî** (pêrb) bn :Nola.

**Noş** [nûj](hn,hk.x.çewa) Pîroz. Saxlem.

**Noşêcan** (hn.l) Daxaza leşsaxî û nûjdarîyê bo êkî di xazin dema xwarinekê bi xwe yan vexwarinekê vexwue  Nûşê can bit.

**Noşêcanbûn** (k.jn.gl.mê) Pîroz bit. Demarniman.

**Noşîn** (k.jn.x.mê) 1.Bi xweşî vexwarin. Vexwarina doşavên pîroz.2. Navê pîrekane.

**Not** (hijn.çend) Hijmara 90.

**Notem** (hijn.desniş) Ya,yê, yên notê.

**Nothizar** (hijn.l.çend) Hijmara90,000.

**Nnotmilyon** (hijn.l.çend) Hijmara90,000,000.

**Nozdeh** (hijn.çend) Hijmara 19.

**Nozdehem** (hijn.çend) Jêgirtina hijmara 19.Ya/ yê/yên nozdehê.

**Nozdehemîn** (hijn.çend) Nozdehem.

**Nozdehizar** (hijn.l.çend) Hijmar 19.000.

**Nozdemilyon** (hijn.l.çend) Hijmara19,000,000.

**Nuh** (hk.x.çewa) Nû. Taze. Teze.

**Nuha** (n.dem) Noke. Niho.

**Nuhurandin** (k.jn.x.mê) Axînk rahêlan. Xwezî xaztin.Poşmanbûn.(K) bdn: ez di nuhurînim em di nuhurînîn, tu di nuhurînî hûn di nuhurînin,ew di nuhurîne[…it] ewan di nuhurînin. Pr:dê bi +bdn. Bdb : di nuhurand, di nuhurandin. Db,dûr : nuhurandibû, nuhurandibûn. (F) : bi nuhurîne, bi nuhurînin.

**Nû** (hk.x.çewa) Nî. Taze. Ter.

**Nûber** (n.x.dz) Zarokê yekê. Berê yekê. Nexrî.

**Nûbihar** (n.l.mê) 1. Biharek nû. 2. Navê pertoka(kitêba) helbestvanê mezin E. Xanî ye ya zarokan.

**Nûciwan** (nl.dz) Xortên nû gehiştî.

**Nûçe** (n.dar.mê) Dengûbas.:Nûçeyên êvarî.

**Nûçegihan** (pîşn.l.dz) bn: Nûçevan.

**Nûçegihanî** (karn.dar.mê) bn :Nûçevanî.

**Nûçevan** (pîşn.dar.dz) Mirovê karê nûçeyan di ke û jibo dezgehekî di şîne. Peyamnêr.

**Nûçevanî** (karn.dar.mê) karê gihandina nûçeyan. Peyamnêrî.

**Nûdem** (nl.mê) Dema nû. Hevçerx. Serdem.

**Nûj** (nx.mê) ***candar kirmijok*** Biyandarekê kirmijokê biçûke, li ser xwîna kelan di jît.

**Nûjenkirin** (k.jn.l.mê) bn: Nîjenkirin.

**Nûjenkirî** (hk.l.çewa) bn: Nîjenkirî.

**Nûke** (hk.dem) Nû. Vêgavê :Nûke tu çi kar dikey?. :Nûke dema nûçeyên seqayî( biyav) ne.

**Nûsal** (hk.dem.l.mê) Sala nû. Sersal.

**Nûsan** (k.jn.x.mê) Pêveman. Pêvemana kaxez,belg, cilik bi tiştekî ve. :Cilikên birîdarî ji ber xwînê bi leşî ve nûsan.

**Nûsar** (n.x.mê) Aveka rengdare di kin qelemên pindan jibo nivîsînê.

**Nûsikandin** (k.jn.x.mê) Pêve nûsan. : Kaxez bi stirkê bi dîwarî ve nûsikand. (K) : bi nûsikîne, di nûsikandin.

**Nûşîgiyan** (hk.l.çewa) Pîroz.

**Nûşîgiyanbûn** (k.jn.gl.mê) Pîrozkirin.(K) bn: Bûn.

**Nûşîn** 1 (k.jn.x.mê) Noşîn.

**Nûşîn** 2 (hk.x.çewa) Şirîn.

**Nûvedan** (k.jn.l.mê) Ji nû ve geşbûn.

**Nûza** (hk.l.çewa) 1. Nûber. 2. Nûjenkirî.

**Nwîsan** ( k.jn.x.mê) Nûsan.

# O

**O** 1.Pîta hejdehê ji abeya kurdî. 2. ***rêzman*** Alavê gazîyê. : Wa.

**Ocax** (n.x.mê) bn: Îcax. Malbat.

**Ocaxzade** (n.l.dz) Mirovê bi rûmet. Kurê ocaxan.

**Ode** (n.x.mê) Mezel. Eywan : Xanî yê me ji çar odeyan pêk di hêt.

**Of** (pêrb) ***rêzman*** Alavê kovan û dax, kovan û keserê. : Of çi bi serê hat.

**Oho** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke dema karek rû di dit, mirov hicmetî di be. : Oho eve vêca çiye?.

**Oksicîn** (n.biyan) Gazeka Bêreng, tam û bêhin e, di valayîyê da heye, mirov û canewer jibo bêhinkêşanê bi kar di hînin. O2.

**Okyanûs** (n.x.mê) Deryayên mezin; mîna Etles, Hindî û htd.

**Ol** (n.x.mê) Dîn. :Ola zerdeşt. Ola îslamê.

**Oldar** (hk.dar.çewa) Dîndar. Xudênas.

**Olperist** (hk.l.çewa) Dîndar. Xudêperês.

**Olperistin** (k.jn.gl.mê) Xudaperistin. Dîdarî.

**Olperistî** (n.l.mê) Kar û erkên peristina dînî.

**Olperwer** (hk.l.çewa) Olperist.

**Olperwerî** (n.l.mê) Olperistî.

**Once** (n.x.mê) ***giya*** Giyayeke belgên wî di kesk,sê û hin caran çar tibilî ye, mina dilî ye.

**Oqyanûs** (n.x.mê) Okyanûs.

**Or** (nx.nêr) Zik. Den.

**Ordek** (n.x.mê) *tewal* Balindeyek hêkkere, hişkavî ye. Werdek.

**Ordî** (n.x.mê) Çekdarên fermî yên berevanî yê ji axa welatê xwe di ken. Leşker.

**Ordîgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê xwecîhbûn û rahênanên leskerî. Serbazgeh. Leşkergeh.

**Orên** (n.x.mê) Dengê çêlan. : Dengê orêna golikê di hêt.

**Org** (n.cîh.x.mê) *mûzîk* Amêrek mûzîkî ye. Orgel.

**Organ** (nbiyan.x.mê) Hedam. Endam. Navend.

**Orispî** (hk.x.çewa) Jina/mêrê pûç. Pişt.

**Ormeşk** (hk.l.çewa) Zikmeşk.

**Ormezin** (hk.l.çewa) Zikmezin.

**Orte** (hk.cih,x.mê) Navîn. Navincî.

**Osmanî** (nbiyan.dar) Împeratorîya Osmanî ya Turkan.

**Oş** (p.x) Şûş.

**Oşo** (n.x.dz) Bi zarê zarokan ; ango dewar.

**Otax** (n.x.mê) Mezel. Ode.

**Otêl** (n.cîha.mê) Cihê hewandina mêvanan. Mêvanxane.

**Otoban** (n.cîh.mê) Şarêya serekî û mezin, li navbera bajêran.

**Otomatîk** (hk.cîh.çewa) Amêrên serbixwe kar di kin.

**Otomobîl** (n.x.mê) tirombêl.Tumbêl.

**Otonomî** (nbiyan.x.nêr) Hikim li xwe kirin. Xwe bi rêvebirin.

**Ox** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê kovan û daxê : Ax.

**Ox** 2 (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo derbirîna xweşîyê bi kar di hêt. : Ox tu zarokek çend ciwanî !.

**Oxir** (n.x.mê) Wexer.

**Oxir be** (daxaz) Daxaza wexereka xweş. Daxaza serkevtinê di wexerê da.

**Owlî** (nx.mê) Balkûn.

**Oy** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo keser, yan janê bi kar di hêt.

**Oye** (n.x.mê) Divêleyên yan pateyên nexşandî di xin kulleyên landikin, çerçef û perdeyên penceran.

**Oyekirin** (k.jn.l.mê) Bi oye xemilandin û nexşandina perde, kulle û çarçfan. (K) bn : Kirin.

**Oyîn** (hk.çewa) Livînên bi kenî.Lêbûkî. Goyîn.

**Oyînbaz** (hk.l.çewa) Mirovek zarveker, xwe bi rengan û cilikan di guhore dako xelik pê bi kenin. Lêbûk. Akrobat.

# P

**P** (pe) Pîta nozdehê ji abeya kurdî.

**Pa** 1 (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo bîxistinê û pisyarê bi kar di hêt. :Pa te di got dê çîn bazarî û tu nehatî.: Seqanasan di go baran na barit, pa eve çiye?.

**Pa** 2 (n.x.nêr) Pê. Ling.

**Pac** (n.x.mê) Medalîya serkevtinan. Paye.

**Pa<u>çe</u>** (n.x.mê) ***zad*** Serûpêk.

**Pa<u>çik</u>** (n.dar.nêr) 1. Pêyên biçûk. 2. Tilîyên pêyan( paçika : beranî,). Pêçik.

**Paçî<u>ne</u>** (n.dar.mê) Pêstirk. Peyîsk.

**Paçîn<u>geh</u>** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê bilind,mîna peyîskan. Peyîsk. Girik.

**Pa<u>daş</u>** (n.x.mê) Diyarî. Qencî. Şabaş.Xelat.

**Padaş<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Xelatkirin. (K) bn : Kirin.

**Padî<u>şah</u>** (karn ) Paşa.

**Pag** (hk.cih,n.x.mê) Cihê paraztina candaran. Pêgeh.

**Pa<u>geh</u>** (n.dar.mê) Pêgeh.

**Pahn** (hn.x.çewa) Pan.

**Pahn<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Panbûn. (K) bn: Bûn.

**Pah<u>nî</u>** (n.dar.mê) ***endaze*** Yekeya pîvana dûrîyê. Panî.

**Pahnkirin** (k.jn.l.mê) Pankirin. (K) bn: Kirin.

**Paj** (n.x.mê) Pişk. Par. Pirt.

**Pajne** (n.x.mê) Panîya pêyê mirovan. Çimika pêlavê.

**Pak** (hk.x.çewa) Tiştê paqij. Şûştî. Bijîn. :Maleka pak. Bajêrekê pak. :Gotineka pak.: Dilekê pak.

**Pakane** (n.dar.mê) Mirov çakîyekê li kesekî di ke. Qencî. Çakî.

**Pakbûn** (k.jn.l.mê) Paqijbûn. Bijînbûn. (K) bn:Bûn.

**Pakij** (hk.x.çewa) Pak. Paqij. :Zarokek pakij. :Fêqîyê pakij.

**Pakijbûn** (k.jn.l.mê) Pakbûn. :Ta bi sabonê neşûy, destên te pakij na bin. (K) bn: Bûn.

**Pakijî** (n.dar.mê) Pakî. Paqijî. Veşûştî. . :Pakijî ji beheştê ye.

**Pakijkirin** (k.jn.l.mê) Şûştin. Bijînkirin. Paqijkirin. (K) bn: Kirin.

**Pakijkirî** (hk.l.çewa) Tiştê şûştî. Bijînkiriî. Paqijkirî.

**Pakistan** (hk.cih,cugir.n) Welatê Pakistanê.

**Pakistanî** (nej,n) 1. Xelikê pakistanê. 2. Mitayê Pakistanê.

**Pakî** (n.dar.mê) Paqijî.

**Pakîja** (hn,hk.çewa) bn :Pakîza.

**Pakîte** (n.x.mê) Amaneke ji kartonê hatî diristkirin bara pirit lakêşeye . : pakîta cigaran 20 cigare têda hene. Paket. Pakêt.

**Pakîza** (hn,hk.dar.çwa) Kiça mêr nekirî. Kiç. Keç.

**Pakkirin** (k.jn.l.mê) Paqijkirin. Pakijkirin. :Didanêd xwe pak bi ke. :Mal pak di kir. (K) bn: Kirin.

**Pal** (n.x.mê) Beten. Kêlek. Rex. :Gundê me li pal çiyaye.

**Palandin** (k.jn.x.mê) Livandin. Paldan. (K) bdn : ez di palînim em di palînîn, tu di palînî hûn di palînin, ew di palîne[…it] ewan di palînin. Pr :dêbi +bdn. Bdb : di paland, di palandin. Db,dûr : palandibû, palandibûn. (F) : bi palîne, bi palînin.

**Palavgeh** (hk.cih) Cih, îzgeh, kargeha palavtinê. :Palavgeha avê.

**Palavte** (n.dar.mê) Parzûnk. Fîlter.

**Palavtin** (k.jn.x.mê) Parzinîn. Dapalîn. Dapalandin. (K) bn : Palêvtin.

**Paldan** (k.jndarmê) 1. Dema mirov hêzê bi kar di hînit jibo livandina tiştekî ji cihekî bo yê din.2. Wekî mirov pişta xwe di dit dîwarekî, palgehekê, kevirekî û htd.(K) bdn: ez pal di dem em pal didin, tu pal di dî hûn pal didin, ew pal di de ewan pal didin..pr: ez dê paldim[pal bidim] ,…bidî,….. Bi din,…bi de. bdb: pal dida. pal di didan. Db,dûr: Paldabû, ... bûn. (F): palde paldin.(palbide).

**Paldank** (n.dar.mê) Dîwarke mirov pala xwe di ditê. Kursîk.Kursîka hêzok.

**Pale** (pîşn.x.dz) Mirovê bi kar û keda destê xwe , xwe xudan di ke. Karker.

**Paletî** (kar.ndar.mê) Karkirin li karxaneyan, yan rez û baxan, ko himberî karê wî dê diravî wergirit yan hindî rojên kar kirî dê xudanê karî bo palê xwe kar kit. Karkerî.

**Palevan** (pîşn.dar.dz) Pelewan. Qehreman.

**Palevanî** (karn.dar.mê) Pelewanî. Qehremanî.

**Paleyî** (karn.dar.mê) Paletî. Karkirin.

**Palêvtin** (k.jn.x.mê) Ji hev cudakirina tiştan[madeyan], wek av û xîz, av û penîr û htd. Parzinîn. (K) bdn: ez di palêvim em di palêvîn, tu di palêvî hûn di palêvin, ew di palêve[…it] ewan di palêvin. Pr:[ dê] (bi) palêvim pavîn, palêvî palêvin, palêve{palêvit] . Bdb: di palaft[palavt] di palavtin.[palaftin] .Db,dûr : palavtibû, ... bûn. (F): bi palêve bi palêvin.

**Palgeh** (n.dar.mê) Balgeh. Balîf. Serîn. :Pîremêrî palê xwe da bû palgehê.

**Palik** (n.dar.mê) Zînê dewaran.

**Palpişt** (hk.l.çewa) Alîkar. Piştevan. :Birayê wî herdem palpiştê wî ye jibo xandinê.

**Palpiştî** (n.l.mê) Alîkarî. Piştevanî. :Ez pêdvî palpiştîya te me !.

**Palpiştîkirin** (k.jn.gl.mê) Alîkarîkirin.

**Palto** (n.cîh.nêr) Sakoyê dirêj ê zivistanê.

**Pan** (hn.x.çewa) Tiştê vedayî. Xir. Ne dirêj. : Mirovekê pan. Palgeha pan.

**Panav** (hk.l.çewa) Erdê bilind û serê wî rast û pan. Banî.

**Panayî** (n.dar.mê) Panî.

**Panbûn** (k.jn.l.mê) Têkçûn yan firehbûna şêweyê tenan. : Girikên hevîrî di destên nanpêjî da pan di bûn. (K) bn : Bûn.

**Panda** (n.biyan) Giyandareka beleke, mîna hiçane.



**Panda**

**Panê** (ngaz.mê) Navê bangkirin û naznavê jinka pan. Qelew û xir.

**Panî** (n.dar.mê) *endaze* 1.Yekeya pîvana dûrîya şêweyan. :Panî ya pencera me 90 cm û dirêjî 240 cm. Pehnî.2. Panîya pêyê mirovan.Binê pêyê mirov û caneweran.

**Pankirin** (k.jn.l.mê) Givanştin yan qutana tenekî ta pan bi bit. : Çiyê xwe pan kirî dê bêjî yê li mala felê xwe. (K) : Kirin.

**Pano** (ngaz.dar.nêr) Bang yan naznavê zelamê qelew û pan.

**Pantol** (n.x.nêr) Pentelon. Pentor.

**Pantor** (n.x.nêr) Pantol.

**Panzdeh** (hijn.çend) Hijmara 15. pazde. 5=10=15. :Panzdehhizar, panzdehmilyon û htd.

**Panzdehem** (hijn.rêz.çend) Yê/ ya/ yên panzdehê.

**Panzdehemîn** (hijn.rêz.çend) Panzdehem.

**Panzdehizar** (hijn.çend.l) Hijmara 15,000.

**Panzdemilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 15,000,000 .

**Papoç** (n.dar.mê) Pêlavên zarokan.

**Papor** (n.x.mê) Belema mezin. Keştî. : Papora Nûhî.

**Paqij** (hk.x.çewa) bn: Pakij. Pak.

**Paqijbûn** (k.jn.l.mê) Pakbûn. Pakijbûn. (K)bn: Bûn.

**Paqijî** (n.dar.mê) bn. Pakijî.

**Paqijkirin** (k.jn.l.mê) bn: Pakijkirin.(K) bn : Kirin.

**Paqil** (n.x.mê) *giya* Baqilk.

**Par** 1 (hk.dem) Sala çûyî. Sala borî. : Par vê demê ez li Kurdistanê bûm.

**Par** 2 (n.x.mê) Pişik.

**Parandin** 1.(k.jn.x.mê) 1.Parvekirin. 2. Lêkvekirin.(K) bdn : ez di parînim em di parînîn, tu di parînî hûn di parînin, ew di parîne[…it] ewan di parînin. Pr : dêbi +bdn. Bdb : di parand, di parandin.Db,dûr :parandibû, parandibûn. (F) : bi parîne, bi parînin.

**Parandin** 2 (k.jn.x.mê) Gazindekirin. Pareparkirin. Lavakirin. Hîvîkirin.

**Parasîtamol** (n.cîh,mê) Dindikên dermanê rawestana janeser û êşanên leşî.(latînî ;Paracetamol).

**Parastin** (k.jn.x.mê) bn :Paraztin.

**Parav** 1 (hk.x.çewa) Mirovê herdem gelte, henek û pêkenînan di bêjit û ji tuxwîbî der di kevit. Şavêr. Çivêl. :Kuro ma tu ji paravîyên xwe ve nabî !.

**Parav** 2 (hk.dar.çewa) Fêqîyê bi av. Avdar. : Ev bacane gelek di paravin. Piav.

**Paravî** (n.dar.mê) Gelte. Henek. Tirane.

**Paravîkirin** (k.jn.l.mê) Henekkirin. Tiranekirin. ; Bes paravîyan bi ke, min gêwilê te nîne!.(K) bn :Kirin.

**Paravtin** (k.jn.x.mê) Palavtin. Parzinîn.

**Paraztin** (k.jn.x.mê) Dûrxistan û çavdêrîya kesek yan tiştekî, ji derd û belayan û ne hêlana zorîyê liser. : Di vêt em xwe ji nexweşîyan bi parêzîn. :Xudê welatê me bi parêze.(K) bdn: ez di parêzim em di parêzîn, tu di parêzî hûn di parêzin, ew di parêze[...it] ewan di parêzin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di parazt[parast] di paraztin[parastin]. Db,dûr : paraztibû, paraztibn. (F) : bi parêze bi parêzin.

**Parçe** (n.x.mê) Ker(***kher***). Pirt. Pinî. :Parçeka erdî, asin û htd.

**Parçebûn** (k.jn.l.mê) Ji hev cudabûn. Pirtbûn. Jêkvebûn. (K) bn: Bûn.

**Parçekirin** (k.jnlmê) Pirtkirin. Kherkirin. Hincinîn. :Perdax parçe kir. :Kaxez parçe di kiirn. (K) bn: Kirin.

**Parçeparçe** (hk.dar.çewa) Pirtpirt. Kerker. Hincinî.

**Parçeparçebûn** (k.jn.gl.mê) Parçebûn. Pirtpirtbûn.

**Parçeparçekirin** (k.jn.gl.mê) Parçkirin. Hincinîn.

**Pardar** (hn,hk.dar.çewa) Pişkdar.

**Pardarbûn** (k.jng.l.mê) Pişdarbûn. (K) bn: Bûn.

**Pardarî** (n.dar.mê) Pişkdarî.

**Pardarîkirin** (k.jn.gl.mê) Pişkdarîkirin. (K) bn: Kirin.

**Pardarkirin** (k.jn.l.mê) Pişkdarkirin.

**Pardest** (hk.l.çewa) Karbidest. Xwedî biryar.

**Pardestî** (n.l.mê) Civak. Pişkdarî. Gelemperî.

**Pare** (n.x.nêr) 1.Pîlek û kaxezên taybet yên bankane jibo kirîn û firotinê bi kar di hên . Dirav.Pere. :Pareyê Emrîka dolare, yê Iraqê dînar, yê Turkî lîre û htd. :Heger min pare hebane, da tombêlekê kirim.2. Mifa. Sûd. :Hindî bo te bêjin bê pareye.ang; bê mifaye, çi naçit nav mejî.

**Paredar** (hk.dar.çewa) Xwedî pare. Zengîn. Heyî.

**Paredarî** (n.dar.mê) Zengînî.

**Parek** 1 (n.dar.nêr) Pareyê asinî. Pirtên asinî mîna peran.

**Parek** 2 (n.x.mê) *rêzman* Pêşpirt, navpirt û paşpirt di zimanê kurdî da.

**Parekêşan** (k.jn.l.mê) Kêşan yan wergirtina pareyî ji bankan. (K) bn: Kêşan.

**Parekirin** (k.jn.l.mê) Vejandin. Bi biha êxistin. Bilindkirin. : Piştî cadeya gundê me qêrkirî, mitayê me hat pare kirin. (K) bn : Kirin.

**Parekişandin** (k.jn.l.mê) Parekêşan. (K) bn: Kişandin.

**Pareperês** (hk.l.çewa) Kesê hinde hez ji pareyî di ke, dinyadarî ji bîra wî di çe. Pareyî di perêsit. Çirîk.

**Pareperistin** (k.jn.l.mê) Dema mirov pareyî ji dîn û dinyayê giringtir bi bînit. mirovatîyê ji bîr di ke. (K) bn : Peristin.

**Parerijandin** (k.jn.l.mê) Weke mirov pareyî glek li karên nebaş bi mezêxit.

**Parêz** (hk.x.çewa) Dema mirov ji egera nexweşî, yan qelewbûnê tuxîbekî jibo xwarina xwe di dane, ka çend û çi core zad bi xwe yan ne xwe. : Ez birincê na xom, çinkî bi parêzim.

**Parêzer** (pîşn.dar.dz) Pisporê qanûnî mirovî ji gunehbarkirinê di parêze.

**Parêzerî** (karn.dar.mê) Karê parêzeran. : : Pismamê min li zanîgehê jibo parêzerîyê di xwînit.

**Parêzgar** 1 (karn.dn) Zêrevan. Çavdêr.

**Parêzgar** 2 (karn.dar.dz) Serokê bajêrên mezin. Serokê parêzgehê. Serokê bajêrvanîyê. :Parêzgarê parêzgeha Duhokê.

**Parêzgarî** (n.dar.mê) Paraztin.

**Parêzgarîkirin** (k.jn.gl.mê) Paraztina ser û malê welatîyan. (K) bn :Kirin.

**Parêzgeh** (hk.cih,n.dar.mê) 1. Bingehê paraztinê. 2.Cihê karê serokê bajêrî. Baregehê bajêrvanîyê.3.Bajêrên mezin yên parêzgar lê heye.:Parêgeha Duhok.Parêzgeha Hewlêr.:Parêgeha Kerkok. Parêzgeha Silêmanî.

**Parêzgirtin** (k.jn.l.mê) Mirov jiber qelewî yan nexweşîyê xwe ji xwarin û vexwarina hine corên zad û xoşavan di parêze. (K) bn : Girtin.

**Parêztin** (n.jn.x.mê) Paraztin.

**Parêzvan** (karn.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr.

**Parî** (n.x.nêr) Pirteka nanî bi qayda devê mirovî bi tirsî yan di xwarinekê di hilînin yan di kene dinav da. Balolik. : Parîyek li mastî da. ***Pend***: Parîyê malbabê.; ang tam û xweşîya taybet heye.

**Parîkirin** (k.jn.gl.mê) 1. Parvekirin. Lêkvekirin. 2.Dirstkirina parî jibo xwarinê.

**Parîçêkirin** (k.jn.gl.mê) (K) bn: Kirin.

**Park** (nbiyanî x.mê) Cihê bi darûbar û dilveker jibo bêhinvedanê. Cihê rawestana tirombêlan. Bax.

**Parker** (nbiyan.x.nê) Corek qelemên têkirina rengavê ye.

**Parlament** (n.cîhan) Perleman. Civata nûneran.

**Parmend** (karn.dar.nd) Pişkdar. : Ew jî di vê gunehê da parmende.

**Parmendî** (n.dar.mê) Pişkdarî.

**Parole** (n.dar.mê) Dirûşim. Drî.

**Parolebilindkirin** (k.jn.gl.mê) Bilindkirina paroleyan : Li newrozê kurdan li derve û Kurdistanê, bi hizaran parole bilind di kirin ko têda daxaza aştî û azadîyê di kirin.

**Paronek** (n.dar.dz) Golik. Mêgank.

**Parpêv** (n.dar.mê) Civat.

**Parsal** (hk.dem.l) Par. Sala çûyî . Sala par. : Parsal ez li Derveyî welatî bûm.

**Parsek** (n.x.dz) Xazok. Çeqrût.

**Parseng** (n.l.mê) Giranî. Seng. Pîvan.

**Parskirin** (k.jn.l.mê) Xaztin. Xazokîkirin. (K) bn: Kirin.

**Part** (n.x.mê) Parçe. Bir. Ref. Deste.

**Partî** (n.x.mê) 1.Desteyeka ramyarî[siyasî] .2. Partîya Demokrat a Kurdistanê.PDK.

**Partîzan** (n,biyan) Çekdareke li devera xweya bindest dijî dujminan xebata çekdarî di ke.  Gerîle.

**Parvekirin** (k.jn.l.mê) Pişkkirin. Lêkvekirin. : Evro xwarin li ser malên hejaran hat parvekirin. (K) bn : Kirin.

**Parvekirî** (hk.dar.çewa) Lêkvekirî.Pişkkirî.

**Parzemîn** (n.dar.mê) Tepa erdî.

**Parzinîn** (k.jn.x.mê) Mast, dew, penîr û htd, li patekî di ken dako av jê bi hêt girtin .Palavtin. Bêrîvanê şîr parzinî ; ang; li tûrkî kir da ji gilêşî pak bi be. (K) bdn: ez di parzinim em di parzinîn, tu di parzinî hûn di parzinin, ew di parzine[...it] ewan di parzinin. Pr:dê [bi] parzinim, parzinîn, parzinî, parzinit. Bdb : di parzinî, di parzinîn. Db,dûr: parzinîbû, parzinîbûn.(F) : bi parzine bi parzinin

**Parzinînk** (n.dar.nêr) Amêreke ji pero yan moxilê hatî diristkirin jibo parzinîna şîr, penîr ça û htd.

**Parzîn** (n.x.nêr) Cantek[cihûrek] nemazeye ji bendikên hirîyê yên rengereng hatî ye çêkirin, şêweyê sêkujî ye, jin di êxin pişta xwe, meşka şîrî û kelûpelên din tê di ken jibo veguhastinê ji mal bo aqarî û berevajî.

**Parzînkirin** (k.jn.l.mê) Parzinîn. (K) bn: Kirin.

**Parzûn** (n.x.nêr) Parzinînk. Filter.

**Parzûnkirin** (k.jn.l.mê) Parzînkirin.

**Pasban** (pîşn.dar.dz) Zêrevan. Çavdêr.

**Pasevan** (pîşn.dar.dz) Pasban.

**Pasîk** (n.x.mê) Cihê vekirî. Banî. Erdê bilind. Basik.

**Pasport** (n, biyan.mê) Giroveka nivêsî ya taybete, mirov di kare bi wê, ji welatî bo yê din biçe. Paseport.

**Paş** (hk.dem) Pişt. Piştî. Dawî. Dûmahî. Şûnda. :Paş deh salan dê rewşa aborî li Kurdistanê gelek geş bit. Br× Pêş.

**Paşa** (pîşn.x.dz) Kesê piştê şahî di bit şah. Cihgirê şahî. Şa. Kiral.

**Paşan** (hk.dem) Paş.

**Paşandin** (k.jn.x.mê) Paşvebirin. Perwerdekirin. Terbîkirin. (K) bdn: ez di paşînim em di paşînîn, tu di paşînî hûn di paşînin, ew di paşîne[...it] ewan di paşînin. Pr: dêbi +bdn. Bdb : di paşand, di paşandin.Db,dûr :paşandibû, paşandibûn.(F) : bi paşîne, bi paşînin.

**Paşatî** (karn.mê) Welatê ko deshelata wî paşayî be.Karê paşayan.

**Paşayî** (pîşn.dar.dz**)** Paşatî.

**Paşbend** (n.dar.mê) *rêzman* Paşpirt. Paşgir. Br× Pêşbend.

**Paşbêj** (hk.dar.çewa) Kesê li pişt [ango ne li nik mirov] bi ne çakî behsê mirovî di ke. Durû.

**Paşbêjî** (n.dar.mê) Wekî mirov dijî yekî gotinên kirêt bi bêje û dema ne cem mirovî.

**Paşdank** (n.dar.mê) *Rêzman* Paşbend.

**Paşda** (hk.dar.çewa) Paşve. Li paş.

**Paşdabirin** (k.jn.gl.mê) Paşve zivirîn. Paşve kêşan. Paşve bizivîn. : Tirombêla xwe pîçek paşda bi be, da cihê ya min jî hebe.(K) bn: Birin.

**Paşdaçûn** (k.jn.gl.mê) Paşveçûn. Jibo alîyê piştê vegerîn.Paşveçûn. ; Dujimin jiber gurzên kujekên pêşmergehan paşda çûn. (K) bn: Çûn.

**Paşde** (hk.dar.çewa) Paşda.

**Paşdir** (hk.dar.çewa) Segê har. Segê kulana yê dirinde.

**Paşecar** (hk.l.çewa) Cara paşin. Kurt û kirmancî. Li dawîyê. Cara domahîkê.

**Paşel** (n.x.mê) Paxil. Sing.

**Paşeroj** (hk.dem.l) Dem û rojên di hên. (Li hin devaran dem û rojên derbaz bûne). : Em daxaza paşerojeka geş jibo gelê xwe di kin.

**Paşewar** (pîşn.dar.dz) Lêger. Vekoler.

**Paşê** (n.dem) Paşî. : Paşê waneya me bi dawî di hêt em dê herin mal.

**Paşgir** (hk,cih.mê) ***Rêzman*** Pirta dawîya tiştî yan peyvê digirit. Paşpirt. Paşbend. Mîna van ji Darvan. Gir ji zêrgir. Geh ji Havîngeh. ker ji karker û htd.

**Paşgotin** 1 (n.l.mê) Gotina dawîyê. Peyva domahîyê.

**Paşgotin** 2 (n.l.mê) Paşbêjî.

**Paşil** (n.x.mê) Paxil.Sing. ::Du dînar di paşila wî da hene.

**Paşilpîs** (hk.l.çewa) Çepel. Lewçe. Ezmandirêj.

**Paşî** (hk.dem) Paş.

**Paşîberdan** (k.jn.l.mê) Kevtin dû karekî, kesekî yan dozekê.

**Paşîhatin** (k.jn.l.mê) bi Dawîhatin. Kutakirin. Kutabûn. Bi Domahîk hatin.

**Paşîn** (hk.dar.çewa) Ya/yê/yên domahîyê. Dawîyê. :Meha, roja cara paşîn.

**Paşîv** (n.l.mê) Xwarina diregî şev li cem rojîgiran. Xwarina direng. :Paşîv xwar û rojî ne girt.

**Paşkevtin** , paşketin (k.jn.l.mê) Gîrobûn. Paşveman. Paşdaman. (K) bn: Kevtin.

**Paşkevtî**,… ketî (hk.l.çewa) Mirovê xwedî hizir û bîrên kevin û kevineperist û paşvemayî.

**Paşnîvro** (hk.dem.gl) Piştî nîroj. Nîro.Paşnîvroj. Êvar.

**Paşperde** (hk.l.çewa) Bûk înan. Veguhaztina bûkê.

**Paşpê** (hk.l.çewa) Piştûpişt. Berevajî.

**Paşpêbûn** (k.jn.gl.mê) Berevajîbûn.

**Paşpêkirin** (k.jn.gl.mê) Berevajîkirin.

**Paşpirt** (hk,cih.mê) bn: Paşgir.Paşbend.

**Paşrojmendî** (n.l.mê) Paşerojeka geş ji xwe ra misogerkirin, bi malkirin û dirav civandinê.

**Paşve** (hk.dar.çewa) Paşda.

**Paşvebirin** (k.jn.l.mê) Piştûpişt birin. Lê heytandin.Paşdabirin. : Kuro ma tu fedî na kî hinde di hêye paşvebirin. (K) bn : birin.

**Paşveçûn** (k.jn.l.mê) Jibo alîyê piştê bizivîn. (K) bn: Çûn.

**Paşveman** (k.jn.l.mê) Paşkevtin.(K) bn: Man.

**Paşvemayî** (hk.l.çewa) Paşkevtî.

**Paşvero** (hk.l.çewa) Paşkevtî. Kevinperist.

**Paşxwarin** (n.l.mê) Zadê giran û gerim, mîna goşt, mirîşk, birinc,savar, metfînî û htd yê li dû xwarina sivika(pêşxwarin) wek avik, zelate piçek nan û htd, di hêt xwarin. Zadê serekî.

**Pate** (n.x.nêr) 1.Perok. Parçe perok. 2. Pinî. Pîne.

**Patekirin** (k.jn.l.mê) Pînekirin. Pinîkirin. : Kuna kiraskê xwe li cem cildirûvanî da pate kirin.

**Patekirî** (hn.l.çewa) Pînekirî. Pinîkirî. : Derpêyê patekirî. Sakoyê patekirî.

**Patexwer** (hk.l.çewa) Xwefiroş. Dardestê dujminî.

**Patik** (n.x.mê) *candarî* Parçeyeka leşîye ya di kevit navbera ser û pişta mirov û giyandaran.alê piştê yê sitoyî.

**Patin** (k.jn.x.mê) bn: Pêjtin. *Pend* : Nan patin û kezwan kelotin.

**Patirî** (n.x.mê) Tenekê lûleyî, pan sêkujî û htd ji bireka dîyarkirî a karebê pêkhatî ye, jibo karkirina radyo, kilçan, demjimêr û htd bi kar tê. Pîl.

**Patî** (hk.dar.çewa) Hatî patin. : Nê patî.

**Patpatik** (n.dar.mê) Tiveng û debance yên zarokan. Teqteqok.

**Pavan** (n.x.dz) Pişkdarê di yarîyê da. Lîstikvan. Yarîvan.

**Pawan** (n.x.nêr) Daristan yan cihê çerwanê pezî, taybet yê malekê yan gundekî ko nabit çi kes û candar nêzî bibin, ji bilî yê xwedî û dema pêvî. Kûz. Çerwan. Çerdan.

**Pawankirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov cihekî bi ke pawan. (K) bn: Kirin.

**Paxil** (n.x.mê) Cihê tiştî tê hildigirin navbera kiras û şîtika mirovî yan navbera du kirasan[cilkan] alîyê singî. :Bapîrê min kîskê xwe kire di paxila xweda. Paşil.

**Paydar** (n.l.mê) Ciyê ko siwarê paysiklê pêyên xwe li ser di dane û di zivrîne dako bi hajût.

**Paye** (n.x.mê) Mezin. Gewre. Rûmet.Pile.

**Payebilind** (hk.l.çewa) Xwedî paye. Sentenet. Piledar.

**Payedar** (hn,hk.dar.çewa) Piledar. Xudan sentenet.

**Payîz** (hk,dem.mê) Werzekê salê ye ji mehên îlûn, çirya êke û çirya duwê pêk hatî ye. Xezam. ***Pend*** : Mastê payîzan bi din ezîzan.

**Paysikil** (n.x.mê) Core amêreke mirov lê siyar di be û bi lêdana paydaran di hajût. Kerkê asinî.

**Paytext** (bajarn.nêr) bajêrê serok yan şa lê di mînit. Her welatekî paytextê xwe heye. Bexda paytextê Iraqê ye.

**Pazde** (hijn.çend) Pazdeh. Panzdeh.

**Pazdeber** (n.l.mê) Lîztika damanê.

**Pazdeh** (hijn.çend) Hijmar 15. panzdeh.

**Pazdehem** (hij,dest) Ya,yêyên pazdehê.

**Pazdehemîn** (hijn.dest) Pazdehem.

**Pazdehizar** (hijn.l.çend) Hijmara 15,000.

**Pazdemilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 15,000,000.

**Pazen** (n.x.mê) Çarçef.

**PDK** (kurtn) Partîya demokrata Kurdistanê.

**Pe** (n.x.mê) Pîta P. Lêvkirina pîta P.

**Peç** (hk.x.çewa) Feç.

**Peçe** (n.x.mê) Pêçe.

**Peçê** (hn gaz.dar.mê) Feçê.

**Peçinîn** (k.jn.x.mê) Nixavtin. : Zadî, fêqî bi peçine.(K) bdn: ez di peçinim em di peçinîn, tu di peçinî hûn di peçinin, ew di peçine[....it] ewan di peçinin. pr : dê[bi] peçinim, peçnîn, peçinî, peçnin, peçinit. Bdb: di peçinî, di peçinîn. Db,dûr: peçinîbû,peçinîbûn. (F): bi peçine, bi peçinin.

**Peço** (gazn.nêr) Feço

**Pegirandin** (k.jn.x.mê) Bijînkirin. Jaravkirin. Şûştin. (K) bdn : ez di pegirînim em dipegirînîn, tu di pegirînî hûn di pegirînin, ew di pegirîne[...it] ewan di pegirînin.Pr :dêbi+bdn. Bdb : di pegirand, di pegirandin. Db,dûr : pegirandibû, pegirandibûn.(F) : bi pegirîne,bi pegirînin.

**Pehin** (hn.x.çewa) bn: Pan.

**Pehinbûn** (k.jnl.mê) Panbûn.

**Pehinî** (n.dar.mê) ***endaze*** Panî.

**Pehinkirin** (k.jnl.mê) Pankirin.

**Pehîn** (n.x.mê) 1.Panîya pêyê mirovî.2. Peyîsk.

**Pehlewan** (n.l.dz) Mirovê leşsivik û bi ser rist, têle û cihên bilind ra derbaz di bit. Canbaz.

**Pehnî** 1 (n.x.mê) ***endaze*** bn: Panî. : Pehnîya banê xanî 70 m².

**Pehnî** 2 (n.x.mê) ***can*** Panîya pêy.

**Pejare** (n.x.mê) Xem. Kovan.

**Pejilandin** (k.jn.x.mê) Perçiqandin. Ji nav birin. Herişandin.(K) bdn: ez di pejlînim em di pejilînîn, tu di pejilînî hûn di pejilînin, ew pejilîne[...it] ewan di pejilînin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : di pejiland, di pejilandin. Db,dûr :pejilandibû, pejilandibûb. (F) : bi pejilîne, bi pejilînin.

**Pejin** (n.x.mê) Saloxdan. Nirxandina mirov, kar û tiştî.Çewanîya tişt, mirov û htd.

**Pejinandin** 1(k.jn.x.mê) Nav lê dan. Nav li xwe dan. Bilindkirin. Serêxistin.(K):bdn: ez di pejinînim em di pejinînîn, tu di pejinînî hûn di pejinînin, ew di pejinîne[...it] ewan di pejinînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di pejinand, di pejinandin. Db,dûr :pejinandibû, pejinandibûn. (F) : bi pejinîne, bi pejinînin.

**Pejinandin** 2 (k.jn.x.mê) Ta û çeqên daran jêkirin da jibo barî û sotinê hilû û dest xweş bin. Kejaxtin. Perjinandin. Veperjandin.

**Pejirandin** (k.jn.x.mê) Kar, biryar û bûyerên mirov yan dezgeh liser razî be û were bi cî anîn. Qayîlbûn liser. :Perlemanî birayara civata wezîran pejirand. (K) bdn: ez di pejirînim em di perjirînîn, tu di perjirînî hûn di pejirînin, ew di pejirîne[..it] ewan di pejirînin.. Pr : dê [bi] pejirînim pejirînîn, pejirînî, pejirîne(nit). Bdb: di pejirand, di pejirandin. Db,dûr: pejirandibû,pejirandibûn. (F): bi pejirîne bi pejirînin

**Pejî** (n.x.mê) ***derd*** Nexweşîyeka Vegir. Persîv. Serma.

**Pek** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo hicmetîbûnê bi kar di hêt. : Pek eve pileyên tene hosa di bilind ?.

**Pekkevtin** (k.jn.dar.mê) Kesê hedamekê leşê wî seqet[leng] bit. Kêmhedam.

**Pekkevtî** (hn,hk.l.çewa) Kêmhedam. Seqet.Lenger.

**Pekko** (pêrb) *rêzman* bn : Pek.

**Pel** 1 (n.x.mê) Pirtên daran li dema şewitînê geş û sor xuya di kin, jibo gerimkirin û lênana zadî mifa jê di hêt wergirtin.

**Pel** 2 (n.x) Ta. Çeq. :Pelên daran.

**Pela** (n.x.mê) Tava baranê.

**Pelakevtin** (k.jn.l.mê) Di erdî da çûna baranê. Nimana erdî jiber baran û befirê :Pela gêsnî ya ketî. Ang ; hindî gêsnî ax ter bûye. : Pela gorî.ang; hindî kûrîya gorî baran çûye xwar.(K) bn :Kevtin.

**Pelandin** (k.jn.x.mê) Dest lêdan. Hembêzkirin. Perixandin. Hilûkirin. Şekirin.(K) bdn :ez di pelînim em di pelînîn, tu di pelînî hûn di pelînin, ew di pelîne[...it] ewan di pelînin.Pr :dêbi+bdn. Bdb : di peland, di pelandin. Db,dûr :pelandibû, pelandibûn. (F) bi pelîne, bi pelînin

**Pelatînk** (n.dar.mê) *candar* Giyandrekê ciwan û rengîne, li biharan pirin û liser gul û giyayan dijîn. Pelîtank. Belatînk.



**Pelatînk**

**Pelav** (n.x.mê) *xwarin* Zadek taybete ji du yan pitir xwarinên têkel di hêt çêkirin.

**Pelavmaş** (n.l.mê) *xwain* Pelava ji birinc û maşan pêk hatî.

**Pelavnîsk** (n.l.mê) *xwarin* Pelava nîsk û birincê Yan savar û nîsk.

**Pelax** (n.x.nêr) Pelex.

**Pelçiqandin** (k.jn.x.mê) bn :Perçiqandin.

**Peldank** (n.dar.mê) Cizdank. Perdank.

**Pele** (hk.x.çewa) Lez.

**Pelekirin** (k.jn.l.mê) Lezkirin.

**Pelemar** (n.dar.mê) Hêriş.

**Pelemardan** (k.jn.l.mê) Hêrişkirin.

**Pelendar** (n.dar.nêr) Bizot. Gulletiveng. Fîşeka gurîyê.

**Pelepel** (hk.x.çewa) Gav bi gav.

**Pelepelkirin** (k.jn.l.mê) Gav bi gav xwe ji astengîyekê qurtal bi kin. (K) bn : Kirin.

**Pelepife** (n.dar.ê) Nanê tenikê liser pelan qelandî. Qelqeloşk.

**Pelex** (n.x.nêr) Bermayî yê darik, pîş û belgan.

**Pelg** (n.x.mê) ***dar*** Dareka bi xemil û keske, liser lêvêd co û ceman hişîn di bit. ***Pend*** :Sîbera pelgê, ne li xwe û ne li xelkê. Ang ; kesê ne kêr xwe û ne bi kêr kesê dî na hêt. Mirovê bêsûz.

**Pelijîn** (k.jn.x.mê) Bizivîn. Xebitîn. (K) bdn: ez di pelijim em di pelijîn, tu di pelijî hûn di pelijin, ew di pelije[...it] ewan di pelijin. Pr:dêbi +bdn. Bdb : ez di pelijîm em di pelijîn, tu di pelijî hûn di pelijîn, ew di pelijî ewan di pelijîn.Db,dûr :ez peljîbûm em pelijîbûyn, tu pelijîbûy hûn pelijîbûn, ew pelijîbû ewan pelijîbûn. (F) : bi pelije, bi pelijin.

**Pelik** (n.x.nêr) ***darûbar*** Belg.

**Peling** (n.dar.mê) Peyîsk. Pêstirk.

**Palişandin** (k.jn.x.mê) Têkbirina şêweyê madeyan nemaze req. Perçiqandin. :Teneke pelişand. (K) bdn: ez di pelişînim em di pelişînîn, tu di pelişînî hûn di pelişînin, ew di pelişîne[…it] ewan di pelişînin. Pr:dê bi + bdn.Bdb: di pelişand, di pelişandin. Db,dû pelişandibû, pelişandibûn. (F) bi pelişîne, bi pelişînin.

**Pelişîn** (k.jn.x.mê) Têkçûna şêweyê teyan bi givaştinê. Herişîn. : Xirxalên tirombêlê pelişîn. : Selik di bin barî ve pelişî.

**Pelişqe** (hk.l.çewa) Kêrnehatî. Pûç. Kevin. Peritî. Bêwic.

**Pelişqebûn** (k.jnlmê) Pûçbûn. (K) bn : Bûn.

**Pelişqekirin** (k.jn.l.mê) xirakirin. Pûçkirin. (K) bn :Kirin.

**Pelixandin** (k.jn.x.mê) Leş, ten yan tiştê şêweyê wî têkçûyî dema hêz yan givaştinek di keve ser. Herişandin. (K) bdn:ez di pelixînim em di pelixînîn, tu di pelixînî hûn di pelixînin, ew di pelixîne[....it] ewan di pelixînin. Pr: dê[bi] pelixînim pelixînîn, pelixînî pelixînin, pelixînit[ne]. Bdn : di pelixand , di pelixandin. .db,dûr: palixandibû,pelixandibûn. (F) : bi pelixîne, bi pelixînin

**Pelixîn** (k.jn.x.mê) Tiştê hatî pelixandin. :Hindî min karê kirî ezê pelixîm. (K) bdn: ez di pelixim em di pelixîn, tu di pelixî hûn di pelixin, ew di pelixe[..it] ewan di pelixin. Pr : dê [bi] pelixim pelixîn, pelixî pelixin, pelixit[xe]. Bdb : ez di pelixîm em di pelixîn.tu,ew di pelixî, hûn,ewan di pelixîn, Db,dûr: pelixîbû, …bûn. (F) : bi pelixe bi pelixin.

**Pelîka** (hk.x.çewa) Behane. Hêcet.

**Pelît** (hk.x.çewa) Felîte. Kolanî. Kêrnehatî.

**Pelîtank** (n.dar.mê) bn: Pelatînk.

**Pelîtik** (n.l.mê) Pirt. Parçek pateyî. : Pelîtikên befirê yên di hên. Pelîtika lempê, çirayî, fanosê.

**Pelp** (n.x.mê) Behane.

**Pelpîne** (n.x.mê) *giya* Pêrpîne.

**Pembe** (hn.x.çewa) *reng* Rengê pîvazî.

**Pembî** (n.x.nêr) *giya* 1.Giyayeke di hêt çandin berê wî jibo perokan mifa jê di hêt wergirtin.2. Berê giyayê penbî ye reng sipî û nerme.

**Pembû** (n.x.nêr) bn : Pembî.

**Pembûjen** (karn.dar.dz) Kesê pembû di veçirit.Kwîrinc.

**Pambûjenîn** (k.jn.l.mê) Veçirîna pembî. (K) bn: Jenîn.

**Pena** (n.x.mê) Hewar. Daxaz. Hîvî.

**Penaber** (hk.l.çewa) Yê hewara xwe di gehînit welat, alî yan kesekî dako canê wî ji belayê bi hêt paraztin.

**Penageh** (hk.cih.mê) Cihê, welatê hewandina penaberan. Wargeha penaberan. Hewangeh.

**Penaxaz** (hk.l.çewa) Yê penayê ji cih yan welatekî di xaze.

**Penaxaztin** (k.jn.l.mê) Daxazkirina hewandinê ji alîyekî.

**Penc** (n.x.mê) Nînokên dirêj û tîj , nemaze yên giyandaran, wek; kitik, seg, şêr û htd.

**Pencbaz** (hn.l.çewa) Mirovê hez ji arêşe û cireyan di ke. Çeqeloz. Mûçirk. Şûm.

**Pencdanan** (k.jn.l.mê) Mirov yan candar bi pencan li yekî bi xin. Penc lê dan. :Kitikê pencek li destê zarokî da. :Hişyar be, ew pişîk pencan di dane. (K) bn: Danan.

**Pencer** (n.x.mê) Ciheke li dîwaran bi caman ava kirîye jibo ronahî û ba bi jor bi keve.

**Penceşêr** (n.l.mê) ***derd*** Nexweşîyek kujeke,di bite egera êvitîna leşê saxlem û kujtina wî.

**Pencik** (n.dar.mê) Penc.

**Pencikkirin** (k.jn.l.mê) Pencdanan.

**Pencirîk** (n.dar.mê) Lêdana pencan. Cihê bi pencan verûşandî. Quncirîk.

**Pend** (n.x.mê) Gotinên bi biha . Şîretên mezinan. :Pendêd pêşînan. :Gotinêd mezinan.

**Penddan** (k.jn.l.mê) Şîretkirin.

**Pendî** (hk.x.çewa) Xuya. Diyar. Berçav.

**Pendvan** (kar.ndar.dz) Şîretvan.

**Peng** (hk.x.çewa) Rawestayî. Bêdeng. Neliv.

**Pengav** (hk.cih,n.l.mê) Cihê av lê di pengit, çi xuristî yan dîwarkirî bit. Bendav. Sikir.

**Pengîn** (k.jn.x.mê) Dema av yan her şileyek ji egera rê lê girtinê li ser hev xirve [kom] di bit. Av di pengit. Xwîn di pengit.

**Penî** 1(hk.cih) li Pişt. Berîve. :Gundê me di kevit penî wî girê henê.ang; pişt girê han.

**Penî** 2 (hk.x.çewa) Xuya. Vekirî. Aşkera. Br× Nepenî.

**Penîr** (nx.nêr) ***spîyatî*** Berhemek giyandarî ye, ji xwarinên rêçalî ye. şîrê kelandî hêvên di ken û paşî di xin nav perokekî giranîyekê li ser di danin dako ji avê vewerit û nîvreq bi bit.

**Pentol** (n.x.nêr) Pentelon. Pentor. Şelwalê teng.

**Pep** (n.x.nêr) Pê bi zarê zarokan.

**Pepexa** (nbiyan.x.mê) Tûtî.

**Pepez** (n.x.mê) 1. Kartên leystinê.2. Core leystineke bi kartên taybetî di hêt kirin.

**Pepezanê** (n.dar.mê) Lîstina bi pepezan. Kartan.

**Pepûk** 1 (n.x.mê) ***balende perinde*** Teyereke (balinde) dengê xwandina wî wek navê wî ye, ango navê wî ji dengê wî hatîye wergirtin.

**Pepûk** 2 (hk.x.çewa) Reben. Jar. Damayî.

**Peq** (n.x.mê) Derza mezin. Kelişte. :Peqên levtîne erdî ji ber hişkesalî yê.

**Peqandin** (k.jn.x.mê) 1.Tişkek yan tenekî bi pestanê[givaştin] yan her karekê din ko bi be egera têkdana şêweyê wî û deng jê peyda di be. Teqandin. : Zarokî pivdanka xwe bi didanan peqand. 2. Qutaneka mezin. Lêdan, lêxistin. (K) bdn: ez di peqînin em di peqînîn, tu di peqînî hûn di peqînin, ew di peqîne[....it] ewan di peqînin.. Pr : dê[bi] peqînim peqînîn, peqînî peqînin, peqînit[ne]. Bdb: di peqand, di peqandin. Db,dûr: peqandibû,peqandibûn. (F): bi peqîne bi peqînin.

**Peqbûn** (k.jn.l.mê) Peqîn. :Erdê bûye peq. :Lêvêd wî yê bûyne peq.

**Peqik** (n.dar.mê) Kulik. Vilik. Bilqik.

**Peqilk** (n.dar.mê) Pivildank. Peqşk.

**Peqîjok** (n.dar.mê) Peqilk. Peqik.

**Peqîn** (k.jn.x.mê) Tenê şêweyê wî têk di çit û deng jê di hêt. Pivdank peqî. :Hind mabû ez ji kerbada bi peqim.(K) bdn: ez di peqim em di peqîn, tu di peqî hûn di peqin, ew di peqe[…it] ewan di peqin. Pr: dê[bi] peqim peqîn, peqî peqin, peqit. Berd,b: di peqî, di peqîn. Db,dûr: peqîbû, peqîbûn. (F): bi peqe, bi peqin.

**Peqîşk** (n.x.mê) 1. Pivdankên biçûk yên ba tê, wek bilqkên avê, sabûnê û htd. 2. Cihek vala, yan xulole. : Peqîşka kezwanê. : Destên min peqîşkên lê hatîn jiber bivrî.

**Per** (n.x.nêr) 1.Tiştê nerim yê ko leşê balindan da di poşit. 2. Kaxez. 3. Cilik[perok].4. Belg.

**Perandin** (k.jn.x.mê) Derbazkirin.

**Perasî** perasû (n.x.mê) *can* Rêze hestîyên leşî ne yên sebeteya singî pêk di hînin.

**Perasîperasî** (hk.l.çewa) Tişt yan cihê wek şêweyê perasîyan rêzkirrî[darijtî], ango nizimî û bilindî heye. :Dîwar yan kevir ê perasîperasî.

**Perasîstûr** (hk.l.çewa) Difinbilind. Xweperês.Nijadperês.

**Perav** (hk.cih,n.l.mê) 1. Lêva avê. Kinar. 2. Pêlên avê.

**Percan** (n.dar.mê) Perjan.Tan. Kotan.

**Perç** (n.x.mê) Peqik.

**Perçe** (n.x.mê) bn: Parçe.

**Perçem** (n.x.mê) 1. Por. Pirç. :Awayî şekirina porê. 2. Pora pêşîya serî li hindav enîyê. Temborî.

**Perçiqandin** (k.jndarmê) 1.Dema mirov tiştekê nîvreq bi herişînit.2. mafên xelkî binpê bi ket.(K) bdn :ez di perçiqînim em di perçiqînîn, tu di perçiqînî hûn di perçiqînin, ew di perçiqîne[...it] ewan di perçiqînin.. Pr: dê [bi] perçiqînim perçiqînîn, perçiqînî perçiqînin, perçiqînit. Berd,db: di perçiqand, di perçiqandin. Db,dûr : perçiqandibû,perçiqandibûn. (F): bi perçqîne, bi perçiqînin.

**Perçiqandî** (hk.dar.çewa) Bi dest yan hêzekê tişt hatîye perçiqandin. Herişandî.

**Perçiqî** (hk.dar.çewa) Herişî. Hatî perçiqandin. :Bacanêd perçiqî. :Tirîyê perçiqî.

**Perçiqîn** (k.jn.x.mê) Tiştek ji egera givaştinekê bi herişit.(K) berd,dn : ez perçiqîm em perçiqîn, tu perçiqî hûn perçiqîn, ew perçiqî ewan p Pr: dê[bi] perçiqim perçqîn, perçiqî perçqin, perçiqit. Ber,db : di perçiqî, di perçiqîn. Db,dûr : perçiqîbû, ... bûn. (F): bi perçiqe, bi perçiqin.

**Perçivandin** (k.jn.x.mê) Êvitandin. Pifkirin. : Wî çavêd xwe bi xewê perçivandin.(K) bdn : ez di perçivînim em di perçivînîn, tu di perçivînî hûn di perçivînin, ew di perçivîne[...it] ewan di perçivînin. Pr : dê[bi] perçivînim, perçivînîn, perçivînî, perçivîn, perçivîne.Bdb : di perçivand, di perçivandin. Db,dûr : perçivandibû, perçivandibûn. (F) : bi perçivîne, bi perçivînin.

**Perçivîn** (k.jn.x.mê) Êvitîn. Werimtin..(K) bdn: ez di perçivim em di perçvîn, tu di perçivî hûn di perçvin, ew di perçve[...it] ewan di perçivin. Pr : dê[bi] perçivim, perçvîn, perçivî, perçvin, perçive[vit]. Bdb : ez di perçivîm, em di perçvîn,tu di perçivî, hûn, ewan di perçivîn, ew di perçivî. Db,dûr :ez perçivîbûn, em perçivîbûyn, tu perçivîbûy, hûn, ewan perçivîbûn, ew perçivîbû. (F) : bi perçive, bi perçivin.

**Perçîn** (n.dar.mê) Amêreke jibo asêkirina kaxezan bi derzîkan.



**Perçîn**

**Perçînkirin** (k.jn.l.mê) Dema bi derzîkên asinî bi makîna perçînê kaxezan bi yek ve di bestin. :Mêvanî bi perçînê deftera xwe perçîn kir.(K) bn : Kirin.

**Perdax** (n.x.mê) Kopê avê, çayê. :Perdaxeka çayê. :Av bi perdaxê vexwar.

**Perde** (n.x.mê) Parçe peroyeke di êxin penceran yan di ken navbir jibo parastin, ciwanî û ji hev cudakirinê. :Perdeya pencerê.

**Perdekirin** (k.jn.l.mê) Perde êxistin pencer, navmalek yan her cihek din. :Em rojê hemîyê mijûlî perdekirina penceran bûyn. (K)bn: Kirin.

**Perdekirî** (hk.l.çewa) Hatîye perdekirin. : Dîwarê perdekirî.

**Perdepoş** (hk.l.çewa) Bi perdeyan hatî girtin. Perdekirî.

**Pere** 1 (n.x.nêr) Pûte. Giringî.

**Pere** 2 (n.x.nêr) Pare.Dirav.

**Pereng** (n.dar.nêr) Agir. Gurîya agirî.

**Perepêdan** (k.jn.l.mê) bn: Giringîpêdan.

**Peresendin** (k.jn.dar.mê) Pêşkevtin. Werarkirin.

**Peresêlik** (n.l.mê) Hacîreşk.

**Perêstin** (k.jn.x.mê) 1.Mirov xwe jibo pîrozîyekê, tiştekî, canekî bi tewîne û nivêj û nizayê ji wîra bike. :Xudê peristin. :Pot peristin. 2. Nûkerîkirin. (K) bdn :ez di perêsim em di perêsîn, tu di perêsî hûn di perêsin, ew di perêse[..sit] ewan di perêsin.Pr:dê[bi] perêsim perêsîn, perêsî perêsin, persit,..[se]. Bdb: di perist, di peritin. Db,dûr : peristibû, peristibûn. (F): bi perêse, bi perêsin

**Pergal** (n.dar.pir) Kelûpel. Alav.

**Pergar** (n.dar.mê) Pilan. Nexşe.

**Pergeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê firotina pergalên nivêsînê, wek kaxez, qelem, defter, jêber, qelemtiraş û htd.

**Pergihandin** (k.jn.dar.mê) Pêçan. Destik kirin. Liser hev rêzkirin. : Hemû kitêb û badek ên xo di refikan da pergihandin.(K) bdn : ez di pergihînim em di pergihînîn, tu di pergihînî hûn di pergihînin, ew di pergihîne[...it] ewan di pergihînin. Pr :dêbi +bdn. Bdb : di pergihand, di pergihandin. Db,dûr : pergihandibû, pergihandibûn.(K) bi pergihîne, bi pergihînim.

**Perginde** (hk.dar.çewa) Peritî. Belavbûyî. Bijale.

**Pergindebûn** (k.jn.l.mê) Belavbûn. Perçebûn. (K) bn: Bûn.

**Pergindekirin** (k.jn.l.mê) Belavkirin. Perçekirin. (K) bn: Kirin.

**Pergî** (n.x.mê) Kelpik. Tîvkil.: Pergîyê keskanê. Pergîyê berîyê.

**Pergîn** (n.x.mê) Pêrgînî.

**Perik** 1 (n.dar.mê) 1. Perê kaxezê yê biçûk. 2. Perên biçûk yen balindeyan.3. Kartên lîztinê. 4. Perikên kaxezî yên tûtinê di xin nav û di pêçin jibo çêkirina cigaran.

**Perik** 2 (n.dar.mê) Baweşînk.

**Peristin** (k.jn.x.mê) Perêstin.

**Peritandin** (k.jn.x.mê) Mirov tiştekî pirt, perçe bi kit. Hincinandin. Pirtkirin. : Ji kerban kaxe û cilikên xwe peritandin. (K) bdn: ez di peritînim em di peritînîn, tu di peritînî hûn di peritînin, ew di peritîne[…it] ewan di peritînin. Pr: dê[bi] peritînim peritînîn, peritînî peritînin, peritîne[nit]. Bdb: di peritand, di peritandin. Db,dûr: peritandibû,peritandibûn. (F): bi peritîne, bi peritînin.

**Peritîn** (k.jn.x.mê) Pirtikîn. Pirtpirtbûn. Mandîbûn. : Heta ez bi ser çîyayî keftim, cilikên min peritîn.(K) bdn : ez di peritim em di peritîn, tu di peritî hûn di peritin, ew di perite[...it] ewan di peritin. Pr: dê[bi] peritim, peritîn, peritî, peritin, peritit[te]. Bdb: ez di peritîm, em di peritîn.tu di peritî, hûn, ewan di peritîn. ew di peritî. Db,dûr: ez peritîbûm,em peritîbûyn(bûn), tu peritîbûy, hûn, ewan peritîbûn, ew peritîbû. (F): bi perite, bi peritin.

**Perixandin** (k.jn.x.mê) Gemirandin. Mesajkirin. Vemalîn. :Daykê pişta zarokê xwe di perixand. (K) bdn :ez di perixînim em di perixînîn,tu diperixînî hûn di perixînin, ew di perixîne[….it] ewan di perixînin. Pr :dê[bi] perixînim, perixînîn, perixînî, perixînin, perixîne[…it] . Bdb: di perixand, di perixandin. Db,dûr : parixandibû,perixandibûn .(F): bi perixîne, bi perixînin

**Perî** 1 (hk.cih,n.x.mê) Ciheke taybet yê perdekirî û xemlandî, bûkê lì bin di danin :Perî ya bûkê.

**Perî** 2 ( n.x.mê) Jinên şox û ciwan wek firîşte. Zerî.

**Perîn** (k.jn.x.mê) Karê guhnelîyê. Cotbûn. : Dema perîna kewalane. (K) bdn :ez di perim em di perîn, tu di perî hûn di perin, ew di pere[....it] ewan di perin. Pr: dê[bi] perim, perîn, perî, perin, perit. Bdb: ez di perîm,em di perîn, tu, ew di perî, hûn,ewan di perîn. Db,dûr : ez perîbûm,em perîbûyn, tu perîbûy, hûn, ewan perîbûn, ew perîbû. (F): bi pere, bi perin.

**Perîşan** (hn,hk.x.çewa) 1. Bê rê. Posîde. Westayî. Bêgêwil. Xemgîn. Hejar. 2. Navê pîrekane.

**Perîşanbûn** (k.jn.l.mê) Hejarbûn. Bê cih û rê bûn. Pergendebûn. (K) bn : Bûn.

**Perîşanî** (n.dar.mê) Derdeserî. Hejarî. Malwêranî.

**Perîşankirin** (k.jn.l.mê) Derbiderkirin. Hejarkirin. Malwêrankirin. (K) bn: Kirin.

**Perîşk** (n.x.mê) Petîlkên berfê. Kulîlkên befirê.

**Perîxan** (n.l.mê) Navê jinane.

**Perîzade** (n.l.mê) 1.Jina nazdar ya ji nivşê perîyan.2. Nexweşîyeke ji egera têkçûna karê derdanan, gerdena mirovî di êvite[werimit].

**Perjan** (n.dar.nêr) Tan. Kotan. Pîjan.

**Perjankirin** (k.jn.l.mê) Tankirin. : Em dê rexûçanên baxê xwe perjan kin dako ji ziyanan bi hêt paraztin.

**Perjankirî** (hk.l.çewa) Tankirî. : Tu kes ni kare biçe nav gorisatana gundê me çunkî ya perjankirî ye.

**Perjinîn** (k.jn.dar.mê) Hildan û aderkirina darana ji çeq û tayên zêde jibo bi qelew û xemildar bi de. Veperjinîn.

**Perjîn** (n.dar.nêr) Perjan.

**Perleman** (hk.cih,.cîh.mê) Civata nûnerên hilbijartî ji alîyê gel ve. Parlamento.

**Permêw** (n.l.mê) Belgê darmêwan. Belgên mêwan.

**Pero** (n.x.nêr) Pateyê ji pembû, kitan, melez, hirî û htd di hêt çêkirin mirov cilik, perde,kule, çarçef û htd jê çê di kin.

**Perok** (n.dar.nêr) Pero.

**Perozînk** (n.dar.mê) Teşqele. Xapandin. Binîkolan. Tepik.

**Perperok** (n.dar.mê) Pelatînk.

**Perpitandin** (k.jn.x.mê) Gevizandin. Hilavêtin.Xo perpitandin, ango; xo hilavêtin.Veperpitandin. :Mirîşka serbirî xwe perpitand. : (K) : bdn: ez di perpitînim em di perpitînîn, tu di perpitînî hûn di prpitînin, ew di perpitîne[...it] ewan di perpitînin. Pr:dê +bdn. Bdb : di perpitand, di perpitandin. Db,dûr :perpitandibû, perpitandibûn. (F) : bi perpitîne, bi perpitînin.

**Perpitîn** (k.jn.x.mê) Gevizîn. Lerzîn. Rahavêtin. (K) bdn : ez di perpitim em di perpitîn, tu di perpitî hûn di perpitin, ew di perpite[...it] ewan di perpitin. Pr :dê bi+ bdn. Bdb : ez di perpitîm, em, hûn, ewan di perpitîn, tu, ew di perpitî. Db,dûr : ez perpitîbûm, em perpitîbûyn, tu perpitîbûy, hûn perpitîbûn, ew perpitîbû, ewan perpitîbûn. (F) : bi perpite, bi perpitin.

**Perqijandin** (k.jn.dar.mê) Pirtikandin. Hincinandin.(K) bdn : ez di perqijînim em di perqijînîn, tu di perqijînî hûn di perqijînin, ew di perqijîne[...it] ewan di perqijînin.Pr :dê bi+bdn. Bdb : di perqijand, di perqijandin. Db,dûr : perqijandibû, perqijandibûn. (F) : bi perqijîne, bi perqijînin.

**Perqijîn** (k.jn.dar.mê) Pirtikîn.Bizdiyan. Herişîn. . (K) bdn : ez di perqijim em di perqijîn, tu di perqijî hûn di perqijin, ew di perqije[...it] ewan di perqijin. Pr :dê bi+bdn. Bdb : ez di perqijîm, em,hûn,ewan di perqijîn, tu, ew di perqijî. Db,dûr : ez perqijîbûm, em perqijîbûyn, tu perqijîbûy, hûn,ewan perqijîbûn, ew perqijîbû. (F) : bi perqije, bi perqijin

**Persîv** (n.x.mê) ***derd*** Nexweşîyeke difinên mirovî di hên xwar û mirov di bêhnijit, hind caran ta jî di gel da di hêt.

**Pert** (hk.x.çewa) Belav. Pirt. Bêserûber.

**Pertal** (n.dar.pir) Kelûpel. Pergal.

**Pertav** (n.l.mê) Şabîta rojê, ronahîyê, layêtê û htd.

**Perû** (n.x.mê) ***candar pêşk*** Stêrstêrok.

**Perûk** (n.dar.nêr) Pateyên ji hirî,pembû, avirmîşî û htd hatîn çêkirin. Perok.

**Perwa** (n.x.mê) Tirs. Sehim. Erjeng.

**Perwane** (n.dar.nê) 1.Xudan per.2.Perên bi hêza agir, bayî yan her têhneka din di zivrin jibo paldana tenan yan hînk[fînik]kirinê bi kar di hêt. Pinpinîk. 3. Pelatînk.

**Perwaz** (n.dar.mê) 1. Kevî. 2.Firîn.

**Perwer** (hn,hk.x.çewa) Dilsoj. Evîndar.

**Perwerde** (n.dar.mê) 1. fêrkirin. 2. dezgehên fêrkirinê. Sexbêrî.

**Perwerdekar** (karn.dar.dz) Fêrvan. Çavdêr. Xwedîker.Sexbêrkar.

**Perwerdekirin** (k.jnlmê) Fêrkirin. Sexbêrkirin. :Mamostayî qutabîyên xwe baş perwerde kirine.(K) bn: Kirin.

**Perwerî** (n.dar.mê) Dilsojî.

**Perwîn** (n.x.mê) Navê keçane.

**Perzîn** (n.x.mê) Cantikê name û kaxezan. Poste. Name.

**Perzole** (n.l.mê) ***xwarin*** Goştê birajtî yê perasîyan.

**Pesar** (n.x.nêr) Çol. Aqar. Beten. Basik.

**Pesin** (n.x.mê) Nîşandana kar û xebat û kesatîya mirovî. Navlêdan. Biha. Nirx.

**Pesinandin** (k.jn.dar.mê) Nirxandin. Biha dan.(K) bdn: ez di pesinînim em di persinînîn, tu di pesinînî hûn di persinînin, ew di pesinîne[...it] ewan di pesinînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di pesinand, di pesinandin. Db,dûr: pesinandibû, pesinandibûn. (F): bi pesinîne, bi pesinînin.

**Pesindan** (k.jn.l.mê) Bilindkirin. Nirxandin. Pesinandin. : Ervo mamostayî gelek pesina qutabîyên xwe di da. (K) bn: Dan.

**Pesinkar** (karn.dar.dz) Kesê xebara mirovan di nirxîne.

**Pesinkirin** (k.jn.l.mê) Pesinandin.

**Pespende** (hk.x.çewa) Bêdeshelat. Lewaz. Kêrnehatî. Bêbiha.

**Pespinde** (hk.x.çewa) Pespende. : Pespindeyo; kengî tu we lê hatî li dîwanan bi axivî.

**Pest** (n.x.mê) Giranî. Givaştin.

**Pestal** (n.x.mê) Pêlav [cezme]ya serbazan.

**Pestan** (n.x.mê) Pest. Givaştin.

**Pestandin** (k.jn.x.mê) Givaştin. : Penîrî bi pestîne da av ji nav der bi keve.(K) bdn: ez di pestînim em di pestînîn, tu di pestînî hûn di pestînin, ew di pestîne[...it] ewan di pestînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di pestand di pestandin.db,dûr: pestandibû,pestandibûn. (F): bi pestîne, bi pestînin,

**Peste** (n.x.mê) Stranên sivik û bi lez. Lavje.

**Pestegotin** (k.jn.l.mê) Gotina stiranêd peste. :Pestegotina wî ne wek yan devera meye.

**Pestek** (n.x.nêr) Êlek. Çoxik.: Pestekê xwe li ber xwe kir çû govendê.

**Pestkirin** (k.jn..lmê) Giranî êxistine ser.(K) bn : Kirin.

**Peşêman** (hn,hk.dar.çewa)1. Mirov karekî di ke,ne wek dixwaze derkevit. Mirovê encamê karê xwe ne qayîl be.2. Navê mêrane. Poşman. *Pend* :Heger şax li peşêman hatibana da yên min gehin esmanî.

**Pêşêmanbûn** (k.jn.l.mê) Paşgezbûn di karekî da . Dema mirov peşêman di be. (K) bn :Bûn. **Peşêmanî** (n.dar.mê) Xwezî nekirina karê mirovî kirî. Pêşêmanbûn.

**Pêşêmakirin** (k.jn.l.mê) Mirov we li yekî bi ke ko ji kiryar û gotina xwe peşêman bi be. (K) bn :Kirin.

**Peşik** (n.x.mê) Pirtên tenên peqî. Seçme. Çipik. Dilop. :Top peqî peşikêt wê di ser serê me ra derbaz bûn.

**Peşîn** (k.jn.x.mê) Pirtek ji tiştekî ve bit û bi firit. Firîn. Vedan. Vepeşîn.

**Peşkîn** (k.jn.x.mê) Bêgavbûn. Neçarbûn.

**Peşm** (n.x.mê) Hirî.Rîs.

**Peşmergîz** (n.l.pir) Şelûşepik.

**Peşmîn** (n.x.mê) Peşm. Hirî.

**Peştemal** (n.l.mê) Şal. Şîtik.

**Peşyan** (k.jn.x.mê) Peşîn. Vepeşyan.

**Peta** (n.x.mê) Persîv. Pejî.

**Petî** (hk.x.çewa) Zelal. Vavartî. :Zimanê kurdî yê petî. Ang; zimanekê vavartî ji peyvên biyanî.

**Petîkirin** (k.jn.l.mê) Zelalkirin. Vavartin. (K) bn: Kirin.

**Petrol** (n.cîh.mê) Neft.

**Petrome** (n.x.mê) Pişka darek hişîn û ter di cihê bi mişarî yan kêrê kelaştî da çandî.

**Petromekirin** (k.jn.l.mê) Pişk çandin di nav kelişteya darê da, ya hatî çêkirin bi rêya petomeyan , bi naylonî di pêçin ta çend rojan hişîn di be.(K) bn: Kirin.

**Petromekirî** (hk.l.çewa) Hatî petromekirin. :Hirmîka petromekirî.

**Pev** (pêrb) *rêzman* Alavê girêdanê. Bi hev. Bi hev ra. Pêkve.

**Pevçûn** (k.jn.dar.mê) Du yan pêtir bir, deste, mirov yan giyndar dijî hev dujwarîyê bi kar bi hînin,bi cengin ji pêxemet meremekê. Pevdaçûn. Cengîn. Li hev û du dan. (K) bn: Çûn.

**Pevdeng** (hk.dar.çewa) Hevdeng. Hevbîr.

**Pevhatin** (k.jn.dar.mê) Li hev hatin .Pêkhatin. Br× Pevçûn. (K) bn: Hatin.

**Pexşan** (n.x.mê) 1.Deqeke bi gotinên xweş û selîqe hatîye darijtin.2. Navê jinane.

**Pey** (pêrb) ***rêzman*** Li pey. Li dîv.: Birayê min çû û me da pey wî.

**Peya** 1 (n.x.nêr) Zelam. Mêr.

**Peya** 2 (hn.x.çewa) Yê bi pêyan di çit. Bi rê di çe. Ne siyar [siwar ]. ***Pend*** :Siyarê xelkî herê peya ye.ang ; di vêt çavê mirov ne li destê biyanî be.

**Peyabûn** (k.jn.l.mê) Weke mirov ji ser pişta dewaran yan tirombêlan da di keve. Di hête xwar. Dakevtin. (K) bn : Bûn.

**Peyade** (n.dar.dz) Mirovên bi pêya di çin yan di hên. Ne siyar.

**Peyakirin** (k.jn.l.mê) Ji tirombêl yan dewaran anîn xwar. :Bûk ji ser pişta mahînê peya kirin. (K) bn : Kirin.

**Peyale** (n.x.mê) Perdaxeka biçûk. Piyale.

**Peyam** (n.x.mê) Nûçe. Dengûbas. Birîske.

**Peyamber** (pîşn.l.dz) 1. Hilgirê nameya pîroz[pêxember].2. Nûçevan. Nûçegihan.

**Peyamnêr** (pîşn.l.dz) Yê peyaman di şîne. Peyamber. Nûçegihan. Nûçevan.

**Peyamnêrî** (karn.l.mê) Karê nûçevanan.

**Peyarê** (n.l.mê) 1.Rêya taybet jibo peyadeyan. 2.Rexên cadeyan, bi tinê mirov bi pêyan lê di hên û di çin.

**Peyda** (hk.x.çewa) Xuya. Berçav.

**Peydabûn** (k.jn.l.mê) Xuyabûn. bi Destkevtin. : Ez li te di geram û tu li tu cihan peyda nabî ?.

**Peydakirin** (k.jn.l.mê) bi Dest xwe êxistin. : Tu di karî bo min kitêbekê peyda bi kî?. (K) bn : Kirin.

**Peydok** (n.dar.mê) 1.Sêdare. 2. Darikê hilawîtina cilan.

**Peyîsk** (n.x.mê) Pêstirk. Pêpelîsk.Pêpelok.

**Peyje** (n.x.mê) Peyîsk.

**Peyker** (n.x.nêr) Mînakê mirov yan candaran bi ber, gêc, çîmento û htd hatî avakirin. Pot.

**Peykersaz** (pîşn.dar.dz) Kesê pispor di warê çêkirina peykeran da. Peykervan.

**Peykersazî** (karn.l.mê) Karê peykersazan. :Karê birayê min peykersazîye.

**Peykertiraş** (pîşn.l.dn) Peykervan.

**Peykertiraşî** (karn.l.mê) Peykervanî.

**Peykervan** (pîşn.dar.dz) Kesê peykeran çê dike.

**Peykervanî** (karn.dar.mê) Karê peykervanan.

**Peyman** (n.x.mê) 1. Sûz. Rêkevtin. Qulp. 2. Navê jinane.

**Peymanbestin** (k.jn.l.mê) Peymangirêdan.

**Peymandan** (k.jn.l.mê) Sûzdan. :Em peymanê di din ko liser xebata xwe jibo azadîya Kurdistanê berdewam bin. :Peymandana me ji dile.

**Peymangirêdan** (k.jn.l.mê) Sozdan. Rêkkeftin.mûrkirina peymanekê.(K) bn : girêdan.

**Peymangirtin** (k.jn.l.mê) Peymangirêdan.

**Peyrew** (n.x.mê) Bername.Rêbaz. Nîşan.

**Perewkirin** (k.jn.l.mê) Pekevtin. Peyçûn. Pêgirtin.

**Peyt** (hn,hk.x.çewa) bi Serûber. Rêkûpêk.Qayîm. Zîx. Çixt. Gurc.

**Peytbûn** (k.jn.l.mê) Qayîmbûn. (K) bn : bûn.

**Peytî** (n.dar.mê) Zîrekî. Ziftî.

**Peytkirin** (k.jn.l.mê) Serûberkirin. Rêkûpêkkirin. Qayîmkirin. (K) bn : Kirin.

**Peyv** (n.x.mê) 1.Gotin. Wuşe. Bêje. :Ciwantirîn peyv peyva KURDISTAN e. :Serokî peyveka nirxdar pêşkêş kir. 2. Navek kurdî du nivhsî ye.

**Peyvdar** (pîşn.dar.dz) Axivtinkerê fermî yê dezgehek yan partekê.

**Peyvîn** (k.jn.x.mê) 1.Axivtin. Gotin. : Seydayê me di heman dem da di nivîse û di peyve. 2. Navek kurdî du zayende.(K) bdn: ez di peyvim em di peyvîn, tu di peyvî hûn di peyvin, ew di peyve[....it] ewan di peyvin. Pr : dê [bi] peyvim, peyvîn, peyvî, peyvin,peyvit[peyve], peyvin. Bdb : ez di peyvîm, em,ew, hûn di  peyvîn, tu,ew di peyvî. Db,dûr : ez peyvîbûm,em peyvîbûyn, tu peyvîbûy,hûn,ewan peyvîbûn, ew peyvîbû. ( F) : bi peyve, bi peyvin.

**Peywend** (n.dar.dz) Navek di zayende.

**Peywendî** (n.dar.mê) Têkilî. Gehandin. :Peywendîya têlefonî, internet tv û htd.

**Peywendîkirin** (k.jn.l.mê) Tekelîkirin. Pêra axivtin. Danûsitandin.(K) bn : Kirin.

**Pez** (n.x.dz) ***candar*** 1.Bireka mîhan. Kerekê mîhan. 2.Mîh.

**Pezare** (n.x.mê) Derd. Jan. Pejare. Kovan.

**Pezîzank** (n.dar.mê) ***tiraş*** Pezpezok.

**Pezkkuj** (n.l.mê) ***tewal*** Tîtîk.

**Pezkûvî** (n.l.nêr) Pezê kûvî.

**Pezpezok** (nl.mê) Tov yan baqilên kêratan.

**Pezûdan** (hk.dem) Spêde zû. Berbang. Elind. :Di gel pezûdanê em ji xwe rabûn.

**Pezvan** (karn.dar.dz) Xwedîyê pez. Şivanê pezî.

**Pezvanî** (karn.dar.mê) Karê xwedî yan sexbêrkirina pezî.

**Pê** 1 (n.x.nêr) ***can*** Yêk ji du,çar yan pitir hedamên leşî, parçeya binî ji lingî ko tibil û du gozek li serin, di mirov û giyandar pê bi rêve di çit. Ling.



**Pê**

**Pê** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdana hevekan,ango :bi wî, bi wê, bi wan û htd. : Xwarin pê kevikî xwar.

**Pê-alinkanê** (nl.mê) ***yarî*** Lîztikek zarokane xwe lêk di din pêyên xwe têk di alînin ka kî dê kê li erdî bi de.

**Pêbaz** (n.dar.mê) Pira derbazbûna peyadeyan.

**Pêç** 1 (hk.x.çewa) Xarûvîç. Rêyê xar, bi çepûçîr.Tiştê werbadayî.

**Pêç** 2 (n.x.mê) Pêçe.

**Pêçan** (k.jn.x.mê) Tiştekî lêk di werbadin, pêç di ke :Bapîrê min cigare pêça, dersûk pêça.(K) bdn : ez di pêçim em di pêçîn, tu di pêçî hûn di pêçin, ew di pêçe[...it] ewan di pêçin Pr: dê[bi] pêçim, pêçîn, pêçî, pêçin, pêçit[pêçe]. Bdb: di pêça, di pêçan. Db,dûr : pêçabû,pêçabûn. (F): bi pêçe bi pêçin.

**Pêçe** (n.x.mê) Perokê jin serûçavên xwe pê di pêçin.

**Pêçik** 1 (n.dar.mê) 1.Pateyeke, zarokên sava pê di pêçin. Qumatk.2. Tûrik.

**Pêçik** 2 (n.x.mê) Tilîyên pêyan. Paçik.

**Pêçî** (n.x.mê) Tilîyên pêyan.

**Pêçoke** (n.dar.mê) ***endaze*** Şêweyên pêç.

**Pêçûlk** (n.dar.mê) Du darin cihê pêyên mirovî li ser hene çendekê ji erdî bilindtirin, jiber herî û befirê mirov pêyên xwe li ser çuklên wan di danin û birêve di çin.



**Pêçûlk**

**Pêçûn** (k.jn.dar.mê) Li dû çûn. Peykevtin. Vekolîn.

**Pêda** (hk,cih) Li ser da hatin . Dane ber xwe. Jûrda.

**Pêdadan** (k.jn.l.mê) Lêdan. Qutan. :Kurê xo girt û pê da da.(K) bn : Dan.

**Pêdakirin** (k.jn.l.mê) Pêwerkirin. Bi serda kirin. Rêjtin ser. : Av bi agirî da kir.

**Pêdanîn** (k.jn.dar.mê) Dan nasîn. Misogerkirin.

**Pêdark** (n.l.mê) Pêlava darî. Qepqepk.

**Pêdirêj** (hk.l.çewa) Mirov yan giyandarê lingdirêj.

**Pêdvî** (n.l.mê)1.Tiştê mirovî pêwîstî pê hebe. :Pêdvîyên navmalê. Pertal. Pêwîst.2. Gereke. Divêt.

**Pêdizkî** (hk.l.çewa) Dema mirov ji tirsan bi dizîve û hişyarî bi rê di çit da deng ji pêyên mirovî ne hêt.

**Pêdizkîçûn** (k.jn.gl.mê) Hêdî bi dizîve çûn dako kes pê nizanit. : Çima tu weha bi pêdizkî di çî?. (K) bn:Çûn.

**Pêdizkîve** (hk.l.çewa) Kiryara hêdî û bi dizî ve ku kes jê haydar nebe. Pêdizkî.

**Pêdizkîveçûn** (k.jn.gl.mê) bn :Pêdizkîçûn. :Ez bi pêdizkî ve çûm ser cihê xwe dako kesê ji xew ra ne kem.

**Pêgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mirov bi şêt lê bi mînit, pê xwe li ser danit. Wargeh.

**Pêhin** (n.x.mê) Lêdana gurzekî bi pêyî.; lîstikvanî pêhinek li tepê da. Pên.

**Pêgir** 1 (hk.l.çewa) Mirovê pêyên wî di mezin. Pêmezin.

**Pêgir** 2 (hn,hn.dar.çewa) Mirovê biryar û sûzan bi cî di hînit.

**Pêgirî** (n.dar.mê) Milkeçî. :Pêgirîya xwe hember biryarê da zanîn.

**Pêgirîkirin** (k.jn.l.mê) Bi cih anîna erk û biryaran. : Divê em her dem pêgirîyê bi qanûnê bi kin.(K) bn: Kirin.

**Pêgotin** (k.jn.dar.mê) Dema mirov stiran yan çîrokan liser navdarekî yan bûyerekê di bêje û pesina wî,wê di de. : Dengbêjan pir stran bi qehremanîya pêşmergehan gotine. (bi wan,wê,wî gotin).

**Pêgotî** (hk.l.çewa) Mirov xelik gelek liser di axivin. Mirovê bernas.*Pend* :Sor di sotîne, sipî di pêtîne(sar), reş di pêgotî ne.

**Pêhêl** (n.dar.mê) Giroveya destûrdana karirin, derbazbûn, çûnejor û htd. Bihêl. : Pêhêla hajotina tirombê.

**Pêhêlan** (k.jn.dar.mê) Destûrdan. Lê xweşbûn. Azakirin. (K) bn: Hêlan.

**Pêjandin** (k.jn.x.mê) Nan çêkirin, nan yan sawik qelandin.Patin.: Kabanî nanî di pêjit.

**Pêjin** (n.x.mê) Dengê pêyên mirovan yan ginawiran di hêt, bê ko mirov tişekî bi bînit.:Pêjna mirovekî ya di hêt neke diz bit!.

**Pêjtin** (k.jn.x.mê) Nan patin. Nan qelandin.pêjandin. *Pend* :Di pêjit, lê na pêjit.ang ; gotina bê kiryar. (K) bdb: ez di pêjim em di pêjîn, tu di pêjî hûn di pêjin, ew di pêje[....it] ewan di pêjin. Pr : dê[bi] pêjim, pêjîn, pêjî, pêjin, pêjit[êje], pêjin. Bdb : di pat[pêjt] di patin[pêjtin]. Db,dûr : pêtibû, (pêjtibû).... bûn..(F) : bi pêje , bi pêjin.

**Pêk** (pêrb) *rêzman* Bi êk. Bi hev.

**Pêkanîn** (k.jn.l.mê) Rêkxistin. Pêk înan. li hev aîn. Diristkirin. (K)bn : Anan.

**Pêkdan** (k.jn.dar.mê) Wêrankirin. Kavilkirin. Xirakirin. : : Dujminan gundê me têk û pêk da.

**Pêkdadan** (k.jn.dar.mê) 1. Li hev xistin. Êk û du qutan. Pevçûn. 2. Pêçan. Werpêçan. Girtin. Têkwerkirin. : Nivînêd xwe pêk da dan û çû. (K) bn :Dan, dadan.

**Pêkenîn** (k.jn.dar.mê) 1. Gotinên bi kenî. : Mamê min pêkenînek got gelek ya bi kenî bû. .2. Mirov bi tiştekî yan bûyerek seyr bi kenit.(K): ez[pê] di kenim em di kenîn, tu di kenî hûn di kenin, ew di kenit ewan di kenin.(F) : [pê] bi kene bi kenin. Pr : dê{pê} [bi] kenim, kenîn, kenî, kenin, kenit[kene] kenin. Db: [pê] kenî, kenîn.

**Pêkenok** (hk.dar.çewa) Mirovê bi kenî. Lêbok.

**Pêkevtin** (k.jn.dar.mê) Li dû kevtin. Kevtin pey.Peykevtin.

**Pêkhatin** (k.jn.l.mê) Lihevhatin. Aştbûn. Gehiştin biryarekê. (K) bn: Hatin.

**Pêkgihorîn** (k.jn.l.mê) Dema mirov tiştekî bi det yekî û hember tiştekê dî ji wî wergirit.cih, erd, xanî û htd pêk bi gihorin. : Azad û Aştî tirombêlên xwe pêkgihorîn.(K) bn: Gihorîn.

**Pêkirin** (k.jn.dar.mê) Hilkirin. Berdanê. : Agir, lempe, sope pê kir.

**Pêkkirin** (k.jn.l.mê) mirovên ko di karin bi hevra bijîn.li hevkirin. Guhdarî ya êk bi ken (K) bn: Kirin.

**Pêkol** (n.l.mê) Bizav.Xebat.Xaztin. Viyan.

**Pêkolkirin** (k.jnlmê) Xwaztin. : Min gelek pêkol kir ko te bi bînin.(K) bn: Kirin.

**Pêkotir** (n.l.mê) *giya* Pêmirîşk.

**Pêkve** (hk.dar.çewa) Bi êkve . Di gel êk. Bi hevre. Tebayî. : Em dê pêkve herin seyranê.

**Pêkveman** (k.jn.l.mê) Bi êkve man. Mane bi êkve. Bi êkve nûsan. :Ev du kefçike hind di nîsekin yên mayne pêkve. :Eve hewe çiye hûn mayne bi stoyê êk ve ?. ang ; cirebirkirin. (K) bn : Man.

**Pêkvenûsan** (k.jn.l.mê) Pêkveman. (K) bn : Nûsan.

**Pêkxistin** (k.jn.l.mê) Lêkdan. Li hev xistin.

**Pêl** (n.x.mê) 1.Vedana avê. Hatina hilmeka bayî. Şepol. Delav.2. Navê keçane.

**Pêlav** (n.l.mê) Tişte mirov li pêyên xwe di ke. Şekal.

**Pêldan** (k.jn.l.mê) Diristbûna pêlan. Av vedan.Pêlvedan.


**Pêlkvan** (n.dar.nêr) Navê xortane.

**Pêlvedan** (k.jn.l.mê) Pêldan.

**Pêlweş** (n.dar.mê) Radyo. Îzgeh.

**Pêlweşandin** (k.jn.l.mê) Weşan bi radyoyan. Belavbûna pêlan. Belavkirin.

**Pêmirîşk** (n.l.mê) 1. Pêyên mirîşkan. 2. Giyayeke li çiya û dolên Kurdistanê pire, bi xavî û zerkirî di hêt xwarin, şbelgên wî mîna pêyên mirîşkane. 3. Bizaveke mirîşk bi lingan di ke jibo peydakirina tomikê xwe.



**Pêmirîşk**

**Pêmirîşkkirin** (k.jn.ggl.mê) Balinde, nemaze mirîşk pencêd pêyên xwe li erdî di xit û di vekolit jibo peydakirina xwarinê li bin erd û gelgeleyî. :Kew pêmirîşkê di ke dako ji xwe ra danî ji nav pelexî derîne û bi xwe.

**Pêmîz** (n.dar.mê) Mîztina seyan.

**Pêmîzkirin** (k.jn.l.mê) Seg li dema mîztinê pêyekê xwe bilind di kit.

**Pên** (n.x.mê) bn: Pêhin.

**Pênase** (n.l.mê) Çewayîya nasîna zaravan. Nasîn.

**Pênc** (hijn.çend) Hijmara 5.   4+1= 5. 10-5=5.

**Pêncem** (hijn.destni) Ya,yê,yên Pêncê.

**Pêncemîn** (hijn.dest) Pêncem.

**Pênchizar** (hijn.çend) Hijmara 5000.

**Pêncî** (hij.çend) Hijmara 50.  40+10 = 50.  60-10  = 50.

**Pêncmilyon** (hijn.çend) Hijmara 5000000.

**Pênçokanê** (n.dar.mê) *yarî* Yarîyeke, zarok yan sinêle, bi pênç beran di lîzin.

**Pêncsed** (hijn.çend) Hijmara 500.

**Pêncşemb** (n.l.mê) Rojeke ji heftîyê, roja berî înê û piştî çarşembê.Heger ji êkşembê dest pê bi ken, dê bite roja pêncê ji heftîyê.

**Pêndav** (n.dar.mê) Corekê şemayê ye mêşhingiv derê kuna xwe pê di girin û teng di ken jibo parastin ji gerim,sirê û adîyên dujmin.


**Pênde<u>va</u>** (n.dar.mê) Pêndav.

**Pêndi<u>xe</u>** (n.dar.mê) Pênc rojên kanîna biçûk ji roja 25 î meha 12 a zayînî tanî 30 heman mehê. Şarezyên seqayî di kevin da bawer di kirin ko ev pênc rojên han bêyî befir barîn derbaz babin.; ***Pend*** :Pêndixe derbaz nabin bê tilxe. ang; tilxeya befirê.

**Pên<u>gav</u>** (n.l.mê) .1. Dirêjîya di hêt pîvan navbera havêtina du gavên mirovî. Gav. 2. Pêşkevtin.

**Pêngav<u>havêtin</u>** (k.jn.l.mê) Pêşveçûn. (K) bn: Havêtin.

**Pên<u>giwîn</u>** (n.cîh.mê) ***candar*** Giyandarekê balindeye, na firit, hêkkere, hişkavîye, li gopikên tepa erdî bi awayê bir(revde) di jîn.



**Pêngiwîn**

**Pê<u>nijîn</u>** (k.jn.x.mê) Hizirîn. Hizirkirin. Nijinîn.

**Pêni<u>vîs</u>** (n.l.mê) Qelem. Xame.

**Pê<u>pan</u>** (hk.çewa) Mirovê pêpan. Pêmezin.

**Pêpe<u>ling</u>** (n.l.mê) Pêpelîsk.

**Pêpe<u>lîsk</u>** (n.l.mê) Peyîska ji daran hatî diristkirin, pêpikên wê jî her ji darî ne. Pêstirk. Peyîsk.

**Pêpe<u>lok</u>** (n.dar.mê) Pêpelîsk.

**Pê<u>petî</u>** (hk.dar.çewa) Pêxas.

**Pê<u>pik</u>** ( n.dar.mê) 1. Pêyên kewalê ser birî.2. Darên peyîskê yên mirov pêyên xwe li ser da dinit jibo bi serkevtinê. :Peyîska banî ji 30 pêpikan pêk di hêt.

**Pêr** (hk.dem) Du rojên borîn. : Ji pêr were[hir ve] min hevalê xwe ne dîtîye.

**<u>Pê</u>ra** (pêrb.alv.gir) ***rêzman*** Di gel . Bi wî,wê,wan re.

**Pê<u>rar</u>** (hk,dem) Du salên borîn.Berîya du salan. :Pêrar ez çûbûm derveya welatî.

**Pêr<u>best</u>** (n.dar.mê) ***rêzman*** Alavên girêdanê di zimanî de ; mîna : û, weha, jiber. Ji, li, lewra, çunkî, tanî, çi, çiqas û htd. Gîhanek.

**Pêrgîn** (n.dar.mê) Pêrgînî.

**Pêrgînî** (n.dar.mê) Pêşwazî. Bi xêrhatin.


**Pêrgînîkirin** (k.jn.l.mê) Pêşwazîkirin. Xêrhatinkirin. . . :Ahingvanên hêja em ji dil û can pêrgînîyê li hewe di ken. :Bi navê bûk zava babê zavayî pêrgînî li dewatîyan kir.(K) bn : Kirin.

**Pêrpîne** (n.x.mê) *giya* Gîyekê hilîye, li ber çoyan hişîn di be, jibo xwarinê di xin nav mast û avikan.*Pend* :Bila pêrpîne liserdilê wî hişîn bi be. ang; mirovê ne hêt rayê, mirovê rikdar.

**Pêrû** (n.x.mê) Navê stêrane.

**Pêsîr** (hk.cih,n.x.mê) Cihê di kevit nav yan nêzî ranan li alê singî. Dang. Dehmen. Zincîra şelwalî. Beten. Danga çiya û girikan.

**Pêstirk** (n.dar.mê)1. Pêpelîsk. Peyîsk.2. Giranbûna leşî. Qerisîna leşî.



**Pêstirk**

**Pêstirkgirtin** (k.jn.l.mê) Leşê mirov ji tirsan di raweste û mirov ne şêt bi livit. :Reşek bo wî çê bû, pêstikê girt ne şîya bi revit. (K) bn : Girtin.

**Pêş** (hk.dem) Berayî. Li berahîkê.li ber.pêş çavan, li ber çavan. Br× Paş.

**Pêşandar** (karn.dar.dz) Rêber.

**Pêşangeh** (hk.cih,n.dar.mê) Pîşangeh.

**Pêşayî** (n.dar.dz) Berahî. Serkêşî. Serokatî. :Li pêşayîyê em pêrgînîya mêvanêd hêja di keyn.

**Pêşbazî** (n.dar.mê) *yarî* Berîkanê.

**Pêşbend** (n.dar.mê) *rêzman* Pêşgir.

**Pêşber** (n.dar.dz) 1. Misoger.2.Ber bi pêş. Serwer.

**Pêşberî** (n.dar.mê) Misogerî.

**Pêşberîkirin** (k.jn.l.mê) Hevberî êk kirin. Anîn hember hev. Hevberkirin.

**Pêşbirkê** (n.dar.mê) *yarî* Berîkanê.

**Pêşbîn** (hn.l.çewa) Mirovê zana yê paşerojê di xwînit.

**Pêşbînî** (n.l.mê) Hizirkirina bûyerêd di hên .Dûrbînî.

**Pêşbînîkirin** (k.jn.gl.mê) Hizir zanîna paşerojê û xwe jibo berhev kirin. : Ez pêşbînîya rojeka geş jibo gelê kurd di kim. (K) bn : Kirin.

**Pêşçav** (hk.l.çewa) Tiştê mirov bi çavan di bînit. Diyar. Xuya. Aşkera.

**Pêşçavkirin** (k.jn.gl.mê) Xuyakirin. Rûnkirin. Zelalkirin. Li ber çavan danîn. (K) bn : Kirin.

**Pêşda** (hk,dem) Berayî. Dema li pêş.

**Pêşdar** (pîşn.dar.dz) Serok. Rêber. Serdar.

**Pêşdarî** (karn.dar.mê) Serokatî. Rêberî.

**Pêşdarîkirin** (k.jn.gl.mê) Serkêşîkirin. Serokatîkirin. Rêvebirin.(K) bn : Kirin.

**Pêşde** (hk.dem) Pêşda.

**Pêşdeçûn** (k.jn.gl.mê) Serkevtin. Pêşkevtin. (K) bn : Çûn.

**Pêşdem** (hk,dem.mê) Demek zû. Kar bi hêt encamdan berî jivanî. Pêşwext.

**Pêşdest** (hk.l.çewa) Berhev. Di destî da.

**Pêşdestî** (n.l.mê) Berî hemûyan. Li berahîyê. Yekemcar

**Pêşdestîkirin** (k.jn.gl.mê) Li pêşîya her kesî dest pê kirin. . :Cantikê xwe pêşdest bi ke, da jibîr ne key.

**Pêşeng** (n.dar.dz) Berayî. Serkêş. Serwer. Semyan.

**Pêşeroj** (hk,dem. Mê) Rojên li pêş mene.

**Pêşevan** (karn.dar.dz) Serok. Berhîk.Rêber.

**Pêşewa** (karn.dar.dz) Serok. Semyan. Pêşî.

**Pêşêxistin** (k.jn.l.mê) Pêşxistin.

**Pêşgir** (hk,cih.mê) *rêzman* Tiştê li cihekî berayîyê digirit. Pirteka pêşî ya peyvê di gire. Pêşbend.

**Pêşgotin** (jn.l.mê) Gotina li berahîyê di hêt kirin yan nivêsîn. Br× Paşgotin.

**Pêşhatî** (n.dar.mê) Bûyer û rûdanên paşerojê.

**Pêşin** (hk.dem) Pêş.

**Pêşî** 1 (n.dar.dz) Serkêş. Semyan.

**Pêşî** 2 (n.x.mê) ***candar*** Mêşikeka kirmijoke li ser xwîna giyanewer û mirovan di jît.

**Pêşîn** (hk.dem) Pêş. Cara pêşîn. Ang; cara yekê.

**Pêşînan** (n.dar.dz) Kevineşop. Mezin. Babkal. :Pendên pêşînan.

**Pêşîne** (n.dar.mê) Parê ne çêk. Parê kaş, berhev. Pare.

**Pêşîv** (hk,dem.mê) Paşeroj. Rojên li pêş.

**Pêşkar** (pîşn.dar.dz) Kesê li ber dezgeh, karxane, firoşgeh an karê nêrvanîyê di ke. Zêrevan.

**Pêşkarî** (karn.dar.mê) Karê zêrevanîyê.

**Pêşkepî** (hk.l.çewa) Kesê hevrikê mirovî di kar û hilbijartinan da.

**Pêşkevtin** (k.jn.l.mê) Çûne pêş. Serkevtin. (K) bn: Kevtin.

**Pêşkevtî** (hn.l.çewa) Hevçerx. Pêşveçûyî. Pilebilind. Serkevtî.

**Pêşkêş** (hk.dar.çewa, n.dar.mê)1. Rêkûpêk. Peyt.2. Diyarî.

**Pêşkêşkirin** (k.jn.l.mê) 1.bi Diyarî dan. :Mamê keça xwe pêşkêşî birazayê xwe kir. 2. Dane nasîn. (K) bn: Kirin.

**Pêşmal** (n.dar.mê) Bermalk. Berkoşk.

**Pêşmerge** (pîşn.dar.dz) Çekdarên berevanî yê ji ax û neteweya kurdistanê di ken. Xwegorîker.

**Pêşmergatî** (karn.dar.mê) Karê pêşmergeyan.

**Pêşnîyar** (n.dar.mê) Dema mirov boçûn û hizir ên serkevtî pêşkêşî alîyek havildar di ke jibo baştirkirina karî. Pêşnîyaz.

**Pêşniyardan** (k.jn.gl.mê) Pêşkêşkirina pêşniyaran .Dana hizirnên pêşkevtî. (K) bn : Dan.

**Pêşniyarkirin** (k.jn.gl.mê) Pêşniyardan (K) bn: Kirin.

**Pêşniyaz** (n.dar.mê) Pêşniyar.

**Pêşrew** (kanr.dar.dz) Serok. Pêşber.Serkêş.

**Pêşû** (n.x.mê) ***candar*** Pêşî.

**Pêşpirt** (hk,cih.mê) ***rêzman*** bn: Pêşgir.

**Pêşve** 1 (hk.dem) Ber bi pêş . Jibo pêş. Alîyê singî.

**Pêşve** 2 (hk.dar.çewa) Li şûna. Li cihê. :Ew pêş babê xwe ve çû zibarê.

**Pêşvebirin** (k.jn.l.mê) Ber bi pêş paldan, birin. Serêxistin. :Pêşvebirina karî, astê jiynê, astê zanînê.(K) bn: Birin.

**Pêşveçûn** (k.jn.l.mê) 1.Pêşkevtin. ; Pêşmerge pêşveçûn ji çeperekî bo yê dî. 2. Çûn. pêşîyê.Çûn berhîyê.  Pêşwazî lê kirin. :Berî bi gehin, gundî pêş mêvanan ve çûn. (K) bn: Çûn.

**Pêşveçûyî** (hk.çewa) Pêşkevtî.

**Pêşverû** (hk.dar.çewa) Mirovê hevçerix. Pêşkevtî.

**Pêşverûyî** (n.dar.mê) Pêşkevtin.

**Pêşwazî** (n.dar.mê)  Pêrgînî.

**Pêşwazîkirin** (k.jn.l.mê) Pêrgînîkirin. :Pêşwazî li mêvanan kirin. Babê zavay pêşwazîyeka  gerim li xandîyan kir. (K) bn: Kirin.

**Pêşwext** (hk.dem)  Pêşdem. Zû. :Pêşwext em li jivana xwe amade bi bûyn.

**Pêşxistin** (k.jn.l.mê) Pêşvebirin. Bilindkirin. Astê çandî li Kurdistan hatîye pêşxistin. (K) bn: Xistin.

**Pêt** 1 (hk.x.çewa) Rengzer. Rengmirî. ::Ev zaroye herê pête neko yê nisax bit?.

**Pêt** 2 (n.x.mê) Hilim û gurî ya agirî. :Pêta agirî bilind bû ber esmanan.

**Pêt** 3 (hk.x.çewa) Peyt. :Jineka pêt. Xortekê pêt.

**Pêtazî** (hk.l.çewa) 1. Pêxas. 2. Xazok. :Pêtzî ji mal derkeft.

**Pêtbûn** (k.jn.l.mê) Ji tirs, fehêtî yan mandîbûnê rengê rûçikê mirovî zer û xav di be. : Zarokê hejar ji tirsa babê xwe pêt bi bû. (K) bn : Bûn.

**Pêtik** (n.dar.mê) Zilikê şixatê. Bizotk.



**Pêtik**

**Pêtivî** (n.dar.mê) bn: Pêdivî.

**Pêtî** (hk.dar.çewa) Renggorî.. Bêreng. Xav. Xirş. :Dara pêtî.

**Pêtîbûn** (k.jnlmê) Pişbûn. Dar pêtî bû.ang; xavbû. :Nanê sêlê ji kevinî da yê pêtî bûy. (K) bn: Bûn.

**Pêtîkirin** (k.jn.l.mê) Mirov tiştekî pêtî bi ke.Pêtîbûn.

**Pêtkirin** (k.jn.l.mê) Peytkirin.

**Pêvajo** (n.dar.mê) Bername. Prose.Heyam.Qonax.

**Pêve** (pêrb) ***rêzman*** 1. Nûsan tiştî bi êkve. 2. Pêve (hk,dem) Paşve. :Ji niho pêve ez dê dest bi rahênanên werzişî bi kim . Ji niho paşve. Ji vêrê û wêve.

**Pêveçûn** 1 (k.jn.l.mê) Heger mirovî karek şaş kir, divê pêve bi çit jibo dubare nebit. Peşêmanbûn. (K) bn: Çûn.

**Pêveçûn** 2 (k.jn.l.mê) Wek hev. Li hev çûn. : Ev keçe bi dayka xwe ve çûye.

**Pêvedan** (k.jn.dar.mê) 1. Gestin. Leqdan. :Marî, dwîpişkî bi wî veda. 2. Lêdan. :Nan, sewik bi tenûrê vedan .ang;nan qelandin. (K) bn: Dan.

**Pêveder** (hk.dar.çewa) Mirovê derd û belayê bi xwe ra di hînit. Mirovê kur.Mirovê beş. Kêvroşka beş.

**Pêvekirin** (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov tiştekî di êxit tiştek din. : Hevsîya me cilik bi ristê ve kirin. 2. Têxistin. :Di şermê êxistin. Ketine kirasê şermê. :Hewe ez pêve kirim, heger da çewa wesa bêjim. (K) bn: Kirin.

**Pêveman** (k.jn.l.mê) 1. Pêkaveman . Pêkvenwîsan. :Rengê maye bi dîwarî ve û jê naçit. 2. daxwazkirin. Hîvîkirin. :Ez gelek mam pêve ko qayîl bi bit wî karî ne ket. :Ez gelek pêve mam da wî qayîl bikem, dest ji cigarekêşanê berde. :Cilk bi leşî ve man . :Cilk bi leşî ve man. (K) bn: Man.

**Pêvenan** (k.jn.l.mê). Dema tiştekê bi yê dî ve di çespînî, bi nûsînî. bêxî ser yan bi gehînî hev :Stirk bi kaxezê ve na.:Destê bi devê wî ve na.:(K) bn: man.

**Pêvenûsan** (k.jn.l.mê) Pêveman. :Benîşt bi cilikan ve nûsa. (K) bn : Nûsan.

**Pêvenûsandin** (k.jn.dar.mê) Bi wî,wê, wan ve girêdan. Pêve çespkirin. Pêvekirin.

**Pêwîst** (rd.dar.çewa) Pêdvî. :Karekê pêwîst.

**Pêwîstî** (n.dar.mê) Pêdvî. Gerek. Divê.:Pêwîstîya min bi te heye.

**Pêxamî** (pêrb.alv. Pêvgir) *rêzman* Jibo. Jibona. Jiber. Pêxemet. :Pêxamî te ez hatin vira(vê dirê).

**Pêxas** (hk.l.çewa) Mirovê pêlav di pêyan da ne bit. :Pêxas dernekeve, dê stirî di piyên te ra çin!.

**Pêxasbûn** (k.jn.gl.mê) Pêlav di pêyan da neman.

**Pêxasî** (n.l.mê) Bê pêlavî. Pê tazî.

**Pêxaskirin** (k.jn.gl.mê) Pêlav ji pîyan kirin. Pêlav danan. : Li mizgeftî divê herkes xwe pêxas bi ke. (K) bn :Kirin.

**Pêxember** (karn.dar) Hilgirê nameya pîroz. Hinartî yê xudê jibo çaksazî yê ra. Pêxemberê Islamê Mihemmede (s.x). :Zerdeştê pêxember (s,x).

**Pêxemet** (pêrb.alv.pêvegir) *rêzman* Jiber. Ji bûna. Ji pêxemet. :Em xebatê di keyn ji pêxemet azadî ya gelê xwe. Pêxamî.

**Pêxistin** (k.jn.dar.mê) Hilkirin. Berdanê. :Agir pêxistin. :Cigarê pê bi xin.(K) bn :Xistin.

**Pêxwarin** (k.jn.dar.mê,n.dar.mê) 1.Xwarinên mirov bi nanî di xwe, mîna mast, penîr, giyayên zerkirî, hêk û htd. : Firavîn îro pêxwarine, me çi girar ne lênane.2. Di gel da xwarin. :Kerefsê bi zadî di xon. :Nan bi çayê xwar.

**Pêzanîn** (k.jn.dar.mê) Tiştê mirov agehdare û di zanit. Saloxdan. Zanîn. : Min tu pêzanîn liser çewayîya mirina wî nînin.

**Piçan** (k.jn.x.mê) Bizdiyan. Qurtivîn. :Bistîka giyayî piça[piçya]. 2. Tirsan. :Ez piçam ji tirsan da. :Dilê min piça wekî min ew dehbe dîtî!.(K) : Bdn: ez di piçim em di piçîn, tu di piçî hûn di piçin, ew di piçe[...it] ewan di piçin. Pr :dê[bi]+ bdn. Bdb: ez di piçam em di piçan, tu di piçay hûn di piçan ew di piça ewan di piçan. Db,dûr: ez piçabûm em piçabûyn, tu piçabûy hûn piçabûn, ew piçabû ewan piçabûn. (F): bi piçe, bi piçin.

**PHKÎ** (kurt) Perlemana Herêma Kurdistana Iraqê, avahîyê wê li Hewlêra paytexe.

**Piçandin** (k.jn.x.mê) 1. Qurtivandin. Kherkirin.Bizdandin. : Wê bi didanan dezî piçand. ; dava giyayî piçand 2. Tirsandin. :Dengê kifêna marî dilê min piçand. (K) bdn: ez di piçînim em di piçînîn, tu di piçînî hûn di piçînin, ew di piçîne[..it] ewan di piçînin. Pr : dê[bi] piçînim, piçînîn, piçînî, piçînin, piçîne[..nit]. Bdb: di piçand, di piçandin. Db,dûr: piçandibû, … bûn. (F): bi piçîne, bi piçînin.

**Piçek** (hk.x.çend) Pîçek. Kêmek. Çendek kêm. Demek kêm. :Ez piçek birçî me, piçek zadî bi de min. :Piçeka mayî dê roj ava bi bit.

**Piçir** (n.dar.pir) *candarî* Didanên singî yên piçandina parî. Kêlbe.

**Piçopiço** (hn.l.çewa) Piçpiç.

**Piçpiç** 1 (hk.l.çewa) Kêmkêm. Hûrik. Hêdî. Pîçpîç.

**Piçpiç** 2 (hk.dar.çewa) Pirtpirt. :Bendikê piçpiç.

**Piçpiçkirin** (k.jn.gl.mê) Pişkkirina tiştî jibo pirtên biçûk. Pirtpirtkirin. :Curdî werîs bi didanan piçpiç kir. (K) bn : Kirin.

**Piçpiçok** (hk.dar.çewa) Tiştê zû di piçit. : Ev divêle gelek di piçpiçokin.

**Piçûk** (hk.x.çewa) 1. Biçûk. Hûr. 2.(n.x.pir) Zarok. :Piçûk di çin nav baxî.

**Piçûkatî** (hk.dar.çewa) Jiyê biçûkatîyê. :Bîrên piçûkatîyê ji bîra mirovî naçin!.

**Piçûkbûn** (k.jn.l.mê) Biçûkbûn.

**Piçûkirin** (k.jn.l.mê) Biçûkkirin.

**Pidî** (n.x.mê) *can* Goştê di devî da ku didan têda rêzkirî ne.pî. pidû. Kepîr.

**Pido** (n.x.nêr) *can* Hedamê nêrînê mîztinê yê zarokan û bi zarê zarokan.

**Pidû** (n.x.mê) bn: Pidî.

**Pif** 1 (n.x.mê) Bayê ji devî der di kevit dema mirov lêvê xwe gurc di ket û dengê pifênê jê di hêt. Pifa wî agir geş kir.

**Pif** 2 (hk.x.çewa) Tiştê pirî ba. Tijî ba. Qelew. : Rûyên vî zarokî di pifin.

**Bifbûn** (k.jn.l.mê) Êvitîn. Qelewbûn. : Zikê kitkê pif bûye, hindî xwarina xwarî.

**Pifdan** (k.jn.l.mê) Ba kirine tiştekî bi devî yan pempî, wek meşk, pifdank û htd. Bat tê kirin. : Pifdankê pfde. (K) bn : Dan.

**Pifdank** (n.l.mê) 1.Lastîkeka nîva wê xuloleye[vala] rengerenge bayî tê di kin jibo ciwanî û yarîyan. Zeqzeqe.2. Mîzdank.

**Pifdankamîzê** (nl.mê) bn: Mîzdan.

**Pifek** (n.dar.mê) *xwarin* 1. Corek dindikin jibo xwarine ji pitatan yan genmokan hatîne çêkirin. 2. Pifek. ang; Yek pif. êk pif.

**Pifkirin** 1 (k.jn.l.mê) Bayê devî kirin derve. :Pif kir agirî jibo vemirandin yan geşkirin. (K) bn :Kirin

**Pifkirin** 2 (k.jn.l.mê) Direwkirin. Virkirin. (K) bn: Kirin.

**Pifkirin** 3 (k.jn.l.mê) Batêkirin. Êvitandin. Qelewkirin. :Alekêd xwe pifkirin.

**Pijak** (n.x.mê) 1.Çipik. Dilop.2. Dengê dilopan. Dengvedan.

**Pijandin** (k.jn.x.mê) Bijandin. Belavkirin.

**Pijkoj** (n.dar.mê) Bijkoj.

**Pijme** (n.x.mê) Bêhnijk.

**Pijmîn** (k.jn.x.mê) Bêhnijîn.(K) bdn: ez di pijmim em di pijmîn, tu di pijmî hûn di pijmin, ew di pijme[...it] ewan di pijmin. Pr:dê [bi]+bdn. Bdb: ez di pimîm em, hûn, ewan di pijmîn, tu ew di pijmî. Db,dûr: ez pijmîbûm em pijmîbûyn, tu pijmîbûy hûn pijmîbûn, ew pijmîbû ewan pijmîbûn. (F): bi pijme, bi pijmin.

**Pikû** (pêrb.alv.hic) *rêzman* bn: Pek. Pikû eve çi tiştek seyre !.

**Pil** 1 (hk.x.çewa) 1.Tiştê sist. Xav. Xo negir. Bêhêz.; . Ew yê pile ko lêve bi bit.

**Pil** 2 (n.x.mê) Lêdana bi tibilê. Lêkdana du tibilan. *Pend* :Bi pilekê çû serê milekê. Ang ; zû bilind bûn. :Pilek li difna wî da.

**Pilan** (n.x.mê) 1.Nexşe.2. Reşnivîs. Rojev. :Pilana te çiye?. :Te çi pilan hene?.

**Pilandanan** (k.jn.l.mê) Mirov di xwaze pilanekê jibo karekî dane. :Hukmetê pilan danaye, ko hind avayîyan jibo fermanberan ava bike. (K): bn Danan.

**Pilandaner** (karn.l.dn) Pisporê pilanan di deanit.

**Pilandarijtin** (k.jn.l.mê) Pilandanan. Nexşe danan.

**Plaster** (nbiyan.mê) *nojdarî* Parçe perokekê dermankirî û nîseke jibo pêçana birînan bi kar di hêt.

**Pilastîk** (nbiya.mê) Lastîk.


**Pilbûn** (k.jn.l.mê) Sistbûn. Leqbûn. :Didanê min yê pilbûy, dê kevit. (K) bn: Bûn.

**Pile** (n.x.mê) 1.Nemre. Peyîsk. 2.Pileya germê, li Kurditanê 35 e.

**Pilepil** (n.dar.mê) Pitpit.

**Pilepilkirin** (k.jn.l.mê) Pitpitkirin. (K) bn: Kirin.

**Piling** (n.x.dz) ***candar*** Candarekê goştxwer û dirindeye. :Piling giyanewerêdirindeye.



**Piling**

**Pilîtan** (n.dar.mê) Pêstirk. Pêpelîsk.

**Pilîtik** (n.dar.mê) Parçe, pirtên nîvşil[kizir]. Pirçik. Pilîtikên pîsatî. :Wî pilîtikek berda nav şelwalê xwe.

**Pilîtkirin** (k.jn.l.mê) Serfirandin . Birîn. Serjêkirin. :Stoyê mirîşkê bi gîzanê pilît kir.(K) bn: Kirin.

**Pilkirin** (k.jn.l.mê) 1. Mirov di tiştekî bi xebitit ta sist bi bit, leq bi bit. 2. Xavvekirina mirovekî ta qayîl bi be. : bi Xudê min yê pil kirî hema dê qayî bît.(K) bn: Kirin

**Pillêdan** (k.jn.gl.mê) pil-lê-dan Mirov pilan li tiştekî bi dit. :Bapîrî pilek li cigara xwe da û got ; .... .(K) bn: Dan.

**Pilox** (hk.x.çewa) Xwarina nerim jibo pidû û didanan. :Sêva pilox. Gundorê pilox.

**Pind** 1 (n.x.mê) ***candar*** 1. Kêzikeka kirmijoke li ser xwîna giyandaran dijît nemaze, kewalan. 2. Kilka mirîşkê ya verîçandî.

**Pind** 2 (hk.x.çewa) Qelew. Xir. Girover.

**Pindbûn** (k.jn.l.mê) Wek pindan qelewbûn. Pifbûn.

**Pindepîr** (n.l.mê) Tevinpîrk. Pîrik.

**Pindê** (ndar,hd,gaz.mê) ***rêzamn*** Gazîkirin[navkirin] a candarê mê yan keça qelew.

**Pindik** (n.dar.mê) Pijkoj.

**Pindikîn** (k.jn.l.mê) Cihê xwe girtin.Pindbûn.

**Pindikî** (hk.dar.çewa) Cihê xwe girtî. Xwe pind kirî. Qelew.

**Pindilk** (hk.çewa,n.dar.dz) Zarokê ciwan, biçûk û qelew.

**Pindivandin** (k.jn.x.mê) Torekirin.Hêriskirin. :Te bûçî zarok pindivand. (K) bdn.: ez di pindivînim em di pindivînîn, tu di pindivînî hûn di pindivînin, ew di pindivîne[....it] ewan di pindivînin. Pr: dê bi +bdn. Bdb: di pindivand, di pindivandin. Db,dûr : pindivandibû,pindivandibûn. (F): bi pindivîne, bi pinvînin.

**Pindivîn** (k.jn.x. mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di pindivim em di pendivîn, tu di pendivî hûn di pindivin, ew di pindive[…it] ewan di pindivin. Pr: dê[bi]. pindivim,pindivîn, pindivî, pindivin, pindivit[..ve]. Bdb: ez di pindivîm, em di pidivîn, tu di pindivî, hûn,ewan, di pindivîn, ew di pindivî. (F): bi pindive, bi pindivin.

**Pindkirin** (k.jnlmê). Dema mirov têr di xut û zikê xwe pir di ket, nexasim zarok. Xwe pankirin (K) bn : Kirin.

**Pindo** (hd,gazn.dar.nêr) ***tirane*** Gazîkirin [navkirin] a xortê qelew.

**Pinî** (n.x.mê) 1.Xaleka mezin. Tewil. 2. Parçeka pateyî. Pîne ; şelwalê wî ji pinîyan tilove ye. ***Pend*** :Kun ji pinîyê mazintire.ang; dema mirov nikare bawerîya hemberê xwe bi gotinekê bîne.

**Pinîdoz** (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî pinî kirina cilik û pêlavan.

**Pinîdozî** (karn.dar.mê) Karê pinîdozan.

**Pinîdozîkirin** (k.jn.gl.mê) Kesê pêlav û cilikan pinî di ke. :Cîranê me pinîdozîyê di ket.

**Pinîkirin** (k.jn.l.mê) 1. Lêdana parçekê bi cihê diryayî ve. Cilik pinî kirin. 2. Gotinekê jibo yekî pinî bi key. ang; pêş wîve behanekê çêkey, yan gotina wî rastve bikî. ***Pend*** : Direweka hinde mezine nahê pinîkirin. (K) bn: Kirin.

**Pinîlêdan** (k.jn.l.mê) bn: Pinîkirin.

**Pinîpinî** (hk.l.çewa) Candar yan tiştê xal û pinî liser hene. : Kiraskê wî pinîpinî ye. :Segekê pinîpinî.

**Pinpinîk** (n.dar.mê) Perwane.

**Pir** 1 (hk.x.çend) Gelek. Zor. Zehf. Mişe. :Eez pir ji geryanê hez di kim. :Mirovêd çak li welatê me pirin.

**Pir** 2 (n.x.mê) Avayî yê li ser avan, çeman yan cihên bilin hatîn çêkirin jibo derbazbûna mirov, giyandar û hin caran tirombêlan. : Pira delalê li Zaxo ye.

**Pirandin** (k.jn.x.mê) Zafkirin. Mişekirin.

**Piranî** (hk.dar.çend) Bara pitir. Zorbe.Behra pitir. :Piranîya xelik ê Kurdistanê kurdin.

**Pirbêj** (hk.l.çewa) Mirovê pir hez ji axivtinê di ke.;Jineka pirbêj. Mêrekê pirbêj.

**Pirbêjî** (n.l.mê) Axivtina zor. Gelek axivtin.

**Pirbûn** (k.jn.l.mê) Tijîbûn. Miştbûn. : Xanîyê me pirî av bû. (K) bn:Bûn.

**Pirç** (n.x.mê) Mûyê serî. Por. :Pirça sor, zer, reş û htd.

**Pirçandin** (k.jn.dar.mê) bn : Piçandin.

**Pirçik** (n.l.mê) Pirt. Çipik. Seçme. :Pirçikên, avê,xwînê û htd.

**Pirçikandin** (k.jn.mê) Pirçandin.

**Pirejimar** (hn.l.çewa) ***rêzman*** Pirînî. Gelek.

**Pirî** (hn.çend) Piranî.

**Pirîsk** (n.x.mê) Pirçik.

**Pirkam** (hk.dar.çewa) ***derd*** Nexweşê deronî ko caran nikare xwe ragire û di qîjîne yan hêris di be.

**Pirkamî** (n.dar.mê) ***derd*** Derdeke deronîye, mirovî di girit. Hîstêrya.

**Pirkirin** (k.jn.l.mê) Tijîkirin. Tejikiirn. Dagirtin. : Cotyarî tovdan ji genimî pir kir. (K) bn : Kirin.

**Pirmîz** (hk.l.çewa) Birmîz.:Zarokê pirmîz. :Kitika pirmîz.

**Pirpêne** (n.x.mê) ***giya*** Pêrpîne.

**Pirpirok** (n.dar.mê) Pelatînk.

**Pirs** (n.x.mê) Pisyar. Serexoşî. :Pirsa te çiye ?.

**Pirsgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê yan nivîsgeha nemaze jibo xwe dan nasîn jibo pisyarkirinê û wergirtina zanyarîyan, dema mirov li desgeh yan baregayekî karek hebit.

**Pirsgirêk** (n.l.mê) Arêşe. Asteng. :Pirsgirêka me ma hilawîstî.

**Pirsik** (n.x.mê) Nîşan yan girêkeke li ser leşê mirovî nemaze rûyan peyda di be ji egera kulbûnê yan li qonaxa jiyê sinêleyîyê da.

**Pir<u>sîn</u>** (k.jn.x.mê) Pisyarkirin. ***Pend*** :Heger dixazî bizanî her bi pirse ji xudanî. (K) bdn : ez di pirsim em di pirsîn, tu di pirsî hûn di pirsin, ew di pirse [..it]ewan di pirsin. P : dê[bi] + bdn. Bdb: ez di pirsîm, em, hûn, ewan di pirsîn, tu,ew di pirsî. Db,dûr : ez pirsîbûm,em pirsîbûyn, tu pirsîbûy hûn, ewan pirsîbûn, ew pirsîbû. (F) bi pirse, bi pirsin.

**Pirs<u>ker</u>** (hk.dar.çewa) Pisyarker.

**Pirs<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Pisyarkirin. (K) bn :Kirin.


**Pir<u>şeng</u>** (hn,hk.l.çewa) 1. Gelek ciwan. Pir xweşik. 2. Navê jinane.

**Pir<u>şên</u>** (n.dar.mê) Tîrojk.

**Pirt** (n.x.mê) Ker (***kher***). Parçe. Pirteka sawik, nanî.

**Pirt<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Parçebûn. Kerbûn (***kherbûn***). (K) bn : Bûn.

**Pirte<u>qal</u>** (n.x.mê) ***fêqî*** Core fêqîyeke, xire, reng sore, tam şirîn û mize.



**Pirteqal**

**Pirteqa<u>lî</u>** (hk.dar.çewa) Rengê sorê vebî.

**Pirtikan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Hûrkirin. Kerkirin (***kherkirin***). Parçekirn.(K) bdn: ez di pirtikînim em di pirtikînîn, tu di pirtikînî hûn di pirtikînin, ew di pirtikîne[....it] ewan di pirtikînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb: di pirtikand, di pirtikandin. Db,dûr : pirtikandibû, …bûn. (F): bi pirtikîne, bi pirtikînin.

**Pirti<u>kîn</u>** (k.jn.x.mê) Parçbûn. Hincinîn. Peritîn. : Cilên wî di berda pirtikîn.

**Pir<u>tir</u>** (hn.çend) 1. Pêtir. Pitir.2. Tijîtir. Zortir.

**Pirti<u>rîn</u>** (hn.çend) Ji hemûyan pêtir. Ji hemûyan tejîtir. Zortir.

**<u>Pirt</u>pirt** (hn.l.çewa) Parçeparçe.

**Pirtpirt<u>bûn</u>** (k.jn.gl. mê) bn: Pirtbûn.

**Pirtpirt<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Pirtikandin. Parçekirin. Hûrkirin. (K) bn: Kirin.

**Pir<u>tûk</u>** (nl.mê) bn: Kitêb.

**Pirtûk<u>xane</u>** (hk.cin,n,l) Kitêbxane.

**Pirxandin** (k.jn.x.mê) Xirxirkirina mirov û candarê nivistî. (K) bdn : ez di pixînim em di pirxînîn, tu di pirxînî hûn di pirxînin, ew di pirxîne[...it] ewan di pirxînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di pirxand, di pirxandin. Db,dûr: pirxandibû, pirxandibûn. (F): bi pirxîne, bi pirxînin.

**Pirxepirxkirin** (k.jn.gl.mê) Xirxirkirin. Pirxandin. (K) bn : Kirin.

**Pirxîn** (k.jn.x.mê) Pirxandin. (K) bdn: ez di pirxim em di pirxîn, tu di pirxî hûn di pirxin, ew di pirxe[...it] ewan di pirxin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : ez di pirxîm, em, hûn, ewan di pirxîn, tu, ew di pirxî. Db,dûr : ez pirxîbûm em pirxîbûyn, tu pirxîbûy hûn pirxîbûn, ew pirxîbû ewan pirxîbûn. (F) : bi pirxe, bi pirxin.

**Pis** (n.x.nêr) Nivşê daykûbaban yê nêrîn. Kur. Law.: Ew pisê mine.ang lawê mine, kurê mine.

**Pisandin** (k.jn.x.mê) bn: Piçandin.

**Pisaxa** (n.l.nêr,malb,n.dz) 1.Kurê axan. Malmezin. 2.Tîreka kurdane li Kurdistnê.

**Pisepis** (n.dar.mê) bn: Pistepist.

**Pisepiskirin** (k.jn.l.mê) bn: Pistpistkirin.

**Pisîk** (n.x.dz) *candar* Pişîk.

**Pismam** (n.l.nêr). Kurê birayê babê. Kurmam. :Araz û armanc pismamêd hevin.

**Pismet** (n.l.nêr) Kurê xuşka babê. Kurmet.

**Pismîr** (maln,n.l.nêr) Ji malên mîran. Kurmîr.

**Pisole** (n.x.mê) Kazez yan karta navnîşan û bihayê kirîn û firotina pertalan.

**Pispis** (n.dar.mê) Pisepis.

**Pispiskirin** (k.jn.gl.mê) Pistepistkirin. (K) bn : Kirin.

**Pispor** (karn.x.dz) Kesê di warên cuda da şarezayî hebit. Zana. Şareza. : Ew pispore di dîroka kurdan da.ang; dîrokzane.

**Pisporî** (karn.dar.mê) Şarezayî.

**Pistepist** (n.l.mê) Axivtina hêdî tinê alîyê havildar tê di gehit. Di guhî da axivitn.

**Pistepistkirin** (k.jn.gl.mê) Pispistkirin.

**Pisto** (n.dar.nêr) Parçe pateyê kirasî yê ko patika[sitoyê] mirovî di girit her du serên wî li hefkê di gehin hev yan hevdu di girin.

**Pistpistkirin** (k.jn.l.mê) Di guhê hevda axivtin bêy ku kesê dî tê bi gehit. (K) bn: kirin.

**Pisxal** (n.l.nêr) Kurê birayê daykê. Kurxal.

**Pisxalet** (n.l.nêr) Kurê xuşka daykê. Kurxalet.

**Pisxaltî** (n.l.nêr) Pisxalet.

**Pisyar** (n.x.mê) 1.Heger mirovî daxazek hebit û ji kesekî bi kit, yan gotin, tiştek ne xuya bit dê daxaza şirovekirinê bi kit. Pirs.: Ev pisyare gelek ya bi zehmete. Br× Bersiv.2. Çevenga pisyarkirinê.

**Pisyar**

**Pisyarker** (hk.dar.çewa) Mirovê pir di pirse. Gelek pisyaran dike. *Pend* :Zanabe, pisyarker be.

**Pisyarkirin** (k.jn.l.mê) Pirsîn.:Ez dê pisyarekê ji te kem, lê bi rastî bersiva min bi de. Br × Bersivdan. (K) bn: Kirin.

**Piş** 1 (n.x.mê) *can* Mêlaka sor. Sîh.

**Piş** 2 ( hk.x.çewa) Tiştê nerim. Vil. Sist.

**Pişê** (ngaz.dar.mê) Gazikirin[navkirin]a pişîka mê.

**Pişêrandin** (k.jn.x.mê) Bişavtin. Bijartin.

**Pişik** (n.x.mê) 1. Pirt. Kher. Parçe. :Ji mitayê evsale du pişik bo cotkara ne. 2. Pirtên goştê xav, qelandî yan birajtî. :Firavîna evro pişkên goştî ne.3. Belgên hêşta ne vebûyîn.Pijkov.

**Pişikkirin** (k.jn.l.mê) Lêkvekirin. Parvekirin. (K) bn: Kirin.

**Pişîk** (nl.mê) Kitik.

**Pişkandin** (k.jn.x.mê) Bênijîn.

**Pişkanê** (n.dar.mê) Kiryara pişikkirinê. Sîstemê parvekirina mitayî, kelûpelan û htd.

**Pişkavtin** (k.jn.x.mê) Bişkivîn.

**Pişkil** (n.dar.mê) Pîsatî yên giyandaran yên kitkit; wek pişkilên kewal, kêrîşk, pezkûvî û htd.

**Pişkilkirin** (k.jn.l.mê) Dema giyanewer pişkilan diken. Rîtin. (K) bn : Kirin.

**Pişkinîn** (k.jn.x.mê) Lêgeran. Dîvçûn.

**Pişkîn** (k.jn.x.mê) Bêhnijîn.

**Pişkovk** (n.dar.mê) Belg yan gulên ne vebûyîn.

**Pişksal** (kn.dem) Demsal. Salwext.

**Pişkul** (n.dar.mê) Pişkil. Kersil.

**Pişo** (hd,ngaz.nêr) Gazîkirin [navkirin]a kitkê nêr. ***Pend*** : Mereqa pişoy jije[goşt]e.ang; mirovê karek, destkevtîyek tenê bo xwe bi vêt.

**Pişodan** (k.jn.l.mê) Bêhinvedan.

**Pişpiş** (hk.dar.çewa) 1. Wekî mirov yan xudan gazî pişîka xwe di ket.2. Dengê mirovê ginginî. Yan dema xewkirinê dengê pişpişê jê di hêt.

**Pişpişî** (hk.dar.çewa) Mirovê dengê pişepişê ji dev kepîyan di hêt.

**Pişpişkirin** (k.jnlmê) Wekî mirov yan giyanewer pişpişê di ke. (K) bn: Kirin.

**Pişt** (n.x.mê) 1.***can*** Alîyê leşê mirovî yê piştê. : Mirov ji rexê piştê ve.: Pişta wî di êşit jiber wî barekê giran hilgirtibû. Alê piştê. :Kirasê vî zarokî yê berûpişte. Ang: pişta wî zivrandîye berî û berevajî. (hk.dem) 2. Paş. Dawî 3.(n.x.mê) Hêz. Alîkar. :Pişta te ya germe , ma dê ji çi tirsî ! Ew yê bi pişte, ang : hêzek li pişt wî ye. 4. Hawîşkirna zarokan.Piştpişt jibo kirin.

**Pişt** (hk.x.çewa) Jina pûç. Orispî.

**Piştdan** (k.jn.l.mê) 1. Ji bîrkirin. Pûte pê nekiirn.2. Alîkarîkirin. Piştgirtin.(K) bn : Dan.

**Piştdest** (n.l.mê) Pişta destî.

**Pişteban** (n.l.mê) Alîyê piştê yê banî. Pişta xanî.

**Pişteder** (n.l.mê) Li şayîya jinînanê, dema veguhaztina bûkê, yek, çi jin yan mêr, dê dergehî girit û na veke û bûkê radigire ta dewatî ango mirovên zavayî diyarîyekê (pare) di denê.

**Piştevan** (hn,hk.dar.çewa) 1. Alîkar. 2. Navê xortane.

**Piştevanî** (n.dar.mê) Alîkarî. : Bi xebata kur û kiçên Kurdistanê û piştevanîya dostên me, welat ji siteмê rizgar bû.

**Piştgerim** (hk.l.çewa) Kesê bawerî bi xwe heye. Xwedî heval û mirov. Bi pişt. Bi xudan.

**Piştgermî** (n.l.mê) Bêminetî. : Piştgermî ya wî ji mirovên wî ye.

**Piştgirî** (n.l.mê) Alîkarî.

**Piştgirtin** (k.jn.l.mê) Alîkarîkirin. Harîkirin. Tagirtin.: Heger tu pişta min ne girî ez di vî karî da bi sernakevim.(K) bn : Girtin.

**Piştik** (hk.l.çewa) Jina pûç. Zelamê pûç. Bêrêz. Bêsinc. Bêrewişt.

**Piştî** (hk,nl.mnêr) 1.Bareke bi qayîda pişta mirovî di hê peytkirin û mirov bi pişta xwe ve di guhêzit cihê pêdvî. 2. (hk,dem,x) Paş. Paşî. :Piştî mal hemû sotî, tu di hewara me di hêy ?.

**Piştîk** (n.dar.mê) 1. Piştîyek biçûk.2. (n.dar.mê) Cihekê biçûk ku di kevit pişt yan ban tiştekî. 3. (n.dar.mê) *can* Sêkujîya di kevit bin zikî hindav endamê mîztinê yê mirovan.

**Piştkov** (hk.l.çewa) Piştkûd.

**Piştkûd** (hk.l.çewa) Mirovê pişta wî xar, nexasim pîremêr û pîrejin.

**Piştkûdbûn** (k.jn.gl.mê) Ji egera pîrbûn û nexweşîyan pişta mirovî di çemit. (K) bn :Bûn.

**Piştkûdî** (n.l.mê) *derd* Piştkûd. :Egera piştkûdî ya bapîrî ji nexweşîyê ye, ne ji pîrîyê.

**Piştkûdkirin** (k.jn.l.mê) Mirovê li rêveçûnê pişta xwe kûd di ket. Di çemîne. (K) bn: Kirin.

**Piştpê** (n.l.mê) Pişta pêyî. Banê pêyî.

**Piştpişt** (hn.l.mê) *deng* Dengeke jibo zarokên sava di bêjin, da hawîş bi bit yan keyfa wî bi hê, bi kenit.

**Piştpiştkirin** (k.jn.gl.mê) Piştpit jibo zarokan gotin. (K) bn : Kirim.

**Piştrast** (hk.l.çewa) Bawerî bi xwe hebûn. Bi hîvî.Dilinya.: Ez ji wî piştrastim dê di ezmûnên xwe da serkevit.

**Piştrastbûn** (k.jn.gl.mê) Dilinyabûn. : Piştrast be ez te na hêlim bi tinê. (K) bn: Bûn.

**Piştrastî** (n.l.mê) Bawerî. Dilinyayî.

**Piştrastkirin** (k.jn.gl.mê) Bi hîvî êxistin. Dilinyakirin.(K) bn : Kirin.

**Piştre** (hk.dem) Paşî. Dûre.

**Piştûpişt** (hk.l.çewa) 1. Paşve. Bo piştê. Bo alîyê piştê. : Pêyên wî jiber çûn, piştûpişt bi erdî kevt.

**Piştûpiştçûn** (k.jn.gl.mê) Wekî mirov ji tirsan, henek yan lîstin bi alîyê piştê ve di çit bêyî rûyê xwe bi zivrînit[vegerîne]. :Tirombêl piştûpişt di çe. (K) bn: Çûn.

**Piştxar** (hk.l.çewa) bn: Piştkûd.

**Piştxarî** (n.l.mê) bn: piştkûdî.

**Pişû** 2 (n.x) Bêhinvedan.

**Pit** 1 (hn.x.çewa) Girover. Xir. Ciwan.

**Pit** 2 (n.x.nêr) Xudayên ji kevir û daran di hatîn diriskirin, hindek miletan di peristin. Pot.

**Pit** 3 (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayek biçûk ko ji cihekî derdi kevit.

**Pitat** (nx.mê) ***giya*** 1. Giyayeke di hêt çandin mifa ji berê wî di hêt wergirtin. 2. Serikên pitatê şêwe xir, hêk û htd. Gelek corên xwarinê jê di hên çêkirin. Kirtopk.

**Pitax** (n.x.mê) Xolî. Xwelî.

**Pitepit** (n.dar.mê) Pitpit. Gazin. Birmebirm.

**Pitepitî** (hk.dar.çewa) Mirovê devgazin. Mirovê hertim pitpitê di ke. : Jinka pipitî.

**Pitepitkirin** (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Mirov pitepitê di ke. (K) bn: Kirin.

**Pitew** (hk.x.çewa) Qayîm. Mikum.

**Pitê** (hd,gaz,n.mê) Gazîkirin[ navkirina] kiçik yan jina qelew, hûr û ciwan.

**Pitir** (hk.çend) Zortir. Gelektit. Pêtir.

**Pitirî** (hk,çend ) Piranî. Bara pitir.

**Pito** (hk.hd,gaz.nêr) Gazîkirin yan naznava xortê qelew û girover.

**Pitpit** (n.dar.mê) Gazinde. Pindepind.

**Pitpitî** (hn.dar.çewa) Mirovê her gav pitepitê di ke. Hez ji pitpitê di ke. Devgazinde.

**Pitpitkirin** (k.jn.l.mê) Gazindekirin. Pir gotin. (K) bn : Kirin.

**Piv** (n.x.mê) Bayê bi deng yê ji paşîyê der di kevit.

**Pivdank** (n.dar.mê) bn :Pifdank.

**Pivken** (hk.dar.çewa) Mirovê pivan di ket.

**Pivkirin** (k.jn.l.mê) Derkevtina bayê nav zikî. (K) bn : Kirin.

**Pix** (n.x.mê) *deng* Dengek taybete jibo tirsandinê bi kar di hînin.

**Pixkirin** (k.jn.l.mê) 1. Weke mirov xeweka giran da bit û dengê pixpixê ji mirovî bi hêt. :Hevalî yê pixkirî ye xewê. 2. Dema hajûtina karikan dengê pixpixê di ken dako bi çin.3. Eger mirovî bi vêt êkî bi tirsîne dê dengê pixênê ji xwe bi hîne. : Pixkirê. (K) bn : Kirin.

**Pixok** (n.dar.mê) Tiveng bi zarê taybet yê zaroyan.

**Piyade** (hk.dar.çewa) Mirovên bi pêyan bi rê di gerin. Peyade.

**Piyale** (ndar.mê) Şûşeyên vexwarina çayê. Peyale.

**Piyano** (nbiya.mê) *mûzîk* Amêrek mûzîkê ye.

**Piyase** (n.dar.mê) Bi rêveçûna hêdî. Hatinûçûneka hêdî. Li ser [pêyên]xwe geryan. Geryan.

**Piyasekirin** (k.jn.l.mê) Wekî mirov li ser pêyan hêdî di gere. Hatinûçûna hêdî.:Dê ka werin da piyasekê bi kîn, berîya firavîn berhev di be. (K) bn:Kirin.

**Piyaw** (n.x.nêr) bn : Peya .Zelam.

**Piz** (n.x.mê) Zaro yan têjikê candaran yê di zikê dayk yan makêda. Sava. Têjik.

**Pizdan** (n.dar.mê) Cihê zaro, yan têjikên giyandaran têda dirist di be, di nav zikî da.

**Pizê** (hn.hd,gazmê) Naznav yan gazîkirina zaroka sava.

**Pizînk** (n.dar.nêr) Memik yan mêjokê lastîkî, yê di kin di devê zarokên sava da, dako tena bi bin.

**Pizîşk** (pîşn.x.dz) Dixtor. Diktor. Nojdar.

**Pizîşkî** (karn.dar.mê) Nojdarî.

**Pizo** (hn,pesin.nêr) Naznav yan gazikirina zarokê sava.

**Pî** 1 (n.x.nê) *can* Pê.Ling.

**Pî** 2 (n.x.mê) *can* Pidî.

**Pîç** (hk.x.çewa) Nebaş. Neçak. Neqenc. Pûç. Kêrnehatî. Bêbiha. Bêrûmet. Xirş.

**Pîçatî** (n.dar.mê) Karên pîç. Kiryarên nebaş. Pûçatî.

**Pîçbûn** (k.jn.l.mê) Dema tiştek, xwarin genî, gemar di be yan mirov ji rêya rast der di kevit. Pûçbûn. (K) bn : Bûn.

**Pî<u>çek</u>** 1 (hk.dar.çewa) Mirovê pîç. Mirovê kêrnehatî.

**<u>Pî</u>çek** 2 (hk.x.çend) Hindik. Kêm. Piçek.: Pîçek ya may dê roj ava bit.

**Pî<u>çê</u>** (hn.gaz.mê) Jina bi kêrnehatî. Jina pîç.

**Pîç<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Weke mirov tiştekî bê biha bi ke. Mirov karekî têk bi de. Pûçkirin. (K) bn : Kirin.

**Pî<u>ço</u>** (hn.gaz.nêr) Zelamê. Peyayê pîç.

**<u>Pîç</u>pîç** (hn.çend) Hindikhindik. Piçpiçe. Kêmkême. :Pîçpîç ezê tê di gehim.

**<u>Pîd</u>za** (n.biyan.mê) Corek sawikane bi goşt, penîr, kivarik û gelek xwarinên din têkel kirîne.

**Pîk** 1 (n.x.mê) 1. ***deng*** Dengek zirav ji encama der kevtina bayî ji dev, pivdank û htd peyda di be. 2. Pîka zirnayê, dudikê bilorê û htd ya bi pifkirina hêza bayî dengek xweş û nazik jê peyda di bit.

**Pîk** 2 (n.x.mê) 2. Pişka dara ter ya berhevkirî jibo pîk yan petromekirinê.

**Pî<u>keb</u>** (n.biyan.mê) Corek tirombêlane.

**Pîk<u>kirin</u>** 1 (k.jn.l.mê) Wekî mirov pişkeka dareka ter li dareka din di de jibo berek baştir peyda bi bit.

**Pîk<u>kirin</u>** 2 (k.jn.l.mê) ***deng*** Dema ba ji ber yekî di hêt dengek wek pîkê jê bi hêt. (K) bn : kirin.

**Pîl** 1 (n.x.nêr) Parçe kaxezkeka biçûke, wêne û nivêsîn li ser rexekî nexşandîne alê din yê nîseke, li bergnameyan di din wek giroveya pareyê şandinê.

**Pîl** 2 (n.x.mê) Patirîyên radyo, tomar, demhijmêr û htd.

**Pî<u>la</u>** (n.x.mê) 1. Core asinekê req û gelek qayîme. Pola. 2. Nîşana hêz û xweragirîyê ye.

**Pî<u>lan</u>** (n.x.mê) Pêkola jinavbirin yan lewazkirina bizavekê. :Darijtina nexşeyên neyînî dijî kes yan desteyekê. :Pîlanêd dujminî jibo vemirandina bizava gelê kurd bingor bûn.

**Pîlan<u>gêran</u>** (k.jn.l.mê) Pîlan dijî alîyekî encam dan.

**Pîlan<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Pîlangêran. : Neyar di xwazin dijî me pîlanan bi kin.

**Pîlik** 1 (n.x.nêr) Kesê navbera malên bûk û zava hatinûçûnê di ke ji serûberkirina karê şayî yê. Postevan. Teter.

**Pîlik** 2 (n.x.nêr) Amanek lûleyî ye şîrî jibo zarokan  tê di xin. Memik.



**Pîlik**

**Pînce** (n.x.nêr) Parçe. Pinî. Pirt. Seçme.

**Pîng** (n.x.nêr) ***giya*** Giyayekê kesk û bêhinxweşe, li ser çok û beravan hişîn di be.

**Pîq** 1 (n.x.mê) 1. Baskên pêyên mirovan. Baq.

**Pîq** 2 (n.x.mê) Pîsatîyê ron yê giyandaran. Fîş.

**Pîr** 1(hk.x.çewa) Jîdirêj. Bi temen. Kevin. :Pîremêrekê pîr. Jineka pîr,.Bizina pîr.

**Pîr** 2 (karn.x) Yek ji texeyên oldarên dînê êzdîyan.

**Pîran** (hk.cihdevern) 1.Devere, gundeke li Kurdistana bakûr.Wargeha şêx Se`îdê Pîran.2. Navê xortane.

**Pîratî** (n.dar.mê) Navsalveçûn. Kevinî. ***Pend***: pîratî û hizar derd. ***Pend*** :Mirin heba, pîratî tuneba.

**Pîrbûn** (k.jn.l.mê) bi Navsalveçûn. Kevinbûn. ***Pend*** :Ez pîrbûm lê dil pîr nabit. (K) bn: Bûn.

**Pîrebizin** (n.l.mê) Bizin a pîr.

**Pîrejin** (n.l.mê) Jina bi navsalveçûyî. Jina pîr.

**Pîrek** (n.x.mê) Jin . Afret.

**Pîremêr** (n.l.nêr) Zelamê pîr. Mêrê pîr. Kevnemêr. Qertemêr.

**Pîreseg** (n.l.nêr) Seyê pîr.

**Pîrê** (hn.hd,gaz.mê) Naznav û gazîkirina jina pîr yan dapîrê.

**Pîrhevî** (n.dar.mê)  Di çîrokan da pîrejinên sêrebaz, kirêt, kêlbedirêj, li gêzikan siyar di bin û dengê kenîyeka kirêt ji xwe di hînin, zarokan di dizin ji xwere di kin xizmetkar.

**Pîrhevok** (n.dar.mê) Pîrhevî.

**Pîrik** 1 (n.dar.mê) 1.Dapîr.2. Dapîroşk.

**Pîrik** 2 (n.dar.mê) *candar* Tevinpîrk.

**Pîris** (hk,cugirn) 1. Çiyayeke li devera Akrê, Kurdistana Iraqê.2. Navekê kurdî yê mêrane.

**Pîrî** (n.dar.mê) bn: Pîratî.

**Pîrkirin** (k.jn.l.mê) Kevinkirin. : Xem û kovanan em pîr kirîn. :Ez pîr nebûm, te ez pîr kirim. (K) bn: Kirin.

**Pîrmem** (hkcih.l) Bajêrkekê ciwan û havîgeheka dilvekere, ser bi Hewlêrê ve li Kurdistana Iraqê. Selahedin.

**Pîroz** (hk.n.x.çewa) 1.Tiştê xelik rêzê lê di girin. Bi rûmet. Cihê pîroz. Navê pîroz. Bîranînên pîroz. :Rojên pîroz. 2. Navê pîrekane.

**Pîrozbayî** (n.dar.mê) bn : Pîrozî.

**Pîrozî** (n.dar.mê) Pîrozkirin. : Em çûn pîrozî ya xanîyê dostê xwe.

**Pîrozkirin** (k.jn.l.mê) Mirov li hilkefteke, cejnekê daxaza serfirazîyê û borandina demek xweş û dileveker bo kes yan alîyekî bi ket. :Cejna hewe pîroz bit. şayî ya hewe pîroz be. Cejna bûna te pîroz bit.

**Pîrozname** (n.l.mê) Kart yan kaxezeke mirov ji hevalek yan nasekî ra di hinêrit, bi helkefteka xweş, têda mirov aheng, cejin, yan keyfa wan pîroz di ke.

**Pîrûpend** (n.l.mê) Mamik. Têderxistinok.

**Pîrt** (n.x.nêr) Komeka mûyan. Por. Pirç. Mû. *Pend* :Mêrê bi pîrt.

**Pîs** (hk.x.çewa) Gemar. Herimî. Nepaqij. Qirêjî.

**Pîsatî** (n.dar.mê) Tiştê pîs. Gemar. Pîsî.

**Pîsbûn** (k.jn.l.mê) Wekî tiştek, mitayek, mirovek û htd, pîs di bit. Gemarbûn. Genîbûn. :Ev ave ya pîs bûy!.:Gora te gelek pîs bi bû!.(K) bn: Bûn.

**Pîsê** (hn.gaz.dar.mê) Jina pîs.Jima kirêt.

**Pîsî** (n.dar.mê) Tiştê pîs. Pîsayî. Pîsatî.

**Pîskirin** (k.jn.l.mê) Herimandin. Gemarkirin. : Vî zarokî yê xwe pîs kirî. :Min destên xwe pîs  kiirn. (K) bn: Kirin.

**Pîso** (hn.gaz.dar.nêr) Zelamê pîs. Mêrê gemar.

**Pîst** (n.x.nêr) *can* 1.Çerim ê giyandaran piştî tamdan û xweşkirin[peytkirin]ê xwerinên rêçalî di xin nav, wek jajî û penîr.2.Çerim.

**Pîş** (n.x.nêr) Giyayê behî. Hişik. Pelex. *Pend* :Palê pîşî. ang ; karê çi pêve nehêt.

**Pîşangeh** (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê nîşadana kelûpalan. 2. Cihê firotina kelûpelan.firoşgeh.

**Pîşe** (n.x.mê) Zanîn û xwandina mirovî jibo karî. Kar. Karbend.

**Pît** (nx.mê) Pêkahatîya peyvan. Bêje. Tîp. :Pîta êkê ji peyva welat ;w; e

**Pîte** (n.x.mê) Giringî. Sexbêrî.

**Pîtedan** pîtepêdan (k.jn.l.mê) Giringî pê dan. Pîte pê dan. (K) bn: Dan.

**Pîtepêkirin** (k.jn.l.mê) Giringî pêdan. :Evro seyday gelek pîte bi havalî di kir!. (K) bn: Kirin.

**Pîtepênekirin** (k.jn.l.mê) Piştguh ve havêtin. Xwe bi serve ne birin.: Ez di ber ra çûm, min çi pîte pê nekir. :Seydayê çi pîte bi min ne kir, diyare yê sile. (K) bn : Kirin.

**Pîvan** (k.jn.x.mê) Hilsengandin. Sengandin. Kêşan. Baristekirin. (K) bdn: ez di pîvim em di pîvîn, tu di pîvî hûn di pîvin, ew di pîve […it] ewan di pîvin. Pr: dê [bi] pîvim, pîvîn, pîvî, pîvin, pîve[..ve], pîvin. Bdb: di pîva, di pîvan. Db,dûr: pîvabû, pîvabûn. (F): bi pîve, bi pîvin.

**Pîvandin** (k.jn.x.mê) Pîvan. Baristekirin. Di pîvînit, bi pîvînin.

**Pîvaz** (n.x.mê) *giya* Mitayeke serik û bistî yên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, tama wê tîj yan şirîne şêwe xir yan hêkî ye , rengên sipî û sor hene. Pîvaza ;sor, sipî, şirîn û tîj. *Pend* :Yê pîvazê ne xwe bêhin ji devî nahêt.ang mirov na havêt çi kesan heger karek şaş ne kiribe.

**Pîvazok** (n.dar.mê) *giya* 1.Pîvaza ter. Pîvaztek.2. Serik. Serikên hinde gulan.

**Pîvazterk** (n.l.mê) *giya* Pîvazên ter,yên begên wan hêjta di kesik û bi kêr xwarinê di hên. hişîn. Pîvazok.



**Pîvazterk**

**Pîver** (n.dar.nêr) *endaze* Yekeya pîvana  tiştan. Terazî. Terazo.

**Pîvok** (n.x.mê) *giya* Giyanekê kûvî ye serikekê sipî di nav pîşkekî da heye û tinê pitatka wî di hêt xwarin.

**Pîyase** (hn.l.mê) bn: Piyase.

**Pîz** (n.x.mê) *giya* Giyayekê tere li ber avan hişîn di bit û bi terî di hêt xwarin.

**Pîzang** (n.x.mê) Stêng.

**PKK** (kurt) Parteka sîyasî ya kurdî ye li Kurdistana Tirkî, bi navê ;Partîya Karkerên Kurdistanê.

**Pol** (n.x.mê) Rêzên xwandinê. : Birayê min li pola pêncê ye.

**Pola** (n.x.mê) Pîla.

**Polîs** (karn.x.dz) Fermanbereke bi cilên fermî, karê wî paraztina yasa, can û malê xelikî ye.

**Polîsxane** (hk.cih,n.dar.mê) Baregehê polîsan.

**Polonya** (hk.cih,welatn.cih) Walatekêewropa rojhitî ye.

**Polonî** (nejad.l) 1. Xelkê Polonya. 2. Mitayê Polonî. 3. Zimanê Polonî.

**Ponijîn** (k.jn.x.mê) Hizirkirin. Bêdeng man. (K) bdn: ez di ponijim, em di pnijîn, tu di ponijî hûn di ponijin, ew di ponije[...it] ewan di ponijn. Pr : dê [bi ]ponijim, ponijî, ponijin,..Bdb : ez di ponijîm, em, hûn,ewan di ponijîn, tu,ew di ponijî. Db,dûr : ez ponijîbûm em ponijîbûyn(bûn), tu ponijîbûy hûn, ewan ponijîbûn, ew ponijîbû. (F) :bi ponije, bi ponijin.

**Por** 1 (n.x.mê) Pirç. :Pora sor. :Pora zer. :Pora kurt. :Pora dirêj.

**Por** 2 (n.x.dz) *balinde* Perindeyekê hêkkere, dengxweşe, di nav daristan û rezan da di jît.



**Por**

**Porpor** (n.dar.mê) Pitpit. Pitepit. Pilepil.

**Posîde** (hk.x.çewa)  Mirovê bêgêwil. Têkçûyî. Mirûto. :Te çiye tu hosa yê posîde?.

**Posîdebûn** (k.jn.l.mê) Wekî mirov bê gêwil di be.: Duh tu gelekê posîde bûy te çi bo? (K) bn: Bûn.

**Posîdekirin** (k.jn.l.mê) Hêriskirin. Bêgêwilkirin. :Xwe posîde ne ke!.

**Post** 1 (n.x.mê) Name.

**Post** 2 (n.x.nêr) *can* Pîst.

**Posteçî** (karn, l.dz) Mirovê karê poste ve guhastinê di ket. Teter. Postevan.

**Postevan** (karn.dar.dz) Poseçî.

**Postxane** (hk.cih,n.dar.mê) Avayî karên poteyî.

**Poş** (hk.x.çewa) Rengê sipî yê ser şînî ve. :Pirça nîvnîve sipî û reş, wek şîn xuya di ke. Bizina poş, pora poş. :Pora wê ya poşe.

**Poşbûn** (k.jn.l.mê) Dema pora serê mirovî sipî di bit. (K) bn:Bûn.

**Poşî** (n.x.mê) Xêlî. Dersok.

**Poşîreş** (hn.l.çewa) Mirovê poşîya reş di ke serê xwe, nexasim jin.

**Poşîreşk** (n.l.mê) *candar* Corek kirmikane li biharan peyda di bin. Zarok stranan jêra di bêjin û destan di qutin [ qutim, qutim poşîreş, kiras sorê biharê] û ew di gel awazê di leyzin.

**Poşman** (hn,hk.x.çewa) bn: Peşêman.

**Poşmanbûn** (k.jn.l.mê) bn: Peşêmanbûn.

**Poşmanî** (n.dar.mê) bn: Peşêmanî.

**Poşmankirin** (k.jn.l.mê) Peşênkirin.

**Poxîn** (n.x.mê) Xwarineke, arê genim, nok, xurnîfk û htd di gel şekirê têkelkirî ye.

**Poz** (n.x.nêr) 1.Difin. Kepî. 2. Paşî.

**Pozbadan** (k.jn.l.mê) Xwe mirûtokirin. Difinbadan.

**Pozberan** (hk.l.çewa) Mirovê kepîya wî wek a beranane.Difinberan.

**Pozbilind** (hk.l.çewa) Difinbilind.

**Pozbilindî** (n.l.mê) Difinbilindî.

**Pozxane** (hk.cih) Girtîgeh.

**Proje** (n.x.nêr) Nexşe. Pilan. Karname.

**Program** (nbiyan.x.mê) Bername.

**Propagenda** (n.dar.biyan.mê) Ragehandina berdij ya lewazkirina û jinav birina projeyên dujmin yan hevrikan.

**Prose** (hnx,biyan.mê) Bizava bêkuta jibo bi cih înana nexşeyên darijtî, kar bo hatî kirin. Proseya dengdanê, aşitî yê û htd.

**Prove** (hn.biyan.mê) Xwe berhev kirin jibo encamdana çelengîyeka , hunerî, siyasî û htd. Rahatin.

**Puxte** (n.x) Naverok.

**Pûç** (hk.x.çewa) bn: Pîç.

**Pûçatî** (n.dar.mê) bn: Pîçatî.

**Pûçbûn** (k.jn.l.mê) bn: Pîçbûn.

**Pûçî** (ndar.mê) Pûçatî.

**Pûçkirin** (k.jnlmê) bn: Pîçkirin.

**Pûjan** (n.x.mê) Pîng.

**Pûl** (n.x.nêr) Pîl.

**Pûr** (n.x.mê) Avdestxane. Destavxane.

**Pûrt** (n.x.nêr) Pîrt.

**Pûş** (n.x.nêr) Pwîş

**Pûşî** (n.x.mê) Hîşar. kefîk. Kesrewan.

**Pût** (n.x.mê) Bêlava nerim ji pateyî , bendikan. Kale.

**Pûte** (n.x.mê) Pîte.

**Pûtepêdan** (k.jn.l.mê) Pîtedan.

**Pûtepêkirin** (k.jn.l.mê) Pîtepêkirin.

**Pûtîn** (nl.mê) bn: Pût.

**Pwîte** , bn: Pîte.

**PYSK** (kurt) Partîya Yeketîya Sosyalîsta Kurdistan. Li 21-27.04.1996 hatîye avakirin.

# Q

**Q** (qe) Pîta bîstê ji abeya kurdî.

**Qaç** (nx.mê) *darûbar* bn :Hevrist.

**Qaçax** (hk.x.çewa) 1.Bazirganîya nerewa. Karê nerewa. 2. Ji derveyî qanûnê.3. Navek kurdî yê mêrane.

**Qaçaxbûn** (k.jn.l.mê) Revîn ji qanûnê, ji zorîyê, ji sitemê. Der bi der bûn.(K) bn: Bûn.

**Qaçaxçî** (karn.dar.dz) Bazirganê mita û karên qaçax.

**Qaçaxçîyatî** (karn.dar.mê) Karê qaçax. Karê nerewa.

**Qaçik** (n.dar.mê) *giya* Corekê giyayî ye wek benîştî di cûn.

**Qaçikêşivanî** (n.l.nêr) *giya* Giyayek rengê wî boze, şivan di xin divê xweda mîna benîştî di cûn.

**Qad** (n.x.mê) Meydan. Cih. Delîve. :Qada xebatê, qada pevçûnê, xwandinê û htd.

**Qadûk** (n.x.mê) Setil.

**Qaf** (n.x.nêr) Tiştê req û vala, xilûle wek tirarî .Qafê serî, :Nojdarî qafê serê wî rakir. Qafê kulindî.:Qafê gulan û htd. Şikev.

**Qafbûn** (k.jn.l.mê) Pirtbûn. Kerbûn(kherbûn). :Serê wî qaf bû.

**Qafê** (hk.cih,n.x.mê) Çiyayek evsaneyîye, di çîvanokan da heye.

**Qafik** (n.dar.nêr) Amanek şêwe lûleyîye ji axa cerikan çê di ken. Cerik.Guldan. Tirar.

**Qafkirin** (k.jn.l.mê) Pirtkirina wek qafan. :Serî wî qaf kir. (K) bn: Kirin.

**Qafqaf** (hn.l) Pirtên wek qafan, wek tiraran. Pirtpirt.

**Qafqafbûn** (k.jn.l.mê) Pirtikîn. :Cer ji milî keft qafqaf bû.

**Qafqafkirin** (k.jn.gl.mê) bn: Qafkirin.

**Qaj** (n.x.mê) Morik. Morika gustîlkê.

**Qajeqaj** (n.l.mê) *deng* 1. Qîjeqîj. 2. Dengê qelereşkan.

**Qajeqajkirin** (k.jn.gl.mê) Qareqarkirin. Qîjeqîjkirin. (K) bn:Kirin.

**Qajên** (n.dar.mê) *deng* Qîjên. Qajeqaj.

**Qajênkirin** (k.jn.l.mê) Qîjandin.

**Qal** (n.x.mê) Pirteka req, pan û tenik.

**Qalib** (n.x.nêr) Bergek req û qayîme jibo têxistin û peytkirina tiştî. Qalibê libneyan, bilokan birînê; bilokan têda dirist di ken dako hemû wek yek der bên.

**Qalik** (n.x.mê) 1.Amankên valakirî, elbikên valakirî. Qalikên fîşkekan; fîşekên hatîn bi kar anîn[teqandin]. 2. Kavlan. Qalika şûrî, xencerê.

**Qam** 1 (nx.mê) Rex. Al.

**Qam** 2 (n.x.mê) Bejin.

**Qam** 3 (hk.x.çewa) Rewşt. Sinc.:Mirovek bi qame, qamdare, bi since. :Zarokekê bêqame; ang nerawestay. Nehecimî.

**Qamçî** (n.x.mê) Kinifekê reqe destikek heye jibo lêda[qutan]ê bi kar dihînin. Darxîç.

**Qamçîkirin** (k.jn.l.mê) Bi qamçîyan lêxistin. Qamçî lêdan.

**Qamçîlêdan** (k.jn.l.mê) Qamçîkirin.

**Qamçîlêxistin** (k.jn.gl.mê) Qamçîkirin.

**Qamdar** (hk.dar.çewa) Bi sinc. Sincan. Xwedî rewşt.

**Qame** (n.x.nêr) Sator yan kêrikek, bi serê tivengan ve ye jibo karên leşkerî bikar dihêt.Qeme.

**Qamik** (n.dar.pir) 1. Girêçikên tilîyên destê mirovî. 2. Tilîya beranî.

**Qamiş** (n.x.mê) Qamîş.

**Qamîş** (nx.mê) Leven . Qerem.

**Qamîşlo** (hk.cih,curig.n) Bajêreke li Kurdistanê- Sûrya.

**Qanûn** (n.x.mê) Yasa.

**Qanûnî** (hk.dar.çewa) Yasayî.

**Qanûnvan** (karn.dar.dz) Pisporê warê zanîna qanûnê.Yasavan.

**Qanûnzan** (karn.dar.dz) Qanûnvan.

**Qap** (n.x.mê) Gotina ji qebarê xwe mezintir. Axivtina gir û qelew.

**Qapberdan** (k.jn.l.mê) Mirovê gotinên ji ji xwe mezintir bi ke. (K) bn: Berdan.

**Qapê** (hdgazn.dar..mê) Navkirin[gazîkirin]a jina bi qap. Axivtinmezin.

**Qapik** (n.l.mê) Dergehk. Dervank . Derpoşk.

**Qapo** (hd,ngazn.dar.nêr) Navkirin[gazîkirin]a mêrê bi qap.Axivtinmezin.

**Qapût** (n.x.nêr) Sako. Qemsele.

**Qarandin** (k.jn.x.mê) Qîjandin. (K) bdn: ez di qarînim em di qarînîn, tu di qarînî hûn di qarînin, ew di qarîne[...it] ewan di qarînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qarandi, di qarandin.Db,dûr : qarandibû, qarandibûn. (F) : bi qarîne, bi qarînin.

**Qareman** (hn,hk,.dar.çewa) Qehreman.

**Qareqar** (n.dar.mê) bn: Karekar.Qêjî.

**Qareqarkirin** (k.jn.gl.mê) Qîjandin. Qîjkirin. (K) bn: Kirin.

**Qarê** (n.dar.mê) yarî Lîztikên zarokane di ken qêrî bi gotina {qarê}û bi lez baz di din bêyî bêhina xwe bînin ta di gehin cihê desnîşankirî.

**Qarên** (n.dar.mê) *deng* Dengek bilind ji xwe derêxistin, ji encama tirs, yan janan. :Dema nojdarî birîna zarokî derman di kir,qarên jê hat. Qîjên.

**Qarik** (hk.dar.çewa) Mirovê bêçare. Mirovê lewaz.

**Qarome** (n.x.nêr) Qerome.

**Qaş** (n.x.mê) Morîka ciwan a di nav gustîl û ristikan da.: Qaşa gustîla min ya şîne.

**Qaşkirin** (k.jn.l.mê) 1.Nexşandin.2.Qaş liser danan.

**Qawe** (n.x.mê) Qehwe.

**Qayde** (hk.x.çewa) Bi qayde , Bi kêr di hêt. Fît. : Ev pêlave bi qayîda pêyên mine.

**Qayîk** (n.x.mê) Belem. Kelek.

**Qayîkvan** (karn.dz.dz) Kelekvan.

**Qayîl** (hk.x.çewa) Nedij. Pêra. Razî.

**Qayîlbûn** (k.jn.l.mê) Pejirandin. Hatin ser rê. :Birayê wê pir hîvî jê kirin, ko qayîl bi be mêr bi ke.(K) bn: Bûn.

**Qayîlkirin** (k.jn.l.mê) Razîkirin. Serrêkirin.(K) bn: Kirin.

**Qayîm** (hk.x.çewa) Bi hêz. Tund.

**Qayîmbûn** (k.jn.l.mê) Tundbûn. Bi hêzbûn. : Hindî banî bi gêrî pitir qayîm di bit.(K) bn: Bûn.

**Qayîmî** (n.dar.mê) Hêz. Tundî.


**Qayîmkirin** (k.jn.l.mê) Tundkirin. Bi hêzkirin. :Xwe qayîm bi ke, gelek nemaye, dê gehîn serê çiyayî!..

**Qayîmtir** (n.hevber) Tundtir.

**Qayîmtirîn** (n.hevber) Tundtirîn. Ji heman tundtir.

**Qayîş** (n.x.mê) Parçek pan û dirêje ji çemê giyandaran, perok, yan naylonî hatî ye çêkirin, mirov jibo girêdan û tundkirina pişta xwe, yan peytkirina bar û tiştên din bi kar di hînin. Kemer. Davek.

**Qaz** (n.x.mê) ***balinde*** Firindeyekê hêkker , hişkavîye,kûvî yan kehî ye.




**Qaz**

**Qazan** (n.x.mê) Amanê kelandina avê yan lênana zadî. Mencel.

**Qazî** (n.biyan.nêr) Zanayê ola Isamê.

**Qazîbaz** (n.l.mê) ***kêzik*** Kêzikeka ciwan û perrengîne, zarok yarîyan pê di ken.



**Qazîbaz**

**Qazîbezînk** (n.l.mê) Qazîbaz.

**Qebare** (n.x.mê) Mezinîya tenan. Mezinîna amanên ragirtina tiştî.

**Qebe** (hk.çewa.çewa) Gir. Mezin. Ava. :Ewê henê çendê qebeye, dê bêjî mîre!.

**Qebekirin** (k.jn.l.mê) Xwe qebekirin. xwe ragirtin. Xwe mezinkirin. (K) bn: Kirin.

**Qebiz** (hk.x.çewa) Wekî desnivêja mirovî nîvreq di bit. : Ev zaroke yê qebize.ang; bi zehmet desnivêjê di ke. Pr ×Hinavêş.

**Qebizbûn** (k.jn.l.mê) Mirov û candaran toşî qebizîyê di bin. (K) bn: Bûn.

**Qebizî** (n.dar.mê) *derd* Qebizbûn.

**Qbizkirin** (k.jn.l.mê) Qebizbûn. : Zadê xwaringehan ezê qebiz kirîm. (K) bn: Kirin

**Qebîn** (k.jn.x.mê) Dema kew di xwînit. Di qebit. Xurîna kewan. Xwandina kewan. Lêheytandin. lêxurîn. (K) bdn: ez di qebim em di qibîn, tu di qebî hûn di qebin, ew di qebe[...it] ewan di qebin. Pr :dê[bi] +bdn. Bdb: ez di qebîm em di qebîn, tu di qebî hûn di qebîn, ew di qebî ewan di qebûn. Db,dûr: ez qebîbûn em qebîbûyn, tu qebîbûy hûn qebîbûn, ew qebûbû ewan qebîbûn. (F): bi qebe, bi qebin.

**Qebqeb** (n.dar.mê) *deng* Dengê xwandina kewan.

**Qebqebkirin** (k.jn.l.mê) bn :Qebîn.

**Qeçax** (hk.x.çewa) bn : Qaçax.

**Qed** (n.x.mê) Ta. Bejin.

**Qedare** (n.dar.mê) Çendîya berhevkirî ko hindî pêdvî, hindî amanî. : Qedareyê birincê, du pedaxên avê di gel du yên birincê.

**Qedexe** (hk.x.çewa) Nehêlana kirina karekî. Nabit .berbend. : Cigarekêşan qedexeye.: Çûne jûr qedexeye.

**Qedexebûn** (k.jn.l.mê) Nehêlan. Berbendbûn.

**Qedexekirin** (k.jn.l.mê) Berbendkirin. Nehêlan. Nehiştin.

**Qedir** (n.x.nêr) Rêz. Rûmet.

**Qedirgiran** (hk.l.çewa) Birêz. Rêzdar. Xwedî qedir. Bi rûmet. Hêja. : Mêvanên qedirgiran hûn gelek bi xêr hatin.

**Qedirgirtin** (k.jn.l.mê) Rêzgirtin. Rûmetgirtin. : Camêrî gelek qedrê me girt dema em lê bûn mêvan. (K) bn : Girtin.

**Qedîfe** (n.x.mê) Corekê perokane.

**Qefare** 1 (n.x.nêr) Qerome.

**Qefare** 2 (n.x.nêr) Kilîleka mezine ji darî ye jibo daxistina dergehan bi kar di hêt. Kîlûn.

**Qefarekirin** (k.jn.l.mê) Daxistin. Kilîldan. (K) bn: kirin.

**Qefes** (n.l.mê) Avayîyeke bi şivikên darî, asinî û yan kinifî bo parastina mitayî yan xwedîkirina gîyandaran, balindeyan. Rikeh. Qefesa : kewan, singî, amanan û htd.

**Qeft** (n.x.mê) Destik. Gurz. Qefteka gulan ; destkekê gulan.: Qefteka gulan jibo hevala xwe kir diyarî.

**Qeftan** (n.x.mê) Fîstan. Kiras.Xiftan.

**Qehreman** (hk.x.çewa) Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs. Zîrek.

**Qehremanî** (n.dar.mê) Zîrekî. Mêrxasî.

**Qehwayî** (hk.dar.çewa) Rengekek taybete. Rengê qehwê.

**Qehwe** (n.x.mê) Corekê vexwarina gerim yan sar e, reng qehwayîyek ser reşîve ye.

**Qehwevan** (karn.dar.dz) Xwedî yan kesê qehweyê di de mêvan. Xudanê qehwexanê.

**Qehwexane** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê, xanîyê vexwarina qehwê. Çayxane.

**Qelaçokirin** (k.jn.dar.mê) Jinav birin. Qelandin.

**Qelaçolan** (hk.cih) Bajêreke li Kurdistanê, devera Silêmanî.

**Qelandin** 1 (k.jn.da.rmê) 1. Kelandina zadên wek hêk, goşt, giya û htd, di rûnî da, yan bi hişkî li ser agirî, wek nanî : Firavîna me evro goştê qelandî ye. (K) bdn: ez di qelînim em di qelînîn, tu di qelînî hûn di qelînin, ew di qelînit[..ne] ewan di qelînin. Pr: dê bi +bdn. bdb: di qeland, di qelandin. Db,dûr : qelandibû, … bûn. (F): bi qelîne, bi qelînin.

**Qelandin** 2 (k.jn.x.mê) Ji holê rakirin. Ji navbirin.: Dujmin di xwazin me bi qelînin. (K) bdn: ez di qelînim em di qelînîn, tu di qelînî hûn di qelînin, ew di qelînit[..ne] ewan di qelînin. Pr: dê bi +bdn. bdb: di qeland, di qelandin. Db,dûr : qelandibû, … bûn. (F): bi qelîne, bi qelînin.

**Qelebask** (n.dar.mê) Qişqilank.

**Qelebelok** (n.dar.mê) Qişqilank.

**Qelefil** (n.x.mê) Corekê xizêmane, xire û wek gulane û bi birxûye jin dixin difina xwe.

**Qelem** (n.x.nêr) Pênivîs. Xame. Kelem.: Qelemrisas, qelemê hişk. Qelemhibir. Qelemê çavkildanê. Qelemreng. û htd.

**Qelemdank** (n.dar.mê) Aman, yan tûrê têkirina qeleman.

**Qelemtiraş**(n.l.nêr) Amêrê tîjkirina qeleman.

**Qelemzirêç** (n.l.nêr) Qelemrisas.

**Qelen** (n.x.nêr) Next. :Qelenê jinan girane.

**Qelereşk** (n.lmê) *tewal* Teyreke(perinde) rengê wî reşe, nîşana têkdanê, durûyîyê ye.

**Qelew** (hk.x.çewa) Pir goşt û bez. Mirovê qelew, candarê qelew; yê têr goşt û bez. Br× Lewaz.

**Qelewbûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov, candar qelew di be. Br×Lewazbûn. (K) bn: Bûn.

**Qelewî** (n.dar.mê) *derd* Kiryara zêdebûna goşt û berz an.: Qelewî ya wê gelek jê di hêt. Br×Lewazî.

**Qelewkirin** (k.jn.l.mê) Candarê di hêt sexbêkirin da qelew bi bit. :Xwe bi zêde xwarin û vexwarinê qelew kir. (K) bn: Kirin.

**Qelihandin** (k.jn.x.mê) Birandin. Qelandin.

**Qelizandin** (k.jn.x.mê) Xwe vedizîn. (K) bdn: ez di qelizînim em di qelizînîn, tu di qelizînî hûn di qelizînin, ew di qelizîne[...it] ewan di qelizînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qelizand, di qelizandin. Db,dûr: qelizandibû, qelizandibûn. (F): bi qelizîne, bi qelizînin.

**Qelizîn** (k.jn.x.mê) Bi dizîve derbazbûn. Bi dizîve çûn. Pêdizkî bi rê kevtin.(K) bdn : ez di qelizim em di qelizîn, tu di qelizî hûn di qelizin, ew di qelize[...it] ewan di qelizin. Pr :dê bi+bdn. Bdb : ez di qelizîm, ew, hûn, ewan di qelizîn, tu, ew di qelizî. Db,dûr : ez qelizîbûm em qelizîbûyn, tu qelizîbûy hûn qelizîbûn, ew qelizîbû ewan qelizîbûn. (F) : bi qelize, bi qelizin.

**Qelî** (n.x.mê) *xwarin* Pişkên goştê hûrkirî di gel rûn û bezî di mencelanda di qelînin, piştî sar di bit dixin cerikan û li zivistan û demên pêdvî di gel xwarinên din wek tirşik, îprax û htd bi kar di hînin.

**Qelîn** (n.x.mê) bn :Qelûn.

**Qelîsêl** (n.l.mê) *xwarin* Pişkên goştê liser sêlê di hêt birajtin.

**Qelîşivan** (n.l.mê) *xwarin* Corekê qelîyê ye taybet jiboşivan di hat çêkirin.

**Qelp** (n.x.nêr) Tîvkilê req. :Qelpê;  darî, kezwan[keskan] ê,. Kelp.

**Qelpik** (n.dar.nêr) Qelp.

**Qelqeloşk** (hk.dar.çewa) Nanê li ser sêlê qelyayî, li dema xwarinê kirekir jê di hêt.

**Qelûn** (n.x.mê) Corekê borîkane ji axa cerikan yan kanzayan hatî çêkirin, serekê mezin û serevraze,xir û valaye tûtinê di xin nav û pelekê liser di danin, yan agirî ber di dinê û serê din dixin di devê xweda di mêjin, mîna kêşana cigareyan. Sebîl.Qelîn.



**Qelûn**

**Qelyan** (k.jn.x.mê) Xwarin, zadê hatî qelandin. :Ev nane gelek ya qelyaye.

**Qemandin** (k.jn.l.mê) Dema tiştek bi hêt gerimkirin bêhin jê di hêt , lê nesojit.: Patek qemandî; nîvsotî.nanê qemandî. (K) bdn: ez di qemînim em di qemînîn, tu di qemînî hûn di qemînin, ew di qemîne[....it] ewan di qemînin. Pr: dê [bi] qemînim, qemînîn, qemînî, qemînin, qemînit[..ne], qemînin. Bdb: di qemand, diqemandin. .db,dûr: qemandibû,qemandibûn. (F): bi qemîne, bi qemînin.

**Qeme** (n.x.nêr) Qame.

**Qemirandin** (k.jn.x.mê) 1.Qemandin.2. Qerimandin.

**Qemî** (pêrb.alv.girê) ***rêzman*** Ji pêxemet. Dako . jibo ko. Belkî.

**Qemsele** (n.x.nê) Qapût.

**Qemyan** (k.jn.x.mê) Dema tiştek di hêt qemandin.

**Qemyayî** (hk.dar.çewa) Nîvsotî. Hatîye qemandin. : Ev pate yê qemyayî.

**Qenat** (n.x.biyan.mê) Co. Kenal.

**Qenatê Kurdo** (n.l.nêr) Rewşenbîrek û zimanvanekê kurdê Sovyetî ye.

**Qenc** (hk.x.çewa) Baş. Çak. Hêja. Xweşmirov. Berkeftî.

**Qencî** (n.dar.mê) Çakî. Başî. ***Pend*** :Qencî, nahêt li kurmancî.

**Qencîkirin** (k.jn.l.mê) Başî, çakîkirin. ***Pend*** : Qencîyê bi ke û di ber avêda berde. (K) bn : Kirin.

**Qenctir** (hn.dar.hevber) Çaktir.

**Qenctirîn** (hn.dar.hevber) Çaktirîn.


**Qend** (nx.mê) Şekirok.

**Qendav** (n.l.mê) Ava gerim di gel şekirê bêyî ça. Şekirav.

**Qendîl** 1 (n.x.mê) Çira.

**Qendîl** 2 (hk.cih,cugir.n) Çiyayke li Kurdistanê- Iraq.

**Qenepe** (n.x.nêr) Cihek wek taqikane ji depan hatîye çêkirin û bi îsfenc û perokan dpoşî ye, mirov jibo li ser rûniştinê bi kar di hînin. Dîwan. Kenepe.



**Qenepe**

**Qentere** (n.x.mê) Rê yan solîna li bin; rê, pir, ber, gir, çiy an. Kenal.

**Qepan** (n.xmê) 1. Terezîya pîvana mitayî. 2. Cihê firotina mitayî bi kom.

**Qepat** (hk.x. çewa) Dapoşî. Dergirtî.

**Qepatbûn** (k.jn.l.mê) Hatin dergirtin. : Çavên wî qepat bûn. Ang; kevtin ser hev.

**Qepatkirin** (k.jnlmê) girtin. Daxistin. (K) bn: Kirin.

**Qepax** (n.x.mê) Derîk. Dergehk. Dervan. Derpoş.

**Qepson** (n.x.mê) Binê fîşekên tiveng debance û topan, yê derzî bi wê di kevit dema şeqandinê.

**Qeramk** (n.x.mê) Derok. Dergehk. : Qeramkê avdankî. : Qeramkê çaydankî.

**Qerebalix** (n.dar.mê) Dengûdor.

**Qerebalixkirin** (k.jn.l.mê) Dengûdorkirin. (K) bn: Kirin.

**Qereç** (nejad.n.x.dz) Desteyeka mirovên gerok û xazokin. Delî.

**Qereçanî**, qereçkanî (hk.dar.çewa) Bizar qereçan ve kirin. zaravê qereçan.

**Qereçox** (hk.cih,cugir.n.biyan) Çiyayeke li Kurdistanê.

**Qeredax** (hk.cih,cugir.biyan) Bajêrek Kurdistana Iraqê ye.

**Qerefil** (n.x.mê) Corek bazinên taybete jin di xin lingên xwe.

**Qerem** (n.x.mê) Qamîş.

**Qerimîn** (k.jn.x.mê) 1. Qerisîn. Tezîbûn. 2. Mandîbûn.(K) bdn: ez di qerimim em di qerimîn, tu di qerimî hûn di qerimin, ew di qerime[…it] ewan di qerimin. Pr: dê bi + bdn. Bdb : di qerimî, di qerimîn. Db,dûe : qerimûbû, … bûn. (F) : bi qerime, bi qerimin.

Qerisandin (k.jn.x.mê) 1. Tezandin. Sarkirin. 2. Ji kar rawestandineka demkî.

**Qerisî** (hk.dar.çewa) Qerisok.

**Qerisîn** (k.jn.x.mê) Bestin. Tezîbûn. Sarbûn.: Ava qerisî. Ya bûye qerîse. : Mirov qerisî.. sar bûn.

**Qerisok** (hk.dar.çewa) Mirovê herdema piçek seqa sarbû, ji serman di lerzit.Yê xwe di ber sirê na gire.

**Qerîse** (n.x.mê) Berif a req. Cemed. Qeş.

**Qerîsok** (hk.dar.çewa) 1. Dema qerîse erdî di girit. 2. Qerisok.

**Qerqode** (n.dar.mê) Kelexê şelandî. Kelexê pûçbûyî. Kelexê bêgoşt. Qerqodeyê : tirombêlê, dewarên mirî. Mirovek qerqode ; mirovek lewaz û bêgoşt. Mirovek nîvmirî.

**Qerome** (n.x.nêr) Darekê dusere, binê wî qayîm di erdî ra di ken, duserên din jibo çemandina gopalan bi kar di hînin. Qefare.

**Qerqeşe** ( n.dar.mê) 1.Cirebir. Cire.2. Arêşe.

**Qerqeşekirin** (k.jn.l.mê) 1.Dengkirin. Dengûdorkirin. Cirekirin. 2. Arêşekirin. (K) bn: Kirin.

**Qert** (hk.x.çewa) 1. Qonaxa dawîya jîyê nîrî. Nêrîyê qert. 2. Pîr.

**Qertejin** (hk.l.çewa) Jina bi temen. Pîr.

**Qertemêr** (hk.l.çewa) Zelamê navsalveçûyî. Pîr.

**Qesel** (n.x.mê) Pîş û pelexê genim, ceh, nîsk û htd. Ka gir.

**Qesik** (n.dar.mê) Madeyek wek tevinî ye kirimkê giyandarên biçûk di qonaxeka jîyanê da di nav da di mînin. : Qesika kirimê avirmîşî.

**Qesîl** (hk.cih,n.x.mê) Cihê qeselê. Zevîya hatî dirûn û qesel lê mayî.

**Qesîlk** (n.dar.mê) Davên hatîn dirûn. Qesela nav zevîyê ya hatî birîn. Zilik.

**Qesp** (n.x.mê) Fêqîyek şirîn bi tame, berê dara xurmeyê ye. ***Pend***: Dîyarî qespe, şûndîyarî hespe. ;ang .kiryara baş bersiva wê herdem baştire.

**Qesrîk** (n.l.mê) Tirarekê lûleyî ye di landikê da li bin zarokan di danin jibo desnivêja wan bi çit nav û xwe pîs nekin.

**Qestakirin** (k.jn.l.mê) Livîn, bizivîn ber bi sentekê. : Min qesta ; mal, ser karî, def hevalekî û htd kir.(K) bn : Kirin.

**Qeşa** (n.x.mê) Befira req. Cemed. Qerîse.

**Qeşabûn** (k.jn.l.mê) Qerisîn. Av qeşa bû,ang; av cemidî.

**Qeşagirtin** (k.jn.l.mê) Qeşabûn. Qerisîn. Cemidîn.

**Qeşakirin** (k.jn.l.mê) Cemidandin. Qerisandin.

**Qeşavî** (hk.dar.çewa) Leşê mirov, ji ber sermayê nexasim lêv û dest rengê wan sipî di bin û di peqin[şeq di bin] mîna qeşayê.

**Qeşavîbûn** (k.jn.l.mê) Weke devûlêvên mirovî qeşavî di bin. (K) bn : Bûn.

**Qeşe** (n.x.nê) Zanayê dînê mesîhîyan. Keşe.

**Qeşitandin** (k.jn.x.mê) Weke mirov li êkî bi xurit bi ket der.Derêxistin. Bi qeşite.

**Qeşitîn** (k.jn.x.mê) Bi serçmandî derkevtin.Bi serşorî ji holê derkevtin.

**Qeşmer** (hn.x.çewa) ***dijûn*** Lewçe. Parav.

**Qeşyan** (k.jn.x.mê) Qeşitîn. : Bi qeşye.

**Qetlazî** (n.x.mê) Kêmasîya xwarinê. Giranînîya kelûpelan û tiştê xwarinê.

**Qetlazîbûn** (k.jn.l.mê) bûn qetalzî Neman yan kêmbûna pertalên jiyanê.

**Qetlazîkirin** (k.jn.l.mê) kirin qetlazî  Di kawdanên nexweş û pevçûnan da,mirov di bin sedema qetazîyan.

**Qetran** (n.x.mê) 1.Rengek reşe mirov li pora xwe di din da reş bi bit.2. Qêr.

**Qewal** (karn.dar) Dîndarekê dînê êzîdîyane.

**Qeware** (n.x.mê) Qebare.

**Qewarok** (n.dar.nêr) Amêrê qewartina bacan, kulind û htd.

**Qewartin** (k.jn.x.mê) Qewirandin. (K) bdn: ez di qewêrim em di qewêrîn, tu di qewêrî hûn di qewêrin, ew di qewêre[...it] ewan di qewêrin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qewart, di qewarin(tin). Db,dûr: qewartibû, qewaritibûn. (F): bi qewêre, bi qewêrin.

**Qewirandin** (k.jn.mê) Jinav înane der. Bacan, bacanreş, kulind û htd bi qewarokî qewirandin navka wan jê înan der.(K) bdn: ez di qewirînim em di qewirînîn, tu di qewirînî hûn di qewirînin, ew di qewirîne[…it] ewan di qewirînin. Pr: dê[bi] qewirînim, qewirînîn, qewirînî, qewrînin, qewirînit[..ne], qewirînin.Bdb: di qewirand, di qewirandin. Db,dûr: qewirandibû, … bûn. (F): bi qewirîne, bi qewirînin.

**Qewirîn** (jn.x.mê) 1.Jinav înaye der. Bacana qewirî.2. kêrikeka taybetî ye jibo qewirandina mitayê wek bacanreşk, xiyar kulind û htd bi kar di hêt. (K) bdn: ez di qewêrim em di qewêrîn, tu di qewêrî hûn di qewêrin, ew di qewêre[...it] ewan di qewêrin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qewart, di qewarin(tin). Db,dûr: qewartibû, qewaritibûn. (F): bi qewêre, bi qewêrin.

**Qewitandin** (k.jn.mê) Derkirin. Derêxistin.

**Qewitîn** (k.jn.x.mê) Derkevtin. Qeşyan.

**Qey** (pêrb.alv. gir) *rêzman* Ma. : Qey tu yê koreyî tu min nabînî ?.

**Qeydî** (pêrb) *rêzman* Gerek. Pêdvî. :qeydî nake, ne gereke, ne pêdvî ye. Çi qeydî ye.

**Qeyîm** (hn.x.çewa)bn: Qayîm.

**Qeymax** (n.l.nêr) *spîyatî* Sertîk. Nexasim sertîkê gamêşan.

**Qeynax** (nl.mê) Amêrekê ji pirteka qayîş û şîşkeka asinê ser badayî,dema drûna dexlan cotyar dixin tiblên xwe jibo pitir qeselê di destê xweda bi girin û parastina destan ji stirî û qurinçkan.

**Qeyre** (hk.x.çewa) Jiyê navîn yê keça bi temen û şû nekirî yan lawê bi temen û zigurd.

**Qeyrebûn** (k.jn.l.mê) Navsalveçûna keç û xortan. (K) bn : Bûn.

**Qeyrejin** (hk.l.çewa) Jina qeyre.

**Qeyremêr** (hk.l.çewa) Mêrê qeyre.

**Qeysî** (n.x.mê) Mijmija hişikkirî.

**Qeytan** (n.x.mê) Bendikek peyt, zirav û qayîme. Bendik. Dav. :Mêrê simbêl qeytan ; simbêlên wî di ziravin.

**Qez<u>me</u>** (n.x.nê) Amêrekê kolana erdî ye, du ser hehe yek tîj û yêdî pane, jibo rakirina erd cihên asê bi kar di hînin.



**Qezme**

**Qêjan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Hewarkirin. Qêjîkirin (kirine qêjî). (K) bdn : ez di qêjînim em di qêjînîn, tu di qêjînî hûn di qêjînin, ew di qêjînit[..ne] ewan di qêjînin. Pr: dê[bi] qêjînim, qêjînîn, qêjînî, qêjînin, qêjîne[….it], qêjînin. Bdb: di qêjand, di qêjandin. Db,dûr: qêjandibû, … bûn.  (F): bi qêjîne, bi qêjînin.

**Qê<u>jî</u>** (n.x.mê) ***deng*** Ji tirs û sehiman da hewarkirin. Dengek bilind û bi sehim. Qîj.qîjên.

**Qêr** (n.x.nêr) 1.Keresteyekê reşe, jibo çêkirina şarê û kolanan bi kar di hêt. 2.Reş.

**Qê<u>rê</u>** (hk.gaz.mê) Bang yan navkirina jina reş.

**Qê<u>rî</u>** (n.x.mê) bn: Qêjî. : Eve çiye tu ho di kî qêrî?.

**Qê<u>ro</u>** (hk.gaz.nêr) Navkirina mêrê reş.

**Qiçe<u>qiç</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê sotina daran. Qiçqiç. Qirçeqirç.qirçên.

**Qi<u>çên</u>** (n.dar.mê) Qirçên. :Qiçên ji didanan hat.

**Qi<u>dîk</u>** (n.x.mê) Qidqidank. Gilîzank.

**Qid<u>qid</u>** (n.l.mê) ***deng*** Dengê xwandina mirîşkan.

**Qidqi<u>dank</u>** (n.dar.gel) Hişa hind cihên nemaze yên leşê mirovî bi destvedanê ji alîyê yekê din ve kenî ya mirovî di hêt. Gilîzank.


**Qidqidank<u>vebûn</u>** (k.jn.gl.mê) Hişkirin bi gilîzankan. : Destê xwe nêzî zikê min neke qidqidankêd min ve di bin.

**Qidqidank<u>vekirin</u>** (k.jn.gl.mê) Heger yek qidqidankêd mirovî ve bike. Gilîzankvekirin. : Qidqidankêd zarokî ji binê pêyan ve kirin.

**Qij** (hk.x.çewa) Pora ne şekirî.pirça gijavij. Serê qij. Pora qij. Gij.

**Qijilan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Kuzrandin. Qemandin.

**Qil<u>îç</u>** (n.x.mê) ***can*** Tibila biçûk ya dest yan pêyêd mirov û hind candaran.



**Qilîç**

**Qi<u>loç</u>** (n.x.nêr) ***candar*** Qoç. Şax.

**Qim** (n.x.mê) Qurç. Qurm.

**Qum<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Qumlêdan. Qurmlêdan. Dema mirov firekê li avê, cigarê di de.

**Qi<u>mil</u>** (n.x.mê) ***candar*** Qembelk. Corek kêzikane.

**Qim<u>yan</u>** (k.jn.x.mê) bn : Qemyan.

**Qimya<u>yî</u>** (hk.dar.çewa) bn : Qemyayî.

**Qina<u>re</u>** (n.x.mê) Sêdare.

**Qinare<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Sêdaredan. Hilawîstin.

**Qi<u>nêt</u>** (n.x.nêr) Niviş. Berebab. Kûk. Qinyat. Tuxim.

**Qin<u>yat</u>** (n.x.nêr) bn: Qinêt.

**Qir** 1 (hn.nx.mê) Ferman. Jinavbirin. Nehêlan. Çam.

**Qir** 2 (n.x.mê) ***balinde*** Qelereşk. ***Pend*** : Hevalê qirê nikil bi gwî[gû] ye.;ang: hevalînî a kesê xirab yê wek qirê, peşêmanî ye.3. Sir. Seqem.

**Qiran<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Şikênan. Dengê qirçênê jê înan. : Ewî darek qirand. ,…pişta xwe qirand[veqirand] ;qirpên jê îna.(K) bdn: ez di qirînim em di qirînîn, tu di qirînî hûn di qirînin, ew di qirîne[….it] ewan di qirînin.Pr: dê[bi] qirînim, qirînîn,qirînî, qirînin, qirînit[..ne], qirînin. Bdb: di qirand, diqirandin. Db,dû qirandibû,qirandibûn. (F): bi qirîne, bi qirînin.

**Qira<u>se</u>** (n.x.nêr) Lîhaz.

**Qirç** (n.x.mê) ***deng*** Dengê şikandina hestî, dar, asin û htd.

**Qirçan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Vekirin yan kêşana gehan ta deng [qirçên] jê bi hêt. : Tilîyên xwe ne qirçîne, eger dê fêr bî.(K) bdn: ez di qirçînim em di qirçînîn, tu di qirçînî hûn di qirçînin, ew di qirçîne[....it] ewan di qirçînin. Pr : dê[bi] qirçînim, qirçînîn, qirçînî, qirçînin, qirçînit[…ne], qirçînin. Bdb : di qirçand, di qirçandin. Db,dûr : qirçandibû,qirçandibûn. (F): bi qirçîne, bi qirçînin.

**Qirçeqirç** (n.l.mê) Qirçqirç.

**Qirçeqirçkirin** (k.jn.gl.mê) Qirçqirçkirin.

**Qirçên** (n.dar.mê) 1.*deng* Dengê ji egera rakêşan yan vekirina gehên leşî.: Min tibila xwe kêşa qirçên jê hat.2. Dengê şikestinê.

**Qirçqirç** (n.l.mê) bn: Qiçeqiç.

**Qirçqirçkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê qirçeqirçê kirin.

**Qirdêl** (n.x.mê) Perçe lastîkeke ,mîna gulane keç pora xwe pê girê di din.

**Qirdon** (n.x.mê) Corekê stovankane. Corek ristikane.

**Qirêj** (n.x.mê) Gemar. Pîsî.

**Qirêjî** (hk.dar.çewa ) Pîs. Gemar. : Tu çendê qirêjîyî, here serê xo bi şû!.

**Qirêjîbûn** (k.jn.l.mê) Pîsbûn. Gemarbûn. . :Leşê min jiber gerim a duh yê qirêjî bûy.

(K) bn: Bûn

**Qirêjîkirin** (k.jn.l.mê) Pîskirin. Gemarkirin. : Azadî cilkên xwe yên qirêjî kirîn.(K) bn: Kirin.

**Qirêjok** (hk.dar.çewa) Qirêjî. Gemar.

**Qirik** (n.l.mê) *can* Gerden. Hefik.: Ew qirika min ber na de.: ang: ji min ve nabe.

**Qirîsk** (n.x.mê) bn: Çirîsk.

**Qirkirin** (k.jn.l.mê) Qelandin. Jinavbirin. Nehêlan. Ji holê rakirin. (K) bn: Kirin.

**Qirnaqûz** (n.dar.mê) bn: Darînqûz.

**Qirpên** (n.dar.mê) bn: Qirçên.

**Qirpênhatin** (k.jl.mê) Qirpên jê hatin 1. Dengê qirpênê. 2. Bûyerek nexweş û ji nişêve qirpên ji piştê hat. .: Dema min çavên wî dîtîn, qirpên ji pişta min hat., min zanî xwelî ya bi êkî werbûy!.

**Qirpênkirin** (k.jn.gl.mê) Qirpênhatin.

**Qirpik** (n.dar.mê) Birik.

**Qirpikhatin** (k.jn.l.mê) Birik hatin mirovî.

**Qirpikhelatin** (k.jn.l.mê) Qirpikhatin.

**Qirqir** (ndar.mê) ***deng*** Dengek taybete, wek yê qelereşkê, derî û htd.

**Qirqirkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê qirqirê jê hatin.

**Qirş** ( n.x.nêr) 1.Dindikeka gilêşî. pirteka dar, ber, ax û htd. 2.Takên darên hişk.

**Qiryan** (k.jn.x.mê) Şikestina daran jiber giranîya çeqan, bayî yan her hêzeka din. : Çeqên sêva me yên qiryayn hindî sêvên pêve hatîn.

**Qişqilank** (n.x.mê) ***tewal*** Core balindeke, kilik dirêje, hêkker, rengê wê reş û sipîye, hêlîna xwe liser darên bilind di ket. ***Mamik*** :Ji qêrî reştire, ji befirê sipîtire, kurî ji bejin ê dirêjtire.

**Qişt** (hn.x.çewa) Zîx. Peyt. Gişt.

**Qiştbûn** (k.jn.l.mê) Zîxbûn. Peytbûn.

**Qiştî** (n.dar.mê) Zîrekî. Peytî.

**Qiştkirin** (k.jn.l.mê) Peytkirin.

**Qîç** (hk.x.çewa) Bilind. Bel. Derkeftî. : Didanên wî di qîçin.

**Qîçbûn** (k.jn.l.mê) Bilindbûn. Dîyarbûn. Xuyabûn. (K) bn: Bûn.

**Qîçkirin** (k.jn.l.mê) Xuyakirin. : Didanên wî ji dûr ve qîç dikin. (K) bn: Kirin

**Qîjandin** (k.jn.x.mê) Qêjandin.

**Qîjên** (n.dar.mê) ***deng*** Qîjeqîj. Qarên.

**Qîjeqîj** (n.l.mê) Qîjên.

**Qîjeqîjkirin** (k.jn.l.mê) Qêreqêrkirin. : Qîjeqîja balindey, çûçikê.(K) bn: Kirin.

**Qîjîn** (n.dar.mê) Qêjîn.

**Qîm** (hk.x.çewa) Têr. Têrakirin. Pûte. :Qîma xwe pê na anî.ang; pûte pê ne kir.

**Qîme** (hnx.mê) ***xwarin*** Goştê gelek hûrkirî. Goştê hêrayî.

**Qîmekirin** (k.jnlmê) Goşt hûrkirin. Goş hêran.(K) bn: Kirin.

**Qîmpêhatin** (k.jn.l.mê) 1. Têrakirin. Pê têrbûn. :Qîma min pê na hêt. 2. Pûte pê kirin. : Qîma xwe pê ne hîna.(K) bn : Hatin.

**Qîqiloqî** (hk.dar.çewa) ***deng*** Selîqa dengê bangdana kiroskî.

**Qîrandin** (k.jn.x.mê) Qîjandin. Qîrên jê berdan. Girandin.

**Qîrîn** (k.jn.x.mê) Qêrîn.

**Qît** (hk.x.çewa) Bilind. Berçav. Qîç.

**Qîtik** (n.dar.mê) Girêk. Pirsik. : Qîtika darê;ang girêkên liser qurmê daran.

**Qîvar** (n.x.mê) bn: Kîvar.

**Qîz** (n.x.mê) Keç. Dot. Kîj.

**Qoç** (n.x.mê) Lêdana serî ya hindek giyandaran; wek beran, nêrî û htd. ***Pend*** :Qoça kevirî; ang pêkola bê berhem û çi pêve nehatin.

**Qoçlêdan** (k.jn.l.mê) Giyandarên bi serî (qoçan) di danin.(K) bn : Lê dan.

**Qodîk** (n..mê) 1.Amaneke jibo têkirina xwarinan bi kar di hêt. : qodîka : doşavê, xoşavê, temateyê û htd.2. bn : Xudîk.

**Qodîkkirin** (k.jn.l.mê) Pirkirina qodîkan. Têkirina xwarinê. Dagirtina qodîkan.(K) bn : Kirin.

**Qol** (n.x.nêr) Bir. Deste.

**Qolçî** (karn.dar.dz) Zêrevanê daristanan.

**Qolinc** (n.x.mê) ***derd*** 1. Navmilên mirovî. 2. Core derdeke di kurdewarî da ko ji egera westanê masolkeyên mirovî kirj di bin û zik û pişt bi janan di kevin.

**Qonax** 1 (hk.dem.mê) Dem. Heyam .Rojev.: Qonaxa êkê ji ya avakirina xanîyê me bi domahî hat.

**Qonax** 2 (n.x.mê) Avahî. Xanî. Hewangeh.

**Qondere** (n.x.mê) Pêlav.

**Qontax** (n.dar.mê) Depê binê tivengê yê pane, mirov li dema teqandinê di êxit milê xwe dako ne livit.

**Qop** (hk.x.çewa) Mirovê bi pêyekî yan bê pê. Mirovê pêbirî.

**Qopbûn** (k.jn.l.mê) Ji destdana pêyên mirovî.

**Qopê** (hk.hd,gaz.mê) Navkirin yan gazîkirina jina qop.

**Qopik** (n.dar.nêr) Tiştê birî. Kurtkirî. Qopikê cigarê.

**Qopkirin** (k.jn.l.mê) Birîn. Jê ve kirin.(K) bn : kirin.

**Qopo** (hd,hk,çewa.nêr) navkirin yan gazîkirina zelamê qop.

**Qor** (n.x.mê) bn: Qur.Kur.

**Qoreqor** (n.l.mê) Qorên.

**Qorên** (n.dar.mê) bn: Orên.

**Qorî** (n.x.nêr) Amanek taybete ava çayê têda gerim di kin. Çaydank.

**Qosk** (nx.mê) bn: Darlastîk.

**Qubandin** (k.jn.dar.mê) Wekî mirov amanekî da girit û pîçek ji lêvên wî bilindtir bi be.ji pirkirinê pitir.: Sindoqê, gûnî bi qubîne. (K) bdn: ez di qubînim em di qubînîn, tu di qubînî hûn di qubînin, ew di qubîne[….it] ewan di qubînin.. Pr : dê[bi] qubînim, qubînîn, qubînî,qubînin, qubît[…ne], qubînin. Bdb : di quband, di qubandin. Db,dûr : qubandibû, qubandibûn. (F): bi qubîne, bi qubînin

**Qube** (n.x.mê) Avayîyek şêwe nîv hêkî, yan nîv tepik[xir]e li ser cihên pîroz ava di kin jibo xemlandinê. Li mizgeft û mezargehan, bi rengê kesik yan zer xemlandine.

**Qubçe** (n.x..mê) bn : Qumçe.

**Qul** (n.x.mê) Cihê hatî qewirandin.kun. Çal. Khor. : Darkokey bahîv kirin di qula darê da.

**Qulaç** (n.x.mê) Cihê bi nav ve çûyî. Paşî. :Qulaça jorê [mezelê]. Quncalk. Br×Kujî.

**Qulipandin** (kjn.x.mê) Mirov yan hêzek tiştekî wergerînit. : Mamê min tirombêla xwe qulipnd. (K) bdn : ez di qulipînim, em di qulipînîn, tu di qulipînî hûn di qulipînin,ew di qulipîne[….it] ewan di qulipînin..Pr : dê[bi] qulipînim, qulipînîn, qulipînî, qulipînin.qulipînit[…ne], qulipînin. Bdb : di qulipand, di qulipandin. Db,dûr : qulipandibû, qulipandibûn. (F) : bi qulipîne, bi qulipînin

**Qulipîn** (k.jn.x.mê) Wergeryan. : pêyê min qulipî.ang : pêyê min wergerya.(K) bdn : ez di qulipim em di qulipîn, tu di qulipî hûn di qulipin, ew di qulipe[…..it] ewan di qulipin. Pr : dê[bi] qulipim, qulipîn, qulipî, qulipin, qulipit[…pe], qulipin. Bdb : ez di qulipîm,em di qulipîn, tu di qulipî, hûn di qulipîn, ew di qulipî, ewan di qulipîn. Db,dûr : ez qulipîbûm, em qulipîbûyn, tu qulipîbûy hûn qulipîbûn, ew qulipîbû, ewan qulipîbûn. (F) : bi qulipe, bi qulipin.

**Qulîzên** (n.dar.mê) *zêmar* Dema bûyerek bi tiris yan nexweş rû di dit, jin û zarok û mêr bi hevre di ken qêjî.hewar û gazî. Zêmar. : Dengê balefiran hat, qulîzên kete gundî.

**Qulkirin** (kjn.l.mê) Kunkiirn. Çalkirin. Çal tê vekirin. Qewirandin. (K) bn : Kirin.

**Qulp** (n.x.mê) Girê. Hevalbendî. Hevpeymanî. Hevgirtin.

**Qulpik** (n.dar.mê) Qumçe. Meyîk.

**Qum** (n.x.mê) Qurç. Qurm. : Qumek li cigarê da.

**Qumandar** (kar.n.dar.dz) Serleşker.

**Qumaş** (nx.nêr) Perok.

**Qumatk** (n.x.mê) Pateke di zarokên sava dipêçin. Pêçe.

**Qumçe** (n.dar.mê) Corekê meyîkane, du pirtin di kevin nav yek. Qumçik.qubçe.

**Qumrî** (n.x.mê) 1. *perinde* Corekê teyrên mezin û gerûke. 2. Navê jinane.

**Quncal** (n.l.mê) Qulaç.

**Quncik** (n.dar.mê) Kunc.

**Qunêrî** (n.dar.mê) Kulikên bi janin li leşê mirovî peyda di bin.

**Quntar** (hk.cih) Betena çiya. Beten. Jêhelî.

**Qur** (nx.mê) Kur. Teqin.

**Qurad** (n.x.mê) *giya* Giyayekê dême, bi serik û kûvîye, bistîkên wî wek yên sîrê ne, tama wî tije jibo xwarinê bi kar di hînin di kin nav sawikan.



**Qurad**

**Quraftin** (k.jn.x.mê) Tirî çinîn. Çinîna tirî. Di qurêfim, bi qurêfe, di quraft.

**Qur àn** (n.biyan) Kitêba pîroza dînê îslamê.

**Qurandin** (k.jn.x.mê) *deng* Qorên kirin.

**Qurav** (n.l.mê) Kura bi av. teqina rûn.

**Qurban** (n.x.nêr) 1. Peyveke jibo rêzgirtina mirovên mezin bi kar di hêt. Gorî. 2. Serê giyandaran di ken qurban li cejna qurbanê. Gorî. Ser.

**Qurban<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) 1. Xwe gorîkirin. 2. Serê kewalan kirin xêr. (K) bn: Dan.

**Qurban<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Gorîkirin. : Şehîdan canên xwe kirin qurbanî xaka Kurdistanê.

**Qur<u>beşk</u>** (n.l.dz) *candar* Core giyandarekê kûvî, şîrdere.

**Qurç** (n.x.mê) Fireka avê yan terayîya devî ko mirov bi êk car da di hîrit. Qurçeka avê.

**Qurçan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Dahîran. Qurçdahîran. (K)bdn: ez di qurçînim em di qurçînîn, tu di qurçînî hûn di qurçînin, ew di qurçîne[...it] ewan di qurçînin. Pr:dê bi+bdn. Bdb : di qurçand, di qurçandin. Db,dûr :qurçandibû, qurçandibûn.(F) : bi qurçîne, bi qurçînin.

**Qurç<u>dahîran</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov qurçekê da di hîre.(K) bn : Dahîran.

**Qurç<u>lêdan</u>** (k.jn.l.mê) Firek lêdan. Ek fir dahîran. : Qurçek li perdaxa avê da. (K) bn: Lêdan.

**Qurçifan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Serfirandin. Pilîtkirin. Birîn. :Tu di bînî Şêrkoy pişkovkên van gulan hemû yên qurçifandîn ?. Qurtifandin.(K) Bdn : ez di qurçifînim em di qurçifînîn, tu di qurçifînî hûn di qurçifînin, ew di qurçfîne[…..it] ewan di qurçifînin. Pr : dê[bi] qurçifînim, qurçifînîn, qurçifînî, qurçifînin,qurçifînit[…ne], qurçifînin. Bdb : di qurçifand, di qurçifandin. Db,dûr : qurçifandibû,qurçifandibûn.(F) : bi qurçifîne, bi qurçifînin.

**Qure<u>der</u>** (n.dar.mê) *dijûn* Corek civîndanê ye. Corek nifrînane.

**Qur<u>fik</u>** (n.dar.mê) Selik.

**Qu<u>rîn</u>** (k.jn.x.mê) Dengê qorênê beqan. *Pend* : Heger beq ne qurit, dê bi dirit.

**Qurm** 1(n.x.dz) 1. Qeda stûr ya darê. Korvilkên birî jibo sotinê.Korvilk. 2. Corekê çekê nêçîrane. Cifte.

**Qurm** 2 (n.x.mê) Çendeka dûkêla cigarê ya carekê. Hilmeka cigarê.

**Qur<u>mên</u>** (n.dar.mê) *deng* Dengê tiveng û qurman. Gurmên.

**Qurmên<u>hatin</u>** (k.jn.l.mê) Dengê qurmênê ji tivengê di hêt. (K) bn : hatin. Gurmênjêhatin.

**Qurmiçandin** (k.jnlmê) dema mirov kaxezekê, gulekê, cilkekî destve di dit ta şêweyê wê têk bi çit yan bi gihorit, kirêt bi bit.(K) bdn: ez di qurmiçînim em di qurmiçînîn, tu di qurmiçînî hûn di qurmiçînin, ew di qurmiçîne[…it] ewan di qurmiçînin..Pr : dê[bi] qurmiçînim, qurmiçînîn, qurmiçînî, qurmiçînin, qurmiçînit[…ne], qurmiçînin. bdb: di qurmiçand, dqurmiçandin. Db,dûr: qurmiçandibû, .... bûn.(F): bi qurmiçîne, bi qurmiçînin.

**Qurmiçî** (hk.x.çewa) Têkçûyî. Hatî qurmiçandin. Lewaz. :Mirovê qurmiçî :Rûçikê qurmiçî. Sêva qurmiçî.

**Qurmiçîn** (k.jn.x.mê) Tiştê têkçûyî, mirovê leşê çerimê wî têkçûyî.: kurê te çendê qurmiçî ye?(K) Bdn: ez di qurmiçim em di qurmiçîn, tu di qurmiçî hûn di qurmiçin, ew di qurmiçe[…it] ewan di qurmiçin. Pr: Dê[bi] qurmiçim, qurmiçîn, qurmiçî, qurmiçin, qurmiçe, qurmiçin. Bdb: ez di qurmiçîm em di qurmiçîn, tu di qurmiçî.hûn, ewan di qurmiçîn, ew di qurmiçî. Db,dûr: ez qurmiçîbûm, em qurmiçîbûyn, hûn, ewan qurmiçîbûn, eww qurmiçîbû. (F): bi qurmiçe, bi qurmiçin.

**Qurmlêdan** (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov dûkêla cigarê qurm qurm di kêşit û ber di dit. (K) bn: Lêdan. 2. Teqandin, lêdana qurmê[cifte].

**Qurnet** (n.x.mê) Kunçik. Qulaç. Kujî yê ji nav da.Br× Kujî [sî].

**Qurt** (n.x.nêr) ***perinde*** Coreke ji teyrên kelexan.

**Qurtal** (hn.x.çewa) Rizgar.

**Qurtalbûn** (k.jn.l.mê) Rizgarbûn. :Ez li tu deran ji ber te qurtal nabim!. (K) bn: Bûn.

**Qurtalkirin** (k.jn.l.mê) Rizgarkirin. :Tu dê çewan xwe ji destên qurtal bi kî!. (K) bn: Kirin.

**Qurtifandin** (k.jn.x.mê) bn: Qurçifandin.

**Qurtifîn** (k.jnxmê) bn: Qurçifîn.

**Qusandin** (k.jdar.mê.biyan) Birîn. Tiraşîn. Jêkirin.

**Quşxank** (n.dar.mê) Qazan.

**Qut** (hk.x.çewa) Kurt. Kin. Birî.

**Qutabî** (n.dar.dz) Xwendekar. Xwîndkar.

**Qutabxane** (.dar.mê) Xwandingeh. Dibistan

**Qutan** (k.jn.x.mê) Lêdan. Lêxistin. .(K) bdn : ez di qutim em di qutîn, tu di qutî hûn di qutin, ew di qute[…it] ewan di qutin.(. Pr Dê[bi] qutim, qutîn, qutî, qutin, qutit[…te], qutin. bdb : di quta, di qutan. Db,dûr :qutabû, qutabûn. (F) : bi qute, bi qutin

**Qutas** (n.dar.nêr) Navekê kevinê kurdî ye.

**Qutbûn** (k.jn.l.mê) Birîn. Bizdîyan. Piçan.(K) bn : Bûn.

**Qutên** (n.dar.mê) *deng* Dengê lêdana dilî.

**Qutkirin** (k.jn.l.mê) Birîn. Kurtkirin. (K) bn : Kirin.

**Qutqut** (n.l.mê) Qutêna dilî.: Qutquta dilê min bû ji tirsan da.

**Quz** (n.x.mê) *can* Endamê guhnelî û mîztinê yê jinan yan giyandarên mê. Koş.Gulînk.

**Qûn** (n.x.mê) 1. Kuna paşîya mirov û giyandaran. Kon. 2. Alîyê piştê. :qonbeş, qonfireh ; kulekfireh ; tisonek.qoncihork, yê qonên wî wek cihoran.qonmezin, qonpan, qonxar.

**Qûndere** (n.l.mê) Pêlava qayîşî.

**Qûrîn** (n.x.mê) Qorîna ga û çêlan.

# R

**R** (re) Pîta 21 ê ji abeya kurdî.

**Ra** (hk.cih,n.x.mê) Rê.

**Raber** (kar.n.dar.dz) Rêber.

**Raberî** (n.dar.mê) Rêberî.

**Raberîkirin** (k.jn.l.mê) Rêberîkirin.

**Raborî** (hk.dem) Dema borî. Çûyî. Karê hatî kirin û derbazabûyî.

**Rabûn** (k.jn.dar.mê) 1.Dema mirov yan tişt bilind di bit, radi westit. :Ew rabû û qesta derî kir.: Dapîra min hind a pîre, nikarit rabit. 2. Bilindbûna bihayê pertalan. : bihayê Dînarê yê rabûy. Br× Rûniştin. (K) bn: Bûn.

**Raçandin** (k.jndar.mê) Tiştekî bi çirî, bi tov belav bi kin. Çandineka bi tov. : :Erd bi mînan hatîye raçandin.

**Raçandî** (hk.çewa) Hatîye raçandin. :Tevinê raçandî.(K) bn: Çandin.

**Raçav** (hk.dar.çewa) Hicmetî. Çavzil.

**Raçavbûn** (k.jn.l.mê) Hicmetîbûn. Hêbetîbûn.

**Raçavkirin** (k.jn.l.mê) Dema gotineka seyr di hên kirin , mirov bi çavan bawer neket. Hicmetîbûn.

**Raçît** (n.dar.mê) Kaxezek nivêsî jibo şirovekirin yan pirkirina zanînan. Girovename.

**Radan** (k.jn.x.mê) Malîna, paqijkirina birkek avê, kanîyek avê, govekê û htd. Paqijkirin. Kanîya gundî radan. :Gova pezî dê rade. (K) bn: Dan.

**Radar** (n.biyn.mê) Amêrek kompiyoterî ye jibo aşkerakirina her livînekê yan nişaneka dujminî, herwesa karûbarên zanînî.

**Rader** (n.dar.nêr) ***rêzman*** Jêder.

**Radest** (hk.dar.çewa) Di destan da.

**Radestbûn** (k.jn.gl.mê) Kevtin destan.

**Radestkirin** (k.jn.gl.mê) Xwe dane dest.: Evro çend serbazên dujminî xwe radestî pêşmergeyan kirin. (K) bn: Kirin.

**Radyo** (n.biyan.mê) Amêrê guhdarîkirina dengan. Îzgehê gehandina dengî. Pêlweş.

**Ragehandin** (k.jn.dar.mê) Gehadina nûçeyan bi rêya rojname, radyo, TV û htd.

**Rageş** (hk.dar.çewa) Mirovê arêşeyên demarî hene. Yê zû hêris di bit û nikarit xwe ragirit.

**Rageşî** (n.dar.mê) ***derd*** Derdê toşî demarên mirovî di bit. Demartundî.

**Ragirtin** (k.jn.dar.mê) 1. Hilgirtin. Rakirin. Liser destan bilindkiirn. 2. Xwedîkirin. Bêhinfirehbûn. : Divê em hember dujminî xwe ragirîn. (K) bn: Girtin.

**Raguhaztin** (k.jn.dar.mê) Ji ser cih û warî rakirin veguhaztin jibo cihek din . :Rijêma jinavçûyî kurd di raguhaztin jêrîya îraqê. (K) bn: Guhaztin.

**Rahatin** (k.jn.dar.mê) Mirov xwe digel kawdan, bîyavekî bi guncînit. Hînbûn. :Em hêjta jibo jiyana derve ne rahatîne. (K) bn: Hatin.

**Rahavêtin** (k.jn.dar.mê) Pêkolkirina giyandaran ko xwe ji destê mirovî bi derêxin. Bizava revînê. Bizava bazdanê. (K) bn: Havêtin.

**Rahejandin** (k.jn.dar.mê) Tiştek bi hêz bi hejînit, bêkuta bi hejînit, ji kerb bi hejînit.veleqandin. Vehejandin. Vezirziqandin. :Milî wî rahejand û gotê ma qey tuyê koreyî tu min na bînî?.(K) bn: Hejandin.

**Rahêlan** (k.jn.dar.mê) Kevtin dû. Kevtin dwîv. Bi dwîv ketin.: Segî rahêlayê û ewî bazda.[revî]. (K) bn: Hêlan.

**Rahênan** (k.jn.ldar.mê) Fêrkirin. Hînbûn. :Rahênanên serbazî.

**Rahiştin** (k.jndarmê) Mirov xwe bi çemînit[bi tewîne] jibo rakirina tiştekî. Balekirinê.bezînê. :Ez rahiştim şekalê û min li lingê xwe kir. Wê rahişt darekî û ji erdê rakir.

**Rajêr** (hk.cih) Jêr. Bin.

**Rajor** (hk.cih) Jor. Ser.

**Rakevtin** (k.jn.da.rmê) Razan . Xwe dirêjkirin. Nivistin. Xwekirin. :Ez dê bêhinkê rakevim xwe min a di hêt. (K) bn: Kevtin.

**Rakêşan** (k.jn.dar.mê) Girtin û kêşana tiştî jibo alîyê xweve anîn.: Babê guhê pisê xwe rakêşa; ang, girt û kêşa. (K) bn: Kêşan.

**Rakirin** (k.jn.dar.mê) Bilindkirin. Hilgirtin. : Ber ji erdî rakir. :Sêv ji bin darsêvê ragirin. (K) bn: Kirin.

**Raman** (n.dar.mê) Têgehiştina kar, kiryar, gotin û htd. Ango. Şirovekirin. Mebest. Hizir.

**Ramedan** (k.jn.dar.mê) Razan. Rakevtin.

**Ramûsan** (n.x.mê) Maç. Maçkirin.

**Ramûsandin** (k.jn.x.mê) Maçkirin. Maçîkirin.

**Ramûsîn** (k.jn.x.mê) Maçkirin. (K) bdn: ez di ramûsim em di ramûsîn, tu di ramûsî hûn di ramûsin, ew di ramûse[...it] ewan di ramûsin. Pr:dê[bi] ramûsim, ramûsîn, ramûse, ramûsî, ramûsin.Bdb: di ramûsa, di ramûsan. Db,dûr: ramûsabû, ramûsabûn. (F): bi ramûse, bi ramûsin.

**Ramyarî** (n.dar.mê) Siyaset.

**Ran** (n.x.nê) *can* Pişka serî û stûr ya lingî. Ji çûkî tanî kemaxê.

**Ranan** (k.jn.dar.mê) Li ser dîwarî zêdekirin.Dîwar bilindkirin. Bankirina xanî. Axkirine serbanî. Avkirineve.

**Ranerim** (hk.l.çewa) Nerimrê. :Mirovek, parteka ranerim.

**Ranik** (n.dar.nêr) *can* 1. Ranê biçûk.2. Ranên çûçikan, mirîşkan.

**Raperîn** (k.jn.dar.mê) Serhildan. Serîhildan.

**Rapêçan** (k.jn.dar.mê) Pêçan. Werpêçan. Kirin Balolik Komkirin û hajotin nav cihekî. (K) bn: Pêçan.

**Rapêçkirin** (k.jn.gl.mê) Wekî mirov tiştekî yan bireka mirovan paldet serêk û derêxit ber bi sentekê ve bi bit wek gilolikê têkwer bi bin, wek pêçanê lê bi hêt. (K) bn : Kirin.

**Rapor** (n.cîh.mê) Nivîsîn û şirovekirina kiryar û bûyeran.

**Raport** (nbiyan.mê) bn :Rapor.

**Raserîn** (hk.dar.çewa) Dilpakî. Dilsojî.

**Rasine** (n.x.nêr) Werîs. Kinif.

**Rast** (hk.x.çewa) 1. Tiştê rast; tiştê ne xar .Bê pêç. Bê çep. : Rêya rast,darê rast, bê çep.2. dirist. Ne saş . Ne direw. Gotina rast. Peyva rast. Peyama rast.

**Rastandin** (k.jn.x.mê) Raskirin. Rasvekirin. : Mamosta nivîsîna qutabî di rastîne. (K) bdn : ez di rastînim em di rastînîn, tu di rastînî hûn di rastînin, ew di rastîne[...it] ewan di rastînin. Pr : dê [bi] rastînim,rastîne, rastînit, rastînim,

**Rastbêj** (hk.l.çewa) Kesê ko direwan na kit. Viran nake. Rastgo.Dilpak.

**Rastbêjî** (n.l.mê) Rastgoyî.Dilpakî.

**Rastdilî** (n.l.mê) Dilsaxî. Rastgoyî.

**Rastdîtin** (k.jn.l.mê) Mirov karekî yan gotinekê dirist bi bîne. Baş bi bînit. : Biryara tedaye, tu bi biçî derve jibo xandinê, ez rast di bînim.

**Raste** (n.dar.nêr) Parçe darek yan naylonek nexşandî û hijmarkirîye jibo kêşana xîçan li ser kaxezan û tiştên din bi kar di hêt. Rastek.

**Rastehez** (hk.l.çewa) Mirovê rasbîn. Mirovê dûrbîn.

**Rastek** (n.dar.nêr) Raste.

**Rasterê** (hk.l.çewa) Rêya rast, karê dirist.

**Rasterêbûn** (k.hn.gl.mê) Kevtin ser rêya rast, dirist. (K) bn :Bûn.

**Rasterêkirin** (k.jn.l.mê) Rêya rast nîşadan. Serrêkirin. (K) bn: Kirin.

**Rastgo** (hk.l.çewa) bn: Rastbêj. :Nirovê rastgo ewe yê direwan neke. Br× Vireker. Direwîn.

**Rastgoyî** (n.l.mê) Dilsaxî. Rastbêjî.

**Rasthatin** (k.jn.l.mê) Hevdîtin. Çavpêkevtin.

**Rastî** (n.dar.mê) Gotina rast. Peyva rast. Karê dirist. ***Pend*** :Rastî di kulavxarin. Ang: xelk hez ji rastîyê û rexneyê nakin.

**Rastkirin** (k.jn.l.mê) 1. Tiştê xar wek bizmar, dar, rast kirin. Peytkirin.2. Mirov rastkirin, mirov înane ser rêya rast. Berê wî dane rêya rast û dirist. Hişyarkirin. :Xwe rast ke, da xudê te bi ser bêxt. (K) bn: Kirin.

**Rastkirî** (hk.l.çewa) 1. Peytkirî. Hatîye rastkirin. 2. Kevtine ser rêya dirist.

**Rastnivêsan** (k.jn.l.mê) Çewayî ya fêrbûna dirist nivêsînê. Vehecandin.

**Rateqan** (k.jn.dar.mê) Revîn. Teqyan.

**Rateqandin** (k.jn.dar.mê) Bi darê zorê derêxistn. Rahêlanê. : Pêşmergehan dujmin ji gundî rateqandin. (K) bn: Teqandin.

**Ratib** (n.x.mê) Parê heyvane yê hember karkirinê. Mehyane.

**Rav** 1 (n.x.mê) Nêçîr.

**Rav** 2 (n.x.mê) *derd* 1.Pinîyên rengîn, li giyanê mirovî di hên, nemaze rûyan.2. Şerim. 3. Rêv.

**Rave** (n.x.mê) Şirove.

**Ravek** (n.dar.mê) Parçeka nivîsanê yan filmî.

**Ravekew** (n.l.mê) Nêçîra kewan.

**Ravekirin** (k.jnlmê) Şirovekirin. :Heger tu bi karî ji me ra vê gotarê rave bi kî, em dê minêkar bin.(K) bn: Kirin.

**Raveyan** (karn.dar.dz) Kesê karê wî ravekirin e.

**Ravker** (karn.dar.dn) Nêçîrvan.

**Ravêj** (n.x.mê) Hizir. Raman. Nijinîn.

**Ravêjkar** (karn.dar.dz) Şîretvan.

**Ravêjvan** (karn.dar.dz) Ravêjkar.

**Raweradin** (k.jn.dar.mê) Kutekî lê kirin ta xwe bi tewîne, lava bi ke. Zorî lêkirin ta xwe bi şikênit.

**Rawest** (n.dar.mê) *rêzman* Rawestan li xalekê. Navbir.

**Rawestan** (k.jn.dar.mê) Ji cihê xwe ne livîn. Ne bizivîn. (K) Bdn: ez radiwestim em radiwestîn, tu radiwestî hûn radiwestin, ew radiwete[…it] ewan radiwestin. Pr: Dê ra[bi] westim, rawestîn, rawestî, rawestin, rawestit[…te], rawestin. bdb: di [radiwestam,radiwestan, radiwetay, radiwestan, radiwesta, radiwestan]. Db,dû: rawestabû, … bûm, bûy, bûyn.bûn. (F): bi raweste, bi rawestin. Rabiweste, rabiwestin.

**Rawestandin** (k.jn.dar.mê) Ragirtin. Ne hêlan bi bizivin. : Lawo; here teksîyekê rawestîne, da siyar bîn û bi çîn seredana mamê te.

**Rawestek** (n.dar.nêr) Amêrê pê rawestandina makîna. : Rawestekê tirombê. Rawestekê paysiklê. Stop.

**Raxirandin** (k.jn.dar.mê) Rakêşaneka bi hêz ko dengê xirênê jê bi hêt. Rakêşan. (K) bn: Xirandin.

**Raxistin** (k.jn.dar.mê) Danana nivînan liser erd û textan di danin. Mal raxistin ; merş, berik, mehfîr lê danan. (K) bn: Êxistin.

**Raxistî** (hk.dar.çewa) Mal yan cihê serûberkirî. Hatî raxistin. : Mala wan her dem ya raxistî ye.

**Raxît** (n.x.nêr) *candar* Adî.

**Raz** (n.x.mê) Nihênî. Nepenî.: Ez nizanim raza te çiye tu hosa yê damayî?.ang; tiştek veşarî di nava te da heye.

**Razan** (k.jn.dar.mê) Rakevtin. Xwe dirêjkirin. Xewkirin. Nivistin. (K) Bdn: ez di razim em di razîn, tu di razî hûn di razin, ew di raze[…it]ewan di razin. Pr Dê[bi] razim, razîn, razî, razin, razit […ze], razin[razên]. Bdb: di razam, di razayn, di razay, di raza, di razan. Db,dûr : razabûm, ..bû, bûn, bûy. radiza,radizan. (F): bi raze[razê], bi razin[razên].

**Razandin** 1 (k.jn.mê) Nivandin. Dirêjkirin. : Daykê zarokê xwe razand.(K)bdn: ez di razînim em di razînîn, tu di razînî hûn di razînin, ew di razîne[...it] ewan di razînin. Pr:dê[bi] razînim, razînîn, razînî, razînin,razîne. Bdb: di razand, di razandin. Db,dûr: razandibû, razandibûn. (F): bi razîne, bi razînin.

**Razandin** 2 (k.jn.l.mê) Xemilandin.Ciwankirin. : Me bajê xo yê razandî jiber cejina Newrozê. .(K)bdn: ez di razînim em di razînîn, tu di razînî hûn di razînin, ew di razîne[...it] ewan di razînin. Pr:dê[bi] razînim, razînîn, razînî, razînin,razîne. Bdb: di razand, di razandin. Db,dûr: razandibû, razandibûn. (F): bi razîne, bi razînin.

**Razanxane** (n.dar.mê) Cihê razanê. Jora razanê. Jora nivistinê.

**Razayî** (hk.dar.çewa) Mirov, candarê razayî. Ang ; mirovê nivistî. Nivistî. Di xew. Rakevtî. Dirêjkirî.

**Reben** (hk.x.çewa) 1. Texeka oldarên mesîhîyan [felan]ne.2 . Bê deshelat. Jar.3. Bend. Dîl. Girtî.

**Rebeq** (hk.x.çewa) Bi hevre. Pêkve. Liser êk. : Deh salên rebeqin ew ji gundê xo dûr kevtîye.

**Reçel** (n.x.mê) *xwarin* Xwarineka şirîne ji fêqî hatîye çêkirin. Mirebe. Reçela xoxan, zerdilan, sêvan û htd.

**Ref** 1 (n.x.mê) Depeke bi dîwarê navmalê ve qayîm di ken, kitêb û pertalan li ser di danin.

**Ref** 2 (n.x.mê) Birên teyran [balindeyan] . Refa kewan, sîskan, kutiran û htd. *Pend*: Her teyr û refa xwe. ang: mirov digel kes û hevalên xwe.

**Refank** ( n.dar.mê) Refa dîwarî.

**Reg** (n.x.mê) *darûbar* Rih.

**Regez** (n.x.nêr) Nivş. Tuxim. Nejad.

**Regezperist** (hk.l.çewa) Nivşperist. Nejadperês.

**Reha** (hk.x.çewa) Tiştê ko bêgoman dê rû bi de.

**Rehwan** (hk.dar.çewa) Şareza. Hînbûyî. Fêrbûyî. Bisteh.: Hespê rehwan. Beza. Bezek.

**Rehwanî** (n.dar.mê) Şarezayî. Bistehî.

**Rejgeh** (gk.cih,n.dar.mê) Sîlav. Sîl. : Rejgeha gelîyê Elîbegê. :Rejgeha gelîyê Duhok.

**Rejî** (n.x.mê) Pirtên darî yên nîvsotî û reng reşin,jibo gerimê û karên lênanê bi kar di hên. Pelên hatîne vemirandin berî hemû bi sojin. Rejû.

**Rejîber** (n.l.mê) Berqêr.

**Rejû** (n.x.mê) bn: Rejî.

**Remedan** (n.biyan) Remezan.

**Remezan** (nx.biyan.mê) Meha rojîgirtinê li cem olan, xasim Islamê.

**Remil** (n.x.mê) Xîz. Teqin. Kur.

**Renc** (n.x.mê) Mandîbûn .Zehmet.

**Rencan** (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn.

**Rencber** (karn.dar.dz) Rêncber.

**Rencîn** (hk.dar.çewa) Mirovê mandî. Mirovê westayî. Renckêş.

**Renckêş** (karn.l.dn) Zehmetkêş. Rencîn.

**Rende** (n.x.mê) Kartîk.

**Ren<u>dek</u>** (n.x.mê) Tax. Gerek.

**Reng** (n.x.mê) 1. Sor, zer, pîvazî, kesk, şîn, esmanî, mor, hinarî, pirteqalî, yan hind reng têkel rengin. : Kesk, sipî,sor û zer rengên ala ya kurdistanê ne. 2. Awa. Cor. Bi vî rengî ; bi vî awayî.

**Reng<u>avêtin</u>** (k.jn.l.mê) Rengdan.

**Reng<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Tiştê rengekî wer di girit. : Kirasê wî yê reng bûy.

**Reng<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) 1.Cilikên bi şûştinê reng jê der di keve û di de cilikên dî. : Sakoyê min li ber baranê rengê xwe di dit û çipikên ava sor jê di kevin. 2. Dengvedan. Navdeng kevtin.

**Rend<u>gder</u>** (hk.dar.çewa) Tiştê rengî di det. Br×Renggir.

**Reng<u>dêr</u>** (n.dar.mê) *rêzman* Hevalnav.

**Reng<u>în</u>** (hn,hk.dar.çewa) Hemereng. Pirreng. Gelek reng bi hev ra. : Televizyûna rengîn.

**Reng<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Wekî mirov rengekî li cihekî yan tişkekî bi ke. Sorkirin, zerkirin, Morkirin û htd. :Me dîwarê xanî reng kir. (K) bn: Kirin.

**Reng<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Hatîye rengkirin. : Dîwarê xanî yê reng kirîye.

**Reng<u>kor</u>** (hk.l.çewa) Mirovê çavêd wî hinde rengan ji hev cuda na ke.

**Reng<u>korî</u>** (n.l.mê) Core êşeke çavên mirovî hinde rengan ji hev cuda nakin.

**Re<u>nik</u>** (n.dar.mê) *rêzman* Jêber.

**Re<u>nî</u>** (n.x.mê) Dema befir ji binve di bihujit û li betenên gir û çiyan giran di bit bi hêz şikestin di kevitê di hêt xarê, gelek caran di be egera wêrankirina gund û deveran.

**Re<u>nîn</u>** (k.jn.x.mê) Dema mirov alavek zivir bi tiştekî ra di xişîne, pirt û kerên biçûk jê ve di ke. : Dar renî, Dîwar renî.(K) bdn : ez di renim em di renîn, tu di renî hûn di renin, ew di rene[…it] ewan di renin. P : dê[bi] + bdn. bdb: di renî, di renîn. Db,dûr : renîbû, …. Bûn. (F) : bi rene, bi renin.

**Re<u>nok</u>** (n.dar.mê) Amêreke li xwaringehan jibo renîna penîr, fêkî û htd bikar dihêt. Bîkar.

**Rep** (hk.x.çewa) Bel. Berhev. Qît. Bilind. Biloq. : Guhêd vî hespî di repin.

**Rep<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Belbûn. : Guhêd kerî ji tirsa gurî rep bi bûn.

**Rep<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dema mirov yan giyandar bê deng di bit di xazit bi bîzit çi denge, guhên xwe bel di kit , nexasim giyanewer. (K) bn: Kirin.

**Rep<u>rep</u>** (n.l.mê) ***deng*** Dengê pêyan dema rêveçûnê. : Ji dengê reprepa pêyên wî ez ji xew rabûn.

**Reprep<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Deng ji pêyan hatin. .: Reprepê neke da cîran hêris nebin.

(K) bn: Kirin

**Req** (hk.x.çewa) 1.Tiştê qayîm.Tiştê ne nerim. Tund. Dijwar.. : Dîwarê, berê, asinê; req. Br× Nerim

**Req<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Dema tişt req di bit.: Nan yê req bûy. 2. Mirin. Sekitîn. (K) bn: Bûn.

**Re<u>qî</u>** (n.dar.mê)1. Rewiştê tiştê req.: Jiber reqîya erdî, kolana rezî bi zehmete.

**Req<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Gihorîna made yan tiştên din ji gaz, şile û nerim bo reqî. (K) bn:Kirin.

**Re<u>sen</u>** (hk.x.çewa) Xurî. Xumalî. Bijavtî.

**Reş** (hk.x.çewa) Rengê reş. Tarî.: Tenî a reş. Bizina reş. Rejî a reş. :Şeva reş.

**Reşa<u>dok</u>** (n.l.mê) ***giya*** Giyayek kesk û tamtîje, di gel zadan di hêt xwarin.

**Reşan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Av lêkirin bi çipikan.(K) bnd: ez di reşînim em direşînîn, tu di reşînî hûn di reşînin, ew di reşîne[…it] ewan di reşînin.. Pr : Dê [bi] reşînim, reşînîn, reşînî, reşînin, reşînit[…ne], reşînin. Bdb : di reşand, di reşandin. Db,dû:rşandibû, reşandibûn. (F): bi reşîne, bi reşînin

**Reşa<u>tî</u>** (n.dar.mê) Tiştê, cihê reş xuya bi ke. : Ji dûr reşatî a wî xuya di kir.

**Reş<u>belek</u>** (n.l.mê) 1.Saloxdana ciwanî ya rengên sipî û reş têkel. :Çavên reşbelek. Ang: çavên reş û sipîlka sipî.2.Şahîya ji jin û mêran pêkhatî. Govenda têkel.

**Reş<u>bext</u>** (hk.l.çewa) Bextreş.

**Reşbûn** (k.jn.l.mê) Reng ber bi reşî di çe. : Li ber tavê çerimê wî reş bû.

**Reşe** (n.dar.mê) Ji tirsan da helamet li ber çavên mirovî çê di bin. Sehim. Tirs. Batirsok.: Reşek jibo dewaran çê bi bû, lewra revîn.

**Reşeba** 1 (n.l.mê) Bahoz. Barove.

**Reşeba** 2 (n.l.mê) ***derd*** Derdê bawîbûnê.

**Reşedirî** (n.l.mê) ***fêqî*** Dirî.

**Reşê** (ngaz.dar.mê) Naznav û navê bangkirina jina reş.

**Reşêle** (n.dar.mê) ***balinde*** Reşwêle.

**Reşik** 1 (hk.dar.çewa,n.dar.mê)1. Mirovê reş û lewaz. 2 .Reşîya çavî. Reşka çavî.

**Reşik** 2 (n.dar.mê) Corekê kevinê pêlavane. Kalik. ***Pend*** :Reşika reş, şiloxa sipî, eve ne, êka dî.

**Reşî** (n.dar.mê) bn : Reşatî.

**Reşîşe** (n.dar.mê) Teveka bara kêm.

**Reşkirin** (k.jn.l.mê) Rengê reş lêdan. :Jiber mirina xweşdivîyê xwe, xwe reş kirin. (K) : Kirin.

**Reşmal** (n.l.mê) Xîvet. Kon. Çadir.

**Reşmar** (n.l.nê) ***candar*** Marê reş yê bê jehir, yan jehirdar.

**Reşmêw** (n.l.nêr) ***fêqî*** Core tirîyekê reng reşe.

**Reşnivîs** (n.l.mê) Nivîsîna liser kaxwezan, hêj ne hatîye rastvekirin û çewtî û ne rêkî têda heye, piştî di hêt rasvekirin di xin ser kaxezeka din yan kompyûterê.

**Reşo** (ngaz.dar.nêr) Navkirina peyayê reş. Mêrê reş.

**Reşpoş** (hk.l.çewa) Mirovê cilên reş li ber xwe di ket ji xeman.

**Reşpoşkirin** (k.jn.l.mê) Ji egera kovanekê mirov xwe bi cilkên reş di poşit. (K) bn: Kirin.

**Reşqelyan** (k.jn.l.mê) Dema mirov li ber tava gerima havîne reş di bit û çermê mirovî wek qelyanê lê di hêt. (K) bn: Qelyan.

**Reşqelyayî** (hk.l.çewa) Mirovê ji ber gerimê reş bûyî û qelyayî.

**Reşreşk** 1 (n.l.mê) 1.Corekê biharatane dindikên wî di reş û hûrikin. 2. Perdeyên yan pirtên reş li ber çavan durust di bin.

**Reşreşk** 2 (n.l.mê) *can* Reşka çavî.

**Reşrihan** (n.l.mê) *giya* Rihana ciwan û reş ve.

**Reştale** (hk.l.çewa) Mirovê reş. Dêzereş. Reş û tarî.

**Reştarî** (hk.l.çewa) Reşê tarî. :Şeveka reştarî.

**Reşûkî** (n.dar.mê) Coreke kevin ê tivengane.

**Rev** (n.x.mê) Baz. Bazdan. Bez.: Segî da dû dizî, bi reva xwe ra ne gehişt.

**Revandin** (k.jn.x.mê) Tiştekî yan mirovekî bi xurtî bi xwera bi bî. Rakêşan. Dizîn. : Pisê cîranê me jineka revandî. (K) bdn: ez di revînim em di revînîn, tu di tevînî hûn di revînin, ew di revîne[…it] ewan di revînin. Pr : dê bi + bdn. Bdb : di revand, di revandin. Db,dûr :ravandibû,revandibûn.(F): bi revîne, bi revînin.

**Revde** (n.dar.mê) Bireka giyandaran bi hevre, wek guran û seyan. : Zivistanan revdeyên guran di mişene.

**Revend** (hk.dar.çewa,n.dar.mê) 1. Mirovê ji wargeha xwe dûr di keve. Koçer. Revenda kurd li derveya welat. 2. Navê mêrane.

**Revî** (n.x.mê) Bir. Revde. : Revîya dewaran.

**Revîn** (k.jn.x.mê) Ji cihê xwe bi tirs yan xurtî derkevtin[çûn]. Bazdan. Teqyan. *Pend* :Revîn jibo mêran şerme.(K) bdn : ez di revim em di revîn, tu di revî hûn di revin, ew di reve[…it] ewan di revin..Pr : dê[bi] revim, revîn, revî, revin, revit[…ve], revin. Bdb:ez di revîm,em di revîn, tu,ew di revî, hûn,ewan di revîn. Db,dûr : ez revîbûm,em revîbûyn, tu revîbûy, hûn,ewan revîbûn, ew revîbû. (F) : bi reve, bi revin

**Revîvan** (karn.dar.dz) Nêçîvan.

**Revok** 1 (hk.dar.çewa) Yê ji tirsa neyaran di reve.

**Revok** 2 (n.x.mê) *candar adî* Kêzikeka firinde, reng gewir veye û jehirdare, hingivê wan şirîn û xweşe, di kunekeviran da şaneyan di danin.

**Revotik** (n.dar.mê) *candar* Revok.

**Revrevik** (n.l.mê) Sîtavk û sînahîyên liber çavên mirovî çê di bin, di rastî da nînin.

**Rewa** (rd.x.çewa) Tişt, gotin, kiryar ên qanûnî yên mirovî maf heye pê ra bi be.

**Rewan** (hk.x.çewa) 1.Can. Giyan. Deron. 2. Zîx. peyt. Zîrek. Desthil.

**Rewanbêj** (hk.l.çewa) Mirovê zîrek û desthil di gotin vehandina peyvan da.

**Rewanbêjî** (n.l.mê) Şarezayî di warê selîqe, gotin û vehandina peyvan. :Waneya rewnbêjîya zimanê kurdî; ang çewayîya fêrbûna zimanê kurdî bi awayekê rast ciwan.

**Rewayî** (rd.dar.çewa) Qanûnî. Yasayî.

**Rewêjtin** (k.jn.x.mê) Birîn. Birîndarkirin.

**Rewişt** (n.x.mê) Sinc.

**Rewiştpak** (rd.l.çewa) Mirovê xwedî sinca pak.

**Rewiştpîs** (rd.l.çewa) Sincpîs. Dehmenpîs. Bêrewişt. Bêsinc.

**Rewiştpîsî** (n.l.mê) Bêsincî. Dehmenpîsî.

**Rewîn** (k.jn.x.mê) Dengê segan. :Segê hewe îşev gelek ê di rewit, diyare dehbe yêd li dora gundî?. ***Pend*** :Se di rewit, karwanî bi rêya xwe di çit.ang; ne pêdivîye pûtey bi din gotinên vala yên mirovê pitpitî.

**Rewş** 1 (n.x.mê) 1. Keyf. Xweşî. Aram. Ronahî. : Rewşa malê zarokin.

**Rewş** 2 (n.x.mê) Bar. Kawdan. : Rewşa tenahîyê li welatê me pir başe.

**Rewşen** (n.dar.mê) 1.Ciwan .2. Navê jinane.

**Rewşenbîr** (rd.l.çewa) Mirovê xandî û zana. Xudan bîr, xwedî hizir. Ronakbîr.

**Rex** (n.x.nêr) Al. Tenişt. Kêlek. Hêja li rex hevalî rûnişt.

**Rexne** (n.x.mê) Destnîşankirina şaşîyan û dîyarkirina rêya çarekirinê.Rexnya avaker ; jibo baştirkirina dozê ye. Rexneya kavilker di bit egera têkdanê û ajawe yê.

**Rexnegir** (pîşn.l.dz) Kesê karê wî rexne girtine.

**Rexnegirî** (karn.dar.mê) Karê rexnegiran.

**Rexnegirtin** (k.jn.l.mê) Dema mirov rexneyê di gire. (K) bn : Girtin.

**Rexnekirin** (k.jn.l.mê) Rexnegirtin.

**Rexnevan** (pîşn.dar.dz) Rexnegir.

**Rexnevanî** (karn.dar.mê) Rexnegirî.

**Rext** (n.x.nêr) Qayîşeke taybet hatîye diristkirin jibo hilgirtina fîşekên tivengan.

**Rextik** (n.dar.nêr) Kulindê zer.

**Rexûçan** (n.l.pir) Dewrûber. Hemû alî. Nêçîrvan li rexûnên xwe nêrî dako nêçrekê bi bîne.

**Rexûdûr** (n.l.pir) Rexûçan.

**Reyîn** (k.jn.x.mê) Rewîn.

**Rez** (n.x.nêr) Çem [bîstan] ê fêqî, bi taybetî tirî.

**Rezber** (n.x.mê, hk.dem) Meha îlonê.

**Rezbirîn** (k.jn.l.mê) Çinîna tirîyê rezan. Mizeyt.

**Rezil** (rd.x.çewa) 1. Çirîk. Pîs. 2. melîl[melûl].

**Rezîlbûn** (k.jn.l.mê) 1.Çirîkbûn. 2. Melûlbûn.

**Rezîlî** (n.dar.mê) 1. Pîsî.çirîkî. 2. Melûlî.

**Rezîlkirin** (k.jn.l.mê) 1. Gotinên kirêt û gef lê kirin. 2. Xwe bêçarekirin. Melûlkirin. (K) bn: Kirin.

**Rezvan** (pîşn.dar.dz) 1. Xwedîyê rezî. Sexbêrkerê rezî.2. Navê xortane.

**Rezvanî** (karn.dar.mê) Karê [pîşeya] rezan. Cotyarî. Cotkarî.

**Rê** (n.x.mê) 1.Cihê[şopa] mirov, giyanewer, tirombêl û htd lê hatinûçûnê di kin. 2. Awa. : Rêya çak û neçak. Rêya rast.

**Rêba** (n.l.mê) Biyav. Seqa.

**Rêbaz** (n.dar.mê) 1.Rêçik. Şop.2. Navek kurdî ye.

**Rêbendan** (n.l.mê) Meha duwê ji werzê zivistanê ye.

**Rêber** (pîşn.dar.dz) 1. Yê şareza rê nîşa xelkî bi dit.2. Navek kurdîye. 3. Serkêş.

**Rêberdan** (k.jn.l.mê) Ji rê derkevtin. Berzebûn. Hindabûn. Dûrkevtin. : Gelê me rêya kurdînîyê tu caran bernade.

**Rêberî** (karn.dar.mê) Rêzanî. Serkêşî.

**Rêberîkirin** (k.jn.gl.mê) Serkêşîkirin. Rênîşadan.

**Rêbir** (rd.l.çewa) Rêgir. Cerdevan. Çete.

**Rêbirîn** (k.jn.l.mê) Rêgirtin. Kevtin di rê da.

**Rêbiwar** (n.l.dz) Rêving.

**Rêbîn** (rd.l.dz) 1. Yê rêya di zanit. Rêzan.Şareza. 2. Navek kurdî ye.

**Rêç** (n.x.mê) Rê. Şop.

**Rêçal** (n.l.nêr) J ajî.Binc.

**Rêçalî** (rd.l.çewa) Xwarinên sipîyatî, wek mast, penîr, jajî û htd. Sipîyatî. Babê min hez ji xwarinêd rêçalî di ke.

**Rêçevan** (pîşn.dar.dz) Rêbîn. Rêzan.

**Rêçevanî** (karn.dar.mê) Rêberî. Rêzanî.

**Rêçik** (n.dar.mê) Rêbaz.

**Rêçûn** (k.jn.l.mê) bi Rêveçûn. bi Rêkevtin. (K) bn: Çûn.

**Rêda** (n.dar.mê) Bingeh. Şengiste.

**Rêdan** (k.jn.l.mê) Destûrdan. Hêlan. Delîvedan. Br× Rêgirtin yan nehêlan. (K) bn: Dan.

**Rêder** (n.dar.dz) 1.Yê ko rê di det mirovî jibo encamdana karekî.2. Cih yan rêya derkevtinê.

**Rêdîn** (n.x.mê) *can* Rihdîn Rîh.

**Rêdîr** (rd.l.çewa) 1.Dûr ji warê xwe. Xerîb. 2.Navekê kurdî ye.

**Rêgeh** (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê rê lê derbaz di bit.2. Proje.

**Rêgir** (rd.dar.çewa) Mirovê rê li xelkî di girit jibo karên xirab. Cerde. Çete.Diz. Talanker.

**Rêgirî** ( karn.dar.mê) Mirovê karê wî rêgirtin be.

**Rêgirtin** (k.jn.l.mê) 1.Şelandin. Xirankarî. Cerdeyî. 2. Girtina rêyan. Astengkirin. (K) bn: Girtin.

**Rêhebûn** (k.jn.l.mê) Hebûna delîveya kirinê. Hebûna şiyanê.

**Rêhesin** (n.l.mê) Rêya şemendefiran û makînên dî ya ji haesinî[asin] hatî çêkirin.

**Rêjan** (k.jn.x.mê) bn: Rêjtin.

**Rêje** (n.x.mê) Pirtek jê. Parçek dîyarkirî ji tenekî. : Rêjeya serkeftina qutabîyan ev sale 20% pitire ji par.

**Rêjgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cih, çal yan gera av di rêjit nav. Sîlav.

**Rêjin** (k.jn.x.mê) 1. Kurîşk. 2. Kelişte. Kun.

**Rêjne** (n.x.mê) Tava baranê.Rêjî.

**Rêjî** (n.dar.mê) Hatina befir û baranan. :Saleka bi rêjî ye ang: geleka barî.

**Rêjîk** (n.dar.mê) Çekê otomatîk.

**Rêjîn** (nl.dz) 1. Valakirin. :Av rêjtin. Kevtina şileyan. Rêjan. Rêjtin. (K) bdn: ez di rêjim em di rêjî, tu di rêjî hûn di rêjin, ew di rêje[...it] ewan di rêjin. Pr:dê[bi] rêjim, rêjîn, rêjî, rêjin, rêje. Bdb: di rêja, di rêjan.Db,dûr: rêjabû, rêjabûn. (F): bi rêje, bi rêjin. 2. Rêya jiyanê. Awayê jîyanî.2. Navê keç û xort an.

**Rêjtin** (k.jn.x.mê) Valakirin. Rûkirin. (K) bdn: ez di rêjim em di rêjîn, tu di rêjî hûn di rêjtin, ew di rêje[…it] ewan di rêjin.Pr: dê bi +bdn. bdb: di rêjt, dirêjtin.[di rêja, di rêjan] db,dûr: rêjtibû, …bûn. (F): bi rêje, bi rêjin

**Rêjkirin** (k.jn.l.mê) Pakijkirina amanan .(K) bn: Kirin.

**Rêk** (hk.cih,n.dar.mê) 1. Rêya biçûk. :Rêka gundî. 2. Hevbîr. Hevdeng. Kûk. :Ez û ew di kar û kiryaran da di rêkin.

**Rêkan** ( hn,nl.dz) 1.Hozeka kurdane li Kurdistana Iraqê. 2. Navekê kurdî ye.

**Rêkanî** 1 (mal.dar.dz) Kesê ser bi hoza rêkanî ve.

**Rêkanî** 2 (hn.l.çewa) Rêya ko nû hatî çêkirin. Rêya nû.

**Rêkêş** (hk.l.çewa) 1. Mirovê serkêşî ya bizavekê bi ke. Rêzan . Rêber. 2. Navê mêrane.

**Rêkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov tiştekî jibo cihekî bi rêket. Bi şîne. Şandin. Virê(bi rê)kirin. (K) bn: Kirin.

**Rêkkevtin** (k.jn.l.mê) Morkirina peymanan. Pêkkirin. Pêkhatin. Li hevhatin. (K) bn: Kevtin.

**Rêklam** (n.biyan.mê) Dane nasîna kelûpelan, deste û dezgehan û htd.Ragehandin.

**Rêkûpêk** (rd.l.çewa) Peyt. Dirist. bi Serûber. :Xortekê rêkûpêk. :Jineka rêkûpêk.

**Rêkûpêkbûn** (k.jn.gl.mê) Peytbûn. Berhevbûn. bi Serûberbûn. (K) bn:Bûn.

**Rêkûpêkî** (n.gl.mê) Serûberî. Peytî.

**Rêkûpêkkirin** (k.jn.gl.mê) bi Serûberkirin. Peytkirin. Berhevkirin. (K) bn:Kirin.

**Rêkxer** (pîşn.dar.dz) Daner. Avrêner. Avaker.

**Rêkxiraw** (n.dar.mê) bn :Rêkxistî.

**Rêkxistin** (k.jn.l.mê) Karê mirov rêk bêxe.çê biket. (K) bn: Xistin(êxistin).

**Rêkxistî** (n.dar.mê) bn: Rêkxiraw. Deste, Bir, a hatî avakirin jibo encamdana karê bo hatî destnîşankirin. : Rêkxistîya xaça sor.Rêkxistî.

**Rêl** (hk.cih,n.x.mê) Cihê pir darû bar. Dehil.Daristan.

**Rêlêgirtin** (k.jn.gl.mê) Rê li kesek yan cihek hatî girtin. Rêgirtin.

**Rênas** (rd.l.çewa) 1. Rêber. Şareza. Nexşdaner. 2. Navek kurdî ye.

**Rênasî** (karn.l.mê) Şarezayî. Rêzanî.

**Rênasîn** (k.jn.l.mê) Rêzanîn. Nexşedanan. (K) bn: Nasîn.

**Rêncber** (pîşn.dar.dz) Karker. Zehmetker.:Ez rêncberim. :Ew mirovekê rêncbere.

**Rêncberî** (karn.dar.mê) Karkirin. Paleyî. Kasibî. ::...rêncberîyê ji xwe ra di ke.

**Rêncî** (rd.dar.çewa) Dema masolkên leşê mirovî ji egera westanê(kar) girj yan xav di bin û jan jê di çin.

**Rêncîbûn** (k.jn.l.mê) Weke masolên leşî xav yan girj di bin. :Destê min rêncî bûye.(K) bn: Bûn.

**Rêncîkirin** (k.jn.l.mê) Mirov leşê xwe bi westîne.:Piçek pêhin a xwe vede, nê te giyanê xwe rêncî kir!.(K) bn: Kirin.

**Rênivîs** (n.l.mê) Çewayîya nivîsînê. Rêya rasta nivîsîna zimanan. Rênivîsa pîtên latînî, erebî.

**Rêsan** (k.jn.x.mê) 1. Hirî, mû pembû û htd. Bi teşîye yan makînê di vehînin û di kin bendik. Ristin. Rêstin.: Dapîr ya hirîyê di rêsit dako bo min gorekê bi ket. Çêkirin. (K) bdn. :ez di rêsim em di rêsîn, tu di rêsî hûn di rêsin, ew di rêse[…it] ewan di rêsin. Pr : Dê[bi] rêsim, rêsîn, rêsî, rêsîn, rêsit[…se], rêsin. bdb : di rêsa, di rêsan. Db,dûr :rêsabû, …bûn. (F): bi rêse, bi rêsin.2. Navê xort û jinan e.

**Rêsîn** (k.jn.x.mê) Ristin. Rêsan. (K) bdn. :ez di rêsim em di rêsîn, tu di rêsî hûn di rêsin, ew di rêse[…it] ewan di rêsin. Pr : Dê[bi] rêsim, rêsîn, rêsî, rêsîn, rêsit[…se], rêsin. bdb : di rêsa, di rêsan. Db,dûr :rêsabû, …bûn. (F): bi rêse, bi rêsin.

**Rêşî** (n.x.mê) Rîşîk.

**Rêşte** (n.x.nêr) Nivş. Berebab.

**Rêtin** (k.jn.x.mê) bn : Rêjtin.

**Rêv** (n.x.pir) ***can*** Mûyên di kevin rexên endamê guhnelî, li binê zikî. Rêv : tiraşîn bn : Tiraşîn. Weryan bn : weryan, weran, reş, zer,sipî,sor: corê rengên,….

**Rêvas** (n.x.mê) ***giya*** Giyayek kûvîye, tem tirş û xweşe bistîka wî di hêt xwarin.

**Rêveber** (pîşn.dar.dz) bn : Rêvebir. :Rêveberê xandingeha me çû seredana malên qutabîyan.

**Rêveberî** karn.l.mê) Cihê rûniştin û karê rêvebirinê.

**Rêvebir** (pîşn.dar.dz) Yê dezgehekî, fermanberîyekê bi rêve di bit. Berpisyarê dezgehê, rêveberî yê.

**Rêvebirin** (k.jn.l.mê) 1. Hajotin. Serrêkirin. 2.Wergirtina karê berpisyarîyê li dezgehekî. Karê mirov bi stoyê xwe ve di girit. Bi rêve di bit. (K) bn : Birin.

**Rêvebirî** (n.l.mê) bn : Rêveberî.

**Rêveçûn** (k.jn.l.mê) liser Rêyê çûn. bi pêyan çûn. Çûn. Bi rê kevtin. : Dapîra min gelek ya pîr bûy êdî nikarit bi rêve bi çit. (K) bn:Çûn.

**Rêvin** (rd.x.çewa) Gemar. Pîs.

**Rêvinbûn** (k.jn.l.mê) Pîsbûn. Gemarbûn.

**Rêving** (n.dar.nêr) 1. Yê bi rêyekê ve di çit. Li ser rêyekê.2. Navê mêrane.

**Rêvingî** (rd.dar.çewa) Mirov bi rêvingî di cihekî ra derbaz bi bit. Bi rêya xuda di wê derê ra bi çe. :Ez bi rêvingî di gundê we da derbaz bûme.

**Rêvinkirin** (k.jn.l.mê) Gemarkirin. Pîskirin. (K) bn:Kirin.

**Rêxer** (ndar.dz) bn : Rêkxer.

**Rêxiraw** (n.dar.mê) bn : Rêkxiraw.

**Rêxistin** (k.jnlmê) bn : Rêkxistin.

**Rêxistî** (ndar.mê) bn : Rêkxistî.

**Rêyakaviran** (n.l.mê) Rêya kadizan.

**Rêz** 1 (hk.x.çewa) 1.Tiştên yek li pey yekê. Bi dû êkve.2. Dêrên nivêsînê. Riste.3. Xîç.

**Rêz** 2 (n.x.mê) Rûmet. Qedir.

**Rêza** (n.x.mê) Raman. Ango.

**Rêzan** (rd.l.çewa) 1. Rêber. Şareza. Rênas. 2. Navek kurdî ye.

**Rêzanî** (n.l.mê) Şarezayî. Rêberî.

**Rêzbûn** (k.jn.l.mê) Li yek rêz bi dû êk ve rawestan. Kevtin dû hev. Kevtin kêleka hevdu.

:Gelî qutabîyan divê hûn jibo silava alaya Kurdistanê ciwan rêz bi bin.

**Rêzdar** (rd.dar.çewa) Hêja. bi Rêz.bi Rûmet.

**Rêzik** (ndar.mê) 1. Rêz. Kêş. 2. Dêrika nivêsînê.

**Rêziman** (n.l.mê) Rêya rast kirin û darijtina zimanan. Bingeha zimanî. Rêzman.

**Rêzimanî** (hn.l.çewa) Zanîna darijtina bingeha zimanî bi zimanê rast.

**Rêzkarî** (n.dar.mê) Rêkûpêkî. Diristî.

**Rêzkirin** (k.jnlmê) Êxistin dwî êk. Kevtin dû hev. Hijmarin. :Xwe rê bi kin dê noke mamosta gotinekê bêjit. (K) bn : Kirin.

**Rêzname** (k.l.mê) Nivîsara fermî ya peyrew û bernameya her rêxistîyekê têda hatî çespandin.

**Ribête** (rd.x.çewa) Candarên li mal sexbêr di ken û çavê xwe baş di dinê dako qelew bi bit jibo firotinê yan serbirînê.

**Ribêtekirin** (k.jn.l.mê) Sexbêrkirina kewalan jibo qelew bi bin. Qelewkirin.(K) bn : Kirin.

**Riçilandin** (k.jn.dar.mê) Dema zadê yekî yê nerim û zêde av bit, di bêjin te xwarina riçilandî.

**Riçilî** (rd.x.çewa) Zadê kirêt,nerim hilyayî ji egera ava zêde, yan neşarezayî ya mirovî. Birinca riçilî: birinca dindikên wê di nav êkda bihujîn.

**Riçilîn** (k.jn.x.mê) Dema xwarin di riçile.

**Ridên** (n.x.mê) Rihdîn. Rîh.

**Rifank** (n.dar.mê) bn: Ref.

**Rih** (n.x.mê) 1. Pişka binî ya di axêra ji dar û giyayî, ko av û xwarin ê di gehînit ta û belgan. 2. Mûyên rûyên mêran. Rihdîn. 3. Nivş. Berebab. Kûk.

**Rihan** (n.x.mê) Giyayek ciwan û bêhindare.

**Rihberdam** (k.jn.l.mê) Rih ne tiraşîn. Hêlana rihan. :Ji hewe ve min rih berdane, ez sofîme?.(K) bn : Berdan.

**Rihdîn** (n.dar.mê) 1. Qefteka mûyên bi hefka yên nêrî û bizinan. 2. Rîh. Rih.

**Rihet** (hk.x.çewa) Tena. Hawîş. Amoj.

**Rihetî** (n.dar.mê) Tenayî. Xweşî.bêhinvedan.

**Rihetbûn** (k.jn.l.mê) Bêhinvedan. Tenabûn.(K) bn: Bûn.

**Rihetkirin** (k.jn.l.mê) Tenakirin. Bêhinvedan.(K) bn: Kitin.

**Rihhavêtin** (k.jn.l.mê) 1. Hişînayî[dar û giya] rihên wî bi hêz di bin û di erdîra belav di bin.2. Zemalê rihên xwe yên berdayî bi tiraşit. (K) bn: Havêtin.

**Rihik** (n.dar.mê) ***xwarin*** Corekê zadî ye ji hevîr, goşt, rûn û biharat an di hên çêkirin û di rûnî da qelînin.

**Rihî** (n.x.mê) Ji egera barîna gelek befir û baranan erd nerim di bit û teqna betenan di hilweşit xwarê û di be egera girtina rêyan caran kuştina kewal û dewaran. Lehî.

**Rihkurkirin** (k.jn.l.mê) Kurtkirina yan tiraşîna rîhan.

**Rihse** [rihseg] ( rd.l.nêr) ***dijûn*** Core civîdaneke dijî mêran jibo bê rêz û rûmet kirinê, rihên wî wek mûyên segan di hên hevber kirin.

**Rihsipî** (hk.l.çewa) Mirovê bi navsal ve çûyî, xasim mêr. Jî dirêj.

**Rihtexe** (rd.l.çewa) Zelamê rihên wî texe bin. : Sofîyê rihtexe.

**Rihtiraşî** (rd.l.çewa) Mirovê rihên wî di tiraşî bin.

**Rihtiraşîn** (k.jn.l.mê) Zelamê rîhên xwe di tiraşit. Rihkurkirin.

**Rijan** (k.jn.x.mê) bn :Rijyan.

**Rijd** (hk.x.çewa) Weke mirov li ser gotin, boçûn a xwe ne hêt xwar û sedased pêra bit.

**Rijdbûn** (k.jn.l.mê) Kesê li ser bpçûna xwe rijd, çi rast yan şaş be. (K) bn: Bûn.

**Rijde** (n.x.mê) *xwarin* Xwrineke şêweyê davên dirêj, xir, pan û htd, ji genim û rûn, di hêt diristkirin. Makeron.

**Rijdî** (n.dar.mê) Dema mirov li ser gotin, kiryara xwe rijde. Liser ya xwe nahatin xwar.

**Rijêm** (hn.x.biyan.mê) 1.Deshelata çewsêner,diktatûr.: Rijêma Be`is. 2. Rêkxististina xwarinê çi başe bi xwe çi ne xwe. Parêz.

**Rijêmkirin** (k.jn.l.mê) Tuxîbkirina cor û awayê xwarinê ji ber nesaxîyan, yan qelewî yê. Parêzkirin. (K) bn: Kirin.

**Rijî** (rd.x.çewa) Tirsî. Tisî. :Nanê rijî. Ang; nan bê pêxwarin.

**Rijyan** (k.jn.x.mê) Weryan. Kevtin. Jê kevtin. :Stêr rijya. Stêr kevte xwarê. Rêjan.: Stêrek ji esmanê Kurdistanê rijya. Ang : Rêberek yan honermendek çû ber dilovanî ya xudê.

**Rik** (hk,rd.x.çewa) 1. Cihek asê. Rêyek destkevir û bi zehmet bo lêçûnê.2. Li ser ya xwe man. Pênedan. Ji ya xwe ne hatin xar. Serreqî. Reqî.

**Rikanê** (n.dar.mê) Dema mirov li ser ya xwe yê rijd be . Hevrikî

**Rikanêkirin** (k.jn.l.mê) Rijdî kirin. Serreqîkirin li ser boçûna xwe. Hevrikîkirin.(K) bn : Kirin.

**Rikdar** (rd.dar.çewa) Serreq.Riko.

**Rikeber** (rd.dar.çewa) Berhelistkar. Berdij. Dij. Ne pêra. Ne digel. Dijber.

**Rikeh** (n.dar.mê) bn :Rikew.

**Rikew** (n.l.mê) Selikeke bi şivikên yek li rex yekê û hêlana valayî yê hindî stûrî ya şivikekê navbera wan da, binên şivikan di darek bazinî ra qayîmkirîne û serên din jî herwesa, ji bazinê biçûktir, binê wê bi depên wek toran peyt di ken û serî bi kevilekî di xemlînin destikekî di êxinê jibo hilgirtin û veguhastinê,derek tê vekirîye di hêt daxistin. Jibo xwedîkirina kew û balindeyan bi kar di hêt. Qefesa kewan

**Rikêb** (n.x.mê) Ciheke bi zînê dewaran ve ye, di keve herdu alîyên kêleka dewarî,mirov li dema siyarbûnê herdu pêyên xwe di xin navda jibo xwe ragirtin liser piştа wan.

**Rikêv** (n.x.mê) bn : Rikêb.

**Rikgirtin** (k.jn.l.mê) Yêherdem rikan di girit. (K) : bn :Girtin.

**Rikîn** (hk.dar.çewa) Riko.

**Riko** (hk.dar.çewa) Mirovê gelek rikan di girit. Serreq. Serhişk.

**Riksar** (rd.l.çewa) Riko.

**Rim** (n.x.mê) *çek* Çekekê kevine, ji darek rast û dirêj serekê tîj hatîye çêkirin. li pevçûnan bikar di hat, herwesa bo karên werzişî bi kar di hêt.

**Rimandin** (k.jn.x.mê) Herifandin.

**Rimbaz** (pîşn.l.dz) Pispor di warê karîn û havêjtina riman.

**Rimhavêj** (pîşn.l.dz) Yên ko rimê di havêjin, bi kar di hînin.

**Rimhavêjtin** (k.jn.l.mê) Riman di havêjin. Bi kar di hînin. (K) bn: Havêjtin.

**Rimj** (n.x.mê) Ewir.

**Rind** (rd.x.çewa) Ciwan. Xweşik. Hêja. :Keçeka pir rinde.

**Rindbûn** (k.jn.l.mê) Ciwanbûn. Xweşikbûn.

**Rindê** (hd,gazn.dar.mê) 1. Naznave û gazîkirin jibo jina rind,ciwan. Ciwanê. 2. Navê pîrekane.

**Rindî** (d.dar.mê) Ciwanî.

**Rindkirin** (k.jn.l.mê) Ciwankirin. Xemilandin.

**Rindo** (hd,gazn.dar.nêr) 1. Naznav û gazîkirin a mêrê rind, ciwan. 2. Navê mêrane.

**Rindtir** (hevbn.dar.çewa) Ciwantir.

**Rindtirîn** (hevbn.dar.çewa) Ciwantirîn.

**Rinek** (n.dar.nêr) Firçe. Rinekê didanan. Rinekê malînê.



**Rinek**

**Ringandin** (k.jn.x.mê) Hijandin û denjgê ringênê jê hatin. Livandin. înanûbirin. (K): bdn: ez di ringînim em di ringînîn, tu di ringînî hûn di ringînin, ew di ringîne[...it] ewan di ringînin.Pr:dê bi+bdn. Bdb: di ringand, di ringandin. Db,dûr: ringandibû, ringandibûn. (F): bi ringîne, bi ringînin.

**Ringering** (n.l.mê) ***deng*** Dengê ringê. Dengê dergeh û tenekeyan. : Ringeringa dergehane jiber ba û bahozê.

**Ringên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê ringeringa dergeh, teneke û penceran ji egera livandinê.

**Ringîn** (k.jn.x.mê) ***deng*** Ringering jê hatin. Ringên jê hatin. Dergeh di ringe.

**Rinîn** (k.jn.x.mê) Jêkirin. Jêvekirin. Belg weryan.

**Ripin** (n.x.mê) Qeft. Gurz. Destik.

**Ripinîn** (k.jn.x.mê) Dema rihên giyayî di erdî da pir û bi hêz di bin. Bûn gurz, destik, qefit. ***Pend*** : Giya liser binê xwe di ripinit.ang; gel,malbat û mêrçak jinav naçin,lê nifşê wan dê şopa wan girit.

**Ripûrût** (rd.l.çewa) Mirovê bê mal û dirav. Rût.

**Riq** (n.x.mê) Rik. Kerb. Kîn.

**Rism** (n.x.nêr) Mînak.Wêne.

**Rismgirtin** (k.jn.l.mê) Mînakgirtin. Wênegirtin. (K) bn: Girtin.

**Rismkirin** (k.jn.l.mê) Kirina mînakan. Wêneyan. (K) bn: Kirin.

**Rist** (n.x.mê) Daveka bendikê hilawîstîye cilikan pêve di ken da zuha bi bin. Werîs.

**Ristandin** (k.jn.x.mê) Rêzkirin. Rêkûpêkkirin. (K) bdn: ez di ristînim em diristînîn, tu di ristînî hûndi ristînin, ew di ristîne[...it] ewan di ristînin. Pr: dê bi+bdn. Bdb : di ristand, di ristandin. Db,dûr : ristandibû, ristandibûn. (F) : bi ristîne, bi ristînin.

**Riste** (n.x.mê) 1. Hevek. Hehok.2. Hozan. Helbest.

**Ristevan** (pîşn.dar.dz) Helbestvan. Hozanvan.

**Ristik** (n.dar.mê) 1. Stovank. 2. Helbest.

**Ristin** (k.jn.x.mê) bn: Rêsan.

**Riswa** (rd.x.çewa) Şermizar.

**Riswabûn** (k.jn.l.mê)Şermizarbûn.

**Riswakirin** (k.jn.l.mê) Şermizarkirin.

**Riswayî** (n.dar.mê) Şermizarî.

**Rişan** (k.jn.x.mê) Vergerana zadê mirovî xwarî di rêka devîda. Dilrabûn. Hilandin. Rişyan Hilavêtin. Verişyan. [Di, Dê]rişim, rişîn, rişî rişin, rişit[…şe].rişam, rişan, rişay.

**Rişk** (n.x.mê) Xerzê, hêkên spîhan. Mêtûlke.

**Rişkkirin** (k.jn.l.mê) Danana xerzê spîhan. Hêkkirina spîhan.(K) bn: Kirin.

**Ritil** (n.dar.gel) ***can*** Cot gunên candaran.

**Ritlo** (gazn.dar.nêr) Mirovê ritil ên wî perçivîn.

**Ritlobûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov toşî derdê ritloyîyê di be.

**Ritlokirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov ritlo di be.: Heger tu kevirên giran hilgirî dê xwe ritlo bi kî!.

**Ritloyî** (hk.dar.çewa) ***derd*** Nexweşîyeke ji egerê ritil di êvitin [ perçivin].

**Rivişt** (n.x.mê) Netewe. Nivş.

**Riwek** (n.x.nêr) Çandek. Darûgîya.

**Riyan** (k.jn.x.mê) Rîtin. Gokirin.

**Riz** (n.x.mê) Birinc.

**Rizandin** (k.jn.x.mê) Mirov fêqîyekî, xwarinekê bi rizînit.

**Rizgar** (hk.x.çewa) 1. Azad. Serberst. Serfiraz. 2. Navê mêrane.

**Rizgarbûn** (k.jn.l.mê) Azadbûn ji sitema dujmin. (K) bn: bûn.

**Rizgarî** (n.dar.mê) Bizav ji pêxemet rizgarbûnê. :Xebat di keyn jibo rizgarî ya Kurdistanê.

**Rizgarkirin** (k.jn.l.mê) Azadkirin. (K) bn: Kirin.

**Rizinde** (n.x.mê) Asinkên ko dergeh, pencer bi melbenan ve di girê den.: Çîreçîr ji dergehî dihêt jiber ko rizindeyêd wî yêd jengî bûyn.

**Rizî** (rd.x.çewa) Tişt yan zadê pûç bûyî û bi kêr karînan û xwarinê na hêt. Pûç. Xirab. Genî.

**Rizîbûn** (k.jn.l.mê) Fêqî, goşt, dar û htd genî di be. Xirab di bit. :Zadê di xwaringeh da rizî bûy. (K) bn : Bûn.

**Rizîkirin** (k.jn.l.mê) Rizandin.

**Rizîn** (k.jn.x.mê) Rizîbûn. Genîbûn. :Fêqî li ber tavê di rize.

**Rizyane** (n.x.mê) ***giya*** Giyayekê kesik û bi xemle, dav zirave û rîşalîye, tam û bêhin xweşe.

**Rîbar** (n.l.nêr) 1. Çem. Robar.2. Navek [nêr ûmê] kurdî ye.

**Rîçal** (n.dar.mê) ***darûbar*** Rih.

**Rîçalhavêtin** (k.jn.l.mê) Rîçalavêtin. Rihhavêtin. Rihdan.

**Rîh** (nx.gel) bn: Rih.

**Rîhsipî** (nl.nêr) bn: Rihsipî.

**Rîho** (ngaz..nêr) Naznavê xudanê rîha. Zelamê bi rîh.

**Rîgeh** (hk.cih,n.cih.mê) Cihê pîroz yê mirov berê xwe di ditê. Rûgeh. Qîble.

**Rîkirin** (k.jn.l.mê) Zad ji qazanan kirine amanên din. Xwarin ji amanekî kirine yê dî. (K) bn: Kirin.

**Rîko** (ngaz.dar. nêr) Rîho.

**Rîl** (n.x.mê) ***tiraş*** Corekê tiraşan(dar)e , li rexên cok û rûbaran hişîn di bit, rengê wê keskek bi xemle û guleka ciwan reng sor yan pîvazî heye.

**Rîp** (n.x.mê) Kiryarek mirov bi destê xapînokan di hêt serdabirin . Xap. Telhe. Şermizarî. : Di kem nakem ji rîpa te qurtal nabim.

**Rîs** 1 (rd.x.çewa) 1. Mirovê bê cilik. 2. Mirovê rût, bê dirav.

**Rîs** 2 (n.x.nê) Hirîya davdavkirî û berhev jibo tevnî.

**Rîsbûn** (k. jn.l.mê) Mirov bê cilik di bit. Rûtbûn.(K) bn : Bûn.

**Rîsî** 1 (hk.çewa) Bê cilî. Hejarî.

**Rîsî** 2 (n.x.mê) Gurzên giyayê dirûtî.

**Rîskirin** 1 (k.jn.l.mê) Cilik jiberkirin. (K) bn: Kirin.

**Rîskirin** 2 (k.jn.l.mê) Çêkirina rîsî. Hirî berhevkirin.

**Rîswa** (rd.x.çewa) Şermizar. Direwîn. Rûreş.

**Rîswabûn** (k.jn.l.mê) Şermizarbûn. (K) bn: Bûn.

**Rîswakirin** (k.jn.l.mê) Şermizarkirin. (K) bn: Kirin.

**Rîşal** (n.x.mê) Rihên daran.

**Rîşalok** (n.dar.mê) Rîşîk.

**Rîşîk** (n.dar.gel) Bisk,davên giyayî, bendikan yan pora serî bi cihekî ve şor di bin.

**Rît** (rd.x.çewa) 1.Bê pare û malê dinê.2. Hulî. Rîs.

**Rît<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Bê mal û pare man. (K) bn: Bûn.

**Rî<u>tê</u>** (ngaz.mê) Jina rît.

**Rî<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Havêtina bermayê xwarinê di rêya paşî yê da. (K) [di,dê] rîm,rîn,rît,rîtin. Bi rî, rîn.

**Rît<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Bê pare û mal kirin. Şelandin. Veriçandin.

**Rî<u>to</u>** (ngaz.dar.nêr) Mêrî ripûrût. Mêrê rîs.

**Rî<u>vî</u>** (n.x.dz) ***candar*** Giyanewerekê kwîvîye, Şîrdere, goşxwere. Rovî.

**Rî<u>vîk</u>** (n.x.mê) Endamên leşê canewer û mirovan yên nav zikî , ko ji gedeyî tanî derve di dirêjin.

**Rîvîka<u>dirêj</u>** (n.l.mê) Rîvîka ji hemûyan dirêj tire di zikî da. Duwazdegirê.

**Rîvîka<u>kore</u>** (n.l.mê) Parçe rîvîkeka zêdeye bi ya stor ve girêdaye.

**Rîvîka<u>stor</u>** (n.l.mê) Rîvîka ji ya dirêj dest pê dike û ji derve bi dawî di hêt. Kolon.

**Rîx** (n.x.mê) Pîsîyê candaran yê rûn. Ziblê rûn.


**Rîxê<u>kevtin</u>** (k.jnlmê) bi Rîxêkevitin. Ji egera nexweşbûn, yan pir xwarinê, candar gelek rîxê diken. Zibilê wan rûn di bit. (K) bn: Kevtin, keftin.

**Rîx<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Candar û mirov rîxê di ken. (K) : Kirin.

**Rîxo<u>le</u>** (n.dar.mê) Rîvîk.

**Ro** (hk,dem,n.x.mê) Roj.

**Roj** (hk.dem,n.x.mê) 1. Tenê xir û reng zerekê ber bi sipî ve li esmanan ko erdî ronayî di ke.2. Duwazde demjimêrên ronayî heye. 3. Heft rojên heftîyekê.



**Roj**

**Ro<u>ja</u>** (n.dar.mê) Navê jinane.

**Roj<u>ane</u>** (hn.keng) Her roj. Hemû rojan.: Rojane ez parê xwe di wergirim. : Rojane mamê wî seredana wî di ke.

**Rojanû** (n.dem. mê) Newroz. Nîroj.

**Rojareş** (n.l.mê) Roja ji hemûyan ne xweştir. Çam.

**Rojava** (hk.l.cih,n.mê) Senta roj lê ava di bit.

**Rojbaş** (n.l.mê) Silaveke ji paşî spêdê ta berî êvarî bi kare, mirov li hevdu di kin.

**Rojbend** (n.dar.mê) Bireka stêr û heyvên li çerix a rojê di zivirin.

**Rojderkevtin** (k.jn.l.mê) Dema li sipêdeyan roj der di kevit. Rojhilatin.

**Rojdîtin** (k.jn.l.mê) Zengînbûn. Roja mirov li bendê di hêt.

**Rojekê** (hk.dem) Carekê bi roj. Demekî roj bû. :Rojekêji rojan min dî teyrek,…. .

**Rojen** (n.dar.mê) Pencerka bilind. Kuleka ronahîyê.

**Rojev** (n.dar.mê) Bername. Berhevî. Karê rojê.

**Rojgirtin** (jn.l.mê) Dema rûyê rojê di hêt dapoşîn û dinya tarî di bit.

**Rojhilat** (hk.cih,n.mê) Senta roj lê di hilêt[ der dikevit].Rohilat.

**Rojhilatanavîn** (hk.cih.mê) Devereka berfirehe gelek welat lê hene, yek jiwan; Kurdistan.

**Rojhilatin** (k.jn.l.mê) Roj hilhatin. Rojderkevtin.

**Rojhijmêr** (n.l.mê) Kitêbeke rojên heftîyê, meh. û werzên salê têda hene, jibo zanîna dem û jivanan mifa jê di hêt wergirtin. Rojjimêr.

**Rojing** (n.dar.mê) Cirnîyê destşûyê yê di keve bin avrêjê.

**Rojî** (n.l.mê) Rojên mirov xwarin û vexwarinê naxwe. Zahidî. Bi rojî: mirovê rojîgir. : Ez yê bi rojî me.

**Rojîgir** (rd.l.çewa) Mirovê zadî ne xut nexasim li meha remezanê. Mirovê bi rojî.

**Rojîgirtin** (k.jn.l.mê) Mirovê ku xwarinê ne xwe. Bi rojî bit. (K) bn: Girtin.

**Rojname** (n.l.mê) Nameyeka rojaneye, zanîn, nûç, peyam û htd; yên hemû- reng û cor têda di hên nivêsîn dako mirov agehdarî bûyerên cîhanê bi bit.

Rokêt (n.biyn) Topên mezin û dûrhavêj.

**Rojnameger** (pîşn.dare.dz) bn: Rojnamevan.

**Rojnamegerî** (karn.dar.mê) bn: Rojnamevanî.

**Rojnamevan** (pîşn.dar.dz) Kesê pispor di warê rojnameyê da. Kesê karê darijtin û nivîsan di rojnameyan da di ke.

**Rojnamevanî** (karn.dar.dz) Karê nivîs, çapkirin, darijtin û htd di rojnameyan da.

**Rol** (p.x.nêr) Pişkdarî ya mirovî di kar yan çelengîyan da. :Rolê wê di avakirina dezgeha me da yê berçave.

**Roldîtin** (k.jn.l.mê) Pişkdarîkirin. :Ew di karit rolek baş di avakirina gundan de bi bîne. (K) bn: dîtin.

**Role** (n.x) Zarok.

**Rollîztin** (k.jn.l.mê) Roldîtin.

**Rom** (nejad.n) Tirk. Turk. Rom û ecem; ang Tirk û faris.

**Roman** (nx.biyan.mê) Pertoka çîrokên dirêj û bi rûdan.

**Romî** (net,nl.dz) 1. Hilgirê nasnameya tirkî. 2. Mita yan xelkê Turkya.

**Romannivîs** (karn.l.dz) Yê ko romanan di nivîsit.

**Romanvan** (karn.l.dz) Romannivîs. Xwedîyê romanê.

**Romanya** (hk.cih,weln) Welatê romanan.

**Ron** (rd.x.çewa) Aşkera. Xuya. Zelal. Birincok.

**Ronahî** = **ronayî** (n.x.mê) Şabîta mirov li ber wê tişt, tenan di bînit. Ronahîya; rojê, karebê, fanûsê û htd. Br× Tarî.

**Ronahîxistinser** (k.jn.gl.mê) Ronkirin, şirovekirina mijarekî. (K) bn: êxistin[xistin].

**Ronak** (rd.dar.çewa) Ron.

**Ronakbîr** (rd.l.çewa) Mirovê gelek xandî û dinya dîtî. Zana. Rewşenbîr.

**Ronakbîrî** (n.l.mê) Rewşenbîrî.

**Ronbûn** (k.jn.l.mê) Çav ron bûn. ang; Çav êdî çak di bînin. Cihek ron bûn.ang; tarî lê neman.

**Rondik** (nl.mê) 1. Dilopên avê yên ji çavan di zên. Hêstir.2. Navek kurdî yê pîrekane.

**Ronî** (n.l.mê) bn: Ronahî. : Ronîya çavan ronahî ya ko çav di bînin.

**Ronînbûn** (k.jn.l.mê) bn: Ronbûn.

**Ronîkirin** (k.jn.l.mê) bn: Ronkirin.

**Ronkirin** (k.jn.l.mê) 1. Cihek ronkirin ang: ronahî ketine ser cihekî ko çav bi karin bi bînin.2. Zelalkirin. Xuyakirin. Şirovekirin. (K) bn : Kirin.

**Roqroqe** (rd.l.çewa) Mirovê lingên wî dirêj. Lingdirêj.

**Rovî** (n.x.dz) Rîvî. ***Pend*** :Rovî kirin paşa, girya çunko bawer ne di kir.***Pend*** :Rovî ne di giha tirî, go tirşe.

**Rox** (hk.x.çewa) Axa bi dirg û req. Bi gumtil.

**Roxandin** (k.jn.l.mê) Herifandin. Pelixandin. Higumandin. (K,F) : [di,dê] roxînim, roxînîn,roxînî, roxînin, roxînit[…ne] bi roxîne, roxînin. Roxand, roxandin.

**Rubad**(n.x.nê) Kewê nêr. Nêrekew.

**Ruh** (n.x.mê) ***dar*** bn : Rih.

**Ruha** (hk.cih,cugirn) Bajêreke li Kurdistana bakûr. Orfa.

**Ruhayî** (maln) Xelikê ji Ruhayê.

**Ruhdan** (k.jn.l.mê) Giya, dar a rihan di de. (K) bn : dan.

**Ruhnî** (n.dar.mê) Ronahî.

**Ruhnîkirin** (k.jn.l.mê) Dar, giyayê rihan di ke. (K) bn : kirin.

**Rux** (n.x.mê) Rwî. Rû. Serûçav. Rûçik.

**Rû** (n.x.mê) 1. Serûçav. Rûçik.2. Robar.3. Berg.

**Rûbadan** (k.jn.l.mê) Dema hevalek, kesek pişta xwe bi de mirovî û êdî ne vêt têkelîya mirovî bi ke.

**Rûbalgeh** (k.l.mê) Rûyê balîfkê. Rwîbalîfk.

**Rûbar** (cugirn.dar.nêr) Çem.

**Rûber** (hk.cih.mê) ***endaze*** Yekeya pîvana tenan.cihan. Dirêjî× panî. : Rûberê hewşa me 40 m². ango :10×4.

**Rûçik** (n.l.mê) Rû.

**Rûçikandin** (k.jn.l.mê) Balindeyên serjêkirî ji perkirin. Perên wan jê kiirn. Rûtkirin. Verûçikandin.

**Rûdan** (k.jn.l.mê) Dema bûyer di qewimin. : Diyare karekî ya rû dayî, lewra mamostayê me evro ne hatîye.

**Rûdemî** (hn.l.çewa) Rojane.

**Rûgerm** (hk.l.çewa) Xwîngerm. Sergerm.

**Rûkirin** (k.jn.l.mê) bn : Rîkirin.

**Rûmet** (rd.x çewa, n.nêr) 1. Rêz. Qedir. Hêja. : Hevalên bi rûmet, hûn ser çavan hatin. 2. Rûçik.

**Rûmetdan** (k.jn.l.mê) Rêzgirtin.

**Rûn** (n.x.nêr) Dihin. Dûn. Rwîn.Nîvişk.

**Rûndank** (n.dar.mê) Amanê têkirina rûn yan nîvişkî.

**Rûnerm** (hn.l.çewa) Bêhinfireh.

**Rûniştin** (k.jn.dar.mê) Mirov di barê bêhinvedanê da li paşîyên xwe di mînit ji kemaxan xar di bit, pêyên xwe dirêj di keyan li bin xwe da di ne. (K) : [di,dê] rûnim,…nîn,.. nî ,…nin,…ne. Bi rûnê[ne] bi rûnin.

**Rûniştvan** (n.dar.dz) Xelkê cihek dîyarkirî. Kesên li cihekî di mînin. Lê dijîn. : Rûniştvanên gundê serî , hatin seredana yên binî.

**Rûnkirin** (k.jn.l.mê) Rûn li tiştekî dan. Rûn têdan.

**Rûpel** (n.l.mê) Alîyekê kaxezê, perê. Berper. Laper.

**Rûperde** (n.l.mê) Rûyê perdekirî jibo ciwanî, xwe veşarin, diz û htd. Pêçe.

**Rûreş** (h.n.l.çewa) Şermizar.

**Rûreşbûn** (k.jn.gl.mê) Şermizar. (K) bn:Bûn.

**Rûreşî** (n.l.mê) Şermizarî.

**Rûreşkirin** (k.jn.gl.mê) Şemizarkirin. (K) bn:Kirin.

**Rûs** (netewe.n) Mirovê bi netewe rûs. ji Rûsya.ûris

**Rûsî** (netewn.çewa, hk.çewa) Tiştê, xelkê welatê Rûsya.ûrisî.

**Rûsya** (hk.cih,cugir.cih) Welatê rûsan.

**Rût** (hk.x.çewa) 1. Bêcilik. Rîs.2. Bêpare. Iflasbûyî.

**Rûtandin** (k.jn.x.mê) Rûtkirin.

**Rûtbûn** (k.jn.l.mê) 1. Rîsbûn. 2. Hejarbûn. (K) bn: Bûn.

**Rûtenî** (hk.l.çewa) Mirovê rûyê wî mîna tenîyê reş. Bêserûçav.

**Rûtik** (n.da.nêr) Pentol. Pentelon.

**Rûtirş** (rd.l.çewa) Navçavgirê. Lêvşîn.

**Rûtî** (n.dar.mê) Hejarî. Neyî.

**Rûtkirin** (k.jn.l.mê) 1. Rîkirin. 2. Hejarkirin. Pare jê sitandin. Şelandin. (K) bn: Kirin.

**Rwîn** (n.x.nêr) bn:Rûn.

**Rwîs** (hk.x.çewa) Mirovê cil di ber nebin.

**Rwîsbûn** (k.jn.l.mê) Mirov bê cilik di bit. (K) bn: Bûn.

**Rwîsî** (n.dar.mê) Rûtî.

**Rwîskirin** (k.jn.l.mê) Rûtkirin. (K) bn :Kirin.

# S

**S** (se) Pîta bîst û duwê ji abeya kurdî.

**Sa** (n.x.mê) Sîber.

**Sabûn** (n.x.mê) Keresteyeke bi bêhîne,di gel avê kefê di girit, jibo şuştina dest, leş û htd bi kar di hêt. :Giyanê xwe bi sabûnê şûşt.

**Sabûnçî** (pîşn.l.dn) Kesê sabûnan çê di ke.

**Sabûnker** (karn.dar.dn) Sabûnçî.

**Sabûnkirin** 1(k.jn.l.mê) Çêkirina sabûnan. :Kargeha sabûnkirinê.

**Sabûnkirin** 2 (k.jn.l.mê) Sabûn li serûcanên xwe kir. :Cilên xwe sabûn kirin. :Serê xwe sabûn kir.

**Sabûnsaz** (pîşn.l.dn) Sabûnker. Sabûnçî.

**Sabûnsazî** (karn.l.mê) Karê çêkirina sabûnan.

**Sac** 1 (n.x.mê) Sêl.

**Sac** 2 (n.x.mê) *dar* Core dareke.

**Saçme** (n.x.mê) Seçme. Pirt.

**Sade** (rd.x.çewa) Tiştê yek reng, yek cor. :Peyveka sade; peyveka xurî, wek Azad. ; mirovek sade ; mirovek vekirî, nezan. Xurî. Pakij. Br× Lêkdayî.

**Sahî** (rd.x.çewa) Esmanê şînê bê ewir. Semal.:Evro dinya sahîye.

**Sahîstêr** (n.l.mê) Dema bi şevê dinya di be sahî û stêrên esmanî baş xuya di kin.

**Sakar** (rd.x.çewa) Sade. Xurî.

**Sako** (n.x.nêr) Cilekê stûr û dirêje zivestanan li ber xwe di kin. Kapot.

**Sal** (hk.dem) Diwazdeh meh, çar werze; bihar, havîn, payîz û zivistan. :Jîyê te çend salin?. :Saleka xweş û bi baran. ***Pend*** :Saleka dî, malaka dî. ***Pend*** :Sala bi hure, ya kure.

**Salane** (rd.dar.çewa) Hersal. Salê carek. : Salane ew seredana derve di ke.

**Salanû** (n.l.mê) Li 21ê avdarê sala nû ya kurdane.Dawîya meha 12 destpêka saleka nû.Nûsal. Sersal.

**Salborî** (n.l.mê) Derbazbûna salekê bi ser bûyerekê da. Bîranînêd salane.

**Salborîn** (jn.l.mê) Salborî.

**Sale** (hk.cih,n.x.mê) Jorek mezine, jibo civîn yan çelengîyên werzişî bi kar di hêt.

**Salekê** (rd.kengî) 1.Bûyerek di saleka ne dîyar rû daye.2. Heyama yek sal.

**Saleyî** (malb,n.ndar) 1. Hozeka kurdane li Kurdistana îraqê.2. Kesê ji hoza saleyî.

**Salix** (n.x.mê) Ronkirin. Ravekirin. Pesin. Tîtal. Kevneşop.

**Salixdan** (k.jn.l.mê) 1.Mirov ronkirinan li ser tiştekî bi de. 2. Pesindan. Mezinkirin.: Bo min salixdana kurê xwe bi ke. Ango: Bo min bêje kanê kurê te çend zîreke, çi di karit, di zane. (K)bn : Dan.

**Salname** (n.l.mê) Namekek nemazeye jibo heyama salekê hatîye diristkirin ko têda meh, heftî û roj destnîşan kirîne di gel bûyerên çêbûne.

**Salon** (n.x.mê) Avayîyeke jibo sertiraşîn û ciwankirina jinan.

**Salox** (n.x.mê) Salix.

**Salveger** (n.l.mê) Hatina dema saxkirina bîranînan piştî salekê, li rojeka taybet.

**Salwext** (hk.ldem) 1.Derbazbûna demek dirêj ko bi salan di hêt gotin.2. Demek[wextek] ê salê.

**Salyad** (n.l.mê) bn: Salveger.

**Saman** (n.x.nêr) Tişt, mal ê mirovî hebit. Dahatî :Neft samanekê neteweyî ye.2. Navê mêrane.

**Samî** (nejadn) Nejadê çend neteweyane wek Ereb.

**Sana** (rd.x.çewa) Sanahî.

**Sanahî** (rd.x. Çewa) Kar yan tiştê zû û bê zehmer bi hêt kirin. : Waneya evroj geleka bi sanahîye.

**Sanahîbûn** (k.jn.l.mê) Mirov karekî bi sanahî bêxe.:Çend mirov xwe bi westîne, kar sanahî di be.

**Sanahîkirin** (k.jn.l.mê) Bi sanahî êxistin. :Mamostayî waneya me gelek li ber me sanahî di kir.

**Sanahîtir** (rd.dar.çewa) Karekê ji yê din xweş yan sivik tire jibo encamdanê.:Kolan ji dirûnê sanahîtire.

**Sanahîtirîn** (rd.dar.çewa) Karê ji hemûyan sanahîtir.

**Sanayî** (hk.x.çewa) Sanahî.

**Santîmetir** (n.cîh.l) Yekeya pîvana dirêjîyê. 100 santîmetir = yek metir. Sentîmetir.

**Sapît** (hk.cih,n.x.mê) Banê xanî û joran[mezel] ji alîyê nav nexasime, nêzî dîwaran. Bersapîtk.

**Saq** (n.x.mê) Goreka zivistanî ye jibo gerim û peytkirinê bi kar di hêt,herdu ser di kunin[vekirî] ji hirîyê diristkirîye bi ser baqên xwe da di girin.

**Sar** (hk.x.çewa) 1.Nizimbûna pileyên germê. Serma. Tezî.2. Bê tam. Kirêt. Ne şirîn.Mirovê sar. Xwînsar. Mirovê kirêt. 3. Sist.

**Sarbûn** (k.jn.l.mê) 1. Tezîbûn. :av sar bû. :Seqayê deverê li payîzan sar di be.2. Sistbûn. Bêgêilbûn. :Dilê min ji karê min sar bûye.

**Sarî** (n.dar.mê) 1. Serma. 2. Bêtamî. 3. Sistî, bê xemî.

**Sarkirin** (k.jn.l.mê) 1.Tezîkirin.Tezandin. 2. Bêtamkirin.Bêgêwikirin. (K) bn : Kirin.

**Sasan** (n.x.nêr) Navek mêrane.

**Sasanî** (nej,n) Kevine welatek,gelekê Iranî ye.

**Satîre** (hk.dar.çewa) Mirovê bê kar û bi kêr nehatî. Tembel. Kolanî.

**Sator** (n.x.mê) Kêra mezin. Çeqoka mezin. :Bi satorê giyayî hûr di kin.

**Sava** (hk.x.çewa) Biçûk. Zarok. Negehiştî.: Zarokê sava, ezmûna sava, :Hikometa sava û htd.

**Savar** (n.x.mê) ***xwarin*** Xwarinek ji dindikên genimê kelandî û li aşî kirî hatîye berhevkirin. ***Pend*** :Savar alîka mêrane.

**Savaxane** (hk.cih,n.l.mê) Cihê xwedî û fêrkirina zarokên savayan.

**Sax** (hk.pesin.n. çewa) Nemir. Zindî. Peyt.

**Saxbûn** (k.jn.l.mê) Vejîn . Vejîyan. Ji nexweşîyê rabûne ve. :Tanî derzîkan bo xwe ne danî tu sax nabî!.(K) bn: Bûn.

**Saxî** (n.x.mê) Nemirî.Tendiristî.:Daxaza saxîyê jibo kirin.

**Saxkirin** (k.jn.l.mê) 1. Ji nexweşî [nisaxî] ê qurtalkirin.2. Zindîkirina bîranîn. (K) bn: Kirin.

**Saxlem** (hk.x.çewa) Leşsax. Peyt. Ne nisax.

**Saxlemî** (n.dar.mê) Tendiristî. Leşsaxî.

**Saxlet** (n.x.mê) Rewişt. Rabûnûrûniştin. :Hemû saxletên kiça wî di başin. Ang ; ya hêjaye.

**Saxte** (hk.x.çewa) Sixte. Zir.

**Saxteçî** (karn.l.dn) Mirovê karên saxte di ke.

**Saye** (n.x.mê) Sih. Sîber. Sa.

**Sayî** (rd.x.çewa) Sahî.

**Sayîhişk** (rd.l.çewa) Dema esman yê sahî, sireka hişk peyda di bit..

**Saz** (n.x.mê) 1.***mûzîk*** Core amêrekê mûzîkê ye. Tembûr.2. Çêkirin.

**Sazandin** (k.jn.x.mê) 1.Sazkirin. Çêkirin. 2. Sazjenîn.(K)bdn : ez di sazînim em di sazînîn, tu di sazînî hûn di sazînin, ew di sazîne[…it] ewan di sazînin. Pr :dê[bi] sazînim sazînîn, sazînî sazînin, sazîne. Bdb : di sazand, di sazandin. Db,dûr: sazandibû, sazandibûn. (F): bi sazîne, bi sazînin.

**Sazbend** (pîşn.dar.dn) Kesê sazê lê di xe. Sazvan. Tembûrvan.

**Sazdêran** (n.dar.mê) Ahinga mûzîkê, xasime ya sazan.

**Sazgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Kargeh. Karxane.

**Sazî** (n.dar.mê) Dezgeh. Bingeh.Karxane.

**Sazkirin** (k.jn.l.mê) Diristkirin. Çêkirin. Avakirin.(K) bn: Kirin.

**Se** (n.x.nêr) ***candar*** Candarekê şîrdere, goştxwere, kehîye, yan kûvî. Seg. Kûçik. ***Pend*** :Se her seye, çi reş yan sipî be.

**Seb** (n.x.mê) Cihê çîmentokirî. Req.

**Sebkirin** (k.jn.l.mê) Çîmentokirin. :Xanîyê xo seb kir. :Ban seb kirin. (K) bn: Kirin.

**Seçme** (n.x.mê) Pîncên guletopan. Pirt.

**Sed** (hijn.çend) Hijmara 100.

**Sedased** (hk.l.çewa) Karê tu goman têda nebit û ji sedê sed dirist bit. Misoger. 100%. :Serkefina wî di ezmûna zimanê kurdî da sedasede.

**Sedem** (n.x.mê) Eger. Verêj. :sedema baran ê befirê, gelek xanî heriftin.

**Sedhizar** (hijn.l.çend) Hijmara100,000.

**Sedir** (hk.dar.çewa) Mirovê cilik xwe di ber na girim, gelek zû cilêd wî di dirin.

**Sedmilyon** (hijn.l.çend) Hijmara100,000,000.

**Sedsal** (hk.dem) Sed sal. Çerx. Babelîsk. :Sedsala bîstan.

**Seg** (n.x.nêr) ***candar*** bn: Se. ***Pend*** : Seg goştê segan na xot. ***Pend*** :Seg, çêtire ji mirovê bê nan û mek.



**Seg**

**Segav** (n.l.nêr) ***candar*** Core candareke di dehil û avan da dijît. Seyê avî.

**Segbab** (hk.l.çewa) Civîneke jibo birîndarkirina hesta mirov, jiber ku bab kesek hêja cihê rûmeta mirovî ye, mina segan bêrêz di ken dema vê civînê didin.

**Segbaz** (pîşn.dar.dn) Mirovê segan hînî rahênanan di ke. Fêrkerê segan.

**Segvan** (ndar.dz) 1. Sêrevan. Nîşanxweş.2. Nêçîrvanê seyan jibo ravê bi kar di hînit. Xwedîyê segan. Segbaz. 3. Navê mêrane.

**Sehkirin** (k.jn.l.mê) Nêrîn. Berexudan. Temaşekirin. :Here sehke mal kanê mêvan hatine?. (K) bn:Kirin.

**Sehim** (n.x.mê) Tirseka mezin. Erjeng.

**Sehol** (n.x.mê) Qeş. Qerîse.

**Seholbestin** (k.jn.l.mê) Qerisîn. Qeşgirtin.

**Sekan** (rd.x.çewa) Lenger. Seqet.

**Sekar** (n.x.mê) Setil. Mencelok.

**Sekitîn** (k.jndarmê) Mirina candaran ;wek seg, ker.*Pend* :Kerê yekî di sekite segê cînarî qelew di be.

**Sekretêr** (n.cîh) Sikirtêr.

**Sel** (n.x.mê) Amaneke ji şivikan hatî ye diristkirin jibo têkirina fêqî û mitayî bi kar di hêt. Sela tirî.

**Selemêş** (n.l.mê) Seleke mêşhingivan têda xwedî di kin şêweyê wê dirêje dervankek heye jibo derîna hingivî yan lê nêrîn û sexbêrkirina wan û serê dî yê ziravtire û kunek biçûk lê ye bo hatinûçûna mêşan.

**Selemêşk** (n.l.mê) Biçûkirina selemêş, naznavê selemêşê. Selemêşa piçûk.

**Selik** (n.dar.mê) Sela biçûk.

**Selî** (n.x.mê) Yek li dû yekê û lezgîn. Selîyeka çekê otomatîk.

**Selîqe** (n.x.mê) Awaz. :Selîqa vê lavjeyê pir xweşe.

**Selmandin** (k.jn.x.mê) Daxuyandin. Aşkerakirin.Danezan. Şirovekirin. Avhilkirin.

**Sema** (n.x.mê) Govend. Keyf. Aheng. Xoşî.

**Semer** (n.x.nêr) Serê bilind yê kurtanê dewaran, di kevit rexê stoyê wan jibo peytkirina bar û siyarbûnê.

**Semone** (n.x.mê) Nanê bazarî, yê stûre, gelek şêwe û cor hene.

**Semyan** (n.x.dn) Serok. Kiral. Xudan. Serwer.Şah. Şajin. Ezbenî. Sexbêrvan. :Kî semyanê van zarokane?.

**Seng** (n.x.mê) Giranî. Pestan. :Senga vî berî çend ?.

**Sengandin** (k.jn.x.mê) Pîvana giranîya tenan. Hilsengandin. Pîvan. li Terezîyê kirin.(K) bdn: ez di sengînim em di sengînîn, tu di sengînî hûn di sengînin, ew di sengîne[...it] ewan di segînin.Pr: dê [bi] sengînim sengînîn, sengînî sengînin, sengîne. Bdb: di sengad, di sengandin. Db,dûr: sengandibû, sengadnibûn. (F): bi sengîne, bi sengînin.

**Senger** (hk.cih,n.dar.mê) Çeper. Kozik.: Pêşmergehî sengerên dujminî dane ber destrêja top û tivengan.

**Sengergeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê yan beroka senger lê hatîn kolan jibo bersinggirtina dujminî.

**Senîmenî** (n.dar.mê) *tirane* Gotineke jibo mirovên lêbok, kar yan tiştê seyr û semere di hêt gotin. :Bi nêre wê pîrejina henê çi senîmenî ji xwe çêkirîne!. ***Pend*** : Senîmenî, mastê tirş û dewê genî, tu bi xwe lêbokî hêjta bi xelikî di kenî!.

**Sent** (n.x.mê) Alî.Araste. : Senta rojava, rojhilat.

**Sentçûn** (k.jn.l.mê) li Sentçûn. Ber bi sentekê ve çûn.Livîneke ber bi alîkî ve.

**Sentenet** (n.x.mê) Xanedan. Mal û dirav. :Rêber mirovêkê xudan sentenete.

**Sentîn** (n.x.nêr) Davên dezîyê nerim û rengîn jibo nexşan bi kar di hên.

**Sepandin** (k.jn.x.mê) Biryardana bi kotekî, bêy heza mirovî. Bindestkirin. Jibo berjewedîya xwe bikar anîn. (K) bdn: ez di sepînim em di sepînîn, tu di sepînî hûn di sepînin, ew di sepîne[...it] ewan di sepînin.Pr: dê[bi]sepînim sepînîn, sepînî, sepînin, sepîne. Bdb: di sepand, di sepandin. Db,dûr: sepandibû,sepandibûn. (F) : bi sepîne , bi sepînin.

**Sepet** (n.x.mê) Sel. Sebete.

**Seq** (rd.x.çewa) Devê das, bivir, sator û htd hatî hisîn.Hisayî.

**Seqa** (n.x.mê) Çewayîya zanîna pileyên gerim û sermayê, barîna befir û baranan. Bîyav. :Erê seqayê dinyayê çewane?.

**Seqakirin** (k.jn.l.mê) Xweşkirin û tîjkirina devê das, bivir, sator û htd bi têxişandina berav yan kartîkî. : Gundîyan bivir û dasên xwe seqa kirîne, çunko sube çilîbire.(K) bn: Kirin.

**Seqandin** (k.jn.x.mê) Seqakirin. Hisîn. Tîjkirin.(K): bdn: ez di seqînim em di seqînîn, tu di seqînî hûn di seqînin, ew di seqîne[….it] ewan di seqînin. Pr: dê[bi] seqînim seqînîn, seqînî, seqînin, seqîne. Bdb: di seqand, di seqandin. Db,dûr :seqndibû, seqandibûn. (F): bi serqîne, bi seqînin.

**Seqav** (n.l.dn) *candar* bn: Segav.

**Seqem** (n.x.mê) Sireka bi bestî û hişk.Sermayeka dijwar. Sireka dujwar. :Rojekê seqem bû, em di mal da asê bûyn.

**Seqet** (rd.x.çewa) 1.Lenger. Pekkevtî.2. Xar. Keç.

**Seqetbûn** (k.jn.l.mê) 1.Lengerbûn. Xarbûn.

**Seqetkirin** (k.jn.l.mê) 1. Lengerkirin. 2. Xarkirin. Keçkirin.

**Seqitandin** (k.jn.x.mê) Seqetkirin.

**Ser** (nx.nêr) 1. Kuloxê hestî yê caneweran yê mejî di nav da. çav,dev ,guh û kepî pêvene. ***Pend*** : Serî gote ezmanî, heta tu li min xudanî, xweşî nagehit gîyanî. ***Pend*** :Serê bi şere, qon li dere. ***Pend*** :Serên du beranan di dîzekê da nakelin. ***Pend*** :Serê ser jiber ne êşin li ber beran bi kêşin.***Pend*** :Serê te dê şikênim, belê gotina te naşkênim.***Pend*** :Serê bê zade[mejî] her bi gire û pêdade. ***Pend*** :Serê bi lef û sahşike, lê pêxas û bê kalike.***Pend*** :Serê ne êşe ne pêdvî girêdanê ye. ***Pend*** :Ser di kulavî da çêtire.***Pend*** :Serê bi şaşik û lefe, yê bê nan û ufe. ***Pend*** :Serê keçelan, di kevin paxilên gerdenzeran.2. Cihê bilind. :Serê çiya. :Serê girî. . : Serên rêka lê berzebûn.

3. Rêber. Mezin. Serwer.: ***Pend*** :Serê hate birînê, lê dey malê xizînê,na hêteve kirînê. 4. Liser tiştekî hatî ye danan. ***Pend*** :[li] Ser berekê panim, ne ji wanim, ne li wanim.5. Destpêk. Berahîk. :Tu xudê çîroka xwe ji serî bo min bêje.

**Sera** (n.x.mê) Koçik. : Seraya sipî.

**Serab** (n.dar.mê) Dema gezîna gerima tavê, caran halamet li ber çavan çê di bin.

**Serad** (n.x.mê) ***serrad*** Core moxileke kunêd wê di mezinin jibo ji hev cuda kirina dan û qeselê bi kar di hêt.

**Serabin** (hk.l.çewa) Tiştê ser û binên wî lêk wergerandî.Ser çûye binî û bin çûye serî.

**Serabinbûn** (k.jn.gl.mê) Ser û bin lêkhatîne guhorîn.

**Serabinkirin** (k.jn.gl.mê) Cihgorîna ser û binan. : Pîrê nevîyê xwe serabin kir, çunkî firşkê wî yê keftî.

**Seradan** (k.jn.l.mê) Çûn nik dost, heval, birader, nexweşek û daxwaza serferazîyê jibo bi hêt kirin. .: Qutabîyan sera mamostayê xwe dan. Seredan. Serlêdan.

(K) bn: Dan. :Em dê sube çin nexweşxanê sera hevalê xwe bi din.

**Seradkirin** (k.jn.l.mê) Mitayê girê mîna nok, baqil, lobîk û htd li seradê di kin dako ji pelexê xwe bi hêt paqijkirin û bi kêr xwarinê bi hêt.

**Seranser** (hk.l.çewa) Gelmperî. Gişt. Hemû. Hemû alî.: Kurd li seranserî welatên cîhanê hene;ango kurd li hemû(piranî) welatên cîhanê hene.

**Serasin** (hk.l.çewa) Mirovê serreqê wek asinî. Serhesin. Serhişk.

**Seraza** (rd.l.çewa) Serbest. Azad.

**Serbadan** (k.jn.l.mê) 1.Dema mirov serê xwe ba di dit; badana stûnî ramana qayîlbûnê ye û ya ahoyî[asoyî] ango ne pêraye.2. Revîn ji babetî,gihorîna mijarê. .Direwkirin.(K) bn: badan.[dan].

**Serbajar** (hk.cih,cugirn.l) Paytext.

**Serban** (hk.cih,n.l.nêr) Alîyê serî yê banê xanî. Ban.

**Serbar** (n.l.nê) 1. Mita yan pertal yê bijare yan zêde ji barî li ser barê dewaran di hêt danîn.2. Kesê di malê da ji hemûyan hejîtir,rêzdartir. Serpişk.

**Serbarî** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo zêdekirina yan ravekirinê bi kar di hêt. Serera. Di ser hindê ra. Jiber hindê jiber vê yekê. Lewra. :Serbarî pêşniyara te, min divê gotineka dî liser zêde bi kem,.. .

**Serbark** (n.l.nêr) Selikeka biçûke, jibo diyarî yan xwarina xudanî, fêqî yan mita tê di kin li ser barî di danin.

**Serbarkirin** (k.jn.l.mê) Serbarkek li ser barî di hêt danan. (K) bn: Kirin.

**Serbask** (hk.cih,n.l.nêr) 1. Rêya di serê gir yan çiyan ra derbaz di bit. 2. Serê darcigarkî.

**Serbaz** (n.dar.dz) 1.Çekdarê fermî. Leşker. Pêşmerge.2 Nevê mêrane.

**Serberdan** (k.jn.x.mê) Serberstkirin. Azakirin. ;Hema min serê te berda ye, tu çi di kî, bike!.

**Serberdayî** (rd.l.çewa) 1. Serbest. Xweser. 2. Serserî. Kolanî.

**Serbest** (n.dar.çewa) Azad.: Ez yê serbestim di biryar danan da.

**Serbestbûn** (k.jn.l.mê) Azadbûn. Serxwebûn.

**Serbesthiştin** (k.jn.l.mê) Serbestkirin. Bajêlekirin. Azakirin.

**Serbestî** (n.dar.mê) Azadî. Xweserî.

**Serbestkirin** (k.jn.l.mê) Azadkirin. Azakirin. Rêdan.

**Serbênek** (n.l.mê) Sivande.

**Serbêrî** (pîşn.l.mê) Serkêş, rêber, berpirsa bêrîvanan.

**Serbiçûk** (rd.l.çewa) Yê ko serê wî biçûk bit. ***Pend*** :Serbiçûka pê mezin ne xwezîya mala tu lê di bîye jin. ***Pend*** :Serê biçûke, lê mejî geleke.

**Serbijare** (hk.l.çewa) Serpişk. Serbar.

**Serbilid** (hk.l.çewa) Serferaz. Bi rûmet. Hêja. Rêzdar. Xudanqedir. :Em bi hewe serbilindin.

**Serbilindî** (n.l.mê) Serferazî. :Serbilindîyê ji gelê xwe ra di xwazîn.

**Serbir** (karn.l.dn) Yê ko seran di birit. Kujek. Bikuj.

**Serbirîn** (k.jn.l.mê) Serjêkirin. Ser di hên birîn. (K) bn : Birîn.

**Serbixo** (hk.l.çewa) Xweser. Negirêdayî çi alî, dezgeh yan cihan.Azad.

**Serbixoyî** (n.l.mê) Azadî. Serbestî. Rizgarî.

**Serbixwe** (hk.l.çewa) bn :Serbixo.

**Serbor** (n.l.mê) Bûyerên hatîne rûdan û mirovî mifa jê wergirtîye. Bi serî hatî. Serhatî. ***Pend*** :Gotin pîrê te jîyê dirêj yan serbor?. Wê got ; heger jîyê dirêj bit, serbor bi xwe di hên.

**Sercanega** (rd.l.çewa) ***dijûn*** Mirovê serê wî wek yê canega mezin.

**Sercem** (n.l.nêr) Gujim. Hemû. Bi hevre.

**Serçavan** (silav) Nîşana rêzgirtin,qayîbûn, û xweşbûna. Pêrgînî.: Tu li ser çavan hatî. Serçavan ez dê bo te çêkem.

**Serçemandin** (k.jn.l.mê) Dema mirov serê xwe di tewîne. Serê xwe di çemînit. (K) bn: Çemandin.

**Serçemk** (n.dar.mê) Serê rêza govendê.

**Serçemkgiritin** (k.jn.l.mê) Kesê li serê rêza govendê ye û alayî hildigirit şahîyê bi rewş di êxit.

**Serçêl** (rd.l.çewa) ***dijûn*** Mirovê serî wî wek ê çêlan mezin.

**Serçinar** (hk.cih,cugrn) Bajêrkeke li Kurdistana Iraqê.

**Serçok** (nl.pir) ***can*** Kudkê serê çokê mirovî.

**Serda** (hk.çewa) Tiştê ko di ser yekê din da. Li serî.

**Serdaçûn** (k.jn.l.mê) 1. Dema tiştek zêde bi ket û êdî xwe negirit. :Nîsk kelî û di ser mencelê da çû. 2. Ji rê derkevtin. Şaşbûn. Xiryan. Ladan. :Ew yê di serda çûye.ang; ladaye. 3. Ketine ser tiştekî. Bi serdaketin. :Pêyên wî jiber çûn bi ser tiraşekê da çû. (K) bn: Çûn.

**Serdahatin** (k.jn.l.mê) 1.Mirov yan tişt bi tiştekî ra bi hêt[derbaz bi be]. 2.Kevtin ser.: Kevirek mezin bi ser kolê wan da hat.(K) bn: Hatin.

**Serdakevtin** (k.jn.l.mê) Weke mirov yan tişt bi kevit ser tiştekî. (K) bn: Kevtin.

**Serdan** (k.jn.l.mê) bn: Seradan.

**Serdar** (karn.dar.dz) 1. Serwer. Semyan. Serok. Rêber. 2. Navek nêrîneye.

**Serdarî** (n.dar.mê) Serwerî. Rêberî.

**Serdark** (n.dar.mê) Dîh. Guhdark. :Serdark liser darê avakir dako giyanewer me xwen.

**Serdatir** (hk.l.çewa) Hêşta di serda. piçeka din  di serda. Bilindtir.

**Serdem** (hk.l.çewa) Hevçerx. Nûdem. :Mirovekê serdem. : Hizreka serdem.

**Serdest** (hk.l.çewa) 1.Azad. Serbest. 2. Serkevtî. Br× Bindest.

**Serdestî** (n.l.mê) Serferazî. Serkevtin.

**Sere** (rd.x.çewa) Kevin. Mezin. Navsalveçûyî.: Mêrekê, jineka sere, ang;ya, yê navsalveçûyî.

**Seredan** (k.jn.l.mê) bn: Seradan.

**Sereder** (hk.cih,n.l.mê)  Alîyê serî yê derê xanîyan. Serê derî.

**Serederî** (n.dar.mê) Danûstandin. :Serderîya mamostay bi xwendekaran ra pir başe.

**Serederîkirin** (k.jn.gl.mê) Danûstitandin pêra kirin. :Bi çi rêyan serederî bi vî mirovî ra na hêt kirin. (K) bn:Kirin.

**Serek** (pîşn.x.dn) Serok.

**Serekanî** (hk.cih,n.l.mê) 1. Kanîya avê ya serekî ko ço jê di çin.2. Jêder. Lêker. Çavkanî.

**Seremirîşk** (n.l.mê) Mirîşka sere.Mezin. Pêşîya mirîşkan. Sermirîşk.

**Sereta** (n.l.mê) Pêşekî. Destpêk. Berahî.

**Serevraz** (rd.l.çewa) Senta ber bi serî ve. Serbilind. Rik.

**Serevrazbûn** (k.jn.gl.mê) Ber bi evraz ve çûn. Çûn bo alê serî. Bilindbûn. (K) :Bûn.

**Serevrazî** (n.l.mê) Cihê ber bi evaraz ve di çe. Jêhelî. ***Pend*** :Her serevarazîyekî sernişîvîyek heye.ang; paş nexweşîyan xweşî di hêt.

**Serevrazkirin** (k.jn.gl.mê) Bilindkirin. Berê wî, wê,wan dane evraz. Jibo alê serî hatotin. (K) bn:Kirin.

**Serexoşî** (n.l.mê) Behîdarî.

**Serexoşîkirin** (k.jn.gl.mê) Sersaxî lê kirin.

**Serexoşîxwaztin** (k.jn.gl.mê) Serexoşîkirin.

**Serêş** (n.l.mê,hn.l.çewa,) 1.Janeser. Êşana serî. 2. Mirovê ser ji ber bi êşin. Hêrisker.

**Serêşan** (k.jn.l.mê) Weke serê mirovî di êşe. (K) bn: Êşan.

**Serêşî** (n.l.mê) 1.Nexweşîyeke serê mirov di êşit. 2. Arêşe.Westiayn.

**Serferaz** (hk.l.çewa) Serbilind. Serkevtî. . : Em bi gel û xaka xwe serferazîn.

**Serferazbûn** (k.jn.gl.mê) Serkevtin. Serbilindî. : Ez hîvî di kim tu di jîyana xwe de serferaz bî.

**Serferazî** (n.l.mê) Serbilindî. Serkevtin. : Serferazî yê bo wan di xazîn.

**Serferazkirin** (k.jn.gl.mê) Serbilindkirin. Serêxistin. :Mirovê çakî yê bi ke, xudê dê wî serferaz bi ket. :Zaroyên baş daybaban serferaz di kin.(K) bn: Kirin.

**Sergamêş** (hk.l.çewa) ***dijûn*** Nifrîneke dijî hevdu bi kar di hînin jibo birîndarkirina hemberê xwe, ko serê wî mezin û kirête, wek ê gamêşî.

**Sergerdan** (hk.dar.çewa) Mirovê serên rêya li ber hinda di bin. Şepirze. Şepilî. Tengav. Perîşan.

**Sergerim** (hk.l.çewa) 1.Çeleng. Çalak. 2. Xwîngerim.3. Nezan. Xişîm. Serve. Hay ji xwe nebûn.

**Sergerimbûn** (k.jn.gl.mê) Dema mirov zû gerim di bit û bêy xandin, biryarê di dit.

**Sergermî** (n.l.mê) Xwîngermî. Hay ji xwe nebûn.

**Sergerimkirin** (k.jn.gl.mê) Serdabirin. Toşkirin.

**Sergevez** (rd.l.çewa) Mirovê bawerî bi xwe heye. Şanazî bi kiryarên xwe birin.

**Sergêjî** (hk.l.çewa) 1.Gêjbûn.2.Arêşe.Derdeserî. :Li biyanistanê pir sergêjî ji bo min çê bûn.

**Sergirêdan** (k.jn.l.mê) Sermestkirin. Xapandin. ::Vî xortî bi devxweşî û davdozîya xo serê kiçan girê di de.

**Sergîfk** (n.l.nêr) Cihê zibil û tiştê zêde .Gîfank. Zibilxane. Zibilgeh.

**Sergîn** (n.dar.mê) Tepikên ji rîxa çevrî û kewalan hatine diristkirin û piştî hişk di bin jibo gerimkirin û lênana zadî û avê mifa jê di hêt werdigirtin. Devedeştî.

**Sergo** (n.l.mê) Sergîfk. Gîfank. Gîfk.

**Sergotar** (n.l.mê) Navnîşanên serî yên destpêkirina gotaran.

**Serhatî** (n.l.mê) Karê yan bûyera bi serê mirovî hatî. Serbor. Çîrok. Serpêhatî.

**Serhejandin** (k.jn.l.mê) Mirov bi qyîlbûn, dij westan yan hicmetîbûnê serê xwe di hejîne. Serleqandin. (K) bn:Hejandin.

**Serhejîn** (hn.l.çewa) Mirov,candar yan tiştê serê xwe bi hejînit. *Pend*:Zivistana serhejîn çêtire ji ya dwîvhejîn. ang; zivistana li destpêkî pir rêjî, dê bihara wê zû hêt ya bi ber bit, lê heger barîna befir baranan li domahîya wê dest pê kir, dê ziyan bi derametî kevit û paş êxit.

**Serheng** (pîşn.dar.dn) Efserek leşkerî piledare.

**Serhesin** (hn.l.çewa) bn :Serasin.

**Serhev** (rd.l.çewa) 1. Demildest. 2. Bi hevre. Pêkve.

**Serhevîrk**(n.l.mê) Mêdek. Buxçik.

**Serhildan** (k.jn.l.mê) Dema desteyeka mirovan yan gelek, dijî dardestan bizavê di ken jibo bi destxistina mafên xwe.:Li biharê gelê kurd dijî dagîrkaran serî hildan.

**Serhirç** (hn.l.çewa) *dijûn* Kesê ko serê wî wek yê hirçane.

**Serhişk** (hn.l.çewa) Mirovê herdem li ser ya xwe û ne guhdar. Mejîhişk. Serreq.

**Serhişkî** (n.l.mê) Serreqî.

**Serhişkîkirin** (k.jnlmê) Mirov ji biryara xwe ne hêt xar : Serhişkîyê di gel yê ji xwe mezintir neke. (K) bn: Kirin.

**Seridîn** (k.jn.x.mê) Behîn. Zerbûn. Gehiştin. :Genim, ceh, giya li destpêka havînê di seridit.

**Serik** (n.dar.nêr) 1. Serê biçûk. 2. Pîvazka hindek corên giyayî, wek: sîr, pîvok, pîvaz, sêvbinerd û htd. 3. Dergehk. Dervank.

**Serikbadan** (k.jn.l.mê) bn : Serbadan.

**Serinc** (n.x.mê) Bal.

**Serincrakêş** (hk.l.çewa) Balkêş.

**Serincrakêşan** (k.jn.l.mê) Balkişandin.

**Serî** li serî (hk,cih) Alîyê serî. Serda.Br× Binî.

**Serîda** (hk.dem) Dubare. Ji serî. Li destpêkê.

**Serjêkirin** (k.jn.l.mê) Serbirîn. :Mirîşk serjêkir. :Bizin serjêkir. (K) bn: Kirin.

**Serkanî** (n.l.mê) Serekanî.

**Serkar** (pîşn.dar.dz) Perpirsê cihê karî. Rêvebirê dezgeh, karxane û htd.

**Serkarî** (n.l.mê) Desteya rêvebirina karî. Kargîrî.

**Serkeft** (hn.l.nêr) 1.Mirovê di karekî da ser di kevit. 2. Navê mêrane.

**Serkevtin** (k.jn.l.mê) 1.Ji cihek nizim ber bi êke bilind çûn. Bilindbûn. Jêhelçûn. :Bi ser çiya di kevin. . 2.Mirov di karekî, taqîkirinnekê bi encamên baş derbaz bi be. Serferazbûn. (K) bn: Kevtin.

**Serkevtî** (hk.l.çewa) Serferaz. Serbilind. Pêşkevtî.

**Serkêş** (pîşn.l.dn) Kesê li berahîya hemûyan xwe di havêjit karekî. Rêber. Serok.

**Serkêşî** (n.l.mê) Serokatî.

**Serkol** (hk.l.çewa) Mirovê çi di serî[li ser serî] nebe. Bê şaşik. Bê kulav. :Wê henê mirovekê bi cilên kurdî û serkole !.

**Serkolbûn** (k.jn.gl.mê) weke çi di serê mirovî ne bit. Bê, dersûk, kulav, hîzar- bûn.

**Serkolî** (n.l.mê) Bê cemedanî, bê kulav û htd. :Nabe jin bi serkolî nivêjê bi ke.

**Serkolkirin** (k.jn.gl.mê) Dersûk, kulav, hîşar û htd ji serî kirin. :Di mal da mirov xwe serkol di ket.

**Serkomar** (pîşn.l.dz) Serokê komarê.

**Ser<u>kot</u>** (ht.l.çewa) bn  :Serkol.

**Ser<u>kut</u>** (hk.l.çewa) Tiştê serê wî yê kut bit. Netîj. Serpan.

**Serkut<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Tepeserkirin. Çewsandin.

**Ser<u>leşker</u>** (pîşn.l.dn) Serokê leşkerî. Qumandarê leşkerî.

**Ser<u>lêdan</u>** (k.jn.l.mê) Seredan. Seradan.

**Ser<u>ma</u>** (n.x.mê,hk.çewa) 1.Sar. Sir. Seqem. : Evro rojeka gelek sermaye. 2. ***derd*** Persîv. :Serma ya hatî min.

**Serma<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Toşî sermayê bûn. Persîvgirtin.

**Ser<u>mal</u>** (n.l.mê) Dersok. Hîşar.

**Ser<u>maye</u>** (n.l.mê) Dirav û mal ê mirovî. Benk.

**Sermaye<u>dar</u>** (karn.dar.dz) Xwedî mal û dirav.

**Sermayeda<u>rî</u>** (n.l.mê) Sistema sermayedar. Kapîtalî.

**Ser<u>mest</u>** (hk.l.çewa) Mest. Serxweş. Gêj.

**Sermest<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Serxweşbûn. Hay ji xwe neman.

**Sermes<u>tî</u>** (n.l.mê) Serxweşî.

**Sermest<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Serxweşkirin. Mestkirin.

**Ser<u>meşq</u>** (n.l.mê) Nimone. Danek ji.Mînak.

**Ser<u>mezin</u>** (hk.l.çewa) ***dijûn*** Mirovê serê wî mezin.

**Ser<u>mil</u>** (n.l.mê) 1.Parçe peroyên di kevin ser milê mirovî. : Cilên min yên xakî bi sermilin.Sako.

**Ser<u>miyan</u>** (rd.dar.çewa) bn :Semyan.

**Ser<u>name</u>** (n.l.mê) Sernav.

**Ser<u>nav</u>** (n.l.nêr) Manşêt. Navnîşan. Taytil.

**Ser<u>nerim</u>** (hk.l.pesin.çewa) Bêhinfireh. Bêdeng. Guhdar.

**Ser<u>nişîv</u>** (rd.l.çewa) 1.Tiştê serê wî jibo xwarê[binî] wergêrayî. : Cerê avê sernişî bû ava wî rêjt. 2. Ber bi senta xwarê. BR×Serevraz.

**Sernişîv<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Serê wî jibo binî xwar kirin. Jordaçûn.

**Sernişîv<u>çûn</u>** (k.jn.gl.mê) Jorda çûn. Jibo alî xwarê bi rê kevtin.

**Sernişî<u>vî</u>** (n.l.mê) Ji serî bo binî. Jordanî. BR×Serevrazî.

**Sernişîvkirin** (k.jn.gl.mê) Ser jibo rexê binî çemandin. Dernişîvkirin.

**Sernivîs** (n.l.mê) Sergotar.

**Sernivîser** (pîşn.l.dn) Sernivîskar.

**Sernivîskar** (pîşn.l.dn) Serokê nivîserên govar yan rojnameyan.

**Sernixûn** (hk.l.çewa) Sernişîv.

**Sernixûnbûn** (k.jn.l.mê) Sernişîvbûn.

**Sernixûnî** (n.l.mê) Sernişîvî.

**Sernixûnkirin** (k.jnl.mê) Sernişîvkirin.

**Sernûçe** (n.l.mê) Navnîşan yan destpêka nûçeyan.

**Serok** (pîşn.dar.dn) Kesê rêvebirîya ,deste, dezgeh, part,welat û htd bi stoyê xwe ve di gire. Rêber. Serkêş.

**Serpel** (pîşn.dar.dz) Efserê leşkerî yê piledar.

**Serperişt** (pîşn.dar.dn) Kesê nêrevanî û dîvçûna karê deste, dezgeh û htd di ket.

**Serperiştî** (karn.dar.mê) Karê serperiştî.

**Serperî** (n.l.mê) Seroka perîyan. Seroka perîyên deryayî.

**Serpêhatî** (n.l.mê) Serhatî.

**Serpola** (hk.l.pesin.çewa) 1.Bi hêz. 2.Riko.Serreq. Serasin.

**Serpoş** (n.l.mê) 1. Derpoş. Dervank. 2. Dersok. Hîzar. Hîşar.

**Serrast** (hk.l.çewa) Rast. Rêya rast. Li ser rastîyê.

**Serrastbûn** (k.jn.gl.mê) Piştrastbûn. Serrêbûn.

**Serrastkirin** (k.jn.gl.mê) Piştrastkirin. Rêya rast nîşêdan.

**Serrêkirin** (k.jn.gl.mê) Pêra derkevtin û rê nîşadan. Rê nîşadan. (K) bn : Kirin.

**Serrû** (n.l.nêr) Rûyê mirovî yê bilindê ko di keve navbera çan alekê.

**Sersal** (hk.dem,n.l.mê) 1.Serê sala nû û dawîya sala kevin.2. Newroz.

**Sersax** (rd.l.çewa) Mirovê sersax ; mirovê bê arêşe û kêmasî.

**Sersaxî** (n.l.mê) Behîdarî.

**Sersaxîkirin** (k.jn.gl.mê) Sersaxî lê kirin. Dema mirovek di çit ber dilovanîya xudê, xelik daxaza sersaxî û hedarê jibo kesûkarên wî di bêjin.

**Sersaxîxwaztin** (k.jn.gl.mê) Sersaxîlêkirin. Sersaxîkirin.

**Serserî** (hk.l.çewa) Şilatî. Kolanî . Pûç. Kêrnehatî.

**Sersûr** (rd.l.çewa) Hicmetîbûyî.. Seyrmayî.

**Sersûrman** (k.jn.gl.mê) Hicmetîbûn. Seyrman.

**Serşîr** (n.l.mê) Sertûk. Qeymax.

**Serşok** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê [jora] mirov ser û leşê xwe lê di şût.

**Serşor** (hk.l.çewa) Mirovê karekê xirab di ke, serê xwe di tewîne ji şerman da. Br× Serbilind.


**Sertaser** (hk.l.çewa) Seranser.

**Sertazî** (hk.l.çewa) bn :Serkol.

**Sertazîbûn** (k.jn.gl.mê) Serkolbûn. :Ez sertazî di bim. Ew sertazî bû.

**Sertazîkirin** (k.jn.gl.mê) Serkolkirin. :Heroj êvarî mamê min xwe sertazî di kir.

**Serteşîk** (n.l.mê) *candar* Giyandarekê biçûke, firindeye mîna, teşîyane li nêz av û daran di jît û xwarina wê pêşikin.



**Serteşîk**

**Sertil** (n.l.mê) *can* Serê tilîyan dest yan pêyan yên mirov û candaran.

**Sertiraş** (pîşn.l.dz) Kesê karê wî tiraşîna rih û pora serê mirovane.

**Sertiraşîn** (k.jn.l.mê). Tiraşîna por yan rihan. (K) bn: Tiraşîn.

**Sertiraşxane** (hk.cih.mê) Cihê tiraşîna pora seran.

**Sertûk** (n.l.nêr) *spîyatî* Xwarineka çevrîye wek texek [tîkek] tenik li ser mast û şîrî paş kelandinê çê di bit.Sertîk. Serşîr.

**Serûber** (hk.l.çewa)Rêkûpêk. Peyt. Zîx. Berhev. : Çend xortekê bi serûbere.

**Serûberbûn** (k.jn.gl.mê) Rêkûpêkbûn.

**Serû<u>berî</u>** (n.l.mê) Rêkûpêkî. Peytî. :Ez di serûberîya te tênagehim.

**Serûber<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Peytkirin. Rapêçan. :Xwe bi serûber bi ke dê mêvan bo me hên.

(K) bn : Kirin.

**Serû<u>bin</u>** (hk.l.çewa) bn :Serabin.

**Serûbin<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) bn :Serabinbûn.

**Serû<u>binî</u>** (n.l.mê) bn :Serabinî.

**Serûbin<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) bn :Serabinkirin.

**Serû<u>çav</u>** (n.l.pir) Rû. Sîma. Serûsîma.

**Serû<u>pêk</u>** (n.gl.pir) ***xwarin*** Xwarineke ji serik û pêpikên kewalan di hêt lênan. Paçe.

**Ser<u>ve</u>** (hk.dar.çewa) 1. Tiştê berçav. Li serî. 2. Mirovê sade. Vekirî.

**Serve<u>kirin</u>** (k.jnlmê) 1.bi Servekirin. Êxistinser. Existinê. : Karwanî hevsar bi ser hespî ve kir.2. ji Servekirin ang ; jêvekirin. Ji serî vekirin. Di serda hînan.(K) bn : Kirin.

**Ser<u>wer</u>** (hk.pesn.çewa) 1. Semyan. Ser. Serok.2. Navê mêrane.

**Ser<u>werî</u>** (n.dar.mê) Yekêtî. Semyanî. Serdarî. Hevgirtin. :Parastina serwerîya axa Kurdistanê erkê ser milên me hemûyane.

**Ser<u>xoş</u>** (hk.l.çewa) Mirovê jiber vexwarina kiholê mest bûye. Mest. Gêj.

**Serxoş<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Mestbûn. Hay ji xwe neman. Gêjbûn. : Areq vexwar, serxoş bû. (K) bn : Bûn.

**Serxo<u>şî</u>** (n.l.mê) Mestî. Mestbûn.

**Serxoş<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Mirov yekî yan xwe bi vexwarinê mest bi ke.(K) bn : Kirin.

**Ser<u>xur</u>** (rd.l.çewa) Mirovê derd û belayê di hînit. Mirovê kur.

**Ser<u>xwe</u>** (rd.l.çewa) 1. li Serxwe. Ang ; xweragir. Peyt. 2. Hêdî. bi Aram. 3. Aza. Azad.

**Serxwe<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Azadbûn Serbestbûn. :Em serxwebûna Kurdistanê di xwazîn.

**Ser<u>xweş</u>** (hk.l.çewa) Serxoş.

**Serxweş<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Serxoşbûn.

**Serxweşî** (n.l.mê) Serxoşî.

**Serxweşkirin** (k.jn.gl.mê) Serxoşkirin.

**Serzik** (n.l.mê) *can* Parçeya serî, alê serî yê zikî.

**Setil** (n.x.mê) Amaneke destikek pêve ye, jibo av û mita têkirinê bi kar di hêt.Cerdel.

**Setimîn** (k.jn.x.mê) Pêyên mirov yan canewer an ji ber di çin yan di tiştekî di hilingivin û di kevin. Hilingivîn.[tin]. (K) bdn: ez di setimim em di setimîn,tu di setimî setimîn, ew di setime[…it]ewan di setimin. Pr:dê [bi] setimin setimîn, setimî setimin, setime. Bdb: ez di setimîm em,hûn, ewan di setimîm, tu, ew di setimî.Db,dûr: ez setimîbûm em setimîbûyn, tu setimîbûy hûn setimîbûn, ew setimîbû ewan setimîbûn. (F): bi setime, bi setimin.

**Sevî** (n.x.mê) Selikek mezin û kûre jibo fêqî û mitayî bi kar di hêt li ser pişta dewaran bar di kin. :Sevî ya tirî, xoxan, sêv û htd.

**Sewda** (n.x.mê) 1.Evîn.2. Mestî.

**Sewdaser** (hk.l.çewa) Evîndar. Mest. Gêj.

**Sexbêr** (hk.çewa) Paristî.

**Sexbêrî** (n.dar.mê) Çavdêrî. Paraztin[ paristin]. : Min bawerî bi sexbêrîya wî bo malê nîne.

**Sexbêrkirin** (k.jn.dar.mê) Çavdan. Çavdêrîkirin. :Heger kes li mal nema, ez dê sexbêrîya zarokan bi kim. (K) bn : Kirin.

**Sexbêrvan** (karn.l.dz) Yê sexbêrîya zarok, mal û htd di ke.

**Sexmerat** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo egerê bi kar di hêt. Ji pêxemet. Jibona.

**Sext** (hk.x.çewa) Dijwar. Tund.

**Sexte** (hk.x.çewa) Karê ne rewa. Tiştê ne dirist. Zir. Xap. : Parê sexte, nasnameya sexte û htd.

**Sexteçî** (pîşn.dar.dn) Sextekar.

**Sextekar** (pîşn.dar.dn) Mirovê xapînok. Mirovê karê sexte di ke.

**Sextekirin** (k.jn.l.mê) Kirina karên sexte. Xapandina xelikî.

**Seyda** (pîşn.x.dz) Jibo rêzgirtinê bi kar di hêt.Mamosta.

**Seyr** (hk.x.çewa) Tişt, bûyer, candar yan mirovê cihê hicmetîbûnê. Balkêş.

**Seyran** (n.x.mê) 1.Geryan, bêhinvedan û xwarin li çûl çîyan. 2. Navê pîrekane.

**Seyrangeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê dilveker û xweş yê seyranî demên xwe lê derbaz di kin.

**Seyranî** (karn.dar.dz) Yên di çin seyranê.

**Seyrankirin** (k.jn.l.mê) Çûn seyranan. :Me îro seyraneka xweş kir.

**Seyrkirin** (k.jn.l.mê) Temaşekirin. Nêrîn.

**Seyvan** (hn,pesinçewa.ndar.nêr) Nîşanxweş. Sêrevan. Segvan.

**Sê** (hijn.x.çend) Hijmara 3. 6-3=3. 1+2=3. *Pend* :Sê tişt di xweşin; rez, pez û jin.

**Sêbare** (hn.nûvekirin) Sê caran rû di dit. Sêcarkî.

**Sêbarebûn** (k.jn.gl.mê) Sêcarkî hatin rûdan.

**Sêbarekirin** (k.jn.gl.mê) Jibo cara sêyem karekî bi keyeve. Sêcarkîkirin.

**Sêbisk** (n.l.mê) *giya* Giyayekê xwarinê ye davên wî wek biskane.

**Sêcar** (hn.l.çend.) Karê sêbare di bit. Sê caran bi hêt kirin.

**Sêçerxe** (n.l.mê) Tirombêl yan paysikil yên ji sê tayêran pêkhatîne.

**Sêdare** (n.l.mê) Sê darên çiklandî û serên wan gehiştîne hev, jibo hilawîstina meşk yan kujtina mirovan bi kar di hêt. Sêpêk.Qinare.

**Sêdaredan** (k.jn.l.mê) Hilawîstina mirovan bi êxistina bendikê sêdarê li hefkê ta bêhin lê çik di be û di mire. Hilawîstin. Qinarekirin. (K) bn: Dan.

**Sêgeh** (n.l.mê) Çengala bi sê tilîyan.

**Sêguh** (n.l.mê) Milhêba bi sê çikilan.

**Sêhem** (hij.rêz.çend) Ya,yê,yên  sêyê.


**Sêhemîn** (hijn.rêz.çend) Ya ,yê, yên sêyê û dawîyê.

**Sêhizar** (hijn.l.çend) Hijmara 3000.

**Sêk** (n.x.mê) Sihik. Sîhêk. Ava tirş.

**Sêl** (n.x.mê) 1.Parçeka kanzayê xire, rexek [kûr û yê din bel]e, li ser agirî di hêt danîn, nan li ser alîyê bel di hêt birajtin.2 Sênîya setelaytê ya ko li ser bilindayîyan di hêt danan jibo wergirtina kenalên têlevizyonê yên esmanî.

Sêlik (n.dar.mê) 1. Sêla biçûk. 2. Sêlên nemazene, deng, reng, bername liser dihên tomarkirin liser amêran wek kompyoter, tomar û htd bi kar di hên. CD.



**Sêlik**

**Sêlwane** (n.dar.mê) bn :Sîvan.



**Sêlwane**

**Sêmilyon** (hijn.l.çend) 3,000000.

**Sênî** (n.x.mê) Amanekê pan û mezine, xwarin û nanî di xin nav da.

**Sênîk** (n.dar.mê) Sênîyek biçûke, ji kanza, dar, feyfûr û htd hatîne çêkirin jibo têkirina girar, avik û htd.

**Sêpê** (n.l.mê) Bingireke ji pêpikan pêhatîye jibo ragirtina amêrên mîna kamêre, çek, pertalên wênegirtinê û htd.Sêdark.

**Sêran** (n.x.mê) bn: Seyran.

**Sêranî** (karn.ndar.dz) bn: Seyranî.

**Sêriyan** (hk.cih,n.l.mê) Cihê ji alîyan rê di gehitê.

**Sêsed** (hijmn.l.çend) Hijmara 300.

**Sêşem** (hk.dem,n.l.mê) Sêşemb.

**Sêşemb** (hk.dem,n.l.mê) Rojeke ji yên heftîyê, navbera duşemb û çarşembê. Sêşem.Roja sîyê ji heftîyê(heger ji êkşembê dest pê bi ken).

**Sêta** (hk.l.çewa) Ji sê tayan pêkhatî. Sêbare.Sê çeq.

**Sêtik** (ndar.nêr) Sê tişt, sê mirov bi hevre.:Sêtikên li mala henê, birayên hevin.

**Sêtîr** (n.l.mê) *çek* Corekê kevin ê tivengane.

**Sêv** (n.x.mê) *fêqî* 1.Fêqîyek biharî û havînî ye, tam şirîn yan mize, gelek cor û şêwe hene. 2. Dara sêvê.

**Sêvaxînk** (n.l.mê) *giya* Sêvbinerd.

**Sêvbinerd** (n.gl.mê) *giya* Core giyayeke, reng keske,serikên mîna pitatan di bin erdî da mezin di bin.



**Sêvbinerd**

**Sêvê** (ngaz. Dar.mê) Naznav yan navê keçane.

**Sêwirandin** (k.jn.x.mê) Helbest, gotin,  peyv ; kirin stiran.

**Sêwî** (rd.dar.çewa) Zaroyê bê dayk, bê bav yan bê daybab.

**Sêwîman** (k.jn.l.mê) Mirina yek yan herduyan ji dayk û babên zaroyan. Zaro bê dayk, bê bab yan bê daybab man.

**Sêwîxane** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê xwedîkirina sêwîyan.

**Sêyek** (hn.çend) Yek ji sêyan. Ji sêyan êk. 1/3. :Sêyeka mirvên …….. ne di xandevanin.

**Sêzdeh** (hijn.l.çend) Hijmara  13.

**Sêzdehem** (hijn.rêz.çend) Yên,ya, yê sêzdehê.

**Sêzdehemîn** (hijn.rêz.çend) Sêzdehem.

**Sêzdehizar** (hijn.l.çend) 13,000.

**Sêzdemilyon** (hijn.l.çend) 13,000,000.

**SHHK** (kurt) Serokê Hikometa Herêma Kurdistan.

**SHK** (kurt) Serokê herêma Kurdistanê. :M Barzanî êkemîn serokê Kurdistnê

**Sibahî** (hk.dem) Roja yekê ya bi hêt. Roja piştî çend demhijmêran. Sibe. :Subahî eynîye,roja  bêhinvedanê ye.

**Sibat** (hk.dem,n.x.mê) Meha sêyê ji zivistanê. *Pend* :Sibatê berif û ba tê, kur ji çîya tê, kiç ji gîyay tê. *Pend* :Sibatê gote biharê, bide min rojekê ji yên avdarê, da çermê gîskî bi serda bînim xwarê. Şiwat.

**Sibe** (hk.dem) Subahî.

**Sibetir** (hk.dem) Dusibe.

**Sibit** (n.x.mê) *giya* Giyayek kesik û dav zirave,tam xweş, bi terî yan hişkî di kin nav dew zadan.

**Sifir** (n.x.mê) Core kanzayekê reng ser zerîve ye.[mêtal] : Amanên sifrî.

**Sifre** (n.x.mê) Sênî yan naylonê danayî li erdî yan ser mêzan jibo danana xwarinê liser.

**Sifredanan** (k.jn.l.mê) Raxistina sênî yan naylonan jibo xwarinê liser rêz bi ken.

**Sih** (n.x.mê) 1. Sîber. 2. Endamê henaseye, di nav singî da ye. Piş. 3. Hijmara 30.

**Sihik** (n.dar.mê) Corek tirşîyê şile ji fêqî di hê çêkirin. Sîhêk. Sirke.

**Sikir** 1 (n.x.nêr) Cih yan dîwareke hatîye avakirin jibo pengîn û xirvekirina avê. Pengav.

**Sikir** 2 (n.x.mê) *candarzanî* Gerî. Gewrî.

**Sikitîn** (k.jn.x.mê) bn : Sekitîn.

**Sil** (hk.x.çewa) Yê naxwazit di gel çi kesî bi peyvit.Ne haşt. Bêgêwil. Zîz.

**Silal** (hk.cih.x) Li serî. Taxê serî. Texa serî. Serbanî. Br× Xarê. :Havînan em li silal di nivîn.

**Silamet** (hk.x.çewa) Bê bela. Sax.

**Silav** (n.x.mê) Gotineke jibo dem başî li hev kirinê roj baş, şev baş, çewanî û htd.

**Silavdan** (k.jn.l.mê) Silavkirin.:Çewanî çakî gotin.

**Silavgirtin** (k.jn.l.mê) Bersiva silavdanê. Silav wergirtin.

**Silavkirin** (k.jn.l.mê) Çewanî başî di gel hev kirin.Daxazkirina xeşî ye.: Min silav kire wan. :Seyda silav kir xwedekaran. (K)bn: Kirin

**Silavlêkirin** (k.jn.gl.mê) Şandina silavan jibo heval, xizim û htd bi name yan di gel yekî. :Heger tu çûye mal silavên min li babê xwe bi ke. (K)bn: Kirin

**Silavrêkirin** (k.jn.gl.mê) Dema mirov silavan ji yekî ra rê di ke.Silavvirêkirin.silavbirêkirin. Silavşandin. : Wî bi hevalekî ra silav ji min ra rêkirin.

**Silbûn** (k.jn.l.mê) Dema mirov sil di be. Zîzbûn. :Dilê zarokan ne hêlin da sil ne bin.(K)bn: Bûn.

**Silêvaneyî** (malb.n) Hozeke li Kurdistanê.

**Silî** (n.dar.mê) Silbûn.

**Silk** (n.x.mê) ***giya*** Core giyayeke bi serike, belgên wî pan û keskin, serik, bistî û belgên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, gelek cor hene; silka sor, sipî û ya şekirê. ***Pend*** : Serê wekî silkê lê kir.ang; serê rûtkirî. ***Pend*** :Silka wî sor kir.ang; direwa wî serav kir.

**Silkirin** (k.jn.l.mê) Eger mirov dilê yekî bi hêlit. Zîzkirin. :Ka bêje çima bavê te tu sil kirî?.(K) bn: Kirin.

**Silsilok** (hk.l.çewa) Kesê zû sil di be.

**Sim** (n.x.nêr) ***can*** Pêyên canewerên wek kewal, çêl û dewaran.

**Simandin** (k.jn.x.mê) Kunkirina darik, dîwara, leş û htd bi tîrik û makînan. Simîn.

**Simaq** (n.x.mê) ***dar*** 1.Dara simaqê. 2. Mitayeke dindikên wî wek nîskane, tam tirşe, jibo tirşkirina zadî bi kar di hînin. Simaqa zêbarê ya bi navdenge.

**Simbêl** (n.x.pir) Mûyên li bin kepîyê zelaman.

**Simbêlboq** (hk, pesinl.çewa) Yê simbêlên wî mezin wek boqên pîvazan.

**Simbêlçixt** (hk,pesin.l.çewa) Mirovê simbêlên wî di badayî û sertîj,serçixt.

**Simbêlreş** (hk.pesinl.çewa) Kesê rengê simbêlên wî reş.

**Simbêlsor** (hk.pesinl.çewa) Zelamê simbêlên wî sor.

**Simbêlşor** (hk,pesinnl.çewa) 1. Zelamê simbêlên wî di şor. 2. Şermizar. Serşor.

**Simbêlzer** (hk,pesinl.çewa) Yê simbêlên wî reg zer.

**Simîn** (k.jn.x.mê) Kunkirin bi şîşkek zirav. Darcigark simtin. Dîwar simtin. [mamik] :Himhime dîwar sime ango; (deng). (K) bdn: ez di simim em di simîn, tu di simî hûn di simin, ew di sime[….it] ewan di simin Pr : dê[bi] simim, simîn, simî, simin, simit[…me], simin. Bdb : di simî, di simîn.db,dûr : simîbû,(simtibû), simîbûn(simtibûn). (F) : bi sime, bi simin.

**Simîtk** (n.dar.mê) *xwarin* Corekê danhêrkîye.

**Simtin** (k.jn.x.mê) Simîn. (K) bdn: Ez di simim em di simîn, tu di simî hûn di simin, ew di sime[….it] ewan di simin Pr : dê[bi] simim, simîn, simî, simin, simit[…me], simin. Bdb : di simî, di simîn.db,dûr : simîbû,(simtibû), simîbûn(simtibûn). (F) : bi sime, bi simin.

**Simtî** (rd.dar.çewa) Kunkirî. Cihê kun tê vekirî. :Guhê simtî jibo guharkan.

**Sinc** (n.x.nê) Rewişt. :Ji alîyê sincî ve çi kêmasî li wê nînin.

**Sincan** (hk,hn.dar.çewa) 1. Xwedî rewişt. Bi cinc. 2. Navê mêrane.

**Sincaq** (n.x.mê) Derzîkeka badaye jibo bestina cilikan bi kar di hêt.



**Sincaq**

**Sincvan** (hk,hn,çewa) Xudan sincek baş. Xwedî rewiştek çê. Birûmet.

**Sindan** (n.x.nêr) Corek cerîye ji axê yan asinî di hêt diristkirin bo têkirina dexil û mitayî bi kar di hêt.

**Sindirîk** (n.dar.mê) Sindoqeka taybete mirîyan di xin nav.

**Sindî** (malbna) 1. Hozeka kurdane li Kurdistana Iraqê.2. Kesê ji hoza sindîyan.

**Sindoq** (n.x.mê) Elbikeke heme cor û şêweye, mita, fêqî,cil û htd di ken têda.

**Sine** (hk.cih,cugir.n) Bajarkeke li Kurdistana Iranê.

**Sinetkirin** (k.jn.l.mê) Birîn, jêvekirina çermkê zêde ji endamê mirovan yê nêrîne yê mîzî.

**Sinetkirî** (hk.l.çewa) Zarokê hatî sinet kirin.

**Sinêle** (hk.x.çewa) Jiye mirovî navber zarokînî û mezinîyê da. Nîvmêr.

**Sing** 1(n.x.nêr) 1. ***can*** Cihê di navbera zik û gerdena mirovî ji alîyê berî ve.2. Ber. Br× Pişt.

**Sing** 2 (n.x.nêr) Darekê sertîje di erdî û dîwaran di qutin jibo girêdana dewaran û qayîmkirina xîvet û karên din. Gilç.

**Singfireh** (hk.l.çewa) Bêhinfireh.

**Singqutan** (k.jn.l.mê) Sing di cihekî ra kirin, qutan: Singek di dîwarî quta.***Pend*** :Her singê ez di qutim tu cantekî pêve di kî.ango Tu çi bo min nahêlî.

**Singvekirin** (k.jnlmê) Mirov yê bêhinfireh bit jibo her rexne, gazinde û pisyaran. (K) bn: Kirin.

**Singvekirî** (rd.l.çewa) Mirovê sinêwî jibo her pisyar, rexne û gazinan ve kirî.

**Sinik** 1 (n.x.nêr) ***candar kirmijok*** Gêzik.

**Sinik** 2 (n.x.mê) ***candar kirmijok*** Core kêzikeka kimijoke liser genim û danana dijît û ziyanê lê di dit.

**Sinûr** (n.x.nêr) Tuxwîb.

**Sipas** (n.x.mê) bn :Supas.

**Sipehiyandin** (k.jn.mê) Sipehîkirin. Xemlandin.

**Sipehî** (hk.x.çewa) Xweşik. Rind. Ciwan.

**Sipehîbûn** (k.jn.l.mê) Rindbûn. (K) bn: Bûn.

**Sipehîkirin** (k.jn.l.mê) Xweşikkirin. Ciwankirin. (K) bn: Kirin.

**Sipehîtî** (n.dar.mê) Ciwanî. Rindî.

**Sipêde** (hk.dem) Destpêka rojê. Elind.

**Sipî** (hn.çewa) ***reng*** Rengê sipî. Rengê berfê, mastî û htd.

**Sipîbûn** (k.jn.l.mê) Dema rengê mirov yan tiştî sipî di bit. . : Jiber dernekeftinê ew yê sipî bûy. (K) bn: Bûn.

**Sipîkirin** (k.jn.l.mê) 1. Rengê sipî lê kirin. :Dîwar bi rengî sipî kir. 2. Qelp yan tîvkilê tiştî jêkirin.Loçkirin. Xiyar, kulind û htd sipîkirin. (K) bn: Kirin.

**Sipîkirî** (hk.l.çewa) Hatîye sipî kirin. Lûçkirî. Sêva sipîkirî.

**Sipîndar** (n.l.mê) ***dar*** Dareke ta dirêj û bilinde, belg kesik û bi xemle, darên wê wek garîte, kête û dep mifa jê di wergirin.

**Sipîtale** (hk.çewa) Tişt yan mirovê reng sipî.

**Sipîyatî** (hk.çewa) 1. Rengê sipî. 2. Berhemê şîrî. Mast, jajî, penîr û htd.

**Sirgun** (nx.mê) Dûratî ya mirovî ji war, welatê xwe.

**Sir** (hn.x.çewa,n.x.mê) Sermayeka dijwar. Seqem. :Rojeka sire. :Eve çi sireka dijware.

**Sirbirin** (k.jn.l.mê) Ji egera lêdana sirê, fêqî û mita xirab di bin di rizin.

**Sirbistan** (hk.cih,welatn.dar) Welatê Sirbîyan. Sêrbiya.

**Sirbî** (nej.n) Xelkê Sirbistanê.

**Sirbûn** (k.jn.l.mê) Hin giyandar jibo heyamkê xwe di nav tevinekî da di pêçin û bizava wan ra diwestit.(K) bn: Bûn.

**Sirgûn** (n.x.mê) Dûrwelat. Biyanistan.

**Sirgûnkirin** (k.jnlmê) Bi xurtî ji warî derêxistin. (K) bn: Kirin.

**Sirke** (n.x.mê) Sihik.

**Sirt** 1 (hk.cih,n.x.mê) Peyarêkeke di ber serê gir yan serê çiyayan ra derbaz di bit. : Şivanî pezê xwe li sirta çiyayî di çerand.

**Sirt** 2 (hk.x.çewa) Kezê zû karê xwe bi dawî di hîne.Mirov yan candarê sivik, çeleng.

**Sirûd** (n.x.mê) 1.Stranên nîştimanî.2 Navekê duzayende.

**Sirûşt** (n.x.mê) bn: Xurist.

**Sisê** (hijn.çend) Hijara sê. Hijmara 3.

**Sisî** (n.x.mê) Danê kengiran dema di qelînin û wek çerez di xon. Tovê kengiran. Kengiroşk.

**Sist** (rd.x.çewa) Xav. Ne tund. Ne rijd.: Ev girêye ya siste, dê zû vebit. : Ew di kar û gotin ên xweda yê siste.

**Sistbûn** (k.jn.l.mê) Xavbûn. : Doxîna şelê wî sist bû û kevte teşkan.

**Sistê** (ngaz.mê) Navkirina jina sist.

**Sistî** (n.dar.mê) Xavî. Bêxemî.

**Sistkirin** (k.jn.l.mê) Xavkirin. Lêvekirin.

**Sisto** (n.gaz.nêr) Navkirina mêrê sist û xav.

**Standin** (k.jn.x.mê) Wergirtina bi xurtî. Bi kar înana hêzê jibo wergirtina tiştekî. Gelê kurd dê mafê xwe bistîne.(K) bdn: ez di stînim em di stînîn, tu di stînî hûn di stînin, ew di stîne […it] ewan di stînin. Pr: dê [bi] stînim, stînîn,stînî, stînin, stînit[…ne], stînin. Bdb : di stand, di standin. Db,dûr : standibû,standibûn. (F): bistîne, bistînin.

**Sitem** (n.x..mê) Xurtî. Zorî.

**Sitemkar** (hk.l.çewa) Kes yan dezgeha sitemê li xelkê di ket.Zordar.

**Sitemkarî** (n.l.mê) Zorî. Xurtî.

**Sitemlêkirin** (k.jn.l.mê) Weke zorî li kes yan gelekî bi hêt kirin.Xurtîlêkirin.(K) bn: Kirin.

**Sitemlêkirî** (hk.l.çewa) Gel, yan kesê zorî lê hatî kirin. Br× Sitemkar.

**Sitî** (n.x.mê) 1. Peyveke jibo rêzgirtina jinan bi kar di hêt. Xanim. Xatûn. 2. Navê jinane.*çîroka kêzê* :Sitîyê şimik reqreqîyê ib keyf û şadî dê kîve çîyê?.

**Sitran** (n.x.mê) Stiran. Lavje.

**Sitranbêj** (karn.l.dn) Lavjebêj.

**Sitrangotin** (k.jn.l.mê) Stirîn. Lavjegotin.

**Sitûn** (n.x.mê) Stûn.

**Sivande** (hk.cih,n.x.mê) Lêva bi serve hatî ya dora banî, ji şivan yan çîmentoyê hatîye çêkirin jibo paristina dîwaran dako verêja ava baran û berfan xirab neke. Serbênek.

**Sivandok** (n.dar.mê) *balinde* Corekê çûçikane li bin sivandeyên xanîyan hêlînên xwe di kin. Sivyank. Kawanî.

**Sivik** (hk.x.çew)a 1. Ne giran.2. Sade.

**Sivikatî** (hn.dar.çewa) Bê rûmetî. Bê bihayî.

**Sivikbûn** (k.jn.l.mê) Weke tişt sivik di be.Li ber çavan bê rûmetbûn. :Mirov di avê de sivik di be. (K) bn : Bûn.

**Sivikî** (hk.dar.çewa) Sivikatî.


**Sivikkirin** (k.jn.l.mê) Barekî, tiştekî sivik bi kî. Xwe bê biha bi kî. (K) bn: Kirin.

**Sivî** (n.x.mê) Tîvkilkê genim, ceh nîsk û htd. Pîşkê dexlî.

**Siv<u>îng</u>** (n.x.mê) Sivande.

**Siv<u>nik</u>** (n.dar.mê) Gêzik.

**Sivo<u>re</u>** (n.x.nêr) ***candar*** Candarekê şîrdere, biçûke li ser kevir û daran di jît, xwarina wî gûz û berîne. ***Pend*** : Sivore sivkê darê, ji vê darê çû wê darê [str,gelêrî] ***Pend*** : Sivore û ber û minên xwe:ang Herkes û karînên xwe.



**Sivore**

**Si<u>war</u>** (n.x.dz) 1. Kesê li pişta dewaran yan li tirombêlan siwar di bit. Siyar. 2. Navê mêrane. Br× Peya.

**Siwar<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Siyarbûn.

**Siwa<u>rî</u>** (hn.dar.çewa) Siyarî.

**Siwar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Siyarkirin.

**Si<u>xirk</u>** (n.dar.mê) Avahîyeke dîwarên wî ji kêteyan û serban bi qerem û levenî di hêt ranan, jibo têxistina alîkên giyandaran mifa jê di hêt wergirtin.

**Six<u>te</u>** (n.x.wê) Kar yan tiştê ne rewa. Xapandin.

**Sixte<u>çî</u>** (karn,rd.dar.çewa) Mirovê karê sixte di ket. Xapînok.

**Sixte<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirovê sixteyan di ke. Xelkî di xapîne. (K) bn : Kirin.

**Siya<u>bend</u>** (n.dar.nêr) 1. Navê yek ji du qehremanên dastana [xec û siyabend] e.2. Navê mêrane.

**Siya<u>mend</u>** (n.dar.nêr) Siyabend.

**Si<u>yar</u>** (rd.x.çewa) bn: Siwar. ***Pend*** :Siyarê xelkî herê peyaye; ang pişta xwe bi biyanîyan qayîm neke. ***Pend*** :Siyarê keran na gehe tu deran. ***Pend*** :Siyar ta ne kevit na bit siyar.ang; bi xebar û mandîbûnê mirov di gehit armancan.

**Siya<u>set</u>** (n.biyan.xmê) Ramyarî.

**Siyaset<u>van</u>** (karn.dar.dn) Şareza di warê siyasetê da. Ramyarîvan.

**<u>Siza</u>** (n.x.nêr) Hemberî her gunehekî yan karek ne dirist siza heye. Tola qanûnî. :Jiber ko dizî kir, sizayê wî heft mehan di girtîgehê da dê bi mînit.

**Siza<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Siza wergirtin ji kesê şaşîyekê di ke. (K) bn :Dan.

**Siza<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Sizadan.

**Sî** 1 (hk.cih,n.x.nê) Kujîyê derve yê xanî. Tî .

**Sî** 2 (hijn.çend) Hijara 30.

**Sî** 3 (n.x.mê) Sîber. Sih.:Li bin siya darê nivist.

**Sî** 4 (n.x.mê) ***endamê leş can*** Siha nav singê giyandaran.

**Sî<u>ber</u>** (n.x.mê) 1. Cihê hetava rojê yan ronahî lê ne dit jiber berbendek di kevit ber rûyê wê. Sîtavk. 2. Navê jinane.

**Sîber<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Wekî roj ber bi ava ve di çit, li hin cihan sîber mişe peyda di be.

**Sîber<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dema dar xemla xwe di girin ta û belgên wê tarî di bin sîbera wê xweş di be.


**Sîç** (n.x.mê) Binas.guneh. Sûç

**Sîç<u>bar</u>** (hk.dar.çewa) Binaskar.Gunehbar.

**Sîçbar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Gunehek êxistine ser stoyê yekî.Gunehbarkirin. Binaskarkirin. (K) bn: Kirin.

**Sî<u>dekan</u>** (hk.cih,cugirn) Devereke li Kurdistana Iraqê.

**Sîh** 1 (n.x.mê) ***leş,can*** Hedamê henasedana candaran. Sih.



**Sîh**

**Sîh** 2 (hijn.çend ) Hijmara 30.

**Sîh** 3 (n.x.mê) Sîber.

**Sî<u>hem</u>** (hijn.rêz.çend) Ya,yê, yên sîhê.

**Sîhe<u>mîn</u>** (hijn.rêz.çend) Sîhem.

**Sîh<u>hizar</u>** (hijn.l.çend) Hijmara 30,000.

**Sîh<u>milyon</u>** (hijn.l.çend) 30,000,000.30 milyon.

**Sîk** (hk.cih,n.x.mê) Cihê kirîn û firotinê.Bazar.

**Sî<u>kav</u>** (n.l.mê) ***candar*** Kirim ê berfê. Kirmikê befrê.

**Sîma** (n.x.mê) Serûçav.Rû.

**Sîme** (n.x.nê) 1.Tan yan perjanê asinî yê dir û bi kelem jibo paraztina zevî û erdan di hêt bi kar înan.2. Davên naylon yan kanzayî di nav perokî da.

**Sîmekirin** (k.jnlmê) 1.Bi sîmê pejandkirina cihekî. 2.Dav êxistine nav cilan. (K) bn: Kirin.

**Sîmerx** (ndar.mê) *candar* Core balindek evsaneyî ye di çîrokan da hatîye, mirov li ser pişta wî siyar di bûn, bo ceng û veguhastinê bi kar di anîn.

**Sînahî** (ndar.mê) Dîtina tiştî wek sîberek yan pêjinekê. Bînahî.

**Sînayî** (n.dar.mê) bn :Sînahî.

**Sînem** (n.x.mê) *gul* Corekê gulane li çîyayên Kurdistanê hene; ango çavgir. 2. Navê jinane.

**Sîpan** (hk.cih,devern) 1 Devereke[çîya] li Kurdistana bakûr.2. Navek kurdî du zayende.

**Sîpe** (hk.cih,devern) Devereke li Kurdistana başûr-Akrê.

**Sîpel** (n.dar.mê) 1. Pivdankeke di nav zikê masîyan da. 2. Sîlav.3. Navê jinane.

**Sîqal** (n.x.mê) 1. Core kerestеyekê civire, mirov ronahîyê têra di bînit. 2. Lûlikên qerîsê li sirên zivistanan bi kevr û banan da şor di bin. Şape.

**Sîr** 1(n.x.mê) *giya* Giyayeke serik û belgên wî jibo xwarinê mifa jê di hêt wergirtin, bêhneka gemar jê peyda di bit.



**Sîr**

**Sîr** 2 (hk.x.çewa) Tameka taybete, wek tama xwê.

**Sîratî** (n.dar.mê) Tama sîr. Tama xwê. Savareka xweş bû, lê sîratîya wê ya zêde bû.

**Sîrbûn** (k.jn.l.mê) Dema xwêya zadî gelek be, dê xwarin sîr be.: Zad bi destê wê herdem sîr di bit. *Pend* :Girara du kabanîyan sîr di be yan bê xwê di be.

**Sîret** (n.x.nêr) Alek. Rû.

**Sîrfisk** (n.l.mê) ***giya*** Corek sîrên kûvî û bêhin gemarin.

**Sîrik** (n.dar.mê) ***giya*** Corekê sîrên kûvîne di biçûkin.

**Sîrî** (n.dar.mê) Sîratî.

**Sîrkirin** (k.jn.l.mê) Dema xwê di xin nav xwarinekê. (K) bn: Kirin.

**Sîrkirî** (hk.l.çewa) Zadê xwê tê kirî. : Giyayê sîrkirî. :Goştê sîrkirî.

**Sîs** (hn.x.çewa) Tiştê tava rojê lê nedayî û sipîtaleye. Kej.

**Sîsark** (n.x.dz) ***balinde*** Corek ji teyrên nêçîrê ye.

**Sîsbûn** (k.jn.l.mê) Mirov yan tiştê li cihek tarî, rengê wî sîs di bit. (K) bn: Bûn.

**Sîseban** (na,dar.mê) Navê dastaneka evsaneyî ye. Borê reş.

**Sîsê** (hn.gaz.mê) Navkirin û naznave, jibo keça sîs di hêt gotin.

**Sîsirk** (n.x.mê) ***candar kêzik*** Core kêzikeke di nav malan da li ser bermayîyên zadê di jîn.

**Sîsk** (n.x.mê) ***tewal*** Balindekê hêkkere li Kudistanê mişeye.

**Sîskirin** (k.jn.l.mê) Sipîtalekirin. Kejkirin.

**Sîso** (hn.hd,gaz.nêr) Naznavek gazîkirinê ye jibo mêrê sîs.

**Sîstem** (n.cîh) Awayê rêkûpêk jibo karkirin, darijtin û avakirinê. :Sîstema xandinê li Kurdistanê cuda ji ya welatên din.

**Sîtav** (n.l.mê) Sîtavk.

**Sîtavk** (nl.mê) Dema ronîya rojê yan her yeka din, li leşekî di de, mînaka wî dirist di be.Sîber.***Pend*** :Ji sîtavka xwe di tirse. Ang; kesê tirsonek herdem tirs di dilê wî daye.

**Sîte** (n.x.mê) Tora masîgirtinê.

**Sîtil** (n.x.mê) Setil.

**Sîvan** (n.l.mê) Sîhwaneya mirov li hindav serê xwe di gire, da xwe ji baranê bi parêze.

**Sîvanok** (n.l.mê) ***gul*** Corekê gulane, gelek reng hene, wek, sor, sipî,ser, mor, û têkel.

**Sîvîl** (n.cîh) Welatî. Bajêrvanî.

**Sîvok** (n.dar.mê) Cihê êvitî yan belbûyî li ser canê mirovî ji egera lêdana gurzekî,bêy ko bi şikêt.

**Sîxme** (n.x.nêr) Darikê tîj. Kelem.

**Sîxur** (n.x.nê) 1. *giyanewer* Candarekê kûvîye, şîrdere leşê wî bi strî ye.2. Nîşana xwefirotinê ye. Dardestê dujminî.

**Sofî** (nx.dz) Mirovên xudênas.

**Sojtin** (k.jn.x.mê) 1.Dema agir bi tiştekî di kevit. Şewitîn. 2.Jan. Êşan. *Pend* :Sotin, nahêt gotin.ang: mirov nikarit ya dilê xwe bêjit.: (K) Bdn: ez di sojim em di sojîn, tu di sojî hûn di sojin, ew di soje[…it] ewan di sojin. Pr :Dê[bi] sojim, sojîn, sojî sojin, sojit[…je]. Bdb : di sotim, di sotîn, di sotî di sotin, di sot, di sotin. Db,dûr : sotibûm,em sojtibûyn,ew sojtibû …tu sojtibûy, hûn, ewan sojtibûn. (F): bi soje, bi sojin.

**Sol** (n.x.mê) Pêlav.

**Solbend** (pîşn.dar.dn) 1. Kesê pêlavan di ke. 2. bn :Nalbend.

**Solbendî** (karn.mê) Nalbendî.

**Solker** (pîşn.dar.dn) Solbend. *Pend* :Solker di pêxasin, cilker di bê kirasin.

**Solîn** (n.x.mê) 1. Coya avê ya di bin axê ra hatî çêkirin li bin kolan mal û cadan. 2. Cihê çandin û firotina gulan. Gulistan.

**Sond** (n.x.mê) Soza mirov bi tiştê pîroz mîna kitêbên pîroz, gora nemiran, welat û htd, di de, ko rastgo û disoj be.

**Sonddan** (k.jn.l.mê) bn : Sondxwarin.

**Sondxwandin** (k.jn.l.mê) Sonxwarin.

**Sondxwarin** (k.jn.l.mê) Wekî mirov hember kesek, destek, dadgeh, berpirs û htd sondê di de ko di kar gotin û kiryarên xweda dilsoj be. (K) bn :Xwarin.

**Sopa** (n.x.nêr) Hêzeka ji bireka çekdarên fermî pêkhatîye. Leşker. :Sopayê êk, dû, .. û htd.

**Sopageh** (hk.cih,n.dar.mê) Baregayê sopayî.


**Sope** (n.x.mê) Amaneke daran yan sotekên din tê di xin jibo xwe gerimkirinê li demên sar. Sopeya: daran, gazê, xazê, karebê û htd.

**Sor** (hk.x.çewa) Rengê xwînê.

**Soran** (hk,cih.ndar.nêr) 1. Devera soran başûrê Kurdistanê. 2. Navê mêrane.

**Soranî** (n.dar.mê) Zar yan devoka xelik ê deverên soran lê di mînin.

**Sor<u>av</u>** (n.l.mê) ***ciwankirin*** 1.Ava hatîye sorkirin. 2. Dermanê sorkirina rû yan lêvan yê jinan.



**Sorav**

**Sor<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) 1.Rengê mirovî ji germê, hêrsbûnê sor di be. 2. Rengê sor li tiştekî bi hêt dan. (K) bn : Bûn.

**Sor<u>elêv</u>** (n.l.pir) Lêvên sor.

**Sor<u>eta</u>** (n.l.pir) ***derd*** Sorik.

**Sor<u>etarî</u>** (hk.l.çewa) Rengê sor ê tarî.

**Sore<u>vekirî</u>** (hk.l.çewa) Rengê sorê vekirî.

**Sore<u>wêl</u>** (n.dar.dn) ***tewal*** Teyrekê avîyê, geroke, reng sore. Flamingo.



**Sorewêl**

**Sor<u>ê</u>** (hn.hd,gaz.dar.mê) Naznav û gazîkirina jibo jina sor.


**Sor<u>gul</u>** (n.l.mê) 1. Gula sor. ***Pend*** :Sorgul di bê stirî nabin.2. Navê jinane.

**Sor<u>ik</u>** (n.dar.pir) ***derd*** Derdeke zarok pê di kevin, pirsikên sor li ser leşê wan peyda di bin û ta di hênê. Soreta.

**Sor<u>ing</u>** (hn.dar.çewa, n.dar.mê) 1. Rengê gorîya agirî. 2. Tarîgewirk.

**Sor<u>îçk</u>** (n.dar.mê) ***can candarzanî*** Borîya ji devî dest pê di kit û li gedê bi daomahî di hêt ya zad têra derbaz di bit.

**Sor<u>kelem</u>** (n.l.mê) ***giya*** Kelemîya sor.



**Sorkelem**

**Sorkirin** (k.jn.l.mê) 1. Rengkirina tiştî bi rengê sor. 2. Qelandina zadî di nav rwînî da.(K) bn: kirin.

**Soro** (hngaz.dar.nêr) Naznav û gazînavê mêrê sor.

**Soryaz** (n.dar.mê) *giya* Giyayek xwarinê, kûvîye li zozanan hişîn di be.

**Sotin** (k.jn.x.mê) bn :Sojtin.

**Soxte** (n.x.dn) Qutabî. Xwendkar.

**Soz** (n.x.mê) Peyman.

**Sozan** (n.dar.mê) Navê keçane.

**Sozdan** (k.jn.l.mê) Peymandan. :Em sozê di din ko destan ji xebatê ber na din. (K) bn: Dan.

**Sozgirtin** (k.jn.l.mê) Sozdan.

**Sozkirin** (k.jn.l.mê) Sozdan.

**Sozsitandin** (k.jn.l.mê) Sozdan.

**Spîlik** (na,hk,cih,dar.mê) 1. *can* Sipîyatîyê çavî. 2. Sipîyatîyê hêkê. 3. Navê deverekêye li

Kurdistana Iraqê.

**Spîyav** (n.l.mê) *ciwankarî* Dermanek arik, yan hevîre, jin di rûyên xwe di din jibo ciwankarîyê.

**Stewir** (hk.x.çewa) Candarê karîna bergirtinê nîne. Xirş.

**Stewirbûn** (k.jn.lmê) Xirşbûn.

**Stewirkirin** (k.jn.l.mê) Ji bergirtinê xistin. Xirşkirin.

**Stêng** (n.x.dz) *candar adî* Candarek jehirdare, baldare, rengê wê sore kunêd xwe di ax û keviran da di kit, mêşhingivan di xwe û ziyanê di gehîne.



**Stêng**

**Stêr** (n.x.mê) Tenê li esmanan yên bi şev xuya di bin. Erd.



**Stêr**

**Stêrik** 1 (n.dar.mê) Stêr.

**Stêrik** 2 (n.dar.mê) Guhkên serê tivengan ko jibo sêregirtinê mirov têra di nêre armanca xwe.

**Stêrikgirtin** Stêrklêgirtin (k.jn.l.mê) Nîşangirtin dema mirov di stêrika tivengê ra di nêrit nîşanê. Stêrika xwe lê girt. (K) bn: Girtin.

**Stêrk** (n.x.mê) Kepirkeke di nav malê da dirist di kin, xwarin û pertalan li ser di danin.

**Stêrnas** ( pîşn.l dz) 1. Zana warê zanîna li ser stêran. 2. Kesê bi rêya stêran pêşbînîya bûyeran di ket.

**Stêrnasî** (karn.l.mê) 1. Zanîna bizav, pêkhatin, dûrî û htd li bareyê stêran.2. Zanîna pêşbînîkirina bûyerên li paşejorê rû di din.

**Stêrok** (n.dar.mê) Setelayt.

**Stêrzan** (pîşn.dar.dz) Stêrnas.

**Stêrzanî** (karn.l.mê) Stêrnsî.

**Stiran** (n.x.mê) Deqeke mirov bi dengê xwe bi awaz û selîqe di bêje. Deng.

**Stiranbêj** (pîşn.l.dz) Kesê stiranan di bêjit. Honermendê karê wî gotina stirana ye. Dengbêj.


**Stirangotin** (k.jn.l.mê) Weke mirov di stire. Stiranan di bêje. Dengan di bêje. (K) bn: Gotin.

**Stirîn** (k.jn.x.mê) Stirangotin. (K) bdn :Ez di stirim, em di sirîn, tu di stirî, hûn di stirin, ew di stire ewan di stirin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di stirîm di stirîn, di stirî, di stirîn, di stirî. Db,dûr : ez stirîbûm em stirîbûyn, tu stirîbûy hûn,ewan stirîbûn, ew stirîbû. (F) :bi stire, bi stirin.

**Sto** (n.x.nêr) ***can*** Cihê di kevit navbera ser û navmilan, ko ser î ra di girit.

**Stobend** (n.dar.mê) Bendikê mirov di ket soyê xwe liser sentor û pentoran. Stovan. Girafît.

**Sto<u>dirêj</u>** (n.l.dn) ***candar*** Giyandarekê şîrdere, giyaxore, stoyê wî dirêje.



**Stodirêj**

**Sto<u>van</u>** (n.dar.mê) 1.Ristik.2. Stobend. :Seydayî sentor û pentorû pentorên xwe li xwe kirin û stovank li stoyê xwe girêda.



**Stovan**

**Sto<u>xwar</u>** (hn.l.çewa) Hejar. Bendewar.

**Strî** (n.x.nêr) Kelem. Dasî.

**Stûr** (hk.x.çewa) Ne zirav. Stwîr. : Darê stûr. Marê stûr. Werîsê stûr.

**Stûr<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Dema tişt stûr di be, mirov qelew di be. Qelewbûn. Pirbûn.

**Stû<u>rî</u>** (n.dar.mê) Pirî. Qelewî. Zorî.

**Stûr<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Qelewkirin. Mezinkirin. Qebekirin. Liserêk danan.

**Su<u>bat</u>** (hk.dem) Meha şubatê.

**Suh<u>bet</u>** (n.x.mê) 1.Danûstandin. Axivtin. 2. Gotinek ne rijd.Tirane.

**Suhbet<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Danûsitandin. Axivtin.

**Sulê<u>manî</u>** (hk.cih,cugirn.cih) Bajêreke li Kurdsitana Iraqê.

**Su<u>pas</u>** (n.x.mê) Bersiveke, gotineke, mebest jê pêxweşbûna mirovîye hember kar yan gotina kesekî. Memnûn.

**Supas<u>dar</u>** (hn,hk.dar.çewa) Mirovê bi karekî xweş û supasîyan jê ra di bêje Mmirov supasî alîyek yan kesekî bit. Mirov bi karekî yê qayîl bit.

**Supa<u>sî</u>** (n.x.mê) Derbirîna qayîlbûnê yan keyf pêhatina mirovî jibo karekî yan gotina kesekî. Memnûnî.

**Supasîkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov supasîya yekî bi ke. :Ez supasî te di kim, ko te alîkarîya min kir. (K) bn : Kirin.

**Supaskirin** (k.jn.l.mê) Supasîkirin.: Ji hewe supas diki, hûn tevî bernameya me bûn. .(K) bn: Kirin

**Suxre** (n.x.mê) Karê jibo veguhastina mita, fêqî yan her kelûpelek bit, ko gundî bi dewarên xweve bi vî karî ra di bin jibo mala axayî yan alîyên din, hin caran bêy vîyana xelkî û bi kotekîye. Alîkarîya malmezinan. Yan hikmetan bi zorî. Zibare.***Pend*** :Suxreya hêstiran bû, rûvî di revî.

**Suxrekirin** (k.jn.l.mê) Bi karê suxrê rabûn. (K) bn: Kirin.

**Suxte** (n.x.dz) bn:Soxte.

**Sûç** (n.x.mê) Binas.

**Sûçbar** (hk.dar.çewa) Gunehbar. Binaskar.

**Sûd** (n.x.mê) Mifa.

**Sûddar** (rd.l.çewa) Mifadar.

**Sûddîtin** (k.jn.l.mê) Mifadîtin. Sûdjêdîtin. Mifajêdîtin.(K) : Dîtin.

**Sûdwergitin** (k.jn.l.mê) Mifawergitin (K) bn:Wergirtin.

**Sûk** (hk.cih,n.x.mê) Cihê kirînûfirotinê. Bazar.

**Sûl** (hn.x.mê) Hilû. Lûs.

**Sûlav** (hk.cih,n.l.mê) Sîlav.

**Sûret** (n.x.nêr) bn :Sîret.

**Sûrî** (nejn) Xelik yan pertalên ji welatê Sûrya.

**Sûrya** (hk.cih,weln) Welatek Komarî ye, ji ereb û kurd an pêkhatî.

**Sûtan** (jn.x.mê) Sojtin.

**Sûtandin** (k.jn.x.mê) Şewitandin. Sojtin.

**Sûz** (nx.mê) 1.Peyman. 2. Dilînî.

**Sûzan** (ndar.dz) Navê keçane.

**Sûzdan** (k.jn.l.mê) Peymandan.: Sûz bi de ko tu çi caran viran ne key. (K) bn: Dan

**Sûzdar** (rd.çewa) Xwedî sûz. Peymandar. Br× Bêsûz.

**Swêd** (hk.cih,weln) Welatek ewropayîye.

**Swêdî** (netewn) 1. Hilgirê nasnameya welatê Swêd. 2. Pertalên ji Swêd.

**Swîr**(hk.x.çewa)Tama xwê. Xwarina sîr ;ang xwarina zêde xwê.

**Swîratî** (ndar.mê) Tama swîr.swîrî.

**Swîrbûn** (k.jn.l.mê) Heger xwêya xwarinê zê be tama wê sîr di be. (K) bn : Bûn.

**Swîrkirin** (k.jn.l.mê) Xwê pêwerkirin. (K) bn: kirin.

**Swîsra** (hk.cih,welatn) Weltek ewropayî ye.

**Swîsrayî** (netewn) 1. Helgirê nasnameya welatê Swîsra.2. Pertalên ji Swîsra.

# Ş

**Ş** (şe) Pîta bîst û sê ji abeya kurdî.

**Şa** 1 (pîşn.x.dn, hn.x.çewa) 1.Rêberê welatekîye ko awayê deshelata wî paşyetî bit. Şah. Kiral. 2. Bijare. Serpişk.Baş. Mezin. Zebelah.

**Şa** 2 (rd.x.çewa) Keyf. Xweşî.

**Şabad** (hk.cih.n.l) 1.Cihê roniştina şahî. Wargehê şahî. Şahnişîn.2. Navê jinaye.

**Şabal** (n.l.nêr) Şaper.Şabalên çûçikê şikestin.

**Şabaş** (n.l.mê) 1.Başîyek mezin. Qencîyek zil. 2. Dîyarîya stiranbêj yan, mûzîkvan û zirnabêjan li dema şahî û govendan.

**Şabaz** (n.dar.dz) ***balinde*** Şahê teyrên. Baz. 2.Navê mêrane.

**Şabelot** (n.l.mê) ***dar*** Şahbelot.

**Şabo** (n.l.nêr) ***tewal*** Balindeyekê rinde, çavên wî di ciwan û mezinin. Bom.

**Şabom** (n.l.dz) Şabo.

**Şabûn** (k.jn.l.mê) Keyxweşbûn. Dilxweşbûn. :Bi hatina babê ew pir şa di be.

**Şabûnî** (n.l.mê) Şahî. Seyf.

**Şaciwan** (n.l.mê) Keç yan jina ji hemûyan ciwantir di hêt hilbijartin.

**Şad** (hn.x.çewa) 1.Bi keyf. Bi gêwil. Xweş. 2. Navê mêrane.

**Şadbûn** (k.jn.l.mê) Kêfxweşbûn. Dilvebûn.(K) bn: Bûn.

**Şademar** (n.l.mê) Şahdemar.

**Şadiman** (rd.l.çewa) Dilfireh. Şabûnî.

**Şadimanî** (n.l.mê) Dilfirehî. Keyf.

**Şadirvan** (n.dar.mê) Melevangeh.

**Şadî** (n.x.mê) Xewşî. Kêf.


**Şadkirin** (k.jn.l.mê) Kêfxweşkirin. Bi wê biryarê te ez şad kirim.

**Şadrewan** (n.dar.mê) Melevangeh.

**Şafir** (n.x.mê) *giya* Giyayekê dême, davên wî di dirêjin, kew û sîsk hêlînên xwe li bin çê di kin.

**Şag** (n.x.mê) Şak.

**Şagenim** (n.l.nêr) 1. Genimê bijare 2. Genmok. Genimşa.



**Şagenim**

**Şagird** (n.l.dz) 1. Kesê liber destê hostayekî karekî di ke. Berdestik. 2. Xwendkar. Qutabî.

**Şagul** (hn,pesin,n çewa) 1. Ciwantirîn gul. Gula mezin.2 Navê keçane.

**Şah** (pîşn.x.dn) Paşa.Şa.

**Şahane** (rd.dar.çewa) Bijare. Serpişk.

**Şahbaz** (n.l.dn) 1. Teyrê baz. Şahê teyra.2. Navê mêrane.

**Şahbelot** (n.l.mê) *dar* 1.Core dareke bi xemil û mezine, kulîlkên pîvazî yan sipî di det. 2. Berê dara şahbelotêye, mîna gûzane, bi kêrê xwarina mirov û candaran di hên.

**Şahdemar** (n.l.mê) Demarên serekî yên ji mejî di stoyî ra derbaz di bin bo leşê candaran.

**Şa<u>heng</u>** (pîşn.l.mê) Şaha mêşhingivan. Şaha mêşa hingvînî.


**Şa<u>hî</u>** (n.x.mê) Şadî. Keyf. Govend.

**Şa<u>hîn</u>** (n.dar.dz) ***balinde*** 1. Teyrê kelexan. 2.Navê mêrane.



**Şahîn**

**Şah<u>mar</u>** (n.l.dz) Şahê maran. Marê kobra.



**Şahmar**

**Şah<u>nazî</u>** (n.l.mê) Serbilindî. Serferazî.: Ji mera şahnazîye, kurd rêzê li mêvanên biyanî di girin.

**Şahnazî<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Mirovê karekî dilxweş û serferaz bi be.: Ew şahnazîyê bi keça xwe dike ko yekem derçû liser xandingeha xwe.

**Şa<u>ho</u>** (n.dar.nêr) ***balinde*** 1.Corek teyrane.2. Navê mêrane.

**Şah<u>rê</u>** (n.l.mê) Şarê.

**Şah<u>siwar</u>** (karn.l) Şahê siwaran. Serokê siwaran. Sersiwar. Şasiwar.

**Şah<u>zade</u>** (karn.l) Pisê yan dota şahan. Paşa.

**Şa<u>jin</u>** (karn..l.mê) Şaha jin. :Jina kiral.

**Şajina<u>ciwanîyê</u>** (n.l.mê) Şaciwan.

**Şak** (n.x.mê) Bistîkên hin daran wek mêw, xwe di daran di alînin dako tayên wê xwe li ser bi girin û bilind bibin.

**Şak<u>havêtin</u>** (k.jn.l.mê) Hişînkatîyê bi hêz û xemil di kevit û şakakan di havêje. (K) bn: Havêtin.

**Şa<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dilxweşkirin. : Te dilê min şakir bi wê mizgînîyê.

**Şal** (n.x.mê) 1.Şîtika ji hirîyê yan mûyên kewalan hatî çêkirin , mêr û jin li pişta xwe di kin. 2. Şel.

**Şalok** (n.dar.mê) Daseka devê wê wek kerê heyvêye, bo dirûna giya,genim ceh û htd bi kar di hînin. Kêlendî.

**Şalûl** (n.x.nêr) ***balinde*** Corek balineyê denxweşe. Bilbil.


**Şalûşepik** (n.l.pir) Şelûşepik.

**Şalyar** (karn.dar. dz) Wezîr. :Şalyarê derve. :Şalyara ragehandin. :Şalyarê berevanîyê.

**Şalyarî** (n.dar.mê) Wezaret.

**Şam** (hk.cih.cugr.n.x) Paytextê welatê Sûryê. Dîmeşq. ***Pend*** :Şam şekire, welat şirîntire.

**Şamirîşk** (n.l.dm) ***candar*** Dîkileşam. Elok. Mirîşkeşa.



**Şamirîşk**

**Şamî** (n.x.mê,hk.çewa) 1. ***fêqî*** Corek gundorane. 2. Mirovê pora wî weryaye.Keçel. Hewês.3. Şamirîşk. Elok.

**Şampo** (n.biyan) Core sabûneka rone, mirov ser û giyanê xwe pê di şût.

**Şan** (n.x.mê) ***can*** Mil.

**Şand** (n.x.mê) Kesek yan çend kes bi nûnerîya dezgeh yan welatekî seredana alî yan jî welatekê din bi ken. :Şanda çandî, ramyarî, aborî û htd. Hinartî.

**Şandin** (k.jn.x.mê) Hinartin. Rêkirin. : Bavê wî nameyek jêra şand. (K) Bdn: Ez di şînim em di şînîn, tu di şînî hûn di şînin, ew di şîne[…it] ewan di şînin. Pr : Dê[bi] şînim, şînîn, şînî, şînin, şînit[…ne], şînin, Bdb :di şand, di şandin. Db,dûr : şandibû, … bûn. (F): Bi şîne, bi şînin.

**Şandî** (hk.dar.çewa) Hatî şandin. Bi rê kirî. Hinartî.

**Şane** (n.x.mê) ***can*** Cihe ji xaneyên biçûk pêkhatîye. :Şaneyên leşê giyandaran. :Mêşhingiv hingiv û kirmên xwe di şaneyan da di dane.

**Şanezerk** (n.l.mê) ***candar adî*** Zirkêtk. :Şanezerkê şaneya xwe bi sivandê ve çêkir.

**Şanik** (n.dar.mê) Nîşan. Xal.

**Şanişîn** (hk.cih.l.mê) Cihê bêhinvedan û rûniştina şahî .Wargehê şahî.Welatê paşayetî.

**Şanî** (n.x.mê) Nîşan.

**Şanîdan** (k.jn.l.mê) Nîşadan. :Ji kerema xwe di karî bingehê polîsan şanî min bi dî ?.(K) bn :Dan.

**Şanîkirin** (k.jn.l.mê) Nîşêkirin. Nîşadan.

**Şano** (hk.cih,n.x.nêr) Cihekê nemazeye jibo pêşkêşkirina zarvekirinê hember temaşevanan.

**Şanoger** (pîşn.dar.dz) Kesê şanoyê pêşkêş di ke.Zarvekerê şanoyê. Şanovan.

**Şanogerî** (karn.dar.mê) Karê şanoyê.

**Şanovan** (pîşn.dar.dz) Şanoger.

**Şanovanî** (karn.dar.mê) Şanogerî.

**Şanşanok** (n.l.mê) Xîçikên di ber yek ra kêşayîn ko di listina zarokan da di hên kêşan.

**Şanşanokanê** (nl.dar.mê) *yarî* Lîstineke zarok di bin du bir, yek li ber makê di mîne ya din di çit dûr û veşartî, xîçikan li ser ber, dîwar, erd û htd, di kêşin. Bira li ber makê lê di gerin û şanşanokên wan xera di kin, heger çi neman, dê bira din kevit ber makê, lê hindî mayîn dê bin xal li ser ya bermakê û dê her li ber mînit.

**Şape** (n.x.mê) Sîqal. Lûlîyên bestiyê.

**Şaper** (n.l.nêr) Perê mezin yê balindeyan, ji gelek peran pêk di hêt. Şabal.

**Şapik** (n.x.nêr) Şepik.

**Şar** (hk.cih,cugrn.x.nêr) Bajêr. Şehir.

**Şarandin** (k.jn.x.mê) Gerimkirin. Dijwarkirin. Arandin. Azirandin. :Wî civata şarndî; bi rewş êxistî bi axivtin û suhbetên xweş. (K) Bdn :Ez di şarînim em di şarînîn, tu di şarînî hûn di şarînin, ew di şarîne[…it] ewan di şarînin.. Pr: dê [bi] şarînim, arînîn, şarînî, şarînin, şarînit[…ne], şarînin. Bdb:di şarand, di şarandin. Db,dûr :şarandibû, … bûn. (F): Bi şarîne, bi şarînin

**Şarbajêr** (hk.cih,cugrn.l.mê) Bajêreke li Kurdistana Iraqê.

**Şaredar** (pîşn.dar.dn) Serokê bajêrî. Parêzgar.

**Şaredarî** (n.dar.mê) Parêzgeh.

**Şaredê** (hk.cih,cugir.n.l.) Bajêrk.

**Şarestûn** (n.l.mê) Cih, xanîyê bi stûnan hatîye ragirtin, dako pestan li ser dîwaran kêm bi be û ji herifînê bêt parêstin.

**Şarestûnkirin** (k.jn.l.mê) Danana yan rêzkirina bireka stûnan li bin banê avahî.(K) bn: Kirin.

**Şarevan** (pîşn.dar.dz) Bajêrvan. Parêzgar.

**Şarevanî** (n.dar.mê) Bajêrvanî.

**Şareza** (hn,hk.l.çewa) Mirovê şiyan û zanîn di warekî heye. Bispor.

**Şarezabûn** (k.jn.l.mê) Mirov di karekî da pelewan bi bit. Zanabûn. Hînbûn.

**Şarezad** (n.l.dz) Kur yan keça şaran. Xelkê bajaran.

**Şarezakirin** (k.jn.l.mê) Fêrkirin. Hînkirin.

**Şarezayî** (n.dar.mê) Zanîn. Pisporî.

**Şarê** (hk.cih,n.l.mê) Rêya mezin ya galiske û tirobêl lê di çin. Cade.

**Şaristan** (hk.cih,cugir.n) Cihekê bajarên wî nêzî hev. Bajêr.

**Şaristanî** (n.l.mê) Pêşkeftina gelan ji alîyê teknolocî, honer,zanîn û çandê ve.

**Şarvan** (n.dar.dz) Xelkê şaran . xelkê bajaran. Xudanê, berpirsê saharî.

**Şarvanî** (n.dar.mê) Civata berpirs bi karên şarî.Bajêvanî.

**Şaryan** (k.jn.x.mê)  Kelbûn.Gerimbûn. Aryan. Xîz, erd, asin, ber û htd yê şaryay ;ang yê kelbûy.

**Şasiwar** (n.l.dz) 1.Serokê siwaran. Sersiyar. 2. Navê mêrane.

**Şaş** (hk.x.çewa) 1.Çewt. Ne dirist. 2. Kesê xwe ji bîr bi kit ji egera tirsê yan şermê.  Şepirze.

**Şaşbûn** (k.jn.l.mê) 1. Çewtbûn. Di serda çûn. Hatin xapandin. 2. Ageh ji xwe neman.  Şepirzebûn. (K) bn: Bûn.

**Şaşik** (n.dar.mê) Dersok. Cemedanî. Kevink.

**Şaşikgirêdan** (k.jn.l.mê) Pêçana şaşikê  û di serê xwe alandin. (K) bn: Girêdan.

**Şaşî** (n.x.mê) 1. Çewtî.2. Şepirzeyî.

**Şaşîkirin** (k.jn.l.mê) Çewtîkirin. Serdaçûn. : Te şaşîyeka mezin kir dema te dest ji xandinê berda. (K) bn: Kirin.

**Şaşkirin** (k.jn.l.mê) Gêjkirin. Hêrkirin. : Ji min vebe, te ez şaşkirin.Xwe şaş neke dê şêy derbazbî.

**Şaşman** (k.jn.l.mê) Weke mirov şaş di mîne. Hicmetîbûn.(K) bn: Man.

**Şaşûper** (n.l.pir) Şaşika bi per û gîfik, mirov di kin serê xwe.:Şaşûperên melayî.

**Şatir** (n.x.dz) 1.Kesê kelûpel, nîşanîyên bûkan û nameyan di gehîne xwedîyên wan. Pîlik. Teter. 2. Heval. Hevbend.

**Şavêr** (hk.x.çewa) Parav. Çivêl.

**Şavêrî** (n.dar.mê) Paravî. Çivêlî.

**Şawîs** (n.l.nêr) Navê mêrane.

**Şax** (n.x.nêr,hk.cih) 1. Hestîyê dirêj û xarûpêç di serê caneweran da nexasim kewalan. Qoç ; kelê bi şax, nêrîyê bi şax. 2. Ta . Çeq. Liq.3. Çiya.



**Şax**

**Şaxvan** (n.dar.dz) 1. Xwedîyê şaxan, çiyan. Çiyavan. 2. Navê kiç û xortan.

**Şaxur** (hk.cih,n.dar.mê) Zinar. Kevir. Tat.

**Şayan** (jn.x.mê) Şiyan.Hêjî.

**Şayî** (n.x.mê) Şahî.


**Şazade** (karn,n.l.dz) Ji xêzana şahan . kur yan keça şahan.

**Şazde** (hijn.l.çend) Hijmara 16. 15 + 1= 16.

**Şazdehizar** (hijn.l.çend) Hijmara 16,000.

**Şazdemilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 16000,000.

**Şe** (n.x.nêr) Dark, lastîk yan asineke , dindikên wî zirav û bi rex êkvene, mirov jibo hilî û peytkirina pora xwe bi kar di hînin.



**Şe**

**Şeb** (n.x.mê) Keresteyekê reqe wek şekirêyê, bê tame. ***Pend*** :Şeb û şekir li nik ewan êkin.ang; li nik mirovên merd qesp û hesp mîna yekin.

**Şe<u>beng</u>** (n.dar.mê) Rengên ji rengên serekî hatîne darijtin. Şeveng.

**Şef<u>talî</u>** (n.dar.mê) Xox.



**Şeftalî**

**Şeh** (n.x.nêr) Şe.

**Şe<u>hir</u>** (hk.cih.cugrna.mê) Şar.

**Şe<u>hîd</u>** (peyv,biyan.hn.çewa) Kesê di rêya dozeka rewa da canê xwe gorî dike.

**Şehîd<u>bûn</u>** (k.jk.l.mê) Canê xwe gorî doza xwe kirin.

**Şehîd<u>keftin</u>** (k.jn.l.mê) Şehîdbûn.

**Şehîd<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirin di rêya rewa da.

**Şeh<u>nişîn</u>** (hk.cih,n.l.mê) Eywana li ser banî. Balkon.

**Şeh<u>reza</u>** (hn.çewa) Şareza.Zana.

**Şehre<u>zad</u>** (n.l.dz) Xelkê şehir. Kur yan keça bajaran. Bajêrî. Br× gundî.

**Şehri<u>stanî</u>** (n.l.mê) Şaristanî.

**Şek** (rd.x.nêr, çewa) Qonaxeka jîyê pezê nêre. Beranê ji du salan mezintir.

**Şe<u>kal</u>** (n.dar.mê) 1. Pêlava mirov dawîya wê li bin panîya pêyî di şikêne û di dide ser pê xwe. 2.Pêlav.

**Şe<u>kir</u>** (n.x.mê) Madeyekê toz yan kabikên şirîne , di kin nav çayê yan xwarinên din jibo şirînbûnê. : Ev çaye ya bê şekire. ***Pend*** :Heger hevalê te şekir be, hemîyê ne xwe.

**Şeki<u>rav</u>** (n.l.mê) Ava şekirkirî. Ava bi şekirê şirînkirî.

**Şekir<u>dan</u>** (n.dar.mê) Amanê têkirina şekirê.

**Şe<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov pora xwe bi şeyî hilî û peyt di ke. Hilûkirina mû û hirî ya kewalan.(K) bn : Kirin.

**Şe<u>kirk</u>** (n.dar.mê) Pirtên çêkirî yên rengîn ji şerkirê yên şirîn û xweş.

**Şekir<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Şekir êxistine nav vexwarin yan zadekî. :Şekirê bi ke çayê. :Ev kada şekirkirî geleka xweşe.

**Şekir<u>nok</u>** (n.l.mê) Şekirkeke nokeka qelandî di nav da ye.

**Şe<u>kok</u>** (n.x.mê) Hirmîka kûvî. Girsik.

**Şek<u>rok</u>** (n.dar.mê) Şekirk.

**Şel** (n.x.nêr) Parçeya binî ji cilên kurdî şelûşepikan. Şelwalê bergîzkan.

**Şe<u>lal</u>** (hk.çewa) Giya,darên ji hev dûr. Ne di berêk ra. Pora şelal ;ang pora dav kêm. Br× bi Tov.

**Şelal<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Ji hev dû kevtina darûbaran. Por mirovî di werit , şelal di bit. Genim hat çerandin şelal bû.

**Şelal<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Jiber êk înan der.

**Şelan<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Mirov êkî, malekê yan gundekî bi şelînit. Ang; mal û diravên wî bi kotekî bi bit. Talankirin. Mirov xwe bi şelînit.ang; mirov cilên xwe yên karî danit û yên bêhinvedanê li ber xwe bi kit. (K) ben :ez di şelînim em di şelînîn, tu di şelînî hûn di şelînin, ew di şelîne[…it] ewan di şelînin. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di şeland, di şelandin. Db,dûr: şelandibû, … bûn. (K) : bi şelîne, bi şelînin.

**Şel<u>te</u>** (n.x.mê) Parçe perokeke jibo nalîk û lihêfkan bi kar di hêt..


**Şelû<u>şepik</u>** (n.l.pirîn) Destê serûbin yên cilên kurdîne ko ji merezê bizineçîran hatîne diristkirin. Bergîz.

**Şel<u>wal</u>** (n.dar.nêr) Parçeya binî ya cilê kurdî.

**Şel<u>war</u>** (n.dar.nêr) Şelwal.

**Şe<u>ma</u>** (n.x.mê) Keresteyekê civir û nerme ji şaneya hingivê mêşan yan bezî hatîye çêkirin, jibo girêdan û tundkirina amêran mifa jê di hêt wergirtin.

**Şe<u>malk</u>** (n.dar.mê) Gelek cor û şêweyên bezê hişikkirîne, pelîtiket pêveye, agirî ber di denê jibo rûnahî û bîranînan bi kar di hêt. Momik.



**Şemalk**

**Şemam** (n.x.nêr) 1. *fêqî* Core gundorekê xîçxîçê ciwan.2. Xîç.

**Şemate** (n.x.mê) Dengûdor.

**Şembî** (n.x.mê) Roja dawîyê ji heftiyê ko di navbera înê û êkşembê daye. :Şembîyê li hin welatan, roja bêhinvedanê ye. *Pend* :Got cuhî were da bi bim beheştê; go ne !, evro şembî ye.ang şembî rojeka pîroze li cem cuhîyan.


**Şemboz** (hk.çewa) Candarê har û zû ve di ciniqit, nemaze dewar. : Hesp, ker, hêstir yê şemboz.

**Şembzbûn** (k.jn.l.mê) Harbûn. Veciniqîn.

**Şembûzkirin** (k.jn.l.mê) Harkirin. Tirsandin.

**Şemdînan** (hk.cih,cugrn.mê) Dever,Bajareke li Kurdistana Turkî.Şemzînan.

**Şemendefir** (n.dar.mê) Makîneka mezine, ji çendîn fargonan pêk di hêt ,ya veguhaztina mirov û karên bazirganî ye.Tirên.



**Şemendefir**

**Şemê** (hd,n.gaz.mê) Nav û naznavê gazîkirinê ye jibo jinan.

**Şemitandin** (k.jn.mê) Hilisandin. Tehisandin.

**Şemitîn** (k.jn.x.mê) Tehisîn. Hilisîn.

**Şemitok** (hk.dar.çewa) Cihê hilû yê mirov yan tişt liser di hilisit. Tehisok. Baran barî, bersiva xanî ya bûye şemitok.

**Şemî** (hk.dem) Şembî.

**Şemkor** (n.l.dn) *candar* Çekçekîle. Şevkork.

**Şemo** (hd,n,gaz,.nêr) Nav û naznavê gazîkirinê jibo mêran.

**Şemûz** (hk.çewa) bn: Şemboz.

**Şene** (n.x.nêr) Xermaşe.

**Şenekirin** (k.jn.l.mê) Hilû kirina paqijkirina erdê çandinê ji dexel, ber, û giyanên ziyandar. Xermaşekirin.

**Şeng** (hn.x.çewa) 1.Ciwan. Rind. Xweşik. Şox.2. Keyfxweş.

**Şengal** 1 (n.dar.mê) Darkezwan. Darkeskan.

**Şengal** 2 (hk.cih,cugirn.dar) Bajêreke li Kurdistana başûr.

**Şengebî** (n.l.mê) ***dar*** Corek bîhokane, xemil ciwane, ta û belgên wê wek pora sreran şor di bit xwar. Bîşeng.

**Şengebîk** (hk.l.çewa) Bûka ciwan û şox û şeng.

**Şengiste** (n.dar.nêr) Cokên kolayî jibo dîwarên avahîyan. Binetar. Bingeh. :Me şengiste danane dê dîwarekî ava keyn.

**Şengeşox** (hk.l.pesin,n.çewa) Ciwan. Şoxûşeng.

**Şens** (n.x.nêr) Carenivîsê baş yan. Lêhatin. : Mirovê bi şens. Ang; mirovê bo lê di hêt. Bişens Br× Bêşens.

**Şensê** (n.gaz.mê) Naznavê jina bi şens ,hin caran bêşens.

**Şenso** (n.gaz.nêr) Naznavê mêrê bişens, caran bêşens.

**Şep** (n.x.mê) 1. Mist. Tep. 2. Dengê lêdana mistekê.

**Şepal** (hn,hk.dar.çewa) 1. Ciwan. Rind.2. Şêra mê. 3. Navê keçane.

**Şepane** (n.x.mê) Pîne. Bizmarkên darî.

**Şepanekirin** (k.jn.l.mê) Bizmar lê dan. Bizmardan.

**Şepeşor** (hk.l.çewa) Mirovê bêserûber. Ne lêkdayî. Ne peyt. Ji berêkçûyî.

**Şepên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê lêdana şep û mistan.

**Şepik** (n.x.nêr) Parçeya serî ji şelûşepikên kurdî.

**Şepilandin** (k.jn.dar.mê) Xwe alozkirin. Alozkirin. Xwe tengavkirin ko karê xwe bi dawî bînit. Tengavkirin. (K) bdn :ez şepilînim, em di şepilînîn, tu di şepilînî, hûn di şepilînin, ew di şepile[…it], ewan di şepilin. Pr : dê + bdn. Bdb :di şepiland, di şepilandin. Db,dûr :Şepilandibûm, …bûyn, .. bûn, … bûn. (F) : bi şepilîne, bi şepilînin.

**Şepilî** (rd.dar.çewa) 1.Mirovê bêserûber. 2. Karên di kevin serêk mirov jê dernakeve. Şepirze.

**Şepilîn** (k.jn.x.mê) Şepizebûn. Tengavbûn. (K) Bdn : Ez di şepilim, em di şepilîn, tu di şepilî hum di şepilin, ew di şepile[…it] ewan di şepilin. Pr : dê bi + bdn. Bdb: di şepilîm, di şepilîn , şepilî, di şepilin, di şepilî, di şepilîn. D,dûr: şepilîbûm, …bû, … bûy, …bûyn, …bûn. (F) : bi şepile, bi şepilin.

**Şepirze** (hk.pesinn.çewa) 1.Mirovê gelek mijîl û bi kar .Şepilî. 2. Core giyayeke dême û bi serike.

**Şepirzebûn** (k.jn.l.mê) Mirov xwe tengav di ket dako karê xwe serkeftî bi dawî bîne. Şepilîn. (K) bn : Bûn.

**Şepirzekirin** (k.jn.l.mê) Xwe tengavkirin. Xwe şepilandin. (K) bn: Kirin.

**Şepirzeyî** (n.dar.mê) Tengavî. Dudilî.

**Şepîlk** (n.x.mê) *can* Çengên mirşk û balindeyan. : Min du kîloyên şepîlk û rankên mirîşkan jibo firavînê kirîn.

**Şepol** (n.x.mê) Pêl.

**Şeq** (n.x.mê) 1. Kelişte. Peq.2.Dengê lêdana destî. Dengê lêdanê, dengê qutanê bi panka destî.

**Şeqam** (n.x.mê) 1.Şeq. Zileh. 2. Cade. Şarê.

**Şeqandin** (k.jn.x.mê) Peqandin. Teqandin.: Tiveng şeqandin. Telhe şeqandin. (K) bdn: Ez di şeqînim em di şeqînîn, tu di şeqînî hûn di şeqînin.ew di şeqîne[…it] ewan di şeqînin. Pr : Dê[bi] şeqînim, şeqînîn,şeqînî, şeqînin, şeqînit[…ne], şeqînin. Bdb : Di şeqand, di şeqandin. Db,dûr : şeqandibû, …bûn. (F): bi şeqîne, bi şeqînin.

**Şeqbûn** (k.jn.l.mê) Wekî tiştek şeq di be. Keliştin. :Dîwarê xanî yê şeqbûye. Erd ji têna da şeqbûye. .(K) bn: Bûn.

**Şeqî** (n.x.mê) Xizmetkar. Zehmetkês. *Pend* :Şeqîyo, mandîyo, ne terazî diyare, ne weqîyo.

**Şeqîbûn** (k.jn.l.mê) Kesê xizmeta mirovan di ke. Zehetkêşan. (K) bn: Bûn.

**Şeqkirin** (k.jn.l.mê) Co tê vekirin. Çêkirina şeqan. Kelaştin. (K) bn: Kirin.

**Şeqle** (n.x.nêr) Darên kelaştî û birî jibo sotin û karên din. Kête. Nîre. Êzînk.

**Şeqlemast** (n.l.mê) Avemast. Dew.

**Şeqşeqbûn** (k.jn.l.mê) Şeq di kevin cihekî. :Destên wî jiber karî yên Şeqşeqbûyn.

**Şeqşeqkirin** (k.jn.l.mê) Mirov tiştekî bi kêrkê yan het devekê tîj şeq bi ke.Pirtpirtkirin.

**Şeqyan** (k.jn.x.mê) Vêkketina du tiştan û deng jê hatin. Teqîna, peqîna tiveng, top û htd. : Telhek şeqya. Tiveng şeqya.

**Şer** (n.x.nêr) Pevçûn. Pevdaçûn. *Pend* :Şer û nîvşer her yekin. *Pend* :Şer ji bêkarîyê çêtire. *Pend* :Şer bi şîrî bazar bi diravî. *Pend* :Şer govenda mêrane. *Pend* :Şerî di gel rojê di ke.[jibo ciwanîyê di hêt gotin]. *Pend* :Şerê ser şovê baştire ji gengeşa ser cuxînê[bêder].

**Şera<u>niş</u>** (hk.cih,cugrn.x.mê) Gundeke li Kurdistana Iraqê.

**Şera<u>nişî</u>** (malbn.dar.dz) Xelkê şeranişê.

**Şer<u>bet</u>** (n.x.mê) Vexwarin. Xoşav.

**Şer<u>çûn</u>** (k.jn.l.mê) bi Şerçûn. Pevçûn. Lêkkevtin. (K) bn: Çûn.

**Şere<u>dev</u>** (n.l.mê) Bi dev girtine hev. Cire. Dujwarbûna gengeşê. Şerenîx.

**Şe<u>ref</u>** (n.x.mê) Namûs. Sinc.

**Şere<u>nîx</u>** (n.dar.mê) Şeredev. Cire. Gengeşe.

**Şer<u>firoş</u>** (hk.l..çewa) Mirovê belakir. Mirovê herdem li şer û têkdanê di gere.

**Şer<u>geh</u>** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şerî. Qada şerî.

**Şe<u>rim</u>** (n.x.mê) Fedî. ***Pend*** :Şerma dinyayê ji (ezaba) gorî mezintire. ***Pend*** :Şermê û tirsê ne kin hevalên xwe, da pêşeman nebin ji biryar û axivtinên xwe.

**Şerim<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Hest bi şermê kirin.Fedîkirin.

**Şerim<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Mirovê karekê ne rewa kirî ko şermê ji xwe di ke.

**Şerim<u>revandin</u>** (k.jn.l.mê) Dema yek karekî bi ke yan gotinekê bêje ko şerim a mirovî bi çe û êdî mirov fedî ne ke.

**Şer<u>kar</u>** (karn.dar.dz) Mirovê pişikdarî şeran di be. Mirovê hez ji şeran di ke.

**Şer<u>ker</u>** (karn.dar.dz) bn :Şerkar.

**Şer<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov şerî di ken. Pevçûn. (K) bn : Kirin.

**Şer<u>min</u>** (hk.cih,cugrn) Gundeke li Kurdistana başûr.

**Şer<u>minî</u>** (malb,na.x.dz) Xelkê Şerminê.

**Şer<u>mizar</u>** (hk.l.pesin,çewa) Mirovê şermizar; mirovê ketiya kirasê şermê.Mirovê karekê xirab kirî û li ber çavên xelkê kêm bûyî. Riswa.

**Şermizar<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Riswabûn. (K) bn : Bûn.

**Şermiza<u>rî</u>** (n.l.mê) Fehêtî. Riswayî.

**Şermizar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Riswakirin. Direw derêxistin. (K) bn : Kirin.

**Şermîn** (hn,dar, pesin,çewa) 1. Mirovê şermê dike.2. Navê keçane. *Pend* :Jina şermîn bi şarekî, mêrê şermîn bi karekî. BR× Bêşerim

**Şermînî** (n.dar.mê) Rewişta, nexweşîya şermê li cem mirovî.

**Şermînok** (rd.dar.çewa) Şermîn.

**Şernex** (hk.cih,cugn) Bajareke li Kurdistana bakûr.

**Şerpeze** (hk.çewa) bn: Şepirze.

**Şervan** (pîşn.dar.dz)1. Kesê pişkdarîyê di şerîda di ket. Çekdarê karê wî şerê berevanîyê ji ax û rastîyê. . 2. Navê mêrane.

**Şeş** (hij,n.x.çend) Hijmara 6.

**Şeşalî** (n.l.mê) *endaze* Şêweyî endazeyî ji şeş rexan pêkhatîye.

**Şeşbalik** (n.l.mê) *endaze* Şeşalî.

**Şeşbêj** (hk.l.çewa) Mirovê gelek di axive û mijaran têkel di ke.Pirbêj.

**Şeşem** (hijn.rêz.çend) Şeşê.

**Şeşemîn** (hijn.rêz.çend) Şeşê.

**Şeşê** (hn.çnd) Ya şeşê. Rêza şşeşê.

**Şeşêk** (hk.çend.mê) Yek ji şeşê. 1/6.

**Şeşgoşe** (n.endaz.l) Şeşkujî.

**Şeşkujî** (n,endaz.l) Şêweyek endazeyî ye, ji şeş kujî yan seran pêkhatî ye.

**Şeşhizar** (hij,n.çend.l.mê) Hijmara 6000.

**Şeşlûleb** (hk.l.çewa) Mirovê pirbêj.

**Şeşmilyon** (hij,n.l.çend) Hijmara 6000000.

**Şeşsed** (hij,n.l.çend) Hijmara 600.

**Şeşik** (n.dar.mê) Şeş rojên xudê peristinê ne.

**Şeşxane** (pesin,n.çewa. n.l) *çek* Tivenga şeş xane he bin.

**Şet** (hk,pesin,n.x.çewa) Xar. Kheç.

**Şetrenc** (n.cih) Yarîyeke pê di lîzin, ji şeş reng yan coran pêkhatîye, şah, şalyar[wezîr], leşker, kelhe, hesp û fîl.

**Şev** (hk.dem.n.x.mê) Duwazde demhijmêr ji rojavabûnê tanî elindê ko dinya tarî di be. *Pend* :Şevê nale nale, rojê hespê fale. *Pend* :Şeva tarî ji êvarî diyare. *Pend* :Şev êke, diz hizarin.

**Şevaborî** (hk.dem) Berîna şevekê. Şivêdî.

**Şevaçûyî** (hk.dem.l) Şevaborî.

**Şevadin** (hk.dem.l) Şevaborî.

**Şevadî** (hk.dem.n.l.mê) Berî du Şevan . Pêr bi şev.

**Şevba** (n.l.mê) Bayê xweş û hînk yê şevan.

**Şevbaran** (n.l.mê) Barana bi şevê di barit. Tevên baranê li şevê.

**Şevbaş** (silav.n.l) Silava şevê ye, mirov daxaza şeveka baş û xweş di ke.

**Şevbêrî** (n.dar.l.mê) Borandina şevê, bi suhbet, çîrok, stiran û htd.

**Şevbêrîkirin** (k.jn.l.mê) Şev derbazkirin. Borandina şevê. :Şevadî me şevbêrîya xwe li mala Genco kir.

**Şevbêrk** (n.dar.mê) Şevbêrî.

**Şevborî** (n.l.mê) Şevbêrî.

**Şevçira** (n.l.mê) 1.Şevên taveheyva wan di ronin wek çirayî. 2. ***candar mêşik*** Stêrok.

**Şeveng** (n.dar.mê) Şebeng.

**Şeverok** (n.ldar.mê) Şevbêrî.

**Şevêdî** (hk.dem.n.l.mê) Şivêdî.

**Şevger** (hn,hk.l.çewa) 1.Mirovê bi şev di gerit.2. Navê mêrane.3. ***candar*** Kimkime.

**Şevgur** (hk.l.çewa) Tarîgewirk.

**Şevî** (hk.çewa) Şevek bi serda çûyî. :Ava şevî bi tam û tezî ye. Girara şevî.

**Şevîbûn** (k.jn.l.mê) Tiştê, xwarin û vexwarina şev bi serda di çe. (K) bn: Bûn.

**Şevîkirin** (k.jn.l.mê) Xwarin û vexwarinên di hêne vegirtin heyama şeveke. Şevek bi serda di çit. (K) bn : Kirin.

**Şevîn** (n.dar.mê) Mirov yan candar li aqarekî, cihekî bi şev di nivin.

**Şevkor** (hk.l.çewa) Mirovê bi şev na bîne, yan baş na bîne.

**Şevkorî** (n.l.mê) ***derd*** Nexweşîyeke çavên mirovî bi şevê baş na bînin.

**Şevreşî** (n.l.mê) bn: Şevkorî.

**Şevreşk** (n.l.nêr) Giyanên kirêt û pîrhevî yên bi sehim ko liber çavên mirovî çê di bin, nemaze bi şevê. Reşê şevê.

**Şevrevînk** (n.l.dz) Çekçekîle.

**Şevşevik** (n.l.dz) Çekçekîle.

**Şevroj** (hk.dem.n.l.mê) Dema sev û rojekê, 24 demhijimêr.

**Şevtiradî** (hk.dem.nl.mê) Berî sê Şevan. Pêş sê şevan.

**Şevtirk** (n.l.mê) Diyarîyeka bi tiraneye, jibo civatê xwarinek wek mêwîj, gûz û htd. Yan vexwrin, di hêt peydakirin, ji ber ko yekî li dîwanê tireka kendî.

**Şevtirsk** (hk,pesin,n.l.çewa) Tirsa şevê.

**Şevxweş** (silav) Silaveke bi şevê di hêt kirin. : Noke dema xewê ye ez dê çim, ; şeva hewe xweş.

**Şevxweşman** (k.jn.gl.mê) Silava malavayîkirinê bi şev. : Şeva we bi mîne xweş.

**Şevyar** (n.l.mê) Nêçîra bi şev. ;Babo herşev di çit şevyarê.

**Şevzengil** (n.l.mê) Di çîrokên kurdewarîda şevek heye li werzê zivistanê ko aqildarekî zengilek li ber derê mala xwe bi darek dirêj çikilandbû dako zêrevanîya befrê bi kit, heta demekê demgê zengilê qutbûye di befrêra hinda bû. Şevên befreka mezin di kevit.

**Şewat** (n.x.mê) 1. Agir. 2.Sotin. 3 .Kovan.

**Şewatek** (n.dar.mê) Tiştên bi kêr sotinê di hên nemaze yên kar pêkirina makînan. Panzîn, gaz, mazot û htd şewatekin. : Jiber pevçûnan li welatî qetlazîya şewatekê ye.

**Şewişandin** (k.jn.l.mê) Madeyekê şil,rûn mirov di amanekî bi livînit tanî deng jê di hêt. Şilqandin.

**Şewitandin** (k.jn.x.mê) Sotin. (K) Bdn :ez di şewitînim. Em di şewitînîn, tu di şewitînî hûn di şewitînin, ew di şewitîne[…it] ewan di şewitînin. PR: dê[bi] şewitînim, şewitînîn, şewitînî, şewitînin, şewitîne, şewitînin. Bdb: (min, te, wî wê di şewitand) , (me, hew[we]wan[ewan]di şewitandin). db,dûr: şewitaindibû, …bûn. (F): Bi şewitîne, bi şewitînin.

**Şewitîn** (k.jn.x.mê) Sotin : Dar di şewite. Dilê me di şewitî.

**Şeyda** (hn,hk.x.çewa) Sergerdan. Evîndar. Dîn.

**Şeyîn** (k.jn.x.mê) bn: Şihîn.

**Şeytan** (n.x.nêr) 1.Xudayê şer û xirabkarîyê.2. Şûm. Ne rawestayî.Zorzan.

**Şeytanî** (n.x.mê) Şûmatî. Ne hecimtin. Ne tena.

**Şeytanîkirin** (k.jn.l.mê) Şûmatîkirin. Ne hecimtin. (K) bn : Kirin.

**Şeytanok** (n.dar.mê) Candare, nerim û hilûye li şopa wî teratîyek wek gilîzî reng sipî di mînit û xwe di nav qalikeka req da di veşêre. Guhmasî.

**Şêlandin** (k.jn.x.mê) Şêlûkirin. Şêlîkirin. (K) bdn : ez di şêlînim em di şêlînîn, tu di şêlînî hûndi şêlînin, ew di şêlîne[...it] ewan di şêlînin. Pr :dê [bi]+bdn. Bdb : min, te, wê,w : di şêland, me, we[hewe], wan[ewan] di şêlandin. Db,dûr : şêlandibû, şêlandibûn. (F) : bi şêlîne, bi şêlînin.

**Şêlav** (n.l.mê) Dema av ra di bin bi ser erd û rezan da di hêt xwar û di axê têkel di bit û şêlî di bit.

**Şêlim** (n.x.mê) *giya* Core giyayeke belgêd wî di pan û kesk in, serikek mezin û reng şîrî di bin axê ra di girit, serik û belgên wî di hên xwarinê.

**Şêlimtirşk** (n.l.mê) Tirşîyê ji şêliman di hêt çêkirin.

**Şêlî** (hk.çewa) Tiştê ne rûn. Ne xuya. Ne zelal. Ava şêlî.ang ; Ava ne zelal. Br×Zelal.

**Şêlîbûn** (k.jn.l.mê) Dema tiştek şêlî di be. Av şêlîbûn Ang ; Ava bi kurê ra têkel di be.Ava êdî bi kêrî vexwarinê na hêt. (K) bn :Bûn.

**Şêlîkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov tiştekî şêlî bi kit. Têkdan. (K) bn: Kirin.


**Şêlîn** (k.jn.x.mê) Tazîkirin, xwe tazîkirin. Xwe şelandin.

**Şêlo** (hn.x.çewa) Şêlî.

**Şên** (hk,pesin,n çewa) Dilveker. Xweşik. Rind. Ciwan.

**Şênî** (hk,pesin,n.çewa) Avakirî. Peyt. Lêkdayî.

**Şêr** (n.x.nêr) *candar* Canewerekê dirinde, şîrder û kûvîye, paşayê daristan û candarane.2. Mêrxas. Mêrçak. Çavnetirs. ***Pend*** :Şîrê şêran, di meşka şêran , şêr bi xwe bi doşit.[mêrxasî]. ***Pend*** :Şêr di mire çerim di mîne, mêr di mire nav di mîne.



**Şêr**

**Şêrane** (rd.dar.çewa) Mirovê çavnetirs kar kiryarêd wî mîna şêran.

**Şêrdil** (n.l.dz.pesinn.çewa) 1. Mêrxas. Dilşêr. 2. Navek kurdî duzayene.

**Şêrejin** (hk,pesinn.çewa) Jina çavnetirs weke şêran.

**Şêrgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şêran. Warê mêrxasan.

**Şêrîn** (rd.x.çewa) 1. Şêrane. 2. Tama şekirê.

**Şêrko** (n.gaz.dar) 1.Naznav, yan navê biçûkirî yê şêrî.2. Navê mêrane.

**Şêrpence** (n.l.mê) bn: Penceşêr.

**Şêrvan** (karnn.dar.dz) 1. Şivanê, xwedîyê şêran. 2. Navek kurdî ye.

**Şêrwan** (hk.cih,cugrn,n.dar.nêr) 1. Bajêrkek û gundekin li Kurdistana Iraqê. 2. Navê mêrane. 3. Şêrê Wanê.

**Şêrwanî** (malb.n.dar.dz) Xelkê şêwanê.

**Şêrzad** (n.l.dz) 1. Têjikê şêran.2. Navê mêrane.

**Şêst** (hijn.çend) Hijmara 60.

**Şêstem** (hijn.rêz.çend) Ya,yê,yêd şêstê.

**Şêstemîn** (hijn.rêz.çend) Şêstem.

**Şêsthizar** (hijn.l.çend) Hijmara 60,000.

**Şêstmilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 60,000,000.

**Şêt** (hk.x.çewa) Dîn. Dîvane.

**Şêtbûn** (k.jn.l.mê) Dînbûn. (K) bn: Bûn.

**Şêtî** (n.dar.mê) Dînî. Dînatî.

**Şêtkirin** (k.jn.l.mê) Dînkirin. (K) bn: Kirin.

**Şêtxane** (hk.cih.n.l.mê) Cihê şêtan. Xanîyê dînan.

**Şêwaz** (n.x.mê) Reng. Cor.

**Şêwe** (n.x.mê) Çewanîya pêkhatina tenan. Awa. Reng. Cor. :Şêweyê xanî çarkujî ye.

**Şêx** (n.x.dz) Mirovê dîndar û malmezin.

**Şêxan** (hk.cih,cugrn) Bajêreke li Kurdistana Iraqê devera Mosil. Esifnê.

**Şêxanî** (n.dar.mê, malbn) 1. Xelkê Şêxan.2. Corek govenda kurdîye.

**Şidandin** (k.jn.x.mê) Givaştin. Tundkirin. : Bar şidand. Destê wî girt û şidand[givaşt] (K) Bdn: ez,em, tu, hûn, ew, ewan [di] şidînim, idînîn, şidînî, şidînin,ş idînit[…ne], şidînin. PR: dê[bi] şidînim,..û htd . Bdb : [di] şidand, şidandin. D,dûr: şidandibû,..bûn.(F) :bi şidîne, bi şidînin.

**Şiftî** (n.x.mê) ***fêkî*** Zebeş. Şitî.

**Şikandin** (k.jn.dar.mê) Mirov tiştek req ker bi ke. Bi ke perçe.Şêweyê tiştî têk bi çe.Pirtkirin.(K) Bdn : ez, em,, tu, hûn, ew, ewan; [di]şikênim, şikênîn, şikênî, şikênin, şikêne[…it], şikênin. Bdb: di şikand, di şikandin. D,dûr: şikandibû,…bûn. . (F): bi şikêne. bi şikênin.

**Şikeft** (n.x.mê) Kunên mezin li çîya û keviran. Berevezên mezin. Ziving.: Li çiyayên Kurdistanê pir şikeft hene.

**Şikestin** (k.jn.x.mê) Perçebûn. Kherbûn. Kevtin.Ppaşverevîn :Destê min yê şikestî. Dujmin di berokên şerda şikest.

**Şikestî** (rd.x.çewa) Hatîye şikandin.

**Şikev** (n.dar.mê) Sindoqk yan zilînka nan têda paraztinê.

**Şikevik** (n.dar.mê) 1.Axa cerikan. Axa gozikan. 2.Cerik. Lînik.

**Şikênandin** (k.jn.dar.mê) Şikandin.

**Şikêr** (hk.cih,n.x.mê) 1.Cihê bi kevir, darûbar û asê. Kelişte û şikeftên asê û kûr li çiyan.

**Şil** (hk.x.çewa) 1. Madeyên rûn wek, avê. Ter. 2. Mirovê seqet. Kêmendam.

**Şilapindk** (n.dar.mê) Giyayk dav zirav û rng ksk, mîna belgên gijnîje, serik (pîvazok)ek sipî hye tamxweşe.

**Şilbûn** (k.jn.l.mê) Tişt bi avê yan madeyek rûn ter di bit. Terbûn.(K) bn: Bûn.

**Şilêr** (n.x.mê) ***gul*** 1. Corek gulane. Sosin. 2. Navê keçane.

**Şilik** (n.dar.mê) Kilovanka serî.

**Şilî** (n.dar.mê) Barê madeyên şil.

**Şilindir** (n.x.mê) ***giya*** Core giyayekê, belg keske, serikek di axê ra mezin di bit reng sore, mîna şêlimane. Silik a sor.



**Şilindir**

**Şilkirin** (k.jn.l.mê) 1.Gihorîna madeyî ji barek req, gaz bo yê şil. 2.Rûnkirin.Terkirin. (K) bn: kirin.

**Şiloke** (n.dar.mê) Teva barana hûrik.

**Şilop** (n.x.nêr) Kinîşt.

**Şiloxe** (n.x.mê) Bendikên peytkirina kalik û reşikan(pêlav).

**Şilxe** (n.x.mê) Komeka mêşhingivan bi hev re.

**Şim** (n.x.mê) Nala jin û mêran. Qebqebk.

**Şimik** (n.dar.mê) Şim. ***Pend*** : Ji şimik ê ta kumik ê. Ang; weke mirov cilên nû ji serî ta pêlavê li xwe di ke.

**Şindoxa** (hk.cih,cugirn) Gundeke li Kurdistana başûr - devera Duhok.

**Şingal** (hk.cih,cugr,n.mê) Bajêrekê kevnare li Kurdistana başûr - devera Mosil. Şengal

**Şino** (hk.cih,cugrn.x) Bajareke li Kurdistana Iranê.

**Şipne** (n.x.nêr) Xermaşe.

**Şipnekirin** (k.jn.l.mê) 1. Zevî, rez bax, xermaşekirin. 2. Darên bêwic ji zevî, rezan rakirin[birîn].

**Şir** (hk.x.çewa) 1.Tembel. Westayî. Bêgêwil.Xav.2. Dengê kevtina avê.

**Şiratî** (n.dar.mê) Tembelî.

**Şirbûn** (k.jn.l.mê) Xavbûn. Kesîrebûn. Têrbûn. Bêzarbûn. (K) bn: Bûn.

**Şirenqe** (n.x.mê) Derzî ya dermanê av tê di kin li leşê mirov û candaran di din jibo çare û bergirîyê.

**Şirepên** (n.dar.mê) Şepên.

**Şireşir** (n.l.mê) ***deng*** Şirên.:Şireşira çokên kolanaye.

**Şirên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê ketina avê ji cihekê bilind bo binî. :Dengê şirêna avê ya di hêt diyare barana di barit?.

**Şirik** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê av jê di kevit xarê û şirên jê di hêt. Şirika avê.

**Şiringên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê lêkdana destan.

**Şirîn** (hn.çewa) 1. Tameka taybete, wek ya şekirê. 2. Mirov yan tiştê xweşik, balkêş. : Ew zarokek şirîne.3.Navê keçane.

**Şirînbûn** (k.jn.l.mê) Xwarina bi têkirina şekirê tama wê şirîn di be. (K) bn: Bûn.

**Şirînî** (n.dar.mê) Tiştê şirîn; şekrok. mirovê şirîn. ***Pend*** :Şirînîya darê ji belgane. ***Pend*** :Şirînî ji şaran di hêt, hingiv ji waran di hêt. ***Pend*** :Ji şirînîya mêwê kurmêwkê di mêjit.

**Şirînkirin** (k.jn.l.mê) Zadê bi şekirê di hêt şirînkirin. Mirovê bi axivtinên xweş û nazik xwe şirîn dike. (K) bn: Kirin.

**Şirkirin** (k.jn.l.mê) Mirov na xwaze bizavekê bi ke.Tembelkirin. Xwe şirkirin; Xwe tênegehandin. Na xwazit bi karekî rabit. (K) bn: Kirin.

**Şirove** (n.x.mê) Zelalkirin.Ronkiririn. Zelal.

**Şirovekirin** (k.jn.l.mê) Ronkirin. Zelalkirin. :Seyda rewşa welatî ji mera şirove kir.(K) bn: Kirin.

**Şirovekirî** (hk.l.çewa) Mijara hatîye şirovekirin.

**Şit** (n.x.nêr) Tişt.

**Şitanê** (n.dar.mê) ***yarî*** Gilçanê.

**Şiv** (n.x.mê) Dareke zirave nîvreqe, di hêt çemandin, fişyan, şivan, karikvan, gavan û htd di destê xwe di girin jibo hajotina terş û dewaran.

**Şivan** (karn.dar.dz) 1. Mirovê di çe ber pezî. Sexbêrvanê terş û kewalan. : Şivan binivit, pez dê bir bit.2. Navê mêrane.

**Şivanberx** (karn.l.dz) Şivan ê,..a, berxan. Berxvan.

**Şivandilke** (n.l.mê) ***balinde*** Sivandok.

**Şivankar** (karnn.l.dz) Şivan ê, ..a, karikan. Kharikvan.

**Şivêdî** (hk.dem.l) Şeva borî. Şeva çûyî. Duh bi şev.

**Şivik** (n.dar.mê) Şiv.

**Şixate** (n.x.mê) Elbikeka biçûke zilik têdane jibo agirkirinê bi kar di hêt. Elbikazilkan.

**Şiwat** (hk.dem.x.mê) Meha duwê. Sibat.

**Şiyan** (k.jn.x.mê) Karîn. (K) Bdn: ez di şêm, em di şên[şêyn]tu di şêy hûn di şên, ew di şê[..êt] ewan di şên. PR: Dê[bi] şêm,ş êyn, şêy, şên, şêt, şên. Bdb: [di] şiyam, şiyayn, şiyay, şiyan, şiya, şiyan. Db, dûr: şiyabûm, ..bûy,…, bû,… bûn. (F): Bi şê, bi şên.

**Şiyandin** 1 (k.jn.x.mê) bn : Şandin.

**Şiyandin** 2 (k.jn.l.mê) Bilindkirina astî. Bi hêzkirin. Pêşêxistin. :Zandorek jibo şiyandina mamostayan hat ve kirin.

**Şiyar** (hn.dar.çewa) bn :Hişyar.

**Şiyarbûn** (k.jn.l.mê) bn :Hişyarbûn.

**Şiyarî** (n.dar.mê) bn : Hişyarî.

**Şiyarkirin** (k.jn.l.mê) Bn :Hişyarkirin.

**Şî** (n.x.nêr) Hevjîn. Mêr.

**Şîjin** (n.x.mê) Derzîyeka mezine cewal, xirar têrikan pê di dirûn. *Pend* :Derzîyê di çavên xelkî da di bînit, lê şîjinê di çavên xwe da na bînit. Ang; şaşiyên xwe di veşêrit, yên xelkî rexne di ke. Şûjin.

**Şîkirin** (k.jn.l.mê) Dema keçek bi fermî li dadgehê, yan bi rêya zanayên dînî bi be jina mêrekî. Şûkirin. Mêrkirin.

**Şîlan** (n.x.mê) *gul* 1. Corekê gulane. 2. Navê keçane.

**Şîlav** (n.dar.mê) Ava fêqî. Xoşav.

**Şîle** (n.x.mê) Aveka şirîne ji gul û fêqî di peyda di be.

**Şîn** (hk.x.çewa) 1.Rengeke. Rengê esmanî, derya. 2. Şûn.Cih.

**Şînayî** ( n.dar.mê) Dar, giya û tiraşên hişîn, bi xemil.

**Şînbûn** (k.jn.l.mê) 1. Gihorîna rengê tiştî ber bi şînî ve cihek şîn bi be.2. Tiştê ko hatî çandin bi ser erdî di keve û werarê di ke.Bi xemilkeftina riwekî. Hişînbûn. (K) bn: Bûn.

**Şîndar** (rd.dar.çewa) Mirovê bi şînî. Xemdar. Behîdar.

**Şîngirêdan** (k.jn.l.mê) Jiber mirina kesekî, mirov behiyê di dane. Behîdan.

**Şînik** (n.x.mê) Depekê pan û reqe, destikek heye, jinan jibo şûştina cilikan bi kar di hînan, dema cilikên bi av û kef liser kevirekî di danîn bi şînkî lê di xistin da qirêj jê bi derkeve.

**Şînî** (n.dar.mê) 1.Ji egera çamekê yan mirina xweşdivîyekî mirov nemaze, pîrek cilên şîn li xwe di kin. Behî. 2. Şînkatî.

**Şînkirin**, hişînkirin (k.jn.l.mê) 1. Çandina mitayî darûbar çandin ko xemila erdî şîn bi be.2. Erdek, dîwarek yan cihek bi rengê şîn bi hêt rengkirin . :Me dîwarê xanîyê xwe şîn kir. (K) bn: Kirin.

**Şînwar** (n.l.nêr,hk.l.cih) 1. Cîhê mirov lê peydabûyî yan mezinbûyî. Warê mirovî. Welatê mirovî. Cihê bîranînên mirovî. Şûnwar. 2. Navê mêrane.

**Şîqşîq** (n.l.mê) Qêjî. Qîjandin.

**Şîqşîqî** (hk.dar.çewa) Mirovê şîqşîqê di ke.:Ew jineka gelek şîqşîqî ye.

**Şîqşîqkirin** (k.jn.l.mê) Qîjandin. Hewarkirin. (K) bn: Kirin.

**Şîr** (n.x.nêr) 1. Şilelekê sipî ye ji guhanên candaran di hêt. 2. Şûr; çekekê kevinê pevçûnanê ye ji hesine,di destê xwe di girin li dujminê xwe di xin.

**Şîranî** (n.dar.mê) Şirînî.

**Şîrbira** (n.l.nêr) Birayê yê şîrê dayka mirovî xwarî. : Ez û ew birayên hevin , çunkî min şîrê diya wî xwarî ye.

**Şîrbirinc** (n.l.mê) ***xwarin*** Core zadekê şile ji birinc û şîrî çê di kin.

**Şîrdan** (k.jn.l.mê) Dana şîrî. Giyandarên bi şîr şîrî di din têjikên xwe. (K) bn: Dan.

**Şîrder** (hk.dar.çewa) Giyandarên bi şîr, mîna bizin, çêl, seg, gur, şêr û htd.

**Şîre** (n.x.mê) Keresteyekê çire jibo derînana mûyan bi kar di hêt.

**Şîret** (n.x.mê) Gotinên bi mifa. Rêya rast nîşadan. Fêrkirina karê dirist.

**Şîretdan** (k.jn.l.mê) Şîret lê kirin.

**Şîretgirtin** (k.jn.l.mê) Wergirtina şîretan. : Berî ez bi çim zandora hînbûna zimanî, ez di xwazin çend şîretan ji te bi girim[wergirim].

Şiretkirin (k.jn.l.mê) Dema şîret li yekî di hên kirin jibo karê çak û neçak ji hev cuda bi ke. (K) bn:Kirin.

**Şîretlêkirin** (k.jn.l.mê) Ji şaşîyê bi dûr êxistin. Rênîşadana dirist. Dema yek pilanên baş nîşanî mirovî bi de. (K) : Kirin.

**Şîretvan** (karn.dar.dz) Mirovê zana û şareza ko şîretan di de mirov, dezgeh karbidestan.

**Şîretwergirtin** (k.jn.l.mê) bn :Şîretgirtin.

**Şîrêz** (n.dar.mê) 1.Ava fêqî. Xoşav.2. Strk. Cewî.

**Şîrêzkirin** (k.jn.l.mê) Pêkve nûsandin. : Kaxezê bi dîwarî ve şîrêz bi ke.

**Şîrhe** (n.x.mê) Çeper. Dîwar. Kelek.

**Şîrhekirin** (k.jn.l.mê) Dîwarkirin. : Mamê min şîrheka li dor rezê xwe ava kirî.

**Şîrikî** (rd.dar.çewa) Rengê mina şîrî.

**Şîrî** (rd.dar.çewa) Şîrikî.

**Şîrîn** (hn.x.çewa) bn :Şirîn.

**Şîrînbûn** (k.jn.l.mê) bn :Şirînbûn.

**Şîrînî** (n.dar.mê) bn :Şirînî.

**Şîrînkirin** (k.jn.l.mê) bn :Şirînkirin.

**Şîrvekirin** (k.jn.l.mê) Paş zarok mezin di be êdî dayk şîrê xwe jê di bire. Ji şîrî hat vekirin. : Ewê zarokê xwe şîrvekirîye. (K) : Kirin.

**Şîş** şîşik(n.x.mê) Tîrikên asinî. Şîşa birajtina goştî. Şîşikên gorekirinê.

**Şîtik** (n.x.mê) Peroyeke li ser cilên kudî mêr û jin di pişta xwe di alînin.Piştên.

**Şîv** 1 (n.x.mê) Danê sîyê ji xwarinê. Xwarina şevê. :Şîva şevê di mala wî da nebû. ***Pend*** :Şîva du caran kelandî,nanê du caran reşandî, bûka du caran xemlandî, çi dilan ne evandî. ***Pend*** :Şîva şevê di mala wî da ne bû.ang ;hine yê hejar bû.

**Şîv** 2(n.x.mê) Nihal. Gelîyê biçûk.

**Şobe** (n.x.mê) ***derd*** Core nexweşîyeke belgên hişînkatî di girit.

**Şofêr** (pîşn.x.dz) Kesê tirombêlê di hajot.

**Şofêrî** (karn.dar. mê) Karê hajotina tirombêlan.

**Şok** (n.x.mê) Şîşikeka sertîj û çemandîye bendikek dirêj pêveye û serê tîj kirimekî yan xwarinekê pêve di kin di havên avê jibo girtina masîyan.

**Şokvan** (pîşn.dar.dz) Kesê karê wî girtina masîyane bi şokê. Masîgir. Nêçîrvanê masîyan.

**Şokvanî** (karn.dar.dn) Karê girtina masîyan. Nêçîra masîyan.

**Şol** (n.x.nêr) Kar. ***Pend*** :Şol şêre, heger mirovî dest havêtê dê bi be rîvî.***Pend*** :Şolê evro ne hêle bo sube. ***Pend*** :Şola ne ji dil, na hête mil.

**Şolker** (karn.dar.dz) Mirovê hez ji şolî di ke. Karker. Rêncber. ***Pned*** :Şolkerê xwe be xweşdivîyê xelkî be.

**Şolkirin** (k.jn.l.mê) Karkirin. (K) bn: Kirin.

**Şop** (n.x.mê) Eger. Şûnpê.Rêbaz. Rêçik.

**Şor** (hk.x.çewa) Nizimkirî. Çemyayî. Hatîye xar.; Lêva şor, serê şor, çavên şor.

**Şorbe** (n.x.mê) Girara şil. Zadê ron. :Şorbeya birincê. Şorbeya nesaxan.

**Şorbûn** (k.jn.l.mê) Çemyan. Nevîbûn. Hatine xar. : Kezî şorbûn ser milan. (K) bn: Bûn.

**Şoreş** (n.x.mê) Xebata çekdarî jibo sitandina mafên xwe. Şoreşa agirî, Şêx se ,idê Pîran, Barzan, Îlonê, Gulanê û htd.

**Şoreşgêr** (karn.dar.dn) bn : Şoreşvan.

**Şoreşkirin** (k.jn.l.mê) Gel jibona azadîyê bi çekî şer di ke. (K) bn: Kirin.

**Şoreşvan** (karn.dar.dz) Kesê pişikdarîyê di şoreşê de di ke.Pêşmergeh.

**Şorkirin** (k.jn.l.mê) Çemandin. Nevîkirin. Nizimkirin. :Firokeyên dujminî li hindav gundî xwe şorkirin.(K) bn: Kirin.

**Şoşandin** (k.jn.x.mê) Peyveke jibo rawestana dewaran di hêt gotin. Oşandin. Şoş kero; em gehiştîn malê. Ang; raweste. :Hespê xwe bi şoşînin. (K) bdn:ez di şoşînim em di şoşînîn, tu di şoşînî hû di şoşînin, ew di şoşîne[...it] ewan di şoşînin. Pr:dê [bi]+ bdn. Bdb: di şoşand, di şoşandin. D,bdûr: şoşandibû, şoşandibûn. (F) bi şoşîne, bi şoşînin. Br× Wuşandin.

**Şoşê** (hk.cih. cugrn) Guneke li devera Akrê Kurdistana Iraqê.

**Şoşî** (malbn.dz) Xelkê şoşê.

**Şov** (n.x.mê) Zevîya kêlayî ne çandîye, da qelew bi be.

**Şovkirin** (k.jn.l.mê) Kêlana zevîyê da jibo sala din qelew bi be. (K) bn: Kirin.

**Şox** (rd.x.çewa) Rind. Ciwan. Xweşk. Şeng.

**Şoxûşeng** (hk.pesn.l.çewan) bn :Şengeşox.

**Şubatê** (hk.dem) Meha duwê ye ji zivistanê. ***Pend*** :Şubatê befir û ba tê.

**Şun** (hk.cih) Şûn. Cih.

**Şunda** (hk.dem) li Paş. Paşda.

**Şudagirtin** (k.jn.l.mê) Dubare wergirtin. Carek din wergirtin.

**Şudahavêtin** (k.jn.l.mê) Paşvehavêtin. Paşdahêlan.

**Şundahiştin** (k.jn.l.mê) Li paş hêlan . Paşda hêlan. Li paş xwe hiştin.

**Şundaman** (k.jn.l.mê) Paşveman. Paşda man.

**Şunwar** (n.l.mê) Şînwar.

**Şuştin** (k.n.x.mê) Şûştin. (K) bdn: ez di şûm, em di şûn[ûyn], tu di şûy hû di şûn, ew di şû [şût[ ewan di şûn. Pr: dê bi + bdn. Bdb: di şûşt, di şûştin. Db,dûr: şûştibû, ...bûn. (F): bi şû, bi şûn.

**Şû** (n.x.mê) Mêr. Hevjîn.

**Şûdan** (k.jn.l.mê) Mirovê semyan, keçekê bi mêr bi de. Dane şwî. : Wî keça xwe da şû.(K) bn: Dan.

**Şûkirin** (k.jn.l.mê) Mêrkirina.: Keça apê min şû kir.(K) bn: Kirin.

**Şûl** (n.x.nêr) bn : Şol.

**Şûm** (hk.x.çewa) Nehecimtî. Netena. Ew zaroyekê şûme. Şwîm.

**Şûmatî** (n.dar.mê) Nehecimtin. Nerawestan.

**Şûmatîkirin** (k.jn.l.mê) Zarok tena nabit. Şûmatîyan di ket. .: Vî zarokî gelek şûmatî yên kirîn. (K) bn: Kirin.

**Şûn** (n.x.mê) Cih.

**Şûnik** (n.x.nêr) Şînik.

**Şûnkar** (karn.l.dz) Kesê li şûna yekî[ berpirsekî] kar di ke.Cihgir. Şûnkarê şalyarî. Şûnkara rêvebirî.

**Şûnpê** (n.l.nêr) Şûna pêyê mirov û candaran li ser erdî çê di bin. Şwîna pêyan.



**Şûnpê**

**Şûnwar** (n.l.nêr) Cihê mirov lê peyda di bit û mezin di bit.Cihwar. Welat.

**Şûp** (n.x.mê) Şûn. Eger. Rêk.

**Şûpkirin** (k.jn.l.mê) Şûplêkirin. Nîşan yan eger li cihekî hêlan.Egerlêkirin.

**Şûr** (n.x.mê) 1.Şer. Pevçûn. 2. ***çek*** Şîr.

**Şû<u>re</u>** (n.x.mê) bn :Şîrhe.

**Şûre<u>şûr</u>** (n.l.mê) ***deng*** bn :Şirên.

**Şûreşûr<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Şireşirkirin. Hatina dengê şirêna avê.

**Şû<u>şe</u>** (n.x.mê) 1. Keresteyekê reqe, di hêt şikandin, rone yan rengîne.2. Amannê ji şûşeyan diristkirîn.

**Şûx** (hn.x.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik. Şeng.

# T

**T** (te) Pîta bîst û çarê ji abeya kurdî.

**Ta** 1 (n.x.nêr) 1. Çeqê darê. :Tayê darê. 2. Dezî.

**Ta** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê merc.Heta.Tanî. : Ji vêrê ta mal ez bi pêyan çûm. Ta tu ne hêy, ez na çin !.

**Ta** 3 (n.x.mê) ***derd nexweşî*** Bilind û nizimbûna pileyên laşê.mirovî. Ta gerim, ta sar.

**Ta** 4 (n.x.mê) Kit. Ket. Lib. :Tayekê terazîyê. Tayekê cewalî. ***Pend*** :Tayek û barek yekin. Rex. Alî.

**Tab** (n.x.mê) Ronîya rojê. Tava rojê. Tav.

**Ta<u>bir</u>** (hk.l.çewa) Dermanên dijî tayê. Dezîyên mela di xin destê nexweşan da tayê ji canê wî bi bire.

**Tab<u>lo</u>** (n.x.nêr) Keval.

**Taf** (n.x.mê) Bela. Nexweşî. Derd. Ataf. Arêşe. :Tu na rûnî dê tafek bi serê te hêt.

**Ta<u>fîl</u>** (hk.x.çewa) Bijîn. Paqij.

**Tafîl<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Pakijkirin ji gemarê. Bijînkirina tiştê herimî. Şûştin. : Mencelê tafîr ke şûna devê segî ye. (K) bn: Kirin.

**Tafîl<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Pakij. Bijîn.

**Ta<u>fîr</u>** (hk.x.çewa) bn:Tafîl.

**Tafîr<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Tafîlkirin.

**Tafîr<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Tafîlkirî.

**Tagir** (hk.l.çewa) Alîgir.

**Tagirî** (n.l.mê) Alîgirî.

**Tagirîkirin** (k.jn.gl.mê) Xwe dane bi alîyekî ra. Cudayîkirin navbera nas, heval mirovan da. :Tagirîyê neke navbera bira û pismamê xwe da!.

**Tagirtin** (k.jn.l.mê) Alîgirtin. Xwe dan dkigel alîyekî ,dezgehekê. Alîyek girtin. (K) bn: Girtin.

**Tah** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo mixabinîyê bi kar di hêr. Tehe. Tehem.Mixabin.

**Tajî** (n.x.dn) *cadar* Corekê seyane, di zirav û sivikin jibo nêçîrê bi kar di hînin. *Pend* :Tajî bi xurtî ravê naket.:Mirovekê hinde pê sivike wekî tajî di bezit.

**Tak** 1 (n.dar.nê) 1. Tayê biçûk. 2. Dava biçûk.

**Tak** 2 (hk.x.çewa) Tek.

**Tako** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegire(merc).Heta. Tanî.

**Tal** (hk.x.çewa) 1. Tameka nexweş ya taybete wek tama giyayê talîşk. Tama fêqîyê negehiştî. Tama çaya bê şekir. 2. Kirêt. Br× Şirîn.

**Talan** (n.x.nêr) 1. Dizî.2. Ferman.3. Mal û dirav.

**Talankirin** (k.jn.l.mê) Giyandar, kewal, terş, çevrî milik û htd yên ko hatîne dizîn yan standin. Dizîn yan standina samanê mirovî. :Cerdevan terşê gundî talan kirin. . :Mala hevsîyê me ya hatî talankirin. (K) bn: Kirin.

**Talanlêdan** (k.jn.gl.mê) Talankirin.

**Talav** (n.l.mê) Ava tam wê tal.

**Talbûn** (k.jn.l.mê) Tama xwarin û vexwarinê tal di be. (K) bn: Bûn.

**Talik** (n.dar.mê) 1. Tal. 2. Corekê tirîyê tam tale.

**Talî** (n.dar.mê) 1.Tama tal. Ne şirîn.2. Nexweşî. Tengavî. Taloke. 3. Çirçove.

**Talîşk** (n.dar.mê) *giya* Giyaykê kesik, dema bizdandina bistîk û belgên wî şîr jê di hêt û tam tale.

**Talkirin** (k.jn.l.mê) Bi tê xistina tiştê tal xwarin û vexwarinê tal di be.(K) bn: Kirin.

**Taloke** (rd.dar.çewa) Nexweşî. Tengavî. Qetlazî. : Kawdanên deverê di talokene.

**Talsêv** (n.l.mê) Sêva hişkkirî. Pirtên sêva hişkkirî.

**Tam** (n.x.mê) Heskirina mirov û candaran jibo ji hev cudakirina xwarin û vexwarinan bi ezmanî û çewayîya cor û xweşîya wan. Çêj.Mije.

**Taman** (n.dar.mê) Petirme. Petrome. Pîk.

**Tamandin** (k.jn.dar.mê) 1.Petirmekirin. Petromekirin. Pîkkirin.2. Tamkirin. (K) bdn : ez di tamînim em di tamînîn, tu di tamînî hûn di tamînin, ew di tamîne[….it]. Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di tamand, di tamandin. Db,dûr : tamandibû, tamandibûn. (F) : bi tamîne, bi tamînin.

**Tamankirin** (k.jn.gl.mê) Tamandin.

**Tamdan** (k.jn.l.mê) Lêdana rengan . Bi tîvkilên fêqî gemirandin. :Tamdana pîstan; bi kelpên hinaran gemirandina pîstan. (K) bn: Dan.

**Tamdar** (rd.dar.çewa) Bi tam. Çêjdar. : Zadê mal herdem yê tamdare.

**Tamêsk** (n.dar.mê) bn :Tamîsk.

**Tamîsk** (n.dar.mê) Corekê pirsikên hûrin li lêvan di hên piştî tayê. Tamîzk.

**Tamkirin** (k.jn.l.mê) Xwarina tiştî û zanîna tama wî bi ezmanî. Tamandin.: Min tam kir hingvî.:Kabanîyê tam kir zadî, berî dane ber mêvanan. (K) bn: Kirin.

**Tamsar** (hk.l.çewa) Mirovê lewçe. Mirovê xwînsar. Dargiran. Hestîgiran. :Kurekê tamsar. :Gotineka tamsar.

**Tamsarbûn** (k.jn.gl.mê) Lewçe, hestîgiran bûn. :Wekî berê nemaye, gelek yê tamsar bûy !.

**Tamsarî** (n.l.mê) Lewçeyî. Çivêlî. : Tu ji tamsarîyêd xo ve nabî.

**Tamsarîkirin** (k.jn.gl.mê) Paravîkirin. Çivêlîkirin. : Ez hîvî di kim li cem xelikî tamsarîyan neke !.(K) bn :Kirin.

**Tamsarkirin** (k.jn.gl.mê) Xwe tamsarkirin ; xwe bêtam, lewçe, çivêl – kirin. :Xorto bes xwe tamsar bi ke !.

**Tamxweş** (rd.l.çewa) Xwarin û vexwarinêd tamdar, bi tam. :Zadê tamxweş. :Ava tamxweş.

**Tamxweşbûn** (k.jn.gl.mê) Tama zadî û vexwarinan xweş di bit. : Piştî karî kirî nav zadî tama wî gelek xweş bû.

**Tamxweşkirin** (k.jn.gl.mê) Xweşkirina tama xwarinê. : Bê zehmet piçek darçînê bi ke nav çayê, tama wê xweş ke.

**Tamzêr** (hk.l.çewa) Kanzayên wek ristik, gustîlk bi ava zêrî hatîn tamdan.

**Tamzêrkirin** (k.jn.gl.mê) Bi ava zêrê tamdan. Di ava zêrî hilandin.

**Tan** (n.x.nêr) Perjan. Kotan. :Tanê bizinî. :Tanê serbanî.

**Tana** (n.x.mê) Hewar.


**Tanahatin** (k.jn.l.mê) di Hewarê hatin. :Li tana min were, di [li] hewara min were.

**Tanc** (n.x.nêr) Kulavê zêrî yê şahan û şajinan.

**Tandan** (k.jn.l.mê) Tankirin.

**Tanî** (pêrb) *rêzman* Alavê girêdanê, merc. Heta. Ta.

**Tank** 1 (n.x.mê) Makîneka serbazîye, jibo pevçûnan dijî dujminan bi kar di hînin.Zirîpoş.



**Tank** (zirîpoş)

**Tank** 2 (n.x.mê) Amaneke avê tê di kin.

**Tanker** (n.dar.mê) Tirombêleka mezine tanka avê li sere jibo av kêşanê bi kar di hêt.

**Tankirin** (k.jn.l.mê) Perjankirin. :Rezê xwe tan kir. (K) bn : Kirin.

**Tanotî** (hk.x.çewa) Mirov ji xerîbî yan dûrkevtin ji xweştivîyan korewar di bit. Evîndar. Têhnî.

**Tanotîbûn** (k.jn.l.mê) Perîşanbûn. Korewarbûn. Xerîbbûn. Bîrkirin.

**Tanotîkirin** (k.jn.l.mê) Bîrkirin. Xerîbkirin.

**Tapik** (n.x.mê) bn :Tepik. Xefk.

**Tapî** (n.x.mê) Çaleka kûre, gelek şêwe hene, dirêj, çarkujî, sêkujî û htd, mirov li berokên pevçûnan di kolin jibo di nav da bi mînin bersingê dujminî bi girin û şerî bi kin.

**Tapo** (nbiyanx.mê) hebûna mil, mal, erd û htd.

**Tapokirin** (k.jn.l.mê) Erd yan xanî tapokirin;ango bi awayê fermî liser navî hatin tomarkirin. :Xanîyê min yê tapokirîye, ang; li cem dezgehên fermî yê mine.

**Tapoxane** (hk.cih,n.dar.mê) Cih yan rêvebirîya tomarkirina erd û malê liser navê kesekî ko maf têda heye.Dezgeha havildar bi karên tapokirinê ve. Rêvebirîya tapoyê.

**Taq** (n.x.nêr) Dîwar.

**Taqiçk** (n.dar.nê) Nîv dîwareke jibo rûniştinê yan aman û pertalan li ser dananê, bikar di hêt.

**Taqî** (n.x.mê) Ezmûn. : Qutabîyan taqîyên nîva salê bi pileyên bijare encam dan.

**Taqîgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê taqîkirinên zanistî. Ezmûngeh.

**Taqîkirin** (k.jn.l.mê) Çewayîya zanîn û aşkerakirina zanistên nû.. (K) bn: Kirin.

**Tarî** (hk.x.çewa) 1. Ne ronahî. :Şeva tarî. :Çavên tarî. 2. Ne zelal. Şêlî.

**Tarîbûn** (k.jn.l.mê) Bûne tarî. Nemana ronahîyê.2. Şêlîbûn. Çavên wî yên tarîbûyn ;ang dinyayê baş nabînit. (K) bn : Bûn.

**Tarîgewrk** (n.l.mê) Dema dinya nîv tarî di be û bi diristî tarî ne kevtîye.:Tarîgewirka êvarî. :Tarîgewirka spêdê.

**Tarîkirin** (k.jn.l.mê) bi Nehêlana ronahîyê biyav tarî di bit.Vemirandina ronahîyan. : (K) bn: Kirin.

**Tarîperist** (hk.l.çewa) Kesê kotekîyê li mirov û jîngehê di ke û jibo tarî û paşdamanê herdem di xebite. :Tîrorist tarîperistin. :Dijminê tarîperist, ang; dijminê dijî pêşveçûnê.

**Tarîstan** (n.dar.mê) Tarîbûneka berfireh a deverekê hemûyê di girit. Şevên pir tarî.

**Tarîtî** (n.dar.mê) Tarîstan.

**Tarîvan** (hk.dar.çewa) Tarîperist.

**Tas** (n.x.nêr) 1. Amanê avvexwarinê. Tirar. Badî. 2. Kulavê zêrî yê serê jinan.

**Taş** (n.x.nêr) Pirteka ber yan asinê pan û tîj. Tefş.

**Taşeber** (n.l.nêr) Pirta berê pan û tîj.

**Taşt** (n.x.mê) *xwarin* bn : Têşt.

**Tatî** (n.x.nêr) Berikek taybetîye, ji hirîya pezî çêkirîye.

**Tatîkirin** (k.jn.l.mê) Cihek, pinîyek bi tatî bi hêt girtin, poşîn. (K) bn: Kirin.

**Tav** (n.x.mê) 1. Ronîya rojê. Hetav. 2. Baran . Reşîşeya baranê. Baraneka kurt. ***Pend*** :Tava tergêye;ang tiştê bi lez di hêt zû di çit. ***Pend*** :Taveka baranê, navbera mehên nîsan û gulanê, çêtire ji bagurdanê zêrî li nîva dîwanê. Jiber giringîya barana van du mehan.[ Isê Dela] ev pende li bîra mîrê amêdîyê înabû.

**Tavbirin** (k.jn.l.mê) Leşê mirovî li ber tava rojê di şewite. : Tavê leşê [te,min, wî wê û htd] yê birî.

**Tavgeh** (hk.cih,n.dar.mê) 1.Cihê bêhinvedan û demborandinê, tav lê di dit av lê heye, ne maze li bihar û havînan.2. Sîlav.

**Tavgez** (n.l.mê) Tavbirin. Sotin. Sotin bi tavê.

**Tavgezîn** (k.jn.l.mê) 1. Gerimeka mezin ko tav di gezit. 2. Tavbirina canê mirovî.

**Tavlêdan** (k.jn.l.mê) Tava rojê li cihekî di keve.:Roj derkeft, tavê li gundî da. :Sipêyan zû em ji banî di hên xwar, çunkî tav li me di de.

**Tawan** (n.x.mê) Sûç. Guneh.

**Tawanbar** (hk.dar.çewa) Gunehbar. Sûçbar.

**Tawanbarbûn** (k.jn.gl.mê) Gunehbarbûn. Sûçbarbûn.

**Tawanbarî** (khk.çewa) Gunehbarî.


**Tawanbarkirin** (k.jn.gl.mê) Gunehbarkirin. : Miovek bi guneha dizînê hat tawanbarkirin.

**Tawankirin** (k.jn.l.mê) Gunehkirin.

**Tawî** (rd.dar.çewa) 1.Mirovê bi derdê melarya kevtî.2. Mirovê tavbirî.

**Tawîbûn** (k.jn.l.mê) 1.Nexweşîya melarya girtin. Toşî melarya bûn.2. Tavbirin.

**Tawis** (n.x.nêr) 1. Navê xudayê tavê li cem kurdên kevin. 2. ***balende*** Balindekê ciwan û rengîne.



**Tawis**

**Tax** (hk.cih,n.x.mê) Pişkeka bajarî yan gundî. Taxa jûrî. Taxa binî. Rendek. Rex. Mil. Alî.

**Taxe** (n.x.mê) Tiştên ciwan liser hev hatîn danan.Deste. Rêz. Texe. :Taxeya tûtinê.

**Taybet** (hk.x.çewa) 1.Mirov,candar yan tiştê hindek salix hene li cem yên dî nînin. 2.Nemaze. Xasime.

**Taybetmend** (hk.l.çewa) Mirov yan tiştê hindek taybetî hene, bi wîve di girêdane.

**Taybetmendî** (n.l.mê) Herkes yan hertiştî taybetîyên xwe hene. :Gelê kurd taybetmendîyên xwe hene, wek ziman, erd, tîtal û htd.

**Taze** (rd.x.çewa) 1. Ter.Nû. Nûgehayî 2. Ciwan.Rind.

**Tazebûn** (k.jn.l.mê) 1. Ciwanbûn,. Rindbûn. Xweşikbûn. 2. Nûbûn.

**Tazekirin** (k.jn.l.mê) 1. Nûkirin.Nûjenkirin 2. Ciwankirin. (K) bn: Kirin.

**Tazekirî** (rd.l.çewa) 1. Nûkirî. 2. Ciwankirî.

**Tazî** 1(n.x.mê) Behî. Şînî.

**Tazî** 2 (hk.x.çewa) Mirovê bê cil.Rwîs.

**Tazîkirin** (k.jn.l.m) Cil xistin. Rwîskirin. Cildanan : Xwe tazî kir; ang xwe rwîs kir. (K) bn: Kirin.

**Te** (cihn.tek) ***rêzman*** 1. Cihnave jibo kesê duwê yê kit(tek). : Te jin înaye?. Te zad xwarîye?. Te çima wesa kir?. ***Pend*** :Te girt bernede, te berda, li dû neçe. *Pend* :Te çend heye, bi hindê dihînî. 2. Hebûna kesê duwê yê kit. Mala te, Bavê te, serê te û htd.

**Teba** (hk.x.çewa) Kesekê nediyar. Tiştê nediyar. : Ew çi tebaye? Ang; çi kese, tişte.

**Tebane** (n.x.nêr) Derpê kurt. Tebanî.

**Tebaşîr** (n.dar.nêr) Corekê gêçê ye, wek qelemî dirist kirîye jibo nivîsînê liser texreşî bi kar di hînin.

**Tebax** (hk.dem,n.dar) Meheke ji werzê havînê. Meha heşte. ***Pend*** :Tebaxê tav li axê. ***Pend*** :Tebaxê ne çe kemaxê. Ang ; meha tebaxê pir germe, jibo guhnelîyê ya girane. ***Pend*** :Tebaxê tirî kefte ser axê.

**Tebayî** (hk.çewa) Wekhevî. Bi hevre. Tevayî. Aştî. ***Pend*** :Tebayî âmê[hemû xelk] dê çîn Şamê.

**Tebel** (n.x.mê) Core şûşeyeka girovire, zarok pê di lîzin. Mat.

**Tebelanê** (n.dar.mê) *yarî* Lîztina bi tebelan . Yarîya tebelan.

**Tebelanêkirin** (k.jn.l.mê) Lîztina bi tebelan.Yarîya tebelanê di kin. (K) bn: Kirin.

**Tebek** (n.x.mê) Core amaneke ji şivan yan zilan dirist kirîye, pan firehe, nanî tê di xin. Zilînk.

**Teber** (n.x.mê) 1. Amêrekê kevine,wek bivrane jibo şeran bi kar di hat. Tevir. 2. Tebel.

**Tebeşîr** (n.dar.nêr) bn :Tebaşîr.

**Tebitandin** (k.jn.mê) Tenakirin. (K) bdn: ez di tebitînim em di tebitînîn, tu di tebitînî hûn di tebitînin, ew di tebitîne[…it] ewan di tebitînin.Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di tebitand, di tebitandin.Db,dûr: tebitandibû, tebitandibûn. (F) : bi tebitîne,bi tebitînin.

**Tebitî** (rd.x.çewa) Tena. Hawîş. Mit. Bêdeng. :Zarokeka tebitî.

**Tebitîn** (k.jn.x.mê) Rawestan. Hecimîn. Tenabûn. : Zarokno çima hûn na tebitin, çi bela weye?. (K) bdn: ez, em, tu, hun, ew, ewn [di] tebitim, tebitîn, tebitî, tebiteit[…te], tebitin PR: [dê] bi+bdn. Bdb: [di] tebitîm, tebitîn, tebitî. db,dûr : Tebitîbûm, ..bû, …bûn. . (F) bi tebite, bi tebitin.

**Teble** (n.x.mê) 1. Dihol. Def. 2. Mêze. Mêzeya biçûk.

**Tebo** (n.x.mê) *can kirmijok* Core kêzeka kirmijoke, liser xwîna Candaran di jît.

**Tedarek** (n.x.mê) Berhevî. Pêrabûn.

**Tedarekkirin** (k.jn.l.mê) Xwe berhevkirin. Cihek berhev kirin jibo civîn,aheng, seyran û govendan. :Wan tedareka xwe kirine jibo veguhaztina bûkê. (K) : Kirin.

**Tefşî** (n.x.nêr) Core tevirkekê biçûk û dev tîje, jibo renîn û tiraşîna dar û depan bi kar di hînin.

**Tefşo** (n.x.nêr) bn :Tefşî.

**Tegere** (n.x.mê) Asteng.

**Teh** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo mixabinîyê bi kar di hêt. Tehem.

**Tehem** (pêrb) *rêzman* bn :Teh. :Tehem xwezî ew çam bi serê wî ne bi hata!.

**Tehisandin** (k.jn.mê) Dema tişt liser hev di hilisin. Jiber hilûbûna wan tişt xwe liserêk nagirin. :Pêyên wî liser qerîsê tehisîn û kevt.(K) bdn : ez di tehisînim em di tehisînîn, tu di Pr : dê bi + bdn. Bdb : di tehisand, di tehisandin. Db,dûr : tehisandibûm, tehisandibû, tehisandibûn. (F) : bi tehisînee, bi tehisînin.

**Tehisîn** (k.jn.x.mê) Mirov yan tişt liser cihek hilû di hilisit. Hilisîn. Vezelyan. (K) bdn : ez di tehisim em di tehisîn, tu di tehisî hûn di tehisin, ew di tehise[…it] ewan di tehisin. Pr : dê [bi] tehisînim,tehisînî,tehisînin, tehisîne[…it] tehisînin. Bdb : ez di tehisîm, tu, ew ;di tehisî, em, hûn, ewan di tehisîn. Db,dûr : tehisîbûm, ..bû, … bûn. (F) : bi tehise, bi tehisin.

**Tehîn** (n.x.mê) Xwarineke, kuncîyan di qelîn û li aşî diken ta şileyeka tîr jê peyda di bit.Doşava kuncîyan.

**Tehjî** (n.x.dn) bn :Tajî.

**Tehnûsik** (n.dar.mê) Tamîsk.

**Tehre** (n.x.mê) Kele germa havînê, nexasin li nîvrojan[nîvro].: Erê ma mejîyê te na hehit li ber vê tehrê tu kar di kî?.

**Teht** (hk.cih,n.x.nêr) Cihek rik û asê. Kevirên mezin û pan.

**Tejî** (hn.x.çewa) bn :Tijî.

**Tek** (hk.x.çewa) Yek bi tinê. Kit. Ket.

**Tekandin** (k.jn.mê) Şilqandin. Hejandin. (K) bdn :ez di tekînim, em di tekînîn, tu di tekînî hûn di tekînin, ew di tekîne[…it] ewan di tekînin. Pr:dê[bi] +bdn. Bdb: di tekand, di tekandin. Db,dûr: tekandibû, tekandibûn. (F) :bi tekîne, bi tekînin.

**Tekane** (hk.dar.çewa) Êkane.

**Tekya** (hk.cih,n.x.mê) Cihê civîn, xudaperistin, xwandinên olî, û alîkarîya hejaran.

**Telar** (n.x.mê) Koçik.

**Telaş** (n.x.nêr) Parçeka ji qurmê darî yê bi bivrî hatî kelaştin û jê ve kirin.

**Telhe** (n.x.mê) 1. Amêreke ji hesin dirist kirîye li çolan û ber rez û baxan ve di din, jibo girtina giyandarên kûvî, weke rûvî, kêvrîşk, sîxur, gur û htd..Telî.2. Pîlan.

**Telhemişk** (n.l.mê) Xefka mişkan.

**Telhevedan** (k.jn.l.mê) Vedana telhê di rêya giyaneweran dako bi kevinê. :Karê nêçîrvanî telhevedane. (K) bn: Dan.

**Telî** (n.x.mê) Telhe.

**Telîs** 1 (n.x.nêr) Gûnî. Ferde. :Telîsê kayê.

**Telîs** 2 (hk.x.çewa) Dema cilik diber mirovîda di bin av jiber baranê yan ketin avê. Ter. Şil.

**Telp** (n.x.mê) Deste. Revde. Bir. Texe. :Telpekê befirê yê keftî.

**Tem** (n.x.mê) Mij.

**Temar** (n.x.mê) Giranîya xewê ku di kevit çavan mirov di nivit. Gêjbûna xewê.

**Temaşe** (hk.x.çewa) 1.Tiştê mirov di xwazit lê binêrit.Balkêş. 2. Nêrîn.

**Temaşekirin** (k.jn.l.mê) Nêrîn. Berêxwedan. Mêzekirin. :Temaşe kir têlefizyonê. (K) bn: kirin.

**Temaşevan** (n.dar.dz) Bîner. :Temaşevanên bernameya êvarbaş gelekin.

**Temate** (n.x.mê) 1.Doşava bacansorkan ya di kin nav zadî ji ber tamdan û rengkirinê. Şîlava bacansorkan.2. *giya* Bacansor.

**Tematekirin** (k.jn.l.mê) Peqandin û givaştina bacansorkan jibo çêkirina temateyê. : Me evsale gelek temate ya kirî .(K) bn: kirin.

**Tembel** (hn.x.çewa) Gemjo. Gemşo. Kêrnehatî. *Pend* :Tembelê bin dara qespê ye.

**Tembelî** (n.dar.mê) Bêkarî. Gemjoyî. Bêxemî.

**Tembûr** (n.x.mê) *mûzîk* Amêrekê mûzîkê ye.

**Tembûrvan** (pîşn.dar.dt) Pisporê warê jenîna amêrê tembûrê. Lêderê, lêdera tembûrê.

**Temen** (n.x.nê) Jî. : Temenê te çende ? ang ; jîyê te çende? Tu çend salîyî?.

**Temendirêj** (hk.l.çewa) Jîdirêj. Kevin. Gelek bi temen.

**Temendirêjî** (n.l.mê) Jîdirêjî. : Daxaza temendirêjîyê bo di kin.

**Temenkurt** (hk.l.çewa) Mirovê kêm temen. Tiştê zû pûç di bit.Jîkurt.

**Temenkurtî** (n.l.mê) Jîkurtî. Kêm.

**Te<u>met</u>** (hk.çend) Peyveke jibo hevberkirina mezinî, dirêjî û pirînîyê bikar di hêt. Hindî. Wek. Mîna. : Ev kevre temet xanîyekîye. Ez ew temet êkînang ; hindî êkîn bi (temen, dirêrêjî qelewî û htd).

**Temiran<u>din</u>** (k.jn.x.mê) Vemirandin. Agirtemirandin, rûnahîtemirandin. Pifkirin, av pêdakirin ta di vemirit. (K) Bdn : Ez di temirînim, em di temirînîn, tu di temirînî hun di temirînin, ew di temirîne […it]ewan di temirînin. PR : Dê [bi]+bdn. . Bdb : di temirand.di temirandin. Db,dûr : Temirandbû,.. bûn. (F) : bi temirîne, bi temirînin.

**Te<u>mirî</u>** (hk.çewa) 1. Agir, ronahî ya hatî temirandin. Ne hilkirî.2. Mirovê nexweş hay ji xwe nebe.Mirov di xeweka kûr da.

**Temi<u>rîn</u>** (k.jn.x.mê) 1. Agir vemirîn. 2. Bêdengbûn. Hay ji xwe neman.

**Temizan<u>din</u>** (k.jn.mê) Pêkve nûsandin. Pêkvekirin.

**Ten** (n.x.nêr) 1. Tiştê cihekî di girit û giranî hebit. Leş. 2. Yekeyeka pîvanê ye. 1000 kîlo.

**Te<u>na</u>** (hk.x.çewa) Hawîş. Bêdeng. Aram.:Biçûkekê tenaye.

**Tena<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Hawîşbûn . bêdengbûn. :Ev kure çima tena nabe?.(K) bn: bûn.

**Te<u>naf</u>** (n.x.nêr) Kinif. Werîs.

**Tenaf<u>baz</u>** (kar.dar.dn) Pelewanê ser ristê.

**Tena<u>hî</u>** (n.dar.mê) Tenayî.

**Tena<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Hawîşkirin.(K) bn: kirin.: Ew zaro yê di girît, tena ke.

**Tena<u>yî</u>** (n.dar.mê) Aramî. Xweşî. Bextewerî.

**Ten<u>dirist</u>** (hk.l.çewa) Saxlem. Nojdar.

**Ten<u>diristî</u>** (n.l.mê) Nojdarî.

**Ten<u>dûr</u>** (n.x.mê) Tenûr.

**Tene<u>ke</u>** (n.x.mê) 1. Madeyekê reqe 2. Amaneke ji madeyê tenekê hatîye çêkirin rûn,av, doşav û htd tê di xin.

**Te<u>nê</u>** (hk.x.çewa) Bi tenê. Ne bi kesê re. Ne di gel tu kesan, tiştan.Tinê. : ew maye bi tenê.

**Teng** 1 (hk.çewa) Biçûk. Ne fireh. Bb×Fireh.: Pêlava teng.binkiraskê teng.

**Teng** 2 (n.x.mê) Qayîşeka pan û dirêje, ji mûyên bizin yan hirîya pezî hatî çêkirin, ya girêdan û peytkirina kurtanê dewaran.

**Ten<u>gal</u>** (n.l.mê) Navteng. Kêlek.

**Tenga<u>sî</u>** (n.x.mê) bn :Tengavî.

**Ten<u>gav</u>** (hk.dar.çewa) Ne tena. Şepirze. Dilteng. : Ez j iber te pir tengavim.

**Tengav<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Şepirzebûn. (K) bn : bûn.

**Tenga<u>vî</u>** (n.dar.mê) Kawdanên berteng. Nexweşî. ***Pend*** :Tengavî di dûv kurtin.

**Tengav<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Bêgavkirin. Bela xwe lêdan. Bela xwe jê ve ne kirin.(K) bn : kirin.

**Teng<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Têkçûna tiştê, cilikên fireh. Têkçûn. Br× Firehbûn. (K) bn: bûn.

**Teng<u>dest</u>** (hk.l.çewa) Hejar. Destkurt. Kêmdirav. :Mirovekê tengdeste.

**Teng<u>destî</u>** (n.l.mê) Hejarî. Kêmdiravî. :Tengdestî li welatê kêm bûye.

**Teng<u>dil</u>** (hk.l.çewa) Dilteng. Bêhinteng. Tengav.

**Teng<u>dilî</u>** (n.l.mê) Tiltengî. Bêhintengî.

**Tenge<u>zar</u>** (hn,hk,.l.çewa) Rê liber mirovî winda di bit. Perîşan. Tengav.

**Tengezar<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Tengavbûn. Perîşanbûn.

**Tenge<u>zarî</u>** (n.dar.mê) Tengavî. Perîşanî. Bêrêyî.

**Tengezar<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Perîşankirin. Bê ser û rê kirin. Rê li ber berze kirin.

**Teng<u>ijîn</u>** (k.hn.mê) bn :Tingijîn.

**Ten<u>gî</u>** (n.dar.mê) Tiştê teng. : Jiber tengîya pêlavê pêyên min birîndar bûn. Br× Firehî.

**Teng<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Cilik, kun, der, yê fireh; bi hêt têkbirin, biçûkirin. : Min şelwalê xwe da teng kirin ji ber ku yê fireh bû. Br× Firehkirin. (K) bn: kirin.

**Te<u>nik</u>** (hk.x.çewa) Tiştê ne stûr. Zirav. Perê tenik, kaxeza tenik, dîwarê tenik. Banê tenik.

**Tenik<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Tişt tennik di bit. (K) bn: Bûn.

**Teni<u>kî</u>** (n.dar.mê) Tiştê tenik. Nazikî. Ziravî.

**Tenik<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Renîn û kolana tiştî yan erdî ta tenik di bit. (K) bn: Kirin.

**Te<u>nişt</u>** (n.x.mê) Kêlek. Rex. Al.

**Te<u>nî</u>** (n.x.mê) Rengê reş yê ji kadîya agirî peyda di bit û bi tiştan ve di mînit.

**Tenî<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Tenîgirtin.

**Tenî<u>girtin</u>** (k.jn.l.mê) Dema tiştek heyamekê li bin dûkêlê bi mîne, tenî liser xirve di be û reş di be. (K) bn: girtin.

**Tenî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Êxistina goşt û tiştan li bin kadîyê tanî tenî di girit. Tenî tê dan.(K) bn: kirin.

**Tenî<u>têdan</u>** (k.jn.gl.mê) Tenîkirin.

**Tenî<u>per</u>** (n.l.mê) Kaxeza karbonî.

**Te<u>nûr</u>** (n.x.mêr) Amêrê pêvedana nanîye,nemaze sawik, li cihekê kûr û deshil asê di kin,nava wê valaye agirî di navda hil di kin ta gerim di be,ji axa cerikan hatî çêkirin.

**Ten<u>ya</u>** (hn,hk.x.çewa) bi Tinê. Êkane.

**Tep** (n.x.mê) ***deng*** Dengê lêdaneka hêhî bi destî li mil yan pişta yekî. Dengê destê mirovî wekî bi henek ve li yekî di din.Mista nazik.

**Tepa<u>nê</u>** (n.dar.mê) ***lîstik*** Bi gokê lîztin. Yarîyên bi gokan

**Tepanê<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Lîztin[ yarîkirin] bi gokê. (K) bn: Kirin.

**Te<u>pe</u>** (n.x.mê) Goka lîztinê. :Pêhnek li tepê da.

**Tepe<u>dor</u>** (n.dar.mê) Dervankek biçûke ji pirteka darê xav hatî çêkirin di kin di derê bitilan da şileyên nav da ne rêjin. Tebedor.

**Te<u>pên</u>** (n.dar.mê) Dengê tep lêdanê. Şepên. :Te destê xwe li zikê wî da tepên jê hat.

**Te<u>pik</u>** 1(n.dar.mê) 1. Girikên hevîr, teqin, yan rîxê. 2. Gok. Tepe.

**<u>Tepi</u>k** 2 (n.x.mê) 1.Xefka ji beran hatî çêkirin jibo girtina çûçik û tewalan. 2. Xapandin.

**Tepikvedan** (k.jn.gl.mê) Dema tepikek di hêt vedan dako berhev bit jibo girtina tewalan. 2. Tepik liber yekî vedan,ang; nexşne danan jibo daweşana gurzekî dijî wî.

**Tepisandin** (k.jn.dar.mê), tepişandin Pestkirin û di navêkda birin. (K) Bdn: Ez, em, tu, hun, ew, ewan. Di tepisînim, tepisînîn, tepisînî, tepisînit[…ne], tepisînin.PR bn: Bdn+ [dê]. Bdb: di tepisand, di tepisandin. Db,dûr: tepisandibû,…bûn.(F) : bi tepsîne, bi tepisînin.

**Tepisandî** (hk.dar.çewa) Hatî tepisandin.

**Tepisîn** (k.jn.mê) Pelişîn. Herişîn.

**Tepîn** (k.jn.mê) Tepisîn.

**Teqalk** (n.dar.mê) 1. Pirteka girover û tenik, mîna meyîkan. 2. Corekê şekirokane.

**Teqandin** (k.jn.mê) Peqandin. (K) Bdn: Ez di teqînim em di teqînîn, tu di teqînî hun di teqînin, ew di teqîne[…it] ewan di teqînin.Pr : Dê [bi] Teqînim. Bdb : Di teqand. Di teqandin. Db,dûr : Teqandibû,.. bûn. (F) : bi teqîne, bi teqînin.

**Teqe** (n.x.mê) Dengê teqêna tivengan. Pevçûnên.

**Teqekirin** (k.jn.l.mê) Gule berdan hev. Tiveng û top teqandin. Teqeka baş li dujminî kirin û paşî paşve zivirîn.

**Teqên** (n.dar.mê) *deng* Dengê peqînê. Dengê vêkkevtina tenên req, dergeh, darbirînê û htd.

**Teqin** (n.x.mê) Qur. Kur. Herî.

**Teqîn** (k.jn.x.mê) Peqîn.

**Teqteqoşk** (n.l.mê) Demance, debanceyên zarokan.

**Ter** (hk.x.çewa) 1. Şil. 2. Nû. Taze. Nazik. 3. Hişîn. BR× Hişk. Zuha.

**Teratî** (n.dar.mê) Cih yan tiştê ter bit. Bi av. Avdar. : Teratî di vî erdî da heye. :Teratîya devî.

**Terazin** (n.x.nêr) Evrazî.

**Terazî** (n.x.mê) 1. Amêrê pîvanê ye.2. Navê stêrekêye.

**Terazû** (n.x.mê) bn :Terazî.



**Terazû**

**Terbî** (n.avêsta.x.mê) Fêrbûn. Çavdêrî.

**Terbîbûn** (k.jn.l.mê) Fêrbûn. (K) bn: Bûn.


**Terbîkirin** (k.jn.l.mê) Perwerdekirin. Fêrkirin. (K) bn: Kirin.

**Terbûn** (k.jn.l.mê) Şilbûn. : Cilikên min li ber baranê ter bûn. (K) bn: Bûn.

**Tere** (n.dar.mê) Giyayên bi terî dihên xwarin, wek kerfs, reşadok, pîng û htd.

**Terecan** (n.l.çewa) Nazik. Ciwan. Ter

**Terektir** (n.l.biyan.mê) Mekîna kêlana erdî.



**Terektir**

**Teremast** (n.l.nêr) Mastê jibo zivistanê parastî [hilgirtî].

**Tereqî** (n.x.mê) *fêqî* Rengekê xoxane, di hilîne.

**Teres** (hk.x.çewa) Gotineke mirov jibo hevdu sivikkirinê bikar dihînin. Dijûneke. Civîne. Pûç.Çepel.

**Tereşiwat** (n.l.mê) Roja dawî a meha şiwatê. *Pend* :Tereşiwatê, gîskî xwe havêt latê. ang; ber bi biharê ye.

**Terezin** (n.dar.mê) Baxçe. Cinîk.

**Terg** (n.x.mê) Gijloka gir.

**Terim** (n.x.nêr) Laşê mirî. Kelex.

**Terimbûn**, bûne terim (k.jn.l.mê) Bûn kelex.(K) bn : Bûn.

**Terimkirin** (k.jn.l.mê) kirin terim. Kujtin. (K) bn: kirin.

**Teriqîn** (kjn.x.mê) 1. Revîn. Bazdan.2. bi Dawî hatin, nemaze yarîya perkanê.

**Terî** (hk.x.çewa) Teratî.

**Terkirin** (k.jn.l.mê) Şilkirin. Av pêdakirin. (K) bn: Kirin.

**Terme** (n.x.mê) Cihê rûniştinê li bihar û havînan ku di kevit ber derê malê.Hewş. Bersivk.

**Termêmexîl** (n.l.nêr) *stêrnasî* bn :Termênihê.

**Termênihê** (n.l.nêr) ***stêrnasî*** Heft stêrin li esmanan wek mînakê hirçeka mezin xuya di kin. ***Pend*** : Di çîvanokan da hatîye; herkesê heft caran vê gotinê bi bêje û bêhina xwe ne hilkêşe dê çite beheştê. :Termê nihê, nih li piştê, heçîyê heft caran bêjit, dê çit beheştê.

**Terq** (hk.x.çewa) Hesin, dar, ber û htd yê sertûj.

**Teşik** (n.x.pir) Ling. Pê.

**Teşî** (n.x.mê) Amêrekê destîye jibo ristina bendikan ji hirî yan mûyan bikar dihêt.

**Teşîrês** (n.l.dz) Mirovê [piranî jin] yê bi teşîyê bendikan di rêsit.

**Teşîrêsk** (n.l.mê) ***balinde*** Corekê teyrane li bilindahiyê di rawestit.

**Teşîristin** (k.jn.l.mê) Diristkirina [ristina]bendikan bi teşîyê (K) bn : Ristin, rêsan.

**Teşqelçî** ( n.l.dz) Xapînok.

**Teşqele** (n.x.mê) Xapandin. Serdabirin.

**Teşqelekirin** (k.jn.l.mê) Xapandin. Direw lêkirin. Serdabirin.(K) bn : Kirin.

**Teşt** (n.x.mê) Amaneke dan û mitayî tê dixin. Test.

**Teter** (karn.dz) 1. Kesê nameyan di gehîne. Posteçî. 2. Navê mêrane.

**Tev** (hk.çewa) Hemû. Gişt.

**Teva** (hn.çewa) Tev.

**Tevayî** (n.dar.mê) Tebayî. Bi Hevre.

**Tevbûn** (k.jn.l.mê) bn :Tevîbûn.

**Tevda** (hk.dar.çewa) Bi hevre. Pêkve.

**Tevdan** (k.jn.l.mê) Têkhelkirin. Têkelkirin. :Ka û ceh tevdan jibo xwarian kerî.

**Tevde** (hk.dar.çewa) Tevda.

**Tevdêr** (n.dar.mê) Makîna çêkirina şîlavê ji fêqî, yan hûrkirina giyayî.

**Tevger** (n.dar.mê) 1. Bizav.2. Navê xor û keçane.

**Tevin** (n.x.nêr) 1. Davên raçandî jibo vehandin û çinîna cewal, werîr, berik û htd. 2. Davên raçandî yêd mala tevinpîrkê.

**Tevin<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Çêkirina tevinî. Danana tevinî.Raçandina tevinî. (K) bn: Kirin.

**Tevin<u>pîrk</u>** (n.l.mê) ***candar*** Core giyandarekê biçûke, tevinî di ke.



**Tevinpîrk**

**<u>Te</u>vir** (n.x.nêr) Amêreke jibo kolana erdî bi kar di hêt. :Bîstan bi tevirî kola. :Xepare bi tevirkî kir.

**Tevizan<u>din</u>** (k.jn.mê) Mirov serê candarekî yan mirovekê bin av bi ke ta bêhna wî çik di be.

**Tevi<u>zîn</u>** (k.jn.mê) Di bin avê ve fetisîn.

**<u>Te</u>vî** 1 (n.x.mê) Baran. Barîna bireka baranê. :Duhî tevîyeka baranê li gundê hat co rabûn.

**Te<u>vî</u>** 2 (hk.x.çewa) Tev. Tevda. Bi hevra. :Emê tevî wan herim dîlanê.

**Tevî<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Pişikdarbûn. :Supasîya te di kin ko tu tevî ahinga me bûyî.(K) bn : Bûn.

**Tev<u>kar</u>** (hk.dar.çewa) Alîkar. Piştevan.

**Tev<u>karî</u>** (n.dar.mê) Alîkarî.

**Tev<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Têkhlkirin. Di nav êk da kirin.

**Tev<u>lihev</u>** (hk.l.çewa) Di nav yekda. Têkel.

**Tevlihev<u>bûn</u>** (k.jn.gl.mê) Têkelbûn.

**Tevli<u>hevî</u>** (hk.l.çewa) Aloz. Alizî. Têkel.

**Tevlihev<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Têkelkirin.

**Tevlî<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Pişikdarbûn. :Em tevlî aheinga jinînana wî bûyn.(K) bn: Bûn.

**Tev<u>şî</u>** (n.x.nêr) Tevirkê daran. Qeraşeyê tiraşîna daran.: tevşîyê berê xweye. Ang; her tişt bo xwe di vê.

**Tev<u>şo</u>** (n.x.nêr) bn :Tevşî.

**Te<u>xe</u>** (n.x.mê) Deste. Pêç. Tilxe. Texa befirê, texa çilî, texa kaxezan û htd.

**Tew** (peyv.kevin.xweş) Gotineke guhdar daxaza leşsaxîyê jibo dengbêj yan lawikbêjî di kin dema disirit .ang ; Pîrozîya xwedayê tavê.

**Tewal** (n.x.mê) Balinde. Firinde. Teyr.Wala.

**Tewalêt** (n.biyan.mê) Daşir. Avrêj.

**Tewandin** (k.jn.x.mê) Jibo rûmetgirtin mirov xwe di çemînit.Çemandin. Xwe şorkirin. :Em bejin a xwe li hember şehîdên Kurdistanê di tewînin. (K) :Bdn ez, em, tu, hun, ew,[ewê], ewan. Di tewînim, tewînîn, tewînî, tewînin, tewîne, tewînin.. PR : Dê[bi] + bdn. Bdb : Di tewand, di tewandin. Db, dûr: tewandibû,.. bûn. . (F) : Bi tewîne, tewînin

**Tewil** (n.x.mê) Pinîya mezin

**Tewilkirin** (k.jn.l.mê) Girêdana dewaran li cihê çerandinê. :Hesp tewil kir. :Hêstirê tewil bi ke. (K) bn: Kirin.

**Tewilkirî** (hk.l.çewa) Hatî tewilkirin. :Kerê tewilkirî.

**Tewilxane** (hk.cih,n.l.mê) Cihê tewilkirina dewaran.

**Tewîk** (n.dar.mê) Dengûdoreke guhdar di ber lawikgotinêra di bêjin daku dîwan gerim bibit û gêwilê stiranbêjî vebibit.

**Tewîkdan** (k.jn.l.mê) Guhdarên stiran û lawikan tewîkan di din. (K) bn: Dan.

**Tewrat** (n.x.mê) Kitêba pîroz ya dîna cihûyan.

**Texe** (n.x.mê) Çîn.Cîn. :Texa çilî, texa axê. Tûtina texe. :Texa paleyan. :Texa karkeran.

**Text** (n.x.nêr) Çirpê nivistinê. Çirpê xewê.



**Text**

**Texte** (n.x.nêr) Dep. Dar.

**Textebend** (n.l.nêr) Text yan kenepeyê liser rûniştinê.

**Textebendkirin** (k.jn.gl.mê) Dîwar, doşk, ban û htd parçeyên depan lê di din jibo ciwanî tunbûnê. Depebendkirin.

**Textekab** (n.l.mê) Textikê kompyoterî, çendîn kabikan liser rêzkirîne, wek ; pît, hijmar, çeveng û htd.

**Texteres** (n.l.nêr) Depekê pan û reşe [yan rengên din] li xwendingehan, jibo liser nivîsanê bi kar di hêt.

**Texterewan** (n.l.mê) Kursîka xirxal bi binî ve û mirov di kare jibo her alî bi zivrîne.



**Texterewan**

**Textik** (n.dar.nêr) 1. Depekê lakêşeyî ye, bi pêpike, goşt û giyayî liser hûr di kin. 2. Textê biçûk.

**Teyfî** (n.x.nêr) *fêqî* Corekê tirîye rengê wî sorekê vebîye.

**Teyr** (n.x.nêr) Tewal. Wala . balinde. ***Pend*** :Teyrê nêçîrê dimik xare.

**Teyrok** (n.dar.mê) Terg.

**Teysandin** (k.jn.dar.mê) Birîskandin. Hilûkirin. : Min pêlava xwe bi reng lêdanê ya teysandî.(K) bdn : ez di teysînim em di teysînîn, tu di teysînî hûn di teysînin, ew di teysîne[...it] ewan di teysînin. Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di teysand, di teysandin. Db,dûr : teysandibû, teysandibûn. (F) : bi teysîne, bi teysînin.

**Teysîn** (k.jn.x.mê) Biriskîn. Birisqîn. : teneke ji dûr di teysit(berd,dn). Enîya wî di teysa (db).

**Teysok** (n.dar.mê) 1.Kaxedeka taybetîye yahilûye,di teyse.2. ***candar*** Stêrok.

**Tezandin** (k.jn.x.mê) 1. Sarkirin. Qerisandin. 2. rawestandin. 3. kujtin.(K) Berd,dn: ez, em, tu, hun, ew, ewan.[Di] tezînim,tezînîn,tezînî,tezînin,tezînit[…ne], tezînin. PR: dê [bi] bn: Berd,dn. Berd.db : di tezand, di tezandin. Db, dûr: tezndbû,..bûn.

**Teze** (hk.x.çewa) bn: Taze.

**Tezekirin** (k.jn.l.mê) bn: Tazekirin.

**Tezî** (hk.x.çewa) Gelek sar. Ava tezîang; ava gelek sar.

**Tezîbûn** (k.jn.l.mê) Sarbûn. Qerisîn. :Fêqî di kir di nav avtezînkê da da tezî bi be.(K) bn: Bûn.

**Tezîkirin** (k.jn.l.mê) Sarkirin. Qerisandin. :Avê tezî bi ke da vexoyn.(K) bn: Kirin.

**Tezînk** (n.dar.mê) 1. Tezîbûneke ji egra , tirsê, serma yan şermê bi ser giyanê mirovî da di çit. 2. Pê yan destê mirovî di qerimit, yan di nivit dema li bin giranîyekê di mînit.

**Tezînkgirtin** (k.jn.l.mê) Dema dest yan pîyê mirovî di teze. Qerimîn.: Tezînkê pêyê min yê girtî.

**Tê** (hk.cih) 1. Di gelda. Di navda. Têda. Di wê[wî]. Jê. 2. Rû. Rex. Al. Tî.

**Têbahî** (n.dar.mê) Qonaxeke dema rûnahî û qebarê heyvê kêm di bit.

**Têbar** (n.xdar.mê) 1.Xîça ji egera lê çûna tenekî çê di bit. Şûp. Şûnpê. : Têbara dirûnê liser perokî ya diyare.2. Pirsgeh.

**Têbirin** (k.jn.l.mê) Ji navbirin. Éxistinê. Toşkirin. (K) bn : Kirin.

**Têbînî** (n.l.mê) Rûnkirin liser mijarekê. Diyarkirina bûçûnan. Nêrîn.

**Têçûn** (k.jn.mê) 1. Di navda çûn. Kunkirin. Simtin. 2. Jinav çûn. Toşbûn. Mirin. 3. Lê mezaxtin : Çêkirina tirombêlê 200 dînar têçûn. Xanîyê te çend tê çû?.(K) bn : Çûn.

**Têda** (hk.cih) Di navda. : Di tirobêlêda. Di malda. :Kirmê di nîva qurmê darê da.

**Têdaman** (k.jn.l.mê) Mirov di nav tiştek, cihek yan karekî da bi mînit.: Tu çi di kî di wê çalê da? ezê mayîm têda nikarim bi hême der. (K) bn: Man.

**Têdanan** (k.jn.l.mê) Li ser danan. Dapoşîn. Li rex danan. Siwarbûn. :Lingên xwe (li hespî danan) têdanan ;ang siwarbû.(K) bn : Danan.

**Têderînan** (k.jn.l.mê) Têbînîkirin. Hestpêkirin. : Min tê ne îna der ku ew yê nexweşe. (K) Derînan.

**Têderxistin** (k.jn.l.mê) Têderînan. (K) bn : Derxistin.

**Têderxistinok** (n.l.mê) Tiştîk. Mamik.

**Têgeh** (n.dar.mê) Tiştê mirov tê di gehit. Raman.

**Têgehandin** (k.jn.l.mê) Mirov karekî yan gotinekê jibo yekî zelal bikit tanî werdigirit.(K) Bdn: Ez tê digehandim em tê digehandîn, tu tê di gehandî hun tê di gehandin, ew tê di gehand ewan tê di gehandin. PR: Dê tê [bi] gehînim, gehînîn, gehînî, gehînin, gehînit[…he], têgehînin. Bdb: Tê[di] gehandim, gehandîn,gehandî,gehandin.gehand. Db,dûr: Tê gehandibû,…bûn. (F): tê bigehîne, tê bigehînin.

**Têgehiştin** (k.jn.dar.mê) Tişt, gotin, kar û htd li cem mirovî zelal bit. (K) bdn: Ez tê di gehim em tê di gehîn, tu tê di gehî hun tê di gehin, ew tê di gehit[…he] ewan tê digehin. PR: Dê tê [bi] gehim, gehîn, gehî, gehin, gehit[…he], gehin. Bdb: Tê di gehiştim,gehiştîn, gehiştî, gehiştin, gehişit,gehiştin. Dr, dûr: Tê gehiştbû,…bûm, bûy, bûyn, bûn. (F) : tê bigehe, tê bigehin.

**Têhavêtin** (k.jnl.mê) Jê derkevtin. : Avê di cilikên min havêt. (K) bn : Havêtin.

**Têhelhatin** (k.jn.l.mê) Karîne tiştekî. Şiyanê. Xwe di ber girtin.: Ev karekê girane, ez tê helnahêm.ang; ji min nahêt pê rabim. (K) bn: Hatin

**Têhilandin** (k.jn.l.mê) Tiştek, amanek xistin nav avê yan şilekî. : Şirînê gozik di avê hiland. :Min parî di metfînîyê hiland.(K) bn: Hilandin.

**Têhilavêtin** ( k.jn.l.mê) bi Hêz havêtina şileyekê bo serî. : têhilavêtina bilqên avê.(K) bn: Hilavêtin.

**Têhildan** (k.jn.dar.mê) 1. Têkelkirin. Bi Nav da kirin. Pêwerkirin. 2.Lêdan. Qutan.

**Têhilkêşan** (k.jn.l.mê) Derzîyeka tîj di perokek yan tiştekê nerim ra bi key û tê bi çit. (K) bn : Hilkêşan.

**Têhin** (n.x.mê) 1. Germîya leşî. Germîya av, şîr, madeyên gaz û req.2. Hêz. Bizav.Şiyan : Têhina karebê. Ang; hêza karebê.

**Têhinşîr** (hk.l.çewa) Têhina wek ya şîrê taze ji giyandaran di doşin. Germîyeka kêm.

**Têhinşîrbûn** (k.jn.l.m) Dema madek pîçek gerim di bit. Wek têhina şîrî. (K) bn: Bûn.

**Têhinşîrkirin** (k.jn.l.mê) Gerimkirin tanî têhinşîr di bit. (K) bn: Kirin.

**Têhisîn** (k.jn.l.mê) Vêkra anîna du tiştan daku hilû yan gerim bi bin. Ji serma destêd xwe têk(di êk) hisîn. :Desteberk di dîwarî hisîn.

**Têjik** (n.x.mê) Zaroyên gineweran. : têjikên balindeyan.

**Têk** (paşg.çewa) Di êk. Di hev. Bi hevre. Di nava êk da.

**Têkalan** (k.jn.l.mê) Li dor êk zivirîn. Hevgirtin. :Destên wan têk alan.(K) bn: Alan.

**Têkalandin** (k.jn.l.mê) Du yan pitir [bendik, ta, çeq, û htd] di dor hev alandin û girêdan. (K) bn: Alandin.

**Têkbirin** (k.jn.l.mê) Di nav hevda birin. Givaştin tanî qebare biçûk di bit. (K) bn: Birin.

**Têkborandin** (k.jn.gl.mê) Di ber êk ra borandin. Di ser hev ra derbaz kirin. (K) bn :Borandin.

**Têkçûn** (k.jn.l.mê) Qebare biçûkbûn. Cilik bi şûştinê têk diçin. Ang; biçûk di bin. (K) : Çûn.

**Têkdan** (k.jn.l.mê) Jinav birin. Wêrankirin. Xerakirin. Herifandin. (K) bn: Dan.

**Têkder** (hk.dar.çewa) Mirovê durû. Ajaweçî. Xirabkar.

**Têkel** (hk.dar.çewa)Du cûn, du tişt, du reng, yên cuda bi ken di navêk da.Têkhel; Bi hevre. Tebayî. Di navêk da.

**Têkelbûn** (k.jn.l.mê) Çûn navêk. : Genim û ceh yên têkel bûyn. Kar û bizin têkelbûn. (K) bn: Bûn.

**Têkelî** (n.dar.mê) 1. Di navêkda. 2. Peywendî. :Min têkelî di gel wî nîne. Govenda têkelî,ang; govenda ji jin û mêran pêkhatî. Reşbelek.

**Têkelîkirin** (k.jn.l.mê) Peywenîkirin. Hevalînîkirin. Hevbendîkirin.. ***Pend*** :Têkelîya keçan neke, çunkî di vehêlin, ya bîjinan neke, bi find û fêlin. (K) bn: Kirin

**Têkelkirin** (k.jn.l.mê) Éxisin nav hevda. Navêkkirin. (K) bn: Kirin.

**Têkevtin** têketin(k.jn.l.mê) Toşbûn. Kevtin kirasê şermê. (K) bn: Ketin[kevtin]

**Têkgirêdan** (k.jn.l.mê) Bi hevre girêdan. :Dewar têkgirêdan,ang; pêkve gîrêdan. Qentarkirin. Mirov têkgirêdan,ang; destên wan bi hevre bestin, girêdan. (K) bn: Girêdan.

**Têkirin** (k.jn.l.mê) 1.Tiştek, xwarinek, vexwarinek û htd vala kin amanekî. Ça tê kir. Ça rêjt [kir] peyalê[kop]. : avê têke tirarî.2. Li kêmî dan. Lewazbûn.(K) bn : kirin.

**Têkoşer** (rd.dar.çewa) Mirovê jibo dozeka hejî xizmetê dike. Xebatker. Xebatkar.

**Têkoşîn** (k.jn.dar.mê) Xebatkirin. : Azadîya li Kudisanê berê têkoşîna gelê kurde. (K) Bdn: Ez tê di koşim, em tê di koşîn, tu tê di koşî hun tê di koşin, ew tê di koşe ewan tê di koşin. PR : dê tê[bi] bn : Bdn. Bdb : tê di koşîm, tê di koşîn,di koşî, tê di koşîn, di koşî, di koşîn. Db,dûr : tê koşîbûm, bû,.bûy, bûyn, bûn. (F) :tê bi koşe, tê bi koşin.

**Têkra** (hk.dar.çewa) 1. Bi hevra. Pêkve.2. Di navêkda. Tirar yên têkra.

**Têkraman** (k.jn.gl.mê) Di navêkda man. Pêkveman.

**Têkûpêkdan** (k.jn.gl.mê) Têkdan. Pirtikandin.

**Têkûpêkkirin** (k.jn.gl.mê) Hatîye têkdan.

**Têkvedan** (k.jn.l.mê) 1. Keviçikek yan darek di nava [xwarin, ça, şile, derman û htd] bi hêt livandin û gêran ta têkelî hev bi be. Şilqandin. (K) bn : Dan.[ vedan].

**Têkwerandin** (k.jn.l.mê) Destên xwe di stoyê hev alandin. (K) bn: Werandin.

**Têkwerbûn** (k.jn.l.mê) 1. Gêjbûn. Kevtin. 2.Têkalan. (K) bn: Bûn.

**Têkwerkirin** (k.jn.l.mê) Xwe havêtin yek. Hevdu himbêzkirin.: Paş çendîn salan hevdu ne dî tibûn, xwe têkwerkirin.(K) bn: Kririn.

**Têl** (n.x.mê) Têle, Davên ji hesinî çêkirîn. Tayên asinî.

**Têlbend** (n.l.mê) Tan, perjan, pero û htd yê bi têlê hatî girêdan.

**Têlbendkirin** (k.jn.gl.mê) Cih yan tiştê bi têlê peyt kirî. (K) bn: Kirin.

**Têldirk** (n.l.mê) Têleya ji dirik û stirîyan hatî çêkirin. Sîme.

**Têldirkkirin** (k.jn.gl.mê) Sîmekirin.

**Têle** (n.x.mê) 1. Dava hesinî. Sîm. 2. Toq. Berbisk.

**Têlefon** (n.dar.biyan.mê) Telefon, Amêrê peywendîkirinê. Amêrê hevbendîyê.

**Têlefizyon** (n.dar.biyan.mê),telefizyon, Amêreke jibo bihîstin û dîtina deng û rengan.

**Tên** (n.x.mê) Têhin.

**Tênan** (k.jn.l.mê) 1. Têkirin. Dagirtin. 2. Kutan.

**Tênik** (n.dar.mê) Tênîbûn.: Tênika min bi xoşavê[şerbet] na şikê.

**Têniviîsan** (k.jn.dar.mê) bi Nivîsan nav û nîşanên xwe dane tomarkirin.

**Têniviîsîn** (k.jn.dar.mê) bn :Têniviîsan.

**Tênî** (hn.x.çewa) Têhnî, Candar,mirov hişînkatî pêdvî bi avvexwarinê di bit.pêdvîya leşî jibo avê. ***Pend*** :Tênî li avê di gerit.ang; divê mirov bi xwe li dû karê xwe bi keve.

**Tênîbûn** (k.jn.l.mê) Dema Candar û darûbar pêdvî vexwarinê bi be. (K) bn: Bûn.

**Tênîkirin** (k.jn.l.mê) Av nedan tanî mirov, candar yan giya tênî di be. (K) bn: Kirin.

**Tênoşkî** (hk.dar.çewa) Mirov gelek avê vedixwe û tênika wî naşikêt.

**Tênoşkîbûn** (k.jn.l.mê) Ji avvexwarinê têr nebûn. (K) bn: Bûn.

**Tênoşkîkirin** (k.jn.l.mê) Hêlan tênî.

**Têper** (rd.dar.çewa) *rêzman* Derbaz.Dema derbaz.

**Têperîn** (k.jn.dar.mê) Derbazbûn.

**Têr** 1 (hk.x.çewa) Mirovê, candarê xwarin xwarî û êdî pêdvî bi zadî nebe. *Pend* :Têrî hay ji [yên] birsî nîne.

**Têr** 2 (n.x.mê) Cihalê duta, li pişta dewaran dikin.Cewal. ferde.

**Têraçûn** (k.jn.l.mê) 1. Têçûn..: Kelemek di çavê hespî ra çû. 2. Di direkê ra derbazbûn[çûn]. : Pişîk di kuleka xanî ra çû jûrê.(K) bn: Çûn

**Têrakirin** 1 (k.jn.l.mê) Tiştekê sertîj di cihekî bi kin ko tê biçit. Têqutan.:Şûjin di cihalî ra kir. :Sing di erdî ra kir.

**Têrakirin** 2 (k.jn.l.mê) Xwarin, vexwarin, pare û htd di berfireh bin û kêmasî têda nebe.: :Zadê mişeye, têra me hemûyan di ke. :Perê min têra rêka hatinûçûnê nake.(K) bn: Kirin.

**Têraman** (k.jn.l.mê) 1. Tiştê tîj ku çûye di cihekî ra der ne kevit. Bi mînit têda. Di navda man :Stirîyekê maye di tibla min ra. 2. Zengînbûn. (K) bn: Man.

**Têrbûn** (k.jn.l.mê) 1.Mirov têr xwarinê di xwe û tê di be. 2. Ji karekî, kiryarekê, bêzar bûn. :Min zad xwar ez têrbûn.(K) bn: Bûn.

**Têrkirin** (k.jn.l.mê) Mirov xwe ji karekî, bi zadî xwarinê tê di kit. (K) bn: Kirin.

**Têrmal** (rd.l.çewa) Zengîn. Heyî.

**Têrmeh** (hk.dem) bn:Tîrmeh.

**Têrxwarin** (k.jn.l.mê) Gelek xwarin. Xwarin ta têr bi be. Ma têrxwarine ?.

**Têşt** (n.x.mê) Zadê sipêdê. Xwarina sipêdê.

**Têşte<u>geh</u>** (n.dar.mê) 1.Têşt ya berheve. Gehiştîye. Dema têştê. 2. Cihê xwarina tiştê.

**Têşte<u>xew</u>** (n.l.mê) Nivistina piştî têştê.

**Têştexew<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Nivistin piştî têşê. :Ez herroj têştexewan di kem.

**Têve<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dijûndan. Civîdan. *Pend* :Hindeka mirine, hindeka têvekirine. (K) bn: Kirin.

**Tê<u>werandin</u>** (k.jn.l.mê) Tê alandin. : Dest di stoyê wî werand. :Dest di gerdenê werand. (K) bn: Werandin.

**Têwer<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Kevtine nav. (K) bn: Bûn.

**Têwer<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) 1. Jaravkirin. Bijînkirin. : Av di devê xwe werda. 2. Matêkirin. : Nabit hûn dest di karûbarên welatê me werdin. (K) bn: Dan.

**Têwer<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Berek darek û htd bi havêjî yekî. Havêtin.. : Xwe di hevdu werkirin, ang; Xwe havêtin hevdu. :Kevirek di gurî wer kir.

**Tê<u>xistin</u>** (k.jn.l.mê) Xistin nav. Toşkirin. Têkelkirin.

**Têz** (n.x.mê) Barît. Barût.

**Tê<u>zav</u>** (n.l.mê) Tirşî. Ava tîj. :Têzava patirîya tirombêlê ya kêm bûy.

**Ti<u>bar</u>** (n.dar.mê) Demsal. Werzê salê.

**Ti<u>bil</u>** (n.x.mê) *can* Tilîyên destan. Tilî.Til.

**Tibil<u>çav</u>** (hk.l.çewa) Şeva tarî ko mirov tibilan di çavên êk bi ken, hevdu na bînin. Tarîstan. :Şeveka hinde tarîye, tibilçave.

**Ti<u>bir</u>** (hk.x.çewa) Zîx. Peyt. Zîrek. Çeleng.

**Tif** (n.x.mê) Şileya devê mirovî.*Pend* :Tifa serevraze,ang; mirov bi destê xwe ziyanê li xwe bi de.

**Tif<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Bi tifê terkirin. Tifkirin.

**Tif<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Av yan Şileya devî havêjtin, kirin. :Tif li tiştekî dan. (K) bn : Kirin.

**Tifne<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Pêtîbûna berên dîwaran û weryan. Hilweryana keviran. (K) bn:Bûn.

**Tift** (hk.x.çewa) Tama tal. Tal.

**Tijî** (hk.x.çewa) Pir. Mişt.: Tirarê tijî av. Birka tijî.

**Tijîbûn** (k.jn.l.mê) Pirbûn. :Perdax ji avê tijî bû.(K) bn: Bûn.

**Tijîkirin** (k.jn.l.mê) Pirkirin :Berîka xwe tijî mêwîj kir.(K) bn: Kirin.

**Tike** (n.x.mê) *xwarin* Pişkên goştê birajtî.

**Tikên** (n.dar.mê) *deng* Dengê lêdana pilan.

**Til** 1 (n.x.mê) Tilî. Tibil. :Dest ji pênc tilan pêk di hêt. *Pend*: Tilên destan ne wek hevin. ang; her mirovekî sincek taybetî heye.

**Til** 2 (n.x.nêr) Kêlek. Tenişt. Tilk. :Debance bi tilê xwe ve kir.

**Tilî** (n.x.mê) 1. Tiblên destî. 2. Libên tirî. :Tilîya tirî.

**Tilîdirêj** (hk.l.çewa) Jina tilîyan wê di dirêj û xweşik.

**Tilîfîşek** (n.l.mê) Coreke ji tirîyê reş, tilîyêd wî di dirêjin. Corekê reşwêwî ye.

**Tilîkêşan** (kjn.gl.mê) Weke tilîyên tirî ji ûşî di kêşin.(K) bn: Kêşan.

**Tilîlî** (n.dar.mê) Dengûdoreke ji devê mirovî nemaze jina derdikevit bi hilkeftinên dilveker hinde caran jî nexweşîyan.

**Tilîlîvedan** (k.jn.l.mê) Tilîlî gotin. (K) bn: Dan.

**Tilînaz** (hk.l.çewa) Mirov, xasime jina tilî ciwan û nazik.

**Tilînîşan** (n.l.mê) Tibla navbera beran û nîvê.

**Tilove** (hk.dar.çewa) Pir. Tijî. Gurî.:Gotina te ji çewtîyan tilove.

**Tilxe** (n.x.mê) Texe.:Tilxeka befirê. :Tilxeka parey.

**Tim** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo berdewamîya rûdanan bi kar di hêt.Herdem. Hergav. Êkcar. Her.

**Timûtim** (pêrb.l) Tim.

**Tinê** (hk.x.çewa) Tenê. *Pend* :Tinê jibo xudê başe.

**Tinêbûn** (k.jn.l.mê) Digel kesê nebûn. : Duh ez li mal bi tinê bûm. (K) bn: Bûn.

**Tingijîn** (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. (K) bdn: ez di tingjim, emtingijîn tingijî, tingijin,tingijit[….je], tingijin. Pr: Dê[bi], + bdn. Bdb : ez di tingijîm em di tingijîn,tu di tingijî hûn di tingijin, ew di tingije[…it] ewan di tengijin. Db,dûr : tingijîbûm,.bûy,.bû,.bûn. (F) : bi tingije, bi tingijin.

**Tinoke** (n.x.mê) Dilop. Çipik.

**Tipên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê vêkkevtina du tenan yan kevtin : Kitik di banîda kevt, tipên jê hat.

**Tiptip** (n.dar.mê) *deng* Dengê pêyan. Teptep. Tipên.

**Tiptipkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê tiptipê jê hatin.

**Tir** (n.x.mê) 1.Bayekê bi denge, ji paşîyê derdikevit. Piv.***Pend*** :Tira meye, sira [nepenî] meye. 2. Paşbendeke jibo hevberkirineka pêtir bi kar di hêt : gelek, gelektir, ciwan ciwantir, pîs pîstir û htd. Gelek.

**Tirane** (n.x.mê) Kiryar û gotinêd ne ji dil. Henek. Gelte. Yarî.

**Tiraneker** (hk.dar.çewa) Yarîker. Bingelte. :Xortê tiraneker. :Jina tiraneker.

**Tiranekirin** (k.jn.l.mê) Henekkirin. :Bibore ez tiranan di kem. (K) bn: Kirin.

**Tiranê** (n.dar.mê) ***yarî*** Lîztineke zarok bi daran di ken. Dartiranê.

**Tiranêkirin** ( k.jn.l.mê) Yarîya tiranê kirin. : Gelê gencan werin da tiranê bi kin.(K) bn: Kirin.

**Tirar** (n.x.nêr) Badî. :Tirarê avê.

**Tiraş** (n.x.mê) Darên qurm û qedên wan mezin nabin. Kêrat.

**Tiraşîn** (k.jn.x.mê) Birîna mûyan. Ser, rih, simbêl, dar û htd Kurkirin. (K) bdn: ez, di tiraşimem di tiraşîn, tu di tiraşî hûn di tiraşin, ew di tiraşe[…it] ewan di tiraşin. Pr : dê [bi]+ bdn. Bdb : di tiraşî, tiraşîn. Db, dûr : tiraşîbû,…bûn. (F) : bi tiraşe, bi tiraşin.

**Tirb** (n.x.mê) Gor. Ziyaret.

**Tirbistan** (n.dar.mê) Goristan.

**Tireqên** (n.dar.mê) ***deng*** Têqên.


**Tirên** (n.x.mê) 1. Şemendefir. 2. ***deng*** Dengê makînan, tirombêlan. 3. Dengê zikçûnê.

**Tirik** (n.dar.nêr, mê) 1. Hej. :Tirik komkirin dako agirî berdenê.2. Tira biçûk.

**Tirikîn** (k.jn.x.mê) Zayîna dêhlan (sega mê). :Dêhlik ya tirikî, heft kûçik înane.

**Tiringên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengeke, mîna dengê lêdana tenekan.

**Tirî** (n.x.nêr) ***fêqî*** Fêqîyekê, ûşîyan di dit ji liban pêk di hêt. berê mêwê ye. Gelek cor û reng hene, mîna zerik, reşmêw, teyfî, mîranî û htd, zer, reş.



**Tirî**

**Tirîrûvîk** (n.l.mê) ***giya*** Core fêqîyekê kûvîye mîna tirîye, rûvî di xon.

**Tirken** (n.dar.dz) Yê tiran di ke.

**Tirkirin** (k.jn.l.mê) Kirin û derêxistina bayê bi deng, ji paşîyê. Pivkirin. (K) bn: Kirin.

**Tirk** (nejn) Mirovê ji netewa tirkan.

**Tirkiye** (welatn) Welatê tirkan.

**Tirkî** (n.x.mê) Ziman, mita, yên ji Tirkiye.

**Tirombêl** (n.x.mê) Amêrek mezin, mirov jibo veguhaztina mirov û baran bi kar di hînin , gelek cor û reng hene.



**Tirombêl**

**Tirozî** (n.x.nêr) ***giya çandin*** Corekê fêqîye, dirêje rengê wî keskekê vebîye, wek aroyane.

**Tirpan** (n.dar.mê) Şaloka dirûnê ya mezin, destikek dirêj heye, miro da di weşîne giyayîû pê di rûn..

**Tirs** (n.x.mê) Hestkirin bi tirsanê. Bi karên bive.:Karê bi tirs. :Dengê bi tirs.:Ji tirsan di lerzî.

**Tirsan** (k.jn.x.mê) Hestkirin bi rûdanên ne xuristî, ko dê karek bi serê mirovî hêt. (K) bdn: ez di tirsim em di tirsîn,tu di tirsî hûn di tirsin, ew di tirse[…..it] ewan di tirsin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : ez di tirsam, em di tirsan, tu di tirsay, hûn di tirsan, ew di tirsa, ewan di tirsan. Db,dûr: tirsabûm,.bûyn,.. bûy,...bû,..bûn. (F) : bi tirse, bi tirsin.

**Tirsandin** (k.jn.dar.mê) Mirov yekî bi tirsîne. :Te ez tirsandim !. (K) bdn : ez di tirsînim, em di tirsînîn, tu di tirsînî, hun di tirsînin, ew di tirsîne[….it], ewan di tirsînin. PR : dê[bi]+ bdn. Bdb : di tirsand, di tirsandin. Dr, dûr: tirsandibûm,.. bûy,.. bûyn,..bû,.. bûn. (F) : bi tirsîne, bi tirsînin.

**Tirsi<u>nok</u>** (hk.dar.çewa) Tirsonek. Tirstirsok. ***Pend*** :Tirsinok be, jî dirêj be.

**Tir<u>sî</u>** (hk.x.çewa) Hişk.Zuha .Zuwa : Firavîna evro nanê tirsîye.ang; nanê zuwa û bi tinê.

**Tirso<u>nek</u>** (hk.dar.çewa) Mirovê pir di tirse. Tirsinok. Tirstirsok.

**Tirstir<u>sok</u>** (hk.dar.çewa) Tirsonek.

**Tirş** (hk.x.çewa) Tameke, mîna ya; simaqê. Tama tirîyê ne gehiştî. ***Pend*** :Tirşê bi nîvî, jê neke hîvî.

**Tirş<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Dema xwarin gemar di be,tama wê tirş di bit. Bi têxistina simaq û xwarinên tirş, zad tirş di be. (K) bn : Bûn.

**Tir<u>şik</u>** (n.dar.mê) ***xwarin*** Zadeke, şileyeka bi giyaye, reng sor yan sadeye û kutilkan tê di kin.

**Tir<u>şî</u>** (n.dar.mê) Xiyar, kelemî, tirozî û htd di gel tirşî vedigirin ta tirş di bin, di gel zadî di xon.

**Tirş<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Xwarinê bi têkirina simaq yan tama tirş, tirş di kin. :Avemastê tirş bi ke da tamxweş.

**Tirş<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Hatî tirşkirin. :Zelata tirşkirî pir bi tame.

**Tir<u>şok</u>** (n.dar.mê) ***giya*** Giyayek belg pane, reng keske, wekî beqlî ye,tama wî tirşe.

**Tir<u>tire</u>** (hk.dar.çewa) Kirêt. Peritî. Bêserûber.

**Tir<u>tirî</u>** (hk.dar.çewa) 1.Kesê ko nikarit gotinên xwe bi diristî bi bêjit jiber têkalîna devê xwe. Devtitirî.2.Mirovê dengbilindê lewçe û gelek cirebirê di ke. ***Pend*** :Ne ewrê girgirî, ne mêrê tirtirî.

**Tir<u>xan</u>** (hk.dar.çewa) Qelew. :Mêrekê tirxan. :Jineka tirxan. :Berxekê tirxan.

**Tir<u>yan</u>** (n.x.mê) Seleke ji levenan çêkirîye nanî dixin nav.Zilînka nanî. Îşkev. ***Pend*** :Tiryanka nanî ji biçûkan ra, dîha çilî ji gîskan ra.

**Ti<u>sî</u>** (hk.x.çewa) bn :Tirsî.

**Ti<u>şt</u>** (n.x.nêr) Tenên nenas. Tenên bê giyan. :Ew çi tişte di destê te da?.


**Tiş<u>tîk</u>** (n.dar.nê) Gotinên ne diyar û bi awayê helbest li civatê di hên gotin bi mînakên şêlî, mebest jê tiştekê ne diyare, ka kî dê bi zanit çîye. Têderxistinok. Mamik. ***Mamik*** :Ez çûme ji vêrê pêda,min karwanek dî di rêda, maka di zikê têjikê da.( bersiv: Tovika gundorî) . ***Mamik*** :Tiştîkê min tiştanî, bê pê di çe ser banî.(bersiv: dûkêl, dûman).

**Tivandin** (k.jn.x.mê) Yê xwe tivandî,ang; xwe keşxe kirîye. Ciwankirin. Xemlandin. Tivtivandin. (K) bdn: ez di tivînim em di tivînîn, tu di tivînî hûn di tivînin, ew di tivîne[…it] ewan di tivînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di tivand, di tivandin. Db,dûr: tivandibû, tivandibûn. (F): bi tivîne, bi tivînin.

**Tiveng** (n.x.mê) *çek* Çekeke bi agirî di teqit û guleyan di hêjit.

**Tivên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengekê zirave mîna dengê kêz, mêş, pêşî û berikên tivengan.

**Tivir** (n.x.mê) ***giya*** Core giyayekê bi serike, tama wî tîje, gelek cor û reng hene, belg û serikên wî di gel zadî di xon.



**Tivir**

**Tivîr** (n.x.mê) Tevin.

**Tivîrk** (n.x.dz) ***perinde*** Balindeyeka kûvîye, mîna kotirane.

**Tivtivkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê tivênê jê hatin. :Pêşî tivtivê di ket. (K) bn: Kirin.

**Tixar** (n.x.nêr) Gonîyeke jibo têkirin, kêşan û pîvana danî tê bi kar anîn û ji ferdan mezintire.

**Tixare** (n.dar.mê) Hêsil.

**Tixe** (hk.x.çewa) Gemar, pîs bi zimanê zarokan.

**Tixûb** (n.x.nêr) Xîçeke du cihan ji hev cuda dike. ***Pend*** :Çîv stûre, tixûb dûre, çîv zirave tixûb ave. :Tixûbê zevîya me û apê min bi hevraye.

**Tixûbdanan** (kjn.l.mê) Diristkirina tixûban di navbera erdan da. :Dagîrkeran di nav welatê me da tixûb danan. (K) Danan.

**Tixûbdar** (hk.dar.çewa) Cihê, gotina hatî tixûbkirin.rade bo hatî danan.

**Tixûbdarkirin** (k.jn.gl.mê) Radek jibo hatî danan. Tixûbek jibo danaye. (K) bn: Kirin.

**Tixûbkirin** (k.jn.l.mê) Çêkirina tixûban.(K) bn : Kirin.

**Tixûbkirî** (hk.l.çewa) Hatîye tixûbkirin. Tixûbdar.

**Tizbî** (n.x.pir) Risteka morikane mirov di destê xwe di girit, nexasim sofî, jibo nizayan bi kar di hînin.

**Tî** 1 (hk.cih,n.x.nêr) Rex. Tenişt. Per: Tîyê rojê derkevt.

**Tî** 2 (n.x.nêr) Birayê mêrê jinê tiyê wê ye. : Tîyê Hîvîyê mêvanê meye. Hêwer.

**Tî** 3 (n.x.mê) Darfêqî bn: Tû, twî.

**Tîj** (hj.x.çewa) Tama tûj, wek bîberên tûj.2. Amêrên serê wan zirav. Terq.Dijwar.3. Mirovê tîj,ang; Zîx. Peyt. Çespan.

**Tîja<u>tî</u>** (n.dar.mê) 1.Tama tîja xwarinan mirov bi ezmanî di zane. Dijwarî. Harî. : Tîjatîya sîrê ne wek ya pîvazê ye.

**Tîj<u>av</u>** (n.l.mê) Têzav.

**Tîj<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) 1. Xwarin bi têkirina tiştên mîna bîberan, catirk û htd tûj di bit. 2. Hisîn û xweşkirina devên amêran wek das, bivir, kêr û htd. (K) bn: Bûn.

**Tîj<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) 1. Tiştên tîj di xin nav zadî.2. Xweşkirina kêr,das, û bivran da tûj bi bin. :Ev zade bi têkirina bîberan tîj kirîye. (K) bn: Kirin.

Tîjkirî (hk.l.çewa) Hatîye tîjkirin. :Darê tijkirî. :Gilçê tîjkirî.

**Tîk** (n.x.mê) Derzeka biçûk. Şikestineka biçûk. Derz:Tîkeka kevtîye dîwarî. Tîkeka kevtîye vî kevirî.

**Tîk<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Dîwar, der di derzin. Derizîn.:Ev bane tîk bûye. (K) bn: Bûn.

**Tîkkirin** (k.jn.l.mê) Derzandin. Tîk êxistinê.

**Tîm** (n.x.biya.mê) Deste.

**Tîm<u>sah</u>** (n.biyan) ***candar*** Candarek hişkavî xişoke, hêkkere, devek mezin didanên tîj hene jibo girtina nêçîrê.

**Tîn** (n.x.mê) Tên. Têhin. Hêz.

**Tîn<u>dar</u>** (hk.dar.çewa) Bi hêz. Peyt. Lêkdayî.

**Tîp** (n.x.mê) 1. Pît. 2.Yekeyeka leşkerî.

**Tîp<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Çapkirin. (K) bn: Kirin.

**Tî<u>qîn</u>** (k.jn.x.mê) Tîqlîqkirin.

**Tîq<u>lîq</u>**, tî<u>qtîq</u> (n.dar.mê) ***deng*** Dengê kenîya bilind. :Ev çi tîqlîqe, ma hûn ji xwe fedî nakin?.

**Tîqlîq<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Kenîn bi tîqlîq ve. : Ka bêje min ew çi tîqlîqe tu di kî?. (K) bn: Kirin.

**Tîr** 1 (n.x.mê) Asin yan darek ê zirave û serê wî tîje, bi kivanî di havêjin.

**Tîr** 2 (hk.x.çewa) Şileyên çir, ne ron. : Ev metfînîye gelek ya tîre. Mastê tîr. Avika tîr. ***Pend*** :Ya tîra di binî mayî. Ang ; gotin, kiryara giring hêjta maye.

**Tîravêj** (pîşn.l.dz) Mirovê tîran di havêje.

**Tîr<u>baz</u>** (kar.dar.dz) Tîravêj.

**Tîr<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Weke şileyek tîr di be.Çirbûn. :Gelek temate kir nav metfînê jiber hindê tîr bû. (K) bn: Bûn.

**Tî<u>rêj</u>** (n.dar.mê) 1. Tîyê rojê. Tîrojkên rojê. Davên ronahîya rojê. 2. Navê xort û keçane.

**Tîr<u>havêj</u>** (pîşn.l.dz) Kesê tîran di havêjit.

**Tîr<u>havêtin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov tîran di havêje.(K) bn: Havêtin.

**Tî<u>rik</u>** 1 (n.x.mê) Tayên daran jibo çandinê berhev kirîn. :Cotyarî sed tîrikêd mêwan di erdî kirin(çandin).

**Tî<u>rik</u>** 2 (n.dar.nêr) Tîrê biçûk. Tûrik. :Tîrik ê dew, mastî.

**Tîr<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov şileyekê tîr bi ke. Ava xwarina kêm bi be, xwarin tîr di be. (K) bn: Kirin.

**Tîr<u>meh</u>** (hk.dem) Meha heştê ji salê. Meha dawîya havînê. ***Pend*** :Tîrme(tîrmeh) tirî hate ber me.

**Tî<u>roj</u>** (n.l.mê) Tîrojk.Tîyê rojê.Rexê rojê. Perê rojê. Davên ronahîya rojê.

**Tîr<u>weşandin</u>** (k.jn.l.mê) Tîrhavêtin. (K) bn : Weşandin.

**Tît** (n.x.mê) Perçeyên zêrî, jin liser enî yan singa xwe girê di din.

**Tîte<u>lo</u>** (hk.dar.çewa) Xir. Girovir.

**Tî<u>tik</u>** (n.dar.pir) Fêqîyê nû ji pijkovkê derkevtî û hêjta ne gehiştî. Tîtika xiyarî. : Xiyarên kevtîne tîtikan, tîtik yên dayn.

**Tî<u>tilk</u>** (n.x.mê) Zîlikê hedamê guhnelî yê tuxmê mê.Zîlik.

**Tî<u>tin</u>** (n.x.mê) Tûtin.

**Tî<u>tirîn</u>** (k.jn.l.mê) Seg li ser kudkê xwe radiwestit. Rûniştina seyan.

**Tî<u>vil</u>**(n.x.nêr) Tîvkil.

**Tîv<u>kil</u>** (n.x.mê) Pişka bergê qurm, ta, çeq, fêqî û htd, da di poşt.Tîvkilê sêvê, mozê, xiyarî. Qelp.

**Tîx** (n.x.mê) 1. Xîç. Hêl. Tîr. 2. Texe. Cîn.

**Tîzab** (n.l.nêr) Ava dijwar. Ava tîj. Ava tirş. Tîjav.

**Tîzav** (n.l.mê) Tîjav.

**Tîzmar** (n.l.nêr) *candar* Kirmên axê.

**Tob** (n.x.mê) Gurzekê pêçayî yê peroyan.Tobê perokan.

**Tobe** (n.biyan.mê) Hêlan. Ji karên ne baş dûr kevtin.

**Tobedar** (n.dar.dz) Kesê karên çewt hêlane.

**Tobekirin** (k.jn.l.mê) Mirov dest ji xirabîyan ber di de. (K) bn : Kirin.

**Tofan** (n.x.mê) Çamên xwezayî, mîna bahoz, barove, lehî û htd. Lêhmişt. Çam. Malwêranî.

**Tol** (n.x.mê) Bersivdana her xurtîyeka li mirovî di hêt kirin.

**Tolajo** (karn.dar.dn) Mirovê tolê ve di ke. Tolveker.

**Tolaz** (hk.x.çewa) Xort. Genc. Law.

**Tolgirtin** (k.jn.l.mê) Tolvekirin.

**Tolhilandin** (k.jn.l.mê) Tolvekirin. (K) bn: Hilandin.

**Tolhildan** (k.jn.l.mê) Tolvekirin.(K) bn: Hildan.

**Tolik** (n.x.mê) *giya* Giyayekê biharîye di hêt xwarin.

**Tolikvan** (karn.dar.dz) Mirovê tolikê di çinit, nexasim jin.

**Tolveker** (karn.dar.dn) Tolajo.

**Tolvekirin** (k.jn.l.mê) Heyfsitandin. Bersivdana bi tundî.: Pêşmegeyan tola şehîdan ji dujminî vekirin. (K) bn: Vekirin.

**Tomar** (n.x.mê) Peyv, gotin û gotarên nivêskî yan wênekirî.

**Tomargeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê yan avahîyê taybet jibo tomarkirina deng, reng û nivîsan.

**Tomarkirin** (k.jn.l.mê) Wergirtin û parastina dengan, nivîsan û wêneyan. (K) bn: Kirin.

**Tomav** (n.l.nêr) Tovê mirov û candarên nêr. Tovê mêran. Spêrma.

**Tomik** (n.x.nêr) Danê genim, ceh, yan mitayên dî, di din mirîşk û tewalan.

**Top** (n.x.mê) 1. *çek* Çekekê mezine di karên leşkerîda dijî hevdu bi kar dihînin.2. Tepe.3. Peroyê ne vekirî. Topekê perokan.

**Topanê** (n.dar.mê) *yarî* Lîztina bi tepanê. Gokanê.

**Topanêkirin** (k.jn.l.mê) Yarîkirin bi tepê.(K) bn: Kirin.

**Topbaran** (n.l.mê) Barana guletopan li ser cihekî.Lêdana topan. Havêtina topan.

**Topbarankirin** (k.jn.gl.mê) Guletop berdan ser deverekê. : Dujminî gundên kurdan topbaran kirin.(K) bn: Kirin.

**Topberdan** (k.jn.l.mê) Tophavêtin.

**Tophavêtin** (k.jn.l.mê) Topan li cihekî di reşînin. (K) bn: Havêtin.

**Topiz** (n.x.nê) Darekê serê wî stûre jibo berevanîyê mifa jê werdigirin. Çîv.

**Topîn** (k.jn.x.mê) Sikitîn. Mirin.

**Toplîztin** (k.jn.l.mê) Topanêkirin.

**Toq** (n.x.mê) Asinekê biçûke jin pora xwe pê di girin. Têle.Berbisk.

**Toqandin** (k.jn.x.mê) Kujtina xelikê bêguneh. Tîrorkirin.

**Tor** (n.x.mê) 1.Davên raçandî jibo girtina masîyan bi kar di hêt. Tora masî yan tewalan.2. Janên berîya zarokbûnê.

**Torandin** (k.jn.x.mê) Torekirin.

**Tore** 1 (hk.x.çewa) Sîl. Hêris.Tengav. :Ew herê toereye niza bûçî?.

**Tore** 2 (n.x.mê) Honer.Rewişt. Tîtal. Hêja. Sinc.

**Torebûn** (k.jn.l.mê) Silbûn. Hêrisbûn. Tengavûn.: Tore ne be, ez henekan di kim. (K) bn: Bûn.

**Torekirin** (k.jn.l.mê) Tengavkirin. Hêriskirin. Silkirin. : Xwe tore neke. : Kurî babê xwe tore kir. :(K) bn: Kirin.

**Torevan** (kar.dar.dz) Şarezayê warên helbest, çîrok, pexşan û htd.

**Torîn** (hk.x.çewa) 1. Şox. Şeng. Ciwan.Naz. 2. Navê jinane.

**Torvan** (karn.dar.dn) Nêçîrvanê bi torê masî ya tewalan di gire.

**Toşbûn** (k.jn.lmê) Têkevtin. (K) bn: Bûn.

**Toşkirin** (k.jn.l.mê) Êxistin davan. Xapandin. :Te ez toş kirim. (K) bn: Kirin.

**Tov** (n.x.nêr) 1.Dan, dindikên mitayî. Tuxmê candaran, bi çandin yan bergirtinê nivşê xwe di parêze.:Tovê genim, ceh, nok û htd. 2. Nivş. Tuxim.

**Tovça** (n.l.mê) bn :Ça.

**Tovdank** (n.l.mê) Tûreke tovî tê dixin. :Cotkarî tovdank li milê xwe kir û çû nav zevîyê.

**Tovhavêtin** (k.jn.l.mê) Tovê mitayî di havêjin erdî jibo hişîn bi be.. (K) bn: Havêtin.

**Tovik** (n.dar.mê) 1. Danê mitayê mîna gulberojan, kulindan û htd ko hatîne qelandin jibo xwarinê. 2. Tov.

**Tovkirin** (k.jn.l.mê) Zevî, erd hatîye çandin bi tovî. :Cotkarî tovê genim bi zevîyê wer kir. :Zevî xwe hêjta tov ne kirîye.(K) bn: Kirin.

**Tox** 1 (hn.x.çewa) Tîr. Çir. Br× Şelal. :Rengê tox.

**Tox** 2 (n.x.mê) Ala.

**Toz** (n.x.mê) Bayê bi ax û qirş. Ar. Arik. Hûrik.

**Tozbûn** (k.jn.l.mê) Peydabûna tozê. Bûne toz.

**Tozkirin** (k.jn.l.mê) Karekî li ser axê bi kin toz peyda di be.(K) bn: Kirin.

**Tu** 1 (cih) *rêzman* Cihnavê kesê duwê yê tek. :Tu kurê kêyî? Eve tuyî?. *Pend* :Tu bi keran re bi gerî dê zirî, bi mirovan re bi gerî dê peyvî. *Pend* :Tu mîna berîya bi kelpîşka xwe nerazî.

**Tu** 2 (pêr.alv,ne) *rêzman* Alaveke jibo neyîkirinê bi kar di hêt. Çune. : Ez tu caran çakîya te ji bîr nakim.

**Tuberk** (n.x.mê) Pîroz.

**Tucarî** (pêrb) *rêzman* Alavê vebirînê. Çi caran. :Ew tuçarî ne çûye Kurdistana azad.

**Tune** (pêrb) *rêzman* Alavê neyîkirinê. Nîne. Çine. :Perê min tune.

**Tunebûn** (k.jn.l.mê) Neyînî. Nebûn. (K) bn: Bûn.

**Tunekirin** (k.jn.l.mê) Direw derêxistin. Pûçkirin. :Gotina rojnamevanî tune kir.(K) bn: Kirin.

**Turk** (nej.n.x.dz) Mirovê nejad turk.

**Turkî** (hn.dar.nej,n)Ziman, tişt û mitayê ji Turkya.

**Turkuman** (nej,n.) Neteweyeke.

**Turkumanî** (n.dar.mê) Zimanê turkumanan.

**Turkumanistan** (hk.cih,cugr,n.dar.mê) Welatê turkumanan.

**Turkya**(hk.cih,cugr,n.x.mê) Welatê turkya.

**Tursik** (n.dar.nêr)  Mamik. Helamet.

**Tursikîn** (k.jn.x.mê) Bazdan. Revîn.


**Tuxim** (n.x.mê) Nivş.

**Tuxûb** (n.x.nêr) Xîçeka du yan pitir erd,zevî, gund, bajar û welatan jihev cuda di ket.Tuxûbê zevîya me û ya we di gel hevin. Tixûb.

**Tû** (n.x.mê) *dar & fêqî* Fêqîyekê şirîne, sipî û reş in, bi dara tûyê ve dihên. Twî.

**Tûb**(n.dar.mê) Deste. Gurz.Tûbik. :Tûbekê kaxezan.

**Tûfirengî** (n.l.mê) *fêqî* Corekê tûyane bina wan giyayîye, reng sore,tam şirîne. Tûya erdî.



**Tûfirengî**

**Tûj** (hn.x.çewa) Tîj.

**Tûjandin** (k.jn.mê) Lêgeran. Li Pey geran. Dîvçûv. Vekolîn. :Tûjandina zanînî.

**Tûjbûn** (k.jn.l.mê) Tîjbûn.

**Tûjkirin** (k.jn.l.mê) Tîjkirin.

**Tûk** (n.x.mê) *tewal* 1. Balindeyeke li daristanan di xwînit, selîqa wî mîna navê wîye(tûk).2. Perên baldaran, yên nerim.

**Tûl** (n.x.nêr) Perdeya tenik ya pencer û deran.

**Tûr** (n.x.nêr) Torbe. Mişot.Têrik.

**Tûqesp** (n.l.mê) *dar* Tûyên sipî.

**Tûreşk** (n.l.mê) *dar* Corekê dar tûyane, tûyên wan di reşin.

**Tûşemb** (n.l.mê) *dar* Corekê tûyane, rengê wan di reşin.

**Tûtandin** (k.jn.mê) Liser kodikan danan. Tîtirîn.

**Tûtik** (n.x.mê) 1.Corekê nanîye. Sawik. 2. Zeratîya tirozîyan.

**Tûtin** (n.x.mê) *giya* Giyeke hişk di ken, bi cigare yan qelûnê di kêşin. Cigare.

**Tûtî** (n.x.mê) *perinde* Balindeyeke. Pepexa.

**Twî** (n.x.mê) Tû.

# U

**U** (u) Pîta bîst û pêncê ji abeya kurdî.

**Ucre** (n.x.mê) Sindoq.

**Unda** (hk.x.çewa) Berze. Winda. Hinda.

**Undabûn** (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. Windabûn.(K) bn: Bûn.

**Undakirin** (k.jn.l.mê) Berzekirin. Hindakirin. Windakirin. (K) bn: Kirin.

**Urdo** (hk.cih,cugr,n.x.) Bajêrkeke di keve kinarê başûr ê derya reş ko tixûbê welatê kurdane.

**Umerî** (malb) Navê tîreyeka kurdane.

# Û

**Û** 1. (û) Pîta bîst û şeşê ji abeya kurdî.

**Û** 2. (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. :Ez û tu. Evro û sube. Par û pêrar. Jin û mêr. Ba û baran. Xwarin û vexwarin. Dayk û bab û htd.

**Û** 3 (pêrb) ***rêzman*** alavê hodeng(hd,bangkirin) gazîkirinê : û şivano![ wa şivano]

**Ũ** 4 (pêrb) ***rêzman*** Alavê pisyar û misogerîyê ye. Pa. : û eve çîye ?[pa ev çîye?].

**Ũçik** (n.x.nêr) Hiçik.

**Ûde** (n.x.mê) Mezel. Jûr.

**Ûlî** (n.x.mê) Koçik. Xanî. Bêla. Vîla.

**Ûlo** (pêrb) ***rêzman*** Alavê nîşadana karek, rêyekê. Wilo. Wesa.

**Ûrdek** (n.x.dz) ***perinde*** Balindeyekê hişkavî,malî û kûvî ye. Werdek.

**Ûrdî** (n.x.mê) Leşker.

**Ûrdîgeh** (hk.cih,n.dar.nêr) Leşkergeh.

**Üremar** (hk.cih,cugr,n.dar) Devereke li Kurdistan bakûr.Hozeke.

**Ûremarî** (malb.dar.dz) Xelkê Üremar.

**Ûris** (nej,n.x.dz) Ros.

**Ûrisî** (n.dar.mê) Ziman û kelûpelên rosî.

**Ûtêl** (n.x.mê) Mêhvanxane.

**Ũtî** (n.x.nêr) Amêrê hilûkirin û ciwankirina cilan.

**ûtîkirin** (k.jn.l.mê) Hilûkirina cilan bi amêrê ûtî.

**Ûx** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo kovanê yan hicmetîbûnê bi kar di hêt.

**Ûy** (pêrb) ***rêzman*** Alavê keser û janan.

# V

**V** (ve) Pîta bîst û heftê ji abeya kurdî.

**Va** (cihn) Ev. Eve. Va çîye ?. Va ye hevalê min.

**Vaca** (rd.x.çewa) Vajî. Berevajî.

**Vagon** (n.x.biyan.mê) Fergonê tirênê(şemendefir).

**Vajî** (hk.x.çewa) Kiras, cilik, tûrik yên vajî.ang ; alê nav hatîye derve û bervajî.

**Vajîbûn** (k.jn.l.mê) Dema cil, gore yan tiştek berê wî di kevit nav û nava wî di kevit serve.

**Vajîkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov cilikekê xwe vajî di ke.

**Vala** (hk.x.çewa) Cihê vala. Ang ; cihê çi têda nîne.kes di navda nîne. Bê. Xilole. :Xanîyê vala. :Gozikê vala. :Serê vala ; ang bê [mirov, av, mejî].BR× Pir, tijî.

**Valabûn** (k.jn.l.mê) Amanek vala bibe. Ang ;derêxistina av yan her tiştê têda . (K) bn: Bûn.

**Valahî** (n.dar.mê) Cihê tu tişt, kes yan candar di nav da be bin.

**Valakirin** (k.jn.l.mê) Rûkirin. Têda ne hêlan. :Cihorkê xwe vala kir. :Xanî vala bi ke.(K) bn : Kirin.

**Valayî** (n.dar.mê) Gerdûn. Xilole. Valahî.

**Van** (pêrb.pir) ***rêzman*** Alavê nîşadana tiştê nêzîk yê pirînî .:Van cilan bi ke ber xo ,gelek ji te di hên. :Van rojan dê mizgînîyeka xweş bo me hêt. Evan.  Br× Wan.

**Vana** (pêrb) 1. ***rêzman*** Alavê nişêdana nêz. Evana. Van.2. Navê jinane.

**Va<u>rê</u>** (hk.x.çewa) Veder. Dûr. Ji rê derkevtin.

**Varê<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Vederbûn. Piçek dûrkevtin. (K) bn: Bûn.

**Varê<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Weke mirov yekî ji cihek yan rêyekê ji mirovan dûr bêxe di gel da bi peyve ko kesê dî guhdarîya gotinên mirovî neke. (K) bn:Kirin.

**Va<u>rik</u>** (n.x.nêr) Candarê yek salî. Candarê xort. ***Pend*** :Gotin kewî çi cih xweşe; go cihê lê bûym varik.

**Vavar<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Tiştê qenc ji yê xirab cuda di kin.Ji hev cihêkirin. Ji hev cudakirin. Bijartin.(K) bdn: ez di vavêrim em di vavêrîn, tu di vavêrî hun di vavêrin, ew di vavêre[…it] ewan di vavêrin. Pr : dê [bi] + bdn. Bdb : di vavart, di vavartin. Db,dûr : vavartibû,vavartibûn. (F): bi vavêre, bi vavêrin.

**Ve** (paş,pêş,pirt) ***rêzman*** Pêşpirt û caran paşpirte, bi kirinan(kiryar) ve girêdaye jibo dubare û çend bare kirinê. :Hateve. :Zivrîve. Çûve. Veçinîn. Vebirîn. Vedan û htd.

**Vebijar<u>tin</u>** (k.jn.dar.mê) Vewijartin.

**Ve<u>bir</u>** (n.dar.mê) 1.Heyameka kurt. Navbir. Bêhinvedaneka kurt.2. Delîve.

**Vebiran<u>din</u>** (k.jn.mê) Vebirîn.

**Vebi<u>rî</u>** (hk.dar.çewa) Kurtkirî. Dawî hatî.

**Vebi<u>rîn</u>** (k.jn.l.mê) 1. Kutakirin. Bi dawî anîn. 2. Berhevkirin.Biryar li ser dan. :Nextê bûkê vebirî.ang ; berhev kir û biryar liser da.(K) bn : birîn.

**Vebir<u>yan</u>** (k.jn.l.mê) Jinav çûn. Qirbûn.bi êkcarî biryan.(K) bn : Biryan.

**Ve<u>bûn</u>** (k.jn.dar.mê) Tiştê girtî ve di bit. Dergeh vebû, birîn vebû, gul ve di bit, devê wî vebû. (K) bn : Bûn.

**Veceman<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Xirvekirin. Komvekirin. Li hev cemandin. :Hevanêt xo vecemandin. :Xêzana xwe vecand. (K) bn: Cemandin.

**Veciniqan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Tirsandin.. :Hesp veciniqand. (K) bn :Ciniqandin

**Veciniq<u>în</u>** (k.jn.dar.mê) Ji tirsan lerzîn. Ji nişkê ve tirsan. ::Dewar ji tirombêlan di veciniqin (K) bn: Ciniqîn.

**Ve<u>cûn</u>**,Ve<u>cwîn</u> (k.jn.dar.mê) Xwarin bi didanan hûrkirin û înan û birin. Axivtin du,sêbarekirin. (K) bn : Cûn.

**Veçinîn** (k.jn.dar.mê) 1.Belkirin. Mûçkirin. Repkirin.: Hespî guhên xwe veçinîn.2. Dubare çinîn. Dubare ristin. Têkalizîn.(K) bn: Çinîn.

**Veçirandin** (k.jn.dar.mê) Rûtkirin. Bi Penc û nînokan cilik hincinîn. :Hestî veçirand,ango; goşt bi hestîyan ve ne hêlan. :Pora xwe di veçirî,ang ; pora xwe bi pencan di kêşa.

**Vedan** (k.jn.dar.mê) 1. Xwe jê dûr xistin. Xwe dane alekî. Vekirin. Peytkirin. Berevajîbûn. :Eng veda. Berhevkirin. :Telhek veda. :Tepik veda.2. Lêdan. Lêxistin. Pêvedan. (K) bn: Dan.

**Veder** (hk.dar.çewa) Ne pêra. Ne di gel. Cuda. Cihê. :Mirovek veder.

**Vederbûn** (k.jn.l.mê) Cudabûn. (K) bn : Bûn.

**Vederkirin** (k.jn.l.mê) Cudakirin. Jêgirtin. : Wî xwe jinav mirovan veder kir, ang; Jinav mirovan derkeft. (K) bn: Kirin.

**Vedirûn** (k.jn.dar.mê) Cihekê vebûyî yan diryayî dubare bi hêt dirûn.: Dê şelwalê xwe vedrût. (K) bn: Dirûn.

**Vedizîn** (k.jn.dar.mê) Bi dizîve ji civatekê, cihekî dûr kevtin. :Çûneka bêy tu kesê ageh ji mirovî hebe. (K) bn: Dizîn.

**Vedîtin** (k.jn.dar.mê) Tiştê hidabûyî careka din mirov bi bîne. : Supas bo xudê min careka dî tu dîtî ve.(K) bn: Dîtin.

**Vedor** (n.dar.mê) Qonax. Heyam. Gav.

**Veger** (n.dar.mê) Zivrîn. Vegeryan. Hatin. :Roja vegera hevalê min ji biyansitanê.

**Vegerandin** (k.jn.dar.mê) Kelûpel yan tiştên mirovî ji yekî wergirtîn , bo xwedîyê wan bi zivrînit. Dubare lê zivrndin. :Ew kitêba min dabû te, jibo min vegerîne.(K) bn: Gerandin.

**Vegerîn** (k.jn.dar.mê) Vegeryan.

**Vegeryan** (k.jn.dar.mê) Dubre zivrîneve. : Ew ji derve vegerya ye Kurdistanê. (K) bn: Geryan.

**Vegirtin** (k.jn.dar.mê) 1. Dema yek tiştekî bi havêt û mirov li esmanan bi destan wergirit. Yan tenek ji bilindayîyekê bi hêt xarê, yek bigire pêş bi keve erdî. :Sêvek ji darê keft, min vegirt. 2. Xwrin di amanan da hilgirtin dako tama wan xweş bi bit. 3. Dagîrkirin. Girtin. (K) bn: Girtin.

**Veguhartin** (k.jn.dar.mê) Wergêran. Wergerandin. :Ji zamanekî bo yê dî veguhart.

**Veguhaztin** (k.jn.dar.mê) Ji cihekî bo yê din birin. :Bûk veguhast. (K) bn: Guhastin.

**Veguhêrandin** (k.jn.dar. mê) 1. Şandin. Hinartin. 2. Pêk gihûrîn.

**Veguhêrîn** (k.jn.dar.mê) 1. Şandin. Hinartin.2.Pêk guhartin.

**Vehandin** (k.jn.dar.mê) Têkalandin. Li hev badan. Darijtin. : Kezî vehandin, bendik vehand, hozan vehandin. (K). Bdn:ez di vehînim em di vehînîn, tu di vehînî hûn di vehînin, ew di vehîne[…it] ewan di vehînin.. Pr : Dê[bi]+ bdn. Bdb : di vehand, di vehandin. Db,dûr: vehandibû,vehandibûn. (F) : bi vehîne, bi vehînin

**Vehejandin** (k.jn.dar.mê) Zirziqandin. Hejandin.Leqandin. Ji xew rakirin bi hejandinê. (K) bn: Hejandin.

**Veherifte** (rd.dar.çewa) Mirovê bê serûber. : Eve te çi kirîye, tu ho yê veherifte?.

**Vehewandin** (k.jn.dar.mê) Li cem xwe hiştin xwarin vexwarin û xew jêra dabîn kirin. Demekê li nik xwe hêlan. (K) bn: Hewndin.

**Vehêl** (hn,hk.dar.çewa) 1. Damayî. Gîro. 2.Navê keç û xortane.

**Vehêlan** (k.jn.dar.mê) Piçek, hindik li paş xwe hêlan. : Em bi rê di çûn, me hevalên xwe piçek vehêlan. (K) bn: Hêlan.

**Vehisîn** (k.jn.dar.mê) Dîwar vehisîn , cihên pêdvî kurê yan çîmentoyê lê di din û bi amêrekî hilî di kin. Bivir, das, kêrik û htd vehisîn ang; bi beravî hisîn û dubare hisîn û xweşkirin.(K) bn: Hisîn.

**Vejandin** (k.jn.dar.mê) Dubare çêkirin. Nûkirineve.Saxkirin. Anîn jiyanê. :Bernameya avakirinê vejand.

**Vejen** (n.dar.dz) 1. Vedan. Karvedan. Dengvedan. 2. Navekê kurdî du nivşî ye.

**Vejenîn** (k.jn.dar.mê) Bersivdana karî. : Zarokî ber li dîwarî da, vejenî û bi serê wî kevt[keft]. (K) bn : Jenîn.

**Vejîn** (k.jn.dar.mê) 1.Dubare jîyan. Xwe di ber kawdanên nexweş girtin. Berdewamîya jiyanê. 2. Navê xort û keçane.

**Vekêş** (n.dar.mê) 1.Givişk.2. Kêşan. :Ji xewan vekêkş dane xwe.

**Vekêşan** (k.jn.dar.mê) Dema mirov tiştekî jibo alîyê xo rabi kêşe.

**Vekêşîn** (k.jn.dar.mê) bn :Vekêşan.

**Vekirin** (k.jn.dar.mê) Tiştê girtî mirov ve di ke. Derî veke, dilê xwe veke. Çavên xwe vekirin. (K) bn: Kirin.

**Vekirî** (rd.dar.çewa) Derê hatî vekirin. Vala. :Derê malê herdem jibo mêvanan yê vekirîye.

**Vekolan** (k.jn.dar.mê) 1. Erdekî bi kolî û çalan tê ve bi kî. 2 .Li dû çûn. : Ber derê mala xwe vekola. (K) bn : Kolan.

**Vekolîn** (k.jn.dar.mê) Lêkolîn. Li dwîvçûn. :Vekolîn liser mijarê hat kirin.

**Vekujtin** (k.jn.dar.mê) Serbirîn. : Bizin, pez, ga, mirîşk û htd vekujt, ang; serê wî/wê jê vekir.(K) bn: Kujtin.

**Velîztin** (k.jn.dar.mê) Guhertina mijarê û dirokirin. Xapandin. Serdabirin. Badan. (K) bn:Lîztin.

**Vemalîn** (k.jn.dar.mê) 1. Pakijkirin. Malîn. 2. Perixandin. :Pişta wî velamî. Xuha enya xo vemalî. (K) bn: Malîn.

**Veman** (k.jn.dar.mê) 1. Gîrobûn. Paşdaman. 2. Navekê kurdî du alîye. (K) bn: Man.

**Vemirandin** (k.jn.dar.mê) Çikkirin. Bêdengkirin. Temirandina agirî, radyo, tv û htd. :Agir vemirand. :Cigarê vemirîne. (K) bn : Mirandin.

**Vemirîn** (k.jn.dar.mê) Bêdengbûn. Kizbûn. Temirîn. :Agir vemirî.

**Venan** (k.jn.dar.mê) Danan. Çiklandin. Qîtkirin. : Kêlek vena, armancek vena.

**Veniştin** (k.jn.dar.mê) Mirîşk liser hêkan, liser hêlînê melisî.

**Venwîsan** (k.jn.dar.mê) Li ber danan. Xwe berhevkirina jibo êrişekê, yan girtina tiştekî. :Pişîkê xwe li ber mişkî venwîsaye. : (K) bn: Nwîsan.

**Veperixandin** (k.jn.dar.mê) Vemalîn. Qayîlkirin. Vexurandin. (K) bn: Perixandin.

**Vepeşîn** (k.jn.dar.mê) Hilingivtin. Peşîn.: Ker vepeşî û di ser serê xwe da çû.(K) bn: Peşîn.

**Veqetandin** (k.jn.l.mê) Jê vekirin. Jê birîn. Bi cih hêlan. : Ez yê ji hevalan ve qetaym.

**Verestin** (k.jn.dar.mê) Xwe ji girêdan, qeydkirinê, vekirin û bazdan. Xwe ji destan derêxistin. Havêtin.

**Vereşan** (k.jn.dar.mê) Verişyan. Hilavêtin.

**Verêj** (n.dar.mê) Bermayî. Puxte. :Verêja axiftinê.

**Verêlyan** (k.jn.dar.mê) Bêserûberbûn.

**Verêlyayî** (hk.dar.çewa) Bê serûber. Şepilî. Jiberêk çûyî.

**Verês** (n.dar.mê) *rêzman* Çewanîya dirist xwandin û lêvkirina pît û peyvan.

**Verêsan** (k.jn.dar.mê) *rêzman* Pît pît xandin ta bi karin peyevê bi lêv kin. Vehandin.

**Verişyan** verişyan (k.jn.dar.mê) Dilrabûn. Rijyan. Hilandin. (K) bn: Rişyan.

**Vestirîn** (k.jn.dar.mê) Hevîrkirin.ar vestirîn, kur vestirîn û htd. (K) bn: Stirîn.

**Veşargeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê xwe lê veşarinê. Hişargeh.

**Veşarin** (k.jn.dar.mê) bn:Veşartin.

**Veşartgeh** (hk.cih,n.dar.mê) bn:Veşargeh.

**Veşartin** (k.jn.dar.mê) Li cihekî danan ko tu kes nebîne. (K) bdn: ez di veşêrim em di veşêrîn, tu di veşêrî hûn di veşêrin, ew di veşêre[…it] ewan di veşêrin.Pr.dê [bi] + bdn. Bdb: di veşart, di veşartin. Db,dûr: veşartbû,…bûn. .(F) bi veşêre, bi veşêrin

**Veşartî** (hk.dar.çewa) Tiştê hatî veşartin. Berze. Veşarî.

**Veşartok** (n.dar.mê) *lîstik* Kesê li yarîya çînganê xwe di veşêre.Lîstikvanê çînganê yê xwe veşarî.

**Veşartokanê** (n.gdar.mê) *lîstik* Yarîya çînganê.

**Vetiringîn** (k.jn.dar.mê) Tiringên jê hatin. Tirkirin.

**Vetirsandin** (k.jn.dar.mê) Tirsandina demildest. Bizdandin. Tirsandin. (K) bn: Tirsandin.

**Vetirsîn** (k.jn.dar.mê) Tirsîna ji nişkêve.(K) bn: Tirsan.

**Veweşîn** (k.jn.dar.mê) Vepeşîn . Kevtin.

**Vexwandin** (k.jn.dar.mê) Gazîkirin jibo şahîyekê, xwarinekê û htd. : Me dused mirov vexwandin jibo şahîya pismamê xwe.(K) bn: Xwandin.

**Vexwandî** (n.dar.dz) Xandî. Mêvan.

**Vexwarin** (k.jn.dar.mê) 1.Weke mirov avê yan madeyên şil di xwe[ vedixwe]. 2. Tiştên şile, mirov bi kare fir ke.mîna av û xoşavan.(K) bn: Xwarin.

**Vexwendin** (k.jn.dar.mê) bn :Vexwandin.

**Vexurandin** (k.jn.dar.mê) 1. Veperixandin. 2. Qayîlkirin. Hawîşkirin. (K) bn: Xurandin.

**Vezelîn** (k.jn.dar.mê) Vepeşîn. Hilisîn. Tehisîn.

**Vezelyan** (k.jn.dar.mê) Vezelîn.

**Vezirziqandin** (k.jn.dar.mê) Livandin û leqandin. Zirziqandin.

**Vê** (cihn.x.mê) *rêzman* Cihnavê mêye û nêzîke.Evê. : Vê; keçê, jinê, darê, bizinê carê, gavê, rojê û htd. :vê ne, ya dî.

**Vêca** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegire ,bikar di hêt dema mirov gotina hemberê xwe bi çi ve negirit. Herweko mirovî pêşdem ew gotin bihîstîye û ne seyre.Evca.2. Jibo berdewamîdan bi axivtinê û agehdarkirinê.

**Vêcar** (pêrb.alv.pêvegir.l) Evê carê.

**Vêdan** (k.jn.x.mê) Kitkit rakirin.Liblib hilgirtin. :Vêdana sêvên weryayn, :Vêdana pareyê hûr. :Vêdana genimî. (K) bn: Dan.

**Vêga** (pêrb.alv.gir) Vêca. Evca.

**Vêgavê** (hk.dem) Noke.

**Vêkdan** (k.jn.dar.mê) Komkirin. Lêkdan. Xirvekirin.

**Vêkevtin** (k.jn. dar.mê) Peydakirin. Vedîtin. Cihê wê/wî zanîn . bi ser hilbûn.(K) bn: Kevtin.

**Vêkkevtin** (k.jn.l.mê) Bi êk kevtin. Lêkdan. : Du tirombêl vêkkevtin. :Mirov vêkkevtin. (K) bn : Kevtin.

**Vêra** (hn.çewa) Bi hevra. Pêkve. Pêra. di Gel.

**Vêrê** (hk.cih) Vê dirê. Vê rê. : Eve ji kengî were tu li vêrê ?.

**Vêsan** (k.jn.x.mê) Bêhinvedan. Palvedan. Xwe jibîrve kirin.

**Vêxistin** (k.jn.dar.mê) Lêdan. Hilkirin. : Fanos vêxist. Çira vêxistin. (K)bn :Xistin.

**Vi** (pêrb.x) bn :Bi. Vê

**Viç** (hn.x.çew) *deng* Dengê tiştên hilî,wek av û kefê.

**Viçên** (n.dar.mê) *deng* Dengê viçviçê.

**Viçviç** (n.dar.mê) Viçên.

**Vijên** (n.dar.mê) *deng* Dengê bayî, weke li tayên daran di dit.

**Vil** (hk.x.çewa) Cihê nerim. Nerim. Pilox.: Gundorê vil. Peqîşka vil.

**Vilbûn** (k.jn.l.mê) Nerimbûn. :Sîvoka serê wî ya vil bûy!.(K) bn : Bûn.

**Vilik** (n.dar.mê) Peqîşkên vil ji egera karî li dest û pêyên mirovî peyda di bin. Peqîşk.

**Vilkirin** (k.jn.l.mê) Nerimkirin. Qayîlkirin. (K) bn: Kirin.

**Vir** 1 (n.x.mê) Direw. Diro.

**Vir** 2 (hk.cih) Li vêrê .Li vir. Eve çend salin ez li vir di mînim. BR× Wir.

**Vir** 3 (n.x.mê) Avrîyeke mirov rûyê xwe badide, derbirîna bê minetîyê .Difinbilindî .

**Virdanan** (k.jn.l.mê) Xwe badan û difinbilindkirin. (K) bn : Danan.

**Virçikî** (hk.dar.çewa) Mirovê lewaz.

**Virde** (hk.dem) 1. Li vir. Bo vêrê. 2. Ji noke û paş. :Ji îro û virde ez dê her roj herim xwendingehê.

**Virek** (hk.dar.çewa) Direwîn. Direwker.

**Virên** (n.dar.mê) *deng* Dengê havêjtina tenan, mîna dar, ber, kevir û htd.

**Virik** (n.dar.mê) Zikçûn. Hinavêşî.

**Virişkî** (hk.da.çewa) Çepel. Lewçe. Dîn.

**Virker** (hn.dar.çewa) Direwîn.

**Virkirin** (k.jn.l.mê) Direwkirin. (K) bn : Kirin.

**Viro** (hd,pesin,n.gaz. dar) Direwîn. Direwker.

**Virvirandin** (k.jn.l.mê) Mirov tiştekî wesa bi havêje ko virên jê bê.

**Virîk** (n.x.mê) xwarin Core zadeke danhêrk û kulind an di nav av û temate da di kelînin. Virîka bi kulind.

**Virvirok** (n.dar.mê) 1.Amêreke ji bendikan û xirxalekê dirist kirîye zaro ba didin virên jê di hêt. 2. Perwaneyên kaxetî.3. Firokeya helîkopter.

**Vitên** (n.dar.mê) *deng* Dengeke jibo mirovê tirsonek di bêjin ko ji paşîyê di hêt.

**Viyan** (k.jn.x.mê) Hezkirin. (K) bdn:min,me, te, hûn, wî, wê, wan, we, di vêt bdb: di viya. Db,dûr; viyabû, bû, (F): bi vê, bi vên.2. Navê keçane.

**Vizên** (n.dar.mê) Dengê avê yan xwînê, dema ji kunek yan cihekê teng ra di peşit.

**Vî** (cihn.tek) ***rêzman*** Cihnavekê, teke, nêre. Evî. :Vî peyayî çi bi serê min anî !.

**Vîdyo** (n.cîhan) Amêreke, kasêtan di kin ber jibo nîşadan yan tomarkirina reng û dengan.

**Vîn** (n.x.mê) Evîn. Vîyan.

**Vîndar** (hk.dar.çewa) Evîndar.

**Vîr** (hk.x.çewa) Mirovê çavên wî di xwar. Çavtirîwar. Xêl. Hewêl.

**Vîrbûn** (k.jn.l.mê) Çavên mirovî vîr di bin. (K) bn: Bûn.

**Vîrkirin** (k.jn.l.mê) Mirov çavên xwe xwar di ke. Xêl di ke. (K) bn: Kirin.

**Vîros** (n.x.cîhanî.mê) ***candar*** Candarekê hûrike, bi çav nahêt dîtin. Vayros.

**Vîtamîn** (n.x.cîhan.mê) Madeyeke di nav xwarinanda ye, gelek corin, mîna a,b,c,d, û htd,leşî pêdvî pê heye.

**Vîze** (n.cîhan.x.mê) Derbazname.

**Vîzên** (n.x.mê) ***deng*** Dengê bayî.

**Vîzevîz** (n.dar.mê) ***deng*** bn :Vîzên.

**Vîzevîzkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê vîzênê jê peydabûn. Bayê vîzevîzê di ke.

**Vîzvîzk** (n.dar.mê) Hacîreşk. Kurîmeqesok.



**Vizvizîk**

**Volkan** (n.biyan) Agirkan. Kanîya agirî.

**Volt** (n.biyan) Yekeya hêza têhna karebê.

# W

**W** (we) Pîta bîst û heştê ji abeya kurdî.

**Wa** 1 (hd,pêrb) ***rêzman***. 1.Alaveke jibo hicmetîbûnê bikar dihêt.: Wa, ma te ez ne dîtîme tu wesa li min dinêrî?. 2.Alavê hodenge, Jibo bangkirinê bi kar di hêt. : Wa hevalino. Wa yadê, wa bira.

**Wa** 2. (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo misogerkirin û hevberkirinê bi kar di hêt. Wesa. Ûsa. Weha.

**Wa** 3 (cihn) Wan. Wana. Ewan.:Mala wa. Gundê wa,ango mala wan, gundê wan.

**Wan** 1 (cihn) ***rêzman*** Cihnavê kesê sêyem yê pirînî. Ewan. :Ji wan re bêje îro me civîn heye.

**Wan** 2 (hk.cih,bajar,cugirn) Bajarekê kurdane li Kurdistana bakûr.

**Wana** (cihn) ***rêzman*** Mala wana li perê gunde. Wan.:Tu çûy mala walana?.

**Wane** (n.x.mê) Waneya ziman, waneya dîrokê, waneya dîn û htd. Fêrkirin. Nîşadan.

**Wanedan** (k.jn.l.mê) Pêşkêşkirina waneyan .Fêrkirin.:Seyda waneyan di de xwendekaran. (K) bn: Dan.

**Wanî** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir,ango; Weha. Wesa. :Çend caran dê bêjim te wanî na be!.

**Waqên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê rûvî.

**Waqwaq** (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê waqêna rûvî.qaz û werdekan. 2. Qîjîyên zarokên zava.

**Waqwurman** (k.jn.dar.mê) Hicmetîbûn. Seyrman. Hêbetîman.

**War** (hn.cih,n.nêr) 1.Cih. Welat. Cihwar.2. Delîve. Alî.: *Pend* Warê direwînî reşe. *Pend* :Warê ji waran pîroztir hene.

**Wargeh** (hn.cih) Cihwar. Şûnwar.

**Warhêl** (hn,hk.dar.çewa) 1. Kesê ji warê xwe dûr di keve.2 .Navê keç û xortane.

**Warîn** (hk,hn.n.dar.dz) 1. Mirovê evîndar û girêdayê ware xwe.1. Navê jin û mêrane.

**Warkor** (hk.l. çewa) Bê mal. Bê welat. Bê cih.Korewar.

**Warocax** (n.l.mê) Şûnwar.

**Warvan** (hn,hk.n.dar.dz) 1.Xwedî welat, war.2. Navekê du zayende.

**Warvîn** (hn,hk,.n.dar.dz) 1. Warperwer.2. Navekê nêr û mêye.

**Warxan** (n.dar.mê) Texe. : Xanîyê me ji sê warxanan pêk di hêt.

**Warzan** (hk,hn.n.dar.dz) 1. Şarezayê warê xwe. 2 .Navê kiç û kurane.

**Wate** (n.x.mê) Raman. Ango. :Wateya vê peyvê çiye?.

**Wawîk** (n.x.mê) Dijûn. Xeber.

**Wax** (pêrb) *rêzman* Alavê dax, kovan ê. Ax.

**Way** (pêrb) *rêzman* 1. Alavê keser û kovanê. : Way eve çi bi serê vî rebenî hat. 2. Alavê hicmetîbûnê. :Way ew çîyayê hanê çendê bilinde!. Wey.

**We** 1 (pêrb) *rêzman* Alavê hicmetîbûnê. :We, eve çi axiftinin tu di bêjî!.

**We** 2 (cihn) *rêzman* Cihnavê kesê duyê, pirînî.Hewe. :Mala we. :Derdê dilê we. :We çi di vê?.

**We** 3 (pêrb) *rêzman* 1. Alavê hevberkirinê. Wesa. Weha.:We ne ke!. :We diyare tu ne ji vî bajarîyî?. 2. Alavê pejirandinê. Rast. Dirist. : Asiftina te gotî weye.

**Weha** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegir. Hosa. Osa. Wesa.wanî.

**Wek** (pêrb) *rêzman* Alavê mînakî. Mîna. Nimûne.:Wek te kerem kirî. :Wek wan diriste!.

**Weke** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegir. Weko. Herweko.:Weke di bêjin. :Weke mirov bi xwaze.

**Wekêk** (hk.l.çewa) Peyveke mirov bo hevberkirina tiştan, du yan pitir, mirov, candar. :Ez û te ne wek êkîn.:Ev du kotire wekêkin. :Cêmik wekêkin. :Xanîyê hewe û wan wekêkin. Wekhev.

**Wekêkî** (n.l.mê) Wekhevî

**Wekhev** (hnkl.çewa) Wek yek. Wekêk.

**Wekhevî** (n.l.mê) Mirov hemû wek yek bin. Bê cudayî. Tebayî.

**Wekî** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Mîna. Wek.

**Weko** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir. Wek. Mîna.

**Wekok** (n.dar.nêr) Mînak. Wêne. Jêgir.

**Welat** (n.x.nêr) Tixûbê cihekê diyarkirîye , ku deshelata xwe heye, ziman û çanda wan heye, rûnişvanên wê xwe bi rêve di bin. War.:Welatê me Kurdistane.

**Welatî** (n.dar.dz) 1. Kesê nasnameya wî ya welatekî be, yê lê di jît. :Welatîyên Kurdistanê.2. Rûniştvan.

**Welatname** (n.l.mê) Giroveyên welatîyan. Paseport. Nasnameya welatî.

**Welatparêz** (hk.l.çewa) Mirovê berevanîyê ji welatê xwe di ke.Nîştimanperwer.

**Welê** (pêrb) ***rêzman*** Alavê girêdanaê. Lê. Jiber hindê. Jiber vê yekê.

**Wend** (hk.x.çewa) Mêrçak. Çavnetirs. Merd.

**Weqweq** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê qaz, werdek, rûvî td. Waqwaq.

**Weqî** (n.x.mê) Yekeyeka pîvanê ye. : Weqîyeka şekirê, tovçayê û htd.

**Wer** (pêrb) ***rêzman*** Alavê pêvegir.Wesa. Hosa. Wetov.

**Werandin** (k.jn.mê) Jê êxistin bi hejandinê. : Ba belgên daran di werîne. Azadî sêv werandin. (K) bdn: ez di werînin em di werînîn, tu di werînî hûn di werînin, ew di werîne[…it] ewan di werînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di werand, di werandin. Db,dûr: werandibû,werandibûn. (F) : bi werîne, bi werînin.

**Weranîn** (k.jn.x.mê) Werandin.

**Werar** (n.x.mê) Pêşdaçûn. Pêşkevtin. Geşbûn.


**Werarkirin** (k.jn.l.mê) Pêşdaçûn. :Rewşa aborî li welatî roj bi roj wararê di ke.

**Werbadan** (k.jn.dar.mê) Li hev badan. Lêkzivrandin. Têkalandin. (K) bn: Badan.

**Werçerxan** (jn.l.mê) Wergeran.

**Werdan** (k.jn.dar.mê) 1.Tafîrkirin. Pakijkirin. Şûştin. 2.Binavkirin. Niqokirin.

**Werdek** (n.x.dz) *tewal* Balindeyek, hêkker,malî yan kûvîye, di avê da û li dêmî di jît.



**Werdek**

**Werez** (n.dar.dz) Mirovê rez, bîstan yan cinîka êkî bi kirê di girit hember hindek ji hatîyê mitayî, yan pareyî.

**Werger** (pîşn.dar.dz) Wergêr.

**Wergeran** (k.jn.dar.mê) Qulipîn. Hilingivîn. Guherîn. (K) bn: Geran.

**Wergerandin** (k.jn.dar.mê) 1. Deqên zimanekî bo yê din veguhaztin. 2.Serabinkirin. (K) bn:Gerandin.

**Wergêr** (pîşn.dar.dz) Kesê zimanekî di guhêrit yê dî. Mirovê karê wergênê di ket.

**Wergêran** (k.jn.dar.mê) Zimanek wer di gêre yê din. : Ev çîroke ji elmanî wergêraye ser zimanê kurdî. (K) bn: Gêran.

**Wergirtin** (k.jn.dar.mê) Bi dest xwe ve anîn. Peydakirin. :Hêjta min mehyana xwe ne wergirte. :Vê diyarîyê ji min wergire!. (K) bn: Girtin.

**Werim** (n.x.mê) Cihê êvitî.

**Werimîn** (k.jn.x.mê) Évitîn. Perçivîn.(K) bdn: ez di werimim em diwerimîn, tu di werimî hûn di werimin, ew di werime [...it]ewan di werimin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb: ez di werimîm em di werimîn, tu di werimî hûn di werimîn, ew di werimî ewan di werimîn. Db,dûr: ez werimîbûm, em werimîbûyn, tu werimîbûy hûn werimîbûn, ew werimîbû ewan werimîbûn. (F): bi werime, bi werimin.

**Werimtin** (k.jn.x.mê) Werimîn.

**Werîn** (k.jn.x.mê) [hatin] Bizivîn ji cihek dûr bo yê nêz. (K) bdn: ez di werim em di werin, tu di werî hûn di werin, ew di were

ewan di werin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb. Db,dûr : bn hatin. (F) : were, werin.

**Werîs** (n.x.nêr) Bendekê stûr û dirêje, jibo girêdan û peytkirina baran mifa jê di hêt wergirtin,ji hirî û mûyên kewalan çê di kin. Kinif. *Pend* :Werîsê direwan yê kurte.

**Werpêçan** (k.jn.dar.mê) Çend caran lêkpêçan. Têkpêçan. Balolikkirin. (K) bn: Pêçan.

**Werqas** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo destnîşankirina çewayî û çendayîyê bi kar di hêt. Hinde. Wesa.

**Werwere** (n.dar.mê) Debance. Demance.

**Weryan** (k.jn.x.mê) Kevtin. Jê kevtin. : Por weryan. Fêqî di werit.

**Werz** (n.x.nêr) 1. Demsal. Dansal. :Çar werzên salê; bihar, havîn, payîz û zivistan.2. Perçe erdê çandinê. Bîstan. :Werzekê gundoran, zebeşan.

**Werziş** (n.x.mê) Yarî. Lîztin.

**Werzişkirin** (k.jn.l.mê) Yarîkirin. Lîztin. :Qutabî li qada xandingehê werzişê di ken.(K) bn: Kirin.

**Werzişvan** (n.dar.dz) Lîstikvan. Yarîvan. Yarîzan. :Azad werzişvanekê hêjaye.

**Wesa** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegir. Weha. :Tu çima wesa di bêjî ?. :Çewa tu hatî, wesa jî here!.

**Westan** (k.jn.x.mê) Manîbûn. :Ez îro geklekê wstaym. (K) ; bdn: ez di westim em di westîn, tu di westî hûn di westin, ew di seste[…it] ewan di westin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di westam[westiyam], westan[westayn], westay[westiyay] ,westan[westiyan], westa[westiya]. Db, dûr: westabûm[westiyabûm],….bûy, bûyn, Bûn. (F) : bi weste, bi westin.

**Westandin** (k.jn.mê) Mandîkirin. : Ez xwe gelek di westînim, jibo karê xwe zû bi dawî bi hînim.(K): bdn: ez di westînim em di westînîn, tu di westînî hûn di westînin, ew di westîne[…it] ewan di westînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : (ez di hatim westandin.ango; ez westandim) di westand, di westandin. Db,dûr:westandibû, westandibûn. (F): bi westîne, bi westînin.

**Westayî** 1 (rd.dar.çewa) Mandî. :Ew mirovek westayîye.

**Westayî** (hk.dar.çewa) Rawestayî. Li ser pêyan rawestan.

**Westihan** (k.jn.mê) Westan.

**Westihayî** (hk.dar.çewa) Westayî.

**Westiyan** (k.jn.mê) Westan.

**Westiyayî** (hk.dar.çeqwa) Westayî.

**Westîk** (n.dar.mê) Rawestana zarokan li ser pêyan bo cara êkê.

**Westîkkirin** (k.jn.l.mê) Zarok pêkolê di ke liser pêyan raweste. :Keça wan bi pêyan na çit, lê westîkê di ket. (K) bn: Kirin.

**Weş** (rd.x.çewa) Xweş. Xoş.

**Weşan** (n.x.mê) Belavkirin. Ragehandin.Gehandin. : Guhdar di karin her roj weşana radyoya dengê Kurdistanê bi bihîzin.

**Weşandin** (k.jn.x.mê) Derêxistin. Derkirin. Çapkirin. :Rojnamek weşand. Radyo, TV weşandin. (K) bdn :ez di weşînim em di weşînîn, tu di weşînî hûn di weşînin, ew di weşîne[…it] ewan di weşînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di weşand, di weşandin. Db,dûr : weşandibû,weşandibûn. (F) :bi weşîne, bi weşînin.

**Weşanxane** (hk.cih,n.l.mê) Cihê weşandinê. Çapxane.

**Weşî** (n.dar.mê) Xweşî. Tenayî.

**Wexer** (n.x.mê) Çûn. Dûrkevtin. Koç.

**Wexerkirin** (k.jn.l.mê) Koçkirin. Barkirin. Malavayîkirin. Mirin. (K) bn: Kirin.

**Wext** (n.x.nêr) Dem. Çax.

**Wey** (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo hicmetîbûnê bi kar dihêt. :Wey babo eve çi dehbeye!.

**Weye** (pêrb) *rêzman* Alava misogerkirin û piştraskirinê ye. Wesaye. : Axivtina te gotî sedased weye.

**Wezaret** (n.x.mê) Şalyarî. Cihê karê wezîrî.

**Wezîr** (n.x.dz) Şalyar.

**Wê** (cihn.x.mê) *rêzman* Cihnavê kesê sêyê yê mê. Ewê. : Eve mala Nesrînê ye, eve mala wê ye.Çaxê borî. : Wê rojê tu li xandingehê nebûy. Wê gavê min tu nenasî li min bi bore.

**Wêda** (hn.cih.dar) bi Wî alî da. Ber bi cihek dûr.Wêve.

**Wêdatir**(hn.cin.l) Wêvetir.

**Wêderê** (hn.cih. l) Cihê dûr. Wêrê.Br× Vêderê.

**Wêje** (n.x.mê) Edeb û honer.

**Wêne** (n.x.nêr) Mînak. Nîgar. Risim. :Weneyê xo bi dîwarî ve hilawîst.

**Wêneçîrok** (n.l.mê) Çîrokên bi wêneyan di hên şirovekirin jibo mirov çak tê bi gehe, nemaze zarok.

**Wênegir** (pîşn.dar.dn) Kesê karê wî girtina wêneyan. Kamêravan.

**Wênegirî** 1 (karn.l.mê) Karê girtina wêneyan.

**Wênegirî** (hk.cih,n.dar.mê) Wêneşûyî. :Wêgirîya rojhilat.

**Wênegirtin** (k.jn.l.mê) Mirov wêneyan bi girit yan bi kêşit. (K) bn: Giritin.

**Wênekêş** (pîşn.dar.dn) Wênegir.

**Wênekêşan** (k.jn.l.mê) Çêkirina mînakan bi dest yan bi amêran girtin.

**Wênekirin** (k.jn.l.mê) Çêkirina mînakan. Kêşana wêneyan. (K) bn: Kirin.

**Wêneşûyî** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê şûştina wêneyan.

**Wênevan** (karn.dar.dz) Kesê wêneyan di girit. Xwedîyê wêneşûyê.

**Wêran** 1 (hk.x.çewa) Kavil. Heriftî. : Gundek wêran. Malek wêran;ang kavil.

**Wêran** 2 (k.jn.x.mê) Mirov bê tirs karê xwe bi ket. :Ez ne wêrim bi ava sar serê xwe bi şûm. (K) :bdn: ez di wêrim em di wêrîn, tu di wêrî hûn di wêrin, ew di wêre[…it] ewan di wêrin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb :di wêram, di wêran[wêrayn], di wêray, di wêran, wêra, wêran. Db,dûr : wêrabûm,…bûy..bû, bûn. (F) : bi wêre, bi wêrin.

**Wêranbûn** (k.jn.l.mê) Kavilbûn. Heriftin.

**Wêranker** (karn.dar.dn) Kavilker. Xirabkar.

**Wêrankirin** (k.jn.l.mê) Kavinkirin. Xaporkirin. Herifandin. (K) bn :Kirin.

**Wêrek** (hk.dar.çewa) Çavnetirs. Bihinav. Biwêr. :Jineka wêrek. :Zelamekê wêrek.

**Wêrê** (hk.cih) Çihê dûr.li wê derê. Br× Vêrê.

**Wêrîn** (k.jn.x.mê) bn :Wêran, wêryan.

**Wêryan** (k.jn.x.mê) Wêran. Netirsan.

**Wic** (n.x.mê) Sûd. Mifa. Kêrhatin. : Karekî bi ke wic têda hebit!.

**Wicdar** (hk.dar.çewa) Mirovê wic jê çê di bit. Karê bi wic.:Xortê wicdar, mifayî di gehîne mal û welatê xwe.

**Wiha** (pêrb) *rêzman* Weha. Wesa.

**Wijdan** ( n.x.mê) Mirovê xwedî wijdan, mirovê bi wijdan ,ang; mirovê dilsoj di kar û kiryaranda.. Bê wijdan ; dilreş. dilreq.

**Wilo** (pêrb) *rêzman* Hesa. Wetov. Çima tu wilo di bêjî ?.

**Winda** (hk.x.çewa) Berze. Hinda. :Pareyê winda.

**Windabûn** (k.jn.l.mê) Berzebûn. Hindabûn. : Eve heyameke qelemê min winda bûye.(K) bn: Bûn.

**Windakirin** (k.jn.l.mê) Hindakirin. Berzekirin. :Min telefona xwe winda kirî ye.(K) bn: Kirin.

**Wir** (hn.cih.dûr) Li wir. Li wêrê. Wêra han. Br× Vir.

**Wirde** (n.x.nêr) Pareyê hûr.Hûrde.

**Wirya** (hk.x.çewa) 1. Hişyar.2. Navê mêrane.

**Wisa** (pêrb) *rêzman* Alavê pêvegir. Wesa. Weha.

**Wişandin** (k.f,nx.mê) Hajotina dewaran. Hespê xwe di wişînin. :Wişe kero.Here. (K) bdn: ez di wişînim em di wişînîn, tu di wişînî hûn di wişînin, ew di wişîne[…it] ewan di wişînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di wişand, di wişandin. Db,dûr : wişandibû, wişandibûn. (F) : bi wişîne, bi wişînin. Br× Şoş.

**Wî** 1 (cihn.x, nêr) *rêzman* Cihnave, nêre,kesê sêyê tek. Ewî. : Elindî karê xwe kir, ang; wî karê xwe kir.

**Wî** 2 (pêrb) *rêzman* Alaveke jibo bûyerên seyr bi kar di hînin, xasme jin. : Wî dayê eve çîye?.

**Wîç** (n.x.mê) *deng* Dengê çûçikan.

**Wîçên** (n.dar.mê) *deng* Dengê wîçê ji çûçikan di hêt.

**Wîçkirin** (k.jn.l.mê) Çûçik wîç di ke. Xwandina çûçikan (K) bn: Kirin.

**Wîçwîç** (n.dar,l.mê) Wîç.

**Wîçwîçkirin** (k.jn.gl.mê) Xwandin. Wîçkirin. : Çûçika liser darê wîçwîçê di ket.

**Wîqanê** (n.dar.mê) *lîstin* Yarîyeke zarok xwe di veşêrin û bi lez di hên ber çavên hevdu bi gotina 'wîq'!.

**Wîqanê<u>kirin</u>** (k.j.n.l.mê) Mirov lîztika wîqanê diken.(K) bn: Kirin.

**Wîr** (hk.x.çewa) Vîr.

**Wîsên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê têjikên çûçikan.

**Wîs<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Têjikên balindeyan dengê wîsênê di kin. (K) bn: Kirin.

**Wîswîs<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Wîskirin.

Wîştan<u>din</u> (k.jn.x.mê) Rawestandina kewalan.:Wîşte bizinê!.ango raweste!.. Br× Çitandin.

**Wî<u>tên</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê xwandina hin balindeyane.

**Wî<u>tik</u>** (n.dar.nê) Balindeyê dengê wîtênê jê di hêt. ***Pend*** :Wîtikê wîtanî, te mala min xira kir, ya xwe jî liser danî. Ang; mirovekî dengê wîtêna balindeyî bihîstî, ji wîve bihar hat, lê seqema zivistanê balinde kujt û mirov jî xapand, evca kabira li hindav kelexê teyrikê mirê ev gotin got.

**Wu<u>şe</u>** (n.x.mê) Peyv. :Wuşeya welat.

**Wu<u>ze</u>** (n.x.mê) Têhin.

**Wû** (hk.x.çewa) ***deng*** Dengê lûrîna guran. Lûrîna guran.

**Wû<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Gotin. Peyvîn.

# X

**X** (xe) Pîta bîst û nehê ya abeya kurdî.

**Xabûr** (hk.cih,.cugnr.x.nê) Navê çemekî, û deverekê ye li Kurdistan Iraqê.

**Xaç** (n.x.mê) Du xîçên li ser hevdu derbazbûyîne,. :Nîşana dînê felane.

**Xaçasor** (n.l.mê) Rêkxistîyeka mirovantî, cîhanî ye.

**Xaçepirs** (n.l.mê) Çend pisyarekin di malikên çakujî da bi awayekê stûnî û asoyî hevdu di birin, her malikek bi pîtekê di hêt pir kirin tanî peyvek peyda di bit, çi stûnî yan asoyî.

**Xaçerê** (n.l.mê) Rêyên di serêk ra derbaz di bin mîna xaçê. Duryan.

**Xaçerêz** (n.l.mê) Xişteyeke ji çendîn valayîyên şêwe çarkujî pêk hatîye, hevdu bi stûnî û asoyî di birin,her çarkujîyekî mirov pîtekê têda di nivîse, tanî bi awayê asoyî û herweha stûnî peyvek jê peyda di be. Xaçepirs.

**Xaçkirin** (k.jn.l.mê) Kêşan xaçê. Xaç pêvekirin. (K) bn: Kirin.

**Xaçperês** (hk.l.çewa) :Mirovê bawerî bi dînê mesîh heye. Fele.

**Xaçprêsî** (n.l.mê) Bawerî bi ola felan.

**Xak** (n.x.mê) 1. Ax. Erd. Welat. 2. Cilên kurdî yên mêran.

**Xakenas** (n.l.mê) Mera kolanê. Merbêl. :Bi xakenasê rezan di kolin.

**Xakî** (hk.dar.çewa) Rengê axê, rengê xak. :Cilikêt serbazan rengê xakîne.

**Xal** 1 (n.x.nêr) Birayê dayka mirovî.

**Xal** 2 (n.x.mê) Çipik. Nîşan. Pinî. :Xaleka liser rûyê wî.


**Xalbêhnok** (n.l.mê) Çevengeka nemazeye di risteyanda bi kar di hêt, jibo ravekirineê.

**Xalet** (n.x.mê) Xuşka dayka mirovî.

**Xaltî** (n.x.mê) bn:Xalet.

**Xalxalk** (n.dar.mê) ***can*** Hedamekê nav leşî ye, rengê wî sore.Sipl.

**Xalxalok** (n.l.mê) ***candar*** Kêzikeka Li ser şîlava gul û belgên daran di jît, gelek cor û reng hene ji wan; reng sor û xalên reş.



**Xalxalok**

**Xam** (hk.x.çewa) Xav.

**Xame** (n.x.nêr) Qelem. Pênivîs. Pênûs.:Xameyê rengav. :Xameyê hişk. Xameyê rengîn.

**Xamtîr** (hn.cih,cugrn.x) Çîyeke li Kurdistanê devera Zaxo.

**Xan** 1 (n.x.mê) Xanî. Gova dewaran.

**Xan** 2 (n.x.dz) 1.Jibo rêzgirtinê digel navan bikar di hînin. Hêja. Mîr.: Şirîn xan, Avdel xan û htd.2. Navê qehremanê dastana Dimdime.Xan ê lepzêrîn.

**Xan** 3 (n.x.mê) 1. Malik. 2. Pêkahatîyên şaneyên leşê candaran.

**Xançî** (karn.dar.dz) Xwedîyê xana dewaran.

**Xandevan** (n.dar.dz) Mirovê xandin û nivêsînê di zanit. Xwendevan.

**Xandin** (k.jn.x.mê) Nivîsana liser kaxez û cihên dî ko mirovê xwendevan di kare bi xwîne.Waneyan di xwîne. Kitêban di xwînim. (K) bdn: ez di xwînim em di xwînîn, tu di xwînî hûn di xwînin, ew di xwîne[…it] ewan di xwînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xand, di xandin. Db,dû, xandibû, ….. bûn. (F) : bi xwîne, bi xwînin.

**Xandingeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê wane xwendinê. Dibistan. Qutabxane. :Xandingeha birayetî. :Qutabî çûn xandingehê. :Xandingeha kiçan. Xandingeha têkel. Xandingeha seretayî, navincî, amadeyî.

**Xandî** (n.x.dn) Mirovê hatî daxazkirin jibo pişkdarîyê di şahîyê da bi ket.

**Xanedan** (hk.dar.çewa) Mala ava û herdem ji mêvanan ra der vekirî. :Maleka xanedan.

**Xanedanî** (n.dar.mê) Rêzgirtina mêvanan. Mêvandarî.

**Xanenişîn** (hk.l.çewa) Mirovê ji karî westayî ji egera bi dawî hatina salên karî yan nexweşîyan.

**Xanenişînbûn** (k.jn.gl.mê) Dema mirov di gehe qonaxa xanenişînîyê, êdî ji karî di westit. :Paş çendîn salên karî seyda xanenişîn bû. (K) bn :Bûn.

**Xanenişînkirin** (k.jn.gl.mê) Dema deshelat yan dezgeha karder mirovî xanenişîn di ke. : Rêveberîya çandinê çar fermaberên xwe xanenişîn kirin. (K) bn: Kirin.

**Xaneqîn** (hk,cih,cugrn) Bajêreke li Kurdistana Iraqê.

**Xanê** (hd,gazn.dar.mê)1. Naznav û bangkirina pîrekane.2. Navê pîrekane.

**Xanik** (n.dar.nêr) Mêzeka girovire, sê pêye, yan çarkujî û çarpê, ji gêçê yan depî hatîye çêkirin, nanî liser di pêjin.

**Xanim** (n.x.mê) 1. Jibo rêzgirtin di bêjin jinan. Hêja. Bi rûmet.2. Navê pîrekane.

**Xanî** (n.x.nê) 1. Mal. Avahî. ***Pend*** :Xanî bê karîte ava na be. ***Pend*** :Xanîyan stûn, karî qon. ***Pend*** : Xanîyan stûn, mêranîyê qon. 2. Paşnavê helbesvanê mezinê kurd Ahmedê Xanî.

**Xanîk** (n.dar.nêr) 1. Xanîyê biçûk ê zarokan. 2. Naznavê xanî.

**Xano** (hd,gazn.dar.nêr) Naznav û gazîkirina mêrê navê wî xan.

**Xanûman** (n.g.l.pir) Navê keç û kurekî ye di stiran û çîrokên kurdî da. : Xan û Man cotin.

**Xanxanik** (n.l.mê) Xişte.

**Xanzad** (n.l.mê) 1. Ji malbatên xanan, mîran. 2. ***dîrok*** Mîra mîrnişîna soran. 3. Navê jinan.

**Xap** (n.x.mê) Find. Direw. Bêbextî. Tepik.

**Xapandin** (k.jn.dar.mê) Di serda birin. Xirandin. Fêlkirin. Binîkolan. (K) bdn : ez di xapînim em di xapînîn, tu di xapînî hûn di xapînin, ew di xapîne[…it] ewan di xapînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xapand, di xapandin. Db,dûr : xapandibûm,…bûy, bûyn.. bû,..bûn.(F) : bi xapîne, bi xapînin.

**Xapartin** (k.jn.x.mê) Xepirandin. Xeparekirin. Rezî bi xapirîne. Wî bîstanê xwe di xapirand.

**Xapîn** (k.jn.x.mê) Di serda çûn. Hatin xapandin.

**Xapînok** (karn.dar.dz) Mirovê xelkî di xapîne. Sextekar.

**Xar** 1 (hk.x.çewa) Nerast. Nedirist.Keç. *Pend* :Teyrê nêçîrê dimê wî xare.

**Xar** 2 (hk.cih) Binî. Jêr. li Xar. Li Binî. :Sivore ji darê hat xar. Ji kerê rikan nahêt xar.

**Xarbûn** (k.jn.l.mê) Weke tişt xar di be. *Pend* :Heta xar nebit, rast nabit.ang; serbor dîtin pêdvîye. (K) bn : bûn.

**Xardan** (k.jn.l.mê) Xarkirin. Bazdan. Ew ji mal ta xwendingehê bi xardan çû.(K) bn: Dan.

**Xarin** (k.jn.x.mê) Dema mirov zadî di xwe. Zad. (K) bdn: ez di xom, em di xoyn, tu di xoy hun di xon, ew di xot ewan di xon.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di xar, di xarin. Db,dûr. Xarbû, …bûn. (F) : bi xo, bi xon. Xwarin.

**Xaringeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê mirov xarinê bi pare di kirit di xot. Cihê lênana xarinan. Xurekxane.

**Xarîfk** (n.dar.mê) Perdax. Kop.

**Xarkirin** (kj.n.l.mê) Mirov tiştekî, hesinekî darekî û htd xar bike. Çemandin. Tewandin.(K) bn: Kirin.

**Xarkirin** (k.jn.l.mê) Bi lez çûn. Bazdan. :Zarok di kin xar. (K) bn: Kirin.

**Xarza** (n.dar.dz) Kur yan keça xwehê. Xuşkza. :Kur yan kiça xwîşkê.

**Xas** 1 (hk.x.çewa) 1.Mirovê pêrîs. Bê bêlav. :Hejarê xas.

**Xas** 2 (hk.x.çewa) Çak. :Mirovekê xase û çi guneh nînin.

**Xasbûn** (k.jn.l.mê) Pê rwîs di bin . bê pêlav di bin. Pêlav ji pêyan bû.(K) bn: Bûn.

**Xasî** (n.x.mê) Bê pêlavî. Pêyên rwîs.

**Xaskirin** (k.jn.l.mê) Pêlav ji pêyan kirin. :Xwe xas ke û here di avê da.(K) bn: Kirin.

**Xasme** (hk.x.çewa) Taybet. Nemaze. :Pêdvîye hemû kes bi nivin, xasme zaro.

**Xaş** (rd.x.çewa) Xweş.

**Xaşî** (n.dar.mê) Xweşî. Tenahî.

**Xatirxaztin**, xatirxwaztin (k.jn.l.mê) Malavayîkirin. (K) bn: Xwaztin.

**Xatînok** ( n.dar.mê) Fêqî(tirî)yê hişikkirî. Kişmiş.

**Xatûn** (n.x.mê) Şajin. Xanim. Hêja. Sitî. :Xatûnê peyvek xand. :Xatûna sertextî.

**Xav** (hk.x.çewa) 1. Zadê ne kelandî. : goştê, hêka xav. :Zikê min di êşe, min zadê xav xwarîye. 2. Mirovê sist.

**Xavbûn** (k.jn.l.mê) Sistbûn.:Mirov ji birsan da xav di bît. (K) bn: Bûn.

**Xavkirin** (k.jn.l.mê) Sistkirin. Bêhinvedan. :Karê xwe bi ke û xwe xav neke!.(K) bn: Kirin.

**Xavlû** (n.x.mê) Xawêlî.

**Xawêlî** (n.x.mê) Qerîfk. Destmala zuhakirina leşî.

**Xazgînî** (n.dar.pir) Bireka mirovan diçin mala bavê keçê jibo kurekî di xazin..Xaztina keçan.

**Xazîn** ,xwazîn(k.jn.x.mê) Daxazkirin. (K) bdn: ez di xazim em di xazîn, tu di xazî, hûn di xazin, ew di xaze[…it] ewan di xazin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xazt[xast] di xaztin. Db,dûr : xaztibû, ….bûn. (F) : bi xaze, bixazin.

**Xaztin** (k.jn.x.mê) Xazîn. Xwestin.

**Xazok** (hk.dar.çewa) Mirovê paran û tiştî di xazit.Çeqrût.

**Xebat** (n.x.mê) Xizmeta dozeka rewa. Kar. Bizav. Têkoşîn. :Me sond xwarîye em dstan ji xebatê ber neden.

**Xebatgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê karî. Qada xebatê.

**Xebatkar** (karn.l.dz) Mirovê kar û xebatê di ke. :Pêşmergeh xebatkarin.

**Xebatker** (karn.dar.dz) Xebatkar.

**Xebatkirin** (k.jn.l.mê) Têkoşîn. Bizavkirin. Xebitîn. :Pale, cotyar, qutabî xebatê di ken jibo serferazîya gel û welat.(K) bn : Kirin.

**Xeber** (n.x.mê) Dijûn.

**Xebergotin** (k.jn.l.mê) Dijûndan. (K) bn : Gotin.

**Xeberreş** (hk.l.çewa) Mirovê ezmanpîs. Ezmanreş. : Wey heware eve çi zarokek xeberreşe!.

**Xebitîn** (k.jn.x.mê) Xebatkirin. Bizavkirin. :Jibona azadîya Kurdistanê em di xebitîn.(K) bdn: ez di xebitim em di xebitîn, tu di xebitî hûn di xebitin, ew di xebite[…it] ewan di xebitin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xebitîm, di xebitîn, di xebitî, di xebitîn, di xebitî, di xebitîn. Db,dûr : xebitîbûm,…bûyn,.bû,…bûn. (F) : bi xebite, bi xebitin.

**Xebxeb** (n.dar.mê) *can* Lama binî ya mirov û candaran, ko didan liser rêzbûne.

**Xec** (n.x.mê) 1. Navê jinane. 2.Evîndara siyamendîye di dastana Xec û Siyamend da.

**Xecê** (hd,gazn.dar. mê) Naznav û navê bankirinê ye jibo pîreka navê wê xec be di hêt gotin.

**Xecxecok** (n.dar.mê) 1.Core kêzeke di firit, li havînan dema balête di kevit tirî, peyda di bin. Zarok yarîyan pêra dikin û vê gotitnê di bêjin :Xecxecokê bi xecîne, tirîyê rezan bi helîne[gehîne]. 2. Canewerekê avî ye, yê reş û zere, mîna kimkimane[xemegur]. Ku navê wî di vê mamikê hatîye *mamik* :Zere ji zêrî zertire, reşe ji qêrî[yan poşîyê] reştire.

**Xefandin** (k.jn.mê) Nivandin. Xewandin.:Biçûkî bi xefîne, xewa wî di hêt. (K) bdn: ez di xefînim em di xefînîn, tu di xefînî hûn di xefînin, ew di xefîne[...it] ewan di xefînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di xefand, di xefandin. Db,dûr: xefandibû, xefandibûn. (F): bi xefîne, bi xefînin.

**Xefik** (n.x.mê) Telheka biçûke jibo girtina çûçik û mişkan ve didin.

**Xefîn** (k.jn.mê) Nivistin. Xewîn.

**Xeftan** (n.x.nêr) 1.Kurtan. 2. Kiras yan sakoyê şor ku di gehe ser gozekan.

**Xeftin** (k.jn.x.mê) Nivistin. Xewtin.

**Xelat** (n.x.nêr) 1. Diyarî.2. Navê mêr û jinane.

**Xelatdan** (k.jn.l.mê) Dema mirov xelatekî bi de êkî. : Mamostayî jiber zîrekîya wan, xelat dan qutabîyên xwe.

**Xelatkirin** (k.jn.l.mê) Xelatekî jibo kesekî ku karekê çak kirîye di kin diyarî. ;Herkesê zanînan li ser tîroristan bi de cihên havildar, dê hêt xelatkirin. (K) bn : Kirin.

**Xelek** (n.x.mê) Tiştê, şêweyê bazinî..:Zincîr ji xelekan pêk di hêt. : Filmê bîst xelekî.

**Xelekî** (hk.dar.çewa) Pora xelekî. Şêweyê xelekî.

**Xelk** (n.ndiyar.x.nêr) Bireka mirovan. Gel. Kesên ne diyar. ***Pend*** :Xelk bi çavekî, em jî bi çavekî. Ang; mirov jî wek xelkî.

**Xem** (n.x.mê) 1.Kovan. Derd. ***Pend*** :Xemên dilan na hên ser milan.***Pend*** :Xem xeman di kêşit.***Pend*** :Xem hene lê xemrevîn jî hene. ***Pend*** :Cuxîn her xema baye.ang; di vê mirov karê her bi ke çi zû yan direng. 2. Pêdivî. Erk. : Xem nake, hema evro li mal be.

**Xembar** (hk.l.çewa) Dilşikestî. Kovandar.:Jiber mirina hevalê xwe ez pir xembarim.

**Xembarî** (n.l.mê) Nexweşî. Kovan.

**Xemeba** (n.l.mê) Derdeke mirovî di girit.

**Xemegur** (n.dar.dz) ***candar*** Kimkime.



**Xemegur**

**Xemê** (hk,hd,gazn.dar.mê) Naznav û navek gazîkirinê yê pîrekane.

**Xemgîn** (hn,hk.dar.çewa) 1. Bi xem. Xembar. Kovandar. 2.Navek kurdî ye.

**Xemgînbûn** (k.jn.gl.mê) Bi xem kevtin. Posîdebûn. Dilsarbûn.

**Xemgînî** (n.dar.mê) Xembarî. Dilşikestin. Posîdeyî.

**Xemgînkirin** (k.jn.gl.mê) Posîdekirin. Dilşikandin. : Wexerkirina wî em xemgîn kirîn.

**Xemil** (n.x.mê) Rewş. Ciwanî. : Xemil a darê.

**Xemilandin** (k.jn.mê) Xweşikkirin. Ciwankirin. Rêkûpêkkirin. : Bûk xemiland, ang ; cilên xweşik li ber kirin.(K) .Bdn : ez di xemilînim em di xemilînîn, tu di xemilînî hûn di xemilînin, ew di xemilîne[….it] ewan di xemilînin. Pr : dê[bi] + Bdn. Bdb : di xemiland, di xemilandin. Db,dûr : xemilandibû, ….. bûn. (F) : bi xemilîne, bi xemilînin.

**Xemilandî** (rd.dar.çewa) Ciwankirî. Xweşikkrî. : Eve meheke bajêrê me yê xemilandîye jiber hatina cejna Newrozê.

**Xemilîn** (k.jn.x.mê) Ciwanbûn. Bi xemil kevtin. : Li biharan dol çiya di xemilin.

**Xemilkirin** (k.jn.l.mê) Xemilîn. Xemilandin. : Biharê xemil a xwe kir.

**Xemrevandin** (k.jn.l.mê) Xwe ji bîrve kirin. Xwe mijîlkirin jibo xemên xwe bi revînin. : Da bi çîn geryanekê qemî xemêd xwe piçek bi revînîn.

**Xemrevîn** (hn,hk.l.çewa) Kesê bi axivtinên xweş û şirîn xema ji bîra mirovî di bit.keyfxweş. ***Pend*** : Xem hene û xemrevîn jî hene.

**Xemrî** (hk.x.çewa) ***reng*** Rengê şîn û sor yên têkel. Mor.

**Xemsar** (hk.l.çewa) Mirovê di kar û kiryarên xo da bê xem. Ne rijd.Tembel.

**Xemsarî** (n.l.mê) Pûte nedan bi karî. Ne kirina karî yan nîvbero hêlan. Piştguh ve havêtin

**Xemsarîkirin** (k.jn.gl.mê) Karê xwe bi diristî bi rêve ne birin. : Te gelek xemsarî di karê xwe da kir, jiber hindê tu bi ser ne kevtî.

**Xemxor** (hk.l.çewa) Mirovê karî bi giringî di wergirit. Kesê xwe mandî di ket.

**Xemxwarin** (k.jn.l.mê) 1. Xem û kovan li xwe kom kirin. Xem ji xwera çêkirin. 2. kar bi rijdî wergirtin û encamdan. : Ew pir xemê ji karê xwe di xwe.

**Xemxwer** (hk.l.çewa) bn :Xemxor.

**Xen** (hk.x.çewa) Xîçên sor. : bizina xen ,ang; bizina xîçên sor li serûçavên wê.

**Xena** (n.x.mê) Keresteyeke,rengeke di por û destan di din dako sor bi bin.

**Xencer** (n.x.mê) Satoreka tîje wek şûre, bi destik û kavlane di ber şîtika xwe ra di kin. ***Pend*** :Xencer biraye, tiveng pismame. Ang ; Xencer herdem di gel mirovî daye ya desthile.

**Xendek** (n.x.mê) Tapî.

**Xendiqandin** (k.jn.dar.mê) Fetisandin. Desthefkênan.(K) bdn: ez di xendiqînim em di xendiqînîn, tu di xendiqînî hûn di xendiqînin, ew di xendiqîne[…it] ewan di xendiqînin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xendiqand, di xendiqandin. Db,dûr : xendiqandibû, …. Bûn. (F) : bi xendiqîne, bi xendiqînin.

**Xendiqîn** (k.jn.x.mê) Mirov yan lawir di bin avê de di fetisin. (K) bdn : ez di xendiqim em di xendiqîn, tu di xenciqî hûn di xendiqin, ew di xendiqe[…qe] ewan di xendiqin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xendiqîm, di xendiqîn, di xendiqî, di xendiqîn, di xendiqî, ewan di xendiqîn. Db,dûr : xendiqîbûm,…bûyn,..bû,...bûn. (F) : bi xendiqe, bi xendiqin.

**Xepare** (n.x.mê) Kolana erdê çandî bi tevir û meran, jibo zaxkirinê.

**Xeparekirin** (k.jn.l.mê) Kolana binê hişînkatî. (K) bn: kirin.

**Xepik** (n.x.mê) Tepik. Xefik.

**Xepirandin** (k.jn.mê) Xeparekirin. : Binê sêvan bi tevirî di xepirîne. (K) bdn: ez di xeprînim em di xepirînîn, tu di xepirînî hûn di xepirînin, ew di xepirîne[..it] ewan di xepirînin. PR: dêbi + bdn. Bdb : di xepirand, di xepirandin. Db,dûr : xepiradibû, …bûn . (F) :bi xepirîne, bi xepirînin.


**Xepînok** (hk.dar.çewa) bn :Xapînok.

**Xerar** (n.x.nêr) bn:Xirar.

**Xerat** (pîşn.x.dz) Dartiraş.

**Xerbend** (karn.dar.dz) 1. Kesê bi dewaran xwarin mitayî ji cihekî bo yê dî di veguhêze. 2. Bend. Reben. Xizetkar. Dîl.

**Xerçeng** (n.dar.dz) *candar* Kêvjale.




**Xerçeng(kêvjale)**

**Xeritandin** (k.jn.x.mê) Renînîn. Tiraşîn. Gogirandin. :Destikê bivir î xeritand. Ang ; hilû kir.(K) bdn : ez di xeritînim em di xeritînîn, tu di xeritînî hûn di xeritînin, ew di xeritîne[...it] ewan di xeritînin.Pr :dê[bi]+bdn. Bdb : di xeritand, di xeritandin. db,dûr : xeritadnibû, xeritandibûn. (F) : bi xeritîne, bi xeritînin.

**Xerîk** (hk.x.çewa) Mijîl. Mijûl. :Evan rojan ez xerîkim, xanî ava bi kem.

**Xerman** (n.x.mê) Cuxîn.

**Xermaşe** (n.dar.mê) Amêrekê pencpene û destikek heye, jibo pakijkirina zevîyan ji dexel û giyayên bêwic herwesa hilîkirina erdî bi kar di hêt. Binkol. Kilêb.



**Xermaşe**

**Xermaşekirin** (k.jn.l.mê) Bi xermaşeyî zevî, zer bîstan hilû û ji giyayî paqijkirin.

**Xermaşekirî** (hk.l.çewa) Erdê bi xermaşeyê hatî çêkirin. :Rezê xermaşekirî.

**Xermişandin** (k.jn.mê) bn :Xerpişandin.

**Xermoşk** (n.dar.mê) Penc. Nînok.

**Xernof** (n.x.mê) Xurnîfk.

**Xerpişandin** ( k.jn.dar.mê) Verûşandin. Zwîrikandin. Pencirîk lêdan.

**Xerpûng** (n.dar.mê) Pûng. Pîng.

**Xert** 1(hk.x.çewa) Nemana mitayî.

**Xert** 2 (n.x.mê) Amêreke, darek kivanî û divêlek qayîm, piranî ji kevilî ye, di şîşikeka tîj di alînin serê tîjê şîşikê liser dar yan depekî di danin bi destî darê kivan di hînin û di bin dako wî darî yan depî bi simin.

**Xertbûn** (k.jn.l.mê) Bi dawî htina berê daran. fêqîyê daran. :Sêv yên xert bûyn . :Tirî xertbûye?. :Gundor xert bûne. (K) bn: Bûn.

**Xertkirin** (k.jn.l.mê) Kar bi amêrê xertî kirin. :Dep xertkirin. Anko simtina darî bi amêrê xertî.

**Xerz** (n.x.nêr) Hêkên candaran yên hûrik û kom.Tov.: Xerzê spihan, xerzê nav zikê mirîşkan.

**Xerzkirin** (k.jn.l.mê) Wekî candar xerzê xwe liser dar, belg, cilik û htd di kin. :Xalxalokê xerzê xwe liser tayê darê kirîye.

**Xes** (n.x.mê) ***çandin*** Giyayekê keske, belgên wê xemildarin, bi xavî di gel zadî yan lênan di hên xwarin.



**Xes**

**Xesandin** (k.jn.x.mê) 1. Karekê nojdarîyê ye endamê guhnelîyê yê lawiran ji kar di êxin ,ku nikarit bi perit.(K) bdn :ez di xesînim em di xesînîn, tu di xesînî hûn di xesînin, ew di xesîne[…it] ewan di xesînin. PR:dê bi + bdn. Bdb : di xesand, di xesandin. Db,dûr: xesandibû, …bûn. (F): bi xesîne, bi xesînin. Hesp xesand. Nêrî xesand. 2. Çend kelan di hînin zadî ku guherîn bi kevit tama wî û ya nexweş ji nav derkeve.: Karî xesandin. Nîsk xesandin.

**Xesandî** (hk.x.çewa) 1. Candarê nêr yêhedamên guhnelîya wî hatîn ji kar xistin.2. Zadê çend kelek hatînê û tam û rengê wî hatîn gihoran.

**Xesas** (karn.x.dz) Mirovê karê xesandina candaran di ke.

**Xesasî** (karn.dn) Karê xesandina giyaneweran. Karê xesasî.

**Xest** (hk.x.çewa) ***made*** Çir. Tîr.

**Xestexane** (n.l.mê) Nexweşxane.:Xestexaneya Azadî. Xestexana mezin.

**Xesî** (n.x.mê) bn :Xesû.

**Xesok** (kar.dar.dn) bn :Xesas.

**Xesû** (n.x.mê) Dayka jinê jibo mêrî, yan dayka mêrî jibo jinê.***Pend*** : Xesûyê jibo te di bêjim, bûkê guhê xwe bi dê.ang; dema mirovî bi vêt bi awayekê ne êkser gotina xwe bi gehîne êkî.

**Xetimîn** (k.jn.x.lê) Kun, borî, lûlî û htd di hên girtin û av yan ba di nav de naçit.: Solîna cadê ya xetimî, av têra naçit. :Jêrav xetimî.

**Xew** (n.x.mê) Nivistin. ***Pend*** : Kew û xew bi hevra nabin. ang ; dema mirov karekî bike nabit guh bi de ji dest danana karek din.

**Xewar** (hk.dar.çewa) Xewte.

**Xewgeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cih yan jora xewê. Jora nivistinê.

**Xewgiran** (hk.l.çewa) Mirovê zû ji xew ra nabe. Dema xew di ke mîna mirîyane.

**Xewhatin** (k.jn.l.mê) Dema canê mirov û lawiran sist di be û niqosk di hênê, di xwazin xew bi kin. :Xewa min di hêt dê çin bi nivim.

**Xewin** (n.dar.mê) 1. Bûyerên mirovê nivistî di bînit. Hizrên mirov di xew de di bîne. ***Pend*** : Xewnên kanînan, wek tirên mahînan. ***Pend*** :Heger mirovî êk ne vêt, xewnan pêve di bînit.2. Hîvî.

**Xewindîtin** (k.jn.l.mê) 1. Mirov di xew da bûyeran di bîne.2. Leşpîsbûn.(K) bn : Dîtin.

**Xewinîn** (k.jn.l.mê) Agir xweşbûn. Agir geşbûn. : Agirê tenûrê yê xewinî.

**Xewkirin** (k.jn.l.mê) Nivistin. Mirov di nive. Razan. (K) bn : Kirin.

**Xewle** (hk.x.çewa) Nediyar. Ne xuya.

**Xewlekirin** (k.jn.l.mê) Xilwekirin. Varêkirin.

**Xewnexoş** (hk.l.çewa) Mirovê di xew da pir di livit û ji ser cihê xwe di çit.

**Xewnexweş** (hk.l.çewa) bn :Xewnexoş.

**Xewsivik** (hk.l.çewa) Mirovê bi sanahî û zû ji xew ra di bit û leşê wî sivik.

**Xewte** (hk.dar.çewa) Mirovê pir hez ji xewê di ke.

**Xewxoş**(hk.l.çewa) Mirovê li dema nivistinê bêdeng û bê bizav. : Ev zaroke gelek yê xewxoşe, ta spêdê xwe na livînt.

**Xewxweş** (hk.l.çewa) bn :Xewxoş.

**Xeyidandin** (k.jn.x.mê) Torekirin. Hêriskirin.(K) bdn: ez di xeyidînim em di xeyidînîn, tu di xeyidînî hûn di xeyidînin, ew di xeyidîne[..it] ewan di xeyidînin. Pr: dê [bi] + bdn. Bdb : di xeyidand, di xeyidandin. Db,dûr: xeyidandibû, xeyidandibûn. (F): bi xeyidîne, bi xeyidînin.

**Xeyidîn** (k.jn.x.mê) Torebûn. Hêrisbûn. Silbûn. Zîzbûn. (K) bdn: ez di xeyidim em di xeyidîn, tu di xeyidî hûn di xeyidin, ew di xeyide ewan di xeyidin.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di xeyidîm, di xeyidîn, di xeyidî, di xeyidîn. Xeyidî. Db,dûr. Xeyidîbûm,…bûyn,...bûy, ..bû,…bûn. (F) : bi xeyide, bi xeyidin.

**Xezal** (n.x.mê) *candar* Mamiz.

**Xezam** (hk.dem) *werzê salê* Payîz.

**Xezan** (hk.x.çewa) Hejar. Belingaz.

**Xezanbûn** (k.jn.l.mê) Hejarbûn. Belingazbûn.

**Xezanî** (n.dar.mê) Hejarî.

**Xezankirin** (k.jn.l.mê) Hejarkirin. Belingazkirin.

**Xezûr** (n.x.nêr) Babê mêrî jibo jinê, yan babê jinê jibo mêrî.

**Xêl** (hk.x.çewa) Vîr. Çavtirîwar.

**Xêlbûn** (k.jn.l.mê) Vîrbûn.

**Xêlî** 1 (n.dar.mê) Vîrî. Çavtirîwarî. :Xêlîya çavên wî jê di hêt.

**Xêlî** 2 (n.x.mê) Pêçeya ser ser yan milên bûkan.

**Xêve** (n.x.nêr) 1. Fêqîyê ji nû gehiştî. 2. Navê mêrane.

**Xêvekirin** (k.jn.l.mê) Xwarina fêqîyê nû gehayî.:Başbû min evsale jî hijîr xêve kirin. (K) bn: Kirin.

**Xêvzan** (karn.dar.dz) Mirovê bi pêşeroja xelkî di zane. Falveker.

**Xêz** (n.x.mê) Xîç. Hêl.

**Xêzan** (n.x.mê) Mal.Malbat. Ninemal :Xêzana me ji deh kesan pêk dihêt.

**Xêzandar** (hk.dar.çewa) Xwedî xêzan. Xudan malbat. Zelamê xêzandar;ang, zelamê xudan jin û zarok.ê

**Xêzkişandin** (k.jn.l.mê) Xîçkêşan.

**Xifîtan** (n.x.dz) Yê ko kelûpelan di kirit. Bikir.

**Xiftan** (n.x.mê) Élekên jinan û mêran.

**Xilav** (n.dar.mê) Xwelî.Xolî.

**Xilinkî** (hk.x.çewa) Ji gehçûna hestî.Xilyayî.

**Xilinkîbûn** (k.jn.l.mê) Ji gehçûna hestî. Xilyan. :Dest xilinkî bû. (K) bn: Bûn.

**Xilinkîn** (k.jn.x.mê) Xilyan. Ji gehçûn. :Destê lîstikvanî yê xilinkî.

**Xilole** (hk.x.çewa) Vala. :Erdê xilole.

**Xilolebûn** (k.jn.l.mê) Valayî di nava erdekî da çêbûn.

**Xilolekirin** (k.jn.l.mê) Valayî di cihekî da çêkirin.

**Xilt** (k.x.mê) *derd* Core derdeke çerim ê mirovî kul di bit.

**Xilxile** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê pirî ber û kevir.

**Xilwekirin**(k.jn.l.mê) Mirov jibo yekî bi tenê bi axivit. Varêkirin. (K) bn: Kirin.

**Xilyan** (k.jn.x.mê) Xarbûn yan êşaneka mezin, egera kevtinê yan gurzekî, li dest, ling, tibil û htd, bê ko bi şikêt. Ji gehçûn.

**Ximav** (n.dar.mê) Şileyek rengîne, şîn, sor, kesk, zer û htd di kin qeleman jibo nivîsandinê. Rengav.

**Ximavdank** (n.gl.mê) Amanê têda paraztina ximavê.Rengavdan.

**Ximxim** (n.dar.mê) Kun û perên difina mirovî.

**Ximximbeş** (hk.gl.çewa) Mirovê kunên kepîya wî di vekirî û beş.

**Xinavke** (n.x.mê) Ristik. Stovank.

**Xinzirîn** (k.jn.x.mê) Torebûn. Azirîn. Hêrisbûn. : Kitik xinzirî. (K)bdn: ez di xinzirim em di xinzirîn, tu di xinzirî hûn di xinzirin, ew di xinzire[....it] ewan di xinzirin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : ez di xinzirîm em,hûn,ewan di xinzirîn, tu,ew di xinzirî.Db,dûr : ez xinzirîbûm, em xinzirîbûyn(bûn), tu xinzirîbûy hûn xinzirîbûn, ew xinzirîbû. (F) : bi xinzire, bi xinzirn.

**Xir** (hk.x.çewa) 1. Girovir. :Gundor xire. :Tepika yarîyan xire. 2. Hemû. : Qutabîyên pola pêncê xir serkeftin.

**Xirab** (hk.x.çewa) Nebaş. Neçak. Pîs. Gemar.Herifî. :Karê xirab şerim û belaye.

**Xirabbûn** (k.jn.l.mê) Pîsbûn. Wêranbûn. Genîbûn. :Zadê xirab bûy. (K) bn: Bûn.

**Xirabî** (n.dar.mê) Karê ne rewa. :Xwe ji xirabîyan dûr bêxin!.

**Xirabkirin** (k.jn.l.mê) Pîskirin. Herifandin. ***Pend*** :Mala xo bi destên xo xirab di kin. (K) bn: Kirin.

**Xirandin** (k.jn.l.mê) 1. Ji rê derkevtin. Ji rêya rast derêxistin. 2.Rakêşan. (K) bdn: ez di xirînim em di xirînîn, tu di xirînî hûn di xirînin, ew di xirîne[…it] ewan di xirînin.Pr: dê[bi] + bdn. Bdb: di xirand, di xirandin.Db,dûr: xirandibûm,xirandibûyn,xirandibûy,xirandibû, xirandibûn. (F) : bi xirîne, bi xirînin.

**Xirar** (n.x.nêr) Ferdê mezin. Gûnîyê mezin.

**Xirbûn** (k.jn.l.mê) 1. Civîn. Kombûn. :Gundî li mala melayî xir bûne.2. Girovirbûn. :Girika hevî di destan da xir bû.(K) bn: Bûn.

**Xirek** 1 (hk.x.çewa) Hilî. Pûç. Mehyayî. :Bixûyê xirek.

**Xirek** 2 (hk.çewa)Hemû. Gişt.

**Xirekbûn** (k.jn.l.mê) Mehyan. :Didannkên birxûyî yên xirek bûyn. (K) bn: Bûn.

**Xirekkirin** (k.jn.l.mê) Mirov didankên tiştekî bi mehînit. Jê bi bit.(K) bn : Kirin.

**Xirepişan** (n.dar.mê) Xwe lêkdan, nemaze xwe lêkdana pişîkan.

**Xirexir** (n.l.mê) Xirxir.

**Xirexirkirin** (k.jn.gl.mê) Xirxirkirin.

**Xirê** (hk.hd.dar) Naznav û bankirina jina xir.

**Xirik** (n.dar.mê) Xelek. Gîx.

**Xirink** (hk.x.çewa) Ciwan. Rind. :Pîrekeka xiring.

**Xirîk** (n.x.mê) Girîyeka bi zêmar.

**Xirîkçûn** (k.jn.l.mê) Girîya bi xirîk. : Ev jine ya di xirîk çûyî ji girîyan da.(K) bn: Çûn.

**Xirkirin** (k.jn.l.mê) 1. Komkirin. Civandin. :Şivanî pez li bin daran xir kir.2. Girovirkirin. :Girikêt xwe xir bi ke.(K) bn: kirin.

**Xirmexirm** (n.l.mê) ***deng*** Dengê devê mirov û candaran dema xwarineka req di xon. :Xirmexirma devê bizinê ye ya nanê hişk di xwe.

**Xirmiçandin** (k.jn.mê) Bi pencan zîrikandin. Rûşandin.(K) bdn: ez di ximiçînim em di xirmiçînîn, tu di xirmiçînî hûn di xirmiçînin, ew di ximiçîne[...it] ewan di xirmiçînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: di xirmiçand, di xirmiçandin. Db,dûr: xirmiçandibû, xirmiçandibûn. (F): bi xirmiçîne, bi xirmiçîne.

**Xiro** (hdgaz.nêr) Naznav û bangkirina peyayê xir.

**Xirosk** (k.x.nêr) Dîkil. Kirosk.

**Xirp** (hk.x.çewa) Qelew. Pit.

**Xirpek** (hk.dar.çewa) Erdê kêlayî. Zevîya kolayî. Xirmaşekirî.

**Xirpik** (n.x.mê) ***can*** Kirkirok.

**Xirpin** (hk.x.çewa) Qelew. Girovir.

**Xirş** (hk.x.çewa) Bêber. Stewir. : Bahîva nav rezê me ya xirşe.

**Xirşbûn** (k.jn.l.mê) Darûbarên nexweş di bin û êdî berî nagirin.

**Xirtik** (n.dar.mê) ***derd*** Koxka dengê xirtexirtê jê di hêt. Xendxendok.

**Xirtxirt** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê vekolana axê. : Xirtxirta mişkî ye di bin dîwarî ve.

**Xirtxirtkirin** (k.jn.l.mê) Xirtxirtê ji erdî di hîne.(K) bn: Kirin.

**Xirvebûn** (k.jn.gl.mê) Dubare li hev civyan. (K) bn: Bûn.

**Xirvekirin** (k.jn.gl.mê) Carek din li hev xir kirin. :Gundî dubare xirvebûn.(K) bn: Kirin.

**Xirxal** (n.dar.mê) 1. Tayên tirombêlan. 2. Bazinê lingan.

**Xir<u>xir</u>** (n.l.mê) ***deng*** Dengê ji dev û difinên mirovê nivistî der di kevit, mîna xirêna kitikan.

**Xir<u>xire</u>** (hk.dar.çewa) Mirovê gir,  lêkdayî û pan. :Lewend zelamek xirxireye.

**Xirxir<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Mirovê nivistî yê xirxir jê di hêt.

**Xir<u>yan</u>** (k.jn.x.mê) Di serda çûn. Ji rê derkevtin.

**Xis<u>tin</u>** (k.jn.x.mê) Êxistin.

**Xişan<u>din</u>** (k.jn.dar.mê) Li erdî kêşan. Xirandin. (K) bdn: ez di xişînim em di xişînîn, tu di xişînî hûn di xişînin, ew di xişîne[….it] ewan di xişînin.Pr: dê [bi] + bdn. Bdb: di xişand, di xişandin. Db,dûr: xişandibû,xişandibûn. (F): bi xişîne, bi xişînin.

**Xi<u>şan</u>** (k.jn.x.mê) Liser erdekî vezelyan. Tehisîn.

**Xi<u>şên</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê belg û daran ji lingên mirov û lawiran, yan livîna adîyan di hêt.: Te guh li xişêna marî heye!.

**Xişên<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Dengê xişênê ji xwe anîn, hatin. (K) bn :Hatin.

**Xi<u>şîm</u>** (hk.x.çewa) Nezan. Ne şareza.

**Xiş<u>kok</u>** (hk.dar.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik. :Keçeka xişkok. :Xortekê xişkok.

**Xi<u>şok</u>** (hk.dar.çewa) Candarên Xwînsar hêkker, yan di zên û xwe li edrî di xişînin, wek mar û margîskan.

**Xiş<u>te</u>** (n.x.mê) Lîsteyeka bi xîçan û malikan  berhevkirîye jibo zanyarîyan.


**Xiş<u>xiş</u>** (n.dar.mê) ***deng*** Xişên.

**Xişxiş<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Lawir û mirov xişênê di kin. (K) bn: Kirin.

**Xişxi<u>şok</u>** (n.l.mê) Alaveke zarok di destên xwe di girin jibo tenabûnê ko bi hijandinê dengê xişxişê jê di hêt.

**Xiş<u>yan</u>** (k.jn.x.mê) Li ser erdî hatin xişandin. : Berek ji kendalî xişya.

**Xi<u>yar</u>** (n.x.nêr) Aro.



**Xiyar**

**Xizan** (hk.x.çewa) 1.Nezan. Xişîm. :Xortê xizan. :Jina xizan. 2. Hejar.

**Xizanbûn** (k.jn.l.mê) Hejarbûn. (K) bn: Bûn.

**Xizanî** (n.dar.mê) 1. Hejarî.2. Nezanî. :Derdê xizanîyê pir girane.

**Xizar** (n.x.nêr) Mişar.

**Xizêm** (n.x.mê) Parçe zêreke mîna liban yan guharan jin li poz[difin] a xwe di kin. Qenefin.

**Xizim** (n.x.nêr) 1. Birayê yan mirovên jinê jibo mêrî yan mirovên wî. Bîra. 2. Kesûkar.

**Xizîne** (n.x.mê) Defîne. Gencîne.

**Xizîran** (hk.dem, n.x.mê) Meha yekê ji havînê. Cehzeran. ***Pend*** :Xizîran xinzirî, çi tişt xwe li ber na girî, ji bilî xurnîf û mêwa tirî.

**Xizmatî** (n.dar.mê) Mirovantî. :Me di gel wan xizmatî ya kirî.

**Xizmet** (n.x.mê) Alîkarî. Xebat. :Xizmeta te na hêt ji bîr kirin.

**Xizmetkar** (karn.l.dz) Kesê xizmetê di ke.

**Xizmetkirin** (k.jn.l.mê) Alîkarîkirin. Xebatkirin. Xebitîn. :Kesê ximetê bi ket li nik xelikî xweşdivî ye.

**Xizxizok** (n.dar.mê) ***derd*** Bêhinkurtkî.

**Xîç** (n.x.mê) Hêl. Gîx. :Xîça firokeyan. Xîça marî.

**Xîçbûn** (k.jn.l.mê) Xîç di kevin cihekî sedema bi hev kevtin yan lêk xişyanê. (K) bn: Bûn.

**Xîçik** 1 (n.dar.mê) Xîça biçûk.

**Xîçik** 2 (n.dar.nêr) Benîşt. Qaçik.

**Xîçkêş** (n.l.nêr) Alaveke, ji dep, lastîk, asin û htd hatî diristkirin jibo kêşana xîçên rast liser erd yan kaxezan. Raste.

**Xîçkêşan** (k.jn.l.mê) Çêkirina xîçan. Çêkirina xîçikan bi xîçkêşan.(K) bn: Kêşan.

**Xîçkirin** (k.jn.l.mê) Mirov xîçekê li cihekî bi kêşit. (K) bn: Kirin.

**Xîsên** (n.dar.mê) ***deng*** Dngê kelaştin yan birîna leşî û tiştan. : Kêrek li tilîya xwe da xîsên jê hat.

**Xîsk** 1 (n.x.mê) Îsk.

**Xîsk** 2 (hk.cih) Cih, gir , erd ên xîzî.

**Xîskandin** (k.jn.mê) Xîst hatin mirovî. Îskvedan.(K) bdn: ez di xîskînim em di xîskînîn, tu di xîskînî hûn di xîskînin, ew di xîskîne[....it] ewan di xîskînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di xîskand, di xîskandin. Db,dûr: xîskandibû, xîskandibûn. (F): bi xîskîne, bi xîskînin.

**Xîskîn** (k.jn.mê) Xîsk berdan. Îsk hatin mirovî.

**Xîskkişandin** (k.jn.l.mê) Îsk vedan.îsk hatin.

**Xîvet** (n.x.mê) Çadir. Kon. Reşmal.

**Xîvetvedan** (k.jn.gl.mê) Hildan û berhev kirina xîvetê jibo bi kar anînê.

**Xîz** (n.x.nêr) Corekê hûrik yê axa ber avane, jibo avayîyan di gel çîmentoyê têkel di kin.

**Xîzik** 1(n.dar.mê) Xîçik. Gîx.

**Xîzik** 2 (n.dar.nêr) Beten, gir,erdê bi xîz. Xîsk.

**Xîzikkişandin** (k.jn.l.mê) Xîçkêşan.

**Xîzkirin** (k.jn.l.mê) Xîzî li erd, cade, hewş ban û htd di kin. (K) bn: Kirin.

**Xo** (cihn) *rêzman* Hebûn.Xwe. Ez bi xo, Here mala xo. Bo xo bi xwîne.

**Xobixo** (hk.dar.çewa) Ser bi xwe. Tenê.

**Xodîk** (n.dar.mê) Qodîka mirov xwe têra di bînit. Neynik.

**Xol** (n.x.mê) Zandor.

**Xolgeh** (hk.cih,n.x.mê) bn:Xulke.

**Xolî** (n.x.mê) Arê sipî ye ji encama şewitîna tiştan peyda di bit. Xwelî.

**Xolîdank** (n.dar.mê) Amaneke xolî û bermayîyên cigaran tê di ken.

**Xonçe** (n.x.mê) Pijkovk. Pişkvk

**Xopan** (hk.x.çewa) Wêran. Kavil. Çam. Şikestin. . :Paş xopana sala 1976 ew peyda bûye.

**Xopanbûn** (k.jn.l.mê) Kavilbûn. Wêranbûn.

**Xopankirin** (k.jn.l.mê) Kavilkirin. Wêrankirin. Herifandin. Erdhejê gun xopan kir.

**Xor<u>ak</u>** (n.x.mê) Xwarin.

**Xort** (hk.x.çewa) Genc. Law. Cihêl.Peyt. : Ew xortekê hêja ye. :Ha xorto eve tuyî?. *Pend* :Ava xortan serevraze. ang; Karînên mirovê xort di bê tixûbin.

**Xorta<u>nî</u>** (n.dar.mê) Cihêlî. : Min her ji xortanîya xwe hez ji geryanê di kir.

**Xort<u>xapînok</u>** (hk.l.çewa) Keça bi cil û livînên xwe yên direw û taybetî, bala xortan di kişîne.

**Xoş** (hk.x.çewa) Bi tam. Balkêş. Dilveker. Xweş. Evro rojeka xoşe. :Xwarineka xoş ji mera çêke.

**Xo<u>şav</u>** (n.l.mê) 1.Av û mêwîjan têkel dikin ta tama wê xweş û şirîn di be. 2.Ava fêqî.Doşav.

**Xoş<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Bi tam bûn. Dilvekerbûn. Tenabûn. Lêborîn.

**Xoş<u>divî</u>** (hk.l.çewa) Mirovê şirîn ko hemû kes hez jê di kin.Xoştivî.

**Xoşe<u>wîst</u>** (hk.l.çewa) Xoşdivî. Xoştivî.

**Xoş<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Mirov xwarinekê xoş çê bike. Mirov cihekî, dîwanekê, malekê û htd bi rewş bêxe. :Bajêrvanîyê gundê me gelek xoşkirîye paş av û kareb gehandînê.

**Xox** (n.x.mê) *fêqî* Şeftalû.



**Xox**

**Xoz<u>ge</u>** (pêrb.slv.xoz) bn :Xozî.

**Xo<u>zî</u>** 2 (pêrb) *rêzman* Alavê hez û xewinan. Xwezî.

**Xo<u>zî</u>** 1 (n.x.mê) Tif. : Ji tirsan xozîya xo daqurtand.

**Xu<u>da</u>** (n.x) Xudanê erd û esmanan. Ezdan. Xweda.

**Xu<u>dan</u>** (n.x.dz) 1. Xwedê. 2. Xwedîyê kar, mal, rez, bax û htd.

**Xudan<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Sexbêrîkirin. Çavê xwe danê. Perwedekirin. Xwedîkirin. Candar xudankirin. Zarok xudanirin. (K) bn : Kirin.

**Xuda<u>yî</u>** (hk.dar.çewa) Kar yan bûyera ji xudê ye û bêy karînên mirov di bit. : Mirin karek xudayî ye çi bi destê mirovan nîne.

**Xu<u>dê</u>** (n.x) Xuda. Xweda.

**Xudîk** (n.l.mê) bn :Xodîk.

**Xuh** (n.x.mê) Aveka tam swîre jiber westanê û germê,ji giyanê mirovî der di keve. : Bi xuha enîyê, zarokên xwe xudan di ket.

**Xuhdan** (k.jn.l.mê) Leşê mirovî xuhê der di ke. :Ezê xuhdayî me. : Xuh da. (K) bn: Dan.

**Xulam** (pîşn.x.nêr) Xizmetkarê li nav malan kar dike. ***Pend*** :Xulamên axa, her axane.ang; yê têkelîya mirovên mezin bi ket, wek wane.

**Xulamînî** (karn.dar.mê) Karê xulaman.

**Xulke** (n.x.mê) Yekeyeka demîye ji 60 çirkeyan pêk di hêt. Her demhijmêrek 60 xulkeye.

**Xumalî** (hk.l.çewa) Pertal, xwarin, cilik ên li mal di hên çêkirin. Rûnê xumalî. Rûnê pezî yê ko li mal di hêt kirin.

**Xumên** (n.x.mê) ***deng*** Dengê top û tivengan dema li çiyan deng ve di det.

**Xumîn** (n.x.mê) bn:Xumên.

**Xumxum** (n.dar.mê) Top.

**Xunav** (n.dar.mê) 1. Çipikên ava spêdeyan liser gul û giyayî dirist di bit. 2. Navê jinane.

**Xunavgirtin** (k.jn.l.mê) Xunav liser gul û giyayî peyda bûn. :Xunavê belgên gula girtin. (K) bn: Girtin.

**Xunçe** (n.x.mê) bn:Xonçe.

**Xundin** (k.jn.x.mê) Vexwandin. Daxazkirin. : Wan gundî xundine jibo şahîya lawê xwe.

**Xundî** (hk.dar.çewa) Xandî.

**Xunivîn** (k.jn.x.mê) Barîna barana hûrik. Xunav barîn.

**Xunkar** (karn.dar.dz) Paşa. Kiral.

**Xur** (n.x.mê) Xuran.Xuryan.

**Xuran** (k.jn.x.mê) Hesteke leşê mirovî pêdivî bi gemirandinê di bit. Xuryan. (K) bdn: ez di xurim em di xurîn, tu di xurî hûn di xurin, ew di xure[….it] ewan di xurin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xuram,di xuran, di xuray, di xura. Db,dûr : xurabûm, …bûyn, bûy, bû, ..bûn. (F) bi xure, bi xurin.

**Xurandin** (k.jn.l.mê) 1. Mirov xwe yan yekî di xurînit. 2. Qayîlkirin. Kehîkirin. (K) bdn : ez di xurînim em di xurînîn, tu di xurînî hun di xurînin, ew di xurîne[….it] ewan di xurînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xurand, di xurandin.Db,dûr : xurandibû,xuradibûn. (F) bi xurîne, bi xurînin.

**Xurçik** (n.dar.mê) Mêdek. Buxçik. Cihork.

**Xurek** (n.dar.mê) Xwarin. Zad.

**Xurekpêj** (n.l.dz) Kesê xurekê di lênit.

**Xurekxane** (hk.cih,n.l.mê) Jora xwarin lê dihêt lênan. Xwaringeh.

**Xurist** (n.l.nêr) Tiştê bi xwe werarê di kit bê destkarî ya mirovan. Xweza.

**Xuristî** (hk.l.çewa) Xwezayî.

**Xurî** (hk.x.çewa) Sade. Bi tenê. Peyva xûrî, mîna : ser, dar, Aza, bira û htd. rûnê xurî.

**Xurîk** (n.dar.pirîn) Derdeke pirsik li leşê mirovî di hên û cihê wan wek pinîyan di mînin.

**Xurîn** (k.jn.x.mê) 1.Bi dengek bilind bangkirin. Gazîkirin. Lê heytan. 2. Dengê şêran. 3. Xuryan. (K) bdn: ez di xurim em di xurîn, tu di xurî hun di xurin, ew di xure[…it] ewan di xurin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xurîm, di xurîn, di xurî, di xurîn. Xurî. Db,dûr :xurûbûm, …bûyn,..bûy,.. bûn,…bû,….bûn. (F) :bi xure, bi xurin.

**Xurme** (n.x.mê) *fêqî* Core fêqîyeke bi darên qespan ve di hêt.

**Xurmerûn** (n.l.mê) Xwarineke xurmeyê di rûnî de di qelînin.

**Xurnî** (n.x.mê) Taştê. Têşt.

**Xurnîfk** (n.x.mê) *tiraş* Giyayekê tiraşe, bi stirîye, berê wî bi hişkî di hêt hêran û xwarin.

**Xurnîk** (n.x.mê) bn :Xurnîfk.

**Xurt** (hk.x.çewa) Bi hêz. Peyt. Çeleng. :Mirovê xurt. :Hespê xurt.

**Xurtbûn** (k.jn.l.mê) Zîrekbûn. (K) bn : Bûn.

**Xurtî** (n.dar.mê) Zorî. Kotekî.

**Xurtîkirin** (k.jn.l.mê) Zorî li xelkî kirin. : Ez hîvî ji te di kem xurtîyê li min neke!. (K) bn : Kirin.

**Xurtkirin** (k.jn.l.mê) Bi hêz êxistin. Pêşêxistin. Dijwarkirin : Divê kurd xebata xwe xurt bikin.(K) bn: Kirin.

**Xuryan** (k.jn.x.mê) Xuran.

**Xusar** (n.dar.mê) Texeka sipî ya tenik ji qerîsê, li spêdeyên direnge payîz, yan bihar û zivistana li erd û ser giyayî çê di bit.

**Xuşîmank** (hk.dar.çewa) Zarokê xweşik. Sipehî.

**Xuşînk** (hk.dar.çewa) Sipehî. Rindik.

**Xuşk** (n.x.mê) Xweh. Xwîşk.

**Xuşkok** (hk.dar.çewa) Rind. Ciwan. Xweşik.

**Xuşkokbûn** (k.jn.l.mê) Ciwanbûn.(K) bn: Bûn.

**Xuşkokkirin** (k.jn.l.mê) Ciwankirin. (K) bn: Kirin.

**Xuwa** (n.x) Xudê. Xuda.

**Xuya** (hk.x.çewa) Diyar. Berçav.

**Xuyabûn** (k.jn.l.mê) Diyarbûn. Aşkerabûn. :Eve tu li kû derêyî, çima xuya nabî ?.(K) bn: Bûn.

**Xuyakirin** (k.jn.l.mê) Diyarkirin. Aşkerakirin. :Tu çima xuya na kî?.(K) bn: Kirin.

**Xuyanî** (hk.dar.çewa) Xelkê mirovî bi xwe. Br× Biyanî.

**Xû** (n.x.mê) Sinc. Rewişt.

**Xûlî** (n.x.mê) Xolî.

**Xûlîpêwerbûn** (k.jn.gl.mê) Çamek hatin serê mirovî.Xwelîpêwerbûn.

**Xûlîpêwerkirin** (k.jn.gl.mê) Çam bi serî înan. Xwelîpêwrkirin.

**Xûlîser** (hk.l.çewa) Mirovê berataf. Mirovê derd bi serî hatîn.

**Xûn** (n.x.mê,hk.x.çewa) 1.Şileyeke rengê wê sore di nav leşê mirov û giyandaran da heye.2. Gelek bi biha. Gelek giran.

**Xûnberdan** (k.jn.l.mê) Mirov xûnê ji leşê xwe ber di din. (K) bn :Dan.

**Xûnkar** (n.l.dz) Dirinde. Hov.

**Xûnmêj** (karn.l.dz) Kesê xûna xelkî di mêje. Hov. Dirinde.

**Xûnmêtin** (k.jn.l.mê) Xûnê di mêjin. Hovitî. (K) bn: Mêtin.

**Xûnrêj** (karn.l.dz) Hov. Xûnmêj. Dirinde.

**Xûnrêjtin** ,..rêtin(k.jn.l.mê) Mirovên hov xûnê di rêjin. (K) bn: rêtin, rêjtin.

**Xûşk** (n.x.mê) Jin yan keç a heman daybabên mirovî. Xweh. Xuşk.

**Xûzî** (pêrb.alv.xoz) ***rêzman*** Peyveke jibo hîvî û daxazan bikar di hêt.:Xûzî ji xwedê ra ez niha li Kurdistanê bama.

**Xûzîka** (pêrb.alv.xoz) ***rêzman*** Xûzî.

**Xwakurk** (hk.cih, n) Çîyayeke li Kurdistanê.

**Xwandin** (k.jn.x.mê) Mirov nivêsînê di zanit. Şiyana kitêb xandinê.xandin. xwendin. Xandin. (K) bdn: ez di xwînim em di xwînîn, tu di xwînî hun di xwînin, ew di xwîne[…it] ewan di xwînin. Pr : dê[bi] + bdn. Bdb : di xwand, di xwandin. Db,dûr: xwandibû,…bûn. (F) : bi xwîne, bi xwînin.

**Xwandingeh** (hk.cih,n.dar.mê) Xandingeh.

**Xwarin** (k.jn.x.mê) Dema mirov zadekî di ket di devê xweda bi didanan di hêrit û di çit nava zikî. Zad. (K) bdn: ez di xwem em di xwen, tu di xwey hûn di xwen, ew di xwe[xwet] ewan di xwen. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb : di xwar[xwer] di xwarin[xwerin]. Db,dûr : xwerbû, ….bûn. (F) : bi xwe, bi xwen.

**Xwaringeh** (hk.cih,n.dar.mê) Xaringeh. Xurekxane. . :Em sibe li xwaringehê dê firavînê xwen.

**Xwarinxane** (hk.cih,n.dar.mê) Xurekxan

**Xwarzî** (n.x.dn) Xarza. :Kurê, Keça xwîşkê.

**Xwastek** (n.dar.mê) Daxazî. Pêdivî. :Xwastekên me hemû bi cih hatin.

**Xwastin** (k.jn.x.mê) Xastin. Xaztin. Xwestin. :Tu çi di xwazî ?.

**Xwastî** (hk.dar.çewa) Keça hatî xwaztin û di dezgirê da. :Daxazkirî.

**Xwazgînî** (n.dar.pir) Xazgînî.

**Xwe** (cihn) Xo. :Min ji xwe ra tu kar ne kirin. Xwe mezin ne ke !.

**Xwebîn** (hk.l.çewa) Mirovê gelekê bo xwe di danit. Ji xwe piştrast.

**Xwecih** (hk.l.çewa) Mirovê cihek hebe jibo vehewyanê. Akincî. :Ez li Duhokê xwecihim.

**Xwecihbûn** (k.jn.gl.mê) Akincîbûn. Vehewyan.

**Xwecihî** (n.l.mê) Binecihî. :Xwecihbûn.

**Xwecihkirin** (k.jn.gl.mê) Akincîkirin. Binecihkirin. :Deshelatê xelik li akincîgehan xwecihkirin.

**Xwedan** (n.l.dz) Xudan.

**Xwedanîn** (k.jn.l.mê) Xwe kêmkirin. :Ji ya xwe hatin xwar. Nabe em xwedanînan jibo dujminî bi kin.

**Xwedayî** (hk.dar.çewa) Tiştê yan bûyera bi ferman û heza xwedê rû di dit.

**Xwedeçûn** (k.jn.l.mê) Bêhoşbûn. Jibîrveçûn. :Jiber bêhin a dermanan nexweş bi xwe da çû. (K) :Çûn.

**Xwedê** (n.dar) Xudê. :Xwedê alîkarê me gişka be. :Xwedê zaroyên te bi hêlit.

**Xwedênas** (hk,n.l.dz) Dîndar. Oldar. :Mirovekê xwedênas.

**Xwedênenas** (hk,n.gl.dz) Bêdîn. Bêbawer.

**Xwedî** (n.dar.dz) 1.Xudan.2. Bi. : Xwedî ; namûs, bext, mal, zaro, jin, milk, rez,û htd.

**Xwedîbext** (hk.l.çewa) Mirovê dilpak. Dilsax. Bi bext. Rr×Bêbext.

**Xwedîbûn** (k.jn.l.mê) Xudanbûn. (K) bn : bûn.

**Xwedîderkevtin** (k.jn.gl.mê) Li karekî yan dozekê xwedî derkeve ,ang; berpisyarî ya wî liser milên xwe danan. :Divê em li ziman û çanda xwe xwedî derkevin. (K) bn: Derkevtin.

**Xwedîkirin** (k.jn.l.mê) Xudankirin. :Wan ji xwe ra pez xwedî di kirin û me bizin. (K) bn: Kirin.

**Xwedîtin** (k.jn.l.mê) Rolê xwe dîtin. Çewayîya di xwe gehiştin. : Tu çewa xwe di bînî, dê karî serkeftinê bi dest xwe ve bihînî?. :Xwezî min tucaran weha xwe ne bi dîta. (K) bn : Dîtin.

**Xwedînamûs** (hk.l.çewa) Mirovê xudan rûmet. Bi namûs. Sincdar.

**Xwefiroş** (hk.l.çewa) Mirovê xwe jibo pare û malê di firoşit dujminî. Kirêgirtî.

**Xweger** (hk.l.çewa) Alavên bi xwe kar di ken. Otumatîk. Demhijmêra xweger. Tirombêla xweger. Çekê xweger.

**Xwegirtin** (k.jn.l.mê) Xwe di ber karî girtin. Berxwedan. Xweragirtin. Liser pêyan rawestan.

**Xweh** (n.x.mê) Xuşk.

**Xwehatin** (k.jn.l.mê) Hişyarbûn. Hiş hatin serî.

**Xwehebûn** (hk.l.çewa) Yê gelekê bi xwe di danit û xelkê din tune. Ezî.

**Xwekujtin** (k.jn.l.mê) Dema mirovek xwe di kuje.

**Xwekuj** (hk.l.çewa) Kiryarên xwe kujtinê.

**Xwelêkdan** (k.jn.gl.mê) 1. Bevçûn. 2. Xwe berhevkirin jibo karekî. Xwe peytkirin.: Emê xwe lêk di din dê sube herîn seredanekê.

**Xwelî** (n.x.mê) Arikê bermayî yê sotina daran. Xolî. *Pend* :Çav li deran, xwelî ya seran.

**Xwelîdank** (n.dar.mê) Xolîdank.



**Xwelîdank**

**Xwelîpêwerbûn** (k.jn.gl.mê) Atafek yan çamek bi serê yekî bi hêt. : Babê wî yê mirî xwelî ya bi serî wer bûy. (K) bn : pêwerbûn, bûn.

**Xwelîpêwerkirin** (k.jn.gl.mê) Weke dujminek belayekê bi serê mirovî bi hînit. (K) bn : Kirin.

**Xwemalî** (hk.l.çewa) Xumalî.

**Xwenas** (hk.l.çewa) Ji qinêt.Bi rûmet. Rêzdar. Şerim ji xwe kirî. Xwedî malbat. Ji malan.

**Xwenasîn** (k.jn.l.mê) Xwe ji bîr nekirin. Ji rê der ne kevtin. (K) bn: Nasîn.

**Xwenaskirin** (k.jn.gl.mê) Xwenasîn. (K) bn: Kirin.

**Xwendegeh** (hk.cih,n.dar.mê) Xwandingeh. Xandingeh.

**Xwendekar** (karn,l.dz) Qutabî.

**Xwendevan** (hk.dar.çewan) Mirovê xwendinê di zanit.

**Xwendin** (k.jn.x.mê) Xwandin. Xandin.

**Xwendingeh** (hk.cih,n.dar.mê) Dibistan. Xandingeh.

**Xwendî** (n.x.dn) Xundî. Xandî. Mêvan.

**Xwenenas** (hk.l.çewa) Xwe ji bîr kirin. Nivşê xwe ji bîr kirin. Xwefirotî.

**Xwenîşadan** (k.jn.l.mê) Dema bireka mirovan di rijin ser cade û kolanan daxaza gihorîn û mafên xwe di kin bi gtin û bilindkirina paroleyan. Îşîkkêşan.

**Xweparaztin** (k.jn.l.mê) Xwe ji derd, bela û karên nerewa dûrxistin.

**Xweperest** (hk.l.çewa) Mirovê her tişt tinê jibo xwe bi vêt. Ezokî. Ezî.

**Xwepêşandan** (k.jn.gl.mê) Xwenîşadan.

**Xweragir** (hk.l.çawa) Xwedî bawerî. Bi hêz. :Pêşmergeh xweragire.

**Xweragirtin** (k.jn.l.mê) Dema mirov bi karit li nexweşî û deravên teng da hebûna xwe bi parêzit.

**Xwere** (hk.dar.çewa) Mirovê gelek xwarinê di xwe. ***Pend*** :Kereye, xwereye, nekere, dilkesere.ang; mirovê xwe mandî bike, dê berê renca xwe bi xwe.

**Xweredîtin** (k.jn.gl.mê) Wekî mirovî bawerî bi karînên xwe hebe, ko dê şêt karekî encam bi de. :Ez di xwere di bînin evî kevirî hilgirim.

**Xwerist** (n.l.mê) bn :Xurist.

**Xweristî** (hn.l.çewa) Xuristî. Xwezayî.

**Xweser** (hk.l.çewa) Mirov yan tiştê ne girêdayî tu kesan. Serbixwe. Xuser.

**Xwestek** (n.dar.mê) Daxaz. Pêdvî. Hezkirin.

**Xwestik** (n.dar.mê) Keça hatî xwestin. Xaztî. Dezgir.

**Xwestin** (k.jn.x.mê) Xazîn. Xaztin.

**Xweş** (hk.x.çewa) Xoş.

**Xweşav** (n.l.mê) bn :Xoşav.

**Xweşbîn** (hk.l.çewa) Geşbîn.

**Xweşbûn** (k.jn.l.mê) Bi tam kevtin. Tenabûn. Lêborîn. Azadkirin. (K) bn : Bûn.

**Xweşik** (hk.dar.çewa) Rindik. Ciwan. Bedew.

**Xweşî** (n.dar.mê) Tenahî. Azadî. Tamxweş.

**Xweşkirin** (k.jn.l.mê) Tenakirin. Başkirin. Bi tam êxistin.: Cihê xwe xweş ke. :Jîyana xwe xweş kir.

**Xweşmêr** (hk.l.çewa) Mêrçak. Mêrxas. Xoşmêr. Camêr.

**Xweşmêrî** (n.l.mê) Zîrekî. Mêrçakî. Mêranî. :Xweşmêrîya xwwe li def bêdeshelatan diyar di ke!.

**Xweşxweşk** (n.l.mê) Tiştên xweş. Gotinên xweş.

**Xwexwetî** (n.dar.mê) Xuyatî.

**Xweyî** (n.x.nêr) Xudan. Xwedî.

**Xweyîguneh** (hk.l.çewa) Gunehbar. Gunehkar.

**Xweyîhiş** (hk.l.çewa) Hişyar.

**Xweyîkulfet** (hk.l.çewa) Zelamê bi jin. Mêrê xwedî jin.

**Xweza** (n.l.mê) Xurist.Xwerist. :Xwezayê Kurdistanê gelek ciwane.

**Xwezî** (pêrb) ***rêzman*** Alavê xozîyê. Xozî. ***Pend*** :Bi xwezîyan, na gehî cotê kezîyan. Ang; kez bi niza nagehit armanca xwe.

**Xwezîka** (pêrb) ***rêzman*** Xwezî.

**Xwezka** (pêrb) ***rêzman*** Xwezîka.

**Xwê** (n.x.mê) Toza sipî ya tam a wê swîr, di kin nav xwarinan da. ***Pend*** :Xwekirî xwê d zanin. ***Pend*** :Xwêya xwe di ke nav hmî giraran.ang; mirovê matêker. ***Pend*** :Hemû tişt bi xwê, xwê jî bi manê(ankoyê).ang; her kar û kiryarê tuxûbê xwe heye.

**Xwêdan** (k.jn.l.mê) 1.Xwedî kewal xwê di din kewalên xwe.2. Rojeka taybete, xwê di din pez û bizinî . (K) bn :Dan.

**Xwêdank** (n.l.mê) Amanek biçûk û hemecore,xwê tê di kin.



**Xwêdank**

**Xwêkirin** (k.jn.l.mê) Xwê bi zadî da kirin jibo tama wî swîr û xweş bi be.

**Xwêlîn** (n.dar.mê) Kanî û cihê mirov xwê jê di derêxin. Kanîya xwê.

**Xwêravk** (n.l.mê) Av û xwê. :Zadê gelek swîr.

**Xwêrik** (n.dar.mê) ***derd*** Derdeke mirovî di gire.

**Xwêrî** (hk.x.çewa) ***dijûn*** Çepel. Lewçe.

**Xwîk** (n.x.mê) Bac.

**Xwîl** (hk.x.çewa) Xar. Xwar. Xêl. Vîr.

**Xwîn** (n.x.mê) Xûn. Şileyê reng sore di leşê mirov û candaran. ***Pend*** :Xwîn na be av.

**Xwînber<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) *kevneşop* Mirov xwînê ji candara û mirovan bi lêdana devek tîj li guhan yan cihek dî, jibo çarekirinê ji derdan. (K) bn:Berdan.

**Xwîn<u>bir</u>** (karn.l.dn) Pateke xwîna candar û mirovan pê di rawestînin, dema birîdarbûn yan xwîn ji difinan verestinê.

**Xwîn<u>çûn</u>** (k.jn.l.mê) Dema xwîn ji birînan di keve. : Xwîna birîndarî gelek ya çûyî, jiber hindê gêj di bit.

**Xwîn<u>dan</u>** (k.jn.l.mê) Weke mirov xwîna xwe bi de kesekê xwîna wî kêm û canê wî pêdivî xwînê hebe.

**Xwîn<u>dar</u>** (n.dar.dz) Kesê mirovekî di kuje, xwedîyên kujtî wî bi xwîndarê xwe di hijmêrin û di xwazin tola xwe hilînin.Dujmin. Neyar.

**Xwînda<u>rî</u>** (n.dar.mê) Dujminî. Neyarî. ***Pend*** :Xwîndarî li beran nekevit.ang; nizayeke jibo mirov ji derdê xwîrîyê dûr bêxit.

**Xwîne<u>lok</u>** (hk.dar.çewa) Birîna bi xwîn. Leşê xwîn jê hatî. Leşê xwînê girtî. : Pêyên min yên xwînelok bûyn çunkî ez pêxas di nav stirîyan da derbaz bûm.

**Xwîn<u>germ</u>** (hk.l.çewa) Mirovê ji dil û viyan karî di ke û liser rijde. Bi gêwil. Çeleng.

**Xwîn<u>kar</u>** (n.l.dz) Xwîndar.

**Xwîn<u>karî</u>** (n.dar.mê) Xwîndarî.

**Xwîn<u>mêj</u>** (hk.l.çewa) Dirinde. Hov. :Dujminê xwînmêj.

**Xwîn<u>pendgîn</u>** (k.jn.l.mê) *nexweşî* Derdeke xwîna mirovî di pengit û ji barê xweyê asayî kêm yan pitir di bit.

**Xwîn<u>rêj</u>** (hk.l.çewa) Xwînmêj. Hov. Dirinde.

**Xwîn<u>rêjîn</u>** (k.jn.l.mê) Rêjtina xwîna ji canê candaran.

**Xwîn<u>rêjtin</u>** (k.jn.l.mê) Xwînrêjîn. :Em dijî xwîrêjtinê di westin.

**Xwîn<u>rijandin</u>** (k.jn.l.mê) Xwînrêjtin.

**Xwîn<u>sar</u>** (hk.l.çewa) 1. Sist û xav. 2. Xwîntal. Sar. Neşirîn. :Cîranê me mirovekê xwînsare.

**Xwîn<u>şirîn</u>** (hk.l.çewa) Xweşik. Balkêş. Şirîn. :Biçûkê xwîşirîn.

**Xwîn<u>xwar</u>** (hk.l.çewa) Xwînmêj. Hov. Dirinde.

**Xwî<u>rik</u>** (n.dar.mê) Kirmeke hirî û bendikan di xwe.

**Xwîşk** (n.x.mê) Xûşk. Xweh.

# Y

**Y** (ye) Pîta sîhê ya abeya kurdî.

**Ya** 1(pêrb) ***rêzman*** 1.Alaveka bi kar di hêt dema mirov di xazit gotinekê misoger bi ket. :Ya

Eve kê we got !.2. Alava daxwaz û nizayan :Ya xudê tu welatê me ji destên dujminan bi parêzî.

**Ya** 2 (pêrb) ***rêzman*** Alavê hebûna mê. :Ya min. :Ya te. Ev ne ya din. A. Keça wî, mala te.

**Yaban** (hk.cih.cugr,n) Yapan. Japan.Welatê Japonê.

**Yabanî** (malb.n) 1. Xelkê Yabanê. Japonî. 2. Pertal, ziman ên Yaban.

**Yad** (n.x.mê) Bîranîn.

**Yadgarî** (n.dar.mê) Bîrewerî.

**Yahê** (n.x.mê) Supasî.

**Yaho** (n.x.mê) Supasî.

**Yadkirin** (k.jn.l.mê) Saxkirin. Bîranîn. (K) bn :Kirin.

**YAK** (kurt) Yekêtî a Afretên Kurdistanê.

**Yan** (pêrb) ***rêzman*** Alaveka jibo destnîşankirin yan bijartinê bi viyan yan bi xurtî,bi kar di hêt. : Kurdistan yan neman. :Ev yan ew. ***Pend*** :Naçim aşî, yan dê aşvanî kujim. An.

**Yane** (hk.cih,n.x.mê) Bingeh. Navend.

**Yanzdeh** (hijn.çend) Hijmara 11. Yazdeh. Yazde.

**Yanzde<u>hem</u>** (hijn.çend) Ya,yê, yên yanzdehê.

**Yanzdehe<u>mîn</u>** (hijn,rêzkir.çend) Yanzdehemîn.

**Yaz<u>dehê</u>** (hijn.rêz) Ya,yê,yên yazdehê.

**Yanzde<u>hizar</u>** (hijn.l.çend) Hijmara 11,000.

**Yanzde<u>milyon</u>** (hijn.l.çend) Hijmara 11,000,000.

**Ya<u>pan</u>** (hk.cih.cug,n) Welatê Japan.

**Yapa<u>nî</u>** (nejn.dar.dz) Japanî.

**Yar** (n.x.dz) Dost. Heval. :Yara te. :Yarê wî. :Yara min. :Yara min. Br× Neyar.

**Ya<u>rê</u>** (hk,hd.dar.mê) Naznav û gazîkirina keça yar.


**Yarî** (n.x.mê) 1. Werziş. Lîztik.:Zarok çûn yarîyan. 2. Tirane. Gelte. Henek.

**Yarî<u>ker</u>** (karn.dar.dz) 1. Lîztikvan. Werzişvan. 2. Tiraneker. :Mirovê yarîker.ang; tiraneker.

**Yarî<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) 1. Lîztin. :Yarîvanan yarî di kirin. 2.Tiranekirin. (K) bn: Kirin.

**Yarî<u>van</u>** (karn.dar.dn) Yarîzan. Lîstikvan.

**Yarî<u>zan</u>** (karn.dar.dz) Lîztikvan.



**Yarîzan**

**Yar<u>metî</u>** (karn.x.mê) Alîkarî.

**Ya<u>ro</u>** (hk,hd.dar.nêr) Naznav û gazîkirina mêrê yar.

**Ya<u>sa</u>** (n.x.mê) Qanûn.

**Yaz<u>de</u>** (hijn.çend) Hijmara 11.

**Yazde<u>hem</u>** (hijn.rêz.çend) Yanzdehem.

**Yazdehe<u>mîn</u>** (hijn.rêz.çend) Yanzdehem.

**Yaz<u>dê</u>**( hijn.çend) Ya/ yê yazdê. Cara yazdê. :Meha yazdê.

**Yazde<u>hizar</u>** (hijn.l.çend) Hijmara 11,000.

**Yazdemilyon** (hijn.l.çend) Hijmara 11,000,000.

**Yek** (hijn.çend) Hijmara 1. Êk. 4-3=1.

**Yekanî** (hk.dar.çewa) Xort yan keça tenê di malê de. Êkane.

**Yekbawer** (hk.l.çewa) Çend mirovên bawerîyê bi karek, kirayarek, dînek, armancekê û htd di hînin. Hevbawer.

**Yekbîr** (hk.l.çewa) Hevbîr. :Ez û tu di boçûnên xwe da yekbîrîn.

**Yekbûn** (k.jn.l.mê) Yekgiritin. Hevgirtin. (K) bn: Bûn.

**Yekcan** (hk.l.çewa) Bi can bi hevre.:Havalînîya ji dil, ji can.

**Yekcar** (hk.l.çend) Demildest.Ékcar. :Carekê, bi carekê

**Yekcor** (hk.l.çend) Corek bi tinê.

**Yekdest** (hk.l.çewa) Bi hevre.Hevgirtî.

**Yekdil** (hk.l.çewa) Bi dil û can bi hevra.

**Yeke** (n.dar.mê) Peyveke girêdayî pîvan, kêşan û hijmartinê ye. :Gez yekeya pîvana dirêjî ye.

**Yekem** (hijn.rêz.çend) Ya, yê, yêd êkê.

**Yekemîn** (hijn.rêz) Êkemîn.

**Yekê** 1 (n.nenas.dar.mê) Êkê. :Jinekê got.ango yekê got. :Bizinekê nanê şivanî xwar.

**Yekê** 2 (hijn.rêz.çend) Ya, yê, yên êkê. :Cara yekê ez hatim, welatî.

**Yekêtî** (n.dar.mê) Êketî. Wekhevî.



**Yekêtî**

**Yekgirtin** (k.jn.l.mê) Hevgirtin. Êkgirtin. (K) bn : Girtin.

**Yekgirtî** (hk.l.çewa) Hevgirtî.

**Yekhizar** (hijn.l.çewa) Êkhizar. Hijmara 1000.

**Yekî** (hk.nenas.nêr) Êkî. Yê yekê. Yekê nediyar.

**Yekîtî** (n.dar.mê) Yekêtî.

**Yekkirin** (k.jn.l.mê) Têkelkirin. Kirin êk.

**Yekreng** (hk.l.çewa) Ji êk reng pêkhatîye. Rengek bi tenê.

**Yek<u>rû</u>** (hk.l.çewa) 1. Wek yek.2. Êkser.

**Yek<u>san</u>** (hk.dar.çewa) Wekhev.

**Yek<u>sanî</u>** (n.dar.mê) Wekhevî.

**Yek<u>ser</u>** (hn.l.çewa) Demildest. Yekcar. Êkser.

**Yekû<u>du</u>** (n.l.mê) Berahî. Miştûmir. Rêkevtin. Êkûdu.

**Yekûdu<u>kirin</u>** (k.jn.gl.mê) Miştûmirkirin. : Berîya em bihên vêrê, me yekûduwa xwe kirîye.

**Yek<u>şem</u>** (hk.dem) Roja êkşembê.

**Yek<u>ta</u>** (hk.l.çewa) Tayek. Ketek. Libek.

**Ye<u>men</u>** (hk.cih,cugir.n) Welatek Erebane.

**Yeme<u>nî</u>** (nejn) 1. XelkêYemenê. 2. Pertalên ji welatê Yemen.

**Yep<u>rax</u>** (n.x.mê) Îprax.

**Yew<u>nan</u>** (hk.cih,cugirn.nejn) 1.Welatê Yewnanistanê.2. Xelkê Yewnanistan.

**Yewnanis<u>tan</u>** (hk.cih,cugrn) Welatê Yewnanan.

**Yewnanista<u>nî</u>** (netwn) bn :Yewnanî.

**Yewna<u>nî</u>** (netew,n)1. Xelik ê Yewnan. 2. Mita, ziman û pertalên ji Yewnanê.

**Yez<u>dan</u>** (n.dar) Xweda. Ezdan.

**Yezda<u>nî</u>** (hk.dar.çewa) Karê xwedayî.

**Yê** (pêrb) ***rêzman*** Alaveke jibo tuxmê nêr yan kesek ne diyar bi kar di hêt. :Birayê min. :Yê rawestayî hevalê teye, yan yê rûniştî?. ***Pend*** :Yê guh nede mezinan, dê lê hên şaxên bizinan. ***Pend*** :Yê bi lingekî, xera dike gundekî. ***Pend*** :Yê got û kir mêre, yê ne got û kir şêre, yê got û ne kir, kerê nêre. ***Pend*** :Yê neke, na xwe. ***Pend*** :Yê ne li şerî, şêre.

**Yêx** (hk.x.çewa) Peyveke bo kewalên lewaz û kêmgoşt, ji nav yên bizinî veder di kin dako bihayê kewalên çak kêm ne be.

**Yêx<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Cudakirina kewalên yêx.

**YNK** (kutr,n) Partî ya Yekêtîya Nîştimanî a Kurdistan.

**Yû<u>ro</u>** (n.cîn.x) €, Diravê çend welatên ewropayî.

# Z

**Z** (ze) Pîta sih û êkê, û dawîyê ya abeya kurdî.

**Za** (hk.x.çewa) 1.Bergotineke jibo bi hêzkirina gotinan bi kar di hêt. Ma. 2. Zuha.

**Zab** (hk,cih,n.x.mê) Çem. Robar.

**Za<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) bn:Zuhabûn.

**Zad** (n.x.nêr) 1. Xwarin.2. Navek paşpirte bi navan ra .Têjik. Nivş : Şêrzad. Ang; kurê, keça şêran. Begzad, tuxmê(ji malbegan)Perîzad; ang ji perîyan û htd.

**Za<u>de</u>** (paşpir) Nivş. Zad.

**Zad<u>xane</u>** (hk.cih,n.dar.mê) Xwaringeh. Xurekxane.

**Zaf** (kn.x.çewa) Pir. Gelek. Mişe. Zehf.

**Za<u>gon</u>** (n.x.mê) Qanûn.

**Za<u>hid</u>** (hk.x.çewa) Mirovê zad ne xwarî. Mirovê birsî. Mirovê birçî. Girevgirtî.

**Zahid<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Zad ne xwarin. Girevgirtin. Xwe birçîkirin. (K) bn: Kirin.

**Zak** (n.x.mê) 1. Şîrê cara yekî piştî candar di zêt. 2. Ger. Dor. Car. : Vî zakî tu li ber çwîngê bi mîne. :Zakê mine, teye, .. û htd.

**Za<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) bn:Zuhakirin.

**Zal** (hk.x.çewa) Serdest. Xurt.

**Zal<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Şiyan. Karîn. Têhelhatin. (K) bn: Bûn.

**Zalkirin** (k.jn.l.mê) Serdestkirin.

**Zam** (n.x.mê) Birîn. Derd. Kul.

**Zamdar** (hn, hk.dar.çewa) Birîndar. Nexweş. Dilkul.

**Zamkevtin** (k.jn.l.mê) Kulbûn yan herişîna masolkên mirovî.

**Zan** (k.jn.x.mê) Giyandarên mê têjikan yan zarokan di kin. Berdewamîya nivşî. : Bizina wan ya zay. Çêlek di zê.

**Zana** (hk,hn.x.çewa) Mirovê şareza. Bispor. ***Pend*** :Zana be pisyarker be. ***Pend*** :Zana aqilî ji nezanan werdigire, û nezan ji zanayî.

**Zandor** (n.dar.mê) Xwendin li ser mijareka taybetî jibo wergitina zanyarîyan. Xol.

**Zanebûn** (hk.çewa, jn) Mirov karekî bi zanîn bi ke. Karê bi pilan. Br× Bêdestî.

**Zanist** (n.dar.mê) Zanîn.

**Zanistî** (hk.dar.çewa) Tiştê girêdayî zanînê. :Bernameyên zanistî.

**Zanîn** (k.jn.x.mê) Zanyarî, salixên zanistî, mîna fîzîk, kîmîk, bîrkarî, candarzanî û htd. Şarezabûn di warê cuda de. :Te zanîye dê van rojan ahingeka mezin hêt gêran?. (K) bdn: ez di zanim em dizanîn, tu di zanî hûn di zanin, ew di zane[…it] ewan di zanin. Pr: dê[bi] + bdn. Bdb :di zanî, di zanîn. Db,dûr: zanîbû,zanîbûn. (F): bi zane, bi zanin.

**Zanîngeh** (hk,cih,n.dar.mê) Bingehê xwendina bilind. Zanko. :Zanîngeha Duhok. :Xwîndkarê zanîngehê.

**Zanko** (hk.cih,n.x.mê) Zanîngeh.

**Zanyarî** (n.dar.mê) Salix. Zanîn. : Te çi zanyarî hene liser rewşa welatî?.

**Zar** 1 (n.x.nêr) Ziman. Devok. :Zarê soranî. Zarê hewramî. Zarê badînî.

**Zar** 2 (hk.x.çewa) ***deng*** Dengê girî û gilîyên zaroyan. Zarzar.

**Zar** 3 (n.x.dn) Zarok.

**Zara** (n.x.mê) Navê keçane.

**Zarav** (n.dar.mê) Peyvên nemaze jibo karek yan tiştekî. Zaravên zanistî. Zaravên toreyî.

**Zarezar** (n.l.mê) 1. ***deng*** Qîjandina zarokan. 2. Lavakirin.

**Zarezarkirin** (k.jn.gl.mê) 1.Qîjandin. 2. Lavakirin.

**Zarîn** (k.jn.x.mê) Zarezarkirin. (K) bdn: ez di zarin em di zarîn, tu di zarî hûn di zarin, ew di zari[...it] ewan di zarin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb: ez di zarîm em di zarîn, tu di zarî hûn di zarin, ew di zarî ewan di zarîn. Db,dûr: ez zarîbûm em zarîbûyn, tu zarîbûy hûn zarîbûn, ew zarîbû ewan zarîbûn. (F): bi zare, bi zarin.

**Zaro** (n.x.dz) Mirovê jîyê wan ji sinêleyî û kêmtir. Piçûk. ***Pend*** :Zarokê bê dê(bê dayk) weke çiyayê bê rê .***Pend*** :Zarok fêqîyê zivistanê ye. ***Pend*** :Zarok gula nav malê ye.

**Zarokînî** (n.dar.mê) Qonaxa mirov têda zarok. :Ew bi zarokînî fêrî jenîna amêrên mûzîkê bûye.

**Zarotî** (n.dar.mê) Zarokînî.

**Zarveker** (karn.dar.dn) Mirovê zar xelkî ve di ke. Mirovê pispor di warê honerê zarvekirinê, di şanogerî û filman da. Ekter.

**Zarvekirin** (k.jn.l.mê) Mirov mîna kesekî bi peyvit. Dengê xwe mîna yekî biket. (K) bn: Kirin.

**Zarzar** (n.l.mê) ***deng*** Zarezar.

**Zarzarkirin** (k.jn.gl.mê) Zarezarkirin.

**Zava** (n.x.nêr) 1.Mêrê nû jin anî û şahîya jibo di hêt kirin. :Zelamê jinekê ji malbatekê di hînit, di bite zavayê wan.

**Zavabûn** (k.jn.l.mê) Bûne zava. Dema mêrek di be zava û şahî jêra tê rêxistin.:Kurê wî bû zava.ang; jin jêra anî.

**Zavakirin** (k.jn.l.mê) kirin zava, Weke malbatek bo kurê xwe jinê di hîne,şahî û govendê bo di ken, kurê xwe di ken zava. :Mala xudê ava me kurê xwe kir zava.

**Zavatî** (hk.çewa,n.dar.mê) Heyama mêr têda zava. :Cilikên zavatîyê.

**Zax** (hk.x.çewa) Zîrek. Peyt. Barkirî. Sax. Vejandî.:Mirovê bi zax.ango; mirovê zîrek kêrhatî.:Erdê zax.ang; erdê zibilkirî û law(çak) jibo çandinê.:Pîlên (patirî) zax.ango; jibo karînanê diristin, kar di ken, pirî bargeh.

**Zaxbûn** (k.jn.l.ê) Peytbûn. Pîtbûn. : Zevî bi zibilî zax bû.

**Zaxkirin** (k.jn.l.mê) Bi hêzkirin. Zibilkirin. Barkirin. Bargekirin.Vejandin : Zavî zax kir. :Têlefonê zax di ke. Patirî zax kir. Mejî bi mûzîkê zax kir. (K) bn: Kirin.

**Zaxkirî** (rd.l.çewa) Hatîye zaxkirin. Peyt.:Patirîya tirombêlê ya zakirî ye.

**Zayend** (n.dar.nêr) ***rêzman*** Nivş. Tuxim. :Zayendê nêr, wek nêrî, hesp, peya, bira û htd, zayendê mêwek ; keç, dayk, bizin, manga, dêhil, bûk û htd, û duzayend; wek gîsk, qutabî, dost, heval, û htd.

**Zayîn** (k.jn.x.mê) Zan. Zêdebûn. : Sala 2005 ya zayînî.

**Zayîngeh** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê zana candaran. Cihê bûna zarokan. :Nexweşxaneya zayîn di keve cada xebat.

**Zayînxane** (hk.cih,n.l.mê) Zayîngeh.

**Zaza** (maln.x) Mirov yan zarê zaza.

**Zazakî** (n.dar.mê) Zareke ji zimanê kurdî. Dimilkî.

**Zeb** (hk.x.çewa) Hêzdar. Tund. Qayîm.

**Zebale** (n.dar.mê) Têreke ji qamîşî hatîye diristkirin, derê wê berdaye, Jibo veguhaztina ax û zibilî bo nav bax û rezan li pişta dewaran di kin.

**Zebbûn** (k.jn.l.mê) bn :Zepbûn.

**Zebelah** (hk.dar.çewa) Mirovê gelek kelex mezin û dirêj. :Bi nêre wê henê çi zebelahe li dira henê rawestaye?. Br×Çirkune, girgine.

**Zeber** (hk.x.çewa) Hêzdar. Deshelatdar. Tund. Şiyan.

**Zeberdest** (hk.l.çewa) Mirovê hêzdar û bi zend û bask. :Serbest xortekê zeberdeste.

**Zebeş** (n.x.nêr) ***fêqî*** Fêkîyeke, dirêje yan girovire, niva wî sore, tovikên reş di nav dane,tama wî şirîne. Şitî. Zebeş.

**Zebir** (n.x.mê) Zeber.

**Zebirdest** (hk.dar.çewa) bn :Zeberdest.

**Zebkirin** (k.jn.l.mê) bn :Zepkirin.

**Zehf** (hk.x.çewa) Zaf. Pir. :Ez zehf ji te hez di kin. :Hêk li bazarî di zehfin.

**Zehfbûn** (k.jn.l.mê) Pirbûn. Mişebûn. :Biyanî li seyrangehên me zehf bûne.

**Zehfî** (n.dar.mê) Berfirehî. Mişeyî.

**Zehfkirin** (k.jn.l.mê) Mişekirin. Berfirehkirin. Zêdekirin.

**Zehmet** (n.x.mê) Giranî. Asteng. Çetin. :Zehmeta min hemû di ber avê da çû!. : Eve karek bi zehmete.

**Zehmetbirin** (k.jn.l.mê) Xwe mandî kirin.Xizmetkirin. : Tu bi xudê çi zehmeta ne be.

**Zehmetkêş** (karn.l.dm) Mirovê xwe jibo karekî zehmet di de. Rêncber. Pale. Karker.

**Zehmetkêşan** (k.jn.l.mê) Dema mirov xwe mandî di ke ji pêxemetî dozekê.

**Zehmetkirin** (k.jn.l.mê) Zehmetbirin.

**Zegzege** (hk.dar.çewa) Zebelah.

**Zelal** (hk.x.çewa) Ron. Aşkera. : Ava kanîyan ya zelale. :Dengê te zelale. ***Pend*** :Wî çi avên zelal ne hêlane !. ang ; mirovê neçak û destdirêj.

**Zelalbûn** (k.jn.l.mê) Ronbûn. Eşkerabûn. (K) bn : Bûn.

**Zelalî** (n.dar.mê) Xuyayî. Ronî. Aşkerayî.

**Zelalkirin** (k.jn.l.mê) Ronkirin. Eşkerekirin. :Heger zehmet ne bit waneya me ji me ra zelal bi ke!. (K) bn: Kirin.

**Zelam** (n.x.nêr) Peya. Mêr. ***Pend*** :Zelamek hebû, çaxê nanê wî hebû, navê wî tunebû, çaxê navê wî hebû, nanê wî tunebû û çaxê herdu hebûn, ew li mal nebû. ***Pend*** :Zelam bi mûyan, jin bi rûyan.

**Zelamînî** (n.dar.mê) Mêranî.Nîşana hêza zelaman. :Çi zelamînî li nik vî kurî nîne!.

**Zelate** (n.x.mê) ***xwarin*** Xwarina ji giyayên ter, yên hûrkirî, mîna kerefs, reşad, xes, xiyar, bacan û htd, digel xwê û tirşî têkel di ken bi zadî ra di xwen.

**Zelû** (n.x.mê) ***candar ,kirmik*** Zêrî. Zêlî.

**Zeman** (hk.dem) Jeman. Dem. Çax. Dan.Danroj.

**Zembele** (n.x.nêr) 1.Mîilê demhijmêran.2. Borîyên avê(henefî).

**Zembîl** (n.x.mê) Seleke ji levenan, zilik, yan şivikan hatî çêkirin.



**Zembîl**

**Zembîlfiroş** (karn.l.dz) 1.Kesê zembîlan di firoşe.2. Navê dastaneka kurdî ye, ko qehremanê çîrokê zembîl di firotin.

**Zemîn** (n.x.nêr) Erd.

**Zend** 1(n.x.mê) Qeda destî ji enîşkê tanî destî, yan ji milî ta destî.

**Zend** 2 (malb,n.x) Hozeka kurdî ye.


**Zendikbadayî** (hk.l.çewa) Mirovê zendikên wî bi hêz, peyt û badayî. Xwedî zend û bas.

**Zendûbas** (n.l.pir) Destê mirovî ji mistê(lep) tanî milî. :Zend û bas bi hevre.

**Zeng** (n.x.mê) 1. Amêrekê asinî deng jê di hêt jibo hişyar û agehdarkirinê bi kar di hêt. : :Zenga malê, demhijmêrê, zenga bi stoyê kewalan ve di ken. Zirzirk. 2. Éke ji du karikên çîroka zeng û bengê.

**Zengene** (malb,n) Hozeka kurdane.

**Zengil** (n.dar.mê) Zeng. Zirzirk.



**Zengil**

**Zengilandin** (k.jn.dar.mê) Lêdana zengê. Deng ji zengilê di hêt peydakirin.(K) bdn: ez di zengilînim em di zengilînîn, tu di zengilînî hûn di zengilînin, ew di zengilîne[….it] ewan di zengilînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di zengiland, di zengilandin. Db,dûr: zengilandibû, zengilandibûn. (F): bi zengilîne, bi zengilînin.

**Zengillêdan** (k.jn.gl.mê) Zengilandin.

**Zengilok** (n.dar.mê) *balinde* bn :Zengulîk.

**Zengilxane** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê hilawîstin yan danana zengilê.

**Zengîn** (hk.dar.çewa) Dewlemend. Heyî. :Mêrê zengîn. :Jina zengîn. :Welatê zengîn.

**Zengînbûn** (k.jn.l.mê) Pere û malê mirovî zehf di be. (K) bn: Bûn.

**Zengînî** (n.dar.mê) Heyînî. Hebûn. : Zengînîya wî ji zîrekîya wî ye.

**Zengînkirin** (k.jn.l.mê) Mirov bi kar û zanînê xwe dewlemend di ke. (K) bn: Kirin.

**Zengulîk** (n.dar.mê) ***balinde*** Corekê çûçikane.

**Zep** (hk.x.çewa) Tund. Qayîm. Peyt.

**Zepbûn** (k.jn.l.mê) Tundbûn. Ne livîn. :Xwîna birînê bi girêdanê zep na be.(K) bn : Bûn.

**Zepkirin** (k.jn.l.mê) Liser zalbûn. Tundkirin. Ne hişt bi live. :Xwe zep ke, nexwe dê bi kevî.(K) :bn : Kirin.

**Zepkirî** (hk.l.çewa) Hatî zepkirin. Tundkirî.

**Zepzepe** (hk.dar.çewa) Zebelah.

**Zeqzeqe** (n.dar.mê) Pivdanka naylonî. Pivdank.

**Zer** (hk.x.çewa) Rengekê taybetî ye. Rengê rojê, rengê mûzê, rengê belgên payîzê.

**Zerav** (n.dar.mêr) ***can*** Kîsikeke di zikê candaran da ye, ava zer têda ye.Zerdav.

**Zerbûn** (k.jn.l.mê) Rengê mirovî jiber nexweşî yê zer di bit. Belgên daran li payîzê zer di bin. (K) bn : Bûn.

**Zerd** (hk.x.çewa) Zer.

**Zerdav** (n.l.mê) Zerav.

**Zerdeşt** (n.x.nêr) 1. Pêxemberê dînê behdînî(zerdeştî) ye. Pêxemberê kurdan. 2. Navê mêrane.

**Zerdil** (n.dar.mê) ***fêqî*** Mijmije.



**Zerdil**

**Zergul** (n.l.mê) ***giya*** Corekê genimîye.

**Zerik** (n.dar.mê,hk.çewa) 1. ***nexweşî*** Derdeke giyan û çavên mirovî zer di ke. 2. Mirovê lewaz û rengê wî zer.3. Zerîya nîva hêkê. Zerika hêkê.

**Zerikîn** (k.jn.dar.mê) Rûçikê mirovî ji egera nexweşî yan tirsê zer di be. (K) bdn: ez di zerikim em di zerikîn, tu di zerikî hûn di zerikin, ew di zerike[….it] ewan di zerikin. PR: dê [bi]+bdn. Bdb : ez di zerikîm, tu, ew, di zerikî, em,hûn, ewan di zerikîn. Db,dûr : ez zerikîbûm, tu zerikîbûy, ew zerikîbû, em zerikîbûyn, hûn, ewan zerikîbûn.(bi bûn).

**Zerî** (n.x.mê) 1. Jina xweşik û xwedî bejin û bal. Xatûn. Perî. Kejal. 2. Rengê zer. : Zerîya dêmê wî ne ji nexweşîyê ye.

**Zerîle** (n.dar.nêr) *balinde* Zerwêle.

**Zerîn** (n.x.mê) *gul* 1. Nêrgiza zer.2. Navê keçan.

**Zerkêtk** (n.dar.mê) *adî* Core adîyekê firindeye, jehirdare, rengê wî zere, mîna mêşhigivane.

**Zerkêzk** (n.l.mê) bn :Zerkêtk.

**Zerkirin** 1 (k.jn.l.mê) Mirov dîwarekî, kaxetekê, cilekî bi zerî reng bike. (K): Kirin.

**Zerkirin** 2 (k.jn.l.mê) Qelandina giyayên xwarinê di nav rûnî da. :Tolik, kengir, zerkirin. (K) bn: Kirin.

**Zerkirî** 1 (hk.l.çewa) Rengê zer lê hatî dan.

**Zerkirî** 2 (hk.l.çewa) Qelandî. Sorkirî.

**Zerole** (n.dar.nêr) *balinde* bn :Zerwêle.

**Zerpêtî** (hk.l.çewa) ) Mirovê nexweş ko herdem rengê wî zer û pêtû xuya di ke.

**Zerpêtîbûn** (k.jn.gl.mê) Rengê mirov zer û pêtî di be.

**Zerpiçî** (rd.dar.çewa) Zerpêtî.

**Zerpitixî** (rd.dar.çewa) bn :Zerpêtî.

**Zerwêle** (n.l.dn) *balinde* Çûçikeka zer û rengîne,bihar û havînan li Kurdistanê di pirin.



**Zerwêle**

**Zerzewat** (n.dar.pir) *giya* Giyayên xwarinê, mîna kerefs, reşad, xes û htd. Teregiya.

**Zerzîrî** (n.x.pdn) *balinde* Corekê balindeyane, rengê wan reşe birbir di jîn.

**Zever** (hk.x.çewa) Wêran. Zîrek. Çavnetirsî. Zeber.

**Zeveş** (n.x.nêr) *fêqî* Zebeş.

**Zevî** (n.x.mê) Erdê bi kêr çandinê bi hêt. Zevîya genim, ceh, nok û htd.

**Zevlek** (n.x.pir) Masolk. Zendûbask.



**Zevlek**

**Zevlekdar** (hk.dar.çewa) Mirovê gir û bi hêz. Xudan zevlek.

**Zeyt** (n.x.mê) Rûnê şil ko ji giya, tov û candaran di hêt çêkirin.

**Zeytûn** (n.x.mê) Berê darzetûnane, şê xir yan hêkîye, rengên kesk, reş, sorê tarî û htd hene paş vegirtinê dindikên wî bi xwarinê ra di hên xwarin û mifa ji zeyta wan di hên wergirtin..

**Zexme** (n.x.pir) Mîna kulavane jin di xin singa xwe.

**Zê** 1(n.x.nêr) Çem. Rîbar.Co.

**Zê** 2 (hk.cih,n.x) Du çemin yek zêyê mezin(zêyê behdînan) yê din biçûk li başûrê Kurdistan.

**Zêbar** (hk.cih,dever,n.mê) Devereke li Kurdistana Iraqê. Hozeka kurdane li Kurdistanê.

**Zêbarî** (malb,n. dar) Xelkê devara Zêbar.

**Zêç** (n.x.pir) Zarok. Jin. Xêzan.

**Zêde** (hk.x.çewa) 1. Pir. Mişt. Tijî.2. Ne pêdivî.

**Zêdebûn** (k.jn.l.mê) Pirbûn. Mişebûn. Zehifbûn. :Roj bi pojê endamên navendê zêde di bin. (K) bn : Bûn.

**Zêdegavî** (n.l.mê) Gavên zêde. Karê nerast. Kiryarêd ne rewa

**Zêdegavîkirin** (k.jn.gl.mê) Karên ne rast, rewa kirin. . : Kesê zêdegavîyan bi ke dê hêt sizadan. (K) bn: Kirin.

**Zêdekirin** (k.jn.l.mê) Mişekirin. Zehifkirin. :Hukmetê mehyana mamostayan zêde kirin. (K) bn: Kirin.

**Zêdeyî** (n.dar.mê) Mirov,kar yan tiştê zêde.Zêdebûn.

**Zêdik** (malb,n) Hozeka kurdane.

**Zêmar** (n.x.mê) Nalîn. Fîxan. Gîrîn.

**Zên** (n.x.mê) Hizir. Bîr. Zanîn.

**Zêndar** (hk.dar.çewa) Mirovê bîrtîj, ko zû di gotinan di gehit û jibî na ket. Bi zên. :Zîrek qutabîyek pir zêndare, hema carekê di xwînit û waneya xwe tê di gehit.

**Zêndî** (n.x.pir) Mirov,candar û giya. Jiyandar. Nemir. BR×Mirî.

**Zêr** (n.x.nêr) 1. Kanzayekê zere pir bihaye. : Stovanka zêrî, gustîla zêrî.2. Tiştê ciwan û bihadar.

**Zêrav** (n.l.mê) Ava zêrî.

**Zêravkirin** (k.jn.gl.mê) Tamdan bi ava zêrî. :Qayîşa demhijmêrê ya zêran kirî.

**Zêravkirî** (hk.l.çewa) Hatîye zêravkirin. Bi ava zêr tam daye. :Qelemê min zêravkirî ye.

**Zêrevan** (pîşn.dar.dz) 1. Nêrevan. 2. Navê mêrane.

**Zêrevanî** (karn.dar.mê) Çavdêrî. Nêrevanî.

**Zêrevanîkirin** (k.jn.l.mê) Lê nêrîn. (K) bn : Kirin.

**Zêrger** (karn.dar. dz) Kesê karê kirîn û firotina zêrî dike. Zêringir.

**Zêringir** (kar,n,dar.dz) Zêrgir.

**Zêrî** (n.x.mê) *candar* Kirmeke di avêda di jît.

**Zêrîn** (hk.dar.çewa) 1. Tiştê rind û bi biha mîna zêrî. 2. Navê keçan.

**Zêrker** (karn.dar.dn) Zêrger.

**Zêrkirin** (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina zêrî. 2. Tamdana kanzadan di zêrî. Bi zêrî tamdan.

**Zêrvan** (karn.dar.dz) Xwedîyê zêran. Zêrker. Zêringir.

.**Zêval** (hk.x.çewa) Çîrikên pateyan.

**Zêwe** (hk.cih,cugrn.x) Navê çendîn gundane li Kurdistanê.

**Zêwik** (hk.cih,cugrn.dar) Navê hinek gundane.

**Zibale** (n.dar.mê) Têra zibilî. Zebale.

**Zibare** (n.x.mê) Karê bi tebayî jibo malekê. Karê bi hevre.

**Zibarekirin** (k.jn.l.mê) Bi karê zibarê rabûn. :Gundî zibarê jibo mala melayî di kin.

**Zibil** (n.x.nêr) Rîx û pişkulên kewal û dewaran.

**Zibildan** (hk.cih,n.dar.mê) Cihê zibilî di kinê. Gîfank. Gîfk.

**Zibilîn** (k.jn.x.mê) Wekî giyandar rêxê di kin. Çêl di zibilit.

**Zibilkirin** (k.jn.l.mê) 1. Jibo zaxkirinê, cotyar zibilî li bax, rez û bîstanan di kin. 2. Zibilîn. (K) bn: Kirin.

**Ziç** (hk.x.çewa) Mit. Şir.

**Ziçbûn** (k.jn.l.mê) Şirbûn. (K) bn: Bûn.

**Ziçkirin** (k.jn.l.mê) Şirkirin. Çavşorkirin. :Rabe karekî bike, xwe wesa ziç neke. (K) bn: Kirin

**Zigurd** (hk.x.çewa) Zirgurt.

**Zik** (n.x.nêr) *can* 1.Qeda giyanê mirovî ya nerim, navbera ran û singî, ji alê singî. *Pênd* :Zikê xwe hînî du nanan meke, canê xwe hînî du karan meke. 2. Cihê xwarin di kevitê. Gede.



**Zik**

**Zikçêl** (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mezin,mîna yê çêlekan.

**Zikçûn** (k.jn.l.mê) Şilbûna desnivêja mirov û candaran ji egera nesaxî yan pîs xwarin û zêde xwarinê. Hinavçûn. (K) bn:Çûn.

**Zikêş** (hk.l.çewa) 1. Mirovê zinx. Mirovê çepel. 2. Janezikî. Êşana zikî.

**Zikêşan** (k.jn.l.mê) Êşana zikî. Zik di êşe. (K) bn: Êşan.

**Zikfireh** (hk.l.çewa) Kesê bêhinfireh. Bêhinfireh.

**Zikfirehî** (n.l.mê) Bêhinfirehî.

**Zikîn** (hk.dar.çewa) Mirovê herdem di xazit zikê xwe pir xwarin bi ket.Bêhnefs.

**Zikmakî** (hk.l.çewa) Nivşî. Berebabî. :Lengerîya wî zikmakî. :Derdên zikmakî.

**Zikmeşk** (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mîna meşkan.

**Zikmezin** (hk.l.çewa) Mirovê zikê wî mzin.

**Zikreş** (hk.l.çewa) Mirovê çavên wî bi xelkê dî na rabin û bi xoşîya wan tengav di bit. Mirovê ne dilsoj.

**Zil** 1 (hk.x.çewa) Mezin. Gewre. Qebe. Biloq.

**Zil** 2 (n.x.nê) Dava giyayê hişk. Zilik. Çeqikê darê yê zirav.

**Zilam** (n.x.nêr) Zelam. Mêr.

**Zilbûn** (k.jn.l.mê) Zîqbûn. Girbûn. :Çavên wî pêve zil bûn. (K) bn : Bûn.

**Zilhêz** (hn.l.çewa) Xwedî deshelat û hêz. Emerîka welatekê zilhêze.

**Zilik** (n.dar.nêr) Zil.Zilikê şixatê.

**Zilînk** (n.dar.mê) Tiyanka nanî, ji zilikên genim yan ceh hatî çêkirin.

**Zilkirin** (k.jn.l.mê) 1.Zîqkirin. Mezinkirin. Girkirin. 2.Rawestandin. Ne livandin. : (K) bn :Kirin.

**Zilpên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengê kevtina dilopên avê.

**Zilq** (n.x.mê) Zibilê tewalan, çûçikan. :Zilqên sivandokan.

**Zilqutandin** (k.jn.dar.mê) Li hevdana zîhên çavan. Livîna çavan. (K) bdn : ez di zilqutînim em di zilqutînîn, tu di zilqutînî hûn di zilqutînin, ew di zilqutîne[…it] ewan di zilqutînin. Pr : dê [bi]+ bdn. Bdb : di zilqutand, di zilqutandin. Db,dûr: Zilqutandibû,ziqutandibûn. (F) : bi zilqutîne, bi zilqutînin.

**Zilok** (n.x.mê) bn :Zilînk.

**Ziman** (n.x.nêr) 1.Alavê di hev gehiştinê ye.Derbirîne bi gotin yan nivîsîn, jibo ko mirov di hev bigehije. Her netewekî zimanê xwe heye, zimanê kurdan Kurdîye.2. Ezman. ***Pend*** :Ziman heye dermanê malê, ziman heye wêranê malê.

**Zimandirêj** (hk.l.dz.çewa) Ezmandirêj.

**Zimanreş** (hk.n.l.dz.çewa) Ezmanreş.

**Zimanpîs** (hk.l..çewa, n.l.dz) Ezmanpîs.

**Zimanvan** (pîşn.dar. dz) Şareza di warê zimanan da.

**Zimanvanî** (karn.dar.mê) Şarezayî di warê zimanî da.

**Zimanzan** (pîşn.dar.dz) Zimanvan.

**Zimanzanî** (karn.dar.mê) Zimanvanî.

**Zimên** (n.x.mê) ***deng*** Dengek hêdî û zirave hinde caran ji guhêd mirovî di hêt. Ziringên.

**Zimpare** (n.x.mê) Corekê kaxeza zivir e, mirov jibo renîn û hilûkirina dar, ber, kanzad û htd bi kar di hîne.

**Zimparekirin** (k.jn.l.mê) Hilûkirin bi zimpareyê. (K) bn:Kirin.

**Zinar** (nx.nêr) 1. Nizar.2. Navê mêrane. Br× Beroj.

**Zinc** (n.x.mê) Kolê ji qamîşî çêkirî.

**Zincîr** (n.x.mê) 1.Du qeytanên pan yên wekhev dirêj lêvên wan bi didankan rêzkirîne, ev didanke hevdu di girin jibo peytkirin û vekirina cilan bi kar di hên.2. Rêz. 3. Ristika ji xelekan pêkhatî.

**Zincîrkirin** (k.jn.l.mê) 1.Bi zincîran daxistin. 2. Dorpêçkirin. (K) bn: Kirin.

**Zindî** (hk.x.çewa) Sax. Êkser.: Evro bernameyek pir xweş bi awayek zindî li KTV dê hêt belavkirin.

**Zindîbûn** (k.jn.l.mê) Saxbûn. Vejiyan.

**Zindîkirin** (k.jn.l.mê) Saxkirin. Vejandin. : Hersal em bîranîna şehîdan zindî di kin.

**Zingezing** (n.l.mê) ***deng*** Zingên.

**Zingên** (n.dar.mê) ***deng*** Dengek zirav di kevit guhê mirovî. Ziringên.

**Zinx** (hk.x.çewa) Çepel. Lewçe.

**Zir** 1 (hk.x.çewa) Nerast. Nedirist. Sexte.

**Zir** 2 (n.x.mê) ***deng*** Dengê zirîna keran.

**Zirarî** (malb,n) Hozeka kurdane.

**Zirav** (hk.x.çewa) Ne stûr. :Bejin azirav

**Ziravbûn** (k.jn.l.mê) Tişt zirav dibe. Bi werzişê bejina mirov zirav dibit. ***Pend*** :Di kûderê zirav bû bila di wêderê bi piçe. (K) bn : Bûn.

Ziravî (n.x.mê) Yekeya ziravbûnê. Br×Stûrî.

**Ziravkirin** (k.jn.l.ê) Tiştê stûr mirov bi birîn û jê birinê zirav bi kit. (K) bn : Kirin.

**Zirbab** (n.dar.nêr) Zirbav 1. Babê nerast. 2. Mêrê daykê.

**Zirbar** (hk.l.çewa) Zirbehir.

**Zirbarbûn** (k.jn.gl.mê) Zirbehirbûn.

**Zirbarî** (n.l.mê) Zirbehrî.

**Zirbarkirin** (k.jn.gl.mê) Zirbehirkirin. :Ji mal û milkan hat zirbarkirin.

**Zirbehir** (hk.dar.çewa) Bê behir. Par têda tunebûn.

**Zirbehirbûn** (k.jn.gl.mê) Bê behir bûn.(K) bn: Bûn.

**Zirbehirkirin** (k.jn.gl.mê) Jê bê behir kirin. Bê parkirin. :Birayê xwe ji malê zirbehir kir.(K) bn: Kirin.

**Zirbehrî** (n.l.mê) Behir tê nebûn. Bêbehrî.

**Zirbira** (n.dar.nêr) Birayê mirovî, ji daykê yan ji bavê bi tinê.

**Zirdayk** (n.l.mê) Jinbab. Jinbav.

**Zire** (n.x.mê) Lempeya piçûk ya elektirîkên destî.

**Zirezir** (n.l.mê) ***deng*** 1. Dengê zincîr û ristikan. 2. Dengê zirêna keran.

**Zirezirkirin** (k.jn.gl.mê) Dengê zirezirê jê peydabûn. Bihîstina dengê zirezirê. :Ker zirezirê di ke, diyare yê têni ye!.

**Zirên** (n.dar.mê) ***deng*** 1. Dengê ristik, stovank, zincîr û htd. 2. Dengê zengilan. 3. Dengê zirîna keran.

**Zirgurt** (hk.dar.çewa) Mêrê bêjin. Xortê bi tinê. Bêjin. Bitinê.

**Zirgurtî** (n.dar.mê) Jiyana bi tinêyî. Bêjinî.

**Zirî** (n.x.mê) Cilên ji hesin hatîne çêkirin şervanan li xwe di kirin jibo parastin ji şûr, tîr û riman.

**Zirîç** (n.x.mê) 1.Davên teysokin di nav perokanda, nexasim yên jinan. 2. Dindikên hinarane yên hişikkirî.3. Zibil ê çûçikan.

**Zirîn** (k.jn.x.mê) Dengê kerane. : Ker di zirit, di zirî, di zirin.

**Zirîpoş** (n.l.mê) Mirov yan tiştê bi zirî hatî poşîn. Tank.

**Zirîze** (hk.cih,cugir,n) Gundeke li devera Zaxo.

**Zirk** (n.x.mê) Ava bi xwelîyê hatîye vegirtin, rengê wê zerve di bit, jibo mizeytan bi kar di hêt.

**Zirkeç** (n.x.mê) Nevisî. Keça nevisî.

**Zirkêtk** (n.l.mê) ***adî*** Zerkêsk. Zerkêtk.

**Zirkur** (n.l.nêr) Kurê nevisî.

**Zirna** (n.x.mê) ***mûzîk*** Amêrekê mûzîkêye, bi pifkirina devî lê dixin, dengê wê pir xweş û dilvekere.

**Zirnabêj** (pîşn.l.dz) Zirnavan.

**Zirnavan** (pîşn.dar.dz) Mirovê zirnayê lê dixe. ***Pend*** :Şahîya zirnevanî be û ew bi xwe lê bixe.

**Zirşerim** (hk.dar.çewa) Bêşerim. :Mirovê zirşerim.

**Zirt** (n.x.mê) Nav li xwedan.

**Zirtek** (hk.dar.çewa) Mirovê bi zirt û gefan di xurit. Belakir. Difinbilind. Ji xwe zêde. Şerxwaz.

**Zirtekî** (n.dar.mê) Zorî. Kûtekî.

**Zirtkirin** (k.jn.l.mê) Dema mirov nav li xwe di de, xwe mêrxaz û zorzan di zanit. Pesinêd ji xwe mezintir dan. (K) bn: Kirin.

**Zirto** (hk.dar.çewa) Zirtek.

**Zirtole** (hk.dar.çewa) Zirtek.

**Zirtonek** (hk.dar.çewa) Zirtek.

**Zirxesû** (n.dar.mê) Jinbaba jina mêrî, yan jinbaba mêrê jinê.

**Zirxezûr** (n.dar.nêr) Zirbavê jin yan mêrê mirovî.

**Zirxîtik** (n.dar.mê) ***kêzik*** Sîsirk

**Zirxweh** (n.dar.mê) Xweha mirovî ji daykê yan bavê bi tenê.

**Ziryan** (k.jn.x.mê) Dema pîstê mirov û candaran jiber xuryan, cilikên zivir,nexweşîyan û htd di zîrikit û xwînelok di bit. (K) bdn: ez di ziryim em di ziryin, tu di ziryî hûn di ziryin, ew di zirye ewan di ziryin(zirin). PR: dê bi ×bdn. Bdb : di zirya, di ziryan. Db,dûr : ziryabûm, ..bûyn, ..bûy, ..bûn. (F) : bi zirye, bi ziryin(bi zirin).

**Zirziqanndin** (k.jn.l.mê) Leqandin. Veleqandin. Hejandin.(K) bdn: ez di zirziqînim em di zirziqînîn, tu di zirziqînî hûn di zirziqînin, ew di zirziqîne[…it] ewan di zirziqînin. PR: dê bi + bdn. Bdb : di zirziqand, di zirziqandin. Db,dûr : zirziqandibû,ziziqandibûn. (F) : bi zirziqîne, bi zirziqînin.

**Zirziqîn** (k.jn.dar.mê) Livîn. Leqîn. Hijyan. Di zirziqim, bi zirziqe, zirziqî, di zirziqin.

**Zirzir** (hk.dar.çewa) ***deng*** Zirên. :Zirzira dengê bazinkan.

**Zirzirkirin** (k.jn.l.mê) 1.Zirtkirin. Dengê xwe kirin. 2. Dengê zirzirê. (K): Kirin.

**Zistan** (hn.dem.n.x.mê) bn :Zivistan.

**Zivêl** (hk.x.çewa) Perçeyên perokan. Pirtên pateyan.

**Zivil** (n.x.nêr) bn :Zibil.

**Ziving** (n.x.mê) Şikeft. Berevez.

**Zivir** (hk.x.çewa) Tiştê ne hilû. : Dîwarê zivir. Destên zivir.

**Zivirandin** (k.jn.dar.mê) 1. Vegerandin. 2. Badan. (K) bdn: ez di zivirînim em di zivirînîn, tu di zivirînî hûn di zivirînin, ew di zivirîne[…it] ewan di zivirînin. Pr: dê[bi]+bdn. Bdb : di zivirand, di zivirandin. Db,dûr: zivirandbû,zivirandibûn. (F) : bi zivirîne, bi zivirînin.

**Zivirbûn** (k.jn.l.mê) Tişt zivir di bit. : Destên wî jiber karkirinê yên zivir bûyn. (K) bn: Bûn.

**Zivirîn** (k.jn.x.mê) 1. Vegeryan. 2. Li dora xwe zivirîn. ***Pend***:Zivirî dest ji pêyan dirêjtir. Ang; çi bi destê mirovî ve ne hêt. (K) bdn: ez di zivirim em di zivirîn, tu di zivirî hûn di zivirin, ew di zivire[….it] ewan di zivirin. Pr: dê [bi]+bdn. Bdb: ez di zivirîm, em di zivirîn, tu,ew di zivirî, hûn,ewan di zivirîn. Db,dûr. Ez ivirûbûm em zivirîbûyn(bûn), tu zivirîbûy hûn, ewan zivirîbû, ew zivirîbû. (F) :bi zivire, bi zivirin.

**Zivirkirin** (k.jn.l.mê) Mirov tiştê hilî zivir bi ke. :Min dastên xwe zivir kirin. (K) bn: Kirin.

**Zivistan** (hk,dem.n.x.mê) Werzê berf û baranê, yê di dû payîzê ra di hêt. ***Pend*** :Zivistana serhejîn çêtire ji ya dûhejîn. Ang; heger li destpêka zivistanê gelek barî dê dawîya wê ya xweş be. ***Pend*** :Agir fêkîyê zivistanê ye.***Pend*** : Zivistanan xwe gîro neke, biharan xwe ter neke.

**Zivîrk** (n.x.mê) ***adî*** Core kêzikeka zere, jehirdar, mîna mêşhingivê ye.

**Zivt** (hk.x.çewa) Zîx. Peyt. Çeleng.

**Zivtbûn** (k.jn.l.mê) Peyt, çeleng, zîrek- bûn.

**Zivtî** (n.x.mê) Peyt. Zîx.

**Zivtkirin** (k.jn.l.mê) Zîrek, çeleng- kirin.

**Ziyad** (hk.x.çewa) Zêde.

**Ziyadbûn** (k.jn.l.mê) Zêde, pir- bûn.

**Ziyadî** (n.dar.mê) Zêdeyî.

**Ziyadkirin** (k.jn.l.mê) Zêdekirin.

**Ziyan** (n.x.mê) Karê nebaş. Karê xira. :Karê tu pê hestayî tu mifa nîne, lê ziyane.

**Ziyangehandin** (k.jn.l.mê) Wekî mirov yan tiştêk bi bit egera xirabkirinê, ziyanê bi gehîne. Karekî têk bi de. : Evsale çirçirkê ziyanên mezin gehandine çandinê. (K) bn :Gehandin.

**Ziyankirin** (k.jn.l.mê) Karên xirab kirin. :Pezê şivanî ziyana mala melayî kir. Ang; hat çerandin.

**Ziyaret** (n.x.nêr) Gor. Goristan.

**Zî** 1 (n.x.mê) Xîç.

**Zî** 2 (hk.dem) bn :Zû.

**Zîçik** (n.x.mê) Pên havêtina dewaran.Pehînên dewaran.

**Zîçikdanan** (k.jn.l.mê) Dewar pênan di weşînin,di danin. Zîçikan di danin. :Hespî zîçikek dana xudanê xo.

**Zîçikhavêtin** (k.jn.l.mê) Zîçikdanan.

**Zîh** (n.x.mê) ***can*** Lêvên çavan ko mijîlank liser rêzin.çermê çavan da di poşit.

**Zîl** (n.x.nêr) bn :Zîlik.

**Zîlan** (hk.cih,devern.x.mê) 1. Navê deverekê ye li Kurdistanê. 2. Navê keçane.

**Zîlik** ( n.dar.mê) 1. Tiştê sertîj yên leşê candarên mîna stêng, zerkêtik, mêşhingiv û htd ko berevanî ya xwe ji dujminan pê di kin dema di leşî di çikilînin û jehirê di rêjinê. 2. Dava giyayê ji nû hişîn di be û bi ser axê di keve, hêjî reng sipî ye. Zîlikê tovikên gundoran ji nû bi ser axê kevtîne.3. Tîtilk.

**Zîlikdan** (k.jn.l.mê) Hişînbûna giya û daran dema zîlikan di de. : Xiyaran zîlikên dayîn.

**Zîn** (n.x.nêr) Corekê kurtanane, kurte û ciwane, bi rîşîk û bendên rengereng xwemlandîye. Rikêb bi herdu alîyan ve heye jibo siwar pêyên xwe lê peyt bi ken. ***Pend*** :Zînê li çêlê kirî. Ang ; heger cilik ji yekî ne hên.

**Zîndan** (hk.cih,n.dar.mê) Girtîgeh.

**Zîndanî** (hk.dar.çewa) Kesê di zîndanê da. Girtî.

**Zîndankirin** (k.jn.l.mê) Xistin nav zîndanê. Girtin.

**Zîndankirî** (hk.l.çewa) Mirovê hatî zîndankirin. Mirovê kevtî di girtîgehê da.

**Zîndewer** (n.dar.nêr) Candar. Canewer. Jiyandar.

**Zîndî** (hk.dar.çewa) bn:Zindî.

**Zîndû** (hk.dar.çewa) Zindî.

**Zînkirin** (k.jn.l.mê) Zîn liser pişta dewaran danan, kirin. Kurtankirin. : Hesp zîn kir. (K) bn : Kirin.

**Zînkirî** (hk.l.çewa) Dewarê zîn lê hatî kirin û peytkirin. ***Pend*** :Zînê li çêlê kirî.

**Zîpe** (n.dar.mê) Heşt rojên sira dijwarin di zivistanê da, ku ji 18 tanî 25 î şiwatê, hember 3 tanî 10 adarê[zayîn]. ***Pend*** :Ez zîpeme zîpedarim, heger bi barim yan nebarim her ya sarim. ***Pend*** :Zîpene zîpedarin, heger bi barin, genim û çalin, heger nebarin, berx û karin. ***Pend*** :Ne bihar berîya zîpene, ne zivistan piştî zîpene. ***Pend*** :Heger li zîpeyî barî, me da rê, heger ne barî, genim li karê.ang ; barîna berf û baranan li zîpeyî jibo çandina genimî pir başe.

**Zîpik** (n.x.mê) 1. Pirsik. 2. Çipik.

**Zîq** (hk.x.çewa) Gir. Mezin. Beloq. Çavên zîq. Çavên zil.

**Zîqbûn** (k.jn.l.mê) Zilbûn. Belbûn.Girbûn. : Çavên wî ji kêfan zîq bûn. (K) bn: Bûn.

**Zîqkirin** (k.jn.l.mê) Belkirin. Zilkirin. Çavên xwe zîqkirin. (K) bn: Kirin.

**Zîqzîqok** (n.l.mê) Tiştê di biriskit, di teysit.

**Zîrek** (hk,hn.x.çewa) 1. Hoşbend. Peyt. Çeleng. Zîx. Jîr. 2. Navê mêrane.

**Zîrekbûn** (k.jn.l.mê) Peytbûn. Çelengbûn. Jîrbûn. : Mamostayî gote qutabî tuyê zîrek bûyî, çinke tu pitir ji berê di xwînî .(K) bn: Bûn.

**Zîrekî** (n.dar.mê) Çelengî. Peytî.

**Zîrekkirin** (k.jn.l.mê) Peytkirin. Zîxkirin. : Divê tu evsale xwe zîrek bi kî li xwendingehê. (K) bn: Kirin.

**Zîrevan** (hk.dar.çewa) Mirovê hez di ke her tiştî bi zane. Davdoz.

**Zîtik** (n.x.mê) Zîçik.

**Zîv** (n.x.mê) ***kanza*** Core kanzayeke bi bihaye, rengê wî ber bi sipî ve ye, mîna stovank, gustîl, ristik û htd bi kar di hînin.

**Zîvar** (hk.x.çewa) Hejar. Destkurt.

**Zîvarî** (n.dar.mê) Hejarî.

**Zîving** (n.x.mê) bn :Ziving.


**Zî<u>vî</u>** (hk.dar.çewa) 1. Tiştê rengê wî weke zîvî be.2. Cejina borîna 25 salan, ya avakirinê yan jinanînê. Cejinazîvî[yobîla zîvî].

**Zîv<u>ker</u>** (karn.dar.dz) Mirovê zîvî çê dike.

**Zîv<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) 1. Çêkirina zîvî.2. Tamdan bi zîvî.

**Zîv<u>kirî</u>** (hk.l.çewa) Hatî tamdan bi zîvî. Bi zîvî hatî poşîn.

**<u>Zîv</u>zîve** (n.dar.dz) ***candar adî*** Adîyeke gelek pê hene jihirdare. :Zîvzîvey bi destê wî ve da!.



**Zîvzîve**

**Zîv<u>zîvk</u>** (n.dar.mê) ***can*** Hestî yê pişta candaran, yê bi girê ji patikê tanî kilkê. :Zîvzîvka pişta mirovî ji çendîn girêyan pêkhatîye.



**Zîvzîvk**

**Zî<u>wan</u>** (n.x.mê) Giyayên bi ziyan yên di nav genim, ceh, birinc û htd hişîn di bin.

**Zîx** (hk.x.çewa) Zîrek. Peyt. :Kovan lawekê zîxe, li xandingehê.

**Zîx<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Zîrekbûn. :Kovan ne wek berê yê zîx bûy!. (K) bn: Bûn.

**Zî<u>xik</u>** (n.dar.mê) Tiştê sertîj. : Zîxikên mûyên rihdîna wî yên biser kevtîn.

**Zî<u>xî</u>** (n.dar.mê) Zîrekî.

**Zîx<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Zîrekkirin. :Xwe zîx ke da ser bi kevî!.(K) bn: Kirin.

**Zîz** (hk.x.çewa) Sil. Tore. Xemgîn. :Jina zîz. :Xortê zîz.

**Zîz<u>bûn</u>** (k.jn.l.mê) Bi silbûn ji mal derkevtin. Silbûn. :Jina wî zîz bû. :Kurik zîz bû.(K) bn: Bûn.

**Zîz<u>kirin</u>** (k.jn.l.mê) Silkirin. (K) bn: Kirin.

**Zom** (hk.cih,n.x.mê) Ciheke li çolî, xelik li havînan kepir û zincan

avan di ken lê akincî di bin, jibo çerandina kewalên xwe û bêhinvedanê.

**Zor** (hk.x.çewa,hn.çend ) 1. Kûtek. 2. Pir. Gelek. ***Pend*** :Zora zor jê di çin, kêma kêm jê di çin.

**Zoran** (n.dar.mê) ***yarî*** Core lîstineke, mirov xwe lêk di din kanê kî dê hevdijê xwe li erdî bi dit û ser kevit. Xwelêkdan.

**Zoranbaz** (pîşn.dar.dn) Mirovê rahatî jibo xwelêkdanê.Lîstikvanê xwelêkdanê.

**Zoranbazî** (n.l.mê) Xwe lêk dan.



**Zoranbazî**

**Zorandin** (k.jn.x.mê) Yarîya zoranê kirin. Xwelêkdan. (K) bdn: ez di zorînim em di zorînîn, tu di zorînî hûn di zorînin, ew di zorîne[….it] ewan di zorînin. Pr:dê[bi]+bdn. Bdb : di zorand, di zorandin. Db,dûr: zorandibû, zorandibûn. (F): bi zorîne, bi zorînin.

**Zordar** (hk.dar. çewa) Kesê zorîyê dike.Zirtek.

**Zordarî** (n.dar.mê) Kûtekî. Xurtî.

**Zordarîkirin** (k.jn.l.mê) Xurtî li xelik kirin. Kûtekîkirin.

**Zordest** (hk.l.çewa) Zordar. Zilhêz.

**Zordestî** (n.l.mê) Zordarî. Kûtekî.

**Zordestîkirin** (k.jn.gl.mê) Zordarîkirin. Xurtîkirin.

**Zorî** (n.x.mê) 1. Kûtekî. Xurtî.2. Pirînî. Gelekî.

**Zorîkirin** (k.jn.l.mê) Zordarîkirin.

**Zorker** (hk.l.çewa) Zordar.

**Zorkerî** (n.l.mê) Zordarî.

**Zorkerîkirin** (k.jn.l.mê) Zordarîkirin.

**Zorzan** (hk.l.çewa) Mirovê pir zana. Mirovê gelek di zanit.

**Zotik** (n.x.mê) Paşîya candar û mirovan.

**Zov** (n.x.nêr) ***candar adî*** Zîvzîve.

**Zozan** (hk.cih, n.x.mê) 1. Cihê fênik û dilveker li havînan. ***Pend*** :Zozan di xweşin bi koçerî. 2. Navê keçane.

**Zuha** (hk.x.çewa) Tiştê av jê veweryayî. Hişik. Ne ter. Ne şil. ***Pend*** :ji avê derkeft zirp û zuha.

**Zuhabûn** (k.jn.l.mê) Hişikbûn. (K) bn: Bûn.

**Zuhakirin** (k.jn.l.mê) Hişikkirin. Vewerandin : Cilikên xwe li ber agirê kuçkî zuha kirin. (K) bn: Kirin.

**Zuhakirî** (hk.l.çewa) Hatî zuhakirin.

**Zuhayî** (n.dar.mê) Hişkî.

**Zurbe** (n.x.mê) Revde. Bir. :Zurbeyeka guran. Dehban. Berazan.

**Zurne** (n.x.mê) ***mûzîk*** Zirna.

**Zuwa** (hk.x.çewa) Zuha.

**Zû** (hk.den) Berî dema pêdivî.Di dema xweda. Ne direng. : Zû were mal. Zû bi nive.

**Zûda** (hk.dem, dar) Pêşdem. Berî noke. Zû. Ji mêje. :Zûda ew li derveyî welat di mîne.

**Zûkirin** (k.jn.l.mê) Lezkirin. :Zû ke, heger heval dê te hêlin.

**Zûrezûr** (n.l.mê) ***deng*** Zîrezîr. Qîjeqîj. Nizeniz.

**Zûrezûrkirin** (k.jn.gl.mê) Zîrezîkirin.Girîn. Niznizkirin.

**Zûrîn** (n.dar.mê) Girîn. Zarzar. Zarzarkirin.

**Zûve** (hk.dem) Zûda.

**Zûxav** (n.dar.mê) Kêm .Edav.